

HEZAR Û YEK ŞEV

CILD 5, 6, 7, 8



Wergera ji Erebat

Menaf Osman

HEZAR Û YEK ŞEV (CILD 5, 6, 7, 8)

Çîrokên Gelerî

Navê Kitêbê Ya Orjinal: Elf Lêyle we Lêyle

Weşan: Darul Mearif, Misir, Kahîre, 2004

Ji Erebi Wergera Kurmancî: Menaf Osman

Çîrok: 06 / 18

Gerînendeya Weşanê

Eslîxan Yildirim

Sererastkirin

Eslîxan Yildirim - Serwet Deniz - Azad Zal

Berg û Rûpelsazî

J&J

Çapa Yekemîn

Weşanên Azad, 2022

Çapxane

Bizim Büro Matbaa Dağıtım Basım Yayımcılık San. Tic. Ltd. Şti. Sanayi 1. Cad. Sedef Sok.

No:6/1 İskitler Ankara

Sertifika No: 42488

ISBN: 978-605-81463-7-2

Sertifika No: 40407

NAVNÎŞAN

AZAD YAYINEVÎ

Viranşehir Mah.34330 Sk. No15 A/4

Mezitli/ Mersin

WEB: www.wesanxaneyaaazad.com

© *Mafê wê parastî ye. Ji bilî danasînê bêyî destûr bi tu awayî nayê kopîkirin û nayê belavkirin.*

HEZAR Û YEK ŞEV

CILD 5, 6, 7, 8



Wergera ji Erebi
Menaf Osman



Menaf Osman (Wergêr) , di sala 1965'an de li Heskê hatiye dinyayê. Xwendina xwe ya seretayî, navîn û lîse li wir kuta kiriye. Piştê li Zanîngeha Şamê, Beşa Jeolojiyê xwendiyê. Ji ber xebata xwe ya siyasî di sala 1993'yan de li Tirkîyeyê hatiye girtin û cezayê mûbedê lê hatiye birîn. Niha jî li Girtîgeha Girtî ya Tîpa T a Akhisar/Manisa (T-Tîpi Kapalı C. Evi-C/20 Akhisar/Manisa) de ye. Ji Frensî û Erebi wergerên wî hene, 7 roman û 2 kitêbê wî yê çîrokan hatine çapkirin; bi tevayî 13 berhemên wî hene. Romana wî ya bi navê **Girê Şêran** di 2017'an de hatiye qedexekirin. Wekî piraya zarokên Serxetî û Binxetî, gelek çîrok di derbarê sinorê di hundirê welatê xwe de bihistine û ev di berhemên wî de xwe didin der. Xebatên wî yê neçapkirî jî pir in. Heman demê hunermend e, wêneya jî xêz dike. Berga kitêba wî ya bi navê "SÎNOR" minakek jî van xebata ye.

Berhemên Menaf Osman:

Girê Şêran (Roman) , Weşanxaneya Aramê, 2003
Şîrok (Çîrok) , Weşanxaneya Lîsê, 2011
Namûsname (Roman) , Weşanxaneya Aramê, 2012
Silava Bajariyan (Çîrok) , Weşanxaneya Azad, 2013
Pîlîng-Şoreşname-1 (Roman), Weşanxaneya Arê, 2015 /Sinor (Roman)
 Weşanxaneya Aryenê, 2018
Hezar û Yek Şev-cild 1,2,3,4, (Wergera ji Erebi-çîrok) Weşanxaneya Azad, 2018
Mîrê Monte Krîsto-Alexandre Dumas (Wergera ji Frensîzî-Roman),
 Weşanxaneya Azad
Helbestên Xezablêhatî-Nîzar Qebannî (Werger ji Erebi-Helbest),
 Weşanxaneya Azad
Lênûska Leyla (Roman) , Weşanxaneya Aramê, 2018
Cuhû - Sebareya Zîdane 1 (Roman), Weşanxaneya Sîtav, 2019
Sol (Roman) , Weşanxaneya Aryen, 2021
Hezar û Yek Şev-Cild 5,6,7,8 (Werger ji Erebi-Çîrok) Weşanxaneya Azad, 2022

Hin berhemên ku li bende çapê ne:

Antolojiya Ehmed Hilmî El-Qoxî El-Diyarbekirî, Tîpguhêzî û berhevkerin
Baskên Şikestî (Roman-Cubran Xelîl Cubran) , Werger ji Erebi
Sêwî (Hektor Malot) , Werger ji Frensî
Belqîz, (Helbest-Nîzar Qebannî) , Werger ji Erebi
Hezar û Yek Şev-Cild 9,10,11,12, Werger ji Erebi
Çûkên Bêbask (Helbestên Mahmûd Derwîş) , Werger ji Erebi

NAVEROK

PÊŞGOTIN	9

HEZAR Û YEK ŞEV

CILD 5

(ÇÎROKA JOJÎ Û KEVOKÊ)	13
(ÇÎROKA MEYMÛN Û DIZ)	15
(ÇÎROKA ŞIYAR Û XEWAR)	17
(ÇÎROKA HEYVA ZEMAN, KURÊ MELÎK ŞEHRÎMAN)	69
(Çîroka Bidûr Xan û Jîyan Xanê)	117

HEZAR Û YEK ŞEV

CILD 6

(Çîroka Herdu Kurên Heyva Zeman, Emced û Eshed).....	139
(Çîroka Bexşê û Bexşo)	166
(ÇÎROKA ELADÎN EBÛ ŞAMAT)	187
(ÇÎROKA HATIMÊ TAÎ).....	233
(ÇÎROKA MAN BÎN ZAÎDE).....	234
(ÇÎROKA BAJAROKÊ LEPTA)	236
(ÇÎROKA HÎŞAM BÎN EBDILMELÎK Û KURIKÊ EREBAN)	237
(ÇÎROKA ÎBRAHÎM ÎBNÎL MEHDÎ Û EL-MAMÛN).....	239
(ÇÎROKA ABDULLAH BÎN EBÎ QULABE).....	244

(ÇÎROKA ÎSHAQE MÛSILÎ)	248
(ÇÎROKA HEŞAŞ)	253
(ÇÎROKA HARÛNÊ REŞÎD BI XELÎFEYÊ DÛYEMÎN RE)	256
(ÇÎROKA 'ELÎYÊ ECEM)	270
(ÇÎROKA HARÛNÊ REŞÎD BI ÎMAM EBÛ YÛSIF RE)	273

HEZAR Û YEK ŞEV

CILD 7

(ÇÎROKA XALID BÎN ABDULLAH EL QESRÎ)	279
(ÇÎROKA HARÛNÊ REŞÎD Û MIHEMEDÊ TIRAL)	281
(ÇÎROKA ELÎ ŞAR)	295
(ÇÎROKA HARÛNÊ REŞÎD Û ELİYÊ KURÊ MENSÛRÊ TOLAZ)	327
(ÇÎROKA XELÎFE EL-MAMÛN Û HER ŞEŞ CARIYEVAN)	339
(ÇÎROKA WERDANÊ QESAB Û JIN Û HIRÇÊ)	348
(ÇÎROKA JINÊ Û MEYMÛN Û XORTÊ QESAB)	351
(ÇÎROKA QRAL Û HERSÊ HEKÎMAN)	352
(ÇÎROKA MIROVÊ MIFLIS Û KODIKA BER KÛÇIK)	371
(ÇÎROKA LEŞKER Û DIZ Û WALİYÊ ÎSKENDERİYÊ)	373
(ÇÎROKA HERSÊ WALİYAN LI BER DESTÊ MELÎK NASIR)	374
(ÇÎROKA SERAF Û DIZ)	377
(ÇÎROKA HÎLEBAZ Û WALİYÊ QEWS)	378
(ÇÎROKA ÎBRAHÎMÊ MEHDÎ Û TACIR)	379
(ÇÎROKA JINA XÊRXWAZ Û BIRÎNA DESTÊ WÊ)	381
(ÇÎROKA XWIROŞKAR Û LÛLÛ)	383
(ÇÎROKA EBÛ HESSAN EL-ZEYYADÎ Û MAMÛN)	384
ÇÎROKA DEWLEMENDEKÎ KU ÇERXA FELEKÊ DI SER RE ÇÛ EW FEQÎR KIR	386

(ÇÎROKA ZILAM Û DEFÎNE)	387
(ÇÎROKA EL MUTEWEKIL Û MEHBÛBE).....	388

HEZAR Û YEK ŞEV

CILD 8

(ÇÎROKA INSELWICÛD Û WERDÊ)	393
(ÇÎROKA HARÛN REŞÎD Û ZUBEYDE XATÛN)	413
(ÇÎROKA KESRA ENÛŞREWAN Û KEÇIKA GUNDÎ)	414
(ÇÎROKA AVKÊŞ Û ZÊRKER).....	415
(ÇÎROKA JINA BAŞ A JI BENÎ ÎSRAÎLIYAN)	417
(ÇÎROKA CAFERÊ BERMEKÎ Û ZILAMÊ KAL)	418
(ÇÎROKA CIWANÊ KUJER Û OMERÊ XETAB).....	418
(ÇÎROKA EL MUTELEMÎS Û JINA WÎ)	422
(ÇÎROKA QERAŞ Û JINA WÎ Û CÎRANÊ WÎ).....	422
(ÇÎROKA XAFIL Û KER)	424
(ÇÎROKA EL HAKÎM BÎ EMRÎLLAH Û TACIR)	425
(ÇÎROKA QRAL XUSREV Û NÊÇÎRVAN).....	426
(ÇÎROKA CAFER BÎN MÛSA ELHADÎ Û EMÎN).....	427
(ÇÎROKA SEÎDÊ BAHILÎ Û BERMEKIYAN).....	428
(ÇÎROKA ME'MÛN Û PÎRAMÎDÊN MISRÊ)	429
(ÇÎROKA TOBEKAR Û DIZ).....	430
(ÇÎROKA ÎBNIL FARABÎ Û REŞÎD Û MESRÛR).....	432
(ÇÎROKA KURÊ HARÛN REŞÎD Ê ZAHID)	433
(ÇÎROKA MAMOSTEYÊ ZAROKAN-1)	437
(ÇÎROKA MAMOSTEYÊ ZAROKAN – 2)	439
(ÇÎROKA MAMOSTEYÊ ZAROKAN – 3)	440
(ÇÎROKA QRAL Û JINIKÊ Û MÊRÊ WÊ).....	441
(ÇÎROKA ÎSHAK BÎN ÎBRAHÎM EL-MÛSILÎ).....	442

(ÇÎROKA EBÛ BEKİR EL-ENBARÎ Û ABDILMESÎHÊ KEŞÎŞ)	445
(ÇÎROKA MÎRZAYA MEŞAYIXAN)	449
(ÇÎROKA MIROVÊ MEXRIBÎ Û TEYRÊ REX)	454
(ÇÎROKA HIND BINT ENNÛMAN Û ÛDEY BÎN YEZÎD).....	455
(ÇÎROKA EBÎ ÎSA BÎN REŞÎD Û NÛRA ÇAVAN).....	456
(ÇÎROKA ELİYÊ MISRÎ KURÊ HESEN EL-CEWHERÎ).....	460
(ÇÎROKA HECÎ Û PÎREJINA SALIH).....	476
(ÇÎROKA ELÎ BÎN MUHAMED BÎN ABDULLAH BÎN TAHİR Û MÛNISA CARIYE)	478
(ÇÎROKA EBÛL HESEN Û CARIYEYA WÎ TEWEDÛD BI HARÛN REŞÎD RE)	479
(ÇÎROKA MELÎKÊ MIRINÊ).....	513
(ÇÎROKA JINA QENC A DI NAV BENÎ ÎSRAÎL DE)	514
(ÇÎROKA JINA SALIH BI MÎRZAYEKÎ RE LI MEKKEYÊ)	517
(ÇÎROKA ZILAMÊ CIHÛ YÊ QENC).....	519
(ÇÎROKA ÎBRAHÎM ÎBNIL XEWAS Û KEÇA SILTAN)	522
(ÇÎROKA CIHÛYÊ DURUST).....	524
(ÇÎROKA KURÊ DANYAL).....	528
 PÊVEK.....	 533
JI KITÊBA 1'EMÎN - HEZAR Û YEK ŞEV (CILD 1-2-3-4).....	533
NAVEROK	535
PÊŞGOTINA WERGÊR.....	539
JI WEŞANXANEYA AZAD	543

PÊŞGOTIN

Kitêbên çîrokên “HEZAR Û YEK ŞEV” ê ji 12 cildan pêk hatiye. Menaf Osman di hepsê de ev xebata bêhempa kiriye û 12 cild ji Erebi wergerî Kurdî kirine, yanî berhem bi tevayî qedandiye. Wek Weşanxaneya Azad, me di 2018'an de 4 cild çîrokên “HEZAR Û YEK ŞEV”ê wek yek kitêb çap kiribû. Niha dîsa em çar cildên din di yek kitêbê de diweşînin. Wek ku me di kitêba pêşî de îfade kiriye, çîrokên “HEZAR Û YEK ŞEV”ê di dinyayê de kitêba herî naskirî ye û wergerî bi sedan zimanî bûye. Ya herî girîng ev çîrok yê civat û herêma me ne û li tevaya dinyayê bela bûye, ji gelek berhemên edebî, filman... re bûye bingeh. Ji bo van agahîyan, hûn dikarin li pêşgotina pirtûka l'emîn (cild 1-2-3-4) ya wergêr Menaf Osman û nivîsa destpêkê ya weşanxaneyê ya di dawîya vê pirtûkê de binerin. Piraya lêkolîneran jî dibêjin, di dinyayê de di warê zargotin û çîrokan de Kurd û Kurdistan di rêza pêşiyê de ye. Lê ji ber bêdewletbûn û astengîyan ev zêde nayê xuyakirin.

Ji bo ev xebat bigihe ber destê hemû xwendevanan me kitêba l'emîn (cild 1-2-3-4) li ser înternetê bela kiriye. Di ser malpera weşanxaneya me re, digel hin berhemên din, herkes dikare bêheq xwe bigihîne pdf a wê (<https://we-sanxaneyazad.net/index.php/pirtuken-pdf/>). Heman demê Reşad Sorgul hin ji wan çîrokan xwendine û vîdeoyên wan di youtubê de bela kirine; yê bixwaze dikare li wan guhdar jî bike. Berî ev kitêba 2emîn bê xwendin, kitêba ewil di ber çavan re bê derbaskirin wê baş be.

Mijara çîrokan, bi serpêhatîyên Melîk Şehriyar û birayê wî Şahzeman dest pê dike ku herdû ji aliye jinên xwe ve hatine xapandin. Gava Melîk Şehriyar bi vê dihise, jina xwe û hevkarên wê dikuje; ji wê rojê bi şûn de, her şev keçekê ji xwe re tîne qesrê, pê şa dibe û dûvre wê dide kuştin. Xelk ji vê zulme perişan bûne, hin ji wan keçên xwe ji bajêr bidûr xistine. Dema keç li bajêr namînin, wezîr dikeve qelaqê, nema zane wê çawa bike. Qîza wezîr Şehrezad rewşê fêrî dike û bavê xwe îkna dike ku vê carê wê ji Melîk Şehriyar re bibe. Fikarek Şehrezad heye û hêvî dike ku bi vê plana di serê xwe de wê her tişt bê guherîtin. Şehrezadê her şev çîrokên sîdewer, balkêş ji Melîk Şehriyar re dibêje û ji bo berdewamiya vegotina çîrokan, ji hêrsa melîk xelas dibe û nayê kuştin... Çîrok 1001 şevê berdewam dîkin. Di kitêba ewil de (cild 1, 2, 3, 4) ya ku me di 2018'an de çap kiribû, çîrokên ji şeva 1emîn heya şeva 154'emîn cih digre. Niha dîsa em çar cildên din, yanî cildê 5, 6, 7 û 8'an di yek kitêbê de çap dîkin. Ev pirtûka 2yemîn jî bi çîrokên berdewamiya şeva 154'emîn dest pê dike, heya şeva 484'emîn dom dike. 4 cildên din yê mayî, yanî cild 9, 10, 11 û 12 jî karê wan û amadekariya ji bo çapkirinê dom dîkin. Ew jî ji çîrokên şeva 485'emîn dest pê dike heya şeva 1001ê.

Li ser vegotin û mijarên van çîrokan hewcedarî bi xebatên cuda cuda û berfireh heye; ev bi serê xwe mijarên kitêbin din in. Lê bi çend hevokan be jî

ez dixwazim balê bikşînim ser hin ji wan. Her çiqasî çîrok ne yê herêmeke teng be jî, dema çîrok li herêmekê bê vegotin, ew çîrok li gor wê herêm û demê û li gor serdestê wê herêmê tên guhertin. Ev çîrok di dema serdestiya dewletên ku bi navê îslamîyetê bi rê ve dihatin meşandin hatiye berhevkirin. Loma di hin çîrokan de wesîfdana hin xelîfeyan derdikeve pêş, li gelek cihan propaganda îslamê û kêmxistina dînên din xwe dide xuyakirin. Wekî dîn, di hin cihan de, li gor berjewendiyên desthilatdaran çawa dîn hatiye bikaranîn jî xwe dide der... Ji ber ku wê demê, axaftin û sohbeta di şevbuhêrkan de cihê perwerdehiya herî bi bandor bû, tesîra çîrokan li ser civatê pir zêde bû; şikil dida şeqsiyetê, dida civatan û dan û stendinan... Ji ber van sedeman, dema mirov van çîrokan bixwîne, gerek mirov wan li gor demê û şertan şîrove bike.

Wekî dîn, werger karekî pir hasas e û xebatên ku bi zanebûn bêne kirin pir hêja ne. Di wergeran de dewlemendiya zimanan xwe dide der, wêje bi pêş de diçe û ji xebatên nû re dibin bingeş. Ev xebat pir bi zehmetî têne meşandin û heger xebatkar di zindanan de bin, bi wan derfetên kêmtir zehmetî pir zêdetir dibe. Wek ku tê zanîn, xebatên wêjeyî yê di zindanan de heya ku digihe ber destê me, heya derbasî kompîturan dibe gelek wext derbas dibe. Ji ber ku em nikarin bi nivîskar, yan wergêr re rasterast di têkiliyan de bin jî, xebatên wan pir bi zehmetî têne weşandin. Loma piştî demek dirêj û xebatên bi fedekarî ev berhem digihin ber destê we. Di gel ewqas bergirî û kêmdarfetiyên Menaf Osman wergerek pir delal kiriye; hem di helbestan de, hem di vegotinan de pir serkeftî ye. Em spasdarê wî ne ku ev berhema bêhempa diyarî Kurdî kiriye. Di vê berhemê de, kesên bûne alîkar jî pir in; di derbaskirina kompîturê de ya destnivîsan, malbata Menaf Osman kedek mezin dide. Di 2 cildê pêşî de ji Komeleya Nivîskarên Mezra Botan ya li Mêrdînê Omer Akın, Bahaddîn Robar û Eyyûb Guven; di derbaskirina kompîturê de bûne alîkar. Yek bi yek em spasî hemûyan dikin.

Wek ku tê zanîn, bikaranîna Kurdî li gor herêman tê guhertin û hîna standartkirinek tekkûz pêk nehatiye, loma hin gotin cuda hatine bikaranîn û me nexwest em wan biguherin. Wek mînak; geh “siltan” geh jî “sultan” hatiye bikaranîn, geh ‘cêrî’ geh jî ‘cariye’ hatiye bikaranîn; ev herdu şikil jî di nav gel de têne axaftin, me jî xwest bi herdu lewna jî tê de cih bigre. Min bixwe redaksiyona cildê 5 û 6’an çêkiriye, redaksiyona cildê 7 û 8’an Serwet Denîz û Azad Zal çêkirine û min dîsa di ber çavan re derbas kirine. Ji ber ku 4 cild bi hev re tîr amadekirin, ev pêvajoyê gelek dem distînin. Wek ku di 4 cildê ewil de jî min diyar kiribû, ji ber ku wergêr Menaf Osman di zindanê de bû û danûstendina me ne hêsan bû; di sererastkirina dokumanan de em zêde diteqîn û bi destûra Menaf Osman hin caran me insiyatîfa xwe bikar anîye. Piştî vê kitêbê, wê xebata çapkirina cildê 9, 10, 11 û 12 dest pê bike, em hêvî dikin di demeke kin de em bikaribin wan jî bigihînin ber destê we.

Gerînendeya Weşanxaneyê Azad

Eslîxan Yildirim

HEZAR Ū YEK ŞEV

CİLD 5

(ÇÎROKA JOJÎ Û KEVOKÊ)

Şehrezadê got:

Şahînşahê min î bextewar! Tê gotin ku di zemanekî de joiyek hebûye ku mala xwe li ber qurmê dareke xurmeyan çêkiribû. Kevokê bejî û jina xwe jî, hêlîna xwe li ser şaxekî heman darê çêkiribû ku jiyana xwe di nav xêr û bêrê de derbas dikirin. Dibêjin, rojekê ji rojan jojî ji xwe re got: “Kevok bi rehetî ji berên vê darê dixwe, jiyana xwe pê berdewan dike û yê min, ez nikarim vê yekê bikim. Divê xap û rîpekê bikim da ku ez jî rêyekê ji xwe re vekim û debara xwe bikim!”

Dibê, piştî, hat ji xwe re qulek kola di ber qurmê darê de û wê derê ji xwe re kir mal, ew û jina xwe, tê de rûniştin. Li kêleka malê jî, cihekî xilwetê ji xwe re çêkir ku carinan ew bi tena serê xwe diçû; tê de rûdinişt, îbadet û taeta xwe dikir û destên xwe ji malên dinyê dikişand.

Ji xwe Kevok bi xwe jî mirovekî oldar û bawermend bû. Loma çawa ku ew oldarî li dora jojî dît, dilê wî bi ser ve çû û jê re got: “Gelo çend salên te çê bûne ku tu di vî halî de yê?” Jojî got: “Sih salên min e.” Kevokê got: “Xwarina te çi ye gelo?” Got: “Hema çi ji darê bikeve xwarê.” Got: “Kinc û bergên te çi ne?” Got: “Hinek strî ne ku ez xwe pê disitirînim.” Kevokê got: “Û te çima ev cih ji xwe re hîlbijart gelo?” Got: “Ji ber ku tu rê û rêçik di vir re nediborin min vir hîlbijart, ji bo kesên ku riyê xwe şaş bikin û di vir re derkevin, ez rê nîşanî wan bidim û alîkariya wan bikim.” Kevokê got: “Min qet nizanîbû ku tu mirovekî ewqasî başî, dilê min bijîya vê jiyana te ya bi vî şeklî!” Jojî got: “Ez ditirsim ku gotina te berevajî kare te be û di encamê de, tu jî mîna wî cotkarî yê ku dema wextê çandiniyê dihat, destê wî li bizir nedigeriya û digot ez ditirsim ku dema çandiniyê derbas bûbe, bila bizrê min bi avê de neçe, lê gava ku wextê çinînê dihat û xelkê berên xwe radikirin poşmam dibû û digot xwezîka min jî biçanda û bi êşa wê poşmaniyê nexweş diket, diçû!”

Kevokê got: “Naxwe ka tu şîretekê li min bike û bêje bê ez çawa bikim,?” Jojî jê re got: “Kesekî qanî be, çavbirçî nebe û hertim xwe ji bo roja qîyametê amade bike, dê besî te be.” Kevokê got: “Ez ê çawa bikaribim tiştekî wîsa bikim û ez tenê teyrek im ku ez nikarim ji ser vê darê dakevim, da ku ez bikaribim debara xwe li ser bikim. Ji xwe ez bixwazim jî ez nikarim herim li cihekî din bi cih bibim?” Jojî jê re got: “Tu û jina xwe hûn dikarin qederekî mezin ji xurmeyên vê darê bi qasî ku salekê têra we bike dawêşînin; bixin erdê û hûn jî mîna min kunekî di biniya darê de çêbikin, ji bo

ku hûn tê de bi rehetî îbadeta xwe bikim û di rêça xwedayê xwe de bijîn. Ev rêbazeke baş e ji jiyaneke watedar. Ji xwe gava we têra xwe xurme dawesandin û têra salekê kom kirin, dê wextê we yê vala pir bimîne ji bo sewm û selat û îbadetê. Heger hat û qewimî, erzaqê we qedîya jî, hûn dikarin bi rehma Xwedê têr bibin û xwe ragirin hetanî sala dîtirkê.” Kevokê got: “Xwedê ji te razî be û temenê te dirêj bike, ji ber vê qencîya ku te bi min kir û rêya rast da ber min.”

Kevokê nêr û jina xwe, mil dane hev û dest pê kirin xurme ji darê weşandin hetanî ku ber pê ve nehiştin. Jojî jî têra xwe xwar û ê mayîn jî kom kir hetanî ku kuna xwe pê dagirt. Piştê di dilê xwe de got: “Gava ku pêdiviya kevokê û jina wî bi qût çêbibe jî, dê were xwe li min bigire û ji min bixwaze. Ji xwe bawerîya wî jî pir bi min heye ji ber teqwaya min.” Lê gava ku Kevokê elametên bêbextiyê li dora wî dîtîn, jê re got: “Çima gotin û emelê te hevdu nagire û tu sibehê bi awayekî, evare bi awayekî tevdigerî? Qey tu nizanî ku xwedayekî bindest û mazlûman jî heye? Baş baldar be û xwe dûrî xap û rîpan bigire, bêbextiyê bi cîranê xwe re meke da ku tiştê bi serê wan kesên ku bêbextî li tacir kirine, hatiye serê wan, bi serê te de ji neyê!” Jojî got: “Û ew çawa çêbûye?”

Kevokê got: “Tê gotin ku li bajarekî bi navê Senda, tacirek hebûye ku gelek mal û mulkê wî hebûye. Vêca ew tacir, rojekê ji rojên Xwedê, malekî mezin amade dike, li ser piştê deveyan bar dike, dişidîne, kerwanê xwe tekûz dike û dikeve ser rê de, ji bo ku here wî malê xwe li bajarin dîtir bifiroşe. Du mirovên fenek û hîlebaz jî dikevîn pey wî de û ew jî hinek malên firotinê li gel xwe radikîn, dibin, çawa ku ew jî tacir bin. Ji xwe mirovê tacir jî wana wisa nas dike. Piştî meşeke dirêj, navber dan rêwîtiya xwe û li xanekê rawestîyan, lê bûn mêvan. Lê hîna ji şeva yekê de, herdu hîlebaz lê bûne yek û ew şelihandin, malên wî jê dizîn û çûn. Lê belê bi rê de, şeytan ket dilê wan de û herduyan nêr li hevdu xera kirin. Yekî ji wan di dilê xwe de got: Heger ez wî bixapînim, dê evqasê mal hemû bi min bimîne! Yê dîtirkê jî di heman tiştî de fikirî. Loma, herduyan jî ji hev re xwarin amade kirin û jehr xistin nav de. Di encamê de herduyan hevdu kuştin. Tacirê ku li pey wan dihat, gîha ser cendekên wan. Li bêrikên wan geriya, zêr û zivên xwe tê de dîtîn û baş tê ghişt ku herdu zilam diz û bêbext bûne. Malê xwe ji ser wan rakir û dişa bi rêya xwe de çû.”

Şehrîyarê gewre ji Şehrezadê re got: “Bi vê çîroka xwe te ez şiyar kirim û hişê min kişand ser mijarekê ku ez tê de xafil û bêagah bûm. Gelo di vê mijar û babetê de çîrokin din ji li ba te hene?”

Şehrezadê got:

Belê Şahînşahê min, li ser seran, li ser çavan, ez ê bibêjim.

(ÇÎROKA MEYMÛN Û DIZ)

Şehrezadê got:

Şahê min î gewre û mehrîban! Tête gotin ku li welatekî zelamekî xwedî meymûn hebû ku li ser rûyê erdê diz mîna wî tunebûn; diçû kîjan sûka bajêr, destvala venedigeriya û her car, gelek malên giranbuha bi xwe re dianî malê.

Rojekê mirovekî ku kirasekî perpitî xistibû destê xwe de; daketibû sûka bajêr, ew kirasê xwe xistibû mazadê û li ser wî gazî kiribû, ji bo ku wî bifiroşe. Lêbelê, kirasê xwe nîşanî kê dabû, wan piştî xwe dabûnê û jê nekiribûn. Gava ew mirov ji gera li nav sûkê aciz bû û betilî, kirasê dest xwe xist buxçîkekê û çû ji xwe re li goşeyekê rûnişt, piştî xwe da dîwarekî da ku bêhna xwe berde. Wê gavê, ew zîlamê diz ê xwedîyê Meymûn jî çav lê ket, çû cem wî, li kêlekê rûnişt. Meymûn li raserî wî reqîsî û lîst, bala wî kişand ser xwe; diz jî fersand dît û ew buxçîka wî jê dizî û ji wir rabû, dûr ket.

Zîlamê dizek li gel Meymûnê xwe çû devereke aram û xalî. Li wê derê rûnişt, buxçîka xwe li ber xwe danî û ew vekir. Lê meyzand, dît ku kirasekî kevnîk û perpitî tê de ye. Ew ji wir derxist û ew xist nava buxçîkek nû û biroqankî. Dûvre berê xwe da sûkeke din û buxçîka xwe ya xweşik da ber bazarê, bi şertê ku neyê vekirin. Gava xelkê dît ku buxçîkek bi qeseb û xweşik e, hem jî erzan û ne buha ye, hemû lê hatin hev. Zîlamê ew buxçîk eciband, şertê nevekirina wê qebûl kir, ew kirî û berê xwe da malê, çû ew buxçîk bir ji jina xwe re.

Gava ku jinik çav li buxçîkê ket, ji mêrê xwe re got: “Ev çi ye?” Mêrê wê got: “Malekî erzane, min ew bi pereyekî hindik kiriye. Ez ê wî bibim sûkê, bi pereyekî giran bifiroşim. Jîna wî jê re got: “Mago! Qey xelk ehmeq in tişteki erzan bifiroşin te ku ne malê diziyê be. Ma qey tu nîzanî ku kirîna tişteki beyî ku bê raçavkirin şaşitîyeke mezin ê û dibe belayeke mîna ya terzî bi serê mirov bê” Mêrê wê got: “Û ew çîroka terzî çawa ye gelo?”

Jîna wî jê re got: “Tête gotin ku Terziyek hebû ku li gundan digeriya û bi kedeke mezin debara xwe dikir. Vêca mirovekî maldar jî nêzikî wan de-veran hebûye ku rojekê xêrek daye û welîmeyer li dar xistîye, hemû xelkên wê deverê vexwendine ser welîmeya xwe. Di nav wî xelkî de Terzî jî hebûye, ew jî çûye ser welîmeya wî mirovê maldar û li wir dîtiye ku kesên xwedî cilûbergên xweşik, xwarina xweş têne ber wan û xwedîyê malê jî bi rêzdari nêzikî wan dibe û qedrê wan digire. Gava ku ew dîmen dîtiye, di dilê xwe de ji xwe re gotiye: Heger ez vê pişeya xwe biguherînim bi yeke din û diravî pirtir qezenç bikim; ez ê jî bikaribim kincin xweşîktir li xwe bikim û bibim maldarekî mezin î ku herkes rêzdariyê ji min re bigire. Ez ê bibim mirovekî mezin di çavên xelkê de!

Piştire bala xwe didêyê ku yek ji nav vexwendêran radibe diçe bi sûreke bilind ve hildikêşe; diçe ber birca wê û ji wir xwe davêje erdê, li ser lingan dikeve bêyî ku tiştek pê were, ango devereke wî bişkê. Wê çaxê, ew jî ji xwe re dibêje: Bêgûman ez jî dikarim mîna vî zilamî bikim û xêlkên derdorê gişan şaşwaz bikim. Rabû ser xwe û ew jî bi sûrê ve hilperikî, çû ser birceke bilind û ji serê bircê xwe berda xwarê. Li ser stûyê xwe ket, stûyê wî şikiya û mir. Vêca min çiroka vî tamakarî ji te re got, ji bo ku tu jî tamakariyê nekî û serê xwe nexî beleyan.” Mêrê wê jê re got: “Ne her kesê zana dikare xwe bisitirîne bi zanebûna xwe û ne jî her kesê nezan li belayan diqelibin ji ber nezaniya xwe. Dibe ku mirovek kedîkirê maran û zanayê wan be, lê dîsa jî roj tê ku mar pê vedide û wî dike. Dibe ku yekî din î ku tiştekî ji maran fêm nake, bikaribe xwe ji wan bisitirîne.”

Lewre, mirov guh neda hişiyariya jina xwe û her car malên diziye bi erzanî ji dizan kirî û anî malê, hetanî ku serê wî ket belayekê ku nikaribû xwe jê xelas bike û tê de çû.

Vêca di wê dewranê de, çûkek hebû ku bênavber digeriya û her roj diçû serdana mîrekî teyran. Ji cem mîrekî diçû cem yekî din. Îcar li çiyayekî nêzîkî wê dewerê jî, komeke teyr û tilûr li hev civîyabûn, yekî ji yên din re gotibû, “Vaye em jî pir bûne û êdî hêdî hêdî pîrsgirêk û nexweşî di nava me de derdikevin. Divê ji îro û pê de mîrekî me hebe ku pîrsgirêk û xilafên nava me çareser bike, me bigihîne hev û gotina me bike yek.”

Di wê navberê de ew teyrê gerok rêya xwe bi wan xist û ji wan re pêşniyar kir ku Teyrê Tawis ji xwe re bikin şah. Lewre Tawis dostê wî bû û her car rêya xwe pê dixist. Wan jî bi ya wî kirin û Tawis ji xwe re hîlbijartin; ew kirin şah li ser serê xwe. Tawis jî, bû şahekî baş ji wan re û qencî bi herkesî kir. Ew teyrê han jî ji xwe re kir wezîr û katip. Teyr jî geh wezîrtî dikir ji Tawis re, geh jî bi karen din dadiket.

Rojekê Teyrê gerok nehat dîwana şah, Tawis jî li ser wî ket qelaqê û bi bêsêbrî li hêviya wî ma. Gava ku Teyrik bi derengî hat, Tawis jê re got: “Tu hetanî niha li ku bû û çi hişt ku tu ewqasî dereng bikeve ji civata min?” Teyrik got: “Çavên min li tiştekî ket, gûman bi min re çêbûn, loma ez dereng ketim.” Tawis got: “Te çi dît?” Teyrik got: “Min zilamek dît ku dehfikek di destê wî de ye û diçe, wê li ber kuna min vedide, benê wê girêdide û libeke genim jî dixê nava wê de. Ez jî li dûrî wê rûniştim û min çavdêrî kir bê ka çi diqewime. Di wê navberê de, min bala xwe dayê ku çûkek li gel jina xwe ji wê ve tê. Qedera wan, ew birin ser dehfikê û ketin nava wê de. Piştire waqe waq û care car bi wan ket, nêçîrvan jî hat ew girtin, birin. Wê bûyerê ez aciz kirim û sebeba derengmayîna min jî ev bû padişahê min, mîrê çol û beyaran! Jixwe ji tirsan, ez jî nema dikevim wê kuna xwe de û naçim ser hêlîna xwe.” Tawis jê re got: “Ji warê xwe dûr nekeve û here ser hêlîna xwe,

lewre ku qedera mirov hatibe, reva ji qederê negengaz e.” Teyrik bi ya şahê xwe kir, serê xwe hejand û got: “Ez ê bi ya şahê xwe bikim û ez ji hêlîna xwe dûr nakevim.”

Teyrik ji aliyekî ve li xwe miqate bû û ji aliyekî din ve ji xizmeta şahê xwe fikir û xwarina wî jê re dibir, li ber wî rûdinişt hetanî ku şah têr dixwar û ji ser xwarinê radibû. Piştî ew ji radibû ser xwe û diçû mala xwe. Rojekê gava ku bi rê de dihat, bala xwe dayê ku du çûk, pevdikevin li ser rûyê erdê. Wê gavê Teyrik ji xwe re got: Çawa ez wezîrê şah im û du çûk li ber çavên min pevdikevin û ez li himber vê yekê bédeng im? Bi navê Xwedê ez ê herim wan li hev bînim! Rabû ser xwe, çû cem wan ji bo ku wan li hev bîne. Lê çawa ku gîha cem wan, nêçîrvan tora xwe li wan anî hev û hersê girtin. Nêçîrvan hat Teyrik ji torê derxist û ew bir, da dostê xwe û jê re got: “Çûkekî baş qelew e, tu ji lê miqate be!” Teyrik di dilê xwe de got: Tiştê ku ez timî jê ditirsiyam, bi serê min de hat! Naxwe Tawis pir rast digot, reva ji qederê negengaz e, gava ku qedera mirov bê, xelasî tune ye û tevdîr ji bê encam e. Wî helbestkarî çiqasî rast destnîşan kiriye gava ku gotiye:

Tiştê ku tunebe, bi hîleyan nabe
Tiştê ku hebe, jixwe dê hebe
Her tişt wê di wextê xwe de be
Birayê nezaniyê ji her di xefikê de ye

Wê kêlikê Şehreyar gotina Şehrezadê birî û jê re got: “Şehrezad, kanî hinek çîrokên din ên mîna vêna ji min re bibêje!” Şehrezadê got: “Heger Şahînşahê gewre min bihêle hetanî şeva pêşiya me, ez ê jê re bibêjim.”

Xwişka wê Dinyazadê ket navberê û got: “Vegotina te çiqasî xweş û şîrîn e xwişkêcan! Tu çiqasî dîlnaz û şêrîn î!” Şehrezadê got: “Tew tew Dinyazad, ma qey ev ji tişteke li ber çîroka Şiyar û Xewar ku tu çîrok mîna wê erjeng nînin?” Şehreyar got: “Îcar ev çîroka Şiyar û Xewar çawa ye?”

Li Şehrezadê bû sibe, wê ji vegotina xwe birrî.

ŞEVA 155'EMÎN

(ÇÎROKA ŞIYAR Û XEWAR)

Şehrezadê got:

Ey Şahînşahê dem û zemanan, gewretirîn şahê mîr û began! Tê gotin ku di dema xîlafeta Harûn Reşîd de, zilamekî tacir hebû ku navê kurê wî Ebûl Hesen Elxelî bû. Vêca gava bavê wî mîr, hemû maldariya xwe ji kurê xwe re hişt. Kurê wî Ebûlhesen, ew malê ku ji bavê xwe mîras girtibû, kir

du beş. Beşek jê ji xwe re hilanî jî bo rojên teng û beşa din jî da ber destê xwe, ji bo debar û jiyanê. Êdî ew jî pozbilind bû û edî bi zarokên tacir û maldaran re hevaltî kir, mazûbanîya wan kir, xwar û vexwar bêhed û hesap, hetanî ku rojek hat û ew diravên wî giş qedîyan. Piştî ku pereyên wî qedîyan, kesî nema lê pirsî, heval û hogirên wî dev jê berdan û bi tena serê xwe ma. Dilşikestî vegeyriya malê û çû cem diya xwe, çiroka xwe jê re vegot ji serî hetanî binî. Diya wî jê re got: “Ebûlhesenê min, binêre kurê min; ciwanên vê serdemê hemû wisa ne! Gava ku malê te hebe, xwe nêzikî te dikin û li derdora te kom dibin, gava ku malê te tunebe jî, ji cem te diçin.”

Dilê diya wî pê şewitî û hewl da ku li ber dilê wî here û bê. Ew jî xemgîn bû, hêsir barandin û ew çend beyt di ber xwe de gotin:

Dost li gel min namînin gava ku ez bêdirav bim
Dema ku diravên min pir dibin, dost jî pir dibin
Xwedê dizane bê çend kes ji bo diravan bûn dost
Û çend heb jî bûne dujmin dema ku bê mal im

Piştî rabû ser xwe û çû ew cihê ku nivê malê xwe tê de veşartibû. Ew pereyên xwe ji wir derxistin ji bo ku jiyanê bextewar ji xwe re saz bike û sûnd xwar ku careke din hevaltîyê bi wan kesên berê re neke. Biryar da ku hevaltîyê bi kesên xerîb re bike, ew jî bi qasî şevêkî tenê bi wan re bimîne, ne zêde; da ku gava bibe sibe û lê rast bê jî, nema wî nas bike. Lewma ji xwe re kir adet ku her şev here li ser pirê rûnê, hetanî ku xerîbek were lê rast bê û ew jî wî bi xwe re bibe malê, pê re şevbuhêrkê bike hetanî şevêqê, piştî wî bi rê bike, bişîne û careke din nema nêzikî wî bibe, ne jî silavêkê bidêyê angî wî vexwîne mala xwe. Salekê sax bi wî hawî tevgerîya.

Rojekê, dîsa mîna her car li ser pirê rûniştibû li bendî mêvanekî xerîb, da ku wî bibe mala xwe û şevbuhêrkê xwe pê re derbas bike. Xelîfe Harûn Reşîd û xizmetkarê wî Mesrûr jî, cil û bergên xwe guhertibûn, xwe xistibûn qelafetekî din de û ber bi wî ve dihatin. Çawa ku gîhan hinda wî, Ebûl Hesen bi wan ve rabû û ji wan re got: “Gelo hûn dixwazin bi min re werin mala min, ser şivê, da ku em bi hev re goştê biraştî bixwin û şerabê bi ser de vexwin?” Xelîfe got: “Na” û qebûl nekir. Lê belê Ebûl Hesen tikan jê kir û got: “Ezbenî tu bi qedrê Xwedê bikî tê min neşikîni û tê bi min re were malê, li cem min bibi mêvan!” û hey ji wê daxwaza xwe bi şûn de venegeriya hetanî ku Xelîfe got: “Bila be” û daxwaza wî qebûl kir.

Ebûl Hesen pir kêfxweş bû bi erêkirina Xelîfe. Piştî, da pêşiya wan, sohbeta xwe jî bi wan re berdewam kir hetanî ku gihîştin malê û ew derbasî hêwana xwe kirin. Xulamê wî danî ber derî û Xelîfe jî li ser berrê da rûniştandin. Piştî çû jê re hinek xwarin û vexwarin anî, li gel wî rûnişt li ser sifrê û bi hev re xwarin hetanî ku jê têr bûn. Xwarin rakir, destên xwe û yên mêvanê xwe şûştin, dûvre şerap anî, li raserî wî rûnişt û bi hev re vexwarin.

Her ku tasa mêvanê wî vala dibû, dîsa jê re dadigirt û guftûgoya xwe pê re berdewan dikir. Comerdiya wî pîr bandor li Xelîfe kir, jê re got: “Xorto tu kî yî? Hela xwe bide nasîn da ku ez xelatekê bidime te?”

Ebûl Hesên bişîrî û jê re got: “Ezbenî çîroka min kûr û dûr e. Tiştê çûyî bi şûn de venagere. Xwezîka di demeke din de ez û tu rastî hev bihatina lê heyhat!” Xelîfe li ber wî geriya û got: “Û çima wisan? Çima tu derdê xwe bi min re parve nakî?” Ebûl Hesên got: “Mîrzayê min, çîroka min erjeng e û ew jî ji ber sebebekê ye!” Xelîfe got: “Û ew sebeb çi ye?” Ebûl Hesên got: “Sebeb gunehkarî ye!” Xelîfe keniya, çawa ku jê bawer nekiribe.

Ebûl Hesên axaftina xwe berdewam kir û jê re got: “Ez ê hewl bidim ku vê mijarê, bi çîroka Pîro û Xwarinpêj ji te re rave bikim mîrzayê min. Mêrekî pîr hebû ku rojek hat û tiştek di destê wî de nema ku debara xwe û malbata xwe pê bike. Dinya lê hate hev, cih lê teng bû û sebîr pê re nema. Çû ji xwe re raket û nema rabû ser xwe hetanî ku rokê li serî da, ew gêj kir û kefe di devê wî re avêt. Piştî rabû ser xwe, lê derhemek tenê jî di bêrikê de nemabû û nizanîbû bê wê çi bike. Bi nava sûkê ve meşîya hetanî ku di ber xwaringehê re derbas bû ku xwediyê wê beroş û taweyên xwe li ser agir danîbûn û bêhnna rûnê qelandî ji wan difûriya. Xwaringehê wisa tekûz bû ku her tiştê wê nû paqij kiribûn. Pîro hat cem xwarinpêj û jê re got: “Kani bi nîv derhemî goşt, bi çarîkekê xwarinê û bi çarîkeke din ji nan bide min!”

Xwarinpêj bi fermokarî ew derbasî hundur kir, daxwazên wî jê re wezinandin û danîn ber wî. Mirovê pîr jî ket ser xwarina xwe û bi dilbijokî xwar hetanî ku binê lalîkan giş alastin. Lê belê bê çare bû û nizanîbû bê wê heqê xwarinê çawa bide! Serê xwe li dora xwe zivîrand û çavên xwe li nava dikanê gerand. Mekebeke serdevkirî dît, destê xwe avêtê, ew rakir, dît ku teriya hespekî di bin de ye ku hîna xwîn jê dinisile! Tê derxist ku Xwarinpêj goştê hespan çêdike li şûna goştê pez. Çawa ku ev fena Xwarinpêj zeft kir, bêhnna wî hate ber wî û dilê wî rehet bû. Çû destê xwe şûst û serê xwe hejand, berê xwe da derî ji bo ku derkeve. Dema ku Xwarinpêj dît ku ew diçe bêyî ku heqê xwarina xwe bide, gazî wî kir û got: “Mêro! Tu bi ku ve diçî, raweste!” Kalê pîr di cihê xwe de sekinî û lê zivîrî, got: “Beraz kurê berazan, tu çawa wisa gazî min dikî?” Xwarinpêj qeherî, bi pey wî ket û got: “Goştxiwiro, xwarin xiwiro! Nanxiwiro, dewvexxiwiro, tu çawa diçî bêyî ku tu heqê xwarina xwe bidî?” Kalê pîr, lê vegerand û got: “Derewan meke kurmiyo!”

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî.

ŞEVA 156'EMÎN

Şehrezadê got:

Şahê min î bextewar! Îcar çawa ku Pîro xwest derkeve, biçe, Xwarinpêj bi berstuka wî girt û li derdora xwe kir gazî, got: “Xelkino, bajarîno! Ev mirovê hanê çawa xwarina min dixwe û heqê xwe nade, diçe?” Xelk hemû li wan hatin hev, lome ji kalê pîr kirin û jê re gotin: “Heqê xwarina ku te xwariye bide wî!” Pîro got: “Berî ku ez derbasî xwaringeha wî bibim, min derhemek dayê.” Xwarinpêj got: “Heger te metelîkek tenê jî dabe min, bila her tiştê ku îro ez bifirosim bibe jehr û di qirika min de bimîne!” Piştî li xelkên derdorê zîvirî û axaftina xwe berdewam kir got: “Bi navê Xwedê, vî zilamî tu tiştê nedaye min. Tenê hat xwarina xwe xwar û rabû ser xwe ji bo ku derkeve here!” Pîro got: “Na wele min derhemek da te!” Piştî sixef jî jê re dan û pêde xeyîdî. Wî jî bi heman şêweyî lê vegerand û xwe rakişandin hev. Çawa ku Pîro pêhnek avêtê, pevçûn, bi milên hev girtin û hevdu birin û anîn. Xelkên derdorê hemû li ser serê wan kom bûn û ji wan re gotin “Ev çi halê we ye û çima hûn pevdikevin?” Pîro got: “Wele em ji ber gunehkariyekî pevdikevin!” Xwarinpêj di cî de nerm bû û bi bergerî jê re got: “Bi navê Xwedê îcar te anî bîra min ku te derhemek daye min!” Di pey re li xelkê derdorê zîvirî û berdewam kir, got: “Wellehî camêr rast dibêje, derhemek dabû min, de ka were ez wî tiştê di ser derhemê te re maye jî, li te vegehin!” Lewre Xwarinpêj jî têgihîştibû bê Pîro çima behsa gunehkarîyê dike û meqseda wî ji wê yekê çî ye. Vêca birayê delal, ê min jî sebebeke min heye.”

Xelîfe keniya û got: “Bi heqê navê Xwedê ev çîroka te wê xweş be, loma ez dixwazim tu wê ji me re bibêje û sebeba vê helwesta xwe ji me re rave bike.

Ebûl Hesên got: “Ser seran, ser çawan, mîrzayê min!

Mêvanê hêja, navê min Ebûl Hesên e. Gava ku bavê min çû ser dîlo-vaniya Xwedê, malekî pîr ji min re hişt. Min jî ew mal kir du beş; beşek hilanî û beşa din jî danî ber destan ji bo xerçkirina li ser mazûbaniya dost û hogiran, kurên mîr û began û taciran. Kê xwe li min girt, min hevaltî bi wan re kir û malê xwe giş li ser wan kir hetanî ku derhemek tenê jî di bêrika min de nema û ez bûm zugurd. Wê gavê, îcar ez bi ser wan dost û hevalên xwe de çûm, min got belkî dilê wan bi min bişewite û li min bêne rehmê. Lê kesî ji wan berê xwe nedan min û gepak nan jî dananîn ber min.

Ez jî dilşikestî bi wê rewşa xerab û bi gilî û gazin bi ser diya xwe de çûm, min rewşa xwe jê re vegot. Wê jî ji min re got: “Heval û hogirên vê serdemê wisa ne, gava diravên te, mal û milken te hebe, bi ser te de tên, li dora te kom dibin, bi te re dixwin û vedixwin. Lê belê gava ku tu feqîr dibî jî, ji te dûr dikevin û nema silavê jî didin te. Min jî êdî ew nîve mayîn ji diravên xwe yên veşartî derxistin û min sûnd xwar ku êdî zêdî şevekê pê ve, ez destbiraktiyê bi tu kesi re nekim. Şevekê tenê pê re bimînim û piştî

silavê jî lê nekim; carekî din wî venexwînim mala xwe. Loma min ji te re got: “Heyhat ku tiştê çûyî venagere” lewre ev şeva me jî dê dubare nebe.”

Gava ku Xelîfe ev gotina wî bihîst, kenîya û got: “Birayê ezîz! Bi navê Xwedê heqê te heye di vê helwestê de. Lê belê yê min, bi izna Xwedê ez ê tu carî ji te qut nebim.” Ebûl Hesen lê vegerand û got: “Min jî ya xwe ji te re got û ez tu carî ji gotina xwe venagerim. Tiştê çû, nede dû. Êdî ji şevêkê pê ve, ez nema dostanîya kesî dikim. Tenê şevêkê!”

Piştî sifreya şivê raxistin li ber Xelîfe, sênî li pey sênîyê anîn, danîn ber. Qazên heşandî, girar û şorbe û fêkiyên cûr be cûr. Ebûl Hesen jî dest bi perçekirina goştê biraştî kir û da ber Xelîfe, herdûyan bi hev re xwarin hetanî ku têr bûn. Dûvre jî, misîn û legan û pêşgir anîn. Wan jî destên xwe şûştin û dîsa rûniştin, piştî xwe dan balîfan. Sê mûm û sê çira pêxistin û sifreya şevbuhêrkê jî pê re raxistin. Meyeke kevnar î bêhnxeş ku weke miskê bêhn jê difûriya anîn li ber wan danîn. Ebûl Hesen piyala yekemin dagirt û ji Xelîfe re got: “Mêvanê hêja, bi destûra te be ez ê vê piyaleya pêşî vexwim ji bo ku gûman bi te re çênebin!” Piyaleya pêşî vexwar û ya duduyan dagirt, da destê wî.

Xelîfe pir kêfxweş bû bi vê helwest û nêzîkahiya wî û di dilê xwe de ji xwe re got: Qesem bi navê Xwedê ez ê vî zilamî xelat bikim!

Ebûl Hesen careke din piyaleya Xelîfe dagirt, da destê wî û bi helbestî got:

Heke me bizanibûya hûn ê werin vir
Me dê reşîka çavan vexwara li ber
Hemû hest û kelecana dilan bida der
Li ber nigên we ey mêvanê hêvîner
Û li ser mijangan pêşîwazî bikira li der

Gava ku Xelîfe ev helbest ji devê Ebûl Hesen bihîst peyale ji destê wî girt, mey vexwar û peyaleya vala dîsa da destê wî. Ebûl Hesen ji destê wî girt, peyaleyê me yê vexwar, dûvre yeke din dagirt û dîsa da destê Xelîfe û bi helbestekî got:

Hatina we şeref e ji bo me bira
Loma em wê tînin ziman bi dila
Dê vala bimîne dil bi çûna we re
Tu kes dê nikaribe şûna we dagire

Bi wî hawî, kêf û laqirdiya xwe berdewam kirin hetanî nivê şevê. Li dawîya wê şevînê, Xelîfe ji Ebûl Hesen re got: “Birayê delal, gelo daxwazeke te ya veşartî, angî hesreteke ku di dilê te de mabe heye ku tu bixwazî wê pêk bînî?” Ebûl Hesen got: “Bi Xwedê hesretek tenê di dilê min de heye; xwezîka carekê bi destê min ve bihata ku min ew hesreta xwe pêk bianiya!”

Xelîfe jê re got: “Tu bi heqê Xwedê bikî, ka wî tiştê di dilê xwe de bêje, da ku ez jî bizanibim bê hesreta di dilê te de çi ye!” Ebûl Hesen got: “Xwezîka rojekê tenê ez bibûma desthilatdar ji bo ku min bikarîba heyfa xwe ji cîranên xwe hilanîya! Lewre çar cîranên min ên kal hene ku pir zikreşî û hesûdiya min dikin û çi gava ku mêvanên min tên, gefan li min dixwin, bi ser min de tên û çavsorîyan li min dikin, dibêjin em ê giliyê te li ba Xelîfe bikin. Xwezîka rojekê bi destê min ve bihata û min her yekî ji va yextiyaran çarsed qamçî li wan bida, li pêş çavên xelkê, da ku herkesi bizanîba bê cezayê nehêqî û zikreşiyê çi ye, da ku herkesi bizanîba bê cezayê wî kesê ku cîranê xwe acîz bike û kêfa wî xera bike çi ye. Pê re jî min delalek bera nav Bexdê bida ji bo ku sikak bi sikak bang bikira û ev bûyer bi xelkê gişan bida bîhîstin, ji bo ku biba ders ji herkesi re. Hesreta di dilê min de, tenê ev e ezbenî!”

Xelîfe jê re got: “Bi izna Xwedê dê ev daxwaza te pêk were. De êdî mitalan meke û were em vexwarina meya xwe birdewam bikin hetanî ku şeveq lê bide. Şevek din jî ez ê dîsa li cem te bibim mêvan.” Ebûl Hesen got: “Heyhat! Lewre ev ne gengaz e.”

Xelîfe piyaleyek jê re dagirt, piçek benc jî avêt nava wê û da destê Ebûl Hesen, jê re got: “Tu bi qedrê Xwedê bikî birayê ezîz, vê piyaleyê ji destê min bigire û xatirê min neşkîne!” Ebûl Hesen got: “Ji ber ku ji destê te ye, ez ê wê vexwim.” Piştî destê xwe avêt piyaleya meyê û ew bi ser xwe dakir, vexwar. Pê re jî ji ser hişê xwe çû, mîna meYTEKî li erdê veziliya, dirêj bû. Xelîfe rabû ser xwe, li Mesrûr zîvirî û jê re got: “Li vî ciwanmêrî baş miqate be, va ez diçim qesrê. Tu jî wî li ser milê xwe bike û wî bîne malê. Lê ji bîr neke ku tu deriyê mala wî li pey xwe bigire.”

Piştî ku Xelîfe rabû ser xwe çû, xizmetkarê wî Mesrûr jî rabû, Ebûl Hesen hilda ser milê xwe, deriyê malê li pey xwe girt û da dûv Xelîfe, berê xwe da qesrê. Hetanî ku ew gîhand qesrê, şeveqê lêda û dîkan banda. Derbasî qesrê bû û bi devlikenî, Ebûl Hesen ji ser milan danî ber nigên Xelîfeyê xwe.

Li Şehrezadê bû sibeh, wê jî navber da vegotina çîroka xwe û bêdeng bû.

ŞEVA 157'EMÎN

Şehrezadê vegotina çîroka xwe berdewam kir:

Di wê navberê de, Xelîfe qasidek şand dûv Caferê Bermekî, ji bo ku were ber destê wî. Gava ku Cafer hat, Xelîfe Harûnê Reşîd jê re got: “Baş li vî ciwanê mêran binêre û wî nas bike! Heger sibe te ew li şûna min dît ku li ser textê xilafetê rûniştiye bi kinc û bergên min, xizmeta wî bike çawa ku tu xizmeta min dikî û şîretê li hemû mîr û wezîr û gizîran bike ji bo ku bi ya

wî bikin û fermanên wî pêk binin û li ber destên wî herûwerin. Dema ku ferman da te jî, bêgûmûn pêk werîne û qet li himber wî dernekeve hetanî êvarê.” Cafer, bejna xwe li ber Xelîfe tevand û got: “Bilabe ezbenî, te çawa gotiye ez ê bi ya te bikim!”

Xelîfe rabû ser xwe, çû hêla din î qesrê, nav carîyeyan û ji wan re jî got: “Li vî ciwanê razayî binêrin û wî nas bikin. Sibe gava ku ji xew rabû, derbas bin cem wî û erda bin nigên wî ramûsin, li dorê herûwerin û kincên xilafetê lê bikin. Hûn çawa xizmetê ji min re dikin, ji wî re jî wisa bikin û qet kêmanîyê tê de nekin. Herdem jê re bêjin tu xelîfe yî û em cêriyên (cariyeyên) te ne, di xizmeta te de ne.” Piştê ew baş şîret kirin bê wê bi kîjan zimanî pê re biaxivin û çû xwe di pişt perdeyekê de veşart.

Îca em vegerîn ser Ebûl Hesen ê ku bencê ew gej kiribû û xistibû xeweke bêbinî. Ew jî incex berê sibehê bi ser xwe ve hat û ji xew şîyar bû. Di cî de cêriyek pê ve hat û jê re got: “Mewlayê min, dema nimêja sibehê ye!” Ebûl Hesen çavên xwe firkandin, di ber xwe de beşîşî û awirên xwe li derdorê gerandin, li ser wan dîwarên qesrê yên ku bi zêr û zîv neqîşandî bûn û zikê wê yê ku bi cewher û mircanan xemilandî bû. Deve wî ji hev ma û şaşwaz bû li ber wan perdeyên hevrêşimî û zêrîn, ew cam û qîzêzên çînî, ew ber û merşên ecemî û ew sênî û tasikên zîv û zêrîn! Ew xizmetkar û cêrî û berdestkên derdora wî, ew matmayî hiştibûn ku ji çavên xwe bawer nedikir û di dilê xwe de digot: “Gelo bi rastî jî ez şîyar im ango hîna jî ez di xew de me û ev tiştên li derdora min, hemû dîmenên xewneke şêrîn in. Ango ez ketime buhuştê de û hayê min ji min tune ye? Piştê çavên xwe girtin û hewl da ku dîsa rakeve ji bo piştrast bibe ji wan dîmenên li ber çavên xwe. Cêriya berdestê wî gazî kirê û jê re got: “Emîrê min, taca serê min, ev ne ji adetên te ne, gelo çî bi serê te hatiye ey serkêşê hemû bawermendan?”

Dûvre, hemû cêriyên qesrê mîna horîyan lê hatîn hev û ew ji xew rakirin, li ser nivîna wî dane rûniştandin. Ebûl Hesen bi ser xwe ve hat û dît ku li ser doşekeke nerm û qalînd e ku gazeke jî erde bilind e û bi periyên çukan hatiye heşandin. Jinên cêrî, balîf dane bin çengên wî û li ser nivînê ew dane rûniştandin. Wî jî careke din çavên xwe li derdora xwe gerandin û awireke din avêt ser wê qesra tijî zîv û zêr û xizmet û cêriyên ku li dora wî diçûn û dihatin; piştê ji xwe re got: “Bi her sê navê Xwedê ez hîna jî di xew de me û ne gengaz e ku ev tiştên li derdora min, rasteqîn bin!” Bi xwe re keniya, piştê ji ser cihê xwe rabû û rûnişt, ji bo ku tiştên li ber çavên xwe di piratîkê de piştrast bibe û gûmanan ji dilê xwe bavêje. Lê gava dît ku cêrî pê dikenin, li ber xwe ket û tiliya xwe gez kir. Gava tiliya xwe gez kir, êşek dişwar pê ket, hişt ku ax û ox pêkevin. Ev hemû li ber çavên Xelîfe çêdibû ku wî jî her tişt ji pişt perdeyê ve temaşe dikir û pê dikeniya.

Herî dawî Ebûl Hesen gazî cêriyekê kir û jê re got: “Tu bi Xwedê kî

horiya buhuştê, rastiyê ji min re bibêje, bi rastî jî ez xelîfe me ku ez li ser vî textî me?" Jina cêrî lê vegerand û got: "Erê welleh tu niha xelîfe û emîrê bawermendan î." Ebûl Hesen got: "Tu derewan dikî!" Piştî berê xwe da serxizmetkarê mezin û gazî wî kir. Serxizmetkar hat ber destê wî û bejna xwe li ber wî tevand, jê re got: "Bêje Emîrê Bawermendan!" Ebûl Hesen got: "Îcar Emîrê Bawermendan kî ye gelo?" Xizmetkar got: "Tu yî ezbenî, ma wê kî be!" Ebûl Hesen lê vegerand û got: "Tu derewan dikî!"

Ebûl Hesen çû cem xizmetkarekî din û bi şeweyeke bergerî jê pirsî, got: "Ezbenî tu bi qedrê Xwedê bikî rast ji min re bibêje, ez Emîrê Bawermendan im an na?" Xizmetkar lê vegerand û got: "Erê willeh tu niha Emîrê Bawermendan î, tu xelîfeyê hemû musulmanan î." Ebûl Hesen ji xwe re got: "Doh ez Ebûl Hesen bûm, çawa ez îro bûme xelîfe?"

Serxizmetkar pê ve hat û ji Ebûl Hesen re got: "Serkêşê welatan, Emîrê Bawermendan! Rabê Alemê te bisitirîne ezbenî, wille tu xelîfeyê me yî û Sultanê Sultanan î, çima tu bawer nakî?" Pê re jî cêrî û navmalî û xizmetkar bi heyrangorî li dora wî çûnûhatîn. Piştî bendeyek pêş ve hat, şimikek hevresîmî û kesk ku bi zêrê sor xemilandî bû, da ber nigê wî. Ebûl Hesen şimik ji destê wî girt û ew xist zendika cubeyê xwe de. Bende qîrek da û got: "Na ezbenî na, ev şimik ji bo ku tu wê bixî nigên xwe û pê biçî avdestxaneyê yê, ne ji bo tiştêkî dîn e!"

Ebûl Hesen li ber xwe ket û fedî kir ji ber wê şaşitiya xwe. Şimik ji destên xwe avêt erde û nigên xwe di wan rakir, ew xistin serê nigên xwe û rabû ser xwe di wan rakir, ew xistin serê nigên xwe û rabû ser xwe da dûv bende, çû avdestxaneyê, pêwîstiyên xwe pêk anîn û dîsa vegehiya qesrê. Çend cêrî bi misîn û teştên zêr, pê ve hatin, av li destên wî kirin da ku destnimêja xwe bigire. Piştî sicadeyek jê re raxistin da ku nimêja xwe bike. Wî jî bîst rîket nimêj kirin û di dilê xwe de got: "Bi rastî jî dibe ku ez xelîfe û Emîrê Bawermendan bim! Ne gengaze ku ev hemû, xewn bin û ne gengaz e ku ev qase tişt di nava xewnekê de biqewîmin!" Darizandineke hûr û kûr di nava xwe de kir û gîha encamekê ku bi rastiyê jî ew xelîfe ye. Spasiya xwe ji Xwedayê xwe re kir, duayên xwe yên dawî jî kirin û ji ser sicadeyê rabû.

Careke din bende û xizmetkar û cêrî lê hatin hev, ew birin cihekî din di qesrê de. Ew kincên wî di ser re anîn, kincin din î hevresîmî lê kirin û darekî bi zêr û zeberced naqîşandî dan destê wî. Piştî serxizmetkarê mezin da pêşiya wî, ên biçûk jî dan pey wî û ew di pişt perdeyekê re derbas kirin, ew birin li ser textê desthilatdariyê dane rûniştandin.

Ebûl Hesen, çawa ku li ser text rûnişt û çavên xwe li dora xwe gerandin, dît ku di eywaneke mezin de ye ku çil deriyên wê hene û her deriyek perdeyek li ber e. Li hemberî wî jî meclisa hukim û endamên ji mêr û wezîr û gîzîrên mîna Elûdî, Elreqaşî, Elcûdîm û berdestkê wî Ebû Îshaq.

Li rexê din jî leşker û karmend û mezinên Dewleta Ebasîyan hemû di rêzê de bûn; bi cil û bergên xwe yên rengîn; bi şûr û rim û mertalên xwe yên zêrîn; bi awirên xwe yên biryardar mîna şêran. Dîmena li ber çavên wî, dîmeneke wisa bêtîmtêl bû ku hest û kelecaneke bêsînor pê re diafirand. Di nava şaşwaziyeke mezin de, li ser textê xwe rûnişt û darê xilafetê yê bi zêr û zeberced xemilandî jî xist dawa xwe de. Di wê navberê de herkesê di meclisa wî de, yeko yeko hatîn, bejna xwe li ber wî tewandin, erda ber nigên wî maçî kirin û dua ji Xwedayê xwe kirin ku temenekî dirêj bide wî. Di encamê de jî Caferê Bermekî hat raserî wî, bejna xwe li ber tewand, erda ber nigên wî ramûsa û got: “Xwedê Teala buhuştê bide te û dogehê bide dujminên te! Xwedê neke ku cîranên te dujminahiya te bikin û agirê mala te tucaran venemire ey xelîfeyê zemanan û desthilatdarê hemû welatan!”

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî navber da çîroka xwe û ma bêdeng.

ŞEVA 158'EMÎN

Şehrezadê vegotina çîroka xwe ji Şehreyarê gewre re berdewam kir û got:

Ebûl Hesen qîrek li Caferê Bermekî da û jê re got: “Ey kûçikê Bermekiyan! Niha di vê katjimêrê de here cem waliyê bajêr, tu û wî herin filan semtî, filan kolanê li diya Ebûl Hesen bigerin, wê bibînin, silavên min jê re bibêjin û sed dînarî bidin wê. Her çar yextîyarên cîranên wê bigirin, wan li ser piştê keran siwar bikin, wan li nava bajêr gişî bigerînin û her yekî ji wan çarsed qamçiyî li wan bidin, ji bo ku bibin îbret ji xelkê re ku tukes zikreşîya cîranê xwe neke. Piştê wan bibin li semteke din bi cih bikin.”

Cafer, bejna xwe li ber wî tewand, erda bin nigên wî maçî kir û got: “Bilabe ezbenî, dê fermana te di vê seatê de pêk were.” Û di cih de çû emrê wî pêk anî; sed dînar da diya Ebûl Hesen û her çar cîranên yextîyar jî di feleqê re derbas kirin, her yekî ji wan çarsed qamçî li wan dan û ew li keran siwar kirin, li nav sikakên Bexdê gerandin û gazi kirin ji xelkê re gotin: “Cezayê herî kêr ji bo kesê ku paşgotina cîranê xwe dike û aramiya wî xera dike, ev e!”

Ebûl Hesen jî pîrsgirêkên welat jî wezîr û mîr û mîrêkan guhdar kir û ji bo çareserkirina wan pîrsgirêkan emîr û ferman dan, hetanî ku êvar hat û roja wî bi dawî bû. Êvarê, izna meclîsê da, hemû karmendên dewletê, mîr û mîrek û wezîr rabûn ser xwe, çûn malên xwe. Xizmetkar û bende jî pê ve hatin, dua jê re kirin ji bo ku Xwedê temenekî dirêj bide wî. Piştê jî perde dane alî û ew derbasî alîyê din î qesrê kirin. Li wê derê, Ebûl Hesen dît ku ciwanîkin xweşik distirên li ber şewqa mûm û çirayan. Hişê wî li hev ket û ji xwe re got: “Nexwe bi rastî jî ez xelîfeyê Bawermendan im!”

Çawa ku derbasî wî alîyê qesrê bû, cêrî pê ve rabûn, ew derbasî eywanê kirin û şîveke dewlemend ji xwarinên pir xweş jê re amade kirin. Ew jî li ser şîvê rûnişt û xwar hetanî ku têr xwar. Dûvre gazî cêriyeke kir û jê re got: “Navê te çi ye?” Cêriyê got: “Navê min Mîskê ye” Ji yeke din re got: “Navê te çi ye?” Wê jî got: “Tarfa ye.” Ya sisyan jî got “Navê min Tuhfe ye.” Her weha hemûçkan yeko yeko navên xwe jê re gotin. Piştî ji wir jî rabû, çû meclisa kêf û şahî û meyxuriyê. Li wir jî dît ku her tişt tekûz e û di nava pergaleke giranbuha de hatiye amadekirin. Di rêzê de deh sêniyên mezin hebûn ku hemû fêkiyên xweş û şêrînahî û peqlaweyên bi nav û deng tê de bicihkirî bûn. Li ser sifrê rûnişt û têra xwe jê xwar. Sê heb koroyên stranbêj ji cêriyan hatin li rex wî rûniştin û dest bi stranan kirin. Cêriyên din û xizmetkarên mayîn jî tev li zarok û xulam û bendeyan hatin li derdora wan kom bûn û li wan temaşe kirin. Cêriyên stranbêj li pey hev stranên xwe yên herî xweş li ser gelek meqaman gotin û guhdarên xwe mest kirin bi devgên xwe. Di wan kêliyan de ket bîra Ebûl Hesên ku ew di nava buhuştê rehman de ye. Dilê wî xweş bû û bêhnê wi fireh bû û bi kêfxweşîyeke mezin ket nava şahîyeke bêdawî de ku li dawiyê dirav û xelat li ser cêriyan belav kirin.

Ev hemû diqewîmîn, Xelîfe Harûnê Reşîd jî ji pişt perdeyê ew temaşe dikir û di ber xwe de dikeniya. Îcar gava nivê şeve hat, Xelîfe gazî cêriyekê ji wan kir, perçeyek benc da wê û jê xwest ku here wê bence bixe nav meya Ebûl Hesên û pê bide vexwarin. Cêriyê fermana Xelîfe pêk anî û çû ew perçeyê bence xist nava peyaleya Ebûl Hesên û pê da vexwarin. Pê re jî Ebûl Hesên ji ser hişê xwe çû û li erdê veziliya. Xelîfe jî ji pişt perdeyê derket, kenîya û gazî wî xizmetkarê ku ew ji mala wî anîbû kir û ferman dayê ku dîsa wî bibe mala wî. Xizmetkar hat, rahişt Ebûl Hesên, ew bir mala wî, li hundurê wî danî û deriyê malê lê girt û bi şûn de vegehiya cem Xelîfe, agahî dayê da ku dilê wî bikeve cih de. Xelîfe jî bi dilekî rehet çû ser nivîna xwe û raket.

Ebûl Hesên, ji ber bandora bence, zû bi ser xwe ve nehat. Roj derket, du bejna bilind bû, ew nû ji xew rabû. Çawa ku şiyar bû û bi ser xwe ve hat, jê werê ku hîna Xelîfe ye û dora wî tîji cêrî û xizmetkar in, hema di cih de gazî wan kir û navên wan hilda, got; “Mîskê, Tarfayê, Tuhfayê, Dilşayê, Sêvê! Ka hûn li ku ne?” û qajeqaja xwe berdewam kir hetanî ku deng çû diya wî û pê ve hat û got: “Xêr e kurê min, xêr e însallah! Rabe ji xew kurê min! Ebûl Hesên, tu xewnan dibînî lawo!”

Ebûl Hesên çawa ku çavên xwe vekirin dît ku pîrejinek li ber serê wî ye. Rabû ser xwe û jê re got: “Tu kî yî?” Wê jî bi şaşwazî lê vegerand û got: “Ez diya te me lawo.” Ebûl Hesên, xwe aciz kir û got: “Tu derewan dikî pîra heram, ji ku tu bûyî diya min, ez xelîfe me, ez emîrê hemû bawermendan im!” Diya wî jî qeherî bi vê gotina wî û pê de rabû, got: “Huş be, bêdeng be kurê min, Xwedê neke ev gotina te bigihe guhên Xelîfe, dê Xelîfe mala me

xera bike û dest dayne ser hemû hebûna te jî. Xwedê te bisitirîne û hişê te li te vegeirîne, kurê min!”

Bi wê hişyariya diya xwe, Ebûl Hesen nû bi ser xwe ve hat û ji wê xewa giran şiyar bû, diya xwe jî nas kir û tê derxist ku li mala xwe ye, ne li qesr û qonaxan. Ket ber fediyê û bi hêdika axivî got: “Dayêcan, bi Xwedê min di xewna xwe de dît ku ez li qesra Xelîfe Harûnê Reşîd im û derdora min tijî bende, xizmetkar û cêrî ne. Heta min dît ku ez li textê xîlafetê rûniştî me û fermanan didim hemû wezîr û gizîrên di meclisa xwe de. Bawer bike dayêcan, bawer bike min ev giş di xewna xwe de dîtî, lê rastî bû ne xewn bû, lewre ez van gişan jiyam!”

Hebekî bêdeng bû, di nava xwe de ramiya û piştî demekê got: “Gelo bi rastî jî ez Ebûl Hesen im? Ez çawa Ebûl Hesen im û qasekî berîya niha min dît ku ez xelîfe me û li ser textê desthilatdariyê rûniştî me, emîr û fermanan didim derdora xwe!”

Piçekî din jî ramiya, piştî serê xwe rakir û got: “Bêgûman ev tiştên min dîtî hemû ne xewn bûn, jiyanêke rasteqîn bû û ez jî xelîfeyê hemû musulmanan bûm, min xelat li xelkê belav dikirin û ferman didan wezîrên xwe.”

Diya wî jê re got: “Kurê min, li xwe miqate be û hişê xwe biparêze, yan na wê te bibin bîmaristanê û dê bêhtirî mehekê te li wir bigirin di nav dînan de. A rastî te kabûs di xewna xwe de dîtî û şeytan henekê xwe bi te kiriye. Lewre gelek caran şeytan bi aqlê mirovan dilîze.”

Diya wî gotina xwe birî, hebekî ponîjî, di nava xwe de fikirî, piştî jî kurê xwe pirsî, got: “Gelo şeva borî kes li gel te hebû di şevbuhêrkê de?” Ebûl Hesen got: “Belê, yek û xizmetkarekî xwe li ba min bûn. Bêgûman dibe ku ew zîlam şeytan be, tu rast dibêjî dayêcan. Lewre min rewşa xwe bi berfirehî pê re parve kir û çîroka xwe anî zîman. Bêgûman wê ew zîlamê hanê şeytan be. Lê dîsa jî ka rastiyê ji min re bibêje dayêcan. Bi rastî jî ez Ebûl Hesen im an na?”

Diya wî got: “Belê kurê min, tu Ebûl Hesen î. Ez dixwazim mizgîniyekê jî bidime te ku doh wezîrê Harûnê Reşîd, Cafer Elbermekî hat vê derê û ew her çar yextiyarên cîranên me girtin, her yek ji wan çarsed qemçî li wan dan, ew li nava sûkê gerandin û gazî xelkê kirin gotin ev e cezayê kesê ku zikreşîya cîranê xwe dike û şahiya wan xera dike û piştî jî ew ji vê semtê derxistin birin, bera wan dan ji vir. Sed dînar jî da min, got silavên Xelîfe ji te re hene û dîsa bi şûn de çû.

Bi wê gotina wê re, qîrînek bi Ebûl Hesen ket û got: “Pîra bêoxir, ev giş qewimîne û hîn ji tu gotina xwe di ser a min re digirî û tu dibêjî tu ne xelîfe yî! Halbûkî ez bûm ê ku min ferman da Caferê Bermekî ji bo ku were

li wan zikreşên cîranên me bide û sed dînarî jî bixe destê te li gel silavên min î germ. Xelîfeyê rasteqîn jî ez im pîra heram! Tu jî derewîneke xurîfî yî, tu nizanî bê tu çî dibêjî!”

Piştî rabû ser xwe û bi şiveke xêzeranan li diya xwe da hetanî ku qîrîn pê ket û got: “Hewar e Hewar e! Musulmanino hewar e!” Lêbelê Ebûl Hesen dîsa nesekînî û lêdana xwe berdewam kir hetanî ku xêlkê dengê hewara diya wî bihîst û pê ve hatin. Gava ku xelk pê ve hatin û dîtî ku li diya xwe dide û dibêje “Xelîfe ez im pîra bêyom û bêoxir, a ku ez efsûn kirime jî tu yî, ne kesî din e!”, gotin: “Ev dîn bûye û hişê xwe wenda kiriye.”

Şeveqê lêda û li Şehrezadê bû sibe, wê jî vegotina çîroka xwe birî û bê-deng ma.

ŞEVA 159’EMÎN

Şehrezadê vegotina çîroka xwe berdewam kir û got:

Vêca gava xelkê ew gotinên wî bihîstin û bi çavên serê xwe dîtî bê çawa li pîra diya xwe dide, gotin Ebûl Hesen dîn bûye. Hemû jî bê şik û gûman bûn ji wê gotina xwe. Loma di cih de pê ve beziyan, dest û nigên wî girêdan û ew birin bîmaristanê, radestî berpirsiyarê wê kirin. Berpirsiyarê bîmaristanê got: “Çi bi vî xortî hatiye?” Wan jî got: “Dîn bûye.” Ebûl Hesen ket navberê û got: “Wilehî derewan li min dîkin û ez ne dîn im, ez xelîfeyê Musulmanan im!” Berpirsiyar, bi vî gotina wî pir acîz bû û got: “Derewînê mezin tu bi xwe yî, dînê berradayî!” Û di cih de kincên wî di ser re anîn, ew tazî kir û zincîreke hesinî avêt stûyê wî, ew bi şibakeyê bilind ve girêda û bi daran pê ket, lêda û hey lêda hetanî ku laşe wî nerm kir mîna pembo. Piştî wê lêdana biêş, diya wî hat cem û jê re got: “Kurê min Ebûl Hesen! Hişê xwe bîne serê xwe lawo... Hişê xwe bîne serê xwe û xwe ji wê listika şeytan rizgar bike!”

Ebûl Hesen, li diya xwe veğerand û got: “Tu rast dibêjî dayêcan gotinên te ji Qu’ranê ne, di huzûra te de vaye ez tobe dikim û ji wan gotinên xwe yên çewt vedigerim û lanetê li şeytan tînim, ji rêya wî derdikevim, tîm ser rêya heq, de êdî ka min ji vî dojêhê rizgar bike, willehî ez ji ser xwe çûme, ez li ber helakê me!”

Diya wî çû cem berpirsiyarê bîmaristanê, pê re axivî û kurê xwe ji ber destê wî girt, ew bi xwe re bir malê. Dîsa mîna berê ew û diya xwe bi hev re jiyan û rojên xwe derbas kirin. Lê belê piştî mehekê, Ebûl Hesen dîsa bêriya şevbuhêrkan, bêriya destbirakan kir. Lewre bêyî wan sebra wî nedihat. Dîsa mîna berê, ber êvarê sifreya xwe bi xwarin û vexwarinên xweş dagirt û êvarkî jî çû ser pirê ji bo ku mêvanekî bîne ser şîva xwe û şevbuhêrka xwe

pê re derbas bike. Piştî ku demekê li ser pire ma, dît ku careke din Xelîfe Harunê Reşîd hate cem wî -ku hîna jî wî nizanîbû bê ew kî ye- û silavek dayê. Ebûl Hesen ê ku di dilê xwe de digot “Jixwe belayên ku bi serê min de hatin hemû sûcê te bûn”, mehdê xwe pê re tehl kir û jê re got: “Ne bi xêr û ne jî li ser çavan be! Jixwe tu şeytan î û tu belaya serê min î!”

Lê belê Xelîfe xwe aciz nekir û lê vegeriya, got: “Birayê min î delal, ma min ji te re negotibû ku ez ê careke din li te vegerim?” Ebûl Hesen got: “Tu pêdiviya min bi te nîne. Jixwe bav û kalên me jî gotine, ne deriyê xwe vekirî bihêlin û ne jî qulhûwellahû ehad bixwinîn. Serê ku neêşe çima ez ê paçan lê bigerînim heyran! Jixwe ew şeva ku min tu birî malê û me bi hev re şevbuhêrka xwe kir û bi şûn de, çawa ku şeytan hatibe mala min, tasewaseke ecêb ket nava min de, hindik mabû ku ez dîn bibim!”

Xelîfe jê re got: “Û ew şeytan kî ye gelo?” Ebûl Hesen got: “Tu yî.” Xelîfe beşişî, li kêlaka wî rûnişt, destê xwe avêt ser milê wî û bi zimanekî şêrîn pê re axivî, got: “Birayê min, gava wê şevê ez ji cem te derketim, min derî li pey xwe negirt. Dibe ku şeytan di wir re derbasî mala te bûbe!” Ebûl Hesen got: “Qet li min ne pirsê bê çi bi serê min hat wê şevê! Gelo çi ket bîra te de ku te derî wisa vekirî hişt li pey xwe û şeytan jî hat cem min, ewqase bobelat bi serê min de anîn?” Ebûl Hesen, hebekî bêdeng bû, piştî ew tiştên ku bi serê wî de hatibûn, yeko yeko anîn ziman. Xelîfe jî ew guhdar dikir û di nava xwe de dikeniya bêyî ku di rûyê xwe de bide der wî pê bihesîne.

Herî dawî Xelîfe jî Ebûl Hesen re got: “Spas ji wî xwedayî re ku ew xerabî ji te dûr xistine û va êdî rewşa te aram û baş e.” Ebûl Hesen lê veğerand û got: “Ez jî êdî nema mêvanan digirim mala xwe û ne jî şevbuhêrkan bi wan re li dar dixim. Êdî destbiraktî jî nema ji min re lazim dibe. Jixwe bavikên me jî gotine çi kiro bi xwe kiro, bi rastî jî çi tê serê mirov, ji destê mirov bi xwe ye. Loma min jî biryar da ku êdî ez nema destbiraktiyê bi tu kesî re bikim lew ku şevêk tenê be jî. Vêca birayê delal li qusûra min nenêre ku ez nema dixwazim bi te re şevbuhêrkê bikim û ne jî sohbeta bi te re berdewam bikim!” Xelîfe bi zimanekî şêrîn pesnê wî da, li ber dilê wî çû û hat, piştî got: “Ez mêvanê te me û mêvan, mêvanê Xwedê ne, divê tu berra min nedî!” Piştî vê gotina Xelîfe, Ebûl Hesen jî ya xwe daket, nerm bû û ew da dûv xwe bir malê, li ser sifreya şivê da rûniştandin, xwarin da ber wî û sohbet pê re kir, wensa xwe pê anî. Piştî jî çi hatibû serê wî, hemû jî Xelîfe re vegot. Xelîfe jî têra xwe kenîya û bêhna xwe derxist.

Piştî ku têr xwarin, sifreya xwarinê rakirin û li şûna wê, sifreya fêkî û meyê danîn. Sê piyaleyên pêşî wî vexwarin, a çaran jî da destê Xelîfe û got: “Vê meyê ji destê bendeyê xwe qebûl bike ez benî!” Dûvre jî bi helbestî got:

Heta ku şev tarî be ez ê her vexwim

Heta ku roj derkeve ez ê her vexwim
Wê serê min herdem xûz be bi ser qedehê de
Ez ê tîrêjên rojê vexwim ta şeveq lê bide
Ez ê her dem di nav kêf û şahîyê de bim
Her dem kul û derd û xeman biqewirînîm

Gava ku Xelîfe ew helbesta wî guhdar kir, coş bû û piyale ji dest girt, mey bi ser xwe dakir, vexwar. Ebûl Hesen ji bê navber, geh ji xwe re dagirt, geh ji wî re, hetanî ku meyê li serên wan da û nigên wan ji erdê qut kirin, ew bi hewa xistin. Wê gavê Ebûl Hesen ji Xelîfe re got: “Dosto! Bi rastî jî ez his dikim ku ez şeva borî xelîfe bûm, ez desthilatdar bûm, min ferman didan, pere belav dikirin, xelat dida cêriyên xwe û li wan gûhdar dikir. Gelo bi rastî jî ev xewn bûn, ango rasteqîn bûn, çawa ku ez niha his dikim?” Xelîfe lê vegerand û got: “Bêgûman ew hemû xewn û kabûs bûn. Êdî xwe ji wê derûnîyê rizgar bike birawo!” Di wê navberê de Xelîfe fersend dît ku qetek benc bavêje nav piyaleya wî. Piştî rahişt piyaleyê, da dest wî û jê re got: “Ji bo xatirê min, vê qedehê jî vexwe biracan!” Ebûl Hesen got: “Ji destê te be, ez vedixwim” û rahişt qedehê, vexwar.

Ebûl Hesen, xortekî rastgo û ji dil bû, loma bandoreke mezin li ser Xelîfe Harûn Reşîd kir. Herî dawîyê Xelîfe pir jê hez kir û baweriya wî pê hat, di dilê xwe de got: “Bi navê Xwedê ez ê vî cwamêrî bikim destbirakê xwe yê şevînan û dostê xwe yê sohbetê.” Di wê nabberê de benca ku di qedeha Ebûl Hesen de bû, bandor lê kir û ew xist xeweke bêbînî de. Bêhiş li erdê dirêj bû, veziliya. Xelîfe di cih de rabû ser xwe û ji xizmetkarê xwe re got: “Rahêje vî zîlamî wî bîne qesra Xîlafetê.” Xizmetkar ew avêt ser milê xwe û ew bir qesrê. Li wê derê Harûn Reşîd ferman da xizmetkaran ku wî bavêjin ser nivîneke Xîlafetê, balîfin ji perîkên çukan bidin ber serê wî û lihêfên ji hevrêşîfê bavêjin ser. Piştî gazî cêriyên dengbej kir û ji wan re got: “Hûn jî li dora wî kom bibin, li ûd û tembûrên xwe bixin, stranên xwe yên herî xweş jê re bêjin!” Cêriyan fermana wî pêk anîn, Xelîfe jî çû goşeyê-ke qesrê û xwe di pişt perdeyekê de veşart; ma li bende bê gava Ebûl Hesen bi ser hişê xwe ve bê, dê çi bike, çi neke!

Li dawîya şevê, Ebûl Hesen, bi ser hişê xwe hat û ji xew şiyar bû, li ser dengê ûd û sazan. Çavên xwe vekirin û li dora xwe nêrî, dît ku heman cêriyên şeva borî li ber serê wî ne û li ber newayên çeng û ûdê stranên pir xweş dibêjin. Dengê wan ê xweş, di nava qesrê de wisa olan dida ku, mirov mest dikir. Lê Ebûl Hesen bi tirs rabû ser xwe û di dilê xwe de got: “Lahewle û laquwete îlla lîllah! Bi rastî ez ji wê bîmaristanê ditirsim, lewre qet ji bîra min naçe bê cara ewil çi bi serê min hat! Ya Rebî tu şeytan bi bin bixînî û û min ji wî rizgar biki!”

Piştî çavên xwe dîsa girtin û serê xwe xist bin lihêfê bi hêviya ku dua-

ya wî qebûl bibe. Lê gava ku careke din serê xwe rakir û çavên xwe vekirin, bala xwe dayê ku hîna di nava qesreke ronak de ye û cêrî jî hîna li çengê didin û wan stranên xwe yên xweş dibêjin! Di wê navberê de xizmetkarek hata gel wî, bejna xwe li ber tewand û got: “Emîrê Bawermendan! Ka rabe ser xwe, li cêriyên xwe guhdar bike û li qesra xwe temaşe bike!” Ebûl Hesen got: “Xwedê min bisitirîne, gelo bi rastî jî ez Emîrê Bawermendan me, angî hûn derewan li min dikin? Lewre doh ez ne ji malê derketim û ne jî min erka desthilatdariyê pêkanî, tenê min vexwar û ez di nava serxweşiyê de di xew re çûm, tu jî hatiye min şiyar dikî!” Pê re jî Ebûl Hesen rabû li ser qûna xwe rûnişt û careke din fikirî li ser hemû qewimînên ku bi serê wî de hatibûn. Lêxistina ku li diya xwe kiribû, mûdaxeleya cîranan û birina wî ya Bîmaristanê. Li wê derê lêxistina ku ji destê karmendê Bîmaristanê xwaribû û herî dawî dîsa hatina diya wî û rizgarkirina wî ji Bîmaristanê, hemû tevde, mîna zincîrekê anîn ber çavên xwe. Şaşwaz bû û li xwe ma heyirî. Di dilê xwe de got: “Bi Xwedê ez nizanîm çî bi serê min hatiye, çî qewimîye û kê ez anîme vir!”

Ebûl Hesen li cêriyekê zîvirî û jê pirsî, got: “Ez kîme?” Wê jî lê vege-
rand û got: “Tu Emîrê Bawermendan î.” Bi vê bersiva wê re Ebûl Hesen hêrs
bû û got: “Tu derewan dikî Nekba! Heger bi rastî jî ez Emîrê Bawermendan
bim, ka tiliya min gez bike, da ku ez bizanibim ez di xew de me an na?”
Cêriyê hat tiliya wî gez kir, êşek ecêb bi nava wî ket, cêrî bi şûn de tehfand
û got: “Besel!” Lê dîsa jî dilê wî neket cîh de û jê bawer nekir ku xelîfe be. Li
serekê xizmetkaran zîvirî û jê pirsî got: “Ez kî me?” Got: “Tu xelîfeyê me yî,
tu Emîrê Bawermendan î!”

Hişê Ebûl Hesen hîn bêhtir tevlihev bû û nema dizanîbû wê çî bike,
çî neke. Dev ji wî serxizmetkarî berda û çû cem koleyekî temen biçûk ku
hîna zarok bu û jê re got: “Kani guhê min gez bike!” Pê re jî xwe tewand
û guhê xwe xist devê wî de. Zarokê kole jî hebekî dînik bû, hema di cîh de
diranên xwe li kerika guhê wî anîn hev û bi şîdan gez kir ku hindik mabû
guhê wî qut bike. Ebûl Hesen jê re got “Bes e”. Lê zarok bi Erebi nizanîbû
û her ku jê re digot “Bes e”, wî digot belkî dibêje “hîn bêhtir”, loma, wî jî
diranên xwe hîn bêhtir bi ser hev de dişidandin û êşeke bêsinor dixist nava
Ebûl Hesen de.

Li aliyê din, Xelîfe Harûn Reşîd ê ku ji pişt perdeyê her tişt dişopand
û temaşe dikir, êdî ji kenan piştî-zikû bûbû û nema xwe digirt. Ji pişt per-
deyê derket û bi dengê bilind gazî wî kir û jê re got: “Kuro Ebûl Hesen,
te ez kuştîm bi kenan lawo!” Bi vê banga Xelîfe re, Ebûl Hesen lê zîvirî û
çawa awirên wî pê ketin, ew nas kir. Bi lomekariyeke derewîn lê vege-
rand û got: “Na wele te ez kuştîm birako! Ne tenê ez, te ez û diya min û yextiyarên
cîranên min jî da kuştî!”

Piştî vê hevnaskirina wan a erjeng, Xelîfe Harûnê Reşîd, Ebûl Hesen nêzîkî xwe girt, qedr û qiymetekî mezin da wî û ew zewicand. Piştî jî ew di qesra xwe de bi cih kir û di asta destbirakê xwe de ew kir baştirînê her deh dostên şevbuhêrkên xwe.

Ji ber ku Ebûl Hesen, bi xeznedara Zubeyde Xanima jina Harûnê Reşîd re zewicî bû, ku navê wê Dilşa bû, êdî pir nêzîkî malbatê bûbû û her dem bi hev re radibûn û rûdiniştin. Xelîfe jî êdî Ebûl Hesen pir nêzîkî xwe digirt û di gelek mijaran de pê dişêwirî, fikra wî distend. Lê belê jiyana di nava wê xêr û xweşiyê de pir buha bû û di demeke kurt de diravên Ebûl Hesen qedîyan û iflas kir. Bê çare ma, nema zanîbû wê çi çawa bike. Herî dawî, çu cem jina xwe Dilşa û jê re got: “Ez ê niha herim fenekê li Xelîfe bikim û ez dixwazim ku tu jî biçî heman fenê li jina wî Zubeyde Xanimê bikî da ku di nava saatekê de em dused dînarî û du top hevreşim ji wan bistînin” Dilşa lê vegerand û got: “Tu çawa bixwazî, ez ê wisa bikim! De êdî ka ji min re bibêje bê ez ê çi bikim, çawa bikim?”

Ebûl Hesen ji jina xwe re got: “Em ê lîstika mirinê bi wan re bilîzin. Di destpêkê de ez ê xwe li mirinê deynim. Ez ê xwe li erdê dirêj bikim. Tu jî, tê foteyekê bavêjî ser min, şara serê min vereşîni, lingên min bidî ber hev, kêrekî deynî ser sêngan min û hinek xwê jî li ser min bireşîni. Piştî gijika porê xwe ji hev belav bik, kirasê xwe biqetîni û bi ser xatûna xwe de bazde, her cem wê û bi kulman li rûyê xwe bid û bike hewar. Ew jî dê bêtirse û wê ji te re bibêje xêr e, çi qewimîye Dilşa? Tê jê re bibêjî “Xatûna min bila serê te saxbe, Ebûl Hesen mir!” Ew jî dê pir xemgîn bibe, bigirî û dê fermanê bide xeznedarê xwe ji bo sed dînarî bide te li gel qetek cawê hevrehşimî ji bo pêçanê û wê ji te re bibêje, “Here wî derxîne û merasîma veşartinê amade bike!” Tu jî tê cawê hevrehşimî û diravan bigirî, tê werî cem min. Gava tu hatî, êdî li şûna min tê xwe li erdê dirêj bikî, li mirinê deynî û ez ê jî bi hewar û gazî birevim, biçim cem Xelîfe. Bi rê de ez ê kincê xwe biçirînim, riha xwe bikşînim û herim jê re bibêjim “Bila serê te sax be, Dilşaya me mir!” Ew ê jî wê dilê wî li ser te biêşe û ji xeznedarê xwe re bibêje “Perçeyek hevrehşim û sed dînarî bide Ebûl Hesen” û ji min re jî bibêje “Here meytê wê rake û ji definkirinê re amade bike!” Ez ê jî werim cem te.

Dilşa pir kêfxweş bû bi vê hîleya mêrê xwe û jê re got: “Ev, hileyêke pir baş e!” û di cî de ew li erdê ramidand, çavên wî girêdan, nigên wî dan ber hev û foteyek avêt ser wî û berê xwe da cem xatûna xwe Zubeyde Xan. Bi rê de serê xwe vekir, porê xwe kişand û bi wêlê-wêl derbasî cem Zubeyde Xanê bû. Çawa ku Zubeyde Xanim ew di wî halî de dît, tirsîya û got: “Ev çi hal e Dilşa û tu çima wisa digirî?” Dilşayê got: “Xatûna min, bila serê te sax be, Ebûl Hesen çû ser dilovaniya xwe!” Zubeyde xanê pir xemgîn bû li ser wî, dilê wê êşîya û bi qasî seatekî li ser wî giriya. Piştî ferman da xeznedara xwe û jê re got: “Qetekî hevrehşim û sed dînarî bide Dilşa” Piştî

li wê jî zîvirî û jê re got: “Dilşacan, tu jî biçe wî ji malê derxîne û wî amade bik ji bo definkirinê!”

Dilşa got : “Bila be xatûna min” Piştî rahişt qetê hevrêşim û diravan û ji wir derket, berê xwe da malê bi dilgeşîyeke xweş û mezin. Hat derbasî cem Ebûl Hesen bû û tiştê ku pê re qewimîbû jê re anî ziman. Ebûl Hesen bi kêf rabû ser xwe, newqa xwe girêda û ji kêfan dest pê kir, reqîşî!

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî navber da vegotina çîroka xwe û bêdeng bû.

ŞEVA 160'EMÎN

Şehrezadê berdewam kir:

Piştî wê kêf û reqsa xwe, Ebûl Hesen jina xwe Dilşa, li dewsa xwe dirêj kir li erdê. Çavên wê girtin, nigên wê dane ber hev û foteyek bi ser dakir. Piştî kofîya serê xwe çirand, rîha xwe kişîşand, dawa xwe çirrand û bi helkehelk bazda, çû cem Xelîfe, derbasî meclîsa wî bû. Çawa ku Xelîfe ew di vî halî de dît, bi metirsi jê pirsî û got: “Xêr e Ebûl Hesen, çi qewimîye?” Ebûl Hesen girîya û got, “Xwezîka ne ev destbirakê te hebûya, ne jî ev seata han bidîta!” Xelîfe got: “Hela ji min re bibêje” Ebûl Hesen got: “Bila serê te sax be, Dilşa çû ser dilovanîya xwe!” Xelîfe xemgîn bû, destên xwe li hev xistin û got: “Lailahe illallah!” Piştî bêdengîyeke kurt, serê xwe rakir û axaftina xwe berdewam kir, got: “Mitalan meke Ebûl Hesen, ez ê cêriyeke din bidim te!” Di pey wê re jî gazî xeznedarê xwe kir û jê xwest ku sed dînarî û perçeyeke cawê hevrêşim bide wî. Û li Ebûl Hesen jî zîvirî, jê re got: “Tu jî cenazeyê wê rake û wê amadeke bike ji bo definkirinê.”

Ebûl Hesen rahişt hevrêşim û dînarên xwe, piştî bi kêf û çov berê xwe da mala xwe. Derî vekir û bi kelecânî derbasî cem Dilşayê bû û jê re got: “De ka êdî rabe ser xwe, vaye lîstika me çû serî û me diravên xwe jî bi dest xistin, li gel qetek hevrêşim!” Bi dilekî geş jinik rabû ser xwe û ji nû ve xwe girêda, piştî herdû bi hev re ketin nava sohbetake bi kêf û laqirdî.

Îca em vegerin ser Harûnê Reşîd. Çawa ku Ebûl Hesen ji cem derket êş û xemgîniya nava dilê wî kûrtir bû û nema xwe girt. Meclîs û dîwana xwe belav kir, ew jî rabû, pala xwe da ser milê Mesrûr ê Celad û berê xwe da xilweta Zubeyde Xanimê ji bo ku sersaxîyê jê re bixwaze ji ber mirina cêrî û xeznedara wê ya berê, Dilşa. Çawa derbasî cem wê bû, dît ku rûnîştî ye û digirî. Jixwe ew bi xwe jî difikirî ku rabe ser xwe û biçe sersaxiya mêrê xwe ji ber mirina destbirakê wî yê şevan Ebûl Hesen. Xelîfe ji jina xwe Zubeyde Xanimê re got; “Ji ber wefata Dilşayê bila serê te sax be xanim!”

Jina wî Zubeyde Xanim rimekê ji cihê xwe pengizî û got: “Selamete cêriya min Bego, Xwedê wê bisitirîne, yê ku çûye ser dilovanîya xwe ne-

dîmê te Ebûl Hesen e, bila serê te sax be, ma em çawa bikin, qedera me gişan di destê wî de ye!” Xelîfe kenîya û li xadimê xwe Mesrûr zîvirî jê re got: “Tu jî dibînî bê jin çiqasî kêmaqil in! Tu bi Xwedê kî Mesrûr ka ji wê re bêje, çend kêlikan beriya niha jî Ebûl Hesen ne li cem min bû?” Zubeyda Xanim ji ber êşa dilê xwe û ji hêrsan kenîya û got: “Ma niha dema henekên te ye ku tu wisa dikenî! Qey nebes e ku me Ebûl Hesen wenda kiriye, tu dixwazî Dilşayê jî bide kuştin û me ji herduyan mehrûm bihêlî! Tew bi ser vê yekê de tu min kêmaqil ji destnîşan dikî!” Xelîfe, di ya xwe de îsrar kir û bi bawerî dubare kir, got; “A ku miriye cêriya te Dilşa ye” Zubeyde Xanim jî bi heman şeweyê di ya xwe de îsrar kir û got: “Belkî ez ne li cem te bûm û ez nizanîm bê kî li wir bû, lê divê tu bizanibî ku çend kêlî beriya niha jî Dilşa li vir bû; digiriya, porê xwe kişandibû û kincên xwe qetandibûn, digot mêrê min miriye. Ez jî li ber dilê wê çûm û hatim û min sed dînar û qetek hev-rêşim dayê. Ji bo here ku amadekarîya rakirin û definkirina cenazeyê wî bike. Ji xwe ez li bendî te bûm ji bo ku ez sersaxiyê ji te re bixwazim ji ber mirina nedîmê te.”

Xelîfe dîsa kenîya û got: “Ya ku miriye Dilşa ye!” Zubeyde got: “Na wile yê ku miriye Ebûl Hesen e!” Bi vê gotina wê re Xelîfe hêrs bû, qeherî û xwêdaneke germ di aniya wî ya haşimî re avêt. Bi dengê bilind qirîya û gazî Mesrûr kir, jê re got: “Zû rabe, here mala Ebûl Hesen û binêrê bê kî miriye û were!” Piştî li Zubeyde vegeirîya û jê re got: “Di vê mijarê de tu bi min re dikevî şert de?” Zubeyde lê vegeand û got: “Ez bi te re dikevim şert de û ez dibêjim ê ku miriye Ebûl Hesen e!” Xelîfe got: “Ez jî diêjim a mirî Dilşa ye û heger tu qebûl bikî bila şertê me jî bexçeyê Seyranê be, yê di neqeba qesra te û qesra Mûzeyê de.” Wê jî pejirand û herdû rûniştin, man li bendî xebera ku Mesrûr ji wan re bîne.

Mesrûr jî bi lez çû mala Ebûl Hesen. Di wê navberê de Ebûl Hesen li ber şibakê rûniştî bû û li sikakê dinêrî. Çawa dît ku Mesrûr bi lez ber bi mala wan ve tê, mesele fêm kir û ji Dilşa re got: “Ez bawer dikim ku çawa ez ji cem Xelîfe derketim, ew jî çûye cem Zubeyde Xanim ji bo ku sersaxiya wê bike ji ber mirina te. Zubeyde Xanim jî sersaxiya wî kiriye ji ber mirina min û gotiye yê ku miriye Ebûl Hesen e, ne Dilşa ye. Piştî herdû ketine qirika hev de û li dawî şert avêtine ber hev û Mesrûr şandine mala me ji bo ku xebara rast ji wan re bibe, lewre waye Mesrûr bi lez tê mala me. Vêca ka rabe xwe li erde dirêj bike û li mirîtiyê deyne, da ku xebera mirina te ji Xelîfe re bibe û gotina min piştrast bike.”

Dilşa, xwe li erde dirêj kir û nigên xwe dana ber hev. Ebûl Hesen jî çavên wê girtin û foteyek avête ser, ew nuxumand. Di wê kêlikê de jî Mesrûr li derî da û kete hundur de. Çawa ket hundur de û silav li Ebûl Hesen da, dît ku jina wî Dilşa li erdê dirêjkiriye û çavên wê girti ne. Hat di ser meytê wê re sekini û got: “Lalîlahe îllalah, nexwe xwişka me Dilşa çûye

ser dilovaniya xwe. Pir zû bû, lê em çawa bikin rehma Xwedê lê be û wê bi buhuşta xwe şa bike!”

Mesrûr vegeyriya qesrê, bi devlikenî derbasî cem Xelîfe û jina wî bû. Harûnê Reşîd çawa ku ew di wî halî de dît, pê de xeyidî û jê re got: “Kotîyo, ma niha wextê kenê te ye! Ka hele ji me re bibêje bê kîjan ji wan miriye?!” Mesrûr got: “Bêgûman wek Ebûl Hesen bi xêr û selamet e, ya ku miriye jina wî Dilşa ye!” Xelîfe li Zubeydeyê zîvirî û jê re got: “Te qesr û bexçeyê xwe di listikekê de wenda kir!” Piştî kenîya û ji Mesrûr re got: “Ka Mesrûr ji xatûna xwe re bibêje bê tu çawa çû û te çi li wir dît!” Mesrûr li xatûna xwe zîvirî û got: “Rast e Zubeyde xan, ez bi lez çûm mala Ebûl Hesen. Çawa ku ez derbasî hundur bûm, min dît ku termê Dilşayê li erdê ramidandî ye, foteyek bi ser dakirî ye û Ebûl Hesen jî li ber serê wê rûniştî ye, digirî. Min silavek dayê, sersaxî jê re xwest û ez li kêlekê rûniştîm, min fote ji ser çavên Dilşayê da alî, min dît çavên wê girtîne, çawa ku di xewek bêdawî de be. Rûçikê wê jî nepixokî û sipîçolkî bûbû. Min ji Ebûl Hesen re got; ka laşê wê rake mizgeftê da ku em li ser nimêj bikin. Wî jî got; bila be. Ez jî zû hatim ji bo ku ez we agahdar bikim. Ew jî, wê amade dike.”

Xelîfe kenîya û ji Mesrûr re got: “Tu baş dibêjî, lê belê xatûna te ya kêmaqîl tê nagihêje!” Bi vê gotina Harûn Reşîd re, Zubeyde xan hêrs bû û got: “Kesê kêmaqîl, tenê ew ê ku ji gotina koleyekî bawer dike!” Piştî sixêf ji Mesrûr re dan û ew ji wir qewirand. Xelîfe jî hîna dikenîya. Mesrûr jî berî ku ji wan dûr keve ji Xelîfe re got; “Kesê ku gotiye jin kêmaqîl û kemal in, rast gotiye!”

Zubeyde Xan li Xelîfe zîvirî û jê re got: “Emîrê Bawermandan, tu laqirdiyan bi min dikî û ev koleyê te jî piştî xwe bi te qewîn dike û henekê xwe bi min dike! Lê belê ez ê rastîye derxim holê û ez ê nişanî te bidim bê yê mirî kî ye!” Piştî gazî Qehremanê kir û jê re got: “Bi lez rabe here mala Ebûl Hesen û binêre bê kî miriye û bi heman lezê li me vegere, xebera rast ji me re bîne!” Pîrejina dilsoz di cîh de ji wir derket û ber bi mala Ebûl Hesen ve sûrikî çû. Xelîfe û Mesrûr jî hîna dikenîyan.

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî vegotina çîroka xwe bi dawî kir û bêdeng bû.

ŞEVA 161'EMÎN

Şehrezadê vegotina çîroka xwe berdewam kir:

Qehremanê bi lez û bez di sikakê de disûrikî gava ku Ebûl Hesen ji jêr ve, ji şibakeya mala xwe ew dît bê çawa tê. Di cîh de texmîn kir bê ji bo çi tê mala wî, li jina xwe zîvirî û jê re got: “Dilşa Xan, wa ye ew pîrejina Qehremanê tê mala me ji bo ku rastiya meseleyê fêm bike û here ji xatûna

te Zubeyde re bêje. Lewre, wisa xwiya dike ku Zubeyde Xatûn baweriya xwe bi gotina Mesrûr ne anîye. Îcar vê carê dora mirinê li ser min e. Divê min mirî bibîne ji bo vê carê gotina te rast derkeve li ba Zubeyde Xanimê!” Dilşa got: “Tu rast dibêji.” Ebûl Hesen xwe li erdê dirêj kir û nigên xwe jî bi hev ve zeliqandin. Dilşa çavên wî girêdan û foteyek bi ser dakir, ew nixumand. Piştî li ber serê wî rûnişt, gijika porê xwe kişkişand û dest bi girî kir. Tam di wê kêliyê de Qehremanê derbasî hundur bû û dît bê Dilşa di çî halî de ye û çawa li ber serê Ebûl Hesen rûniştiye, li ser digirî! Di heman demê de çawa ku çavên Dilşayê li Qehremanê ket, wêlê-wêl pê ket û jî pîrejîne re got: “Wax li min, wax li min! Te dît bê çawa Ebûl Hesen ji vê dinyê bar kir û ez bi tenê bî hiştim?” Piştî careke din wêlê-wêl pê ket û gotina xwe dîsa berdewam kir, ji pîrejîne re got: “Dayêcan, xwezîka te bizanîba bê ji niha ve, min çiqasî bêriya wî kiriye!” Qehremanê got: “Tu mafdarî keça min, lewre ez jî dizanim bê wê çiqasî ji hevdû hez dikir û hûn çiqasî hayî hev bûbûn!” Piştî têgihişt ku Mesrûr derew li Xelîfe û jina wî kirîye, axaftina xwe berdewam kir û got: “Hindik mabû ku Mesrûr fitneyeke bixe neqeba xelîfe û jina wî de û wan berra hev bide!” Dilşa gotina wê birrî û jê pirsî, got: “Îcar ew fitne çî bû dayêcan?” Qehremanê got: “Keçkê, qasek berê Mesrûr hat cem we û vegerîya hat ji xelîfe û jina wî Zubeyda Xanimê re got ku tu miriye û Ebûl Hesen sax e, rastiya heyî berovajî kir.” Dilşa got: “Dayêcan jixwe ez çûbûm cem xatûna xwe û min ew agahdar kiribû. Wê jî sed dînarî û perçeyek hewreşm dabû min. De êdî va tu jî dibini bê ez di çî halî de me û çî bi serê min hatîye! Ka ez ê tenê bi serê xwe bikaribim çî bikim û çî xwelîyê li serê xwe bikim! Xwezî ez di şûna wî de biçûma, ew di şûna min de bimaya!” Û giriye xwe jî pê re berdewam kir, pîra Qehremanê jî pê re giriya û hewl da dilê wê xweş bike.

Beriya rabe ser xwe, guhkê foteyê ji ser çavên Ebûl Hesen da alî, dît ku çavên wî girtî ne û rûyê wî sipîçolkî bûye xwîn jê kişiyaye, nepixiye. Fote dîsa kişand ser çavên wî. Sersaxî ji Dilşa re xwest û rabû ser xwe, vegeriya qesrê. Çû cem xatûna xwe Zubeyde û çîroka heyî jê re got. Zubeyde Xan keniyan û jî pîrê re got: “Ka vê rastiyê ji xelîfeyê ku min kêmaqil dibîne re bibêje, ji bo bizanebe îman û ola kê kê m e.”

Mesrûr xwe negirt û jî pîrê re got: “Tu derewan dikî pîra bêmîrê, min bi çavên serê xwe dît ku terme Dilşa li erdê raxistî ye û Ebûl Hesen jî li ber serê wê rûniştî ye digirî.” Pîrê bi hêrsa dil lê vegerand û got: “Na wele tu yî yê derewan dikî û tu dixwazî fitneyê bixî navbera Emîrê Bawermendan û Zubeyda Xanimê!” Mesrûr di bin gotina wê de nema û bi heman şeweyê lê vegerand, got: “Derewîna mezin tu yî pîra bêmom, xatûna te jî xurîfî ye ji ber ku ji te bawer dike!” Di pey vê gotina wî re, Zubeyde Xanim bi ser de qirîya û pê de xeyîdî. Piştî jî giriya. Rabû Xelîfe jê re got: “Ez derewan dikim û xizmetkarê min derewan dike. Tu derewan dikî û xizmetkara te

jî derewan dike, de îcar wê çawa bibe? Ez ê ya rast nişanî we bidim: “Ka rabin em hemû bi hev re herin mala Ebûl Hesen û em binêrin bê kî ji wan miriye, kî maye. Ne bi vê şêwayê be, em nikarin mijarê zelal bikin.” Mesrûr di cîh de li pey xelîfe dûbare kir û got: “Ka rabin em herin, ji bo ku dûvre ez bikaribim haweyên xerab bi vê pîra bêoxir bikim!” Pîrê jî lê vegerand û got: “Kêmaqîlo, kotîyo, befediyo, ma qey aqîlê te dibe mîna yê min? Aqîlê te nabe bi qasî yê mirîşkekê jî!” Mesrûr pir hêrs bû bi vê gotina wê û xwest ku lê bide. Lê Zubeyde Xanim ew berbend kir, bi şûn de dehband û got: “Seatek bi şûnde, dê hemû derewên we derkevin holê û rastî ya kê ji we be jî, wê çaxê wê xuya bike!”

Li Şehrezadê bû sibe û wê jî navber da vegotina çîroka xwe.

ŞEVA 162'YEMÎN

Şehrezadê vegotina çîroka xwe berdewam kir û got:

Di encamê de her çar bi hev re ketin şert de û ji qesrê derketin, dane rê ber bi mala Ebûl Hesen ve. Ebûl Hesenê ku li ber şîbakê rûniştî bû û çûnûhatina di sikakê re dişopand, nuh ew dîtîn, li jina xwe zivirî û jê re got: “Wisa xuya dike ku cerê diçe avê, her car ji şkenandinê xelas nabe! Ez texmîn dikim ku pîra Qehremanê çûye mirina min ji xatûna te re gotiye, Mesrûr derewîn derxistiye û li ser vê yeke ew û Mesrûr ji aliyekî ve pev ketine û ji aliyê din ve jî Zubeyde Xatûn û Xelîfe pev ketine û di encamê de hemû bi hev re ketine şert de û wa ye her çar bi hev re ber bi mala me ve tîn!” Bi vê gotina Ebûl Hesen re Dilşayê ji mirina xwe ya derewîn veciniqî û rabû ser xwe, got: “Îcar em ê çawa bikin?” Ebûl Hesen got: “Em ê herdu jî xwe li erdê dirêj bikin, hilma xwe bibirin û xwe li mirîtiyê deynin.” Jina wî jî bi ya wî kir, herduyan xwe li erdê vezilandin mîna du miriyan. Nîgên xwe dane ber hev, çavên xwe girtin û her yekî ji wan foteyek bi ser xwe dakir, bêhnçikyayî man, wek ku bi rastî jî miribin.

Xelîfe Harûnê Reşîd û Zubeyde Xanim li pêş, Mesrûr û Qehremanê jî li paş, derbasî hundur bûn. Gava derbas bûn û dîtîn ku herdu jî li erdê dirêj kirî ne, mirî ne, Zubeyde Xatûn got: “Hingî we nîfir li cêrîya min kir û xwest ku ew bimire, wa ye ew jî miriye. Lê belê ez texmîn dikim ku wê, mirina mîre xwe ranegirt û bi mirina wî re ew jî ji kerban di pey wî re mir û çû.” Xelîfe got: “A rastî ew berîya Ebûl Hesen miriye. Jixwe çawa ku mir, Ebûl Hesen hat cem min ez agahdar kirim, min jî perçeyek hevêrêşim û sed dînar da wî û min jê re got here meytê wê ji definkirinê re amade bike. Heta min xwest ku ez li ber dilê wî herim û bêm, min jê re got mitaleyan meke ez ê cêrîyeke ji wê çêtir bidim te li şûna wê. Lê wisa xwiya dike ku dilê wî ranegirtiye.” Lê belê Zubeyda Xatûn ev gotina wî qebûl nekir û gelek tiştên

din jê re gotin. Wî jî gotinin din gotin, lê kesî bi serê yên din nexist û li hevdû nehatin.

Xelîfe çû li ber serê herduyan rûnişt û bi dengekî hêdî di ber xwe de got: “Bi tirba Resûlê Ekrem û bi tirba bav û kalikên min, heger yekî we ji min re bigota bê kî berî kê miriye, min ê hezar dînar weke diyarî bida wî!” Gava Ebûl Hesen ev gotina Xelîfe bihist, bi lez ji cihê xwe çeng bû, rabû ser xwe û got: “Ez berî wê mirim Emîrê Bawermendan, de êdî sunda xwe neşkîne û kanî wî hezar dînarî bide min!” Di heman kêliyê de Dilşa jî serê xwe rakir û rabû ser xwe. Gava ku Xelîfe û Zubeyde Xatûn herdu sax dîtin li himber xwe, dilxweş bûn û ji kêfan re baskên wan çêbûn, hemûçikan herdû himbêz kirin, ramûsan û dilê xwe rehet kirin.

Dûvre Xelîfe û Zubeyde Xatûn ew pîroz kirin ji ber saxî û sebatîya wan û ji herduyan jî fêr bûn ku ew listika mirinê ji bo bidestxistina dînan bi wan re listine. Zubeyde Xatûn ji Dilşayê re got: “Te dikarîbû pêdivîyên xwe yên ji diravan ji min bixwesta bêyî ku wisa dilê min bişewitînî!” Dilşayê lê vegerand û got: “Min şerm kir ku ez ji te bixwazim xatûna min!”

Xelîfe jî ji ber kenan xerîqîbû. Ji Ebûl Hesen re got: “Tu çima navê wisa xweş li xwe dikî û karen wisa ecêb û xerib dikî?” Ebûl Hesen lê vegerand û got: “Emîrê Bawermendan, gava ew diravên te dabûne min qedîyan, min fedî kir ez careke din diravan ji te bixwazim. A rastî gava ez azîb bûm, ne xema min bû bêdiravmayîn. Lê piştî te ez bi vê jinê re zewicandim, heger malê te hemû yê min bûya jî, min ê biqedanda. Vêca gava bêrika min vala bû, min ev hîle li te kir û bi wî hawî sed dînar û perçeyek hevrêşim bi dest xist. Ev hemû sedeqeyên xelîfeyê me ne, de êdî sunda xwe bigire û kanî wî hezar dînarî ji bide min!”

Xelîfe û Zubeyde Xatûn herdu kenîyan bi wê gotina Ebûl Hesen. Rabûn vegeyriyan qesra xwe, li wir hezar dinarên din dan Ebûl Hesen û jê re gotin: “Ev jî bila xelata xelasiya te ya ji mirinê be!”

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî navber da vegotina çiroka xwe û bêdeng bû.

ŞEVA 163'YEMÎN

Şehrezadê vegotina çiroka xwe ji Şehreyar re berdewam kir û got:

Ji adeta Ebûl Hesen bû ku li gel xortekî ciwan bi navê Elî Bekar rûnê. Elî Bekar bi xwe jî, kurê mîrekî Eceman bû. Bejin zirav, rûgeş û lihevhatî bû. Sorhinarrû, burhûqeytan û zîmanşêrîn bû. Ji sohbet û destbîrakiyê hez dikir. Vêca rojekê gava herdu li dikana Ebûl Hesen rûniştî bûn, guftûgo dikirin, deh jin di ber wan re derbas bûn ku her yek ji wan mîna heyveke çardeşevî bûn, pir spehî û mêrkuj bûn. Vêca di nava wan her dehan de jî,

yeke li qantirê siwarkirî hebû, mirov newêribû lê binêriya. Fîstanekî hevrê-
şimî lêbû û kemereke zêrin li newqa wê ya zirav girêdayî bû ku bala herkesî
dikişand, çawa ku helbestkar jî gotiye:

Rûyê wê yî şayîk û nermok mîna hevrêşim e
Kulîmekên wê grover û giran in lê ne zêde ne
Cotek çavên belek ku nûr dibare ji nava wan
Û hiş dibe ji serî mîna wê meya ergûwan
Bila zêde bike her şev êşa dilê min ew
Belkî gîhaştineke me hebe li wê dinyê lew

Gava ew jin gîhaştin texma dikana Ebûl Hesen, a ku li qantirê siwar
bû, jê daket û derbasî hundur bû, hat li cem Ebûl Hesen rûnişt piştî silav-
dayîneke germ. Bi dîtina wê, Elî Bekar kelecânî bû û hindik mabû aqilê
xwe wenda bike. Rabû ser xwe bi armanca ku here, lê jinikê jê re got: “Li
cihê xwe rûnê! Çawa tu dikî herî û em hatine vir!” Elî Bekar got: “Wellehî
xatûna min ez dikim ji vê sipehîbûna kujer birevim! Wî helbestkarî çiqasî
rast gotiye gava gotiye:

Roj e ew li azmanê heftan
Ezîza ber dil e kujera mêran
Nikarî tu herî cem li wî banî
Ne jî dakevî ji cem wê xwarî”

Jina ciwan bişîrî, gava ku ew helbest ji devê Elî Bekar bihîst. Çavên
xwe vekirin û ji Ebûl Hesen re got: “Ev xortê li gel te kî ye û navê wî çi ye?”
Ebûl Hesen lê veğerand û got: “Ciwaneke xerîb e, kurê mîreke Eceman e.
Em jî mecbûr in qedrê xerîban bigirin.” Jinikê got: “Dema cêriya min hate
cem te, wî bişîne cem min!” Ebûl Hesen jî got: “Ser seran, ser çavan!”

Jinik rabû ser xwe bi rêya xwe de çû, lê belê pêlên xweşikbûna wê
agirek di nava Elî Bekar de dadabû ku nema dizanîbû wê çawa vemirîne!

Saatek bi şûn de, cêriya wê jinikê hat dikanê û ji Ebûl Hesen re got:
“Xatûna min, te û hevalê te vedixwîne cem xwe!” Ebûl Hesen di cîh de rabû
ser xwe, Elî Bekar jî bi xwe re bir û berê xwe dan qesra Harûnê Reşîd. Gava
gîhan wir, cêriyê ew derbasî eywanekê kirin û li wir ew dane rûniştandin.
Qasekî bi şûn de jî xwarin û vexwarin li ber wan rêz kirin. Wan jî xwarina
xwe xwarin, piştî destên xwe şuştin. Di pey wê re şerab û mey ji wan re
anîn, ew jî vexwarin. Piştî ew ji wir rakirin û ew derbasî eywanekê din ki-
rin ku li ser çar nigan bû û bi merş û berrên ecemî yên giranbuha raxistî bû
û hemû cûreyên xêzê xemilandîbû mîna buhuşteke heftrengî. Ebûl Hesen
û Elî Bekar herdu jî matmayî man li himber wê dîmena bihuştî.

Hîna herduyan çavên xwe li ser xeml û xêza wê eywanê digêrandin
û pê şadîbûn, bîst cêrî derbasî hundur bûn ku Rojan jî di nav wan de bû.
Bîst cêriyên mîna bîst stêrkan bûn û Rojan jî mîna navê xwe bû di nava

wan stêrkan de. Kirasekî şîne ezmanî lê bû ku bi şerîten zêr xemilandîbû û kemerek bi yaqût û cewheran ve hûnayî li newqê girêdayîbû. Weke qitikê meşîya hetanî çû li ser text rûnişt.

Çawa ku çavên Elî Bekar lê ketin, li Ebûl Hesen zîvirî û jê re got: “Heger te xêra min bixwesta, beriya ku em derbasî vir bibin, teyê ez agahdar bikirama ji van dîmenên li pêşîya min, ji bo ku min jî tevdira xwe bigirta û singê hefsarê nefsa xwe bikuta da ku li ber vî bayî û vê talanê neçûya!” Piştîrê kûrekûr pê ket giriya, gazin û lome lê kirin û pê êşîya. Ebûl Hesen, jê re got: “Biracan, ji xêrê pê ve min tiştê ji te re nexwestîye. Lê belê min dil ji te tunebû ji serî de ez ji te re bibejim, da ku kelecana te negire û di dema rasthatinê de te serobino neke. Bila dilê te aram be û qinyata te hebe ku ew pir kêfxweş e bi dîtina te û zû jî dixwaze xwe bigihîne te!” Elî Bekar jê pirsî û got: “Navê wê çi ye gelo?” Ebûl Hesen got: “Navê wê Rojan e û ji herema Emîrê Bawermendan, Harûnê Reşîd e. Ev der jî, beşek ji qesra xîlafeta wî ye.

Nuh Rojan li ser textê xwe rûnişt, çavên xwe zîq berda ser Elî Bekar û bi wan awirên xwe yê mêrkuj, spehîbûna wî teqiland, kêland û di encamê de dilê xwe bi nav destê wî de berda bê şert û merc. Elî Bekar jî bi heman awiran li wê dinêrî û bi agirê wê dişewitî, bêyî ku deng derxîne. Herdu dil ketibûn hev û serên wan gêj bûbû bi îksîra eşqê, beyî ku meyê vexwîn.

Di wê navberê de her cêrîyekê rahiştibûn amûreke mûzîkê û li ser cihê xwe rûniştibûn, li bendî îşareta Rojanê bûn ji bo dest pê bikin. Her yek ji wan li ber şibakakê rûniştî bû û mîna steyrekê şewq dida tarîya şevê. Dema Rojan bi îşaretekê ferman da wan, cêrîyekê ji wan dest bi lêxistina ûdê kir û got:

Nameya dil dîsa li min vegerîne
Bersiva min eşkere bigire mizgîn e
Ey gewretirîn mîrê mîran
Li ba te dikim vî giliyê dilan
Ey serdarê vî dilê bê dîn û îman
Ey kilidê jiyana min ciwan
Maçekê bide ji bo xatirê Yezdan
Bila deyn be li ba min ne ku bexşan
Ez ê duqat li te vegerînim wan maçan
Bila bêhesab bin ger bixwazî tu ey can

Elî Bekar, mest û gêj bû bi vê strana xweş. Loma li Rojan zîvirî û got: “Xwezî hîn bêhtir bigotana ji wan helbestan!” Rojanê li cêrîyeke din nêrî û jê re got: “Tu berdewam bike!” Wê jî li çenga xwe xist û dest pê kir, got:

Xew ji çavan revand bi wê meyle
Bi dîtina wî serxweş ketim ne bi meyê

Ne ber dilê min girt îro wê bîranînê
Ne jî em gîhandin hev wê hêvîyê
Bi nêrînekê tewand ewî vîna ji pola
Bi birînekê kuşt ewî ev keça çola

Gava ku ew stran jî qedîyan, Elî Bekar bi ser cêrîya kêleka xwe de zî-
virî û jê re got: “Ka êdî tu bibêjî!” Cêrîyê rahişt ûda xwe û dest pê kir, got:

Pevşabûn jî tengav dike vî canî
Çima wisa dibe, gelo delal dizanî
Ma kengî kilidê dil parastiye ji dilan
Kengî rûpoşan cemal parastiye ji çavan
Şa bin bi wextê xwe her bê hesab
Ev in demen zêrîn ji we re evîn sewab

Gava cêrîyê ew helbesta xwe qedand, Elî Bekar, kesereke kûr veda û
hêsir barandin, axîn û nalîn pêket. Dema Rojanê çav li wê rewşa wî ket û
dît bê çawa agirê eşqê ew qemirandiye, ji ser textê xwe rabû û çû ber deriyê
eywanê. Elî jî çû cem û herduyan hevdû maçî kirin û bi agirê wê maçê jî, ji
ser hişê xwe çûn, li erdê dirêj bûn. Cêrîyên din bi wan ve rabûn, ew anîn ser
cîhên wan û ava gulan bi ser çavên wan de reşandin. Piştî demekî bi ser hişê
xwe ve hatin û dîtî ku Ebûl Hesen ne xwiya ye! Çawa ku Rojanê got: “Kanî
Ebûl Hesen?”, wî serê xwe ji pişt text derxist û got: “Va ez li vir im xatûna
min!”, lewre bi zanebûn xwe ji ber çavên wan veşartibû. Rojanê kêfxweş bû
bi vê helwesta wî û jê re got: “Ez hêvî dikim Xwedê Teala xelata vî kare te ye
giranbuha bide te, ey mirovê qenc û dilsoz!”

Dûvre bi ser Elî Bekar de vegeriya û jê re got: “Mîrê min! Bawer bike
her hilmek ji evîna te, sed hilm evîn bi min re diafirîne, lê vê gavê, ji sebrê
pê ve tu rê li ber me tunene!” Elî Bekar lê vegerand û got: “Xatûna min! Tu
jî bawer bike ku hevgîhaştina me jî nema dikare vê agirê nava min vemirî-
ne! Heta ev dilê min hebe, dê zewal jî eşqa te re tunebe!” Hîna ev gotina
xwe neqedandibû, hêsir ji çavên wî hatin xwarê, mîna barana buharê.

Çawa Rojanê dît ku Elî digirî, ew jî pê re giriya û hêsirên wan li nav
hev ketin, bi ser hinarkên wan de herikîn. Ebûl Hesen nema xwe girt, bi
heyrangorî axivî û got: “Bi rastiya xwedê mirov hem zikreşîya we dike, hem
jî li rewşa we heyirî dimîne! Şaşwazîya min î herî mezin ew e ku hûn her-
dû di himbêza hev de ne, lê dîsa jî hûn digirîn, mîna ku hûn dûrî hev bin
û nikaribin bêgihêne hev! Heger niha hûn di vî halî de bin, gava hûn jî hev
veqetin dê halê we çawa be? Şiyar bibin û bi ser xwe ve werin, ev dem dema
kêf û şahîyê ye ji bo we, ne dema girî û êşê ye!”

Qasekî din bi şûn de, Rojanê bi destan îşaretek da cêrîyeke xwe ji bo
paşîvekê bînin. Cêrî di cî de rabû ser xwe û çend hebên din jî bi xwe re bi-
rin. Piştî demekê bi şûn de hatin û di destên wan de sênîyên zêr û sifreyên

zîv ku ser wana tijî xwarinên cûr bi cûr bû. Hemû danîn ber wan.

Rojanê hem dixwar hem jî gepo gepo di devê Elî radikir, ew têr dikir. Li dawîyê sifreya xwarinê rakirin, wan jî destên xwe şûştin, zuhakirin û dîsa li cihê xwe rûniştin. Cêrîyekê çend heb buxûrdane anîn, darikên buxûrê tê de bi cîh kirin û pêxistin. Bêhnên xweş li eywanê belav bûn. Dûvre yeke din jî tas û zerikên ava gulan anîn, li ber wan danin. Hemû çikan bi ser xwe dakirin û bêhna xwe pê derxistên. Herî dawî ji çend careyeyan fêkî û şarab û meyên cûr bi cûr anîn li ser sênîyên zêr ên neqîşandî, li ber wan danîn.

Piştî Rojanê deh heb stranbêj ji cêrîyên xwe hîlbijartin û deh heb ji xizmetkaran, ji bo li wir bimînin û ji hemû cêrî û xizmetkarên mayîn xwest ku ji wir herin. Çawa ku ew bi tenê man û yên din derketin, Rojanê li yekê ji wan stranbêjan zîvirî û jê re got: “ Li ûdê bide û bistrê.” Cêrîyê dest pê kir û got:

Eşqê hemû razên min eşkere kirin
Çi hebû di sînga min de veder kirin
Hêsirên çavan jî ketin navbera me de
Çawa ku ew bi xwe jî aşîqêd wî bin

Gava ku stranbêjê ev helbesta xwe bir serî, Rojanê piyaleyek vexwar û yek ji dagirt, da destê Elî Bekar...

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî navber da vegotina çîroka xwe û bêdeng bû.

ŞEVA 164'EMÎN

Şehrezadê ji Şehreyar re got:

Îcar şahînsahê min î bextewar, berdewamiya çîroka me bi vî hawî ye, gava Rojanê piyaleyek bi meyê dagirt û da destê Elî Bekar, ji cêrîya kêleka xwe jî xwest ku çend beytên din bi stranî bixwîne. Cêrîyê jî li çenga xwe da û dest pê kir, got:

Hêsirên min bi meyê re her dibine ar
Çawa ku ji piyale birjin her têne xwar
Gelo ji hêsirên şil bûne mijankên min
Ango bi meyê xwe şûştine wan ji min
Gelo ji piyalê bû min vexwar ew ab
Ango ji mijankan dawerivîbû ew ab

Bi vê helbestê re, Elî Bekar jî meya xwe vexwar û piyaleya vala li Rojanê vegerand. Wê jî dîsa dagirt û da destê Ebûl Hesen. Piştî wê bi xwe destê xwe avêt ûdê, têlên wê şidandin û bi helbestî stra, got:

Fermîskên canrij dilerizin li ser hinarkan
Ji agirê wecda eşqê dilizin ew di hinavan

Nêzîk bin jî digirîn ew ji tirsî dûrketina tavan
Lewre cîran in hêsrên êş û şahîyê li cem wan

Gava ku Ebûl Hesen, Elî Bekar û hemû haziran ev helbesta strankî ji Rojanê bihîstin, serxweş û mest bûn. Hindik mabû ku baskên wan çêbibin. Di nava wê ken û kêf û xweşiyê de, coş û kelecaneke bêsinor ew dane ber pêlên xwe û bi hewa xistin...

Di wê navberê de ji nişkê ve cêrîyek ket hundur de ku her derê wê ji tirsan dilerizî. Li raserî Rojanê sekînî û got: "Xatûna min, Emîrê Bawermendan tê vir. Hindik maye bikeve hundur de. Celadê wî Mesrûr û gelekên din jî pê re ne, hemû jî bi şûr û rim îm!"

Gava ku ev gotin bihîstin, qidûmên gişan şikest ji tirsan û nema dizanibûn wê çi çawa bikin. Lê dema dîtî ku Rojanê dikene, bêhna wan hate ber wan. Rojanê got: "Wan bide mijûlkirin hetanî ku em ji vê eywanê derkevin." Piştî ferman da cêrîyên dîtirkê ji bo perdeyan berdin, şibake û deriyan bigirin. Ew jî ji wir derket, derî li dû xwe kilid kir û çû di bexçe de, li ser textê xwe rûnişt û ji cêrîyekê xwest ku nigên wê bifirkîne, ji yên din jî xwest ku her yek here cihê xwe û ma li bende hatina Xelîfe. Çend kêlik derbasbûn, Mesrûr di deriyê bexçe re xuya kir. Di pey wî re jî bîst heb zîlamên din derbasî hundurê bexçe bûn. Hemû jî bi şûr bûn. Rojanê ji wan re got: "Hûn hatine çi?" Gotin: "Emîrê Bawermendan silavan li te dike û dibêje min pir bêriya dîtina wê kiriye, dibêje îro rojeke xweşî û bextewariyê ye û ez dixwazim ku bi hebûna wê re ev bextewarî derkeve asta herî jor. Vêca gelo tê were cem wî, ango ew dê were vir?" Rojanê di cî de rabû ser xwe, bejna xwe tewand û erd maçî kir, piştî got: "Fermana Emîrê Bawermendan li ser ser û çavên min e!" Dûvre gazî qehremane û cêrîyan kir û fermana xelîfe ji wan re jî ragihand û xwest ku derûdorê têkûz bikin ji bo pêşwaziya xelîfe yê Bawermendan. Her dawî jî dîsa li Mesrûr û qasidên xelîfe zîvirî û ji wan re got: "Herin cem Emîrê Bawermendan û jê re bibêjin di nava çend xelean de em amade ne ji bo pêşwazîkirina wî. Ji xwe ez ê cihekî baş jê re raxînim û amade bikim."

Bi vê gotina Rojanê re Mesrûr û her bîst zîlamên xwe bi şûn de çûn. Rojan jî bi lez rabû çû eywanê cem evîndarê xwe Elî Bekar û ew himbêz kir, xatir jê xwest û giriya. Elî got: "Xatûna min kanî derfetê bide min ku ez çêja vê xatirxwestinê derxînim, lewre dibe ku mirina min bê û ez careke din te nebînim. Ez hêvî dikim ku Xwedê sebrê bide min da ku ez bi vê belaya eşqê re herim serî." Rojanê got: "Wele ya ku wê mala wê xera bibe ez im. Ê te, dîsa tu dikarî derkevi sûkê, kesin ku wensa te bînin bibîni û sebra xwe bi wan bîni. Lê belê yê min, dê serê min bikeve belayê. Bi taybetî jî piştî ku min civanek da Xelîfe. Dibe ku ev yek metirsiyeke mezin li ser min çêbike ji vê evîna min û bêrîkirina te û eşqa ku dê li pey veqetandina ji te were. De

ka êdî ez ê bi kîjan zimanî bistirêm, bi kîjan dilî Xelîfe pêşwazî bikim, bi kîjan hestan ez ê bikaribim sohbetê bi Xelîfe re bikim, bi kîjan awiran ez ê li deverekê binêrim ku tu tê de tuneî û ez ê çawa di civatekê de rûnê ku tu tê de nebî û bi kîja çêjê ez ê meyekê vexwim ku ne ji destê te be?”

Ebûl Hesen jê re got: “Bêhna xwe fireh bike û xwe acîz neke. Bi taybetî îşev, sistahîyê neke di pêşwaziya Xelîfe de û hewl bide ku tu şiyar bî!”

Hîna ku ew wisa di nava xwe de dipeyîvîn, cêrîyek hat û ji Rojanê re got: “Xatûna min xulamên Emîrê Bawermendan hatin!” Rojan di cîh de rabû ser xwe û ji cêrîyê re got: “Tu jî Ebûl Hesen û hevalê wî bi xwe re bibe hetanî jora bexçe û wan li wî cihê tarî bihêle. Dûvre hewl bide ku tu wan ji bexçe derxîni derve.” Lê belê zeman nebû ku pê re bigihên, wan bibin wê derê. Loma cêrîyê hema ew birin xistin rewşenê û derî li ser wan girt. Rewşen odeyeke biçûk bû, di kêleka textê Rojan xatûnê de bû ku carinan kincê xwe tê de diguhertin.

Em vegerin ser rewşa Rojanê, ew jî bi tirs ma li hêvîya Xelîfe. Çend kêliyên din derbas bûn û pê de, Xelîfe û kesên pê re xuya kirin. Nêzikî sed kesî hebû. Nîvê wan xizmetkarên bi şûr û rim bûn ku kincin giranbûha û biroqankî li wan bû. Bi qasî bîst heb cêrîyên xweşik jî, li gel kincên xwe yên hevrêsimî û tacên xwe yên bi zêr û zebercedan neqîşandî, li dora Xelîfe dimeşîya mîna xelekik ji stêrkan. Di destê her yekê ji wan de jî mûmeke pêxistî hebû ku agirê wê li ber bê direqisî. Li pêşîya Xelîfe jî, Mesrûr û Efîf û Wezîf hebûn, xwe ditewtîhandin û dihatin, Xelîfe jî di nava wan de dilewlihî.

Rojanê û hemû kesên li cem wê, bi yek carê re rabûn ser xwe û bi pêş de çûn ji bo Xelîfe li devê derîyê bexçe pêşwazî bikin. Li devê derî, hemûçkan bejna xwe li ber tewandin û erda bin nigên wî maçî kirin. Piştî dan pêşîya Xelîfe û ew birin ser text, dane rûniştandin û ew jî li dora wî xelekek çêkirin, li ser nigan man. Mûm pêxistî bûn, çeng û saz û ûdê lê dida û ew jî li hêvîya fermana Xelîfe bûn. Li dawîyê Xelîfe jî xizmetkaran xwest ku ji wir biçin û ji Rojanê jî xwest ku li ser doşekan rûnin. Rojanê li ser doşeka li kêleka Xelîfe rûnişt û dest pê kir, pê re axivî. Helbet dengê vê axiftina wan diçû Ebûl Hesen û Elî Bekar jî, lewre çend metroyek di neqeba wan de hebû, ne zêde. Lê hayê Xelîfe ji wan tunebû. Piştî Xelîfe bi Rojan re list û laqirdî kirin. Di pey wê re jî ji xizmetçîyan re got: “Wê eywanê jî vekin!” Û xwarin û vexwarin xwestin, çîra û mûm pêxistin û şeva xwe weke rojê ronî kirin. Di pey re sêniyê zîv û zêr, tijî xwarina cûr bi cûr hate ber wan. Çend kêliyan bi şûn de jî, şerab û meyên kevîr ji wan re hatin.

Êdî herkesî vedixwar, hetanî bi xizmetkar û cêrîyan jî. Xelîfe li cêrîyekê zivirî û jê re got: “Stranbêja ciwan, hela bêje em binêrin çî li cem te heye?” Cêrîyê dest pê kir got:

Qet nabîne jineke Ereb serbilindiya eşqa xwe
Lewre vedigere ew her li serbilindiya hîcaza xwe
Gava tu hayî siwarekî bû bêriya wî bike tu
Bi agirê dil rabe bi hêsirên çavan bigire tu
Ji lerzînê bêhtirîn hewesa eşqê li min dide
Gava ku ez gunehê dikim di derbarê te de

Xelîfe Harûnê Reşîd mest bû bi wê helbestê û ji cêriyê xwest ku berdewam bike di stranên xwe de. Di wê navberê de cêriya Rojanê ya peywendîdar jî fersend dît ku peywira xwe ya nivcomayî bibe serî û çû ji paş ve deriyê rewşanê vekir bi dizî, Ebûl Hesen û Elî Bekar jî wir derxistin, birin ber qirawa avê û li wir, çepik lê dan, îşaret da hinekan. Çend xulekan bi şûn de, jî hêla din ve kekekê ber bi wan ve hat û li cem wan sekini. Cêriyê jî Ebûl Hesen û hevalê wî re got: “Li kekekê siwar bin.” Ew jî lê siwar bûn. Cêriyê jî kelekvan re got: “Van herduyan bibe wî aliyê avê û bilezîne!” Piştî wê jî xwe avêt kekekê û bi hev re çûn.

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî vegotina çiroka xwe birrî û navber dayê.

ŞEVA 165'EMÎN

Şehrezadê vegotina çiroka xwe ji Şehreyar re berdewam kir got:

Kelekvan bêrên xwe li avê xistin û bi lez çû hetanî ku ava çem qut kir û gihaşt aliyê din î avê. Li wê derê, cêriyê xatir jî Ebûl Hesen û hevalê wî xwest û got: “Min nedixwest ku ez we bi tenê bihêlim, lê mixabin ji vir wêdetir ez nikarim bi we re bêm.” Û jî wê derê bi şûn de vegeriya. Elî Bekar jî mîna meytekî bê liv mabû di nav lepê Ebûl Hesen de, nizanîbû wê çi pê bike. Herî dawî Ebûl Hesen jî Elî re got: “Ev dera han ne ewle ye û ez ditirsim ku beleyin bi serê me de bîn, ji destên diz û rêbirran!”

Bi wê gotina Ebûl Hesen re, Elî Bekar rabû ser xwe û meşîya. Lê belê bi zorê dimeşîya. Baş bû ku li wê texmê dost û hevalên Ebûl Hesen hebûn. Berê xwe da cem yekî ji wan dostên xwe yên ku bi wan ewle dibû û çû ber deriyê wî, lê da. Çawa ku dostê wî derî vekir û ew di wî halî de dîtîn, bi lez ew derbasî mala xwe kirin, ew dane rûniştandin û li halê wan pirsî. Ebûl Hesen jê re got: “Mirovekî ku min danûstendin pê re fikir hebû, min bihîst ku dê derkeve rêwîtiyekê û dê diravên min jî bi xwe re bibe. Ji bo ku ez diravên xwe jê bigirim, min civanek jê girt û min ev hevalê xwe jî bi xwe re anî û em hatin vê derê, lê me ew zîlamê xwe nedît. Em mecbûr man destvala vegerin, lê di vegerê de li me bû şev û em mecbûr man xwe li te bigirin, lewre em mêvan perweriya te dizanin!”

Mazûbanê wan xêrhatina wan kir, qedr û qîymetê wan girt û nivîn ji wan re danîn ji bo ku rakevin. Gava şev qediya û sibeh hat, Ebûl Hesen,

xatirê xwe ji mazûbanê xwe xwest û ji mala wî derketin û hêdî hêdî meş-
yan, hetanî ku xwe gîhandin bajêr. Li gel ku zêde ne bi dilê Elî Bekar bû jî,
Ebûl Hesen zorî da wî û ew bi xwe re bir mala xwe. Hebekî ji xwe re raketin,
piştî rabûn, ser çavên xwe şuştin û firavîna xwe xwarin. Di pey wê re Ebûl
Hesen ji xulamên xwe xwest ku cihekî baş ji Elî Bekar re raxin û amade
bikin. Di dilê xwe de ji xwe re got: “Divê ez li vî dostê xwe Elî miqate bim,
lewre ez rewşa wî baştir dizanim!”

Di wê navberê de Elî misînek av ji xulaman xwest, av jê re anîn. Wî
jî rabû destnimêjek girt û nimêjen ku wê rojê tê derbas bûbûn, qeza kirin.
Piştî bi duayan hewl da ku bêhna xwe fireh bike. Gava ku Ebûl Hesen ew
di wê rewşê de dît, jê re got: “Mîrê min, îşev jî li cem min be, ez ê hebekî
sebra te bînim, belkî bi wî hawî tu hebekî bi ser xwe ve bê û bêhna te fi-
reh bibe, tu wê tengahîyê ji ser xwe bavêje!” Elî Bekar lê vegerand û got:
“Birawo, tu çi dikî, çawa dikî wisa bike. Ji xwe min serê xwe xistiye belayê!”

Ebûl Hesen rabû ser xwe, gazî xulamên xwe kir û ew şandin pey dost
û hevalên xwe ji bo ku werin şevbuhêrka wî. Dûvre şand pey stranbêj û
mûzîkvanan jî, ew jî anîn mala xwe. Xwarin û vexwarineke baş jî amade
kirin ji bo êvarê û çawa ku tarî kete erdê, mûm û qendilên xwe pêxistin,
piyale dagirtin, çingîn bi wan xistin, li ser destan gerandin û şevbuhêrka
xwe dest pê kirin. Stranbêjekê jî li çengo xwe da û dest pê kir, stra:

Ez der hatim avêtin ji demê bi tîran
Xerîb ketim ez veqetiyam ji hevalan
Sebra min nema felek bû dijminê min
Lê beriya niha jî her texmîn dikir min

Çawa ku Elî Bekar ev strana han ji devê wê cêrîyê bihîst, ji ser hişê
xwe çû û li erdê ket, vezeliya wisa jî di wî halî de ma hetanî şeveqa sibehê.
Ebûl Hesen pir tengav bû û êşîya bi vî rewşa wî. Sibehê nuh bi ser xwe hat
jî, xwest ku here mala xwe. Ebûl Hesen jî pêşîya wî negirt ji tîrsa ku tişteki
xerabtir bi serê wî de bê. Lewma gazî xulamên xwe kir, çûn jê re qantirek
anîn, ew lê siwar kirin û Ebûl Hesen bi xwe jî pê re çû hetanî ku ew gîhan-
din mala wî. Çawa ku bi saxî û selamatî gîha mala xwe, spasdariya xwe ji
Ebûl Hesen re rave kir û şikir ji Xwedayê xwe re kir ku ew bi ewlehî gîhand
mala wî û ji wertayekê rizgar kir. Lê belê hîna hêsirê wê eşqê bû û serdesti-
ya xwe bi dest xwe nexistibû.

Piştî ku dilê Ebûl Hesen jî kete cih de, ji dostê xwe re got: “Biracan,
herdem min agahdar bike ji rewşa xwe! Te go erê?” Elî Bekar got: “Bila be
birawo!” Ebûl Hesen, wê çaxê xatir jê xwest û çû sûkê, dikana xwe vekir û
lê rûnişt. Piştî kurtedemekê, cêrîya Rojanê hat dikana wî û silavek lê da.
Ebûl Hesen silava wê girt û got: “Ser seran ser çavan, gelo rewşa Rojan
Xanê çawa ye?” Cêrîyê got: “Ez ê rewşa wê ji te re bibêjim, lê gelo rewşa

Elî Bekar çawa ye?" Ebûl Hesen rewşa wî ji serî hetanî binî jê re vegot û rave kir. Di wê navberê de Ebûl Hesen rûyê cêrîyê raçav kir û têgihişt ku xemgîn û dilkovan e. Jixwe çawa ku rewşa Elî jê re got, ax û wah pê ketin û dilêşiya xwe eşkere kir. Dûvre wê bi xwe jî rewşa xatûna xwe anî ziman û got: "Rewşa xatûna min hîn xerabtir e. Jixwe gava ez bi we re derketim, me-tirsiyîn mezin bi min re hebûn ku tiştek bi serê wê bê. Lê piştî ku bi saxî û selameti me ev derbas kir û ez vegeriyam, bêhna min hebekî hate ber min. Lê belê çawa ku ez gîham cem Rojan Xatûn û min dît ku li erde dirêjkirî ye û ji ser hişê xwe çûye, ez dişa tirsiyam. Demek bi şûn de şiyar bû, bi ser xwe ve hat, lê êdî bi kesî re nedixivî. Emîrê Bawermendan jî li ber serê wê bû, lê hayê wî jê tunebû bê sebeb çî ye, lewre kesî tutişt jê re negotibû. Nîvê şevê hebekî din bi ser xwe ve hat. Wê gavê Xelîfe ji cêrîyeke dengbêj xwest ku çend beytan bi stranî bixwîne. Cêrîyê di cî de dest pê kir û got:

Piştî we tu jiyan ji min re nemabe
 Gelo piştî min dê halê we dostan çawabe
 Hêsirên min ji xwînê ne êdî ka tu jî rabe
 Lew ku tu jî dirjîni hêsiyan wê rewş çawabe

Gava ku Rojanê ev helbest bihişt, ji ser hişê xwe çû.

Li Şehrezadê bû sibe û wê jî navber da vegotina çîroka xwe, bêdeng bû.

ŞEVA 166'EMÎN

Şehrezadê berdewam kir:

Cêrîya Rojanê ji Ebûl Hesen re got: "Gava ku xatûna min ew helbest guhdar kir, ji ser hişê xwe çû. Min bi destê wê girt, kişand ba xwe û ava gula li ser rûyê wê reşand. Piştî demekê bi ser xwe ve hat, min jî jê re got 'Xatûna min, tu bi xatirê heskiriye xwe bikî hebekî xwe ragir bî û xwe nehetikîne di mala xwe de.' Wê jî li min vegerand û got 'Ma qey ji mirinê wêdetir tiştekî din heye? Jixwe ez jî mirinê dixwazim, lewre yekane rêya xelasiya min di wê de ye!'

Hîna ku em wisa dixivîn, cêrîyeke din stra û got:

Gotin piştî sebrê aramî dikeve dil de
 Min jî got qey sebir heye bi çûna wî re
 Jixwe me soz daye bi hev re ji wê rojê de
 Çawa ku hat, em ê serê wî jêkin ji serî de

Xatûna min Rojan jî dişa ji ser hişê xwe çû û ket. Çawa ku Emîrê Bawermendan ew di wî halî de dît, pê ve hat û ferman da xizmetkaran ku mey û şarabê rakin û her cêrîyek vegere odaya xwe. Ew jî li ber serê xatûna min ma hetanî şevêqê. Gava bû sibeh, gazî textor û hekîman kir ku wêna

derman bikin, lewre hîna jî bêagah bû ji eşq û evîna wê. Vêca ez jî mecbûr mam ku pê ve mijûl bibim hetanî ku bi ser xwe ve bê. Loma ez dereng ketim di hatine cem we de. Jixwe çawa ku bi ser xwe ve hat, wê ez şandim vir, ji bo ku ez agahekê di derbarê Elî Bekar de ji wê re bibim.”

Dema ku Ebûl Hesên ev gotin ji cêrîyê bihîst, matmayî ma! Piştî got: “Min rewşa wî ji te re got. De êdî here cem xatûna xwe, silavên min lê bike, bila bêhna xwe fireh bike. Jê re bibêje, bila raza xwe veşêre. Min derdê wê nas kiriye û ez dizanim bê ew derd çiqasî zor û biêş e. Divê em tevdîrên xwe baş bigirin!”

Cêrîyê spasdariya xwe pêşkêş î wî kir, xatir jê xwest û çû cem xatûna xwe.

Ebûl Hesên jî, hetanî êvarê li dikana xwe ma. Êvarî, dikana xwe girt û berê xwe da mala Elî Bekar. Hat ber mala wî, li derî da. Hinek ji xulamên wî derî jê re vekirin û ew derbasî hundur kirin. Çawa ku awirên Elî Bekar bi Ebûl Hesên ketin, mehdê wî vebû û xwin bi rûyê wî ve hat. Lê nêrî û got: “Ebûl Hesên, bawer bike di nava rojekê tenê de, min pir bêriya te kir. Wisa xwiya dike ku hetanî dawiya emrê min, dê ruhê min li cem te bimîne!” Ebûl Hesên lê vegerand û got: “Dev ji vê gotinê berde Elî! Bi hersê navê Xwedê heger gengaz bûya, min ê xwe ji te re bikira qurban da ku tu bextewar bibî û bigihêji miradê xwe. Îro cêrîya Rojanê hat gel min li dikanê û got ku nehatina wê ya cem me, tenê ji ber ku xelîfe li cem xatûna wê rûniştî mabû. Jixwe piştî hatina me, çi tiştê ku li wir qewimîbû, ji min re got.” Di pey re hemû tiştê ku cêrîyê anîbû ziman, jê re rave kir. Elî Bekar, pir xemgîn bû bi wan agahan û kûrekûr pê ket, giriya. Piştî li Ebûl Hesên zivirî û jê re got: “Tu bi qedrê Xwedê biki, alîkariya min bike, hetanî ku ez ji belayê rizgar bibim! Xwezî ku tu îşev li cem me bima, da ku wensa min bi te bihata!”

Ebûl Hesên hevalê xwe neşikand û daxwaza wî qebûl kir ku wê şevê li cem wî bimîne. Şev pê de axivîn, derd û kulên xwe ji hev re gotin, lê di cihekî hestiyar ji sohbe de, Elî Bekar xemgîn û tengav bû û piştî jî ji ser hişê xwe çû. Ebûl Hesên got belkî jiyana xwe ji dest daye. Lê belê dûvre têgihişt ku sax e. Pê re mijûl bû û li ber serê wî çû û hat hetanî ku dîsa bi ser xwe ve hat û baş bû. Sibehê xatir jê xwest û dîsa vegehiya dikana xwe. Deriyê dikanê vekir, lê rûnişt, lê hîna çend kêlî derbas nebûbûn, cêrîya Rojanê hate cem wî û silavek dayê. Ebûl Hesên jî silav lê vegerand, hal û wextê Rojan Xatûnê jê pirsî. Cêrîyê got: “Hela di serî de tu ji min re bibêje bê ka rewşa Elî Bekar çawa ye?” Ebûl Hesên got: “Hema rewşa wî qet ne-pirse! Ji ber êş û jana eşqê, sekn û hedan lê nemaye. Bi şev xew lê diherime, ranakeve û bi roj jî ah û nalîna wî ye.”

Cêrîyê got: “Silavên xatûna min, ji te û wî re hene. Jixwe nameyek jî ji bo wî nivîsiye. Gava name da destê min, got divê tu li min venegere bêtî ku

tu bersiva vê nameya min bîni! Lewre rewşa wê ji ya wî jî xerabtir e. Vêca gelo tê bikaribî bi min re werî mala wî, da ku ez vê nameyê bidim wî û bersivê ji wî bigirim?” Ebûl Hesen got: “Ser seran ser çawan.”

Ebûl Hesen dîsa derîyê dikana xwe girt, ew xiliqand û cêrî da dûv xwe, berê xwe da mala Elî Bekar. Gava gihan wir cêrî li ber derî sekinand û ew derbesî hûndir bû, çû cem Elî Bekar jê re got: “Keçekê, cêrîya xwe şandiye cem te û nameyek daye wê, jê re gotiye vê nameye bigihîne Elî Bekar û jê re bibêje sedemin girîng hene ku nehiştine ez werim cem wî. Ew sedem çî ne, jixwe di nameye de nivîsandine û bersivê ji te dixwaze. Niha ew cêrî li devê derî sekini ye, gelo tu iznê didî wê ku derbasî hundur bibe?”

Elî Bekar di cih de fêhm kir bê Ebûl Hesen behsa cêrîya kê dike. Rûyê wî yê girtî vebû û hêviyek teze di nava dilê wî de gul veda. Bişîrî û got: “Ka bila ew cêrî were hundur!”

Li Şehrezadê bû sibeh, wê jî navber da vegotina çîroka xwe û bêdeng bû.

ŞEVA 167'EMÎN

Şehrezadê vegotina çîroka xwe berdewam kir û got:

Çawa ku Elî Bekar çav li cêrîyê ket, mehdê wî vebû, rûyê wî geş bû û germahiyek di rehên wî de geriya, bedena wî ya mirî vejand. Bi dengêkî hêdî jê pirsî û got: “Rewşa xatûnê çawa ye gelo, inşallah bi ser xwe ve hatiye û tendurustiya wê baş e?” Cêrîyê got: “Baş e li ser xwe ye.” Piştî kaxeza nivîsandî ji paxila xwe derxist û da destê wî. Elî Bekar name ji destê wê girt û vekir, lê nêrî dît ku wiha nivîsandiye:

Ev qasid li şûn agahan tête gel te
Êdî li şûna dinê tu wê guhdar bike
Lew te bi giranî ez nexweş xistim bi evînê
Bêrîkirineke nexweşbar çêkir te bi wê çûnê
Li ber xwe didim ez bi sebr im li gel vî derdî
Lê bes felek her bêbext e û gelek nemerd e
Disa jî aram be dilo dûr bikeve ji wê dojê
Lewre her tu di bîra min de yî bi şev û rojê
Carek binêr tu li wê bejna zirav dilo carek
Tu dê rê bibî ser rêç û şopa min di şarek

Vêca ez nameyeke ne diyar û bê ziman ji te re rê dikim û bê axaftin jî her wê dirêj dikim. Lewre êşa çavên min î ku ji xewê dûrketine, rewşa min ji te re rave dike. Dilê min î ku tu ji xwe re kiriye qiblegeh jî, dê ji te re rave bike bê rojê çend caran ez dikevim xiroşê ji Xwedayê xwe re. Niha ez di rewşeke wisa xerab de me ku, yê nizanibe wê bêje qey di temamê emrê

xwe de min xweşî û bextewarî qet nedîtîye. Mîna ku ez zaroka êş û elem û xemgîniyê bim. Lewre jana dilê min, her ku diçe kûrtir dibe, eşqa wî jî duqat dibe. Bêrîkirina êşbar jî, weke cameke şikeştî perçe perçe bûyê û di canê min radibe. Çawa ku helbestkar jî gotiye:

Dil hatiye guvaştin raman her veziliyayî ye
Xew bi çavan nakeve laş her westiyayî ye
Hicran her berdewam e aram li min nemaye
Dil hatiye vedizin û hiş her li min nemaye

Divê tu bizanîbî ku gilî û gazin, agirê vê belayê venamirîne, berevajî wê, xwediyê xwe nexweş dixê bi êşa dûrketinê. Lewma yê min ez dilê xwe bi bîranînan xweş dikim, çawa ku hozan jî gotiye:

Heger nebin zor û zehmetî di eşqê de
Qey xweşî dimîne di nîvîs û nameyan de!

Gava ku Elî Bekar ev destnivîsa Rojanê xwend his kir ku gotinên wê ew ji nû ve vejand û wateyên wê jî ew ji nû ve kuşt. Mîna ku agir ji destê xwe derxîne, name dîsa bi şûn de da cêriyê û jê re got: “Silavên min bigihîne xatûna xwe û jê re bibêje ku bêrîkirin û evîna wê, hemû xalên bedena min dagir kirine û bêhn li min çikandine. Jê re bibêje pêdiviya min bi rizgarkarê heye ku min ji mirinê xelas bike!” Pê re jî kûrekûr pê ket û giriya. Cêrî jî pê re giriya û dûre ji wir derket, piştî ku xatir jê xwest. Ebûl Hesên jî pê re derket, ew gîhand hetanî bi sûkê û dûvre dîsa çû dikana xwe.

Ebûl Hesên wê rojê nehedinî û hetanî êvarê jî di qelaqê de ma. Dilê wî hate guvaştin, sînga wî li dilê wî teng bû û ma heyyirî, nizanîbû wê çi bike, çawa bike! Êvarê dikan girt û çû malê, lê li malê jî aramî nedît. Roja dîtirkê çû cem Elî Bekar û li tenîştê wî rûnişt. Pê re mijûl bû, li hal û wextê wî pirsî û xwest ku rewşa wî fêhm bike. Elî Bekar gazin û lome jê kirin, piştî dest bi helbestekê kir, got:

Beriya min jî xelkê giliyê eşq û evînê dikir
Tîrsa wendakirina stêrkan jî her wan dikir
Lê belê parsûyên tu kesî mîna yên min nebûn qewîn
Ne jî ewqasî bi şid guvaştibûn dilê bi evîn

Ebûl Hesên got: “Min tu kes mîna te nedîtîye ku ewqasî êşiyaye bi evînê. Vêca di rewşeke wisa de, ev bêlîvîya te, dê çawa be û çi bîne serê te? Ev wisa ye ku tu dil ketîye yeke mîna xwe dilsoz, lê ku yeke xapînok ba teyê çawa bikira? Misoger dê razên te hemû êşkere bikirana!” Bi wî hawî Ebûl Hesên dilê Elî xweş kir û aramiyek di nava wî de peyde kir.

Îcar zêrkîrekî hevalê Ebûl Hesên hebû ku ew û Elî Bekar herdû nasdikirin û ji dostaniya wan a germ jî haydar bû. Lê belê baş bi cîh nizanîbû bê çi di navbera wan de heye. Loma her car dihat cem Ebûl Hesên û rewşa Elî jê dipirsî. Dema ku cêrî jî dihat ba wî, ew jî jê dipirsî û digot “Cêriyê çi

got?” Ebûl Hesen jî digot: “Wele min ew bi hev dane naskirin û hew, ji wê pê ve ez tişkekî din nizanîm!” Lê belê zêrkir bi wê bersivê têr nedibû û hey wî lêkolîna xwe berdewam dikir. Evê yekê jî hişt ku metirsî bi Ebûl Hesen re çêbibin û têkeve qelaqê. Lewre ditirsiya ku raza navbera Rojan û Elî eşkere bibe û serê wî bi Xelîfe re bikeve belayê. Loma dekek di serê xwe de çêkir û çû ji zêrkerê hevalê xwe re got: “Tu jî dizanî ku ez mirovekî nas im û agahîyên berfireh bi min re hene di derbarê keç û xortan de. Vêca ez ditirsim ev rojekê raza hinekan ji wan eşkere bibe û serê min bikeve balayekê, malik li min xera bibe û zarokên min sêwî bimînin. Loma min nêr kiriye ku malê xwe bidim ser hev û berê xwe bidim Besrayê û li wir bi cih bibim, hetanî ku rewşa wan zelal bibe. Lewre divê kes bi cihê min nizanibe. Tu ya rastî bixwaze, Elî û Rojan evîndarên hev in û ew cêrî jî qasida di neqeba wan de ye, nameyên wan dibe û tîne. Cêriyek ketum û devgirtî ye, ez texmin nakim ku razên wan eşkere bike û xwe ji tê de bişewitîne bi agirê wan.

Zêrkir ji Ebûl Hesen re got: “Te agahîyeke xeternak da min ku mirovê xwedî hiş jê ditirse! Xwedê te bisitirîne ji şer û xerabiya xeraban û selametiyê bike dûmahî ji te û dostên te re. Ez bi bawer im ku rêya te ew dayê ber xwe, rêya herî rast û pêkane.” Bi vê gotina zêrkir re, bêhna Ebûl Hesen hate ber wî û nava wî hebekî aram bû. Rabû çû mala xwe. Kar û barê xwe kir, deynên xwe dane ser hev, sozên ku dabû xelkê pêk anîn, kerwanê rêwîtiya xwe amade kir û di nava sê rojan de hemû amadekariyên xwe têkûz kirin, kêmaniyên xwe qedandin. Piştî ket ser derzika rê û berê xwe da Besrayê.

Zêrkirê hevalê wî piştî sê rojan lê vegeyriya, ew nedît. Ji cîranên wî pirsî, gotin wele çûye Besrayê da ku kare ticareta xwe bike û deynên xwe bide hev. Zilam hebekî qeliqî, çû û hat, lê belê metirsiyên wî derbas nebûn. Di dilê xwe de got: “Xwezî min Ebûl Hesen bi tenê bernedaba. Ka ez rabim, herim çareyekê, rêyekê bibînim ji bo ku ez xwe bigihînim Elî Bekar. Rabû çû mala wî, li derî da û ji xulamê wî re got: “Ji begê xwe re bibêje ez dixwazim wî bibînim!” Xulam çû ji Mîrzayê xwe re got, wî jî got: “Bila were hundur!” Xulam çû ew anî hundur, derbasî cem Elî Bekar kir. Zêrkir silavek lê kir û lêborîna xwe jê xwest ji ber ku demekî dirêj lê nepirsiye. Piştî axaftina xwe berdewam kir û lê zêde kir, got: “Begê min tu jî dizanî ku dostaniyeke baş di navbera min û Ebûl Hesen de heye. Lewre ew sindoqa razên min bû û rojekê tenê jî ez dûrî wî nedimam. Vêca wê roja hane ji bo karekî ez ji malê derketim û li gel çend dostên xwe ez sê rojan bûm rêwî. Li vegeerê min dît ku dikana wî girtî ye. Min ew ji cîranên wî pirsî, gotin çûye Besrayê. Vêca ji te pê ve min tu dostên wî nas nedikirin, min got ez werim rewşa wî ji te bipirsim îcar te di derbarê wî de hinek agahî bidana min, wê baş bûya!”

Gava ku Elî Bekar ev gotina wî bihist, qeliqî û rengê wî hate guhertin. Qirika xwe paqij kir, xwêziya xwe daqurtand û got: “Bi serê te va ye ez xe-

bera çûna wî ya Besrayê nû ji te dibihizim. Vêca heger rewş bi vî awayê ku tu behs dikî be, mala min xera bûye!” Pê re jî çavên wî tijî hêsir bûn û ew çend beyt ji nav levan derketin:

Ez digiriyam li ser bextewariyeke wendabûyî
Li ser heval û hogir û dost û xoşewistên çûyî
Ji wan qut bûme îro ez bêdaxwaz û bê dev im
Lewma li ser wan digirim ez bê aram û bê xew im

Piştî serê xwe berra ber xwe da û bêdend kete nav hizir û fikareke kûr û bêbinî. Saatek bi şûnde, serê xwe rakir û ji xulamekî re got: “Here mala Ebûl Hesên û lê bipirse, heger bêjin çûye Besrayê, bêje gelo çûye kîjan devera Besrayê û were!”

Xulamê wî çû û bi qasî seetekê nehat. Piştî vegeriya, hat got: “Xwediyên wî dibêjin Ebûl Hesên çûye Besrayê. Di wê kêlikê de cêriyek li ber deriyê wan hebû, ku min ew nas nedikir. Lê belê çawa ku wê ez dîtim, got: “Tu ne xulamê Elî Bekar î?” Min jî got: “Belê” Got: “Nameyeke giranbûha ya hezkiriyê wî ya herî baş li cem min e û ez dixwazim bi dostan bigihînim wî!” Min jî ew bi xwe re anî û wa ye li devê derî sekîniye!” Elî Bekar got: “Ka wê derbasî cem min bik!” Xulam çû ew anî hundur. Çawa ku çavên zêrkir pê ketin, di dilê xwe de got: “Cêriyekê xweşik û nazenîn e!”

Cêriyê silavek da Elî û pêş de hat...

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî navber da vegotina xwe û bêdeng bû.

ŞEVA 168' EMÎN

Şehrezadê vegotina çîroka xwe berdewam kir:

Çawa ku şeva borî jî min got, xwe nêzikî wî kir û bi dizî pê re axivî. Jê re sond xwar ku li ser wê mijarê bi zêrkêr re neaxivîye û piştî xatirê xwe xwest û rabû bi şûn de çû. Mirovê zêrkir jî fersend dît û dest bi axaftinê kir, ji Elî re got: “Wisa xwiya dike ku, daxwazin qesrê ji te hene. Ango danûstendineke te li gel zîlamên Xelîfe hene!” Elî Bekar got: “Û tu ji ku dizanî?” Zêrkêr lê veğerand û got: “Naskirina min bi vê cêriya Rojanê re heye. Wê ez haydar kirim. Lewre beriya niha bi çend rojan, ev cêriya han hat dikana min û nameyeke xatûna xwe Rojanê da destê min ku tê de behsa pêdiviyê xwe ya bi morîk û cewheran dianî ziman dikir. Ji xwe min jî ew pêdiviya wê jê re şandibû.”

Gava ku Elî Bekar ev gotina wî bihîst, lerîzî û metirsî pê re çêbûn. Di dilê xwe de got: “Wisa xwiya dike ku dê serê min bikeve belayê de!” Piştî li zêrkir zîvirî û got: “Birayê min ê delal! Tu bi heqê navê Xwedê bikî, ka ji min re bibêje bê tu vê cêriyê ji ku nas dikî?” Zêrkêr lê veğerand û got: “Dev

ji van pirsan berde, dê çetir be!” Elî Bekar: “Ez dev jê bernadim hetanî ku tu rastiya mijarê ji min re nebêjî!” Zêrkir got: “Temam, wê çaxê ez ê mijarê bi şeklekî vekirî û eşkere jî te re rave bikim, bi şertê ku tu jî rastiya xwe ji min re diyar bikî û bibêjî bê çima tu di vî halî de yî û sebeba nexweşîya te çi ye?” Elî Bekar, çiroka xwe bir hûrgulî jê re rave kir, ji serî heta binî. Piştî lê zêde kir got: “Vêca birayê ezîz, bi Xwedê ji tirsaxelkê min ew rewşa xwe ji te veşartibû. Paşgotinî pir e û xelk razên mirov eşkere dikin.” Zêrkir bi dilo-
vanî got: “Bawer bike birawo, tenê ji ber hezkirina te, ez tême gel te. Bawer bike ku dilê min bi ser te ve ye ji ber vê êşa jihevduêrketinê û ez dixwazim li şûna Ebûl Hesên bibim dostê şevbuhêrkên te, ji bo ku wensa te bi min bê û tu êşa xwe ji bîr bikî. Bi kêmanî hetanî ku Ebûl Hesên li te vegere. Vêca bila gûman bi te re çênebin û dilê te di cîh de be!”

Elî Bekar spasiya xwe ji bo wî rave kir û ew çend ristê jê re gotin:

Lew ku bêjin ez bi sebr im piştî dûrbûna wî
Evqase hêsirên min dê her bibêjin derew î
Îcar ez ê çawa hewadariya te bikim li gel wî
Ev fêrmûstên ku li ser sifreya rûçkê min î tu

Elî Bekar bi qasî saatekê bêdeng bû, piştî ku ew ristên xwe xwendin. Piştî serê xwe rakir, li Zêrkir zîvirî û jê re got: “Gelo tu dizanî bê wê cêriyê çi ji min re got û çû?” Zêrkir got: “Na wele ezbenî!” Elî, bersiva pirsaxwe da û got: “Angaş kir ku min Ebûl Hesên îqna kiriye ji bo ku here Besrayê, ji bo ku navbera min û Rojanê qut bibe û çûnûhatina name û peyaman bisekine. Yanî ez bi hîlekariyê sûcdar kirim. Min jê re sond xwar; min kir nekir ji min bawer nekir, ji ber ku wê tenê guhdida Ebûl Hesên. Li gel wan gûmanan çû cem Rojan Xatûnê ku ez bi bawer im dê heman tiştî ji wê re jî bibêje.”

Zêrkir, bi dilgermî xwe da gel Elî û jê re got: “Birawo, ji liv û tevgera wê, min jî ew encam ji wê cêriyê derxist. Lê belê bi izna Xwedê ez ê bîkaribim bi te re bibim alîkar di vê xalê de û te bigihînim miradê te.” Elî lê vegerand û got: “Tê çawa pê re bixebite û ew wisa bi gûman e ji min û te?” Zêrkir got: “Divê ez kedekê bidim, divê hewldaneke min hebe ji bo alîkariya te. Ez ê mîna ava di bin kayê re, bêdeng xwe nêzî wê bikim û bi dizî xwe bigihînim encamekê, bêyî ku zirarek bigihêje te.” Û izna çûnê jê xwest. Elî got: “Birawo, divê tu raza min û Rojanê eşkere neke. Yan na wê bobelatek bi serê me de bê!” û giriya. Zêrkir jî pê re kelogirî bû û xatir jê xwest, derket çû.

Bi rê de, serê wî di ber wî de bû, hem hêdî hêdî dimeşîya, hem jî kûr kûr diponijî li ser kul û derdên vî destbirakê xwe, da ku çareseriyekê jê re bibîne. Di nava wê ponijînê de, ji nişkê ve çavên wî li kaxetêke pêçayî ket, ku li qiraxa rê bû. Xwe daqûl kir, rahiştê û lê nêrî, dît ku li ser kaxezê “Ji

evîndarê biçûk, bo evîndarê mezin” nivisandîye. Kaxeza pêçayî vekir, nameyek jê derket. Name xwend. Di nameye de ev tişt nivisandî bû:

“Qasîdê te hate gel min bi çavekî birçî
Bi gûman im ez ku ew e xapgirê diltî
Gelo dê avê bixwaze an xwîna vî dilî
Lewma ez aram nebûm bi hatina wî
Gelo dibe ku ne ev be sebeb têgihîştina wî?

Îcar guh bide min ronîya çavan! Hîn jî ez nizamim bê sebeb çî ye ku nameyên te nema tîn ber destên min. Heger dilhişkîyek li gel te peyde bû-be jî, yê min ez ê her sozdar û dilsozê te bim û heger evîn ji te dûr ketibe jî, yê min li gel dûrketina te jî ez ê evînê biparêzim.”

Hîna ku Zêrkir razên vê nivîsê baş ji hevdû dernexistibûn, dît ku cêrî ji raserî wî ve tê û her gavekî-dudan, li çep û rastê xwe dinêre. Gava ku cêrî ghişt hinda wî û ew kaxez di destê wî de dît, jê re got: “Begê min, ev kaxeza a min e û ji min ketibû!” Lê Zêrkir lê venegerand û her wî meşa xwe berdewam kir. Cêrîyê jî dev jê berneda û li pey wî çû, hetanî ku li dûv wî ket mala wî de. Li wir dîsa jê re got: “Kanî wê kaxeza min bide min, begê min! Ew kaxeza min bû û ji min ketibû!” Zêrkir, lê zivirî û got: “Metirse û xemgîn nebe, lê belê ez dixwazim ku tu rastiya vê mijarê ji min re veke. Bawer bike ku ez mirovekî rast û dilsoz im. Sonda Xwedê li min be ku ez razên te ji tukesî re nabêjim û her ez ê bi te re bibim alîkar, hetanî ku tu bigihêjî armanca xwe!”

Gava ku cêrîyê ev gotina wî bihîst, metirsîyên wê belaw bûn û aramiyek ket nava wê de. Ji zêrkir re got: “Mîrzayê min, raza ku min wenda kiribû te ew dît û meqsada ku ji min reviyaye jî, tê wê bi destê min bigihî-ne. Dilê min li te ewle ye û ez ê rastiya meseleyê ji te re bibêjim, da ku tu kaxeza min bide min.” Piştî, çirok jê re vekir, ji serî hetanî binî û li dawîyê jî bi ser ve zêde kir, got: “Xwedê şahide min e ku ez rast dibêjim!” Zêrkir got: “Tu rast dibêjî, lewre ez jî xwedî agah im di vê mijarê de. Piştî, tiştê ku bihîstibû ji serî hetanî binî, jê re anî ziman. Gava ku cêrîyê ev gotin ji wî bihîstin, dilê wê hîn bêhtir kete cîh de û kêfa wê hat. Dûvre herduyan li hev kirin ku wê kaxeze bibin, bidin Elî Bekar û wî ji her tiştî agahdar bikin. Loma Zêrkir kaxeza dîsa da wê. Cêrîyê jî name dîsa mîna berê pêça, mohr kir û got: “Xatûna min ev name mohrkirî dabû min, loma min dîsa mohr kir. Ez ê niha vê nameye ji wî re bibim, dema ku bersiva wê da, ez ê wê jî binim nîşanî te bidim.”

Cêrîyê xatirê xwe ji Zêrkir xwest û berê xwe da cem Elî Bekar. Hat cem wî û name da destê wî. Elî Bekar name xwend û piştî jî bersiva wê nivîsand û da destê cêrîyê, jê re got: “Vêna bigihîne xatûna xwe!” Cêrîyê rahişt bersivê û bi şûn de vegeriya cem Zêrkir, name da destê wî. Zêrkir name

vekir û xwend. Elî, di nameya xwe de digot:

Ev qasida ku di navbera me de raz û pir bû
Razfiroş derket niha ji berê ve bextfiroş bû
Qasideke hêja û ewlegir bo min bişîn tu
Bila yeke rasgot be ne fennek û derewîn be

Divê ku baş bizanibî ku ne evin ji min dûrketiye û ne jî hişkahi di dilê min de peyda bûye. Ne min soza xwe ji bîr kiriye û ne jî peymana di navbera me de. Qutbûna ji te, tenê êş û azara min kûrtir kiriye û bêrikirineke bê timtêl, hemû malikên laşe min dagir kiriye. Bila tu gûman bi te re çênebin û baş bizanibe ku ji eşq û evîna te pê ve, tiştê di dilê min de tune. Jixwe ev eşq e ya ku niha ez nexweş xistime. Rewşa min niha wisa ye. Silav û rêz!”

Gava ku zêrkir ev nameya Elî Bekar xwend û têgihişt bê rewşa wî çawa ye, êşeke mezin ket dilê wî de û giriya. Cêrîyê jê re got: “Vîna tuhmetin sipartine min ku ew di vê hêlê de mafdar e jî, lê belê divê ez van gûmanên ser xwe zelal bikim. Tu li vir be hetanî ku ez herim xatûna xwe bînim cem te. Lewre ew li bendî bersivê ye û niha pir qeliqîye li ser min.” Pê re jî rabû ser xwe û bi lez çû. Piştî demekê, li zêrkir vegeya û jê re got: “Ka rabe tevdira xwe bigire, bila kesek ji cêrî û xulamên te wê nebînin!” Zêrkir lê vegeya û got: “Tenê pîrejineke reşîk di mal de heye, xizmeta min dike.”

Cêrî rabû ser xwe, deriya navbera hundurê malê û odeya pîrejina xizmetkar girt, xulamên xwe şandin derve û piştî derket, çû pey xatûna xwe. Piştî demekê, ew û xatûna xwe hatin û derbasî hundurê Zêrkir bûn. Zêrkir, di cîh de pê ve rabû, bin wê xweş kir, bêhnên gulên li hundur belav kirin, qedrê wê pir girt û li biniya nigên wê rûnişt. Rojan Xanê, bi qasî seatekê bêdeng ma hetanî ku bêhna wê hate ber wê û hebekî aram bû. Piştî rûpaşa xwe da alî û rûyê xwe vekir. Wê gavê tiştê wisa li ber çavên Zêrkir sêwirî, jê werê ku rojê tav vedayê di mala wî de!

Rojanê ji cêrîya xwe re got: “Zilamê ku te qala wî kir, ev e?” Cêrîyê got: “Belê, xatûna min!” Rojanê li Zêrkir zivirî û jê re got: “Rewşa te çawa ye!” Got: “Ez baş im.” Rojanê, axaftina xwe berdewam kir û got: “Te em ber bi xwe ve kişandin û hişt ku em rêya xwe bi te bixin û raza xwe bi te re parve bikin!” Piştî li wî û li malbata wî pirsî. Wî jî hemû agahiyên pêwîst jê re gotin û herî dawî jî lê zêde kir û got: “Ji xeynî vê mala min, maleke min a din jî heye ku li wê derê ez bi heval û hogirên xwe re rûdin û şevbuhêrkan li dar dixim. Lê belê maleke vala ye û zêde tiştê tê de nîne, çawa ku berê ji min ew ji cêrîya te re rave kiribû.”

Rojanê di derbarê rastiya mijarê de jî jê pirsî. Zêrkir, pêşkîna bûyeran ji serî hetanî binî, jê re bi lêv kir, mîna tu ta bi derziyê vekî. Axînek bi Rojanê ket û dilê wî êşîya li ser Ebûl Hesen û derbederbûna wî ya ji Bexdayê. Dû re serê xwe rakir û ji Zêrkir re got: “Ruhê herkesî mîna hev

li xerabiyān dinêre. Kar bêyî gotinê nabe, gotin jî her ew rêgeha kar e. Her karek jî incex bi destê karkerekî dibe. Aramî û şahî jî, incex bi ked û sebrê pêkan e.”

Lê Şehrezadê bû sibe, wê jî ravekirina çîroka xwe sekinand û navber dayê.

ŞEVA 169' EMÎN

Şehrezadê vegotina çîroka xwe berdewam kir û got:

Rojan Xanimê axaftina xwe ya bi Zêrkir re berdewam kir û got: “Bê ked û kar, mirov nagihêje serkeftinê û serkeftin bi xwe jî incex karê rûmet-karan e. Vêca niha min razên xwe hemû ji te re rave kirin. Êdî sitara me jî, hetka me jî di destên te de ye. Tu jî mirovekî dilsoz û xwedî rûmet î. Va ye te ev cêrîya min a dilsoz jî naskiriye ku ew li ba min giranbuha ye û herdem razparêz e. Jixwe min ew di vî warî de peywirdar kiriye. Herdem wê ew agah û peyamên min bigihîne te, tu jî tê bigihîni Elî Bekar. Ji aliyê min ve jî bila dilê te rehet be.”

Piştî ku gotinên xwe qedandin, Rojanê rabû ser xwe û bi zorê meşîya, lewre qudûm pê ve nemabû. Zêrkir jî da tengala wê û pê re çû hetanî ku ew gihand qesra wê. Piştî dîsa vegehiya malê û li cihê xwe rûnişt, ponîjî li ser spehîbûna Rojanê ya bêtîmel, axaftina wê ya xweş û aqilê wê yî kûr, edeb û dîlnazî û tevgera wê ya ji dil û hemû meziyetên wê tanin ber çavên xwe û pê mest dibû. Gava ku hebekî bi ser xwe ve hat, xizmetkar û bermaliyên wî sifre raxistin û şîveke xweş danîn ber. Bi qasî ku ber dilê wî bigire hinek xwar û ji ser sifreyê rabû, çû destê xwe şûşt. Piştî kincên xwe guhertin û ji malê derket, berê xwe da cem Elî Bekar.

Xizmetkaran derî jê re vekirin û ew derbasî hundur kirin. Çû cem Elî Bekar, dît ku di nivînê de paldayî ye mîna nexweşan. Çawa ku çavên wî bi Zêrkir ketin, bi ser xwe ve hat û got: “Tu pir dereng ketî dosto, te kul û kederên min zêdetir kirin bi vê derengmayînê!” Piştî xulam û xizmetkarên xwe ji hundur derxistin, derî girt û axaftina xwe berdewam kir got: “Bi navê Xwedê ji gava tu çûyî, xew bi çavên min neketiye. Doh cêrî hat gel min û nameyeke mohkîrî ku ji cem xatûna xwe anîbû da min. Îcar hem bêhna min teng kir wê cêrîyê, hem jî şaşwaz kirim ku êdî min nizanîbû ez ê çawa pê re bidim û bîstînim. Di dilê xwe de min got xwezîka Ebûl Hesen li vir bûya! Lewre wî xweş pê re dida û distend, hem jî ew baş nas dikir!”

Gava ku Zêrkir ev gotina wî bihîst, kenîya! Elî Bekar hêrs bû, qeherî û got: “Tu çawa bi gotina min dikenî û min tu ji xwe re weke alîkar û rêzan hesibandîye?” Di pey re ev çend rist gotin bi lomekarî:

Wî çawa dît ku ez digirîm bi min kenîya
 Lew ku ev êş a wî bûya jî dê bigiriya
 Kesê bi kul û derd be, êşkêşekî bê xwedî ye
 Rastedilê wî carinan hevparê êşa wî ye
 Dernakeve ji dil her ew mûqîmê wî ye
 Ne mêvan e ew xwecîhiyê welatê dil e
 Li ser rûyê erdê nîne tu kes ji wî pê ve wile
 Ew e êş ew e derd ew e hebûn û nebûna dil e

Gava Zêrkir ev ristên wî bihistin, hestiyar bû bi têngîhiştina rewşa wî û pê re giriya. Piştî tiştê ku di navbera wî û cêrîyê de qewimibû, hemû jê re gotin bi berfirehî. Elî Bekar jî bi baldarî ew guhdar dikir û bi gotinê wî re, mehdê wî li ser hev dihate guhertin. Geh vedibû, geh jî dihate girtin û bêmehd dibû. Geh hêz dihate bedena wî, geh jî qudûmên wî dişikest. Di dawîyê de jî dişa kûrekûr pê ket, girîya û ji Zêrkir re got: “Biracan, wisa xuya dike ku di demeke nêzik de wê ruhê min ji bedena min derkeve û ez ê bimirim. Loma ez ji te dixwazim ku tu bi min re alîkar bî heta ku Xwedê Teala deynê xwe ji min bistîne û ez ji vê dinyayê bar bikim, herim. Ez ê jî herdem di rêya te de bim û bi ya te bikim.”

Zêrkir lê vegerand û got: “Ez jî baş dizanim ku ev agirê nava te venamire, hetanî ku tu evîndara xwe nebînî. Lê belê hevgihaştina we li cihekî wisa talûke çênabe. Maleke min î din heye li rex mala min î niha, ew a ku cêrî û xatûna xwe hatibûnê; ew cih guncave ji bo pevgihaştina we. Jixwe Rojan Xanê ew der ji bo xwe hîlbijartibû, da ku te li wir bibînî. Li wir, hûnê derd û kulên xwe bi hev re parve bikin, gilî û gâzincên xwe li hev bikin.”

Elî Bekar got: “Tu çawa pêwîst dibînî, wisa bike!”

Zêrkir, wê şevê li cem Elî Bekar ma. Şev pê de, pê re sohbet kir, êş û kulên wî parve kirin, wensa wî anî û dilê wî xweş kir. Bi şeveqê re jî ji xew rabû, nimêja xwe kir û gava ku roj bejneke bilind bû, wî jî xatir ji Elî Bekar xwest û derket, çû mala xwe. Lê belê hîna bêhna xwe bernedabû, cêrîya Rojan Xatûnê hat li derîyê wî da. Silavek lê da û derbasî hundur bû, rûnişt. Zêrkir jî tiştê ku di navbera wî û Elî Bekar de qewimibûn, jê re vegot, da ku kelecana wê hinekî sar bibe. Lê wisa nebû û di fersanda ewilî de, cêrî bi lez axivî û got: “Berî çend kêliyan Xelîfe ji mala wê derket, çû qesra xwe û qesra xatûna min guncavtîre ji vê derê. Tu Elî bînî qesra xatûnê, wê çetir be!”

Zêrkir got: “Tu rast dibêjî, lê belê tu dever ne mîna vê mala min guncav e. Vê derê, stareke baş e ji bo me.” Cêrîyê lê vegerand û got: “Biryar a te ye û tu çawa dizanî wisa bike. Ez ê niha rabim herim cem xatûna xwe û ez ê vê peyamê te jê re bibêjim.” Cêrîyê, çawa ew gotina xwe qedend, rabû ser xwe û li xatûna xwe vegehiya, çû cem wê. Çend seetan bi şûn de jî, dişa li Zêrkir vegehiya û jê re got: “Rojan Xanê, fikra wê guncav dît!” Piştî kîsek

dînar ji paxila xwe derxist, dirêjî wî kir û axaftina xwe berdewam kir, got: “Silavan li te dike û ev dirav ji te re şandine ji bo ku tu pêdiviyên wê pêk bînî û mala xwe ya dîtir ji nû ve raxîne.” Lê belê Zêrkir, ew dirav ji destê wê negirtin û sûnd xwar ku diravên wê negire. Cêriyê rahişt kisê diravan û dîsa li Rojan Xatûnê vegeriya, jê re got: “Zêrkir ev dirav qebûl nekirin û ew dane min.” Rojan Xatûnê jê re got: “Naxwe tu here wê mala wî ya duyemîn bi van diravan ji nû ve raxîne, têkûz bike û hemû pêdiviyên me bikire!” Cêriyê got: “Bila be xatûna min!” Û di cih de çû mala zêrkir a duyemîn û çî tiştê kêmbûn hebûn ji merş û balîf û kulav û nivîn û beroş û sêniyên zîv û zêr kirin û birin ew tê de bi cih kirin. Çi amûrên mûzîkê hebûn anîn li wir danîn. Xwarin û vexwarinên cûr be cûr, ên xweş û pir buha anîn û li metbaxa wê danîn. Piştî çû xatûna xwe anî. Rojan Xatûnê hazirî û raxistina malê ecibandin û ji Zêrkirê xwe re got: “De îcar here Elî Bekar bîne vir!” Zêrkir got: “Wele heger ne tu bî, tukes nikare wî bîne vir!”

Rojan Xatûn rabû çû cem mala Elî Bekar û ew anî wê mala Zêrkir a ku nû amade kiribûn. Çawa ku hat hundur û Zêrkir çav li wê rûgeşî û ronîya çavên wî ket, kêfa wî hat û dilê wî xweş bû, bi coşeke mezin ew pêşwazî kir. Li ser doşekan da rûniştandin, buxûrdan pêxistin li dora wî û qasî seetekê ji pê re sohbet kir.

Di wê navberê de cêrî û Rojan Xatûna ku ji bo nimêja êvarê ji malê derketibûn, vegeeriyên malê li gel du heb xizmetkarên xwe yên jin, çawa ku derbasî hundur bûn û çavên Rojanê û Elî li hev ketin, aqil di serê herduwan de jî nema hişê wan nema gihayê bê çî bikin. Piştî teqnekî bêdengiyê bi ser hişê xwe hatin û hatin li kêleka hev rûniştin, mîna du qumriyan bi hev ve ketin nava henek û laqirdiyan. Piştî hinek bêhn jî bi ser xwe dakirin û çavên xwe li derdorê gerandin. Gava ku her tiştê di malê de têkûz dîtîn, spasiyên xwe ji bo Zêrkir diyar kirin ku ev xizmeta baş ji wan re kiribû. Zêrkir ji wan re got: “Ka ez hinek xwarin ji me re neynim gelo?” Gotin “Belê.” Xwarin ji wan re anîn, wan jî têra xwe xwarin, piştî destên xwe şûştin û derbasî odeyeke din bûn ku li wê derê amadekariyê mey û şerabê hatibûn kirin ji bo wan. Li wir jî vexwarin hetanî ku serxweş ketin û ketin himbêza hev de.

Piştî Rojan Xatûnê ji Zêrkir re got: “Ezbenî ka ev qenciya ku te bi me kiriye bibe serî û ûdekê ji me re peyde bike, ango amûreke din a mûzîkê, da ku em dilê xwe şa bikin.” Zêrkir rabû çû ûdekê anî û da destê Rojanê. Wê jî ûd xist himbêza xwe û awazin pir xweş lêdan. Di pey re bi stranî ev çend rist gotin:

Xew li min nemaye çawa ku ez aşiqê bêxewîyê bim
 Dil û hinavên min peritîn çawa ku ez aşiqê êşê bim
 Çav li min zuha bûn hêsir li min her bûne çem

Xwedêyo dê gengaz be gelo nûdîtineke bêxem?

Û her bi wî hawî xwendina helbestan berdewam kir, li gel lêdana newayên ûdeke dilêş û dilşa, ku hiş û aqil diheyirandin. Her kesên di wê meclîsa wê de mest û gêj bûn bi wî dengê pirrengî û dilovan. Zêrkir got: “Xwezî bi dilê wî ewê ku vî dengî guhdar dike!” û piyaleyên meyê dîsa da-girtin û danîn ber mêvanên xwe.

Rojanê jî ços bû û ev çarînên han, bi stranî xwendin:
Evîndarê min soz da û soza xwe pêk anî
Di şeveke weha de ruhê min ji xurbetê anî
Ev şev şeveke bi hezar şevî ye li ba min
Dûrî galgal û gotegotên gellacê welatê min
Ew destê rastê radipêçe li dora newqa şêrîn
Ez bi destê çepê wî radikişînim ber sênga camîn
Me didin ber bayê xwe ev rûmûsanên agirîn
Buhušta baqî ye ev li vir nabe xemgîn

Derengî şevê, Zêrkir, herdu evîndar xwe bi xwe hiştin û çû mala xwe ya dîtirkê. Bêhiş ket nav nivînên xwe û di cîh de raket. Bi şeveqê re rabû nimêja sibehê kir, qehweya xwe vexwar û xwe amade kir ji bo ku here cem Elî û Rojanê. Di wê kêlikê de cîranê wî di nava tirs û hêlewêleke balkêş de derbasî cem wî bû û bi dengê lertzak got: “Bîrawo wile ez pir êşiyam bi wê bûyera ku îşev bi serê te de hat, li mala te ya din!” Zêrkir şaşwaz û matmayî bû li himber vê gotinê. Bi zorê axivî û got: “Çima çi bûye cîran can?” Cîranê wî got: “Şeva borî diz ketibûn wê mala te de. Her tiştê tê de birine û herdu mêvanên te yên ku tê de bûne ji kuştine. Min bi çavên xwe nedît, lê xêlkên deverê wisa digotin!” Zêrkir, pir tirsîya û got: “Ka em bi hev re herin wê mala min û binêrin çi qiwimîye!” Herduyan dan tengala hev û bi lez berê xwe dan cihê bûyerê. Gava gihan wir, dîtin ku mala wî vikîvala kirine, her tişt birine û herdu mêvan û cêrîyên wan jî ne xwiyanê. Zêrkir di dilê xwe de got: “Ez qet li ber malê xwe yê ku hatiye dizîn nakevim, lew ku min hinek ji wanan bi emanetî jî anîbûn, lê belê ez herî zêde li ber Elî Bekar û Rojan Xatûna ku delalîya ber dilê Xelîfe Harûnê Reşîd bû dikevim û têsim. Lewre heger tiştek bi wan hatibe, dê malik li min jî xerabibe û ez vê yekê jî baş dizanim!”

Zêrkir li cîranê xwe zîvirî û jê re got: “Tu cîranê min î û qencîya min dixwazî, gelo tu dibê ez çi bikim?” Cîranê wî got: “Ez dibê xwe ragire! Heger van kesin wisa navdar ên meclîsa xelîfe kuştibin, jixwe wê asayîş zû wî bigire û wê heyfa te jî were hilanîn!” Zêrkir, bêdeng vegeriya mala xwe.

Li Şehrezadê bû sibeh, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 170'YEMÎN

Şehrezadê vegotina çîroka xwe ji Şahîñşahê mezin Şehreyar re berdewam kir û got:

Çawa ku me şeva borî jî behs kir, Zêrkir vegeriya malê, ponijî û di dilê xwe de got: “Naxwe tiştê ku Ebûl Hesen ji ber wî reviya ev bû û vaye ev bi serê min de hat!”

Bûyera bi serdegirtina mala wî û diziya hemû tiştên di malê de, pir zû hate bihîstin û di nav xelkê de belav bû. Nas û dost û mirovên wî jî zû bi ser de hatin dilxweşkirin û serlêdana wî. Kul û derd û êşên wî pê re parve kirin û piştgirî danê. Wî jî gilî û gazinek xwe bi wan re parve kirin û di nava xemgîniyê de ponijî bêyî ku tiştêkî bixwe, an jî vexwe. Di wê navberê de xulamekî wî derbasî hundur bû û hat jê re got: “Kesekî ku ez wî nasnakim li devê derî ye û dixwaze te bibîne!” Zêrkir pê ve rabû û çû cem wî, silav lê kir, dît ku kesekî nenas e. Zilam jê re got: “Tiştêkî ku ez ji te re bibêjim heye!” Zêrkir ew derbasî hundur kir û jê re got: “Hela bibêje bê çî li cem te heye?” Zilam got: “Ka bi min re were ew mala te ya din, a ku hatiye dizîn, ez ê tiştêkî nîşanî te bidim!” Zêrkir matmayî got: “Qey tu wê mala min nas dikî?” Zilam got: “Ez gelek agahên di derbarê te de dizanim. Xwedê hez bike ez ê xeberek xweş bidime te ku bêhna te fireh bike!”

Zêrkir di dilê xwe de got: “Heger wisa be, ew ku derê bixwaze ez ê pê re herim!” Piştî da tengala wî û berê xwe da mala xwe ya dîtir. Gava gihan wir, zilam jê re got: “Derî li ber malê nîne, em nikarin li vir bisekenin. Ka bi min re were cihekî din, em ê li wir biaxivin!”

Bi wî hawî zilam ew ji cihekî bir cihekî din, hetanî kuşevê baskên xwe bi ser wan de berda. Zêrkir jî tu pirs jê nedikirin û bédeng li dû wî diçû mîna tayê ku li dû derziyê biçê. Demek bi şûn de bajar li pey xwe hiştin û gihan çolê. Dîsa jî zilam ji Zêrkir re got: “Bide dûv min!” û bazda. Zêrkir jî li pey wî bazda hetanî ku gihan ber avê. Li qiraxa avê kelekek hebû, lê siwar bûn. Zilam li pêş siwar bû, bêr girtin destê xwe û bi şidan av kişand. Di demeke kurt de xwe gihand aliyê din ê avê û ji kelekê peya bûn, dîsa ketin bejahiyê û lezandin. Li dawiyê zilam bi destê Zêrkir girt, ew derbasî cihekî kir ku di temenê xwe de tiştêkî wisa nedîtibû. Nizanibû bê ew li kîjan aliyê bû jî. Piştî li ber deriyekî sekini, kilît ji bêrika xwe derxist, derî vekir û Zêrkir bi xwe re derbasî hundur kir. Dûvre jî deriyê mezin li dû xwe girt, xilqeke hesinî asê lê da. Di pey re jî Zêrkir da dûv xwe û ew derbasî binerdeke kir û pê de çûn hetanî ku gihan cihekî; deh zilam tê de bûn hemû jî dişibîyan hev, mîna ku cewîyên hev bin.

Zilam silawek da wan, wan jî silava wî vegerandin, dûvre jî Zêrkir xwestin ku rûnê. Ew jî rûnişt. Jixwe pir betilî bû û pêwîstiya wî bi rûniştinê

hebû. Xwarin û vexwarin jê re anîn, wî jî têra xwe xwar û vexwar. Piştî hinek ji ava gulan jî bi ser xwe dakir, da ku bêhna wî were ber wî. Wê gavê di derbarê xwarinê de hinek şik û gûman ketin dilê Zêrkir de, lê dûvre tiştêkî din kete bîra wî û ji xwe re got: “Heger tiştêk di wê xwarinê de hebûya, wan jî bi min re nedixwarin!” Û bêhna wî hate ber wî. Cêwîyan jê re gotin “Tu me nas dikî?” Got: “Na wele ez we nas nakim û yê ku ez anîme vir jî ez wî nas nakim û ez nizanîm ev der ku der e jî.” Wan jî lê veğerandin û gotin: “Naxwe ka rastiya çîroka xwe ji me re bibêje, bêyî ku tu derewan bixe nav de!” Zêrkir got: “Wele rewşa min erjeng e û halê min jî ne ji rêzê ye. Gelo hûn tiştêkî di derbarê min de dizanin?” Gotin: “Belê, şeva borî, me bi ser mala te de girt, mal û mûlkên te birin, dostê te û dostika wî jî, me ew hêsîr girtin û anîn vir.” Zêrkir, hilmeke kûr stend û got: “Naxwe we ew sitirandin! Xwedê we jî bisitirîne, ke ew dostê min û ew stranbêja wî li ku ne?” Cêwîya destên xwe ber bi hêlekê ve dan û gotin: “Li vê derê ne, lê wele me tiştêk ji wan fêm nekiriye. Jixwe gava me ew anîn vir û me nîşaneyên mirovên mezin û maqûlan li ser wan dîtî, me tu pirs jî ji wan nekirin û em tekil wan nebûn. Jixwe tiştê ku em berbend kirin û nehişt ku em wan bikujin jî, ev rewşa wan bû. Vêca kanî rastiya wan ji me re bêje, soz û peyman be em tiştêkî xerab bi we nakin!” Çawa ku Zêrkir ew gotin ji deve wan bihistin, çogên wî ricifin û tirseke mezin ket dilê wî de. Zorî da xwe û ji wan re got: “Divê hûn bizanibin ku di roja îro de mirovên rûmetkar nemane, lê belê di şexsên we de, va ye bi bextewarî ez dibînim ku hîna jî mirovên bi rûmet li ser rûyê erdê hene! Jixwe heger razeke min heba jî, ez baş dizanîm ku ev raza min, incex di sînga we de veşartî bimîne!” û her bi wî hawî pesnên wan pir da.

Piştî Zêrkir hinekî din jî ponijî û têgihişt ku eşkerekirina mijarê, çetir e ji veşartina wê. Li ser vê yekê biryar da ku her tiştî bi awayê rastî ji wan re bibêje. Mijar ji serî hetanî binî, çawa ku qewimîbû, wisa ji wan re vegot. Wan jî piştî ku çîrok giş bi baldariyeke mezin guhdar kirin, ji Zêrkir pirsin û gotin: “Niha ev xortê han Elî Bekar û ev xatûna han jî Rojan Xan e?” Zêrkir got: “Belê!”

Gava ew gotin bihistin, her deh bi hev re rabûn ser xwe û lêborîna xwe ji herduyan xwestin, gotin: “Li qusûrê nenêrin wele tiştê ku me ji mala we diziye jî, ev tenê jê maye, yê dîtir me ew xwarin” Û tiştên ku li cem wanan mabû hemû li Elî Bekar veğerandin. Gotin: “Heger tu dixwazî, çawa me ev tişt ji malê derxistine, emê niha rabin dîsa bibin cihê wan deynin!” Elî Bekar got: “Temam nexwe dîsa wan tiştan bibin mala ku we ew jê anîne!” Çend heban ji wan cêwîyan rahiştin wan tiştan jî ji wir derketin, çûn.

Elî Bekar û Rojanê jî, hîna jî di qalikên xwe de bûn û cogên wan diricifî ji tirsan. Lê dema ku çavên wan li Zêrkir ket û ew guhertina bi cêwîyan re çêbûn û pê de; hinekî bi ser xwe ve hatibûn. Zêrkir ber bi wan ve çû û si-

lavek li wan kir, got: “Gelo çi bi serê cêrîyê hat û ew stranbêj bi ku ve çûn?” Gotin “Wele tu agahiya me ji wan nîne!”

Dûvre hemû bi hev re ji wir derketin û bi şûn de vegeriyan, çûn hetanî ku gîhan her qiraxa avê. Li wir, ew keleka ku pê derbasî vî aliyê avê bûbûn, li wir bû. Cêwîyan dîsa ew lê siwar kirin û ew di avê re derbas kirin, ew birin wî aliyê avê. Lê çawa ku ji kelekê daketin, qefleke siwarên leheng dora wan girtin û mîna teyrên baz bi ser wan de girtin. Hemû cêwî derdest kirin, ew dîsa li kelekê siwar kirin, ew derbasî wî aliyê avê kirin. Zêrkir, Elî Bekar û Rojanê jî, di cihê xwe de matmayî mabûn. Siwarên ku nobedariya wan dikirin ji wan re got: “Îcar hûn kî ne?” Heyyîrî man, nema zanîbûn wê çawa û çilo bersiva vê pirsê wan bidin. Lewre wan jî nizanîbû bê êdî di destê kê de ne. Zêrkir got: “Ew kesên ku we ew girtine, em wan nasnakîn, me jî ew li vir dîtîn. Lewre yê me, em stranbêj û mûzîkjen in.”

Hindik mabû ku wan berdîn. Lê gava ku yekî ji wan li Rojanê meyzand, gûman jê kirin û biriyara xwe guhertin, ew bernedan. Li Zêrkir û Elî Bekar zîvirîn û gotin: “Hûn rastiye nabêjin, hûn derewan li me dikin. Em ê careke din jî fersendê bidin we ji bo ku hûn rastiya xwe ji me re bibêjin bi zamanekî vekirî. Bêjin bê hûn kî ne li ku derê, li kîjan taxê rûnidinên?” Kesî ji wan nizanîbû wê çi bibêje û pir tengav bibûn. Rojanê xwe nêzikî siwarekî ji wan kir û bi dizî di guhên wî de axivî, tiştin jê re gotin. Siwar di cîh de ji hespa xwe daket û ew li hespa xwe siwar kir. Bi rişmeya wê girt û hesp li dû xwe kişand. Du siwarên dîtirkê jî weke wî kirin, ji hespên xwe daketin, Zêrkir li yekî û Elî Bekar li ya din siwar kirin û ew dane dûv xwe, birin hetanî ku ew gîhandin qiraxa aveke mezin. Li wir qîrek dan hineke din. Wan jî di cî de kelekê anîn ew lê siwar kirin û yeke din jî ew bi xwe lê siwar bûn. Piştî bêrên xwe li avê dan û ew pêş de birin, hetanî ku ew gîhandin qesra Harûnê Reşîd. Ew her sê jî di nava tirseke bêtarîf de bûn, ditirsiyan ku werin kuştin. Rojanê li wir peyabû û derbasî qesrê bû, Zêrkir û Elî Bekar jî berbasî aliyê din bû û di wir re çûn mala xwe siwarên bi wan re jî, bi rêya xwe de çûn.

Li Şehrezadê bû sibeh, wê ji vegotina çîroka xwe birrî û navberek dayê, bêdeng bû.

ŞEVA 171'EMÎN

Şehrezadê vegotina çîroka xwe berdewam kir û got:

Roja dîtirkê çawa ku Zêrkir ji mala xwe derket, dît ku cêrîya Rojanê li devê deriyê wî ye! Ji nişkê ve tirseke bê diran, dil û hinavên wî dagir kir û rêya xwe ji ser wê vegerand û bi lez ber bi sûkê ve çû. Cêrîyê jî da pey wî û hewl da ku xwe bigihînê. Lê vê hewldana wê tirsê nava Zêrkir mezin-

tir kir. Her ku li pey xwe dizîvirî û lê dinêrî, tîrsa nava wî mezintir dibû; birêveçûna wî jî bileztir dibû. Cêrîyê jî hîn bêhtir dilezand û gazî wî dikir, digot: “Hela ka bisekine, ez ê tiştêkî ji te re bibêjim!” Lê belê ew nesekînî û her meşa xwe berdewam kir hetanî ku gîha mizgefteke vala ku kes lê tunebû. Li wê derê, cêrîyê dîsa got: “Bisekine ez tiştêkî ji te re bibêjim, metirse wî!” Zêrkir derbasî mizgeftê bû û du ruket nimêj kir, cêrî jî li pey wî. Herî dawî kufekuf pê ket û lê zîvirî jê re got: “Çi ye, tu çi ji min dixwazî?” Cêrîyê li halê wî pirsî, Zêrkir got: “Şikir ji Xwedê re, ez başim!” Û çîroka xwe û Elî Bekar a dawî bi kurtahî jê re vegot. Piştî pirsî û got: “Te çawa kir, tu çawa filîtî?” Cêrîyê got: “Gava ku wan dîzan derîyê malê şikandin û ketin hundur de, ez pir tirsîyam ku zîlamên Xelîfe Harûnê Reşîd bin û di cîh de me bikujin. Loma ez û herdu stranbej, em derketin ser banê xanî û di wir re me xwe avêt erdê û em revîyan hetanî ku me xwe gîhand qesra xelîfe. Lê em perişan bûbûn û rewşa me, em didane dest. Dîsa jî me rastiya xwe veşart û mîna ku em li ser agir bin, bi zor û heft belayan me xwe ragirt hetanî êvarê. Çawa ku tarî kete erdê, min gazî ew kelekvanê berê kir û jê re got ‘Xatûna min wenda ye û me tu xeber jê negirtiye. Kanî min li kelekê siwar bike û di avê re derbas bike, da ku ez lê bigerim, belkî ez wê bibînim.’ Wî jî ez li kelekê siwar kirim û bêr li avê dan, ez birim. Bi seatan ez di nava wê avê de gerandim hetanî ku em li kelekê din qelîbîn ku ber bi qesrê ve diçû. Du zîlam û jinek tê de bûn. Em jî li pey wan çûn. Gava ku gîhan qiraxa avê û jê peyabûn, min naskir ku jinîk xatûna min Rojanê ye. Ez jî peya bûm û min li pey wê bazda. Ji kêfan re baskên min çêbibûn, hêsir jî çavên min dihatin xwarê. Gava ku min xwe avêt himbêza wê û destên wê maçî kirin, ji min re got ‘Hezar dînarî bide xwedîyê vê keleka ku ez anîme vir!’ Min fermana wê bi cîh anî, piştî min û herdu xizmetkaran, me rahiştê û ew bir qesrê, xist nava cihê wê de, lewre pir westiyayî bû. Hetanî sibehê di nava xemgînî û êşeke kûr de ma. Gava bû sibe jî nehişt kes derbasî cem wê bibe. Roja dîtîrkê gava min ew ji xew rakir, mîna mirîye ku ji tîrbê rabe, mirûzekî ecêb li ser bû. Min ava gulan bi ser dakir rûyê wê şûşt û kincên wê guhertin. Piştî dest û nigên wê jî şûştin û li ber dilê wê çûm û hatim hetanî ku min ew îqna kir ku çend gep nan xwarin jî bixwe. Wê gavê ez li ber gerîyam û min jê re got: “Bese xanima min! Êdî hebekî li xwe were rehmê, ji xwe bobelat bi serê te de hatiye û te têra xwe êş kişandiye. Wisa berdewam bike, tu dê mala xwe xera bikî!” Wê jî got: “Cêrîya xêrxwaz, bawer bike mirin jî hêsantîre ji min re, li himber ev tiştê ku bi serê min de hat. Misoger ez ê bihatama kuştin, lê çawa bû ez jî nizamim!”

Zêrkir hem guh dida ser gotinên cêrîyê û hem jî rêya xwe berdewam dikir. Wisa meşîyan hetanî ku gihan hinda dikana wî. Li wir cêrîyê jî Zêrkir re got: “Ka hinekî xwe ragire li benda min, ez ê herim hetanî cihekî û werim!” Û bi lez çû. Piştî demeke kurt, bi şûn de vegeriya û kîsîkekî diravan di bin çengê wê de bû. Kîsik da destê Zêrkir û got: “Xatûna min, weleh

rewş pir aloz e û ez jî tengav im. Lê ez ê çareyekê bibînim û xwe bigihînim we! Niha ez ê biçim wê mala xwe ya din, dîsa di ber çavan re derbas bikim, piştî agahiyekê bigihînim we!”

Cêriyê xatir jê xwest û çû, Zêrkir jî rahişt tûrikê diravan û vegeriya mala xwe. Li malê tûrik vekir û dînarên tê de hejmartin, bala xwe dayê ku pênc hezar dînar e. Hinek ji wan danîn malê, hinek dan deynê xwe û yên mayîn jî bir mala xwe ya ku hatibû şêlandin, ji nû ve saz kir û kêmaniyan wê temam kirin. Necar û xebatkaran, di çend rojan de mala wî disa vegrandin mîna berê. Zêrkir dîsa cêriya xwe xist wê malê de û mîna ku tiştê nebûbe jiyana xwe berdewam kir.

Rojekê Zêrkir çû mala Elî Bekar û dît ku ew ketiye rewşeke pir xerab de ku êdî nikare biaxive jî. Li ber serê wî rûnişt, Elî çavên xwe vekirin. Çawa ku awirên wî li Zêrkir ketin, zimanê wî geriya û got: “Ji bo her tiştî dûmahiyek heye û dûmahiya eşqê jî ya mirin e an jî pevşabûn e. Ez jî bêhtir niha nêzîkî mirinê me. Xwezî beriya ku ev tişt bi serê min de hat, ez bimirama! Heger Xwedê li me nehata rehmê û em nesitirandana, em ê bihetikiyana û di nav xêlkê de rezîl û ruswa bibûna. Ya girîngtir jî ez nizanim bê ka ez ê çawa ji nava pirikê derkevim û xwe xelas bikim! Bawer bike heke ne ji tîrsa Xwedê bûya, min ê dawî li jiyana xwe bianiya. Lewre niha ez mîna çûkê di qefesê de me, nefesa min hatiye birrîn û mecal ji min re nemaye. Lê ev jî bi sînore e û ez baş dizanim ku dawiya wê mirin e!” Pê re jî hêsrên wî bariyan û kûrekûr pê ket, giriya...

Zêrkir jê re got: “Va ez diçim malê, wê cêriya wê were min li wir bibîne. Ez hêvîdarim ku dê ew agahiyekê xweş ji bo te bîne!” Elî Bekar, keserek kişand û got: “Baş e. Naxwe here, lê ku te agahiyek girt, zû li min vegere!” Zêrkir got: “Bila be Biracan!” Û xatir jê xwest, derket çû. Giha malê, rûnişt hebekî bêhna xwe vekir û di wê navberê de cêrî hat li deriyê wî da. Çawa ku derî lê vekir û dît ku digirî û dinalê, jê re got: “Begê min, tiştê ku em jê ditirsiyan bi serê me de hat! Doh gava ez bi ser xatûna xwe de çûm, min dît ku bi hêrs û qehr e, li himberi cêriyêkê ji wan herdu cêriyên stranbêjên ku di wê şeva malûm de li ba me bûn û ferman da ya dîtirkê ku lê bide. Ew jî tirsîya û ji wir reviya. Lê hinek ji navmaliyan li devê derî lê rast hatin û hewl dan ku wê bibin cem xatûna wê. Ew jî ji bo ku xwe ji nav lepên wan xelas bike, bi yekî ji wan re kenîya û çav dayê weke ku meyla wê li ser hebe. Nevmalî jî kêfxweş bû bi wê yekê û pê re da û stend hetanî ku rastiya wê fêr bû û cêriyê jî çî tiştê ku bi serê wê û xatûna wê de hatibû, ji wî re eşkere kir. Bi wî hawî xeber gîha Xelîfe jî. Xelîfe Harûnê Reşîd jî ferman da ku xatûna min ji qesra wê derxîne û wê bibe li qesra xwe bi cih bike. Xatûna min li gel hemû mal û mulkê wê birin li qesra xelîfe bi cih kirin û bîst heb xîzmetkara jî li ber destên wê danîn. Loma, ez hîna jî derbasî cem wê nebûme û ez nizanim ez çî bikim, çawa bikim. Ez ditirsim ku tiştê ku bi serê min û wê de

were. Lewre ji min pê ve, tu kes nikare razên wê biparêze!”

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî navber da gotina xwe û bêdeng bû.

ŞEVA 172'YEMÎN

Şehrezadê berdewam kir:

Cêrîyê ji Zêrkir re got: “Mîrzayê min, hela tu bi lez biçê cem Elî Bekar û wî agahdar bike bi vê pêşketinê, da ku hayê wî jê hebe û tedbîra xwe bigire li himberî dibêtiya ku derkeve holê!” Zêrkir lê vegerand û got: “Û em ê bikaribin çi bikin?” Êşeke giran ketibû nava wî de û bêçaretîyê ruhê wî dagir kiribû. Cêrîyê got: “Tu dikarî bi lez agahiyê bigihîni Elî Bekar ji bo ku xafil neyê girtin. Ez ê jî guhên xwe baş vekim û derkevim nêçîra agahiyên pêşketinên nû!” Piştî xatir xwest jî Zêrkir û bi lez derket, çû.

Çawa ku cêrî di deve derî re derket, Zêrkir jî rabû ser xwe û berê xwe da cem Elî Bekar. Gava derbasî cem wî bû, dît ku bi xwe re diaxive, ber dilê xwe xweş dike bi hêviya ku evîndara xwe bibîne. Dema ku çavên wî li Zêrkir ketin bi ser xwe ve hat û got: “Ez bala xwe didimê ku tu pir zû li min vegeyîyî?” Zêrkir got: “Dev ji van çîrokan berde û were em hinekî din mûcid bin, lewre qewimînin wisa giring çêbûne ku ez ditirsim em tevde tê de biçin!”

Elî Bekar hêrs bû bi vê gotina Zêrkir û got: “Brawo! Naxwe ka zû ji min re bibêje bê çi qewimîye?” Zêrkir jê re çîroka ku qewimibû ragihand û di encamê de jî lê zêde kir got: “Divê tu bizanibî, heger hetanî êvarê tu wisa li mala xwe bimînî, tê nefilite!” Elî Bekar behetî ma bi wê gotina Zêrkir û hindik mabû ku giyana wî dev ji bedena wî berde. Qasek bi şûn de, bi ser xwe ve hat û lê vegerand got: “Biracan, naxwe ka tu ji min re bibêje bê ka ez çi bikim?” Zêrkir got: “A rast ew e ku tu zû rabe ser xwe û bi lez hemû mal û mulkê xwe kom bikê û bi qasî ku tu karibî bi xwe re rake û berî ku bibe sibe tu ji vî bajarî derkevî, biçî warekî dîtir. Helbet bi qasî tu bikaribî, xulam û xizmetkarên xwe jî bi xwe re bibe!” Elî Bekar got: “Tu rast dibêjî, ez ê jî wisa tevbigirim.” Û di cîh de rabû ser xwe, virde wirde beziya, malê xwe da ser hev, lêborîna xwe ji dost û kes û karen xwe xwest, meqsada xwe ji wan re rave kir û wesiyetên xwe li wan kirin.

Piştî ew malên xwe giş li sê deveyan bar kirin û li qantirekê siwar bû, da dû xulam û xizmetkarên xwe û bi dizî ji bajêr derket. Zêrkir bi xwe jî mîna wî kir û tev li barên xwe da dûv wî û ew jî pê re bû rêwîyê rêya wî ya nediyar. Şev û rojekê sax meşîyan bêyî ku bisekinin. Roja dîtir, li cihekî guncav rawestîyan, barên xwe danîn deve û qantirên xwe girêdan û bêhnêkê ji xwe re raketin. Lê belê ji ber ku pir westiyabûn, bi ser xwe ve

nehatin û ji xew ranebûn. Gava ku diz û keleşan dora wan girtin, nû ji xew şiyar bûn û bi ser xwe ve hatin. Lê êdî pir dereng bû û tiştek nema ji destên wan dihat. Diz û keleşan, xulamên wan kuştin, hemû mal û mûlkên wan jî birin û ew tazî li wir hiştin, çûn. Ew jî di nava wê perîşaniya xwe de rabûn ser xwe û meşiyar hetanî ku li wan bû sibeh.

Sibehê xwe gîhandin bajarekî din û derbasî hundur bûn, bi wî halê xwe yê şerpeze. Çûn xwe dan kêleka mizgeftê û li wir man hetanî êvarê bê xwarin û vexwarin. Gava ku şev ket erdê jî, ew di mizgeftê de raketin. Bi şeveqê re dîsa rabûn ser xwe, nimêja sibehê kirin û li wir rûniştin. Jixwe devereke ku pê de biçûna jî tunebû. Di wê navberê de zilamekî din hat hundur, silavek li wan kir, piştî du ruket nimêj kirin. Dûvre li wan zîvirî û got: "Hûn herdu jî mîna xerîban e?" Wan jî got: "Rast e, em xerîbin. Dizan em şelihandin û em wisa rût ketin vî bajarî de ku kesekî em xwe lê bigirin, biçin cem jî nîne!" Mirov got: "Gelo hûn dîkin werin mala min!" Zêrkir li hevalê xwe zîvirî û jê re got: "Kanî rabe ser xwe em pê re herin da ku em ji du mijarên sereke xelas bibin. Niha em ditirsin ku yekî nas derbasî hundur be û me di vî halî de bibîne. Ya duduyan jî jixwe em xerîbin û devereke meyî ku em xwe lê bigirin nîn e!"

Elî Bekar got: "Tu çawa dizanî wisa bike?" Zilamê mazûban careke din teklîfa xwe dubare kir û got: "Bi ya min bikin û werin em herin cem min!" Wê gavê Elî û Zêrkir gotin: "Bila be." û bi ya wî kirin. Mazûban ew herdu birin mala xwe, her yekî ji wan kinc û cilek dayê, pêdiviyên wan pêkanîn, nan û xwarin da wan û dilê wan xweş kir. Ew jî li cem mala mazûbanê xwe man hetanî êvarê. Êvarê rewşa Elî Bekar xerabû û tê derxist ku ecelê wî nêzik bûye. Gazî Zêrkir kir û jê re got: "Biracan, rewşa min giran bûye û hîna ku devê min digere ez dixwazim wesiyeta xwe li te bikim. Wesiyeta min ew e ku çawa ez mirim, tu bi lez biçê cem diya min, wê agahdar bikî bila were ser cenazeyê min û tev li merasîma binaxkirina min bibe. Dîsa bila hebekî qewîn be û zêde xwe li ser min neêşîne!"

Elî Bekar, rastiya xwe baş dizanîbû, loma piştî ku ew gotina xwe qedand bi demeke kurt, ji ser hişê xwe çû û li erdê veziliya. Gava ku qasekî bi şûn de hebekî bi ser xwe ve hat û çavên xwe vekirin, dît ku cêriya mazûbanê wî distirê. Ew jî geh pê re kenîya, geh êşîya û xemgîn bû. Cêriyê digot:

Mirinê zû em ji hev û din veqetandin
Piştî cirantî û dostaniyeke din
Êşa şevan em ji hev qetandin
Gengaz e gelo ku hebe dîdareke din
Çima veqetandin tê herdem li pey dîdariyê
Û çima ev dujminahîya evîndariyê
Êşa mirinê kurt e zû zû derbas dibe

Lê belê êşa evîndariyê her di dil de ye
Ger gengaz bûya û min xwe bigihanda wê
Min ê bihiştê ku furaq bitehmîne çêja fûraqê

Gava ku Elî Bekar ev helbest bi stranî ji deve wê cêrîyê bihîst, hilmeke kûr stend û piştî wê bêdeng bû, laşê wî sist bû, jiyana xwe ji dest da.

Li Şehrezadê bû sibeh, wê ji dengê xwe birrî û navber da vegotina çîroka xwe.

ŞEVA 173'YEMÎN

Şehrezadê çîroka xwe berdewam kir û got:

Gava Zêrkir dît ku Elî Bekar jiyana xwe ji dest daye, li xwediyê malê zîvirî û jê re got: “Ez tikan ji te dikim ku tu li meytê vî dostê min xwedî derkeve, hetanî ku ez herim Bexdê, dê û kes û karên wî ji mirina wî agahdar bikim, da ku werin û ew bi xwe cenazeyê wî rakin!” Zilam got: “Ser seran, ser çavan!”

Zêrkir di cîh de berê xwe da Bexdayê û bi lez çû. Gava gîha Bexdê, destpêkê çû mala xwe, kincên xwe guhertin û piştê çû mala Elî Bekar. Çawa ku xûlamên Elî Bekar çav lê ketin, lê kom bûn û pirsra Elî jê kirin. Lê Zêrkir rice ji wan kir ku îznê ji diya wî bixwazin, da ku derbasî cem wê bibe. Diya wî izin dayê, Zêrkir ji derbasî cem wê bû, silavek lê kir û gotina xwe berdewam kir, got: “Em hemû dizanin ku gava qedera yekî bê, kes nikare jê bireve. Emre Yezdanê Diloan çi be, ew dibe!” Diya Elî di cîh de his kir ku tiştê qewimîye, ji Zêrkir re got: “Tu bi Xwedê kî rastiyê ji min re bibêje, kurê min çûye ser diloaniya xwe an na?” Lê Zêrkir kir û nekir nikaribû bi axaviya ji ber êşa nava xwe. Gava ku diya Elî Bekar ew di wî halî de dît, kûrîni pê ket, di nava girî de fetisi û bê hiş li erdê ket, ji ser hişê xwe çû. Zêrkir di ber xwe de got: “Xwedê te bide ber rehma xwe û wî ji bi buhuştê xwe şa bike!”

Piştê gava ku bi ser hişê xwe hat, Zêrkir çîroka kurê wê Elî Bekar ji serî hetanî binî jê re got. Li dawîyê diya wî ji Zêrkir pirsî û got: “Gelo tu wesiyetên xwe ji te re negotin?” Zêrkir got “Belê” û tiştê ku di wesiyeta xwe da anîbû ziman, ji diya wî re vegot: “Vêga rabe û zû bilezîne, amadekariyên rakirina cenazeyê wî bike!” Lê çawa ku diya Elî ev gotinên Zêrkir bihîstin, her derê wê lerizî û dîsa ket, ji ser hişê xwe çû. Lê piştê demeke kurt, dîsa bi ser xwe ve hat û rabû ser xwe amadekariyên xwe kirin. Ew ji rabû, di nava wê êşê de, berê xwe da malê. Lê hişê wî hey li ser ciwaniya Elî Bekar û ew bobelata ku bi serê wî de hatibû de bû.

Hîna Zêrkir di nava êşa wê ponijandinê de bû, bala xwe dayê ku ji-

nekê bi destê wî girtiye û dikişkişîne. Gava lê zivirî, dît ku cêriya Rojanê ye! Çawa ku awirên wan li hev ketin û hevdû nas kirin, pir hestiyar bûn û ji kêfan firiyar, hêsir barandin. Bi hev re meşiyar hetanî ku gîhan malê. Li wê derê Zêrkir ji cêriyê re got: “Tu qet dizanî bê çi bi serê Elî Bekar hatiye?” Got: “Na.” Zêrkir, çi qewimîbû jê re got, ji serî hetanî binî. Dûvre lê zêde kir û got: “Û rewşa xatûna te çawaye?” Cêriyê got: “Di derbarê wê de kê çi got, Emîrê Bawermendan ji wan bawer nekir, lewre wî pir jê hez dikir. Ji ber wê jî ew di qesra xwe de bi cih kir û jê re got tu ezîza ber dilê min î û dujminê te di derheqê te de çi bibêjin jî, ez guh nadim wan. Piştî ferman da wêzîrê xwe ku odeyeke bi zêr û zîv raxistî jê re amade bikin û ew li cem xwe bi cih kir. Vêca rojekê gava ku Xelîfe dîsa têra xwe şerab (mey) vexwaribû û gazî cêrî û stranbêjan kiribû, Rojanê jî li kêleka xwe da rûniştandin û şevbuhêrka xwe geş kirin. Wê gavê ji cêriyeke xwe xwest ku ew jî stranekê bibêje. Cêriyê rahişt ûda xwe û dest pê kir, got:

Daxwazkarekî eşqê ez vexwendim ez jî çûm
 Me ji hev hez kir û bêhesap ez pê de çûm
 Hêsirên min şop çekirin li ser herdu dêman
 Mîna ku agahê bidin di derbarê de dilan
 Tiştên êşkere veşêrin û yên veşartî êşkere bikin
 Dê êdî ez ê çawa veşêrim eşq û evîna xwe
 Himber vî dilê ku bênavber dihetikîne xwediyê xwe

Gava ku Rojanê ev helbest bi stranî guhdar kir, weke pelê dara çilo li ber bayê eşqê hejiya, nema xwe li qûn girt, ji ser hişê xwe çû û got rep li erdê ket. Xelîfe jî piyaleya dest xwe danî û pê ve çû û destê xwe di bin serî rakir, serê wê danî ser çoga xwe û ew maçî kir. Qajewaj bi cêriyan ket, hemû li derdora wê kom bûn, nizanîbûn wê çi bikin. Gava Xelîfe ew maçî kir û pêjna germahiyê tê de nekir, tirsîya û destê xwe danî ser dilê wê dît ku ruh tê de tune!

Dema ku Xelîfe ji mirina wê ewle bû, pir hêrs bû û ferman da xizmetkarên xwe ku hemû amûrên mûzîkê yên li wir bişikînin û bavêjin. Piştî rahişt meytê Rojanê û ew bir odeyeke din û li wê derê, pê re ma hetanî sibehê. Roja dîtirkê emir da xizmetkaran ku wê bişon û veşêrin. Xelîfe pir xemgîn bû bi mirina Rojanê û êşeke mezin kişand. Lê qet li rewş û sebeba wê yekê nepirsî bê çima Rojanê ketibû wê rewşê de.” Herî dawî cêriyê bi tikanwarî axivî û ji Zêrkir re got: “Tu bi qedrê Xwedê bikî ji min re bibêje bê cenazeyê Elî Bekar kengî radikin û min jî bi xwe re bibe ser cenazeyê wî, da ku ez jî tevî merasîma veşartina wî bibim!” Zêrkir got: “Ê te tu dikarî li her derê min bibînî, lê ka ez ê çawa û li ku te bibînim, dema ku bê xwestin?” Cêriyê lê vegerand û got: “Piştî wefata Rojan Xatûnê, Xelîfe em hemû cêriyên wê azad kirin û em berdan. Niha jî em li ser turbeya wê dimînin.”

Zêrkir bi cêriyê re çû ser tirba Rojanê, fatîheyek li ser xwend û dîsa bi

rêya xwe de çû, piştî ku dema rakirina cenazeyê Elî Bekar jê re got.

Gava ku cenazeyê Elî Bekar rakirin û anîn bajêr, xelkê Bexdê hemû pê ve rabûn. Helbet Zêrkir û cêrîya Rojan xatûnê jî di nav wan de bûn. Dema ku çavên Zêrkir çû ser cêrîyê û dît ku kesa herî xemgîn û biêş ew e, pir hes-tiyar bû. Hetanî wê rojê, li bajarê Bexdê tu cenaze mîna cenazeyê Elî Bekar bi awayekî cemawerî nehatibû rakirin. Zêrkir bi xwe jî êdî her êvara îne, bênavber diçû ser tirba Elî Bekar û Rojane, ew ziyaret dikirin.

Şehrezadê qurtek av vexwar û berdewam kir got: “Lê belê ev çîrok tu carî nabe mîna çîroka Heyva Zeman, kurê Melîk Şehrîman.” Xwişka wê Dunyazad, li ber geriya û got: “Naxwe tu bi Xwedê kî xwişkêcan, kanî vê çîroka han jî ji me re bibêje!” Şehrezadê got: “Heke Şahê Gewre Şehriyar iznê bide, sibe êvarê ez ê bibêjim!” Şehriyar got: “Baş e, bibêje!”

ŞEVA 174'EMÎN

(ÇÎROKA HEYVA ZEMAN, KURÊ MELÎK ŞEHRÎMAN)

Şehrezadê li nav çavên Şehreyar meyzand û got:

Şahînşahê min î bextewar! Di zemanê berê de sultanek hebû, jê re digotin Melîk Şehrîman. sultanekî pir maldar bû, xwediyê leşkerên giran û alîkar û xizmetkarên bêhesab bû. Lê belê temenê wî çûbû, hêz tê de nemabû û hîna jî Xwedê Teala kurek nedabû wî. Rojekê pir xemgîn bû li ser vê rewşa xwe û kûûr kûr ponijî û gazînên xwe ji wezîrê xwe kir û jê re got: “Ez ditirsim ku ez rojekê bimrim û evqase mal û mulkê min hemû bi avê de here, lewre ez kurdûnde me û kesî min î ku xwedîtiyê li vî mulkî bike, tune!” Wezîrê wî jê re got: “Bêhna xwe fireh bike sultanê min, dibe ku Yezdanê Dilovan rêyek xêrê li ber te veke û kurekî bide te. Lewre kurek dabû Îbrahîm jî di sedûşêst saliya wî de! De êdî tewkeliya xwe bi Xwedê bîne û rabe destnimêja xwe bigire, du rikêt nimêj bike û her bi jina xwe re rakeve, belkî ya di dilê te de pêk were!”

Sultan bi ya wêzîrê xwe kir û çû bi jina xwe re raket. Bi emrê Xwedê wê şevê jina wî ber girt û ducanî bû. Gava ku neh mehên wê qedîyan û hemlê xwe danî, kurekî wisa spehî jê re çêbû ku mîna heyveke ronak be di şeveke tarî de. Loma navê wî kir “Heyva Zeman” û pir şad û bextewar bû bi çêbû-na wî. Heft rojan serê bajar xemilandin, li def û dohalan dan û şêranî belav kirin, şahî li dar xistin. Kurik di nava xêr û xweşî û bereketê de mezin bû, hetanî ku temenê wî gîha panzdehan.

Heyva Zeman êdî cîwanekî pir lihevhatî, bejinzirav û spehî bû. Bavê

wî jî pir jê hezdikir û şev û roj ew li kêleka xwe digirt, ne dihişt ku jê veqete. Carekê Melîk Şehrîman şika dilê xwe ji wezîrê xwe re vekir û got: “Ez pir ditirsim li ser kurê xwe ku qede an jî beleyek bi serê wî bê berî ku ez wî bizewicînim û neviyek ji min re çêbibe! An jî tiştek bi serê min bê berîya ku ez neviyê xwe bibînim.” Wezîr got: “Sultanê min ê bextewar, jixwe zewac ji suneta peyxemberê me ye- eleyhîs selam- û dê tiştekî pir di cihê xwe de be heger tu kurê xwe niha bizewicîne di saxiya xwe de!” Li ser vê gotina wezîrê wî, Melîk Şehrîman jê re got: “Ka hela gazî kurê min Heyva Zeman bike, bila were vir!” Wezîr çû kurê wî anî hizûra wî. Heyva Zeman bejna xwe li ber Sultan tewand û silavek dayê. Bavê wî jê re got: “Heyva Zeman! Ez dixwazim te bizewicînim û beriya ku bimirim ez daxwazim şahîya te li dar bixim!”

Heyva Zeman li bavê xwe vegerand û got: “Wele bavocan tu nêta min tuneze ez bizewicîm û bi dek û dolabên jinan re mijûl bibim. Lewre min gelek pirtûk xwendîne di derbarê fen û hîleyên wan de. Helbestkarek di vê mijarê de dibêje:

Heke pirsyar bî tu mebhesa jinan de
Baş dîzanîm ez di ehwalên jinan de
Gava dem tê û porêd mirov spî dibe
Tu şensê mirov namîne êdî di evîna wan de

Yekî din jî waha dibêje:

Rêya rast ew e tu qet bi ya wan nekî
Gava te hevfsarê xwe da dest wan tê çawa bikî
Çiqasî tu pir zana û xweşmêr û baş bî
Bawer bike her tu yî yê ku dê wenda bikî

Piştê axaftina xwe berdewam kir û ji bavê xwe re got: “Bavocan, ez tucarî nazewicim û ez tikan ji te dikim, tu jî vê yekê ji min nexwazî!” Gava ku Şehrîmanê Sultan ev gotin ji devê wî bihîstin, êşa xemgîniyeke kûr, xwe berra ser dilê wî da...

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 175'EMÎN

Şehrezadê vegotina çîroka xwe ji Şehreyar re berdewam kir û got:

Wek ku me got, gava Melîk Şehrîman ew gotin ji kurê xwe bihîstin, perdeyeke tarî xwe bi ser rûyê wî de berda û nûr tê de nema. Qet texmîn nedikir kurê wî Heyva Zeman, li himber gotina wî derkeve û bi ya wî neke. Lewre pir jê hez dikir. Lê êdî careke din nema behsa zewacê jê re kir. Ne ew qeherand, ne jî hişt ku dilê wî bimîne. Bervajî wê yekê, li ber geriya, dilê

wî xweş kir, henek pê re kirin û gelekî jî qedrê wî girt.

Heyva Zeman jî her ku diçû girantir dibû, bejn û bala wî kamiltir dibû, rûyê wî geştir, husna wî xweşiktir dibû. Melîk Şehrîman jî salekê sax xwe ragirt da ku kurê wî biaqiltir bibe û di hêla kesayetiyê de bêhtir têkûz û qewîn bibe. Bi rastî jî êdî Heyva Zeman bûbû mîna xortên kamîl û lihevhatî di nava aşiqan de. Rûheyy bû mîna navê xwe, ku mirov dikaribû gul û qurunfulan biçine jî wî bexçeyê rûyê wî. Çawa ku helbestkarekî jî gotiye:

Subhan ji wî re dîsa xwiya kir ewan heyvan
Ew e serdarê xortan ew e qeşengê qeşengan
Herkes îro xizmetkarê wî ye bo wî heyran
Di rehên wî de hunguv digere û dike seyran
Durr û heqîq jî rêz bi rêz raxistî ne li ser lêvan
Xweşiktirîn rû rûyê wî ye gelo di nav rûyan
Devê deriyê dilan vedike ew her mîna gulan
Li ser levan zelal hatiye nivîsîn bi xwîna dilan
Eşhedû en la ehsene el hûn îlla hûwe ji nava wan

Piştî ku salek din jî di ser re derbas bû, bavê Heyva Zeman dîsa gazi wî kir û jê re got: “Kurê min, gelo vê carê tuyê guh bidî gotina min?” Heyva Zeman bi wê gotinê re hejiya û bejna xwe li ber bavê xwe tewand û bi lez got: “Ma ez ê çawa guh nedim gotina te bavocan! Ez ê çawa guh nedim te û Yezdanê Dilovan ferman daye min ku ez bi ya te bikim û ji rêya te dernekevim!” Şehrîmanê Sultan, axaftina xwe berdewam kir û got: “Kurê min, divê tu bizanîbî ku ez dixwazim berî mirina xwe te bizewicînim, bi zewaca te kêfxweş bibim û te bikim Sultan li şûna xwe, berî ku ez herim huzûra Xwedayê xwe!”

Gava ku Heyva Zeman ev gotin ji devê bavê xwe bihîstin, serê xwe berra ber xwe da û bi qasî seetekê bêdeng ma. Piştî serê xwe rakir û got: “Bavocan, tucarî ez tişteki wisa nakim, lew ku tu qedehê jehra mirinê bidî destê min jî! Ez baş dizanim ku Xwedê ez erkdar kirime ku ez bi ya te bikim û ji rêya te dernekevim. Lê belê ez tikan ji te dikim ku tu jî qet behsa tişteki wisa ji min re nekî. Lewre hetanî dawiya emrê xwe jî ez ê qet nezewicim. Ji ber dizanim bê çi bi serê kesê ku dizewice tê. Ji ber mekr û bêbextî û xapên jinan ên ku naqedin. Helbestkarek dibêje:

Lew ku ew angaş bikin ku keçin xama ne
Paqij in ew ferxên xezalên deşt û çiya ne
Bawer neke ji wan biracan tu ye nêçîra wan
Lew ku ew raza şevêkê bi te re parve bikin
Rojê dîtirkê wê di himbêza yekî din de bin
Mîna xana ku tu şevêkê lê peya bibe
Û şeva li dû wê yekî din mêvanê wê be

Û yekî din jî hîn xweştir gotiye:

Ê ku bikeve nav lepên qehpikan mirî ne
Lew ku kedê bide jî felat ji wî re nîne
Ger ku ava bike sûr û keleşan li dora xwe
Xelasî nîne bêbexte jin li himber zilamê xwe

Gava ku Melîk Şehrîman ev gotinên kurê xwe bihistin, têgihişt û her tişt fêm kir. Nema xwest tiştêkî li gotina xwe ya berê zêde bike. Lewre pir jî kurê xwe hez dikir û nedixwest dilê wî bihêle, an jî wî aciz bike. Loma ew rûniştin bi dawî kir, herkes belav kir û piştî gazî wezîrê xwe kir û ji wî tenê re got...

Dîsa bû şeveq û Şehrezadê gotina xwe bi şekir birrî, bêdeng bû.

ŞEVA 176'EMÎN

Şehrezadê berdewam kir û got:

Melîk Şehrîman devê xwe bir ber guhê wezîrê xwe û jê re got: “Kanî tu bibêje wezîr can, ez çi bikim divê mijara kurê xwe Heyva Zeman de? Te ji min re got wî bizewicîne, beriya ku tu wî li şûna xwe bikî sultan û min jî biya te kir, ez pê re axivîm ji bo ku bizewice. Lê wî bi ya min nekir û got ez qet nazewicim. De ka bêje bê êdî niha divê ez çi bikim?” Wezîrê wî got: “Sultanê min ê bextewar, bi ya min be ez dibêjim kanî saleke din jî xwe ragire. Piştî salekê gava ku tu pê re axivî jî, bi tenê pê re neaxive. Di rojeke ku te hemû serkirde û wezîrên xwe li hev kom kirine û li pêşiya herkesî jê re behsa zewaca wî û daxwaza xwe bike. Bila hemû serleşker, emîr, wezîr, gîzîr, dergevan û xizmetkar vê daxwaza te bibihîzin di huzûra wî de. Wê gavê wê ew bikeve ber fediye û wê nikaribe daxwaza te red bike.”

Gava ku Şehrîman ev gotin ji devê wezîrê xwe bihistin, dilşad bû û bêhna wî pir fireh bû. Lewre ew fikra wezîrê xwe pir rast û aqilane dît. Bawer kir ku bi wê rêbazê dê encamêkê bigire. Loma xelatek da wezîrê xwe li ser vê yekê û pir qedr û qîymetê wî girt.

Melîk Şehrîman, xwe saleke din jî ragirt. Di wê navberê de Heyva Zeman ji her hêlê ve xweşiktir û kamiltir bû. Êdî temenê wî dihate bîst salan û ew jî gihîştîtir bû û kêmanî di şewq û şemala wî de neman. Hinarkên rûyê wî sor bûbûn, eniya wî dibiriqand di nava çarçoveya wî porê wî yê reş de.

Tew ew newqa wî ya zirav û kulîmekên wî yên giran, dihişt ku bulbul jî li ser bistirên û spehîbûnên wî binin ziman, çawa ku helbestkarekî jî di derbarê wî de gotibû:

Sondê dixwim bi herdu lêv û herdu rûçikan

Bi wan tîrên ku tûj têne dil û hinavan
 Bi wan hestên agirîn ên tenik û kûbar
 Bi wê enîya heyveron û wî reşporê xembar
 Û ew cênîkên zirav ên di ber de li dar
 Ew e yê ku kêr dike dilê aşîq bi lêvên dilar
 Û ew gulên meyandî li ser rûçikan mîna efsûn
 Ew kenê neqîşandî li ser lêvan dike meftûn
 Bêhna ku jê difûre gulîn e ew weke beybûn
 Ew e cewher ew e ember her ew e sorxwîn
 Rastgo ye camêrekî di timtêla Hatim de ji dil
 Bi qedr û qîmet e ew ji çavên xwe de bi kil
 Hêdî dihat roj li pey wî bi wê şewqa xwe
 Heyvê jî her ji wî digirt wê ew navê xwe

Melîk Şehrîman bi zor û heft beleyan salekê xwe ragirt, hetanî demsa-
 leke havînî nû hat. Êdî mîna her sal dê Şehrîman hemû endamên desthilat-
 dariya xwe ji wezîr û mîr û gizîr û serleşker û parêzgeran kom bikira, ji bo
 ku biryarên salane bide, di derbarê gelek mijaran de...

Li Şehrezadê bû sibeh, wê ji navber da vegotina çîroka xwe û bêdeng bû.

ŞEVA 177'EMÎN

Şehrezadê vegotina çîroka xwe berdewan kir û got:

Vêca padişahê dewr û zeman, şahînahê min î bextewar, weke min
 şeva borî jî got; gava Şehrîmanê Sultan hemû erkanên dewleta xwe komî
 ser hev kirin, qasîdê xwe şand dûv kurê xwe da ku ew jî were, amade bibe.
 Gava Heyva Zemanî hat, bejna xwe li ber bavê xwe tewand, erda ber lingên
 wî sê caran maçî kir û li raberî bavê xwe rawestiya, li bendî fermana wî
 ma. Bavê wî jê re got: “Kurê min! Vê carê di huzura hemû wezîr û gizîr û
 emîr û leşkeran de min tu vexwendî vê derê kir ji bo ku tu bi ya min biki
 û li himber gotina min dernekevî. Ez dixwazim ku tu bi keça şahekî re bi-
 zewice beriya ku tiştek bi serê min de bê, da ku ez jî dilşa û kêfxweş bibim
 bi zewaca te.

Gava Heyva Zeman ev gotina bavê xwe bihîst, serê xwe berra ber
 xwe da û bi qasî katejimarekê bêdeng ma, ponijî. Wê kêliyê dînîtiya wî ya
 cîwantiyê dişa lê vegeriya, serê wî germ bû û bi hêrs axivî. Ji bavê xwe re
 got: “Ez bimirim jî ez nazewicim bavocan! Jixwe berê jî du caran te ji min
 pirsibû û min heman bersiv dabû te. Lê wisa xwiya dike ku tu mirovekî
 kêmaqil î, an jî yexçarekî xurifî yî ku tu vê pîrsa xwe dubare diki!” Pê re
 jî berbejnên nav milên xwe vekirin û zêndikên xwe lê qulaptin di huzûra
 bavê xwe de, mîna ku meydanê jê re bixwîne. Bavê wî fedî kir ji ber vê liv û

tevgera wî, lewre ev tişt li himberî hemû erkanên dewletê pêk hatibû û erza wî hatibû şikandin. Piştî hêrs bû, qeherî û pozbilindiya sultan ew girt, qirek da û bi kurê xwe de xeyidî ew tirsand. Piştî bi ser mîr û wezîran de jî qîriya û ferman da ji bo kurê wê bigirin û wî derdest bikin. Wan jî di cîh de ew girtin, derdest kirin û anîn pêşîya bavê wî. Heyva Zeman sertewandî, di nava şermeke mezin de bû. Dilê wî, tijî tirs û xof bûbû û xwêdanê di eniya wî ya spî re davet, nema dizanibû wê çi bike, çawa bike.

Bavê wî sixêf jê re dan, bi ser de rabû û jê re got: “Bêjî kurê bêjiyan, kê ev terbiye daye te ku di nava van leşker û mîr û wezîran de, tu bersiveke wisa didî min? Wisa xuya dike ku hetanî niha kesî tu terbiye nedaye te. Hayê te qet jê nîne ku heger yekî din li şûna te ev bersiv bida min, dê çi bihata serê wî.”

Piştî Melîk Şehrîman, ferman da leşkerên xwe û ji wan re got: “Dest û nigên vî serserî girê bidin û wî bavêjin odeyeke ji odêyan birceke kelehê!”

Leşkeran di cîh de fermana sultan kirin meriyetê, dest û nigên Heyva Zeman girêdan û ew birin bircekê ji bircên kelehê. Di heman demê de, xizmetkar û bermalîyan jî rahiştin melkes û bêrikên xwe; çûn odeyek ji odeyan wê bircê paqij kirin, şûştin, zuha kirin û doşekêk tê de raxistin, lihêf û balîfêk jî danîn ser û mûm û fanosek jî li rex wê danîn, lewre ode bi rojê jî tarî bû. Heyva Zeman xistin wê odeyê û deriyê wê girtin, nobedarek li ber danîn.

Heyva Zeman, xemgîn û dîlşikestî li ser doşeka xwe rûnişt û lome ji xwe kirin ji ber ku bi ya bavê xwe nekiribû. Pir poşman bûbû, di demeke ku êdî sûda poşmaniyê nemabû. Di dilê xwe de ji xwe re digot: “Xwedê mala keç û jinên xayîn û bêbext xera bike ku ez xistim vê rexşê de. Xwezî min bi ya bavê xwe bikira û ez bizewiciyama, dê çêtir bûya ji vê rewşa ez ketimêyê!”

Em Heyva Zeman di wê rewşê de bihêlin û em vegerin ser bavê wî. Bavê wî jî wê rojê hetanî êvarê li ser text ma, kar û barên dewletê birêve bir. Gava bû êvar jî, meclisa xwe belav kir û ew û wezîrê xwe bi tenê man. Gava bi tenê man, sultan ji wezîrê xwe re got: “Sebeba ev tiştê ku îro qewimî tu bû. Te hişt ku ev şer di navbera min û kurê min de derkeve bi wan şîretên te. Îcar madem bi wan şîretên te em hatin vê radeyê, ka tu ji min re bibêje bê ez çi bikim?”

Wezîr ji Melîk Şehrîman re got: “Bila kurê te di wê zindanê de be hetanî panzde rojan, piştî gazî wî bike, bila wi bînin huzura te û vê carê jê bixwaze ku bizewice. Ez vê carê qet texmîn nakim ku bi ya te neke! Misoger dê bi ya te bike û qebûl bike ku bizewice.”

Li Şehrezadê bû sibeh, wê jî navber da vegotina xwe û bêdeng bû.

ŞEVA 178'EMÎN

Şehrezadê berdewam kir:

Melik Şehrîman dîsa bi ya wezîrê xwe kir. Dilê wî bi ser kurê wî ve bû û dil ji layê xwe tunebû ku wî di wê zindana tarî de bigire, lê fikara wezîrê xwe maqûl dît û ket nav livînê xwe, ji bo rakeve. Lê dilê wî bi kul bû û çavên wî nediçûn ser hev. Lewre elimîbû ku her şev destê xwe bixe bin serê Heyva Zeman û wisa rakeve. Kurê wî yek bi tenê bû û pir jê hez dikir. Mîna ku kurm ketibin canê wî de, hetanî sibehê di nav livîna xwe de çû û hat, mîna ku li ser agir raketibe. Taswas ketibûn dilê wî de û xew lê herimîbû, bênavber hêsir ji çavan dihatin xwarê. Wî jî ji xwe re digot:

Şev li min dirêj bû îro, xew li min herrimîye!

Dil bi veqetînê hatiye sotin gelo ew li ku ye?

Kul û derdan jî şev li min dirêjtir kiriye!

Vêca roj li ku ma, kanî şewqa sibahê li ku ye?

Melik Şehrîman di wê rewşa zor de bû, îcar em vegerin ser Heyva Zeman ê ku şeva xwe ya ewilî di zindanê de derbas dikir. Çawa ku şev hat, nobedar mûmek di mûmdankê de bi cih kir, pêxist û da Heyva Zeman. Piştî çû fanosek û hinek xwarin jî anî da wî.

Heyva Zeman, bêdil hinek xwarin xwar û avek bi ser de vexwar. Lê di ber wî de nediçû ji ber wê derûniya poşmaniyê ku li ser wî peyde bûbû. Her ku ew bêdebiya li himberî bavê xwe kiribû dihate bîra wî, dilê wî têşiya, tengav dibû, lome ji xwe dikirin û digot: “Qey tu nizanî ku insan berpirsiyarê gotina xwe ye, çi tê serê mirov, ji ber zimanê mirov e!” Û bi wî hawî lome ji xwe kirin, hetanî ku hêsiyan di çavên wî re avêtin û agir bi dilê wî yê perpitî ket. Pir pir poşmam bûbû li ser wan gotinên ku ji bavê xwe re kiribûn. Giriya û di ber xwe de got:

Ciwanê ku têknaçe li himberî mêr û mêrxasan

Serûbin dibe li himberî kelema zimanê xwe

Serkeftî ye bêtirs e ew li himberî neyaran

Bi xwe re jî naçe serî her qels e ew ji ber ziman

Piştî demekê, Heyva Zeman misîne avê ji nobedar xwest û rabû ser xwe, dest û nigên xwe şûstin, destnimêja xwe girt, nimêja êvarê û ya ‘eşayê li dû hev kirin û dîsa rûnişt kete nava hizr û fikaran...

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî vegotina çîroka xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVE 179'EMÎN

Şehrezadê berdewam kir:

Piştî demekê, Heyva Zeman xwe ji wan fikaran rizgar kir û rahişt Qur'anê da ku pirtuka pîroz bixwine. Di serî de sûretê El-Beqera û Al-Uran xwend. Piştîre Yasîn, Er-rahman û Tebarek xwend. Herî dawî jî dua kirin, îstîxfara xwe anî, alikarî ji Xwedayê xwe xwest û xwe dirêj kir lir ser nivînê xwe ya ku biperîyên neamê hatibû dagirtin. Berîya ku rakeve jî, kincên xwe ji xwe kiribûn û bi tena kirasekî ji hevrêşim mabû. Ji ber ku kumekî şînik jî xistibû serê xwe de, rûyê wî tam mîna heyva li çardehan xwiya dikir di nava tarîtiya wê zindanê de.

Heyva Zeman, fanos dabû biniya nigên xwe û mûmek jî danibû hinda serê xwe û wisa di xew re çûbû.

Vêca ew birca ku zindana Heyva Zeman tê de bû, pir kevnar û xalî bû; bi salan bû kes neketibûyê. Bîreke Romanî jî di bînê wê bircê de hebû, jineke cînnî tê de bi cih bûbû. Ew jin ji tuxmê îblîs bû û navê wê Meymûne keça Demiryat bû ku ew bi xwe jî Melikeke bi nav û deng bû ji melikên cînnîyan. Îcar nivê şevê û di dema ku Heyva Zeman raketî bû, Meymûnê ya efrît ji wê bîra Romanî derket û bi bircê ve hilkişiya, ji bo der û dorê guhdar bike bê ka pêjina kesî tê an na. Gava ku berjor ket, çavên wê li şewqa odeya Heyva Zeman ket û tê derxist ku tişteki nû qewimîye li derdorê. Lewre tu-carî şewqên wisa li wir nedîtibûn. Di dilê xwe de ji xwe re got: “Ev cara ewil e ez tişteki wisa li vir dibinim û ne gengaz e sebeba vê yekê nebe! Misoger sebebek wê heye!”

Piştîre berê xwe da wê şewqê, dît ku ji wê odeyê tê. Berê xwe da wê odeyê, çû, dît ku nobedar li ber derî raketiye. Ew derbas kir û çû hundurê odeyê, dît ku nivînek li erdê raxistî ye û xortek jî li ser dirêjkirî ye, çawa ku raketî be. Fanosek pêketî li ber nigên wî bû, mûmek jî li ber serê wî bû. Meymûne şaş û metal bû li himber wê dîmenê, xwe nêzîkî wî kir, baskên xwe danîn û li ber nivîna wî rawestiya, têra xwe lê meyzand û ser rûyê wî vekir da ku xweştir wî bibîne. Şaşwaziya wê kûrtir bû li himber spehîbûna wî.

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî vegotina çîroka xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 180'YEMÎN

Şehrezadê berdewam kir û got:

Çawa ku Meymûneya cînnî ew xweşîkbûna Heyva Zeman dît û bi qasî seetekê li wê nûra dêma wî meyzand, xwe yekcarî wenda kir! Nema dikaribû awirên xwe ji wan hinarkên wî yên sorik û ew eniya wî ya rindik veqetanda. Tew ew bêhna wî ya ku ji ya miskê jî xweştir, ew mest û gêj kiribû, çawa ku helbestkarekî jî gotiye:

Gava min ew ramûsa, xweşiktir bû hinarkên di rû de
Biriqîn reşikên çavan di nava wan mijangan de
Ey dilşadê dil, heye gelo dildarekî din di vir de
Ku ewqasî xweşik û spehî be di vê dinyê de

Li himberî wê dûmena efsûnî, nefes li Meymûne qut bû, ji ços û kelecane. Di ber xwe de got: “Subhan ji wî re ku tu afirandiyê!” Lewre Meymûne ji cinnek bawermend bû. Loma bêhtirî seetekê li rûyê Heyva Zeman meyzand û yekîtiya Xwedayê xwe anî bira xwe û heyran goriya xwe li himberî afirîneriya wî anî ziman. Piştî di dilê xwe de got: “Bi navê Xwedê ez tu zerarê nadim vî ciwanî û ez nahêlim ku tukesî din ji zerarê bide wî! Ez ê wî biparêzim ji hemû xerabîyan, lewre ev rûçikê rahmanî layiqî hemû qencîyan e. Ji xwe mirov dil jê tune ku lê binêre. Lê belê yekî weha, çawa li nava xirbeyekî wisa pîs hatiye jibîrkirin? Çawa dê û bavê wî ew li vir jibîrkirine û lê nagerin? Berî min, yekî din ji tayfeya me lê rast bihata, dê ew bikuşt!”

Piştî Meymûne xwe bi ser de tewand, ew maçî kir ji naw çawên wî û dişa rûpoşa wî bi ser çavên wî de kişand û baskên xwe vekirin, ber bi azmanan ve firiya, çû û çû hetanî giha azmanê heftan. Li wê derê pêjina firrîna baskberekî din kir. Berê xwe da cihê ku deng jê dihat, dît ku efrîteki cinnî ye ku jê re dibêjin Dehneş. Mîna başokeyekî bi ser de girt, ew derdest kir. Gava Dehneş dît ku ya ew girtiye Meymûneya keça mîrê cinnîyan Demiryat e, lerizî û pir tirsîya. Xwe avêt bextê wê û jê re got: “Tu bi qedr û qîmetê wî Xwedayê gewre û ew neqşa pîroz a li ser hungulîska Nebî Suleyman bikî, li min were rehmê û zerarê nede min!”

Gava ku Meymûne ew gotin ji devê Dehneş bihîstin, dilê wê bi wî şewitî, lê zivirî û jê re got: “Te ez xistim bin barê sondeke mezin de, ey melûn! Lê belê dişa ji ez te bernadim hetanî tu ji min re nebêji bê tu ji ku tê, di vê seeta derengî şevê de.” Dehneş lê vegerand û got: “Wele xatûna min, ez ji dawîya welatê Çînê tîm û ji hundurê welatê Cezayîrê. Ez ê ji te re bibêjim bê min kîjan tiştê erjeng ditiye, vê şevê. Heger te ji min bawer kir, jixwe tu yê min berdî, da ku ez bi rêya xwe de herim. Jixwe divê tu bi xeta destê xwe ji min re binivîsinî ku ez girtiye te bûme, ji bo kesî din ji wî mîletê cinan rêya min nebire; ne ji cinên jorîn ne ji yên jêrîn.”

Meymûnê lê vegerand û got: “Dehneş! Naxwe ka ji min re bibêje bê ka te çî ditiye, vê şeva han? Rast bibêje û hewl nede ku tu bi derewan xwe ji nav lepên min rizgar bikî! Ez sond dixwim bi wê neqşa pîroz li ser hungulîska Nebî Suleyman ê kurê Dawîd –silavên Xwedê li ser wan bin- heger gotina te ne rast be, bi destê xwe ez ê periyên te yeko yeko rakim û bi ber bê de berdim û hestiyên te bişikînim.” Dehneşê kurê Şemhorş ê firok got: “Heger gotina min ne rast be, tu çî bi min dikî, tu dizanî xatûna min!”

Li Şehrezadê bû sibeh, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 181'EMÎN

Şehrezadê berdewam kir:

Dehneş got: “A rastî, ez îşev ji dereke dûr tîm; ji qiraxên welatê Çînê, ji cihê ku sultanê gewre, xwediyê girav û derya û heft qonaxan Şah Xeyûr lê hukum dike. Keçeke wî şahî heye ku di seranserê cihanê de keçeke mîna wê spehî nîne. Ez nizanim bê ez ê çawa wesfê wê ji te re bidim û binim ziman. Dîsa jî bi qasî ku ez karibim û bi qasî ku zimanê min tîrê bikêyê, ez ê hinekî wesfê wê ji te re bibêjim. Porê wê mîna şevên hicranê ye, rûyê wê jî mîna rojên wîsalê ye. Çawa ku helbestkarekî jî di derbarê wê de gotiye:

Her sê biskên wê dibûne çar bi reşahiya şevê re

Heyv jî li asîmanan dibûne dudu bi hatina wê re

Dehneş wesîfdana keça Şah Xeyûr berdewam kir û got: “Îcar Meymûnê Xan, pozekî wê heye mîna şûr dibiriqîne û herdu rûçikên wê mîna kapika erxwanan e. Hinarkên wê mîna gulên nîsanê, lêvên wê jî mîna mercan û morîyan e. Tehma lêvên wê mîna meya ku tîna cêja wê êşa şewatê dişikîne. Zimanekî şêrin li ser e ku di cîh de bersiva rasteqîn dide hemû pirsên ku arasteyî wê dibin. Tew sêngê li ser zalime heye ku Xwedê bibe alîkarê ew kesê ku wê bibîne û aqilê xwe wenda neke! Du heb mil jî bi wê sêngê ve girêdayî ne ku Xwedê mirov bistirîne ji wan, çawa helbestkarekî jî gotiye:

Herdu zend ger nehatana pêçan bi bazinan

Mîna du çeman dê biherikîyana nav zendikan

Tew sîngê li ser e, mîna acê ye, şewq ji ser dîtayîse bi ser herdu heyvan de. Newqa wê jî mîna ya Qiptîyan e; zirav zirav ditewe û bi ser du kulîmekên grover de dadikeve ku mîna du girikan; bi rabûna wê re radibin û bi rûniştina wê re rûdinên; çawa ku helbestkar jî gotiye:

Tebekek li ser wê ye bêje ya sitar!

Pîştî newqa zirav kulîmekên wê ne li dar

Çi gava ku tê de difikirim ez tîme sotin

Çi gava ku navê wê hildidim tîme girtin

Vêca di biniya wan kulîmekan de, du hêt hene ku mîna du stûnên mermerî ne. De êdî tiştên mayîn jî ez nema dikarim wesfê wan bidim, lewre ew nigên wê yên hûrikî lihevhatî tenê, lê hejayî bi seetan mirov pesnê wan bide. Lê şaşwaziya min a mezin jî ew bû ku ew nigên hûrik çawa di karîbû ew beden rabikirna!”

Li Şehrezadê bû sibeh, wê jî vegotina çîroka xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 182'YEMÎN

Şehrezadê vegotina çîroka xwe jî Şehreyar re berdeyam kir:

Vêca Şahînşahê min ê bextewar, Dehneş kurê Şemhorş ê cinî, vegotina rêwitiya xwe ya şevê ji Meymûnê ya cinî re berdeyam kir û got:

Îcar tiştê mayî ji spehîbûna wê keçikê, nayê wesifdan. Bavê wê jî gew-retirîn şahê Farisan e, ê ku şev û roj derya û welat û war derbas dikirin bêyî ku ji mirinê bitirse, an jî ji tu hêzdarên din. Lewre ew mêr û zalemekî hêzdar e ku tirs çiyê nas nake; xwediyê artêşan e, xwediyê war û girav û welatan e, xwediyê mal û mulk û qonaxên bê hed û hesab e. Şah Xeyûr, xwediyê deryayan, xwediyê heft konaxan e.

Îcar vî sultanî ji vê keça xwe pir hez dikir. Ji ber vê hezkirina xwe jî, malê heft mîr û emîr û heft welatan kom kiribû û bi wî malî heft qonax ji keça xwe re lêkiribûn ku her qonaxek ji tiştêkî cuda hatibû avakirin: Qonaxa yekê ji qizêzê (camê) hatibû avakirin, ya duduyan ji mermer, ya sisîyan ji hesin ê çînî, ya çaran ji qurmê daran û zilan, ya pêncan ji zîv, ya şeşan ji zêr û ya heftan ji cewheran bû. Her heft qonax jî bi hemû teşeyên ber û mers û sicadeyên qedirbûha hatibûn raxistin, firaxên xwarin û vexwarinê ên ku di wan de bi cih kiribûn jî, hemû ji zêr û zîv û madenên giranbûha bûn û li gora pêdiviya şah û melîkan hatibûn amadekirin. Îcar vî sultanî, ji vê keça xwe xwestibû ku her salê, carekê, qesra xwe biguherine û derbasî qesra din bibe. Keça wî ya ku bi navê Melîke Bidûr dihate nasîn jî, bi ya bavê xwe kir û her saleke xwe, di qesrekê de derbas dikir.

Îcar gava navûdengê spehîbûna Bidûr Xanê di nava welat û dinyayê belav bû, melîkên gelek weletan qasidên xwe şandin cem bavê wê, da ku wê ji xwe re bixwazin. Lê belê, wê qet nedixwest bizewice û her car heman bersiv dida bavê xwe, jê re digot: “Bavocan! Qet nêta min tuneye ku ez bizewicim. Lewre ez niha melîke me û ez desthilatdariyê li ser xelkê dikim, ez naxwazim bibim jina zilamekî ku ew desthilatdariyê li ser serê min bike.” Lê belê wê çiqasî zewac red dikir, xwazgênîyên wê pirtir dibûn. Herî dawî, hemû melîkên Cezayira Çîna navîn, gelek diyarî, antîke û tiştên giranbûha ji bavê wê re şandin û daxwazên xwe jê re nîvîsandin ku ew dixwazin bi keça wî Bidûr Xanê re bizewicin. Wî jî dîsa her car daxwazên wan melîkan ji keça xwe re got, lê belê wê jî mîna her car ew daxwaz red kirin û xwe ji bavê xwe qeherand, jê re got: “Bavocan, heger careke din tu behsa zewacê ji min re bikî, ez ê şûrekî bigirim destê xwe, qebzeya wî bixim erdê û serê wî bixim nava xwe de û xwe bi ser de berdim hetanî ku di pişta min re bide der!” Gava bavê wê ev gotin ji devê wê bihistin, nûr di çavên wî de nema, rûyê wî tarî bû û agir bi dil û hînavên wî ket. Tirsiya ku keça wî xwe bikuje û ma heyirî, nema dizanibû wê çawa tevbigere, çi bike, çi neke! Herî dawî çû ji

keça xwe re got: “Madem tu naxwazî bizewicî, wê çaxê ji mal dernekeve, ji bo ku tukes te nebîne. Êdî ji îro û pê de li gora vê fermana min tevbigere!” Piştî ew xist hundur de û derî li ser girt. Deh heb pîrejinên xizmetkar jî li cem wê bi cih kirin, ji bo ku jê re xizmetê bikin. Çûna her heft qonaxan jî, lê qedexa kir û hewl da ku qehr û xeyda xwe jê re bide diyarkirin. Piştî jî hemû xwazgînîyên wê yên şah û melîk re nivîsand û got ku keça wî hişê xwe wenda kiriye, dîn bûye û ev saleke wê ye ku tenê dimîne di bin çavdêriyê de.

Dehneş, vegotina rêwitiya xwe ji Meymûne re berdewam kir û got: Îcar ez jî her şev diçim serdana wê. Çawa ku di xew de diçe, ez diçim ser nivîna wê û ez têra xwe li wî rûyê wê yê nûranî dinêrim û wê radimûsim. Helbet ez tu zirarê nadim wê bi vê hezkirina xwe. Çawa ku min ji te re got, xweşikbûn di ser a wê re nîne û mirov dil jê tune lê binêre. Loma ez dixwazim ku tu bi min re werî da ku em herin cem wê û tu bi çavên serê xwe vê rastiye bibînî. De êdî biryar a te ye.

Piştî Dehneş serê xwe berra ber xwe da, baskên xwe danîn û li bendî bersiva Meymûneyê ma.

Meymûne, bi wan gotinên Dehneş kenîya û tif kir ser çavên wî, jê re got: “Ev keçîk kî ye ku tu wisa behsa wê dikî? Ev keçî incex jineke ji rêzê ye, li himberî evîndarê min! Bi hersê navê Xwedê, kesê ku wî di xew de jî bibîne, dê şaş û matmayî bimîne li himberî spehîbûna wî û dê ji ser hişê xwe biçê.”

Gava Dehneş ew gotinên Meymûneyê bihîstin, got: “Ev xortê tu behsa wî dikî kî ye û xwediyê spehîbûneke çawa ye?” Meymûne got: “Çîroka vî ciwanî ya malbatî, pir dişibe ew çîroka hezkiriya te Bidûr Xan a ku te behsa wê kir. Lewre ev evîndarê min jî, gelek carî bavê wî doza zewacê lê kiriye, lê ew red dike. Herî dawî bavê wî pir jê diqehere, lê tê xezebê û derdest dike wî davêje odeyeke wê birca kevnar a ku ez tê de dimînim. Ez jî îşev gava ez çûm şûna xwe min ew dît.”

Dehneş ji Meymûneyê re got: “Xatûna min, naxwe kanî vî ciwanî nîşanî min bide da ku ez bibînim bê ka ew xweşik e an evîndara min. Lê ez texmîn nakim tukes li ser rûyê ve dinyayê mîna evîndara min Bidûr Xanê xweşik hebe!”

Li himberî vê gotina Dehneş Meymûne pir hêrs bû û got: “Tu derewam dikî ey şeytanê bêyom û rezil! Lewre ez baş dizanim ku tukes mîna evîndarê min spehî nîne!”

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî vegotina çîroka xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 183'EMÎN

Şehrezadê berdewam kir:

Meymûne axaftina xwe berdewam kir û ji Dehneş re got: “Ez baş dizanim ku tu kes mîna evîndarê min Heyva Zeman xweşik nîne li ser rûyê vê erdê, îcar çawa tu cesaret dikî ku tu wê evîndara xwe ya ji rêzê bide ber hev?” Dehneş lê vegerand û got: “Xatûna min, tu bi qedrê Xwedê kî ka were em herin li evîndara min binêrin û piştê werin li yê te ji binêrin û em bibinin bê kî ji yê din xweşîktir e!” Meymûne got: “Bêgûman em mecbûr in wisa bikin melûno! Lê ji ber ez dizanim bê tu şeytanekî çiqasî melûn û xwedî dek û dolabî, divê destpêkê em bi hev re bikevin şertekî. Heger ê min ji ya te xweşîktir be, tu dê şertê min pêk binî û heger a te ji yê min xweşîktir be, ez ê şertê te pêk bînim.” Dehneş di cih de got: “Min şertê te qebûl kir, de ka rabe destpêkê em herin diyarê bavê wê Şah Xeyûr!” Meymûne got: “Cihê evîndarê min ji cihê yê te nêzîktir e, hema va ye di biniya me re ye. Ka destpêkê bi min re were em biçin ê min bibînin, piştê em ê biçin û ê te ji bibinin!” Dehneş got: “Ser seran, ser çawan, bila weke te be!”

Herduyan bi hev re, xwe berjêr kir û daketin eywana burcê. Ji wir jî derbasî odeya Heyva Zeman bûn, çûn li ber nivîna wî sekinîn. Meymûne, xwe bi ser de tewand û bi hêdika perdeya ser rûyê wî rakir, da alî. Çawa ku perde ji ser rûyê kurê Şehrîman hate rakirin, şewqa rûyê wî da derdorê û şeva tarî ronî kir bi nûra xwe. Meymûne li Dehneş zivirî û jê re got: “De êdî baş lê binêrê kurmîyo û hîleyan meke. Lewre em qismê keçikan, em giş nexweş ketine bi eşqa vê spehîbûna wî!”

Dehneş xwe bi ser de xûz kir û bi qasî seetekê li rûyê wî yê nûranî te-maşe kir, bêtî ku yek gotinê tenê bibêje. Jixwe bixwesta jî nikaribû bigota, lewre zimanê wî nedigerya û devê wî ketibû hev de ji matmayînê. Piştê serê xwe rakir û ji Meymûneyê re got: “Wele xatûna min, tu ji mafdar î. Lê belê ji bîr neke ku derûniya jin û meran ji hev cuda ye û lîenêrîna wan a li spehîbûnê jî li gora wê têtê guhertin. Lê bi hersê navê Xwedê ev evîndarê te, ji herkesî bêhtir dişibe evîndara min, di husn û cemala xwe de, di rûşêrînî û rûspehîbûna xwe de. Mirov dibê qey herdu ji hêkekê derketine!”

Dema Meymûne ev gotin ji Dehneş bihistin, ronî di çavên wê de nema, agir di devê wê re avêt. Bi baskê xwe şeqamek li ser çavên wî da, hindik mabû ku dawîya wî bîne. Piştê got: “Qesem bi serê wî be ez ê vê ji te re nehêlim! De kanî zû rabe ey melûnê bêbext û here di cih de wê evîndara xwe bîne vir, da ku di xew de, em herduyan bidin ber hev û em bibinin bê kîjan ji wan, ji yê din xweşîktir e! Vêca heger tu bi ya min nekî û zû neçî wî neynî vir, baş bizanibe ku ez ê te bişewitînim bi agirê xwe! Ez ê te parî parî bikim û bavêjim nav sergoyê razên xwe û ez ê bihêlim ku tu bibî îbret

ji herkesî re!”

Dehneş lê vegerand û got: “Bila be xatûna min!” Û di cîh de baskên xwe vekirin û bi hewa ket. Meymûne jî li dû çû, ji bo çavdêriya wî bike û wî biparêze. Bi qasî katjimêrekê ji ber çavan wenda bûn, piştê xuya kirin û bi şûn de vegeyan bi wê keçika han. Kirasekî şîncevzî li ser bû ku bi du heb şerîten zêr hatibû neqîşandin û ev herdû rist jî li ser hatibûn nivîsandin: “Sê tiştan keçik berbend kiriye ji serdana min! Tirsê ji reqîban, xofa ji zikreşan û ew şewqa enîyê li gel bêhna ebîr a ku jê difûre!”

Keçik daxistin cem Heyva Zeman û bi wî halê wê li kêleka wî dirêj kirin...

Li Şehrezadê bû sibe, ew jî bêdeng bû.

ŞEVA 184'EMÎN

Şehrezadê berdewam kir:

Meymûne li ber serê herduyan rûnişt û perdeya ser rûyê wan da alî, pe re jî rûyên herduyan şewq da, mîna du heyvan! Herdu jî ewqasî dişibîyan hevdu ku mirov digot qey cewî ne û ji zikê heman dayikê derketine! Spehîbûna wan jî ewqasî dijwar bû ku di rastîyê de beleya serê herkesî bûn, çawa ku helbestkar jî gotiye:

Ey dil nebe evîndarê şêrîneke ewqas delalî
Da ku tucaran tu jî qet nebî sertewandî
Lewre her dem pir in daxwazkarên xwînşêrînan
Hinek herin jî misoger gelek din tên li pey wan

Dehneş û Meymûne, bêhnçikîyayî li wan herdu rûheyvan temaşê kirin bi bêdengî, hetanî ku bêhna wan hate ber wan. Wê gavê Dehneş axivî û got: “Dildara min ji dildara te spehîtir e!” Meymûne lê vegerand û got: “Ê min ji ya te spehîtir e! Ka hela baş binêre Dehneş, qey tu kor bûyî tu vê rastîyê nabinî malxerabo? Ev rûheyvê bêtîmtêl, ev bejinziravê ku dil disojîne û ev ciwaniya bêsinor çawa nayê dîtin? Heger tu bawer nekî, hela guhdar bike û bibihîze bê min helbesteke çawa nivîsandiye di derbarê aşiqê xwe de. “Meymûne, Heyva Zeman çend caran li ser hev ramûsand û di pey re jî dest bi helbesta xwe kir, got:

Destê min li te nagere dil ji te nayê binêrim
Li wî rûyê te yî spehî û şêrî mîna xewnekê
Gotin jî giran tên dema ku guhdar rûferîşte be
Awir jî mîna risasê bi teql in dema rû yê te be
Giraniya evîna te rahişte min ez birim çiyê
Mixabin nikarim rakim ez vê rûpoşê ji ber wê

Li gel te ye dilê min her dem pir bi ciwanî
 Lewre bêrikirin adeta min e tu jî her nava dilî
 Dil û armanc yeke cano tu jî êdî aram be
 Bejinzirav û newqzirav her ên hev in bêxem be
 Gelo xwe bisitirînim ez ji pêla eşqa te rûheyv
 Ê ku sepehîbûna xwe bi deyn daye Yûsiv
 Ê ku belavkarê eşq û evînê ye roj û şev
 Ka bibêje min ey hosteyê dilan çi bûye îşev
 Di vî bistanê cemalê de çi qiwimiye îşev
 Çima hişke wisa ev dil îro li himber min gelo
 Helbet dê ew jî fêrî nermîyê bibe rojekê ro
 Tu yî yê ku dilê hesinî fêrî hestistanan dikî
 Tu yî yê ku min ewqasî diltenik û nazik dikî
 Di cemalê de rikebir ji te re nîne mîrê min
 Tenê bi awiran her tu desthilatdarî li ser min
 Carinan jî her tu yî xizmetkarê dil li ba min
 Derewan dikin ew ên dibên cemal a Yûsiv e
 Çendîn Yûsiv hene di xweşikbûna te de
 Cinnî me cin ditirsîn ji min dema rastî te tîm
 Dilê min jî her bi lerz e çi gava rastî te tîm
 Pir biçûk dibim ez li raserî wê heybeta te
 Lewma di rêyan de me herdem da bigihême te
 Ew coteçavên reşbelek li gel rûgeşîya berdêr

Îcar heger tu jî evîndarekî ji dil bî, divê tu jî helbesteke wisa bixwînî li ser evîndara xwe!”

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî dengê xwe birrî.

ŞEVA 185'EMÎN

Şehrezadê vegotina çîroka xwe berdewam kir ji sultanê gewre Şehreyar re:

Gava Dehneş ew helbest ji devê Meymûne bihîst, bi wî zimanê tenik û dilînî, pir hestiyar bû. Mest bû ji dilê xwe û li wê helwesta Meymûneyê şaş û metal ma! Piştî li Meymûne zivirî û jê re got: “Te ev helbesta tenik li ser dildarê xwe got. Ez ê jî hewl bidim li ser evîndara xwe helbestekê bibêjim, lê li gora xwe!” Dûvre çû cem evîndara xwe Bidûr a paldayî û ji nav çavan ew maçî kir, piştî got:

Serxweş ketim ez bi meya eşqa cananê
 Hûr bariyan hêsir ji çavan li ber stranê
 Hewl didim ez bextewer bibim bi wîsalê

Lewre mafê min e dilxweşiya bi rûyê sîmalê
Lê çima gazincan dikim gelo ji her sê cihan
Ji awirên mêrkuj, bejna zirav û herdu lêvan
Wê ji her digot ji min re çi, gava lê digeryam
'Li dilê xwe binêre dilo, her ez di wir de me'
Min ji digot 'Lê kanî ew dil di ku de ye?'

Gava Meymûne ev helbesta Dehneş guhdar kir, hestiyar bû û got:
"Dest û dilê te ter be Dehneş! Te pir xweş got. Lê de îcar ka bibêje bê kîjan ji
van herduyan xweşîktir e ji yê din?" Dehneş got: "Evîndara min ji evîndarê
te spehîtir e!" Meymûne lê vegerand û got: "Te derew kir! Qudoşê kurmî,
diyar e ku dildarê min ji ya te spehîtir e. Çima tu vê rastiyê înkâr dikî!"

Devavêtina wan bi wî hawî berdewam kir hetanî ku Meymûne bi ser
Dehneş de qîriya û hewl da ku malê lê xera bike. Lê di wê kêliyê de Dehneş
serî li ber wê tewand û bi zimanekî şêrîn axivî, got: "Heger tu guncav bi-
binî, bila yekî din hakimtiyê di navbera me de bike dê çêtir be. Lewre her
yek ji me hezkiriyê xwe digire û ev ji tişteki xwezayî ye."

Bi vê yekê, Meymûne ji hêrsa xwe derbas kir û got: "A rast ji ev e. Em
ê wisa bikin."

Meymûne nigê xwe li erdê da, efrîtekî gurî û bi çavekî derket ku heft
quloç û çar gulîkên porê wî hebûn ku bi erdê ve dikişiyar û du destên wî
hebûn mîna yên guran, neynûkên wî ji mîna lapûşkên şêran bûn, nigên wî
mîna yên filan bûn û simên wî ji mîna yên keran bûn.

Ew efrît çawa ji bin erdê derket, bejna xwe li ber Meymûneyê tewand,
erda bin nigên wê maçî kir û bi rêzdarî got: "Daxwaza te çi ye xatûna min,
keça şahê min?" Meymûne got: "Qeşqes can, ez dixwazim tu hakimtiyê di
navbera min û vî belqitîyê Dehneş de bike..." û çiroka xwe ji serî hetanî
binî jê re got.

Qeşqes li rûyê ciwanê raketî û rûyê keçika li kêlekê dirêj kirî baş mey-
zand. Dît ku herdu di himbêza hev de û destên wan di bin serê hev de ne
û wisa raketî ne, di nava dûmeneke efsûnî ji dûmenên cemalê de! Herdu ji
hem pir dişibiyar hev û hem ji mîna hev spehî bûn. Qeşqes matmayî ma li
raserî wê xweşîkbûna wan. Piştî demeke dirêj ji temaşekirinê, li Meymûne
û Dehneş zîvirî û got:

Here cem evîna xwe û dev ji gotinên zikreşan berde
Mîrovên dexes her tim dujminê eşqê û evîna ne
Xweşîktirin dûmena ku Yezdan afirandiye ev e
Dûmena van herdu evîndarên dirêj kirî li ser nivînê ev e
Binêrin çawa bi ramûsan herdu bi hev re diaxivin
Li gel hevdu bi du dest û çar nigan çawa têdikoşin

Lê gelo gava dil li hev dibanin çima zikreş har dibin
Ey mirovên ku gazinc û lomeyan ji evîndaran dikan
Gelo xweşî û bextewarî qet heye di dilê xerabkaran de
Ey Yezdanê dilovan alîkar be di van mijaran de
Rê nede xerabiya bextereşan ku derbasî dilan bibe

Piştî Qeşqêş ev helbesta xwe qedand, hilmek kûr kişand û axaftina xwe wisa berdewam kir: “Bi navê Xwedê herdu ji mîna hev spehî ne. Tişteki yekî ji yê din zêdetir tune ye û herdu ji bi qasî ku cewîyê hev bin, dişibin hevdû. Ne gengaz e ku mirov wan ji hev veqetîne ango yekî di ser ê din re bibîne. Loma ez ji we re dibêjim ku çareseriyêke din li ba min heye ji bo vê mijarê: Ez dibêlîm kanî em herduyan ji xew şiyar bikin bêyî ku hayê yekî ji yê din hebe. Kîjan ji wan agir bi dilê wî keve û bi ser ê din de here, dilê xwe bi dest wî ve berde, ew ji yê din kêmtir e.”

Meymûne got: “Nêrîna herî baş û rast, ev nêrîna te ye. Ez bi xwe, pê razî me!” Dehneş got: “Ez jî pê razî me!”

Wê gavê Dehneş ket sûretê kelmêşekê û çû bi Heyva Zeman veda, ew şiyar kir...

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî vegotina çîroka xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 186'EMÎN

Şehrezadê vegotina çîroka xwe berdewam kir:

Çawa me şeva borî got, Dehneş xwe kir kelmêş û bi stûyê Heyva Zeman veda. Wî jî destê xwe avêt cihê pêvedanê û stûyê xwe xurand da ku êşa xwe bisekinîne. Pê re jî li kêleka xwe zivirî û çavên xwe yên mexmûrî vekirin. Çawa ku çavên xwe vekirin, dît ku yek di himbêza wî de raketî ye. Bi lez rabû ser xwe, li qûn rûnişt û lê nêrî, dît ku keçeke weke durekê li rex wî raketî ye ku rûyê wê mîna gulekê, sênga wê mîna guldaneke, bejna wê mîna spîndarekê û laşê wê jî nerm û germ e mîna nivîşkê li ser hingiv e. Behetî û şaşwaz bû li himberî spehîbûna wê. Pesindariya helbestkarekî hat bîra wî wê gavê ku digot:

Mîna stêrekê dide der di nava şaxan re
Bêhn jê difûre bi lez e ew mîna xezalan
Ew e ya ku vediguhêze xemgînîyê ji dilan
Her ku wenda dibe ji ber çavan di wisalan

Heyva Zeman careke din li Bidûra ciwan meyzand bi hûrgulî da ku ji wê spehîbûna wê têr bibe. Gelo kî bû ev keça ku tena wê kirasê cûnîk û bê devling li kêlekê raketibû, tev li wê kofiya xwe ya ji zêr û zîv û cewheran û ew gerdanka giranbuha ya di stûyê wê de? Heyva Zeman baş dizanibû ku

ew gerdanka stûyê wê, ya keça sultanane û ne gengaz bû ku keçeke din wê bixe stûyê xwe de. Di nava demek kurt de, spehîbûna keçikê hemû ajoyên wî rakirin serhildanê û daxwazeke xurt pê re çêbû ku wê maç bike û pê şa bibe. Destê xwe avêt kemera wê ew vekir û kirasê wê ji ser da alî hetanî ku nafika wê jî xwiya kir. Gava li sênga wê ya dagirtî, li çimên wê yên mîna penêr û navtenga wê nêrî, xwîna wî bi lez geriya û kelecaneke mîna babî-sokê hemû malikên laşê wî dagir kir. Di dilê xwe de got: “Qedera Xwedê çi be, dê ew bi serê min bê!” Piştîrê destê xwe li milê wê da da şiyar bibe, got: “Rabe evîndara min, rabe ji xew û binêre li min, ez Heyva Zeman im!” Lê keçik şiyar nebû ji ber ku Dehneş xewa wê giran kiribû.

Di wê navberê de rehma Xwedê ket nava wî de û gelek fikir û ramanên din jî hatin bîra wî ku bi xêra wan hebekî bi tevdir nêzikî keçikê bû û di dilê xwe de got: “Gelo nebe ku keça bavê min dixwaze wê bi min re bizewicîne ev bê? Erê bi Xwedê dibe ku ev be! Naxwe min bêaqilî kiriye ku ev sê salin ez bi ya bavê xwe nakim û bi keçeke evqasî xweşik re nazewicim! Heger vê carê bû sibeh, bi xêr û selamet ez ê ji bavê xwe bixwazim ku min bi vê keçikê re bizewicîne!..”

Li Şehrezadê bû sibeh, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 187'EMÎN

Şehrezadê berdwam kir û got:

Heyva Zeman piçekî din jî ponijî û gûmanin nû pê re çêbûn. Di dilê xwe de ji xwe re got: “Çi dibe bila bibe, heger bibe sibe ez vê keçikê ji dest xwe bernadim û madem ku misoger ez ê pê re bizewicim, naxwe ji niha ve jî ez dikarim pê şa bibim!” Xwe bi ser de xwar kir ji bo ku wê ramûse. Meymûne pir tirsîya ji ber vê helwesta wî, Dehneş jî pir kêfxweş bû ku pêşbîniya wî dê rast derketa. Lê di kêliya dawî de metirsîyeke din ket dilê Heyva Zeman û xwe bi şûn ve kişand, ew maçî nekir. Di dilê xwe de got: “Bila bavê min ji min nexeyide. Ez ê hinekî din jî xwe ragirim. Dibe ku bavê min dixwaze bi vê bûka han, min di ezmûnê re derbas bike. Dibe ku wî şîret kiribe û şandibe cem min, ji bo di himbêza min de rakeve û xwe li xewê deyne û min şiyar neke, da ez çi pê bikim, ew jî here ji bavê min re bibêje. Kî dizane belkî bavê min bixwe jî niha li van derdoran veşartî be û min dişopîne, da ku sibehê were cem min û bêje ‘ka qaşo te digot ez nazewicim û naxwazim nêzikî jinan bibim û waye tu çûyî, tu keçikê maçî dikî!’ A baş ew e ku ez karibim bi xwe û xwe ragirim. Ez destê xwe pê nakim û qet nêzikî wê jî nabim! Ez ne berê xwe didime wê û ne jî lê dinêrim. Lê tenê ez ê perçeyekî ji eşyayên wê li cem xwe bigirim, ji bo weke îşaretekê bimîne di navbera min û wê de!”

Heyva Zeman rahişt destê Bidûrê û hungulîska wê ya tiliya navê, ji destê wê derxist, xist destê xwe û ya xwe xist tiliya wê de. Hungulîska wê bi cewheran xemilandî bû û li dora kevîrê nava wê, ev çend rist nivîsandî bûn:

Bila neyê ber dilê we ku min sozên we jibîr kirine
Çiqasî ku hûn bigirin li ber min deriyên xwe
Mirzayên min, li min werin rehmê bi hestên xwe
Belkî rojekê ez jî ramûsim lêv û hinarkên wê
Bi Xwedê ez ji ber deriyê we naçim bi Xwedê
Lew ku hûn sînor û tixûbên xwe derbas bikinê

Heyva Zeman, piştî ku hungulîska wê ya giranbuha xist tiliyo xwe de, piştî xwe da keçikê û ji nû ve ket xewê. Meymûne pir kêfxweş bû bi vê helwesta wî ya sinckar û li Dehneş û Qerqeş zîvirî, ji wan re got: “Îcar we dît bê dildarê min Heyva Zeman çawa bi sinckarî nêzikî vê keçikê bû! Ah ev in meziyetên herî spehî û hêja! Lewre kurik hemû xweşîkbûn û rindiyên keçikê dîtin, lê dîsa jî destê xwe nedayê û ew maçî nekir. Brevajî wê yekê, piştî xwe da keçikê û raket!” Dehneş û Qerqeş herduyan jî ew gotinên Meymûne pejirandin û gotin: “Wele me bi çavên xwe dît, bê çawa bi exlaqî tevgeriya!”

Wê gavê Meymûne xwe kir kêçek û ket nav kirasê Bidûrê. Destpêkê li ser nigê wê meşiya, piştî çû çimê wê, herî dawî jî xwe çeng kir ser rahnê wê û ji wir jî çû ser navika wê û li wir pê veda. Bidûr çavên xwe vekirin û di cîh de rabû, li qûn rûnişt, dît ku xortekî ciwan li gel wê paldayî ye û ketiye xew de. Rûçikên wî mîna gulên buharê vekiribûn, devê wî weke hungulîska Nebî Suleyman bû û çavketina bejn û balê mest dikir.

Çawa Bidûr Xanê Heyva Zeman di wî halî de dît, dilê wê lê da û xwîna wê keliya, dîn û har bû li ser wî...

Li Şehrezadê bû sibeh, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 188'EMÎN

Şehrezadê berdewam kir:

Bidûr Xanê di cîh de dilê xwe da Heyva Zeman, lê wê kêlikê tiştêkî din ket bîra wê û di dilê xwe de ji xwe re got: “Wax li minê! Çawa ez bi vî xortê xerîb re raketim di nava heman nivînê de?” Piştî awîrê xwe li ser kom kirin û careke din xwest ku dilê xwe bixe cîh, di derbarê spehîbûn û nazîkbûn û delalîya wî de. Piştî dîsa ji xwe re got: “Bi navê Xwedê ev xortekî pir delal û spehî ye, mîna heyvekê ye. Dil û hinavên min diperitin li ser wî û vê xweşîkbûna wî. Wax li minê! Bi navê Xwedê ger min bizanîbûya ku vî xortî ez xwestim ji bavê min, min qet nedigote na û minê qebûl bikira ku ez pê

re bizewicim û ji spehîbûna wî têr bibim!”

Bidûr Xan li rûyê Heyva Zeman meyîzand û got: “Mîrê min, seydayê dilê min û nûra çavê min! Ka rabe ji xew û çavên xwe veke ji bo tu nûra cemala min bibînî û dilê xwe pê derman bike!” Û bi destê xwe ew hejand. Lê Meymûnê baskên xwe li serê wî pêçan û xewa wî giran kir, nehişt ku şiyar bibe ji xewê. Bidûr Xanê careke din bi destê xwe ew hejand û jê re got: “De ka ji bo xatirê min rabe ser xwe û li vê nêrgîza himber xwe binêre! Rabe û destê xwe bigerîne li ser navîka min û hetanî sibehê bi min re bilîze, şa bibe û li kêfa xwe binêre! Rabe û xwe nede ser balîfê, ranekeve!” Lê Heyva Zeman bêdeng ma û bersiv neda Bidûr Xatûnê. Bidûr dîsa axivî û got: “Tu çima wisa sergêj û belawela yî mîrê min? Tu çiqasî rind û spehî yî, ez jî ewqasî spehî me, çima tu wisa dikî? Gelo wan ber te girtiye? Ango bavê min ê kal ê beradayî axaftina te qedexe kiriye bi min re îro?”

Bidûr Xanê bi hesreteke mezin û dilbijokiyeke serhildêr, careke din lê nêrî. Lêdana dilê wê lezgîntir bû, nava wê li hev ket û agir bi cerg û hinavên wê ket. Dîsa bi bergerî ji Heyva Zeman re got: “Delalê ber dilê min, evîndarê min, mîrê dilê min! De kanî bersivê bide min û bi min re biaxeve! Bi kêmanî navê xwe ji min re bibêje, lewre te agir berda nava min!”

Heyva Zeman ji xew ranebû û bi gotinekê tenê jî bersiv nedayê. Bidûr Xatûnê axîneke kûr ji kezebê kişand û got: “Tu çima ewqasî pozbilind î?” Pê re jî destê xwe lêda, ew hejand û destê wî ramûsa. Gava destê wî ramûsa, dît ku hungulîska wê di destê wî de ye! Li tiliya xwe nerî dît ku va hungulîska wî tê de ye. Bêhneke kûr berda, hêvîyek nû ket dilê wê de, axaftina xwe berdewam kir û got: “Bi Xwedê tu evîndara min î û tu ji min hez dikî. Lê belê xuyaye ku tu dixwazî delalîyê xwe li min bikî, li gel ku tu hatiye cem min di dema ku ez raketî bûm. Ez nizanim bê ka tu çawa hatiya cem min jî. Dîsa jî ez hungulîska xwe ji tiliya te dernaxim!”

Li bêrika libse wî nêrî, tişteke tê de nedît ku bigire cem xwe. Li her derê wî geriya disa tişteke pê re nedît. Jixwe şerwalê wî jî ne li ser bû. Xwe bi ser de tewand, ew ramûsa û destê xwe di bin kirasê wî rakir, destê wê şemitî ser çimên wî yên şayîtok, pir kelecana bû û lerizî, lewre şehweta jinan ji ya zilaman xurtir e. Ket ber fediyê de. Stûyê wî maçî kir û hinekî bi destê wî list. Ji dev û lêvan careke din ew maçî kir, piştê ew himbêz kir û deverêk ji laşê wî nehişt ku lêvên xwe nedan ser û ew maçî nekir. Destekî xwe xist bin çengê wî de û destê din li stûyê wî anî hev û di himbêza wî de raket...

Li Şehrezadê bû sibe, ew jî bêdeng bû û gotina xwe birrîn.

ŞEVA 189'EMÎN

Şehrezadê vegotina çîroka xwe berdewam kir:

Gava Bidûr Xatûnê ket himbêza Heyva Zeman û raket, Meymûne pir pir kêfxweş bû û li Dehneş zîvirî, jê re got: “Te îcar dît qurmiçiyoy? Te dît bê çawa dildara te, xwe bi ser ê min de avêt? Te dît bê çawa agir pê ketiye û li dorê diçe û tê? Bêgûman dildarê min ji dildara te spehîtir û hêjatir e. Lê belê ez di te de buhurîm û ez nema tişteki ji te dixwazim!” Ji bo ku dilê wî bikeve cîh de jî, kaxezeke beraetê nivîsî, wajo kir û da wî. Dûvre li Qerqes zîvirî û got: “Rabe, tu jî alîkariyê bi Dehneş re bike, dildara wî bibin mala wê, lewre şev dereng ketiye û hindik maye ku tîrêjên rojê bavêjin!”

Dehneş û Qesqes herdu bi hev re çûn gel Bidûr Xanê, xwe dan bin gewdê wê û firiyan, ew bi hewa xistin, berên xwe dan Cezayîra Çînê, warê şahê gewre, xwediyê heft qonaxan, bavê Bidûr Xanê.

Bi şeveqê re, Heyva Zeman ji xew rabû. Li cep û rastê xwe nêrî, lê ew keçîka rindik, delalîya ber dilê xwe nedît! Di dilê xwe de got: “Ev çi ye êdî? Bavê min dixwest ku min bi wê keçîkê re bizewicîne û niha jî bi dizî ew ji kêleka min revandiyê, biriye, ji bo daxwaza zewacê xurttir bike bi min re! Misoger wisa ye!” Qîrek da dergevanê li ber deriyê wî raketî bû û jê re got: “Rabe kotiyo, rabe ser xwe, tu çi dikî li vir?” Dergevan ji xew veciniqî, rabû ser xwe. Lê hîna jî mîna gêjan dilewlihî, bêyî ku bikaribe xwe li ser nigan bigire. Deriyê adoyê vekir, test û misînê avê da ber Heyva Zeman. Wî jî rahişt misîn, çû destava xwe girt û vegeriya hundur, nimêja xwe ya sibehê kir, piştî li dergevan vegeriya û jê re got: “Ey Sawap, ka ji min re bibêje bê kî vê sibehê hat ew keçîka ku li gel min raketîbû bir û ez di xew de hiştim?” Dergevan got: “Keçîka çi û halê çi Begê min?” Heyva Zeman got: “Ew keçîka ku şev pê de bi min re raketî bû.” Sawap hêrs bû bi vê gotina wî û jê re got: “Tu keçîk li cem te tunebûn Begê min, ma wê çawa keçîk bikevin cem te û ez li ber deriyê te yê kilîtîkîrî? Begê min, bawer bike tukes derbasî cem te nebûye, ne mêr ne jin.”

Heyva Zeman hêrs bû û got: “Tu derewan dikî ey bendeyê beyom! Qey tu jî ewqasî mezin bûye ku êdî tu min dixapînî û rastiyan ji min vedîşêrî? Çawa tu ji min re nabêji bê ew keçîka bêdew a şev pê de li gel min bû, bi ku ve çûye? Çawa tu ji min re nabêji bê kê ew biriye?” Dergevan hîn bêhtir aciz bû, qeherî û got: “Wele Begê min tu kes nehatiye vir û min jî tu keç li vir nedîtine.”

Heyva Zeman, bi vê gotina wî pir aciz bû: “Wisa xwiya dike ku wan tu jî fêrî rîp û xapan kirine, ey melûn! Ka were cem min!” Dergevan hat cem wî, Heyva Zeman ew girt û bi hindikan pê ket, ew avêt erdê, lê da, li ser dilê wî rûnişt û bi pêhnan lê da, destên xwe xistin qirika wî de û hewl da wî bi-

fetisîne hetanî ji ser hişê xwe çû. Piştê ew bi dewla bîrê ve girêda û ew bera binê bîrê da hetanî gîha avê. Werîsê dewlê di ser çirikê re kişand û berda, ji bo bin av ve ser av bibe di wê zivistana sar de. Dergevan jî hişiyar bibû bi wê ava cemidî û helke helk pê ketibû, hilma wî çikiyabû, dikir ku biqefile ji serman. Qajewaj pêketibû, nema dizanîbû wê çawa bike, çi bibêje. Lewre Heyva Zeman bênavber bi ser de diqîriya û digot: “Ey melûnê rezîl, hetanî tu cihê wê keçe nebêji, ez te ji vê bîrê dernaxim! Zû bibêje bê kê ew biriye û ez di xew de hiştîme!”

Li Şehrezadê bû sibe, wê ji vegotina çîroka xwe birî û bêdeng bû.

ŞEVA 190'EMÎN

Şehrezadê berdewam kir:

Herî dawî dergevan lavelav ji Heyva Zeman kirin û jê re got: “Begê min! Min ji binê vê bîrê derxîne, ez ê rastiya mijarê ji te re bibêjim!”

Li ser vê gotinê, Heyva Zeman ew ji binê bîrê kişand. Dergevan soro-moro bûbû, ruh tê de nemabû ji tirsan. Laşê wî yê şil mîna pelê çilo diricifî ji ber serme û seqemê; şerqêşerqa diranên wî bû li hev diketin, mîna ku ji nav berfê derketibe. Vêca çawa yê dergevan dît ku careke din derketiye ser rûyê erdê, dîsa ruh pê hat û ji Heyva Zeman re got: “Mirê min, roniya çavên min! Ka destûrê bide min da ku ez herim van kincên şil ji xwe bikim, wan berba bikim û hineke din î zuha li xwe bikim, ji bo hişê min bê serê min û ev lerza bedena min bisekine. Piştê, ez ê mijarê ji serî hetanî binî ji te re vekim û çîroka wê keçêkê bi berfirehî binim ziman.” Heyva Zeman lê vegeand û got: “Ey bendeye bêmîrê, welîhî û billehî û tillehî, heger te mirin bi çavên serê xwe nedîta, tu li xwe mukur nedihat û te rastî nedigot. De êdî here pêdiviyên xwe bibîne û zû li min vegere, da ku tu çîroka wê keçîkê ji min re bibêje!”

Dergevan ji nav lepên Heyva Zeman derketi bû, lê belê hîn jî bawer nedikir ku xelasê bûye. Bêyî navberê bide meşa xwe, bi bazdanê çû cem Sultanê xwe Şehrîman. Çawa derbasî cem wî bû, dît ku ew û wezîrê xwe, di derbarê kurê xwe de diaxivin. Sultan ji wezîr re digot: “Ez îşev qet rane- ketim ji ber tesewasa ku ketibû nava min de, di derbarê kurê min Heyva Zeman de. Ez ditirsim ku tiştek bi serê wî de bê, di vê birca kevnar de. Ji xwe avêtina wî ya zindanê bê fêde ye û em nagihin tu encaman!” Wezîr jî lê vedigerand û digot: “Li ser wî metirse şahê min, bi Xwedê tu tiştek bi serê wî nayê û xerabî nagihêjêyê. Bihêl, bila mehekê girtî bimîne, dê ew serhişkiya wî giş here!”

Dergevan, çawa derbasî hundur bû, ji Sultan re got: “Xwedanê min,

Sultanê min! Mixabin kurê te dîn bûye û ev hawe bi serê min de anîn, mala min xera kir. Dibêje îşev, keçek li ba min raketî bû, ka bêje bê kê ew bi dizî ji cem min biriyê! Ez ji nizamîm bê ew keçik kî ye, çi ye û bi ku ve çûye!”

Gava Şehrîman ê gewre ew gotinên di derbarê kurê xwe de bihîstin, agir bi kezeba wî ket û qîrîya, got; “Ka rabe rewşa kurê min fêr bibe, bê çi bi serê wî hatiye!”

Wezîr bi tirs rabû ser xwe û bi lez sûrikî, çû ber bi birca ku Heyva Zeman tê de girtî bû. Pir tirsîyabû ji hêrsa sultanê xwe. Di nav fikr û raman û tasewasin kujer de, da dûv dergevan. Lingên wî çiqasî bi lez diçûn jî, nedigîhan ruhê wî yê ku li pêşiya wî diçû. Heta ku gîha wir, rojê ji da der. Wezîr derbasî hundurê zindanê bû, dît ku Heyva Zeman li ser nivîna xwe rûniştî ye û Qur’anê dixwîne. Silavek lê da û li kêlekê rûnişt, jê re got: “Mîrzayê min, ew bende û dergevanê bêxêr î bêyom xebereke nexweş û çewt da me, em aciz kirin. Sultanê me jî pir hêrs bû ji ber vê yekê.” Heyva Zeman got: “Ey wezîr! Dergevan çi ji we re got ku hûn ewqasî aciz kirin?” Wezîr got: “Bi kincin şilo-pilo û di rewşeke bêhawê de hat cem me û -hêşî te- gotinên ne di rê de di derbarê te de gotin, em aciz kirin. Xwedê te û ciwanîya te bisitirîne, hiş û zimanê te yê şêrîn biparêze ji xerabîyê ya Rebî! Helbet xerabî ji te dernayê û em dizanin ku ew dergevanê bêoxir derewan dike.” Heyva Zeman pîrsa xwe dubare kir û got: “Vî ebdê bêyom çi ji we re gotiye?” Wezîr got: “Ji me re got ku tu dîn bûyî û te gotiye ku şeva borî keçikek li gel te bûye. Gelo te tiştêkî wisa ji dergevan re gotiye?”

Gava ku Heyva Zeman ew gotin bihîstin, agir ji çavên wî da der, xezeb ji awirên wî bariya. Ji wezîr re got: “Niha ji min re eyan bû ku we, ew lîstoka han fêrî dergevan kiribû û we bi destê wî pêkanî...”

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî vegotina xwe birrî.

ŞEVA 191’EMÎN

Şehrezadê vegotina çîroka xwe berdewam kir:

Heyva Zeman axaftina xwe berdewam kir û got: “Ez baş dizanim ku we nehiştiye ew wê mijara keça li ba min raketî ji min re bibêje. Gelo ew rindika ciwan a şeva borî di himbêza min de bû, bi ku ve çû? Jixwe ew şandibû cem min û ferman dabû wê ku di himbêza min de rakeve. Ez jî hetanî sibehê pê re raketim û sibehê ez şiyar bûm ku ne li cem min e, gelo niha li ku ye?”

Wezîr şaşwaz bû û metirsîyên wî pir bûn, got: “Sîtara Xwedê li ser te be mîrê min, me tu keçik neşandine cem te îşev. Tu jî bi tena serê xwe bûyî û derî li ser te girtî bû, dergevan jî li ber deriyê te raketî bû. Loma, ne keçik

hatine cem te û ne jî kesî din derbasî cem te bûye. Îcar hişê xwe vegerîne serê xwe û bêhna xwe fireh bike mîrzayê min!”

Heyva Zeman hêrstir bû bi vê gotina wî û lê vegerand, bi zimanekî dijar jê re got: “Binêr wezîrê min! Ew keçika han dildara min e, xezala çavreş û delala ber dilê min e. Şeva borî mine ew himbez kir û hinarkên wê yên sorgulî ramûsan û tu nikarî wê înkâr bikî!” Wezîr behetî ma li vê gotina wî û jê re got: “Gelo îşev te ev keçik bi çavên serê xwe dît, angî te ew di xew de dît?” Heyva Zeman, lê vegerand û got: “Ey pîremêrê bêyom, jixwe min ew bi çavên serê xwe dît, ma ez ê wê bi guhên xwe bibînîm!? Min destê wê temaşê kir û ez bi spehîbûna wê şabûm. We jî, we şîret lê kiribû ji bo bi min re neaxive, bersivê pîrsên min nede, xwe li xewê deyne û bêdeng bimîne li kêleka min. Ez jî li gel wê raketim hetanî sibehê û gava sibehê ez ji xew rabûm, min ew li gel xwe nedît.”

Wezîr dubare kir û got: “Dibe ku te ev hemû di xew de dîtîbin begê min. Dibe ku ji ber bandora hinek xwarinan, an jî weswasa şeytanan kabûsin wisa bi ser te de hatîbin û xew li te herimandîbin.” Heyva Zeman got: “Ey pîremêrê bêyom û dilxerab, tu çawa henek û tinazên xwe bi min dikî û tu dibêjî te kabûs dîtine? Li gel ku dergevan bi xwe jî hebûna wê keçikê ya gel min qebûl kir û got li vegerê ez ê çîroka wê ji te re bibêjim!”

Pîştî ku ew gotina xwe qedand, Heyva Zeman ji nişkêve êrîş kir ser wezîr û bi rîha wî ya dirêj girt, rîha wî li destê xwe pêça û kişkişand hetanî ku ew li erdê dirêjkir û ket ser dilê wî de. Êşa rîha wî, kazîn bi dilê wezîr xist. Wê kêliyê his kir ku ruhê wî jî bedana wî derdikeve. Lê Heyva Zeman dev jê berneda û bênavber bi pîhnan li zikê wî da, bi kulman jî li ser çavên wî xist. Wezîrê ku êdî hêviya wî ji jîyanê qut bûbû, di dilê xwe de got: “Heger wî dergevanî bi dereweke biçûk xwe ji nav lepên vî dînî rizgar kiribe, çima ez nikarim tiştêkî wisa bikim! Heger ez wisa nekim, misoger dê min bikuje. A baş ew e ku bi derewekê ez ruhê xwe rizgar bikim, lewre êdî baş hişkere bû ku ev kurik dîn bûye!”

Wezîr li Heyva Zeman zîvirî û jê re got: “Mîrzayê min, li min negire û li min bibûre! Lewre bavê te sond bi min da xwarin ji bo ku ez mijara vê keçikê ji te veşêrim. Niha piştî ku min evqasê lêxistin xwar, êdî ez nema dikarim li ber xwe bidim. Lewre ez yextiyar im û hal di min de nemaye. De êdî ka fersendê bide min ji bo ku ez rastiya mijarê û ya wê keçikê ji te re bibêjim!”

Heyva Zeman lêdan sekinand û jê re got: “Çima beriya ku ez li te bidim û te perişan bikim, te çîroka wê keçikê ji min re negot? De ka êdî rabe ser xwe ey kalepîrê bêyom û rastiya çîroka wê keçikê ji min re bibêje?” Wezîr lê vegerand û got: “Ma ne tu li wê keça spehî û rindik dipîrsî?” Heyva Zeman got: “Belê. Ka ji min re bibêje bê kê ew anî vir û li cem min

ew xiste xew de û niha li ku ye, da ez rabim herim cem wê. Vêca heger bavê min Şehrîmanê gewre ev listik li serê min kiribe û ev keçik şandibe cem min ji bo ku min di ezmûnekê re derbas bike, ji niha ve ez razî me ku ez bi vê keçikê re bizewicim. Wî wisa kiribe jî, dilê min ketiye vê keçikê û min jê hez kiriye û êdî ji bîra min dernakeve. Belkî wî ew dûrî min xistiye ji ber helwesta min a li himber zewacê, lê êdî vaye ez bi zewacê razî bûme. De êdî here bavê min agahdar bike bi vê yekê û wî şîret bike ku min bi vê keçikê re bizewicîne. Lewre ji wê pê ve, ez tukesî naxwazim. Dilê min, wê tenê dixwaze. Îcar ka zû rabe biçê cem bavê min ji bo vê mijara zewaca min û zû li min vegere, were vir!”

Wezîr çawa dît ku ji nav lepên wî xelas bûye, bi lez di derî re derket û berê xwe da cem melîkê xwe Şehrîman...

Li Şehrezadê bû sibe, ew jî bêdeng bû.

ŞEVA 192'YEMÎN

Şehrezadê vegotina çîroka xwe berdewam kir:

Çawa ku wezîr derbasî cem Sultan bû, Sultan jê re got: “Xêr e wezîrê min, çima tu di nava kelûçedê de yî? Kê tîr avêktine te ku tu wisa bi tîrs vegeyriyaye cem min?” Wezîr lê vegevand û got: “Sultanê min, mizgîniyeke min ji te re heye?”

Sultan got: “Mizgîniya çi?” Wezîr got: “Mizgîniya ku kurê te Heyva Zeman dîn bûye!”

Gava ku Şehrîmanê gewre ev gotin ji wezîrê xwe bihîstin dîn û har bû, agir ji çavên wî rijîya. Bi wezîr de qîriya û got: “Ey Wezîr, kanî ji min re bi-bêje bê kurê min çawa dîn bûye?” Wezîr got: “Ser saran ser çavan” û mesele jê re vekir, ji serî hetanî binî ta bi derziye vekir. Sultan lê vegevand û got: “Ey Wezîr heger mizgîniya te ji min re dînbûna kurê min be, wê mizgîniya min jî ji te re firrandina serê te be! Ey xerabtirîn wezîrê ser rûyê erdê û bîyomtirîn emîrê welat! Lewre ez dizanim ku tu bûye sebaba dînbûna kurê min bi wan fikr û ramanên xwe yên xerab. De binêre wellehî heger zerarek bigihêje kurê min an jî dîn bibe, ez ê te bi minare ve daliqînim û êşekê bi-dime te, ku di heyata xwe de te tiştekî wisa nedîtiye!”

Piştî, Sultan ji cihê xwe rabû, wezîrê xwe jî da pêşiya xwe û berê xwe da birca ku kurê wî tê de girtî bû. Çawa ku gîhan wir, Heyva Zeman bi lez û bez ji ser cihê xwe rabû û çû destê bavê xwe maçî kir, piştî xwe bi şûn de kişand hebekî û bejna xwe li ber wî tewand, himber bavê xwe sekinî di rewşeke amade de. Demeke dirêj di wê rewşê de ma, piştî serê xwe rakir, li bavê xwe nêrî û hêsir barandin, got:

Heger gunehkar bim ez di derbarê we de
Ji ber şaşitiyeke borî û ne di rê de
Va ye poşman vedigerim ez li we
Û dizanim ez ku pir fireh e dilê we

Wê gavê Şehrîmanê gewre hestiyar bû, xwe çeng kir himbêza kurê xwe, destên xwe li newqa wî anîn hev û herdu çavên wî maçî kirin. Piştê ew li kêleka xwe da rûniştindin, li ser nivînê. Piştê awirin ku xezeb ji wan dibariya li wezîrê xwe nêrî û jê re got: “Ey seh kurê sehan! Tu çawa dibêji kurê te Heyva Zeman weha weha bûye û tu dilê min jê sar dikî, tu min ditirsînî?” Piştê bêyî ku li bendî bersiva wezîrê xwe bisekine, li kurê xwe zivirî û jê pirsî, got: “Navê vê roja ku em tê de ne çi ye, kurê min?” Heyva Zeman got: “Îro şemî ye, sibe yekşem e, roja li pey jî duşem e, ya li pey jî çarşem e, a din pêncşem e û roja li pey jî in e.” Sultan got: “Kurê min, şikir ji Xwedê re ku tu li ser hişê xwe yî kurê min. Vêca ka ji min re bibêje bê ev meha em tê de çi ye li gora hesabê me yê Hîcrî kurê min?” Kurê wî got: “Ev meh zulqêde ye, zulhicce jî li pey wê tê. Di pey re jî Mûherrem, Safer, Rebiyûlewel, Rebiyûlsanî, Cûmadilewel, Cûmadilsanî, Receb, Şaban, Remezan û Şewwal tê.”

Sultan pir kêfxweş bû bi van bersivên kurê xwe. Tif kir ser çavê wezîrê xwe û jê re got: “Ey kalê xerabiyê! Tu çawa angaşt dikî ku kurê min dîn bûye? Halbukî ya rastî ew e ku tu dîn bûyî!” Wezîr, serê xwe hêjand û hewl da ku biaxive, lê di kêliya dawî de biryara xwe guhert û bêdeng ma, li bendî ku tiştêk biqewime. Ji xwe hîna ku çend xulek derbas nebûbûn, Sultan ji kurê xwe re got: “Kurê min îcar ew gotinên ku te ji dergevan û wezîr re gotibûn çawa bûn; te gotibû ku şeva borî keçeke rind û xweşik li ba min bûye, gelo ew çi mesele ye?” Heyva Zeman kenîya û got: “Bavocan, bawer bike tu hêz bi min re nemaye ku ez henekan tehmûl bikim, rakim. Îcar hûn jî barê min zêde girantir nekin, lewre bêhna min teng bûye ji vê listika ku hûn bi min re dîkin. Ji aliyekî din ve jî bavocan, ez dixwazim tu bizanibî ku êdî ez razî bûme bi zewacê, lê bi şertê ku keça ez pê re bizewicim, ev keçik bi xwe be ew a ku îşev li ba min bû. Lewre ez baş dizanim ku te ew keçik şandibû cem min, ji bo ku tu zewacê bi min şêrîn bikî. Piştê jî te hinek li pey wê şandin û beriya şeveqê te ew ji cem min bir.”

Sultan ji tirsan lerizî û got: “Destê Xwedê li ser te be kurê min, Xwedê te bisitirîne lawo, Xwedê Teala hiş û aqilê te bisitirîne ji dînbûnê...”

Li Şehrezadê bû sibe, ew jî bêdeng bû.

ŞEVA 193'YEMÎN

Şehrezadê vegotina çîroka xwe berdewam kir û got:

Şehrîmanê gewre, axaftina xwe berdewam kir û got: “Îcar ev keçîka ku min ew şandiye ji te re û beriya şevê ew bi şûn de biriye kî ye û çî ye? De binêr kurê min, bi hersê navê Xwedê hayê min ji tiştêkî wisa tune. Vêca ka tu ji min re bibêje bê ev çî ye û çî mesele ye, gelo ne encamên kabûs û xewnan bin, kurê min? Dibe ku bandora hinek xwarinan be jî. Ez texmîn dikim ku şeva borî gava tu raketiye, hişê te li ser meseleya zewacê bû, lewre di rûyê wê de wisa bûye, nalet li zewacê bê û Xwedê mala wî xera bike ew ê ku ev şîret li min kir. Bêgûman ez dizanim ku hêrsa ji ber ku te daxwaza min pêk neaniye, loma te xewneke wisa dîtiye ku tu keçekê himbêz dikî. Piştî gava tu şiyar bûyî jî, te gotiye qey bi rastî jî tiştêkî wisa qewimîye. Bi dibêtiyeke mezin wisa bûye, hemû xewn û xeyal bûne.”

Heyva Zeman got: “Dev ji van gotinan berde û ka ji min re sond bixwe bi wî Xwedayê bi tenê, bi Qur’ana wî ya pîroz û bi vê roja malûm ku hayê te ji wê keçîkê tune ye!” Bavê wî, tiştê ku wî got dûbare kir û got: “Bi heqê navê Xwedayê Mûsa û Îbrahîm ez ji te re sond dixwim ku hayê min ji wê tune. Dibe ku ji ber hinek xewnan tiştêkî wisa li ber çavên te sêwirîbe kurê min!” Kurê wî lê veğerand û got: “Bavocan ka tu ji min re bibêje, gelo dibe ku yek di xewna xwe de şer bike û gava ji xew şiyar bibe, şûrekî bi xwîn di destê xwe de bibîne?” Bavê wî got: “Na kurê min, tiştêkî wisa çênabel!” Heyva Zeman got: “Îcar ka ez ji te re bibêjim bê çî bi serê min hatiye îşev. Nivê şevê ez ji xew şiyar bûm, min dît ku keçek li kêleka min raketiye. Ew jî di temenê min de bû û bejn û bala wê lihevhati bû mîna min. Min destê xwe dayê, ew ramûsa û min hungulîska wê ji destê wê derxist, xist destê xwe de û ya xwe jî xist destê wê de û ji bo ku li himberî te nebin fedîkar, ez pê re raneketim. Lewre min got belkî te ew şandibe cem min, ji bo ku min biceribînî û zewacê bi min şêrîn bikî. Piştî ez razam û gava ku ez sibehê ji xew rabûm, min dît ku keçik ne li kêleka min e. Ne tiştê li pey xwe hiştibû û ne jî şopek. Di pey re, ew tiştê ku di neqeba min û dergevan de qewimî û piştî jî ew tiştê ku bi wezîr re qewimî, hate meydanê. Vêca wê çawa ev tişt xewn be û hungulîsk li holê ye, li ber çavên me ye? Heger ne ji hungulîskê bûya, minê jî bigota xewn e. Lê va ye tu jî dibînî ku hungulîska wê hîna jî di tiliya min de ye! De êdî lê binêre bê hungulîskek çiqasî buha ye?”

Heyva Zeman, hungulîsk ji tiliya xwe derxist û ew dirêji bavê xwe kir, da destê wî. Bavê wî rahişt hungulîskê û ew di nav destê xwe de qulupand, piştî li kurê xwe zivirî û got: “Wisa xuyadîke ku bûyerin giran û dîrokek gewre li pey vê hungulîskê heye! Ev hevdişîna te û vê keçîkê, rewşeke balkêş û erjeng e! Ez nizanim bê ev hemû çima bi serê me de hatine? Hebe nebe ev bûyer giş ji bin serê vî wezîrî derketine! Îcar kurê min, tu bi Xwedê kî, hebekî xwe ragire û bêhna xwe fireh bike. Belkî Xwedê li te bê rehmê û van kulên te çareser bike, çawa ku helbestkar jî gotiye:

Dibe ku felek hefsarê xwe sist bike

Û serdemeke nû bi ser me de bîne
Hêvîyên me geş bike, dilê me xweş bike
Wê gavê her tişt ji nû ve dê bê nasîn

Vêca kurê min, şikir ji Xweda re ku hişê te li serê te ye û tendurustiya te di cîh de ye. Ev derdê te jî, tenê Xweda dikare wî çareser bike.” Kurê wî lê vegerand û got: “Tu bi qedrê Xwedê kî bavocan, li vê keçikê bigere û zû wê ji min re bîne, heger na, ez ê bimrim ji kerban!” pê re jî hestiyar bû, lerizî, li bavê xwe zîvirî û bi helbestî got:

Heger hûn soza xwe negirin û me negihînin hev
Dua ji me re bikin ku li wê dine em bêne gel hev
Gelo çawa xeyal dikarin bibin mêvanên mijankan
Û xew êdî qedexe ye li xwediyê wan mijankan
Li Şehrezadê bû sibe, ew jî bêdeng bû, gotina xwe birrî.

ŞEVA 194'EMÎN

Şehrezadê vegotina çîroka xwe berdewam kir û got:

Wê gavê wezîrê ku bêdeng mabû ji nişkê ve jî Şehrimanê gewre re got: “Ey Şahê Bextewar, demeke dirêj buhurî ku tu ji artêşa xwe û serkirdeyên meclisa xwe veqetiyaye, dibe ku ev yek kar û barê welat qels bixe û kêmaniyên mezin derkevin. Tiştê rast jî ew e ku gava kar gelek ketin ber mirov, mirov jî kare mezin dest pê bike. Loma niha ya baş ew e ku tu kurê xwe ji vir bibe wê qesra xwe ya raserî behrê, wî li wir bi cih bike û tu jî li gel wî be. Bila Meclîsa hukum jî, heftiyê du caran tenê bicive. Duşem û pêncşemê. Di wan herdu rojan tenê de bila emîr û wezîr û walî û serleşker û hacip û hemû erkanên welat bicivin, tu jî pirsgirêkên wan çareser bike, biryaran bide, rêveberiyê têkûz bike û her pênc rojên mayîn jî bi kurê xwe re mijûl bibe, hetanî ku Xwedê deriyekî xêrê li me veke. Tu jî, divê tu sist nebî Şahê min, lewre çerxa felekê her dem bi fitl û ger û dewran e û mirov nizane çi li pêşîya mirov e. Çawa ku helbestkarekî jî gotiye:

Gava ku xweşî bi ser we de tê bawerîya we bi felekê tê
Tîrsa wê qet çênabe ji qederê ku xerabiya mezin jê tê
Dema şev bi we re dikene kêfa we her li cih e
Qet nayê bîra we ku kulên mezin di şevê de veşartî ne
Hişyar bin xelkino li himber felekê û her bi tevdîr bin

Gava ku Sultan ev gotin ji wezîrê xwe bihîstin, nerm bû û ew gotin ketin serê wî de, bandor lê kirin û tîrsiya ku bi rastî jî rêveberiya wî qels bibe. Hema di cîh de rabû ser xwe û ferman da xizmetkaran ku kurê wî bibin wê qesra raserî deryayê. A rastî ew qesir li qiraxa deryayê bû. Bi qasî bîst gavan bi nava avê de bû û şibakeyên qesrê hemûçikan li deryayê dinêrî. Erda

qesrê bi mermeran raxistî bû û zikê banê wê jî bi rengên giranbuha hatibû boyaxkirin û bi zêran jî hatibû neqîşandin. Beşek ji wê qesrê ji bo Heyva Zeman veqetandin û ew bi ber û merş û hevrêşiman raxistin û dîwar hemû bi perde û dîbaç û cewheran xemilandin.

Heyva Zeman, di wê beşa qesrê de bi cih bû. Lê ji ber diywariya evîn û eşqê, xew lê diherîmî û her dem şiyar dima. Herdem li ser dildara xwe diponijî û bala wî meşxûl dima. Vê yekê jî, êşeke mezin dida wî, rûyê wî zer dibû û laşe wî hejar dibû. Her ku diçû jî ew rewşa wî xerabtir û girantir dibû. Sultan jî her ku diçû xemgîntir dibû bi vê rewşa kurê xwe. Li ber serê wî rûdinişt û êşa wî dikişand bêyî ku bikaribe çareyekê bibîne. Her duşem û her pêncşem, dîwana hukum li dar dixist, wezîr, gizîr û mîr û emîrên welêt li hev kom dikirin, li wan guhdar dikir, emîr û fermanên pêwîst didane wan, ew dîsa dişandin ser kar û piştî dîsa li kurê xwe yê bêsiûd vedigeriya. Li ber serê wî rûdinişt, şev û roj pê re dima, bêyî ku jê veqete. Sultan Şehrîman, bi rojan ew kare xwe wisa berdewam kir.

Heyva Zeman jî, weke me got, xew lê herimîbû ji ber agirê eşqê û êdî şev pê de nema dikarîbû raketa. Wî jî roj û şevên xwe di nava êşeke bêdawî de berdewam dikir.

Îcar em vegerin ser Bidûr Xanê, keça şahê heft qonaxan. Gava ku herdu cinan (Dehneş û Qeşqeş) rahiştênê û ew birin, danîn ser nivîna wê, hîna sê seet ji şeveqê re mabûn. Sê seet bi şûn de, gava şeveqê lê da, ew jî ji xew şiyar bû...

Li Şehrezadê bû sibeh, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 195'EMÎN

Şehrezadê vegotina çîroka xwe berdewam kir û got:

Gava Bidûr Xanê ji xew şiyar bû û dildarê xwe li gel xwe nedît, dilê wê ricifî, hişê xwe wenda kir û bi dengê bilind qîrîya, hemû xizmetkar û cêrî û navmalîyên qesrê şiyar kirin, ew xistin qelaqê de. Hemû bi lez û bez lê hatin hev, li ser serê wê kom bûn. Jina mezintirîn di nav xizmetkaran de, jê re got: “Xêr e xatûna min, çi qewimîye?” Bidûrê got: “Pîra bêyom, kanî ew dildarê min ê ciwan ê ku îşev di himbêza min de raketî bû, çû bi ku ve? Ka ji min re bêj bê bi ku ve çûye?”

Gava ku pîra xizmetkar ew gotin ji devê wê bihîstin, ronî di çavên wê de nema, tirs û saweke mezin dilê wê dagir kirin. Bi tirs axivî û got: “Ev çi gotinên çewt in, xatûna min?” Bidûr Xanê got: “Pîra bêyom û diranqîç! Kanî ew dildarê min ê rûheyv û çavbelek ê ku şeva buhurî hetanî derengî şevê bi min re bû û di nav nivîna min de bû?” Pîrê got: “Bi Xwedê min tu

ciwan û xort li van deran nedîtiye xatûna min. Ez hêvîdarim ku tu laqir-diye wisa nekî xatûna min. Heger bavê te van henekan bibihîze, xelasiya me ji destê wî nîne!” Bidûr Xanê berdewam kir û got: “Lê ku ciwanek îşev li gel min raketibe û ew ciwan xweşiktirîn ciwanên vî welatî be, tê çi bibêjê?” Pîrejina ku navê wê Selame bû lê vegerand û got: “Tu kes li ba te tunebû îşev!” Bidûr xan li destê xwe nêrî, mîna ku bixwaze angaşta xwe piştrast bike. Çavên wê çûn ser hungulîska ku hîna di tiliya wê de bû, bêhna wê hate ber wê. Ji Selame re got: “Tu çiqasî bêyom û bêbext î pîra diranqîç! Tu çima derewan dikî li min û tu bi derewan sûnd dixwî û çewt dipeyîvî?” Pîrê got: “Welehî min derew li te nekirine û bi derewan sûnd nexwariye!”

Bidûr Xatûnê hêrs bû û jê pir qeherî, şûrekî ku nêzikî wê bû ji kalanê wî kişand û li stûyê wê xist, ew kuşt. Bi kuştina Selame re care-war û qêrîn bi cêrî û xîzmetkarên qesrê ket, hemû li bin guhên hev ketin û di cîh de çûn cem bavê wê, ew agahdar kirin ji vê rewşa wê ya metirsîdar. Şah jî di cîh de, bi lez û bez bi keça xwe ve hat û jê re got: “Çi ye, çi qewimîyê keça min?” Bidûrê got: “Kanî ew xortê ku îşev bi min re raketiba, çû bi ku ve?” Hem digot “Kanî bi ku ve çûye?” û hem jî çavên xwe li çep û rast digerlandin, hewl dida ku şopeke wî bibîne, lewre hiş di serê wê de nemabû û eşqê ew ker û kor kiribû. Dema ku li şopeke dildarê xwe rast nehat, hêrsa wê hemû sînor derbas kirin û êdî dîn û har bû; kincên xwe qetandin, kirasê ser xwe jî kir terîş û parî parî kir.

Gava ku çavên bavê wê li wê rewşa wê ket, ferman da xîzmetkar û pasevanan ku wê destgîr bikin. Pasevanan dest û nigên wê qeyd û zircîr kirin. Zincîrek ji avêtin stûyê wê û ew bi şibakeyeke qesrê ve girêdan.

Bavê Bidûrê, gava ku keça xwe di wê rewşa xerab de dît, kulek mezin ket dilê wî de û dînya li serê wî teng bû. Lewre pir ji keça xwe hez dikir û tiştêkî wisa jê hêvî nedikir. Gazî zana, hekîm û loqman û efsûngeran kir, ew li dîwana xwe kom kirin û ji wan re got: “Ê ku keça min ji vê rewşê rizgar bike, ez ê wî pê re bizewicînim û nîvê mal û mulkê xwe jî bidime wî. Lê heger ew rehet nekir jî, ez ê şûr li stûyê wî bixim û serê wî bi ser deriyê qesrê ve daliqînim.”

Ën ku xwe dane pêş û xwestin keçikê rehet bikin, pir bûn. Lê kesî ew ji wê nexweşîya wê xelas nekir û Şah jî her car serê yekî jêkir, bi ser deriyê qesra xwe ve daliqand hetanî ku çil heb hatin serjêkirin. Piştî ew rêbaz da sekinandin û gazî hemû hekîm û loqmanan kir, da ku çareyekê ji keça wî re bibînin, lê tukesî çare jê re nedît û herkes şaş û metal ma li rewşa Bidûr Xanê. Ne zanayan, ne hekîman û ne jî pênûsgirtiyar tû rê jê re nedît.

Bidûr Xatûn ji her ku diçû, bêhtir bêriya dildara xwe dikir û hestiyar dibû, hêsr dibarandin û digot:

Eşqa te ez hêsîr girtime ey heyverûyê min!
 Navê te jî her dostê min e di şevbuhêrkan de
 Vedişêrim ez lê yê di nava min de her agir e
 Pir bi şewat e min disoje ev çi agire
 Bi nexweşiya agirê te ketime her dişewitim
 Êş û azara min her tu yî êdî diperritim

Hem digot û dinaliya, hem jî digiriya û hêsir dibarandin hetanî ku çavên wê kul dibûn û rûyê wê sorûmor dibû, nexweş diket bêyî ku çare û dermanekî ji birîna xwe re bibîne. Bidûr Xatûnê, sê salan di wî halî de ma.

Îcar biraşîrekî Bidûr hebû ku navê wî Merzewan bû û ji ber ku çûbû welatekî dûr, ji zû ve ew nedîtibû. Ew birê wê jî, ji hezkirina birayetiye jî bêhtir, jê hez dikir. Loma çawa vegeriya malê, di serî de li Bidûr Xanê pirsî. Diya wî jê re got: “Kurê min, wile xwişka te dîn bûye û ev sê sal in ku zincîr di stûyê wê de ye û girêdayî ye. Ne hekîm û bijîşkan, ne jî zane û efsûnkaran dermanekî ku wê baş bike jê re peyde kirin.

Çawa ku Merzewan ev gotin bihîstin, pir xemgîn bû û ji diya xwe re got: “Misoger divê ez wê bibînim, ji bo ku ez rewşa wê ji nêz ve bişopînim, belkî ez dermanekî jê re bibînim!” Dîya wî got: “Wê gavê, divê tu xwe ragire hetanî sibehê, ji bo ku ez hîleyekê, rêyekê ji te re bibînim û te derbasî gel wê bikim!”

Merzewan got: “Bila be.” Diya wî jî bi lez çû qesra Bidûrê ku li qiraxa deryayê bû. Çû cem serdergevanê berpirsiyarê odeya ku Bidûrê lê girtî bû û diyariyeke baş da wî. Piştî, jê re got: “Keçeke min heye ku Bidûr Xanê pê re mezin bûbû. Piştî ku mêr kir, dîrî me ket û ji zû de nehatibû vir. Lê dema bihîst ku ew bobelat bi serê xatûna te Bidûr de hatiye, ew jî hat vir û dixwaze Bidûr Xanê bibîne. Pir jê hez dike û dilê wê bi ser wê ve ye, ez tikan ji te dikim ku tu izne bidî wê, da ku were demjimarekê tenê wê bibîne û dîsa bi şûn de here, bêyî ku tu kes bibihîze!” Serdergevan got: “Naxwe divê bi şev were vir. Çawa ku şah hat keça xwe dît û dîsa ji vir derket, tu û keça xwe jî werin derbasî cem wê bibin. Çê bû?” Dîya wê got: “Çêbû!” Destê serdergevan ramûsa û bi şûn de vegeriya malê.

Roja dîtir, nuh tarî kete erdê û şevê baskên xwe avêtin ser bajêr, jinik rabû ser xwe, kincên keçikan li Merzewan kir û bi destê wî girt, ew derbasî qesra deryayî kir. Piştî ku Şah ji cem keça xwe derket çû, ew jî çûn cem serdergevan. Gava serdergevan ew dît, bi wan ve rabû û ji wan re got: “Derbasî cem Bidûrê bibin, lê zêde li gel wê nemînin û sohbeta xwe dirêj nekin!” Pîra diya wî li gel kurê xwe Merzewan derbasî cem Bidûr bûn û silavek lê kirin. Dilê wan pê şewitî, gava ku ew di wê rewşê de dît. Merzewan di cîh de ew kincên keçikan ji ser xwe avêtin û pirtûkên xwe derxistin, mûmek jî pêxist. Wê kêliyê Bidûrê ew nas kir û jê re got: “Birawo

tu çû û agahîyên te ji me qut bûn?" Merzewan got: "Rast e, lê va ye ez bi selameti li we vegerîyam! Rastiya Xwedê, min xwest ku ez dîsa bikevim ser rêyan û bibim rêwî, lê çawa ku min bihist serê te di belayekê de ye, dilê min bi te şewiti û ez hatim vir, min got belkî ez dermanekî ji te re peyda bikim." Bidûrê lê vegerand û got: "Biracan, gelo tu dibêji ku ez dîn bûme?" Û bêyî ku li bendî bersiva wî bimîne, ev çend riste gotin:

Dibêjin min tu dîn bûyî bi eşqa evîn û evîndaran
Min jî got ma çi tama jînê heye bêyî dildaran
Rast e ez dîn bûme ji kerba aşîqekî pir ciwan
Ger pak bibim bi wî ez, ji dînbûnê nekin loman

Bi van gotinên wê, Merzewan têgihişt ku xwişka wî aşîq e. Jê re got: "Kanî çîroka xwe ji min re bibêje, belkî ma Xwedê ku ez çareyekê ji pirs-girêka te re bibînim..."

Li Şehrezadê bû sibe, wê ji gotina xwe birrî û bêdeng ma.

ŞEVA 196'EMÎN

Şehrezadê berdewam kir û got:

Bidûrê li Merzewan vegerand û got: "Biracan, çîroka min wiha ye. Şevêkê bi derengî ez ji xew rabûm, min dît ku ciwanekî pir spehî û lihev-hatî ku mirov nikare pesnê wî bide, li kêleka min raketî ye. Min jî got belkî bavê min wisa kiriye, wî ferman daye, ew anîyê li rex min daye dirêjkin, ji bo ku min biceribîne. Lewre gelek şah û mîr û emîran dihatin ez dixwestim û min jî hemû red dikirin û min qebûl nedikir ku ez bizewicim. Îcar min got qey bavê min min diceribîne, ez bi wê tirsê razam. Gava bû sibeh û ez ji xew rabûm, min dît ku ne li ba min e û hungulîska wî di tiliya min de ye. Hîna ji dîtina ewil ve min jê hez kir û eşqa wî ket dilê min de. Lê belê ji ber ku min rê nebîr ser wî û tu şopên wî nedîtî, ji wê rojê ve ez bi agirê eşqê û bêrîkirina wî dişewitim. Xew li min diherime, ez nema karim razê. Şev û roj, ji girî pê ve, ez tu tiştekî din nikarim bikim. Her şev, ji êvarê hetanî sibehê ez hêsiyan dirjînim û di nava bêçaretiya xwe de dişewitim. Çîroka min, ev e birawo!" Piştî dîsa hêsiyan barandin û got:

Dûrketina dildar jî gelo li xweşiya min diçe
Çêreya xezalê jî her li ser mêrg û çimenên dil e
Ji fikir û çavên xwe jî bi hesed im ez li ser te
Tu jî dizanî ku hinek reqîbên hinekan e li ser te
Mijank jî bi hest û dilin tîrên xwe diavêjne te
Kîjan ji wan jî biçikile dê şensek be ji bo te
Gelo dibe ku careke din jî bibînim ez wî rûyê te
Belkî ger hebe hîn jî şensekî min di dinyayê de

Ez ê raza te veşêrim di dil de li ber sînga xwe
Çiqasî dûr be jî tu ji min, her tu qublegeha dil î
Bedena te çiqasî dûr be ji min, tu jî ewqasî nêzikî

Gava Merzewan ev helbest ji xwişka xwe bihîst, pir bandor lê bû hes-
tiyar bû. Serê xwe berra ber xwe da û bi qasî demjimêrekê ponijî, bêyî bu
bizanibe dê çi bike, çi bibêje. Behetî mabû li rewşa xwişka xwe. Herî dawî,
serê xwe rakir û jê re got: “Çiroka te rasteqin e û serpêhatiya vî xortê ku te
behsa wî kir, fikra min şiyar kir. Ez ê li hemû bajar û welatan bigirim, ji bo
ku ez dermanekî ji te re bibînim. Îcar bêhna xwe fireh bike, metirse, belkî
Yezdanê Dilovan nexweşiya te li ser destên min rehet bike.”

Piştî Merzewan dua jê re kirin û xatir jê xwest, derket çû. Wê şevê li
mala diya xwe ma, li cem raket. Roja dîtirkê jî amedekariyên xwe kirin û
piştî dest bi rêwitiya xwe ya dûvdîrêj kir. Ji bajarekî çû yê din, ji giravekê
çû ya din û bi wî hawî, bi qasî mehekê geriya bê rawestan. Di ku re derbas
dibû, diçû kîjan bajarî, dibihîst ku xelk di nav xwe de dipeyivin û dibêjin
ku Bidûr Xatûnê dîn bûye, hişê xwe xwariye. Ew jî li dûv wan gotegot û
qîlûqalan çû hetanî gîhaşt bajarekî ku jê re digotin Teyran. Li wir bihîst
ku kurê Sultan Şehrîman-Heyva Zeman- nexweş e û ew nexweşiya wî jî bi
awayê dînbûnê li serê wî daye.

Gava Merzewan ev gotin bihîstin, ji hinek bajariyan li cih û warê
Heyva Zeman pirsî. Wan jî jê re got: “Li Cezayîrê, li giravên pîroz dimîne.
Di rêya deryayê re, mirov mehekê digihêje wir, lê heger di bejahiyê re tu
biçî, di şeş mehan de tê bigihêjî wir!”

Merzewan li keştiyekê siwar bû û berê xwe da giravên pîroz ên
Cezayîrê. Ba xweş lê dida û keştiya wan ji xweş bi rê ve diçû. Pir nêzikî pe-
ravê bibûn, lê bêşensiya wan ew bû ku li wê derê bahozeke ecêb li wan rabû
û keştiya wan quluband, ew û rêwiyan wê hemû binav bûn...

Li Şehrezadê bû sibe, wê ji gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 197'EMÎN

Şehrezadê berdewam kir û got:

Ji bo keştiyê û hemû rêwiyan bêşensî be jî, ji bo Merzewan şensê wî
lêda û pêlêke ava deryayê rahişt wî û li raserî qesra ku Heyva Zeman tê de
girtibû, ew avêt peravê. Wê rojê jî hemû mîr û emîr û wezîr û gizîrên Melîk
Şehrîman li dor wî kom bûbûn, ji bo ku xizmetê jê re bikin. Ew jî li ber
serê kurê xwe Heyva Zeman bû, serê wî xistibû himbêza xwe de. Wezîr jî li
hinda nigên wî bû, li ber şibakeya ku li behrê dinêrî. Carekê gava wezîr di
şibakê re li behrê nêrî, çavên wî li Merzewan ketin û dît ku di nav avê de, li

ber xwe dide. Xwe nêzîkî sultanê xwe kir û jê re got: “Te destur bida min, ez ê daketima hewşa qesrê, ji bo ku ez deriyê wê vekim û herim mirovekî rizgar bikim, beriya ku di avê de bifetise! Belkî ev kare xêrê bibe sebeb ku kurê te ji vî derdê xwe xelas bibe.”

Melîk Şehrîman got: “Ev tiştê bi serê kurê min de hat, hemû li ser rûyê te bû. Dibe ku tu here vî xerîbî rizgar bikî û ew jî here vê rewşa kurê min bi gotegotan li nav xelkê belav bike, razên me eşkere bike! Wê gavê jî ez ê şû-rekî li stûyê te bidim, serê te bifirînim beriya yê wî. Lewre tu sebeba hemû xerabiya ku bi serê me de tê, ey wezîr! De êdî here û çawa ji te re li hev tê, wisa bike, wezîro!”

Wezîr rabû ser xwe û bi lez çû hewşa qesrê. Deriyê derve vekir û bîst gavên dawî çû ber qiraxa avê. Li wir dît ku Merzewan hewldanên xwe yen dawî dike û li ber fetisandinê ye. Bi lez destê xwe avêt porê wî û ew jî nav avê kişand, derxist. Ruhê wî yê ku hindik mabû ji laşê wî derkeve, dîsa lê vegeriya û bi ser xwe ve hat. Wezîr, kincên wî di ser re anîn, kincin nû lê kirin û kofiyek ji kofiyên xulamên xwe da serê wî, ew xist teşeya mirovekî maqûl de. Piştî jê re got: “Te jî dît ku min tu ji mirinê xelas kir, êdî tu jî nebe sebeba kuştina min û xwe!” Merzewan şaşwaz bû, got: “Ew çawa ye?” Wezîr lê vegerand û got: “Niha tê jî bi min re were nav wezîr û emîr û gîzî-ran. Tê bibîne ku hemû bêdeng in û kes ji wan napeyive, hemû xemgîn in ji ber rewşa Heyva Zeman, kurê Melîk Şehrîman.”

Gava ku Merzewan navê “Heyva Zeman” bihîst, texmin kir bê kî ye, lewre berê jî pê hisiyabû û li dû wî digeriya. Merzewan got: “Heyva Zeman kî ye?” Wezîr lê vegerand: “Min ji te re got, kurê Melîk Şehrîman e, nexweş û hezhizî ye, li ber mirinê ye. Ne xwarinê dixwe, ne jî tiştêkî vedixwe. Pir hejar bûye û êdî şev û rojê jî ji hev dernaxe. Şev û roj di nava êş û azareke bêhawe de ye û me jî hêviya xwe jê birrîye, em li bendî mirina wî ne. Êdî tu jî qet lê nenêre, tenê li ber nigê xwe binêre, da ku tu nebe sebebê kuştina min û xwe!”

Merzewan got: “Tu bi Xwedê kî ka hinek agahî bide min, di derbarê vî xortî de! Gelo sebeba vê nexweşiya wî çi ye?” Wezîr got: “Ez sebeba nexweşiya wî nizanim. Lê tiştê ku ez dizanim, hîna ji beriya sê salan ve, bavê wî jê dixwest ku bizewice û wî jî qebûl nedikir. Rojekê, gava ku himber bavê xwe derket û bavê wî jî ew avêt zindanê, ji xew rabû û got şeva borî keçikeke pir spehî li kêleka min raketî bû ku ziman nikarin wesfê wê bidin. Digot min û wê, me hungulîskên xwe pev guhertine û ez dixwazim hûn wê ji min re binîn! Me jî nizanîbû bê bi rastî jî keçike wisa heye an na. Loma di wî halê xwe de ma û roj bi roj helîya, hetanî ku ket vê rewşê. Vêca tu bi qedrê Xwedê bikî gava em bi hev re derbasî hundurê qesrê bûn, tu li kurê Sultan nenêre. Lewre Sultan pir xemgîn e û dilê wî tijî kul û derd in.”

Merzewan, di dilê xwe de got: “Bi navê Xwedê, xortê ku ez lê digêrim ev e!”

Wezîr bi derenceya qesrê ve hilkişîya, Merzewan jî li pey wî çû hetanî ku derbasî eywana qesrê bû. Li wê derê, wezîr çû li ber nigên Heyva Zeman rûnişt. Merzewan jî meşa xwe berdewam kir hetanî ku hat ber serê wî. Li wir rawestiya û li nav çavên Heyva Zeman nêrî. Wezîr pir tirsîya û bi dizî çavek da Merzewan ji bo ku zû tê derbas bibe û ji wir here. Lê Merzewan hey mîna xwe kir û li nav çavên Heyva Zeman nêrî mîna ku hayê wî ji tiştekê tunebe. Di heman demê de, baş tê derxist ku xortê ew lê digere, ew e!...

Li Şehrezadê bû sibeh, wê jî dengê xwe birrî û ma bêdeng.

ŞEVA 198'EMÎN

Şehrezadê, vegotina çîroka xwe berdewam kir ji Şahînşahê mezin Şehreyar re:

Merzewan got: “Subhan ji wî re ku endama wî mîna ya wê, renga wî mîna yê wê; dev û lêv û rûçikên wî, mîna yên wê çekirine!” Heyva Zeman, çavên xwe vekirin û li hawirdora xwe nêrî. Gava Merzewan dît ku Heyva Zeman li gotinên wî guhdar dike, lêvên xwe ji ser hev rakirin û bi helbestî got:

Wisa xuya dike ku tu îro pir xemgîn û dilbiêş î
Lê vegotina derdan jî her tu bi ziman qet nabêjî
Gelo tîrên bêriyê li te dane an evîndarî tu
Xisleta dildaran ew e lew ku evînê veşêrî tu
De êdî ka bide min piyala meyê û ka bibêje
Bibêje û bistirê bi navê Selmayê lê eşkere neke
Lewre li ser wê bi xîretim ez dexesiya şalê wê dikim
Hesûdiya wan piyaleyên meyê dikim li ser lêvan
Zikreşiyê ji wan caman dikim ez li ber devan
Baş bizanibe ku ez ne bi şûrekî hatime kuştin
Kuştîyê tîrên awirên çavên wê me ez birawo
Dema min ew himbêz kir li ser nivîneke ji pembo
Ew bû ya ku germ dikir, hinavên min bi agiran
Ew bû ya ku axivî û tovên evînê xist hinavan
Di derbarê çîroka evîna negotî de axivî û gote min
Tu yî evîndarê vî dili lê eşkere neke tu sira min
Tu jî xwe ragire bira û nede nav avê hetanî çogan
Me nehetikîne qurban di nav xelkê de bi tewanan
Ji lewre min çavên xwe vekirin çawa ku dengê te hat
Min dest û dilê xwe ji te re vekir lê tu tê negîhaşt
Bê çawa xwîn diherike li şûna hêsiyan bi ser rû de

Li kefa destê min binêre û bibîne şopa xwînê li ser
 Xwezî wê ji rê bida vê girîxwîna min li ber
 Wê gavê bêêş dê biherikiyana hêsirên min li der
 Dê rizgar bibûya dilê min ji vê êşa dil û keder
 Lê belê beriya min ew giriya û rûmet ji min girt
 Bawer nakim ku minakeke din mîna wê hebe qet
 Yûsifê li Misrê ye ew bi husn û cemala xwe
 Dawid dişopîne ew belkî bi newayan xwe
 Mîna Meryem e bi dîlnazî û masûmîyeta xwe
 Bi sebra xwe mîna Eyyûb e ew pir berxwedat
 Loma rakirîye ser milên xwe barê giran êşa xedar
 Heger mirim ez bi êşa wê, tikan dikim wê nekujin
 Tenê jê bipirsin bê çawa qetla min lê helal bûya?

Ew gotinên helbestê Merzewan rastê rast derbasî nav dilê Heyva Zeman bûn û bandoreke mezin lê kirin, hiştin ku devê wî vebe û zimanê wî bigere. Keserek da û ji bavê xwe re got: “Bavocan, bila ev xortê ha li kê-leka min rûnê!”

Şehrîmanê ku despêkê de pir qeherî bû ji Merzewan û di dilê xwe de sûnd xwaribû ku serê wî bifirîne, di cîh de nerm bû û pê ve rabû, jê re got: “Derbasbûyî be xorto! Spas ji Xwedê re ku tu xelas bû ji wan pêlên behrê!” Piştî ew li rex kurê xwe da rûniştandin. Merzewan jî spasiya wî kir û dua jê re kirin bi temenekî dirêj û bextewar. Melîk Şehrîmanê jê pirsî û got: “Tu ji kîjan welatî yî?” Wî jî got: “Ez ji Cezayîrê me, ji welatê giravan, ji welatê şahê heft qonaxan.” Şehrîman got: “Ma hêvîya me Xwedê û xewna nivê şevê, belkî inşelleh rehetbûna kurê min li ser destê te be, ji vê nexweşiyê!”

Piştî Merzewan li Heyva Zeman vegeriya û di guhê wî de got: “Dilê xwe xwirt bike, bêhnê xwe fireh bike û bila dilê te jî bikeve cîh de. Gelo tu dizanî bê ew a ku ji bo wê tu ketîye vê rewşê, niha di çi halî de ye? Te ya di dilê xwe de êşkere nekiriye tu ketîye vî halî, lê wê, ya di dilê xwe de êşkere kiriye û dîn bûye! Niha jî di şert û mercên herî xerab de girtî ye û di zincîr û qeydan de ye. Hesinên zingarî di stûyê wê de ne. Lê Xwedê bê erê, dê dermanê nexweşîya we herduyan jî, li ser destê min be!”

Bi vê gotina Merzewan re, ruhê Heyva Zeman lê vegeriya û dîsa bi ser xwe ve hat, mîna miriyên ku ji tîrbê rabin. Îşaret da bavê xwe, ji bo ku wî ji nav nivînê rakin û wî bidin rûniştandin. Sultan zêde zêde kêfxweş bû bi vê yekê û kurê xwe di cîhê wî de da rûniştandin û du balîf dan bin çengên wî. Piştî ferman dan xizmetkaran ji bo ku bêhnên xweş bi qesrê dakin û bajâr jî bixemilînin.

Sultan ji Merzewan re got: “Hatina te, oxireke mezin tê de hebû kurê min! Hatina te, hatineke pîroz e ji bo me!”

Li gel wê jî, qedr û qîymetê wî pir girt û ferman da xizmetkaran ku şîveke xweş jê re bînin. Xwarin jê re anîn, wî û Heyva Zeman bi hev re xwarin.

Li Şehrezadê bû sibeh, wê jî dengê xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 199'EMÎN

Şehrezadê vegotina çîroka xwe berdewam kir:

Melik Şehrîman wê şevê, ji kêfa dilê xwe re li cem herduyan ma û li wir raket. Lewre pir dilşad bibû bi başbûna kurê xwe û xelasbûna wî ji wê nexweşiya dijwar. Loma bê navber û li ser hev ji Merzewan re digot: “Tu bi xêr hatî, ser seran û ser çavan hatî kurê min!” Lewre, bi xêra wî kurê wî dîsa li xwarin û vexwarinê vegeyabû. Vê yekê jî pir pir kêfa wî tanî û dilê wî xweş dikir.

Piştî Sultan ev mizgîniya xêrê û xweş da diya wî û hemû kesên di qesrê de. Herkes pir kêfxweş û dilşad bû bi vê mizgîniyê û şahîyeke gewre li dar xistin, ew roja ji rêzê zîvirandin rojeke cejnê.

Merzewan jî çawa ku sibehê ji xew rabû û taştîya xwe xwar, ji Heyva Zeman re got: “Ez derdê te dizanim û ez wê keçîka ku bi şev hatibû gel te û ketibû nav nivîna te nas dîkin. Navê wê keçîkê Bidûr e, keça Şahê heft qonaxan: El-Xeyûr e.” Dûvre, jê re behsa Bidûrê kir, ta bi derzîyê vekir û çîroka wê ji serî hetanî binî jê re vegot. Piştî lê zêde kir û got: “Ew jî pir ji te hez dike. Tu dildarê wê yî û çî hatibe serê te, heman tişt bi serê wê jî hatiye. Qet şik û gûman neke û bila dilê te aram be, lewre hûn herdû jî yên hev in. Vîna xwe xwirt bike û baweriya xwe bi min bîne, misoger ez ê we bigihînim hev, wek ku helbestkarekî jî gotiye:

Gava ku evîndarek ji yê dîtir veqete
Û ji ber êşa wê jî dîlnexweş bikeve
Ez wan digihînim hev û dikim yek
Mîna mîxekî herdu textan pevvedikim

Merzewan, dilê Heyva Zeman xweş kir, nav tê da û hêz dayê hetanî xwe komî ser hev kir û bi ser xwe ve hat, her car xwarina xwe di dema wê de xwar û vexwar û çû hemamê serê xwe şûşt, porê xwe jêkir û rîha xwe kur kir. Rûyê wî vebû, xwin pê ve hat û êdî sipehîbûna wî jî lê vegeyaya. Bavê wî jî kêfxweşiya xwe bi berdana girtiyan anî ziman û ferman da ji bo bajar bixemlînin.

Li Şehrezadê bû sibeh, wê jî gotina xwe birrî û ket bêdengiyê.

Şehrezadê vegotina çîroka xwe berdewam kir û got:

Weke me şeva borî jî got, Melîk Şehrîman pir kêfxweş bû bi başbûna kurê xwe û xelasbûna wî ji wê nexweşiya dijwar û ew roj kire cejn ji bo hemû xelkên bajêr. Girtiyên di zindanan de serbest berdan, bajar da xemilandin bi fermanên xwe, xelat û diyarî li her kesên derdora xwe belav kir.

Merzewan jî ji Heyva Zeman re got: “Mîrzayê min ê delal, divê tu baş bizanibî ku hatina min ji cem Bidûr Xanê hetanî vir, tenê ji bo vê mijarê bû. Min dixwest ku ez wê ji wê nexweşî û kul û kederan rizgar bikim. Niha jî ji bo ku em herin xwe bigihînin wê, tu rê li pêşiya me tunene ji xeynî riya ku em bi dizî biçin, lewre bavê te qebûl nake heger pê bihese. Loma bi mahneya çûna nêçîrê, divê tu xurcika xwe tijî zêr bikî li hespekî siwar bibî, alikarekî bigirî cem xwe û ji bavê xwe re bibêji ez ê herim beriyê, derkevim nêçîr û seyde da ku ez hebekî bêhna xwe derxînim. Dibe ku ez şevêkê li der jî bimînin, bila hayê te jê hebî, da ku tesewas bi te re çênebim.”

Heyva Zeman pir kêfxweş bû bi vê gotina wî û di cih de berê xwe da cem bavê xwe û destûr jê xwest, ji bo ku derkeve nêçîrê. Ev daxwaza xwe jî, bi heman şeweya ku Merzewan gotibû anî ziman. Bavê wî izin dayê û jê re got: “Zêdî şevêkê li derve nemîne û misoger sibe li min vegere, lewre tu jî dizanî ku debara min bêtî te nabê. Ji xwe tu jî dizanî bê ez di çî halî de bûm di dema nexweşiya te de û hîna jî ez bawer nakim ku tu ji wê nexweşiyê xelas bûye.” Piştî wan gotinan, bavê wî ev çend riste jî gotin:

Lew ku di nav xweşiya buhuşta baqî de bim

Lew ku xwedanê hemû mal û mulkê dinyê bim

Dîsa jî bê wate ne hemû tev li ba min

Gava ku salweqat çavên min li te nekevin

Piştî amadekariyên Heyva Zeman û Merzewan kirin û ferman da ji bo çar hesp ji wan re werin amadekirin li gel bendeyekî. Piştî av û xwarin jî ji wan re bar kirin, pêdiviyên wan temam kirin. Heyva Zeman, nehişt ku kes ji xizmetkarên wî pê re herin. Di xatirxwestinê de, bavê wî ew himbêz kir û jê re got: “Tu bi xatirê Xwedê kî, zêdeyî şevêkê dûrî malê nemîne! Jixwe di wê şevê de jî dê xew li min haram be.” Pê re jî hestiyar bû û bi helbestî axaftina xwe berdewam kir, got:

Hebûna te buhuşt e ji bo min buhuşt

Sebra bê te êşeke dijwar e ku ez kuşt

Ger sûcê min evîna te be qurban im ez

Lewre giran e sûcê min evîndar im ez

Gelo heman êşa nava min bi te re heye

Gelo kes heye mîna min disoje kes heye

Piştî xatirxwestinê Heyva Zeman, Merzewan û bendeyê xwe dan kê-leka xwe li hespên xwe siwar bûn û bi rê ketin. Av û xwarina xwe jî li deve-yekî kirin, ew û çend deve û hespên din jî bi xwe re birin, çûn.

Li Şehrezadê bû sibeh, wê jî gotina xwe birrî.

ŞEVA 201'EMÎN

Şehrezadê vegotina xwe berdewam kir û got:

Îcar Şahînşahê min ê bextewar, weke min got, Heyva Zeman û Merzewan berê xwe dan beriyê û meşîyan. Roja ewilî hetanî êvarê meşîyan. Piştî navber dan meşê rûniştin, xwarina xwe xwarin, ava xwe vexwarin, hesp û deveyên wan jî bêhna xwe berdan. Dûvre, dişa li hespên xwe siwar bûn û meşa xwe berdewam kirin.

Sê rojan li ser hev, meşa xwe bi wî hawî berdewam kirin. Roja çaran li çayîreke fireh rast hatin ku dar û daristan bû. Li wir peya bûn. Bêhna xwe berdan, xwarin, vexwarin û pêdiviyên xwe pêk anîn. Piştî Merzewan deveyek serjêkir, ew hûr hûrî kir, şalekî Heyva Zeman jê stend, ew di xwînê da, ew perçe perçe kir û li gel çend perçe kincên din, ew hemû li serê duriyanê avêtin, dûre rêya xwe berdewam kirin, dişa meşîyan.

Heyva Zeman li wê liv û tevgera hevalê xwe ecêbmayî ma gava ku sebeba wê yekê jê pirsî jî, hevalê wî Merzewan lê vegerand û got: “Tu jî baş dizanî ku bavê te pir ji te hez dike û gava ku tu şevêkê li derve bimînî û venegerî, wê di cih de bikeve pey şopa te û were hetanî ev cihê ku niha em jê rabûn. Îcar gava wan kincên te yên bixwîn û qetyayî bibîne, wê bêje belkî hinek rêbiran an jî ajalin dirinde tu kuştine û dê hevîya xwe ji te qut bike û bi şûn de vegere malê. Bi vê hîleya han, em ê jî bigihêjin meqseda xwe.” Heyva Zeman aram bû û got: “Te ya rast, kiriye. Her bejî ji te re!”

Ew meşa xwe bi rojan dewam kirin. Çiqasî rêya wan dirêj dibû, hê-viyên Heyva Zeman jî kêmtir dibûn û xemgîniya ser dilê wî kûrtir dibû, ditirsiya ku evîndara xwe nebîne. Rojêkê gava Cezaîrê ji wan ve xwiya kir û Merzewan mîzgînî dayê, jê re got ev Cezaîra Şah Xeyûr e, Heyva Zeman çoş û peroşdar bû û dest pê kir bi helbestî got:

Tu çawa aşîqekî jibîr dikî ku her tim tu di birê de yî
Çawa tu jê diqerî û ew hertim daxwazkarê te yî
Ger kiribe min bêbextî bi te re Xwedê bistîne canê min
Ger derew kiribe min li te bila Xwedê kor bike çavê min
Bêguneh im ez her gav lê mecbûr mam her di hicranê
Ger hebe jî gunehekî min va tême ez bi poşmanî
Tiştê erjeng ew e ku te ez berdame îro li vê derê

Roj û şev jî her bi kul tên ew mîna dema berê

Heyva Zeman, pir kêfxweş û şanaz bibû ku dê bigihana meqsedê xwe. Spasiyên xwe ji hevalê xwe re pêş keş kirin û pesnê wî da ji ber jêhatbûna wî.

Piştî ketin bajêr û çûn li xanekê peya bûn, bi qasî sê rojan bêhnra xwe vedan, ji bo ku hebekî bi ser xwe ve bûn, lewrê pir betilîbûn di wê rêwîtiya dûvdirêj de. Dûvre çûn hemamê, xwe şûştin, paqij kirin. Di pey re Merzewan çû kincên taciran anîn, li Heyva Zeman kirin, alet û edewatên lazîm jê re peyde kirin, Ûsturlabeke¹ zêrîn jî jê re çêkir, da destê wî û jê re got: “Mîrê min, here ber qesra Şah Xeyûr û bi dengê bilind gazî bike, bi-bêje ez im stêrikzan û Hekîmê zana, gelo heye kesî ku min dixwaze. Gava Melîk vê gotina te bibîhîze, wê di cîh de xulamêkî xwe bişîne pey te û wê te derbasî cem keça xwe ya nexweş bike, yanî maşûqa te Bidûr. Jixwe çawa ew te bibîne, wê di cîh de rehet bibe. Dê bavê wê jî pir kêfxweş bibe bi vê yekê û wê te pê re bizewicîne û wê mal û mulkê xwe bi te re parve bike, lewre wî ev şert dane pêş û sûnd xwariye ku wisa bike, bi ew kesê ku keça wî rehet bike.

Heyva Zeman bi ya wî kir, rabû ew kincên taybet li xwe kirin, rahişt aletên xwe û ji xanê derket, berê xwe da qesra Şah Xeyûr. Gava gihast cem qesrê, gazî kir û got: “Ez hekîm û zaneyê xeybê me; ez im ê ku nivîştan çêdike û hêviyên daxwazkaran pêk tînim; gelo kesekî ku vê ji min dixwaze heye?”

Li Şehrezadê bû sibehê, ew jî bêdeng bû.

ŞEVA 202'YEMÎN

Şehrezadê vegotina çîroka xwe berdewam kir:

Gava bajariyên derdorê ew gotinên Heyva Zeman bihîstin, hemû hatin lê kom bûn û ji xwe re lê nihêrin. Jixwe demeke dirêj derbas bûbû ku kesekî wisa nedîtibûn. Dema li qam û bejna wî ya lihevhatî, rûyê wî yê spehî û ciwantiya wî ya jîndêr nerîn dilê wan pê şewitî û jê re gotin: “Tu bi qedrê Xwedê bikî mîrzayê hêja û delal, vê yekê bi xwe neke û dev ji temahiya ku tu bi keça Şah Xeyûr re bizewice berde û xwe nede kuştin. Qey tu van serên daliqandî nabînî? Ev hemû di ber wê yekê de hatin jêkirin û tamahiya xwe-diyan wan, seren wan xwarin!” Xelk hemû li ber geriyan, lê wî bi ya xwe kir û dîsa gazî kir, bi dengê bilindtir qîriya û got: “Ez im ew hekîmê ku bi sererd û binerdê dizane û daxwazên daxwazkaran pêk tîne, gelo kesî ku min bixwaze heye an na?” Xelkên derdorê dîsa lê hatin hev, li ber geriyan,

¹ Ûsturlab: amûreke ku hertim bakur nîşan dide, mîna pûsûla roja îro ku Seyyah û keşîf van bi kar tînin. (Qîrnê 9-10)

lê belê wî guh neda tukesî û weke xwe kir. Gelê ku li dora wî kom bûbûn jî hêrs bûn, kirin qîrewir û gotin: “Tu xortekî pozbilind û debeng î, gotin bi serê te de naçin. Lê dîsa jî li ciwanî û spehîbûna xwe were rehmê û serhişkiyan meke!” Heyva Zeman dîsa qir kir û got: “Ez hekîm û zanayê her tiştî me, gelo kesî ku min bixwaze heye an na?”

Di wê naberê de, dengê qirewîra xelkê çû Şah jî. Şah Xeyûr gazî wezîrê xwe kir û jê re got: “Here wî hekîmê zemanan bîne vir.” Wezîr çû, Heyva Zeman anî ew derbasî hundur kir. Nuh Heyva Zeman derbasî cem Şah bû, bejna xwe jê re tewand û erda ber nigên wî maçî kir, piştî ev çend riste gotin:

Heşt heb lûtkeyên rûmetê hemû bendeyên te ne
Hîna jî bi daxwaz in giş xizmetkarên te ne
Bîr û bawerî, rûmet û şanazî tev yên te ne
Peyv û wate, serfirazî û gîpta her taca te ne

Şah Xeyûr bi heyrangorî lê meyzand û ew li kêleka xwe da rûniştandin. Piştî lê zivirî û jê re got: “Kurê min xwe neke hekîm û stêrzan û nekeve bin barê vî şertê min ê giran! Lewre min sûnd xwariyê ku kesê derbasî cem keça min bibe û wê ji nexweşiya wê pak neke, ez şûr li stûyê wî didin, serê wî jêdîkim. Îcar bila lihevhatibûn û ciwaniya te, te nexapîne. Willehî û billehî û tillehî ger tu wê rehet neke, ez ê serê te jêkim!” Heyva Zeman bêtirs û bê teredud got: “Ez şertê te qebûl dikim şahê min; lewre berî ez bême vir ez ji şertê te agahdar bûm.”

Şah gazî qazî û şahidan kir, hişt ku Heyva Zaman gotina xwe li ber wan jî dubare bike, piştî ew radestî xulaman kir û ji wan re got: “Wî derbasî cem Bidûr a şahbanû bikin!”

Xulamekî bi destê wî girt û ew derbasî dehlîzê kir, da ku wî bibe cem Bidûr a şahbanû. Heyva Zaman ewqasî bi lez diçû ku xulam li pey wî dima. Xulam got: “Bi nav Xwedê cara yekê ye ku ez dibînim yekî mîna te bi vê lezê diçe mirinê! Lê xuyaye tu nizanî bê çi bobelat li pêşiya te hene.” Heyva Zaman, berê xwe da xulam û got:

Zana me ez lê nezanê xeysetên te me ez
Şaşwaz û bêgan im nizamim çi bêjim ez
Nizanî tu lê heyv û rok e ew ne find û çira
Qet naçe ava tim ronahî ye ew lo bira
Spehîbûneke kamil e ya wê nayê wesifdan
Tevde bi lerz in wesifkarên wê bê ziman

Li Şehrazadê bû sibeh, wê jî gotina xwe birrî.

Şehrezadê vegotina çîroka xwe berdewam kir:

Xulam da pêşiya Heyva Zeman û ew kir odeya Bidûr Xanê, ew li ber perdeya li ber derî da rawestandî. Heyva Zeman li pişt perdeyê sekinî û ji xulam re got: “Gelo kîjan dê baştir be ji bo te. Ez ji vir xatûna te rehet bikim, ango derbasî hundur bibim û ji wir wê rehet bikim?” Xulam şaşwaz û behetî ma li hember vê gotina wî. Hinekî ramiya, dûvre lê vegerand û got: “Heger tu bikaribî ji vê derê, ji pişt perdeyê wê rehet bikî, ev yek dê hostetîya zanîna te û radeya hekîmtîya te diyar bike!”

Heyva Zeman li wir rûnişt, hibr û pênûsa xwe derxist û li ser kaxezeke dest bi nivîsekê kir, ev çend gotin nivîsandî: “Kesa ku birîna wê ji ber firaqê be, dermanê wê dilsozî ye. Kesê ku bêhêvî bûbe ji jiyane, tu derman ji dilê wî yê xemgîn re nîne. Dê çavên wî her bêxew bimînî û kerbên wî hey dê biserkevin. Dê rojên wî agir, şevên wî azar bin. Dê laşe wî yê hejar ji bêhal bikeve, bêyî ku qasîdek an ji evîndarek ji ev rist lê zêde kirin. Piştê bi helbestî jî ev rist lê zêde kirin:

Dinivîsînîm bi dilekî ku dîn û har bûye li ser te
Mijangên ku kul bûne ji xwînhêsirên li ser te
Laşekî ku kincin ji êş û bêrîyê li xwe kirine
Û ev şapîka ku bedena hezhizî ji te vedişêre
Gazî ji eşqê kir min gava ez kuştîm bi agirê te
Tîştêk ji min re nema çî bikim ez ji birîna te
Dexilê te me ez li min were rehmê rehîm î tu
Dil perçe ye hinav bi xwîn e hekîmê min î tu

Li biniya vê helbestê jî weha nivîsand: “Dermanê dilan, hevdiîna evîndaran e. Kesê evîndarê wî dev jê berde, Xwedê alîkarê wî be. Kî ji me bêbextiyê bike, nagihêje armancên xwe. Evîndarê dilsoz her dem xweşîktir e ji evîndarê bêbext.”

Di beşa dawî de jî weha nivîsand: “Ji evîndarê dilsoj û cegerbiêş, hey-rangorîyê te yê ku bêrî û evîne ew hêsir girtiye, ji Heyva Zeman kurê Melîk Şehrîman, bo yekemîna zemanê me û xweşîktirîn jina rind û dilsoz, keça Şah Xeyûr Bidûr a Şahbanû! Divê tu bizanibî ku şevên min bêxew derbas dibin û rojên min jî her agir in. Eşq û evîna min her zêde dibe, lê laşe min jî her ku diçe lawaztir û hejartir dibe. Gotinên agirîn li pey hev dertên ji devê min, keser jî ji wan bêtir in. Ez hesîrê eşq û cefayê me, kuştîyê veqetînê me; rikebirê bêbextan, aligirê evîndaran. Ez im ew ê xew bi çavên wî nabe û êş ji dilê wî kê nabe. Ne agirê dilê min vedimire û ne jî pêtên evîna min kê dibin” Dûvre di qiraxa kaxeza xwe de, weha nivîsand:

Silavî giranbûha û nerm û watedar

Bo dermanê dilan, ew keça evîndar
Li qiraxa dîtirkê ji ev beyt nîvisandin:
Hungulîska ku nîşaneyê me bû ji te dişînim
Tu jî ya gel xwe bişîn da ku te bibînim!

Pîştî nivîsa xwe qedand, hungulîska ku ji tiliya Bidûr Xanê derxistibû û xistibû tiliya xwe ji destê xwe derxist, xist nav kaxetê, ew li hev pêça û da destê xulam...

Li Şehrazadê bû sibeh, wê jî gotina xwe birrî.

ŞEVA 204'EMÎN

Şehrezadê berdewam kir:

Xulam, kaxeza pêçayî ji dest Heyva Zeman girt û ew bir, da destê Bidûr Xan. Wê jî kaxez ji destê wî girt û vekir; dît ku hugulîska wê bi xwe tê de ye! Bi çûş û kelecaneke mezin kaxez xwend û têgihişt ku evîndarê wê Heyva Zeman, li pişt perdeyê sekinî ye. Bêhna wê hate ber wê û dilê wê rehet bû. Jî kêfxweşiya xwe dest pê kir û helbestek xwend, got:

Poşman bûme ez ji wê hevveqetîna me
Qirnek bû gelo, çiqasî dirêj bû ew firaqa me
Sal û meh çûn lehî rabûn ji hêsirên me
Sûndxwar im ez ger rojekê pevkevin çavên me
Ez ê qurbanekê bidim da ku sax be serê me
Ji kêfan re digirîm, şahiyê êriş kiriye ser me
Ev çavên reben çima digirîn ji kêfan bêlome
Nexwe bi rastî jî girî ye remza kêfa me

Çawa Bidûr xanê ew helbesta xwe xwend, bi çûş rabû ser xwe herdu nigêr xwe spartin dîwêr û bi herdu destê xwe zincîra stûyê xwe kişand bi hemû hêza xwe. Zincîr qetand û ji nişkê ve ji pişt perdeyê derket, xwe avêt himbêza Heyva Zeman û bi hemû germahiya xwe ew maçî kir ji lêvan û pê re got: “Gelo ez di xew de me ango rastî ye ew? Naxwe di dawiyê de Xwedê li me hat rehmê û em gîhandin hev!” Piştî bi dûvdirêji spasdariya xwe peşkeş kir ji Xwedayê xwe re ku ew gîhandine hev piştî bêhêvîyeke kujer.

Gava ku xulam çaw li wê dimenê ket û şahbanûya xwe di wî halê nû de dît, bi lez bazda û şûn de çû cem şahê xwe Xeyûr. Bejna xwe li ber wî tewand û erda bin nigên wî maçî kir û jê re got: “Şahê min ê bextewar! Bawer bike ev hekîmê stêrzan, zanayî herî mezin e di nava stêrzanan de! Vî ciwanmêrî ji pişt perdeyê keça te rehet kir, bêtî ku derbasî cem wê bibe!”

Şah ji xulamê xwe re got: “Ev tiştê ku tu ji men re dibêji rast e gelo?” Xulam lê vegrand û got: “Mîrzayê min tu dixwazî ka tu bi xwe rabe û binê-

re bê çawa wê bi xwe zincîrên xwe qetandine û derketiye hekîm himbêz û maç dike.” Kelecaneke mezin laşe Şah dagir kir. Di cîh de rabû ser xwe û çû, derbasî cem keça xwe bû. Gava çavên keça wî pê ketin ser porê xwe girt û li ber wî rabû ser xwe, piştî bi helbestî got:

Hez nakim ez ji tenêtiyê tu jî dizanî
Lewre sifateke Xwedê ye ev tenahî
Ma qey kî tê bîra min ji xeynî Şah î
Qey ne tu yî warisê pêxembaran î

Bavê wê pir kêfxweş bû bi saxî û selameta keça xwe, ew maçî kir ji eniya wê, lewre pir hez dikir ji keça xwe. Piştî li Heyva Zeman zîvirî, pê şa bû, li hal û wextê wî pirsî û jê re got: “Tu ji kîjan welatî yî?” Heyva Zeman rewşa xwe jê re vegot, agahiyên di derbarê xwe de danê, got ez kurê Melîk Şehrîman im û ta bi derziyê vekir, çîroka xwe ji serî hetanî binî jê re rêz kir; çawa ew û keça wî Bidûr gîhane hev, çawa hungulîskên xwe pev guhertine, çawa ji hevdu qut bûne û çawa li pey hev ketine. Şah şaş û metal ma li himberî wê rewşê, piştî got: “Divê ev çîroka we were tomarkirin, da ku bibe dîrok û hemû nîfşên li pey we jî vê çîroka bixwînin!”

Piştî Xeyûr ê Şah, di cîh de gazî şahîd û qazîyan kir, mehra Bidûr û Heyva Zeman birrî û ferman da ji bo bajar were xemilandin û kêf û şahî werin lidarxistin hetanî heftiyekê. Sifreyên xwarinê raxistin û sênîk rêz kirin. Leşker kom bûn û xelk jî ji çar hêlên welêt herikîn bajêr ji bo pîrozbahîkirinê.

Di encamê de jî Heyva Zeman derbasî cem Bidûr Xanê bû û her du pev şa bûn, gîhan miradê xwe. Şah Xeyûr jî pir kêfxweş bû bi zewaca keça xwe û şikir ji Xwedayê xwe re kir ku saxî û selametiya wê lê vegerand û hişt ku dilê wê bikeve xortekî rind û hêja; kurekî milûkan.

Wê şevê, Heyva Zeman û Bidûr Xanê ketin nav heman nivînê de, pev şa bûn, hevdu himbêz kirin û ramûsan dane hev hetanî sibehê. Her du pir spehî bûn û gelekî jî dişibiyan hev, mîna ku çêwîyên hev bin. Gava xwe di ber hev re dirêj dikirin, mirov dil ji wan tunebû li wan binêre!

Roja dîtirkê, Melîk ezîmeyeke mezin çêkir, hemû xelkê Cezaîrê hundurîn û Cezaîra derveyîn vexwendin ser wê ezîmeyê. Sifreyeke mezin raxistin û xwarin rêz kirin li ber wan. Ev sifreya xwarinê mehekê sax raxistî ma.

Rojekê Heyva Zeman bavê xwe di xew de dît. Di xew de bavê wî jê re digot: “Kurê min ma mirov wisa bi bavê xwe dike?” Piştî bi helbestî bavê wî ev rist jê re digotin:

Heyvên şevan şivanên min in êdî bi çûna te re
Mijangên min jî bûne parazvan ji çavên te re
Sebir bike dilo belkî li min vegere ew bi rojê re

Sebir bike kezeba min fereca xêrê ne dûr e

Gava Heyva Zeman dît ku bavê wî lomeyan jê dike, pir xemgîn bû û çû ev tişt ji jina xwe re jî got, pêre parve kir...

Şeveqê lê da, Şehrezadê jî gotina xwe birrî.

ŞEVA 205'EMÎN

Şehrezadê vegotina çîroka xwe berdewam kir û got:

Vêca gava Heyva Zeman di xew de dît ku bavê wî lomeyan jê dike, xemgîn bû. Rewşa xwe ji jina xwe re got, piştî herdu bi hev re çûm cem bavê Bidûr Xanê, mijar bi wî re jî parvekir û izin jê xwest, ji bo rêwîtiyê. Melîk jî izin da wî. Bidûrê ji bavê xwe re got: "Bavocan, sebra min bêyî wî nayê û ez jî dixwazim pê re herim!" Bavê wê lê vegerand û got: "Bila be keça min, tu jî pê re here!" Û izin da wê ku pê re here û salekê sax li wir bimîne. Dûvre jî got: "Her salê carekê, were bavê xwe bibîne!" Bidûrê, ev şertê bavê xwe qebûl kir, Heyva Zeman jî tev li wê bû.

Melîk fermaneke lezgîn da, ji bo amadekariya rêwîtiya wan. Karmend û xizmetkaran jî bêsekin ferman pêkanîn. Kel û pelên ku dê ji wan re lazim bibana amade kirin; hespên kedîkirî û jêhatî, qantir û deveyên dermale derxistin ser rê, hodecek li ser deveyeke sipî çêkirin ji bo Bidûr Xanê; xwarin û vexwarina wan bar kirin, her tiştên wan di demeke kurt de têkûz kirin.

Beriya bi rê kevin, Melîk zavayê xwe girt, xezîneyeke zêr û zîv dan wî, sênîyeke ku bi cewheran neqîşandî bû, diyarî wî kir û jê xwest ku ji keça wî re qenc be û lê miqate be. Dûvre, bi wan re derket meşê hetanî bi derveyî bajêr û li wir, destpêkê xatir ji Heyva Zeman xwest, piştî derbasî cem keça xwe bû, ew himbêz kir, giriya û got:

Sebir bike ey telebkarê firaqê melezone
Şahiya aşiqan ramûsan e hespê nebezîne
Hêdî biçe bizanibe ku felek bêbext e ew
Dawiya eşq û aşiqan jî her firaq e ew

Piştî ji cem keça xwe derket û dîsa li zavayê xwe Heyva Zeman vegeriya, careke din ew himbêz kir, maçî kir û oxir jê re xwest, ew bi rê kir. Ew jî li gel leşkerên xwe dîsa vegeriya bajarê xwe.

Heyva Zeman û kesê pê re jî, xulam û xizmetkar û parêzvanan, ketin ser rê de û meşyan û hey meşyan. Piştî mehekê ji rêwîtiyeke zor û zehmet, xwe gihandin devereke xweş ku hemû çayir û çîmen bû. Li wê deverê rawestiyên, barên xwe danîn, bêhna xwe vedan û raketin.

Di dema raketinê de Heyva Zeman derbasî hodeca Bidûr Xanê bû, dît ku ew jî razayî ye. Fîstanekî hevrêşim î dîweder li ser bû ku laşe wê giş tê re xwiya dikir. Kofiya wê ya ku bi zêr û cewheran xemilandî bû jî hîna li serê wê bû. Ba ketibû bin fîstanê wê de, ew berjor ve hildabû heta bi nafikê û newqa wê ya spî mîna berfê, derketibû holê. Tew herdu çimên ji mermer, qet nedihatin vesifdan. Heyva Zeman coşiya û har bû, wek ku agirek bi nava wî ketibe. Xwe nema li ber wê pêla hestan girt, bi helbestî got:

Hilma wê bûye agir bilind bûye hewar e
Pêtên wî gur bûne di dil de rivîn û ar e
Gelo dixwazî bibînî tu herdu mermeran
Gelo dixwazî vexwî tu ava zemzeman

Heyva Zeman destê xwe danî ser girêka kirasê wê û ew kişand. Girêk vebû, wî jî kiras da alî. Di wê navberê de tişteki bala wî kişand gava ku girêka kirasê wê vekir; lewre kevirekî sorik mîna cewherekî bi serê bene kirasê wê ve bû ku nivîsek li ser bû û nedihate xwendin. Heyva Zeman li wî kevirkê sor ecêbmayî ma û di dilê xwe de ji xwe re got: “Heger qîmeteke mezin a vî kevirkî li ba wê tunebûya, ew bi serê benê kirasê xwe venedikir! Misoger qîmetekî mezin dide vî kevirkî ku ew bi devera herî girîng ve girêdaye ji bo ku jê veneqete û wî wenda neke! Gelo sirê di vî tiştî de çi ye û çima ew wisa veşartîye?

Heyva Zeman, ew kevirkê sor ji benê kirasê wê vekir û ew bir derve, da ku li ber ronahîyê lê binêre û çêtir bibîne...

Li Şehrezadê bû sibeh, wê jî navber da çîroka xwe.

ŞEVA 206'EMÎN

Şehrezadê vegotina çîroka xwe berdewam kir:

Heyva Zeman ew kevirkê sorik bir ber ronahîyê û kûr kûr lê meyzand. Di wê navberê de teyrekî hat ew kevirk ji destê wî girt û ew bir. Lê zêde neçû, li erdê danî. Heyva Zeman li ser wî kevirkî tirsîya, li dû teyr ket ji bo ku wî bîne. Lê çawa ku ew nêzikî teyr bû, teyr firiya û çû li devereke dûrtir danî. Heyva Zeman jî dev jê berneda û li pey wî çû û çû. Lê her ku nêzikî teyr dibû, ew disa difiriya û diçû devereke din datanî. Bi wî hawî wî teyrî gir bi gir, newal bi newal Heyva Zeman li dû xwe gerand hetanî ku şev hat û tarî ket erdê de. Teyr li ser darekê raket, Heyva Zeman jî li binya wê pal da, lewre pir westiyabû û ji hal de ketibû. Ji aliyekî din ve jî pir birçî bûbû û qudûmên wî nema dişuxulîn. Xwest ku bi şûn de vegere, lê şev ketibû erdê û wî ji nizanîbû bê ew li ku ye. Di binya wê darê de raket hetanî sibehê. Çawa ku sibehê ji xew şiyar bû û rabû ser xwe, bala xwe dayê ku ew teyr ji ser darê firiya. Rabû da dûv wî û li pey çû. Teyr jî her gav fira xwe, li gorî

leza Heyva Zeman eyar dikir û li gora wî jî li erdê datanî. Heyva zeman ew yek dît û ji xwe re got: “Bi navê Xwedê ev tiştekî ecêb e! Ev têyrê han doh pir bi lez diçû û îro, ji ber ku dizane ez betilî me, hêdî hêdî diçe! Misoger divê ez li pev vî teyrî herim hetanî ez tiştekî jê fêm bikim, lew ku ew min bibe ser mirina min jî!”

Bi wî hawî Heyva Zeman hey li pey wî çû û teyr jî her firiya û danî bêtî ku xwe ji ber çavên wî bixe. Her ku tarî dikete erdê û şev dihat jî, li ser darekê diniviya, Heyva Zeman jî li binya heman darê radiket. Heyva Zeman, deh rojan bi wî hawî li pey wî çû. Çi diket ber wî de dixwar, av biketa ber de jî vedixwar. Piştî deh rojan gihîştin bajarekî şên. Teyr, bi lez firiya û di ser wî bajarî re çû, derbas bû. Heyva Zeman jî şopa wî wenda kir, nema dizanibû bê ew bi ku ve çû. Şaşwaz û behetî ma, ji xwe re got: “Hemd ji Xwedê re ku ez gihandim vî bajarî!” Piştî çû ser avekê, li ber rûnişt, dest û lingên xwe şûştin, peşkek av bi ser çavên xwe dakir, bi qasî seetekê bêhnê xwe veda; hebekî ponijî. Xweşî û rehetiya ku ew berê tê de bû anî ber çavên xwe. Ew xweşî û rewşa ku ew tê de bû bi westandin, birçîbûn û xerîbiyê da ber hev û êşa dilê xwe tewiland. Piştî bi helbestî got:

Tiştê ku min ji ber wê veşartibû derket holê
Xew jî dinisile ji çavên min ji ber tehbê
Gava fikaran dilê min qels kirin min kire gazî
Wer meke ey felek nestîne ji min û nede bi dizî
Ger sultanê evînê hakimekî adil be ji bo min
Xew û xewn û xweşî qet dûr nediketin ji çavên min
Xwe ragire ezbenî û zêde neke fişarê li ser min
Dilxwazê ezîzekî bin ku vîna gel e ew mîna min
Xwe bi ser min de tavêtin ew keçên xama
Lê qet min guh nekir li wan rojekê ne jî bi ya wa
Gotin evîndar bûyî tu, lew tu xwe bipêçî bi êşan
Lê Xwedê dizane ku min ew bijart ji nava gişan

Dûvre jî rabû ser xwe û di deriyê bajêr re derbasî hundur bû.

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî.

ŞEVA 207'EMÎN

Şehrezadê berdewam kir û got:

Wek me got, Heyva Zeman derbasî bajêr bû bêtî bizanibe wê bi ku ve biçe. Di deriyê bejahîyê re derbasî bajêr bû û zikak bi zikak li nava bajêr geriya hetanî ku di deriyê deryayê re ji bajêr derket. Jixwe bajar li kêleka deryayê bû, mîna zimanekî bi nava avê de diçû. Di seransera wê meşa xwe de, kes î ji xelkê bajêr ew pêşwazî nekir, wî jî meşa xwe berdeqam kir hetanî

ku gîhaşt nav bistanên bajêr. Di nav şîndaran re derbas bû hat li ber deriyê Bistanekê sekinî. Xwediyê bistên xêrhatina wî kir û jê re got: “Şîkir ji Xwedê re ku bi saxî û سلامتî tu ji nav lepên xelkên vî bajari filitiye! De êdî zû were derbasî nav bistan bibe berî ku hinek te bibinin!”

Heyva Zeman derbasî nav bistan bû, lê belê şaşwaz û behetî mabû li wê gotina Bistanî. Hîna bêhna xwe bernedabû ji Bistanî re got: “Çi çîroka xelkên vî bajari heye?” Bistanî got: “Xelkên vî bajari hemû mecûsî ne, ateşperest in, tu bi Xwedê kî ka ji min re bibêje bê te çawa xwe gîhandiye vir û çima tu hatiye welatê me?” Heyva Zeman ta bi derziyê vekir û çîroka xwe ji serî hetanî binî jê re vegot. Bistanî ecêbmayî ma li wê çîroka wî û jê re got: “Binêre kurê min! Welatê musulmanan pir dûr e ji vir. Ji vê derê divê tu herî deryaya girava Ebenos û ji wir incex tu bikaribî xwe bigihîni cezaîra nemir û sultanê wê Şehrîman.”

Heyva Zeman, bi qasî seetekê bi xwe re ponijî û li dawiyê ji xwe re got: “Ya baş ew e ku ez li cem vî Bistanî bimînim û bi nêvî di bistanê wê de bixebitim.” Piştî li Bistanî zivirî û jê re got: “Gelo tu min qebûl dikî ku ez weke cotkarekî di bistanê te de bixebitim bi nêvî?” Bistanî lê vegerand û got: “Ser serê min, ser çavê min!”

Piştî rêbaza avdanê nîşanî wî da û ew fêr kir bê wê çawa koncalên avê di nava daran de veke. Heyva Zeman jî zû fêrî cotkariyê bû û dest bi avdana daran kir. Carinan jî rahişt tefşo heşîş birrî, gîha da hev, ew kir dêz. Bistanî jî berdêlkek şîn da wî ji bo di ber kar de li xwe bike. Berdêlka wî hetanî bi kabokê dadiket û rehetî dida yê di kar de.

Heyva Zeman êdî bûbû cotkar û kare avdanê dikir. Her roj jî doponijî, xemgîn dibû, digiriya û helbest digotin, di derbarê dildara xwe Bidûr de. Yek ji wan helbestan jî ev bû:

Sozeke we hebû ji min re gelo we ew pêk anî
Gotineke we hebû li gel min gelo we ew bi cîh anî
Li ber hukmê evînê me şevîn girt hûn raketin
Diyar e ku şevîn û xew cuda ne ji hev ne yek in
Hebû me peymanek em veşêrin doza evînê
Lê Beko hûn xapandin em terqiyan li vê dinê
Ey dostên tengahî û firehîyê, meqsed hûn in
Dilê min ji eşan nabe xalî û derman jî her hûn in
Xwezî ew jî heydar bûya ji vê rewşgeha min
Çavên her kesî ne kul û eşin mîna çavên min
Dilê her kesî jî her li pêş e mîna vî dilê min
Wê zulum kir li min û got eşq û evîn her zalim e
Bêgûman hûn jî rast dibêjin lê Xwedê alim e
Wensa dildarekî bînin ku felek pê re nalîkar e

Lew ku agirekî gur di nava wî de her li dar e

Heyva Zeman di wî halî de bû; îcar em vegerin ser rewşa jina wî Bidûr Xanê, keça Şah Xeyûr...

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî.

ŞEVA 208'EMÎN

(Çîroka Bidûr Xan û Jîyan Xanê)

Şehrezadê vegotina çîroka xwe berdewam kir û got:

Bidûr Xanê çawa ku ji xew rabû, gazî xulamê xwe kir û jê xwest ku gazî mêrê wê bike. Xulam çû li Heyva Zeman geriya, lê ew nedît. Di wê navberê de bala Bidûr Xanê çû ser kiras û delingê wê yê vekirî. Bi benikê wî girt, destê xwe lê peland, dît ku ew kevirkê sorik ne pê ve ye! Di dilê xwe de got: “Îcar ev çi ye? Xwedêyo! Ne be ku mêrê min ev kevirkê sor bi xwe re biribe û çûbe bêyî ku raza kevirk bizanibe!” Gava xulam ew agahdar kir û jê re got: “Xatûna min, mêrê te nexuyaye!” Bidûrê tirsîya û ji xwe re got: “Gelo bi ku ve çûye? Ez baş dizanim ku ew seetekê tenê jî debar nake bêyî min, vêca wê bi ku ve çûbe? Laneta Xwedê li wî kevirkî û li wê seeta ku min ew bi doxîna xwe vekir bê!”

Bidûr Xanê, demeke dirêj ponijî, piştî di dilê xwe de got: “Ger ez derkevim nav rêwiyên bi me re û ez ji wan re bejim mêrê min wenda bûye, dibe ku çavên xwe berra min bidin. Bêgûman divê ez hîleyekê, rêbazeke xelasîyê ji xwe re bibînim.”

Qasekî din fikirî, piştî rabû ser xwe, kincên mêrê xwe li xwe kirin, kofîya wî da serê xwe û destmalek li rûyê xwe gerand, cêrîyek jî xist şûna xwe, ew di texterewanê de bi cî kir û ji çadîra xwe derket, bi ser xulaman de qîriya, hespê xwe xwest. Hespê Heyva Zeman jê re anîn, lewre her kesî ew wisa naskir û kesî tu gûman jî jê nekirin. Jixwe her du jî pir dişibîyan hev-dû. Bidûr Xanê li hespê xwe siwar bû, gazî çend xulamên din jî kir û ji wan re got: “Barê xwe bar bikin, hemû amedekariyan bikin em ê bi rê kevin!” Piştî ku amadekarî qedîyan, kerwan, dîsa ket ser rê de û meşîyan.

Bidûr Xanê û kerwanê xwe meşa xwe berdewam kirin şev û roj, hetanî gîhan raserî bajarekî ku li kêleka behrê bû. Li wê derê rawestîyan, peya bûn, barên xwe danin û çadirên xwe vegirtin ji bo bêhnvedanekê, lewre bi rojan bû ku dimeşîyan. Bidûr Xanê çend xulam şandin ji bo di derbarê bajêr de lêpîrsînekê bikin û hinek agahîyan binîn. Xulam çûn û hatin, go-tin: “Ev bajar, bajarê Ebenos e û şahê vî bajarî jî Melîk Ermanos e. Keçeke wî jî heye, navê wê Jiyan Xan e.”

Melik Ermanos bi xwe jî qasidek şand cem wan û ji qasîde xwe re got: “Here binêre bê ev kerwan kerwanê kê ye û çima hatina li kêleka bajarê me konên xwe vegirtine?” Qasîd hat cem wan û pirsî melîkê xwe ji wan re got. Wan jî jê re gotin: “Here ji melîkê xwe re bibêje, ev kerwan, kerwanê kurê şahê ye ku rêya xwe şaş kiriye.” Qasîd vegeriya cem melîkê xwe û peyama wan jê re got. Melik Ermanos rabû ser xwe, gizîr û wezîrên xwe da tengala xwe û ji bo pêşwazîkirinê çû cem wan. Gava ku Melik Ermanos gîhaşt nêzikî çadîran, Bidûr Xan ji hespê xwe peya bû. Melik Ermanos jî peya bû û silav li hev kirin, hal û wextên hev pirsîn. Piştî Melik Ermanos ew dan kêleka xwe û ew derbasî bajarê xwe kirin, ew birin qesra xwe û ferman da xizmetkar û xulaman ku Bidûr Xanê bibin odeya mêvanan. Li wê derê xwarin, vexwarin, xwe şuştin û sê rojan bêhna xwe vedan. Roja çaran Melik Ermanos derbasî cem Bidûr Xanê bû, ji bo ku pê re biaxeve. Wê rojê jî Bidûrê çûbû hemanê, serê xwe şuştibû û pir spehî bûbû; rûyê wê bûbû mîna heyveke li çardehan ku dilê her kesî ji wan didizî...

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî.

ŞEVA 209'EMÎN

Şehrezadê berdewam kir û got:

Çawa ku me şeva borî jî got, gava Melik Ermanos Bidûr Xanê di nava wan kincên hevrêşimî, ên ku hatibûn xemilandin bi zêr û zîv û mûcewhe-
ran de dît, şaşwaz bû li himber spehîbûna wê. Melik jê re got: “Kurê min, çawa ku tu jî dibînî vaye ez bûme kalekî pîr û xwedê zarok nedane min ji xeynî keçeke ku di temenê te de ye û mîna te xweşik û lihevhatî ye. Ez jî bêhêz bûme û ez nema dikarim kar û barê rêveberiyê bikim. Gelo tu dikarî li vir li welatê me bimînî, bi cîh bibî û bi keça min re bizewicî, ez ê jî textê hukmê xwe bidim te, tê bibe Sultanê vî welatî li şûna min?”

Bidûr Xanê ket ber fediye de, serê xwe berra ber xwe da, hebekî ponijî û ji xwe re got: “Îcar ez ê çawa bikim, dikarim çi bikim û ez jin im? Heger ez piştî xwe bidim wî û rêwîtiya xwe berdewam bikim herim, dibe ku artêşekê bi dûv min de bişîne û min bikuje, heger ez rastiye jî jê re bibêjim, ez ê bihetikim! Dildar û hevserê min Heyva Zeman jî wenda bûye û tu agahî jê tunene, gelo ez çi bikim? A baş ew e ku bi ya wî bikim û li vir bimînim hetanî ku Xwedê Teala rêyeke xelasiyê nîşanî min bide.” Piştî serê xwe rakir û teklîfa wî pejirand. Melik pir kêfxweş û dîlşad bû bi vê bersiva wê ya erênî û ferman da mûnadi² ku vê fermana wî bigihîne hemû xelkên Cezaîra Ebenosê. Ferman da xulam û xizmetkaran jî ji bo ku gazî mîr û emîr û ser-

2 Mûnadi: Bangeşkarê ku li nav bajêr digere û bi dengê bilind fermanên sultan ji xelkê re radigihîne

kirde û serdar û qazî û karmendên dewletê bikin, da ku di huzûra wan de desthilatdariya welat radestî Bidûr Xanê bike.

Pê re jî sikakên bajêr hemû xemilandin, şad û şahî li dar xistin û mizgînî li seranserê welat belav kirin. Bi fermana Melîk, kincekî melîkî li Bidûr Xanê kirin û ew li ser textê desthildariyê dane rûniştandin di nava dêlindêzeke muhteşem de. Mîr û emîr û gizîr yeko yeko derbasî cem Bidûr Xanê bûn. Kesî tê dernexist ku ew jin e û hemûçik jî li xweşikbûna wê behetî man. Kê lê meyzand, delingê xwe şil kir ji ber spehîbûna wê.

Piştî ku dêlindêza desthilatdariyê bi dawî bû û Bidûr Xan bi fermî bû Sultanê Ebanosê, Emîr Ermanos jî dest bi amadekariyên zewaca keça xwe kir û daweteke pir mezin ji bo wê û emîrê nû li dar xistin. Piştî çend rojekî jî, Bidûr Xanê derbasî cem keça wî Jiyan Xan kirin. Gava herdu hatin gel hev, mîna du heyvan, mîna du rojan spehî xuya dikirin. Derî li ser wan girtin, perdeyên şibakeyan berdan xwarê, doşek û nivîn raxistin û agir bi mûman xistin.

Gava ku Bidûr Xanê li gel Jiyan Xanê rûnist, dildarê wê hate bîra wê, xemgîniyeke kûr xwe berra nava wê da, hestiyar bû û got:

Qelaqa dilê min zêde dibe ey rêwiyê wenda
Hêz û qewet nema hêviya min ji maye Xweda
Çavên ku ji êşê dijenin ji ber wê bêxewiyê
Li ber pêlên hêsiyan diçin êdî xwezî bi bêxewiyê
Bi çûna we re dil şikiya û çav miçiqîn
Îro li ku ye tu, çi bi te hat, gelo heye mizgîn
Ne ev çemên hêsiyan bûya agir digirte erdê
Agir agirê vî dilê hejar e wellahî bi Xwedê
Ez giliyê te li ba Xwedê dikim wendabûyo
Çawa destê te li dilê min gerya malneketiyo
Tu gunehên min nîn in ji hezkirinê pê ve
Lê çi bikim ez geh şên im geh şang im, qeder ev e

Piştî ku Bidûr Xanê ev helbesta xwe xwend, li kêleka Jiyan Xanê rûnişt û ji lêvan ew maçî kir, kêf û henek pê re kir; piştî rabû ser xwe, çû destnimêja xwe girt û dest bi nimêjê kir û berdewam kir hetanî ku Jiyan Xanê di xew re çû. Wê gavê nimêja xwe bi dawî kir û ew jî ket nav nivîna wê û pê re raket, hetanî sibehê. Demû ku ji xew rabûn, Emîr û jina xwe çûn, derbasî cem keça xwe bûn û li rewşa wê pirsin. Jiyan Xanê jî tiştê ku qewimibû anî ziman û ji wan re behsa helbesta Bidûr Xanê û nimêja wê kir.

Bidûr Xan jî, çawa ku sibehê rabû ser xwe, destpêkê taştiya ku jê re amede kiribûn xwar û piştî çû li ser textê desthilatdariyê rûnişt, serdanên emîr û karmend û serdarên artêşê qebûl kirin û pirsgrêkên ku di nav gel de derketibûn çareser kirin. Ên ku hatibûn pîrozbahiyê jê re peşkeş bikin

jî, spasî wan kir û diyarî li ser wan belav kirin, qedr û qîmetê gişan girt; wan jî pir jê hezkirin û baweriya wan pê hat. Lewre Bidûr Xanê bi adilane tevgeriya, desthilatdariya xwe li ser dadê da sazkirin; girtiyên di zindanan de efû kirin, ew berdan û gelek fermanên din ên pêwîst jî dan, ku yek ji wan jî fermana rakirina li ser gumrikê bû.

Êvarê, Bidûr Xanê ji ser textê hukum rabû û dîsa vegeriya hundurê ku lê dima...

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî dengê xwe birrî.

ŞEVA 210'EMÎN

Şehrezadê vegotina çîroka xwe berdewam kir û got:

Gava ku Bidûr Xanê derbasî hundurê xwe bû, dît ku Jiyan Xan li wir rûniştî ye. Ew jî çû cem wê rûnişt, destê xwe danî ser milên wê, henek pê kirin, enîya wê maçî kir, pitşre jî ev helbest xwend:

Raza min eşkere dike ev hêsirên nazenînê
Laşe min jî timî rave dike vê eşq û evînê
Vedişêrim ez lê belê rave dike min êşa evînê
Pêdivî bi gellacan jî namîne bo eşkerekirinê
Rêwîyo cano bi çûna we re nema dizanim çi çi ye
Westîna laşê min jî ji ber barê bîranîna we ye
Bûne xerîb hûn cihê we jî her xerîbî ye
Hêsirên min jî her dibarin çav li rêya we ye
Xwebaxşa rêwîya me ez, fedaya canê te me
Dilê'm li gel te ye, Bidûr im ez aşîqa te me
Kul bûne kodikên çavan ji ber wê evîna te
Miçiqîne herdu kanî ji ber girîyê li ser te
Dilnexwaz û xêrnexwazan gotin fîraq e ew
Lê kanî guhê ku gellacan guhdar bike ew
Gûman borîn êdî wê kengî bê Heyva Zeman
Bi qencîyê mişt bû îro dilê yaran li her deran
Li vê dinyê qet nebû mîna te dildarek
Çiqas rêz kim çiqas lêkim evan risteyan
Têrê nake tu wesîfdan bo van meziyetan

Bidûr Xanê, çawa ku helbesta xwe qedand, rabû ser nigan hêsirên xwe paqîj kirin, destnimêj girt û dest bi nimêjê kir hetanî ku xewê zora Jiyan Xanê bir û di xew re çû, raket. Wê gavê Bidûr Xanê jî ket nav nivîna wê, xwe di ber wê re dirêj kir û pê re raket hetanî sibehê.

Sibehê zû jî, Bidûr Xanê dîsa ji xew rabû, nimêja xwe ya sibehê kir, taş-

tê xwar û dîsa çû li ser textê desthilatdarîyê rûnişt ji bo ku kar û barê welat bimeşîne. Dîsa ferman dan, serkirdeyên devletê qebûl kirin û pirsgirêkên heyî bi dadwerî çareser kirin.

Îcar em Bidûr Xanê li wir bihêlin û em vegerin ser rewşa Melîk Ermanos. Ew jî sibehê rabû ser xwe, çû derbasî cem keça xwe bû û li rewşa wê pirsî. Jiyan Xan ji bavê xwe re got: “Bavocan, min tukes mîna mêrê xwe bîaqil, bifedî û bi terbiye neditiye. Lê belê timî digirî û keseran dikişîne.” Bavê wê got: “Keça min, hinekî din jî li wî bi sebir be û bêhna xwe lê fireh bike. Heger îşev jî bi te re raneket û peywira mêraniya xwe pêkneanî, wê çaxê em ê tevdîran bigirin li himberî wî. Bêgûman ez ê wî ji ser textê desthilatdarîyê daxim û wî ji vir nefî bikim.” Bi wî hawî, wî û keça xwe li hev kirin, piştî rabû, çû.

Li Şehrezadê bû sibeh, wê jî axaftina xwe birrî.

ŞEVA 211'EMÎN

Şehrezadê vegotina çîroka xwe berdewam kir:

Gava Bidûr Xanê ji meqamê xwe vegeriya qesrê û derbasî malê bû; dît ku mûm pêxistî ne û Jiyan Xanê rûniştî ye. Wê kêliyê, mêrê wê hat bîra wê, hestiyar bû û helbestek xwend û got:

Axaftinên min erd û ezman giş rapêçane mîna rokê
Şewqa xwe danê her derê lê fêr nebû yek carekê
Ev îştîyaq û îmtîna hemû tevde ji ber wî ye
Bûm rikeber ji sebrê ra gelo çima wilo ye
Tu carî te dîtî ye qey, kes bûye reqîp ji sebrê ra
Her kêliyeke sebrê dibe kujer ew ji min ra
Lewre ez jî êdî bûme dujmin ji kêliyan ra
Yeko yeko wan dijîm dikim gazî ji Xwedê ra
Bo ku rake êş û azara li ser min bi sibê ra
Lê belê başkirina nexweşiyê jî bdestê evîndar e
Binêr çawa destmala newqê bi hestan dilîze
Hêvîdar im ku rûyê gewer mîna berê mirêz e
Hêvîdar im rojek ronak ew ê derê demek nêz e

Piştî ku Bidûr Xanê ev helbesta xwe qedand, hewl da ku rabe nimêja xwe bike, lê Jiyan Xanê destê xwe avêt guhkê kirasê wê û jê re got: “Mîrzayê min! Qey tu fedî nakî ji wê qenciya ku bavê min bi te re kir û tu wisa dev ji min berdidî, diçî di wextekî şevê ê weha de?”

Çawa ku Bidûr Xanê ew gotina wê bihîst, di cîh de li ba wê rûnişt û jê re got: “Tu çi dibêjî dildara min?” Jiyanê lê vegerand û got: “Min kesekî

mîna te pozbilind û qurre nedîtiye. Gelo hemû xortên mîna te lihevhatî û spehî wisa pozbilind in? Lê belê ev gotin ne ji bo ku dilê te bibije min ez wan dibêjim. Rastiya Xwedê ez li ser te ditirsim û divê tu bizanibî heger tu îşev bi min re ranekevî û bekareta min ranekî, dê bavê min sibe te ji desthilatdariyê bigire û wê te surgûnî welatekî din bike. Heta dibe ku hêrsa wî xwirtir bibe û te bikuje jî. Vêca mîrzayê min, min xwest ez te agahdar bikim; dîsa jî biryar a te ye!” Gava ku Bidûr Xanê ev gotin bihîstin, serê xwe berra ber xwe da û heyyirî ma, nema dizanîbû wê çi bike. Di dilê xwe de got: “Ez bi ya wî nekim, dê Ermanos min bikuje, ez rewşa xwe jê re eşkere bikim jî, ez ê bihetikim! Lê belê ez niha Sultana Cezaîr a Ebenosê me û bajar di bin destê min de ye û heger gîhaştineke min û Heyva Zeman hebe jî, incex li vê derê em ê bikaribin bi selametî bigihêne hev. Lewre ji bo ku ew derbasî welatê xwe bibe, mecbûre ku di vir re derbas bibe. A baş ew e ku ez xwe bispêrim Xwedê û şenşê xwe biceribînim!” Piştî Jiyan Xanê zîvirî û jê re got: “Binêre delala min! Rewşa min a ji te, ne bi destê min e...” Piştî tr a bi derzîyê vekir û çîroka xwe ji serî hetanî binî jê re got û laşe xwe nîşanî wê da. Li dawîyê jî lê zêde kir, got: “Vêca tu bi xatirê Xwedê ke tê min bisitirînî û tê raza min veşêre hetanî ku Xwedê Teala min û dildarê min bigihîne hev. Piştî jî emre Xwedê çî be, dê wisa bibe...”

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî.

ŞEVA 212'EMÎN

Şehrezadê vegotina çîroka xwe berdewam kir û got:

Vêca gava Bidûr Xanê çîroka xwe jê re vegot û jê xwest ku sirrê wê veşêre, Jiyan Xanê lê ma behetî, lê di heman demê de dilê wê pir pê şewitî, dua jê re kirin bo ku bigihêje mêrê xwe, dûvre jî lê zêde kir û got: “Xwişkêcan, bila dilê te aram be û qet metirse. Bêhna xwe fireh bike, em binêrin bê wê Xwedê çawa bike!” Li dawîyê jî ev çend rist li gotina xwe zêde kirin û got:

Mala razan dergirtî ye li ba min razgir im ez
Mifteyên derî wenda ne çawa ku ne li mal im ez
Tekes nikare van razan veşêre ji xeynî dildaran
Sergirtî û mohrkirî ne ew li gel bawerdêran

Piştî ku ew ristên xwe jî gotin, Jiyan Xanê berdewan kir û got: “Xwişkêcan, sînga kesên azad, tirba razan e û ez ji keçeke azad im, ez tucarî vê raza te ji kesî re nabêjim!”

Di pey re herdu li hev baniyan, dilê xwe ji hev re vekirin, kêf û henek kirin, hevdu ramûsan û berê sibehe raketin. Piştî Jiyanê rabû mirîşkek serjêkir û xwîna wê di xwe da, delingê xwe ji xwe kir û qîrek da, hemû xelkên di malê de bi xwe hesandin. Diya wê, li gel çend cêrîyan derbasî cem

bûn û li halê wê pirsin; dilê wan kete cîh de û hetanî êvarê li gel wê man.

Bidûr Xanê jî çawa ji xew rabû derbasî serşokê bû, laşe xwe şûşt, xwe helal kir; piştî nimêja sibehê kir û dû re berê xwe da meqamê saltanatê; çû li ser text rûnişt û dest bi çareserkirina pirsîrêkên gelê xwe kir.

Melik Ermanos jî, çawa dengê tilîlîyan ji hundur bihîst, kelecani bû; sebeba wê yekê ji xulaman pirsî, wan jî ew agahdar kirin bi cewherê meseleye. Bêhna wî hate ber wî û dilê wî şa bû. Ferman da xizmetkaran, xêr belav kirin û welîme li dar xistin.

Em Bidûr Xan û Jîyan Xanê li vir bihêlin û em vegerin ser rewşa Melik Şehrîman. Ew jî çawa ku kurê wî Heyva Zeman li gel Merzewan derkete seyd û nêçîrê û bi hatina êvarê nehate mal, hişê wî tevlihev bu, ket qelaqê de û metirsi pê re çêbûn. Wê şevê xewa wî nehat û hetanî sibehê şîyar ma. Bi zor û heft beleyan şeveqê lêda. Hetanî nîvro jî li bendî vegera kurê xwe ma. Gava ku kurê wî dîsa nehat, qolinc ketin nava wî û sênga wî teng bû li dilê wî. Janê ew girt, dilê wî bi kurê wî şewitî, li ser wî giriya hetanî ku kincên wî şil bûn ji hêsirên wî. Wê gavê ev çend rist xwendin û got:

Hîna jî li himberî evîndara me ez
Geh li êşê geh l'şahiyê rast tême ez
Vexwar im piyala êşê di şopê de me ez
Çi bikim dilo ji vê êşê xemgîn im ez
Gelek zor e rêya êşê bê derfet im ez
Geh qismetê azadîlan geh jî bende me ez
Felek dewla xwe davêje lê, cezakar e ew
Ceza da min ez kirim qurban, sozdar e ew

Piştî ku helbesta xwe xwend, hêsirên xwe paqij kirin û gazî leşker û serleşkerên xwe kirin, ji bo ku amadekariyên meşê û sefere bikin. Artêş hemû li hev kom bûn û amadekariyên meşa dirêj kuta kirin. Sultanê dilşewitî Şehrîman jî rabû li hespa xwe siwar bû û artêşa xwe kir çar perçe; yek li pêş, yek li paş, yek li hêla xwe ya rastê û yek jî li hêla çepê. Piştî ji wan re got: “Em ê her yek bi bergehê de herin û sibehê di çariyanê de em ê bigihêne hev.”

Artêş hemû kete rê de û her beşekî jê, berê xwe da cihekî. Wê rojê meşa xwe berdewam kirin hetanî ku şev kete erdê. Şev pê de meşîyan hetanî ku li wan bû sibeh. Ji wir jî meşa xwe berdewam kirin û ber nîvro li çariyana rê gîhan hev, bêyî ku bizanibim dê rêya xwe bi kîjan hêlê ve berdewam bikin, lewre nizanibûn bê Heyva Zeman di kîjan riyê re meşa xwe berdewam kiriye. Di wê navberê de çavên wan li hinek kincên qetiyayî û bixwîn ketin, hinek perçeyên goşt jî li derdorê dîtin, ku ji wan re xerîb nedihat. Jixwe çawa ku Melik Şehrîman çav li wan kincan ket, qîrîn pê ket, got: “Lowoooo, lowooo!” Dengê wî gîha erşê heftan. Bi kulman li xwe da,

kincên xwe qetandin, rîha xwe kişkişand, rakir û dest bi giri kir û wêlê-wêlê pê ket û leşkerên wî jî pê re girîyan; lewre dil vî de ku kure wî hatiye kuştin.

Şev bi ser wan de hat, hîna jî digiriyan û xwelî li serê xwe dikirin. Hemû tevde perişan bûbûn. Agir bi nava Melîk Şehrîman ketibû û rivîna wî agirî bi hilmê re di devê wî re derdiket. Di nava hestiyariyeke giran de dest bi helbestê kir û got:

Lomeyan nekin li xemgînkêşan di êşa wan de
Lewre bêriyê ew fetisandine di ava xwe de
Her ku digirîn ew ji ber êş û poşmaniya xwe
Arê eşqê wan disoje bi pêtrivînên xwe
Xweziya min bi wî kesê ku naêşe ji hinavan
Lew ku hêşir birrî ji her du çavan
Ka ew rûyê heyva liçardan kanî ew Heyva Zeman
Ronî dikir derdora xwe şewqa me bû Heyva Zeman
Mirin îro piyaleyeke meyê dide vî şahê tawî
Nêzik dibe, diyar dibe va ye tê me koça dawî
Dev ji me berda, berê xwe da felekê û çû
Xatir nexwest ji tikesî, gelek zû çû gelek zû çû
Tîr avêtin bi dûrketinê, cerg û dil wî bir û çû
Bi wê çûn û bi wê hicranê eşek mezin bêtarîf da
Bi rêya xwe de çû bê gotin çû berî da Xweda
Homa Xweda tu wî bistirîni di rehma xwe da

Pişt ku Melîk Şehrîman ev helbesta xwe qedand, hebekî bi ser xwe ve hat. Gazî kir fermandarên xwe û berê artêşa xwe da bajarê xwe, bi şûn de vegeriyan.

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî.

ŞEVA 213'EMÎN

Şehrezadê vegotina çîroka xwe berdewam kir:

Gava ku Melîk Şehrîman fêr bû ku kurê wî hatiye kuştin li ser destê hinek rêbiran an jî hinek ajalên dirrinde, ferman da artêşa xwe û bi şûn de vegeriya bajarê xwe. Ferman da ji bo ku herkes kincên reş li xwe bikin û şînê li ser Heyva Zeman bikişînin. Ji xwe re jî cihekî xilwetê çêkir, navê wî kir “Mala Şînê”, ango “Mala Xemgîniyê” Êdî her roj diket mala xengîniyê û jê dernediket. Şev û roj kurê xwe bi bîr tanî û helbest li ser wî digotin. Tenê roja duşem û pêncşemê li ser textê hukûm rûdinişt ji bo ku karê welêt û welatiyan birêve bibe.

Em Melîk Şehrîman li vir bihêlin û em vegerin ser rewşa Bidûr Xan,

keça Melik Xeyûr. Bidûr Xanê bibû Melikê welatê Ebenos û bi dadwerî welat bi rê ve dibir. Xelkên wî welatî jî pir jê razî bûn, lewre herkesî ew weke zavayê Melikê dinasî û li gora wê nêzikî wê dibûn. Ew jî her şev bi Jiyanê re radiket, jê re behsa mêrê xwe Heyva Zeman dikir û bêrîkirina xwe ya ji wî re tanî ziman. Şikl û şemalê wî tanî ber çavên xwe, wesîfdana wî dikir bi hêviya ku wî bibîne lew ku di xewnê de be jî.

Em Bidûr Xanê li vir bihêlin û em vegerin ser rewşa Heyva Zeman. Ew jî hîna li gel Bistanî dixebitî, cotkarîti dikir. Şev û roj digiriya, xemgîn dibû û helbest digotin li ser rojên xweşî û şahiyê. Bistanî jî jê re digot: “Li dawîya salê dê keştî bi rê keve, tê jî wê çaxê bikaribî biçî welatê misilmanan.”

Rojekê Heyva Zeman dît ku xelk hemû li hev kom dibin. Şaşwaz û behetî ma. Di heman kêliyê de Bistanî derbasî cem wî bû û jê re got: “Îro daran av nede û neçe kar kurê min, lewre îro cejn e û dê xelk serdana hev bikin. Tu jî ji xwe re îstîrahat bike û haydar be. Ez ê jî herim bajêr û hewl bidim ku cihekî ji te re eyar bikim di keştiyê de. Lewre hindik maye ku keştî derkeve seferê.”

Dûvre Bistanî derket, çû; Heyva Zeman bi tenê ma li nav bîstên. Di nava wê tenêtiya xwe de, dîsa hestiyar bû, dilê wî yê şikestî hate guvaştin di nav êşên bîranînan de. Dest bi girî kir, hêsirên wî herikîn û di wî halî de ma, hetanî ku ji ser xwe çû. Gava ku dîsa bi ser xwe ve hat, rabû ser xwe û li nav bistan geriya. Hem digeriya, hem jî diponijî û li ser rewşa xwe kûr û dûr diçû, dixwest ku fêma bike bê felekê çi bi serê wî de aniye. Hîna di nava wan fikaran de bû, nigê wî li kevîrekî ket lukumî, serdev li erdê ket. Bi ketinê re, rûyê wî rastî qurmê darekê hat, birîn tê de vebû, xwîn jê hat. Xwîna ku tev li hêsirên wî dibû û dihate xwarê, bi zendika kirasê xwe paqij kir û disa rabû ser xwe û meşa xwe ya di nav bistan de berdewam kir; lê hişê wî tevlihev û belawela bû. Di wê navberê de du teyrikên ku li ser darekê pev diketin bala wî kişandin. Yekî ji wanan bi nukulan li yê din dida. Herî dawî serê wî ji gewdeyê wî qut kir, xist nav herdu nukulên xwe û firiya, çû. Gexdeyê teyrê mirî jî ket erdê, li ber Heyva Zeman ket. Di heman kêliyê de du teyrên din hatin, li ber wî gewdeyî danîn, yek li hinda serê jêkirî, yê din jî li hinda terîka wî sekinîn, baskên xwe vekirin û stûyên xwe dirêjî wî kirin, çawa ku li ser bigirin. Wê gavê Heyva Zeman jî li ser jina xwe ya wenda giriya û tev li giriyê wan herdu teyran bû...

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî.

ŞEVA 214'EMÎN

Şehrezadê vegotina çîroka xwe berdewam kir û got:

Di wê navberê de Heyva Zeman dît ku wan herdu teyran koncalek kolan, laşê teyrê mirî tê de veşartin û dîsa baskên xwe vekirin, fîryan bi hewayê ketin, bi qasî seetekê ji ber çavan wenda bûn; piştî dîsa bi şûn de vegeriyan, lê vê carê kujerê ew teyrê din bi wan re bû. Ew li ser tirba teyrê kuştî danîn û ketin ser dilê wî de, lêdan hetanî ku ew kuştin. Di pey wê re jî, zikê wî dirandin, nava wî vekirin, hûr û pizûrê wî derxistin û goştê wî pari pari kirin; xwîna wî li ser tîrbê rijandin û perçeyên goştên wî jî li derdora tîrbê belav kirin.

Ev hemû li ber çavên Heyva Zeman diqewimîn û wî jî gav bi gav ew dişopandin. Di vê navberê de tişteki ku li ser tîrbê bû, li cihê ku teyrik lê hatibû kuştin, bala wî kişand. Çû ser, dît ku berkurka teyrik e. Rahişt wê berkurê û devê wê vekir, dît ku ew kevirê sorik ê ji doxîna jina xwe vekiribû tê de ye! Çawa ku çavên wî li wî kevirê ket, kelecaneke mezin girt ser dilê wî û ji kêfan re ji ser hişê xwe çû, li erdê ket, vezeliya. Piştî demekê dîsa bi ser xwe ve hat û ji xwe re got: “Bêgûman ev nîşaneyê xêrê ye û dibe ku ez û dildara xwe dîsa bigihîne hev!” Piştî bi dûvdîrêji li wî kevirê sorik nêrî, ew bi zenda xwe ve girêda bi hêviya ku xêrê jê re bîne û dîsa rabû ser xwe, li wan deran geriya û ma li bendî vegera Bistanî. Lê belê şev kete erdê û hîna jî Bistanî lê venegeriyabû. Heyva Zeman li wir raket û sibehê dîsa rabû ser xwe ji bo here ser karê xwe. Benekî ji kindir li newqa xwe girêda, rahişt tefşoyekî û dest bi tevr û kolanê kir. Demek bi şûn de jî dest bi birrîna çend daran kir. Carekê gava ku tefşo li qurmê darekê xist, “teperepêk”e balkêş jê hat ku bala Heyva Zeman kişand. Gava ku ax ji ser da alî dît ku deriyekî ji textan di bin de ye. Axa derdorê baş da alî û ew derî vekir, dît ku hêwanek tê de heye. Pê de çû hetanî gîhaşt odeyê ku tijî zêrên sor bû. Çawa çavên wî li wan zêran ket şaşwaz bû û bi kêfxweşî ji xwe re got: “Naxwe rojên zor û zehmetiyê qediyên û êdî dê rojên xweşî û şahiyê dest pê bikin!”

Dûvre Heyva Zeman ji odeya binerdê derket, deriyê wê dîsa mîna berê girt û vegeriya nav bistan. Dîsa bi avdana daran mijûl bû, ber wan xweş kir û hetanî êvarê jî ew karê xwe berdewam kir. Êvarê Bistanî hat ba wî û jê re got: “Kurê min, mizgîniya min li te, êdî tu yê bikaribî vegere welatê xwe! Lewre tacîran xwe û keştiyên xwe amede kirine ji bo ku herin bajarekî misilmanan, jê re dibêjin Cezaîra Ebenos. Vêca ku tu gîha wir, di rêya bejahiyê re divê tu şeş mehan rêwîtiyê bikî ji bo tu xwe bigihîni Cezaîra Nemir a ku Melîkê wê Şehrîman ê bi nav û deng e.”

Heyva Zeman, pir kêfxweş bû bi wê xeberê û di nava wê kêfxweşiyê de bi helbestî got:

Dûr nekevin ji wan, hûnê nikaribin vegerin li wan
Dûr nekevin ji wan û xwe nekin kujerên wan
Nayê razan, çiqasî dirêj bibe li me ew hicran

Rewşa herkesî biguhere jî, her ez nayê m meydan

Piştire testên Bistanî maçî kirin û jê re got: “Bavocan çawa ku te mizgî-niyek da min, ez ê jî mizgîniyekê bidime tel!” Û ew agahdar kir bi wê odeya zêran a di bin erdê de. Bistanî pir kêfxweş û şabû û got: “Kurê min, ev bû heştê sal ku ez di nava vî bistanî de me, rojekê ez li tiştêkî wisa rast nehatim. Lê yê te ev saleke te ye û va ye tu li vê xezîneya zêran rast hatiye.”

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî dengê xwe birrî.

ŞEVA 215'EMÎN

Şehrezadê got:

Îcar Bistanî got; ê min heştê sal e min tiştêk li vir nedîtiye, yê te tu salekê li vir ma, te ev xezîneya zêran dît, helbet wê ev zêr mafê te bin, rizqê te bin, di bedêla wê êşa ku te kişandî ye. Jixwe wê ji te re pir lazim bibin jî, ji bo ku tu xwe bigihîni xwediyê xwe.” Lê Heyva Zeman ew nepejirand û got: “Bi kêmanî divê em wan di navbera xwe de parve bikin, naxwe ez qebûl nakim!”

Piştire, Heyva Zeman da pêşiya wî û ew bir ser wê xezîneyê, ew derbasî hundur kir û zêr nîşanî wî dan bi giştî bîst sindoq zêr bûn, deh ji xwe re birin û deh ji dan Bistanî û bi wî hawî li hev kirin.

Bistanî jê re got: “Kurê min, ji xwe çend hîzan bi van zeytûnên me yên Asafirî dagire, lewre ev rengezeytûn li tu welatan tune. Zêran jî di bin zeytûnan de bi cîh bike û ser wan bigir, girêbid û piştire bide barkirin.”

Heyva Zeman bêsêkin rabû ser xwe, zêrên xwe di pêncî hîzî de bi cîh kir û ser wan tijî zeytûn kir. Ew kevirkê xwe yê sorikê giranbûha jî di hîzekî ji wan de bi cîh kir; hemû girêdan û piştire bi Bistanî re rûnişt, pê re sohbet kir. Edî baweriya wi xwîrt bûbû ku dê bikaribe xwediyên xwe bibîne û care-ke din bigihêje hezkiriyên xwe. Di dilê xwe de got “Piştî ez gîhiştim Cezaîra Ebenos, ji wir ez ê herim welatê bavê xwe û ez ê dildara xwe Bidûr Xanê li wir bibînim. Gelo wê jî niha xwe gîhandiye wir? Ango bi şûn de vegeyriyaye cem bavê xwe? Ango bi rê de tiştêk pê hatiye?” Piştire hebekî ponijî û got:

Bêrîkirineke kûr xist dilê min de û dûr çû
Dûr ket ew ji welat wê ez tenê hiştim û çû
Ji cih û waran dûr ket ew gelo bi ku ve çû
Ne serlêdan ma ne wîn, gelo ew bi ku ve çû
Li ber xwe didim ez bi hêviya vegera wî
Lê dawî nayê ji êşê re gelo ka şopa wî
Bi çûna wî re çû şahiya dil û qet nema hat
Hedana min çû, sebir nema û qet ew nehat

Bariyan hêsir ji çavên min her bariyan
Ji kodikên çavan herikîn wek ava çeman
Dirêj bû ev bendewarî gelo dê kengî were
Bêrikirin kûrtir dibe bar jî girantir, ka were
Sîmaya te di hiş de ye, ew di nivê dil de
Bîranîna te jî îro peykir ke agir e di dil de

Di pey vê helbestê e, Heyva Zeman hewl da ku dema xwe derbas bike. Çîroka wan teyrikan, pevçûna di navbera wan de, giş ji Bistanî re vegot. Bistanî matmayî ma li wê çîrokê. Dûvre serê wî gêj bû, çû raket hetanî sibehê. Lê ew sergêjiya wî lê bû nexweşî û ew rewşa wî du rojan berdewam kir. Roja sisyan nexweşiya wî lê giran bû û giha ber mirinê. Heyva Zeman, li ser wî pir êşiya û xemgîn bû. Di wê navberê de qeptan û çend keştivan hatin li Bistanî pirsîn, gotin: “Kanî ew xortê ku dixwaze biçe Cezaîra Ebenosê?” Heyva Zeman got: “Ev ciwamêrê li himberî we, ew bi xwe ye!” Wan jî got: “Naxwe ka xwe amade bike em biçin, lewre ba xweş lê dide û divê em dereng nekevin!” Heyva Zeman got: “Wê çaxê ka van hîzan bar bikin, wan bavêjin keştîyê hetanî ez xwe amade bikim!” Keştivanan hîz bar kirin, Heyva Zeman jî xwarin û zewadeya xwe bir avêt keştîyê û bi şûn de vegeriya cem Bistanî ji bo xatir jê bixwaze. Lê gava hat cem wî, dît ku Bistanî di sekerata mirinê de ye. Li ber serê wî rûnişt hetanî nefesa xwe ya dawî da. Çavên wî girtin, tirba wî kola û ew definand. Piştî, bi lez çû cem keştîya xwe, lê nuh giha wir, dît ku keştîyê bavanê xwe vekiriye û bi lez ji peravê dûr dikeve. Bi dilekî şikestî û dilêşiyeke mezin li çûna wê keştîyê nêrî hetanî ku ji ber çavên wî ket. Di nava dilşikîn û dehşeteke biêş de vegeriya nav bîstên, di nava kul û kederin kujer de...

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotona xwe birrî.

ŞEVA 216'EMÎN

Şehrezadê vegotina xwe berdewam kir û got:

Heyva Zeman gava dît ku keştî çûye, bi şûn de vegeriya nav bistan-ku êdî bûbû bistanê wî- û ji xwe re alîkarek girt ji bo alîkariya wî bike di avdana daran de. Piştî, çû daket xezîneya zêran û zêrên ku mabûn, giş xistin pêncî hîzi de, ser wan tijî zeytûn kir û dîsa çû bajêr, li keştîyên ku dê ji bajêr derketana pirsî. Wan jî jê re got: “Keştîyên me salê carekê diçin rêwîtiyê!” Xwêziya wî di qirîkê de ma û tasêwasên di dilê wî de zêdetir bûn. Bi piranî jî piştî ku ew kevîrkê sorik ê ku dê ew bigihanda Bidûr Xanê wenda kir û ew ji dest xwe berda, pir xemgîn bû û êdî şev û roj digiriya û helbest digotin.

Em Heyva Zeman li wir bihêlin û em vegerin ser Bidûr Xanê. Keştîya ku qaşo dê Heyva Zeman bi xwe re bibira û ew li şûna xwe hişt, bextê wê

vekirî derket û di wextê xwe de gîha Cezaira Ebanosê û wisa li hev hat ku di wê seeta ku keştî gîha benderê de Bidûr Xanê li ber şibakeyê rûniştî bû û li hêla benderê dinêrî. Gava dît ku keştî hate wir, dilê wê lêda, kelecani bû! Rabû ser xwe, li hespê xwe siwar bû, emîrên xwe jî dan gel xwe û li gel xizmetkarên xwe berê xwe da benderê.

Dema gîhişt wê derê, gazî qeptanê keştiyê kir û jê pirsî bê ka çi pê re heye, çi tune. Qeptan got: “Emîrê min î hêja, barê min ê vê carê derman, kil, merhem, rûn, qumaş û cawên baş, baharat û bîhnên xweş, xurmeyên hindî, zeytûnên asafirî û gelek tiştên giranbuha yên ku li van deran peyda nabin.

Dilê wê bijiya zeytûnan, ji qeptan re got: “Gelo çiqase zeytûn bi te re hene?” Qeptan got: “Bi qasî pêncî hîzên zeytûnan bi min re heye. Lê belê ji ber ku xwediyê wan bi min re nehatiye, emîrê min dikare li gora dilê xwe tevbigere, çiqasî dixwazî bibe!” Bidûr Xanê got: “Kani wan daxin ji keştiyê da ku ez lê binêrim!”

Qeptan qîrek da xebatkaran, wan jî rabû her pêncî hîz ji keştiyê daxis-tin, anîn cem wan. Bidûr Xanê hîzek vekir û li zeytûnên tê de nêrî, ew eci-bandin û got: “Ez wan pêncî hîzî ji we dikirim û buhaya wan çiqas be, ez ê bidime we.” Qeptan got: “Ev zeytûn li welatê me bêqimet in, lê belê xwediyê wan bi şûn de ma û xwe pê re negîhand. Mirovekê pir feqîr e jî.” Bidûr Xanê got: “Û buhaya wan çiqas e gelo?” Qeptan got: “Hezar derhem.” Bidûr Xanê got: “Ez ê hezar dînarî bidime te!” Pere dan û ferman da xizmetkarên xwe ku wan zeytûnan blîbin qesrê.

Gava ku êvar hat û şev ket erdê, Bidûr Xanê ji xulaman re got: “Kani hîzekî ji wan zeytûnan bînin!” Xulaman çûn hîzek anîn hundur ku wê gavê ew û Jiyan Xan tenê li mal bûn. Piştî sênîyek jî jê re anîn û devê hîz vekir, zeytûn berra sênîyê dan. Lê li gel çengek zeytûn, du sê ceng zêrê sor jî ket sênîyê û ew dagirt! Bi şaşwazî li Jiyan Xanê zîvirî û got: “Bêgûman ev hemû zêr in!” Piştî li tiştê di binî de mayî jî nihêrî, dît ku hemû zêr e. Li hîzên dîtîrê jî nêrî, dît ku hemû tijî zêr in û tenê çend zeytûn li ser devê her hîzî danîne. Gava ku li nav wan zêran geriya ew kevirê xwe yê sorîk jî di nav de dît! Devê wê ji hev ma dirêj dirêj lê meyzand û baş nas kir ku ew, ew kevir bi xwe ye! Ji kêfan lal bû, qîrek da û jî ser hişê xwe çû...

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî.

ŞEVA 217'EMÎN

Şehrezadê çîroka xwe berdewam kir û got:

Gava ku Bidûr Xanê dîsa bi ser hişê xwe ve hat, di dilê xwe de got: “Ev

kevirê sor bû yê ku sebeba veqetîna min û dildarê min Heyva Zeman. Niha ji heman kevirê dibê nîşaneyê xêrê û mizgîniyê qedirbuha.” Piştî jî jî agahdar kir ji wê yekê.

Sibehê zû disa rabû nimêja xwe kir û çû li ser textê desthilatdariyê rûnişt û di cîh de qasîdek şand dû qebtanê keştiyê. Qeptan çawa ku hat ber destê wê, bejna xwe jê re tewand û erda ber nigên wê maçî kir. Bidûr Xanê jê pirsî û got: “Kani xwediyê van zeytûnan?” Qeqtan got: “Emîrê min ê hêja, me ew li welatê Mecûsan hişt. Ew cotkarek e ku di bistan de dixebite.” Bidûr Xan got: “Heger tu wî ji min re neynî, Xwedê dizane bê ez ê çî bi serê te û keştiya te de bînim!” Dûvre emir da xulamên xwe bo ku hemû depo û embarên wî qeptanî mohr bikin û dîsa li qeptan vegeriya jê re got: “Xwediyê van zeytûnan deyndarê min e û deynekê min î giran lê heye. Vêca heger hûn wî neynin, ez ê we gişan bikujim û malê we talan bikim!”

Keştîvan hemû li qeptanê xwe kom bûn û jê re gotin: “Me ji vî melîkê zalim xelas bike, em ê heqê rê bidene te. Ka dîsa bi şûn de vegere, here wî xortê bistanî bîne û were!”

Qeptan li keştiya xwe vegeriya, çengelê wî vekir, bavanê we berda û bi şûn de vegeriya. Xwedê wisa jê re li hev anî ku bi xêr û selameti vegeriya û nivê şevê giha bajarê Mecûsiyan. Li wir peyabûn ji keştiyê û çûn nav bistanan, berê xwe dan cem bistanê Heyva Zeman.

Heyva Zeman jî wê şevê pir bi kul û keder bû, li ser dildara xwe digiriya û digot:

Şeveke giran e, stêrkek tenê li ezmanan nagere
Ne jî fersendê dide ku mirov bêhna xwe berde
Bi qasî roja qîyametê dirêj e ev şev qey naqede?

Di wê navberê de qeptan û zilamên xwe hatin nav bistan û li deriyê wî dan. Heyva Zeman derî vekir û ew pêşwazî kir. Qeqtan bi destê wî girt û ew bir li keştiyê siwar kir û di cîh de jî bavanê xwe vekir, li ber bayê berda û bi rê ketin. Keştî çû û hey çû, bi seetan bi rêve çû, lê Heyva Zeman hîna jî nizanîbû bê çima wî bi xwe re dibin. Gava sebeba vê yekê ji qeptan pirsî jî, jê re got: “Tu deyndarê zavayê Melîk Ermanos, Melîk Cezaira Ebenosê yî. Te malê wî diziye bênamûs!” Heyva Zeman lê veğerand û got: “Bi navê Xwedê, di emre xwe de ez derbasî vî welatê ku tu dibêji nebûme û ez nas jî nakim.” Lê qeptan guh neda bersiva wî û meşa xwe di deryayê de berdewam kirin.

Axirê dîsa gihan Cezaira Ebenos û li bendera wê sekinîn, kindira keştiyê avêtin peravê û peyabûn, çûn qesrê. Qeptan, Heyva Zeman da pêşiya xwe û ew bir ber destê Bidûr Xanê. Çawa ku çavên wê lê ketin, ew nas kir. Ji qeptan re got: “Wî bide dest xulaman, bila wî bibin hemamê.” Piştî keştivan û tacirên girtî berdan û diyariyê bi qîmetê deh hezar dînar jî da

qeptanê keştiyê û ew bi rê kirin. Dûvre, derbasî cem Jiyan Xanê bû û ew ji mijarê agahdar kir, jê re got: “Bila ev yek veşartî bimîne û niha ji kesî re nebêje da ku ez bigihêjim mirazê xwe û ez bihêlim ku ev çîroka me bibe dîrokeke watedar ku her kes wê bixwîne, ji şahan hetanî bi şivanan.”

Xulaman fermana Bidûr Xanê pêkanîn û Heyva Zeman birin hemamê, ew şuştin, kincên şahan lê kirin ku êdî bûbû mîna beybûnekê, an mîna stêrkeke ku mirov fedî dikir lê bimeyzîne. Ruhê wî yê berê lê vegeiriyabû, rûyê mîna gulekê vebûbû. Bi wê şewq û şemala ku bala herkesî dikişand, ew dîsa vegeandin qesrê û derbasî cem Bidûr Xanê kirin.

Çawa Bidûr Xanê çav lê ket, dilê wê bi şida lêda û kelecaneke mezin ew rapêça! Ji xwe re got: “Dilo sebir bike, di demeke nêzik de tê bigihêji miradê xwe!” Dûvre rabû qedrê wî girt, mal û mülk dayê, xulam û xizmetkar dan ber destê wî, qefleke deve û qantir jî dane wî ji bo ku ticareta xwe pê bike, lewre ji xezîneyê jî gelek dirav û dînar dane wî. Pê re, pê re Heyva Zeman jî hêdî hêdî bilind bû, hate naskirin, bawerî pê çêbû û hezkiriyên wî pir bûn, dilxwazên wî di nav dewletê de jî pirtir bûn. Bidûr Xanê jî her car ew hîn bêhtir nêzikî xwe dikir û herî dawî ew kir xeznedarê devlete, mal û dirav teslîmî wî kirin. Her roj rutbe û nîşaneke nû dida wî û Heyva Zeman nizanîbû bê sebeba wê yekê çi ye.

Her ku malê Heyva Zeman pir bû; wî jî hîn bêhtir xelat û diyarî û sedeqe li xelkê belav kirin. Bi wî hawî hîn bêhtir nêzikî Emîr Ermanos jî bû û ji hev hez kirin. Ne tenê Emîr Ermanos, hemû mîr û emîr û gizîran jî, hemû feqir û xîzanan jî jê hez kirin. Wisa dewam kir hetanî ku rojek hat êdî herkesî bi navê wî sûnd dixwar. Heyva Zeman her şaşwaz bû ji ber wî qedr û qîmetê zêde yê ku Bidûr Xanê dida wî û di dilê xwe de digot: “Bi her sê navê Xwedê sebebek vê yekê heye. Bi dibêtiyeke mezin ev melîkê han vî qedr û qîmetî dide min ji mebesteke xerab! A baş ew e ku ez destûra çûnê jê bixwazim û ji vir herim.”

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî.

ŞEVA 218'EMÎN

Şehrezadê vegotina çîroka xwe berdewam kir û got:

Di encamê de Heyva Zeman çû cem Bidûr Xanê û jê re got: “Ey Şah û Melîkê min î heja! Te qedr û qîmetekî baş û giranbuha da min. Ji bo ku tu vê qencîya xwe bigihîni serî, destûra min bide ku ez herim û malê xwe jî bi xwe re bibim!” Bidûr Xanê kenîya û jê re got: “Gelo çi hişt ku tu destûra çûnê bixwazi û tu li vê derê di nav xweşî û şahîyê de yî; çima ji nava vê aramî û maldariyê, tê berê xwe bidî dahatûyeke xeternak û nediyar?”

Heyva Zeman lê vegerand û got: “Melîkê hêja, heger sebebek ji vî qedr û qîmetê re tunebe, wê ev tişteki ecêb be! Bi taybetî jî ev rutbe û meqamên ku tu wan didî min, hemû kar û meqamên mirovên navûser û temenmezînan in û ez jî hîna ciwanekî nûhatî me, ez zarok tême hesêb!”

Bidûr Xanê got: “Sebeba vê yekê ew e ku ez pir ji te hez dikin; ji ber wê husn û cemala te; ji ber wê xweşikbûna te ya zêde û heger tu daxwaza min pêkbînî, ez ê qedrekî mezintir ji te re bigirim, mal û mulkêki zêdetir bidime te û bi vê temenê te yê biçûk ez ê te bikim wezîr, çawa sultan jî bi vê temenê min ê biçûk ez kirime emîr, li serê xwe û vî gelî. Jixwe tu ecêb û sosretî di serkêşîya ciwanan de, çawa helbestkar jî gotiye:

Mîna ku ev dem dema qewmê Lût be

Herkes dixwaze zarokan pêşkeşî hev bike

Gava ku Heyva Zeman ev gotin bihîstin, ket ber fediyê û hinarkên rûyê wî sor bûn, mîna ku agir bi wan ketibe. Bi dilekî şikestî got: “Tu pêdiviya min bi qedr û qîmetekî wisa nîn e û ne jî ez dixwazim gunehan bikim. Bi feqîrtî be jî ez dixwazim bi rûmet bijîm û ji exlaqê xwe dûr nekevim.” Bidûr Xanê got: “Ez bawer nakim bi vê oldariya te ya ciwan û vê nazdariya te. Hela guhdar bike vî helbestkarî gotiye:

Min civanek dabûyê û ew civan bi bîra wî xist

Wî gote min ev çi ye ey zimandirêjê bêbext

Min dinya nîşanî wî da ez ê pir dilşewat

Gote min ne gengaz e, ji min xwest wî felat

Gava Heyva Zeman ev gotin ji devê Bidûr Xanê bihîstin û wateya helbestê fêhm kir, got: “Ey Melîk, ez ne yekî ku van karan bikime û ne jî ez dikarim tişteki wisa rakim bi vî temenê xwe yê biçûk.” Bidûr Xanê keniya û lê vegerand, got: “Ev tişte ku tu dibêjî, ew bi xwe ecêb e! Madem ku tu wisa biçûk î, çima tu ji gunehan ditirsî û guneh kare gihîştîyan e? Gava mirov kamil nebûbe, Xwedê li gunehên mirov nagire û tu şerm jî tê de nîne. Lê belê wisa xwiya dike ku di nîqaşê de, te mahneyek ji xwe re dîtiye û ev jî derbasdar e, lewre êdî te heq kiriye ku tu daxwaza min pêk binî û dev ji cîdalê berdî, bêgûman qedera Xwedê teala çi be, dê pêk were!”

Çawa ku Heyva Zeman ev gotin bihîstin, nûr di rûyê wî de nema. Xwêziya xwe daqurtand û got: “Emîrê hêja, li ba te ewqase jin û cêriyên xweşik û spehî hene ku di tevahiya dinyayê de nîn in, gelo tu nikarî wan li şûna min bi kar bînî? Min berde û bi yekê ji wan re rakeve!”

Bidûr Xanê got: “Tu rast dibêjî, lê belê yek ji wan nikare êşa eşqa te bi dawî bike di dilê min de. Vêca gava mizaç û xwezaya mirov xera bûbe, tu fedaya şîret û gotinan namîne. Tu jî dev ji cîdal û nîqaşê berde û binêr bi helbestkar çi gotiye:

Yarocan ev spehîbûna te ola min e
Min hemû jinên xwe berdan ji bo te
Bo wilo xelk giş dibêjin ev rahîb e

Tew yekî din heye, dibêje:

Min ji bîr kir Zeyneb û Nûran
Ji ber sorguleke nayê wesifdan
Ez bûme evîndarê yekî çavbelek
Dilê'm naxwaze pir tişt gelek
Rêheval û hogirê min her tu yî
Çi li vir çi li xilwetê her tu yî
Naxwe lomeyan dikî tu li min
Ne Zeyneb ne Nûran tu yî yara min
Her tişt eşkere ye çima vedişêrî tu
Qey dixwazî bibî hêsîrê hêsîran tu
Bi pêtên te xwezî werin sotin
Di arîyê de ez werim veşartin

Gava Heyva Zeman ev gotinên dawî bihîstin, tê gihîşt ku mefer û xelasiya wî ji wê qedara wî nîn e, rabû got: "Ey Melîk û Şahê zemanan! Heger çare ji vê yekê re tunebe, wê çaxê soz bide min ku carekê tenê, tu vî karî bi min bikî û heger carek tenê, xwezaya te ya ji rêderketî sererast nebe, divê hetaheta tu nema behsa vî tiştî ji min re bikî; belkî Xwedê li min were rehmê û gunehê min bibexşîne!" Bidûr Xanê got: "Ez vê sozê didime te, bi hêvîya ku Xwedê gunehên me jêbibe bi meznahiya dilovaniya xwe û li me bibore. Lewre dilovaniya wî bi qasî deryayan mezin e, dikare me ji gunehên mezin rizgar bike û perdeyên tarîtiya ser me biçîrrîne bi nûra xwe ya pîroz; çawa ku helbestkar jî gotiye:

Diyar e ku xelkê gûman ji me kirine
Di dilê xwe de, wan nav li me kirine
Ka were em jî pêk binin wan gûmanan
Tenê yek carê, piştire bidin dû tobekaran

Piştire, Bidûr Xanê soz û peyman û sûnda herî mezin xwar ku ji carekê tenê pê ve, ew kar di nav wan de pêk neyê, lew ku bi mirna wî be jî. Li ser vê peymanê, Heyva Zeman pê re çû, derbasî cihê xelweta wî bû, ji bo ku agirê dilê xwe pê vemirîne. Bi rê de, dua dikirin û ji xwe re digot: "La hewle wela îlla lillal! Naxwe ev qedera min e!"

Di hundir de, gava şerwalê xwe ji xwe kir, pir fedî kir û hêsir ji çavan hatin xwarê. Lê Bidûr Xanê pê re keniya û ew bi xwe re derxist ser text û nivînê. Piştire jê re got: "Ji îşev pê ve, tu dê tişteki bê dilê xwe nebînî!" Û xwe bi ser de tewand, bi maç û ramûsan ket ser dilê wî de. Dûvre çimên xwe li yên wî pêçan û jê re got: "Ka tu jî destê xwe bavêje nav seqê min, belkî ewkê

min jî ji sicûdê rabe ser xwe!” Heyva Zeman girîya û got: “Ez nizamim tiştê wisa bikim!” Bidûrê got: “Hela ji bo xatirê min bike!”

Destê xwe dirêj nav seqên wê kir, dît ku ranên wê ji rûn nermtirin û ji awêneyê jî şayîtokîtir in. Ev yek xweşiya wî çû. Destê xwe bi her hêlê de gerand û di dilê xwe de got: “Ev emîr ne nêr e, ne jî mê ye; gelo dibe ku nêrûmê be?” Di pey re dengê xwe bilind kir û berdewam kir got: “Melîkê hêja, min tu alet di nav seqê te de nedîtîn. Madem ku tu ne mîna zilamên din î, çima tu van karan dikî?” Bidûr Xanê bi wê gotina wî keniya heta ku ser piştê ket. Dûvre jê re got: “Evîndar û dildarê min î dilovîn, çiqasî zû te ji bîr kir ew şevên me yên ku em bi hev re raketin!” Û xwe da naskirin. Heyva Zeman, bi derengî be jî têngihîşt ku ew jina wî Bidûr Xan e, keça Melîk Xeyûr, Melîkê cezaîr û deryayan. Rabû ew himbêz kir, maçî kir û herdu pev şabûn hetanî sibehê...

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî navber da çîroka xwe.

ŞEVA 219'EMÎN

Şehrezadê vegotina çîroka xwe berdewam kir û got:

Piştî ku gihiştin hev, Bidûr Xanê, çîroka xwe ji serî hetanî binî ji Heyva Zeman re vegot. Wê bi xwe jî, ya xwe ji serî hetanî binî jê re vegot. Dûvre lome û gazincên xwe jê re rez kirin û got: “Çi hişt ku tu îşev vê dolabê li serê min bigerîni?” Bidûr Xanê got: “Li min bibore cano, bi Xwedê meqseda min tenê ew bû ku ez henekan li te bikim û em bi hev re kêfxweş bibin.”

Gava ku şeveqê lêda û tîrêjên rojeke nû bi ser bajêr de çirusandin, Bidûr Xanê şand dûv bavê Jiyan Xanê Ermanos ê Melîk, ta bi derziyê vekir, çîroka xwe ji serî hetanî binî jê re vegot û hişkere kir ku ew jina Heyva Zeman e û pê da zanîn ku keça wî Jiyan Xanê hîna keç e û bekar e.

Gava Melîk Ermanos bihîst ku Bidûr Xan keça Melîk Xeyûr, şahê Cezaîra Ebenos û ew çîroka ku bi serê wê de hatibû guhdar kir, şaş û metal ma! Piştî ferman da nivîskarên xwe ku vê çîroka wan bi ava zêr binîvisînin. Di pey re jî li Heyva Zeman zivirî û jê re got: “Ey kurê şahan! Gelo tu qebûl dikî ku tu bibî zavayê min û bi keça min Jiyan Xanê re bizewicî?” Heyva Zeman got: “Di vê mijarê de, divê ez bi Melîke Bidûr Xanê re bişewirim, lewre heqê wê li ser min heye û qenciyên ku wê bi min kirine nayêne jimartin.”

Dema ku Heyva Zeman pê şewirî, Bidûr Xanê jê re got: “Biryarda herî rast û karê herî qenc ev e, pê re bizewic û ez ê jî jê re bibim xizmetkar, lewre heqê wê li ser min heye û gelek qencî bi min kirine. Jixwe em di mala wan de ne û di welatê wan de û qenciyên ku bavê wê bi me kirine, nayêne hesêb.”

Heyva Zeman dît ku Bidûr Xanê jî ji dil û can dixwaze ku ew bi Jiyan Xanê re bizewice û his kir ku tu xîret û dexesiya wê nîn e li himberî Jiyan Xanê. Rabû bi bavê wê re li hev kir li ser zewaca bi keça wî re. Di heman demê de, razibûna Bidûr Xanê jî pê re parve kir û got ku ew dixwaze xizmetkara Jiyan Xanê be. Melîk Ermanos pir kêfxweş û dilşa bû bi vê biryara Heyva Zeman. Di cîh de rabû ser xwe û çû li ser textê desthilatdariyê rûnişt û agahî da hemû wezîr û emîr û gizîr û fermanîdar û karmendên dewletê ku werin li diwana wî kom bibin. Gava ku kom bûn, Melîk jî çîroka Heyva Zeman û jina wî Bidûr Xanê ji serî hetanî binî, ji wan re rave kir, got. Di pey wê re jî ji wan re got ku ew dixwaze keça xwe Jiyan Xanê bi Heyva Zeman re bizewicîne û wîna bike sultanê welat, li şûna jina wî Bidûr Xanê. Wan jî hemûçikan bi hev re gotin: “Madem ku Heyva Zeman mêrê sultana me ya berê Bidûr Xanê ye û madem ku dê ji îro û pê de zavayê Melîkê me Ermanos be, em ê jî ji niha û pê de wî Sultanê xwe qebûl bikim û em ê ji rê û fermanên wî dernekevin; em ê xulam û xizmetkarên wî bin. Bila dilê sultanê me aram be!”

Sultan Ermanos, pir kêfxweş û dilşa bû bi wê gotin û helwesta wan. Dûvre gazî qazî û şahidan kir, ew û serkêşên dewletê anîn ba xwe û di huzura gişan de mehra keça xwe li Heyva Zeman birrî. Piştî şahî û pîrozbahî li dar xistin, xwarin belav kirin, welîme li dar xistin, sifre raxistin û xelatên giranbûha li emîr û fermanîdar û leşkeran belav kirin, xêr û sedeqe li feqîr û xîzanan belav kirin, hemû girtiyê zindanan berdan, ew azad kirin û bi wî hawî herkesî mîzgîniya destpêkirina sultanetiya Heyva Zeman girtin û jê re dua kirin bi hêviya rojên xweş û aram; rojên tijî dadî û bextewarî di bin siya desthilatdariya wî de.

Gava ku Heyva Zeman bû sultan, zindaniyên mayî berdan, dadwerî li welat server kir û desthilatariyeke têkûz da meşandin. Bi jinên xwe re jî jiyanêke dilsoz û bextewar jiya ku tijî xweşî û dilşadî bû. Her şevêkê li gel yekê ji wan radiket û wekhev nêzîkî wan dibû. Di nava wê kêf û xweşiyê de xwe wenda kir û bavê xwe Melîk Şehrîman ji bir kir. Di wê navberê de Xwedê teala du zarok dane wî ku mîna du heyvên bişevq bûn. Mezinê wan jî jina wî Bidûr bû û navê wî El-melîk El-Emced û yê biçûk jî Jiyan Xanê bû û navê wî El-Melîk El-Esad bû. Herdû jî di nava hebûn û xweşiyêke mezin de, bi delalî mezin bûn; li ser sinc û edebeke kamil. Hînî zanîn û siyasete bûn, fêrî siwarbûna hespan bûn û xwe gîhandin astek mezin ji jêhatbûn û liv û tevgerê. Her du jî pir xweşik û lihevhatî bûn, bala hemû xort û keçan dikişandin ser xwe. Hetanî hivyê saliya xwe jî weke du cewîyan bi hev re bûn ji hevdu venediqetiyar, bi hev re dixwarin, bi hev re vedixwarin û seetekê tenê jî ji hev qut nedibûn. Ji ber vê yekê jî herkesî hesûdiya wan dikir.

Gava ku kamil bûn û xeysiyetên zîlamên gihîştî girtin, ewlehiya bavê wan jî bi wan hat û êdî çi gava ku diçû seferekê an jî bi rêyekê de diçû, her-

du bi dorê li ser textê desthilatdariyê didane rûniştandin, her yekî ji wan du rojan hukum dikir, piştî dewrî birê xwe dikir.

Qederê jî tora xwe wisa li dora wan danî ku rojekê Es'ad ê kurê Jiyan Xanê, dil ket jinbava xwe Bidûr Xanê û dilê Emced ê kurê Bidûr Xanê jî ket jinbava wî Jiyan Xanê. Herdu hewiyan dest pê kirin, bi kurê hev listin. Her yekê bi kurê ya din re diket nav nivîna eşqê û bi maç û ramûsan hevdû dibirin û tanîn. Geh hevdû himbêz dikirin, geh jî hevdû difetisandin di nava ramûsan de. Lê herdu hewiyan jî bi nêta hev nizanîbûn, her yekê ji wan gava ku kurê xwe di himbêza hewiya xwe de didît, digot belkî diloanî û hezkirina dayiktîyê ye. Loma çî gava ku kurê yekê ji wan li hewiya wê rast dihat, di cîh de ew himbêz dikir û nedixwest ku jê veqete.

Carekê bi demdirêjî Sultan ji malê derneket, herdu jinên wî jî di bendewariya aşiqên xwe de bêsebir û bêhteng bûn. Dev ji xwarin û vexwarinê berdan, xew û razan ji wan dûr ket; di nava êşa dilan de hatin qemirandin. Rojekê Sultan çû seyd û nêçîrê û herdû kurên xwe mîna her car li şûna xwe danîn ser hukum. Her yekî ji wan, dê rojekê li ser hukum bimaya....

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî.

HEZAR Û YEK ŞEV

CİLD 6

(Çîroka Herdu Kurên Heyva Zeman, Emced û Eshed)

Şehrezadê vegotina çîroka xwe ji Şahê Mezin Şehreyar re berdewam kir û got:

Îcar Şahinşahê min ê gewre, weke min şeva buhuri ji got; gava Heyva Zeman derket nêçîrê, herdu kurên xwe Emced û Eshed li şuna xwe danîn. Rojê yek ji wan dê li ser hukum bûya. Roja ewil Emced, kurê Bidûr Xanê li şûna bavê xwe bû desthilatdar. Ferman dan, hinek ji peywîrê girtin, peywîr dan hinekan, tiştin qedexê kirin, qedexekirin ji ser hinekan rakir, dirav dan hinekan, ji hinekan jî stend û bi wî hawî welat bi rê ve bir. Di wê navberê de Jiyan Xanê, diya Eshed, nameke evînî jê re nivîsand, tê de got: “Ji hejara evîndar û xemgîn, a ku cîwanîya xwe li ser evîna te kir û bi salan e di navêşa tenêtiyê de ye, bo dildarê min î rûheyvî! Xwezîka te bizanîba bê niha, ez di çi halî de me? Çi êşê dikşînim; di nava çi agirî de, çawa dişewitim! Xwezî te bizanîba bê min çiqasî bêrîya te kirîye û dilê min çiqasî xemgîn e gava tu ne li ber çavên min bî! Heger ez her tiştî ji te re bibêjim, ne kaxez ne jî pênûs têra nivîsandinê dikin. Tenê ez dixwazim ku tu bizanîbî dinya li min teng bûye û tu hêvîya min di kesî din de nemaye ji te pê ve. Tikan ji te dikim; vê hicranê ez kuştim û qudûm bi min ve nehiştîye, gelo tu di hewara min de nayê?”

Piştî ev rîstên jêr jî li nivîsa xwe zêde kirin:

Ger min ev êş û azara xwe bigota bi lez

Ne pênûs diman li ser rûyê dinyê ne kaxez

Piştî kaxeza xwe li hev pêça û xist nav paçekî hevrêşimî ku bi misk û emberê hatibû şuştin û çend bisk ji wî porê xwe yê bi zêran peyde nedîbû jî, pê re pêçan di nava destmalekê de û da xulamê xwe, jê re got: “Vê destmalkê bigihîne Melîk Emced!” Xulam destmal ji destê wê girt û ev bir da Melîk Emced.

Dema Melîk Emced ew destmalê ji destê xulam girt û vekir, dît ku nameyek pêçayî û çend biskên porekî têde ye ku bêhna misk û emberê jê te! Kaxez vekir, xwend û têgihişt ku jinbava wî xayîntîyê bi bavê wî re dike. Gelekî hêrs bû û hemû qewmê jinan gunehbar û şermezar kirin, ji ber vî kare wan. Di dilê xwe de got: “Laneta Xwedê li ser jinên xayîn û kêmaqil û kêmanîyan be!” Piştî şûrê xwe kişand û bi ser xulam de qîrîya, got: “Ey reşîkê bêbext û bêwijdan, tu çawa nameyên xayîntîyê di navbera jina Mîrzayê xwe û xelkê de digerinî? Wellehî tu xêr di te tune ye ey rûreşê dilreş û gemarî!” Bi vê gotina xwe re jî, şûr li stûyê wî da û serê wî firrand û

ew name dişa pêça di nav wê destmalkê de û xist berîka xwe. Piştîre çû cem diya xwe, mijar bi wê re jî parve kir, sixef ji wê re jî dan û got: “Hûn giş ji hevdu xerabtirin di vî karê nicis de. Bi navê Xwedê heger ne ji ber rêzdariya min a li himber bavê min Heyva Zeman û birayê min Melik Eshed bûya, ez ê niha biçûma cem wê û min ê serê wê jî mîna yê xulam bifiranda!” Dûvre di nava hêsek mezin de ji Bidûr Xanê dûrket, çû.

Gava Jiyan Xanê bihist bê Emced çî bi serê xulamê wê kirîye, sixef jê re dan, kîna wî xist dilê xwe û nêta xwe lê xera kir.

Emced, wê şevê bêhal ket, di nava qehr û fikaren de, ne tiştekek xwar, ne jî vexwar.

Roja dîtirkê, birê wî Eshed ket şûna wî de û li ser textê hukûm rûnişt, da ku kar û barê welêt birêve bibe. Diya wî Jiyan Xan jî pir bêhêz û bêhal bûbû piştî ku bihist Emced xulamê wê kuştîye.

Dema Eshed bu hukûmdar, bi awayekî adilane tevgerîya, yê ku nehaqî kiribûn ew ji peywirê girtin. Li şûna wan kesin xwedî wijdan kirin berpirsiyar di karê dewletê de. Di her mijarê de li gora pêdiviyê û li gora heqîyê ferman dan, kesin xelat kirin, hinek ceza kirin û hinek li hev anîn.

Ber esirkî, Bidûr Xan a diya Emced, gazî pîrejineke sihirbaz kir û nêta xwe jê re eşkere kir bê ka dixwaze çî bike. Dûvre ji bo evîn û hezkirina xwe ji kurê mêrê xwe, Eshed re ragihîne rahişt kaxezekê û nivîsand: “Ji ew a ku bi agirê evîna te şewitîye, bo xweşîktirîn, zanetirîn û zîrektirînê hemû zîlam û xortan! Ji wî kesê ku ez heyrana spehîbûna wî me; ew ê ku ez li ser dîn û har bûme, yê ku ez xwe dikujim ji bo xwe nêzikî wî bikim; ê ku timî di bîra min de ye; Melîk Eshed ê bejinzirav û lihevhatî, yê rû heyv û enîbişewq! Ev nameya min ji bo ew ê ku laşe min helandîye û hestîyên min ji hev xistine! Divê tu bizanibî, sebir bi min re nemaye; ez pir bêçare û bêdebar im. Dilê min tê guvaştin û agirê bêrîkirînê nava min dikewîne. Xemgînî û qalaqa min, xew li min herimandîye, malîk li min xera kirîye. Li gel vê jî ez amade me xwe feda bikim, tenê ji bo tu ji min razî bî û tu zerar negihîne te.”

Piştîre ev helbest lê zêde kir û nivîsî:

Qedara min ew bû ku ez dil bikevime te
Ey rûheyvê bi şewq qey deng nayê te
Ziman lal e uşe teng in ezê çawa bêjim
Xweza bê te ne xweza ye ez jî ker û gejim
Razî me ez ku tu bu sebeba êşana min
Sedeqekê bidî, carek tenê binêre li min
Di rîya te de kî bimre dîlşad e ew
Kesê bê îşq û evîn ji her bêxêr e ew

Dûvre, ev helbest jî nivîsand:

Ji Eshed gazincan dikim ez ji vî agirî
 Dilovan be li ser min dildara nav agirî
 Heta kengî di nav lapûşkên bêriyê de
 Heta kengî di êşa eşq û evîn û ereqê de
 Geh di nava avê de geh jî di nava hêtûnê de
 Çi ecêb û sosretin ev hestên di nava min de
 Gazincan meke ji evînê çima tu wisa direvî
 Bang û qîrên min nabihîzî qey tu kerr î
 Êşên te ji xweş in naxwazim derkevim ji wan
 Tu yî hekîmê dilkenî ew mey û derman
 Dev ji hicranê berde û vegere gel min
 Naxwe tê jî biçî bi vî derdî mîna min

Li Şehrezadê bû sibe, vê ji vegotina çiroka xwe birrî.

ŞEVA 221'EMÎN

Şehrezadê, vegotina çiroka xwe berdawam kir, got:

Piştî Bidûr Xanê ew helbest jî nivîsand, misk û ember bi ser kaxezê dakir û li gel çend biskên porê xwe, ew di nava hevrêşimeke Îraqî de pêça, ku tayên wê ji zumruda kesk a ku bi dur û cewheran hatibû neqîşandin. Di pey re jî ew da destê pîrejina sihirbaz û jê re got: “Here, vê nameye bide destê Melik Eshed.”

Pîrejin çû, derbasî cem Melik Eshed bû ku wê gavê Melik bi tena serê xwe bû. Name da destê wî û bi qasî seetekî jî, li bendî bersivê xwe ragirt. Gava ku Melik name xwend û te gihîşt bê meqsed çî ye; name dîsa li hev pêça û keziyên por le gerandin, dûvre ew xist bêrika xwe de. Pir hêrs bûbû û bê navber lanet li jinên bêbext tanî, di nava xwe de. Ji nişkê ve rabû ser xwe, şûrê xwe ji kalanê wî kişand û li stûyê pîrejinê da, serê wê firrand. Dûvre meşiya, çû cem diya xwe Jiyan Xan, dît ku nexweş e û hîna di nav nivînê de ye. Sixef jê re dan, lanet lê barandin û derket; çû cem birayê xwe Emced û çiroka diya wî Bidûr Xanê, ji serî hatanî binî jê re got û ji kuştina pîrejinê jî ew agahdar kir û lê zêde kir, got: “Lewre wê pîrê name anîbû û kuştin heq kiribû. Vêca bi Xwedê keko, heger min ji te fedî nekiribaya; di vê kêlikê de, ez ê derbasî cem wê bibûma û min ê serê wê bifiranda!” Birê wî Emced, lê vegerand û got: “Welle birayê min ê delal, doh çî bi serê min hatibû, îro jî bi serê te hat. Diya te jî nameyek ji min re şand, heman tiştê ku niha tu behs dikî, tê de nivîsandîbû û mijara qewimî bi hûrgulî jê re vegot. Piştî berdeyam kir û pê de çû, got: “Heger ne ji ber fedîya te bûya, ez ê biçûma cem wê û tiştê ku min bi xulamê wê kiribû min ê bi wê jî bikira!”

Şev pê de, gilî û gazincên xwe ji hev kirin, nalet li jinên bêbext anîn,

hêza xwe dane hev û di encamê de şîret li hevdû kirin ku vê mijarê di nav xwe de veşêrin, ji bo ku bavê wan Heyva Zeman pê nehese û herdu jinên xwe nekuje.

Gava bû sibeh, Melîk Heyva Zeman li gel zêrevanên xwe ji nêçîrê ve-gerîya û derbasî qesrê bû. Piştî mîr û mîrek şandin malên wan û ew jî çû malê; derbasî hundur bû, dît ku herdu jinên wî nexweş in û di nav nivînê de ne. Herdu hetikî bûn û ji bo ku avê jî ser xwe zelal bikin û xwe ji kuştinê rizgar bikin, dek û dolabek ji herdu kurên xwe re amade kiribûn. Vêca gava Melîk ew di wî halî de dîtîn, ji wan re got: “Çi bi we hatiye? Herdu pê ve rabûn, destên wî ramûsan, mesele pê re parve kirin û gotîn: “Ey Melîkê gewre, divê tu bizanîbî ku herdu kurên te yên bi saya serê te mezin bûn û gihiştin vê radeyê, bêbextî bi te re kirin di miqabil herdu jinên te de û şer-meke mezin bi ser te de anîn!”

Dema Heyva Zeman ev gotin ji herdu jinên xwe bihîstin, ronahî di çavên wî de nema, hêrs bû, ji qehran hişê xwe wenda kir û ji jinên xwe re got: “Kanî meseleyê bi hûngulî ji min re vekin û bêjin bê çawa qewimîye?”

Bidûr Xanê got: “Ey Melîkê hemû dewranan! Kurê te Eshed ev deme-ke ku nameyan ji min re dişîne û dixwaze zînayê bi min re bike. Ez jî her car li hember derdikevim û wî şîyar dikim. Lê wî her berdewam kir û gava tu derketî nêçîrê, ew serxweş derbasî cem min bu û sûre wî jî di destê wî de bû. Ez tirsîyam ku min jî mîna xizmetkara min bikuje, ez li himber derneketim, wî jî ewka xwe, bi zorê bi min kir û gîha miradê xwe. Vêca heger tu heqê min ji wî nestîni, ez ê bi destê xwe dawîya xwe binim, lewre piştî vê qephetê, jiyan ji min re heram e.” Jiyan Xanê jî heman tişt û heman daxwaz ji mêrê xwe re anî zîman.

Li Şehrezadê bû sibe, wê ji gotina xwe birrî.

ŞEVA 222'YEMÎN

Şehrezadê berdewam kir û got:

Çawa me got, Jiyan Xanê jî weke Bidûr Xan axivî û got: “Kurê te Emced jî, heman tişt bi serê min kir...” Pê re girîya, porê xwe kişand û berdewam kir, got: “Heger tu heqê min ji wî nestîni, ez ê ji bavê xwe Melîk Ermanos re bibêjim!” Dûvre herdu jinên wî bi hev re giriyan, li xwe dan û hêsr rijandin mîna avê.

Dema Heyva Zeman ew gotin ji herdu jinên xwe bihîstin û ew rewşa wan a perişan ket ber çavên wî, bawer kir ji gotinên wan û hêrsek pê re çêbû ku çiya li ber diçûn! Xwest ku di cî de serê herduyan jî bifirîne. Lê di wê kêliyê de li xezûrê xwe Ermanos qelibî ku dihate balê ji bo ku xêrhatina

wî bike. Gava ku Melîk Ermanos ew di wî halî de dît û şûrê di destê wî de, xwîna ku ji pozê wî diherîkî li ber çavên wî ketin, şaşwaz bû û got: “Çi qewimiye, tu çima ewqasî hêrs bûyî?” Heyva Zeman, tiştê ku di derheqê herdu kurên xwe de bihistibû, pêre parve kir û got: “Va niha jî ez ê herim wan bi kuştineke wisa pîs bikujim, bila bibin îbret ji herkesi re!”

Melik Ermanos jî pir hêrs bû bi wê xeberê. Hewadariya wî kir û jê re got: “Xwedê te bistirîne kurê min, helbet tu mafdarî û tu tiştên rast dibejî. Ma qey kurên ku tiştên wisa bi bavê xwe bikin, hene! Bêgûman herduyan jî ew ceze heq kirine. Lê belê kurê min, divê bê bîra te ku bav û kalên me jî dibejin ‘kesê ku encama karê xwe nefikire û bike, gelek caran poşman dibe.’ Veca çawa be jî ev herdu gunehkar kurên te ne. Divê tu wan bidestê xwe nekuji da ku rojek were û tu poşman bibî, êşeke mezin nekeve dilê te de. Ya baş ew e ku tu herduyan teslîmî xizmetkarekî xwe bikî, bila wan bibe çolê û dûrî çavên te, wan bikûje.”

Heyva Zeman, ew gotina xezurê xwe rast dît. Şûrê xwe dîsa li kalanê wî vegerand û dîsa çû ser textê hukum rûnişt û gazî xeznedarê xwe kir. Xeznekarê wî pîremêrekî zana û di çerxa felekê re derbas bûbû. Heyva Zeman, ji xeznedarê xwe re got: “Here cem herdu kurên min Emced û Eshed û wan baş girê bide, bixe du sindoqan de; wan li qantirekê bike û tu jî li yekê siwarbe, wan bibe çolekê û li wir, wan şerjê bike û du şûşe xwînê ji xwîna wan dagire û zû bine ji min re!”

Xeznedarê yextiyar got: “Ser serê min, ser çavên min!” û di cî de rabû ser xwe, berê xwe da cem Emced û Eshed. Di rê de li wan rast hat û ew dîtîn, dema jî dehlîza qesrê derdiketin. Herdu jî di nava cil û bergin pir spehî de bûn û berê wan li cem bavê wan Heyva Zeman bû, ji bo herin silavekê lê bikin û xêrhatina wî bikin ku bi saxî û selametiyê vegeirîyaye malê. Xeznedar, ew girtin û ji wan re got: “Kurên min, hûn jî dizanin ku ez bendeyekî hukumdar im û bi fermanên wî tevdigerim. Niha jî bavê we fermanek daye min, gelo hûn ê bi ya min bikin?” Gotin: “Belê.” Wê çaxî xeznedar bi ser wan de çû, ew girêdan û her yek ji wan xist sindoqekê. Piştî ew bar kirin ser piştî qantirekê û ew jî li yekê siwar bû û ji bajar dûr ketin.

Bi çolekê de çûn û meşîyan hetanî nîvro. Gava gîhan devereke xewle, ji hespa xwe peya bû û herdu sindoqên li ser piştî qantirê daxistin erde, ew vekirin, Emced û Eshed ji wan derxistin. Gava xeznedar li spehîbûna herdu birayan nêrî, hestiyar bû û giriyê wî hat, kûrekûr pê ket, giriya. Piştî şûrê xwe dîsa li kalanê wî vegerand û ji wan re got: “Mîrzayên min ên delal! Bi Xwedê ez nikarim xerabiyê bi we bikim û we bikujim. Lê belê ez evdeki bende me û bavê we ferman daye min ji bo ez we bikujim, îcar ka ez ê çawa bikim, çilo bikim?”

Herduyan lê vegerandin û gotin: “Bavê me çi ji te re gotibe, gotina wî

pêk bîne. Xwîna me li te helal e û Xwedê hez bike em ê bikaribin xwegir bin li hemberî vê biriyara wî!” Di pey re herduyan xwe avêtin himbeza hev, hevdû maçî kirin û xatir ji hev xwestin. Eshed ji xeznedar re got: “Apocan tu bi qedrê Xwedê kî min berî birayê min bikuje ji bo ku ez êşa wî nekşînim û ez bikaribim li ber xwe bidim!” Emced jî heman daxwaz ji xeznedar kir û xwest ku di destpêkê de serê wî jêbike: “Eshed ji min biçûktir e, nehêle ez êşa wî bikêşînim!” Pê re jî giriya û hêsir barandin mîna baranê. Bire wî jî pê re giriya û xeznedar jî bi wan re giriya...

Li Şehrezadê bû sibeh, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 223'EMÎN

Şehrezadê vegotina çiroka xwe berdewam bir:

Vêca gava ku xeznedar jî bi wan re giriya, yekî ji wan ji yê din re got: “Ev hemû ji ber wê bêbextiya diya min û diya te bû; diya min bêbextî li te kir û ya te jî bêbextî li min kir, Xwedê heqê me ji wan re nehêle!” Di pey re Eshed dîsa birê xwe himbêz kir, keserek kişand û got:

Ey qublegeha hemû gazinc û lomeyan
Li cem te ye çare ne li cem sultan
Tu çare nîn in li ba min jî xeynî te
Dinyê gişî bigirim jî nîne kes derî te
Ey xeznedarê dilsoz kanî ew qencî
Xêrekê bike bi min ey mirovê sincî

Wê kêliyê Emced jî birayê xwe himbêz kir û got:

Ey destekdarê comerd ê bêrawestan
Her dem li gel min bû tu bi herdu destan
Di hemû tengahiyan de tu bûyî ew dost
Tu bûyî alîkarê min her tu bûyî ew dost

Dûvre Emced berdewan kir û got: “Tu bi navê Xwedayê hêzdar ê bi tenê kî, tê min berî birayê min bikujî, da ku agirê dilê min vemire û ez mîrîna wî nebinim!” Li himberî vê gotna Emced, Eshed got: “Divê ez beriya birayê xwe bême kuştin.” Emced got: “A baş ew e, em hevdu himbêz bikin û wisa bimînin di himbêza hev de hetanî ku şûr li stûyê me herduyan bikeve û em herdu bihevre xelas bibin!”

Gava herduya hevdû himbêz kirin û rûyên wan bi hev ve zeliqî bêtî ku hevdû berdî; xeznedar ew bi şerîtan gîrêdan û di ber re jî digiriya. Piştî şûrê xwe ji kalanê wî derxist, lê nikaribû wî hilde. Kelûgirî bû û ji wan re got: “Mîrzayên min, willehî kuştina we pir zor e bi min. Gelo tu daxwazeke we ya dawî heye ku ez pêk binîm; ango wesîyetek, nameyek we heye ku ez

wê bigihînim hinekan?”

Emced got: “Tu pêdivî û daxwaziya min tune, lê weke wesîyet ez dixwazim tu serê min deyne serê birayê min, da ku derba ewil li stûyê min keve. Gava te em kuştin û tu çûyî cem sultan û wî jî ji te pirsî bê kanî me çî gotiye berî mirina xwe; jê re bibêje, silavên kuren te li te hene, dibêjin; te herdu kuştine bêtî tu bizanibî bê gunehên wan hene an na, bêtî ku tu li rewşa wan bipirse û zelal bike, te ew kuştine.” Di pey re jî bi helbestî berdewam kir û got:

Jin şeytan in ji bo me afirîne
Eûzû-bîllah ji wan bila kes nebîne
Sersebeba hemû sebebên ew in
Çi li vê dinê çi li wê dinê her ew in

Û jê re got: “Ez dixwazim tu van her çar rîstên ku min ew gotin jî, tu wan bigihîni wî....

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotîna xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 224'EMÎN

Şehrezadê berdewam kir û got:

Emced ji xeznedar xwest ku wan çar rîstên wî bigihîne bavê wî û di pey re jî berdewam kir, got: “Ez hêvîdar im tu piçekî din jî bêhna xwe li me fireh bike ji bo ku ez çend rîstan ji birayê xwe re jî bibêjim.” Pê rê jî hêsir barandin, giriya û got:

Di dîroka sultanê de gelek ders hene
Gelo çiqase bûyer tê de qewimîne?
Biçûk û mezin gelek bûyeran tê de rûdane
Helbet em jî çîrokek ji wan çîrokane

Dema ku xeznedar ev gotinên Emced bihîstin, giriya û hey giriya hetanî ku rîha wî şil bû ji ber hêsirên wî. Eshed jî pîr hestiyar bû bi wan gotinên birê xwe, çavên wî tijî bûn, got:

Dibarêne qeder bi ber me de bobelatan
Giriyê me ne li ser sûretan e li ser xeyalan
Ev ne bêbextiya şevan bû ne jî şevînan
Qedera xaliq bû ev bi destên dexesokan
Wê xefîka xwe vedabû li ber kurê zubêr
Ne xefîka li ber Elî bû li mizgeftê ne jî li dêr
Madem ku jiyanek hate bexşîn bi derew
Xwezî bi dilekî şad û şûd biçûya lew

Piştî hêsirên xwe paqij kirin û dîsa berdewam kir, got:

Şev û roj hatin mohrkirin bi bêbextiyê
Dek û dolab û xap pir bûne vê dawîyê
Her derê serab e simbêlê mişkan jî heye
Di her dereke reştari de çavekî kul jî heye
Gunehê min ew e ku ez ne li gora demê me
Gunehê şûrkêş jî ew e ku şûrê wî nabire

Piştî keserek kûrtir kişand û dîsa berdewam kir, got:

Daxwazkarê jiyana gunehkar qet nizane
Ku ev dinya mala keder û şîrk û êşane
Û roja li pey wê jî mirov dide êşandin
Ez ê çi bikim ji maleke ewqasî bêwijdan
Naqedin êrîşên wê her dixwe ew serê mirovan
Qet têr nabe ew ji xap û rîp û zirderewan
Ne jî têr dixwe ew malxerab ji berdêlan
Çendîn kesan tinazên xwe bi wê kirine
Çendîn mêran serê xwe li ber wê rakirine
Çendan piştî xwe xûz kirine bi derdan
Çendan ji wan xwe negîhandine dilan
De temenê xwe bijî û berde tu wan hesaban
Guh mede rûpoşan, çi hebe di pişt wan de ye
Berde hezkirina vê dinyê birawo berde
Da ku tu bibînî rêya rast û şahî di gel de

Piştî Eshed ev helbesta xwe qedand, careke din birayê xwe himbêz kir bi kelecaniyeke mezin. Herduyan hevdû bernedan mîna ku bûbîn yek mirov. Xeznedar jî şûrê xwe rakir, ji bo seren wan bifirîne. Lê di wê kêlikê de hespê wî cefilî, fişefiş pê ket û bi çolê de terqîya. Hespê wî pir buha bû û zînek li ser piştî wî bû ku bi hezar dînarî bû. Loma, wî jî di cih de şûr ji destê xwe avêt û ket pey hespê xwe de...

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî dengê xwe birrî.

ŞEVA 225'EMÎN

Şehrezadê berdewam kir û got:

Çawa ku me şeva berê jî got, xeznedar bi kelecî û metirsîyeke mezin li pey hespê xwe çû, ji bo ku wî bigire. Lê hesp jê xurttir bû, mecal nedît ku xwe zû bigihîneyê. Herî dawî, hespê wî ket nav daristanekê, ew jî li pey çû. Gava ku xwe nêzikî wî kir, dît ku hespê wî pîkolê dike; her çar nigên xwe bi hev re li erde dide, dike hîrehîr, toz û ecaceke ecêb bi dora xwe dixê. Tu nabê şêrekî weke dêwekî di nav wê daristanê de hebû ku agir ji çavên wî diçû. Qelafetekî erjeng li ser bû ku nava mirov diqetand.

Veca beriya ku xeznedar xwe bigihîne hespê xwe, bala xwe dayê ku ev şêr bi ser wî de tê. Di dilê xwe de got; “Lahawle wela quwete illa billah! Bi her sê navê Xwedê, ew hemû di rûyê zulma ku min li Emced û Eshed kiriye têne serê min! Xuyaye ev herdu kurik bê guneh in û ew rêwîtiya min wisa tête xwiyakirin ku ji serî de bêoxir bûye!”

Emced û Eshed jî ji tînan dikirin ku bifetisin di bin germahîya kelkela havînê de. Zimanê wan bihustekê dirêj bûbû, kalekal û hewara wan bû, lê tukes bi wan ve nedihat. Wê gavê, herduyan ji xwe re gotin: “Xwezîka em bihatana kuştin û me ev êşa han nekişanda! Lê gelo kî dizane bê hesp ji ber çi cefilî, reviya û çima xeznedar bi dûv ket, çû û em wisa girêdayî hiştin? Bêgûman heger bihata em bikuştana, wê ji me re çêtir bûya ji vê ezîyetê!” Lê di wê navberê de tiştikî din ket bîra Eshed û ji birayê xwe re got: “Hebekî din sebirwar be birawo, bêgûman fereca xêrê nêzik e, dê Xwedê li me were rehmê. Cefilîna hesp û reva wî jî lutfek ji ba Xwedê ye û dê bibe sebebeke xêrê. Li himberî vê tîbûnê em bikaribin hinekî din ji xwe ragirin, pîrsgirek namîne.” Piştî hêza xwe gîş komî ser hev kir, dest û milên xwe tev dan, xwe vir de wir de bir û anî hetanî ku benê ser milên wî şemitî û destên wî vebûn. Bi lez rabû ser xwe, destên birayê xwe jî vekirin û rahişt şûrê xeznedar, dûvre ji Emced re got: “Bi Xwedê divê em ji vir neçin hetanî ku em agahîyekê ji xeznedar negirin û fêr nebin bê çi bi serê wî hatiye!”

Herduyan dan tengala hev û ketin pey şopa wî çûn hetanî ku gihan wê daristanê. Herduyan ji hev re gotin: “Em texmîn nakin ku hesp û xeznedar ev daristan derbas kiribin!” Li wir Eshed ji birayê xwe re got: “Tu li vir be, ez ê biçim nava daristanê raçav bikim û werim!” Emced lê veğerand û got: “Tu tenê meçe, em ê herdu bi hev re herin nav daristanê û bi hev re werin. Heger tişteke qewimî jî, bela bi serê me herduyan de biqewime!”

Herdu bi hev re derbasî nav daristanê bûn û di nava çend xulekan de, dîtin ku şêrekî mîna dêwekî êrîşî ser xeznedar dike û mîna çûkekî wî di nava lopûşkên xwe de dibe û tîne. Ew jî “Allah Ellah”ê wî ye, gazî û hewara xwe dibe Xwedê. Çawa ku ew dîmen li ber çavên wan ket, Emced rahişt şûr û êrîşî ser şêr kir, şûrê xwe li nivê serê wî xist, di cîh de ew kuşt. Şêr gindirî erdê û xeznedarê ziravqetiyayî jî bi lez û bez rabû ser xwe matmayî mabû, hilma xwe bi zorê dikişand. Gava ku Emced û Eshed di wê rewşa xelaskar de dîtin, xwe avêt ber nigên wan û bi bergerî got: “Mîrzayên min! Willehî hûn ne kesin ku divê werine kuştin in, bi navê Xwedê ez ê ruhê xwe di ber we de bidim û ez nahêlim hûn werine kuştin...”

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî vegotina çîroka xwe birri û bêdeng bû.

Şehrezadê berdewam kir û got:

Piştî xeznedar ji wan re got ‘Ez ê xwe bikim qurbana we, ez nahêlim tiştek bi we bê’ rabû ser xwe, ew herdu himbêz kirin û sebeba hatina wan ji wan pirsî. Wan jî gotin: “Welleh em pir tî bûbûn, me nema debar dikir û ji mecbûrî me destê xwe vekir. Lê ji ber ku me rewşa te pir meraq dikir, em li pey şopa te hatin hetanî vîr.” Xeznedar pir hestiyar bû bi vê nêzikahîya wan û spasîya xwe pêşkeşî wan kir.

Piştî ku ji nav daristanê derketin û bi şûn de vegeirîyan cihê xwe, Emced û Eshed ji xeznedar re gotin; “De kanî îcar fermana bavê me pêk bîne!” Xeznedar got: “Ne gengaz e ez zerarekê bidime we û bêwijdanêtiyeke wisa mezin bikim. Lê ez ê kincên we ji we bikim û yê xwe li we bikim; ez ê du şûşeyan ji xwîna wî şêrê kuştî dagirim û ez ê herim cem bavê we, ez ê jê re bibêjim, binêre sultanê min vaye min herdu kurên te kuştine. Hûn jî ji xwe re bi cihekî din ve herin, lewre erda Xwedê fireh e û dinya mezin e! Divê hûn jibîr jî nekin ku veqetîna ji we êşekê betimtêl dîde min, lê ez mecbûr im ji we veqetim!” Piştî bi ser wan de giriya, ew jî bi ser wî de giriyan.

Piştî ku herduyan kincên xwe ji xwe kirin, xeznedar jî kincên wan dane ser hev û xistin du buxçikan, du şûşê jî bi xwîna şêr dagirtin û xatir ji wan xwest, li hespê xwe siwar bû, berê xwe da bajêr.

Xeznedar hate bajêr, berê xwe da qonaxa sultan, derbasî cem wî bû. Sultan çawa çav li wê rewşa wî ya jihevketî û rûyê wî yê mehdedayî ket, di dilê xwe de got: “Xwîyaye ku vî zilamî fermana min pêk anîye û cezayê wan herdu gunehkaran daye wan!” Û bi vê yekê kêfxweş bû, jê re got: “Te karê xwe qedand?” Xeznedar lê vegeand û got: “Belê Mîrzayê min!” Pêre jî herdu buxçikên ku kinc û şûşeyên xwînê tê de bûn dirêjî wî kir. Sultan Heyva Zeman got: “Di wê rewşê de te ew çawa dîtî? Tu wesîyet û daxwazên wan çêbûn gelo?” Xeznedar got: “Herdu jî pir xweragir û xwedî vîn bûn li himberî cezayên xwe. Herduyan jî gotin bavê me mecbûr bû wisa bike, silavên me bigihîne wî û jê re bibêje ku tu gunehê wî dî xwîne me de tune ye û wesîyeta xwe li min kirin ku ez van ristêyên wan ji te re bixwînim:

Jin şeytan in ji bo me afirîne
Eûzûbillah ji wana bila kes nebîne
Sebeba hemû belayan ew in
Tovê hemû xerabîyan ew in

Gava ku sultan ev gotin ji devê xeznedar bihîstin, serê xwe bera ber xwe da û kûr kûr fikirî. Herî dawî jî giha encamakê ku ev gotin têne wê wateyê ku herdu kurên wî bi neheqî hatine kuştin. Li ser dek û dolabên jinan fikirî û buxçikên ber xwe vekirin, li kincên zarokên xwe temaşe kir

û giriya...

Li Şehrezadê bu sibe, wê jî gotina xwe birrî.

ŞEVA 227'EMÎN

Şehrezadê berdewam kir û got:

Sultan buxçik vekirin û giriya. Gava destê xwe avêt kincê kurê xwe Eshed, dît ku kaxetek di bêrika wî de ye. Kaxeta pêçayî vekir, xwend; dît ku jina wî Bidûr Xatûnê nivisandîye û çend biskên porê xwe jî xistiye nav de. Têgihişt bê rastiya meseleyê çi ye û fêm kir ku kurê wî Eshed bi neheqî hatiye kuştin. Kincên Emced jî li hev qulupandin, dît ku nameyek di bêrika wî jî de ye. Nameya li hev pêçayî vekir, dît ku çend biskên porê jina wî Jiyan Xanê di nav de ne û name jî bi destê wê hatiye nivisandin. Name xwend û têgihişt ku kurê wî Emced jî bi neheqî hatiye kuştin. Herdu destên xwe danîn ser hev û got: "Lahevle û laqewete îllabîllah, herdu kurên min jî bêguneh bûn û min ew bi neheqî kuştin!"

Bi destan por û rîha xwe kişkişand, li serê xwe da û nalenal pê ket û got: "Wêy li minê, wey li minê! Min çawa bi destê xwe mala xwe xerakir û herdu kurên xwe yên bêguneh kuştin!"

Sultan ket nava xemgîniyeke kûr û bêdawî, ferman da ku du goran çêbikin û navên kurên wî li ser wan binivîsinin da ku hinekî bêhna wî bi wan derkeve. Maleke şîniyê jî li ser herdu goran da avakirin û xwe avêt ser tirba Emced, giriya û got:

Kanî ew stêrka ku bi neheqî hate binaxkirin
Kanî ew heyva ku hemû stêrk li ser digirîn
Min dil ji te tunebû ku ez li te binerim
Lê tu çû û te hişt ku ez dîn û lal bigerim
Xew li min herimî her ser bieş û gêj im
Şevbuhêrka min li gel te ye her dil bieş im

Piştî, xwe avêt ser tirba Eshed û giriyê xwe berdewam kir, li gel gilî û gazinc û nifîrên ku li xwe dibarandin. Di encamê de qirek da û bi helbestî got:

Min dixwest ku mirina min jî bi ya te re be
Lê Yezdanê me her xwest ku ew cuda be
Reş bû dinya li ber çavên min bi çûna te re
Wisa tarî ku reşahiya çawan jî bir bi xwe re
Di çavên min de hêşir neman tev miçiqîn
Rehên dil giş zuha bûn kanî ew xwîn
Dilovan be û carekê tenê xwe nişan de

Li cihekî ku bênamûs û namûskarê wî yek be

Piştire Heyva Zeman bi temamî, xwe ji jiyana rojane qut kir û nema derket ji mala xemgîniyê. Dûrî jinan ket, dûrî heval û dostan ket û nema ji ber kêlên herdu tirban rabû.

Em Heyva Zeman li wir bihêlin û em vegeirîn ser rewşa Emced û Eshed. Wan ji meşa xwe li wê çolistanê berdewam kirin. Gava ku birçî dibûn, çi biketa ber wan dixwarin, gava ku tî dibûn ji ava baranan an ji a cihok û koncalan vedixwarin û bi wê hêza xwe diparastin ji bo ku bikaribin meşa xwe berdewam bikin. Bi wî hawî mehekê sax meşiyar. Piştî mehekê, xwe gîhandin çiyayekî ku kevirên wî berhesteyên reş bûn û ne serî jê re hebû, ne binî. Li wê derê rê ji li duriyanekê bi dawî dibû û dibû dû re; yek di pala çiyê re diçû û ya din ji berjor ve diçû ber bi serê çiyê ve. Bi hev şewirîn, piştire di rêya ku berjor ve diçû meşa xwe berdewam kirin, lê dawî jê re nehat û ew ji pir betilin; lewre fêrî meşa li çiyar nebûbûn. Careke din bi hevdû şewirîn û di encamê de bi şûn de vegeirîyan û ji nûve di ew riya dîtirkê meşa xwe berdewam kirin.

Li Şehrezadê bû sibeh, wê ji gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 228'EMÎN

Şehrezadê vegotina çîroka xwe berdewam kir:

Di vegerê de piştî meşa roj û şevê Eshed westiya û ji birayê xwe Emced re got: "Biracan, bi Xwedê ez pir westiyame û ez nema dikarim bimeşim!" Emced lê vegerand û got: "Hebekî din ji li ber xwe bide birawo, belkî Xwedê Teala deriyekî xêrê li ber me veke!" Di pey re bi qasî seetêke din ji meşiyar, lê şev tarî bû û riya çiyê zor bû, qudûmê Eshed nema şuxulî û hal tê de nema. Ji birayê xwe re got: "Emced, birawo ez pir betilim, hêz di çogên min de nema!" Û hîna ew gotina xwe neqedandibû, çogên wî fisîyan, li erde ket û giriya. Birayê wî rahiştê û riya xwe bi wî hawî berdewam kir; seetekê meşiya û seetekê bêhna xwe berda hetanî ku lê bû sibeh.

Bi sibehê re Emced birayê xwe gîhandibû serê çiyê. Li wê derê kaniyeye avê dîtî ku li kêleka wê dareke hinaran û mîhrabek hebû. Çawa kuu ew kaniya avê dîtî ji kêfan perên wan çêbûn; têra xwe av jê vexwarin, hinar xwarin û li kêleka kaniyê rûniştin, bêhna xwe vekirin û raketin hetanî ku tava rojê li wan da. Dîsa rabûn ser xwe, dest û rûyê xwe şûştin, têra xwe hinar xwarin, ava xwe vexwarin o careke din xwe dirêj kirin, raketin hetanî esrê, wê gavê Emced xwest ku rabin, meşa xwe berdewam bikin, li nigên Eshed werimî bûn û qet nikaribû bi rê ve biçûya. Lewma mecbûr man ku sê rojên din ji li wir bimînin.

Piştire dîsa meşa xwe berdewam kirin bi rojan hetanî ku tîbûn û westanê laşên wan hezhizandin. Lê gava ku ji dûr ve bajarek li ber çaven wan ket, pir kêfa wan hat û dîsa qudûmê wan şuxulî, meşa xwe berdewam kirin hetanî ku gîhan wî bajarî. Beriya ku derbasî bajêr bibin, Emced ji Eshed re got: “Birayê min, ê te tu li vir bimîne, hetanî ku ez herim bajêr û binêrim bê çi heye, çi tune; bi kêmanî ez fêr bibim bê em li ku derê ne. Lewre erda Xwedê fireh e û bi mehane em dimeşin. Xwedê dizane heger em di vê riyê de nehatana, belkî saleke din jî em negîhana vî bajarî. Îcar şikir ji Xwedê re ku me rîya xwe rast kir û em bi wê rîya din de neçûn.” Birayê wî Eshed lê vegerand û got: “Bi Xwedê birawo yê ku biçe bajêr, divê ez bim ne tu. Divê ez cangoriyê te bim. Jixwe gava ku tu diçî û ez bi tenê dimênim, pir mitale bi min re çêdibin li ser te û ez nikarim xweragirim bêyî te: pir fikar bi min re çêdibin.” Wê gavê Emced jê re got: “Naxwe here û dereng nekeve!”

Eshed birayê xwe li wir hişt û xwe ji pala çiyê, berjêr ve berda hetanî ku ket nav bajêr û di sikakên wê re meşîya. Di rê de li yextiyarekî temendirêj qelibî ku rîha wî bi ser sînga wî de dadiket, kalozekî mezin di serî de bû û kincên giranbuha lê bûn. Gava ku Eshed ew kalozê sor li serî û ew kincên ecêb li ser wî ditin, lê ma behetî! Jê pirsî, got: “Mîrzayê min, gelo mirov di ku re dikare xwe bigihîne sûkê?” Kalo ji axaftina wî fêm kir ku xerîbê wan devera ye. Pêre beşîşî jî got: “Mirov dibêje qey tu ne ji van devera ye xwarzê?” Eshed lê vegerand û got: “Belê kalocan, ez xerîbim û ne ji vir im.” Kalo got: “Te kêfxweşî ji me re anî bi hatina xwe re û te xemgînî li pey xwe hişt di nav kes û karen xwe de. Gelo çi kare te li sûkê heye?” Eshed got: “Apocan wile birayekî min jî heye ka niha li derveyî bajêr e û niha li hêviya min e. Em ji welate dûr in û ev sê mehên me ne ku em di rê de ne, dimeşin. Vêca gava em li vî bajarê we qelibîn, ez hatin vir da ku ez hinek xwarin-marîn bikirim û dîsa li birayê xwe vegerim.” Kalo jê re got: “Ez ê jî niha ve mizgîniyeke xêrê bidime te. Ez agahdar bûme ku îro xêrek têtê belav kirin, ku xwarinên herî xweş têtê hene. De êdî ka bi min re were wir da ku ez têra te xwarin û marînê bidime te, bêyî ku ez metelikekî jî ji te bistînim. Hem jî di wê navberê de ez ê hal û rewşa vî bajarî jî ji te re ragihînim? Ji aliyekî din ve jî şikir ji Xwedê re ku yekî mîna min derxistiye pêşîya te, ne yekî din.” Eshed got: “Tu çawa dixwazî wisa bike, lê hebekî bilezîne ji kerema xwe re lewre birayê min li benda min e û qedrê wî li ba min pir heye!”

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî.

ŞEVA 229^{EMÎN}

Şehrezadê berdewam kir û got:

Kalê pîremêr bi destê Eshed girt ew da dûv xwe û di sikakek teng re

meşîya hetanî ku ket zaboqekê de. Li wir, di rûyê wî de beşîşî û ji Eshed re got: “Duayan ji Xwedê re bike ku tu ji xelkê vî bajarî sitirandiye!” Û meşa xwe berdewam kir hetanî ku ket maleke xweş û fireh de. Di hundur de çil heb pîremêrên din, mina wî kal hebûn, ku li dora agirekî dadayî rûniştîbûn, bûbûn xelek û ji agir re ketibûn xiraş û sicûdê de. Gava ku Eshed çav li wê dîmenê ket, mûyên laşê wî rabûn, şaşwaz bû bêyî ku bizanibe mesele çi ye. Kaloyê ku ew anîbû jî, çawa ku derbasî cem wan bû, ji wan re got: “Ey şêxên agir! Agir ji rojê jî berdêrtir û mubarektir e!” Bêhna xwe berda û li evdekî reş î pozpellixî û rûdayî zîvirî, jê re got: “Ey xezebo! Kanî rabe vî xortî girêbide!” Xezebê ku mîna dêwekî bû rabû ser xwe, dest û nigên Eshed girêdan. Kalo axaftina xwe berdewam kir û ji evd re got: “Wî bibe, bixe binerdikê de, bila li wir bimîne.” Û li cêrikê jî zîvirî, jê re got: “Tu jî bi şev û roj îşkence û lêdanê lê bike!”

Evdê reş Eshed daxist jêr, ew xist dehlîza bin erdê û piştî jî berpirsiyariya wî, radestî cêrîyê kir û bi şûn de çû. Cêrîyê jî dest bi kare îşkenceya xwe kir, sibehê nanek, êvarê jî nanek dayê, kûzekî ava şor bi firavînî re û yek jî bi şîvê re dayê. Kâlân jî ji hev re gotin: “Dema ku cejna agir were, em ê wî serjê bikin û laşê wî bidin ber agir!”

Cêrîyê ew birçî hişt û ew da ber daran, lêda hetanî ku xwînê di her derên wî re avêt û di encamê de jî ji ser hişê xwe çû. Wê jî nanek danî ber serê wî, kûzekî ava şor jî li gel danî û çû. Nîvê şeve, “Eshed bi ser xwe ve hat û ji xew rabû. Li xwe nêrî dît ku dest û nigên wî girêdayî ne û laşê wî giş bi birîn û êş e. Bi ser wî halê xwe de giriya û di rojên xwe yên şahî û kêfê yên buhurî de fikirî, agir bi kezaba wî ket. Kûr kûr keser vedan û dî ber xwe de got:

Li ber kavilan rawestin û agahiyên me ji wan bigirine
Qet nefikirin ku em hîna mîna berê di mal de ne
Feleka bêbext em ji hev û din belawela kirine
Zikreşan çawa dixwest wisa bi serê me de anîne
Eş û azara van qamçîyan hîna di nava min de ne
Hemû beden û giyana min bi êşê tijî kirine
Vêca hêviya me ma Xwedan û dibêtiya dîtine

Piştî ku Eshed ew helbest xwe got, bêhne xwe berda û destên xwe bi hêla serê xwe de dirêj kirin. Çawa ku ew dîrej kirin, destên wî li nanekî ket. Wî ev nan xwar da ku birçûbûna xwe pê bişkîne û hinekî bi ser xwe ve bê. Piştî hinek ji wê ava bixwê jî vexwar û şîyar ma hetanî sibehê, lewre kêç û kermêş pir bûn û rê nedidan wî ku kêliyekê tenê jî di xwe re here.

Bi sibehê re, gava ku cêrî hat, ew kincên wî yên bixwîn di ser re anîn û ew jî wisa girêdayî di nava qeyd û zincîran de birayê wî Emced û rojen wî yên xweş hatin bîra wî, dilê wî bi wî şewitî û kûr kûr ponijî...

Li Şehrezadê bû sibeh, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 230'EMÎN

Şehrezadê berdewam kir û got:

Veca gava birayê wî hat bîra wî û ew rojên xwe yên şahî û xweşiyê ji nû ve yad kirin, Eshed xemgîn bû û dilê wî êşîya, pê re jî giriya û di ber xwe de got:

Xwedêyo tu çiqasî mezin î bi hukm û hêza xwe
Ger tu razî bî ezê firehtir bikim bêhna xwe
Lê sebra insan çî be jî rev nîne ji qedera xwe
Dîsa jî ew e çeka min çî bikim ez ji qedera xwe
Bijareka min sebr e lew ku agir be li ser te
Hêvîya min dad e lew zulum pir bûbe li ser me
Belkî bi qencyekê hemû guneh werin efûkirine
Ango tu çaven xwe ji ser gunehan digirî haşa!
Ma qey tu ne Xwedayê min î jî ey Xwedayê erşa!

Bêdeng bû, hinekî din ponijî û dîsa bi helbestî got:

Guh med tu tiştî her tişt demkî ye
Hem qencî hem jî xerabî her heye
Her kes jî her li bendî dora xwe ye
Carinan bedxerabî jî ji xêrê ve ye
Dibe ku roj were ev tengahî jî rabe
Ango ev rewş bi xwe bike xerabtir bibe
Çawa dixwazî wîsa bike ey Xweda
Qet li himber te dernakevim ez tu cara
Va ye mizgîniya xêrê hat ji min ra

Hîna ku nû ev helbesta xwe qedandibû, cêrî dîsa lê vegerîya û bi daran pê ket, lêda hatanî ku careke din ji ser hişê xwe çû, çawa ku ji ser hişê xwe çû, cêriye dîsa kûzekî ava şor û nanek danî ber serê wî û ji wir çû; ew bi tenê hişt di nava wan qeyd û zincîran de, bê kes û kûs û dûrî hemû nas û hezkiriyên wî...

Li Şehrezadê bû sibeh, wê jî vegotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 231'EMÎN

Şehrezadê berdewam kir:

Îcar em Eshed di nava wê îşkencê û lêdanê de bihêlin û em vegerin ser rewşa birê wî Emced. Emced jî hetanî nîvro li bendî vegera birayê xwe ma.

Lê dema ku birayê wî nehat, dilê wî lêda û tîrên êşeke nedîyar xwe berra nava hinavên wî dan. Dest bi girî kir li ser birayê xwe, hêsir li ser barandin û di dilê xwe de got: “Wax wax birawo! Tu çawa ji min veqetiya!?”

Piştî rabû ser xwe û hêdî hêdî ber bi bajêr ve çû. Hem hêsir dibarandin li ser birayê xwe û hem jî li ser rewşa wî diponijî. Derbasî bajêr bû û nesekîni hetanî ku gihast sûka bajêr. Li sûkê, rewşa bajêr û navê wê ji xelkê pirsî; jê re gotin, ev bajar warê Mecûsîyan e û xelkên wê agirperest in, sultanê wê jî mirovekî egîd û mêrxas e.

Piştî li bajarê Ebanos pirsî, wan jî jê re got: “Mesafeya di navbera me û Ebanos de, di bejahîyê re meşa salekê ye û di riya deryayê re jî şeş meh e. Nanvê sultanê wê Ermanos e. Lê vê dawîyê yekî bi navê Heyva Zeman kir zavayê xwe û ew li şûna xwe kir sultan. Bi qasî me bihîstîye ew sultanê han jî mirovekî rast dadmend, ciwamêr û destvekirî ye, ku qencîya wî digihê herkesî.

Gava ku Emced di derbarê bavê xwe de ev gotinên xweş bihîstin, pir hestîyar bû û pêlên bêrikirinê ew rapêçan. Giriya, ah û wah pê ketin û nema dizanîbû wê çi bike, çi neke û bi kû ve here. Hinek nan û pêxwarin ji xwe re kirrî û çû li cihekî nepenî rûnişt ji bo gepek xwarin bixwe û birçûbûna xwe bişkîne. Lê hîna çend gep nexwaribûn, birayê wî hat bîra wî, dîsa dest bi girî kir û xwarin di qirika wî re neçû.

Di pey re rabû ser xwe, li nava bajêr gerîya, ji bo ku agahîyekê di derbarê birayê xwe de bigire. Li dikanekê terzîtîyê, mirovekî musulman dît, li gel wî rûnişt û çîroka xwe û birayê xwe jê re vegot. Terzî jî got: “Heger birayê te ketibe destê yekî Mecûsî, pir zor e tu bikaribî wî bibîni. Dîsa jî ez hêvîdar im ku tu birayê xwe bibîni!” Piştî bêdengîyê kurt, terzî axaftina xwe berdewam kir û ji Emced re got: “Birayê min, tu dikarî li gel min bimîni?” Emced lê vegerand û got: “Belê.” Terzî pir kêfxweş bû bi mana wî. Her roj pê re mijûl bû, ew fêrî hûrguliyên pişesazîtiya terzîtîyê kir û pêre bû alîkar, hetanî ku bû hosteyê wî karî.

Rojekê, Emced ji xwe re derket seyranê. Çû ber qiraxa deryayê kincên xwe şûştin. Çû hemamê û kincin nû li xwe kirin. Piştî li nava bajêr gerîya. Di wê navberê de li keçeke spehî rast hat ku mêr dikûştin bi husn û cemala xwe. Rûheyv, qirik mircan, çavbelek û bejinzirav bû. Gava ku keçikê jî ew dît, rûpoşa xwe rakir, çavek da Emced û laqirdî pê re kirin. Emced ji îşaretek da wê û bi helbestî got:

Rûgul e xatûn stirî kom in li derdorê
Tukes nikarê destê xwe bavêjêyê bi zorê
Kî dikare tûşî wê bibe û zêrevan li dorê
Çawa ku awir pêkevin dê birjînîn xwînsorê

Ji wê mêrkuja zalim ra bibêje bila adil be
 Ger dadmend be ew her dê pir spehîtir be
 Rûyê wê ronak û bişewq e her dilbijîne
 Ayetên spehîbûna wê jî her digirin jîne
 Mîna heyvekê diçûrisîne ew rûyê gewez
 Ka ku bi tama xemgîniyê jî bihata bi lez
 Dê weke sipîndarekê xuya bikira ew dildiz
 Çima pêşiya me digirin gelo zêrevanên taxê
 Wan berdin ger meqseda we be birîna şaxê
 Bila baş bizanibin ku ez qet natirsam ji wan
 Lewre xetera mezin awirên wê ne ne zêravan

Gava ku keçikê ev gotinên Emced bihistin, keserî kûr berdan, îşare-
 tek da wî û bi helbestî got:

Tu xwe bi şûn de didî ne ku ez ber te digirim
 Heger daxwazkar bî tu ji zû ve ez minêkar im
 Bê payebûn dibêjim ku eşqa ez sotime bi agir
 Lê tiştêkî asayî ye ku atêşperest himbêzke agir
 Diyar e ku bêdirav difiroşî tu wî dilê xwe
 Ger wisa be naxwe tu jî min bibe li şûna dilê xwe

Gava ku Emced ev gotinên wê bihistin, jê re got: “Gelo tê bi min re
 werî angû ez bi te re werim?” Keçikê şerm kir û serê xwe berra ber xwe da,
 piştî ayetek ji Qur’ânê neqand û got: “Zilam serdestin li himberî jinan lew
 ku hîlbijartina wî li gora qenciya wan e!”

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 232’EMÎN

Şehrezadê berdewam kir:

Çawa ku me got, Emced ji wê ayeta ku keçikê xwend, têgihîşt ku ew
 dixwaze pêre here. Ew da dûv xwe û di sikakê re meşîya. Lê fedî kir ku wê
 bibe cem terziyê ku li cem wî dimîne. Loma meşa xwe berdewam kir û ji
 sikakekê derbasî sikakeke din bû bêtî ku li cihekî raweste. Carekê keçikê jê
 re got: “Mirzayê min, kani mala te li ku derê ye?” Emced got: “Li pêşiya me
 ye, zêde nemaye!” Piştî li sikakeke paqij zivirî û pê de çû hetanî ku gihîşt
 dawîya sikakê. Li wê deverê rastî şibakeyekê hat. Lê nêrî û ji xwe re got:
 “Lahewle wela qewete ille billah!” Di pey re awirên xwe bi hêla çepê de zî-
 virandin û dît ku deriyekî mezin î bi du baskan, di zikê sikakê de ye. Lê belê
 derî girtî bû. Emced li ser pêlika derî rûnişt, keçik jî li ser ya dîtirkê rûnişt
 û jê re got: “Tu li bendî çî ye, Mirzayê min?” Emced serê xwe bera ber xwe
 da, hinekî ponijî, dûvre got: “Ez li bendî xulamê xwe me, mifteya derî bi wî

re ye loma! Berîya ku ez ji malê derkevim, min jê re gotibû hetanî ku ez ji hemamê bêm, tu jî hinek xwarin û vexwarin ji me re amade bike, lê va hîna jî nehatiye!” Piştîre di dilê xwe de got: “Heger wîsa ez berdewam bikim û meseleyê dirêj bikim, belkî ew jî zivêr bibe û dev ji min berde here!”

Bi dirêjbûna demê re, keçik qelîqî û jê re got: “Mîrzayê min, xulamê te dereng ket û em jî li sikakê rûniştîne!” Bi vê gotina xwe re jî keçik rabû ser xwe, rahişt kevirekî û li kilîda derî da. Emced jê re got: “Eceleyê meke û xwe ragire hetanî ku xulam were!” Lê keçikê guhdar nekir û bi kevîr li xilqê da, hetanî ew şikenand û derî vekir. Emced jê pirsî: “Çi ket bîra te de ku te wisa kir?” Keçikê got: “Û çî bi te hatiye mîrzayê min, ma qey ev mal ne mala te ye?” Emced got: “Belê, mala min e, lê hewce nedikir ku tu kilidê bişkîni.”

Keçik derbasî hundur bû, Emced jî tirsîya ku xwedîyê malê bi ser wan de were û nema dizanîbû bê wê çî bike, çawa bike? Keçik lê zîvirî û jêre got: “Ka çima tu derbasî hundur nabî mîrzayê min, nura herdu çavên min, kezaba min?”

Emced lê vegerand û got: “Rast e, xulam dereng ket, lê ez nizanim ka çî kir, çî nekir?” Piştîre da dû keçikê û derbasî hundur bû. Lê belê metirsîyên nava wî, di rûyê wî re didane der, lewre ditirsîya ku xwedîyê malê, bi ser wan de bê.

Çawa ku herdu derbasî hundur bûn, keçikê bêhna xwe berda, maçek da Emced û jê re got: “Mîrzayê min, heger civanê te bi yekê din re hebe, ez ê pêşmalkekê li ber xwe girêbidim û xizmeta wê bikim!”

Emced ji qehra dilê xwe yê tijî hêrs kenîya û çû li rastî derî rûnişt. Bi pifepif nefesa xwe berdida ji bo ser dilê xwe sivik bike. Lê hîna ew di wî halî de bû, dît ku xwedîyê malê ber bi derî ve tê.

Xwedîyê malê zilamekî xwiyayî û karmendekî baş bû di bajêr de, lewre ew emîrekî berdestê mîr bû, ku navê wî Behadir bû û ew mal ji xwe re raxistibû ji bo carinan were bêhna xwe lê derxîne, ango civanekê li wir bide hinekan û bi tena serê xwe bi wan re rûnê.

Behadir mirovekî comerd, dîlpak û destvekirî bû. Gava ku ket devê derî...

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî vegotina çîroka xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 233'YEMÎN

Şehrezadê çîroka xwe berdewam kir:

Behadir çawa çav li deriyê xwe yê vekirî ket, leza xwe sist kir û bi hê-dîka serê xwe di derî re dirêjî hundur kir û meyizand, dît ku keç û xortek rûniştî ne û sifreyeke fêkî û şerabê li ber wan e.

Di heman kêlikê de jî qedeha Emced di destê wî de bû û li derî dimey-zand. Loma çawa ku çavên wî û yên Behadir li hev ketin, mehdê wî zer bû, xwîn ji rehên wî kişiyân û qudûmê wî şikest. Nuh çavên Behadir jî li wê zerbûna rûyê wî ket, çav kir wî û tiliya xwe danî ser herdû lêvên xwe. Çawa ku jê re bibêje “Bêdeng be û were cem min!”

Emced qedeha dest xwe danî erdê û rabû ser xwe ji bo ku pê ve here. Keçikê jê re got: “Tu bi ku ve diçî?” Emced serê xwe jê re hejand bi awayê ku bibêje “Ez diçim avekî vexwîm” pê re jî derket hêwanê bêyî ku tişteki bixe nigên xwe. Bi lez xwe dirêjî destên Behadir kir, ew maçî kirin û lave jê kirin, got: “Tu bi qedrê Xwedê kî mîrzayê min, ka destpêkê çiroka min guhdar bike, piştî min bikuje!”

Emced, bi kurtahî be jî çiroka xwe jê re vegot: Çima ji welatê xwe derketibû û çawa gîhabû wir û çawa jî bêyî daxwaza xwe ketibû mala wî de. Gava Behadir ew çiroka wî guhdar kir û têgihişt ku ew kurê mîrekî ye û ev bobelat hatiye serê wî, dilê wî pê şewiti û jê re got: “Binêr Emced! Naxwe divê tu li min guhdar bikî û ji gotina min dernekevî. Ez ê jî ewlehiya te bigirim ser xwe û ez nahêlim tişteki bi te bê. Lê heger tu bi ya min nekî, ez ê te bikujim!” Emced got: “Tu çi ji min re bibêjî, ez ê bi ya te bikim û ez tu-carî ji gotina te dernakevim. Ez bendeyê qencîya te me.” Behadir jê re got: “Naxwe bila dilê te di cî de be û here hundur, li heman cihê xwe rûne weke tu xwedîyê malê bî. Navê min jî Behadir e, gava derbasî hundur bûm, tu jî bi min de bixeyid û sixêfan ji min re bide û ji min re bibêje, çima tu dereng ketî hetanî vê seetê. Dema ku min mazeret ji xwe re peyda kirin jî, tu wan qebûl neke û rabe ser xwe, li min bide. Heger dilê te bi min bişewite, ez ê mala te xera bikim. Vêca here li cihê xwe rûnê û qet mereqan neke. Jixwe tu çi ji min bixwazî, ez ê bînim ber destê te. Îşev pê de li kêfa xwe binêre û sibe jî bi rêya xwe de here, lewre tu xerîbê van dera ye û ez jî ji xerîban hez dikim.”

Emced destê wî ramûsa û dîsa bi şûn de çû hundur, piştî ku rûyê wî sor û spî bû ji kêfan û ji fedîyan. Çawa ku çû cihê xwe, ji keçikê re got: “Xatûna min, te pir wensa min anî, di vê şeva mubarek de.” Keçikê li vegerand û got: “Ev tişteki erjeng bû ku wisa te dilê xwe û mala xwe ji min re vekir ji nişkê ve!” Emceda got: “Ez çi bikim xatûna min, welleh min got belkî xulamê min Behadir ew zêrên min biribin, loma venegerîyaye. Vêca rabûm min li wan zêran nêrî, dilê xwe xist cî û dîsa li te vegeriyam. Heger ez hebekî dereng ketibim jî, li qusûra min nenêre, hemû ji ber wî kotiyê xulamê min bû. Heger niha were, misoger ez ê cezayekî bidime wî, ji ber

vê derengmayîna wî.”

Bi van gotinên Emced, dilê keçikê xweş bû û bêhna wê hate ber wê. Dilê wan li hev vebû û bi hev re xwarin û vexwarin, henek û laqirdî bi hev re kirin hetanî ku Behadir hat. Behadir ew kincên qodemanan ji xwe kiribû û kincên xulama li xwe kiribûn, newqa xwe girêdabû û mîna hemû navmalîyan şimikek xistibû nige xwe de. Çawa derbasî hundir jî bû, herdu destên xwe li ber xwe danîn ser hev û bejna xwe li ber Emced tewand hetanî ku serê wî gîhaşt erdê, mîna gunehkarekî ku gunehên xwe qebûl kiribin. Emced awirin tûj tê firandin, wek ku pir hêrs bûbe û jê re got: “Ey xulamê pîs, ji bo çi tu dereng ket hetanî niha?” Behadir got: “Mîrzayê min, wele ez bi şûştina kincên xwe daketibûm û min nizanîbû ku tu di vê seetê de hatiye malê. Lewre civanê min û te piştî muxrib bû ne berîya muxrib.” Emced bi ser de qîriya û got: “Tu derewan dikî ey xulamê mirdas û bêxîret! Welehî te lêxistin heq kiriyê!” Pê re jî rabû ser xwe û ew li erdê dirêj kir, ket ser dilê wî û bi darekî lêda, lê bi hêdîka. Keçik rabû ser xwe, ew dar ji destê Emced girt û bi şida li Behadir da, hetanî ku hêsiyan di çavên wî re avêt û laşê wî bû zevîya êş û janê. Behadir, diranên xwe bi ser hev de diqiriçandin û bê navber hewara xwe di mîrzayê xwe dida ji bo ku wî ji nav lepên wê rizgar bike. Emced jî hey qîr dida û ji keçikê re digot: “Wisa neke, wisa neke!” Keçikê jî her car digot: “Tu ka bise ez kela dilê xwe li vî bênamusî hênîk bikim!”

Herî dawî, Emced mecbûr ma ku wî darî ji destê wê derxîne û wê bi şûn de bidehîne ji ser dilê Behadirê ku hêsiyan wî mîna baranê dihatin xwarê. Piştî Emced, hêsiyan Behadir paqij kirin, ser çavên wî şûşt, li rewşa wî pirsî û wan deran giş paqij kir û çira jî pêxist.

Lê belê keçikê belaya xwe jê venekir. Her ku Behadir tiştêk tanî û derbasî cem wan dibû, keçikê sixef jê re didan û lanet lê dibarandin. Emced jî her car hewl dida ku pêşîya wê bigire û jê re digot: “Tu bi qedrê Xwedê kî belaya xwe ji vî xulamê min veke!” Dîsa jî Behadir berdewam kir di xizmeta wan de, wan jî xwarin û vexwarina xwe berdewam kirin hetanî nivê şeve. Jê û pê de hêl û qewet di Behadir de nema. Pir westiyabû ji ber kar û lêxistinê û nema dikaribû xwe li ser nigan bigire. Li erdê ket, raket, di xew ve çû û bû xurawura wî, kazîn û nalîn pêket. Keçika ku êdî serxweş bûbû, ji Emced re got: “Rabe ser xwe, wî şûrê daliqandî bigire destê xwe û serê vî xulamî jêbike! Heger tu wî nekujê, ez ê mala te xera bikim!” Emced bi şaşwazî got: “Û çi ket bîra te de heta ku kuştina vî zilamî hat bîra te?” Keçikê got: “Bi kuştina wî re incex şensê me li hev bê. Heger tu wî nekujî, ez ê rabim wî bikujim!” Emced nêta xwe li wê xera kir û got: “Madem ku divê were kuştin, wê çaxê ez wî bikujim dê çetir be.” Piştî destê xwe avêt şûr, ew ji kalanî wî kişand û bi jor ve hilda. Piştî bi hemû hêza xwe li stûyê keçikê da, serê wê ji bedena wê veqetand. Serê wê bi ser Behadir de gindirî,

ew ji xew rakir. Behadir şiyar bû, çavên xwe vekirin, dît ku Emced li ser nigan e û şûrê bixwin di destê wî de ye. Keçik jî serjêkirî li erdê raxistî bû. Rastîya bûyerê ji Emced pirsî, Emced bûyerê jê re vegot û lê zêde kir, pê de çû: “Îsrar kir ku te bikuje, min jî ew ceza dayê!” Behadir rabû ser xwe, enîya Emced maçî kir û jê re got: “Mîrzayê min, xwezîka tu tê bibuhûriya, lê êdî çû û tu rê li ber me nema ji xeynî ku ew cendekê wê ji vir derxînin berî ku şeveq lê bide...”

Li Şehrazadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 234'EMÎN

Şehrezadê berdewam kir û got:

Pîştî ku herdu bi hev şewirîn û gîhan biryarekê, Behadir rabû ser xwe, newqa xwe girêda, keçik di nava ebayekê de pêça, ew avêt ser milê xwe û ji Emced re got: “Ê te tu xerîbî û tu kesî nas nakî, loma hema tu li cihê xwe rûnê, xwe tew nede û li bendî min bimîne hetanî ku roj derê. Heger hetanî derketina rojê ez li te venegerîyam, bizanibe ku ez çûme wê dinyê. Êdî ev mal û mulk û qumaş jî dê yên te bin.”

Di pey wê gotina xwe re, meytê keçikê li ser piştî xwe kir, xatir ji Emced xwest û di devê derî re derket, çû. Deskpêkê sûk derbas kir, piştî ket ser rêya ku diçe ber behrê, bi hêviya ku cendekê wê bavêje nav bahrê. Lê hîna ku negîhabû ser avê, waliyê bajêr û zîlamên xwe pergî ve hatin û dora wî girtin. Gava naskirin ku Behadir e, lê ecêbmayî man. Pêçeka ser piştî wî vekirin û meytê keçikê tê de dîtin. Ew girtin, zincîr û qeyd lêdan, ew avêtin pişt deriyekî hesinî hetanî sibehê. Gava bû sibeh, ew birin cem mîr û çîroka wî jê re vegotin.

Mîr pir hêrs bû û jê re got: “Zalim Behadir! Naxwe her car tu xelkê dişelînî û piştî jî tu wan dikuji û davêji behrê ha? Gelo beriya niha te çend kesên din kuştine?” Behadir serê xwe berra erdê da û bêdeng ma! Mîr pê de qîriya û got: “Tu çima bersivê nadi, kê ev keçik kuştîye?” Behadir got: “Min ew kuştîye mirzayê min, lahewle wela quwete îlla billah!”

Mîr pir hêrs bû û fermana kuştina wî da. Ji walî re got, wî bide ber destên cellad û li nav bajêr gişî bigerînin, sûc û cezayê wî êşkere biqîrin ji bo ku bibe îbret ji herkesê ku bide ser rêya şeytên û xerabiyê bi xelkê bike!” Ev, li ser rewşa Behadir, veca em vegerin ser rewşa Emced û bûyerên ku li dora wî qewimîn.

Gava ku bû sibe, roj bejneke bilind bû û Behadir venegeriya malê, xemgîn bû, qolînç ketin nava wî de û di ber xwe de got: “Lahewle wela qewete îlla billah. Gelo çi qewimî û çi bi serê wî hat?”

Hîna ku Emced wisa li ser wî difikîrî, bala xwe dayê ku dengê bangdêran tê, gazî xelkê dike ji bo herin li şenîqandina Behadîr temaşe bikin! Dilê wî hate guvaştin û giriya li ser rewşa wî. Di dilê xwe re got: “Xwe di ber min de feda kir! Ne gengaz e ku ez neheqîyeke wisa qebûl bikim!”

Di cî de rabû ser xwe, ji mal derket, derî li dû xwe girt û bi lez beziya di nav sikakên bajêr re hetanî ku xwe gihand cem walî. Li ber wî sekinî û jê re got: “Begê min, Behadîr nekujin, ew mirovekî bê gunehê! Ê ku ew keçik kuştîye ez im, ne ew e.”

Gava ku walî ew gotinên wî bihîstin, ew û Behadîr dan tengala xwe û ew birin cem mîr. Li wê derê, rewşa Emced û agahîyên ku dabûn, bi mîr re parve kirin. Mîr li Emced nihêrî û jê re got: “Ê ku ev keçik kuştîye, tu yî?” Emced got: “Belê.” Mîr jê re got: “Ka ji min re bibêje bê çima te ew kuştîye û ji bo çi?” Emced got: “Mîrê hêja, tiştê ku bi serê min de hatiye, pir erjeng û ecêb e. Heger li ser ronîya çavan bihata nîvisandin, dê ji her hesî re bibûya îbret...” Piştî çîroka xwe û birayê xwe Eshed, ji serî hetanî binî, ji mîr re vegot. Mîr behetî ma li çîroka wî, jê re got: “Niha ez têgihiştîm ku mazeretên te hene û tu mafdar î. Lê belê xorto, ez dixazim ku tu bibî wezîrê min, gelo tu vê teklîfa min qebûl dikî?” Emced got: “Bêguman!” Mîr di cî de ew û Behadîr xelat kirin. Piştî malek ji Emced re destnîşan kir û têra wî xulam û cêrî û mal mulk dayê. Mehmîzeke baş jî jê re veqetand û hemû pêdiviyên wî jê re pêkanîn. Di encamê de ferman jî dayê ji bo ku li birayê xwe Eshed bigere.

Emced bû wezîr û dest bi karê xwe kir. Desthilatdariya xwe bi dadmendî da meşandin. Pîrsgirêkên xelkê çareser kirin, ên xerab jî peywirê girtin, ên qenc jî anîn şûna wan û hewl da ku pêşîya xerabîyan bigire, pêşîya qencîyan veke. Ji bo birê xwe jî bangdêrek derxist nava bajêr da ku li nava hemû kolanên bajêr bigere û ji bo wî bike gazî da ku şopa wî bibîne.

Em Emced li wir bihêlin û em vegerin ser rewşa birayê wî Eshedê ku girtiyê destê Mecûsiyan bû. Mecûsiyan weke her car, sibehê, nîvro, êvarê, îşkence û lêdan li Eshed kirin hetanî ku sala wî qedîya û cejna Mecûsiyan nêzik bû. Gava cejna wan nêzik bû, Behramê Mecûsî keştîyek tekûz kir û xwe jî amade kir ji bo rêwîtiyê...

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotîna xwe birrî, bêdeng bû.

ŞEVA 235'EMÎN

Şehrezadê berdewam kir:

Piştî ku Behram keştîya xwe amade kir, Eshed jî xist sindoqekê, devê wê li ser kilît kir û ew bir xist keştîyê de. Piştî ew û zîlamên xwe jî li keştîyê

siwar bûn û bi avê de çûn, ketin rê de. Bi rojan û bi şevan meşîyan hetanî ku xwe gihandin çiyayê agir. Li we derê bayekî ecêb li wan rabû, pêlên behrê bilind bûn û behr hêrs bû. Wan jî rêya xwe şaş kirin û ketin ser rêyeke din. Di encamê de gîhan bajarekî ku li qiraxa behrê avakirî bû û keleheke wê hebû ku şibakeyên wê li behrê dinêrîn. Mîra wî bajarî jî jineke bi navê Mercane bû.

Li wir qeptan ji Behram re got: “Begê min, me rê şaş kiriye û em mec-bûr in ku derbasî wî bajarî bibin, ji bo em bêhna xwe berdin û pêdiviyên xwe rakin. Piştî jî Xwedê mezin e.” Behram jê re got: “Tiştê herî rast jî ew e!”

Hatin, gihan bajar û bavanê xwe danîn, zengilê xwe lê dan hetanî ku keştî sekinî. Tam di wan kêliyan de Mercane ya banû û leşkerên xwe, dora wan girtin. Banû Mercane ber bi keştiyê ve çû û gazî qeptanê wê kir. Qeptan derket derve, bejna xwe li ber wê tewand û bi rêzdarî ew pêşwazî kir. Banû got: “Çi di keştîya we de heye û kî bi we re ye?” Qeptan got: “Ey banûya dewr û zemanan! Tacîrekî koleyan bi min re ye ku xulaman difroşe.” Banûyê got: “Ka wî bişîne gel min!” Çend kêlikan bi şûn de, Behram jî keştiyê derket û Eshed jî li pey wî di qilixê koleyan de bû. Çawa ku gîha cen Mercane, Behram bejna xwe li ber wê tewand û erda bin nigê wê maçî kir. Banûyê got: “Rewşa te çawa ye?” Behram got: “Ezbenî, ez tacîrê koleyan im û rewşa min baş e. Banûyê li Eshed meyzand, got qey ew jî kole ye, loma jê re got: “Navê te çi ye?” Kelûgirî bû û jê re got: “Navê min Eshed e!” Dilê banûyê pê şewitî û jê re got: “Tu dizanî nîvisandinê gelo?” Got: “Belê” Banû Mercane, hibîr û kaxezek da destê wî û jê re got: “Ka hela tiştêkî binîvisîne ji bo ku ez nivîsa te bibînim!” Eshed rahişt pênûs û kaxezê û ev çend beyt nîvisandin:

Mijara kolefiroşîyê xapek e lê qedera min ev e
Ey bînera hêja û rûmetkar ev e qedera min ev e
Zincîrkirî min davêjin nav avê û dilêş şil nabe
de êdî xwe tûşî avê neke bila laşe te zuhabe

Gava ku banûyê ew beytên Eshed xwendin, ji Behram re got: “Vî ko-layî bifiroşe min!” Behram got: “Xatûna min ez nikarim wî bifiroşim, lewre min hemû koleyên xwe firotine û ew tenê li ba min maye.” Banûyê got: “Bêgûman divê tu wî bidî min; an bi firotin, an jî weke diyariyekê.” Behram got: “Ez ne wî diforoşum ne jî diyarî dikim.”

Banûyê ferman da leşkerê xwe ji bo Eshed hildin ba xwe. Ew bi xwe re birin û veşeriyên keleha xwe. Dûra banûyê qasîdek şand cem Behram û jê re got: “Heger tê biçî, îşev here ji welatê me, heger tu neçî, ez ê dest deynim ser hemû mal û mulkê te û keştîya te jî bişewitînem!”

Çawa ku peymanê banûyê giha ber destê Behram, pir xemgîn bû û

got: “Ev rêwîtiya me bêoxir derket!” Dûvre rabû amedekariyên xwe kirin û ma li hêviya şevê ji bo bikeve rê de.

Em Behrem li wir bihêlin û em vegerin ser rewşa Banû Mercane...

Li Şehrezadê bû sibê, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 236'EMÎN

Şehrezadê got:

Dema Mercaneyê Eshed bir kelehê, ew derbasî qesra xwe kir û şibake vekirin da ku bayê behrê li wan bide. Dûvre ferman da cêriyên xwe da ku hinek xwarin û vexwarin ji wan re peşkeş bikin. Xwarin anîn, wan jî xwarina xwe xwarin û dest bi vexwarinê kirin. Wê gavê, bi emrê Xwedê hezkirina Eshed ket dilê Mercaneyê. Wê jî bê navber û li ser hev qedeha wî jê re dagirt hetanî ku serxweş ket û ji ser hişê xwe çû.

Bi direngî be jî, bi ser hişê xwe ve hat û dît ku tengav bûye. Rabû ser xwe, li dora xwe meyzand, dît deriye hêwanê vekirî ye. Bi armanca ku pêdiviya xwe pêkbîne di derî re derket û meşiya, çû hetanî ku di nava bîstaneke re derket. Bîstan û bexçeyekî mezin bû ku tijî darên fêkî û gulan bû. Li bin darekê rûnişt, pêdiviya xwe pêkanî û rabû çû ser kaniya ku di nava bîstan de bû. Kincên xwe ji xwe kirin, dest û nigên xwe şûştin, avek vexwar û li wir palda. Bayekî hênîk lêxist, di xew re çû û kincên wî li dorê. Bû êvar, şev jî hat û hîna ew di xew de bû.

Îcar em vegerin ser rewşa Behram. Ev jî çawa ku şev kete erdê, gazî zîlamin xwe kir û ji wan re got: “Şerîtên keştiyê vekin û xwe amade bikin ji bo rêwîtiyê!” Wan jî gotin: “Bila be mîrzayê me. Lê hebekî bêhna xwe li me fireh bike hetanî ku em herin meşkên xwe yên avê dagirin û werin!” Rahiştin meşkên xwe û li kelehê zivirîn, çûn hetanî ku ketin nav bîstaneke mezin de. Şopek li ber wan derket, bi pey wê ketin hetanî ku gihan ser kaniyekê. Li wir dîtin ku Eshed li ser piştê dirêjkiriye û raketiye. Ew nas kirin û kêfa wan hat. Meşkên xwe tijî av kirin û rahiştin wî jî ew bi xwe re birin û bi şûn de çûn, bi lez. Hatin cem Behramê Mecûsî û jê re gotin: “Mizgîniya me li te be, me ew hêsirê te yê ku banûyê bi zorê ji te stendibû dît û me ew dîsa bi xwe re anî! De êdî bila dilê te rehet bibe û kêfa te li te vegere mirzayê me!”

Gava ku Behram ew xebera xweş bihîst û careke din çavên wî li Eshed ketin, hêrsa dilê wî çû û bêhna wî hate ber, rûyê wî geş bû. Zîlamên xwe hemû xelat kirin ji ber wê serkeftina wan, fermaneke nû da wan ji bo ku zû birêkevin. Di nava çend kêlikan de ketin rê û berê xwe dan çiyayê agir. Bênavber meşiyên hetanî ku li wan bû sibeh.

Îcar em vegerin ser rewşa Mercaneya banû. Ew jî gava ku Eshed derket, çû ji bo pêdiviya xwe pêk bîne, bi qasî seetekê xwe li hêviya wî ragirt. Lê gava ku nehat, mûm pêxistin û ferman da cêriyan, ji bo ku herin lê bigerin. Ew bi xwe derket nav bîstan û lê geriya. Li kêleka kaniyê şimika Eshed dît, lê ew bi xwe nedît. Li nav bîstan lê geriya hetanî sibehê, lê ew nedît. Li keştiyê pirsî gotin wele şeva buhurî ketiye rê de. Mercane texmîn kir ku wan Eshed bi xwe re biribe. Pir zora wê çû. Hêrs bû, pir qehirê û ferman da ku deh heb keştiyan amade bikin ji şer re da ku bikevin pêy Behram wan de. Ew bi xwe jî li keştiyê siwar bû û ketin rê de. Hîna ji serî ve ji qeptanan re got: “Kî ji we xwe bigihîne wî Mecûsî, ez ê wî xelat bikim, mal û mulkê mezin bidime wî. Û heger hûn xwe pê ve negihînin jî, ez ê we tevan bikûjim!” Vê gotina wê, tirseke mezin xist dilê keştîvanan.

Her deh keştî ketin rê de û her yek ji wan, bi hêleke behrê de vebû. Sê rojan li ser hev geriyan, şev û roj çavdêrî kirin û di roja çaran de keştiya Behram dît. Hîna ku şev neketibû erdê, dora keştiya wî girtin. Behram, di wan kêliyan de li Eshed dida û îşkence pê dikir, cezayê wî didayê. Eshed bê navber hawar û gaziyan xwe dikirin, lê kes pê ve nedihat. Laşê wî giş di nava êş û janê de mabû. Bê hêvî bûbû û bi awirin melûl li derdora xwe dinêrî. Carekê ji nîşka ve dît ku çend keştiyan din dora wana digirin, wan dorpêç dikin, çawa ku sipîka çavan, reşika wan dorpêç dike!

Gava ku çavên Behram jî li wê dorpêçe ket, têgihîşt ku dê mala wan xera bikin. Hêrs bû, bi ser Eshed de qîriya û got: “Ew hemû ji ber te ye, pîsê heram!” Dûvre jî ji zilamên xwe re got: “Vî bînamûsî bavêjin behrê, bila em jê xelas bin, beriya ku em ji bîne kuştin!”

Keştîvanan bi dest û nigên Eshed girtin û ew avêtin nav ava behrê. Lê Xwedê Teala lê hate rehmê û ew ji mirinê parast. Eshed bi dest û nigan melevanî kir, geh binav bû, geh serav bû û geh jî pêlên avê ew rakirin û dûr avêtin; hetanî çû peravekê û xwe bi çuquliyên darekê girt, ji avê derket. Pê li axê dikir û hîna jî bawer nedikir ku rizgar bûyê. Li cihekî rawêstiya, kincên xwe di ser xwe re anîn, ew guvaştin û li ser tehtekê raxistin ji bo ku zuha bibin û ew jî tazî rûnişt. Hebekî ponijî li ser wan babelatên ku bi serê wî de hatiban û bi êş ji xwe re got:

Xwedêyo sebr û teqet bi min re nemaye
Sîng li min teqîya gelo xelasîya min heye
Kesê belengaz heta kengî dê gazinan bike
Ji te pê ve kîye wî heye hêviyan jê bike

Piştî rabû kincên xwe li xwe kirin, lê belê nizanibû wê bi ku ve here, li dora xwe geriya, çû û hat, ji fêki û gihayê çolê xwar, ji ava wê vexwar û bi şev û roj meşiya hetanî ku gîhaşt bajarekî, êvarkî gîhaşt ber deriyê bajêr...

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî vegotina çiroka xwe birrî û bêdeng bû.

Şehrezadê çîroka xwe berdewam kir:

Bajarê ku Eshed gîhabû ber deriye wê, heman bajarê ku ew û birayê xwe hêşir li hatibûn girtin bû, lê hayê wî jê tunebû. Ji ber ku êvar meyilî bû û tarîka şevê hêdî hêdî diket erdê, deriyê bajêr girtî bû. Wî jî çawa dît ku derî girtiye, berê xwe da qebrîstanê û çû li nav tirban geriya. Turbeyeke ku deriyê wê vekiribû dît, ket hundurê wê û tê de raza. Em Eshed li vir bihêlin û em vegerin ser rewşa Behram û zîlamên wî.

Gava Behram dît ku derdora wî hatîye girtin, efsûnek ji wan re çêkir. Çembera dora keştiya xwe şikand û bi şûn de vegeriya ber bi bajarê xwe ve. Dema ku bi saxî û selametî gihan peravê, pir kêfxweş bû û êşa dilê xwe ji bîr kir. Ji keştiyê peya bûn û bi dilgeşî bi rê de meşîyan. Gava giha hinda goristanê û di nav re çû, dît ku deriyê tîrbekê vekirî ye. Ji xwe re got: “Divê ez li vê tîrbê binêrim!” Lewre ecêbmayî mabû. Gava çû derbasî hundurê tîrbê bû, dît ku Eshed tê de raketî ye. Ji bo ku dilê xwe bixe ci de, baş li rûyê wî nêrî: Ew bû! Ew şîyar kir û jê re got: “Naxwe hîna tu nemiriye!” Piştî destê wî girt û ew bi xwe re bir malê. Di mala wî de jêrmînek hebû ku ji bo lêdan û îşkencekirina Musulmanan, ew veqetandibû. Qeyd û zincîreke giran li dest û nigên Eshed girê dan û ew avêt wê jêrmînê, derî li ser girt û têra wî jî lêda. Piştî mifteyên derî giş dan destê keça xwe Bîstan ya bi tenê û jê re got: “Êdî ew di bin berpirsiyariya te de ye. Tu çawa dixwazî wisa lê bike, şev û roj îşkenceyê lê bike û qet wî rehet bernede hetanî ku bimre!”

Roja dîtirkê, Bîstanê çû derî vekir û derbasî cem Eshed bû ji bo ku îşkenceyê lê bike. Lê gava çav lê ket û dît ku xortekî spehî û lihevhatî ye, lê neda. Li herdu çavên wî yên şînik û burhuyên qelemkirî meyzand, ket bin bandora wî û jê re got: “Navê te çi ye?” Wî lê vegerand û got: “Navê min Eshed e.” Bîstanê got: “Tu jî ê hemû rojên te jî bextiyar bin!¹ Tu xortekî nestêle yî û tu ne kesekî ku mirov îşkenceyê lê bike. Jixwe ez dizanim ku tu mazlûm î û neheqî li te bûne.” Di berdewamiya axaftina xwe de, Bîstanê li ber dilê wî çû hat, dilê wî xweş kir, qeyd û zincîrên wî vekirin û pirsin di derbarê ola Îslamîyetê de jê kirin. Wî jî bersivên pirsên wê dan û jê re da xuyakirin û sinckariya Musulmantiyê jê re rave kir. Jê re da xuyakirin ku rêya bextewariyê di rêya vê ola pîroz ve derbas dibe.

Tesîr li keçikê bû, jê hêz kir û êdî baş lê nêrî. Herdem xwarin û vexwarinên xweş jê re anîn û li dawiyê jî Xwedê Teala îman xist dilê wê, şadeta xwe anî û ew jî bû Musulman. Her roj mirîşkên qelandî û goşt danê, hetanî bi ser xwe ve hat û birînên wî baş bûn.

1 Ji ber ku wateya “Eshed” bi Erebi “Bextiyar”e, keçik jî bi wî hawî balê dikşîne ser navê wî.

Carekê dema ku Bistanê ji cem Eshed derket derve, hîna di devê derî de bu dengê bandêran bihîst ku dibêje: “Xortekî ciwan, spehî û li hevhatî heye, xwediyê taybetmendiyên weha weha ye... Kesê ku vî xortî teslîmî me bike, dê xelateke mezin bigire û çiqase dirav jî bixwaze dê bigire. Lê kesê ku wî li cem xwe digire û vedişêre, wê li deriyê bajêr were daliqandin û hemû mal û mulkê wî jî wê were talankirin!”

Ji ber ku Eshed çîroka xwe bi temamî ji Bistanê re gotibû, wê jî di cî de fêhm kir ku bangdêran behsa Eshed dike. Di cî de lê vegeriya, derbasî jêzemîna wî bû û mijar jê re rave kir, ew jî her tiştî agahdar kir. Piştî, bi hev re ji malê derketin û çûn mala wezîr. Çawa ku Eshed çav li wezîr ket, got: “Xwedêyo! Ev birayê min Emced bûye wezîr!?” Ew û Bistanê bi hev re derbasî hundur bûn û derketin huzura wezîr. Çawa ku çavên Emced li birayê wî ket, xwe bi ser de avêt û ew himbêz kir, bi germahî. Xulamên qesrê û karmend jî hemû li wan hatin hev. Di wê navberê de Emced û Eshed ji ser hişê xwe çûn û incex piştî seatekê dîsa bi ser xwe ve hatin. Piştî ku bi ser xwe ve hatin, Emced, birayê xwe bir cem mîr û çîroka wî jê re vegot jî serî hetanî binî...

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî vegotina çîroka xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 238'EMÎN

Şehrezadê got:

Piştî ku mîr serpehatiya Eshed guhdar kir, ferman da ku hemû mal û mulkê Behram were talankirin û xaniyê wî were şewitandin. Leşker di cî de çûn ew biryar pêk anîn û mala Behram şewitandin. Keça wî Bistan jî xelat kirin û qedr û qîmetê wê girtin.

Piştî keçik derxistin cem wezîr; wî jî qedrê wê girt û ew xelat kir, piştî ku Eshed çîroka xwe û wê ji wî re got û rave kir bê çawa ew ji kuştin û îşkence û lêdanê xelas kiriye, wî jî qedrê wê girt.

Emced ê wezîr û birayê xwe hevdû bernedan, kul û derdên xwe ji hev re gotin, hesreta xwe sivik kirin û pir bi hevdû şa bûn. Heyfa wan rojên êş û dîrketîna hemûçkan hilanîn.

Di wê navberê de, mîr çend leşkerên xwe şandin pey Behram, ew anî huzûra xwe û ferman da celadê xwe ku serê wî jêbike. Lê Behram jê re got: “Ey mîrê gewre û mehrîban! Naxwe te biryara kuştina min daye?” Mîr got: “Belê.” Behram got: “Hinekî bêhna xwe li min fireh bike ey mîr!” Pê re serê xwe bera ber xwe da û çend kêlîyan ponîjî. Dûvre serê xwe rakir û eşheda xwe anî, li ser destê mîr bû Musulman. Mîr û wezîr û gizîr û karmendên li wir hemû kêfxweş bûn bi Musulmantiya Behram.

Piştire, Emced û Eshed çîroka xwe bi berfirehî ji Behram re gotin. Çi qewimîbû, çî bi serê wan hatibû û çawa di wê xerîbîyê re derketibûn, hemû jê re vegotin. Behram ji wan re got: “Mirzayên min, naxwe xwe amade bikin ji bo rêwîtiyê, ez e jî bi we re bêm. Qet hewce nake hûn bigirin, bi îzna Xwedê, hûnê jî mîna Bexşê û Bexşo bigihêne hev.” Emced û Eshed bi heyrangorî gotin: “Gelo çî bi serê Bexşê û Bexşo hatibû?”

(Çîroka Bexşê û Bexşo)

Behram got: “Xwedê çetir dizane, lê tête gotin ku di demeke borî de, kesekî bi navê Buharê Hatemî li bajarê Kûfeyê dijiya ku mirovekî maldar û bi navûdeng bû di bajêr de. Di heman demê de mîrzayekî xwedî eşîr bû. Xwedê Teala lê hat rehmê û kurek dayê, wî jî got, madem Xwedê Teala ev ji me re bexşandiye, bila navê wî Bexşo be.

Rojekê gava ku li sûka koleyan bû, bala xwe dayê ku cêriyeke ku piti-kek di destê wê de, dane ber bazarê. Pitika wê cêriyê bi qasî ku bala Buhar bikîşîne, xweşik û spehî bû. Buharê Hatemî îşaretek da Nexas(firoşkarê kole û cêriyan) û jê re got: “Bi çend dînara ne ew cêrî û pitika wê?” Nexas got: “Pêncî dînar.” Buharê Hatemî got: “Firoşnameyê binîvisîne, pereyên xwe bigire û wê jî teslimî xwediyê wê bike!” Pê re jî pereyên wî û bexşîşek jî di ser re dayê, cêrî jî da dûv xwe û ew bir malê.

Gava ku jina wî çav li cêriyê ket, jê re got: “Pismam, ev çî cêrî ye?” Buharê Hatemî got: “Dotmam, min ji bo wê zaroka di himbêza wê de ew kirriye. Ez ji te re sûnd dixwim ku gava ev pitik mezin bibe, dê bibe xweşiktirîn hemû keçên welatên Erebb û Eceman.” Jinik li cêriye zivirî û jê re got: “Navê te çiye cêriya delal?” Wê got: Navê min Tewfê ye, xatûna min” Xatûnê got: “Û navê pitika te çiye?” Cêriyê got: “Şengê ye xatûna min.” Xatûnê got: “Tu rast dibêji lewre ez û yê te kirriye, em herdu şad û şeng bûn!” Piştire li mêrê xwe zivirî û jê re got: “Tê çî navî lê biki?” Mêrê wê got: “Tu kîjan navî hildibijêrî bila ew be.” Xatûnê got: “Bila navê wê Bexşê be!” Buharê Hatemî got: “Ne xerab e.”

Bexşê û Bexşo di yek dergûşê de, bi hev re mezin bûn. Gava temenên wan gîha dehan, herdu ji hevdû spehîtir bûn. Hetanî wê gavê jî Bexşo ji Bexşê re digot xwişkê, Bexşê jî ji Bexşo re digot birawo. Rojekê Buharê Hatemî ji Bexşo re got: “Kurê min Bexşê ne xwişka te ye, cêriya te ye. Hîna ku tu di dergûşê de bûyî, min ew li ser navê te kirî. Êdî ji îro û pê de jê re nebêj xwişkê!”

Bexşo jî bavê xwe re got: “Heger rastî ew be, ez ê pê re bizewicim” û çû cem diya xwe, rewş jê re rave kir û daxwaza xwe anî ziman. Diya wî got:

“Kurê min jixwe ew cêrîya te ye.” Bexşo berbasî cem Bexşê bû, pê şabû û jê hez kir. Şeş salên wan wisa derbas bûn. Di seranserê bajarê Kûfe de, jinek mîna Bexşê xweşik û spehî tunebû. Mezin bûbû, Qu’ran û ilm û marîfet xwendibû, fêrî hemû cûreyên lîsk û amûran bûbû, di stranbêj û mûzîkê de jî serkeftineke mezin bi dest xîstibû. Wisa tê gotin ku li pêşîya hemû keç û jinen hemdemên xwe xistibû...

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî.

ŞEVA 239’EMÎN

Şehrezadê berdewam kir:

Rojekê gava ku Bexşê û mêrê xwe Bexşo li gel hev rûniştibûn, di şev-buhêrkeke şerab û mûzîkê de, rahişt ûdê, têlên wê şidandin û bi helbestî got:

Bi saya te dijîm tu xwendanê min î
Serê keleman bi te jê dikim tu şûrê min î
Bêminetîya Zeyd û Emr bila li dera han be
Bexşekarê min her tuyî her ku cî li min teng dibe

Bexşo mest û şa bû bi vê helbesta wê û jê re got: “Bexşêcan, hela tu bi qedrê Xwedê kî ka straneke din, li gel def û nayê ji min re bibêje!” Bexşê dest pê kir û got:

Sûnd û pêyman be ez ê serî hildim
Li himberî reqîb û zikreşan ez ê rabim
Li pey te bêm ez ê lomekaran vala derxim
Ez ê dev ji cêj û rehetîyê gişî berdim
Di nava xwe de jî ez ê gorekê çê bikim
Bêyî agah bidim dil ez ê tê de veşêrim

Bexşo careke din mest bû û jê re got: “Xwedê te bisitirîne Bexşoka min!” Her weha herduyan jî di nava wê xweşî û şadiyê de jiyana xwe berdewam kirin. Nav û dengê Bexşê jî li tevaya welat belav bû. Rojekê gava ku Hecac di diwana xwe de rûniştî bû, ji zêrevanên xwe re got: “Bi çi xap û rîpê be jî divê ez vê cêrîya bi navê Bexşê bi dest xînim û wê ji Emîrê Bawermendan, ji Ebdulmelîk Bîn Merwan re bişînim. Lewre di qesra wî tevî de, cêrîyeke mîna wê xweşik û zana û hunermend peyda nabe.” Piştî gazî pîrejineke efsûnger kir û jê re got: “Qehremane Xatûn, rabe here cem Buharê Hatemî, lê bibe mêvan û xwe bigihîne Bexşê û wê ji min re bîne bi rêyekê ji rêyan. Lewre cêrîyek mîna wê peyde nabe li ser rûyê dinyê.” Qehremane, daxwaza Hecac erê kir û got: “Bila be begê min!”

Çawa bû sibe Qehremane rabû ser xwe, kincên xwe yên hirî li xwe

kirin, tizbîyekî hezarlibî xist stûyê xwe, gopalek xist destê xwe, metereyekî yemamî yê avê jî xist milê xwe û bi rê ve çû. Di meşê de jî bênavber dua kirin û got: “Subhan ji wî re, subhan ji navê wî re, subhan ji qudreta wî re... Bêgûman tu kar û xebat bêyî vîna wî naçe serî; ew e xwedayê yek û bi tenê; zanayê sererd û binêrdê...”

Navê Xwedê ji ser lêvên pîrê kêr nedibû, lê dilê wê jî tijî xap û rîp û fen û fût bûn. Di dema nimêja nîvro de gihîşt ber deriyê Buharê Hatemî. Li derî da, derî jê re vekirin û gotin: “Tu çi dixwazî pîrê?” Qehremane got: “Ez feqîreke bawermend im û dema nimêja nîvro hatiye, gelo ez dikarim li vê mala pîroz nimêja xwe bikim?” Dergevanê malê jê re got: “Pîrê ev der mala Buharê Hatemî ye, ne mizgefte ne jî mala Xwedê ye.” Pîrê got: “Ez jî dizanim ku ev ne mizgeft e û ne jî camî ye. Ez jî Qehremane me û ji qesra Emînê Bawermendan derketime ji xwe re li ger û îbadetê digirim.” Dergevan got: “Ne gengaz e ku tu derbasî hundur bibî!”

Gotin avêtin ber hev û xirecir di navbera wan de derket. Di encamê de Qehremane jê re got: “Yekî weke te nahêle ez derbasî mala kurê Buharê Hatemî bibim û ez a ku her roj derbasî qonaxên mîr û beg û wezîran dibim!” Di wê navberê de Bexşo, dengê wê bihist û devliken di derî de derket, ew vexwend hundurê malê û jê re got: “Kerem bike pîra bawermend a delal.”

Pîrê da dûv Bexşo û derbasî hundur bû. Bexşo ew derbasî odeya Bexşê kir. Pîrê, silaveke germ lê kir û bi çavekî kirînê awirên xwe li ser wê gerandin, ji serî hetanî gwizekan. Pîrê hejiya li ber spehîbûna Bexşê ya zêde. Xwêzîya xwe daqurtand û vê jê re got: “Xwedê, te û mîrzayê te bistirîne ji nezera hesûdan, bi vê xweşikbûn û cemala we. Amîn!” Piştî derbasî mîhrabê bû û dest bi nimêja xwe kir. Çend ruket kirin ne diyar bû, lewre bênavber radibû û rûdinişt hetanî ku êvar hat û hîna jî wê nimêja xwe ne qedandibû. Bexşê jê re got: “Dayêcan, hebekî navberê bide nimêjê, bi kêmanî ji bo ku nigên te rehet bibin!” Pîrê got: “Keça min, kesê ku daxwaza wê dinyê bike divê li vê dinyê bibetile. Kesê ku li vê dinyê xwe nebetilîne jî, nikare li wê dinyê tişteki bi dest bixe.

Dûvre, Bexşê xwarin danî ber pîrê û jê re got: “Pîrêcan, xwarina min bixwe û duayan ji min re bike!” Pîrê got: “Ez bi rojî me xatûna min, lê yê te tu ciwaneke nûhatî yî, xwarin ji bo te baş e. Ciwan wisa ne dixwîn, vedixwîn û kêfê dikin.

Heger gunehêk di wê de hebe jî, dê Xwedê li te bibore. Jixwe xwedayê me gotîye; tenê kesê ku tobe bike, baweriya xwe bîne û karekî birêkûpêk bike, cihê wî buhuşt e.”

Qehremane axaftina xwe bi qasî seatekî berdewam kir bi Bexşê re.

Gelek şîret û wa'z lê kirin. Di encamê de Bexşê ji Bexşo re got: "Mîrzayê min, tu bi qedrê Xwedê kî bila ev pîrejin li ba me be! Şewqeke nûranî ji rûyê wê dibare û dilê mirov aram dike." Bexşo got: "Naxwe cihekî jê re vala bike, bila xiroş û îbadeta xwe lê bike û nehêle tukes derbasî cem wê bibe, belkî Xwedê teala xêreke wê bi ser me de jî bişîne, bo ku em qet ji hev qut nebin.

Roja dîtirkê çawa bû sibeh, Qehremane hat cem Bexşo û Bexşê, rojbaşek ji wan re kişand û ji wan re got: "De îcar bi xatirê we!" Bexşê got: "Tu bi ku ve diçî dayêcan, jixwe mirzayê min emir daye min ji bo ku ez cihekî ji te re vala bikim, da ku tu bi rehetî îbadeta xwe tê de bikî!" Pîrê got: "Xwedê ji we razî be û rehmeta xwe ji ser we kêm neke rebbî! Lê belê ez dixwazim ku hûn ji dergevan re bibêjin da ku ber min negire gava ez bixwazim derbasî mala ve bibim. Ez ê jî her dem li cih û deverên pîroz bigerim û pîştî her nimêjê, her roj û her şev ez ê duayan ji ve re bikim."

Di pey wê gotina xwe re pîrê ji mala wan derket, çû. Bexşê xemgîn bû bi çûna wê re û bêhemdî xwe giriya, bêyî ku bizanibe ew pîrejin çima ji cem çûye.

Qehremane di cî de çû cem Hecac. Hecac jê re got: "Te çi kir, çawa kir?" Pîrejinê got: "Min ew cêrî dît. Di vî zemanî de tu dayikan keçeke mîna wê newelidandine!" Hecac jê re got: "Heger tu wê fermana min pêk bînî, tê xelateke mezin ji min bigirî!" Pîrejinê got: "Ez bi qasî mehekê mohletê ji te dixwazim!" Hecac got: "Ez mehekê sax mohletê didime te!"

Jê û pê de car caran Qehremane çû û hat mala Bexşo û bi Bexşê re axivî...

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 240'EMÎN

Şehrezadê vegotina çîroka xwe berdewam bir:

Çawa ku şeva borî jî me got, pîra efsûnger êdî car caran diçû û dihat mala Bexşo û bi Bexşê re danûstendin dikir. Wan jî qedr û qîmetê wê digirtin. Çûnûhatina wê roj bi roj zêdetir bû û germahîya her kesê di malê de jî zêdetir bû bi pîrê re. Rojekê gava pîrê fersend dît ku ew û Bexşê bi tena serê xwe bi hev re bimînin, jê rê got: "Xatûna min, bawer bike ku ez çûbim kîjan cihê pîroz, min dua ji te re kirin. Lê xwezîka tu jî carekê bi min re bihata ser wan şêx û meşayixan, wan cihên pîroz û te bi xwe jî ji xwe re dua bikirana!" Bexşê got: "Tu bi qedrê Xwedê kî dayêcan, min jî bi xwe re bibe!" Pîrê lê ve-gerand û got: "Naxwe iznê ji xesûwa xwe bixwaze, ez ê te bi xwe re bibim."

Gava Bexşo hat rûnîşt, pîra Qehremane pê ve çû û destê wî maçî kir.

Lê Bexşo izin nedayê. Wê jî dua jê re kirin û ji mala wî derket, çû. Roja dîtirkê gava dîsa hat mala wî, Bexşo ne li mal bû. Ew jî çû cem Bexşê û jê re got: “Doh min ji we re dua kirin, lê ka rabe em îro herin, tu jî wan cihên pîroz bibîne, piştî em ê pir zû vegerin û beriya ku mîrzayê te were malê, emê bên!” Bexşê ji xesûya xwe re got: “Ez dexilê te me tu iznê bidî min ku ez bi vê jina salih re herim ser ziyaret û merqedan ji bo ku ez wan mekanên pîroz bibînîm. Ji xwe ez ê pir zû vegerim û berî mîrzayê xwe ez ê verim malê!” Xesûwa wê got: “Ez ditirsim mîrzayê te pê bihese!” Qehremaneya pîr, xwe avêt nav gotinê û pê de çû: “Bi navê Xwedê ez nahêlim ku ew li wir yek xulekê raweste, angî xwe dereng bixe.”

Bi fen û fûtan, bi gotinên xweş, pîrejina efsunger Bexşê ji mal derxist û berê wê da qesra Hecac. Li wir, jina ciwan xist odeyekê û agaha hatina xwe gihand Hecac. Nuh Hecac hat li Bexşê meyzand, dît ku ew jina herî spehî ye di dew û dewrana xwe de! Dema çavên Bexşê jî li Hecac ketin, rûyê xwe nuxwimand.

Hecac ji cem Bexşê neçû hetanî gazî serxizmetkarê xwe kir, pêncî siwar jî amade kirin û jê xwest ku wê cêrîye li deveyeke baş bike û berê xwe bide Şamê, here wê derê, wê teslîmî Emîrê Bawermendan Ebdulmelîk Bin Merwan bike. Nameyek jî ji xelîfe re nîvisand û ji serxizmetkar re got: “Vê nameyê bide destê wî, bersivê jî bigire û zû were!”

Serxizmetkar, cêrî li deveyekî giranbuha sîwar kir û berê wê da Şamê. Bexşê jî bê navber digiriya li ser wê veqetana ji Bexşo. Dema gihan Şamê, izin ji Emîrê Bawermendan xwestin, xelîfe izin da. Serxizmetkar derbas bû cem xelîfe, nameya Hecac da dest wî û sebeba hatina xwe jê re rave kir.

Xelîfe odeyek ji cêrîya nû re vala kir û çû derbasî herema xwe bû. Li jina xwe rast hat, jê re got: “Hecac cêrîyek ji nav keçên Kûfeyê ji min re kir-rîye bi deh hezar dînar û li gel nameyekê va ew ji min re şandiye...”

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî vegotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 241'EMÎN

Şehrezadê berdewam kir:

Gava ku Xelîfe mijara wê cêrîyê ji jina xwe re vekir, jina wî jê re got: “Xwedê xêra wî qebûl bike!” Piştî vê pîrozkirinê, xwişka xelîfe derbasî cem cêrîye bû û lê nêrî. Gava çav li wê xweşikbûna wê ket, bêhna wê çikiya! Bi derengî be jî axivî û got: “Bi navê Xwedê tu li mala kê bî, tukes li kirrîna te poşmam nabe, lew ku buhayê te deh hezar dînar be!” Cêrîyê jê pirsî û got: “Ev qesra han a kîjan mîrî ye gelo? Û ev bajar kîjan bajar e?” Xwişka xelîfe got: “Ev bajar bajarê Şamê ye û ev qesir jî qesra birayê min Ebdulmelîk Bîn

Mervan, Emîrê Bawermendan e.” Navberek da gotina xwe û piştire dîsa berdewam kir got: “Çima tu dipirsî, ma qêy tu vir nas nakî ango te nizanîbû ku tu hatiya vir?” Bexşê got: “Wellehî xatûna min, hayê min ji tutîştêkî tune.” Xwîşka xelîfe got: “Naxwe kê tu firat û heqê te girt? Qey ji te re negot ku xelîfe tu kirîyî?” Çawa ku Bexşê ev gotin bihîstin, giriya û hêsrên wê hatin xwarê. Di dilê xwe de got: “Naxwe hilê li min kirine!” Dûvre keserek kişand li xwe vegeriya û ji xwe re got: “Heger ez rastiyê bibêjim jî, kes ji min bawer nake! A baş ew e ku bêdeng bimînim hetanî ku xwedayê min rêyeke xêrê li ber min veke!” Ket ber fediye, serê xwe berra ber xwe da û rûçikên ku ji ber tava rojê sor bûbûn, veşartin. Xwîşka xelîfe jî wê gavê dev jê berda, ew di halê wê de hişt û çû. Roja dîtir, bi zincîrên zêr û cewheran, bi kincên hevrêşim û giranbuha, bi bazin û xirxalan lê vegeriya. Ew kincên xweşik hemû lê kirin û ew zêr û cewher jî xistin stû û dest û nigen wê. Di pey re xelîfe hat, derbasî cem bû û li kêleka wê rûnişt. Xwîşka xelîfe jê re got: “De êdî li vê cêriye binêre bê Xwedê ew çiqasî xweşik afirandiye!”

Xelîfe Ebdulmelîk Bin Mervan ji cêriye re got: “Ka rûpoşê bide alî û rûyê xwe yê nuxwimandî veke!” Cêriyê rûyê xwe venekir. Di wê navberê de çavên xelîfe li zendên wê ketin û pê re jî hezkirina wê ket dilê wî de. Xelîfe li xwîşka xwe zivirî û jê re got: “Bila niha wensa xwe bi te bîne. Hetanî sê rojan ez pê re ranakevim.” Û pê re jî rabû ser xwe, ji wir derket, çû.

Bexşê jî tengav bû di nava bêçaretîyeke kujer de û ket nava fikaran, pir êşîya li ser veqetandina ji Bexşo. Piştire gava ku şev bi ser de hat, Bexşê nexweş ket, bi şewbê. Rûyê wê hate guhertin, dilê wê jî li xwarin û vexwarinê hate girtin û mirûzê we xerabû. Xizmetkaran xelîfe agahdar kirin ji wê rewşa wê. Xelîfe jî gava dît ku nexweşî lê giran bûye, gazî hekîm û loqmanan kir, ew derbasî cem wê kirin û ji wan xwest ku wê derman bikin. Lê kesî jî wan ew ji wê nexweşiyê xelas nekir. Îcar em Bexşê li vir bihêlin û em vegerin ser rewşa mîrzayê wê Bexşo.

Bexşo jî çawa ku nivrokî vegeriya malê û çû li ser cihê xwe rûnişt, gazî cariyeya xwe kir û got: “Bexşî!” Lê tu bersiv jê re nehat. Ji cihê xwe rabû û çend carên din gazî kir, lê kesî lê venegerand; lewre cêrî û xizmetkara wî ya din jî ji malê dûr ketibûn ji tirsan. Bexşo çû cem diya xwe, dît ku rûniştî ye û herdu destên wê li ber rûyê wê ne. Jê pirsî, got: “Dayêcan kanî Bexşê li ku ye?” Diya wî got: “Kurê min, bi wê jina salih re çûye ser ziyaretên pîroz ji bo ku xêran bike bi xizanan û ji xwe re jî çend duayan bike û were.” Bexşo got: “Û te çawa izin dayê?” Diya wî lê vegerand û got: “Kurê min, wê wisa xwest!” Bexşo di ber xwe de got: “Lahewle wela qewete îlla billah!”

Bexşo weke serxweşan ji malê derket û berê da cem serdarê asayîşê, jê re got: “Tu çawa min dixapînî û tu cêriya min ji mala min dibî? Wellehî ez ê herim giliyê te li cem Emîrê Bawermendan bikim!” Serdarê asayîşê got:

“Ma kê cêrîya te biriye?” Bexşo got: “Pîrêjineke weha weha ye, kincin hirî li ser in û tizbiyeke hezarlibî di destê wê de ye.” Serdarê asayîşê got: “Ka wê jinikê nîşanî min bide, ez ê cêrîya te jê bistînim.” Bexşo got: “Ma kê dikare cihe wê ayan bike?” Serdarê asayîşê got: “Bêgûman ji Xwedê pê ve tukes xeybê nizane!” Serdar ew gotin digotin ji ber ku wî jî dizanibû ku Hecac ev tertîb çêkiriye. Bexşo got: “Ez cêrîya xwe ji te dixwazim û heger tu wê ji min re neyne, ez ê herim giliyê te li cem Hecac bikim.” Serdarê asayîşê got: “Tu giliyê min li cem kê dikî bike, tu bêminetî!”

Bexşo berê xwe da qesra Hecac. Ji ber ku bavê wî ji mezin û giregirên Kûfeyê bû, hêviya wî tê de hebû ku Hecac giliyê wî bi awayekî ji dil bigre dest. Gava gîha mala Hecac û daxwaza xwe ji xizmetkarê wî re got, xizmetkar derbasî cem Hecac bû û daxwaza Bexşo gîhande wî. Hecac got: “Ka bila were huzura min!” Bexşo derbas bû, hat li raserî Hecac sekinî. Hecac jê re got: “Derdê te çi ye?” Bexşo got: “Derdê min ev, ev e...” Ji serî hetanî binî jê re rêz kir. Hecac gazî xizmetkaran kir, got: “Kanî serdarê asayîşê bînin vir!” Gava ku serdarê asayîşê hat, Hecac jê re got: “Ez dixwazim ku tu herî li cêrîya Bexşo kurê Buhar bigere, wê bibînî û lê vegerîne!” Serdarê asayîşê le vegerand û got: “Tenê hayê Xwedê ji xeybê heye begê min, ma ji wî pê ve kê xeybê dizane!” Hecac got: “Bêgûman tu mecbûrî li hespê siwar bibî û bikevî ser rêyan, li cêrîyê bigerî li nava bajaran.”

Şeveqê lêda, Şehrezadê ji navber da vegotina çiroka xwe û bêdeng bû.

ŞEVA 242'YEMÎN

Şehrezadê berdewam kir:

Piştî ku Hecac ew ferman da serdarê asayîşê, li Bexşo zivîrî û jê re got: “Heger cêrîya te li te venegerîne jî, ez ê deh cêrîyan ji cem xwe bidim te, dehan ji ji cem serdarê asayîşê.”

Bexşo bi dilekî şikestî ji cem Hecac derket. Pir xemgîn bûbû û êşeke mezin ketibû nava wî de. Hîna şazdesalî bû û mû bi binçengên wî ve nehatibûn. Çû mala xwe, bi tena serê xwe rûnişt, giriya û li çogên xwe da, hetanî şeveqê. Sibehê bavê wî Buharê Hatemî pê ve hat û jê re got: “Kurê min, Hecac bi xwe hîle li cêrîya te kir û ew bir. Lê hêviya xwe ji Xwedê qut neke û fereca xêrê ne dûr e.”

Kul û xemên Bexşo her ku diçû pirtir dibûn. Hişê wî tevlihev bûbû, nema dizanibû wê çi bike, çawa bike. Kî derbasî cem wî dibû û derdiket jî, wî nizanibû bê kê ne. Ew nexweşîya wî sê mehan berdewam kir ku di encamê de pir bêhêz û lawaz bû. Bavê wî jî bêhêvî bûbû ji rewşa wî. Gazî textor û hekîman kir, hatin ser lê nêrîn, gotin: “Ji wê cêrîya wî pê ve tu

dermanê wî nîne!”

Rojekê bavê wî bihîst ku hekîmekî farisî heye ku hemû rengên dermankirinê dizane, li gel stêrknasî û efsûn û falgêriyê jî. Xêlkên bajêr gişan pesnê hunerên wî didan. Rabû Buhar jî gazî wî hekîmekî farisî kir, ew anî mala xwe û qedrekî mezin jê re girt. Piştî jê re got: “Ka li rewşa kurê min û nexweşîya wî binêre!” Hekîm jî Bexşo re got: “Ka destê xwe bide min!” Bexşo destê xwe dayê. Hekîm li rûyê wî nêrî û pê re kenîya. Di pey re li bavê wî zîvirî û jê re got: “Ji nexweşîya dil pê ve tu tişteki kure te tune ye.” Bavê wî got: “Tu rast dibêji hekîmekî heja! Naxwe baş li kurê min binêre û bi hûrgulî rewşa wî ji min re rave bike! Tu tişteki wî, ji min veneşêre, te got erê?” Hekîm got: “Ez wisa texmîn dikim ku ew bi cêrîyekê ve hatiye girêdan û ev cêrî jî li Besra an jî li Şamê ye. Dermanê nexweşîya kurê te jî ew e ku vê cêrîyê bibîne.” Buhar got: “Naxwe ez ê jî mizgîniyekê bidime te: “Heger tu wî rehet bikî ez ê bihêlim ku tu hemû temenê xwe di nav xêr û xweşî û malderîyêke mezin de derbas bike.” Hekîmekî farisî got: “Ev tişteki hêsan e.” Dûvre li Bexşo zîvirî û jê re got: “Dilê xwe xweş bike û mereqan nekşîne!” Di pey re careke din li Buhar zîvirî û axaftina xwe berdewam kir, got: “Kanî çar hezar dînar bide min!” Buhar çar hezar dînar dane dest wî. Hekîm got: “Ez dixwazim ku kurê te jî bi min re were Şamê!” Buhar ew daxwaza wî jî erê kir. Bexşo rabû, xwe amade kir, piştî xatir ji bavê xwe xwest û bi hekîmekî farisî re ket rê de.

Destpêkê çûn Helebê û ji wir jî derbasî Şamê bûn. Sê rojan li nava bajêr gerîyan, çavdêrî kirin, piştî hekîmekî farisî dikanek kirî û dikana xwe tijî malên çînê, perdeyên hevrêşimî, refîken bi zer xemilandî, ên mûzerkeş û gelek perçeyên giranbûha. Pêşîya dikanê jî tijî kûz, şûşe, qotikên tijî hemû rengên boyaxê û hemû teşeyên şerabê. Derdora xwe jî tijî tas û îskan û qedeh û cam kir. Usturlabek jî danî ber xwe û kincên hekîm û loqmanan li xwe kirin. Bexşo jî weke suxteyê ber destê xwe da şuxulandin. Qemîsekî hevrêşimî ku bi zêr neqîşandî lê kir û çend şîret jî lê kirin got: “Binêr Bexşo! Ji îro û pê de tu kurê min î. Divê timî tu ji min re bibêjê bavo, ez ê ji te re bibêjim kurê min. Tu xwe ji bîr nekî ha, te fêhm kir?” Bexşo got “Belê babo-can, ez têgihiştim!”

Nîştecihên Şamê jî hêdî hêdî bi ser dikana wî de hatin û ji xwe re li spehîbûna Bexşo û ya malên di dikanê de dinêrîn. Hekîm jî çî gava ku bi Bexşo re dipeyivî, bi zimanê farisî pêre diaxivî, lewre Bexşo jî bi farisî dizanibû mîna hemû zarokên wezîr û gizîr û emîran. Gava ku hekîm bi farisî pê re diaxivî, Bexşo jî bi heman zimanî lê vedigerand.

Di nava demê de dikandariya wî hekîmî nav û deng da û xelkên Şamê gişan ew nas kirin. Êdî pir mirov dihatin serî lê didan ji bo ku derman ji nexweşiyên wan re bibîne. Wî jî dermanê pê wîst ji wan re çêdikir û dida

wan, nexweşîyên wan rehet dikirin.

Rojekê gava ku mîna her cara li dikanê rûniştî bu li gel Bexşo, pîreji-neke extiyar î ku li kerekê siwar bû, hate cem wî...

Şeveqê lêda, Şehrezadê ji navber da vegotina çîroka xwe.

ŞEVA 243'EMÎN

Şehrezadê vegotina çîroka xwe ji Şehreyar re berdewam kir:

Pîrejina ku li kerê siwar bû, ebayeke bi cewheran xemilandî li ser milên wê bû, giraniya wê diyar dikir. Li devê deriyê dikana wî, rişmeya kerê kişand, ew sekinand û jê pirsî got: "Gelo ew hekîmê faris ê ku ji Iraqê hatibû vir, tu yî?" Hekîm got: "Belê." Jinikê got: "Keçeke min î nexweş heye û ez dixwazim ku tu dermanekî bidî min ji bo wê!" Hekîm got: "Xatûna min, gelo navê keça te çiye? Ji bo ku ez stêrka wê nas bikim û bizanibim bê kîjan seet baş e ji bo vexwarina dermana wê, divê ez navê wê bizanibim?" Pîrejinê got: "Birayê faris, wele navê wê Bexşê ye."

Hekîm çawa navê wê bihist, kelecani bû û dest bi nivîsê kir, tiştin he-sibandin, piştê jê pirsî got: "Xatûna min ji bo ku ez derman jê re binî-visînim, divê ez bizanibim bê ew ji ku ye û di hewayeke çawa de, li kîjan erdnîgariyê mezin bûye û temenê wê çend salin?" Pîrê got: "Temenê wê şazde sal in û li Kûfê ya Iraqê mezin bûye!" Hekîm got: "Û çend mehên wê çêbûye ku hatiye vir?" Pîrê got: "Çend meheke ku hatiye vir!"

Gava ku Bexşo ew gotinên pîrê bihistin û nas kir ku ew keça behsa wê dike cêriya wî ye, kelecaneke mezin ket nava wî û dilê wî lêda. Hekîm ji pîrejinê re got: "Fîlan û fîlan derman dê ji nexweşiya wê re baş bin!" Pîrejinê got: "Naxwe kanî wan dermanê ku tu dibêji amade bike, ji kerema xwe re!" Piştê deh dînar avêtin ber wî. Hekîm li Bexşo nêrî û jê re got: "Rabe wan dermanan amade bike!" Bexşo, dermanên di kodikan de li hev xistin û çelqandin. Di wê navberê de pîrê li Bexşo meyzand, piştê got: "Subhanallah! Ew pir dişibe keça min, Xwedê te bistirîne lawo!" û li hekîm zivirî, axeftina xwe berdewam kir got: "Birayê min ê faris, gelo ev kurê te ye, angî xulamê te ye?" Hekîm got: "Ev kurê min e."

Bexşo derman amade kirin, piştê rahişt kaxetekê û ev çend beyt li ser nîvisandin:

Heger tu Bexşê bi ey xatûncan
Awirekê bibexşîne bo canan
Lewre xemgîn im ez ne şad im
Ne dilxweş im ne jî ez bad im
Gotin heger ji bir bikî tu wê cêriyê

Em ê te xelat bikin bi bistên wek wê
Min jî got nîne li dînye kesek wek wê

Pîstre kaxet pêça û di qutîka derman de veşart. Qutîk jî hemû xîstî nav buxçîkek biçûk û bi xetek kofî li ser nîvisand: “Ez Bexşo kurê Buharê Hatimî me.” û buxçîk da ber pîrejînê. Pîrê jî rahişt buxçîka dermanan, xatir ji wan xwest û bi şûn de çû qesra xelîfe. Gava gîha qesrê, buxçîka dermanan da destê Bexşê û jê re got: “Xatûna min, hekîmekî faris hatiye vir ku tukes mîna wî zana û têngîhiştî nîne. Piştî ku ev sênika ha di destê min de dît, min navê te jê re got, wî jî nexweşiya te nas kir û derman ji te re nîvisand. Kurê wî jî derman amade kirin. Ez texmîn nakim ku kesek mîna kurê wî bedew û lihevhatî hebe. Ne jî bi qasî wî şêrîn û bi qasî wî kincspehî. Tu dikan jî mîna dikana wî nîn in.”

Bexşê çawa rahişte buxçîkê, dît ku navê mîrzayê wê li ser nîvisandî ye! Navê wî û bavê wî! Di cî de rûyê wê vebû û ji xwe re got: “Bêgûman xwedîyê vê dikanê li pey min hatiye!” Pîstre li pîrê zivîrî û got: “Ka hela pesnê wî ciwanî ji min re bide!” Pîrê got: “Navê wî Bexşo ye û şopek li ser burhuyê wî yê rastê ye. Kincin giranbuha lê ne û pîr rûgeş û lihevhatî ye.” Bexşê got: “Naxwe kanî van dermanan bide min, êdî ma Xwedê ku min ji vê nexweşiye rehet bikin!” Pîstre bi devlikenî rahişt derman û ew vexwar. Dî pey re got: “Ev dermanekî pîroz e!”

Di wê navberê de gava ku qutikên dermanan tevdan, li kaxezekê rast hat, kaxez vekir xwend û êdî baş têngîhişt ku ew derman ji mîrzayê wê Bexşo hatine. Dilxweş bû û bêhna wê hat ber wê û di ber xwe da beşişî.

Gava pîrê dît ku cêrî dikene, jê re got: “Îro rojeke pîroz e!” Bexşê jî lê veğerand û got: “Pîrêcan, ez birçî bûme, ji min re xwarin û vexwarinê bîne!” Pîrê di cî de li xizmetkaran kir gazî û got: “Kanî xwarina herî xweş, ji xatûna xwe re binin!”

Şeveqê lêda bû sibe, Şehrezadê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 244'EMÎN

Şehrezadê berdewan kir:

Çawa ku xizmetkara xwarin anîn û ew jî li ser sifreyê rûniştin, Ebdulmelîk Bin Mervan derbasî cem wan bû û dît ku cêrîya wî ya nexweş li ser sifreya xwarinê rûniştiye, bi dilbijokî dixwe! Ew jî pîr kêfxweş bû bi wê yekê. Pîrê got: “Ey Emîrê Bawermendan! Ez mîzgîniyê didime te ku cariyêya te Bexşê ji nexweşiya xwe rehet bûye. Ev jî bi xêra mirovekî hekîm î pîr baş bû ku nû hatiye bajêr. Bawer bike kesekî ku bi qasî wî ji nexweşiyan fam bike nehatiye vî bajarî. Min ji cem wî derman anî û cêrî xatûn jî bi wî

dermanî rehet bû.” Xelîfe got: “A ji te re hezar dînar, wan bibe bide wî weke xelat û derman jî ji ser cêrîyê kême neke!” Piştî bi kêf ji wir derket, çû.

Pîrê jî berê xwe da hekîmê farisî û çû ew hezar dînar da wî û ew agahdar kir ku keça nexweşketî cêrîya xelîfe Ebdulmelîk Bîn Mervan bûye. Piştî ew pere dan destê wî, kaxeza ku Bexşê nivîsandibû jî da destê wî. Hekîm ew kaxeza di cî de da destê Bexşo.

Bexşo çawa kaxeza vekir, nivîsa wê nas kir û di cî de ji ser hişê xwe çû ji kêfan. Piştî ku dîsa bi ser hişê xwe hat, nameya Bexşê xwend, dît ku tê de dibêje: “Ji cêrîya ku hatiye revandin ji nava buhuştaya xwe û hatiye xapandin ji aqilê xwe, ya ku dûr ketiye ji dildarê dilê xwe; bo kezaba min! Piştî silav û rêzan, ez dixwazim bibêjim ku min nameya we girt û ez pir pê kefxweş bûm û bêhnê min hate ber min, barekî giran ji ser piştê min rabû; çawa ku ez ji nû ve hatibim dinyayê. Çawa ku helbestkarekî jî gotiye:

Nameya te hat û tilînivîsa te hungivî dilê min
Vejiyand ji nû ve wan tiliyan ruh û canê min
Çawa ku Mûsa li diya xwe dîsa vegerya be
Ango kirasê Yûsûf li çavên Yaqub vegeryabe

Gava ku Bexşo ew rist xwendin, pir hestîyar bû û giriya. Pîrejinê jê re got: “Tu çima digirî kûrê min? Xwedê Teala kesî bi girî nede yarebbî!” Hekîm lê vegerand û got: “Xatûna min, wê kurê min çawa negirî û ev cêrîya han a wî ye û ew jî Bexşoyê kurê Buharê Hatemî yê Kûfeyî ye. Jixwe başbûna cêrîyê bi dîtina wî ve girêdayî ye û tu nexweşiyên wê yên din tune. Veca xatûna min, a ji te re vî hezar dînarî ji xwe re bibe û ez ê hezarî ji cem xwe jî bidime te û êdî ma hêviya me Xwedê û hunerên ku ji destê te bînin; bi Xwedê ne tu be, kes li me nayê rehmê. De êdî tu vî derdê me çareser bike!”

Pîrê li Bexşo zîvirî û got: “Bi rastî jî tu xwediyê wê cêrîyê ye?” Bexşo got: “Belê.” Pîrê got: “Tu rast dibêji, lewre keçik herdem behsa te dike û navê te ji ser zimanê wê nakeve.” Piştî Bexşo, çîroka xwe û wê ji serî hetanî binî ji pîrê re vegot. Pîrê lê vegerand û got: “Kurê min, ne ez te bigihînim wê, tûkes nikare we bigihîne hev!” Di pey re xatir jê xwest û vegeirîya cem cêrîyê jê re got: “Xwediyê te hişê xwe wenda kiriye ji ber evîna te û dixwaze te bibîne. Tu çi dibêji di vê mijarê de?” Bexşê got: “Ez jî dîn û har bûme ji ber eşqa wî ez dixwazim wî bibînim.”

Pîrê rahişt hinek kincên jinan, hinek xeml û xêz û bazin jî peyde kirin, hemû xistin buxçîkekê û berê xwe da cem Bexşo.

Hat cem wî û jê re got: “Kanî em herin cihekî bi tenê!” Bexşo ew bi xwe re bir odeyeke biçûk î ku di pişt dikanê de bû. Li wir, pîrê buxçîka xwe vekir, kincên jinan lê kirin, ew xemiland bi zêr û zîv û cewheran, bazin xistin destan de, xirxal xistin nigan de, ew mîna cêrîyekê xemiland ku kes

mîna wê spehî nebû. Piştî li qelafetê wî nêrî û got: “Subhan ji ew ê ku xuluqandîye! Bi vî halê xwe, tu ji wê cêrîyê jî xweşiktir î! De êdî bide pêşiya min û bimeşe. Bila nigê te yê çepê li pêş be, yê rastê jî li paş be gava tu derbasî cihekî bû. Di meşê de jî kulîmekên xwe bihejîne, te got erê!” Bexşo bi ya wê kir û bi hawê ku wê digot, meşiya. Gava pîrê ew meşa wî dît, pê bawer bû ku dikare rola jinan bike. Jê re got: “Bila îşev derbas bibe, sibe, bi xêr û selamet ezî werim, te bibim qesrê. Vêca li wir gava ku rastî hacip û xizmetkarên qesrê hatî, vîna xwe xwirt bike serê xwe bihejîne û bi kesî re neaxive. Ez ê bi wan re biaxivim. De êdî ma Xwedê.”

Roja dîtir, çawa bû sibeh, pîrê hat Bexşo bi xwe re bir qesra xelîfe. Ew da pêşiya xwe û berê xwe da derîyê qesrê. Di devê derî de, dergevan xwest ku nehêle derbasî hundur bibe. Pîrê pê de xeyîdî û jê re got: “Dergevanê bêxêr û beradayî! Ev Bexşê ye, cêrîya xelîfeyê me ye, bêaqilo tu çawa pêşiya wê digirî!” Di pey re jî li Bexşo zîvirî û jê re got: “Ka derbas bibe hundur cêrîya delal!”

Bexşo bi pîrê re derbasî qesrê bû, lê hîna ku li hewşa wê bûn, pîrê ji Bexşo re got: “Aram be, vîna xwe xwirt bike û bi gavin ewle li ser destê çepê bizîvire, derbasî hundur bibe! Pênc derîyan bijmêre û di derîyê şeşan re derbasî hundurê wê odeyê bibe, ew ode ji bo te hatiye amadekirin. Heger hinek bi te re axivîn ji, qet metirse; tenê bersivê nede wan û hew, tutişta nabe.” Piştî bi hev re meşîyan hetanî ku gîhan ber derî. Li wir dergevan jê re got: “Ev cêrî kî ye?”

Şeveqê lêda, bû sibe, Şehrezadê jî bêdenge bû.

ŞEVA 245'EMÎN

Şehrezadê vegotina çîroka xwe berdewan kir:

Çawa ku dergevan got ev kî ye, pîrê got: “Xatûna me dixwaze wê bikirre.” Dergevan got: “Kes nikare derbasî vir bibe bêtî destura Emîrê Bawermendan. Wê vegerîne, bibe, lewre min biryar da ku ez nahêlim tu wê derbasî hundur bike!” Pîrejînê got: “Serdergevanê gewre, kanî ew aqilê te? Ma qey tu nizanî ku Bexşê cêrîya xelîfe ye hem jî ya ku dilê wî pêve girêdayî ye û niha ew cêrî ji nexweşiya xwe rehet bûye û dixwaze vê cêrîyê bikire. De êdî rêya wê negire da ku ew ji vê helwesta te fêr nebe û xezeba xwe bi ser te de nerîjîne. Divê tu baş bizanibî ku heger ji te biqehere, dibe ku serê te bide jêkirin!” Hilmek berda û axiftina xwe berdewam kir, ji Bexşo re got: “De êdî tu jî derbas bibe cêrîya hêja û gotinên wî guhdar meke. Ji xwediya xwe re jî nebêje dergevan pêşiya min girtiye ha, te fêm kir?” Bexşo mîna cêrîkê tevgeriya, serê xwe hejand û bêdeng di derî re derbas bû. Lê li şûna ku bi hêla çepê de here, xwe şaş kir û bi hela rastê de çû. Li şûna ku pênc

deriyan bijmêre û derbasî yê şeşan bibe, şeş jimartin û derbasî yê heftan bû. Çawa redbasî hundur bû, dît ku her der bi berr û tejikên ecemî raxistî ye, dîwar hemû bi perdeyên hevrêsim ên bi zêr neqîşandî hatina xemilandin û hundur tije bîhna misk û emberê ye. Di zîkê odeyê de jî nivîneke bi dîbac xemilandî raxistî ye. Bexşo li ser wê nivîne rûnişt bîyî ku hayê wî jê hebe bê çî di qedera wî de nîvisandî ye. Hîna ku ew wisa rûniştî ji xwe re dipojînî, xwişka Emîrê Bawermendan û cêrîya xwe, derbasî hundur bûn. Çawa çavên wî li Bexşo ket, got belkî cêrîyek be. Nêzî wê bû û jê re got: “Tu kîjan cêrî ye û rewşa te çawa yî? Ya dîtir jî, tu çima derbasî vir bûyî?”

Bexşo ne axivî û bersiv nedayê. Xatûnê got: “Heger tu cêrîyeke bire min bî û birê min bi te de xeyidî be, ez dikarim li ber bigerim û te li ba wî bidim efûkirin?” Bexşo dîsa bersiv neda û bêdeng ma. Wê gavê xwişka xelîfe ji cêrîya xwe re got: “Li ber derî bisekine û nehêle tukes derbasî hundur bibe.” Piştî hat cem Bexşo û ji nêz ve li spehîbûna wî nêrî û jê re got: “Ciwanişkê, tu kî ye, navê te çî ye û tu çima hatiye vir? Ez texmîn nakim ku tu ji xelkên qesrê bî, lewre min qet tu nedîtîyî li van deran?” Lê Bexşo dîsa bêdeng ma û bersiva pirsên wê neda. Xatûn jî vê carê qeherî û destên xwe danî ser singa Bexşo, dît ku pêşîr pê ve tune ne. Xwest ku kincên wî jêbike, Bexşo jê re got: “Xatûna min ez koleyek im, min bikirre û li min were reh-mê!” Xatûnê got: “Tişt nabe, hela ji min re bibêje bê navê te çî ye û kê tu derbasî odeya min kiriye?”

Bexşo got: “Şahbanûya min! Ez Bexşo kurê Buharê Hatemî yê Kûfeyî me. Min xwe avêt talûkeyê û ez hatim vir ji bo cêrîya xwe Bexşê bibînim, ya Hecac bi fêr û fûtan ew ji min dizî û anî vir.” Xatûnê got: “Tiştêk nabe, mereqan neke!” Piştî gazî cêrîya xwe kir û jê re got: “Here odeya Bexşê û gazî wê bike, bila were vir!”

Di wê navberê de pîrejina xizmetara Bexşê jî çûbû odeya wê û jê re gotibû “Xatûna min kanî mîrzayê te Bexşo nehate cem te?” Wê jî gotibû: “Na wele nehatiye!” Pîrê jî gotibû: “Naxwe rêya xwe şaş kiriye û derbasî cihekî din bûye!” Bexşê jî gotibû: “Heger wisa bûbe, dê mala me xera bibê! Lahewla wela qeweta îlla billah!” Vêca hîna ku herdû wisa diponijîn di nava wê bêçaretîyê de, cêrîya xwişka Emîrê Bawermendan derbasî hundur bû, silav li Bexşê kir û jê re got: “Xatûna min te vedixwîne cem xwe!” Wê jî got: “Bila be, ser seran, ser çavan!”

Pîrê ji Bexşê re got: “Dibe ku xwediyê te çûbe odeya wê û ev jî tê wê wateyê ku raza me êşkere bû êdî!” Bexşê rabû ser xwe û çû derbasî cem xwişka xelîfe bû. Xwişka xelîfe jê re got: “Va yê mîrzayê xwediyê te li ba min rûniştîye. Wisa xwiya dike ku wî rêya xwe şaş kiriye. Lê bela dilê we herduyan jî aram be. Bi izna Xwedê tiştêk nabe!”

Şeveqê lêda, bû sibe, Şehrezadê jî bêdeng bû.

ŞEVA 246'EMÎN

Şehrezadê berdewam kir:

Çawa ku çavên Bexşo li Bexşê ket, per pê ve çêbûn û di cî de xwe avêt himbêza wê. Herduyan bi kelecani hevdu himbêz kirin û pê re jî mest bûn, lerizin, ji ser hişê xwe çûn, li erde ketin, dirêj bûn. Piştî demekê gava ku dîsa bi ser xwe ve hatin xwişka xelîfe ji wan re got: “Hela kanî rûnin da ka em li ser vê tengasiya we bisekinin, guftugo bikin, belkî em çareserîkê ji we re bibinin!” Herduyan got: “Ser seran, ser çawan, tu çawa û çilo dibejî, em ê wisa bikin.” Xwişka xelîfe got: “Bi navê Xwedê tu zarara me nagihêje we, êdî dilşad û aram bin!” Piştî gazî cêrîya xwe kir û jê re got: “Ka xwarin û vexwarinê ji mêvanên min re bîne!”

Cêrîyê çû xwarin û vexwarin anî, ew jî li ser rûniştin û têra xwe xwarin û vexwarin, qedehên xwe li hev xistin, tijî kirin, vala kirin hetanî ku kul û xemên xwe ji ser xwe avêtin. Bexşo got: “Ax! Gelo piştî vê, dê çawa bibe?” Xwişka xelîfe got: “Bexşo, birastî jî tu ji cêrîya xwe Bexşê hez dikî?”

Wî jî lê vegerand û got: “Xatûna min, eşq û evîna wê bû tişkî ku hişt ez canê xwe bavêjim talûkeyê û di vir re derkevim!” Xwişka xelîfe pirs ji Bexşê jî kir. Wê jî got: “Xatûna min, tiştê ku ez nexweş xistim û laşe min weke mûmê heland, ez kirim vî halî, evîna wî bû!” Xwişka xelîfe got: “Wellehî hûn pir ji hevdû hez dikin û negengaz e ku kes we ji hevdû qut bike. De êdî bila dilê we aram be!”

Herdu jî pir kêfxweş bûn bi wê helwesta xwişka xelîfe. Ûdek ji Bexşê re anîn, wê jî rahiştê ew akord kir û lêxist, li gel newayên mestekar dest pê kir got:

Li gel ku tu dujminatiya me ji wan re tunebû
Gelacên neyar veqetandina me pir dixwestin
Bênavber êrîşî ser min û navê min dikirin
Di dawiyê de bi tenê mam ez bê xwedan û bêkes
Lê min êrîşî ser wan kir bi fêrmiskên xwe bes
Bê agir û av û şûr jî ez mam weha bê nefes

Dûvre Bexşê ûda xwe da Bexşo û jê re got: “Ka tu jî helbestekê ji me re bejê bi stranî!” Bexşo ûd rakir, têlên wê ji nû ve akord kir û dest pê kir, got:

Heyva li çardehan rûyê te vedigot ji min re
Ger carinan nehata girtin roj jî dişibya te
Şaşwaz bûm ez pir û evîn mişt şaşwazî ye
Kul û derd û kêr û êşkişandin tê de heyê

Gava ku Bexşo helbesta xwe qedand, Bexşê qedeha wî dîsa dagirt û da destê wî; wî jî vexwar. Bexşê yeke din dagirt û da destê xwişka xelîfe, wê jî

vexwar. Di pey re dîsa ûd ji destê mîrzayê xwe girt, ew akord kir û dest pê kir, got:

Êş û xemgînîyekê kon vedaye di dil de
Jana valabûnekê ez dagir dikirim di hiş de
Ev hêjariya bedena min jî beyana wê ye
Seqema ruh û canê min her ji ber wê ye

Piştîre ûda xwe da dest Bexşo, wî jî rahişt ûdê, ew akord kir û dest pê kir got:

Ey dildara ku min canê xwe dayê û bê tebat im
A ku min ew xelas kir lêbelê ez bi ser neketim
Evîndar têgihişt êdî dizanim çawa xwe xelas kim
Lewre ev fersenda dawî ye beriya ku ez bimrim

Her weha helbest û stran wisa avêtin ber hev, vexwarin û serê xwe hejandin li ber newaya ûdê û di nava kêf û şahîyeke bêtîmtêl de, heta ku ji nişkê ve Emîrê Bawermendan derbasî cem wan bû. Çawa ku çav li xelîfe ketin, rabûn ser xwe, bejna xwe li ber tewandin û erda bin nigin wî maçî kirin. Awirên xelîfe çû ser Bexşê û ûda di destê wê de. Pê re jî got: “Bexşêcan, şikir ji Xwedê re ku êş û janên te çûne û tu rehet bûyê!” Di pey re li Bexşo zivirî ku hîna di nava kinc û lîbasê jinan de bû û axaftina xwe berdewam kir ji xwişka xwe pirsî, got: “Xwişkêcan ev cêrîya han a li kêleka Bexşê kî ye?” Xwişka wî lê vegerand û got: “Emîrê Bawermadan ev jî wenskara Bexşê bi xwe ye, bêyî wê sebra Bexşê nayê û nikare av û xwarinê jî bêyî wê vexwe û bixwe.” Piştîre bi helbestî got:

Du dijber in têne gel hev di rewşa halê de
Dijber bi xwe ye yê ku şemala dijber dertîne odê

Xelîfe got: “Bi navê Xwedê ew jî mina wê xweşik û spehî ye. Sibe sibehê odeya kêleka ya Bexşê ji wê re vala bikin. Berr û merş û perde û hemû pêdiviyên raxistinê jî binîn û bila tiştêkî wê ne kêmkî yê Bexşê be!”

Piştîre xwişka xelîfe ferman da xizmetkara xwe ku xwarineke xweş ji birayê wê re bîne. Xizmetkarê xwarin anî, li ber wî danî. Ew jî li gel wan, li ser sifreyê rûnişt, xwarin xwar, piştîre qedehek bi meydê dagirt...

Şeweqê lêda, li dinyê bû sibe, Şehrezadê jî bêdeng bû.

ŞEVA 247'EMÎN

Şehrezadê berdewam kir û got:

Piştî ku xelîfe qedeha xwe dagirt, bi serê xwe îşaret da Bexşê da ku çend nemayên din lê bide û helbesteke din bixwîne. Bexşê destê xwe avêt ûdê piştî ku du qedeh vexwarin û dest pê kir, got:

Gava nedîmê min sê kaseyan bilind dike ji bo min
Bi xumexum diherike weke çeman ev hestên min
Weke elokan xwe dinepixînim ez difre jî ligel min
Mîna ku'z Emîrê Bawermendan bim tu jî ligel min

Emîrê Bawermendan Ebdulmelîk Bîn Merwan, mest û gêj bû bî vê
helbestê. Kaseyeke din dagirt û ew da Bexşê, piştê jê xwest ku bistirê.
Bexşê, piştî ku ew qedeh jî vexwar, tiliya xwe li têla da û got:

Ey gewretirîn rûmetkarê dewr û dewranan
Ey bêtîmtêlê çavkaniya başî û qencîyan
Ey comerdîrîn desthilatdarên welatan
Ey navdartirîn seydayê şah û sultanen
Û ey şahîşahê hemû şax û gerdûnan
Her tu qencîyan dikî bê minnet û talan
Xwedê te bistirîne ji dek û dolabên neyaran
Dahatû her dê ya te be sultanê hemû dozan

Dema ku xelîfe ev rist ji Bexşê guhdar kirin, jê re got: “Bexşêcan ev çi zimanê fesîh û xwendina hestiyar e! Ev çi herîkbarî û vîna hestan e!” Û bi wî hawî guftûgoya xwe berdewam kirin hetanî nivê şevê. Di wê navberê de xwişka xelîfe li wî zivirî û jê re got: “Emîrê Bawermendan, hele guhdar bike ez çîrokekê xweş ji te re vebêjim di derbarê hinek kesên payebilind de!” Xelîfe got: “Ka bêje bê ev çi çîroke?” Xwişka wî got: “Li bajarê Kûfeyê ciwanek hebû ku navê wî Bexşo bû, Bexşo kurê Buharê Hatemî. Cêriyeke wî jî hebû ku pir jê hez dikir û wê ji wî pir hez dikir. Herdu bi hev re, di heman nivînê de mezin bûbûn û gava mezin bûbûn ji hevdû pir hez kiribûn. Lê di wê demê de felek li serên wan gerîyabû û misibet bi ser wan de barandibûn, ew ji hevdû veqetandibûn. Hîlebazan carîyeya wî ji mal derxistibûn, dizibûn û ew firotibûn mîrekî bi deh hezar dînar. Bexşo jî bêtî wê debar nekir û dev ji xwediyên xwe, dev ji mal û milken xwe berda û bi dûv wê ket, lê gerîya ji bo ku wê bibîne. Di ecamê de cêriya xwe Bexşê dît. Lê hîna ku pev şa nebûbûn mîrê ku ew ji dîzan kirrîbû, derbasî cem wan bû, ew zêft kirin û fermana kuştina wan da. Ne bêhna xwe li wan fireh kir û ne jî guh da dengê wijdanê xwe. Vêca di derbarê edalet û dadweriya vî mîrî de, tu çi dibêji Emîrê Bawermendan?”

Ebdulmelîk Bin Merwan got: “Ev, tiştêkî ecêb e! Diviyabû mîr wan efû bike. Lewre peywira mîr e ku sê tişkan biparêze: Ya yekê herdu dildarên hev in, a duduyan di mala wî de ne û di bin destê wî de ne; ya sisyan jî divê mîr bi bêhtengî tevnegere di darizandina xelkê de; bi taybetî jî gava ku ew bi xwe jî di nav wî karî de be. Loma tiştê ku vî mîrî kiriye, ne kare mîran e.”

Xwişka wî got: “Tu bi heqê Xwedê kî keko bihêle bila Bexşê bistirê û tu jî li wê guhdar bikî!” Xelîfe got: “Bexşê, ka ji min re bistirê!” Bexşê li ûdê

xist û got:

Feleka xayîn bêbextî kir û hîn jî dike
Dilê min bîrîn kir û va ye hin jî dike
Dost û dildaran ji hevdû dûr dixîne
Êş û kul û eleman her car ev bi xwe re tîne
Berê jiyanê min î xweş hebû ligel we
Gelek caran dihatin gelhev ez û te
Niha jî digirîm li ser te bi êş û jan im
Waxewaxa min e şev û roj ez dinalim

Şeveqê lêda, bû sibe, Şehrezadê jî bêdeng bû, gotina xwe birrî.

ŞEVA 248'EMÎN

Şehrezadê berdewan kir:

Xelîfe got: “Ev neva û ev vegotin asteke pir bilind e di hunere de!” Xwişka wî, di wê kêliyê de ket navberê de û ji xelîfe re got: “Keko te biryarek da ku ew biryar te jî girêdide û divê tu jî li gora wê tevbigere!” Dûvre li Bexşê û Bexşo zîvirî û ji wan re got: “Ka hela rabin ser piyan!” Herdu rabûn ser xwe. Wê jî axaftina xwe berdewam kir û got: “Ey Emîrê Bawermendan, ev a ku li ser nigan sekiniye Bexşê ya ku di çîroka min de derbas dibû û Hecac Bin Yûsif El-Seqefî ew ji xwedîyê wê diziye û di nameya xwe de derew kiriye, gotiye min ew bi deh hezar dînarî kirrîye. Ev ê li kêlekê jî, xwedîyê wê Bexşo yê kurê Buharê Hatemî ye. Veca tu bi xatirê wan bav û kalên xwe yên ruhpak bikî, van herdu ciwanên dildar efû bike, lewre herdu jî di mala te de ne, nanê de xwarine, ava te vexwarine û ez jî kefla wan im.”

Xelîfe got: “Tu rast dibêji. Ez ê jî biryara xwe bi wî hawî bidim. Û tû jî dizanî ku ez tucaran ji biryara xwe venagerim!” Dûvre li cêrîyê zîvirî û axaftina xwe berdewan kir got: “Ev ê li kêlaka te xwedîyê te Bexşo ye?” Got: “Belê, Emîrê Bawermendan.” Wî jî berdewam kir û got: “Baş e, naxwe ez we efû dikim û dîsa we li hev vedigerînim!” Di pey re li Bexşo vegeriya û dîsa axivî, got: “Te çawa cihê wê nas kir û kê rêya vê derê da ber te?” Bexşo got: “Emîrê Bawermendan, bi heqê Xwedê û bi tirba kalikê min û te, ez tiştekî ji te venaşêrim û ez rastiye bi hûrgulî ji te re bînim ziman.” Di pey re ta bi derziyê vekir û çîroka xwe û Bexşê ji serî hetanî binî jê re vegot: Çawa bi hev re mezin bûn, çawa pîra efsûnger ket mala wan de û Bexşê xapand ew bir da Hecac, çawa nexweş ket, çawa ew hekîmê farisî ew rehet kir û berê wî da Şamê û çawa pîrejina xizmetkara Bexşê ew anî û derbasî qesrê kir. Xelîfe pir behetî ma li wê serpêtatiyê. Ji xizmetkarên xwe re got: “Herîn ew ê farisî bînin vir!” Ew anîn ber destê wî, xelîfe jî ew kir şewirmendê xwe, xelatek dayê û mehmizex jê re veqedand û got: “Kesên wisa biaqil û biwijdan, dive

nêzîkî me bin!”

Pîştire, Xelîfe qedrê Bexşê, Bexşo û pîrejina xizmetkar jî girt û heft rojên din ew li ba xwe girtin bi mêvantî. Di wan heft rojan de, xwarin û vexwarinên xweş pêşkêşî wan kirin û qedr û qîmetekî mezin da wan. Piştî heft rojan, Bexşo izna çûnê ji xelîfe xwest. Xelîfe jî izina wî û cêriya wî Bexşê da. Herdu vegeriyan Kûfeyê û ligel dê û bavên xwe, jiyanekê xweş û bextewar berdewam kir, hetanî ku xerabkarê jiyana xweş û bextewariyê li wan qelibî.

Îcar gava Emced û Eshed ew serpêhatiye han ji devê Behram guhdar kirin, pir behetî man û gotin: “Ev, tişteki ecêb û erjeng e!” Dûvre, wê şevê bi hev re raketin û roja din Emced û Eshed xwe amade kirin û xwestin ku derbasî huzura Mîr bibin. Mîr izîn da wan, ew jî derbasî cem wî bûn, bi hev re rûniştin û ketin nav guftûgoyeke xweş de.

Hîna wan wisa ji xwe re sohbet dikir, dengê carewar û qîrewîreke mezin, dengê hewar û fiwan û axîneke ecêb hate wan. Pê re jî serxizmetkar derbasî hundur bû û ji mîr re got: “Melîkek ji milûkan li gel leşkerên xwe têne bajarê me û şûrên wan kişandî ne, em nizanin bê çi dixwazin!”

Mîr ev agahîya ku serxizmetkar jê re anîbû, ji herdu wezîrên xwe Emced û Eshed re got û fikra wan pirsî. Emced got: “Ez ê herim pêşiya wî melîkî.” Û bi lez çû, ji bajêr derket. Dît ku Melîk û leşkerekî giran li gel jimareke bêhed û hesab ji koleyan ber bi wan ve tîn. Gihan hinda hev û leşkeran naskirin ku Emced qasidê mîr e, di cî de ew birin cem Melîkê xwe. Çawa hat raserî Melîk, Emced bejina xwe jê re tewand û erda bin nigê wî maçî kir. Piştî serê xwe berjor ve rakir û dît ku Melîk jineke bi rûpoş e. Melîke bi hêrs axivî û ji Emced re got: “Tu daxwaza min ji we tune ye ji xeynî bendeyekî serhildêr ku ji ber taetê reviyaye. Heger min ev bende ji destê we girt, jixwe tu pirsgirêk namîne di neqeba me de. Lê heger hûn wî radestî me nekin, wê çaxê dê cengeke mezin di neqeba me de derkeve. Lewre hatina min, tenê ji bo wî ye.”

Emced lê vegerand û got: “Ey Melîke ya gewre, ev bendeyê ku tu behsa wî dikî navê wî çi ye û mirovekî çawa ye?” Melîkeyê got: “Navê wî Eshed e û navê min jî Mercane ye. Behram ê Mecûsî ev kole anîbû welatê me û nexwest ku bîfiroşe min, min jî bi zorê jê stand, lê piştî wî dişa ew ji cem min bir bi dizî. Şikl û şemalê wî jî weha weha ye.”

Gava Emced ev gotinên wê bihîstin, tê derxwist ku behsa birayê wî Eshed dike. Loma lê vegerand û got: “Ey şahbûnûya dem û dewranan, şikir ji Xwedê re ku kul û derdên me derman kirin û birayê me li me vegerand, lewre ev bendeyê ku tu behsa wî dikî birayê min e.” Piştî çî hatibû serê wî û birayê wî jê re vegot: Li xerîbiyê çî hatibû serê wan, sebeba derketina

wan ji girava Ebenosê, hemû jê re gotin. Mercane pir kêfxweş bû bi vê hev-rasthatinê û xelatek ji bo Emced deranî, lewre wî mizgîniya dîtina Eshed dabûyê.

Emced vegeyriya cem mîrê xwe û ew ji rewşê agahdar kir. Hemû kêfxweş bûn bi vê pêşketina nû. Piştî mîr rabû ser xwe û li gel Emced û Eshed çûn pêşiya Melike Mercane û derbasî çadira wê bûn, pê re rûniştin û ketin nav guftûgoyeke kûr. Lê hîna ew di wî halî de bûn toz û ecacek ji dûr ve rabû ku mîna ewrekî rûyê ezman hemûçik girt. Piştî seatekê jî ew toz belav bû û artêşeke gewre mîna pêlên behrê ji nav derket û ber bi bajarê wan ve hat û dora bajêr girtin, mîna hungulîska ku li dora tiliyê were hev. Piştî jî şûrên xwe kişandin. Emced ji Eshed re got: “Lahewle, îcar ev çi artêş e? Bêgûman wê ev artêşa dujminekî me be. Heger em bi Melike Mercane re yekîtiyekê çênekin, dê bajar ji me bîstînin û me bikujin. Tu rê jî li ber me tune ye niha, ji xeynî ku em qasidekî bişînin pêşiya wan û rastiya meseleyê fêhm bikin!”

Piştî Emced rabû ser xwe û çû pêşiya wan. Gava gîha cem wan, dit ku ew, artêşa kalkê wî bavê Bidûrê ye...

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bê deng bû.

ŞEVA 249'EMÎN

Şehrezadê berdewam kir û got:

Mîna ku şeva borî jî me got, çawa ku Emced gîha cem wan, dit ku kalkê wî Şah Xeyûr, xwediyê cezayir û deryayan ê ku bi heft qesr û qonaxên xwe tête nasîn. Gava ku Emced çû huzura wî, bejna xwe li ber tewand û erda bin nigê wî maçî kir; nameya mîrê xwe pêşkeşî wî kir û jê re got: “Navê te çi ye?” Şah got: “Ji min re dibêjin Xeyûr, mîrê cezayir û deryayan, xwediyê heft qonaxan. Ez û artêşa xwe jî em bi rêwîti di vir re derbas dibin, lewre felek li serê me geriyaye. Keça min Bidûr ji me veqetiyaye û bi şûn de venegeriyaye. Bi salan e me tu agahî ji wê û mîrê wê Heyva Zeman negirtî ye. Gelo tu agahî li ba we hene di derbarê wan de?”

Gava ku Emced ew gotin bihîstin, serê xwe berra ber xwe da û bi qasî seeteki bi xwe re ponijî, hetanî baş lê ewlê bû ku ew şah kalkê wî, bavê diya wî ye. Piştî serê xwe rakir û jê re got, ku ew kurê keça wî Bidûr e. Çawa ku Xeyûrê Şah ew gotin ji devê Emced bihîstin, xwe çem kirye û ew himbêz kir. Bi hestiyarî hevdû ramûsan, giriyan û kul û derdên xwe bi hev re parve kirin. Xeyûrê Şah got: “Kurê min, Şikir ji Xwedê re ku em gîhan hev!” Emced jî ew agahdar kir ku keça wî Bidûr û Heyva Zeman jî dijîn û bi xêr û selametî û wê gavê ew li girava Ebenosê ne. Piştî berdewam kir û jê re got ku bavê wî Heyva Zeman ji wî û birayê qeheriye û fermana kuştinê di

derbarê wan de daye, lê belê dilê xeznedar bi wan şewitiyê û ew nekuştine.

Şah Xeyûr got: “Mereqan meke kurê min, ez ê navberan we û bavê we çêbikim, we li hev binim û ez ê ji li gel we bimînim, li wir niştêcih bibim.” Emced pir kêfxweş bû bi vê gotina kalkê xwe û serê xwe li ber tewand, erda bin nigê wî maçî kir. Şah jî ew xelat kir û qedr û qîmetê wî girt.

Emced bi kêf û şahî li mirê xwe vegeriya û çîroka kalkê xwe Xeyûr ê şah jê re got. Ew jî ecêbmâyî ma bi wê çîrokê û di cî de peywira mazûbantiya xwe kir û jê re hemû pêdiviyên wî yên bi hesp û deve û pez û êm û wekî din pêkanîn. Ji aliyekî din ve jî qasidek şand cem Melîke Mercane ji bo ku vê rewşa nû jê re ragihîne. Gava Mercane ev agahî girtin, got: “Ez ê ligel arteşa xwe bi we re bêm û alîkariya we bikim di navbeynkariyê de.”

Hîna ew li wir di wê rewşê de bûn, dîtin ku toz û ecacek bi ezmanan ketiye ku roja wan kir mîna şevê. Ji nava wî ewrê tozê yê giran jî, dengê hîrehîra hespan û qajewaja mirovan dihat, şûrê wan dibiriqandin, rimên wan li ba dibûn. Gava nêzîkî bajêr bûn û leşker li pêşiya xwe dîtin, li def û dohalê dan.

Gava mirê bajêr çav li wê dîmenê ket, di ber xwe de got: “Ez bi hêvî me ku ev roj, rojeke pîroz be. Şikir ji Xwedê re ku em bi herdu artêşên din re lihev hatin. Xwedê hez bike em ê bi vê artêşê re jî li hev bîn. Dûvre li Emced û Eshed zîvirî û ji wan re got: “Kanî herin keşfa vê artêşê jî bikin, lewre ev artêşêke pir girane!”

Emced û Eshed, weke tevdîr destpêkê deriyê bajêr girtin li ber leşkerên derdorê û berê xwe dan pêşiya ew artêşa ku ber bi wan ve dihat. Gava gihiştin wan, dîtin ku ew leşker artêşa Sultanê Ebenosê ne û bavê wan Heyva Zeman jî di pêşiya wan de ye. Çawa ew dîtin, erda bin nigê wî maçî kirin û giriyan. Heyva Zeman jî çawa ku herdu kurên xwe dîtin, xwe bi ser wan de avêt û ew bi germahî himbêz kirin û êş û jana ku piştî çûna wan kişandibû, ji wan re anî ziman. Emced û Eshed jî hatin û hevdîtina xwe ya bi Şah Xeyûr û leşkerên wî re vegotin. Dûvre hemû bi hev re li hespên xwe siwar bûn û berê xwe dan cem artêşa Xeyûr ê şah. Lê hîna ew di rê de bûn, yek li pêşiya wan çû cem Şah Xeyûr û jê re gotin va ye Heyva Zeman tê ligel herdu kurê xwe. Silav dane hev, li hev kom bûn û şaşwaz bûn ji ber wê rasthatina wan!

Xelkên bajar mazûbantiya xwe kirin, xwarin û vexwarin li ber mêvanên xwe rêz kirin, şêranî dane ber wan, hesp û deve û her tiştê ku lazim dibû ji wan re pêşkeş kirin, hemû pêdiviyên leşkeran temîn kirin.

Di wê navberê de dîsa toz û ecaceke bêhawe ber bi ezmanan ket, gumegum û şingeşing û reperep bi dahol û rîman, bi binê nalê hespan ket, erd jî ber wan dihejiya. Mîna ku bahoz û erdhej çêbûbe. Artêşek ber bi wan ve

dihat ku bi hejmareke mezin bûn û hemû ji reşgirêdayî bûn. Di pêşiya wan de ji kalepîrek hebû ku rîha wî hetanî bi ser sînga wî ve dadiket û kincên wî ji reş bûn.

Gava ku mîrê bajêr li wê arteşa mezin nêrî, li mîrên dîtirkê zîvirî û ji wan re got: “Xwedê kir ku îro hûn hemû nas derketin û li vir gîhan hev, naxwe me yê çawa bikarîba xwe li himberî artêşeke ewqasî mezin li ber xwe bida!” Mîrên dîtirkê ji jê re gotin: “Metirse yê me em sê mîr in û her yek ji me ji artêşa wî pê re ye. Heger dujmin bin, em ê bi wan re şer bikin lew ku jimara wan du qatê vê jimara ku xwiya dike bin jî!”

Hîna ew wisa li ser rewşê diaxivîn, bala xwe danê ku qasidek ji cem wê artêşa gewre, ber bi wan ve tê. Xizmetkar çûn pêşiyê, ew anîn cem Heyva Zeman û Şah Xeyûr û Melike Mercane û mîrê wî bajarî. Qasid, çawa ghişt cem wan, erda bin nigên wan maçî kir û got: “Ev artêşa han a Sultanê welatê Eceman e, ku bîst û du sal bêrê kurê xwe wendakiriye û niha ji li pey wî hatiye hetanî vir. Heger kurê xwe li ba we bibîne, pirsgirêk dernakeve, lê heger kurê xwe li cem we nebîne, dê şer di neqeba we û wî de biqewime û dê sultanê min bajarê we xera bike.” Heyva Zeman lê vegerand û got: “Gelo navê sultanê we çi ye?”

Şeveqê lêda, Şehrezadê ji bêdeng bû û gotina xwe birrî.

ŞEVA 250'YEMÎN

Şehrezadê çîroka xwe berdewam kir:

Gava ku Heyva Zeman ew pirsra xwe ji qasid kir, wî ji lê vegerand û got: “Jê re dibêjin Melîk Şehrîman, xwedîyê cezayîrên pîroz. Ev leşkerên xwe giş ji bi rê de ji welatên ku tê re derbas dibû kom kiriye. Ji bo kurê xwe, li seranserê welatan geriyaye û dûvre hatiye vir.”

Gava ku Heyva Zeman ev gotin bihîstin, ji kêfan laşê wî giş lerizî û ji ser hişê xwe çû, xiliya bi ser erdê de. Piştî seetekê, disa bi ser xwe ve hat û pir giriya. Piştê ji Emced û Eshed re got: “Kurên min, bi qasîd re herin û silavekê bidin kalkê xwe Şehrîman ê Melîk û mîzgîniya saxitiya min bidinê, lewre ew pir xemgîn û biêş e li ser min. Ev reşgirêdana wan ji li ser min e.”

Piştê Heyva Zeman, çîroka ciwantiya xwe û bûyerên ku bi serê wî de hatibûn ji wan mîrên din re ji got. Ew hemû şaşwaz û behetî man li wê serpêhatiya wî. Piştê hemû bi hev re li gel Heyva Zeman çûn ber bi bavê wî de. Çawa çav li hev ketin Heyva Zeman û bavê xwe hevdû himbêz kirin bi hestiyariyeke mezin. Pê re ji herdu ji ser xwe çûn ji kêfan. Piştî ku bi ser xwe ve hatin, Şehrîman çîroka serpêhatiya xwe bi hûrgulî jê re anî ziman. Mîrên din ji silav danê û li halê wî pirsin.

Piştire Mercane şandin welatê wê û di pey re jî bi Eshed re zewicandin, lê bavê wê jê xwest ku wan jibîr neke. Bîstana keça Behram jî bi Emced re zewicandin û hemû bi hev re çûn Ebenosê. Li wir Heyva Zeman bi xezûrê xwe re xewle bû û çî hatibû serê wî jê re got, ta bi derziyê vekir, ji serî hetanî binî jê re rave kir bê çawa filîtîye û çawa bi zarokên xwe re gîhaye hev.

Piştire derbasî bajarê bûn. Melîk Xeyûr, li wir keça xwe Bidûr Xatûnê dît, hesreta bêrîkirina wê şikand û bi qasî mehekê li wê derê man li cem wan, piştire jî Xeyûr û keça xwe Bidûr Xatûn rabûn çûn welatê xwe.

Emced û Eshed jî bûne desthilatdar li Ebenosê. Heyva Zeman jî amadekariyên xwe kirin û bi bavê xwe Melîk Şehrîman re çûn cezayira pîroz, welatê bav û kalên wan. Bajar bi çûna wan re hate xemilandin, qurban hatin serjêkirin û xêr hatin belavkirin. Ew pîrozbahîya vegera wan mehekê sax berdewam kir. Dûvre Heyva Zeman bû melîkê wê derê û ket şûna bavê xwe û jiyana xwe di nava bextewariyeke xweş de derbas kirin, hetanî ku fitneyek bi ser wan de hat û ew rehetîya wan xera kir.

Wê gavê Şehreyarê Şahînşah axivî û ji Şehrezadê rê got: “Ev çîroka te, çîrokeke ecêb bû!” Şehrezadê got: “Şahê min ê gewre! Ev çîroka ku min got ne tutîştêk e li ber çîroka Eladînê Ebû Şamat!” Şehreyar got: “Îcar çîroka Eladînê Ebû Şamat çawa ye?” Şehrezadê got: Bi xêr û selamet, ez ê wê di vê şeva pêşîya me de bibêjim!

Şeveqê lêda, Şehrezadê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 251'EMÎN

(ÇÎROKA ELADÎN EBÛ ŞAMAT)

Şehrezadê got:

Şahê min ê gewre û mehrîban, tê gotin ku di dem û dewraneke kevn de, təcîrek li Misrê hebû ku navê wî Şemsedîn bû. Yekî rastgo û baştirînê tacîran bû di Misrê de. Gelek mal û mulk û xizmetkar û kole û cêrîyên wî hebûn. Di heman demê de şahê bendera ticaretê bû, di wî welatî de jineke wî jî hebû ku pir jê hez dikir û wê jî pir ji wî hez dikir. Çil salî bi hev re jiyân, lê hîna kurdûnde bûn û Xwedê ne kurek dabû wan, ne jî keçek. Rojekê ji rojan, gava li dikana xwe rûniştî bû, dît ku hemû hevpişeyên wî xwedî zorak in. Her yekî ji wan kurek, du kur, sê kurên wî hene û ligel wan rûniştî ne di dikanan de, bandora wê dîmenê pir lê bû. Ew roj jî roja îne bû.

Rabû ser xwe, çû hemamê xusla îne kir û derket di eynîkê de li rûyê xwe nêrî û got: “Eşhedû enla îlahe illallah we eşhedû ene Mûhemedên

resûlallah!” Dûvre li rîha xwe meyze kir, dit ku tayên spî ji yên reş pirtir bûne û hat bîra wî ku extiyarî elametên mirinê ne.

Jina wî jî dema vegera wî ya malê dizanîbû. Loma her car beriya ku mêrê we were, radîbû ser xwe, xwe dişûşt, xwe diediland, xwe jê re amade dikir û ew jî çawa dihat, derbasî cem wê dibû. Wê rojê jî wisa bû. Çawa derbasî cem jina xwe bû, jinikê got: “Evara te bi xêr be!” Wî jî lê vegerand û got: “Wile min tu xêr nedîtiye!” Piştî mîna her car cêriya wî sifre li ber raxist, xwarin jê re anî û got: “Kerem bike ser xwarinê mîrziyê min!” Tacir got: “Ez xwarinê naxwîm!” Û piştî xwe da sifreyê. Jina wî jê re got: “Sebeb çîye û çima tu wisa xemgîn xwiya dikî?” Got: “Ji ber ku dilê min biêş e.” Jinikê got: “Û çima dilê te biêş e?” Şemsedîn Tacir got: “Îro gava min dîkana xwe vekir û ez lê rûniştîm, min bala xwe dayê her yek ji hempişeyên min kurekî wan heye, an ji du-sê kurên wan hene û ew jî mîna bavên xwe bi wan re rûdinên li dikanan û kirîn û firotinê dikin. Wê çaxê min ji xwe re got: “Ê ku bavê te ji dest te bîriye, wê te jî bibe! Vêca gava em zewicîn min ji te re sûnd xwaribû ku ez hewîya neynim ser te û ne ji bi cêriyeke Romî an jî Hebeşî re rakevim. Jixwe ji wê rojê ve ez şevêkê tenê jî dûrî te neketim; lê tu zarokan nayîne û raketina bi te re jî mîna ser kevir e!” Jina wî got: “Pirsgirek di te ye, ne ji min e. Lewre avika te tenîk e.” Zilam got: “Çi têkiliya sivikbûna avikê bi hemlê ketiye?” Jinikê got: “Avika sivik jinan bihemle nake.” Zilam got: “Ka tiştê ku avikê tîr dike li ku ye, ez herim wî bikirim ji bo ku avika min jî tîr bike?” Jinikê got: “Here cem etaran lê bipirse!”

Tacir wê şevê raket û roja din sibehê, li wê gotina xwe poşmam bû ku sûc xist stûyê jina xwe û ew biçûk xist. Di heman demê de jina wî li xwe poşmam bû ku sûc avêt stûyê mêrê xwe û ew biçûk xist bi wan gotinên xwe. Di nava wê poşmaniyê de, Şemsedîn berê xwe da sûkê. Li wir etar dît, jê re got: “Gelo dermanekî ku avika tîr dike li ba te tune?” Etar got: “Li ba min hebû, lê wele qediya. Lê tu dikarê ji van cîranê min bipirse.” Şemsedîn yeko yeko, li ser etaran tevan geriya û heman pirs ji wan kir. Hemû pê kenîyan û kesî tiştêk neda dest wî. Ew jî vegeriya dikana xwe û ji xwe re rûnişt.

Li wê sûkê serdellalek hebû ku mirovekî tiryakêş bû, efiyon û heşîşa şîn dikişand, bi navê Şêx Mûhammed Simsim dihat naskirin. Mirovekî xizan bû û adeta wî bû ku her sibeh rêya xwe bi Şemsedîn dixist û silavek lê dikir. Wê rojê jî mîna her car rêya xwe bi Şemsedîn xist û jê re got: “Silav li ser te bin!” Wî jî lê vegerand û bi hêrs got: “Silav li ser te jî.” Şêx Mûhammed got: “Begê min tû çima bihêrs î?” Rabû wî çiroka xwe ji serî hetanî binî jê re vegot û pê de çû, got: “Ev çil sal e ku em bi hev re zewicîne, lê zarok ji me re çênebûn. Îcar hînekan ji min re got ku ji ber avika te ruhne, jina te ber nagire. Ez li tiştêkî geriyam ku avika min tîr bike, lê min ew nedît.” Serdellal got: “Begê min, tiştêkî ku avikê tîr bike li gel min heye. Vêca heger piştî çil salî ji zewaca we, ez bihêlim ku jina te ducanî bibe, tê çi bibêjî?” Tacir got:

“Heger tu bikaribî tiştêkî wisa bikî ez ê te di nava diravan de bihêlim û qenciyeke baş bi te bikim.” Serdellal got: “Ka dînarekî bide min?” Tacir got: “A ji te re du dînar!” Serdellal rahişt herdu dînanan û got: “Kanî wê tebeke çînî bide min?” Tacir tebek dayê, wî jî rahişt tebekê û çû cem firoşkarê heşîrê, du weqîyên şekîrê Romî yê parzûn kirî. Piştî çû hinek ji kababeya çînî, hinek qurnufil, qerfeyeke çînî, libeke hala Hindistanî (Gîhayekî bi bêhn e), piçîk zencefil, bibera spî û siqenqûra çiyayî hemû kirrîn, xistin nav hev û kutan; piştî jî ev di nav zeyta zeytûnan de kelandin. Dûvre sê pelên Hasilbanê nêr û hinek ji genime reş, ew xistin nav avê, ev nermijandin û hemû tevlihev kirin, di nava hinguv de stran û ew xist tebekê de.

Piştî li tacir vegeriya, ew tebek dayê û jê re got: “Tiştê ku avikê tîr dike, ev macûn e. Divê tu vê macûnê piştî xwarinekê bixwe. Ev xwarina han jî divê ji goştê mange û kevoka malan bê çêkirin û gelek buharat tê de hebe. Herî dawî ji şekîrê dawerivî bi ser de vexwe.

Tacir, ew tiştên ku serdellal behsa wan kiribû hemû kirrîn û ev ji jina xwe re şand û jê re got: “Vî goştî baş çêbike, bikelîne, xwarina min amade bike û vê macûna han jî li ba xwe bigire hetanî ku ez ji te bixwazim.”

Jina wî, bi ya wî kir, xwarina wî jê re amade kir. Wî jî şîva xwe xwar, piştî ew macûna derman xwest. Jina wî tebeke macûne jê re anî, wî jî destpêkê hinek ji xwar, gava dît ku xweş eyê mayî jî xwar û piştî bi jina xwe re raket. Wê şeve jina wî tov girt û ducanî bû. Gava mehek dudu derbas bûn û neket cila, dilê wê ket cî de û li xwe ewle bû ku ducanî bûye.

Piştî ku neh meh û deh rojên wê qediyar, qolinc hatin wê û ket ber welidandinê. Pîrik pê ve mijûl bû hetanî ku ji hev xelas bû û zaroka xwe anî. Zaroka wê kurik bû. Pîrikê, bi navê Mûhemed û Elî axivî û di guhê wî de ban da û ew da destê diya wî. Wê jî pêsêra xwe xist devê wî û şîrê xwe dayê, hetanî ku têr xwar û raket. Pîrik, sê rojên din li cem wan ma, hetanî ku helawa wî çêkirin û di roja heftan de li ser xelkê belav kirin. Piştî jî xwêya wî reşandin.

Tacir jî derbasî cem wê bû, ew pîroz kir û selametî jê re xwest. Piştî jî got: “Kanî ew emanetî Xwedê li ku ye?” Jina wî pitika xwe ya spehî da dest wî ku hîna heftroji bû, lê di dirûvê wî de, mîna yeksalî be xwîya dikir. Tacir li rûyê wî nêrî, dît ku mîna heyveke li çakdeyan dibiriqîne û du şanik jî li ser herdu rûçikên wî ne. Ji jina xwe re got: “Te çi nav lê kiriye.”

Şeveqê lêda, Şehrezadê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 252'YEMÎN

Şehrezadê vegotina çîroka xwe berdewam kir:

Tacir ji jina xwe re got: “Te çi nav lê kiriye?” Jina wî got: “Heger keç bûya, min e nav lê bikira, lê ew kurik e û divê tu nav lê bikê.” Vêca di wê demê de xelkê bi fe’lan nav li zarokên xwe dikirin. Hîna ku ew wisa bi hev re dişewirîn li ser navan, yekî got: “Mîrzayê min, bila Eladîn be!” Wî jî ji jina xwe re got: “Bila navê wî Eladîn Ebû Şamad² be, lewre du şe’in di hî-narkên rûçkê wî de ne!”

Dûvre çend dayikên şîr û çend pîrik dane peywirdarkirin ji bo ku baş wî xwedî bikin. Ew du salan şîr dan û piştê ew ji pêsêran qut kirin. Mezin bû, meşîya û gava ku temenê wî gîhaşt heft salan, ji bo ku nezar lê nede û kes wî çavînî neke ew xiztî jêzemînekê de û derî li ser girtin ji bo ku dernekeve û tukes wî nebîne, hetanî ku rîha wî derkeve. Cêriyek û koleyek jî peywirdar kirin bi wî karî, da ku mezin bikin. Cêriyê xwarin jê re amade dikir, kole jî radihişt xwarinê, ew jê re dibir.

Dema wextê wî hat, ew sunet kirin û şahîyeke mezin ji bo wê yekê li dar xistin. Piştê feqîyek dan cem wî, ew fêrî Qur’an û nivîs û zanînê kir û têgihiştineke baş pê da qezenkirin.

Rojekê gava kole xwarina wî jê re bir, di vegerê de deriyê odeyê vekirî hişt û ji bîr kir ku bigire. Eladîn jî ji odeya xwe derket, çû cem diya xwe. Wê keliye jî, diya wî civat gerandibû û gelek li dora xwe kom kiribûn û ketibûn nava sohbetake kûr de. Eladîn, mîna xizmetkarekî serxweş ket hundur de. Ji ber ku pir spehî û lihevhatî bû, çawa ku ew jinên di civatê de çav lê ketin, ser çavên xwe girtin û ji diya wî re gotin: “Xwedê cezayê te bide te, tu çawa xortekî biyanî derbasî cem me dikî?” Ma qey tu nizanî ku fedîkirin ji îmanê ye?” Diya wî ji wan re got: “Zimanê xwe xweş bikin û nifiran li min nekin. Ev ciwan ne xerîb e, ev kurê min e, berhema dilê min û kurê şahê bendera taciran, Şemsedîn ê tacir e.” Wan jî lê vegerandin û gotin: “Bavê wî li ser ditirsiya ku hinek wî çavînî bikin bi nezera xwe, loma ew xist odeyeke di bin erdê de. Wisa tê xwiyakirin ku xizmetkarê wî, ji bîr kiriye ku deriyê wî bigire, ew jî derketiye, hatiye vir. Me nedixwest ku kes wî bibîne hetanî ku rîha wî derkeve, loma.” Hemû jinen civatê ew piroz kirin ji ber wê helwesta wan.

Eladîn ji cem jinan derket, çû hewşê û li wir rûnişt li ser kursiyekê. Hîna ku ew li wir rûniştî bû, bala xwe dayê ku çend kole li gel qantira bavê wî, derbasî hewşê bûn. Eladîn ji wan re got: “Ev qantir li ku bû?” Wan jî got: “Me bavê te bir hetanî dikana wî bi vê qantirê û em vegeriyan, me qantir jî bi xwe re anî.” Eladîn got: “Karê bavê min çi ye gelo?” Wan jî got: “Bavê te şahê bendera tacirên Misrê ye, yanî sultanê zarûkên Ereban e.”

Eladîn, bi şûn de zivirî cem diya xwe û jê re got: “Bavê min çi karî dike

2 Şamat: Şe’in e (bi zimanê Erebi).

dayêcan?” Got: “Bavê te tacir e, kurê min; şahê bendera tacirên Misrê ye; sultanê ewladên Ereban e. Koleyên wî yên ku li ber destên wî dixebitin jî, tenê di firotina tiştên ku buhaya wan di ser hezar dînarî re be, pê dişêwirin. Tiştê ku buhaya wî di biniya heştêd dînarî re be, ew bi xwe difiroşin bêyî ku pê bişêwirin. Çi malê ticaretê yê ku xelk dibin û tînin jî, misoger tê ber destê wî û ew jî li gora daxwaza xwe teserrûfê tê de dike. Veca Xwedê Teala jî malekî pir daye bavê te kurê min!”

Eladîn got: “Dayêcan, naxwe şikir ji Xwedê re ku ez kirime kurê sultanê Ereban ê ku şahê bendera tacirên Misrê ye. Lê belê madem ku wisa ye dayêcan, çima hûn min dixin wê odeya binerdê û hûn derî li ser min digirin?” Dîya wî got: “Kurê min, ji bo ku kes te çavînî neke, em te dixin wê odeyê. Lewre nezer rastîye û gelek kesên din goristanan de ji ber nezerê çûne.”

Şeveqê lêda, sibeh hat, Şehrezadê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 253'YEMÎN

Şehrezadê vegotina çîroka xwe berdewam kir:

Gava ku diya wî ew bersiv dayê, Eladîn got: “Dayêcan û reva ji ber qedêrê wê çawa çêbibe? Tevdîr çiqasî xurt bin jî, nikarin pêşiya qedera mirov bigirin. Di qedera mirov de çi hatibe nivîsandin, ew tê serê mirov. Tiştê ku kalkê min ji dest me bir, dê bavê min jî ji dest me bibe. Îro bijî jî, sibe dê nikaribe bijî. Veca gava bavê min bimre û ez derkevim pêşberî xelkê û ez ji wan re bibêjim ez Eladîn, kurê Şemsedînê tacir im, tukes ji min bawer nake. Herkes dê bibêje, bi salan e ku em hevdu nas dikin û me tu zarokên Şemsedîn nedîtine; ne kur, ne jî keç. Wê çaxê jî dê Beytulmal were û dest deyne ser malên bavê min. Îcar dayêcan, tu bi bavê min re bi axiv ji bo ku min bi xwe re bibe sûkê û dikanekê ji min re veke, da ku ez jî tê de rûnim û ji bavê xwe fêrî kirrin û firotanê bibim. Da ku ez fêrî danûstêndinê bibim!” Dîya wî got: “Bilabe kurê min, gava bavê te hat, ez ê vê jê re bibêjim.”

Gava tacir vegehiya mala xwe, dît ku kurê wî Eladîn li kêleka diya xwe rûniştî ye. Ji jina xwe re got: “Te çima ew ji odeya wî derxistîye?” Jinê got: “Ne min ew derxistîye, lê belê xizmetkaran derî vekirî hiştine, xwe ji bir kirine ku bigirin, ew jî derketîye. Ez bi civata jinan re diaxivîm gava min dît ku derbasî cem me bûye.” Piştî tiştê ku kurê wê jê xwestibû ku ji bavê wî re bibêje, jê re rave kir û daxwaza wî jê re got. Tacir ji kurê xwe re got: “Bila be kurê min, bi xêr û selamet sibe ez ê te bi xwe re bibim sûkê. Lê belê mana li sûkê û di nav xelkê de jî, çand û sinc û edebekê dixwaze. Bila hayê te ji vê yekê jî hebe.”

Wê şeve, Eladîn bi kêf ket nav nivîne xwe û raket. Gava bû sibe, dest-pêkê ew xistin serşokê têr şûştin. Piştî bedlekî kincan lê kirin ku pir giranbûha bû. Di dûvre jî taştiya xwe xwar, şêrînî vexwar û êdî amede bû ji bo çûnê. Bavê wî ev li qantîrekê kir, ew bi xwe jî li ya xwe siwar bû, ew da dûv xwe û berê xwe da sûkê. Gava giha wir, xelkên li sûkê bala xwe danê ku sertacirê wan Şemsedîn tê û kurekî mîna heyva li çardeyan jî li dû wî ye. Yekî ji xelkê wir, ji hevalê xwe re got: “Hela ji xwe re li vî kurîkê bi sertacir re binêre! Me jî digot belkî zîlamkî rastgo û xwedî sinc e qaşo! Naxwe ew jî mîna marê di tûr de ye!” Serdellal jî got: “Êdî em nema dipejirînin ku yekî wisa bibe sertacir û şahê bendera ticaretê li vî welatî!”

Veca ji adeta wê sûkê bû ku her roj gava ku şahê taciran her sibeh ji malê dihat û li dikana xwe rûdinişt, hemû tacirên sûkê ligel serdellalê wan Mûhemmed Simsim, dihatin cem wî, tevan bi hev re fatiheyek dixwendin, duayên xêrê dikirin û piştî ji hev belav dibûn, her yek ji wan diçû ser karê xwe. Lê wê rojê gava şahê taciran li dikana xwe rûnişt, mîna her sibeh tacirên sûkê nehatin cem wî. Şemsedîn gazî Mûhemmed Simsimê serdallal kir û jê pirsî got: “Çima mîna her car tacir nehatin serdana min?” Serdellal got: “Ez nizanîm fitne û paşgotinan bikim; Taciran gişan li hev kirin ku şahîtiyê ji dest te bigirin û yekî din li serê xwe bikin şahê taciran. Loma naxwazin werin fatiheyê ji te re bixwînin!” Şemsedîn got: “Sebeb çi ye?” Mûhemmed Simsim got: “Evê li kêleka te çi kare wî heye li ba te û tu mirovekî navûsêr î, tu şahê bendera taciran î li vî welatî? Gelo ev kur koleye te ye, ango merivekî jina te ye? Ez texmîn dikim ku dilê te di vî kurîkê de heye û tu xwe pê şa dikî!” Şemsedîn hêrs bû, qîrîya û got: “Hiş be kotiyo! Xwedê te bimesixîne hawile ha!.. Kurê min e lawo!” Mûhemmed Simsim got: “Qey rojekê me nebihîst ku kurekî te heye?” Şemsedîn got: “Gava te dermanê tîrkirina avîkê ji min ra anî, jina min ducanî bû û ev kurîk ji me re çêbû. Lêbelê ji ber ku ez pir li ser ditirsîyam ku hinek wî çavînî bikin, min ew di odeyeke binxanî de mezin kir. A rastî min nedixwest ku ji malê derkeve hetanî ku rîha wî bê. Lê gava ku diya wî razî nebû, min jî xwest ku ez wî fêrî ticaretê bikim û dikanekê jê re vekim; loma min îro ew bi xwe re anî.”

Mûhemmed Simsim ê serdellal çû li ser taciran geriya û rastîya mijarê ji wan re rave kir, ew agahdar kirin. Hemû rabûn ser xwe, dan dûv serdellal û hatin cem sertacirê xwe Şemsedîn, fatîhe jê re xwendin. Ew pîroz kirin bi wî kurê wî û temenekî direj jê re xwestin. Dûvre jê re gotin: “Xwedê Teala kur û bavê herduyan jî bisitirîne û temenê wan dirêj bike, lê belê ji adetê ye ku gava kurîkek ji yekî re çêdibe, xêrekê dike, xwarinekê çêdike, dost û merivên xwe jî vedixwîne ser xwarinê. Feqîrên me wisa dikin, veca çawa camêrekî mîna te nake!” Şemsedîn got: “Temam, bila wisa be, hûn hemû mêvanên ser xwarina min in. Li bistanî em ê li hev kom bibin...”

Şeveqê lêda, Şehrezadê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 254'EMÎN

Şehrezadê vegotina çîroka xwe berdewam kir:

Çawa bû sibe, Şemsedînê tacir, navmaliyê xwe şand ew qesra xwe ya di nav bîstanê de û jê re got: “Here wan deran paqij bike, odeya mêvana baş amade bike û raxîne.” Dûvre aşpêj jî li dû wî şand, ji bo xwarinê û goşt û rûn û çi lazimiye ku hebûn şandin wir. Piştî xizmetkaran jî sifre raxistin û sênîyên xwarinê li ser rêz kirin. Şemsedîn û kurê xwe Eladîn jî xwe girêdan û amade kirin ji bo pêşwaziya mêvanan. Wê çaxê Şemsedîn ji kurê xwe re got: “Kurê min mêvanî extiyar û navûser bên, ez ê wan pêşwazî bikim û ez ê wan bibim odeya mezin; mêvanê ku zarok be, tu wî bi xwe re bibe hêwanê, wî li ser sifreyê wê derê bide rûniştandin.” Eladîn li bavê xwe vegehand û got: “Bavocan, çima em du sifreyên xwarinê radixin û zilam û zarokan ji hevdu cuda dikin?” Bavê wî got: “Kurê min, zarok û ciwanên nûhatî, fedî dikin bi zilaman re biaxivin” Kurê wî got: “Naxwe wisa çêtir e.”

Îcar gava tacirên mêvanên wî hatin, Şemsedîn zilam û extiyar pêşwazî kirin û ew birin odeya mêvanan, Eladîn jî zarok û ciwanên nûhatî pêşwazî kirin û ew birin ser sifreyê ku li hêwanê raxistî bû. Piştî, xwarin, vexwarin, li kêfa xwe nêrin û li newaya ûd û çengên guhdar kirin, şerab vexwarin û ketin nav sohbet û guftûgayan de. Mezinan behsa zanist û zanîna kirin, serpêhatiyên xwe bi hev re parve kirin. Vêca tacirek di nava wan de hebû ku navê wî Mahmûdê Belxî bû.

Mirovekî di şiklê xwe de Musulman û di cewherê xwe de Mecûsî bû. Pir tolaz bû bi zorak û naşîyan re mijûl dibû. Gava ku çavên wî li Eladîn ketin jî, heman fikar ket serê wî, dilê wî lê xera bû. Hest û ajoyên wî tevan serî hildan û agirekî şeytanî ket nava wî de, ew mest û gêj kir. Loma çawa ku fersend dît, berê xwe da hêwanê, derbasî aliyê zarok û naşîyan bû. Hemû zarok ji ber wî rabûn, hurmet jê re girtin. Eladîn jî di wê navberê de çûbû destavê, ne li wir bû. Mehmûd ji zarokan re got: “Heger hûn Eladîn îqna bikin ku bi min re derkeve rêwîtiyeke ticaretê, ez ê ji her yekî ji we re bedlekî kincên giranbuha bikirim.” Û di cî de bi şûn de vegeriya nav zilaman.

Gava ku Eladîn ji destavê vegeriya, zarok ji ber wî rabûn û ew di sênga civatê de dane rûniştandin û ketin nava sohbetekê ku bi pirranî li dora serpêhatiyên wan digeriya. Yekî ji hewalê xwe re got: “Sîdî Hesên, hela ji min re vebêje bê te ew malê ticaretê çawa bi dest xwe xistiye?” Sîdî Hesên got: “Gava ez nû kamil bûm, min ji bavê xwe re got kerwanekî bide min ez ji xwe re pê ticaretê bikim. Wî jî got ewqase malê min tune, here cem tacirekî û ji xwe re hineke mal jê deyn bike û bi wî malî ticaretê bike. Fêrî danûstendîna, fêrî kirrîn û firotinê bibe. Ez jî çûm cem tacirekî û min hezar dînar ji wî deyn kir. Bi wî hezar dînarî, min ji xwe re qûmaş kirrî û ew

bir Şamê, li wir firot. Bi wê ticaretê yeka diravên min bû dudu. Ji wir jî min barekî ticaretê kirrî û min bir Bexdê; li wir firot. Bi wê yekê jî diravên min du qatên xwe zêde kirin. Û bi wî hawî min ticareta xwe berdeyam kir he-tanê ku sermîyanê min giha deh hezar dînarî.”

Bi wî hawî zarokan yeko yeko pirsên wisa ji hev kirin û bersivên wan dan hetanî ku dor hat ser Eladîn û zarokên din jê re gotin: “Te çawa kir mîrzayê me?” Eladîn ji wan re got: “Ez di odeyeke binerdê de mezin bûm û îna borî ez jê derketim. Niha nû ez bi bavê xwe re diçim dikanê û tême malê.” Hevalên wî jê re gotin; “Tu fêrî rûniştina malê bûyî û tu çêja rêwîtiyê û gerê nizanî. Jixwe rêwîtî tenê karê zilaman e.” Eladîn got: “Tu pêdiviya min bi rêwîtiyê nîne û qîmetê rehetiyê jî li ba min nîne.”

Wê gavê zarokakî ji yê kêleka xwe re got: “Evê han mîna masî ye, ni-kare ji ava xwe qut bibe.” Piştî gişan bi hev re gotin: “Eladîn, ciwanên me tenê bi gerekî rêwîtiyê pesnê xwe didin.”

Eladîn pir hêrs bu bi wê gotinê û giriya û berê xwe da malê. Gava gî-haş malê, çû cem diya xwe, jê re got: “Zarokên taciran henekê xwe bi min dikin û dîbêjin; çêja herî xweş ew e ku mirov bigere û qutê xwe jî ji ticaretê derxîne.”

Şeveqê lêda, li Şehrezadê bû sibeh, wê jî dengê xwe birrî bêdeng bû.

ŞEVA 255'EMÎN

Şehrezadê berdeyam kir û got:

Gava ku Eladîn wisa got, diya wî jê re got: “Kurê min qey tu dixwazî rêwîtiyê û geriyanê biki?” Eladîn got: “Belê dayêcan!” Diya wî got: “Tu dixwazî biçî kîjan welatî?” wî got: “Ez dixwazim herim Bexdê. Li wir qe-zenca mirov ji sedî dused e.” Diya wî got: “Kurê min, jixwe bavê te tacir e û malê wî pir e. Ez ê jê re bibêjim bela kerwanekî ticaretê ji malê xwe bide te. Heger neke jî, ez ê ji malê xwe kerwanekî ji deh baran bo te amade bikim.” Eladîn got: “Qenciya herî baş a ku mirov di ci de bike, veca heger tê qenci-yekê bi min bikî, niha bike!” Diya wî gazî kole û xizmetkaran kir, ferman da wan, ew jî çûn topên qumaşan anîn û deh bar jê re veqetandin.

Îcar em vegerin ser rewşa bavê wî Şemsedîn. Gava dît ku kurê wî li wan deran xwiya nake, ji zarokan pirsî, wan jî gotin: “Wele Eladîn li qan-tira xwe siwar bû û çû malê.” Ew jî li ya xwe siwar bû û ket pey kurê xwe, çû malê. Çawa ket hewşa malê de dît ku deh heb deve barkirî ne. Li mijarê pirsî, jina wî mijar jê re rave kir û gotinên ku di navbera kurê wê û zarokan de derbas bûbû, jê re got. Şemsedîn ji kurê xwe re got: “Kurê min, yezdanê dilovan ji xurbetê nexweş e û pêxemberê me jî gotiye bextiyariya mirov

ew e ku mirov li welatê xwe bijî û rizqê xwe ji wir derxîne. Bav û kalên me jî gotine, dev ji rêwîtiyê berde lew ku meyla mirov jî li ser hebe!” Lê kurê wî qet guh neda wan şîretan. Bavê wî jê re got: “Naxwe tu di biriyara çûnê de bi bîriyar î?” Kurê wî got: “Ez bi biryar im û vegera min jê tune ye. Bêgûman divê ez bi kervanekî ticaretê re herim Bexdê. Heger na ez ê van kincan ji xwe bikim, kincên derwêşan li xwe kim û bikevim ser rêya gêştê.”

Bavê wî jê re got: “Malê min pir e û pêdiviya min bi tiştêkî din nîn e kurê min!” Piştî, mal û mulk û mexzenên ticaretê hemû nişani wî dan û pê de çû, jê re got: “Ji bo her welatekî cuda, malekî cuda heye ji bo ticaretê!” Di pey re jî barê çil deveyî nişani wî da ku buhaya her yekî ji wan hezar dînar bû û jê re got: “Kurê min, de êdî vî çil barî li gel wan deh barê ku diya te ji te re amade kirine bibe û bi izna Xwedê bikeve rê de. Lê belê ez ji bo te ditirsim kurê min. Lewre di rêya Bexdê de daristaneka bi navê Daristana Esed heye û newalek jî bi navê Newala Sohan heye ku mirovan dadîqurtînin bêyî kes bi wan bihesel!” Eladîn got: “Ew çima bavo?” Şemsedîn got: “Ji ber ku rêbirrekî Erebi li wir heye bi navê Eclan, kî di wir re diçe, wan dikeve û dişêlîne.” Kurê wî got: “Rizq rizqê Xwedê ye, heger şensê min tê de hebe, dê zirara wî zilamî jî negihêje min.”

Eladîn û bavê xwe siwar bûn û çûn sûkê, Akam rastî wî hat. Çawa ku Şemsedîn dît, ji qantira xwe peya bû û çû destê sertacirê xwe maçî kir û jê re got: “Mîrzayê min, ev demeke dirêj e ku em bi hev re derneketine ticaretê.” Şemsedîn got: “Ji bo her karî zilamek ji bo her demê zilamek heye. Rehma Xwedê li wî helbestkarî be ku digot:

Extiyarek dimeşe bi çar hêlên dinyê ve
Riha wî jî hetanî bi kabokê de dakeve
Min jê re got tu çima wisa xûz bûyî
Destên xwe ber bi min ve tewand û gotî
Ciwaniya min wendabû bi hewa ve çû
Ez jî vaye lê digirim li van deran zû”

Piştî ku helbesta xwe qedand li Akam vegerîya û dîsa berdewam kir, got: “Ey Akam, ê ku dixwaze vê carê kerwan bi rêxe kurê min e, ne ez im!” Akam got: “Xwedê wî ji tere bihêle!” Şemsedîn, ew kir wekilê kurê xwe ji bo ku bi rê de lê miqate be. Piştî wesiyeta wî lê kir û jê re got: “A ji te re ev sed dînar, ji boyî xulamên tel!” Dûvre şêst qantir û deve ji Akam re kirrî û ji kurê xwe re jî got: “Kurê min, ez ne bi te re me û ev camêr jî di şûna min de mîna bavê te ye. Çi bibêje, bi ya wî bike û ji rêya wî dernekeve.” Piştî hemû tevde çûn û wê şevê mûlîdek li ser rûhê şêx Ebdîlqadirê Gêlanî li dar xistin, hemû xulam û koleyên rêwî vexwendin ser xwarinê.

Bi sibehê re, şahê bendera tacirên Misrê, kerwanê ticaretê teslîmî kurê xwe kir, deh hezar dînar jî da wî û jê re got: “Gava hûn gihan Bexdê, binêrin

heger malê we buhabe bifiroşin, heger na ji van pereyan xerc bike!” Dûvre xatir ji hev xwestin û li heywanên xwe siwar bûn, ji koleyan re gotin: “Barên mane ji bar bikin!” û piştî ketin rê de...

Şeveqê lêda, li Şehrezadê bû sibeh, wê jî dengê xwe birrî bêdeng bû.

ŞEVA 256'EMÎN

Şehrezadê vegotina çîroka xwe ji Şehreyar re berdewam kir û got:

Piştî xatirxwestinê, kerwanê Eladîn û Akam ê ku êdî şûna bavê wî digirt, kete rê de û ji bajêr derket. Mehmûdû Belxî jî kerwanê xwe amade kiribû ji bo ku biçe Bexdê. Lê belê ew ji berê ve derketibû derveyî bajar û li wir rawestiyabû, di dilê xwe de digot: “Divê li çolê ez vî kurikî zêft bikim da ku ne şahid hebin ne jî rikebir.” Jixwe hezar dînarê Şemsedîn jî bi deyn li ba Mehmûd hebûn û dema ku Mehmûd çûbû xatir jê xwestibû, xwestibû ku wî deynê wî bidêye, lê Şemsedîn gotibû: “Jixwe tu jî bi wan re diçî, hema wî hezar dînarê min jî bide kurê min Eladîn!” Û tembi lê kiribû, jê re gotibû: “Lê miqate be, ji xwe ew jî weke kurê te ye.” Mehmûdê Belxî jî gotibû: “Bila be.” Û ketibû rê de, kerwanê xwe li derveyî bajêr sekîandibû, mabû li bendî Eladîn.

Çawa ku kerwanê Eladîn û Akam gîha hinda wî, Mehmûd jî tev li wan bû û bi hev re rêya xwe berdewam kirin. Hîna ji serî ve Mehmûdû Belxî ji aspêjê Eladîn re got: “Tu qet xwarinê çêneke, hewce nake!” Û her car wî xwarina xwe da Eladîn û civata wî. Bi hev re xwarin, bi hev re vexwarin û rêwîtiya xwe wisa derbas kirin.

Mehmûdê Belxî jî mirovekî pir maldar bû û çar malên wî hebûn. Maleke wî li Misrê bû, yek li Şamê bû, yek li Helebê û yek jî li Bexdê bû. Vêca gava ku kerwanê wan gîha Şamê, Mehmûd bendeyekî xwe şand dûv Eladîn. Bende çû, dît ku Eladîn dixwîne. Rahişt destê wî maçî kir, Eladîn got: “Tu çi dixwazî?” Bende got: “Silavên xwediyê min li te hene, te vedixwîni mala xwe.” Eladîn jê re got: “Ka bise ez herim bi Akam bişêwirim, piştî ez ê bersivê bidime te.” Eladîn çû bi Akam şêwirî; Akam jê re got: “Neçe mala wî!” Wî jî çû ew bersiv da Bendeyê Mehmûd.

Piştî jî Şamê derketin, berê xwe dan Helebê. Piştî meşekî dirêj, kerwanê wan gîhaşt Helebê. Li wir, Mehmûdê Belxî xwarineke xweş da çêkirin û ziyafeteke mezin li dar xist û şand dûv Eladîn jî. Eladîn dîsa bi Akam şêwirî, Akam got: “Meçe!” Eladîn got: “Vê carê ez e herim!” Û rabû xwe girêda, şûrêk jî di bin kincên xwe de bi cih kir û çû derbasî cem Mehmûdê Belxî bû. Mehmûd pê ve rabû, qedrê wî girt û sifreyeke xwarinê yeke zengîn li ber wî raxist. Bi hev re xwarin û vexwarin, piştî destê xwe

şuştin û dest bi vexwarinê kirin. Mehmûd xwe bi ser Eladin de tewand ji bo ku ramûse, lê Eladîn destê xwe da ber devê wî û jê re got: “Tu dixwazî çi bikî?” Mehmûd got: “Min tu anî vir ji bo vê yekê, ne ji bo tiştêkî din.” Pê re jî da xwe ku xwe bavêje ser wî, mîna dirindeyekî. Eladîn xwe çeng kir, şûrê xwe ji bin kirasê xwe kişand û jê re got: “Qey tu ji ber vî temenê xwe fedî nakî? Jixwe tu jî dizanî ku ev daxwaza te ne gengaz e! Qey te nebihîstiye ku helbestkarekî gotiye: “Rîh û porê xwe yê sipî biparêze ji gemarê, lewre rengê sipî zû digire gemarê!” Piştîrê bêyî ku li bendî bersiva wî bimîne, axaftina xwe berdewam kir û got: “Ev malên ticaretê êdî malê Xwedê ne û dive neyên firotin. Heger tu wan bi zêran jî bifiroşe, ez ê wanan bi zîvan dîsa bifiroşim te. Ji aliyekî din ve jî ey mirovê nêtxerab, divê tu bizanibî ku ji îro û pê de ez nema bi te re dimeşim!”

Eladîn zû li Akam veşariya û jê re got: “Ev zîlamê han, mirovekî fasiq e ez nema pê re dimeşim û ne jî pê re didim ser rêyekî?” Akam got: “Kurê min, ma min ji te re negot meçe cem wî! Lê belê ji aliyekî din ve kurê min, heger em jê veqetin jî dibe ku bele bi serê me de bîn, loma bihêle ku em bi hev re rêya xwe berdewam bikin, dê çêtir be.” Eladîn got: “Ne gengaz e ku gavekî tenê jî pê re berdewam bikim!”

Piştîrê Eladîn kerwanê xwe ji yê Mehmûd veqetand û wî û Akam rêya xwe berdewam kirin ber bi Bexdê ve. Gava gîhan newalekê, xwestin ku li wir navberê bidin meşa xwe. Akam got: “Li vir nesekekin û meşa xwe bi lêz berdewam bikin da ku em xwe bigihînin Bexdê, berî ku deriyên bajêr bi êvarê re bêne girtin. Lewre deriyên bajêr zû têne girtin û dereng jî vedibin, ji ber tirsê ku Rafizî bajar bixin destê xwe û hemû pirtûkên ilm û zanîne bavêjin Dîcleyê.” Eladîn ji Akam re got: “Bavocan ne ji bo ku ez debara xwe bikim ez ketime rê de, na; ji bo ku ez geşt û seyranê bikim û Bexdê bibînim, ez bi vî kerwanê re digêrim.” Akam got: “Kurê min, ji ber ku ez ji bo te ditirsim, ez wisa dibêjim.” Eladîn aciz bû û got: “Tu xizmetkarê min î ango tu mîrzayê min î? Ez derbasî Bexdê nabim hetanî ku nebe sibe da ku gava ez bi kerwanê xwe derbas bibim, herkes min nas bike.” Akam jê re got: “Min şîret li te kir, de êdî tu çawa dixwazî wisa bike!”

Eladîn ferman da xizmetkaran da ku barên xwe deynin û çadîrên xwe vegirin. Barên xwe ji ser piştê heywana danîn, cihê xwe xweş kirin û rûniştin. Nivê şevê, Eladîn rabû ser xwe ji bo ku here destava xwe bişkîne. Çavên wî li tiştinan ket ku diçûrisandîn. Çû cem Akam, jê re got: “Osta, ev tiştên dibiriqîn çi ne?” Akam, di nava tariya şevê de baş meyze kir û li xwe ewle bû ku ew tiştên dibiriqîn serên şûr û rîman in.

Ew şûr û rîman, ên Ereban bûn. Navê serkêşê wan Şex Eclan Ebû ban bû. Vêca gava ew rêbirrên Ereban nêzikî wan bûn û çav li wî barê wan ketin, ji hev re gotin: “Ev şev şeva talanê ye!” Îcar dema ku ew dengê wan çû Akam,

derket pêşiya wan û ji wan re got: “Bi edeb bin lawo, zarokên Ereban!” Eclan di cî de xencera xwe di sînga wî rakir, di nav parsûyên wî re derxist. Akam, di devê çadirê de li erdê ket, mir.

Ev hemû li ber çavên Eladîn diqewimîn. Erebi li dora kerwan çûn û hatin, çep û rast li wan zîvirîn û yeko yeko ew kuştin, hetanî ku Eladîn tenê ma. Hemû malên ku talan kiribûn jî, li ser piştê qantirê û deveyan kirin û birin, çûn. Eladîn ji xwe re got: “Tiştê ku te dide kuştin ev qantira te û ev bedlê te ye!” Pê re jî kincên xwe di ser xwe re anîn û ew avêtin ser qantirê û bi tena gumlekê û kirasê xwe ma. Çend gavan pêş de çû, dît ku golekê xwînê di devê deriyê çadira wî de ye û meytê zilamên wî giş li ser hev in. Rabû wî jî xwe di nava wê xwînê de vegevizand hetanî ku kincên wî giş bûnê bixwîn, ew jî bû mîna kuştîyê ku di nav xwîna xwe de fetisî be. Em Eladîn li wir bihêlin û em vegehin ser Şêx Eclan û Ereben wî. Piştî talanê, Eclan ji hevalên xwe re got: “Erebino! Gelo ev kerwan ji Misrê dihat ber bi Bexdê ve, ango ji Bexdê diçû ber bi Misrê ve?”

Şeveqê lêda û li Şehrezadê bû sibe, ew jî bêdeng bû.

ŞEVA 257'EMÎN

Şehrezadê berdewam kir:

Gava ku Eclan ew pirs ji hevalên xwe kir, wan jî got: “Ev kerwan ji Misrê ber bi Bexdê ve diçû.” Eclan got: “Naxwe li kuştîyan vegehin û wan di ber çavan re derbas bikin, lewre ez texmîn dikim ku xwediyê vî kerwanî nehatiye kuştin.” Bi vê gotina serkêşê wan re, hemû Erebi li kuştîyan vegehin û yeko yeko ew di ber çavan re derbas kirin, hetanî ku gihan ser Eladîn ê ku xwe avêtibû nav cendekên kuştîyan. Çawa ku ew di wir de dîtîn, jê re gotin: “Madem ku te xwe di nava kuştîyan de veşartî ye, naxwe em te jî bikujin!” Erebeke xencera xwe kişand û xwest ku di sînga Eladîn de biçikîne. Di wê kêlikê de Eladîn nifirek kir û got: “Ya Şêx Evdîlqadir û xasa Xwedê nefîsa pîroz, de lê bide êdî ev wext, wextê te ye!” Bi vê gotina wî û bi emrê Xwedê, wê kêlikê dûpişkekî bi kefa destê wî Erebeke veda û hişt ku qêrîn pê bikeve. Erebi, serserkî ket erdê û qîriya, got: “Erebino, werin bi min ve, dûpişkekî bi min veda!” Hevalin wî pê ve hatin û rahiştinê, ew dîsa li hespê wî kirin û jê pirsin, gotin: “Çi qewimî?” Wî jî got: “Dûpişkekî bi min veda.” Ew girtin nav xwe û dîsa bi şûn de çûn.

Îcar em vegehin ser Mehmûdê Belxî. Wî jî piştî çûna Eladîn-wan, ferman da xizmetkarên xwe û got: “Baran bar bikin, em ê bi rê kevin!” Xizmetkaran amadekarî kirin, kerwan dîsa sazî kirin û ketin rê de, meşîyan. Gava gihan Daristana Şêran, li cendekên kole û xizmetkarên Eladîn rast hatin û dîtîn ku hemû hatine kuştin, Eladîn tenê maye, ew jî tena binkiras-

kê xwe raketî ye. Mehmûd ew şîyar kir û jê re got: “Kê wisa bi te kiriye û tu xistiye vî halî de?” Eladîn got: “Ereban wisa kir.” Mehmûd got: “Kurê min, bila mal û mulk hemû bi qurbana te bin. Qey te nebihîstiye ku ozanakî gotiye: “Gava ku camêr ji mirinê rizgar bibin, wendakirina mal û mulkan, tenê mîna birrîna neynûkan e! De êdî rabe were û metirse!”

Eladîn rabû, li qantireke xwe siwar bû û bi wan re kete rê de. Bênavber meşîyan, hetanî ku ketin Bexdê de. Li wir, çûn mala Mehmûdê Belxî. Piştî bêhnvedanekê, Mehmûd ferman da xizmetkaran ku Eladîn bibin hemamê. Ew birin hemamê. Mehmûd jê re got: “Mal û mulk û diravên min hemû bi qurbana te bin kurê min. Heger tu bi ya min bikî, ez ê bi qasî du kerwanên mîna yê te mal û mulk bidime te!”

Piştî ku ew ji hemamê anîn, ew derbasî hêwanekê kirin ku çar diwan tê de hebûn û bi berreke zêrneqşî hatibû raxistin. Di pey re Mehmûd ferman da xizmetkaran ku sifreya xwarinê raxînin. Cûr be cûr xwarinên xweş û şerab û vexwarinên cankêş li ser sifreyê rêz kirin. Wan jî têra xwe xwarin û vexwarin, piştî jî Mehmûdê Belxî xwe bir ser Eladîn de tewand, ji bo ku wî ramûse ji rûçikê wî ve. Eladîn jî destê xwe da ber devê wî û jê re got: “Naxwe hîna jî tu di nava xerabîyê de yî? Qey min ji te re negotibû ku tu vî malê xwe bi zêran bifiroşî, ez ê wî bi zîvokî bidim te?” Mehmûd got: “Ew bedlê kincan, ew qantir û malê ku min dane te, hemû ji bo vê daxwaza min bûn. Lewrê ez har û dîn im li ser te!” Eladîn lê vegerand û got: “Tiştêkî wisa ne gengaze ku pêk were! De êdî a ji te re bedlê kincan û qantira xwe bigire û derî ji min re veke bo ez herim!” Mehmûd derî jê re vekir. Eladîn jî derket, çû, kûçik jî li pey wî direyan.

Hîna ku ew wisa ji xwe re dimeşîya, li derîyê mizgeftêkê rast hat. Derbasî hundur bû, ket dehlîza Mizgeftê de, tê de rûnişt, di nava wê tarîtiyê de. Demek bi şûn de, bala xwe dayê ku şewqek derbasî cem wî bû û ber pê ve hat. Gava nêzîkî wî bû dît ku du fanosin di destên du koleyan de ne. Du tacir jî li pêşîya wan dimeşîn. Yek ji wan temendirêj û rûxweş bû, yê dîtir ji ciwan bû. Ewê ciwan ji yê extiyar re digot: “Apocan tu bi Xwedê kî dotmama min li min vegerîne!” Extiyar jî jê re digot: “Ma min çend caran tu şîyar kir di mijara berdanê de, lê dîsa jî tu çû û hersê telaqên wê avêtin!” Di wê navberê de, herdu jî gîhabûn hinda Eladîn û çavên wî tacirê extiyar lê ketibûn, dîtibû bê ciwanekî çiqasî spehî û rûgeş e. Extiyar li ber Eladîn sekinî û jê re got: “Selamun Elêykûm!” Eladîn silava wî girt. Extiyar berdewam kir û got: “Ey ciwanê delal, navê te çi ye û tu kî yî?” Eladîn got: “Ez Eladîn ê kurê Şemsedîn ê şahê bendara ticaretê li Misrê. Min ji bavê xwe xwestibû ku kerwanekî ticaretê bide min da ku ez ji xwe re li wan welatan bigerim. Wî jî pêncî bar qûmaş û kinc û tiştên giranbûha ji min re amade kirin û deh hezar dînar jî da min ji bo ku ez bi rê kevim. Ez jî ketim ser rêya Bexdê û ez hatim hetanî Daristana Şêran, li wê derê rêbirrên Ereban derketin pê-

şiya me, xizmetkarên min giş kuştin, mal û mulkên min giş birin û çûn. Ez jî hatim vir, lê min nizanîbû ez herim li ku derê rakevim. Loma çaxa min ev dehlîza Mizgeftê dît, ez ketim vir de û tê de rûniştim...

Şeveqê lêda, bû sibe, Şehrezadê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 258'EMÎN

Şehrezadê berdewam kir, got:

Gava ku Eladîn çiroka xwe jê rê got, tacirê extiyar got: “Kurê min, heger bedlekî bi hezar dînarî û hezarê din jî di ser re bidime te, tê çi bibejî?” Eladîn got: “Û ji bo çi tê wan diravan bidî min apocan?” Extiyar got: “Ev xortê bi min re, kurê birê min e. Di heman demê de kurê bi tenê ye ji bavê xwe re. Ez jî bavê keçeke bi tenê me, ku navê wê Zubeyde ye. Keçek pir xweşik û biaqil e. Min keça xwe pê re zewicand ji ber ku pir jê hez dikir. Lê keça min ji wî hez nedikir û bê dilê wê bû. Veca kurik sûnd xwar bi sê telaqên bêfitû û ew berda. Keçikê dev jê berda, vegeriya malê. Wî jî gelek navbeynkar xistin neqeba me de ji bo ku ez keçikê lê vegerînim. Min jî jê re got çênabe, lewre te sê telaq avêtine û te fitû tê de nehiştiye. Divê bi zilamakî din re bizewice û dûvre ew jî berde, piştê dê bikaribe li te vegere. Me li hev kir ku em yekî xerîb pê re bizewicînin ji bo helal bibe û dîsa li birazîyê min vegere, ji bo kes wî nasneke û henekê xwe pê neke.

Veca madem tu jî xerîbê vî bajarî yî, bi me re were em mehra te lê bibirin, tu jî îşev pê re rakev û bi sibehê re wê berde. Em ê jî weke min got, hezar dînarî bidin te û bedlekî kincan jî di ser re.”

Eladîn di dilê xwe got: “Îşev ji bo min raketineke bi bûkeke xweşik re û li ser nivîneke nerm, çêtir ji mana li vir, di vê dehlîzê de!” Loma teklîfa tacir û birazîkê wî pejirand û bi wan re çû, cem qadî. Çawa ku qadî li Eladîn nêrî, jê hez kir û ji bavê keçikê re got: “Daxwaza we çi ye?” Extiyar got: “Em dixwazin vî ciwanî bikin helalkerê keça xwe. Lê belê di destpêkê de em dixwazin senedekê pê re wajo bikin ku heger sibe bernede deh hezar dînar qelen bide, lê heger sibe berde jî, em ê hezar dînarî bidine wî.”

Sened û peymanek li gorî wan şertan nîvisandin û di huzura qadî de wajo kirin. Piştê Eladîn bi xwe re birin malê, ew li devê derî rawestandin û bav derbasî cem keçîka xwe bû û jê re got: “Min mehra te li xortekî ciwan û hêja birrî ku navê wî Eladîn Ebû Şamat e. Ev jî seneda qelenê te ye, a ji te re û pir li vî ciwanî miqate be!” Piştê ji cem derket, Eladîn jî derbasî cem wê kir û çû.

Pismamê Zubeydeyê jî çû cem pîrejineke sihirbaz ku berê ew nas dikir û jê hez dikir, jê re got: “Dayêcan, ez texmîn dikim ku piştî Zubeyde vî

xortê spehî û lihevhatî bibîne, dê nema bi min razî bibe û ne jî li min vedigere. Veca ez dixwazim ku tu rêyekê, hîleyekê bibînî û tu nehêle ku dotma-min dilê xwe bide wî xortî!” Pîrê got, “Ez bi serê te kim, ez qet nahêlim ku Zubeyde nêzikî wî jî bibe.” Piştî di cî de çû derbasî cem Eladîn bû û jê re got: “Kurê min, ji bo Xwedê ez dixwazim şîretekê li te bikim. Nêzikî wê keçikê nebe û dev jê berde, bila bi tena serê xwe rakeve. Ne nêzikî wê bib û ne jî destê xwe bide wê!” Eladîn got: “Çima?” Pîrê got, “Laşê wê gurrî ye û ez ditirsim ku tûşî te jî bibe. Heyfa te, lewre tu ciwanekî spehî û nûhatî yî.” Eladîn got: “Jixwe tu pêdiviya min bi wê tune ye.”

Pîrê dûvre çû, derbasî cem Zubeyde bû û heman tişt jî wê re jî got. Zubeyde got: “Jixwe tu pêdiviya min bi wî nîne. Ez ê bihêlim ku bi tena serê xwe rakeve. Gava bû sibe jî, ez ê wî bi rêya wî de bişînim.”

Piştî, pîrê çû sifreya xwarinê anî, danî ber keçikê û jê re got: “Vê xwarinê jê re bibi, bila şîva xwe bixwe.” Zubeyde rahişt sifreya xwarinê û ew bir danî ber Eladîn. Eladîn li ser sifrê rûnişt û xwar, hetanî ku têr bû. Piştî sûretê yasînê xwend bi dengê xweş. Keçikê jî lê guhdar kir û dît ku dengê wî mîna mezmûrên Dawîd e. Di dilê xwe de got: “Lanet li wê pîrê were ku ji min re got, ev xort gurrî ye! Kesê ku gurrî be, ne gengaz e ku dengê wî ewqasî xweş be!” Piştî wê jî rahişt û deke Hindî, tîlên wê akord kirin û bi dengê ewqasî xweş stra ku teyr li ezmanan disekinîn ji bo newaya wê:

Hez kir min ji askeke çawreş bi giranî
Ne tenê ez her tişt bi xîrete li ser wî
Çima ber min digire û nahêle herim ba wî
Xwedê daye wî spehîbûn ji her alî

Bi vê helbestê re, keçikê hîn bêhtir jê hez kir. Rabû ser xwe û şerpa serê xwe vekir. Çawa ku Eladîn lê meyzand, bi helbestî got:

Heyva me da der û bi ser min de xilîya
Keçezalek bû ew ku ember jê difûrîya
Dilê min jî her xemgîn e û min pêş ve dide
Seata xatirxwestinê jî her min ber bi wê ve dide

Zubeyde mest bû bi vê helbesta wî, kulîmekên xwe hejandin bi çûnû-hatinê û awirin mîrkuj tê vedan. Herduyan jî bi hesreteke agirîn awirên hev dişopandin. Gava ku tîrekî wê li dilê wî ket, Eladîn got:

Heyv hilat li asîmanan çiqasî bi şewq e
Şev belav kir vê rûheyvê weleh heqq e
Pêşwaz dike ew bi rûyê xwe heyva çardan
Em rû bi rû ne wek du heyvan li ber çavan

Û gava ku Zubeyde ber bi wî ve hat û tenê du gav di navbera wan de man, Eladîn got:

Sê reşebisk bi ser eniyê de berdane
Şevên min çarin êdî gelo çi nîşan dane
Herdu jî li hev dinêrin bi hesreta dil
Lê belê herdu jî bêagah in ji kula dil

Gava Zubeyde nêzîkî Eladîn bû, Eladîn got: “Dûrî min bikeve ji bo ku tu nexweşiya xwe tûşî min neki!” Wê jî di cî de çeplên xwe tazî kirin û nîşanî wî da. Milên wê spî weke acê bûn. Pê re jî ji Eladîn re got: “A rast, tu ji min dûr keve, ji bo ku nexweşiya te tûşî min nebe!” Wî jî got: “Kê wisa ji te re gotiye?” Zubeyde got: “Pîrê ji min re got.” Eladîn got: “Pîrê ji min re jî got ku tu gurrî yî!” Û pê re jî milên xwe tazî kir, nîşanê we da. Milên Eladîn mîna zîv dibiriqîn li ber çavên wê. Di cî de herduyan xwe çem kirin hev, hevdû himbêz kirin, maç û ramûsan dane hev. Herî dawî jî Zubeyde li ser piştê xwe dirêj kir û Eladîn bi ser xwe de kişand.

Sibehê, Eladîn ji Zubeyde re got: “Ev çi kêfeke xweş bû ku wisa zû hat û zû qedîya, derbas bû!” Zubeyde lê vegerand û got: “Ev çi gotinin ji devê te derdikevin?” Wî got: “Xatûna min, tenê seetêke min bi te re maye!” Keçikê got: “Kî wisa dibêje?” Eladîn got: “Bavê te senedek li ser min nivîsandiye, ku vê sibehê ez te bernedim, divê ez deh hezar dînar bidim wî li şûna qelenê te. Heger ez qelen nedim û te bernedim jî, dê min bavêjin zindanê û aniha dev ji deh hezar dînar berde, ez nikarim diravekî zîv î bi tenê jî bidim!” Zubeyde got: “Mîrzayê min, ma vîna berdanê di destê te de ye an di destê wan de?” Got: “Di destê min de ye, lê belê dirhemekî min jî nîne.” Zubeyde got: “Ev mesele sivik e, tu qet mereqan neke. Ha ji te re vî sed dînarî bigire. Heger diravin bêhtir jî hebûna, minê hemû bidana te. Lê belê ji ber ku bavê min ji kurê xwe hez dike, çi tiştê li ba min hebû, bir mala wî, hetanî bi zêr û zîvên daweta min jî... Vêca heger sibe bavê min û qadî gazî te kirir û ji te xwestin ku tu min berdî, ji wan re bibêje, ev kîjan mezheb e ku dihêle mirov êvarê bizewice û sibehê jî jina xwe berde? Piştî destê qadî ramûse û xêrekê bide wî. Di heman demê de kîjan şahidê ku li wir bûne, destên wan jî ramûse û her yekî ji wan deh dînanan bide wan. Gava ji te re gotin tu çima wê bernadî û li gora şertê me hezar dînarî û bedlê cilan û qantirê nabî, ji wan re bibêje; “Ez her tayekî ji porê wê nadim bi hezar dînarî! Ez ne wê berdidim û ne ji pereyan di ber de digirim, ne gengaz e ku ez qebûl bikim.” Heger qadî ji te re got naxwe qelenê wê bide, tu jê re bibêje, ez niha tengav im û ji destê min nayê. Wê çaxê dê dilê qadî û şahidan bi te bişewite û wê moletê bidine te...

Şevqê lêda, bû sibe, Şehrezadê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 259'EMÎN

Şehrezadê berdewam kir:

Hîna ku ew wisa bi hev re dîaxivîn, qasidê qadî ber bi wan ve hat û li derî da. Eladîn derî jê re vekir, qasid got: “Mîrzayê te li bendî te ye. Diviyabû tu bihata cem qadî ji bo ku te jina xwe berda.” Eladîn, pênc dînar xistin destê wî û jê re got: “Di kîjan mezhebi de, mirov êvarê dizewice û sibehê jina xwe berdide?” Qasid got: “Di tu mezheban de nîne! Heger tu şerîatê nizanibî, ez dikarim bibim wekilê te, di vê mijarê de.” Û pê re çû dadgehê, cem qadî. Li wir, qadî jê re got: “Çima tu li gora şertnameya xwe tevnagerê û tu jinê bernadî?” Eladîn ber bi qadî ve çû, pêncî dînar xist destê wî û jê re got: “Ezbenî wisa nabe, gelo di kîjan mezhebî de mirov êvarê dizewicê û sibehê jî di bin darê zorê de jina xwe berdide?” Qadî got: “Bêyî daxwaza mirov, angû bi zorê, berdan çênabe. Ev yek, di tu mezhaban de tune ye.” Bavê keçikê got: “Heger tu wê bernede, wê çaxê kanî deh hezar dînar qelenê wê bide?” Eladîn got: “Sê rojan moletê bid min!” Qadî got: “Sê roj têrê nakin, bila deh rojan moletê bide!”

Li ser wê gotinê li hev kirin: Piştî deh rojan yan wê qelen bida, yan jî jina xwe berdaya. Eladîn li ser wê lihevhatinê jî cem qadî derket û berê xwe da mala jina xwe Zubeyde û çî qewimî bû hemû jê re vegot. Zubeyde got: “Çawa ku hekîmekî jî gotiye, bêhna xwe fireh bike dema ku bele bi serê te de hatin û xwînşêrîn be dema ku livkarên hêrkariyê li te werin hev. Lewre şevên zeman ducanî ne bi gelek tiştên erjeng; di her kêliyê de dibe ku ecêbekê biwelidînin!” Piştî rabû taştê amade kir û herdu bi hev re li ser sifrê rûniştin û li gora dilê xwe xwarin û vexwarin.

Di pey re Eladîn jî wê xwest ku jê re bistirê. Zubeydê rahişt û da xwe û newayek lê xist ku cemed pê re germ dibû û kevir pê re diheliya. Hîna ku ew herdu wisa di nava kêf û henek û mestkariyeke ahengi de bûn, deriyê wan lêda. Zubeyde jî Eladîn re got: “Ka rabe binêre bê kî li derî dide!” Eladîn rabû derî vekir, dît ku çar derwêş li ber derî ne. Got: “Hûn çî dixwazin?” Wan got: “Mîrzayê me, em derwêşin xerîb in ji vir û ruhê me pir bêriya guhdarkirina helbest û newayan kiriye. Em dixwazin îşev li mala te bêhna xwe vekin û sibe jî bi rêya xwe de herin. Bila ev xêra te jî ji bo Xwedê be. Kesekî ku helbest û kilam û stranên Endelûsî nizanibe, di nav me de nîn e. Em pir dildarê mûzîkê ne û jî guhdarkirina helbestan pir hez dikin.” Eladîn got: “Ka bisekinin ez herim bi malîyên xwe bişewirim, piştî ez ê bersivê bidime we!” Çû cem jina xwe, ew jî daxwaza wan agahdar kir, jinikê got: “Derî ji wan re veke û bi germahî wan pêşwazî bike û derbasî hundur bike.”

Piştî xwarin û vexwarin jî wan re anîn, xwarina xwe xwarin û gotin: “Mîrzayê me, gava ku zikra Xwedê di dil de be û alana newayên stranan jî di guhê mirov de be, xwarin jî nayê bîra mirov. Hekîmek dibêje; helbest jî bo civata ne, xwarin jî ji bo ajalan e. Vêca beriya em derbasî hundur bibin, dengêkî xweş jî cem we dihat, çawa em hatin hundur, ew deng jî hate birîn. Gelo ew a ku li ûdê dida cêriyeka spî bû, an yeke reşik bû, angû keçeke

ciwamêran bû?” Eladîn got: “Ewa ku lê dida jina min bû.” Piştîre çiroka xwe giş ji wan re got û li dawîyê ev lê zêde kir: “Xezûrê min deh hezar dînar qelênê keça xwe ji min dixwaze û tenê deh roj molet dane min.” Derwêşekî ji wan jê re got: “Xemgîn nebe û dilê xwe xweş bike. Ez şêxê tekiyekê me û çil heb derwêşên min hene. Ez ê deh hezar dînarê te ji wanan berhev bikim, tê ji qelenê xwe bidî xezûrê xwe. Lê belê ka ji jina xwe re bibêje bila newayekê ji me re lê bide û giyanên me şad bike. Lewre newa ji weke xwarinê ye ji bo hinek mîletan û ji bo hineke din weke derman e, ji bo hinekan ji mîna bawêşînkê ye.”

Rastiya van her çar derwêşan pir cuda bû. Lewre yek ji wan Xelîfe Harûn Reşîd bû, yê din Wezîrê wî Cafer ê Bermekî bû, yê sisîyan Ebû Newas ê helbestkar bû û yê çaran jî şûrkêş û celadê xelîfe bû. Sebeba ku ew gihandibûn hetanî wê malê jî, bi vî hawayî bû: Êvarkî bêhna xelîfe teng bûbû û ji wezîrê xwe re gotibû: “Kanî em xwe berra nav bajêr bidin û hebekî li kolanan bigerin, belkî bêhna min derkeve.” Piştî rabûbûn kîncên derwêşan li xwe kiribûn û xwe berdabûn nava bajêr û geriyabûn hetanî ku di ber wê malê re derbas bûbûn û dengê helbest û newayên Zubeydeyê hatibû wan. Û wan jî xwestibû rastiya wê yekê fêhm bikin û li derî dabûn, derbasî hundur bûbûn.

Vêca piştî wê daxwaza wan, Zubeydeyê dîsa li ûdê xist, helbest ji wan re xwendin, hemûçikan civat gerandin û kêfa xwe kirin hetanî şeveqê. Gava bû sibe, xelîfe sed dînar xist bin sicadeyê de û rabûn ser xwe derketin, bi reya xwe de çûn. Gava ku jinikê sicadê rakir, ew sed dînar dît û ji mêrê xwe re got: “Ez texmîn dikim ku wan derwêşan ev sed dînar xistin bin vê sicadeyê de û çûn, bêtir ku em bibînin.” Eladîn rahişt wan pereyan û çû sûkê bi wan goşt û birinc û hemû pêdiviyên xwe kirrin.

Şeva dîtirkê, dîsa mûm pixistin û...

Şeveqê lêda û li Şehrezadê bû sibe, wê jî dengê xwe birrî.

ŞEVA 260'EMÎN

Şehrezadê berdwam kir:

Piştî ku Eladîn mûm pêxistin, ji jina xwe re got: “Ew derwêşên me nehatin û deh hezar dînar jî neanîn, çawa ku soz ji me re dabûn. Wisa xwiya dike ku ew derwêşin pir feqir in. Lê belê hîna ku wî ew gotina xwe neqedandibû, dengê lêdana deriyê wan hat. Jina wî got: “Here derî ji wan re veke!” Eladîn çû derî vekir, ew jî derbasî hundur bûn. Eladîn ji wan re got: “Ka gelo we soza xwe pêkanî û we ew deh hezar dînar anî?” Wan jî got: “Weleh bi dest me neket, lê tu qet mereqan neke, Xwedê hez bike sibe em ê

vî karî çareser biki. De êdî ka ji jina xwe re bibêje bila ji me re bistirê û dilê me xweş bike. Lewre me pir bêriya newayên wê kiriye.” Eladîn ji jina xwe re got, wê jî rahişt ûda xwe û newayin dil şewat lê dan ku kevir li ber dihejiyan. Hemû di nava mestbûneke hestiyar de serav û binav bûn hetanî ku şeveqê lêda. Çawa ku bû sibe û rojê tîrêjên xwe avêtin, xelîfe sed dînar xist bin sicadeyê de; ji hevalên xwe re got “rabin em herin” û di derî re derketin çûn bi rêya xwe de.

Her wisa bi wî rengî hatin mala Eladîn, şevbuhêrka xwe gerandin û bi sibehê re çûn hetanî neh rojên wan qedîyan. Roja dehan nehatin. Sebeba wê ji ew bû ku xelîfe şandibû dûv tacirekî mezin û jê re gotibû pêncî bar ji qumaşê ku ji Misrê tê ji min re bîne ku her barek bi heşt hezar dînar be û buhaya her barî jî li ser deyne. Koleyekî Hebeşî jî ji min re bîne. Tacir jî çûbû ew hemû anibû ber destê wî. Xelîfe jî test û misînekî zêr û diyariyek û her pêncî barên qumaş dan ew koleye Hebeşî û nameyek jî li ser navê Şahê Taciran Şemsedîn nivîsand, da wî û jê re got: “Here van gişan bibe filan taxê û li filan malê bipirse, bêje kanî mîrzayê min Eladîn Ebû Şamat? Dê xelk wî nîşanî te bidin, tu jî van tevan bigihîne wî.” Koleyê Hebeşî rahişt name û diyariyê û barên qumaşan dan pey xwe û ber bi Eladîn ve çû.

Îcar em vegerin ser kurapê Zubeydeyê. Kurapê wê çû cem bavê wê û jê re got: “Ka were em herin cem Eladîn ji bo ku dotmama min berde!” Apê wî rabû ser xwe, herdu bi hev re çûn cem Eladîn. Gava gihan wîr, ditin pêncî barên li qantiran barkirî di devê deriyê wî de ne û koleyekî reşik jî li ser qantira xwe, li ber wan sekiniye. Jê re gotin: “Ev barên ticaretê yên kê ne?” Kolê got: “Ên Mîrzayê min Eladîn Ebû Şamat in. Bavê wî berê jî jê re kerwanekî ticaretê amade kiribû û pê re şandibû Bexdê, lê ereboşkan pêşiya wî birribûn û malên wî talan kiribûn. Vê gava ew agah giha bavê wî, ez bi vî kerwanî re şandim bo şûna yê din bigire ku ev pêncî bar, bi giranbuhaya pêncî hezar dînar e. Disa buxçikeke ku bi tûrekî zêr nayê û kurkekî semûr û test û misînekî zêrîn bo wî şandiye.” Bavê keçikê jê re got: “Ev ciwamêrê ku tu behsa wî dikî, zavayê min e, ka bide dûv min, ez te bibim gel wî!”

Eladîn ji hîna ku wisa li malê rûniştî bû di nav kul û xemên xwe de, bala xwe dayê ku hinek li deriyê wî dixin. Gazî jina xwe kir û jê re got: “Zubeydecan, wisa xwiya dike ku bavê te qasidê xwe şandiye bi emrê qadî, an jî bi emrê walî.” Jina wî got: “Ka rabe û binêre bê çi dixwaze!” Eladîn rabû derî vekir; dît ê li ber derî xezûrê wî bavê Zubeydeyê û li peş wî jî koleyekî reşik î xwînşêrîn li ser piştê qantirekê ye. Çawa ku kole ew dît, ji qantirê daket û çû destê Eladîn ramûsa. Eladîn jê re got: “Tu çi dixwazî?” Koleyê reşik got: “Ez bendeyê mîrzayê xwe Eladîn Ebû Şamat im; kurê Şemsedîn ê şahê bendera tacirên Misrê. Bavê wî ev emanet dane min li gel vê nameyê û ji min xwestiye ku ez bigihînim wî.” Eladîn name ji destê wî girt û xwend; dît ku ev rist tê de nivîsandîne:

Ey nameya dilarîn wî ramûse çawa te dît
Axa bin nigan maçî bike te çawa ew dît
Hêdî here û qet melezîne da ku tu şaş nekî
Lewrê ew e ruh û canê min guh nede tu malekî

Û di berdewamiya nameyê de jî dibêje: “Piştî silav û rêzên germ ji min, ji bavê te Şemsedîn; Ez dixwazim ji kurê xwe Eladîn Ebû Şamat re bibêjim ku agaha şêlandina te ji aliyê Erebên rêbir ve gîha min û ez pê hesiyam ku zîlam û xizmetkarên te ji hatine kuştin, loma ez niha vî pêncî barên ji qumaşê Misrî ji te re dişînim, li gel bedlek kinc, kurkekî semûr û teşt û misînekî zerin, tu qîmetê mal û mulkê dinîye tune ye kurê min, lewre qet xemgîn nebe û xwe aciz neke. Diya te û hemû xelkên di mal de başin û rexşa wan ne xerab e. Hemû silavên xwe ji te re dişînin. Tu jî agahiyekê di derbarê xwe de ji me re bişîne, lewre me bihîstiye ku tu bi Zubeyde Elûdiye re zewiciye û bavê wê qelenekî bi qasî pêncî hezar dînarî li ser te nivîsandî ye. Lê mereq neke, vaye ez malekî giran bi bendeye te Selîm re dişînim, êdî wê kare te sererast bibe.”

Piştî ku Eladîn name xwend, mal û mulk û diyariyên ku bavê wî jê re şandibûn, teslîm girtin. Piştî li xezûrê xwe zivirî û jê re got: “A ji te re pêncî hezar dînar, bila qelenê keça te be. Vî kerwanê ticaretê jî bibe bifroşe û bila fêdeya wî jî ji te re be, tenê sermayeya wî li min veqêrîne, bes e!” Xezûrê wî got: “Ez tiştêkî naxwazim. Meseleya qelen jî, tu û jina xwe li ser li hev bikin bes e!”

Eladîn û xezûrê xwe, rabûn barên qantiran danîn, hemû bi cî kirin, piştî çûn derbasî cem Zubeydeyê bûn. Zubeyde ji bavê xwe re got: “Bavocan, evqase mal hemû yê kê ye?” Bavê wê got: “Ê mîrê te Eladîn e. Bavê wî ji Misrê jê re şandiye, li şûna kerwanê wî yê di rê de hatin talankirin li ser destê Ereban. Ne tenê ew barên qumaşan, pêncî hezar dînar, buxçîkek, kurkekî semûr, hespek û teşt û misînekî zêrin jî jê re şandiye. Vêca di mijara qelend de tu çawa dixwazî wisa bike bi mîrê xwe re.” Di wê navberê de Eladîn rabû ser xwe, sindoqa diravan vekir û pêncî hezar da jina xwe.

Pismamê jinikê jî xwe pê de da û ji mamê xwe re got: “Apocan bila Eladîn jina min berde!” Apê wî got: “Ev tiştaya qet nema dibe, lewre vîna vê biriyarê êdî di destê wî de ye.” Kurik pê xemgîn bû bi wê bersiva mamê xwe û kolîpoşman ji hundir derket, çû malê û xwe li erdê dirêj kir û di nava wan birinên ku nedihatîn dermankirin de bi ser hev de hat guvaştin. Ew êşa wî lê bû nexweşiyeke bêderman û di demeke kurt de canê xwe ji dest da.

Eladîn jî pergaleke nê da mala xwe. Çû sûkê hemû pêdiviyên malê tedarik kirin, ji xwarin û vexwarinê û ji Zubeyde re got: “Te dît bê ew derwêşên me çiqasî derewîn derketin! Qaşo soz dabûne me!” Zubeyde

got: “Tu kurê şahê tacirên Misrê bû, te nikarîbû metelîkek peyde bikiraya, êdî wê çawa wan hejaran pêncî hezar dînar peyda bikirana!” Eladîn got: “Yezdan bereketa xwe bi ser me de şand û em zengîn kirin, êdî ji îro û pê de heger werin jî ez nema derî ji wan re vedikim.” Zubeyde li himber vê fikra wî derket û got: “Bi hatina wan re ev xêr bi ser me de bariyan, jixwe her şev jî sed dînar dixistin bin guhkê sicadeyê û diçûn. Heger werin jî, misoger divê tu derî li wan vekî!”

Gava roj çû ava û dîsa şev bi ser wan de hat, Eladîn mûm pêxistin û ji jina xwe re got: “Zubeyde, ka tu jî ji me re li ûdê bide û bistirê!” Lê hîna ku dest pê nekiribû, deng ji deriyê wan hat, hinakan lê dida. Zubeyde got: “Rabe binêre bê kî li ber derî ye!” Eladîn çû derî vekir, dît ku ew her çar derwêşin. Ji wan re got: “Silav li ser derewkaran! Hela werin hundur, werin hundur!” Derbasî hundur bûn û mîna har car li cihê xwe rûniştin. Sifre li ber wan raxistin, wan jî têra xwe xwarin û vexwarin, kêfa xwe kirin. Piştî re Eladîn got: “Dilê me li ser te ye mîrzayê me, ka rewşa te çawa bû gelo; te û xezûrê xwe we çî bi serê hev kir li ser wê mijara qelen?” Eladîn got: “Xwedê ji pêdiviya me bêtir ji me re şand.” Derwêşan got: “Bi Xwedê em ji bo te ditirsîn!”

Şeveqê lêda û li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 261'EMÎN

Şehrezadê berdewam kir:

Gava derwêşan gotin “Bi Xwedê em ji bo te ditirsîn, lewre destê me kin derket û me xwe negihand diravan” Eladîn got: “Xwedê fereca xêrê li me vekir. Bavê min pêncî hezar dînar û pêncî bar qumaşê barkirî ku buhaya her barekî hezar dînar e, ji min re şand. Ne ew tenê jî, bedlek, kurkekî semûr, hespek û teşt û misînekî zêr jî ji min re şandiye. Ez û xezûrê xwe jî li hev hatin. Jina min jî êdî helala min e û welhamdû lîllah!”

Di wê navberê de xelîfe rabû çû ji bo destavê. Cafer jî ev fersend ji xwe re bi kar anî û xwe bi ser Eladîn de tewand û jê re got: “Hinekî biedep tevbigere lewre tu di huzura Emîrê Bawermendan Harûn Reşîd de ye!” Eladîn got: “Mi çî bêdebeî kiriye di huzura Emîrê Bawermendan de û kî ji we Emîrê Bawermendan e?” Cafer got: “Ê ku qasek berê bi te re diaxivî Emîrê Bawermendan bû, ez jî wezîrê wî Cafer im, evê han jî celadî wî Mesrûr e û evê mayî jî helbestkarê wî Ebû Newas e. Vêca Eladîn, ka bifikire û ji min re bibêje bê meşa ji Misrê hetanî Bexdê çend rojan dikşîne?” Eladîn got: “Çil û pênc rojan.” Cafer got: “Kerwanê te beriya deh rojan hate talankirin veca çawa bavê te di nava deh rojan de hem agahî girt, hem kerwanekî din li şûna wî ji te re şand û hem jî ev kerwan di demekî wisa kurt de gîha vir?”

Eladîn got: “Begê min naxwe evqase mal ji ku hat ji min re?” Cafer got: “Xelîfe ev mal ji te re şand, ji ber ku ji te hez dike.”

Hîna ev wisa diaxivîn, xelîfe ji destavê vegeŕiya. Eladîn pê ve rabû, erda bin nigê wî ramûsa û got: “Xwedê te bisitirîne û emrê te dirêj bike Emîrê Bawermendan, Xwedê xêr û qenciya te ji ser serê me kê m neke yarebî!” Xelîfe got: “Eladîn ka bila Zubeyde ji me re li ûdê bide û stranekê bibêje, di xatirê vê lihevhatina ve de!”

Zubeyde rahişt ûda xwe û newayin nû lêdan ku kevir dihelandin. Hemûçikan lê guhdar kirin bi dilmestî hetanî sibehê. Gava bû sibeh, xelîfe ji Eladîn re got: “Bi roj were dîwana min!” Eladîn got: “Bilabe xelîfeyê min, bi xêr û silamet ez ê werim.”

Piştî Eladîn deh lalîk anîn, yadîgariyek xiste wan û ew bi xwe birin, derket huzura Emîrê Bawermendan ku di wê kêliyê de li ser textê desthilatdariyê rûniştî bû. Eladîn bi van risteyan silav da xelîfe û got:

Roja te baş be rojbaş be her dem û roj
Bila biteqe zikê wan zikreşan şev û roj
Rojên li gel te her wê şadî û bextewarî bin
Rojê dujminêd te ji her wê reşî û rûreşî bin

Xelîfe lê vegeŕand û got: “Tu bi xêr hatî Eladîn!” Eladîn got: “Ey Emîrê Bewermendan, pêxemberê me jî dîyarî digirtin, va ev jî deh lalîk in û dayariyeke min di nav de ye ji bo te.” Xelîfe diyariya wî qebûl kir; wî jî ew xelat kir û fermanek da. Ew kir Şahê Taciran û ew di dîwana xwe de da rûniştandin. Di wê navberê de bavê Zubeydayê jî derbasî hundur bû. Gava Eladîn di dîwanê de dît, ji xelîfe re got: “Ey şahê dem û dewranan, ev kes çima di cihê min de rûniştîye û ebaya min li ser mile wî ye?” Xelîfe got: “Min ew kir şahê Bendera Taciran li şûna te û min tu ji peywîrê girt.” Xezûrê Eladîn got: “Ew jî ji me ye, tiştê nabe. Xwedê xêra te binîvisîne û destê te ji ser serê me kê m neke. Gelek kesên biçûk mezin bûne, Xwedê vê peywîrdarkirina te bi xêr bike!”

Piştî xelîfe fermanek ji bo Eladîn nivîsand û da walî. Walî da bangeşkar, bangeşkar jî rabû û di dîwanê de qîrîya û got: “Sertacirê me û Şahê Bendera Taciran Eladîn Ebû Şamat e. Tenê wê gotina wî were guhdarkirin bi rêzgirtin û bînîqaş.”

Piştî ku dîwan belav bû, walî telal derxist derve û ferman dayê ku vê biryara nû bi herkesi bide bihîstin. Ew jî sikak bi sikak gerîya û qîrîya, got: “Şahê Taciran Mirzayê min Eladîn Ebû Şamat e, Şahê Taciran Mirzayê min Eladîn Ebû Şamat e...”

Şeveqê lêda, bû sibe. Şehrezadê jî bêdeng bû.

ŞEVA 262'YEMÎN

Şehrezadê berdewam kir:

Çawa bû sibe, Eladîn dikanek ji koleyê xwe Selîm re vekir û tê de da rûniştandin da ku kirrîn û firotina malê wî bike. Ew bi xwe jî her roj mîna adeta xwe, diçû dîwana xelîfe û li cihê xwe rûdinişt.

Rojekê gava ku dîsa wisa li dîwanê rûniştî bû di cihê xwe de, dît ku yek ji xelîfe re dibêje: “Emîrê Bawermendan, bila serê te sax be, Serokê Sitîn îro çû ser dîlovaniya Xwedê!”

Xelîfe fermanek derxist û Eladîn Ebû Şamat li şûna wî kir Serokê Sitîn. Vêca ji ber ku serokê mirî kurdûnde bû, hemû mal û mulkên wî jî bi Eladîn ma. Xelîfe ji Eladîn re got: “Wî bide veşartin û hemû tiştê ku li dû wî maye, ji xwe re bibe. Hemû dikan û mal û kole cêrî û xizmetkarên wî jî ji xwe re bibe.” Piştî jî xelîfe destmalka xwe hejand, dîwana wî belav bû.

Eladîn ji dîwanê derket û serleşker Ehmed El-denef li gel çil zilamên xwe li kêleka wî ya rastê bûn; serleşker Hesên Şoman jî li gel çil zilamê xwe li kêleka wî ya çepê bûn. Eladîn li Hesên Şoman zîvirî û jê re got: “Tu biba navbeykar û te ji serleşker Ehmede El-denef re bigota belkî ez weke kurê xwe bipejirandama bi emre Xwedê. Hesên ew daxwaza wî ji Ehmed re got, wî jî qebûl kir û ji Eladîn re got: “Ji îro û pê de, her roj ez û zilamên xwe, emê li pêşîya te bimeşin û te binîn dîwana xelîfe.”

Bi wî hawî Eladîn her roj çû û hat dîwanê û di xizmeta xelîfe de xebitî. Rojekê Eladîn ji dîwanê rabû û berê xwe da mala xwe. Ehmed El-denef û zilamên xwe jî piştî ku ew gihand mala wî, çûn malên xwe. Eladîn li rex jîna xwe rûnişt, mûm pêxistin. Piştî demekê, Zubeyde rabû, çû destavê. Çend kêlî bi şûn de, qîrîneke ecêb hate Eladîn. Ew jî bi lez rabû ser xwe û derket da ku binêre bê çi qewimîye. Çawa derket, dît ku jîna wî li erdê dirêjkirî ye. Dêstê xwe danî ser sînga wê, dît ku miriye.

Ji ber ku mala bavê wê jî, li rex mala wan bû, ew jî bi wî dengî hesiyabû û di cî de ji malê derketibû, ber bi wan ve hatibû. Çawa ku li Eladîn rast hat, jê re got: “Çi heye, çi qewimîye mîrzanê min?” Eladîn got: “Bila serê te sax be bavocan, keça te Zubeyde wefat kiriye! Xêra baş jî ew e ku mirov mirîye xwe zû veşêre!” Çawa bû sibe, meytê wê veşartin û herduyan sersaxî ji hev re xwestin.

Piştî wefata jîna wî, Eladîn xwe reş girêda, şîna wê kişand û nema çû dîwana xelîfe. Lewre êdî ew şev û roj digiriya, bêçare di nava êş û azareke bêtîmtêl de vedigevizî.

Xelîfe ji Cafer re got: “Çima Eladîn nayê dîwanê?” Cafer got: “Emîrê

Bawermendan, dilê wî şikeştiye û nava wî tijî xwîn bûye li ser jina wî. Şîna wê dikşîne û di nava xemgîniyê de ye.” Xelîfe got: “Peywira me ye ku em herin serdana wî.” Wezîrê wî Cafer got; “Ser seran, ser çavan Emîrê Bawermendan!” Cafer amadekarî kirin, ew û xelîfe û çend heb xizmetkar siwar bûn û çûn mala Eladîn.

Eladîn, li hundur rûniştî bû gava dît ku xelîfe û wezîrê xwe tèn serdana wî. Bi wan ve rabû, erda bin nigên wan maçî kir û bi germahî ew pêşwazî kirin. Xelîfe jê re got: “Bila serê te sax be, Xwedê şûna wê vala nehêle!” Eladîn got: “Xwedê ji we razî be û temenekî dirêj bide we!” Xelîfe got: “Eladîn tu çima nayê dîwanê?” Eladîn got: “Ji ber xemgîniya min a li ser jina min Zubeyde, Emîrê Bawermendan” Xelîfe got: “Dilê xwe qewîn bike û tu fêdeya xemgîniyê tune. Jixwe ew jî çûye ser dilovaniya Xwedê.” Eladîn got: “Emîrê Bawermendan, heger ez jî bimrim û min li kêleka wê veşêrin, wê çaxê ez ê ji xemgîniyê xelas bibim.” Xelîfe jê re got: “Helbet wê Xwedê li te were rehmê û şûna wê dagire. Tu çare ji mirinê re tune, ne mal û mulk, ne jî tiştekî din jê re nabe çare.”

Piştî sersaxiyê, xelîfe şîret lê kir û jê xwest ku were dîwanê û ji wir qut nebe. Di pey re jî ji mala wî derket û vegehiya qesra xwe. Roja dîtirkê, Eladîn li hespa xwe siwar bû û çû dîwana xelîfe. Derbasî cem wî bû û erda bin linge wî maçî kir. Xelîfe, bi germahî xêrhatina wî kir û ew li kêleka xwe da rûniştandin, jê re got: “Eladîn, îşev tu mêvanî min î!”

Êvarkî ew derbasî qonaxa xwe kir û gazî cêrîke xwe kir ku navê wê Yaqûta Dilan bû û jê re got: “Jineke Eladîn hebû ku jê re digotin Zubeyde El-ûdiye, pir sebra wî tanî û kul di dilê wî de nedihîştin. Lê mixabin ew jina wî ya delal çû ser dilovaniya Xwedê. Loma ez ji te dixwazim ku tu valahiya jina wî dagire û tu newayin xweş jê re bibêje, da ku ji wan kul û derdên xwe xelas bibe û bi ser xwe ve bê.”

Şeveqê lê da, Şehrezadê jî vegotina çîroka xwe sekinand û bêdeng bû.

ŞEVA 263'YEMÎN

Şehrezadê vegotina çîroka xwe berdewam kir:

Gava ku Xelîfe ew daxwaz jê kir, Yaqûta Dilan got: “Ser serê min, ser çawên min!” û di cî de rabû ser xwe, rahişt ûda xwe, têlên wê akord kirin û ahengek lêda bi newayeke balkêş û pê re stra bi dengekî mexmelî yî cankêş ku kes ji ber bandora wê xelas nedibû. Xelîfe li Eladîn zîvirî û jê re got: “Eladîn! Ka tu dengê vê cêrîyê çawa dibînî?” Eladîn got: “Dengê wê bi qasî yê Zubeyde nayê, lê belê hostayeke ûdê û xwedîya hunereke spehî ye ku kevir li ber dihejin!” Xelîfe berdewam kir û got: “Te ew jî ecîband an na?”

Eladîn got: “Min ew eciband Emîrê Bawermendan!” Xelîfe got: “Bi serê xwe û bi tirba kalkên xwe sûnd dixwim ku dê ev cêrî dê diyariya min be ji te re. Ne tenê ew, ew û hemû cêrîyên di xizmeta wê de jî diyariya min in, bo te.”

Eladîn got belkî xelîfe henekan lê dike. Lê roja dîtirkê, çawa ku bû sibê, xelîfe gazî cêriya xwe Yaqûta Dilan kir û jê re got: “Min tu diyarî Eladîn kiriye!” Cêrî pir kêfxweş bû, lewre ji dîtina ewil ve jê hez kiribû. Piştî xelîfe ji seraya xwe derket û çû dîwana xwe. Li wir gazî hemalan (barkêşan) kir û ji wan re got: “Kel û pelên Yaqûta Dilan û cêrîyên wê bibin mala Eladîn. Piştî wê û cêrîyên wê jî bibin.”

Barkêşan, Yaqûta Dilan û cêrîyên wê, li gel hemû kel û pelên wan birin mala Eladîn û di qesra wî de bi cih kirin. Xelîfe jî hetanî êvarê dîwana xwe bi rêve bir û êvarê dîwan belav kir.

Îca em vegeirîn ser rewşa Yaqûta Dilan. Ew jî çawa nêr kir ku li gel çil cêrî û gelek xizmetkaran derkeve raber Eladîn, ji du heb xizmetkarên xwe re got: “Yek ji we li ser kursiyekî li çepê rûnin, yê din jî li ser kursiyekî li hêla rastê rûnin. Gava ku Eladîn hat, hûn jî destên wî ramûsin û jê re bibêjin “Xatûna me Yaqûta Dilan te vedixwîni qesrê, lewre xelîfe ew diyarî te kiriye, tevî cêrî û xizmetkarên wê.”

Herduyan gotin: “Bila be xatûncan, emê wisa bikin!” Û çawa ku ji wan re hatibû gotin, tevgeriyan. Îcar gava Eladîn hat, dît ku du xizmetkarên xelîfe li ber derî rûniştî ne. Pir şaşxaz bû û ji xwe re got “Ez baş dizanim ku ev der mala min e, veka çi qiwimiye gelo?” Tam di wê kêliyê de, herdu xulam rabûn ser xwe, pê ve beziyan, destên wî maçî kirin û gotin: “Em xizmetkarên xelîfe û koleyên Yaquta Dilan in. Xatûna me silavan li te dike û ji te re dibêje ku xelîfe ew diyarî te kiriye li gel hemû xizmetkar û xulamên wê û dixwaze ku tu derbasî qesra xelîfe bibî û wê bibîni.” Eladîn ji wan re got: “Jê re bêjin ku ez silavên wê li ser serê xwe digirim, lê belê heta ku ew di qesra xelîfe de be, ez nayê cem wê, lewre tiştê ku yê xwedan be, çênabe ku bende nêzîkî wî bibe. Dîsa jê re bibêjin gelo mesrafa wê ya rojane ya li cem xelîfe çiqase ye?”

Herdu xulam vegeirîyan cem Yaquta Dilan û tiştên ku Eladîn ji wan re gotibû, ji wê re vegotin. Yaqûta Dilan ji wan re got: “Mesrefa min a rojane sed dînar e.” Herdu dîsa vegeirîyan cem Eladîn û peyama wê jê re gotin. Eladîn di dilê xwe de got: “Tu pêdiviya min pê tune ye ku Yaqûta Dilan bide min ji bo ku ez rojê sed dînarî li ser xerc bikim. Lê dîsa jî ez mecbur im qebûl bikim û diyariya wî red nekim!”

Yaqûtû Dilan hat mala Eladîn û êdî wî jî her roj sed dînar ji bo wê xerc dikir, daxwazên wê pêk tanîn. Çend rojekî wisa berdewan kir, hetanî

ku Eladîn dîsa ji dîwana xelîfe qut bu û nema çû wîr. Xelîfe Harûn Reşîd ji wezîrê xwe Cafer re got: “Tenê ji bo ku Eladîn nema li ser jina xwe bifikire û xemgîn nebe, min Yaqûta Dilan diyarî wî kir, îca çima ji dîwana min qut bûye?” Cafer got: “Emîrê Bawermendan, tê gotin ku kesê dildarê xwe dibîne, dostê xwe ji bîr dike!” Xelîfe got: “Lê ez dibêjim ku divê mazereteke wî hebe, naxwe wê bihata dîwanê. Lê ez dibêim em ê herin serdana wî!”

Îcar çend rojekî berî wê jî Eladîn ji wezîr re gotibû: “Min ji ber êşa xwe ya li ser Zubejde gili û gazin, kul û derdên xwe ji xelîfe re gotin, wî jî Yaqûta Dilan diyarî min kir!” Wezîr jî jê re gotibû: “Heger pir ji te hez nekira, cêriya xwe diyarî te nedikir. Gelo tu pê re raket?” Eladîn jî gotibû “Na, destê min jî pê nebûye.” Wezîr gotibû: “Çima?” Wî jî gotibû: “Ey wezîr, tiştê ku yê xwedan be, ji koleyan re nabe!”

Xelîfe û Cafer kincên xwe guhertin, xwe veşartin û berê xwe dan mala Eladîn. Gava gîhan wir, Eladîn ew nas kirin. Bi wan ve rabû û destê xelîfe maçî kir. Xelîfe bala xwe dayê ku Eladîn rûxemgîn û dilbiêş e. Jê re got: “Ey Eladîn, sebeba vê xemgîniya te çi ye? Qey tu bi Yaqûta Dilan re ranakeve?” Eladîn got: “Emîrê Bawermendan, tiştê ku malê mîrzayan be, ji xulaman re nabe. Loma ez hetanî niha qet raneketime bi Yaqûta Dilan re û destê min jî pê nebûye. Te ez jê xelas bikirama dê baş bûya.” Xelîfe got: “Ser seran, ser çavan!”

Xelîfe derbasî cem Yaqûta Dilan bû...

Şeveqê lêda û li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 264'EMÎN

Şehrezadê vegotina xwe berdewam kir û got:

Îcar çawa ku şeva berê jî me got, xelîfe derbas bû cem Yaqûta Dilan û jê re got: “Eladîn bi te re raneket?” Yaqûta Dilan got: “Na wele bi min re raneketiye Emîrê Bawermendan. Heta min şand dîv wî jî ji bo were nav nivîna min, lê wîna qebûl nekîr.”

Piştî ku ew gotin ji wê bihîstin, xelîfe ji Yaqûta Dilan re got were qesra min. Ji Eladîn re jî got: “Êdî tu jî ji dîwana me qut nebe!” Û bi şûn de vegeriya qesra xwe. Eladîn jî wê şevê raket û roja dîtirkê çawa bû sibe, li hespa xwe siwar bû û çû li kêleka Serdarê Sitîn rûnişt. Xelîfe ferman da xeznedarê xwe ku deh hezar dînar bide Cafer ê wezîr. Xaznedar rabû ew dirav dan Cafer. Xelîfe ji Cafer re got: “Rabe Eladîn bi xwe re bibe sûka cêriyan û jê re cêriyekê li gorî dilê wî bikire bi wî deh hezar dînarî.” Cafer rabû ser xwe, Eladîn bi xwe re bir û çû sûka cêriyan.

Veca wê rojê lihevrashtatinek çê bû ku di heman demê de waliyê xelîfe Emîr Xalid jî daketibû sûka cêrîyan ji bo ku cêrîyekê ji kurê xwe Hebzelm Bezaza re bikire. Ev kurê wî jî, xortekî nexweşik, gemaî, bêhngenî û bêmirês bû; tukes pê qayîl nedibû. Loma diya wî Xatûn xan ji walî xwestibû ku here jê re cêrîyekê bikire. Îcar Emîr Xalîd û Cafer di heman rojê de daketibûn heman sûkê, lê hayê wan ji hev tunebû.

Piştî ku Cafer û Eladîn gîhan sûkê bi demeke kurt, çavên wan li cêrîyêke pir xweşik ket. Cafer ji Dellal re got: “Vê cêrîyê têxe bazarê, ez hezar dînarî tê de didim!” Dellal, keçik di nava kirîdaran de gerand. Dema ku gîha hinda walî û kurê wî Hebzelm Bezaza, kurik ji bavê xwe re got: “Bavocan vê cêrîyê ji min re bikire!” Û bi dilbijokiyeke sotîner lê meyzand ku axî bi dilê wî dixist! Bavê wî gazî Dellal kir, jê pirsî bê ka navê wê çi ye. Dellal got: “Navê wê Yasmin e!” Got: “Buhaya wê ya niha çi ye?” Got: “Hezar dînar e.” Bavê Hebzelm Bezaza got: “Ez hezarî te didim!” Lê Eladîn lê zêde kir û got: “Ez du hezar dînar tê didim!” Ew lihevzêdekirina wan wisa berdewam kir; her ku walî dînarek zêde dikir, Eladîn hezar dînar li wî zêde dikir. Herî dawî walî pir hêrs bû û ji Dellal re got: “Kî ye evê ku li min zêde dike?” Dellal got: “Cafer ê wezîr, zêde dike û dixwaze wê cêrîyê ji Eladîn Ebû Şamat re bikire.”

Eladîn buhaya cêrîyê zêde kir hetanê ku gîha deh hezar dînarî û kesî nema lê zêde kir. Bi wî hawî cêrî bû ya wî. Deh hezar dînar da xwedîye wê û cêrî bi xwe re bir cem qadî. Destpêkê jê re got: “Bi emrê Xwedê û nêta baş ez te azad dikim, êdî tu jineke azad î!” Piştî jî mehra wê li xwe birrî û ew bir malê. Dellal jî heqê xwe girt û bi şûnde çû. Lê walî gazî wî kir û jê re got: “Ka cêrî çû ku?” Dellal got: “Eladîn ew kirrî bi deh hezar dînar û piştî ku ew azad kir, pê re zewicî.”

Piştî ku Hebzelm ew agahî girt, dilê wî şikest, bêhna wî teng bû, hînavên wî wêran bûn. Ewqasî ji wê cêrîyê hez kiribû ku çûna wê ew veguherandibû kavilekî wêrankirî. Gava diya wî ew di wî halî de dît, jê re got: “Xwedê ya bi xêr bike kurê min, çi qewimiye?” Hebzelm got: “Ji min re Yasemînê bikire dayêcan!” Diya wî got: “Gava gulfiroş di vir re derbas bibin, ez ê qefleke yasemîn ji te re bikirim. Kurê wê got: “Ez ne behsa wê yasemîna ku tê bêhnkirin dikim dayêcan, ez behsa cêrîyekê bi navê Yasemîn dikim ku bavê min ew ji min re nekirî.” Diya wî Xatûn xan got: “Çima ji te re ew cêrî nekirî?” Kurê wê got: “A ku ji mîrza re bibe, ji xulam re nabe, dayêcan û hêza min jî nagihêye ku ez wê bikirim; lewre yê ew kirîye Eladînê serkêşê Sittin e!”

Kurik ji kerban re nema ne xwarin xwar, ne jî av vexwar. Her ku çû bedena wî lawaztir bû, nexweş ket û xewa şevan lê herimî.

Diya wî jî dilteng û xemgîn bû li ser kurê xwe. Nizanîbû wê çi bike,

çawa bike ji bo ku wî ji wê rewşê derxîne. Hîna ku ew wisa di nava wê bê-çaretiya xwe de diponijî, pîrejinek derbasî cem wê bû ku jê re digotin Dîya Ehmed Qumqum ê diz. Kurê wê Ehmed Qumqum dizekî ewqasî jêhatîbû ku kil ji ji çavan didizîn. Hîna ji ciwaniya xwe ve wisa bû. Piştî gava ku ew kirin serkirdeyê derekan (asayîş) ew adetên xwe berdeyam kirin û dirav dizîn. Lê walî bi ser de girt, ew derdest kir û bir huzûra xelîfe. Xelîfe cezayê kuştinê dayê. Lê wezîr li ber geriya û qedrê wezîr jî li ba wî hebû, xelîfe got: “Tu çima dixwazî ez nexweşîyek ku dê zêrê bide xelkê efû bikim, ji bo xatirê te?” Wezîr got: “Emîrî Bawermendan, kesê ku zindan afirandiye, hekimêkî pir biaqil e. Lewre zindan gora zindîyan e û pêkenoka dujminan e.” Piştî vê gotina wezîr, xelîfe cezayê kuştinê ji ser Ehmed Qumqum rakir û ferman da ku qeydekî bixin nigên wî û li ser qeydê binivîsinin “Kes vê qeydê venake hatanî ku nimêja mîriyan li ser xwediyê wê bibe di camîyê de.” Qeydeke wisa xistin nigên wî û Ehmed avêtin zindanê. Diya wî jî ji wê rojê ve, her car diçû cem walî Emîr Xalid û destûr jê dixwest ji bo ku kurê xwe yê zindanî bibîne. Gava diçû ew didît jî, jê re digot: “Ma min ji te re negot malê hêram nexwe û tobe bike!” Wî jî digot: “Ev qedera min bû dayêcan, lê belê gava tu derbasî mala walî bû û te jina wî dît, jê bixwaze bila efûya min ji mêrê xwe bixwaze.”

Vêca gava dîya Ehmed çû mala walî û serdana jina wî kir, dît ku jina walî pir xemgîn û biêş e. Jê pirsî got: “Tu çima wisa xemgîn e?” Jina walî got: “Ji ber rewşa kurê xwe Hebzelm Bezaza.” Diya Ehmed got: “Xêr e inşallah, çi bi serê wî de hatiye?” Jina walî çîroka xwe jê re got. Pîra diya Ehmed got: “Heger tu qencîyeke bi yekî di tengasîyê de bikî, dê kurê te jî ji wê tengasîya xwe rizgar bibe.” Wê got: “Çawa?” Dîya Ehmed got: “Kurekî min bi navê Ehmed Qumqum heye ku dizî kiriye û niha di zindanê de ye, li ser qeyda wî ‘heta heta’ nivîsandine. Vêca tu jî xwe bişo, kincên xweşik li xwe bike û bêhneke xweş bi ser xwe dake û gava mêrê te vegeriya, bi rûkenîyeke xweş wî pêşwazî bike. Weke hemû zilaman, êvarkî bi şev, ew jî dê dawa wê yekê li te bike, lê tu iznê nedê û jê re bibêje ‘Çima gava ku zilam daxwazekê ji jinên xwe dîkin, misoger bi dest dixin, lê ku daxwaza jinê dikeve cem mêrê wê, pêk nayê.’ Ew jî dê ji te re bibêje ‘Ka bibêje bê çi daxwaza te ji min heye?’ Tu jî bibêje ‘Hetanî ku tu sûnd nexwî, ez nabêjim.’ Heger bi serê xwe, an navê Xwedê sûnd xwar jî, tu bibêje ‘Hetanî ku tu bi sê telaqên bêfitû sûnd nexwî ku tê daxwaza min pêk bîni, ez daxwaza xwe ji te re nabêjim.’ Vêca gava ku ser her sê teleqan sûnd xwar, tu jê re bibêjî ‘Li cem te, di zindanê de serkirdeyekî derekan heye ku navê wî Ehmed Qumqum e. Diyeke wî ya feqîr, hejar û bitenê heye; li ber min geriya ji bo ez ji te re bêjim û ji te dixwaze ku tu li ber xelîfe bigere ji bo ku wî efû bike û ew jî tobe bike bibe mirovekî salih da ku xêra wî ji te re were nivîsandin.”

Jina walî ji pîrê re got: Ser seran, ser çawan; ez ê daxwaza te pêk

bînim...

Şeveqê lê da li Şehrezadê bû sibe, wê jî dengê xwe birri bêdeng bû.

ŞEVA 265'EMÎN

Şehrezadê berdewam kir:

Êvarê gava ku walî vegerîya malê û derbasî cem jina xwe Xatûn xan bû û bi şev jî ket nav nivîna wê ew daxwaza zîlamî lê kir, jina wî li gora şîrêten pîrê tevgerîya û di ecamê de walî bi sê telaqê bêfitû sûnd xwar ku dê daxwaza wê pêk bîne. Wê jî xwe dayê û pê re raket.

Sibehê, piştî ku walî xwe şûst û nimêja sibehê kir, berê xwe da zindanê û çû cem Ehmed Qumqum, jê re got: “Ey dizekê bêwijdan! Gelo tu dixwazî tobe bikî û dev ji wan kiriyarên heram berdî?” Ehmed got: “Min tobe kiriye û ez dîsa tobe dikim û efûya xwe ji Xwedê dixwazim ku min bibexşîne ji van gunehan! Ez van gotinan ji dil û can dibêjim û ev tobeya nesûh e.” Walî ew ji zindanê derxist û tev li wan qeydên wî ew bir huzura xelîfe. Bejna xwe tewand û erda bin nigê xelîfe maçî kir. Xelîfe got: “Ey Emîr Xalîd, tu hatiya daxwaza çî bikî ji min?” Ehmed Qumqum ber bi xelîfe ve çû û hebekî din nêzikî wî bû, bala xelîfe kişand ser xwe. Xelîfe jê re got: “Wey, qey hîna jî tû sax î Qumqum?” Qumqum got: “Emîrê Bawermendan, kesê xerab emrê wan dirêj e!” Xelîfe li walî zivirî û jê re got: “Ey Emîr Xalîd, ji ber çî tu hatiya vir?” Walî got: “Emîrê Bawermendan, dayikeke vî dizî heye, pîr, jar û feqîr e û tu kesî wê tune ye ji vî kurî pê ve. Hat gel min û ji min xwest ku ez şefatê jê re bixwazim li ba te, da ku tu qeyd û zincîrên wî vekî û ew tobe bike, vegere ser riya rast ji bo ku tu wî dîsa bikê serkirdeyê derekan.”

Xelîfe ji Ehmed Qumqum re got: “Gelo te tobe kiriye û tu vegeriyaye rêya rast?” Ehmed Got: “Min tobe kiriye Emîrê Baxermendan” Wê çaxê xelîfe gazî hesinkar kir û ferman dayê ji bo ku qeydên wî veke. Piştî ew dîsa kir serkirdeyê derekan û şîret lê kirin ji bo ku êdî jî rêya rast dernekeve. Wî jî destên xelîfe maçî kirin û çû ser kare xwe, derekên di bin fermana xwe de xelat kirin, wan jî serkeftin jê re xwestin di kare wî de. Demekê li ser kar ma, piştî vegeriya malê, çû, derbasî cem diya xwe bû, herduyan hesret şikandin.

Piştî gava ku diya wî careke din ji bo sipasdariyê çû serdana jina walî, wê jî jê re got: “Şikir ji Xwedê re ku kurê te ji zindanê derket û ji mirinê rizgar bû. Êdî niha baş e, li ser kar e û tendurustiya wî jî li cî ye. Vêca çima te jê re negot bo ku rêyekê bibîne û wê cêrîyê ji kurê min Hebzelm re bîne?” Diya Ehmed got: “Ez ê herim jê bixwazim.” Û di cî de rabû, çû cem kurê xwe, dît ku serxweş e. Jê re got: “Kurê min, a ku tu ji zindanê rizgar kir, jina

walî bû û ew jî niha jî te dixwaze ku tu bi tevdirêkê Eladîn Ebû Şamat bikuje û tu cêriya li cem wî, jî kurê wê Hebzelm Bezaza re bîne.” Kurê wê Ehmed got: “Ev tiştêkî pir hêsan e. Îşev, ez ê rêyekê jî vê yekê re bibînim.”

Ew roj jî, şeva yekemîn ji meha nû bû, ku ji adeta Emîrê Bawermenda bû wê şevê li cem Zubeyde rakeve, ji bo ku koleyekî, an jî cêriyekê azad bike. Di heman demê de jî, ji adeta wî bû ku wê şeve kincên xilafetê ji xwe bike, hungulîska sultanî û tizbî û şîva xilafetê jî ji dest xwe deyne; hemû datanîn ser kursîya odeya şevbuhêrkê. Lempeyeke zêrîn a xelîfe hebû ku pir jê hez dikir û di wê lempeyê de jî sê cewherên di têleke zêrîn re derbaskirî hebûn. Vêca gava xelîfe rabû berê xwe da odeya Zubeydeyê, ew lempe hilda destê xwe, xizmetkarên wî jî rahiştin tiştên mayî û derbasî cem Zubeyde bûn.

Ehmed Qumqum e diz jî, xwe ragirt hetanî nivê şeve. Piştî ku dinya bêdeng bû û xelk ketin xewê de, wî jî şûrê xwe kişand bi destê rastê, bi destê çepê jî rahişt çengelekî û berê xwe da odeya şevbuhêrkê ya xelîfe. Nêrdewan da ber dîwêr û çengelê xwe avêt sefirneya odeya şevbuhêrkê û bi şerîtekê pê ve hilkişîya, derket ser ban. Textek jî ser ban da alî û ji jor ve xwe bera hundurê odeyê da. Li hundurê odeyê nerî, dît ku xulam û xizmetkar hemû raketî ne û bêdengî li hundur heye. Hemû tiştên wî yên giranbuha yên ku ew danîbûn ser kursiyê jî lempeya zêrîn û cewher û tizbî û hungulîsk û kopalê xilafetê, û pir bi lez dîsa derket ser ban, di heman kuna ku xwe tê re berdabû jêr. Dûvre kuna ku di banê odeyê de vekiribû dîsa girt, ew mîna berê kir û ji wir daket, berê xwe da mala Eladîn Ebû Şamat. Eladîn jî wê şevê di nava kêf û xweşîyeke bêtemtêl de bi cêriya xwe Yasemîn re mijûl bû. Pê re raketibû û jina wî ya nû jî hemlê xwe girtibû. Di wan kêlikên ku Eladîn di himbêza Yasemînê de bû, Ehmed Qumqum ket hewşa mala Eladîn. Mermerek ji erda wê rakir û bin wê kola, piştê ew tiştên xelîfe yên giranbûha hemû tê de bi cî kirin û careke din ser wan girt, mermer li cihê wî vegerand, mîna berê jî dora wî bi cisê seyand. Di dilê xwe de got: “Ez ê herim ji xwe re vexwim hetanî ku ez serxweş bibim, li ber vê lempeya zêrin!” Lewre ew lempe li gel tiştên dîtirkê veneşartibû û ew jî xwe re biribû.

Gava bû sibe, xelîfe ji cem Zubeydeyê derket û çû odeya şevbuhêrkê, dît ku hemû xulam û xizmetkar benckirî û hîna jî di xew de ne. Ew şîyar kirin û çû ser kursiyê nêrî, tiştêkê xwe li wir nedît: “Ne bedlê kincan, ne hungulîsk û tizbî û gupalê xilafetê û ne jî ew lempeya xwe ya zêrîn li wir nedît! Pirs hêrs bû û çû kincên sor, ên xezebê li xwe kirin û bi wan kincan, çû li diwana hukum rûnişt. Wezîrê wî pêş ve hat, bejna xwe li ber tewand, erda ber nigê wî maçî kir û got: “Xwedê ya xêrê bike Emîrê Bawermendan. Çi qewimîye gelo?” Xelîfe got: “Xêr kêmbûye û xerabî zêde bûye!” Wezîr got: “Gelo çi bûye?” Xelîfe, ji serê hetanî binî jî wî re rêz kir. Di wê navberê de walî û Ehmed Qumqum derbasî hundur bûn. Xelîfe li walî zivirî û jê re

got: “Ey Emîr Xalîd! Gelo rewşa Bexdê çawa ye?” Walî got: “Ewle û aram e!” Xelîfe got: “Tu derewan dikî!” Walî got: “Çima Emîrê Bawermendan? Te sebebê wê ji min re bigota baş bû.” Xelîfe, tiştê ku qewimîbû ji wî re jî got. Piştî lê zêde kir: “Vêca divê tu wan tiştên min ên ku hatine dizîn hemûyan bîne û dizan jî ceza bikê!” Walî got: “Emîrê Bawermendan, kur-mê darê ji darê ye û di darê de ye. Lewre tukes nikare ji derve were û xwe bigihîne hetanî bi ber serê te.” Xelîfe got: “Min fermanek da te, êdî ku tu fermanê pêk neyne, ez ê te bikûjim.” Walî got: “Berî ku tu min bikuje, ez ê jî Ehmed Qumqum bikujim. Lewre kesê ku divê diz û bêbextan nas bike û wan bigire, serkirdeyê derekan e.”

Ehmed Qumqum rabû ser xwe û ji xelîfe re got: “Min bixê şûna walî de, ez ê soz bidim te ku ez ê şopa wî dizî bişopînim, wî bigirim û bînim ber destê te. Lê belê du alîkarên qadî û du heb alîkarên walî bide rex min, lewre ez baş dizanîm ku zîlamê ev kar kiriye, ne ji walî ditirse û ne jî ji te.” Xelîfe got: “Temam, tu çawa dixwazî wîsa bike, lê belê lêgerîna pêşî di qesra min de bikin û ya duduyan jî di qesra wezîr de bikin, a sîsyên jî di mala serkirdeyê Sîtin de bikin.” Ehmed Qumqum got: “Tu rast dibêji Emîrê Bawermendan, belkî evê ku ev tişt kiriye, yek ji ew ên ku di qesra Emîrê Bawermendan de mezin bûye ye, angî yekî nêzikî wî!” Xelîfe got: “Ez bi serê xwe û bavê xwe sûnd dixwîm ku yê ev kar kiriye, kurê min be jî dê serê wî were jêkirin!”

Ehmed Qumqum, şahid û tiştên ku xwestibûn bi xwe re birin û çû. Helbet fermana ku xelîfe ji bo lêgerîna malan nivîsandibû bi xwe re bir...

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî vegotina çîroka xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 266'EMÎN

Şehrezadê berdewam kir û got:

Piştî ku Ehmed Qumqum fermana lêgerînê ji xelîfe girt, rahişt sê darîkên sîran, sê darîkên paxir û sê hebên hesinî xistin destê xwe û dest bi lêgerînê kir di qesra xelîfe de. Piştî derbasî mala wezîr, mala serxizmetkar û cîgiran bû. Herî dawî jî rêya xwe bi mala Eladîn Ebû Şamat xist. Gava ku dengê xire-cirê li derve hat, Eladîn ji cem jina xwe Yasemîn rabû, çû derî vekir, dît ku walî li devê derî ye. Jê re got: “Xêr e Emîr Xalîd, çi heye?” Walî çîrok jê re got. Eladîn jî lê vegerand û got: “Derbasî mala min bibin û lêgerîna xwe bikin!” Walî got: “Haşa ku em derbasî mala te bibin ji bo lêgerîna Mirzayê min, tu mirovekî rast û durust e û bêbextî li dora te peyda nabe.” Eladîn îsrar kir û got: “Illeh-bileh divê hûn mala min jî di ber çavan re derbas bikin!” Piştî vê gotina wî walî û şahid û qadî derbasî hundur bûn. Ehmed Qumqum çawa derbasî hewşê bû û lê geriya, darîkên xwe di hîza-

ya sînga xwe de girtin û ber bi wê mermera xwe ve çû û gava gîha ser wê, horsê xwe bi ser mermerê de xist. Mermer şikest û ji koncala bin wê ronî-yekê çirusand. Serkirdeyê derekan Ehmed got: “Bi navê Xwedayê dilovanî mehreban horsê me kenza bin mermerê eşkere kir û ew derxist holê! Ez dixwazim dakevim nava vê koncalê da ku ez bibînim bê çî tê de ye.”

Qadî û şahid jî li wê koncalê hatin hev, lê nêrîn û dîtîn ku hemû alavên xelîfe yên wenda, tê de ne! Li ser vê dîmenê, kaxezek nivîsandin û tê de gotin ku her tişt di mala Eladîn de dîtine. Piştî mohrên xwe lê xistin û fermana girtina Eladîn dan. Kolozê wî jî serê wî kirin, hemû mal û mulkên wî tesbît kirin û listeya wan derxistin. Ehmed Qumqum jî Yasemîna ku ducanî bûbû destgîr kir û ew radeştî dîya xwe kir, jê re got: “Wê teslîmî Xatûn a jina walî bike!”

Dîya wî Yasemîn bir û ew radeştî jina walî kir. Kurê wê Hebzelm Bezaza jî çawa çav lê ket, ruh pê ve hat û mîna mirîye ku ji tîrbê rabe, di cî de rabû ser xwe û bi kêf û eşqeke mezin ber bi wê ve çû. Gava nêzîkî wê bû, Yasemîn xencera xwe kişand û jê re got: “Ji min dûr keve, naxwe ez ê xwe jî, te jî bikujim!” Dîya wî Xatûn xanim ket navbera wan û ji Yasemînê re got: “Şermûta bêfedî! Bihêle, bila kurê min bi te şabibe!” Yasemîn got: “Kûçîka heram, ma ka di kîjan mezhebi de çêdibe ku jinek bi du zilaman re bizewice? Û çî dihêle ku kûçîk têkevin şûna şêran de?”

Di wê navberê de girêz bi devê Hebzelm ket û agirê nava wî gurtir bû. Lê vê helwesta Yasemînê her tişt di qirika wî de hişt, vîna wî şikand û eşqeke mezin di nava wî de peyda kir. Loma nema xwe li ser nîgan girt û li ser nivîna xwe ket. Dîya wî Xatûn xanim bi Yasemîn de xeyidî û got: “Qehpîka bêrû, tu çawa dilê kurê min wisa dişikîni! Bêgûman divê ez te îşkence bikim û divê Eladîn jî bê xenîqandin.” Yasemîn got: “Ez li ser wî dimirim!” Wê gavê jina walî rabû ser xwe, hemû zêr û zîv û kincên hevrehîyê di ser wê re anîn û li şûna wan kincin zivir lê kirin û ew avêt nav cêrîyan û jê re got: “Êdî ji îro pê de tê êzingan bişkîni, pîvazan hûr bikî û agir bidî bin tîfikê. Ev jî cezayê te ye!” Yasemîn got: “Ez bi her tiştî razî me û bi her xizmetê jî, lê ez naxwazim rûyê kurê te bibimim!”

Xwedê wisa ji Yasemîn re li hev anî ku dilê cêrîyan pê şewitî û wan şûna wê girt di wan xizmetan de. Ev li aliyê Yasemînê wisa, îcar em vegerin ser rewşê Eladîn.

Eladîn jî piştî ku hate destgîr kirin, ew birin dîwana xelîfe li gel ew eşyayên xelîfe yên ku di mala wî de hatibûn girtin. Çawa çavên xelîfe li wan tiştên wî yên wenda ket, ji wan re got: “We ev hemû di ku de zeft kirine?” Gotin: “Me ew di mala Eladîn Ebû Şamat de girtin!” Xelîfe hêrs bû, rahişt eşyayên xwe, ew li hev qulubandin, lê lempeya zerîn di nav wan de nedît. Ji Eladîn re got: “Kani lempe li ku ye?” Eladîn got: “Min tişteke nediziye, ez

tişteki nizamim, hayê min ji tişteki nîne û min tişteki neditiye!” Xelîfe pê de qîriya: “Bêbext! Çawa ez te nêzî xwe dikim, tu xwe dûr dikî û çawa ez li te ewle dibim, tu bêbextiyê li min dikî!” Piştî fermana kuştina wî da û ji walî re got: “Wî bixeniqînin!” Walî ew bir, bangeşkar jî ket nava bajêr û gazi kir, qiriya got: “Ev e cezayê kesê ku bêbextiyê bi xelîfeyên Raşîdîn re bike!” Xelk hemû lê kom bûn û banga bangeşkar jî berdewam kir.

Em Eladîn li wir bihêlin û em werin ser rewşa parêzvanê Eladîn Ehmed El-denef ê ku şûna bavê wî girtibû û her roj ew dibir dîwana xelîfe û tanî malê. Ehmed El-denef û her çil zêrevanên xwe li nava bistanekî rûniştî bûn, di nava kêf û henekan de. Li wir, ji nişkê ve avkêşek hat cem wan û di nava kelacaneke mezin de ji Ehmed re got: “Ey Ehmed El-denef, tu wisa ji xwe re rûniştî ye, lê av di bin te re diçe û hayê te jê nîne, tu nizanî bê çi qewimîye!” Ehmed El-denef got: “Çi heye?” Avkêş got: “Kurê te Eladîn dê were sêdarkirin!” El-denef li Hesên Şoman zivirî û jê re got: “Hesên ka çi li cem te heye, tu çi dibêjî?” Hesên Şoman got: “Eladîn bêguneh e di vî karê xerab de. Dujminekî wî, ev dek û dolab li serê wî gerandiye!” El-denef got: “Em ê çi bikin?” Wî jî got: “Bi izna Xwedê em ê wî xelas bikin.”

Hesên Şoman rabû, çû zindanê û ji zindancî re got: “Kanî girtiyeke ku hukmê mirine lê hatiye birîn bide me!” Zindancî yekî ku dişibiya Eladîn da wî, Hesên jî ew bir ji Ehmed El-denef re. Ehmed El-denef ew girti xist neqeba xwe û Elî-Zeybek ê Misrî û berê xwe dan cihê ku dê Eladîn lê bihata darvekirin. Gava gîhan wir, dîtî ku Eladîn li ber darvekirinê ye. Ehmed El-denef pê li nigê celad kir, çav kire. Celad jê re got: “Cih bide min ji bo ku ez bikaribim karê xwe bikim!” Ehmed dîsa çav kir wî û jê re got: “Vî zîlamî bi dar veke li şûna Eladîn Ebû Şamat, lewre Eladîn mirovekî bêguneh e. Jixwe Xwedê Teala jî beranek feda kir li şûna Îsmail. Tu jî vî zîlamê gunehkar li şûna Eladîn bi dar veke dê çêtir be.” Celad negot na. Ehmed û Elî-Zeybekê Misrî jî Eladîn bi xwe re birin û çûn mala Ehmed El-denef. Gava gîhan malê, Eladîn ji Ehmed re got: “Xwedê xêra te binivîsîne û tengahiyan bi serê te de neyne!” Ehmed got: “Min tişteki ji te re nekiriye...”

Şeveqê lêda û li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 267^{EMÎN}

Şehrezadê berdewam kir û got:

Ehmed El-denef ji Eladîn re got: “Min tu tişteki mezin ji te re ne kiriye. Tu jî şaşitiyan meke! Kesê ku li te ewlê bû, bêbextiyê pê re meke, welew ku ew bêbewtiyê bi te re bike jî. Xelîfe li te bawer bû, li te ewlê bû û tu girtî cem xwe, veka çawa te bêbextî pê re kir û te malê wî dîzî?” Eladîn got: “Bi Xwedê hayê min ji tişteki wisa tuneye bavocan. Min tişteki wisa nekiriye û

tu gunehê min jî tê de nîne.” Ehmed El-denef got: “Xwiyaye ku dujminekî te ev kar kiriye. Helbet ev kes kî be wê cezayê xwe bigire, lê belê yê te, li Bexdê cî ji te re nema Eladînê min. Lewrê tukes nikare dujminahîyê bi xelîfe re bike û kesê ku mîr û xelîfe li wan bigerin, filitandin ji wan re tune! ” Eladîn got: “Naxwe ez bi ku ve herim?” Ehmed El-denef got: “Ez ê te bibim Îskenderiyeyê. Îskenderiye bajarekî pîroz û baş e; jiyana li wir jî pir xweş e.” Eladîn got: “Tu çawa dibêjî ez ê wisa bikim.”

Ehmed El-denef ji Hesên Şoman re got: “Ez ê Eladîn bibim Îskenderiyeyê, vêca heger Xelîfe li min pirsî, bêje çû li welat digere ji bo karekî xwe.” Piştê Eladîn da tengala xwe û ji Bexdê derketin. Di nava bîstan û baxan de du cihû dîtîn, ku her yek ji wan li ser piştî qantirekê bû. Herdu ji karkerên xelîfe bûn. Ehmed ji herduyan re got: “Kanî bacekê bidin û xwe bidin efûkirin!” Wan jî lê vegerand û got: “Em ê çima û di ber çî de bacê xwe bidin?” Ehmed got: “Em xwediyê vê newalê û van bîstanan e. Her yekî ji wan sed dînar dan. Piştê Ehmed, herdu cihû jî kuştin û dest danî ser herdu qantirên wan; ew li yekê, Eladîn li ya din siwar bû û berê xwe dan bajarê Îyas. Gava gîhan wir, çûn xanekê û lê man hetanî sibê. Roja din sibehê, rabûn çûn qantira Eladîn firotin û ya Ehmed jî bi emanetî li xanê hiştin. Piştê çûn Benderê û li keştiyekê siwar bûn, çûn Îstenderiyê. Herdu bi hev re li sûkê geriyan bala xwe danê ku dellalekî dikanek daye ber bazarê, bi buhaya nehsed û pêncî dînarî. Eladîn jê re got: “Ez ê hezar dînarî bidime te û vê dikanê bifiroşe min!” Delal pejirand û mifteya dikanê radestî Eladîn kir. Wî jî rahişt mifteyê û deriyê wê vekir derbasî hundur bû, bala xwe dayê ku mexzenek jî di nava dikanê de heye û tijî alav in. Herdu bi doşekan raxistî bû, palpişt û balîf li hawîrdorê danîbûn. Koşeyeke wê jî rengê reng tiştên malan hebû.

Eladîn Ebû Şamat li dikanê rûnişt. Ehmed El-denef jî jê re got: “Kurê min, êdî dikan û mexzen bûne yên te. Tu jî tê de rûnê û ji xwe re kîrîn û firotinê bike, lewre Xwedê ticaret pîroz kiriye. Êdî baldar be û neheqiyê meke.”

Ehmed El-denef sê rojan li cem Eladîn ma, piştê xatir jê xwest û got: “Tu li vê derê bimîne hetanî ku ez herim cem Xelîfe û ji wir xeberekê, aga-hiyekê bînim, di derbarê ewlehîya te de û ez fêr bikim bê ka kîjan îblîsî ev dek û dolab li sêrê te gerandiye.”

Ehmed El-denef li keştiyekê siwar bû û vegeiriya Îyas. Li wir, çû ew xana xwe ya berê, qantira xwe girt û lê siwar bû, berê xwe da Bexdê. Li wir çû cem Hesên Şoman û zîlamên wî...

Şevqê lêda û li Şehrezadê bû sibe. Wê jî vegotina çîroka xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 268'EMÎN

Şehrezadê vegotina çîroka xwe berdewam kir û got:

Di pey wê re Ehmed El-denef çû cem Hesên Şoman û zîlamên wî, jê re got: “Ey Hesên! Gelo xelîfe li min pîrsî?” Hesên got: “Na li te nepîrsî û tu qet nehatî bîra vî jî!” Bi wî hawî, Ehmed El-denef jî mîna berê, kare xwe yê di qesrê de berdewam kir.

Em bîn ser dema piştî darvekirina zîlamê ku dişîbiya Eladîn. Xelîfe Harûn Reşîd li wezîrê xwe Cafer zivirî û jê re got: “Te dît bê Eladîn çi bi serê min kir?” Cafer got: “Emîrê Bawermendan, wî ew karê xerab kiribe, te jî cezayê wî dayê û te ew daliqand.” Xelîfe got: “Meqseda min ew e ku ez herim cihê ku lê hatiye daliqandî û ez bi çavên serê xwe wî daliqandî bibînim.” Wezîr got: “Tu çawa dixwazî, em wisa bikin Emîrê Bawermendan!”

Xelîfe li gel wezîrê xwe, berê xwe da cihê sêdarekirina Eladîn. Gava gihan cem sêdarê, xelîfe lê nêrî û bi şaşwazî ji wezîrê xwe re got: “Cafer, ew ê ku hatiye şeniqandin ne Eladîn e!” Wezîr got: “Te çawa tê derxist ku ne Eladîn e?” Xelîfe got: “Eladîn kin bû û evê daliqandî dirêj e.” Wezîr got: “Ê ku tê bidarvekirin dirêj dibe!” Xelîfe got: “Eladîn gewr bû û evê daliqandî esmer e!” Wezîr got: “Emîrê Bawermendan ma qey tu nizanî ku mirovê mirî têtê veguherîn?”

Xelîfe ferman da, mirovê daliqandî ji sêdarê daxistin, li nigên wî dîtin ku li ser pehniyên wî navê herdu pîrxasan nîvisandiye. Xelîfe got: “Wezîrê min, Eladîn Sunnî bû û evê daliqandî rafîzî ye?” Cafer got: “Subhan ji wî xwedayê me re! Lê disa em nizanin ev kes Eladîn e an na?” Xelîfe ferman da ku were veşartin, xulaman cesedê wî birin binax kirin. Û bi wî hawî Eladîn jî hate jibîrkirin.

Îcar em vegerin ser rewşa Hebzelm Bezazayê kurê walî. Ew bi agirê eşq û evîne hate sotan û di dawîyê de ji kerba mir, çû ser dilovaniya Xwedê û piştî jî ew veşartin.

Yasemîn a jina Eladîn jî, piştî ku neh mehên wê qedîyan, hemlê xwe danî û kurikekî mîna heyvê anî. Cêriyan gotin: “Em çi navî lê bikin?” Wê jî got: “Ger bavê wî sax bûya, dê wî nav lê bikira. Lê madem ku divê ez nav lê bikim, bila navê wî Eslan be.” Piştî, du salan sax şîr dayê û di pey re ew jî şîr birrî û bi hezkirineke mezin ew xedî kir.

Demekê gava ku Yasemîn di metbexê de dişuxulî, kurikê wê Eslan jî li dû wê çû metbexê. Lê piştî demekê aciz bû û bi şûn de vegeriya, di hêwanî re derket derve û bi pêlekên ve raperikî, çû ser dike ku Emîr Xalîd jî li wir rûniştî bû. Emîr Xalîd ê walî, çawa ew dît û çav lê ket, dilê wî bi ser de çû. Rahişt kurik û ew xist himbêza xwe, di dawa xwe de da rûniştundin. Li

rûyê wî meyzand û got: “Subhan ji wî re ku ev suret xuliqandiye!” Lewre pir spehî bû û gelekî jî dişîbiya Eladîn Ebû Şamat.

Di wê navberê de diya wî li derdora xwe nêrî û bala xwe dayê ku kurê wê nexwiyaye. Bi şûn de çû, lê geriya hetanî ku çû ser dike û ew di dawa walî de dît. Kurik dilîst û Emîr Xalid jî pê şa dibû. Çawa ku çav li diya xwe ket, xwest ku xwe bavêje himbeza wê, lê belê walî ew di dawa xwe de hişt û ji Yasemînê re got: “Were li kêleka min rûnê!” Yasemîn çû li kêlekê rûnişt, walî jê pirsî: “Ev kurik ê kê ye?” Dîya wî got: “Berhema dilê min e!” Walî got: “Bavê vî wî kê ye?” Yasemîn got: “Bavê wî Eladîn Ebû Şamat e. Lê êdî ji îro û pê de tu bavê wî yî!” Walî got: “Eladîn Ebû Şamat xayîn bû!” Yasemînê got: “Ew mirovekî rast û durust bû, heşî wî ku bêbext be!” Walî got: “Gava ku kurik mezin bibe û navê bavê xwe ji te bipirse, bêje tu kurê Emîr Xalid ê walî yî.” Yasemînê got: “Bila be mîrzayê min!”

Emîr Xalid kurik bi delalî û bi terbiyeke baş mezin kir. Feqeyekî xetat û zana jê re anî, ew fêrî xwendin û nivisandinê kir. Kurik Qur’an xwend û ew xitim kir. Êdî wî ji walî re digot ‘Bavo’, walî jî ji re digot ‘Kurê min’ û jê re hesp û şûr û mertal anîn, ew fêrî huner û zanîna şer kir, hetanî ku mezîn bû û bû siwarekî jêhatî, di çardasalîya xwe de. Êdî ew jî ketibû nav xebatên parêzvaniyê.

Rojekî Eslan, Ehmed Qumqum dît û pê re bû heval. Piştî çû meyxaneyê. Li wir, Ehmed Qumqum ew lempêya zerîn û bicewher a ku ji mala xelîfe dizîbû derxist, danî ber xwe û li ber ronîya wê mey vexwar, serxweş ket. Eslan jê re got: “Serkirdeyê min, kanî vê lempê bide min!” Ehmed Qumqum got: “Ez nikarim wê bidime tel!” Eslan got: Çima?”

Şeveqê lêda û li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 269’EMÎN

Şehrezadê vegotina çîroka xwe berdewam kir û got:

Îcar gava Ehmed Qumqum got “ez nikarim bidim te”, Eslan got: “Çima?” Ehmed got: “Ji ber ku gelean canê xwe di ber de da!” Eslan got: “Kê canê xwe di ber de da?” Ehmed Qumqum got: “Yek hatibû vir û li vir bûbû serkirdeyê Sittîn. Navê wî Eladîn Ebû Şamat bû, ew di ber vê lempê de hate kuştin.” Eslan got: “Îcar çîroka sebeba mirina wî çawa bû?” Ehmed Qumqum çîroka wî ji serî hetanî binî jê re got. Çawa Hebzelm Bezaza nexweş ket û mir, çawa Eladîn bi neheqî hate kuştin, hemû jê re vegot. Eslan di dilê xwe de got: “Wisa wuya dike ku ev cêriya ku behsa wê dike diya min e û Eladîn Ebû Şamat jî bavê min e!” Bi dilekî xemgîn ji cem Ehmed Qumqum derket û çû cem Ehmed El-denef. Ew jî çawa çav lê ket, got:

“Subhan ji wî re ku ev xortê ciwan xuliqandiyê! Çiqasî dişibêyê?” Hesen Şoman lê veğerand û got: “Mîrzayê min, tu li çi behetî mayî?” Ehmed El-denef got: “Ev ciwanê han pir dişibe Eladîn Ebû Şamat.” Piştîre gazî kirê û got: “Ey Eslan! Navê diya te çi ye?” Eslan got: “Jê re dibêjin cêrî Yasemîn.” Ehmed got: “Bila serê te bilind be Eslan, lewre Eladîn Ebû Şamat bavê te ye. De êdî here cem diya xwe û li bavê xwe bipirse!” Eslan got: “Bila be mîrzayê min!” û çû derbasî cem diya xwe bû û jê pirsî, got: “Kî bavê min e?” Diya wî got: “Emîr Xalîd bavê te ye.” Eslan got: “Eladîn Ebû Şamat e bavê min, ne kesî dîn!” Dîya wî giriya û got: “Kê tu agahdar kir bi vê yekê, kurê min?” Kurik got: “Serkirde Ehmed El-denef ez pê agahdar kirim.” Rabû diya wî jî mesele ji serî hatînî binî jê re vegot û pê de çû, got: “Rast e kurê min, rastî ew e ku Eladîn Ebû Şamat e bavê te. Lê yê ku te xwedî kiriye Emîr Xalîd e. Wî tu mezin kiriye û bavîtî ji te re kiriye. Vêca gava te Serkirde Ehmed El-denef dît kurê min, jê re bibêje tu bi xatirê Xwedê kî tê heyfa min ji kujerê bavê min hilînî!”

Eslan, ji malê derket berê xwe da cem Ehmed El-denef, hat cem wî, destên wî maçî kirin. Ehmed jê re got: “Çi bi te hatiye kurê min?” Eslan got: “Ezbenî, niha ez fêr bûm kû bavê min Eladîn Ebû Şamat e. Loma ez dixwazim ku tu heyfa min ji kujerê wî hilînî!” Wî jî got: “Kî kujerê bavê te ye?” Eslan got: “Ehmed Qumqum ê dizek e.” Ehmed El-denef got: “Û kê ev yek ji te re got?” Eslan got: “Min ew lempeya zerîn a ku ji nav eşyayên xelîfe hatibû dizîn pê re dît û min ew jê xwest, wî qebûl nekir ku bide min û got gelek canê xwe di ber vê lempê de dane û çîroka wê ji min re vegot bê çawa wî ev eşyayên xelîfe dizîne û ew birine di mala bavê min de veşartine.”

Ehmed El-denef jê re got: “Gava ku carekê Emîr Xalîd kincên şer û cengê li xwe kirin, jê re bibêje kanî van kincan li min jî bike. Piştîre gava tu pê re çû û derbên mêran di huzûra xelîfe de nîşan dan, dê xelîfe ji te re bibêje ‘Hela tişteki ji min bixwaze Eslan?’ Tu jî bibêje ‘Ez dixwazim ku tu heyfa min ji kujerê bavê min hilînî.’ Ew jî dê bibêje ‘Bavê te walî Emîr Xalîd e û vaye hîna sax e.’ Tu jî lê veğerin û bibêj ‘Bavê min Eladîn Ebû Şamat e, Emîr Xalîd mezinê min e, ez xwedî kirime.’ Piştîre çîroka xwe ji serî hetanî binî jê re bibêjê, bê çawa te û Ehmed Qumqum we hevdu nas kiriye û çawa ew bi devê xwe li xwe mikur hatiye, her tişt ji te re gotiye, di dawî de jî jê re bibêje ‘Emîrê Bawermendan, tu fermana lêgerîna ser wî bide, ez ê wê lempeya te ji bêrika wî derxinîm.’ ” Eslan got: “Bila be ezbenî!”

Eslan veğeriya malê, dît ku Emîr Xalîd kincên leşkerî li xwe dike û xwe amede dike ji bo ku here dîwana Xelîfe. Jê xwest ku kincên leşkerî li wî jî bike. Emîr Xalîd, kincên leşkerî li wî jî kirin û ew bi xwe re bir dîwanê. Piştîre xelîfe li gel leşkerên xwe derket derveyî bajêr. Kon û çadîrên xwe vegirtin, leşker jî lek bi lek, rêz bi rêz derketin holê, bi rim û şûr û mertalên xwe farîsên jêhatî ji hev re daketin tirada hespê, dudu dudu ketin himber hev de.

Vêca di nav leşkeran de casûsek hebû ku dixwest xelîfe bikuje. Wî leşkerê casûs rahişt gurzê xwe û li solecanê da, ew ber bi serê xelîfe de pekand. Lê di heman kêliyê de Eslan bi gurzê xwe, pêşiya wê girt û nehişt ku solacana casus li serê xelîfe bikeve. Solacan li nav milan ket û kete erdê. Xelîfe ji Eslan re got: “Aferîn ji te re! Xwedê te bisitirîne Eslan!”

Di pey re, hemû ji hespan daketin û li ser kursiyan rûniştin. Xelîfe ferman da ku ew ê casus bînin raber wî. Casus anîn wir, xelîfe jê re got: “Kê tu xapand û hişt ku tu vî karê xerab bikî? Gela tu dujminê me yî, ango dost î?” Casûs got: “Ez dujmin im û min dixwest ku ez te bikujim.” Xelîfe got: “Sebeb çi ye, qey tu ne Musulman î?” Casûs got: “Na, ez Rafizî me!” Xelîfe fermana kuştina wî da û li Eslan zîvirî, jê re got: “Tu ji tiştêkî ji min bixwaze da ku ez ji te re pêk bînim û qenciya te li te vegerînim?” Eslan got: “Ez dixwazim ku tu heyfa min ji kujerê bavê min hilîni!” Xelîfe got: “Bavê te sax e û va ye li ser nigan e!” Eslan got: “Kî ye bavê min?” Xelîfe got: “Walî, Emîr Xalîd bavê te ye!” Eslan got: “Emîrê Bawermendan, ew bavê min ê ku ez mezin kirime. Lê belê bavê min ê rasteqîn Eladîn Ebû Şamat e.” Xelîfe got: “Bavê te xayîn bû!” Eslan lê vegerand û got: “Emîrê Bawermendan, kesê dildost û dilewle bêbextiyê nakin. Kanî bavê min çi xayîntî bi te re kiriye?” Xelîfe got: “Bedlê min û tiştên mala min dizîn!” Eslan got: “Heşî bavê min e ku xayîntî bi te re kiribe ezbenî. Gelo gava te ew tiştên xwe wenda kirin û piştê dîsa li te vegerîyan ew lempeya te ya zêrîn a bi cewheran xemilandi ji li te vegerîya?” Xelîfe got: “Me ew nedît.” Eslan got: “Min ew lempe bi Ehmed Qumqum re dît û min ew jê xwest, lê wî neda min û got gelek canê xwe di ber vê lempê de daye û çîroka meseleyê rave kir, got ‘Hebzelme Bezaza, kurê Emîr Xalîd dil ketibû diya min Yasemîn û wî Ehmed Qumqum ji zindanê rizgar kiribû da ku plana xwe ya dizîya tiştên te li dar bixe. Piştî ku Ehmed Qumqum disa bûbû serkirdeyê derekan, ew plan li dar xistibû û ketibû qesra te de, eşyayên te dizibûn û ew biribûn di mala bavê min de veşartibûn. Lempe ji li ba xwe hiştibû. Vêca ez dixwazim ku tu heyfa min jê hilîni!”

Xelîfe fermana girtina Ehmed Qumqum da, ew anî huzûrê û ji Ehmed El-denef re got: “Ka li ser wî lêgerîne bike!” El-denef destê xwe xistin bêrika wî û lempeya zêrîn jê derxist. Xelîfe got: “Bêbexto te ev lempe ji ku aniyî?” Ehmed Qumqum got: “Min ew kirrîye, Emîrê Bawermendan.” Xelîfe got: “Te ew ji kê kirrîye? Kî dikare bibe xwediyê wê ku bifiroşe te?” Piştê ferman da ku lêpîrsînê pê re kûr bikin. Lêdan, îşkence pê kirin û li dawiyê sûcê xwe qebûl kir û li xwe mukur hat ku wî dizîya mala xelîfe kiriye. Xelîfe jê re got: “Bêbexto, te çima ev kare pîs kir û te ew mirovê dildost Eladîn Ebû Şamat da kuştin?”

Piştê xelîfe, fermana girtina wî û walî da. Walî Emîr Xalîd got: “Emîrê Bawermendan, ez bêguneh im, lewre te ferman da min ji bo ez wî bi dar

vekim. Hayê min jî ji vê dek û dolabê tunebû, lewre ên ku plan gerandibûn Ehmed Qumqum û pîrejina min bûn. Ez jê bêagah bûm ezbenî!” Li Eslan zîvirî û gotina xwe berdewam kir: “Û tu jî li min were rehmê kurê min!” Dilê Eslan pê şewitî û li ber xelîfe geriya ji bo ku wî efû bike. Xelîfe ji walî re got: “Gelo çi bi dîya vî kurî hat? Niha fermana min guhdar bike û here ji jina xwe re bibêje bila kincên jinên azad li wê bike, zêr û zîvên wê lê ve-gerîne û wêna dîsa li xwediyê wê ve-gerîne. Mohra li ser mala Eladîn rake, mal û mulkê wî jî li kurê wî ve-gerîne!” Walî got: “Ser seran, ser çawan Emîrê Bawermendan!”

Walî ve-gerîya malê û ferman da jina xwe ji bo ku kincên wê cêrîya xwe ya berê Yasemîn lê bike û zêrên wê lê ve-gerîne û wê azad bike, dîsa bişîne mala wê. Mohr jî ji ser deriyê mala Eladîn rakir û mifteyên malê dan Eslan.

Piştî Xelîfe ji Eslan re got: “Gelo daxwazeke te ya din ji min heye Eslan?” Eslan got: “Ez dixwazim ku tu me û bavê min dîsa bigihinî hev ezbenî!” Xelîfe giriya û got: “Bi dibêtiyeke mezin bavê te hatiye bidarvekirin, lê sond û peyman be heger yek mizgînîyekê bide min û bibêje Eladîn sax e, ew çi bixwaze ez ê bidim wî û wî xelat bikim!” Ehmed El-denef ber bi wî ve çû, bejna xwe li ber tewand, erda bin nigên wî maçî kir û got: “Soz bide min Emîrê Bawermendan!” Xelîfe got: “Soz be!” Ehmed got: “Ez mizgînîyê didime te ku sozdar û dildostê te Eladîn Ebû Şamat sax e û hîna dijî!” Xelîfe got: “Tu çi dibejî?” Ehmed got: “Bi serê te ez rast dibêjim. Lewre min yekî dinî ku mirin heq kiribû li şûna wî bi dar vekir û min Eladîn jî bir Îskenderiyê, li wir dikanek jê re vekir û ew tê de bi cih kir.”

Şeveqê lêda, Şehrezadê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 270'YEMÎN

Şehrezadê berdewam kir û got:

Wê gavê Xelîfe ji Ehmed El-denef re got: “Ez ji te dixwazim ku tu here wî binî vir!” Ehmed got: “Ser seran, ser çawan!” Xelîfe ferman da ku deh hezar dînar bidin Ehmed, wî jî rahişt wan dinaran û berê xwe da Îskenderiye...

Îcar em ve-gerîn ser rewşa Eladîn Ebû Şamat. Ew jî çawa ku li Îskenderiye bi cî bû û dikan vekir, hemû tiştên xwe firotin û çend kel û pel bi tenê man. Yek ji wan kelûpêlan jî goreyeke kevn bû. Gava rahişt wê goreyê û ew dawesand, morîkek jê ket ku di zincîreke zêr de bû û pênc rûyên wê hebûn ku gelek nav û nîşan û tilsim li ser hebûn, hemû mîna şopa gêrikê tê de xuya dikirin. Her pênc rûyên wê firkandin, lê tu bersiv tê de nedît. Di dilê xwe de got: “Dibe ku ev morîka tirse be!” Ew bi dikanê ve daliqand û dîsa li

cihê xwe rûnişt. Di wê navberê de konsolosek di ber dikana wî re derbas bû û çawên wî li wê morîka daliqandî ket. Di cî de berê xwe da dikanê û hat ji Eladîn re got: “Ezbenî, ev morîka han ji bo firotinê ye?” Eladîn got: “Her tiştê di dikanê de, ji bo firotinê ye!” Konsolos got: “Tê wê bi heşt hezar dînarî bidî min?” Eladîn got: “Bila rêya te vekiribe birawo!” Konsolas got: “Ez ê deh hezar dînar bidim te, te go çî?” Eladîn got: “Temam, min firot te bi deh hezar dînarî, de êdî kanî wan dînaran bide min!” Konsolos got: “Îskenderiye tijî diz e, ez nikarim evqas dînar li vir bidim te. Divê tu bi min re werî keştiya min da ku ez li wir hem deh hezar dînarên te hem jî ez ê topek cawê hiriyê encorî, yekî etler, yekî çox û yekî qatîfî jî bidime te.”

Eladîn rabû dikana xwe girt, mifteyên wê dan cîranê xwe û jê re got: “Bila ev mifte bi emanetî li cem te bin hetanî ku ez herim keştiya vî konsolosî û ez heqê morîka xwe bînim û bêm. Heger di xiyaba min de Ehmed El-denef hat û li min pirsî, van mifteyan bide wî û çîroka min jê re bibêje.” Piştî berê xwe da keştiya konsolos û çû.

Konsolos ew derbasî keştiya xwe kir û kursiyek jê re danî, Eladîn li ser rûnişt. Piştî jî keştivanan re got: “Kanî wan diravan bînin!” Jê re anîn. Wî deh hezar dînar û her pênc topên qumaş en ku soza wan dabû, dane wî û ji Eladîn re got: “Ezbenî tu mêvanê min î û ez dixwazim ku tu xwarineke min bixwe û aveke min vexwe!” Eladîn got: “Heger ava te hebe, avekê bide min!” Konsolos ji xizmetkaran re got: “Avê bînin!” Ava bi benc jê re anîn, wî jî çawa ku ew vexwar ji ser hişê xwe çû û ket. Konsolos jî di cî de fermana birêketinê da zîlamên xwe. Wan jî bi lezûbez amadekariyên xwe kirin, werisê keştiyê vekirin, bavanê wê rakirin û bi rê ketin. Ji xwe ba jî xweş rabûbû, baş bi rê ve çûn. Gava gîhan nava deryayê, konsolos got: “Kanî Eladîn ji jêrzmînê derxînin, werînin vir!” Zîlamên wî çûn Eladîn ji wir derxistin, anîn û bêhna dijberî bencê dan ber pozê wî, ew şiyar kirin. Eladîn çavên xwe vekirin, li dora xwe nêrî û got: “Ez li ku me?” Konsolos got: “Tu li vir î û tu girtiye min î, ez ê te bibim ji evîna dilê xwe re!”

Hîna wan wisa ji xwe re guftûgo dikir, bala xwe danê ku keştiyek di ber wan re derbas dibe û çil tacirên Musulmanan tê de ne. Qaptanê keştiya konsolos ket pêşiya wan, çengelên xwe avêtin keştiyê û girtin ser wan. Hemû derdest kirin, malê di keştiyê de hemû talan kirin û bi xwe re birin Cenovayê. Gava gîhan wir berê keştiyê dan qesra Qeytûn û li ber deriyê wê sekinandin. Tam di wê kêlikê de keçeke rûpoşkîrî berjêr ve daket û çav li keştiyê ket. Bi kelecani gazi kaptan kir û got: “Te morik û xwediyê wê bi xwe re anî?” Konsolos got: “Min herdu jî anîn.” Keçikê got: “Kanî wê morikê bide min!” Morik dayê û berê keştiya xwe da bendera keştiyan. Topên pêşwazîkirinê teqîyan, Qiral jî pê hesiya ku keştiya konsolos vegeiriyaye. Ew jî derket pêşiya wî ji bo pêşwazîkirinê. Ew himbêz kir û jê re got: “Rêwitiya te çawa derbas bû?” Got: “Pir baş derbas bû. Bi rê de em li keşti-

yekê rast hatin ku çil tacirên Musulmanan tê de bûn, me ew jî hêsîr girtin û bi xwe re anîn tev li malên wan.” Qiral got: Kanî wan derbasî bajêr bike!” Kaptan ew ji keştiyê peya kirin, hemû qeyd û zincîrkirî bûn. Ew dane pêşî-ya xwe –ku Eladîn jî di nav wan de bû-û çûn hetanî ku derbasî dîwanê bûn. Li wir, ew yeko yeko birin pêşîya Qiral. Ê ewil anîn pêşîyê, qiral jê re got: “Musulmano, tu ji ku yî?” Got: “Ji Îskenderiyê me!” Qiral got: “Serê wî bifirînin!” Cellad serê wî jê kir. Piştî yê duduyan, yê sisyan û wisa pê de çûn ew hemû kuştin hetanî ku dor hat ser Eladîn ê ku di dawiyê de bû. Qiral jê re got: “Tu ji ku yî?” Got: “Ez ji Îskenderiyê me” Qiral got: “Cellado serê wî bifirîne!” Eladîn di dilê xwe de got: “Temenê te qediya! Rehma Xwedê li Eladîn be!” Lê hîna cellad şûrê xwe bi ser stûyê wî de danexistibû pîrejinek ket hundur de ku qiral bi xwe jî ji ber wê rabû bi rêzdarî. Pîrê got: “Qiralê hêja! Qey te ji bîr kir ku min ji te re gotibû heger kaptan hat û hêsîr bi xwe re anîn, yekî-duduyan ji wanan ji bo xizmeta dêrê bihêle!” Qiral got: “Dayêcan, xwezî beriya seetekê tu bihata vir!” De êdî ev hêsîrê mayî ji xwe re bibe!” Pîrê li Eladîn zîvirî û jê re got: “Tu yê werî xizmeta dêrê bikî, angî ez te bihêlim bila te bikujin?” Eladîn got: “Ez ê xizmeta dêrê bikim.” Pîrê ew bi xwe re bir dêrê.

Li wir Eladîn jê re got: “Ka ez ê xizmeteke çawa bikim?” Pîrê got: “Tê sibehê rabî ser xwe û pênc qantira bi xwe re bibî daristanê. Tê êzingên hişk kom bikî, bişkinî û wan ji bo metbexa dêrê binî. Piştî tê merşan rakî, êrdê reş bikî, mermeran paqij bikî û nivînan rakî li cihê wan deynî. Dûvre jî tê selikek genim serad bikî, bihêrî, bistirê, bike hevîr û minênan çêkî ji dêrê re. Di pey re tê olçekek nîsk li ber ba bixî, binermijînî û piştî bikelînî. Piştî te ew qedand, tê çar bermîlên avê dagirî û ji wan bermîlan sêsed û şêst û şeş lalîkan dagirî û tê minênan û nîsken kelandî bera nav wan di û tê her lalîkekê ji wan bibî, bidî ber keşîşekî.” Eladîn got: “Min vegerîne cem qiral, bela min bikuje çêtir e ji vî karî!” Pîrê got: “Heger tu xizmeta xwe bi rastî û durustî bikî, ez ê te ji mirinê xelas bikim! Heger na, ez ê ji qiral re bibêjim, wê te bikuje!”

Eladîn bi dilkovanî di cihê xwe de rûnişt û bi dilekî xemgîn ponjî. Bê çare bû û mecbûr bû, vêca di wê dêrê de deh kesên seqet û kor hebûn ku her yekî ji wan, tiştek jê dixwest, wî jî daxwazên wan pêk tanîn. Li dawiyê pîrê hat û jê re got: “Çima te karên xwe giş nekirine?” Got: “Ma kanî çend dest bi min ve hene ku ez karibim wan karan gişan bikim?” Pîrê got: “Dîniko, min tu aniye vir ji bo ku tu xizmetê biki!” Piştî şîşêke ji paxir dayê ku xaç bi serî ve bû û berdewam kir got: “A ji te re vê şîşê bigire û here, derkeve sikakên bajêr, kî hate pêşîya te -lew ku walîyê bajêr be jî- gazî wî bike, bêje were xizmeta dêrê bike ji bo xatirê mesîh- silavên Xwedê li ser bin- dê were û bi ya te bike. Tu jî jê re bibêje, bila genim biserridîne, bihêre, moxil bike, bike hevîr û minênan jê çêbike. Kesê ku bi ya te neke jî, bêtirs li wan bide.”

Eladîn got: “Ser seran, ser çawan ez ê wisa bikim.” Û wisa kir jî.

Eladîn, hivde salan bi wî hawî kar ji dêrê re kir, biçûk û mezin di kare xwe de dan şuxulandin. Rojekê gava li dêrê rûniştî bû, pîrê hat jê re got: “Rabe ji dêrê derkeve, here derve!” Eladîn got: “Ez ê herim ku?” Pîrê got: “Îşev li meyxaneyekê rakeve ango li cem dostekî xwe.” Eladîn got: “Çima tu berra min didî ji dêrê?” Pîrê got: “Meryema keça Yûhenna yê qiralê vî bajari, dixwaze were dêra me ziyaret bike. Loma divê ew li te rast neyê.” Eladîn çawa ku bi ya wê bike, rabû ser xwe û meşîya, çû, çawa ku ji dêrê derkeve di dilê xwe de got: “Gelo keça vî qiralî jî mîna keçên me ne, ango ji wan spehîtir e? Bi Xwedê ez naçim, hetanî ku ez wê nebinim!” Piştî xwe di cihekî de veşart ku taqeke wê hebû û hundurê dêrê jê ve xwiya dikir.

Îcar hîna ku wî ji taqê ve li hundurê dêrê dinêrî, dît ku keça qiral tê. Bi hesretê lê nêrî, ku agir bi dilê wî xist. Lewre keçik mîna heyva li çardeyan bû. Jineke din jî li rexê wê bû...

Şevqê lêda û li Şehrezadê bû sibe. Wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 271'EMÎN

Şehrezadê berdewam kir:

Çawa ku me got Eladîn di taqê re li keça qiral nihêrî bi hesret. Qasekî bi şûn de, bala xwe dayê ku keça qiral ji jina kêleka xwe re dibêje: “Te wensa min anî û te ser dilê min rehet kir Zubeyde, Xwedê ji te razî be!” Eladîn çawa navê “Zubeyde” bihist, awirên wî hemû li ser wê jinê kom bû û bi baldarî lê meyzand, bala xwe dayê ku ew jinik bi rastî jî jina wî ya mirî Zubeyde El-udîye ye!” Xwedêyo, piştî bişt salan ev çawa ji gorê rabûye?”

Piştî keça qiral ji Zubeyde re got: “Ka rabe ji me re li ûdê bide û ahengekê bi me bide guhdarkirin!” Zubeyde got: “Ez lê nadim hetanî ku tu miradê min pêkneyîne û li soza xwe xwedî dernekeve!” Keça qiral got: “Soza çi?” Zubeyde got: “Te soz dabû min ku tu min û mîrê min Eladîn Ebû Şamat bigihîni hev!”

Keçikê got: “Zubeydecan, de kanî dilê xwe xweş bike, giyanê xwe aram bike û li ûdê bidî, newayekê bi me bide guhdarkirin ji bo xatirê ku tu û Eladîn Ebû Şamat bigihêne hev!” Zubeyde bi kelecaneke mezin got: “Û ka ew li ku ye?” Keçikê got: “Ew niha li vir e, di vê dêrê de ye û van gotinên me jî dibihîze, ji wî cihê ku xwe tê de veşartîye!” Zubeyde bi coşeke mezin li ûdê da ahengek derxist ku kevir li ber direqîsîn.

Gava ku Eladîn ew deng bihîst û li wê dimenê temaşe kir, dîn û har bû! Nema xwe girt û ji cihê xwe derket, êrîşî ser jina xwe kir, ew hilda himbêza

xwe. Hevdû naskirin û bi bêrîkirineke nayê wesifdan hevdû maçî kirin. Bi wê maçîkirinê re jî ji ser hişê xwe çûn û xiliyan bi erde de, veziliyan. Keça qiral Meryema Şahbanû, ava gulan bi ser wan de reşand, ew şiyar kirin û ji wan re got: “Xwedê hûn gihandin hev!” Eladîn got: “Bi saya serê te, xatûna min!” Dûvre li Zubeyde zîvirî û axaftina xwe berdewam kir, got: “Ma tu nemirî bû Zubeyde? Ji xwe me tu veşartibû bi destê xwe! Îcar tu çawa vêjiya û tu hatî vê derê?” Jina wî got: “Ez ne miribûn begê min, lê belê hineke cinî ez revandibûm û ez anîbûm vir. A ku we ew veşart jî ne ez bûm, yeke cinî xwe xistibû dirûvên min de, xwe li mirîtî danîbû û piştî ku we ew binax kir, wê tirba xwe qelaşt û derket, hat vir, mîna berê ket xizmeta Şahbanûya min Meryem Xan. Ez jî çawa bi ser hişê xwe ve hatim û min çavên xwe vekirin, min dît ku ez li cem Şahbanûyê me. A vaye ew jî li vir e. Min jê re got te çima ez anîme vir, ji min re got, di qedera min de nivîsandiye ku ez ê bi mêrê te Eladîn Ebû Şamat re bizewicim. Vêca tê min qebûl bikî ku ez bibim hewîya te û Eladîn şevêkê bi min re rakeve, şevêkê jî bi te re? Min jî got, li ser seran, ser çawan xatûna min, lê kanî mêrê min li ku ye? Wê jî got, li ser eniya wî nivîsandiye û kengî wextê wê bê, dê ew jî li pey qedera xwe were vir. Îcar tu ji min re li ûdê bid da ku em herdu sebra xwe bi hev bînin, hetanî ku Xwedê Teala me bigihîne hev. Ez jî evqase sal li gel wê mam hetanî ku xwedayê me, îro em gihandin hev, di vê derê de.”

Meryem li Eladîn zîvirî û jê re got: “Îcar mîrzayê min, tê min qebûl bikî gelo ku ez bibim jina te û tu jî bibî mêrê min?” Eladîn got: “Xatûna min, tu fileh î û ez Musulman im, îcar em ê çawa bi hev re bizewicin!” Meryemê got: “Xwedê neke ku ez kafir bim begê min! Ev hîjdeh salên min in ku ez Musulman im, bi vê rêyê ve girêdayî me û ji gunehan dûr im.”

Eladîn got: “Şahbanûya min, meqseda min ew e ku ez bêjim, ez dixwazim herim welatê xwe.” Meryemê got: “Lê belê ez jî pê dizanim ku tişte li ser eniya te nivîsandiye, hîna bi temamî te ew pêk neaniye. Tiştin li ser eniya te nivîsandî ne, divê ew jî pêk werin piştî tu herî welatê xwe. Ji aliyekî din ve jî, ez dixwazim mizgînîyê bidime te ku kurekî bi navê Eslan ji te re çêbûye, mezin bûye û niha li kêleka xelîfe rûniştî ye, di dewsa te de. Temenê wî bûye hîjde sal. Ji aliyekî din ve rastiya dizîya eşyayên xelîfe jî derketiye holê û kesê ku ew dizî kiriye Ehmed Qumqum e, ew jî niha di zindanê de ye. Ya din jî, divê tû bizanibî ku kesê ew morîk ji te re şand û xist wê goreya di dikana te de jî, ez bi xwe bûm. Piştî jî min konsolos şandibû pey te û wê morîkê. Divê tu bizanibî ku ev konsolosê kaptan dil ketiye min û dixwaze bi min re bizewice, lê min qebûl nekir û min jê re got: “Ez nahêlim tu xwe bigihîni min hetanî ku tu neçî Eladîn û wê morîkê neyîni vir. Min sed kîs zêr dayê û di sûretê tacîreki de li pey te şand. Gava ku tu li gel wan hêşîran anîn vir û qiral jî ew hêşîr yeko yeko kuştin û dor hate ser te, min ew pîrejina diya qiral bi ser te de şand, ji bo ku te rizgar bike.” Eladîn kêfxweş bû û

got: “Xwedê xêra te binivisîne!”

Piştire Meryema Şahbanû, Musulmantiya xwe nû kir li ser destê wî. Eladîn jî êdî ji rastiya gotinên wê bawer kir û jê re got: “Naxwe kanî raz û qenciya wê morîka erjeng ji min re rave bike û bibêje bê ew morîk niha li ku ye?” Şahbanûyê got: “Ev morîk di nav kenzekî (gumu) de derket ku di dema mirov lê diqewime, pênc fêdeyan dide mirov. Pîrika min, yanî diya bavê min jineke efsûnger bû, ji hemû rengên nîşan û îşaretan fêm dikir û bi xêra wan hunerên xwe, rê dibir ser kenzan. Di kenzekî ji wan de jî li vê morîkê rast hatibû. Vêca gava ez mezin bûm û temenê min bû çarde sal, Încîl jî di nav de, gelek pirtûk ji min re xwendin ku Mûhemmed eleyhisselam di çar heban ji wan de derbas dibû: Tewrat, Încîl, Zebûr û Qur’an. Min jî bawerîya xwe bi Mûhammed anî û ez bûm Musulman. Min tê derxist ku rêya rast a wî ye û ez têgihîştim ku xwedayê me tenê ji ola Îslamê razî ye. Îcar gava pîrika min nexweş ket, ew morîk diyarî min kir û her pênc xeysi-yetên wê yên qencîyê jî bi min re parve kirin. Beriya ku bimre jî, bavê min jê re got ‘Kanî falekî ji min re veke û binêre bê çi di qedera min de heye û dê çi were serê min.’ Pîrika min got tê li ser destê hêsîrekî ku ji Îskenderiyê bê, werî kuştin. Rabû bavê min jî sûnd xwar ku hemû hêsîrên ji Îskenderiyê werin, bikuje. Heman tişt ji kaptan jî xwest û jê re got ‘Te kîjan keştiya Musulmanan dît, êrişî ser bike û çi kesê ji Îskenderiyê hebe, yan wî bikuje, yan jî wî ji min re bînî.’ Kaptan jî bi ya wî kir û bi qasî porê serê xwe mirov kuştin. Wê gavê pîrika min mir û efsûna wê derbasî min bû. Min jî bextê xwe vekir û li fala xwe nêrî, min dît ku heger ne bi Eladîn Ebû Şamat re be, ezê qet nezewicim bi tu kesî din re. Min ew fala xwe ji herkesî veşart û ez mam li bendî qedera xwe, hetanî ku îro em gîhan hev.”

Dûvre Eladîn bi Meryemê re zewicî û jê xwest ku vegere welatê xwe. Meryema Şahbanû jê re got: “Madem ku tu wisa dixwazî, nexwe rabe, bi min re were!” Ew bi xwe re bir qesra bavê xwe û ew di cîyekî de veşart, piştire derbasî cem bavê xwe bû. Bavê wê çawa çav lê ket, got: “Keça min, ez îro pir dilteng bûme, ka were bi min re rûnê da ku em bi hev re vexwin û bêhna xwe derxînin!” Keçik pêre rûnişt, wî jî gazî xizmetkaran kir û xwest ku sifreya şevbuhêrkê ji wan re raxînin. Sifre raxistin, keçikê jî bênavber ji bavê xwe re şarab dagirt û da destê wî, hetanî ku ji ser hişê xwe çû. Gava ji ser hişê xwe çû, keça wî rabû benc xist nav qeneha şarabê û ew jî dayê. Çawa ku vexwar, li erdê bû term. Meryemê rabû çû cem Eladîn û ew ji cihê wî derxist, jê re got: “Dujminê te ji ser hişê xwe çûye û weke meytekî li erdê dirêj bûye. Êdî tu çi pê dikî, bike!” Eladîn çû cem qiral, dît ku benckirî li erdê dirêjkirî ye. Ew baş girêda û...

Şeveqê lêda û li Şehrezadê bû sibe. Wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 272'YEMÎN

Şehrezadê berdewam kir:

Pîştire Eladîn panzehîrekî li himber bencê da Qiral û ew şîyar kir. Qiral çawa çavên xwe vekirin, dît ku Eladîn û keça wî, di ser diê wî de ne! Bi şaşwazî ji Meryemê re got: “Keça min tu çawa wisa li min dikî!” Meryemê got: “Heger ez keça te bim, tu jî bibe Musulman, lewre ez bûme Musulman. Min rêya rast dît û bi dilekî aram min berê xwe da xwedayê xwe, êdî ez ji rêya Îslamê dernakevim û gunehan nakim. Îcar tu jî ji rêya şaş derkeve, were ser rêya rast; heger na, wê çaxê çûna te ji mana te çêtir e.”

Pîştire Eladîn jî gelekî li ber geriya û şîret lê kirin ji bo ku were ser dinê rast, lê wî qebûl nekir û serî hilda. Eladîn xincera xwe kişand, da ser stûyê wî û ew serjêkir. Pîştire di kaxezekê de peyama xwe nivîsand û danî ser eniya wî. Dûvre jî ew û Meryemê rabûn ser xwe û rahiştin hemû tiştên sivik û buha û ji wir derketin, çûn dêrê. Li wê derê, Meryemê çû ew morîka xwe anî û hêla wê ya neqîşkirî firkand, di cî de nivînek hat pêşîya wê. Ew û Eladîn û Zubeyde El-ûdiye lê siwar bûn, di pey re got: “Ey nivîna pîroz! Tu bi heqê navê Xwedê kî û tu bi heqê hemû nav û tilsim û remz û zanîna li ser vê morîkê kî, me bilind bik û bi hewa xîn!”

Bi wê gotîna wê re nivîn bi hewa ket, firiya û ew birin newaleke rût û bê dar û ber. Meryemê berê her çar hêlên din ji morîkê da azmanan, pîştire rûyê ku nivîn li ser xezkirî bû firkand. Bî wê firkandinê re nivîna ku li ser bûn, berjêr daket erdê. Pîştire rûyê ku merş li ser xêzkirî bû firkand, merşek li erdê hate raxistin, ew jî lê ser rûniştin. Çawa ku me got, ew der newaleke rût bû, ne av lê hebû ne jî nebat. Meryemê berê her çar rûyên morîkê da asmanan û got: “Tu bi heqê navên Xwedê bikî, tê ji me re daran şîn bikî û avê di ber wan re biherikîni!” Di cî de golek avê li ber wan derket û şîndar li derdorê rabûn, bilind bûn. Wan jî têra xwe av jê vexwarin û destnimêja xwe girtin. Dûvre Meryemê her sê rûyên mayîn ji morîkê bi ser rûyê ku sifreya xwarinê li ser xêzkirî bû de qulupand û dua kir, got: “Tu bi heqê navên Xwedê kî, tê sifreyekê xwarinê li ber me raxîni!” Di cî de sifreyek li ber wan hate raxistin û ser wê tijî xwarin û vexwarinên xweş, giranbûha bûn. Ew jî ketin ser de, têra xwe xwarin, vexwarin û kêfa xwe kirin. Îcar em van li vir bihêlin û em vegerin ser rewşa qiralê kuştî.

Gava ku kurê qiral derbasî cem bavê xwe bû ji bo wî agahdar bike, bala xwe dayê ku hatiye kuştin û kaxezek li ser enîya wî ye. Kaxeza ku Eladîn nivîsîbû, xwend û her tişt fêhm kir. Li xwişka xwe geriya, ew nedît. Ji wir çû dêrê û ji pîrê pirsî, wê jî got ji doh êvarê ve, min ew nedîtîye. Gazî lêşkeran kir û ji wan re got: “Zû hespên xwe bînin siwarino!” Pîştire tiştê ku qewimîbû ji wan re got.

Li hespên xwe siwar bûn û bi pey wan ketin, hatin hetanî ku gîhan nêzîkî wan. Meryemê dît ku toz û ecacek bi hewa ketiye û ber bi wan ve tê, mîna ewrekî reş û tarî. Gava ku nêzîktir bû, û toz belav bû, birê wê û leşkerên wî jî xwiya kirin. Birê wê got: “Hûn bi ku ve biçin, hûn ji nav lepên me xelas nabin!” Meryemê ji Eladîn re got: “Di şer û cengê de, tu çawa yî?” Eladîn got: “Ez mîna darekê me! Ez ne dizanim rahêjim şûr û mertal û ne jî rimê bavêjim.” Meryemê rûyê morîkê yê ku hesp li ser xêzkiribû firkand, di cî de hespekî spehî û siwarekî rimbaz derket holê, ket pêşiya wan û bi şûr û rima xwe li wan da, hetanî ku bera gişan da û ew bi şûn de vergerandin.

Meryemê li Eladîn zîvirî û jê re got: “Gelo tu dixwazî herî Îskenderiyê?

Şeveqê lêda û li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birî û bêdeng bû.

ŞEVA 273'YEMÎN

Şehrezadê vegotina çîroka xwe berdewam kir û got:

Îcar Meryemê ji Eladîn re got: “Tu dixwazî biçî Îskenderiyê ango biçî Misrê?” Eladîn got: “Ez dixwazim biçim Îskenderiyê.” Li nivîna xwe siwar bûn û berê xwe dan Îskenderiyê. Di kêlîkekê de gîhan wir. Eladîn Meryem û Zubeydeyê xistin şikeftê û ew çûn bajêr, ji wan re kinc û cil anîn, li wan kirin û ev dane dûv xwe, ew birin dikana xwe ji wir jî ketin rê de û berê xwe dan Bexdê. Di rê de li Ehmed El-denef rast hatin, lewre ew jî diçû Îskenderiyê. Silav li hev kirin, hevdû himbêz kirin û hesreta xwa şikandin. Ehmed mizgînî da Eladîn û got kurê te Esla çêbûye û li ber destê Yasemînê mezin bûye, bûye zilamekî bîstsalî. Piştî çîroka wî ji serî hetanî dawî, jê re got. Eladîn jî çîroka xwe ji serî hetanî binî jê re got. Ehmed şaş û metal ma li himber wê çîroka wî. Piştî Eladîn dîsa bi şûn de vergerandin dikanê xwe.

Roja dîtirkê Eladîn dikana xwe firot. Jixwe Ehmed El-denef jê re goti bû, “Xelîfe te dixwaze û ji vê yekê ez li pey te şandime.” Perên xwe hemû dane ser hev û ji Ehmed re got: “Ez dixwazim di destpêkê de biçim Misrê serîyekî li dê û bavê xwe bidim. Piştî Xwedê mezin e.” Hemû tevde bi hev re siwar bûn li qantirên xwe û berê xwe dan Misrê, hatin taxa El-Esfer, ku mala bavê wî li wir bû û çû ber derî, lê da. Diya wî ji pişt derî gazî kir û got: “Piştî çûna hezkiriyan, gelo kî li deriyê me dide?” Wî jî got: “Ez Eladîn im!” Diya wî derî lê vekir û ew hilda himbêza xwe û têra xwe ew maçî kir hetanî ku jê têr bû. Piştî, ew û herdu jinên wî û Ehmed El-denef û zilamên wî derbasî hundur kirin û pir qedrê wan girt. Hemû sê rojan li wir man, bêhna xwe derxistin, Eladîn jî hesreta dê û bavê şikand, piştî xwest ku here Bexdê. Bavê wî got: “Li cem min bimîne kurê min!” Eladîn got: “Ez nikarim bêyî Eslan bijîm!”

Eladîn dê û bavê xwe jî bi xwe re bir û gişan bi hev re berê xwe dan Bexdê. Gava gişan wir, Ehmed El-denef derbasî cem xelîfe bû û mizgîniya vegera Eladîn dayê û çîroka wî jê re vegot ji serî hetanî binî. Xelîfe rabû ser xwe û kurê wî Eslan jî bi xwe re bir û çû pêşiya Eladîn ji bo ku wî pêşwazî bike. Çawa rastî hev hatin, hevdû himbêz kirin û hesreta xwe şikandin. Piştî, xelîfe ferman da, got: “Ey Eladîn, eva ye dujminê te li ber destê te ye, de êdî tola xwe jê hilînê!” Eladîn, şûrê xwe kişand û serê Ehmed Qumqum firrand.

Dûvre, xelîfe şahîyeke mezin li dar xist bi mûnasebeta vegera Eladîn bi saxî û selamatî. Di heman demê de gazî qadî û şahidan jî kir û mehra Meryema Şahbanû lê birrî. Di heman rojê de daweta wî li dar xistin û êvarî Eladîn derbasî cem Meryemê bû, di nav nivîna wê de raket, pê şa bû.

Kurê xwe Eslan kir serkirdeyê sittin û xelateke mezin jî da wî. Hemû bi hev re di nava xweşî û başî û bextewariyeke mezin de jiyan, hetanî ku xerabkarê bextewariyê rêya xwe bi wan xist û ew ji hev belav kirin.

Şehrezadê axaftina xwe berdewam kir û got: “Şahînşahê min ê gewre û mehrîban, îcar ev çîroka ku min got, li himberî hinek çîrokên din, ne tutîşt e!” Şehreyar got: “Çi li ba te hebe, ka ji min re bibêje!”

(ÇÎROKA HATIMÊ TÂÎ)

Şehrezadê got:

Şahînşahê min ê bextewar! Gelek çêrokên comerdan hene û yek ji wan jî Çîroka Hatimê Taî ye. Tê gotin ku gava ew ciwamêr mir, ew li serê çîya-yekî veşartin û li ber gora wî, du hawiz çêkirin di tehtan de. Di heman teht û zinaran de, peykirên keçên porvekirî çêkirin.

Di biniya wî çîyaî de çemek hebû ku ava wî timî diherikî. Îcar gava ku xelk di wir re derbas dibûn û li ser wî çemî diman, şev pê de dengê qajewajekê dihate wan û gava dibû sibeh, tukes li wan deran nedidîtin ji xeynî peykerên wan keçên porvekirî.

Rojekê Emîrê keran Zûlkîra di wir re derbas bû û di wê newalê de navber da meşa xwe, li wir sekinî ji bo ku bêhna xwe vede. Gava ku şev hat û ew jî li wir raket, ew dengê qajewajê bihîst û got: “Ev çi qajewaj e, gelo çi li serê vî çîyaî heye?” Kesên li derdorê jê re gotin: “Tirba Hatimê Taî li wir e û li kêleka jî du birkên avê hene û li gel wan jî peykerên keçên porvekirî di tehtan de kolandî ne. Kesên ku li vir dimînin, her şev vî dengî dibihîzin.” Emîrê keran Zûlkîra henekê xwe bi Hatem kir û got: “Ey Hatimê Taî! Qaşo tu bi comerdiya xwe tê nasîn, lê vaye em li te bûne mêvan û em hîna birçî ne!”

Piştire xewê zora wî bir û di xew re çû. Lê ji nişkê ve cefilî û ji xew veciniqî, şîyar bû û ji kesên derdora xwe re got: “Erebino, zû rabin bi min ve werin û wê deveya min bînin.” Çawa ku deve anîn cem wî, di cî de serjê kir, goştê wê hûr kir, biraşt û hemû li ser rûniştin, ew xwarin. Dûvre xelkê jê pirsin, gotin: “Te çima wisa kir?” Zûlkîra got: “Min Hatem di xewna xwe de dît, hat cem min û şûrek di destê wî de bû. Ji min re got: “Tu hatiye mêvantiya min û xwarineke ku ez bidim te li ba min tune. Piştire deveya min serjêkir bi wî şûre xwe. Jixwe ku min niha ew serjênekira jî dê deveya min bimira, lewre Hatem şûrê xwe lê dabû.”

Gava bû sibe, Zûlkîra li deveyeke hevalekî xwe siwar bû û ew li pişt xwe kir û rêya xwe wisa berdewam kir. Nîvrokî, bala xwe danê ku zilamek ji wê ve tê, li deveyekê siware û ber bi wan ve tê. Gava ghişt cem wan, jê re gotin: “Tu kî yî?” Zilam got: “Ez Êdey im, kurê Hatimê Taî me.” Bêhna xwe berda û axaftina xwe berdewam kir, got: “Emîrê keran, Zûlkîra kîjan ji we ye gelo?” Wan jî Zûlkîra nîşanî wî dan û gotin: “Ev e!” Êdey got: “A ji te re ev deveya han, lê siwar bibe, li şûna ya te ya ku bavê min ew ji te re serjêkir.” Emîrê keran got: “Û kê ji te re got!” Êdey got: “Îşev hat xewna min û ji min re got ‘Ey Êdey, Emîrê keran hat mêvantiya min û tiştê di mal de tunebû, min jî deveya wî jê re serjêkir. Îcar deveyekî bibîne û zû pê ve bigihîne ji bo ku lê siwar bibe!’ ”

Zûlkîra, şaş û metal ew deve ji destê Êdey girt û lê siwar bû, çû, rêwi-tiya xwe berdewam kir, piştî ku behetî ma li comerdiya Hatim!

Ev jî çîroka ‘Hatim ê Taî’ bû, niha ez ê ji we re ya ‘Man Bin Zaîde’ bêjim.

(ÇÎROKA MAN BÎN ZAÎDE)

Rojekê ji rojan Man Bîn Zaîde derket seyî û nêçîrê. Piştî demekê tî bû û av bi xulamên xwe re nedît. Di nava bêçaretîya wê avê de, bala xwe dayê ku sê jin ber bi wan ve tên û her yek ji wan kûzekî avê li ser milê wê ye...

Şevqê lêda û li Şehrezadê bû sibe, wê jî vegotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 274’EMÎN

Şehrezadê berdewam kir û got:

Her sê keç gihan hinda wan, Man av ji wan xwest. Wan jî av dane wî. Man ji xulamên xwe xwest ku hineke dirav bidin wan, di ber wê ava wan de. Lê belê tiştê bi kesî ji wan re tunebû. Wî jî rabû ji kêleka xwe sê tîrên serbizêr derxistin û her yekê ji wan, tîrek dayê û rêya xwe berdewam kir.

Wê gavê keçikekê ji wan ji hevala xwe re got: “Hebe nebe ev zîlamê han Man Bîn Zaîde ye. Lewre ev mezyeteke wî ye û tukesî din wisa tevnagere. Vî zîlamî pesindanek heq kiriye, ka werin her yekê ji me, em çend ristan di derbarê wî de bibêjin!”

Keça ewil got:

Sertîrên zêrîn bi darikên xwe vedike ev camêrê han
Bi kevanê xwe jî comerdîyê dibarîne bi ser dujminan de
Lewre birîn jî carinan dibin derman ji gelekên re
Carinan jî kefen pêwîstin ji kesên ku di gorê de

Keça duduyan got:

Ew qasî comerd e ku bi tîrên xwe qencîyê belev dike
Comerdîya xwe bê cûdahî bi ser dost û dujminan belav dike
Tîrên xwe jî ji comerdîyê saz dike ev camêrê cîwan
Da ku şer jî wî berbend neke ji belavkirina qencîyan

Keça sîsyan jî got:

Ji ber hezkirinê qet venagire li ber kesî ew destê xwe
Ji ber comerdîya xwe jî ew tîrên zêr davêje dujminê xwe
Da ku ew jî bi wê tîra han derman bike ew birîna xwe
An jî pê kefenekî bikire ji xwe re bo bipêçe termê xwe

Tê gotin ku rojêke din ji gava ku Man Bîn Zaîde, li gel hevalên xwe çûbû seyd û nêçîrê, keriyekî xezalan ber bi wan ve hat. Li wê derê ji hev belav bûn û her yekî ji wan da dûv xezalekê û bi pey ket. Man jî li dû yekê çû, ew girt û serjêkir. Di wê navberê de dît ku zîlamek li kerê xwe siwar e û ber bi wî ve tê. Di cî de li hespê xwe siwar bû û çû pêşîya wî. Gîha cem wî, silav lê kir û jê re got: “Tu ji ku tê û bi ku ve diçî?” Zîlam got: “Ez ji warê Qetaa tîm. Warekî bejî bû, lê îsal min axa wî rakir û çand, Ecûrê ku min ew çandibû zû ber da û berî mewsîmê xwe gihişt. Min jî ecûrên baş jêkirin û niha ez diçim cem Emîr Man Bîn Zaîde, da ku ez wan ji wî re bibim. Lewre ew mirovekî camêr û destvekirî ye.” Man jê re got: “Tu çiqasî jê hêvî dikî?” Wî jî got: “Hezar dînarî jê hêvî dikim ku bide min!” Man got: “Lê heger ew ji te re bibêje ev buhayêke mezin e?” Zîlam got: “Ez ê bibêjim pêncsed dînar.” Man got: “Lê heger bibêje ew ji zêde ye?” Zîlam got: “Ez ê bibêjim sed dînar.” Man got: “Lê heger bibêje ew ji zêde ye?” Zîlam got: “Ez ê bibêjim pêncî dînar.” Man got: “Lê heger bibêje ew ji pir e, tê çawa bikî?” Zîlam got: “Ez ê ewkê kerê xwe di ewkê diya kim û destvala vegeim malê!”

Man bi wê gotina wî kenîya û hespê xwe ajot, li dû leşkerên xwe çû, xwe gîhand wan û çû mala xwe. Gava derbasî hundur bû jî, ji xulamê xwe re got: “Heger yekî li kerê siwar hat û ecûr pê re hebin, wî derbasî hundur bike.”

Piştî demekê ew zilam hat, xulam jî izin dayê û ew derbasî hundur kir. Zilam derbasî cem Man bû û tê dernexist ku yê bi rê de lê rast hat ew e. Lewre Man, pir bi heybet xwiya dikir li ser wî textê ku li ser rûniştî bû û ew zilamên ku li pêş û paş û çep û rastê wî sekinibûn. Gava zilam silav lê kir, Man got: “Ey birayê Erebb, tu hatiye vir ji bo çi?” Zilam got: “Min ecûrin virnî ji Emîr Man re anîne bi hêviya ku wan ji min bikire!” Man got: “Tê wanan bi çiqasî bidî min?” Zilam got: “Bi hezar dînarî!” Man got: “Ev pir e!” Zilam got “Pêncsed dînarî.” Man got: “Pir buhayê!” “Bi dused dînarî.” Man got: “Çênabel!” Zilam got: “Sed dînarî.” Man got: “Wisa jî nabe.” Zilam got: “Bi pêncî dînarî.” Man got: “Nabe.” Zilam got: “Bi sih dînarî” Man got: “Pir e!” Zilam got: “Bi Xwedê ew zilamê ku bi rê de ez lê rast hatibûm jî ji te bêhêvî bû. Lê ez kêmi sih dînarî nadim te.”

Man kenîya û bêdeng bû. Zilam nû tê derxist ku yê bi rê de lê rast hatibû, ew bi xwe bû. Rabû jê re got: “Mîrzayê min, heger tu sih dînarî nedî min, vaye kerê min li ber derî girêdayî ye û vaye Man jî li vê derê rûniştî ye!” Wê gavê Man kenîya û hey kenîya hetanî ku zikopiştî bû. Piştî gazi wekilê xwe kir û jê re got: “Hezar dînarî, pêncsed dînarî, sêsed dînarî, dused dînarî, sed dînarî, pêncî dînarî û sih dînarî bide vî zilamî û bila wî kerî jî girêdayî bihêle li wê derê.” Zilam hem behetî ma, hem jî bi kêfxweşîyeke mezin duhezar û sed û heştê dînar girt û çû. Rehma Xwedê li gişan be.

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî vegotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 275’EMÎN

(ÇÎROKA BAJAROKÊ LEPTA)

Şehrezadê vegotina xwe berdewam kir û dest bi çîrokek nû kir:

Şahînşahê min ê bextewar, tê gotin ku bajarokekî bi navê Lepta hebû ku paytexta welatê Romê bû. Qesreke derîgirtî jî tê de hebû ku tu caran kesî deriyê wê venedikir. Her ku melîkekî wan dîmir û yekî din dihate şûna yê çûyî, xilqeke nû li derî dida. Bi wî hawî berdewam kir hetanî ku bîst û çar xilq li wî derî hatin xistin.

Her melîkekî xilqek lê da. Piştî wan, zilamek hat şûna wan, bû desthilatdar ku ne ji sûlaleyê wan bû. Xwest ku wan xilqan veke ji bo ku binêre bê çî di wê qesrê de ye. Lê karmend û mezinên dewletê li himber wî derketin, rexne kirin û ew hişiyar kirin. Lê belê wî jî qebûl nekir û got: “Misoger divê ez deriyê vê qesrê vekim.” Çi di destên wan de hebû ji mal û mulk û zexîre û diravan ji dest xwe berdan ji bo ku derî nedin vekirin, lê melîk ji ya xwe venegeriya.

Di encamê de melîk deriyê qesrê vekir û derbasî hundurê wê bû, dît ku wêneyên siwarin Erebi li ser dîwarên wê hatine neqîşkirin tev li hesp û şûr û rimên wan, bi hemû heybeta xwe, bi hemû spehîbûna xwe. Li wê derê pirtûkek li ber çavên wî ket, çû rahiştê û vekir, xwend. Tê de digotin: “Heger ev derî vebe, dê Erebi zora vî bajarokî bibin û wê bixin destê xwe de. Ew Ereben ku werin vir jî, dê mîna evên di wêneyan de bin. Loma baldarî, baldarî, baldarî û disa baldarî! Vî derî qet venekin!”

Ew bajarokê Lepta li Endelûsê bû. Jixwe di heman salê de, Tariq Îbîn-Ziyad ew welat vekir û desthildariya wî xist destê xwe. Ew bûyer jî di dema xîlafeta El-welîd Bin Abdûlmelîk ê Benî-Umeyye de bû. Îcar ew Melîkê ku deriyê wê qesrê vekiribû, bi awayekî hovane hatê kuştin, welatê wî Lepta jî hate talankirin, jin û zarok û pezê wê jî hemû weke xenîmet hatin desteserkirin û xelkê wê ji xwe re kirin cêrî û xulam. Ne ew tenê jî, zexîreyeke mezin tê de hebû ku bê hed û hesap bû. Li gel sed û heftê tacên ji dur û yaqûtan, li gel gelek kevirên din ên giranbuha ku bi dest kesî nediketin. Tew eywanin wisa raxistî bi ber û tejbên Ecemî hebûn ku bi qasî gasînan firebûn û tijî sênî, lalîk û beroşên zîv û zêr bûn.

Tiştên ku Tariq Bin-Ziyad li wî welatî dîtîbûn, ne ew tenê bûn. Sifreyeke xwarina raxistî dît ku sifreyeke wisa li ber pêxemberê Xwedê Suleyman eleyhîsselam nehatibû raxistin; lewre hemû lalîk ji zûrudê kesk bûn. Ev sifreya ku hetanî niha jî li bajarê Romayê tête parastin bi hemû firaxên xwe yê zîv û zêr û zebercedên giranbuha. Disa li wî bajarokî zebûrek dîtî ku bi zimanê Yewnani hatibû nîvisandin, li ser rûpelên zêrin ên ku bi cewheran hatibûn xemilandin. Pirtûkek din jî tê de dît bu behsa fêdeyên kevirên giranbuha û gund û bajar û tilsim û zanînen kimyawî dikir. Pirtûkek din jî dît ku behsa çekirina kevirên giranbuha û jehr û dijhehrê dikir. Disa nexşenîgariya erd û derya û bajar û madenan li wir dît. Odeyeke tijî îksîra ku derhemekî dike hezar derhem û zîv dike zêr jî, li wir dîtî. Awêneyeke mezin î girover li wir dîtî ku ji Sultan Suleyman re hatibû çekirin; gava mirov tê de li xwe dinêrî, heft demsal bi mirov re tê de xuya dikir. Tebeqe yeke yaqûtê Behremanî li wir dît ku nayê pesindan.

Tariq Bîn-Ziyad, ev hemû birin ji El-Welîd Bîn Abdûlmelîk re. Ereben ku ketibûn Îspanyayê jî li nav bajar û bajarokên wê belav bûn û dest danîn ser hemû hebûnên wî welatê maldar û xweş, ku welatekî herî xweş bû di dinyê de.

Niha jî ez ê çîrokek din bêjim.

(ÇÎROKA HÎŞAM BÎN EBDILMELÎK Û KURIKÊ EREBAN)

Disa tê gotin ku rojekê, Hîşam Bîn Abdûlmelîk derketibû seyda û nêçîrê

û ji nişkê ve li xezalekê rast hat. Kûçik û tajiye xwe berra pey wê dan û ew jî bi dû wan de çû. Lê hîna wisa li pey diçû, dît ku ciwanek ji aliyê din ve tê û keriyekî mihan li ber wî ye. Hîşam qîrek dayê û got: “Ciwano! Hela pêşiya wê xezalê bigire û wê ber bi min ve bîne!” Kurik serê xwe rakir, berê xwe da wî û jê re got: “Ey nezanê qedr û qîmet! Çima tu bi çavekî biçûk li min dinêre û bi gotinên xwe min kêmkirî? Gotin û awaftina te ya zirzopa ne û liva te ya keran e!” Hîşam got: “Wey! Qey tu min nas nakî ku tu wisa bi min re diaxive?” Kurê ciwan got: “Bê edebîtiya te, tu bi min da naskirin. Lewre tu bi min re axivî beriya ku tu silavê li min bikî!” Xelîfeyê Emewî hêrs bû û got: “Kêmaqilê debeng ez Hîşam Bîn-Ebdîlmelik im!” Ciwanê Erebb got: “Xwedê warê te nêzikî warê me neke û hezkirina gora te bi me re peyde neke! Tu çî zilamekî pîrgotin û kêmkirin î?”

Hîna kurik ew gotina xwe kuta nekiribû, leşkerên xelîfe derdora wî girtin ji her çar helan ve. Hemûçikan jî bi hev re digot: “Silav li ser te bin Emîrê Bawermendan!” Hîşam jî got: “Dev ji van gotina berdîn û wî ciwanî bigirin!”

Şeveqê lêda û li Şehrezadê bû sibe, wê jî vegotina çîroka xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 276'EMÎN

Şehrezadê berdewam kir û got:

Çawa ku me got, leşkaran dora wî ciwanî girtin û ew derdest kirin. Hîşam dev ji nêçîrê berda û vegeriya qesra xwe, derbasî meclîsa xwe bû û jî karmendên xwe re got: “Kanî wî kurê koçer bînin!” Ew anîn huzura wî. Gava ku kurik ew pîrbûna bende, xulam, cêrî û karmendên li wir dît, ne guh da wan, ne jî li wan pîrsî; serê xwe berra ber xwe da û tenê ber nigên xwe nêrî û meşiya hetanî ku gîha raserî Hîşam Bîn-Ebdîlmelik. Li wir, bêdeng sekinî bêtî ku lêvên xwe ji ser hev rake û silavekê lê bide. Xulaman jê re gotin: “Sehê Ereban, tu çima silavekê nadî Emîrê Bawermendan?” Kurik li xulaman zîvirî û bi hêrs li wan nêrî, got: “Kurtanê kerê! Tîştê ku nehişt ez silavê bidim, rêya dirêj û ewqase pêlikên derenceya ku ez pê ve hilkişiyam bû!” Hîşam ê ku pîr qehîrbû got: “Sûtalê debeng, wisa xwiya dike ku tu di roja mirina xwe de hatiye vir, ne hêvî û ne jî temanê te maye!” Kurikê ciwan got: “Ey Hîşam bi Xwedê heger roja min hatibe, temenê min ne kêmkirî dibe ne jî zêde û gotina te jî ne fêdê dide min ne jî zirarê.”

Wê gavê xizmetkarê xelîfe bi serde çû û got:

“Ey rezîltirînê Ereban, qey pîsîtiya te gîhaye wê radeyê ku tu gotin bi gotin bersiva xelîfe bidî?” Kurikê ciwan bi lez bersiva wî da û got: “Dînê

berradayî! Xwedê hiş di serê te de nehêle, qey te nebihîstiye ku xwedayê me gotiye ‘Wê rojek were ku dê her kes bi nefsa xwe re têkoşînê bike!’ ” Wê gavê Hîşam pir hêrs bû û got: “Ey cellad! Ka serê vî xulamî bifirrîne! Lewre pir axivî û lome tê de neman!”

Cellad bi destê wî girt, ew bir ser dika xwînrijandinê, şûrê xwe kir-şand, danî ser stûyê wî û ji xelîfe izin xwest, got: “Ey Emîrê Bawermendan! Vî koleyê te yê gunehkar sûcekî giran kir, gelo ez xwîna wî birijînim?” Xelîfe got: “Erê.” Dûvre cara duduyan jî izin jê xwest, xelîfe dîsa izin dayê. Lê gava ku cara sisîyan izin ji xelîfe xwest, kurik tê derxist ku heger xelîfe vê carê jî izne bide wî, wê cellad serê wî bifirrîne. Rabû pîrqînî pê ket û kenîya hetanî ku memikên guhên wî sor bûn. Hîşam hîn behtir qeherî û jê re got: “Kuro qey tu mirovekî dîn î, ango hişê te ne li serê teyî? Qey tu nabînî ku wê serê te were jêkirin, tu radibî wisa bi xwe dikenî?” Kurik got: “Emîrê Bawermendan, heger dawîya emir hatibe, piçek derengxistin an jî piçek pêşvexistin, tu fêdeyê nadê min, lê te bi van gotinên xwe, çend ristek anî bîra min, kerem bike lê guhdar bike, ji xwe kuştina min di nav lepên te de ye!” Hîşam got: “Ka bibêje û dirêj neke!” Kurik wisa got:

Min bihîst ku rojekê bazek li çûkekî rast hat
Baskê xwe li hev dan çûk bi lapûşkan ve hat
Xeber da çûkî di nav lapûşkan de baz jî her difiriya
Çûk digot tu ne yekî ku bi goştê min têr bixwe ha
Ger te xwar jî ez feqîrê Xwedê kî ye gelo riswa
Baz kenîya, lê behetî ma, piştî jî ew berda

Bi van gotinê wî re, xelîfe beşîşî û got: “Bi heqê Xwedê û bi heqê mer-vantiya min û resulê Xwedê, heger di serî de ev gotin bigotana û çi ji min bixwesta, min ê bidayê!” Piştî li xulamê xwe zivirî û axaftina xwe ber-dewam kir got: “Rabe devê wî tijî cewher bike û xelateke baş bide wî!” Xulam rabû fermana xelîfe pêk anî û tiştên ku gotibûn, hemû dane wî ku-riki. Ew jî derket û bi rêya xwe de çû.

Ev çîroka me jî xelas.

(ÇÎROKA ÎBRAHÎM ÎBNÎL MEHDÎ Û EL-MAMÛN)

Tê gotin ku dema xîlafet ket destê El-Mamûn kurê Harûn Reşîd de, apê wî Îbrahîm El-Mehdî biêt jê re nekir, xîlafeta wî qebûl nekir û angaşt kir ku xîlafet heqê wî ye û giliyê xwe li cem Meclîsa Şewrê kir. Biraziyê wî El-Mamûn hebekî xwe lê ragirt û li hêviya wî ma ku vegere ser rê û xîlafeta wî qebûl bike. Lê Îbrahîm Îbnîlmehdî ew angaşt xwe salek û yazde mehan û duwazde rojan berdewam kir û reviya çû li bajarê Reyê bi cih bû. Herî dawî bêhna El-Mamûn teng bû, sebra wî nema, rabû li hespa xwe siwar

bû, zilam û xulam û xizmetkarên xwe dan kêlaka xwe û berê xwe da Reyê, ket pey Îbrahîm El-mehdî de. Gava ku ev agahî çû ji Îbrahîm re, rewş hate guhertin.

Îbrahîm El-Mehdî got: “Çawa min bihist ku El-Mamûn û zilamên xwe ketine pey min de, ez tirsîyam ku ez bême kuştin û nigên min li hev ketin min nema dizanîbû bê ez ê çi bikim, çawa bikim. Nîvrokî ez ji mala xwe derketim bêyî ku ez bizanibim bê ez bi ku ve diçim. Herî dawî ez ketim jikakekê û min dît ku dawîya wê rêkork e; min ji xwe re got lahwelê wele qewete îlla billah, îcar mirina min hatiye! Ez bi şûn de vegeyîyama bi wan kincên xwe yê veşartinê, dê gelean gûman ji min bikirana, ez venegeriyama jî dereke ku ez pê de biçûma tune bû! Di wê navberê de çavên min li koleyekî reş ket, ku di dawîya sikakê de, di devê derîyê xwe de sekinîbû. Ez ber bi wî ve çûm û min jê re got: “Gelo cihek li cem te heye ku ez tê de bimînim hetanî ku şev bê?” Got: “Belê, heye.” Û derî ji min re vekir, ez derbasî hundur kirim. Maleke paqij û raxistî bû bi kulav û çerm û balîfan. Kole jî piştî ku ez xistim hundur de, derî li ser min girt û çû. Gûman bi min re çêbûn û min ji xwe re got: “Wisa xwiya dike ku çû giliyê min bike û min bide girtin!” Qûna min nema erd girt û ez mam li ser agir, di nava bêcaretiyeke pîs de.

Hîna ku ez wisa diponîjim, min bala xwe dayê ku vegeyîya û barkêşok jî pê re bû ku ser pišta wî tije nan û goşt û beroşên nû û kûz û amûr û şerbik. Barê ser pišta barkêş danî û li min zîvirî ji min re got: “Ez mirovekî hîcamkar im û ez ê xwe bikim bi qurbana te, ezbenî! Helbet ez dizanim ku dilê te nabije vê rewşa min a jiyani. Lê ev xwarin û firaxên ku min niha ji te re anîne, destê kesî bi wan nebûye. De êdî dilê te çawa dixwaze, wisa ji xwe re çêbike û bipijîne.”

Îbrahîm got: “Rabû min ji xwe re xwarineke xweş çêkir û ez ketim ser de hetanî ku min têr xwar. Nayê bîra min ku careke din min xwarineke weke wê xweş xwariye. Îcar piştî koleyê reşik ji min re got ‘Mîrzayê min, Xwedê Teala ez kirime xizmeta te, îcar em hinekî bi hev re vexwin wê çawa be? Tê gotin ku mey, kul û derdên mirov dibe û barê mirov sivik dike!’ Min jî jê re got ‘Ji bo ku ez wensa Hîcamkarê xwe bînim, ez nabêjim na!’ Rabû çû ji min re sênî û şûşe û qedehên camîn anîn ku hîna kesî destê xwe nedabû wan û got ‘Canê te çawa dixwaze û kîjanê dixwaze wê meyê ji xwe re dagire!’ Min jî meyeke xweş û hêja hîlbijart û bera qedeheke nû da û vexwar. Piştî ew rabû çû qedehcam û şerbikin nûtir anîn û got ‘Gelo tê izne bidî min ku ez xwe bidim kêlekekê û meyekê li gora xwe vexwim?’ Min jî got ‘Li gora kêfa xwe tevbigire û rehet be!’ ”

Şevqê lêda û li Şehrezadê bû sibe, wê jî vegotina çîroka xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 277'EMÎN

Şehrezadê berdewam kir:

Îcar Îbrahîm Îbnîl Mehdi axaftina xwe berdewam kir û got: “Min jî ji wê meya xweş vexwar û hey vexwar hetanî ku bandora wê li ser min çêbû û pêleke germahîyê li laşê min da. Wê çaxê Hîcamkar rabû ser xwe, deriyê dolabekê vekir ûdek jê derxist û ji min re got ‘Mirzayê min, ne hedê min e ku daxwaza stran û newayan li te bikim. Lêbelê rêzdarî û rûmetdana te hêzek da min ku tiştekî wisa ji te bixwazim, dîsa ray û biryar a te ye. Min jî daxwaza wî pejirand û rahişt ûdê ji destê wî girt. Hîna min ûd akord dikir, malbat û zarokên min hatin bîra min, bi wê hesreta wan, min stra û got:

Ê ku rê nişanî Ûsiv da û rûmet da wî di zindanê
Dibe ku dua me jî qebûl ke me bîne gel hev li malê
Helbet dikare wisa bike Xwedayê mezin vê carê

Bi van gotinên min re, ew jî ços bû, ûd ji destê min girt, lê da û got:

Şev pê de me gilî û gazinên xwe kirin ji dostan
Wan jî digot bavo çiqasî kin in ev şevên han
Lewre xewa şevê zû digirte ser çavên wan
Lê belê qet nêzîkî çavên me nedibû ew xewa han
Gava şevên xedar tûşî evîndar û dildaran dibin
Tirseke me digire lê gava diçin em jî her şa dibin

Min jê re got ‘Bi navê Xwedê te pir xweş got ey mirovê şareza û hişmend! Te kul û kederên min giş birin, de kanî berdewam bike û helbestin din jî bibêje! Wî jî berdewam kir û got:

Gava ku rûmeta mirov têk neçe bi bêbextiyê
Çi cilan li xwe bike jî her ew xweşik û rind in
Wê dev avête min bi hindikbûna dost û mirovan
Min jî got ku kesên comerd jixwe her hindik in
Em hindik bin wê çi bibe gava cîranê me pir bin
Gava cîranê me pir bin û yên xelkê hindik bin
Em qewmekî dilsoz in em kuştina kesî naxwazin
Lê gava ku rûmet li holê be em ji mirinê natirsin
Belkî evîna dadê temenê me kin ê wan dirêj bike
Lê dîsa jî em xera nakin soza xwe bi tu kesî re
Lew ku înkâr bikin ên din hemû soz û peymanên xwe

Gava min ev gotinên wî guhdar kirin, ez şaşwaz bûm bi van helbestên wî yên ku mirov mest dikirin. Di ber wan newayên ûda wî re ez di xew re çûm û incex piştî muxrub ez bi ser xwe ve hatim, şiyar bûm ji xew. Çawa ez şiyar bûm, min ser çavên xwe şûst. Piştê ez fikirîm, min dît ku ez nikarim herim bêyî ku ez vî ciwanmêrî agahdar bikim. Min ew ji xew rakir û tûri-

kekî dînanan derxist, da wî û min jê re got ‘Bi xatirê te dosto! Va ye ez diçim û ez hêvîdarim ku tu wan dînarên di tûrik de ji xwe re xerc bikî. Lewre qenciya te pir çêbû li min, te ez ji tirsê parastim. Lê belê wî tûrikê dînanan li min vegeand û got ‘Ezbenî, qedrê me balengazan li ba we nîne, lê belê ji ber ku ez jî mirovakî xwedî rûmet im, ez ê çawa diravan ji te bîstînim di ber mana te ya vir de, mêvantiya ku min nîşan daye! Îcar heger tu di ya xwe de israr bikî û tu wî tûrikî bi ser min de bavêjî, ez ê xwe bikûjim!’ Bê dilê xwe min rahişt tûrikê dînanan û ez rabûm ser xwe, meşiyam. Rahiştina wî tûrikî pir giran hat bi min. Lê hîna ez di devê derî de bûm, min dengê wî bihîst, got ‘Begê min, ev der ji te re ewletir û çêtir e. Tu giraniya te li ser min tune, li cem min bimîne hetanî ku Xwedê rêyeke xêrê ji te re veke!’ Ez lê vegeriyam û min jê re got ‘Bi şertê ku tu ji tûrikê min xerc bikî, ez ê li ba te bimînim?’ Serê xwe bi erênî hejand, ez jî li ba wî mam û min rojên xwe di nava xweşî û şahîyê de derbas kirin. Lê belê min bala xwe dayê ku tiştê ji tûrikê min kêr nabe! Wijdanê min qebûl nekir ku ez ji kîsê wî bijîm di nava wê xweşîyê de. Rojekê ez rabûm, min kincên jinan li xwe kirin, xwe xemiland û ez ji mala wî derketim, çûm. Min lêz de meşa xwe hetanî ku min pirr derbas kir, piştê ez ketim kolanekê û rastî malekê hatim ku deriyê wê vekiribû û jinek li hêwanê bû. Min jê re got ‘Xatûna min, li min were rehmê û min di mala xwe de bisitirîne, lewre kujerên min di pey min de ne û ez ditirsim.’ Jinikê got ‘Ser seran ser çawan, derbas be hundur birawo!’ Ez birim odeyekê, doşkek ji min re danî, xwarin û vexwarinek ji anî û got ‘Bila dilê te aram be, tu kes bi te nizane!’ Ez ji bi dilekî rehet li wir mam.

Gava bu êvar û tarî ket erdê, min dîsa kincên jinan li xwe kirin û ez ji mala wê derketim. Ez bi lez meşiyam û hatim mala xizmetkareke me ya berê. Çawa ku çav li min ket, girîya, êşiya û got ‘Şikir ji Xwedê re ku tu sax î û bi selamet î.’ Piştê derket, min jî got belkî diçe sûkê ji bo ku qedrê min bigire bi amadekirina şîvekê. Hîna ez di nava wan fikaran de bûm, min dît ku Îbrahîmê Mûsilî û leşker û zîlamên xwe ber bi malê ve tên û jinek jî di pêşiya wan de ye. Min baş lê nihêrî, min tê derxist ku ew xizmetkara me ya xwedîya malê ye. Jinikê ew anîn ser min û ez dame girtin. Êdî mirina min pir nêzik bûbû. Bi wî halê min û di nava wan kincên jinan de, ez birim cem El-Mamûn.

El –Mamûn diwana xwe li dar xist û ez derxistim pêşîya diwanê. Çawa ez derbasî cem wî bûm, min silava xîlafetê lê kir. Wî got ‘Ne bi xêr û ne jî ser çavan!’ Min got ‘Emîrê Bawermendan, bêhna xwe fireh bike, jixwe qassas dikare tola xwe hilîne û dikare efû ji bike. Lê belê efû, nêzîktirî bawermendan e. Xwedê Teala efûkirina te di ser hemû efûkirinan re girtiye û gunehê min jî di ser hemû gunehan re girtiye, lewre ji hemûçikan girantir e. Heger tu tola xwe ji min hilînî, mafê te ye û heger tu efû bikî jî, ji mezinahiya te ye.’ Piştê min ev çend rist ji helbestekê got:

Gunehê min mezin e û tu ji wî mezintire
De êdî mafe xwe bigire û li min nebuhure
Ango bibuhure ger ez ne ji comerdan bim

El-Mamûn serê xwe rakir, min berdewam kir û got:

Min gunehekî mezin kir û tu efûkar î
Ger tu li min bibore serbilindîya te ye
Ger te ez ceza kirim jî ew mafê te ye

El-Mamûn, serê xwe berra ber xwe da û got:

Gava dostek min hêrs dike bi helwestekê
Gava bêhna min teng dike bi kiriyaçekê
Efû dikim ez gunehên wî, qet lê nagirim
Lewre ez ji jiyaneke bê dost pir bi tirsim

Şeveqê lêda û li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bedêng bû.

ŞEVA 278'EMÎN

Şehrezadê berdewam kir:

Îbrahîm Îbnîl Mehdi axaftina xwe berdewam kir û got: “Gava min ev gotin ji devê El-Mamûn bihîstin, dilê min aram bû û bêhna min hate ber min. Piştî El-Mamûn li kurê xwe Abas, birê wî Ebû-Îshaq û hemû dost û nasên xwe zivîrî û ji wan re got ‘Em çi pê bikin?’ Hemûçikan kuştina min xwestin. Lê belê li ser şiklê kuştinê li hev nekirin. Wê gavê El-Mamûn ji Ehmed Bin-Xalîd re got ‘Tu çi dibêji Ehmed?’ Got ‘Emîrê Bawermendan, heger tu wî bikujî, jixwe me gelekên wisa dîtine; lê heger tu wî efû bikî, jixwe em kesî mîna te nabînin.’ Gava El-Mamûn ew gotinên Ehmed bihîstin, serê xwe berra ber xwe da, ponijî û gotina helbestkarekî got:

Birayê xwe bibexşîne gava ku gunehekî bike
Bila qencîyeke te li gel wî be lew ku fêma neke
Pê de mexeyide ger rojekê rêya xwe şaş bike
Her dildar bişopîne û biratiya xwe ji bir neke
Çêja temenê dirêj ewe ku qolinc nekevênê
Çêja xewa dirêj ewe ku kabûs nekevêyê
Gulên di distê guldan de li ser şaxê daran e
Kî heye ku qet guneh nekiriye di emran de
Kî heye ku herdem qencî kiriye di rojan de
Kî heye ku herdem spehî ye di nav kêfan de
Ger derbas bikî zeman bi wan re di azmûn de
Tê bibînî ku gelek ji wan mîna kefê her pûç e

Gava min ev rist ji devê wî bihîstin, min tê derxist ku stûyê min ji şûr filitiye. Bi dengê bilind min tekbîrek da û got ‘Bi navê Xwedê, Emîrê

Bawermendan ez efû kirim!’ Wî jî got ‘Tişteke nabe Apocan!’ Min got ‘Lê belê gunehê min mezintir e Emîrê Bawermendan. Ew qasî mezin e ku mazeret jê re nîne. Lê belê efûya te ji hemûyan jî mezintir e, bi qasî ku ez nikarim spasîyên xwe pêşkêş bikim.’ Dûvre bi helbestî û bi coş min got ‘Xwedayê avadankar dana herî mizin da neviyê heftan û hişt ku hezkerin û rêzdarîgirtina herkesî ji bo te bigihêje lûtkeya herî jor. Dilen hemûyan di xiroşê de ye li himberî te. Serhildana min a li himberî te helbet ji ber tamakariyê bû, lê te ez efû kirim ji ber gunehê ku nayê efûkirin. Bi vê biryar û helwesta xwe, te êş ji dilên zarokan bêguneh derxist û te şahî xist dilê wan û diya wan a ku bi kelecana her li hêviya wan e.’

El-Mamûn got ‘Ez jî didim ser şopa nebî Yûsif û Pêxemberê umatê-silavên Xwedê li ser bin- ku digot: Divê veqetandin di nava we de çênebe, wê Xwedê li we bê rehmê û ji bîr nekin ku ê dilovan û mihriban ew e. Min jî tu efû kir êdî, mal û mulkê te li te veqerand, de êdî xwe aciz neke apocan!’ Min jî ji dil û can jê re dua kirin û piştî got ‘Te comerdî kir û malê min li min veqerand û beriya wê te stûyê min jî ji bin siya şûrê xwe derxist. Îcar bi rijandina xwina xwe mabe jî, ez ê te razî bikim. Bi wî malê ku te li min veqerand jî, ez ê toza sola xwe paqij bikim.

El-Mamûn qedr û qîmet û rêzdarî ji min re girt û dûra got ‘Apocan, El-Abbas û Ebû-Îshaq, ji min xwestin ku ez te bikujim!’ Min jî got ‘Emîrê Bawermendan! Wan fikra xwe ji te re gotin û te jî ya layiqî xwe kir û te tişte metirsnaq ji ber me gişan da alî.’ El-Mamûn got ‘Apocan te kîna min bi jiyana xwe ya gunehbar da vemirand, min jî tu efû kir û min nehişt ku tu têkeve ber minetan!’ Piştî ket sicûdê û piştî demeke dirêj serê xwe rakir û got ‘Apocan, tu dizanî bê çima ez ketim xuroşê?’ Min got ‘Qey te şikir ji Xwedayê xwe re kir, ku tu bi ser xistiye li himber dujminên tel!’ Wî got ‘Daxwaza min ne ev bû, lê şikir ji Xwedê re ku îlhama efûkirinê da min û min tu bexşand û ez bi te re li hev hatim. De ka êdî tu ji min re biavaxe û derdê xwe bibêje!’ Min jî çîroka xwe ji serî hetanî binî jê re got.”

Şehrezadê piçekî bêhna xwe berda û dest bi çîrokek nû kir.

(ÇÎROKA ABDULLAH BÎN EBÎ QULABE)

Şehrezadê got:

Tê gotin ku rojekê ji rojan çend heb deveyên Abdullah Bîn Ebî Qulabe wenda bûn, ew jî rabû ser xwe û bi pey wan ket, li wan gerîya, di seranserê axa Yemen û Seba de. Lê belê hîna ku wî ew gera xwe berdeyam dikir li bajarekî gewre rast hat ku bi keleh û sûrên mezin dorpêçkirî bû. Li derdora kelêhê jî qesr û qonaxin bilind hebûn û serên wan digihan asîmanan. Nêzikî bajêr bû, bi hêviya ku li niştecihan rast bê, ji bo ku deveyên xwe

ji wan bipirse. Lê gava gîha bajar, dît ku kavilekî vîkî vala ye û tukes tê de nîne.

Abdullah ew rêwîtiya xwe rave kir û got: “Wê çaxê, ez ji deveya xwe peya bûm, min ew girêda û ez çûm cem sûrên keleha bajêr, ji bo ku ez derbasî bajêr bibim. Li wir, min dît ku du deriyên mezin di kelehê de hene ku di temenê dinyê de derî weke wan tunene. Pir pir bilind û fireh bûn, bi dur û mircanan hatibûn neqîşkirin. Gava ez çav li wan derîyan ketim, ez şaş û metal mam. Tirs û saw û heyrangorîyek di nava min de peyde bûn û bi wan hestên tevlihev ez di derî re derbasî hundurê kelehê bûm. Min dît ku sûreke dirêj û mezin e û hundirê wê tijî qesr û qûnaxên bilindin ku hemû bi zêr û zîv hatine lêkirin û ji yaqût û mercan û lûlû û zebercedên rengareng hatine xemilandin. Deriyên hemû qesr û qonaxan jî, mîna deriyên kelehê bûn di xweşîkbûn û spehîbûna xwe de. Hemû qesr jî bi berr û lûlûyên ku-bar hatibûn raxistin, bi misk û ember û zehferanê jî hatibûn şûstin.

Îcar gava ez li nava bajêr geriyam û min kesek tê de nedît, tirseke kujer bi min re çêbû ku min nizanibû ez ê çawa xwe jê xelas bikim. Gava ez hilkişiyam ser banê qesran û min li jêra xwe nihêrî, min dît ku hemû kolanên bajêr tijî darên xurme û fêkiyan in û av û çem di nava bajêr re diherikin. Wê kêlikê min ji xwe re got ‘Bê gûman ev buhuşta baqî ya ku behsa wê tê kirin ev e!’ Bi qasî hêza xwe, min rahişt zêr û zîv û cewher û durrên giranbûha û ez vegeriyam welatê xwe û min xelk agahdar kirin ji wê buhuşta li wî bajarî.

Şeveqê lêda, Şehrezadê gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 279’EMÎN

Şehrezadê vegotina çîroka xwe berdewam kir û got:

Abdullah Bin Qulaba axaftina xwe weha berdewam dike: “Îcar ew agahî wisa belav dibe hetanî ku digihê Mûawîye Bîn Ebî Sufyan ku xelîfeyê wê serdemê bû û li Hîcazê dima. Mûawîye jî, ji walîyê xwe yê Yemenê re nameyek nivîsand û jê xwest ku wî zîlamî ji wî re bişîne, ji bo ku ew bi xwe ji mijarê serwest bibe. Qasidê walî jî hat cem min, ez birim cem walî, min jî serboriya xwe û tiştê ku min dîtibû ji serî hetanî binî jê re vegot. Rabû wî jî ez rêkirim cem Mûawîye, min mesele ji wî re jî got. Lê Mûawîye bawer nekir, got ne gengaz e ku bajarekî wisa li wir hebe. Hinek lûlû û misk û embarên ku min ji wir anîbûn, min nîşanî wî da ku bêhneke xweş ji wan dihat, lê belê rengê lûlû hatibû guhertin û ber bi zerbûnê ve çûbû.

Mûawîye Bin Ebû Sufyan şaş û metal bû li himberî wê bêhn û wî dîmenê ku lê dinêrî! Rabû şand dût Kabel Ehbar, ew anî diwane xwe û jê re

got 'Ey Kabel Ehbar, min şand dûv te ji bo tu mijarekê ji min re ronî bike û ez hêvîdar im ku dê ew hêza te hebe.' Kabel Ehbar got 'Mijar çi ye, Emîrê Bawermendan?' Mûawîye jê re got 'Gelo tu agahî li ba ta heye di derbarê bajarekî ku bi zêr û zîv hatiye avakirin û stûnên qesr û qonaxên wê bi yaqut û zeberced hatiye xemilandin û hundurê wan qesran jî bi lûlû û misk û ember û zehferan hatiye raxistin?'

Kabel Ehbar got 'Emîrê Bawermendan, ev bajarê ku tu behsa wî dikî, bajarê Îrem a Bistûn e, yê ku tu bajar mîna wî nehatîne avakirin li ser rûyê vê dinyê. Yê ku ev bajar lêkiriye jî, Şeddad Îbnû Ad El-Ekber e.' Mûawîye got 'Piçekî behsa wî bajarî bike ji me re!' Kabel Ehbar got 'Tê gotin ku du kurê Ad El-Ekber hebûne: Şedîd û Şeddad. Vêca gava ew mir, kurên wî Şedîd û Şeddad bûn melîkên wî bajarî. Melîk û şah û qiralên ser rûyê erdê hemû jî ketibûn bin destê wan. Dema ku Şedîd jî mir, birayê wî Şeddad bi tena serê xwe ma melîkê wî bajarî. Şeddad jî pirtûkhez bû û bi taybetî jî ji pirtûkên kevnar hez dikir. Îcar gava rojekê pirtûkek kevnar dixwend û li mijara axiret û cennetî rast hat, li ser rawestiya û ponijî. Di wir de, behsa buhuşteke dihate kirin ku hemû qesr û qonaxên wê ji zêr in, stûnên wan qesran bi durr û zeberced û yaqut hatine xemilandin, kolanên wê tijî darên fêkî ne, çem di nav re derbas dibin û bêhnna misk û rîhanan ji her derê difûre. Vê yekê pir bala wî kişand û di dilê xwe de ji xwe re got: Misoger divê ez jî bajarekî wisa li ser rûyê erdê ava bikim.

Îcar di bin destê Şeddad de sedhezar melîk hebû û di bin destê her melîkeke de sedhezar qehreman hebûn û di bin destê her qehremanekî de jî sedhezar leşker hebûn. Hemû anîn gel xwe û ji wan re got: Di pirtûkên kevnar de behsa buhuşta li wê dinyayê tê kirin, min jî xwend û ez dixwazim buhuşteke weke wê li ser rûyê dinyayê ava bikim. De êdî li seranserê vê cîhanê bigerin û li devera herî xweş, bajarekî wisa ji min re bidin avakirin ku tijî qesr û qonax be, diwarên wê ji zîv û zêr bin, stûnên wan qesra jî bi kevirkên zeberced û yaqût û lûlû xemilandî bin, hundurên wan bi berran, perdeyên wan bi hevrêşiman hatibe raxistin û bêhnna misk û emberê ji her derên wê bê fûrandin. Bila çem di nav re biherikin û derdora wê giş darên xurme û fêkiyan be.'

Hemûçikan lê vegerand û gotin 'Em ê ewqase zêr û zîv û yaqût û mercen ji ku binîn û em ê çawa karibin vî tiştê ku tu dibêji ava bikin?' Wî got 'Qey we ji bîr kiriye ku hemû melîkên cîhanê di bin destên min de ne û nikarin li himber fermanên min derkevin?' Gotin 'Belê em wê yekê dizanin.' Wî got 'Herin li ser rûyê erdê gişî bigerin, hemû madenên zêr û zîv û yaqût û lûlû û mercan kom bikin û yê mayîn jî ji bin erdê derxînin. Çi tiştê di destê xelkê de hebe û çi tiştê ku di xezîneyên mîran de hebin, hemûçikan kom bikin û yekî jî bernedin. Li himberî vê fermanê ji dernekevin û sist nebin. Heta ji we bê, bênavber bişûxulin!' Piştî ji her qiralekî li ser rûyê

dinyayê re nameyek nîvisand û ji wan xwest ku wan pêdiviyên wî ji nav gel kom bikin û wan kevirên giranbuha ji bin erdê ango ji bin deryayan be jî derxinîn, kom bikin û ji wî re bişînin.

Wê gavê mîr û melîkên li ser rûyê erdê sêsed û şêst bûn. Hemû bi şev û roj xebitîn û di nava bîst salan de, ew tiştên ku Şeddad ji wan xwestibû hemû komî ser hev kirin û jê re şandin. Piştî Şeddad, gazî hemû hekîm û endezyar û pişesaz û zana û karkeran kir, ew ji çar hêlên dinyayê komî ser hev kirin û ji wan re got 'Dê êdî herin cihê minasib bibînin. Hemû ketin ger û lêgerê, li erdnîgariya erdê tevî gerîyan hetanî ku di nava çolekê de wahayek avê dîtî û ew ecibandin. Ne çiya tê de hebûn, ne kavil, ne jî tu rengên gemar û pêmahîyan. Kaniyên avê ji nava wê dipijiqîn û çem tê re diherikîn, her derê wê şindarên fêkî û xurmeyên cûr be cûr bûn. Hemûyan gotin 'Buhušta ku Melîkê me Şeddad dixwaze were avakirin, incex li vir çêbibe.' Piştî li gora fermana Şeddad tê de xebitîn û li gor daxwaza wî bajar dane avakirin. Qenalên avê tê re vekirin, bingeh avêtin û dest bi avakirina qesr û qonaxan kirin. Karker û pişesaz ji her çar hêlên dinyayê bi ser wan de hatin, keştî û barên yaqût û zumrudan bi ser wan de bariyan, kerwan li pey kerwan ketin rê de û herkes mîna gêrikê di bin fermana Şeddad de xebitî bêrawestan. Siîh salî sax xebitîn, bi wî hawî.

Gava hemû karên xwe qedandin û avabûna bajêr têkûz bû, hatin Melîk Şeddat agahdar kirin. Şeddad got 'Niha jî herin keleheke bilind û asê li derdora bajêr ava bikin ku tukes nikaribe tê re derbas bibe li dora kelehe jî hezar qesrî bidin avakirin û bila li ser her qesrê alek hebe, da ku di her qesrekê de wezîrek bi cih bibe.'

Di cî de çûn ew fermana wî jî pêkanîn û di nava bîst salan de, ew qesir jî çêkirin û dîsa li Şeddad vegeriyan û jê re gotin 'Ew fermana te jî pêk hat ezbenî!' Şeddad jî ferman da her hezar wezîrê xwe û hemû leşker û karmend û xizmetkarên ku ji wan ewle bû, da xwe amade bikin ji bo biçin Îrem a Zatel Îmad. Helbet heman ferman da cêrî û jin û xizmetkarên xwe ji bo ku xwe amade bikin. Di nava bîst salan de, ew amedekariyên wan jî qedîyan.

Melîk Şeddad, di nava kêf û şahîyeke bê timtêl de, hemû artêş û karmend û dost û merê û xizmetkar û cêrîyên xwe dan dûv xwe û berê xwe da buhušta xwe ya sererdê! Lê hîna di navbera wan û Îrem a Zatul Îmad de meşa rojekê mabû, Xwedê Teala ji jor ve qîrek da û agirek ji azmanan bi ser wan de barand, hemû kafir bi cehnimê şa kirin. Ne Şeddad û ne jî yek tenê ji wan kesên ku pêre bûn negihan wî bajari, hemû di rê de tunebûn û Xwedê şopek wan jî li holê nehişt. Ew bajar jî dê wisa li şûna xwe bimîne hetanî roja qiyametê.

Mûawîye şaşwaz û matmayî ma li wê vegotina Kabel Ehbar, lê mey-

zand û got ‘Gelo kesek ji mirovan dikare xwe bigihîne wî bajarî?’ Kabel Ehbar got ‘Belê Emîrê Bawermendan, kesek ji dola pêxember be dikare biçe û bêgûman ew zîlam jî ev kesê li vir rûniştî be. Di nava gel de tê gotin ku zanayên Humyer a Yemenê, di vê derbarê de gotina ku piştî mirina Şeddad û artêşa xwe bi wê qîrîna azmanî, kurê wî Şeddad ê biçûk li şûna wî bûyê melîk. Lewre di dema kuştina bavê wî de, ew li Hadremewt û Seba mîr bû û bi bavê xwe re neçûbû Îremê. Jixwe çawa ku wî bihîstibû bavê wî di rêya Îremê de hatiye kuştin, ferman dabû leşkerên xwe ji bo herin meytê bavê wî binin Hadremewtê û ew li wir, di hundurê şikeftê de veşartibû. Piştî ku jê re di tirba wî de doşekeke zêr di bin de raxistibû heftê heb kincên bi zêr hûnayî û bi cewheran neqîşandî avêtibû ser û perçeyek jî danîbî ber serê wî ku li ser ev nivîsandîbû:

Îbretê bigre pozbilindo ji dirêjahiya emr û salan
 Ez im Şeddadê kurê Ad im xwediyê kelehan
 Hêzdar im qudretkar û cûretkarê di cîhanan
 Xelkên cîhanê giş di bin destê min de bûn
 Hemû bi rêz û hezkirin û tirs û xof bûn
 Min jî şerq û xerb û çîn û maçîn girtibûn
 Lê Mehdî em vexwendin ser heqrêya rast
 Dîsa min bi ya wî nekir û guh neda wî qet
 Wê gavê ji azmanan Xweda qîrek li min kir
 Min jî mîna genimgîha xwe li erdê dirêj kir
 Li ser meytê me cot hat kirin em binax bûn
 Em man li bendî roja qiyametê û em çûn...

Îcar dibêjin Sealibîyê dirokzan jî gotiye ku; rojekê du zîlam çûne wê şikeftê û derenceyek di devê deriyê wê de ditîne, pê ve daketine hundurê şikeftê û ditîne ku koncalek bi dirêjahiya sed gazi, bi firehiya çil gazi û bi kêrîhiya sed gazi tê de ye û hundurê wê koncalê tijî zêr û zîv û yaqût û cewher û lûlû ne. Wan jî bi qasî ku dikaribûn ji xwe re rahiştibûn zêr û cewheran û bi rêya xwe de çûbûn...”

Şeveqê lêda, Şehrezadê ji vegotina çîroka xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 280'YEMÎN

(ÇÎROKA ÎSHAQÊ MÛSILÎ)

Şehrezadê şeva din dest bi çîrokek nû kir û got:

Îshaqê Mûsilî jî digot ku: “Rojekê ez ji dîwana El-Mamûn derketim û min berê xwe da malê. Lê belê di rê de mîza min ez tengav kirim. Min

jî berê xwe da sikakek teng û li ser nigan min mîza xwe kir, lewre ez di-tirsiyam ji rûniştina li ber dîwarekî. Wê gava han tiştêkî ku bi dîwêr ve daliqandibû bala min kişand. Bi mereq min destê xwe avêtê ji bo ku ez bizanibim bê ka çi ye. Min bala xwe dayê ku zembîleke mezin î bi çar çembila ye û hawîrdora wê bi şîfon rapêçayî ye. Di dilê xwe de min ji xwe re got 'Bêgûman armançekê vê heye!' Ez ketim erênayê û min nema dizanibû ez çawa tevbigirim. Di encamê de serxweşiya min hişt ku ez li pey rehetîya xwe biçim û di hundurê wê selikê de rûnim. Piştî ku ez tê de rûniştim bi demeke kurt, min bala xwe dayê ku xwediyê malê selika ku ez tê de bûm ber bi jor ve kişand, kêlikên din bi şûn de min dît ku ez di hundurêkî de û çar carîye li dora min in, ji min re dibêjin 'Tu li ser seran û li ser çavan hatiye, de kerem bike hundur!' Ez li pey cêrîyekê çûm ku çirayek di destê wê de bû. Em derbasî maleke raxistî bûn ku bi hemû tiştên xwe dişibiya qesra xelîfe bi xwe. Ez li wir rûniştim. Piştî seetekê min bala xwe dayê ku perde ji ber dîwarekî rabûn û reqqasin derketin ku mûm û bixûr di destên wan de bûn û keçeke spehî weke heyveke li çardeyan jî di nava wan de rûniştî ye. Nuh ez dîtîm rabû ser xwe û got 'Mêvanê me, bi xêr hatî, ser çawan hatî!' Piştî, ez dame rûniştandin û rewşa min pirsî. Min jî jê re got 'Ez ji cem hinek birayê xwe dihatim gava ku şev li min dereng ket û mîza min hat di rê de. Ez jî bi sikakek teng de zîvirîm û gava ku min mîza xwe kir, ez li zembîleke aliqandî rast hatim. Ji ber ku meyê li serê min dabû, ez jî di hundurê zembîlê de rûniştim; hineka zembil kişandin û ez anîm vê malê. Rewşa min ev e.' Keçika rûxatûn jî got 'Tiştêk nabe, ez hêvî dikim ku tu ji bextê xwe razî bî. Gelo kar û pişeya te çi ye?' Min jî got 'Ez tacirekim di sûka Bexdê de.' Wê got 'Gelo tu tiştêkî ji şîir û helbestan dizanî?' Min got 'Tiştêkî hindik!' Wê got 'Naxwe hinekan ji wan bine ziman û bi stranî ji me re bibêje!' Min got 'Ez nû hatime hundur û hîna kelecana destpêkê ji ser min ranebûye. Te dest pê bikira dê baştir bûya!' Wê got 'Tu rast dibêji!' Piştî qeflek ristên helbestên kevnar û ên nûjen gotin ku ez bi wan mest bûm. A rastî min baş nizanibû bê ka ez vegotina wê ango bi xweşikbûne wê mest bûme. Piştî dîsa ji min pirsî û got 'Êdî kelecana te çû ango hîna ji berdewam dike?' Min got 'Erê welleh derbas bû.' Got 'Eger tu bixwazî ka tu jî çend ristan ji me re bixwîne!' Min ristin ji helbestên klasîk jê re xwendin, ew jî pê kêfxweş bû û got 'Kesekî ji rêzê nikare van helbestan ji ber bike!' Piştî ferman da xizmetkaran ji bo sifreya xwarinê raxînin..."

Şeveqê lêda, li Şehrezadê bû sibe, wê jî axaftina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 281'EMÎN

Şehrezadê berdewam kir:

Îshaqê Mûsilî vegotina ser pêkhatiya xwe berdewam kir û got: "Gava

ku xwarin hat û em li ser rûniştin, keçxatûnê bênavber rahişt gepên herî xweş ji xwarinê û danî ber min. Hundur jî ,bi cûreyên misk û rîhanan, bi cûreyên fêkiyên ku incex li cem mîran peyde dibûn dagirtî bû. Di pey xwarinê re, keçxatûnê tepsikên meyê xwestin. Destpêkê qedehek vexwar, dûvre qedehek da destê min û got ‘Îcar niha dema bîranîn û goftûgoyan e.’ Ez jî pê re ketim sohbetê û min got ‘Tê gotin ku wisa wisa qewimîye û felankes jî zilamekî wisa wisa ye...’ û bi wî hawî min çend serpêhatîyên xweş jê re gotin. Keçxatûn pir kêfxweş bû bi wê yekê û got ‘Ez matmayî dimînim bê ka çawa tacirekî mîna te van buyer û serpêhatîyan dizane! Lewre ev serpêhatî incex ên emîran e!’ Min lê vegerand û got ‘Cîranekî min hebû ku behsa çîrokên emîran dikir û di demên betlanê de jî, emîran gazî wî dikirin, bi wî re zeman derbas dikir.’ Wê jî got ‘Bi Qur’ana kerîm, te gelek tiştên xweş ji ber kirine.’

Piştî em ketin nava danûstendineke kûr û fireh de. Her ku ez disekinîm, wê dest pê dikir û her ku ew disekinî, min berdewam dikir, hetanî ku me nîvê şevê derbas kir. Darikên bixûran jî bênavber bêhnên xweş di hundur de belav dikirin. Ez jî di rewşeke wisa mest û xweş de bûm ku heger hayê El-Mamûn jê hebûya, dê bi lez bihata vir. Keçxatûnê ji min re got ‘Tu zilamê naziktirîn û lihevhatîtirîn î. Lewre tu xwediyê edeb û zanînek bêhempa yî. Lê belê kêmanîyeke tenî tenê heye.’ Min jê re got ‘Ev kêmanîya min çi ye gelo?’ Keçxatûnê got ‘Heger te bikarîbûya van helbestan bi newayên ûdê re lê bida û bigotana, tu kêmanîyên te ne diman.’ Min got ‘Min jî ji berê ve hez dikir ji ûdê û min dixwest ku ez fêr bibim, lê mixabin şert û mercên wê çenebûn û fersendeke wisa neket destê min de. Lêbelê dilê min hertim bi ser newaya ûdê ve ye û heger îşev jî me hinek jê guhdar bikira, wê pir baş bûya!’ Wê got ‘Mirov dibêje qey tu daxwaza ûdê dikî.’ Min got ‘Biryar a te ye. Tu xwediyê şevê yî û mal jî mala te ye!’

Ji xizmetkarêkî re got ûdeki bîne, ûd anî. Wê jî bi dengêkî ewqasî xweş stra ku, min tu deng mîna wî hebihîstibûn! Dengêkî hem pir xweş û mester bû, hem jî kamil bû di newaya xwe de. Piştî ji min re got ‘Tu dizanî bê ev newa ya kê ye û ev helbest kê nîvisandîye?’ Min got ‘Na.’ Wê got ‘Helbest a filankes e û newa jî ya Îshaq e!’ Min got ‘Qey Îshaq dikare nawayên wisa bibêje?’ Wê got ‘De binêr binêr binêr! Helbet Îshaq pir jêhatîye di van newayan de!’ Min got ‘Subhan ji wî xwedayî re ku tiştê daye vî Îshaqî, nedaye tukesê din!’ Wê got ‘Te çawa bi vî dengî nebihîstîye hetanî niha?’ Stran û ûda xwe berdewam kir hetanî şeveqê. Çawa ku bû sibe, pîrejinek ket hundur ku mîna dêya wê xwiya dikir, jê re got ‘De êdî rabe, wextê çûna te hatîye!’ Bi vî gotina pîrê re rabû ser xwe û ji min re got ‘Ji bo ku ev meclîsa me ya şahîyê di ewlehîyê de bimîne, tiştê ku di navbera me de qewimî veşêre û ji kesî re nebêje...’ ”

Şeveqê lêda û Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bedêng bû.

ŞEVA 282'YEMÎN

Şehrezadê berdewam kir:

Îcar Îshaq vegotina xwe berdewam kir û got: “Gava keçxatûnê ew hişyarî bo min kir, min jê re got ‘Jixwe ez cangoriyê te me, tu qet mereqan nekî û ez ne bi hewceyê şîreta me di vê mijarê de.’ Piştî min xatir jê xwest, ez meşiyam û min hişt ku cêriyek jî bide pêşiya min hetanî devê derî. Wê derî ji min re vekir, ez bi rê kirim, piştî derî li pey min girt. Ez jî çûm mala xwe, min nimêja sibehê kir û ez raketim. Dûvre qasîdê El-Mamûn hate dû min, ez çûm dîwana wî û min roja xwe li cem wî derbas kir. Gava li me bû êvar, şeva borî û şebuhêrka wê keçxatûnê hat bîra min, ez hestiyar bûm. Lewre ev mijarên han jî, kesên nezan nikarin li himber wan xweragir bin. Ez ji wir rabûm û bi lez ez hatim cem wê selikê, ez tê de rûniştim, mîna şeva borî, dîsa hinekan benê selikê kişandin û ez birim wî cihê min ê dohîn. Ew keçxatûn dîsa hat û ji min re got ‘Tu dîsa hatî?’ Min got ‘Ez texmîn nakim ku ez bikarîbama nehatama!’

Piştî mîna şeva borî me dîsa dest bi sohbet û vegotina serpêhatî û helbest û çîrokên balkêş kir, hetanî sibehê. Di pey re jî, ez dîsa rabûm, çûm mala xwe, min nimêja sibehê kir û ez raketim. Di pey re qasîdê El-Mamûn hat, ez pê re çûm wir û roja xwe li cem wî derbas kir. Gava şev ket êrdê, Emîrê Bawermendan El-Mamûn ji min re got ‘Tu bi Xwedê kî hebekî xwe li vir ragire, bisekine hetanî ku ez herim karekî bikim û vegerim.’

Gava ku xelîfe derket, çû û ez li wir mam; tasewasek ket nav dilê min û dîsa hişê min çû ser şeva borî û bîranîna wê şevê ez ber bi xwe ve kişandim. Nema hat ber çavên min bê wê xelîfe çi bi serê min bike gava ku vegere û min li wir nebîne. Loma ez rabûm ser xwe û bi lez çûm hetanî min xwe gîhand selikê. Ez ketimê, tê de rûniştim, wan jî ez kişandim û ez dîsa birim raserî wê civata cêriyan. Keçxatûnê ji min re got ‘Wisa xwiya dike ku êdî tu dostê me yî!’ Min got ‘Erê welle.’ Wê got ‘Ma qey te vir ji xwe re kiriye mal?’ Min got ‘Mafê mêvantiyê sê rojin û ev jî roja min a sisiyan e. Heger ez îşev çûm û careke din li wê vegeriyam, bila xwîna min li we helal be.’ Bi wî hawî em dîsa rûniştin û ketin nav helbest û newaya ûdê hetanî ku em mest bûn. Dema ku wextê çûna min nêzik bû, hat bîra min ku dê misoger El-Mamûn li min bipirse û vegotina vê çîrokê ji min bixwaze. Min ji keçikê re got ‘Ez bala xwe didimê ku tu pir ji stran û helbestan hez dikî? Kurapekî min heye, ji min spehîtir û biedebtir, awazên Îshaq jî dizane di stranê de.’ Wê aniya xwe qermiçand û got ‘Tu pir mereqkêş î tu pêşniyariyan jî dikî!’ Min lê vegerand û got ‘A ku di mijarê de biryarê dide tû yî!’ Wê got ‘Ger ku ew kurapê te mîna ku tu dibêji be, em dixwazin wî nas bikin!’

Dema çûna min hat, ez jî rabûm çûm mala xwe. Lê belê hîna ku ez

rûneniştibûm, qasîdê El-Mamûn bi ser min de girtin û rahiştin min, ez birim cem wî...”

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 283'YEMÎN

Şehrezadê vegotina çîroka xwe berdewam kir:

Îshaqê Mûsilî axaftina xwe berdewam kir û got: “Qasîd ez birim cem El-Mamûn. Ez çûm, min dît ku li ser kursîyekî rûniştiye û pir hêrs bûye. Çawa ez dîtîm, ji min re got ‘Ey Îshaq! Tu çawa ji gotina min derdikevî û bi ya min nakî?’ Min got ‘Na Emîrê Bawermendan, bi Xwedê ne wisa ye!’ Wî got ‘Naxwe kanî rastiya çîroka xwe ji min re bibêje!’ Min got ‘Bila be, ez ê ji te re bibêjim, lê belê di xilwetê de.’ Xelîfe serê xwe rakir û bi awirekê îşareta rabûnê da hemû kesên di civatê de. Hemû rabûn ser xwe, çûn. Min jî çîroka xwe û wê keçxatûnê jî serê hetanî binî jê re got. Li dawîyê jî min lê zêde kir û got: ‘Min sozek jî dayê ku tu yê herî cem wê!’ Xelîfe got ‘Te baş kirî’ Çawa ku êvar hat, em rabûn bi hev re çûn. Bi rê de min bi bîra xelîfe xist û min jê re got ‘Tu ji bîra nekî ku di huzura wê de, tu bi navê min, gazî min nekî! Lewre ez berdestkê te me li cem wê. Bi wî hawî me li hev kir û em hatin cem selîkê, me bala xwe dayê ku du selîk in! Em di wan de rûniştin, wan jî ber bi jor ve kişandin. Li hundur keçxatûn hat em pêşwazî kirin û silav li me kir. Gava ku El-Mamûn çav li husn û cemala wê ket, şaş û matmayî ma! Piştî re pê re ket nav sohbetê germ û helbest û stranan de. Mey û şerab bi dilxweşî da ber El-Mamûn, wî da ber wê û herduyan vexwarin. Di pey re keçxatûnê destê xwe avêt ûdê, newayek lêda, piştî re ji min pirsî, got ‘Gela ev kurapê te tacir e?’ Min jî got ‘Belê’ Wê jî berdewam kir û got ‘Hûn herdu jî pir dişibin hevûdin.’ Min got ‘Ew jî rast e!’

Gava ku El-Mamûn sê rital mey vexwarin, mest bû bi newayên mûzîkê re û qîrek da got ‘Îshaq?’ Min jî di cî de got ‘Bêje Emîrê Bawermendan!’ Got ‘Ka tu jî li ser vî meqamî bistirê!’ Keçxatûnê çawa têgihişt ku ew El-Mamûn e, rabû çû nebedî bû. Gava min jî stran qedand, El-Mamûn got ‘Ka binêre bê kî xwedîyê vê malê ye?’ Pîrejinê bersiv da û got ‘Ev mala Hesên Bin Sehl e.’ El-Mamûn got ‘Ka gazî wî bike, bila were vir!’ Pîrê rabû, çû. Bi qasî katjimêrekê nebedî bû û bi şûn de vegeriya li gel Hesên. El-Mamûn got ‘Keçeke te heye?’ Got ‘Belê.’ El-Mamûn got ‘Navê wê çi ye?’ Got ‘Navê wê Xedîce ye.’ Xelîfe got ‘Bi mêr e, an na?’ Wî got ‘Na wele nezewicîye!’ Xelîfe got ‘Ez wê ji te dixwazim!’ Wî jî got ‘Ew cêriya te ye û êdî di bin emrê te de ye Emîrê Bawermendan!’ Xelîfe got ‘Ez ê sîh hezar dînarî qelenê wê bidime te, tu jî bi sibehê re nuh te dirav girtin di cî de wê ji min re bîne!’ Wî jî got ‘Ser serê min, Emîrê Bawermendan!’ ”

Piştire, em bi şûn de vegeriyan. Xelîfe ji min re got ‘Îshaq! Tu vê me-seleyê ji kesî re nebêjî ha!’ Min jî ji tukesî re negot hetanî ku El-Mamûn çû ser dilovaniya Xwedê. Îcar ez texmîn nakim ku tukes mîna min, çar rojên wisa ne ji rêze jiyabe. Çar rojan li ser hev, şevên xwe bi Xedîceyê re û rojên xwe jî min bi El-Mamûn re derbas kirin. Lewre ne zilam mîna El-Mamûn hene û ne jin mîna Xedîce hene, li ser rûyê dinyayê; ne bi zanîna xwe û ne jî bi şarezatiya xwe. Disa Xwedê çêtir dizane..”

Şeveqê lêda û li Şehrezadê bû sibe, wê jî vegotina çîroka xwe birrî û bedeng bû.

ŞEVA 284’EMÎN

(ÇÎROKA HEŞAŞ)

Şehrezadê berdewam kir:

Û tê gotin ku carekê di dema hecê de, gava hecîyan dest bi tewafê kiri-bûn û li derdora Kabeyê diçûn û dihatin; yekî xwe bi perdeyên Kabeyê girtibû û bênavber qîr dikir û digot: “Xwedêyo ez tikan ji te dikim ku tu bihêlî ew ji mêrê xwe bixeyide ji bo ku ez pê re rakevim!” Dengê wî çû hecîyan, çend heb ji wan hatin ew zilam girtin û ew birin radestî Emîrê Hecê kirin, piştî ku têra wî lêdan jê re gotin: “Ey Emîr! Me ev zilamê han dît ku di cihên pîroz de, weho weha dibêje!” Emîrê Hecê di cî de fermana darvekirina wî da. Lê zilam li ber Emîr geriya û jê re got: “Tu bi heqê Pêxeberê Xwedê kî li min guhdar bike. Çîroka min bibihîze û piştî jî tu çî dixwazî, wê bi min bike!” Emîr got: “Ka hela bibêje em bibînîn bê çî li cem te heye?”

Zilam got: “Emîrê min, ez mirovekî heşaş im û di sûka pez de dişuxulim; di nava gemar û xwîn û liçikê de. Ez wê gemarê gişî her roj ji wir bar dikim, dibim. Îcar rojekê dişa min ew gemara han li ser piştî kerê xwe kiri bû, ew dabû pêşiya xwe û ez diçûm Kîmanê. Di rê de, min bala xwe dayê ku xelk direvin û yek ji wan jî ji yekî din re dibêje ka were bikeve vê sikaka han, da ku te nekujin. Min jî jê re got ‘Xelk çima wisa direvin?’ Xizmetkarekî got ‘Ev jina mezinekî bajêr e, xwe ji ber bide alî da ku te nekujin!’ Ji xwe xizmetkarên wê jî xelk ji ser rê didane alî û rê jê re vedikirin; piştî ku bi qamçîyan li wan didan, bêyî ku guh bidin tukesî. Ez jî bi kerê xwe ve li fitlonekê rawestiyam û ez mam li bende ku xelk ji hevdû belav bibin û rê ji çûna min re vebe. Di wê navberê de min bala xwe dayê jineke weke heyva li çardeyan, di nava sê cêrîyên rind de, ber bi min ve tê û qeflek xizmetkar jî dane pêşiya wan, rê li ber wan vedike. Gava gîha raserî min, li çep û rastê xwe ninêrî, piştî gazî serxizmetçiyekî xwe yê xesandî kir. Ê xesandî çû ba

wê û guhê xwe bir ber devê wê. Jinxatûn di guhê wî de axivî, wî jî di cî de êrişî ser min kir, ez girêdam û bi benekî ez li pey xwe kişandim, birim bêyî ku ez bizanibim bê çima ye! Xelk jî di pey me de diqîrin û dibêjin ‘Ev zila-mekî heşaş û feqîr e, gelo doza çi lê dikin ku wisa wî bi şerîtan girêdidin?’ Û ji yê xesandî re jî dibejin ‘Lê werin rehmê û wî feqîrî berdin!’

Min jî di dilê xwe de ji xwe re digot ‘Bi dibêtiyeke mezin ev xatûna wan bêhna min a genî kir, aciz bû ji vê gemarê min, ango jinik ducanî ye û zerarek ji vê bêhna min girtiye. Lahewla wela quwete îlla bîllah!’

Ez li pey wan meşiyam û em çûn hetanî em gîhan ber deriyê maleke mezin. Ji wir jî ez derbasî hundur kirim û em çûn hetanî ku em gîhan hêwaneke mezin û raxistî ku nedihate pesindan bi xweşikbûna xwe. Jinxatûn û cêrî hemû derbasî wir bûn, ez jî hîn di destê ewê xesandî de girêdayî bûm. Di dilê xwe de, min ji xwe re got ‘Wisa xwiya dike ku wê min li vir bikûjin û cezayê min bidine min. Ez ê bêkes û kûs herim û dê tukes jî bi min nehîse!’

Lê belê ew texmîna min pêk nehat û ez ji wir birim hemamê kincên min ên perpitî û genî di ser min re anîn û sê cêrî li min hatin hev, yekê ji wan nig û paqên min firkanî, yekê jî serê min şûst û ya mayîn jî laşê min lûfik kir hetanî ku ez paqij bûm. Dûvre buxçîkek kinc anîn, danîn ber min û ji min re gotin ‘Van kincan li xwe bike.’

Min jî ji wan re got ‘Willehî ez nizanim van kincan li xwe bikim!’ Dîsa her sê cêrî li min hatin hev û bi ken û laqirdî ew kinc li min kirin. Dûvre şerbîkên tijî ava gul û rîhanan anîn, bi ser min dakirin û ez ji hemamê derxistim, ez birim hêwaneke din ku ez nizanim çawa wesfê wê bidim, ji xweşikbûn û raxistina wê. Li wê derê jineke pir spekî li ser textekî ji darên xêzeran rûniştî bû...”

Şeveqê lêda û li Şehrezadê bû sibe, wê jî vegotina çîroka xwe birrî û bedeng bû.

ŞEVA 285’EMÎN

Şehrezadê berdewam kir:

Zilam axaftina xwe berdewam kir û got: “Min dît ku jineke pir spehî li ser textekî ji xêzeran rûniştî ye ku nigên wê ji acê bûn. Dema çav li min ket, bi min ve rabû û gazi min kir. Ez çûm cem wê, ji min re got ‘Rûnê’ Ez li kêleka wê rûniştim. Wê jî ferman da cêrîyan ji bo ku xwarinê bînin. Xwarinin xweş û cûr be cûr ji min re anîn. Di pêy re ferman da xizmetkaran ji bo ku şerbîk û îskanên mey û şerabê bînin. Meyên cûr be cûr anîn û agir bi bixûrdankan xistin, bêhnên xweş di eywanê de belav kirin. Cêrîyeke mîna heyvê jî rabû qedehên me dagirtin û dan dest me li ser newayên ûdeke bengî. Ez

û wê jinxatûna li ser text, serxweş ketin di nava mestbûneke bêtîmtêl de. Hetanî wê kêlîkê jî, her tişt ji min re weke xewnekê dihat.

Piştê wê jinxatûnê îşaret da çend cêrîyan ku nivînekê ji me ra raxînin. Nivîn raxistin, ew jî rabû ser xwe, bi destê min girt û ez birim ser nivînê. Em bi hev re ketim nava nivînê û me maç û ramûsan dane hev hetanî sibehê. Her ku min ew himbêz dikir, bêhna misk û emberan ji sînga wê dihat, min jî digot belkî ez di buhuştê de me an di xewneke xweş de. Gava bû sibe, cihê sekna min ji min pirsî. Min jî jê re got ez li filan derê disekinim. Destmalkeke ku bi zêr neqîşandî û tiştê di guhkê wê de girêdayî da min û ji min re got ‘De êdî here mala xwe! Ew diravên di guhkê destmalkê de jî, ji bo ku tu pê herî hemamê ye.’ Ez kêfxweş bûm û min ji xwe re got ‘Heger pênc filûs bin, wê têra xwarina min a îro bike, ma çi hewceye ez herim hemamê!’

Gava ez ji cem wê derketim, min got qey ez ji buhuştê derketime. Ez vegeriyam embara ku ez lê dimam û min guhkê wê destmalka wê vekir, min bala xwe dayê ku pêncî misqal zêr tê de ye! Ez rabûm, min bi du filûsan nan û xwarinek ji xwe re kirî û zêrê xwe yên mayî hemû veşart.”

Şeveqê lêda û li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 286’EMÎN

Şehrezadê berdewam kir:

Zilam axaftina xwe ji Mîrê Hecê re berdewam kir û got: “Bi wî hawî min xwarina xwe xwar û min ji xwe re palda, ez li ser vê rewşa nû fikirîm hetanî ber êvarê. Wê çaxê min dît cêrîyek hat cem min û got ‘Xatûna min te dixwaze!’ Ez rabûm û pê re çûm cem xatûna wê. Çawa ku izin da min ez derbasî cem wê bibim, min bejna xwe li ber tewand û erda bin nigê wê maçî kir. Wê jî ferman da min ji bo ez li kêleka wê rûnê. Ez rûniştîm û pê de, jinxatûnê ji cêrîyên xwe xwarin xwest. Xwarinên xweş anîn, piştê jî mey û şerabên xweş. Dûvre jî ez mîna doh dişa pê re raketim hetanî sibehê. Sibehê dişa destmaleke ku zêr di guhkê wê de girêdayî da min û ez bi şûn de şandim. Ez jî vegeriyam embara xwe û min ew zêr jî li wir, li cem ên berê veşartin.

Çûnaûhatina min a bi wî hawî heşt rojan berdewam kir. Her roj ber êvarê ez diçûm cem wê û pê re radiketim hetanî sibehê, bi sibehê re jî ez vedigeriyam embara xwe. Di şeva heyştan de, gava ku ez li gel wê raketî bûm, cêrîyek hat bi lez ji min re got; rabe derbasî vê odeya kêlekê bibe. Ez rabûm derbasî wê odeya han bûm, lê hîna ez rûneniştibûm, min bala xwe dayê ku dengê ji sikakê tê. Taqek di wê odeya min de hebû, ez rabûm ser xwe, di

wê taqê re min li sikakê nihêrî, min bala xwe dayê ku xortekî mîna heyvê li hespekî siwar e û li ber deriyê derve sekinîye û derdora wî jî tijî leşker û kole û xizmetkar in. Li ber derî, ji hespa xwe peya bû û derbasî hundur bû, hat hêwanê dît ku jinxatûn li ser nivînê rûniştî ye. Erda ber destê wê maçî kir, ber pê ve çû, destên wê ramûsan, lê jinik pê re neaxivî. Lê belê wî dev jê berneda û her li ber wê geriya hetanî ku jinikê ew efû kir û li hev hatin, wê şevê pê re raket.

Sibehê, dîsa leşker û xizmetkarên wî zilamî vegeriyan, ew jî li hespê xwe siwar bû û bi wan re çû. Gava ew zilam çû, jinxatûn hate cem min û ji min re got ‘Te ew zilam dît?’ Min got ‘Erê!’ Wê got ‘Ew mêrê min bû û niha jî ez ê çîroka xwe û wî ji te re bibêjim: Rojekê ez û wî li bexçeyê mala me rûniştî bûn. Ji nişkê ve ji cem min rabû, çû û demeke dirêj bi şûn de venegeriya. Min jî mereqa wî kir û ez li dû wî çûm. Destpêkê min rêya xwe bi qedemgehê xist, min got belkî li wir be. Lê ne li wir bû. Ez çûm hûndur, li metbexê min ji cêrîyekê pirsî, şûna wî nîşanî min da, min dît bi cêrîyekê re raketîye! Wê gavê ez pir hêrs bûm û min sîndeke bêveger xwar ku ez jî zinayê bi zilamê herî pîs û gemarî re bikim. Ez û wî xulamê xwe yê xesandî, em çar rojan li nav bajar geriyan hetanî ku em li te rast hatin û min biryar da ku zilamê herî gemarî di vî bajarî de tu yî. Wê gavê min ji xulam xwest ku te bigire û bîne malê. Piştî jî tu dizanî bê min çawa sunda xwe pêk anî! Îcar heger mêrê min careke din jî bi cêrîkê re rakeve, ez soz didime te ku ez ê dîsa bi te re rakevim!’

Îcar gava min ew gotin û soza wê bihîst, ez pir dilxweş bûm, lê belê dîsa jî ez pir êşîyam bi veqetandina ji wê û dilê min hate guvaştin, ez giriya hetanî ku hêsiyan cihok di rûyê min de vekirin. Dîsa jî min çarsed misqal zêr ji wê girtibû ku hîna jî ez ji wan zêran xerç dikim. Loma ez hatim mala Xwedê û min dua dikir ji wî ku dîsa mêrê wê bişîne cem cêrîyê ji bo ku ew jî bişîne dûv min û ez pê re rakevim.”

Gava Emîrê Hecê li wê çîroka zilam guhdar kir, biryara xwe guhert, ew serbest berda û ji civata derdora xwe re got: “Hûn bi xatirê Xwedê kin, hûn jî jê re dua bikin, lewre mazereta wî heye.”

Şeveqê lêda û li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 287’EMÎN

(ÇÎROKA HARÛNÊ REŞÎD BI XELÎFEYÊ DÛYEMÎN RE)

Şehrezadê berdewam kir:

Tê gotin ku şevêkê ji şevan xelîfe Harûnê Reşîd dilteng bû û qelaqeke mezin ket nava wî de. Rabû gazî wezîrê xwe Cafer ê Bermekî kir û jê re got: “Îşev bêhna min pir teng bûye û dilgiraniyeke mezin xwe berra ser min daye, bêhna min çikandiye. Loma ez dixwazim ez îşev derkevim nav bajêr û di kolanên de, di nav xelkê de bigerim û li hal û wextê wan temaşe bikim, belkî bêhna min fireh bibe. Lê belê divê em kincên taciran li xwe bikin, ji bo ku tukes me nasneke.” Cafer got: “Ser seran, ser çavan Emîrê Bawermendan!” Wezîr Cafer hemû pêdivî amade kirin, piştî ew û xelîfe û celladê wî Mesrûr, bi cilên taciran derketin û li nav kolanên Bexdê geriyan, hetanî ku gîhan qiraxa Diclê. Li wir kelek dîtî ku pîremêrek tê de bû. Çûn cem wî, silavek lê kirin û jê re gotin: “Kalocan, em dixwazin bi keleka te bigerin, li kenarên Dicleyê temaşe bikin û dînarekî heqê te bidin te!”

Kalo ji wan re got: “Xwezî! Ma kî dikare di nav ava Dicleyê de bigere, seyrane bike û xelîfe Harûnê Reşîd her roj bi kelekeke biçûk di behra Dicleyê de digere û bangeşkarê wî bi qîr û hewar dibêje ‘Xelkino! Ez gazî we gişan dikin, çi biçûk çi mezin, çi taybetî çi giştî divê herkes xwe bi şûn de bixşîne û ji ava Dicle derkeve, lewre xelîfeyê me derketiye seyrane. Kî bi kelekê dakeve avê, ez ê serê wî bifirînim an jî wî bi bavana keleka wî ve daliqînim!’ ”

Xelîfe û Cafer ji kalo re got: “Kalocan, a ji te re ev herdu dînar û me li keleka xwe siwar bike, hebekî bigerîne beriya ku keleka xelîfe were!” Kalo got: “Kanî wan herdu dînaran û werin siwar bin, tewkeliya me jî ma bi Xwedê!”

Kalo, herdu zêrên xwe girtin û ew siwar kirin, hebekî gerandin. Lê ji nişkê ve dîtî ku keştiyek nava Dicleyê diqelêşe bi şewqên xwe û ber bi wan ve tê, lewre keştî tijî mûm û meşele bûn. Kalo ji wan re got: “De binêrin! Min ji were negot ku Harûnê Reşîd her şev derdikeve geşt û seyrane!” Piştî, axaftina xwe berdewam kir û got: “Ya Rebbî tu me bisitirîn!” Piştî ew birin, xistin qubeyekê û di bin ebayeke reş de veşartin. Wan jî di bin wê perdeyê re ji xwe re derdor temaşe kirin.

Gava ku ew keştî nêzî wan bû, hîn bêhtir xwiya kir. Di pêşîya keştiyê de zilamek hebû ku fanosek ji zêrê sor, di destê wî de bû, kinckî ji etleşê sor li ser bû û li ser milên wî jî perdeyeke zer î mûzerkeş û li ser serê wî jî şaşîkek mûsilî hebû. Li ser milekî wî jî tûrikek ji hevrêşimê kesk hebû ku darikên sergilokî tê de bûn ku meşele pê vêdixistin li şûna êzingan. Di dawîya keştiyê de jî zilamekî bi heman dirûvî hebû, ku meşeleyek di destê wî jî de bû. Ji xeynî wan herduyan, li çep û rastê keştiyê dused kole hebûn di rêzê de, li ser nigan bûn. Di nivê wê de jî kursiyeke ji zêrê sor hebû û xortekî spehî mîna heyvê jî li ser rûniştî bû, ku kinckî reş û bi zêr xemilandi li ser wî bû û mirovekî mîna wezîran li ber wî dişîbiya Caferê Bermekî

û mirovê di teşeya xizmetkar de jî dişibiya Mesrûr ê cellad, lewre şûrek di destê wî de bû. Bîst heb nedîm jî li derdora wan xwiya dikirin.

Gava xelîfe ew dîmen dît, li wezîrê xwe zîvirî û got: “Cafer!” Wezîr got: “Bêje Emîrê Bawermendan!” Xelîfe got: “Dibe ku evê di vê keştiyê de yek ji kurên min be! Ya Emîn e, yan jî Mamûn e.” Piştî baş li xortê ser kursiya zerîn nihêrî û dît ku xortekî pir spehî û lihevhatî ye. Piştî lênerîneke kûr, li wezîrê xwe zîvirî û got: “Wezîro!” Cafer got: “Libê Emîrê Bawermendan!” Xelîfe got: “Bi navê Xwedê ev xortê rûniştî tam mîna xelîfeyekî ye. Ê raserî wî sekinî jî dişibe te ey Cafer! Xizmetkarê li ber destê wî jî, dirovên Mesrûr pê dikeve. Ew nedîmên derdora wî jî, mîna nedîmên min in. A rastî ez şaş û matmayî mame li himberî vê dîmenê!”

Şeveqê lêda û li Şehrezadê bû sibe, wê jî vegotina çîrokê birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 288'EMÎN

Şehrezadê berdewam kir:

Gava ku xelîfe şaşwaziya xwe anî ziman, Cafer got: “Bawer bike ez jî mîna te şaşwaz im û mîna te bi mereq im, Emîrê Bawermendan!” Di wê navberê de keştî di wan buhurî derbas bû, çû, hetanî ku ji ber çavan ket. Wê gavê kalo dîsa keleka xwe derxist û got: “Şikîr ji Xwedê re ku kes li me neqelîbî û em nedîtîn.” Xelîfe lê zîvirî û got: “Kalocan, qey xelîfe her şev di nav ava Dicle de digere?” Kalo got: “Belê Mîrzayê min û ev salek e, wisa dike.” Xelîfe got: “Kalocan, em dixwazin ku ev şeva pêşiya me jî tu were li vir bisekine û li bendî me bimîne, em ê jî penc dînanan bidine te. Em kesin xerîb in û em dixwazin geşt û seyeranê bikin. Niha jî em li mala mêvantiyê dimînin.” Kalo ji wan re got: “Ser seran, ser çavan!”

Piştî, Xelîfe Harûnê Reşîd û Cafer û Mesrûr vegeyriyan qesrê, kincên taciran ji ser xwe avêtin û dîsa kincên xwe li xwe kirin, derbasî dîwanê bûn û her yek ji wan li cihê xwe rûnişt. Mîr û emîr û wezîr û gizîr û hacib û karmendên dewletê hemû derbasî dîwanê bûn û mîna her roj dîsa meclis li dar ket. Pirsgirêk hatin çareserîkirin û li dawîyê jî weke her car dîsa ji hev belav bûn, herkes çû mala xwe. Xelîfe ji wezîrê xwe re got: “Cafer, kanî rabe em herin dîsa wî xelîfeyê duyemîn temaşe bikin!” Cafer kenîya û rabû ser xwe, çû kincên taciran anîn ji xwe û xelîfe û Mesrûr re. Kincên xwe guherîtin û bi dilekî xweş dîsa derketin, di nav kolanên Bexdê re, berê xwe dan qiraxên Dicleyê.

Gava hatin cihê xwe yê doh, dîtîn ku kalo di keleka xwe de rûniştiye li bendî wan. Ew jî li keleke siwar bûn û bi qasî seetekê xwe ragirtin hetanî

ku keştiya xelîfeyê duwemîn ber bi wan ve hat. Xelîfe û wezîr û celladê xwe baş li keştiyê meyzandin, ditîn ku dused kolê tê de ne, lê ne ew kolên doh bûn. Şewqdarên wan jî dîsa mîna şeva borî bi qîr û gazî bûn, bang dikirin û digotin: “Xelîfe tê, bila tukes bi kelekê xwe nekeve ava Dicleyê.” Xelîfe matmayî ma û ji Cafer re got: “Ey Cafer, heger min ev tişt li ber çavên xwe nedîta, min bawer nedikir, lê belê her tişt li ber çavan e.” Piştî li kelekvanê extiyar zîvirî û jê re got: “Kalocan a ji te re van deh dînan bigire û me di kêleka vê keştiyê re bimeşîne, jixwe em di tarîtiyê de ne û ew di ronahîyê de; me nabînin!” Kalo, her deh dînar ji destê wî girtin û sewlên xwe li avê dan, bi rê ket...

Şeveqê lêda û li Şehrezadê bû sibeh, wê jî vegotina çîroka xwe sekinand û bêdeng bû.

ŞEVA 289'EMÎN

Şehrezadê vegotina çîroka xwe berdewam kir:

Kalo sewlên xwe li avê dan û di tarîtiyê de meşa xwe li pey wê keştiyê berdewam kir hetanî ku gîhan devera bîstan û bexçeyan. Li wê deverê û li hinda axurekî, keştiya raçavkirî rawestiya, herkes jê peya bû. Xulamin ku rişmeya hespekî zînkirî di destê wan de bû, hesp birin ber nigên xelîfeyê duyemîn, ew lê siwar kirin û di nava kole û xulaman re ew dane meşandin.

Xelîfe û Cafer û Mesrûr jî ji kelekê peya bûn û bi dûv wan de çûn, xwe gîhandin qafileyê. Piştî xwe di nav xulam û koleyan rakirin û ketin pêş de, di nav wan de meşîyan. Lê hinekan ji ew xulamên ku meşele di destê wan de bûn, ew ditîn û ji kincên wan gûman kirin ku her sê jî xerîb bin. Dor li wan girtin, ew derdest kirin û ew birin ber destê xelîfeyê duyemîn. Xelîfeyê duwemîn li wan nihêrî û ji wan re got: “We çawa xwe gîhandiye vir û hûn vê wextê li vir çî dikin?” Gotin: “Ezbenî wele em tacirên xerîb in, em van deran nasnakin. Em îşev hatibûn ku ji xwe re geşt û seyrane bikin, lê em li we qelibîn û van xulamên we jî em girtin.” Xelîfeyê duwemîn got: “Ji ber ku hûn xerîb in, tu gunehê we tune. Lê heger hûn ji Bexdayê buna, minê serê we bifiranda.” Dûvre li wezîrê xwe zîvirî û jê re got: “Vanan bi xwe re bibe, ev mêvanên me ne îşev!” Wî jî got: “Ser seran, ser çawan!”

Piştî ew bi xwe re birin û meşîyan hetanî ku gîhan qesrek bilind ku pozê wê bi nav ewran ve diçû. Deriyê wê qesrê ji darê sac bû ku bi zêrekî biroqankî hatibû xemilandin. Rê ji deriyê qesrê diçû hundur hetanî ku bi eywanek mezin î raxistî bi dawî dibû. Di wê eywanê de fisqiyek û şadirwanek hebû. Bi dîbac û nemariq û mase û kursiyan raxistî bû, perdeyên hev-rêşimî bi her dîwarî ve dihatin xwarê û nivînî raxistî tê de hebûn ku aqilê mirov ji serê mirov dibirin. Li ser derî yê derve jî ev çend rist nivîsandî bûn:

Qesreke xwedî silav û rêz evîn ji li ser
Dewr û zemanan spehîbûnek avêtiye ser
Tiştên enteresan û ecêb tê da kom bûne ew
Hemû pênûs û wêjevan lal in li hember wê ew

Xelîfeyê duwemîn li gel civata xwe derbasî hundur bû û çû li ser kur-siya zêrîn rûnişt ku bi cewheran xemilandî bû û li ser kursiyê jî sicadeyeke hevrêşim î zer hebû. Nedîmên wî jî li dora wî xelekek çêkirin û rûniştin. Celladê wî yê şûrvan jî weke dêwekî li raserî wî li ser nigan sekinî. Sifreya xwe raxistin û xwarin xwarin. Piştî jî sênî rakirin, destên xwe şûştin û di pey re jî şerbik û qedehên meyê rêz kirin û amûrên mûzîkê anîn. Qedehên meyê geriyan hetanî ku dor hate ser Harûnê Reşîd. Lê wî ranehişt qedehê û mey venexwar. Xelîfeyê duyemîn ji Cafer pirsî û got: “Çima hevalê te venaxwe?” Cafer got: “Ezbenî ev demeke wî çêbûye ku ji vê meyê venaxwe.” Xelîfeyê duyemîn got: “Li cem min meyeke cuda heye ku ji ava sévan e, dê ji hevalê te re bibî!” Pêre jî ferman da xizmetkaran, çûn ew cûre mey anîn. Xelîfeyê duwemîn ji Harûnê Reşîd re got: “Her ku dor heta ser te, tu jî ji vê meyê vexwe!”

Bi wî hawî vexwarin û hey vexwarin hetanî ku hemû mest bûn û ji ser hişê xwe çûn...

Şeveqê lêda û li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 290'EMÎN

Şehrezadê berdewam kir:

Gava giş ji ser hişê xwe çûn, Harûnê Reşîd ji Cafer re got: “Wezîrê min, tu dibîni ne wisa? De binêr bi navê Xwedê sifreyeke wisa li cem me peyda nabe? Gelo ev xortê ku mîna xelîfeyan tevdigire kî ye û çî dike?”

Hîna ew wisa di nav xwe de diaxivîn û diketin qirika hev, xelîfeyê duyemîn got belkî pevdikevin, ji wan re got: “Naxwe hûn pevdikevin?” Cafer bersiva wî da û got: “Tu pevçûn di neqeba me de tune, lê hevalê min dibêje ez çûme gelek weletan û tev li şevbuhêrkên gelek şah û emîran bûme, min tu şevbuhêrk mîna vê xweş nedîtiye. Lê belê tiştê tenê jê kême ku xelkê Bexdê dibejin; vexwarin bêyî guhdarkirina deng û awazan, serêşê bi mirov re çêdike.”

Dema ku xelîfeyê duyemîn ev gotin bihîstin beşîşî û dilxweş bû. Darîkê destê xwe li xelekekê da, deriyek pê re vebû û xizmetkarek jê derket ku kursiyekî ji acê û zêrkirî di destê wî de bû û cêrîyeke mîna heyva li çardehan jî li pey wî bû ku spehîbûna wê nedihat ziman. Kursî li erdê danî, keçîk jî mîna rokê li ser rûnişt û ûdêk hilda destê xwe ku ji malê Hindiyan bû. Ew

xist himbêza xwe de û mîna dayika ku xwe bi ser pitika xwe de bitewîne xwe bir ser ûdê de tewand û dest pê kir stra; newayin pir xweş gotin, li ser bîst û çar meqaman ku mirov mest dikir. Piştî dîsa vegehiya ser meqamê berê û bi stranî ev çend beyt gotin:

Zimanê evînê deng dide te ji nav dilê min
Vedibêje û te agahdar dike ji evîn û eşqa min
Şahidekî min ji heye ji dilekî azad diaxive
Çavekî bibirîn e ku hêşiran şev û roj dibarîne
Berîya te min tucaran eşq û evîn nasnekiribû
Lê belê emrê Xwedê xuluqkar e kê kiribû

Gava xelîfeyê duyemîn ev helbest ji cêriyê guhdar kir, qîreke ecêb da û kincê ser xwe qetandin, kir tîş û terîş. Bi perdeyekê ew nuxumandin hetanî ku bedlek kincên çetir jê re anîn. Kincên nû li xwe kirin û dîsa li ser kursiya xwe rûnişt mîna berê. Gava dora qedehê dîsa gîha wî, darikê xwe li wê xe-leka girover xist. Pê re jî deriyek vebû, xizmektarekî ku kursiyek zêr di dest de bû jê derket û cêriyek ji ya pêşîyê xweşîktir jî li pey wî hat bi ûda xwe ve. Ew jî mîna ya berî xwe li kursiyê rûnişt, ûda xwe xist himbêza xwe û li gel newayin ku dil dihelandin ev çend riste gotin:

Ez ê çawa xwe ragirim û pêtên evînê wisa har in
Wê çawa beden li pey ruh bê û çav wisa tofan in
Tu jiyan nemaye ji min re êdî qet şad nabim ez
Ma wê çawa şad bibe dil di singê de te got ez

Gava xelîfeyê duyemîn ev helbest ji devê wê cêriyê bihîst, dîsa har bû, qîriya û kincên li ser xwe qetandin ji berstukê hetanî dawê. Xizmetkaran dîsa ew nuxumandin bi sitareyekê hetanî bedlekî nû jê re anîn. Ew kincên nû li xwe kirin û dîsa li ser kursiya xwe ya zêrîn rûnişt. Dîsa vegehiya aramiya berê û ket nava sohbetêke germ de. Gava ku careke din qedeh hate cem wî, darikê xwe li xe-leka grover da, dîsa deriyek vebû û xizmetkarek jê derket ku cêriyek ji herduyên berê jî xweşîktir li pey wî bû. Kursiya zêrîn jê re danî, cêrî jî li ser rûnişt, li ûda xwe da û ev beyt gotin:

Kin bikin hîcranê zuha bikin van çavan
Naxwe we efû nake ev dilê min tu caran
Ji êşa bêrikirinê hatiye guvaştin ev dilê han
Rizaya we dixwaze ew niyaza wî ye hin caran
Ey rûheyvên ku di dilê min de cî girtine
Ezê çawa jineke din hîlbijêrim ji xeynî wê

Şeveqê lêda û li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bedeng bû.

Şehrezadê vegotina xwe berdewam kir:

Gava xelîfeyê duwemîn ew helbest ji devê cêriyê guhdar kir, dîsa har bû, qîrek ecêb da û kincên li ser xwe çirandin. Bi perdeyekê laşê wî nuxumandin heta ku bedlek kincên nû jê re anîn. Piştî ku kincên nû li xwe kirin, dîsa aram bû û li nedîmên xwe vegeriya, şevbuhêrka xwe berdewam kir bi wan re. Dema dîsa qedeha meyê hate ber, darikê destê xwe li xeleva grover da, deriyek vebû, xulamek jê derket ku cêriyek pir spehî jî li dû wî dihat. Kursiya dest xwe danî erdê, cêrî jî li ser rûnişt, rahişt ûda xwe, newayeke xweş lê da û pê re got:

Heta kengî wê berdewan be ev qelaq û hicrana min
 Heta kengî wê êşên buhurî dîsa li min vegerin
 Hetanî doh jî lome dikirin li me van cîranan
 Zikreşîya evîna me dikirin van keç û xortan
 Feleka bêbext qut kirin em ji hev bi salan
 Kavil kirin ewê malên me di pey hîcranan
 Dostino gelo hûn ê çawa ber dilê min bigirin
 Wê çawa bibe gelo ji vî dilê min î serhildêr
 Dev ji lomeyan berdin ne mizgeft dibe ne jî dêr
 Xeyidî me ez ji pûtxaneyê dilşikestî me li vir
 Bêbextî kirin bi min re birano hûn jî nebin dilkevir

Gava xalîfeyê dîyemîn ew helbest ji devê cêriyê bihîst, hêç bû, qîrek da û kincên xwe giş çirandin, piştî ji ser hişê xwe çû û li erdê dirêj bû. Xulamên wî mîna her car, hewl dan ku perdeyekê bavêjin ser, bedena wî binuxumînin, lê goşeyekê wê li ben geriya û hinek ji bedena wî vekirî ma. Harûnê Reşîd çav lê ket û dît ku laşê wî şîn û reş bûye ji lêdanê. Li Cafer zîvirî û jê re got: “Ey Cafer, bi Xwedê ev xelîfeyê han ciwanekî rind û lihevhatî ye, lê belê dizekî heram e!” Cafer got: “Tu çawa dizanî ku ew diz e?” Harûnê Reşîd got: “Li ser newqa wî şoqên qemçîyan, şopên lêdanê xuya dikin!”

Perde ji ser rakirin û kincên wî yên nû lêkirin û ew jî dîsa mîna berê li ser kursiya xwe rûnişt û şevbuhêrka xwe berdewam kir bi nedîmên xwe re. Di wê navberê de axaftina ku bi bédengî di neqaba Harûnê Reşîd û Cafer de berdewam dikir, bala wî kişand. Bi dengê bilind, ji wan re got: “Hûn çi dikin xortino? Çi heye gelo?” Cafer got: “Xêr e ezbenî, tiştêk nîn e. Lê belê ez naxwazim ji te veşêrim ku hevalê min tacîrekî geriyayî ye, cihek, welatek nemaye ku neçûye wir û mîrek nemayê ku pêre hevaltî nekiriye û dibêje ku, ev tiştê mîrzayê me dike îsrafeke mezin e û li tu deveran tiştêkî wisa nedîtiye. Dibêje, min li tu cihî nedîtiye kesî ewqasî kincên xwe qetandine ku her bedlekî kincan bi hezar dînarî ye û ev jî îsrafeke mezin e.”

Xelîfeyê duyemîn got: “Mal malê min e û caw cawê min e. Ev tiştê ku di vê şevbuhêrkê de tête pêşkêşkirin jî, bexşkariya min a ji bo xulam û xizmetkaran e. Lewre ev kincên ku min qetandin, her bedlek ji wan kincên nedîmekî min bûn û li şûna her bedlekî min pêncsed dînar da wan...”

Şeveqê lêda û li Şehrezadê bû sibe. Wê jî vegotina çîroka xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 292'YEMÎN

Şehrezadê berdewam kir:

Gava Cafer ew gotinên xelîfeyê duyemîn bihistin, jê re got: “Te tiştê baş kiriye Mîrzayê min.” Piştî bi helbestî got:

Comerdîyê avahî lêkirine di kefa destê te de
Helal kiriye te malê xwe li xelkê belav kiriye te
Gava comerdî deriyê xwe digire jî li ber dilan
Destê te tim dibe mifte ji bo wan deriyan

Gava xelîfeyê duyemîn ev gotin ji Cafer ê wezîr bihistin, fermana ku xulamên wî hezar dînarî û bedlek cil bidine wî. Piştî dîsa qedeh di nav wan de geriya. Harûnê Reşîd li wezîrê xwe zîvirî û jê re got: “Cafer! Hela wan şopên lêdanê yên li ser laşê wî jê bipirse, da em bibînin bê wê çi bibêje.” Cafer got: “Ecele neke Emîrê Bawermendan û hebekî bêhnfireh be, lewre sebîr baş e.” Xelîfe Harûn hêrs bû û got: “Bi tirba kalkê min Abbas, heger tu wê pîrse jê nekî, ez ê te bikujim!” Tam di wê kêliyê de xortê ciwan û lihevhatî li Cafer zîvirî û jê re got: “Çima tu û hevalê xwe hûn dikevin qirika hev? Ka meseleya xwe ji min re bibêje!” Cafer got: “Tiştê tune mîrzayê min!” Xelîfeyê duyemîn ê ciwan got: “Hûn bi xatirê Xwedê kin çi di navbera we de hebe ji min re bibêjin, ji min veneşêrin!”

Cafer got: “Ezbenî min dît ku li ser herdu kêlekên laşê te, cihên lêdanê hene, şopên şiv û qamçîyan hene û ez şaşwaz bûm helbet, lewre ne gengaz e ku kes bikaribe lêdanê li xelîfe bike! Îcar dixwest ku sebîrê wê yekê fêr bibe?” Xelîfeyê duyemîn û ciwan, çawa ku ew gotin bihistin, beşîşî û got: “Divê hûn bizanibin ku gotinên min xerîb in û rewşa min ecêb e. Heger ez serboriya xwe bi derziyekê li ser korneya çavan binîvisînim, dê bibe îbretê mezin ji herkesî re.” Piştî bi helbestî got:

Vegotina min erjeng e û fikra min ne asayî ye
Cih nemaye ji evîna min re di mezheban de
Ger hûn dixwazin fêr bibin guh bidêrin
Bila herkes bêdeng be û guh bide dilê min
Dilên xwe vekin ji peyvên min re bê şert û da'w
Ji ber ku hemû gotinên min sotîner in mîna tav

Dostino ez kuştîyê eşq û evîneke agirîn im
 Kujera min jî xweşîktir e ji tav û heyvê
 Çavê kilkirî tîran davêje mîna şûrpeyvê
 Burhû jî du şûrên di kalanên xwe de ne
 Geh pev dikevîne geh hevdû himbêz dikine
 Şensê min heye ku xelîfe jî niha li vir e ew
 Emîrê Emîran torînê El-Ebbas e ew
 Cafer ê wezîr jî her di nava we de ye ew
 Sêyemînê we jî Mesrûr ê cellad e ew
 Û heger ne şaş û derew bin ev gotinên min
 Dê hemû daxwazên min pêk bên li ba min
 Lewma şox û şeng û dilxweşî tê ber bi min

Gava ku ev gotin ji devê wî guhdar kirin, têgihiştin bê xelîfeyê du-
 yemîn dixweza çî bibêje. Cafer jê re sûnd xwar ku ew ne ew in. Xelîfeyê
 ciwan kenîya û got:

Ezbenî divê hûn bizanibin ku ez ne xelîfe me, lê belê min ev nav li xwe
 kir ji bo ku ez daxwazên xwe ragihînim we û bajariyan. Navê min ê rastî
 Mûhemed Elî El-Cewherî ye. Bavê min mîrzade bû û gava mîr malekî pir li
 dû xwe hişt ji xeynî zêr û zîv û lûlû û mircan û zeberced û cewahir û aqar û
 hemam û bîstan û dikan û kole û xulamên ku nayên jimartin.

Îcar carekê gava ku mîna her car ez û dost û hevalên xwe li dikanê
 rûniştî bûn, jîneke ku li ser piştê hespekî bû û sê cêrîyên wê pê re bûn
 hatin dikana min û li cem min rûniştin. Jinik mîna heyvek li çardeyan bû
 û cêrîyên wê jî wisa. Jinikê devê xwe anî ber guhê min û got: “Mûhemed
 Elî El-Cewherî tû yî?” Min got: “Belê xatûna min, ez im ew kole û xizmet-
 karê te.” Wê got: “Gelo cewhereke li gora min li cem te heye?” Min jî got:
 “Xatûna min, ez ê tiştê di destê xwe de ji te re bînim. Heger te eciband wê
 ev koleyê te jî dilşad bibe, lê heger tu necebinê jî dê ji ber bêşensiya min be!

Îcar ê min jî nêzîkî sed cewherî li ba min hebû. Min hemû dan pêşiya
 wê, lê belê wê yek tenê jî nepejirand. Got: “Ez yeke ji vanan çêtir dixwazim.
 Gerdeniyeke min a biçûk û bi cewher hebû ku bavê min ew ji min re kirrî-
 bû bi sed hezar dînarî ku li tu deverê cewherên wisa peyda nedibûn; hetta
 li cem sultan û qiralan jî peyda nedibûn.

Min jê re got: “Xatûna min, gerdeniyeke bi cewher li ban min heye
 ku li cem tukesî peyde nabe!” Got: “Kanî wîna nîşanî min bide.” Min ew
 jê re anî, çawa lê nerî, got: “Cewherê ku min ew dixwest ev bû! Bi salan e
 ez lê digeriyam û şikir ji Xwedê re ku îro min ew dît.” Dûvre berdewam
 kir û got: “Buhayê wê çiqase ye gelo?” Min got: “Bavê min ew bi sed hezar
 dînarî kirrîbû.” Wê got: “Bila fêdeya te jî pênc hezar dînar li ser be.” Min
 got: “Xatûna min, cewher û xwediyê wî herdu jî di xizmeta te de ne, qet

tişte hewce jî nake.” Wê got: “Misoger divê fêdeya tê jî tê de hebe, jixwe ez deyndarê te me.” Pê re jî rabû ser xwe û bi lez li hespa xwe siwar bû û ji min re got: “Mîrzayê min, tu bi qedrê Xwedê kî, were cem me bibe mêvan, ji bo ku tu heqê cewhera xwe bigire.” Ez jî di cî de rabûm ser xwe, min dikan girt û di nava aramiyê de ez pê re meşiyam, hetanî em gihan mala wê. Mala wê, şopên bextewariyê û xweşiyê li ser xuya dikirin. Deriyê wê, bi zîv û zêr û lazwerdan neqîşandî bû û li ser wî jî wiha nivîsandî bû:

Mala ku êş û xemgînî derbasî wê nabe ev e

Mala ku felek bêbextiyê pê re nake jî ev e

Çêtirîn mala guncav bo rêwî û mêvanan

Çi gava ku cî li wan teng bibe li canan

Şeveqê lê da û li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotinên xwe birrîn û bêdeng bû.

ŞEVA 293'YEMÎN

Şehrezadê vegotina xwe berdewam kir:

Xelîfeyê duyemîn ê ciwan vegotina serpêhatiya xwe berdewam kir û got:

Jinxatûnê ez derbasî hundur kirim û ji min re got: “Tu li ser pêlika devê derî rûnê, hetanî ku diravdêr were.” Bi qasî seetekê, ez li wir rûniştî mam, hetanî ku cêriyek hat û ji min re got: “Mîrzayê min, ka rabe derbasî hêwanê bibe çêtir e, lewre rûniştina li ber derî ne guncav e.” Ez rabûm derbasî hêwanê bûm û li ser minderekê rûniştîm. Piştî cêriyek din hat, got: “Xatûna min dibêje bila were li ber deriyê dîwanê rûnê, ji bo ku diravên xwe bigirî!” Ez rabûm, derbasî hundur bûm û hinekî rûniştîm. Min bala xwe dayê ku perdeyek ji hevrêşim rabû û ew jinxatûn xuya kir. Li ser kursiyekî zêrîn rûniştî bû û rûyê wê yê girover, mîna heyvek li cardewan şewq dida, gerdeniya ku cewher tê de jî li ser gerdena wê dibîriqî! Aqil ji serê min firiya û hiş tê de nema, ji ber husn û cemala wê.

Nuh ez dîtîm, ji ser kursiyê rabû, ber bi min ve hat û got: “Ronîya çavan, kesekî mîna te bedew, çawa li dildara xwe dinêre û pesnê wê nade?” Min jî got: “Xatûncan min, jixwe jêderka spehîbûnê hemî tu bi xwe yî û wateya wê jî tu bi xwe yî!” Wê got: “Divê tu bizanibî ku ez ji te hez dikim û ez bawer nakim bê çawa min dikaribû te bîne vir!” Piştî, xwe bi ser min de tewand. Me hevdû ramûsa, ez ber bi xwe ve kişandim, di nava çend kêlikan de min bala xwe dayê ku ez di ser sînga wê de me. Wê çaxê min fêm kir ku ez dixwazim pê re rakevim. Wê jî ev nêta min fêm kir û got: “Qey tu dixwazî di rêyek haram re xwe bigihîni min? Bi navê Xwedê ez tişteki wisa qebûl nakim û ne gengaz e ku keçeke mîna min bakîre gunehin wisa mezin bipejirîne. Hetanî îro min nehiştiye ku tukes nêzî min bibe û gotineke

nexweş li ser min bê gotin. Lewre ez ne yeke nenas im li vî bajarî. Gelo tu dizanî bê ez kê me?" Min got: "Na xatûna min, wileh ez nizanim." Wê got: "Ez Dunya xatûn, keça Yehyayê Bermekî me û birayê min Cafer jî wezîrê xelîfe Harûnê Reşîd e!"

Çawa min ew gotinên wê bihîstin, ez sar bûm û hestên min giş sar bûn ji tirsê. Min jê re got: "Xatûna min li qusûra min nenêre, lê jixwe yê gunehkar ne ez bûm, lê belê te hişt ku ez bixwazim bi te re rakevim!" Xatûnê got: "Tiştê nabe. Bêgûman tê bigihêje meqsêda xwe, lê belê di rêyeke helal re. Jixwe ez azad im û emrê min di destê min de ye, bila qadî mehra me bibire û hew. Meqsêd em bibin jin û mîrê hev û wisa bi hev re rakevin." Piştî gazî qadî kir, du şahid jî anîn û ji wan re got: "Ev xortê hane Mûhemed Elî Elcewherî ye; dixwaze bi min re bizewice û ev cewhera han jî li şûna qelenê min daye min û ez jî pê razî bûme!"

Qadî mehra me birrî û pêde, ez derbasî cem wê bûm, min bala xwe dayê ku sifreyê zengîn ji bo şevbuhêrkê amade kiriye û hemû celebên meye rêz kirine. Me bi hev re vexwar hetanî ku serê me germ bû û şewqê di çavên me re avêt. Wê gavê xatûna min î rûheyv destê xwe avêt ûde, nameyeke pir hestiyar lêda û got:

Dîyar bû ji min ve êdî ew şax û xezal û heyv
Qidoşî ji wî dilî re ku nebîne biçav û peyv
Li himberî dost û nasan derdiketin her ku digotin
Mîna ku bêxeber bim li gel ku rivînan dil disotin
Bêdev bi guhdarkirina dil min ji wî her hez dikir
Diheliyam ez bi gotinên wî pêxemberê makir
Pir spehî û rûayet bû ew her li ber çavan
Şaneke razgîr rûniştî bû li ser dêmexalan
Temberîka ser enîyê her bi lîsk bû li bana
Di eşqa dil de hemû yek in çî cahil û çî zana
Loma ne gengaz e ku ez vegerim ser kufrê piştî îmana

Xatûnê mest û har bû bi van helbestên min en diltênik. Di pey min re bi qasî deh cêriyan li pey hev rahiştin ûde, lêdan û stranên xweş gotin. Di dawiyê de xatûna min Dunya, herkes derxist derve! Piştî ku nivîneke rengîn ji me re da raxistin li cihê herî xweş di hundur de. Em çûn ser nivînê, min kincên wê di ser re anîn û em ketin himbêza hev de di nava germahîyeke bêtîmêl de. Xatûna min hîna weke cahnîyeke ku kes lê siwar nebûbe, serhildêr û agir bû. Di emre xwe gişî de, min şeveke mîna wî şevê germ û bicoş neditîbû û ez nejiyabûm jî.

Şeveqê lêda, li Şehrezadê bû sibe, wê jî vegotina çîroka xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 294'EMÎN

Şehrezadê berdewam kir û got:

Xelîfeyê ciwan vegotina serpêhatiya xwe berdewam kir o got:

Mîna baskên kevokan min destên xwe lê pêçan
Tilî jî serbest berdan li nav wan çiya û deştan
Serkeftina mezin ev e gelo eva li ber çavan
Em herdu jî man rapêçayî mîna du rêşopdaran

Bi wî hawî ez mehekê sax li cem wê mam, mîna ku ez di buhuştê de bim. Min kes û karen xwe hemû terk kirin û dev ji dikan û ticaret û kar û welatê xwe berda. Hetanî rojekê ku ji min re got: "Mûhemedê min, nûra çavên min, ez dixwazim îro biçim hemamê. Tu jî li ser vê nivînê be û bi derekê de neçe hetanî ku ez li te vegerim." Min got: "Bila be xatûncan, ser seran ser çavan!" Li ser vê gotina min ez bi sûndxwarin dam û cêriyên xwe bi xwe re birin û çû hemamê.

Lê hîna ku ew negihabû serê sikakê, pîrejinekê li deriyê min da û derbasî hundur bû ji min re got: "Mîrza Mûhemedcan, xatûna min Zubeyde Xatûn bihistiye ku tu dengbêj û newazenekî jêhatî ye, ji te dixwaze ku tu herî cem wê, hebekî jê re bistirê!" Min jê re got: "Bi navê Xwedê ez ji vî cihê xwe ranabim hetanî ku Dunya Xatûn neyê vir!" Pîrejinê got: "Mîrzayê min nehêle ku xatûna min ji te bixeyîde û bibe dujminê te. Rabe were pê re biaxive û dîsa were cihê xwe, ma wê çi bibel!"

Ez rabûm ser xwe, min berê xwe da cem Zubeyde Xatûn û pîrê jî li pêşiya min. Çawa em gihan cem wê û ew çav li min ket, got: "Nûra çavan, qey tu dil ketiye Dunya Xatûnê?" Min got: "Ez kole û bendeye te me xatûna min!" Wê jî got: "Naxwe gotinên di derbarê te de rast in. Bi rastî jî tu xortekî lihevhatî, bedew û bi edeba xwe jî tu kamil î. Tu ne têyî wesifdan ne jî vegotin! De ka êdî ji min re çend stranan bibêje da ku ez wî dengê te yê xweş jî bibihîzim!" Min got: "Ser seran, ser çavan xatûna min!"

Ûdek ji min re anîn, min ew saz kir û got:

Dilê dildar binkefî ye lew ku sîng li ser sîngê be
Laşê wî jî talankirî ye lew ku di nav coşê de be
Hemû zilam nikarin bijîn debar nakin bê canan
Di her kerwanekî de evîndareke wan heye bêgûman
Rûheyva xwe dispêrin we hûn jî wê biparêzin ji dehfikan

Gava min ev helbesta xwe qedand, ji min re got: "Xwedê te bisitirîne û tendurustiyê baş bide te, bi rastî jî te pir xweş got. De êdî raba zû vegere cihê xwe beriya ku Dunya Xatûn vegere malê û te nebîne. Lewre ger wisa bibe, dê pir biqehere!" Min erda ber nigên wê maçî kir û ez rabûm ser xwe,

bi lez ketim rê de. Ez hatim malê, min dît ku Dunya min ji hemamê vege-riyaye û li ser doşek û nivînê raketiye. Ez li ber nigên wê rûniştim û min destê xwe danî ser gwîzeka wê. Şîyar bû, çavên xwe ji hev vekirin. Çawa ku awirên wê li min ketin, pêhnêk li min da ez li erdê xistim û got: “Xayinê bêbext! Te soza xwe negirt, tu li cihê xwe nema li bendî min û tu çû cem Zubeyde Xatûnê. De binêr willehî û billehî û tillehî heger ez ji hetikandinê netirsiyama, ez ê biçûma min ê qesra wê bi ser serê wê de baniya xwarê!”

Dûvre li ebdê xwe zivirî û jê re got: “Sewab can, rabe serê vî xayinî jê-bike, tu pêdiviya me pê nîne!” Ebdê wê hat, terîşek ji bin çengê xwe derxist, çavên min pê girêdan û xwest ku serê min bifirîne...

Şeveqê lêda û li Şehrezadê bû sibe. Wê jî vegotina çîroka xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 295'EMÎN

Şehrezadê berdewam kir:

Mûhemed Elî Elcewhirî vegotina serpêhatiya xwe berdewam kir û got:

Gava ku bendeyî wê çavên min girêdan û xwest ku min bikuje, hemû cêrî, xulam û mezin û biçûkên di mal de jê re got: “Xatûna me, ev ne ye ewilî ye ku vê şaşitiyê dike. Tenê vî camêrî hîna tebiyetê te nasnekirîye û hew, tu gunehên ku li ser bê kuştin nekiriye!” Dunya Xatûn got: “Dîsa jî divê ez tiştêkî bi serê wî de bînim!” Di pey re ferman da wan ku bi şiv û qamçiyên li newqa min bidin. Ev şopên ku we ew li ser newqa min dîtî jî, yên lêdanê ne. Dûvre jî ferman da xulamên xwe ku min ji qesrê derxînin derve û min bavêjin sikakê. Wan jî wisa kir. Ez hêdî hêdî û buhust bi buhust meşiyam hetanî ku min xwe gîhand malê û gazî bijişkekî kir û birîna xwe nîşanî wî da. Wî jî ez derman kirim û ber dilê min xweş kir.

Piştî ku ez hebekî baş bûm û êşa laşê min sivik bû, ez çûm dikana xwe û min hemû malê xwe firoto. Min malê xwe giş komî ser hev kir û min çarsed heb bende ji xwe re kirrîn, ku tu sultan jî nikarin wisa bikin. Min ev keştî jî bi hezaran dînar û zêran çêkir û min navê xelîfe li xwe kir. Min her xulamêk de ser karekî, peywirek jê re dît ji bo ku xelîfe bişopîne û de-ma meşa di nav Dicleyê de bangeşkar biqîre û bibêje: “Çi kesê ku di nav ava Dicleyê de seyrane bike wê serê wî were jêkirin. Bi wî hawî, ev saleke her şev ez dused heb xulamî bi xwe re derdixim û şeva di peyre jî dusedên mayîn derdixim bi xwe re. Ev saleke min qedîyaye û hîna jî min tu agahî ji Dunya Xanê negirtiye.”

Piştê giriya û bi helbestî got:

Bi sond û peyman heta hebim wê ji bîr nekim

Ne dihêlim keseke din nêzî min bibe piştî wê
Ne jî ez nêzikî tu jinên din bibim piştî Dunyayê
Weke heyveke çarderojî bû ew di şemala xwe de
Subhan ji xaliqê wê re her sed subhan ji wî re
Te ez kirim xemgînekî bi çolaketî û der be der
Dilê min jî her li gel te ye nizane bi şûn de her

Gava Harûnê Reşîd ew serpêhatiya wî guhdar kir û ew evîn û bêrî û dilêşa wî dît, pir hestiyar bû û li rewşa wî ecêbmayî ma! Piştî got: “Subhan ji wî re ku ji her tiştêkî re sebebek peyde kiriye!” Piştî destûr ji wî ciwanê dilbîş xwestin, wî jî destûr da wan. Xelîfe Harûnê Reşîd di dilê xwe de soz dayê ku alîkariya wî bike û dermanekî jî kulên wî re bibîne. Bi wê nêtê kete rê de, ew û wezîrê xwe Cafer û celladê xwe Mesrûr çûn qesra xîlafetê. Kincên taciran ji ser xwe avêtin, kincên xwe li xwe kirin, xelîfe li ser textê xwe rûnişt û ji Cafer re got: “Her wî xortê ku şeva berê em li cem bûn, bine vê derê!” Cafer got: “Ser seran, ser çavan, Emîrê Bawermendan!”

Cafer di cî de ket rê û çû cem wî xortî, jê re got: “Emîrê Bawermendan Harûnê Reşîd gazî te dike!” Mûhemedê ciwan rabû ser xwe û bi Cafer re çû qesra xelîfe, derket dîwana wî, erda bin nigên wî maçî kir û dua jê re kirin bi temenekî dirêj, tendurustî û bextewariyeke bêdawî, dahatûyeke ronek û gîhaştina armancan; defa feqîrî û xizaniyê; bidawîhatina şer û ceng û bêaramiyê. Di dawiyê de jî got: “Silav li ser te ey Emîrê Bawermendan û parêzkarê ol û rûmetê.” Di pey re jî bi helbestî got:

Deriyê te hîna jî vekirîye ji herkesi re mîna kabeyekê
Dilê te jî ji hemû mazlûman re vekirîye weke qublegehekê
Toza axa te jî her wêneyan dikşîne li ser eniyên xelkê
Ev der jî meqamê abidan e û tu jî Îbrahîmê Xelîl î

Harûnê Reşîd pê re bişirî, silava wî lê vegerand, bi comerdî ew pêşwazî kir, ew nêzî xwe da rûniştandin û jê re got: “Ya Mûhemed Elî, ez ji te dixwazim ku îşev çî bi serê te hatibe, tu wî ji min re bibêjî, lewre ez dizanim ku tiştin erjeng û ecêb bi serê te de hatine.” Xortê ciwan got: “Ez lêborîna xwe ji te dixwazim Emîrê Bawermendan, ez hêvîdarim ku tu destmala ewlehiya min bidî min, ji bo ku dilê min aram bibe û ez bikaribim bi axivim!” Xelîfe got: “Bila dilê te di cî de be û tirs bi te re qet çênebe, ez bext didime te ku tu di ewlehiya min de yî.” Xort jî dest pê kir, çîroka xwe û tiştê ku şeva din qewimîbû, hemû ji serî hetanî binî jê re vegot. Xelîfe têgişt ku Mûhemed dildar e û kesên evîndar jî bi derd in. Jê re got: “Tu dixwazî ku ez Dunya Xatûnê li te vegerînim?” Mûhemed got: “Heger ev bibe, dê bi saya Emîrê Bawermendan bibe...”

Şeveqê lê da û li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

Şehrezadê berdewam kir:

Gava ku Mûhemed ev gotin anîn ziman, xelîfe li wezîrê xwe zîvirî û jê re got: “Cafer! Here xwişka xwe Dunya Xatûn bine vir!” Cafer got: “Ser seran, ser çavan, Emîrê Bawermendan!” Û di cî de çû xwişka xwe anî wir. Xelîfe jê re got: “Tu dizanî bê ev kî ye, te ew nas kirî?” Dunya Xatûnê got: “Emîrê Bawermendan, ma wê çawa jin zilaman nas bikin?” Xelîfe beşîşî û jê re got: “Dunya, evê hanê dildarê te Mûhemed Elî Cewherî ye. Me çîroka wî guhdar kir û me mijar ji serî hetanî binî fên kir. Ne ew tenê jî, em tiştên berçav û ên neberçav jî fêr bûn. Yanî tiştêkî veşartî nemaye û raz jî hişkere bûne!” Dunya Xatûn got: “Emîrê Bawermendan, qey ev di qedera min de hebû. Ez lêborîna xwe ji Xwedayê xwe dixwazim û ez hêvîdar im ku tu jî min efû bikî!”

Xelîfe kenîya û gazî qadî û şahidan kir, mehra wan ji nû ve birrî û ew bi hevdû şa kirin. Jiyanêke pir xweş û bextewar bi hev re derbas kirin. Harûnê Reşîd jî ew kir nedîmekî xwe û şevbuhêrkên xweş bi hev re jiyan, di nava xweşî û şahîyê de û bi wî hawî beredewam kirin hetanî ku kurme xerabiyê û fitneya fesadan kete nav wan de...

Dunyazadê ji Şehrezadê re got: “Xwişkê can, vegotina te ya çîrokan çiqasî xweş e! Tu bi Xwedê kî xwişkê can, kanî hinek çîrokan din jî ji me re bibêje!” Şehrezadê got: “Ser seran, ser çavan xwişkê, heger şahê gewre Şehreyar izne bide min, ez ê bibêjim!” Şehreyar got: “Kanî çi li cem te heye, bibêje Şehrezad!”

(ÇÎROKA ‘ELÎYÊ ECEM)

Şehrezadê got:

Tê gotin ku rojekê Xelîfe Harûnê Reşîd bêhteng û aciz bû. Rabû gazî wezîrê xwe kir û jê re got: “Cafer! Ez îro pir aciz im û qelaqeke ecêb ketiye nava min de. Ez dixwazim ku tu rêyekê bibînî, tiştêkî bike ku bêhna min pê derkeve!” Cafer got: “Emîrê Bawermendan, dostekî min heye, navê wî ‘Elîyê Ecem e ku gelek çîrokên balkêş û nebîhîstî li ba wî hene. Hemû çîrokên kêf û dilxweşiyê ne, bêhna mirov derdixînin.” Xelîfe got: “Here gazî wî bike!” Cafer got: “Ser seran, ser çavan, Emîrê Bawermendan.” Û di cî de derket, çû qasidek şand dût ‘Elîyê Ecem, ew anî cem xwe. Ji bo ku wî derbasî cem xelîfe bike, jê re got: “Xelîfe te dixwaze, tu jî hewl bid ku tu jê re bibî bersiv!”

Cafer, ew derbasî cem xelîfe kir. ‘Elî çû erda bin nigê wî maçî kir, sila-

vek dayê. Xelîfe jî qedrê wî girt û destûr dayê ji bo ku rûnê. Piştî xelîfe jê re got: “Ey ‘Elî! Îşev bêhna min teng bûye û dilê min jî tengezar bûye. Îcar min bihîst ku çîrok û serpêhatiyên xweş li ba te hene. Ez dixwazin ku tu hinekan ji wan ji min re bibêji û vê kerbê ji ser dilê min biferikîni!” ‘Elî got: “Ey Emîrê Bawermendan, gelo tu kîjanan dixwazî?” Xelîfe got: “Tiştêkî ku te bi çavên xwe dîtibe ji min vebêje!” ‘Elî got: “Ser seran, ser çavan ezbenî!” Piştî berdewam kir û got: “Emîrê Bawermendan! Berê, carinan ez ji Bexdê diçûme bajarên din li gel xulamêkî xwe û min tûrikekî xwe yî xweşik jî dibir. Rojeke, disa ez û wî ji Bexdê derketin û em çûn bajarekî xerib...

Şeveqê lêda û Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 297'EMÎN

Şehrezadê vegotina çîroka xwe berdewam kir:

Elîyê Ecem serpêhatiya xwe berdewam kir û got:

Em çawa gihan wî bajarî, em çûn sûkê û me dest bi kîrrîn û firotanê kir. Lê ji nişkê ve zilamakî Kurd ê êrîşkar bi ser min de hat û ew tûrikê min ji destê min derxist, bir û got: “Ev tûrik ê min e û her tiştê tê de jî malê min e!” Min qîrek da û ji derdora xwe re got: “Misilmanino, xelkino! Werin min xelas bikin ji destê vî zalimî!” Xelkê jî got: “Herdu jî herin cem qadî bila ew pirsgirêka we çareser bike!” Rabû me berê xwe da cem qadiyê ku ez jî bi hukmê wî razî bûm. Gava em derbasî cem wî bûn, qadî ji me re got: “Di kîjan mijarê de we li hev nekiriye û hûn hatine ji bo ku ez biryarê bidim?” Min got: “Em herdu bi angaşt in di derbarê hev de û em dixwazin ku tu me li hev binî û biryara heqane bidî.” Got: “Kî ji we angaştîkir e?” Ê Kurd xwe da pêş û got: “Xwedê ji qadiyê me razî be, ezbenî ev tûrikê han, ê min e û hemû tiştê tê de jî malê min e. Min ew winda kiribû û vî zilamî jî ew ditiye...” Qadî got: “Te kengî wenda kiribû?” Ê Kurd got: “Şeva borî min ew wenda kiribû û şev pê de jî ez raneketim ji derdê wî.” Qadî got: “Heger tûrik ê te be, naxwe ka bibêje bê çi tê de heye?” Ê Kurd got: “Di tûrikê min de kilê çavan, destmalka destan, du mûm û du şemedan, têra raxistina du malan jî merş û ber û mînderan, taximek sênî û taximek kevçî, balîf û doşekik, du misîn, du teşt û du tas, çoçîkek, heskek, du kevgir, distek û du beroş, avşokek û du selik, zembîlek û tîrikek, pisîkek û du kûçîk, miqîlkek û da kursî, kulavek û du kurk, çêlekek û du golik bizinek û du karik, mîhek û du berxik, dolabek û du kulîn, deveyek û du gamêş, gayek û du hirç, şêrek û du rovî, textek û du nivîn, qesrek û du eywan, hêwanek û du ode, metbexek bi du deriyan û qedemgehek tê de hene. Heger tu ji gotina min bawer nake jî, gelek Kurdên me hene ku şahdebûnê ji min re bidin.” Ez şaşwaz û matmayî bûm bi vê gotina wî. Qadî li min zîvirî û ji min re got:

“Tu çi dibêjî?” Ez jî ber bi wî ve çûm Emîrê Bawermendan û min jê re got: “Xwedê Teala qadiyê me biparêze û hêzê bide wî. Ez jî dixwazim bibêjim ku di vî tûrikê min de maleke bêderî û du kaviyê de hene. Koxikek kûçikan û du pînekên mirîşkan, pirtûkin ji bo zarokan û xortin ku bi kaban dilîzin, kon û çadir û zomên koçerên, bajarê Besra û Bexdê, qesra Şeddad Bin Ad û kûrên heddadan, torên masîvanan û dar û berên dartistanan, gelek kur û keç û xort jî tê de hene û bi hezaran qewadên ku şahidiya min bikin hene ku ev tûrik ê min e.”

Gava yê Kurd ev gotinên min bihîstin, giriya, li çogên xwe da û got: “Mîrzayê min, qadiyê min ev tûrikê min baş tê naskirin û her tiştê tê de jî diyar e. Lewre di vî tûrikê min de sûr û burç û keleh hene, şêr û piling û keftar hene, zîlamên ku bi setrence dilîzin, hesp û mihîn û rim û rimbaz, kîvroşk û kund û qertal, bajarek û du gund, qewad û qûnekên jêhatî, mîrovên xesandî û yên nelirê, korek, kerrek û du heb qop, keşîşek, du qewal û haxamek, du rehîb û qadiyek, du gundî û şahidek tê de hene û hemû jî şahdebûnê ji min re didin ku ev tûrik ê min e.”

Qadî got: “Elî, tu çi dibêjî?” Îcar Emîrê Bawermendan, jixwe ez pir hêrs bûbûm ji ew ê Kurd û wê gotina wî, hindik mabû ku ez biteqim. Min lê vegerand û got: “Xwedê temenekî dirêj bide qadiyê me û wî bisitirîne ji xerabiyê...”

Şevqê lêda û li Şehrezadê bû sibe. Wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 298'EMÎN

Şehrezadê berdewam kir:

Elî bersiva qadî da û got:

Qadiyê heja! Di tûrikê min de, zerd, pirtûk, depoyên çekan, hezar be-
ran zozanên koçeran û keriyên pezê wan, hezar kûçikên şivanan û mîrgên
bêsinor, bîstan û bexçe û lalezar û zevîyên şimamokan, darhejîrok û dar-
sêvok, reşkên şevê û hestên şewqdêr, dawet û şahî û herc û merc û den-
gbêj, welatên bêsinor, birayên serkeftî li gel artêş û rim û mertal û şûrên
xwe, dadgehên ku dadweriyê belav dikin û şevbuhêrkên nedîman, xelekên
meyxurên dost û hevalan, zindananê gûnehkaran, tîr û kevan û nêçîrvan,
def û dahol û tembûr, al û aldar û artêşên bêjimar, keç û bûkên bixêlî, cêrî û
stranbêj û pênc jinên Hebeşî, sê heb Hîndî, çar heb bajarî, bîst jinên Romî,
pêncî hebên Tîrk, heftê hebên Ecem, heştê hebên Kurd, not hebên Corcî
û Dicle û Firat, torên masîvanan, heşt dîkê çekê, Îrem a Zatîl Îmad û nê-
çîrvan û axur û mizgeft û hemamên bêjimar, avahî, xerat û dep û bizmar
û ebdekî reş î pêpîk, serdarek, du parêzvan û gelek bajar û bajarok, sedhe-

zar dînar li gel kûf û ambarê, bîst sindoqên tijî qumaş û pêncî weznadar û mehmizdaner, Xezze û Asqelan li gel Dimyat û Aswan û Îwana Kesra Enûşîrwan, Melîk Silêman û mulkê wî, ji Newalê Nûman hetanî Xorasanê, ji Belxê hetanî Îsfexanê, ji Hîndîstanê hetanî Sûdanê tê de heye. Dîsa qadiyê hêja, qeyd û zincîr û hezar kêr û xencer û gûzanên ku rîha qadî kur bikin tê de hene, heger ji cezayê min netirse û biryarê nede ku ev tûrik ê min e!”

Gava qadî ev gotin bihîstin, ew jî pir hêrs bû û got: “Ez wisa dibînim ku hûn her du jî du kesên rûşûştî, bêoxir û zendîq in! Hûn herdu bi qadî û hakimî dilîzin û hûn jî kesî natirsin. Lewre tu kesî ne dîtîye, ne jî bihîstîye tiştêkî mîna ev tiştê ku hûn dibêjin û tu kes jî mîna we neaxivîye. Bi her sê navên Xwedê, ji Çîn û Maçîn hetanî dara Um Xeylan û ji welatê Farisan hetanî bi erda Sûdan û ji Newalê Nûman hetanî bi Xorasanê, tu kesî gotinek mîna van gotinên we nebihîstîye, ne jî tu kes jî gotineke wisa bawer dike. Ma qey ev tûrikê ku hûn behsa wî dikin behreke bêbinî ye ango erda ku roja qiyametê bawermend û kafirên ser rûyê dinyê hemû lê kom dibin?”

Piştî qadî ferman da ku wî tûrikî vekin. Tûrik vekirin, dîtî ku nan û leymûn û penêr û zeytûn tê de ne. Min jî tûrik avêt ber nigê yê Kurd û ez ji wir çûm.

Gava Xelîfe Harûnê Reşîd ev serpêhatîya ‘Elî Ecem bihîst, kenîya û her kenîya hetanî ku zikopiştî li hev qulipî û xwe li erdê dirêj kir. Piştî ‘Elî Ecem xelat kir û têra wî zêr danê.

Şeveqê lêda û li Şehrezadê bû sibe. Wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 299’EMÎN

(ÇÎROKA HARÛNÊ REŞÎD BI ÎMAM EBÛ YÛSIF RE)

Şehrezadê got:

Tê gotin ku Cafer ê Bermekî şevêkê bû nedîmê Harûnê Reşîd û şevbuhêrkek pê re geş kir. Di şevbuhêrkê de, Harûnê Reşîd ji Cafer re got: “Min bihîstîye ku te filan cêrî kirrîye ku ev demeke dirêj bû ez bi dû wê cêrîyê de bûm û min dixwest ku ez wê ji xwe re bikirrim, lewre pir spehî ye û dilê min sotiye. Loma ez dixwazim ku tu wê bifiroşî min!” Cafer got: “Ez wê nafirosim, Emîrê Bawermendan!” Harûnê Reşîd got: “Naxwe wê diyarî min bike!” Cafer got: “Ez wê diyarî jî nakim.” Harûnê Reşîd hêrs bû û got: “Bi her sê telaqê bêfitû, ger ku Zubeyde ji min bê berdan jî, ya tê wê cêrîyê bifiroşî min an jî tê wê diyarî min bikî!” Cafer got: “Bila jina min jî ji min berdayî be, bi hersê telaqên bêfitû ez ne wê difiroşim te û ne jî diyarî dikim.”

Piştî herdu jî bi ser hişê xwe hatin û ji bin bandora serxweşiya meyê derketin, şaş û heyirî mabûn li wan gotin û helwestên xwe! Herdu jî têgihîştin ku ketine rewşeke pir xerab ku xelasî jê tune! Herî dawî Harûnê Reşîd ji Cafer re got: “Ne Ebû Yûsûf be tu kes nikare me ji vê pirrikê derxîne!”

Qasîdek şandin dûv mele di wê nîvşevê de. Ebû Yûsûf di nava tirs û qelaqeke mezin de ji xew rabû û di dilê xwe de ji xwe re got: “Şandina dûv min û di wextekî şevê yê weha de, dide xuyakirin ku pirsgirêkeke di derbarê Îslam û olê de ye!” Beriya ku bi rê keve, ji xulamê xwe re got: “Me îşev êmê qantira xwe nedayêyê, loma ji bîr neke ku tu cuherê wê tijî êm bikî û bi xwe re bînî! Û lê siwar bû, berê xwe da qesra Harûnê Reşîd. Di rê de ji xulamê xwe re got: “Gava me qantirê xwe girêda û em derbasî cem Harûnê Reşîd bûn, tu ji cuherê qantir têxe stûyê wî, bila feqîro jî zikê xwe dagire!” Xulam got: “Bila be ezbenî!”

Gava Îmam Ebû Yûsûf derbasî cem Harûnê Reşîd bû, xelîfe ji ber wî rabû û ew li kêleka xwe, li ser nivîna xwe da rûniştandin. Halbuki hetanî wê rojê, ji xeynî wî tu kes li ser wê nivînê rûnenîştibû. Xelîfe li Mele zîvirî û jê re got: “Ne ji bo mijareke pir girîng bûya me vê şevê gazî te nedikir!” Mijar jê re vekir û got: “Em pir li ser fikirîn, lê me tu çare jê re nedîtîn. Li dawîyê jî me got heger kesekî bikaribe vê pirsgirêkê çareser bike hebe, dê ew kes meleyê me Ebû Yûsûf be!” Mele got: “Emîrê Bawermendan, ev mijar ne ewqasî zor e.” Li Cafer zîvirî û jê re got: “Cafer ka nivê wê bifiroşe Emîrê Bawermendan û nivê mayî jî diyarî wî bike. Bi wî hawî hûn herdu jî, hûn ê ji sûnda xwe xelas bibin!”

Xelîfe pir kêfxweş bû û rûyê wî vebû, dilê wî aram bû. Tiştê ku Mele gotibû pêk anîn, ji sûnda xwe rizgar bûn. Xelîfe ji Cafer re got: “Kanî cêriyê bînin, ez li ser agir im, min pir bêriya wê kiriye!” Di cî de cêrî anîn, xelîfe ji Mele re got: “Sebra min nemaye û ez dixwazim niha pê re rakevim! Gelo ez mecbûr im ku li bendî derbasbûna çilrojîyê bibim hetanî ku ez pê re rakevim? Ma qey çare ji vê re jî tuneye?” Ebû Yûsûf got: “Kanî koleyekî Emîrê Bawermendan ji min re binîn vir ku nehatibe azadkirin!” Rabûn jê re koleyekî wisa anîn, Ebû Yûsûf got: “Ez ê niha wê li vê koleyî mehr bikim û di cî de jî pê bidim berdan beriya ku pê re rakeve, wê çaxê tê jî bikaribî îşev pê re rakevî bêyî ku tu xwe li bendî buhurîna çilrojîyê bigirî.” Xelîfe ev fikra wî eciband û izin da wî ku mehra wê li kole bibire. Qadî jî mehra wan birrî, yê kole ji mehrberrînê razî bû. Piştî qadî ji kole re got: “De êdî wê berde û sed dînarî bigire!” Kole got: “Ez wê bernadim!” Mele Ebû-Yûsûf dînarî din jî li wî sedî zêde kirin û pê de çû hetanî hezar dînarî, lê kole qebûl nekir û got: “Berdana wê di destê min de ye, ango di destê Emîrî Bawermendan de ye?” Mele Ebû Yûsûf got: “Na wele di destê te de ye.” Kole got: “Naxwe ez qebûl nakim!”

Xelîfe pir hêrs bû û li Mele zîvirî, got: “Çare çîye, Ebû Yûsûf?” Mele got: “Emîrê Bawermendan, tu qet xwe aciz neke, çareserkirina mijarê ne zor e. Hela kanî vî kolayî bide cêrîyê bila bibe malê wê.” Xelîfe got: “Ez vî kolayî didim wê, êdî mal ê wê ye!” Mele ji cêrîyê re got: “Tu jî bibêje min qebûl kir!” Cêrîyê got: “Min qebûl kir.” Mele got: “Ji ber ku ew bû mulkê wê, niha jî ez biryara berdana wan ji hev didim: Êdî mehra we betal bû!”

Emîrê Bawermendan hilmeke kûr kişand, rabû ser xwe û got: “Încex îmamekî mîna te dikare daxwaz û hêvîyên mirov pêk bîne!” Piştî gazî xeznedarê xwe kir, sêniyên tijî zêr xwestin û li Ebû Yûsûf vegeriya jê re got: “Gelo tiştêkî ku tu van zêran têxêyê li ba te heye?” Wê kêlîyê, cuherê qantira wî hat bîra wî. Gazî xulamê xwe kir û jê xwest ku wî cuherî bîne. Xulam çû cuher anî, wî jî cuherê xwe da ber zêran, ew tijî kir û çû mala xwe di nava kêf û şahîyeke bêtimtêl de.

Gava bû sibe, Mele Ebû Yûsûf ji civata xwe re got: “Rêya herî hêsan ji bo ol û dinyê herduyan jî, rêya zanînê ye. Ev qase malê han giş, min ew di ber çareserkirina du-sê mijaran de girt. De îcar bala xwe bidin vê zanîna afirîner bê çiqase qencî tê de hene!”

Bi xêra zanîna wî Meleyî, Xelîfe û Cafer herdu jî ji sûndxwarinê rizgar bûn, di heman demê de, daxwaza xwe pêkanîn û neketin gunehan de jî...

Şeveqê lêda û li Şehrezadê bû sibe. Wê jî vegotina çîroka xwe birrî û bêdeng bû.

HEZAR Û YEK ŞEV

CİLD 7

(ÇÎROKA XALID BÎN ABDULLAH EL QESRÎ)

Şehrezadê vegotina çîrokên xwe ji Şehreyarê gewre re berdewam kir û got:

Tê gotin ku Xalid bin Abdullah El Qesrî emîrê Besrayê bûye. Rojekê çend mirovên ku xortek destgîr kiribûn hatin cem wî. Xortê destgîrkirî pir spehî, lihevhatî, giran, mûcîd, biedeb, aqilmend û xwedî bêhneke xweş bû. Gava ku Xalid çîroka wî xortî ji wan pirsî, gotin: “Ev xortê hanê dizek e, şeva borî, me ew di mala xwe de girt!” Xalid li wî xortî nihêrî, şikl û şemalê wî, paqîjiya wî ya zêde pir bandor lê kir, ji wan her çend mirovan re got: “Wî berdin!” Piştî ew nêzikî xwe kir û jê pirsî, got: “Kanî tu rastiya serpêhatiya xwe ji min re bibêje!” Ê xort got: “Ev ciwamêr rast dibêjin û bûyera qewimî jî wisa ye, çawa ku wan anî ziman.” Xalid jê re got: “Çi hişt ku tu diziyê bikî û tu xortekî wisa bedew û maldar xwiya dikî?” Ê xort got: “Tumahiya malê dinyayê ew tişt bi serê min de anî. Qey li ser eniya min nivîsandibû, ma ez çawa bikim!” Xalid jê re got: “Sêwîmawo! Qey ev bedewiya rû û aqilê te, ev sinc û edeba te pêşiya te negirt, ku te destê xwe avêt malê heram?” Ê xort got: “Emîrê min, dev ji vê mijarê berde û guh bide ser gotin û fermanên Yezdanê dilovan. Tiştê ku destên min kirine ev e û Xwedê tu zilmê li kesî nake!”

Xalid, bi qasî katjimêrekê bêdeng bû, li ser rewşa wî ciwanî ramiya, piştî nêzikî wî bû û jê re got: “Ev mikurhatina te pir bala min kişand û ez texmîn nakim ku tu diz bî! Dibe ku ji derveyî diziyê, serpêhatiyeke te yî din hebe? Kanî wê serpêhatiya xwe ji min re bibêje?” Ê xort got: “Mîrê min, bila tu guman bi te re çênebin, lewre tu çîrokên din li ba min tune ne, ji xeynî diziya ku min behsa wê ji te re kir. Ez ketim mala van camêran û bi qasî ku min karibû, min malê wan dizî, lê belê wan ez girtim û ez anîm vir, ber destê te.”

Xalid, fermana zindankirina wî da û bangeşkarek peywirdar kir ku li nava Besrayê giştî bigere û gazî bike, bibêje; werin destjêkirina dizekî temaşe bikin û bi çavên serê xwe cezakirina dizan bibînin.

Gava ku ew xort xistin zindanê û qeyd û zincîr li dest û nigên wî dan, bêhna wî hat ber wî, hilmeke kûr berda. Pê re jî hevok ji devê wî hatin der û bi helbestî got:

Ez tehdît kirim Xalid bi destjêkirinê
Ger mikur neyê me ez li çîroka ewê
Min jê re got ne gengaz e wile bi Xwedê

Ez ê çawa mikur bêm li raza dil û evînê
Destjêkirin çêtir e bo min ji hetikandinê
Lew ku pir biêş be ev karê nemerdane

Dengê wî çû nobedaran, wan jî çûn Emîr Xalid agahdar kirin ji mijarê. Çawa ku şev hat û tarî ket erdê, Xalid ferman da ku xortê girtî binin hizûra wî. Gava ku ew anîn, emîr Xalid pê re axivî û bala xwe dayê ku ciwanekî bisinc, jîr û aqilmend e. Ji xizmetkaran re got: “Xwarinê jê re binin!” Xwarin anîn. Piştî ku xwarina xwe ji xwar, emîr Xalid bi qasî katjimêrekê pê re axivî û got: “Ez fêr bûm, ku çîrokeke te yî din heye ji xeynî wê çîroka diziyê. Îcar gava bû sibe û qadî hat û di hizûra xelkê de ji te pirsî li ser mijara diziyê, înkâr bike, da ku destê te jê nekin. Lew re pêxemberê me ji gotiye, ka heger guman di mijarê de hebe, ceza pêk nayê”. Di pey re jî ferman da zindanî ji bo ku wî dişa bibin zindana wî, xort jî di wir de raket hetanî sibehê.

Gava bû sibeh, xelk kom bûn, ji bo ku cezayê destjêkirinê temaşe bikin. Tu kes di bajarê Besrayê de nema, hemû kal û jin û zarok û ciwan li qadê kom bûn. Emîr Xalid jî li ser piştê hespa xwe li wir amade bû, li gel giregir û mezinên Besrayê. Piştî qadî jî hat, xortê girtî di nava qeyd û zincîran de, derxistin rabêrî gel. Çi kesên ku ew dîtin, hestiyar bûn, dilê wan bi ser ve çû û li ser rewşa wî giriyan. Herî zêde jî wêlewêla keç û jinan bala mirov dikişand. Loma di destpêkê de qadî xwest ku jin bêdeng bibin, piştê got: “Xortê hêja, ev mirovên hanê angaşt dîkin, ku tu ketiyî mala wan û te dizîya wan kiriye. Lê xwiya dike ku te sînore ceza derbas nekiriye! Xort got: “Belê weleh min sînor derbas kiriye û min ceza heq kiriye.” Qadî got: “Lê dibe ku tu şîrikê wan bî, di tiştêkî de?” Xort got: “Na wele tiştên ku min dizîn, hemû yên wan bûn û tu heqê min li ser wan tune bû.” Bi van bersivên wî re, emîr Xalid pir hêrs bû û ew bi xwe pê ve rabû, qamçiyek li ser çavên wî da û got: “Mirov dixwaze tiştinan li gorî dilê xwe bike, lê Xwedê teala jî her wekî xwe dike!”

Di pey re jî gazî qesab kir ji bo ku destê wî jê bike. Qesab hat û kêra xwe anî. Xort jî destê xwe dirêjî bin kêrê kir, ji bo ku jê bike. Wê kêlikê, keçek lihevhatî ji nav koma jinan derket, pêşde hat, qîrek jî da û xwe avêt ser wî xortî, rûpoşa xwe jî ji ser çavên xwe da alî. Gava ku xelk çav li rûyê wê yê mîna heyvê ket, xirecir û qelebalixeke mezin bi wan ket, ku hindik mabû arbede derkeve. Keçikê berê xwe da Xalid û bi dengê bilind qîriya, got: “Emîrê min, tu bi xatirê Xwedê kî, destê wî jêneke, hetanî ku tu vê nivîsê nexwînî!” Û kaxeze vekir, lê nihêrî, dît ku ev rist tê de nivîsandî nê:

Ey Xalid ev xortê han aşiq e, ne diz e
Awirên min in ên li dilê wî dane
Bo wê sûcekî ku nekiriye qebûl kiriye
Da ku nehetike evîndara wî di holê de
Êdî xwe lê ragire ev xort ne xerab e

Xweşmêr e, xweşsinc e, ew qet ne diz e

Gava ku Emîr Xalid ew ristên keçikê xwendin, ji xelkê dûr ket û gazî wê keçikê kir, ew xewle kir û rastiya meseleyê jê pirsî. Keçikê jî eşkere got: “Wele ew aşiqê min e û ez jî evîndara wî me. Hat mala me ji bo min bibîne. Lê di hundir de bav û birayên min pê hisiyan û bi ser de hatin, wî jî hema rabû ser xwe, hemû kincên di hundir de kom kirin û mîna dizan xwe nîşanî wan da, da ku min bisitirîne. Bav û birayên min jî gava ew di wî halî de dîtîn, gotin diz e û ew girtin, anîn cem te. Ew jî li xwe mikur hat ji bo ku min bistrîne. Lew re xortekî dilsoz û pir hêja ye.” Emîr Xalid got: “Naxwe wî heq kiriye, ku bigihîje miradê xwe!” Rabû, gazî wî xortî jî kir. Eniya wî maçî kir û ew pîroz kir, li ser wê helwesta wî ya merdane. Piştî gazî bavê keçikê jî kir û jê re got: “Kalo, wile me biryar dabû ku em destê vî xortî jê bikin, lê Xwedê ew parast. Min biryar da, ku ez deh hezar dirhemî di ber destê wî de bidim, ji bo parastina namûsa te û keça te, di nav xelkê de. Dîsa min emir da, ku deh hezar dirhem bidin keça te, ji bo ku rastiya mijarê ji me re got û em agahdar kirin, nehişt ku em şaşitiyekê bikin. Niha jî ez dixwazim ku tu destûrê bidî min, ji bo ku ez wê bi vî xortî re bidim zewicandin!” Kalebavê wê got: “Destûr a te ye, emîrê min!”

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 301'EMÎN

Şehrezadê vegotina çîroka xwe berdewam kir û got:

Çawa ku şeva borî jî min got, emîr Xalid keçikê jê re xwest û ji xort re got: “Min destûr ji bavê wê girt û va ye, ez ê mehra keçikê li te bibirim bi qelenekî buhayê wî deh hezar dirhem. Ka tu çi dibêji?” Xort got: “Min peji-rand û ez jî vê zewacê qebûl dikim.” Pêlê ke kêf û şahiyê girt ser rûyê xelkê, hemû dilxweş bûn bi wê pêşketinê. Berê bûk û zava dan mala wî, li gel deh hezar dirhemê ku emîr Xalid dabû wan û xelkên bajêr jî bi dilxweşiyeke mezin berê xwe dan malên xwe. Ew roj, rojeke pir erjeng bû; bi şer û girî û êşê dest pê kiribû û bi kêfxweşiyeke mezin jî qediyabû. Tu roj. mîna wê rojê nebûn!

(ÇÎROKA HARÛNÊ REŞÎD Û MIHEMEDÊ TIRAL)

Şehrezadê berdewam kir:

Îcar şahinşahê min ê bextewar, tê gotin ku rojekê ji rojan gava ku xelîfe Harûnê Reşîd li ser textê xwe rûniştibû, xulamekî navmalî derbasî cem wî bû ku taceke ji zêrê sor di destê wî de bû. Tac, bi durr û cewheran neqîşan-dî bû û yaqût û cewherên li ser jî bi buhayekî ku nayê gotin, bûn. Xulam

erda bin nigên xelîfe maçî kir û got: “Ey xelîfeyê bawermendan! Zubeyde Xatûn erda bin nigên te maçî dike û ji te re dibêje, ku tu dizanî wê ev tac çêkiriye û pêdiviya vê tacê bi cewhereke mezin heye, ji bo di serê wê de cî bigire. Lê ew di nav ên xwe de geriya û cewhereke wisa di nav wan de nedît.” Xelîfe ji berdestkê xwe re got: “Li cewhereke mezin bigere, da ku tu ji vê taca Zubeydeyê re bibe!” Berdestkê wî çû, lê geriya lê cewhereke wisa nedît. Xelîfe agahdar kirin, ew jî bêhteng bû bi wê xeberê û got: “Ez çawa xelîfe û serdarê hemû milûkên cîhanê me û ez nikarim cewherekê peyde bikim?” Dûvre li xizmetkarên xwe zivirî û bi ser wan de qîriya got: “Herin ji taci-ran bipirsin!” Ew jî çûn, pirsîn û hatin, jê re gotin: “Emîrê bawermendan, cewhereke wisa niha li van deran peyde nabe. Tenê li gel mirovekî Besrayî peyde dibe, ku navê wi Mihemedê Tiral e.”

Ev agahî ji xelîfe re birin, wî jî ferman da wezîrê xwe Cafer, da ku rênamayekê bişîne ji emîrê Besrayê Muhamed El Zubeydî re, ji bo ku Mihemedê Tiral bibîne û wî jê re bişîne. Wezîrê wî Cafer, ferman pêk anî û derbarê mijarê de nameyek nivîsand, radestî Mesrûr kir û berê wî da bajarê Besrayê. Mesrûr çû Besrayê, derbasî cem emîr Muhamed El Zubeydî bû û name radestî wî kir. Emîr jî pir kêfxweş bû bi hatina wî û bi awayekî baş ew pêşwazî kir. Piştî rênayê xwend û fermana xelîfe girt, got: “Ser seran û ser çavan! Ez ê Mesrûr li gel çend camêran bişînim cem Mihemedê Tiral.” Şandeya bi pêşewantiya Mesrûr çûn cem Mihemedê Tiral û jê re gotin: “Mîrzayê me, emîrê bawermendan te dixwaze!” Mihemedê Tiral erda bin nigên Mesrûr maçî kir û got: “Ser seran ser çavan, ez ê daxwaza emîrê bawermendan bikim lê kerem bikin, derbasî mala min bibin, da ku ez îkrama we bigirim!” Mesrûr û zilamên xwe jî gotin: “Welehî em pir lezgîn in û emîrê bawermendan jî li hêviya te ye!” Wî jî got: “Hebekî xwe ragirin hetanî ku ez xwe amade bikim!”

Şevqê lê da û li Şehrezadê bû sibe, wê jî vegotina çîroka xwe sekinand û bedêng bû.

ŞEVA 302'YEMÎN

Şehrezadê vegotina xwe berdewam kir;

Piştî Mihemedê Tiral ferman da çend xulamên xwe, ji bo ku Mesrûr û yên pê re bibin hemama di malê de. Gava xulaman ew birin hemamê, dîtin ku diwar hemû ji mermer in û giş jî bi zêr û zîv neqîşandî ne. Ava hemamê jî bi ava gulan hatibû xweşkirin û her tişt mîna ku perçeyekî ji bihuştê be xuya dikir. Xulam li ber destên wan çûn û hatin, xizmeta wan kirin, hetanî ku şuştina xwe qedandin.

Dema ku ji hemamê derketin, kincin ji dibacê li wan kirin, ku bi zêr

hatibûn hûnandin û bi wî hawayî ew birin cem Mihemedê Tiral. Gava derbasî cem wî bûn, ditin ku perdeyên ji dîbacê bi zêr neqîşandî bi dîwarê pişt wî ve daliqandî ne û qesra wî giş bi berr û balifên bi zêr neqîşandî raxistî ye û ew jî li ser textekî rûniştî ye, ku bi lûlû û gewheran xemilandî ye.

Çawa ku Mesrûr û heyeta xwe derbasî cem Mihemedê Tiral bûn, bi germahî pêşwaziya wan kir û Mesrûr li kêleka xwe da rûniştandin. Di pey re jî ferman da xulamên xwe û got xwarinê binîn! Dema ku sifre li ber wan raxistin û xwarinên cur be cur anîn li ser danîn, Mesrûr got: “Bi navê Xwedê, sifreya emîrê bawermendan jî ne ewqasî zengîn e!” Lewre hemû xwarinên pir xweş bûn û di lalîkên çînî yên zêrîn de bûn. Mesrûr û yê pê re xwarin û vexwarin, kêfa xwe kirin hetanî êvarê. Roja dîtirkê, Mihemedê Tiral serê yekî ji wan pênc hezar dînar da wan, kincin kesk û bi zêr neqîşandî li wan kirin û pir qedrê wan girt. Mesrûr jî jê re got: “Begê min, em ji xelîfe ditirsîn û em nikarin ji vê derengtir bikevin!” Mihemedê Tiral got: “Mîrzayê min, hema hetanî sibehê xwe li me ragire, da ku em amadekariyên xwe biqedînin û bi we re bên!”

Wê rojê jî li wir man, hetanî sibehê. Bi sibehê re xulaman hespek ji Mihemedê Tiral re amade kirin, zînekî ku bi durr û cewherên cur be cur hatibû rapêçan avêtin ser piştê wê û ew lê siwar kirin. Li himberî wê dîmena balkêş, Mesrûr di dilê xwe de got: “Heger ev zilam bi vê heybeta hanê derkeve raberî emîrê bawermendan, gelo dê emîr jê bipirse bê evqas mal ji ku bi dest xistiye?”

Di nava wan pîrs û fikaran de, xatir ji walî Muhamed El Zubeydî xwestin û ji Besrayê derketin, berê xwe dan Bexdayê. Çend rojekî meşîyan hetanî ku gihan Bexdayê û derbasî bajêr bûn, çûn ber qesra xelîfe sekinîn. Xelîfe gote wan: “Rûnên!” Ew rûniştin û di nava edebeke kamil de axivîn. Mihemedê Tiral got: “Emîrê bawermendan! Bi armanca xizmetê, min diyarîyek ji we re anîye; gelo hûn ê destûrê bidin min, ku ez wê binim?” Xelîfe Harûnê Reşîd got: “Kanî bine, tiştê nabe!” Mihemedê Tiral îşaretek da xulamên xwe, wan jî di cî de rahiştin sindoqekê û ew birin danîn ber wî. Mihemedê Tiral sindoq vekir û gelek ‘entîke jê derxistin, ku darên zêrîn ji di nava wan de bûn. Pelên wan daran ji zumrudê spî bûn û berên wan jî ji yaqûtên sor û zer û ji lûlûyên gewr bûn. Xelîfe bi heyranî li wan nihêrî û ma behetî. Piştî xulaman sindoqek din anîn, danîn ber mîrzayê xwe Mihemedê Tiral. Mihemed sindoq vekir û çadîreke ji dîbacê jê derxist ku bi lûlû û yaqût û zeberced û gelek texlîten gewheran hatibû xemilandin. Stûnên wê çadîrê ji depên hindî bûn û perên wê jî ji xemlên zumrudên kesk bûn, ku nîgarên hemû teyr û tilûr û ajalan li ser hebûn. Ew nîgar hemû jî bi cewher û yaqût û zumrud û zebercedan neqîşandî bûn.

Gava ku Harûnê Reşîd çav li wan diyariyan ket, pir kêfa wî hat.

Mihemêdê Tiral got: “Emîrê bawermendan, bêguman pêşkêşkirina min a van diyariyan, ne ji ber tirsekê ye û ne jî ji ber tamahiyekê ye. Lê belê min dît ku ez mirovekî ji rêzê me û ez layiqî van tiştên xweşik nîn im. Min ji xwe re got, hebe hebe xelîfeyê me incex layiqî van tiştan be û heger tu destûrê bidî min, ez ê hinek hunerên xwe jî nîşanî te bidim?” Harûnê Reşîd got: “Ka rabe, tu çi dikî bike, em ê ji xwe re temaşe bikin?” Mihemêdê Tiral got: “Ser seran û ser çavan, emîrê bawermendan.” Piştî rabû ser xwe, lêvên xwe birin û anîn, bi serê xwe îşaretek da şaneşîna qesrê, şaneşîn ber bi wî ve hat û tewiya. Dûvre, berevajî wê îşaretek dayê, şaneşîn dîsa vegeriya sêra berê û bû mîna xwe. Di pey re, awirek avêt deriyê girtî, xilqa wî vebû, derî bi şûn de vegeriya û dengê çûkên ku bersiv didane wî ji pişt derî hat. Harûnê Reşîd, pir matmayî ma li van hunerên wî û jê re got: “Te ev giş ji ku anîn û tu çawa fêrî vana bûyî û navê te Mihemêdê Tiral e? Bi qasî ku ji min re gotine, bavê te jî mirovekî berber bû û tu mîrate ji te re nehiştibû li dû xwe?” Mihemêdê Tiral got: “Emîrê bawermendan, ji kerema xwe serpêhatiya min guhdar bike?”

Şevqê lê da, Şehrezadê jî vegotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 303'EMÎN

Şehrezadê berdawam kir û got:

Çawa ku şeva borî jî me gotibû, Mihemêdê Tiral ji xelîfe re got:

Emîrê bawermendan, ji kerema xwe serpêhatiya min guhdar bike, tu yê bibînî bê çi çirokeke xerîb e û heger bi serê derziyê li ser bîbîka çavan bihata nivîsandin, dê bibûya îbret ji her kesî re!” Xelîfe got: “Nexwe çi li ba te heye, kanê ji min re bibêjê!”

Mihemêdê Tiral got: “Xwedê hebûna te daîm bike û te ji ser serê me kêm neke emîrê bawermendan! Her kes min bi tiralîtîyê dinase û ji ber wê jî navê min kirine Mihemêdê Tiral. Jixwe gotinên wan hetanî guhê te hatine, ka xelk hemû dibêje bavê min berber bûye û tu mîrate li pey xwe nehiştîye ji bo min. Ev her du gotin jî rast in, ji ber ku bi rastî jî bavê min berber bû û ez jî mirovê herî tiral bûm li ser rûyê vê erdê. Ez ewqasî tiral bûm ku gava ez raketî bûm û roj dihat ser min, min di xwe re nedidît ku rabim xwe bidim ber siyê.

Bi qasî pazdeh salan ez wisa jiyam. Piştî rehmetiyê bavê min çû ber dilovaniya Xwedê û tiştek li dû xwe nehişt ji bo min. Diya min jî xizmet ji xelkê re dikir, bo ku gepek nan bide min û min li ser nigan bigire. Ez jî li ser kêlekê raketibûm, min tiştek nedikir. Rojekê diya min hat cem min û pênc dirhem jî di destê wê de bûn. Ji min re got; “Kurê min, min bihîstiye ku Şêx

Ebûl Muzafer dê biçe Çînê. Îcar a ji te re van pênc dirheman bigire û here bide wî, bila bi wan tişteki ji te re bikirre ji Çînê! Belkî ma Xwedê ku tu jî ji xwe re feydayekê tê de bibînî! Lewre Şex Ebûl Muzafer mirovekî xêrkir bû û ji xizanan hez dikir. Lê belê min di xwe re nedît, ku ez rabim herim cem wî şêxî. Piştî diya min pir zorî da min û sond xwar, ku heger ez ranebim pê re neçim cem şêx, dê nema nan û ava min bide min û min li ber mirinê berde. Helbet min dizanibû ku diya min micid e di wê gotina xwe de, lewre sondên giran xwaribûn. Rabû min jê re got, kanî min ji erdê rakî! Ez raki-rim û ez li ser qûna min dam rûniştandin, ez di nav gîlî û gazinan de, min hêsr dibarandin. Min got kanî pêlava min bîne, wê jî çû pêlava min anî. Min got, wê bixe nigê min! Pêlav xist nigê min. Min got, de ka îcar rahêje min û min ji erdê bilind bike. Ket bin çengê min û ez rakirim ser lingan. Min got milekî xwe bide ber min, da ku ez nekevim. Wê jî wisa kir û ez jî bi kulekî meşiyam, geh terpilim geh min pê li dawa xwe kir, hetanî ku em gihan qiraxa deryayê û me dît ku keştiya şêx di benderê de rawestiyayî ye. Me silavek da şêx û min jê re got: “Gelo Ebûl Muzafer tu yî, apocan?” Got: “Belê ez im ew kesê ku tu lê dipirsî ciwanê min!” Min jê re got: “Ji kerema xwe van pênc dirhemên zîvîn bigire û ji min re tişteki bi wan bikire ji Çînê, belkî ma Xwedê bextê min vekirî derkeve û ez fêdeyekê tê de bibînim.”

Şêx ji zilamên xwe re got; “Hûn vî xortî nas dikin?” Gotin: “Belê ev Mihemedê Tiral e. Me qet nedîtibû ka rojekê ji mala xwe derketiye lê va ye îro derketiye!” Şêx got: “Kurê min, naxwe kanî wan pênc dirheman, belkî ma Xwedê ka tu jî qezencekê ji xwe re bikî!”

Şêx her pênc dirhem ji destê min girtin, ez û diya xwe em vegeriyan malê, wî jî benê keştiya xwe vekir, berê xwe da Çînê û ket rê. Piştî rêwîtiye-ke ku bi rojan berdewam kir, şêx xwe gihand Çînê. Malên xwe firotin û li şûna wan, malên din ji wir kirrîn. Pêdiviyên xwe hildan û dişa ketin ser riya vegeerê, bi şûn de hatin, piştî meşa sê rojan di deryayê de, qewêtiya min (Mihemedê Tiral) hat bîra wî û di ci de li qeptanê xwe vegeerîya jê re got: “Hela keştiyê bisekinîne!” Qeptan got: “Çima, çi qewimiye?” Şêx got: “Mihemedê Tiral qewêtiyek li min kiribû û pênc dirhem dabûn min, ji bo ku ez tişteki ji wî re bikirim, da ku ew jî debara xwe bike. Lê min ji bîr kiribû, ka berê keştiyê biguherîne, em herin qewêtiya wî jî pêk binin!” Qeptan û xebatkarên wî hemûçkan bi matmayî li hev nêrîn, piştî gotin: “Tu bi Xwedê kî mîrzayê me, me bi şûn de venegerîne û me perîşan neke. Ev sê roj in ku em bi rê de tên û em ew qas zor û zehmetî derbas dikin. Lê ne hêja ye ku em ji bo pênc dirheman bi şûn de vegeerin!” Şêx got; “Nîqaş tê de nabe, misoger divê em vegeirin û tişteki jê re bikirrin bi wan pênc dirhemên wî!” Wan jî gotin, em ê du qat û sê qat fêdeya ku ji pênc dirheman bê, bidine te lê me bi şûnde venegerîne!” Şêx ev pêşniyaza wan pejirand û diravekî pir ji wan da hev, ku çar qatê qezenca pênc dirhemên wî bû. Piştî rêya xwe berdewam

kirin hetanî ku gihan giravekê, ku gelek niştecih tê de hebûn. Keştiya xwe li benderê sekinandin û hemû daketin, têra xwe kurrîn û firotin kirin. Bi taybetî jî maden û cewhêr û lûlû kurrîn. Di wê navberê de çavên Şêx Ebûl Muzafer li zilamekî rûniştî ket, ku gelek meymûn li ber destên wî bûn. Yek ji wan meymûnan hatibû peritandin, mûyek jî bi laşê wê ve tunebû û zilam bê navber li wê meymûneyê dida û îşkence lê dikir. Çi gava xwediyê wê ew ji bîr dikir jî, meymûnên dîtirkê êrişî ser wê meymûna rût dikirin, lê didan û ew bi ser xwediyê wê ve didehfandin. Wî jî ew ceza dikir bi lêdaneke hişk ew zincîr dikir û têra wê lê dida, îşkence û azar lê dikir; meymûnên mayîn ji hêrs dibûn ji wê helwesta wê û bi ser de diçûn, lê didan.

Vêca gava Şêx Ebûl Muzafer ew meymûneya rût û zelût di wê rewşê de dît, dilê wî pê şewitî. Ji xwediyê meymûnê bi xwe re got: “Pênc dirhemên kuriyekî sêwî li gel min hene, gelo tu vê meymûna bi van pênc dirhemên didî?” Zilam got: “Belê, ez wê didim. Hema ji niha ve li te pîroz be!” û di cî de meymûn da wî û pênc dirhemên wî girtin. Xulamê şêx meymûn ji destê wî girt û ew bir, di keştiyê de girêda. Piştî hemû li keştiya xwe siwar bûn û çûn giraveke din.

Şeveqê lêda û li Şehrezadê bû sibe, wê jî dengê xwe birrî.

ŞEVA 304'EMÎN

Şehrezadê vegotina çîroka xwe berdewam kir û got:

Mihemedê Tiral vegotina xwe dom dikir ji xelîfe re:

Li wê girava din jî sekinîn û dîtîn ku hinek avbaz li wê derê ne, xwe berî bin avê didin, lûlû û mercanan ji binê behrê derdixin. Rabûn ew jî çûn, diravin dan wan avbazan û ji wan xwestin ku ji bo wan jî xwe bera binê avê bidin. Gava ku wê meymûna rût ew avbaz dîtîn, wê jî benê xwe vekirin û xwe ji keştiyê çeng kir nav avê, bi avbazan re xwe bera binê behrê da. Şêx Ebûl Muzafer got; “La hewle, îcar ev ji ku derket! Ev hemû bêşensiya wî feqirê Tiral e, meymûna ku min ji wî re kiribû jî bi avê de çû!” Lewra dema ku lê geriyan; kirin nekirin meymûn nedîtîn û hemû jî bêhêvî ketin. Lê gava ku avbaz ji binê behrê derketin, meymûn jî bi wan re derket û cewherin giranbuha di destê wê de bûn, ku hişt her kes behetî bimîne. Meymûn ew cewher hemû anîn cem Ebûl Muzafer û ew xistin destê wî. Şêx li wê ecêbmayî ma û got; “Bi Xwedê hunerên erjeng di vê meymûnê de hene!”

Piştî li keştiya xwe siwar bûn û ji wir jî çûn, ber bi giraveke din ku jê re digotin Girava Zincîyan ku niştecihên wê reşik bûn û goştê mirovan dixwarin. Îcar gava zincîyan ew dîtîn, li qeyikên xwe siwar bûn û pêşîya wan birrîn, hemû kesên di keştiyê de destgîr kirin û ew birin cem qralê xwe.

Qral ferman da, ku hinekan ji wan serjêbikin. Hinek ji wan taciran serjêkirin, goştên wan xwarin û yên mayî jî avêtin zindanê. Hemû şaşwaz, xemgîn, dilşkestî û di nava tirseke mezin de bûn. Çawa ku şev hat û tariyê xwe bi ser wan de berda, meymûn çû cem Ebûl Muzafer, qeyd û zincîrên wî vekirin. Dema ku taciran Şêx Ebûl Muzafer destvekirî ditin, kelecânî bûn û gotin; “Naxwe dê xelasiya me bi destê te be!” Ebûl Muzafer li wan vegerand û got; “A rast a ku ez jî xelas kirim, bi emrê Xwedê, ev meymûna hanê bû! Loma ez ê hezar dînarî bidime wê ji ber vê qenciya wê!” Hemû tacîrên mayî jî gotin; “Heger me jî xelas bike, em ê jî her yek, hezar dînarî bidin wê!”

Piştî wê gotina wan, meymûn rabû ser xwe, qeyd û zincîrên wan jî ye-ko ye-ko vekirin, ew azad kirin. Gişan xwe ji wir vedizîn, dan dû hev û çûn li keştiya xwe siwar bûn, ditin ku hîna saxlem e û tiştek jê kêmtune ye. Benê wê çêkirin, bavenê wê berdan û bi avê de çûn. Ebûl Muzafer ji taciran re got; “Kanî sozê xwe pêk bînin û deynê meymûnê bidinê!” Taciran got; “Ser seran û ser çavan!” û her yekî ji wan hezar dînar da. Ebûl Muzafer jî hezar xist ser û bi wî hawayî malekî mezin ji meymûnê re giha ser hev. Piştî rêya xwe berdewam kirin, hetanî ku gihan Besrayê.

Li bendera bajêr, nas û xelkên wan hatin pêşiya wan û ew pêşwazî kirin. Ebûl Muzafer ji wan re got; “Gelo kanî Mihemedê Tiral li ku ye?”

Tu nabêjî wê gavê diya min jî li wir e, hema di cî de hat malê, ez ji xew rakirim û ji min re got: “Kurê min rabe ser xwe, va ye Şêx Ebûl Muzafer vegeyriyaye, de îcar here cem wî û binêrê bê çî ji te re aniye, bi wan pênc dirhemên te? Belkî Xwedê Teala bextê te vekiribe û ji te re li hev hatibe!” Min jî lê vegeyrand û got; “Kanî min ji erdê rakî û xwe bidî bin çengê min, da ku ez xwe bigihînim hinda benderê!”

Min hêla xwe da ser milê diya xwe û bi çî halî be jî, min berê xwe da cem keştiyê. Geh min pê li dawa xwe kir, geh jî ez terpilim lê di encamê de min xwe gihand cem keştiyê, çawa ku çavên Ebûl Muzafer li min ketin, rûyê wî vebû, nûr jê bariya û got: “Ehlen we sehlen bi wî camêrê ku dirhemên wî ez û evqas tacir, ji mirinê rizgar kirin!” Piştî silavdayîneke germ, axaftina xwe berdewam kir û got: “A ji te re vê meymûnê bigire, min ew ji te re kiriyê. Wî bigire bibe malê û li benda min be, hetanî ku ez bêm!” Min jî rahişt meymûnê, ew da ber singê xwe, ez vegeyriyam malê û min di dilê xwe de got: “Bi navê Xwedê, ev ticareteke pir baş e!” Piştî, ez derbasî hundir bûm û min ji diya xwe re got: “Gava ez radikevin, tu min şiyar dikî û ji min re dibêjê rabe ticaretê bike, de êdî bi çavê xwe li vê ticareta min binêrê!”

Hîna ku ez rûniştî bûm, min bala xwe dayê ku bendeyên Şêx Ebûl Muzafer hatin û ji min re gotin: “Mihemedê Tiral tu yî?” Min ji wan re got: “Belê!” Hîna gotina min di devê min de bû, min dît ku Ebûl Muzafer jî li pey wan tê. Ez pê ve rabûm û min destên wî maçî kirin. Wî jî got: “Kanî bi

min re were hetanî mala min!” Min got: “Bila be!” û ez rabûm pê re çûm.
Şevqê lê da û li Şehrezadê bû sibe, ew jî bêdeng bû.

ŞEVA 305'EMÎN

Şehrezadê vegotina çîroka xwe berdewam kir û got:

Mihemedê Tiral vegotina xwe berdewam kir û pê de çû, got:

Ez pê re meşiyam hetanî ku em gihan mala wî. Em derbasî hundir bûn, wî jî ferman da bendeyên xwe û got: “Kanî diravan bînin!” Bendeyan çûn çend sindoqên tijî anîn. Ew jî li min zivirî û ji min re got: “Kurê min, Xwedê bi elba mezin da te û ji wan pênc dirhemên te, evqas dînar qezenc derket! Ev malê hanê, hemû yê te ye, tu xêrê jê bibîne, de êdî bide pêşîya koleyên min, bila ew ji te re wan bigihînin malê!”

Heger her tişt ne li ber çavên min bûna, min bawer nedikir. Ji kêfan hindik mabû ku bask ji min re çêbibin. Min da pêşîya bendeyên ku sindoqên dînanan danibûn ser serê xwe û berî da malê. Dema ez giham mal, min ji diya xwe re jî mesele got! Ew jî kêfxweş bû û got; “Kurê min, bi vî malê pir Xwedê Teala li te hat rehmê, de êdî vê tiraliyê ji ser xwe bavêje û rabe ser xwe, here sûkê, ji xwe re kîrrîn û firotinê bike; ticaret baş e!”

Min dev ji tiraliya xwe berda û rahişt meymûna xwe, ez çûm sûkê û min ji xwe re kîrrîn û firotin kir. Meymûn jî timî li kêleka min bû, bi min re dixwar û bi min re vedixwar. Piştî jî diçû û nema li min vedigeriya hetanî êvarê. Gava ku dihat jî, her car tûrikek bi xwe re dianî ku hezar dînar tê de bû. Ew datanî ber min û li kêleka min rûdinişt. Min bi wî malî bax û bîstan û zevî û qesr û qonax û kole û cariyeyên/cêriyên¹ bê hed û hesab kirin.

Carekê dîsa ez rûniştibûm û meymûna min jî li rexê min bû. Min bala xwe dayê ku çep û rast dizivire û derdora me raçav dike. Ez şaşwaz mam li vê helwesta wê. Di wê kêliyê de min dît ku meymûna min bi emrê Xwedê diaxive û bi zimanekî zelal gazî min dike, dibêje: “Bavê Mihemed!” Bi tirs ez ji cihê xwe veciniqîm bi dengê wê re. Wê axaftina xwe berdewam kir û got: “Metirse! Ez dixwazim rewşa xwe ji te re bibêjim. Lewre ez kesekî cinî me; ji ber lewaziya te ez bi te ve hatim û va ye êdî tu bûyî maldarekî mezin. Niha pêdeviyeke min ketiye aliyê te, ku ez bawer im ew jî wê xêra te be.” Min got: “Pêdeviya te çi ye, bibêje!” Got: “Ez dixwazim te bi keçekê re bizewicînim, ku weke heyvekê ye.” Min got: “Wê ew çawa çêbibe?” Got: “Sibehê, cil û bergên xwe yên herî spehî li xwe bike, zînê xwe yê zêrîn bavê ser pišta hespa xwe û lê siwar bibe û here sûka Ellafan li dikana Şerîf bipirse, li gel wî rûnê û

1. Li gora herêman ev gotin tê guhertin, li hin herêman cêrî, li hin herêman cariyê tê gotin.

jê re bibêje, ez hatime ku keça te ji xwe re bixwazim. Vêca heger ji te re got: “Tu feqîr î, bêkes î, bê esl û fêsl î.” tu hezar dinarî bide wî. Heger hîn bêtir xwest jî, tu qet teksîr meke û çiqas diravan bixwaze, bide wî.” Min jê re got: “Bila be, sibehê ez ê wisa bikim, heger Xwedê bibêje erê!”

Îcar gava bû sibeh, min kincên xwe yên xweşik li xwe kirin, zînê zêrîn avêt ser piştê hespa xwe û ez lê siwar bûm, min berê xwe da dikana Şerîf. Ez çûm cem wî, min silavek dayê û ez li cem wî rûniştim...

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 306'EMÎN

Şehrezadê vegotina çîroka xwe berdewam kir û got:

Îcar şahînşahê min ê bextewar, Mihemedê Tiral vegotina çîroka xwe ji Harûn Reşîd re berdewam kir û got:

Çawa ku min got, ez çûm dikana Şerîf, li cem rûniştim. Bi qasî deh heb kole û xizmetkarên min jî bi min re bûn. Şerîf ji min re got: “Gelo daxwazeke te ji min heye, ku ez wê pêk bînim û bi pêkanîna wê kêfxweş bibim?” Min got: “Belê, daxwazeke min ji te heye.” Got: “Daxwaza te çi ye?” Min got: “Ez hatime ku ez keça te ji xwe re bixwazim.” Wî jî got: “Ne esl û fêslê te heye û ne jî mal û milkê te. Îcar ez ê çawa keça xwe bidim te?” Min tûrikek ji ber xwe derxist, ku hezar dînarê ji zêrê sor tê de bû, da wî û jê re got: “Ev jî esl û fêslê min e! Jixwe pêxemberê me jî gotiye, ‘Binyada herî baş dirav e!’ Helbestkarekî jî ev yek xweş aniye ziman û gotiye:

Du dirhemên wî hebin, lêvên wî fêr dibin gotinan
Dide pêşiya birayan û ew jî her lê didêrin guhan
Tim bi ya wî dikin, ew jî her dide pêşiya wan
Malxerabo her qurre ye di nav dost û hogiran
Ne ji derheman bûya, ew her parsek bû li ber deriyan
Xwedêyo! Şaş biaxive jî kesê maldar her rast tê dîtîn
Feqîrê ku rast biaxive jî her ew şaş tête dîtîn
Li seranserê cîhanê her wisa ye, çavan negirin
Cil û bergên herî spehî ji bo mirovan her derhem in
Payebûn û heybeteke bê timtêl dide wan binêrin

Îcar gava ku Şerîf ev gotin ji devê min bihîstin û helbest fêm kir, serê xwe berra ber xwe da, demeke dirêj ponijî, piştê serê xwe rakir û got: “Heger ez mecbûr bim daxwaza te pêk bînim, wê gavê divê tu sê hezarên din bidî min!” Min lê vegerand û got: “Ser seran û ser çavan!” Piştê min çend xizmetkar şandin malê, çûn sê hezar dînar anîn. Çawa ku Şerîf çav li wan diravan ket, rabû ser xwe, ji xulamên xwe re got: “Dikanê bigirin.”

û berê xwe da sûkê, hemû dostên xwe vexwendin mala xwe û di hizûra hemûçkan da mehra min û keça xwe, li hev birrî. Di pey re jî got: “Piştî deh rojan, ez ê bihêlim ku derbasî cem wê bibî!”

Ez jî bi kêf û şahî, di nava bextewariyeke mezin de vegeyriyam malê. Min meymûna xwe bi tenê xewle kir û tiştê ku qewimibû jê re vegot. Wê jî li min vegeand, got: “Tiştê herî baş çi bû te ew kir!”

Gava ku deh roj bihurîn û civana min û Şerîf nêzik bû, meymûnê ji min re got: “Pêdiviyeke min ketiye aliyê te, heger tu wê ji min re pêk bînî, ez ê her dem ji te razî bim û vê qenciya te ji bîr nekim.” Min got, kanî ji min re bibêje, bê ka pêdiviya te çi ye?” Got: “Gava tu derbasî cem keça Şerîf bibî, di zikê odeyê de tu yê xizaneyekê bibînî ku xelegeke baxirî li ser deriyê wê ye. Mifteya xizaneyê di biniya wê xelegeke baxirî de ye. Wê mifteyê ji wir bigire û deriyê wê veke. Di wir de, tu yê sindoqeke hesinî bibînî, ku li ser çar al û çar tilsiman e. Di nivê de ji teşteke tijî mal heye ku li kêlekên wê yazdeh mar hene. Di nivê teştê de jî dîkekî spî û girêdayî heye. Li kêleka sindoqê jî kêrek heye. Çawa te ew dît, rahêle wê kêrê, dîk serjê bike, her çar alan biqetîne, sindoqê jî biqulibîne û piştî here cem bûkê. Pê şa bibe û bekareta wê rake. Tiştê ku ez ji te dixwazim ev e.” Min jê re got: “Ser seran û ser çavan.”

Piştî ez çûm mala Şerîf û derbasî odeya bûkê bûm, min bala xwe dayê, ku ew xizaneyê ku meymûnê behsa wê dîkir, li wir e. Bûkê bi xwe jî ez şaşwaz û heyran hiştim bi wê bejn û bala xwe ya bitimtel û bi wê spehîbûna xwe ya ku nedihat pesindan! Ez di wê baweriyê de bûm ku tu ziman nikarin wesfê wê baş bidin. Vê yekê şadûmaniyêke kûr bi min re çêkir, ku hindik mabû perên min çebibin, wê gavê. Nêzikî nivê şêvê, bûk di xew re çû, ez jî rabûm ser xwe, min mifte ji bin xelegeke paxir derxist, xizane vekir û min di cî de rahişt kêrê dîk serjê kir û her çar al qetandin.

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotin birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 307'EMÎN

Şehrezadê vegotina çîroka xwe berdewam kir:

Îcar Mihemedê Tiral ravekirina bîranîna xwe berdewam kir û pê de çû, got:

Vêca gava min dîk serjê kir, al qetandin û sindoq quliband, keçik ji xew şiyar bû û dît ku dîk hatiye serjêkirin û xizane jî hatiye vekirin. Bi tirs got: “Lahewle û la quwete îlabîlah, îcar wê yê cinî min bibel!”

Jixwe hîna ku keçikê ew gotina xwe neqedandibû, yê cinî bi ser malê de girt û hat keçik revand, bi xwe re bir û çû. Pê re xirecîreke bêhawe li dû

xwe hişt, ku her kes ji xew şiyar kir. Di heman kêliyê de Şerîf bi wêlê wêlê derbasî hundir bû. Bi destan li ser çavên xwe da û got: “Ev çi kar e ku te bi me kir Mihemed, qey cezayê qenciya min bi te kir ev bû? Min ev tilsim çêkiribû û di vê xizaneyê de bi cih kiribû, ji bo ku ez keça xwe ji vî melûnî bistirînim; lew re ev şeş salên wî bûn ku li dû vê keçikê digeriya û nikaribû ya xwe tê re bibîne. De êdî tu jî rabe here ji mala me, piştî vê bobelatê, tiştêkî te li cem me nema!”

Ez ji cem Şerîf rabûm û vegeriya mala xwe. Ez li meymûnê geriyam, min ew nedît û ez li şopeke wî jî rast nehatim. Wê gavê min tê derxist ku yê jina min revandiye ew e, yê ku hîle li min kiriye û bi destê min ew dîk da serjêkirin û tilsim xera kir jî, ew bû. Qolinceke ecêb ket nava min û laşê min gîş jeniya ji ber êşa wê. Ez pir poşman bûm, min kir nekir bêhna min fire nebû. Dinya li min teng bûbû, min digot qey wê dîwar hemû bi ser min de biherifin.

Gava min dît ku debara min nabe, ez rabûm ser xwe ji malê derketim û min berê xwe da berriyê, ez bi çolê ketim. Ez meşiyam û ha meşiyam, hetanî ku li min bû êvar. Îcar ez ê bi ku ve biçûma ne diyar bû, lewre min nizanibû û hişê min tevlihev bû. Hîna ez di nava wê ponijînê de bûm, min bala xwe dayê ku du mar, ber bi min ve tîn. Yek ji wan spî bû, yê din esmer. Hem pev diketin, hem jî bi ser min de dihatin. Min destê xwe avêt keviyekî û li marê esmer da, min ew kuşt; lewre yê neheq ew bû. Marê spî jî çû û piştî demekê dîsa bi şûn de vegeriya, lê wê carê deh marên spî pê re bûn. Hemû bi hev re li marê kuştî hatin hev, ew qetqetî kirin, xwarin, ji serî pê ve tiştêk jê nehiştin, piştê jî hemûçikan dan dû hev û dîsa bi şûn de çûn. Ji ber ku ez pir westiyabûm, ez jî hema li wir rûniştim û min pal da û ez li ser xwe û rewşa xwe ponijîm. Di wê kêliyê de min dengê bihist, ku dibêje:

Bila qeder weke xwe here
Tu jî dilaram rakeve
Carinan di neqeba du awiran de
Xwedê wê rewşê diguhere

Ez li derdora xwe zivirîm, min çep û rastê xwe raçav kir lê min tu kes nedît! Îcar bawer bike emîrê bawermendan wê kêlikê hemû laşê min lerizî ji tirsan. Hîna ku ez ji wê tirs û behetînê rizgar nebûbûm, min bala xwe dayê ku dengê ji pişt min tê, dibêje:

Ey misilmanê ku Qur2an di dil de ye
Wa êdî aramî hat, mizgîna min li te ye
Qet metirse ji gotinên şeytanane were
Em jî qewm in, weke te xwedî dîn û ol in

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û careke din ket nava bêdengiyê.

ŞEVA 308'EMÎN

Şehrezadê berdewam kir:

Mihemedê Tiral vegotina serpêhatiya xwe ji xelîfe Harûn Reşîd re berdewam kir û got:

Gava min ew helbesta din ji bihîst, ez li pey xwe zivirîm û min got; tu bi xatirê Xwedê kî, ji min re bibêje bê tu kî yî? Wê gavê ew axivgêr ket şûbmeta mirovekî û ji min re got: “Metirse birawo, em cinên bawermend in û qenciya te gihaye me, em jî qenciya te dixwazin. Vêca heger daxwaza te hebe, bibêje, em ê ji te re pêk binin.” Ez rabûm min jê re got: “Wile serê min ketiye beleyeke mezin û pêdiviyeke min a girîng heye, lewre tiştê ku bi serê min de hatiye, bi serê tu kesî de nehatiye.”

Bi vê gotina min re, wî di cî de li min vegerand û got: “Nebe ku tu Mihemedê Tiral bî?” Min got: “Belê.” Wî got: “Ey Mihemedê delal û hêja, ez birayê wê mara spî me, ew a ku te dijminê wê kuşt. Em çar bira ne, ji dê û bavekî û hemû spasdarên te ne. Tiştêkî din ji heye ku divê tu bizanibî, ew kesê di qilixê meymûnekê de, yê ku bêbextî bi te re kir û tu xistî dafikê, kesekî cinî bû. Ne bi wê dafikê bûya, nikaribû ew keçik bibira. Lewre ev de-meke dirêj bû, ku li dû wê bû lê ji ber wê tilsimê nikaribû nêzikî wê bibûya. Ger ew tilsim di cihê xwe de bima, dê tu carî nikaribûya xwe nêzikî wê bike. Ji aliyê din ve jî, divê tu baş bizanibî ku ew qenciya te bi me kir, dê tu carî neyê jibîrkirin.”

Piştî qîreke ecêb da û bangek xurt ki, ku di cî de komeke ji qewmê wî pê ve hat. Pirsê wê meymûnê ji wan kir, yekî bersiva wî da û got: “Ez cihê wê nas dikim, ez dizanim bê niha li ku ye.” Got: “Li ku derê ye?” Wî jî bersiv da û got: “Niha li bajarê paxir e, bajarê ku roj didê.” Birayê mara spî li min vegeriya û ji min re got: “Mehmedê hêja, rabe bendeyekî me bi xwe re bibe, ew dê te li ser piştê xwe hilgire bibe û dê ji te re bibêje, bê tu yê çawa destgirtiya xwe ji nav lepên wî rizgar bikî. Lê belê divê tu bizanibî ku ev bendeyê wê te bibe jî cinekî kafîr û bêol e. Loma divê dema ku te hilgire, tu qet behsa navê Xwedê nekî, da ku xwe ji bin te nede alî û tu nekeve erdê.” Min jî got; bila be, ez ê wisa tevbigirim û ez ji gotina we dernakevim.

Rabû bendeyekî xwe da min. Bende bejna xwe tewand û piştê xwe xûz kir li ber min û got: “De kanî siwar bibe!” Ez lê siwar bûm, ew jî bi hewa ket û bilind bû, hetanî ku dinya ji ber çavên min wenda bû û em ketin nava stêrkên ku mîna çiyayan xwiya dikirin. Di nava wan stêrkan de, dengê ferîşteyan dihat min, gava ku selawat dixwendin. Lê ji ber ku ciniyê di bin min de bê navber bi min re diaxivî, tiştên ecêb nîşanî min dida û bi min re mijûl dibû, min jî xwe ji bîr kir û nehat bira min ku ez navê Xwedê bilêv bikim.

Hîna ez di nava wê temaşekariyê de bûm, min dît ku mirovekî keskecil î pordirêj û rûronik derket pêşiya min ku xencerek di destê wî de bû, li ba dikir û çirûskên agir ji ber diçûn. Ber bi min ve hat û got: “Ey Mihemed! Ka bibêje La îlahe îllalah û Mihemed Resûlullah. Heger na ez ê bi vê xencerê serê te bifirînim!”

Ji ber ku ez ji tirsan bêhnçikiyayî bûbûm û demeke dirêj bû ku min navê Xwedê negotibû, hema di cî de min got: “La îlahe îllallah û Mihemed Resûlullah.” Tam di wê kêlikê de wî mirovê rûronak xencera xwe li bendeyê cinî da. Bende heliya, bû arî û ez jî ji ser piştê wî ketim xwarê û ber bi erdê ve daketim, hetanî ku ez ketim nava deryayeke bi pêl û mewc, ku di nava firtoneyeke ecêb de bû. Lê şensê min hebû ku di heman kêliyê de keştiyek li min rast hat û ez ji nava wan pêlên deryayê rizgar kirim. Kesên di keştiyê de bi zimanekî biyanî bi min re axivîn, min bi îşaretan ji wan re got, ku ez zimanê wan fêhm nakim.

Em wisa meşîyan di avê de hetanî ku li me bû êvar. Di wê navberê de tora xwe avêtin. Masiyekî mezin girtin, ew birajtin, ez têr kirim û rêya xwe berdewam kirin, hetanî ku gihan bajarê xwe. Ez derbasî cem qralê xwe kirim, min jî bejna xwe li ber wî tewand û erda ber nigê wî maçî kir. Qral bi zimanê Erebi dizanibû, ji min re got: “Êdî tu jî endamekî civata me yî.” Min got: “Gelo navê vî bajarî çi ye?” Got: “Navê vî bajarî Henad e û vir perçeyek e ji welatê Çînî...”

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî vegotina çîroka xwe birrî û ket nava bêdengiyekê.

ŞEVA 309'EMÎN

Şehrezadê berdewam kir:

Mihemedê Tiral axaftina xwe berdewam kir û got:

Îcarê Qralê wî bajarî ez spartim wezîrê bajêr, ji bo ku min li bajar bigerîne û bajar bi min bide naskirin. Xelkê wî bajarî, berê kafir bûne, Xwedê jî ew mesex kirine û hemû veguherandine kûç û beran.

Ez li nava bajêr geriyam û min her derên bajêr temaşe kirin lê ji bax û bexçe û berên şindarên wê pê ve min tiştek nedît. Bi qasî mehekê ez li nava bajêr jiyam, piştê ez çûm ber çemekî û li qiraxa avê rûniştim. Hîna ku min li derdora xwe temaşe dikir, min dît siwarek ber bi min ve hat, ji min re got: “Gelo Mihmedê Tiral tu yî?” Min got: “Belê.” Got: “Metirse, qenciya te gihaye me.” Min got: “Tu kî yî?” Got: “Ez birayê wê marê spî me, tu jî li vir nêzikî cihê destgirtiya xwe yî.”

Piştre kincên xwe ji xwe kirin û ew li min kirin û ji min re got: “Metirse, ew bendeyê ku rahiştibû te û hat şewitandin, bendeyekî me bû.”

Dûre, wî siwarî ez li pişt xwe siwar kirim û berê xwe da berriya xwe. Piştre ji min re got: “De êdî dakeve û di neqeba van herdu çiyayan re bi-meşe, hetanî ku tu bigihîjî bajarê paxirî. Lê gava tu gihîştî wir, derbasî bajar nebe, hetanî ez xwe bigihînim te, ji te re bibêjim bê tu yê çawa bikî.” Min lê vegerand û got: “Bila be.” û ez ji pişt wî peya bûm. Di pey re jî ez meşiyam hetanî ku ez giham bajarê paxirî. Ez li dora sûra bajêr geriyam, bi hêvî bûm ku ez deriyekî tê de bibînim lê min tu derî tê de nedîtîn.

Hîna ez wisa li dora sûra bajêr digeriyam, min dît ku birayê mara spî hat cem min û şûrekî bi tilsim, ya li ser hatibû xwendin, da min da ku kes min nebîne. Di pey re jî ji min veqetiya, bi rêya xwe de çû.

Piştî ku ji min veqetiya bi demeke kurt, min bala xwe dayê ku gelheke mezin û qelebalix û bi hêlewêl ber bi min ve tê, ku çavên wan di sîngên wan de bûn. Gawa ku çaw li min ketin, gotin: “Tu kî yî û kê tu avêtiye vê derê?” Min mijar ji wan re vekir û min ew agahdar kirin. Wan jî gotin: “Ew keça ku tu behsa wê dikî, li vî bajarî ye û bi wî yê cinî re ye lê wî çi pê kiriye em nizanin; em bi xwe jî xwişk û birayên mara spî ne. De êdî here ser wê kaniya hanê û binêre bê av di ku re derbasî bajêr dibe, tu jî di wir re derbas bibe, dê ew av te bigihîne bajêr.”

Min bi ya wan kir û ez bi ava kaniyê re derbasî sarinceke bin erdê bûm û di wir re ez çûm hetanî ku ez derketim ser rûyê erdê. Gawa ez derketim rûyê erdê, min bala xwe dayê, ku ez di nîve bajêr de me û keçika destgirtiya min jî li ser nivîneke zêr e, perdeyeke ji hevrişimê hişîn li dora wê ye û derdora wê jî hemû bax, bîstan û şîndarên ji zêr in, ku berên wan jî hemû cewher û yaqût û lûlû û mercan û zeberced in.

Çawa ku keçikê ez dîtîm, ez nas kirim. Silavek da min û got: “Mîrzayê min, kê tu aniye hetanî vir?” Min serpehatiya xwe jê re got û ew ji her tiştî agahdar kir. Wê jî got: “Ji ber ku ev melûnê cinî ji min pir hez dike, agahiyên ku zerarê bidin wî jî dane min û ez fêr kirime ku du tilsim li vî bajarî hene. Heke ew melûn bixwaze, dikare her kesê di vî bajarî de tune bike. Jixwe hemû efrît bi ya wî dikin, çi ji wan re bibêje, wisa dikin. Ew tilsimê ku ez behs dikim jî di nava stûnekê de veşartî ye.” Min jê pirsî, got: “Ew stûn li ku ye? Got: “Li filan derê ye.” Min got: “Û li ser wî tilsimî çi heye?” Got: “Sûretê bazekî li ser e û nivîsek jî li ser e ku ez nizamim bixwînim. Îcar here wî hilde nav destên xwe, kozeke agir jî bibîne û hinek misk bavêje navê da ku dûxan jê derê. Dûxan efrîtan ber bi xwe ve dikişîne, vêca gava tu wisa bikî, dê hemû efrît li te kom bibin û yek tenê jî bi şûn de namîne. Dê hemû li benda fermana te bin û tu ji wan re çi bibêji, dê bi ya te bikin. De êdî tewekeliya xwe bi Xwedê bîne û here wisa bike.” Min got: “Bila be.” û ez rabûm ser xwe.

Ez çûm cem wê stûna ku keçikê behsa wê kiribû û li gora gotina wê ez tevgeriyam; çi gotibû, min wisa kir. Di heman keliyê de min dît, ku hemû efrît li derdora min kom bûne û ji min re dibêjin: “Fermanê bide me mîrzayê me, em hemû amade ne li ber destê te.” Min ji wan re got: “Wî ciniyê bêbext girêdin û wî bînin ber destê min.” Gotin: “Ser seran û ser çavan mîrzayê me! Tu çi fermanê bidî me, em ê di cî de pêk bînin.”

Çûn, ew ciniyê keçik revandibû girtin, dest û nigên wî xistin zincîr û qeydan û ew anîn raberî min, gotin: “Me fermana te pêk anî, mîrzayê me!” Min ji wan re got: “Siheta we xweş, de êdî bi şûn de herin.” û ez jî bi şûn de vegeriyam cem destgirtiya xwe, min jê re got: “Jina min a delal, êdî tu yê bi min re werî?” Got: “Belê.” Rabû min ew bi xwe re bir, xist wê sarinca bin erdê ya ku ez tê re hatibûm û di wir re em derketin dervêyî bajar û em çûn cem wî qewmê ku rêya xelasê nîşanî min dabûn. Li wê derê em bi kêfxweşî pêşwazî kirin, em çend rojan li cem wan jî man û em hatin. Dûra ez û jina xwe li Besrayê bi cî bûn, min bi wî malê xwe yê pir ticareta xwe berdewam kir û em di nava dilşadî û bextewariyeke bêtîmtêl de jiyan.

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bê deng bû.

ŞEVA 310'EMÎN

(ÇÎROKA ELÎ ŞAR)

Dinyazadê got: Xwişkêcan vegotina te çiqasî xweş û herikbar û biçêj e û çîrokên te çiqasî balkêş in!

Şehrezadê lê vegerand û got: Ev çîrokên ku min gotin, ne tu tişt in li himberî çîroka Elî Şar!

Şehreyarê gewre di dilê xwe de got: A baş ew e ku ez wê nekûjim hetanî ez çîrokên wê yên mayî jî bibihîzim! Piştî li Şehrezadê zivirî û jê re got: Û ew çîroka Elî Şar çawa ye gelo?

Şehrezadê got:

Tê gotin ku di demên kevnar û borî de tacîrek ji tacîrên Xoresanê hebû ku navê wî Mecdedîn bû. Mal û milkên wî pir bûn û bende û xulam û navmaliyên wî bê hed û hesab bûn. Lê belê temenê wî gîhabû şêstî û hîna kurdunde bû. Piştî wî temenî Xwedê lê hat rehmê û kurek dayê. Mecdedîn navê wî kurê xwe kir Elî Şar û di nava bextewarî û hebûneke bêtîmtêl de ew mezin kir. Elî Şarê ku mîna heyveke li çardehan bû. Çawa ku kamil bû û dirûvê zilaman pê ket, mezin bû, bavê wî nexweş ket û mirina wî nêzik bû.

Mecdedîn gazî kurê xwe kir û jê re got: “Kurê min va ye mirina min nêzik bûye û ez dixwazim şîretê li te bikim û wesiyetê ji te re bihêlim.” Elî Şar got: “Ka ew çi şîret e, ku tu dixwazî wê li min bikî bavocan?” Mecdedîn got: “Hetanî ji te bê dûrî xelkê bikeve û bi wan re nede û nestîne kurê min. Bila zirara te negihîje kesî û heta ku tu bikaribî ji reşbîniyê û ji mirovê xerab dûr bikeve. Mirovê xerab mîna hêtûna hesinkar e. Heger bi agirê xwe te neşewitîne jî, bi dûxana xwe dê zerarê bide te, çawa ku helbestkarekî jî gotiye:

Di vî dewr û zemanî de yek dost jî nîn e dilo
Ne destek ne destbirakek ne palpiştekan nîn e dilo
Bêkes î tu di tengayê de her tu bi serê xwe yî
Şîreta rast ew e kurê min ku her tu bi tenê yî

Û çawa ku helbestkarekî din jî gotiye:

Goftûgoya bi xelkê re bê fêde ye
Tenê pitepit û paşgotin û hîle ye
Meaxive bi wan re qet nepeyive
Tenê ji bo zanîn guh li wan bike

Ango çawa ku hozanekî din gotiye:

Heger mirovekî xelkê biceribîne
Bêguman dê gotinên wan vala bibîne
Lew re hezkirina wan her tim derew e
Ol û baweriya wan jî her ew nîfaq e

Elî Şar ji bavê xwe re got: “Bila be bavocan, ez vê şîreta te qet ji bîr nakim. Lê gelo divê ez çi bikim û çawa tevbigirim?”

Bavê wî got: “Hetanî ku tu karibî xêr û qenciye bike, kurê min. Timî xêra xelkê bixwaze û dilê wan xweş bike, alîkariyê bi wan re bike, çi gava ku ji te xwestin.”

Kurê wî got: “Bila be bavocan, ez ê vê yekê jî bikim. Ji xeynî vê yekê tu çiyê din ji min dixwazî?”

Bavê wî got: “Bila Xwedê her dem di bîra te de be, da ku di tengasiyê de jî ew te biparêze. Ku tu mal û milkê xwe bi avê de berdî, wê rojek were tu yê muhtacî kesên ketî û xerab bibî. Divê tu bizanibî ku nirxa mirovan, bi qasî diravên di berîka wan de ye.”

Helbestkarekî xweş rave kiriye, gava gotiye:

Dema diravên mirov diqedin dost jî diqedin
Dema ku malê mirov pir dibe, dost jî pir dibin
Ji ber malê mirov gelek caran reqîp jî dost in
Gelek caran bi çûna mal re dost dibin dijmîn

Hozanekî din jî dibêje:

Qenciye bike her ku te dîtî ew fersend
Bi dest mirov nakeve her car keys û fersend

Kurik got: “Min ev jî fêm kir bavocan, çiyê din heye gelo?” Bavê wî got: “Kurê min, bi mezinan bişêwire û eceleyê meke, di hemû karên ku tu dixwazî bikî de. Dilovan be bi kesên ji xwe biçûktir re, da ku mezinên te jî bi te re dilovan bin. Tehdeyê li kesî meke ji bo ku Xwedê zalimekî bi ser te de jî neşîne.” Hozanekî aqilmend dibêje:

Bipîve fikra xwe û bişêwire bi zanayan re
Bêrehm nebe û dilovan be bi xelkê re
Lewre mirov û kes her neynika mirov e
Incex bi du neynikan mirov paş xwe dibîne

Yekî din jî dibêje:

Qet lezê meke li tiştekî ku tu pir wî dixwazî
Dilovan û dilovîn bî bi xelkê re şanaz bî
Lewre di ser her destî re heye destekî alî
Bêguman di ser her zalimî re jî heye zalimek

Yekî din jî dibêje:

Dema desthilatdar bî tu qet zilmê meke
Lewre ji bo her zalimekî tolhildanek heye
Çavên te binivîn jî yên mazlûm her şiyar in
Nifiran li te dike çavên Xwedê jî her şiyar in

Bavê Elî Şar axaftina xwe berdewam kir û got: “Mijareke din jî kurê min, hetanî ji te bê dûrî meyê bikeve, lewre serkêşa xerabiyê ew bi xwe ye. Vexwarina meyê hişê mirov dibe...”

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 311'EMÎN

Şehrezadê vegotina çiroka xwe berdewam kir û got:

Îcar şahîşahê min ê gewre û bextewar, Mecdedînê Tacir ji kurê xwe Elî re got: “Meyê jî venexwe, lewre ew e ya ku hiş ji serî dibe û mirov rezil dike. Hozanekî çiqasî xweş bi lêv kiriye, gava gotiye:

Sond û peyman be qet nabe mey bi van lêvan
Bo ku hiş her di cih de be bi emrê Xwedan
Ne di ciwaniya xwe de serxweş ketim ne jî nihakan
Ne dostê şevbuhêrkan hebû bo min ne jî fixan

Vê şîreta min bike guhar û ji guhê xwe dernexîne Elîcan. Ji bîr neke ku

li şûna min dê çavên Xwedê her dem li ser te bin...”

Piştî wê axaftina Mecdêdîn, levên wî nema ji ser hev rabûn û deng jê biliya, bi qasî saetekê ji ser hişê xwe çû. Piştê dîsa bi ser xwe ve hat, şiyar bû, îstixfara xwe anî, cara dawîn eşheda xwe jî anî û piştê çû ber diolovaniya Xwedê. Kurê wî pir xemgîn bû û li ser wî giriya, dûre jî rabû amedekariyên rakirina cenazeyê wî kir.

Biçûk û mezin, her kesî mil da tabûta wî, di cenazeyê wî de meşîyan. Mele û feqîyan Qur'an li ser wî xwendin, nimêj li ser kirin û ew xistin gora wî û ew binax kirin. Li kêla wî jî ev çend beyt nivîsandin:

Ji axê tu veder bû û ketî nava zindîyan
Tu fêrî vegotinê bûyî zana û mêvan
Dûra dîsa vegeriya tu li ax û makan
Mîna ku dûr neketibî qet tu ji xakan

Elî Şar pir xemgîn bû bi wefata bavê xwe û şîna wî li gora ya navdaran li dar xist. Di berdewamiya wê şîn û xemgîniyê de, diya wî jî çû ber dîlovaniya xwe. Elî Şar ji bo diya xwe jî şînek li dar xist û heman êş û xemgînî kişand û li ser wê giriya.

Piştî ku şîna dê û bavê wî qediya Elî Şar vegeriya karê bavê xwe û ticaretê wî berdewam kir. Li dikanê rûnişt, kîrrîn û firotin kir lê çawa ku bavê wî şîret lê kiribû, nema bi kesî re da û stend û ne jî çû mêvantiya tu kesî. Bi qasî salekê wisa bi wî hawayî berdewam kir. Lê piştê jinên şehwetkar û fasiq, li dorê çûn û hatin û bi fen û fitan ew ji rê derxistin; ew kişandin nava jiyana xwe; jiyana meyxurî û pevşabûnê ku hişê wî ji serî bir.

Rojekê Elî Şar ji xwe re got; bavê min evqas mal û milk bi ser hev de kom kiriye, heger ez wî xerc nekim, gelo wê ji kê re bimîne? Sond û peyman be ez ê jî weke wî hozanî tevbigirim, ew hozanê ku gotiye:

Şev û roj te kom kir ev milk û mal
Çawa û kengî tê xerc bikî ew qasê mal

Elî Şar jî bi wî hawayî tevgeriya. Şevbuhêrk li dar xistin, sifre gerandin û diravên ku bavê wî bi kevçîyan kom kiribû, bi heskan belav kir, hetanî ku malê xwe giş xerc kir û hejar bû, tişteke di destê wî de nema. Elî tengav bû, dilê wî şikest, xemgîn bû bi vê feqîriya xwe. Herî dawiyê dikan û avahiyên xwe jî firotin lê wan jî têrê nekir. Çavên xwe li derdora xwe gerand, tenê çend bedle kincên wî mabûn, ew jî firotin û bi diravên wan kûzek mey kirrî û şev pê de vexwar. Sibehê gava serxweşiya wî çû, bi ser xwe ve hat, êşa qolinceke dijwar di nava xwe de hîs kir. Xwarineke ku bixwe jî di malê de tunebû. Bi zîkê birçî li cihê xwe rûniştî ma hetanî esrê. Piştê ji xwe re got: “A baş ew e ku ez herim cem yekî ji wan dostên xwe yên ku min malê xwe li ser wan kir, belkî ew gepeke nan bidin min!”

Rabû çû, yeko yeko li ser wan dostên xwe yên berê geriya lê kesi ji wan deriyê mala xwe jê re venekir û gepek nan nedanê. Hemûçikan xwe ji ber veşartin, gotin em te nas nakin. Ew jî di nava diranên birçîbûnê de dihat cûtin û dilê wî jî di bin nigên wan nankoran de diperçiqî.

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birî û bêdeng bû.

ŞEVA 312'EMÎN

Şehrezadê vegotina çiroka xwe berdewam kir û got:

Vêca Elî Şarê ku zengilê nava wî lê dida ji birçîbûna, berê xwe da sûka taciran, li wê derê bala xwe dayê, ku komek mirov li dora tişteki kom bûne. Di nava xwe de got: “Gelo evqas mirov çima li hev kom bûne? Bi navê Xwedê hetanî ku ez fêm nekim çima li vir kom bûne, ez ji vir naçim?” Piştî ber bi wan ve çû û dît ku hemûçikan xwe reqîfandine hev û bûne xelek li dora cariyeyeke ku di mazatê de bû, cariyê pir spehî bû; rûheyv, gulhinark û singbilind bû. Bejn û bala wê ewqasî xweşik û kişîner bû, ku ziman nikaribû wesfê wê bida. Çawa ku hozanekî jî gotiye:

Li gora şehwetê afiriye ew her sêveke sor e
Rûgul e ne kin e ne dirêj e qelafetekî bêqisûr e
Spehîbûn bi xwe ye mijûlkarê husn û cemala wê
Bi yek awirê mirov serxweş dixê ew çavên wê
Mêrkujêke rûgeş e singsedef e bejinrihan e
Vejîndar e çêjekar e misk û rihan jê dibare
Weke lûlû weke mercan û yaqûta di nav av e
Şûrekî tûj e ew yeko yeko me gişan dibire

Cariyeya ku navê wê Zumrud bû, çawa ku çavên wî bi wê ketin, dîn û har bû li ser xweşikbûna wê. Di dilê xwe de got: “Bi navê Xwedê ez ji vir naçim hetanî ku ez nebînim bê kî vê cariyeyê dikire û bi çiqasî dikire?” Ew jî ket nava wê xeleka taciran û li cariyeyê temaşe kir. Tacirên derdora wî jî, ji wan werê ku ew jî tacirekî mîna wan e û tevli bazarê bûye, lewre gelean ji wan maldariya Elî Şar bihîstibûn û bêxeber bûn ji wê rewşa wî ya nû.

Dellal li ber cariyeyê sekinî û dest bi bazarê kir, got: “Tacirno, mal-darno! Gelo wê kîjan ji we dest bi bazarê bike û buhayekê li vê şahbanûya rûheyvan bibirre? Ne guneh e ne jî şerm e ku dilê mirov bibijê cariyeyeke ewqasî spehî û şehwetkar, ku navê wê Zumruda Senûrî ye û li gora navê xwe hem durr e hem zumrud e. De kanî ji kerama xwe deriyê bazarê vekin!”

Tacirekî got: “Bila ji min re be bi pêncsed dînarî.” Yê dîtir got: “Pêncsed û deh dînar.” Şêxekî ku navê wî Reşîdedîn bû got: “Ez sed dînarê din jî li ser dikim.” Tacirekî din lê zedê kir û got: “Dehê din jî li ser. Şêx Reşîdedînê

rûgemarî û çavşîn, hêrs bû û got: “Bila ji min re be bi hezar dînarî!”

Bi wê gotina şêx re, hemû taciran devên xwe girtin û gotinek tenê ji ne-
kirin. Dellal bi xwediyê cariyeyê şewirî li ser wê buhaya dawîn, xwediyê wê
got: “Min sond xwariye, ku kesê cariyeya min wî neecibîne, ez wê nafirosim
wî.” Rabû dellal çû gel cariyeyê û jê re got: “Ey şahbanûya heyv û stêrkan, ev
tacirê hanê dixwaze te bikire, tu çi dibêji?”

Zumruda Senûrî li şêx nêrî û ji dellal re got: “Ez nayême firotin bo pî-
rekalekî ku kul û xeman ew xistiye rewşeke ewqasî xerab; çawa ku hozanekî
jî gotiye:

Ramûsanek ji min xwest ew ê zengîn û maldar
Min li kalbûna wî nêrî û sondeke giran xwar
Ez qet naxwazim wî spîrihî û wî porê spî
Naxwazim ez pembo bikeve devê min şûna masî”

Gava ku dellal ev gotina wê bihist, got: “Wile tu jî mafdar î û buhayê te
hêjaye deh hezar dînarî.” Piştî li xwediyê wê zivirî û jê re got, ku keçik wî
extiyarî naxwaze. Xwediyê wê got: “Nexwe pê bişêwirin li ser kirîdarekî din.

Tacirêkî din derket pêş û got: “Ez jî dixwazim bi heman buhaya vî şêxê
hanê wê ji xwe re bibim. Cariyeyê lê nêrî û got: “Ev çi kesm û ev çi mirûz e,
ne gengaz e ku mirovekî wisa nexweşik û porspî nêzikî min bibe!” Dûre bi
helbestî berdewam kir û got:

Tiştek ji rû xwiya kir Xwedêyo ev çi ye!
Qey te ji kelmêşê re jî rih çekiriye!
Qiloçên wî xiliyane di bin barê min de
Qaşo agir pê ketiye îro ji rûyê min de
Boyax dike riha spî xwe vedişêre ji min
Bi porekî spî diçe û bi yekî din tête ba min
Hemû tiştên te qelp in derkeve ji ba min
Naxwazim binêrim li te dûr bikeve ji min

Hinekî hilma xwe girt û piştî dîsa berdawam kir, got:

Got, xwiya ku kalbûna xwe boyax kiriye
Min jî got, ji ber te min ew veşartiye
Tîqîniyek pê ket û bi lez gote min aya!
Naxwe qelpo çêlik derxistine li mala!

Gava dellal ev helbest ji devê wê bihistin, got: “Wile tu rast dibêji.”
Tacir ji dellal re got: “Çima qey çi gotiye?” Dellal ristên wê ji wî re dubare
kirin. Wî jî maf da cariyeyê û dev ji kirrîna wê berda. Di wê navberê de ta-
cirkî din xwe da pêş û ji dellal re got: “Ez jî dixwazim wê bikirim, bi heman
buhayî.”

Cariye lê zivirî, bala xwe dayê ku ew tacirêkî kor e, bi çavekî ye. Ji dellal

re got: Ev jî kor e û hozanek ji bo koran dibêje;

Nebe heval bi koran re her şiyar be
Xwe biparêze ji wan timî baldar be
Heger xêrek di koran de hebûya liha
Xwedê ew kor nedikirin her weha

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 313'EMÎN

Şahrezadê berdewam kir û got:

Gava ku Zumrudê wisa got, dellal serê xwe hejand û got: “Tu mafdar î?”
Piştî tacîrêkî din nîşanî wê da û got: “Tu dixwazî ku ev ciwamêr te bikire?
Zumrudê li wî tacîrî jî nêrî û dît, ku pir kinik e û riha wî dadikeve hetanî
newqa wî. Beşîşî û got; ev bi xwe ye ew kesê ku helbestkar ji bo wî gotiye:

Hevalekî min heye riha wî bê fêde ye
Ne dev e ne poz e ne dest e ne nig e
Rû tarî ye pir weke şevên zivistanan
Pir dirêj e ev rih mîna gezikên cîranan”

Piştî vê gotina cariyeyê, dellal jê re got: “Xatûna min, hema ji xwe re li
van tacîran gişan binêre, tu kîjanî biecibînî ez ê te bifiroşim wî!”

Zumrudê awirên xwe li ser gişan gerandin û ew yeko yeko di ber çavan
re derbas kirin. Herî dawiyê, awirên wê li ser Elî Şar sekinîn. Axîneke bi
keder û hesret kişand û xwest ku bi awirên xwe wî bixwe. Dilê wê bi ser ve
çû û bi qasî ku hişê xwe li ser wî wenda bike jê hez kir. Lewre Elî pir delal û
spehî bû û bayê wî weke miskê bi ser de dihat. Zumrudê got; dellalcan, kesê
ku ez dixwazim bibim cariyeya wî ev bi xwe ye. Wesîfkarek heye dibêje:

Vederda rûyê spehî weke li ber çavan
Axî ket nava dilê evîndar û dildaran
Ger bixwestana wan bi rastî sitara min
Gerek veşartina rûyê wî ji ber çavên min

Ev e yê ku divê min bikire û min ji xwe re bibe; ev e yê ku dîtina wî der-
manê ruh û can e. Ava dilê tî ye ev, girêza wî ye dermanê hemû nexweşiyên
min, çawa ku helbestkar jî gotiye:

Girêza wî meya min e hilma wî misk e
Hinarkên wî kafûra dil e awirkuj e
Çawa ku ji ber horîyan reviyabe ew
Çawa ku nû derketibe ji bihuştê ew
Kî wî dibîne rêya xwe şaş dike ew
Heyva li çardehan e her mafdar e ew

Ew e porxelekê min ê rûgul û evsûnkar e, çawa ku helbestkar jî gotiye:

Şad û bextewar bûme îro ez bi civanê te
Dilêş û dilzar bûme îro ez bi dîtina te
Mijangên te jî piştrast dikin awirên te
Axîn jî dil te gelo çi bikim ez ê jî dîtina te

Dema dellal ev ristên xweş jî cariyeyê bihîstin derbarê Elî Şar de, li ziman û zanîna wê ecêbmayî ma û bi heyrangorî lê nêrî. Xwediyê cariyeyê jî dellal re got: “Li coşa wê behetî nemîne lew ku şewqa rûyê wê ewrekî tarî bavêje ser rûyê heyvê û li zanîna wê ya helbestan jî ecêbmayî nemîne lewre ew dizane Qur’ana pîroz jî bi heft awayan bixwîne, hedîsên pêxember jî bi vegotina herî xweş dibêje, bi heft pênûsan dinivîse, ilm û zanînan jî ji zanayê herî mezin jî çêtir dizane û ya herî girîng jî hunerên destên wê ne, ku zêr û zîv bi xwe re tîne. Lewre gomlekên ji hevrişimê dihûne û her yekî ji wan bi pêncî dînarî difiroşe.”

Dellal got: “Xweziya min bi wî kesê ku vê cewherê bixe mala xwe û bibe xwediyê wê.”

Zilam lê vegerand û got: “Wê bifiroşe kesê ku ew wê dixwaze!” Dellal vegeziya cem Elî Şar, herdu destên wî maçî kirin û jê re got: “Mîrzayê min, vê cariyeyê bikire, lewre wê tu hilbijartî!” Piştî meziyet û xeyretên wê jî hemû jê re rêz kirin û got: “Ger te ew kîrî, li te pîroz be mîrzayê min, bawer bike tiştê ku te ew nedîtiye jî dê bide te.”

Elî Şar serê xwe bera ber xwe da, bi xwe kenîya û bi qasî saetekê ponijî, ji xwe re got: “Hetanî vê saetê hîna min taştêya xwe nexwariye û ez ji van taciran ditirsim ku bibêjim, ez nikarim wê bikirim; gelo çare çi ye?”

Cariyeyê li dellal meyzand û jê re got: “Bi destê min bigire û min bibe cem wî, da ku ez bi xwe, xwe pêşkêşî wî bikim û dilê wî bibijînim xwe, da ku min bikire, lewre ji wî pê ve divê tu kes min nekire.”

Dellal bi destê wê girt, ew bir cem Elî Şar û jê re got: “Îcar tu çi dibêji Mîrzayê min?” Elî Şar, bersiva wî neda. Cariye ket dewrê, ew axivî û jê re got: “Mîrzayê dilê min, evîndarê min, çima tu min nastîni? Bi çiqasî be jî min bikire, bibe mala xwe, ez ê te bextewar bikim.”

Elî Şar serê xwe rakir, lê nêrî û got: “Ma qey kirîn bi zorê ye? Buhayê te hezar dînar e û ev jî diravekî pir zêde ye.” Cariyeyê got: “Min bi nehsed dînarî bikire!” Elî Şar lê vegerand û got: “Na, ez nikarim.” Keçikê got: “Bi heşsed dînarî bikire!” Got: “Na!” Keçikê got: “Bi hefsed dînarî.” Wî dîsa got: “Na!”

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 314'EMÎN

Şehrezadê berdewam kir û got:

Cariyeyê buhayê xwe daxist û hey daxist hetanî ku giha sed dînarî. Lê Elî Şar dîsa got: “Sed dînar bi min re tune.” Cariyeyê got: “Çend dînarên te ji sedî kêmtir in?” Elî Şar got: “A rast ne dînarekî zer ne jî yekî sor bi min re tune. Heta dirhemek tenê jî bi min re tune, îca tu jî dev ji min berde û ji xwe re li yekî din bigere!”

Gava Zumrud têgihîşt ku xortê wê miflis e, jê re got: “Bi destê min bigire û min ber bi xwe ve bikişîne, hawayê ku tu min ramûsî.” Elî Şar bi gotina wê kir û ew ber bi xwe ve kişand. Wê jî di heman kêliyê de tûrikekî ku hezar dînar te de bû, ji ber xwe derxist, da destê wî û jê re got: “Nehsed dînarî ji vanan bide heqê min û sedî jê jî ji xwe re bihêle, belkî ji me re lazim bibe.”

Elî Şar bi ya wê kir û ew bi nehsed dînarî kirî, dînarê mayîn jî avêtin berîka xwe û bi destê Zumrudê girt, ew bir malê. Cariyeyê li hundir nêrî, dît ku maleke ripîrût û vikîvala ye! Ne nivînek, ne jî firaxek tê de heye. Rabû hezar dînarên din da Elî Şar û jê re got: “Here sûkê, ji me re bi sêsed dînarî doşek û lihêf û balîfekê bikire, bi çend dînarên din jî hinek sênîk û beroşan bikire û were. Elî Şar çû sûkê û ew tişt kirîn. Piştî jê re got: “Here bi sêsed dînarên din têra me xwarin û vexwarinê bikire, bi çend dînanan jî dorpêçeke hevrişimî û perdeyekê, hinek qesebê spî û zer, tayê hevrişimî bi heftrengan bikire û were.” Elî Şar çû, ew jî anîn.

Cariyeyê hundir paqij kir û odeya xwe raxist. Piştî mûmek pêxist û herdu li ber rûniştin, xwarina xwe xwarin, vexwarina xwe vexwarin û herî dawiyê çûn ser nivîna xwe, pev şabûn û di himbêza hev de raketin, çawa ku hozanekî jî gotiye:

Tu nêrîn nabe mîna ya du aşiqên di gel hev de
Dest bi dest bin lêv bi lêv bin di himbêza hev de
Pir bi dil bin di nava daxwazeke germ de
Bo çî ev lome ey evîndar û aşiqê dilkar
Dereng mekev pîroz ke tu vî dilê şîndar

Evîna herduyan di dilê hev de meya û hetanî sibehê di himbêza hev de man.

Roja dîtirkê, Zumrudê rahişt perdeyê û bi tayên hevrişimî yên rengîn ew neqîşand bi sûretên têr û tilûran; bi sûretên şêr û pilingan. Bi qasî heşt rojan bi hûrgilî li ser wan neqşan xebitî hetanî ku qedand. Piştî qermîçokên wê kewandin, ew rast kirin û perde li hev pêça, ew da destê xwediyê xwe û jê re got: “Here vêya bibe sûkê û bi pêncî dînarî wê bifiroşe tacîrekî xwecihî,

baldar be bila ne yekî xerîb be, da ku nebe sebebeke ku me ji hev veqetîne, lewre çavên dijminan timî li me digerin.”

Elî Şar got: “Bila be.” û rabû ser xwe berê xwe da sûkê. Çawa ku cariyeyê jê re gotibû, perdeya xwe ya neqîşandî firot tacirekî xwecihî, piştîre çû dîsa perdeyek, qeseba zer û spî, tayên heftrengî, têra xwe xwarin û vexwarin jî kirîn û vegeriya malê; diravên mayîn jî li Zumrudê vegerand.

Ji wê rojê û pê de, êdî her heyşt rojan carekê, Elî Şar perdeyeke neqîş-kirî dibir sûkê, ew bi pêncî dînarî difirot, pêdiviyên malê dikirîn û dîsa vedigeriya malê. Bi qasî salekê, wisa berdewam kir. Rojekê dîsa perdeyeke neqîşandî bir sûkê, da destê dellal. Gava dellal perdeya wî xist mazatê, mirovekî fileh li şûna pêncî dînarî, şêst dînar teklîf kir. Lê wî qebûl nekir. Zilamê fileh buhaya wê zêde kir, hetanî ku teklîfa xwe gihand sed dînarî, ku deh dînarî jî weke bexşîş da yê dellal ji bo ku navbeyniyeke baş bike. Dellal çû ew teklîfa nû di guhê Elî Şar de got û bi hîlebazî hişt ku perdeya xwe bifiroşe yê fileh bi sed dînarî, jê re got: “Metirse begê min, ev filehê hanê, mirovekî pir baş e.”

Bi dilekî metirsîdar, Elî Şar perdeya xwe da ew ê fileh û dirav ji destê wî girtin. Piştîre berê xwe da malê û bi şûn de vegeriya, yê fileh jî li pey wî. Carekê gava li pey xwe zivirî û çav lê ket, jê re got: “Tu çima li pey min î fileho!” Wî jî lê vegerand û got: “Mîrzayê min, pêdiviyeke min heye, min dixwest ku ez li dawîya sikakê wê pêk bînim, Xwedê kesî neçar neke ya Rebî!”

Gava ku Elî Şar gihîşt malê, dît ku ew ê fileh hîna jî li pey wî ye. Hêrs bû û jê re got: “Tu çi ji min dixwazî mel’ûno? Çima tu hîna li pey min î?” Ê fileh got: “Begê min ez pir tî bûme, bi xêra xwe û bavê xwe te tasek av bida min, dê pir baş bûyal!”

Elî Şar di dilê xwe de ji xwe re got: “Evê hanê zilamekî xerîb e û xwe li min girtiye, bi navê Xwedê ez ê avekê bidime wî û ez wî naşikênim...”

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 315’EMÎN

Şehrezadê berdewam kir:

Elî Şar derbasî hundir bû û çû rahişt kûzê avê, da ku bide yê fileh. Cariyeyê ew dît û jê re got: “Ka te ew perde firot dilocan?” Elî Şar got: “Belê” Zumrudê got: “Te ew firot tacirekî me, yan rêwiyekî? Lewre dilê min neqrîskan dide çawa ku di nava metirsiya firaqê de be.” Elî Şar got: “Min ew firot tacirekî.” Zumrudê berdewam kir di israra xwe de û jê re got: “Rastiya

mijarê ji min re bibêje, da ku ez bikaribim tevdîrên xwe bigirim. Û ew çi kûzê avê ye di destê te de, tu yê wî bibi ku?” Elî Şar got: “Ez ê wî ji dellal re bibim, da ku avê vexwe.”

Zumrudê di ber xwe de got: “Lahewle we la quwete îlla billah!”² û ev çend ristên helbestekê xwendin, got:

Melezîne ey daxwazkarê min melezîne!
Qet nexape bi maçekê tenê kuro melezîne!
Dewran xapîner e tikan dikim melezîne!
Ji bir neke piştî her pevgihandinekê firaq e!

Elî Şar rahişt kûzê avê û bi şûn de vegeriya derve lê çawa ku bi şûn de çû, dît ku yê fileh derbasî hêwanê bûye. Bi hers gotê: “Hetanî vir jî tu hatiyî, sehê heram! Çawa tu derbasî hundir bûyî bê izna min?”

Ê fileh got: “Ferq nîn e begê min, ha devê derî ha hêwan, jixwe ez hatim ku avê vexwim û herim begê min. Qencî, comerdî û başî jî karê te ye.” Piştî rahişt kûz, av vexwar û dîsa ew bi şûn de da Elî Şar.

Elî Şar hebekî xwe ragirt bi hêviya ku yê fileh bi şûn de here. Lê mirovê fileh rûnişt û bi şûn de neçû. Elî Şar jê re got: “Çima tu ranabî bi rêya xwe de naçî?” Yê fileh got: “Mîrzayê min, tu jî ne be mîna yê ku qenciyekekê dike û piştî qenciya xwe dike minet li serê mirov û ne jî mîna ew ê ku helbestkar derbarê wî de dibêje:

Nemane li ser rûyê dinyayê ew comerdên berê
Vexwarina avekê jî êdî minet e li ber derê wî

Piştî axaftina xwe berdewam kir û got: “Begê min te avek da min lê ez ji te dixwazim ku tu gepek nan jî bidî min. Hema kurtêlek nanê hişk be, pîvazek be, ferq nake.” Elî Şar bi qehr got: “Tiştêk di mala min de tune ye, zû rabe ji vir here!” Yê fileh got: “Mîrzayê min, heger tiştêk di mala te de tune be, a ji te re ev sed dînar û here sêkê ji min re nanekî, xwarinekê bîne, da ku av û xwêyek bikeve navbera me û qenciya te temam bibe.”

Elî Şar ji xwe re got: “Evê fileh dîn e, ez ê sed dînarî jê bistînim û bi du dînanan xwarinê jê re bînim!”

Zilamê fileh axaftina xwe berdewam kir û got: “Mîrzayê min, ez dixwazim tenê birçîbûna xwe bişikênim, lew ku bi nan û pîvazekê be jî. Lewre xwarina baş, a ku birçîbunê dikuje, ne ya buha ye, çawa ku helbestkar jî gotiye:

Bi nanê tisî têtê qewirandin ev birçîbûn
Bêminetîya wê bide bila were tenêbûn
Di vê dinyê de dadwerê mezin mirin e

2 . Laveke bi Erebi ye: Tu hêz û qewet bêtî Xweda peyda nabin!

Wekhev nêzikî dibe çî mîr çî feqîr”

Di pey vê gotina wî re, Elî Şar jê re got: “Tu li vir xwe ragire hetanî ku ez herim sûkê ji te re xwarinê bînim û bêm.” Piştî deriyê malê kilit kir, mifte bi xwe re bir û çû sûkê. Ji wê derê penêrê qelandî, hingivê spî, mûz û nan kirî û bi şûn de vegeriya malê. Gava ku yê fileh çav lê ket, jê re got: “Ev çî ye mîrzayê min, evqas xwarin têra deh zilaman dike û ez tenê me, her hal tu yê ji bi min re bixwî?” Elî Şar got: “Ez têr im, tu bi tenê bixwe!” Yê fileh got: “Mîrzayê min, zana dibêjin ê ku bi mêvanê xwe re nexwe, piç e.”

Gava ku Elî Şar ev gotina zilamê fileh bihist, li cem wî rûnişt û hinik xwarin pê re xwar. Piştî destê xwe rakir da ku mûzekê hilde.

Li Şehrezadê bû sibe, wê ji gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 316'EMÎN

Şehrezadê vegotina çîroka xwe berdewam kir:

Di wê navberê de yê fileh mûzek qeşart, benceke biefyonî ku misqalekî wê filek davêt erdê tê de bi cih kir û mûz di hingiv dakir û da destê Elî Şar, got: “Mîrzayê min, tu bi heqê dinê xwe kî, tê vê mûzê bixwî!”

Elî Şar fedî kir ku wê sonda wî lê bide şikandin, ew mûz ji dest girt û ew avêt devê xwe. Çawa ku mûz gihîşt aşikê wî, serî lê gēj bû, sist bû û li erdê ket, veziliya û bêdeng bû, weke ku ew saleke wî be di xew de.

Gava ku zilamê fileh çav li wê rewşa wî ket, weke pilingekî ji cihê xwe çeng bû û rabû ser xwe, mifteya hundirê din ji berîka wî derxist û bi bazdanê çû cem birayê xwe û ew agahdar kir ji meseleyê. Îcar birayê wî ji ew şêxê extiyar î ku xwestibû Zumrudê bi hezar dînarî bikire û ew pê razî nebûbû, bi helbestan dev avêtibû extiyariya wî. Vêca bi wê extiyariya xwe jî, ew mirovekî di dilê xwe de kafir bû lê di liv û tevgera xwe de weke misilmanan tevdigeriya. Navê xwe jî kiribû Reşîdedîn da ku kes gumanan jê neke lê belê di rastiyê de navê wî Bersûm bû. Îcar gava ku Bersûm Zumrud ji destê xwe berdabû, çûbû cem birayê xwe yê fileh û giliyê xwe li ba wî kiribû, wî jî jê re gotibû: “Tu qet meraq neke, ez ê herim fenekê li Elî Şar bikim û bêyî ku ez dirhemekî ji bidim ez ê wê ji te re bînim.” Lewre ew bi xwe jî hîlebazekî mezin bû.

Îcar çawa ku hîlekarê fileh gihaşt cem birayê xwe Bersûm û ew agahdar kir, Bersûm li hespê xwe siwar bû, xulamên xwe dan dû xwe, birayê xwe da kêleka xwe û berê xwe da mala Elî Şar. Tûrikekî ku hezar dînar tê de bû ji bi xwe re bir, da ku gava li walî rast bê, weke bertîl bide wî û wî bêdeng bike. Çawa giha mala Elî Şar, deriyê odeya Zumrudê vekirin û hemû xulaman gişan bi hev re êrişî ser Zumrudê kirin, ew tehdît kirin û bi zorê ew bi xwe

re birin. Mala Elî Şar jî weke xwe hiştin li pey xwe, bêyî ku destên xwe bidin tu tiştî. Elî Şar jî li hêwanê vezelandî hiştin û çûn.

Kalê Bersûm, Zumrud bir mala xwe, ew xist nav cariyeyên xwe û jê re got: “Şermûta pozbilind, ez im ew şêxê ku te ew red kiribû û pê qayil nebû-bûyî. Niha jî bêyî dirhemekî jî min tu kirî mala xwe!”

Çavên Zumrudê tijî hesir bûn, lê vegerand û got: “Şêxê xerabiyê, Xwedê heqê min ji te re nehêle, te ez ji xwediye min veqetandim!” Bersûmê extiyar got: “Şermûta evîndar, tu yê bibînî bê ez ê çi bi te bikim û çawa îşkenceyê li te bikim! De binêre, bi heqê Îsa û Meryema ezra, heger tu bi ya min nekî û neyê ser dîne min ez ê ezabê dojhê bi te bikim.”

Zumrudê got: “Bi navê Xwedê tu laşê min qetqetî bikî jî ez dev ji misil-mantiyê bernadim. Lewre bi çi hawayî be jî dê Xwedê li min were rehmê û rêyeke xelasiyê nîşanî min bide. Ew e yê ku dikare her tiştî bike. Aqilmend jî dibêjin: Bila êşa laş be ne êşa giyan be!” Wê gavê, kalê Bersûm bi ser xulam û xizmetkaran de qîriya û got: “Ka wê bavêjin erdê!” Xizmetkaran ew avêtin erdê û bi daran lê dan hetanî ku carewar pê qet û bû hewara wê, xelasi xwest. Zumrudê jî dev ji lavayan berda û êdî got: “Tenê Xwedê ye.” Dubare kir hetanî ku ji ser xişê xwe çû û bêdeng bû mîna miriyan. Kalo jî bêhna wî hat ber û dilê wî rihet bû. Roja dîtirkê dîsa ew avêtin erdê û lêdan, Zumrudê jî dîsa hewara xwe bir pêxember û bînavber kir qîrîn û got: “Xelaskarê min tenê Xwedê ye. Laîlahe illallah, Muhemedûn resûllullah”³

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 317'EMÎN

Şehrezadê berdewam kir:

Îcar em Zumrudê li wir bihêlin û em vegerin ser Elî Şarê ku razayî ma hetanî dîtira rojê. Di roja duduyan de bandora bencê li ser wî kêr bû, hişê wî hat serê wî, çavên xwe vekirin û qîr kir, got: “Zumrudê!” Lê kesî bersiv nedayê. Rabû ser xwe çû hêwanê, dît ku mala wî giş li bin guhê hev ketiye û vîkîvala maye! Têgihîşt ku her tişt ji destê wî zilamê fileh bi serê wî de hatiye. Li çogên xwe da, giriya, gilî û gazinên xwe kirin û di nava bêrikirineke kûr û hestiyar de, bi helbestî got:

Dilo haş be hem aram be
Bêrî tîr e lew dijwar e
Dilovan bin xelkno bi min re
Êşa dil û evînê pir xeter e
Çare nîn e çi bikim bi janan

3 . Xwedê tikî tenê ye û Muhemmed pêxemberê wî ye.

Reh qetiyane îro tîran li dil dan
Binêrin li van derd û kulan
Çawa têşim bi van êş û xeman
Ez ê çi bikim gelo bi vê janê
Kor dibin li min çavên evînê

Hilmek kûr kişand, piştîre dîsa berdewam kir û got:

Ji dijiwariya bêrîkirinê bi tirs im ez li ser wê
Çawa ku bi taye ketibim ez li ber bayê wê
Ev laş her bi lerz û ricf e li ber wêneyê wê
Ode hêwan û mal hemû digirîn li ser wê
Ez jî bi pirs im her li cih û warê wê
Olana dengê dibêje hevdîtî ne gengaz e qet
Ji îro û pê de her fîraq e ew nîn e taqet

Elî Şar, kincên li ser xwe qetandin û bê navber vegevîzî di nava êş û jana poşmaniyeke bêdawî de lê ew jî bêfêde bû. Rahişt du kevîran, bi wan kevîran li singê xwe da û li dora bajêr geriya û got: “Zumrudê! Zumrudê!” Zarok jî bi dû ketin û gotin: “Dîno! Dîno!”

Dost û nasên wî, hogir û mirovên wî, pê êşîyan, li ser wî giriyan û ji hev re gotin: “Ev ne filankes e, gelo çi pê hatiye?”

Hetanî êvarê jî di wî halî de ma. Dema ku şev hat û baskên tarîbûnê xwe avêtin ser bajêr, wî jî xwe avêt sikakekê û li wir raket hetanî şevqê. Gava bû sibeh, dîsa rahişt kevîrên xwe, li singê xwe da! Bang kir got: “Zumrudê Zumrudê!” û dîsa li dora bajêr geriya, hetanî êvarê. Piştîre dîsa vejeriya hêwana mala xwe, da ku li wir rakeve. Cariyeya wî ya ku pîrejineke pîr û xêrxwaz bû, jê re got: “Xwedê xêrê bike kurê min, gelo çi qewimiye? Tu kengî dîn bûyî?”

Elî Şar, bi van ristan bersiva wê da û got:

Gotin min qey tu dîn bûyî li ser evîna dil
Min gote wan jiyana xweş a dîna ye dil
Dînîtiya min her direye di nava min de
Loma nekin xwê nexin birîna min de

Bi vê gotina wî re, pîrejina xizmetkar têgihişt ku mîrzayê wê evîndar e. Pîrê got: “La hewle wela quwete îlla bîllah; kurê min, ez dixwazim ku tu serpêhatiya xwe ji min re bibêjî, belkî Xwedê hêzê bide min û ez jî bikaribim alîkariya te bikim.”

Elî Şar, çîroka xwe ji serî heta binî jê re got; çawa Bersûmê file nas kiribû, çawa pê hesiyabû keşeyê birayê wî navê xwe kiribû Reşîdedîn, her tişt jê re rêz kir, mîna ku ta bi derziyê ve bike. Gava pîrê gotinên wî guhdar kirin û cewherê mijarê fêhm kir, got: “Kurê min!” Piştîre bi helbestî berdewam kir

û got:

Li vê dinyayê besî wan e êşa evîndaran
Xwedê wan bisitirîne ji destê serdaran
Ji derdê eşqê dimirin bêyî ku eşkere bikin
Her dem paqij in ji gemarê dûr dikevin

Hilmeke kûr berda, piştê dîsa berdewam kir û got: “Niha çareyek hat bîra min kurê min! De kanî rabe ser xwe û here sûkê ji min re qefeseke mîna selikên xebatkaran bikire û hundirê wê tijî bazin, guhar, gerdenî, xirxal û hemû amûrên zînetê bike û bînê. Ez ê deynim ser serê xwe û xwe bixim şiklê firoşkareke amûrên zînetê û ez ê herim mal bi mal lê bigerim, hetanî ku ez lê biqelibim. Ango agahiyekê der barê wê de bigirim. Heger Xwedê bêje erê, ez ê bi ser bikevim.

Rûyê Elî Şar vebû, mîna guleke ku av were ser, pir kêfxweş bû bi wê gotina wê. Rabû ser xwe, herdu destên wê maçî kirin û çû sûkê, çi xwestibû, jê re anî û hat. Pîrê jî rabû ser xwe, kincên pînekirî li xwe kirin, morikên hingivîn bi serê vekirin, gopelê xwe hilda destê xwe û rahişt qefesa xwe, bi nava taxê ket, mal bi mal geriya. Ji taxekê derbasî taxa din bû, sikak bi sikak, mal bi mal geriya hetanî ku Xwedê Teala jê re li hev anî û rêya wê bir qesra Reşîdedînê fileh. Li ber derî, pîrê dengê nalînekê ji hundir bihîst. Li derî da.

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 318'EMÎN

Şehrezadê vegotina çîroka xwe berdewam kir:

Gava pîrê li derî da, cariyekê hat derî jê re vekir û xêrhatina wê kir. Pîrê jê re got: “Ev tiştên firotinê li ba min hene, gelo keseke ku wan bikire li ba we heyê?” Cariyeyê got: “Belê hene.” Piştê ew derbasî hundir kir û da rûniştandin. Hemû cariyeyên di malê de jî lê hatin hev û li dora wê kom bûn, her yekê ji wan rahişt perçeyekî. Pîrê jî sohbeta xwe bi wan re kûr kir û zêrên xwe bi erzani firotin wan. Cariye hemû pir kêfxweş bûn bi wê nêzika-hiya wê û wî zîmanê wê yê şîrîn. Pîrê jî çavên xwe li derdorê digelandin bi hêviya ku xwediya wê nalîna hanê û wir bibîne. Di demeke kurt de, çavên wê li xwediya nalînê ketin. Keçeke li erdê dirêjkirî bû, baş lê nêrî, bala xwe dayê ku ew Zumrud bi xwe ye. Rabû giriya û ji cariyeyan re got: “Keçino, ev rebena hanê çima wisa di vî halî de ye?” Cariyeyan çîroka wê ji serî hetanî binî jê re rave kirin. Herî dawî jî lê zêde kirin û gotin: “Ne bi destê me ye lê belê Mîrzayê me fermana vê yekê daye û niha ew ne li vir e, çûye rêwîtiyekê.” Pîrê jî wan re got: “Vê feqîrê vekin û gava ku mîrzayê we ji rêwîtiya xwe vegeriya, hûn dikarin dîsa girêbidin. Bi wî hawayî hûn ê xêreke mezin bikin û wê Xwedê li we were rehmê, ji ber vê qenciya we.” Keçikên cariyeyan

gotin: “Daxwaza te li ser serê me ye, bila be dayêcan, em ê wisa bikin.”

Di ci de pê ve çûn, dest û nigên Zumredê vekirin, av û xwarin danê. Pîrê got: “Xwezîka nigên min bişkestana û ez derbasî cem we hebûbama!”

Pîştire, pîrê çû cem Zumrudê û je re got: “Derbasbûyî be keça min, Xwedê hez bike tu dê rizgar bibî û dê Xwedê teala deriyekî xêrê li te veke.”

Di pey re jî pîrê jê re got, ku ew ji cem Elî Şar hatiye û jê xwest ku şeva pêşiya wan xwe amade bike û guh bide ser dengê ku ji derve bê û got: “Dê mîrzayê Elî Şar were hetanî biniya qesrê û dê ji te re bifikîne. Gava te dengê fikîna wî bihist, tu jî di şibakê re jê re bifikîne û bi werîsekî xwe di şibakê re berde jêr. Ew ê jî te bi xwe re bibe û here.”

Zumrudê destê wê maçî kir, spasiyên xwe pêşkêşî wê kirin, pîrê jî ji wir derket û di cih de çû cem Elî Şar, ew ji mijarê agahdar kir û jê re got: “Şeva pêşiya me nivê şevê here filan taxê, filan sikakê û li ber filan qesrê bisekine, bifikîne, wê keçik jî ji te re bifikîne û xwe ji şibakeyê berde xwarê. Tu jî wê bigre ba xwe û bibe cihê ku tu dixwazî.”

Elî Şar, pir hestiyar bû, spasiya pîrê kir û got:

Têr bûn dildar ji gotin û qîl û qalan
Laş heliya dîl bi pêt e li ber talanan
Rastî li ku ma çîma wilo em dinalin
Ey bêxeberê êş û janan ka tu li ku yî
Guh bidêre bibihîze ka tu li ku yî
Bi çûna te her bi êş im ka tu li ku yî
Xewa şevan li min herimiye ka tu li ku yî
Hêşir hiştîm te ez îro li vî warî
Tenê tu yî herdem wisa li bala min î

Elî Şar, bi bêsabriyeke mezin, xwe li bendî şevê ragirt. Çawa ku tarî ket erdê û nivê şevê bi ser wî de hat, çû taxa ku pîra xizmetkar behs kiribû û li biniya heman qesra ku jê re destnîşan kiribû, rûnişt li ser kevîrekî û ma li hêviya wextê civana xwe. Lê ji ber ku pir betilîbû û çend şevên borî bê xew mabû, li ser wî kevîrî di xew re çû.

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî vegotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 319'EMÎN

Şehrezadê berdewam kir:

Elî Şar, di xew re çûbû lê di wan kêliyan de, dizekî bi hêviya ku tişteki diziyê bibîne, li wan deran digeriya. Di encama wê gerê de şensê wî ew bir cem mala ew ê fileh. Li dora qesra wî geriya lê devereke ku tê re bikeve

hundir nedît. Hîna ku li dora qesrê digeriya, çavên wî li Elî Şarê raketî ket. Bêyî ku wî ji xew şiyar bike, şaşika serê wî dizî û rahiştê, bir. Di wê kêlikê de deng ji şibakeya jor hat.

Zumrudê şibake vekir û li jêr nêrî, dît ku ew jî şipiya ye di nava tarîka şevê de. Wê got belkî ew zilam, mîrzayê wê Elî Şar e, loma jê re fikand. Zilamê diz jî bi heman şeweyî bersiva fîka wê da. Dilê Zumrudê ket cî û bi lez weris li newqa xwe girêda û di şibakê re xwe berjêr berda bi ser wî de, xurcika zêran jî di destê wê de.

Li himberî wê dîmenê yê diz di nava xwe de got: “Bêguman ev tişteki seyr e û sebebên wê yî xerîb hene!” û di cî de xurcika zêran ji destê wê girt, ew jî hilda himbêza xwe û weke birûskê bi rê ve çû, ji wir dûr ket. Zumrudê jê re got: “Pîrejina xizmetkar ji min re got ku tu pir hejar bûyî ji ber hesret û bêrikirina min lê va ye ez dibînim, ku tu mîna hespekî xurt î!”

Dizo bersiva wê neda, Zumrudê destê xwe li ser rûyê wî peland, dît ku mûyên riha wî weke striyên jûjî ne. Te digot qey berazekî ku stirî daqur-tandine û stirî di riha wî re dane der. Zumrudê bi tirs got: “Tu kî yî?” Wî got: “Şermûta zîrek, ez Ciwanê Kurd im; yek ji wan her çil dizên jehatî yên Ehmed Edenef im. Îşev, dê her çil jî di ser te re derbas bibin û hetanî sibehê bi te şa bibin.”

Gava ev gotinên wî bihîstin, giriya, porê xwe kişand û têgihîşt ku careke din tora felekê li dora stûyê wê hatiye hûnandin! Baş dizanibû ku êdî ji Xwedê pê ve, tu alîkarên wê tune ne. Tewekeliya xwe bi Xwedê anî, xwe spart wî, di dilê xwe de eşheda xwe anî û got: “Xwedêyo tu min ji vê tengasiyê rizgar bike, çawa ku te hemû tengavkar ji tengahiyên wan xelas kirine!” Û bi kulman li ser çavên xwe da û porê xwe kişand.

Wê kêlikê sebeba hatina Ciwan a wê deverê ew bû ku ji Ehmed Edenef re gotibû: “Beriya niha jî ez hatime vî bajarî û ez şikeftê li vir nas dikim ku çil mirov tê de hiltên. Îcar ez dixwazim niha li pêşiya we herim wir, ez ê diya xwe li wê şikeftê deynim û ez ê dakevim nav bajêr, tiştinan jê bidizim û vegirim şikeftê, li hêviya we bimînim, da ku ez amadekariyên mazûbantiyeke baş bikim ji bo we.” Ehmed jî jê re gotibû: “Tu çawa dixwazî, wisa bike.” Ew jî li pêşiya wan derketibû, hatibû wê şikefta ku behsa wê kiribû, diya xwe li wir danibû, leşkerê ku li wê derê raketî dîtibû jî kuştibû, meytê wî jî di heman şikeftê de veşartibû û xwe berdabû nava bajêr û hatibû devê deriyê qesra wî filehî, li Elî Şarê raketî rast hatibû û ew tiştê ku me behsa wê kiribû, pêk anibû: Kofiya Elî dizibû, Zumrud revandibû, biribû şikeftê, ew radestî diya xwe kiribû û jê re gotibû: “Bila ev keçik li ba te be, hetanî sibehê, gava ku ez vegerim.” Piştê jî ji cem çûbû.

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina çîroka xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 320'EMÎN

Şehrezadê vegotina çîroka xwe ji Şehreyar re berdewam kir û pê de çû, got:

Vêca çawa ku Ciwan ji şikeftê derket çû, Zumrudê di dilê xwe de got: “Ne bi fen û hîleyan be, ez nikarim xwe ji vê xefikê rizgar bikim! Ma ez ê çawa xwe ragirim û biminim li bendî van çil dizên ku bên û yeko yeko di ser dilê min kevin û min bikin mîna kekeke ku binav bûbe di behrê de!”

Zumrudê li pîra diya Ciwan zivirî û jê re got: “Xaltikê, kanî tu me der-naxî derveyî şikeftê, li ber berojkê ji bo ku ez spî û rişkên serê te bikujim?”

Pîrê got: “Erê wile lawo, ev demeke dirêj e ez neçûme hemamê û min serê xwe neşûştiye, ji ber van berazên ku her roj li cihekî ne û her dem bi ger û fitil û dewran in.”

Her du derketin derve. Zumrudê li ber pîrê rûnişt, serê wê danî ser çoga xwe û spiyên nav porê wê kuştin, hetanî ku li xweşiya pîrê çû û pê re di xew re çû. Wê çaxê, Zumrud rabû ser xwe, kincên wî leşkerê kuştî li xwe kirin, kofiya wî da serê xwe, şûrê wî li newqa xwe girêda û ket qilixê zilaman. Piştî, tûrikê zêran jî rakir û li hespa wî leşkerî siwar bû, ji Xwedayê xwe re got: “Ya Rebî tu min bisitirînî, bi cahê pêxemberê me Muhemmed!” Dûre ji xwe re got: “Ger ez herim bajêr, dibe ku hinek min bibînin û mala min xera bikin!” Loma berê xwe ji bajêr guhert û ber bi çolê ve çû. Bi qasî deh rojan wisa bi rê ve çû. Gava ku tî dibû, ji ava çem û kaniyan vedixwar, gava ku birçî dibû jî, ji gêha û berên şindaran dixwar û dida hespê xwe jî. Di roja yazdehan de, li bajarekî aram qelibî, ku di nava xêr û bêran de bû. Bajarekî ku zivistaneke sar di ser re derbas bûbû û bihareke bi gul û çiçek bi ser de dihat. Bajarekî ku çem û rûbarên wî bi xêr û bêr diherikîn û teyr û tilûrên wî dikirin wî tewît.

Gava ku Zumrud giha ber deriyê bajêr, dît ku hemû mîr û wezîr û gîzîrên bajêr, li wir in û artêşa wan jî li dora wan e. Li wan ma behetî û di dilê xwe de got: “Madem ku hemû li devê derî kom bûne, divê sebebeke vê yekê hebe!”

Gava nêzikî wan bû, leşker hatin pêşiya wê, ji hespên xwe peya bûn û hemûçikan bejna xwe li ber wê tewandin, erda bin lingên wê maçî kirin û gotin: “Xwedê serkeftinê bide û desthilatdariya te bilind bike, siltanê me yê hêja û birûmet!”

Piştî ku hemû serdar û serkirdeyên mayîn jî li pêşiya wê rêz bûn, leşkeran pêşkêşkirina niyazên xwe berdewam kirin û gotin: “Xwedê te bi ser bixe û te bike siltanekî gewre, li ser serê hemû misilmanan, da ku xêr û qenciya te bigihîje hemû xelkên cîhanê! Xwedê hêz û qeweteke hîn mezintir bide te

ey mezintirîn qralê vê dem û dewranê!

Zumrudê bi şaşwazî li wan veğerand û got: “Ev çi helwest e û rewşa we çawa ye xelkino?”

Hacib, xwe da pêş û got: “Xwedayê mezin bi elba mezin daye te û tu kiriye serdar û desthilatdarê vî bajarî; tu kiriye siltanê gewre li ser serê hemû xelkên wê. Lewre divê tu bizanibî ku xelkê vî bajarî, dema ku qralê wan dimire, diçe ber dilovaniya xwe û kurên wî tune bin, hemû leşker û mezinên bajêr derdikevin derveyî bajêr û sê rojan li ber deriyê bajêr dimînin, li benda kesekî ku di wîr re derbas bibe. Kî di wê rêyê re were bajar, wî dikin siltan li ser serê xwe. Vêca şikir ji Xwedê re ku tu xortê lihevhatî ji me re şand. Helbet li şûna te xortekî kêmtir jî bişanda, dê bibûya siltan li ser serê me.

Zumrud jineke têgihîştî û zana bû, baş dizanibû bê çi tê çi wateyê. Bi giranî axivî û ji wan re got: “Divê hûn bizanibin ku ez ne kesekî ji rêzê me. Ez ji malmezinan im û kesekî bi nav û deng im. Lê belê ez ji malbata xwe aciz bûm, bi wan re pevçûm û ji ber wê min dev ji wan berda û ez bi çolan ketim, hetanî ku ez di vir re derketim. Heger hûn bawer nakin, li vê xurcika min a tîjî zêr binêrin, hûn ê rastiye bibînin! Min ev zêr bi xwe re anîn, ji bo ku ez wan bikim sedeqe û li ser jar û feqîran belav bikim. Jixwe bi rê de jî, min gelek zêr û zîv, li ser rêwî û feqîran belav kirin.”

Hemû, kêfxweş û bextewar bûn bi vê gotina Zumrudê. Ew jî pir kêfxweş bû bi kêfxweşiya wan û ji xwe re got: “Piştî ku min xwe gihand vî warî û ez li vir bûm siltan, belkî ez xwedî û evîndarê xwe Elî jî li vir bibînim û em li vir bigihîjin hev!

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 321'EMÎN

Şehrezadê berdewam kir û got:

Piştî Zumrudê berê hespê xwe da deriyê bajêr, ji bo ku derbasî hundir bibe, hemû mîr û beg û wezîr û leşkeran jî dan dû wê û meşîyan. Derbasî bajêr bûn, leşker û xizmetkar pê ve daketin û derbasî qesra wê kirin. Mezinên dewletê hemû ketin bin çengên wê û ew birin li ser textê siltanetê danîn, erda bin nigên wê maçî kirin û rêzdariya xwe pêşkêşî wê kirin. Ew jî çawa ku li ser kursiya desthilatdariyê rûnişt, fermana pêşîn da û ji karmendan re got: “Sindoq û xezîneyan vekin û diravan li ser leşkeran belav bikin!” Karmendan fermana wê di cî de pêk anîn, leşker pir kêfxweş bûn û dua jê re kirin, ku Xwedê desthilatdariya wê dirêjtir bike. Xelkê bajêr hemû jî bi hatina wê şad bû û razibûna xwe jê re diyar kirin.

Demeke dirêj bi heman şeweyî berdewam kir; ferman dan û dadwerî da avakirin hetanî ku dilê gel xweş kir û heskirina xwe xist dilê wan, bi karê qenc û paqij, bi berdana zindanî û girtiyan, bi nêzikahiyeke diloan û adilane, bi rakirina zilm û zora li ser millet. Di wê navberê de ji her ku evîndar û xwediyê wê dihat bîra wê dua ji Xwedayê xwe re dikir ku wan bigihîne hev û pev şa bike.

Şevêkê, dîsa Elî Şar hat bîra wê. Kederek ket ser dilê wê, bi dilêşî rojên xwe yên bi wî re anîn bîra xwe û giriya, hêsir barandin. Piştîre bi helbestî got:

A ku min dikûje îro ji nû ve bêriya te ye
A ku hêsirên bi ser hinarikan de dibarîne êşa te ye
Giriyê min ne ji ber xerîbiyê ye ji ber bêriyê ye
Bawer bike ya ku min dîkuje her êşa firaqatê ye

Piştîre hêsirên xwe paqij kirin û çû derbasî hêla cariyeyan bû, bi derd û pêdiviyên wan ve mijûl bû, cih û ode ji wan re veqetandin, mehmiz û heqdestên wan eyar kirin, xelat û diyarî li wan belav kirin û ji wan re got, ku ew dixwaze bi tena serê xwe bimîne, ji bo ku îbadet û taetê bike ji Xwedayê xwe re. Bi tena serê xwe ket odeyekê û dest bi rojî û îbadetê kir. Mîrek û emîran di nava xwe de gotin: “Ev siltanê me oldarekî kamil e, qet qisûrê naxe îbadeta xwe, tu xizmetkaran ji li cem xwe nagire ji xeynî du zarokên ku navmaliyê jê re dikin û li ber destên wê dixebitin.

Zumrudê bi qasî salekê siltaniya xwe wisa berdewam kir lê ne agahiyek girt der barê evîndarê xwe Elî Şar de û ne ji li şopeke wî rast hat, ket qelaqê û metirsiyên wê çêbûn li ser wî. Herî dawiyê gazî wezîr û gizîrên xwe kir û fermanek da wan, ku avakar û endezyaran bînin û li bîniya qesra wê meydanekê jê re ava bikin bi dirêjahiya fersexekê⁴ û pehnahiya fersexekê. Wan ji di demeke kurt de, ew fermana wê pêk anîn û meydanekê li gora daxwaza wê çêkirin. Wê ji hat lê nêrî û ji bo xwe qubeyek çêkir li goşeyekî wê ji bo mîr û emîr û wezîran ji kursî rêz kirin û ferman da ku li wê meydanê xwarineke herî xweş were dayîn. Sifre hat raxistin û xwarinên xweş li ser rêz kirin. Wezîr û emîr û karmendên dewletê li ser rûniştin, xwarin. Zumrudê ji wan re got: “Ez ji we dixwazim ku di serê her meha nû de sifreyeke wisa li dar bixin û hûn li nav bajêr bang bikin, ku her kes were ser xwarinê, kesê ku neyê ser xwarina siltan dê li devê deriyê xwe were daliqandin.”

Gava ku meha nû hat, karmendên dewletê fermana Zumrudê pêk anîn û sifreyeke xwarinê li wê meydanê raxistin, hemû kesên li bajêr hatin ser û jê xwarin. Bi wî hawayî, dana xwarinê di serê her meha nû de berdewam kir hetanî ku saleke xwe tijî kir.

Di serê meha nû ji sala duduwan de, dîsa mîna her carê xwarina siltan

4 . Fersex: Bi dirêjahiya hezar metreyî ye.

li meydanê danîn, bangêşkar û dellal jî ketin nav başêr û gazî kirin, gotin: “Xelkino, bajarîno! Divê hûn hemû werin ser sifreya siltan, kesê ku li ber dikana xwe were dîtîn, dê di devê dikana xwe de were bidarvekirin.”

Xelqê bajêr, qefil bi qefil hatin meydanê. Zumrudê ferman da wan ku li ser sifreyê rûnên û têra xwe bixwin û vexwin ji hemû teşeyên xwarin û vexwarinê.

Hemû li ser sifreyê rûniştin ji bo ku bixwin, Zumrudê jî ji cihê xwe li wan dinêrî û çavdêriya wan dikir. Wan jî dest bi xwarinê kir lê her yekê ji wan jî di dilê xwe de digot: “Hebe nebe, siltan li min dinêre ne li kesekî din!”

Emîr û wezîran jî bênavber ji wan re digotin: “Fedî nekin û têr bixwin. Siltanê me wisa dixwaze û wisa hez dike.” Li ser vê gotina wezîran, xelkê bajêr jî têra xwe xwar, vexwar û rabûn ser xwe, bi şûn de çûn karê xwe. Bi rê de jî dua ji siltanê xwe re kirin û hinekan ji wan ji hev re gotin: “Di temenê xwe de min nebihîstiye ku tu siltan û qralan ev qasî ji jar û feqîran hez kiriye û alîkariya wan kiriye!”

Xelkê bajêr dua ji wê re kirin bi temenekî dirêj, Zumrudê bi xwe jî vegeriya qesra xwe.

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 322'YEMÎN

Şehrezadê vegotina çîroka xwe berdewam kir û got:

Zumrudê bi dilekî xweş vegeriya qesra xwe û di dilê xwe de got: “Heger Xwedê bêje erê, bi vî şêweyî ez ê bi ser xwediyê xwe Elî Şar vebim, angî bi kêmanî agahiyekê der barê wî de bigirim.”

Meha dîtirkê, mîna her car, dîsa sifreya xwarinê hat raxistin û Zumrudê jî mîna her car li ser kursiya xwe rûnişt û ferman da xelkê ku li ser sifreyê rûnên û xwarina xwe bixwin.

Xelkê ku hatibû qefil bi qefil li ser sifreyê rûnişt, wê jî yeko yeko ew di ber çavan ra derbas dikirin, li wan dinêrî. Di wê navberê de çavê wê li birayê Bersûmê fileh ket, ew ê ku şalê hevrişimî ji Elî Şar kirribû. Di cî de ew nas kir û gazî çend leşkeran kir, ji wan re got: “Herin ew ê ku birinca şîrîn li ber wî ye bînin vir û nehêlin ku gepekê tenê ji bixwe.”

Di cî de çar leşkeran êrişî ser wî kirin, bi çaplên wî girtin, gepa di destê wî de jê girtin û ew li dû xwe kişkişandin, anîn li ber Zumrudê sekinandin. Di wê navberê de, xelkê dev ji xwarinê berda û ji hev re gotin: “Çima nehişt

ku ew jî mîna me bixwe? Bi navê Xwedê ev siltanê hanê zalimek e!”

Yekî jî ji wan got: “Ew keşka li ber min, besî min e, ez tişteki din nema dixwim.” Haşhaşî jî got: “Şikir ji wî Xwedayî re ku nehişt ez ji wê sênîka birinca şîrîn bixwim, nexwe wê beleya hanê bi serê min de jî bihata. Lewre min jî xwe li bendê ragirtibû, ku fersend çêbibe û ez jî wê birincê pê re bixwim.” Hinek kesên din jî ji hev re gotin: “Sebir bikin û xwe ragirin, em bibînin bê wê çi bi serê wî bê!”

Îcar gava ew birin ber destê Zumrudê, bi fermanaxavîneke siltanî jê pirsî û got: “Çavşîno, navê te çi ye û çima tu hatiya welatê me?” Birayê Bersûmê hîlebaz navê xwe veşart û got: “Navê min Elî ye, siltanê min! Ez rêsvan im û bi armanca ticaretê ez hatime bajarê we.”

Melke yê birayê Bersûm, hem navê xwe guhertibû û hem jî şaşikeke spî dabû serê xwe da ku mîna misilmanan xwiya bike. Lê Zumrudê ew nas dikir, bi ser de çû û ji xizmetkarên xwe re got: “Kanî wî textikê falê û pêûsa ji baxirê bînin vir, da ku rastiya vî derewkarî derxînim holê!” Xizmetkaran di cî de pêûsa paxirî û textikê falê anîn, li ber wê danîn. Zumrudê rahişt pêûsê û nîgara meymûnekê xêz kir li ser textik. Piştî serê xwe ji ser nîgarê rakir û bi qasî katjimêrekê li Melke nihêrî. Piştî jê re got: “Sehê derewîn, tu çima viran dikî li siltanan? Di fala te de baş xwiya dike, ku navê te Melke ye, tu birayê Bersûm e û tu fileh î; tu hatiya li tişteki digerrî. De êdî rastiya xwe ji min re bibêje, nexwe ez ê şûrekî li stûyê te bixim, serê te bifirînim.” Zilamê fileh şaş û metal bû li himber vê rewşê û laşê wî tev de ricifî ji tirsan. Kesên derdorê jî behetî man û ji hev re gotin: “Subhan ji Xwedê re, ku zanîna pêş-bîniyan daye vî siltanî!”

Zumrud dîsa bi ser de qîriya û got: “Qey tu kerrî, zû rastiya xwe bibêje, berî ku ez te bikujim!” Zilamê fileh got: “Min bibexşîne siltanê gewre, pêş-bîniya te rast e, ez mirovekî fileh im.”

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî vegotina çîroka xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 323'YEMÎN

Şehrezadê berdewam kir:

Gava ku Bersûm got, ez fileh im û lêborîna xwe ji qral xwest, hemû mîr û beg û wezîr û kesên li wir ecêbmaya man, ji ber wê zanebûna Zumrudê û di nav xwe de gotin: “Ev siltanê me bi sererd û binerdê dizane û kesê mîna wî li vê dinyayê tune ne!”

Zumruda şahbanû ferman da celadên xwe, ku ew ê fileh bikujin, bigurrên, bi kayê biheşînin û wî li ber deriyê bajêr daliqînin. Goşt û hestiyên

wî jî bibin derveyî bajêr, di koncalekê de bişewitînin û gemarê bavêjin ser!

Celadan gotin: “Ser seran û ser çavan û rabûn çûn, di cî de, fermana qralê xwe pêk anîn. Gava ku xelkê dît bê çî bi serê wî zilamê fileh de hat, di nav xwe de gotin: Gepeke xwarinê li serê wî bû bela û cezayê ku heq kiribû girt.” Yekî got: “Sond û peyman be ji îro û bi şûn de devê min nema bi wê birinca şîrîn dibe!” Ê Haşhaşî jî got: “Şikir ji Xwedê re ku ez ji wê birincê parastim!”

Piştî, her kes rabû çû bêtî ku ji wê birinca şîrîn bixwe. Sê mehên din bi şûn de, dîsa sifre raxistin mîna her car û sêniyên xwarinê li ser rêz kirin. Zumruda şahbanû jî li ser kursiya xwe rûnişt û leşker û pasevanên wê jî mîna her car, li dora wê rêz bûn di nav rêzdariyê de; ji ber giraniya wê. xelkê bajêr jî mîna her car derbasî meydana bû û li dora sifreyê rûnişt. Lê di he-man demê de çavên gişan bêhemd diçû ser cihê ku ew sêniya birinca şîrîn li ser bû, yekî ji Xalid re got: “Baldar be û qet nêzikî wê sênîka birincê nebe ha! Bi navê Xwedê ku tu jê bixwî, tu dê werî daliqandin!”

Piştî ku hemû li ser sifreya xwarinê rûniştin, dest pê kirin xwarin. Zumruda şahbanû jî li cihê xwe rûniştî bû, çavdêrî dikir û xelk dişopand mîna her car wê kêlikê, mirovekî ku di deriyê bajêr re derbas bûbû û bi baz-dan ber bi wan ve dihat, bala wê kişand. Lê nihêrî û ew nas kir ku ew mirov Ciwanê Kurd e, yê ku leşker kuştibû.

Ciwanê ku wê çaxê diya xwe û Zumrud di şikeftê de hiştibû û çûbû cem hevalên xwe, ji wan re gotibû: “Min leşkerek kuşt û ez çûm bajêr, min xurcikeke tijî zêr dît û keçeke pir spehî jî bi dest xist, ku ji xurcikek zêran jî bi qîmettir e. Min hemû birin şikeftê, ew danîn cem diya xwe û ez li we vegeriyam.” Hevalên wî jî pir kêfxweş bûbûn bi wê yekê û ber bi êvarê ve, hemû tevde rabûbûn, ketibûn pey Ciwanê Kurd û berê xwe dabûn şikeftê. Lê gava gihabûn wir û dîtibûn ku şikeft vala ye, Ciwan ji diya xwe pirsîbû bê ka çî qewimiye, wê jî mijar ji serî hetanî binî jê re vegotibû. Ciwan jî tiliyên xwe gez kiribûn ji qehran û gotibû: “Bi navê Xwedê ew qehpik ketibe bin erdê jî ez ê herim wê binim û kela dilê xwe lê hênik bikim!

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 324'EMÎN

Şehrezadê berdewam kir:

Vêca gava Ciwan dîtibû ku Zumrud reviyaye û xurcika zêran jî bi xwe re biriye, bi pey wê ketibû û bajar bi bajar lê geriyabû, hetanî ku gihabû wir û ji jinên li ser şaneşinan fêr bûbû, ku qralê wan her meh ziyafetkê li dar dixwe û her kesî vedixwîne ser sifreya xwe. Wê gavê cihê meydana ku xwarin

lê dihat dayîn ji wan jinan pirsîbû û di cî de berê xwe dabû meydanê, hatibû li ser sifreya xwarinê rûniştibû. Ji ber ku cihê vala nemabû ji xeynî ew cihê ku birinca şîrîn le bû, ew jî çûbû li wir rûniştibû.

Ji ber ku pir birçî bû, çawa ku li ser sifreyê rûnişt, destê xwe dirêji birincê kir ji bo ku bixwe. Lê kesên li kêleka wî di cî de ew hişyar kirin û jê re gotin: “Heger tu ji wê sênîkê bixwî, tu dê werî darvekirin!” Ciwan hêrs bû û ji wan re got: “Devê xwe bigirin û min hêrs nekin!”

Ciwan, sênîka birincê ber bi xwe ve kişand. Haşhaşiyê ku li kêleka wî rûniştibû ji tîrsa dilê xwe ji cihê xwe çeng bû pengizî, dûrî wî çû û got: “Tu tîkiliya min bi wê sênîkê re tune ye birano!” Lê Ciwan guh neda wî jî. Destê xwe dirêj kir sênîkê, birinc di nava tiliyên xwe de li hev gerand hetanî ku ew kir gilokeke mezin a mîna simê hespekî, piştî avêt zelûma xwe, bi deng ew daqurtand. Qurequra ku wê gavê bi qirikê ketibû, mîna şerqîniya ewran bû. Şûna wê giloka birincê bûbû mîna koncalekê di nava birinca sêniye de. Kesekî ku li kêleka wî ya din bû, lê ecêbmayî ma û got: “Şikir ji Xwedê re ku wî ez nekirime xwarin û ez nedame ber wan destên te!”

Haşhaşî ji aliyê din gazî kir û ji xelkê re got: “Têkilî wî nebin, bila bixwe, lew re li ber çavên min e bê wê çawa were daliqandin bi benê sêdarê ve!” Dûre li wî jî zîvirî û axaftina xwe berdewam kir, jê re got: “Xwedê vê xwarinê li te neke noşican!”

Ciwan, careke din destê xwe dirêji sêniyê kir û birinc di nava destê xwe de li hev gerand da ku dîsa gepeke pir mezin çêbike. Lê hîna ku ew gepa hanê navêtibû devê xwe, şahbanûyê lê kir gazî û ji çend pasevanên xwe re got: “Zû wî zilamî bînin vir, berî ku wê gepa xwe bixwe!” Leşkeran di cî de cerdî ser wî kirin, ew derdest kirin û anîn cem şahbanûya xwe Zumrudê. Xelkê jî sixêf û dijûn jê re dan û ji hev re gotin: “Di heqê wî de ye, me gişan şîret lê kir, lê guh neda kesî ji me. Diyar e ku civana kesê ku dê were kuştin, li ser wê sênîka birincê ye û her kesê ku lanetî be, dê ji wê birincê bixwe!”

Zumrudxanê ji Ciwan re got: “Navê te çi ye, tu çi karî dikî û bi çi mebestê hatiya vî bajari?” Ciwan got: “Siltanê min ê gewre û bexşekar, navê min Osman e û ez nobedarê bîstanekî me. Sedema hatina min î vî bajari ji ew e ku, ez hatime li tişteki xwe yê wenda digirim.” Şahbanûyê jê re got: “Ez ê remlê bavêjim, li bextê te binêrim, wê fala te rastiye derxe holê!”

Piştî ji xizmetkarên xwe xwest ku textik û pênuşa wê ya paxirî jê re binin. Xizmetkaran pênuş û textik anîn. Zumrudê rahişt pênuşê, nîgarek li ser textik xêz kir û bi qasî saetekê lê meyizand. Piştî serê xwe rakir û jê re got: “Dilgema bêwijdan, çawa tu derewan li siltanan dikî! Va ye remla min ji min re dibêje ku navê te Ciwanê Kurd e û tu diz î, tu xelkê dikujî û malên wan talan dikî!”

Li Şehrezadê bû sibe, wê ji gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 325'EMÎN

Şehrezadê berdewam kir:

Îcar gava Zumruda şahbanû bi ser de rabû û jê re got; beraz kurê be-
raza, rast bibêje, nexwe ez ê serê te bifirînim! Rûyê Ciwan zer bû, xwîn jê
kişiya û diranên wî li hev ketin, şerqêşerq bi diranan ket ji tirsan û bawer
kir ku heger rast biaxive dê bête bexşandin. Rabû ji Zumrudê re got: “Tu
rast dibêji qralê min ê gewre û niha ez dixwazim li ser destê te tobe bikim,
vegerim ser rêya rast û dev ji diziyê berdim.” Zumrudê jê re got: “Ne gengaz
e ku ez pij û keleman di rêya misilmanan de bihêlim!”

Li çend xizmetkarên xwe zivirî û ji wan re got: “Wî bibin, mîna ew ê
ku meha borî we ew daliqandibû ceza bikin. Çermê wî ji ser ve bînin, wî
bigurên, laşê wî derxînin û li şûna wî bi kayê dagirin û wî bi deriyê bajêr
ve daliqînin, goşt û hestiyên wî jî derxînin derveyî bajêr û di kortalekê de
bişewitînin, piştê jî ser tijî gemar û zibil bikin û dev jê berdin.” Xizmetkar
rabûn ser xwe, ew birin, ku fermana siltanê xwe pêk bînin.

Dema ku Haşhaşî dît bê çawa leşkeran Ciwan girtin û ew dan pey xwe
birin, pir tirsîya, piştê xwe da wê sênîka birincê û got: “Guneh e ku çavên
min li wî rûye te yê gunehkar bikeve!” Di pey re jî ew jî mîna her kesî ji ser
sifreyê rabû û vegeriya malê. Zumruda şahbanû jî vegeriya qesra xwe û izna
her kesî da ku vegere mala xwe.

Di serê meha çaran de dîsa mîna her carê, xelkê bajêr berê xwe da
meydana xwarinê. Piştî ku sênî rêz bûn, her kes li ser xwarinê rûnişt û man
li benda iznê, ji bo ku dest bi xwarinê bikin.

Di wê navberê de şahbanûya ku mîna her car di nav kincên siltan de
bû hat meydanê, li ser kursiya xwe rûnişt û mîna her car çavên xwe li ser
mêvanan gerand. Bala xwe dayê ku cihê birinc lê bû vala ye, hem jî bi firehi-
ya cihê çar zilam lê rûniştina. Behetî ma li wê rewşê. Hîna ku li ser sedema
wê yekê difikirî û çavên xwe li derdorê digeland, dît yek di deriyê meydanê
re derbasî hundir bû û bi bazdan hat, hat, hat hetanî ku giha cem wê sênîka
birincê û li ber rûnişt.

Gava Zumrudê bi hûrgilî li wî zilamî nêrî, ew nas kir, dît ku ew ê fileh
e, yê ku navê xwe kiribû Reşîdedîn. Di dilê xwe de got: “Çi xwarineke bi xêr
û bêr e ku ew kafirê han xistiye xefikê!”

Îcar tu nabêji gava ku Reşîdedîn ji seferê vegeriyabû, carîye û navma-
liyên wî ew agahdar kiribûn ji rewşa Zumrudê û reva wê ji malê tev li xur-

çika zêran. Wî jî bi kulman li serçavê xwe dabû, kincên xwe dirrandibûn, qetqetî kiribûn, riha xwe hilkiribû ji êşan û birayê xwe Melke li pey şandibû, da ku here li hemû welatan bigere hetanî ku wê bibîne, bîne. Îcar gava dîtibû ku birayê wî dereng ketiye, ew rabûbû ketibû rê ji bo ku hem li birayê xwe û hem li Zumrudê bigere. Lê qedera wî ew anîbû ber nigê Zumruda ku bûbû siltanek.

Vêca çawa ku Reşîdedîn li ber sênîka birincê rûnişt û destê xwe dirêjî xwarinê kir ji bo bixwe, şahbanû bi ser leşkerên xwe de qîriya û got: “Ka ew ê ku li ser sênîka birincê rûniştiye bigirin, bînin vir!” Leşker pê ve çûn, di cî de ew girtin û ew anîn raserî Zumruda şahbanû. Zumrudê jê re got: “Navê te çi ye, karê te çi ye û tu hatiya vî bajarî çi?” Wî jî lê vegerand û got: “Ey siltanê dem û dewranan! Navê min Rustem e, tu kar û pişeya min nîn e. Ez dewrêsekî belengaz im, ji xwe re digirim.”

Zumrud li xizmetkarên xwe zivirî û ji wan re got: “Kanî textik û pênu-sa remlê bînin, ez fala vî zilamî vekim û li bextê wî binêrim, bê ka gelo rast dibêje yan na!”

Xizmetkaran teştika remlê û pênu-sa paxirî jê re anîn, mîna her car û danîn ber wê.

Li Şehrezadê bû sibe wê jî vegotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 326'EMÎN

Şehrezadê berdewam kir:

Şahbanûyê rahişt pênu-sê, nîgarek li ser textikê remlê xêz kir û bi qasî saetekê lê meyzand, piştî serê xwe rakir û jê re got: “Seh kurê sehan, çawa tu derewan li siltanan dikî? A rast ew e ku navê te Reşîdedîn e, tu fileh î, kar û pişeya te jî ew e ku tu hîleyan li cariyeyên misilmanan dikî û tu dest datîni ser wan. Tu mirovekî bi dev misilman î lê bi dilê xwe fileh î. De êdî rastiye bibêje, nexwe ez ê serê te jê bikim!”

Zimanê wî li hev geriya, kemekum pê ket, bi zorê axivî, got: “Tu rast dibêji ey siltanê dem û dewranan.” Bi vî mikurhatina wî re Zumrudê ferman da celadên xwe û ji wan re got: “Bela paqên xwe dirêj bike, hûn jî li her nîgekî wî sed qamçî lê bidin û hezar qamçî jî li laşê wî bidin. Piştî wî bigurînin, çermê wî tijî pûş bikin û bi deriyê bajêr ve daliqînin. Goşt û hestiyên wî jî, derxînin derveyî bajêr, di kortalekê de bişewitînin û gemarê bavêjin ser.”

Celadan ew birin û fermana siltanê xwe pêk anîn, xelkê bajêr jî xwarina xwe xwar û rabûn çûn mal û karên xwe. Zumruda şahbanû jî vegeriya

qesra xwe û got. Şikir ji Xwedê re ku heqê min ji zaliman re nehişt û kela dilê min hênik kir. Piştîre bi helbestî got:

Desthilatdar bûn destdirêjî kirin
Piştîre gêr bûn, hemû bi bin ketin
Lê zilma wan du qat vegeriya li wan
Û ew rewş bi xwe bû ziman ji bo wan
Got: We çi kir bi xelkê ew hat serê we
Êdî loman nekin ne ji felekê ne ji me

Piştîre, xwedî û evîndarê wê hat bîra wê, hestiyar bû, giriya û hêsir barandin weke baranê. Demekê bi şûn de jî dîsa bi ser xwe ve hat û di dilê xwe de, ji xwe re got: “Belkî ew Xwedayê ku tola min ji dijminên min hilanî, min û Elî Şar bigihîne hev, bi awayekî ji awayan! Ez hêvîdar im ku wisa bibe.”

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî vegotina xwe birrî û bedeng bû.

ŞEVA 327'EMÎN

Şehrezadê berdewam kir:

Çawa ku şeva borî jî me got, Zumruda şahbanû bêhna xwe berda, kersera xwe veda, îstixfara xwe anî û got: “Bêguman dê ew Xwedayê diloan, di demeke nêzik de min û mêrê min Elî Şar bigihîne hevdu. Lewre çi dixwaze, çawa dixwaze wisa dike û ew ê gewre û letîf û mehrebanê ku dilê wî bi bendeyên wî dişewite û li wan tê rehmê.

Şahbanûyê qedera xwe spart Xwedayê xwe, baş bawer kir, ku her despêkek dawiyek jê re heye û her tengahiyek jî firehiyek li pey wê ye. Piştîre bi helbestî got:

Pir bêhnfireh be li hemberî kerban
Gelek bi sebir be li himberî derdan
Lewre şev avis in bi çarenûsan
Li ber zayînê ne ew her deman

Qasek bi şûn de, helbesteke din xwend û got:

Roj û şevan berde wan bigindirînê
Kul û xem her ew bê dûmahî ne
Lew ku çerxa felekê her dizivirîne
Kêliyên xelasiyê her tu wan dibîne

Piştîre, bi qasî mehekê wisa berdewam kir: Bi rojê xelk bi rê ve dibir, ferman didan û erkên desthilatdariya xwe baş pêk dianîn û bi şev jî her xemgîn bû li ser mêrê xwe Elî Şar, digiriya, li xwe dida û hewl dida ku êşa dilê xwe rawestîne.

Di serê meha nû de, mîna her carê dîsa sifreya ziyafetê li meydana xaxistin, xelk hemû li ser sifreyê rûnişt û man li benda siltan ku izna xwarinê bide wan û ew jî dest pê bikin. Zumruda şahbanû jî bi xwe re dihizirî û ji xwe re digot: “Ey Xwedayê ku Yûsif li Yaqûp vegerand û kerb û bela ji ser dilê Eyûp rakirin! Xêrekê bi min jî bike û xwediyê min Elî Şar li min vegerîne! Tu bi heqê navê mezinahiya xwe kî wî li min vegerîne ey Xwedayê şev û rojê, ey rastrênîşankarê bexşanker û hêzdar! Ey bersivkarê duakaran, bersiva min jî bide û min mehrûm neke ji rehma xwe!”

Hîna ku Zumrudê ew duaya xwe kuta nekiribû, xortekî bi bejn û baleke balkêş derbasî meydana bû ku mîna dareke xurmeyan dihejiya û zerbûnek xwiya dikir li ser rûçkê wî. Lê dîsa jî pir spehi û lihevhatî bû, bi qasî ku bala her kesî bikişîne ser xwe. Çavên xwe li meydana gerand, tu cih vala nedît ji xeynî ew cihê sêniya birincê lê bû. Ew jî çû li wir rûnişt.

Çawa ku çavên Zumrudê lê ketin, dilê wê lê da. Baş lê meyzand, dît ku ew xort, xwediyê wê Elî Şar e, ji kêfan, hindik mabû ku biqîre û xwe bavêje ser wî. Lê xwe girt û deng nekir ji bo ku di nava xelkê de nehetike.

Elî Şarê ku li ber şibakeya Zumrudê di xew re çûbû û li şûna wî Ciwanê Kurd Zumrud girtibû, biribû. Dema ku bi ser xwe ve hatibû û ji xew rabûbû, dîtibû ku servekirî maye û hinekan kolosê wî biriye. Wê gavê tê derxistibû ku hinekan tiştêk pê kiriye, gava di xew de bûye. Bê çarê keserek vedabû wê kêlikê û ji xwe re gotibû: “La hewle wela quwete îllabîllah.” û bi şûn de ve-geriyabû cem pîrejina ku cihê Zumrudê jê re gotibû û nîşanî wî dabû. Xwe avêtibû nav lepên wê û bi ser de giriyabû hetanî ku ji ser xwe çûbû. Piştî gava dîsa ji nû ve bi ser xwe ve hatibû, hemû tiştên ku bi serê wî de hatibûn, yek bi yek jê re gotibûn. Wê jî ew rexne kiribû û pê re xeyidibû ji ber wê helwesta wî û jê re gotibû: “Çi tiştên ku bi serê te de hatine, ji destê te bûne.”

Gava ku li Şehrezadê bû sibe, gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 328'EMÎN

Şehrezadê vegotina çîroka xwe berdewam kir:

Çawa ku me got, pîrejinê sûc hemû xistibû stûyê Elî û pêde xeyidibû, lome lê kiribûn, hetanî ku xwînê di pozê wî re avêtibû û careke din ji ser xwe çûbû, li erdê dirêj bûbû, piştî dîsa bi ser xwe ve hatibû û dîtibû ku pîrejin li ser wî û li ser wê rewşa wî digirî, hêşiran dibarîne. Xemgîn û dilbikûl bû û bi bi keder got:

Çiqasî tehl e firaqa dildaran
Çiqasî şîrîn e hevghiştina wan
Xwedêyo me gişan her bigihîne hev

Kesî ji bîr neke wan bide ber hev

Wê gavê pîrejinê jê re gotibû: “Tu li vir bî, ez ê herim binêrim bê çi qewimiye û agahiyên nû bigirim û bêm.”

Pîrê sibehê zû derketibû, çûbû nawa bajêr û nîvrokî lê vegeyabû, jê re gotibû: “Elî Şar, mixabin hêvî bi min re nema, ku êdî tu bikaribî dildara xwe bibînî! Lewre xwediyê malê sibehê ji xew rabûne û dîtine ku şibaka mala wan hatiye vekirin û Zumrud û xurcika zêran jî hatine revandin!”

Çawa ku Elî Şar ew gotin bihîstibûn, roniya çaven wî çûbû mehd lê nemabû, rûyê wî tarî bûbû, daxwaza jiyanê pê re nemabû. Dest bi girî kiribû û nesekinibû hetanî ku ji ser hişê xwe çûbû. Piştî ku bi ser hişê xwe ve hatibû û rabûbû ser xwe jî, êşa dilê wî zêdetir bûbû, kêmtir nebûbû. Nexweş ketibû, hejar bûbû û nema qet ji malê derketibû. Lê belê pîrê dev jê bernedabû, textor û hekîm anîbûn ser û salekê sax derman dabûyê hetanî ku careke din bi ser xwe ve hatibû û tenduristiya wî ya berê lê vegeyabû. Lê ew felaketa ku bi serê wî de hatibû qet ji bîrê nediçû û hey wî helbest ji xwe re dixwendin û digot:

Xwedê digihîne hev û em vediqetin
Hêsir dibarin û dil jî her bi şewat in
Ger bêbiryar bî tu kûrtir dike êşê ev evîn
Barê mirov jî girantir dike ew şewq û rîvîn
Xwedayo heger hebe hîna bo min temen
Rêyekê bide ber min veke bextê min hemen

Gava ku pîrê ev gotinên wî bihîstibûn, xemgin bûbû û jê re gotibû: “Kurê min, bi vî hawayî tu nikarî dildara xwe vegerînî bi vê êş û xembariyê. Rabe ser xwe û here lê bigerê li hemû war û bajaran, belkî tu li şopeke wê, li agahekê rast bêtî.”

Bi wî hawayî pîrê nav tê da û palpiştiya wî kir, hetanî ku hêza xwe komî ser hev kir, wêrekî hatê û rabû ser xwe, ket ser rêyan ji bo ku li şopa dildara xwe rast bêt.

Elî Şar, ger û rêwîtiya xwe bi wî hawayî berdewam kiribû hetanî ku gihabû bajarê Zumrudê û derbasî nav bajêr bûbû, çûbû li ser wê sifreya xwarinê rûniştibû.

Vêca gava li ser sifreyê rûnişt û destê xwe dirêjî xwarinê kir, dilê kesên derdora wî pê şewitî û jê re gotin: “Xorto, ji wê sênîkê nexwe! Kesê ku ji wê sênîkê dixwe bela bi serê wî de tîn!” Elî Şar got: “Dev ji min berdin, çi tê serê min, bila were serê min, jixwe ez jî dixwazim ji vê jiyana êşbar rizgar bibim!”

Pê re jî dest bi xwarina xwe kir. Zumrudê xwest ku gazî wî bike û wî

bîne ber destên xwe lê hat bîra wê ku Elî pir birçî ye. Di dilê xwe de ji xwe re got; a rast ew e, ku ez bihêlîm ew têr bixwe. Piştî Elî Şar xwarina xwe berdewam kir. Mirovên derdora wî jî bi tirs lê dinêrin û li bendê bûn, bê wê çî biqewime.

Gava ku Elî têr xwar, Zumrudê ji hinek xizmetkaran re got: “Herin wî xortê ku birincê dixwe binîn vir, lê bêrêziyê pê re nekin! Jê re bibêjin, siltanê me dixwaze çend pirsan ji te bike û bi xweşkahi wî binîn vir.” Wan jî got: “Ser seran ser çavan siltanê gewre!” Û rabûn ser xwe, çûn cem Elî Şar û jê re gotin: “Ezbenî ji kerema xwe ka rabe ser xwe, were bi siltanê me re biaxive!” Elî Şar got: “Bila be, ser seran ser çavan.” Rabû ser xwe û da dû wan, çû cem siltan!

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 329'EMÎN

Şehrezadê vegotina çîroka xwe berdewam kir:

Îcar gava Elî Şar da dû xizmetkaran û çû cem siltan, xelkê ji hev re got: “La hewle, Xwedê wî bistirîne, gelo wê siltan çî bîne serê vî belengazî?” Hinekan jî got: “Ji qencyê pê ve tiştêkî pê nake. Ji xwe heger xerabî ya wî bixwesta, nedihîşt ku têr bixwe û ji serî ve dê gazî wî bikira.”

Çawa ku Elî Şar hat himberî siltan, bejna xwe li ber wê tewand, silavek dayê û erda bin nigên wê maçî kir. Zumrudê jî bi rêzdarî silava wî ragirt, ew pêşwazî kir û jê re got: “Navê te çî ye, tu çî karî dikî û hatiye vê derê çî?” Elî Şar got: “Siltanê gewre, navê min Elî Şar e û ez kurê tacirekî me, ji welatê Xorasanê. Sebeba hatina min a vê derê jî ew e, ku ez hatime li cariyeyê xwe ya wenda digirim, ku ji herdu çavên min jî ezîztir e li ber dilê min. Lewre ruhê min pê re çûye, ji roja ku min ew wenda kiriye û derdê min nayê vegotin. Piştî xemgîn bû û giriya hetanî ku ji ser hişê xwe çû. Zumrudê ferman da xizmetkarên xwe ku ava gulan li ser rûyê wî bireşînin, wan jî wisa kir, hetanî ku careke din bi ser hişê xwe ve hat. Zumrudê gazî xizmetkaran kir û ji wan xwest ku textikê remlê û pênûsa paxirî jê re binîn. Wan jî çûn anîn. Zumrudê rahişt pênûsê, li ser textik bir û anî piştî bi qasî saetekê lê meyzand û di pey re got: “Tu rast dibêjî xorto, qet mereqan mexwe û nekeve qelaqê, lewre dê Xwedê teala wê daxwaza te pêk bîne, hem jî di demeke kurt de.”

Di pey re ferman da xizmetkaran ji bo ku wî bibin serşokê, bişon û kincin paqij lê bikin, ji kincên mîr û wezîran û wî li hespekê siwar bikin û wî bibin qesra wê. Xizmetkaran gotin: “Ser seran ser çavan siltanê gewre.” û rabûn ser xwe, ew birin serşokê, mirovên ku ew dîmen bi meraqeke mezin

temaşe dikirin jî behetî man û ji hev re gotin: “Çi bi siltanê me hatiye, ku wisa bi rêzdarî û şîrînî nêzikî vî xortî dibe?” Xweşbînê wan ê destpêkê jî dîsa axivî û got: “Ma min ji we re negot tu xerabiyê pê nake? Gava ku bêhna xwe lê fireh kir û hişt ku têr bixwe, min tê derxist, ku tişteki bi wî nake.” Hinekî din jî axivîn û her yekî tişteki din lê zêde kir hetanî ku hemû ji hev belav bûn û her yek çû ser karê xwe.

Zumrud jî bi bêsebrî li benda hatina şevê bû, da ku bikaribe bi delaliyê ber dilê xwe re bikeve xilwetê. Vêca gava roj çû ava û şevê baskên xwe avêtin ser bajêr, Zumrudê derbasî ser textê xwe yê razanê bû, ku mîna her şev, ji du xizmetkaran pê ve kes di odeya xwe de nedihîşt, ew jî ji bo ku xizmetê li ber destê wê bikin. Derdora textê razana wê, bi zêr û zîv û gulikan xemilandi bû, mûmên ku li ber serê wê û di biniya nigên wê de pêketî jî, şewqeke efsûnî li ser nivîna wê belav dikirin. Zumrudê derbasî ser doşeka xwe bû û xizmetkarekî xwe şand dû Elî Şar, gazî wî kir.

Gava xelkê bihîst ku Elî Şar derbasî cem wê bûye, ku her kesî ew weke siltan dinasî, behetî man, bû pitepita wan û ketin nava şik û gumanan. Her yekî li gora xwe çîrokek hûna û vegot. Hinekan jî gotin: “Siltanê me çavên xwe berda vî xortî û pê ve hatiye girêdan, dibe ku sibe dusibe wî bike serleşkerê artêşa xwe!”

Elî Şar jî çawa ku derbasî cem Zumrudê bû, erda bin nigê wê ramûsa û dua jê re kirin. Wê jî di dilê xwe de, ji xwe re got: “Bi qasî saetekê be jî ez rastiya xwe jê veşêrim û hinek laqirdiyan pê re bikim. Zumrud lê zivirî û jê re got: “Elî, gelo tu çûyî hemamê?” Got: “Belê mîrzayê min!” Wê got: “Nexwe were hinekî ji vî goştî bixwe û hinek şerab jî bi ser de vexwe, ji bo ku tu hebekî bi ser xwe ve bêyî, lewre tu birçî û westyayî xwiya dikî. Piştî ku te têr xwar jî, were vir, cem min!” Elî lê vegerand û got: “Bila be xwedanê min.”

Piştî ku Elî têra xwe xwar û vexwar, Zumrudê jê re got: “Were ser nivîna min û hebekî laşê min bifirkîne!” Elî Şar li gora fermana wê tevgeriya, çû cihê wê û ji nigan ve dest pê kir, laşê wê firkand. Lê gava ku destên xwe ber bi jor ve birin û teşkên wê firkandin, dît ku laşê wê ji hevrişimê jî nermtir û şayîtoktir e, behetî ma! Zumrudê got: “Firkandina xwe berdewam bike û destên xwe berjor ve derxîne!” Elî ket ber fediyê û got: “Bibore mîrzayê min, ez nikarim ji kabokê berjortir ve herim.” Zumrudê çawa ku hêrs bûbe, qîriya û got: “Qey tu dixwazî bi ya min nekî û şeva min li min biherimînî?”

Li Şehrezadê bû sibe û wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 330'EMÎN

Şehrezadê berdewam kir:

Çawa ku şeva borî jî me got, Zumrudê pê re xeyidî û ji Elî Şar re got: “Qey tu dixwazî bi ya min nekî û şeva min li min biherimînî? Divê tu bi ya min bikî, lewre ez ê te bikim maşûqê xwe û te bikim mîrek ji mîrên xwe.” Elî Şar got: “Ey siltanê dem û dewranan, di kîjan mijarê de tu ji min dixwazî ku ez bi ya te bikim?” Zumrudê got: “Kincên xwe ji xwe bike û serdev pal de.” Elî Şar behetî lê vegerand û got: “Di temenê xwe giştî de min tişteki wisa nekiriyê. Heger bi zorê tu tişteki wisa bi min bikî jî li wê dinyê mabe ez ê destê xwe bixim qirika te di hizûra Xwedê de û ez ê hesabê wê ji te bipirsim. De êdî hemû tiştên ku we dane min, bi şûn de bigire û iznê bide min bo ku ez ji bajarê te herim!” Pê re jî dest bi girî kir û hêsir barandin.

Zumrudê got: “Cilên xwe ji xwe bike û li ser dev pal bide, nexwe ez ê serê te bifirînim.” Elî mecbûr ma bi ya wê bike, kincên xwe di ser xwe re anîn û serdevkî palda. Zumrudê jî derket ser wî û xwe tê da, Elî bala xwe dayê ku laşekî ji nîvîşk nermtir û ji hevreşim şayîtokîtir li ser wî diçe û tê. Di dilê xwe de ji xwe re got: “Bi navê Xwedê laşê vî siltanî ji yê hemû jinan jî xweştir e.”

Zumrudê bi qasî saetekî li ser piştî wî ma, piştî berjêr ve gindirî, Elî Şar di nava xwe de got: “Şikir ji Xwedê re ku ewkê min ranebû, ne xwe ez ê jî biketama gunehan. Vêca gava Zumrudê ew di wê rewşê de dît, tîqînek pê ket, keniya û jê re got: “Mîrzayê min, piştî evqas xirecira min hîna jî te ez nas nekirime?” Elî Şar got: “Çima qey tu kî yî siltanê min?” Wê jî lê vege-
rand û got: “Ez cariyeya te Zumrud im wîîî!”

Dema ku Elî lê hay bû û bi vê rastiya wê hesiya, mîna şêrekî ku xwe bavêje ser mihekê, xwe bi ser de avêt û ew himbêz kir, ew di nava ramûsan-
anan de fetîsand û bû îmamê mîhraba wê, bû dergevanê bedena wê û ew jî pê re ket rukû û sicûdê hetanî ku dengê himehim û xirecir û selewatên wan giha herdu xizmetkaran û herdu rabûn bi wan ve hatin. Gava di pişt perdeyê re li wan nihêrîn û dîtin ku Elî Şar di ser dilê siltanê wan de ye, ji hev re gotin: “Diyar bû ku ev hîrehîr ne ya zilaman bû û wisa xwiya dike, ku siltanê me jin e, ne zilam e! Lê belê ji kesî re behsa wê yekê nekirin û raza wan di nav xwe de veşartin.”

Gava bû sibeh, Zumrudê qasidên xwe şandin dû hemû leşker û mîr û emîr û wezîr û karmendên dewletê. Gazî wan kir, ew li qesrê kom kirin û ji wan re got: “Ez ê bibim rêwî û berê xwe bidim bajarê vî camêrî, vêca hûn jî wekîlekî ji nava xwe hilbijêrin bo ku li şûna min rûnê hetanî ku ez vegerim.” Wan jî got: “Ser seran û ser çavan siltanê me!”

Dest bi amadekariyên rêwîtiyê kirin û hemû pêdiviyên xwe komî ser hev kirin, ji xwarin û vexwarin û dirav û deve û hespan û di pey re ketin ser rê û ji bajêr derketin.

Rêwîtiya xwe berdewam kirin hetanî ku gihan bajarê Elî Şar. Li wir peya bûn û çûn li mala wî bi cih bûn. Xêr û sedeqe li ser xelkê belav kirin û di nava bextewariyê de bi hev re jiyan û zarokên wan jî çêbûn. Bextewariya wan berdewam kir di nava xweşî û şahiyê de hetanî ku xerabkarê xweşiyê bi ser wan de hat û ew ji hev veqetandin. Êdî subhan ji wî Yezdanê dilovan re ku kes nizane bê ew dixwaze çi bike!

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî dengê xwe birrî.

ŞEVA 331'EMÎN

(ÇÎROKA HARÛNÊ REŞÎD Û ELIYÊ KURÊ MENSÛRÊ TOLAZ)

Şehrezadê îca ji Şehriyarê gewrê re dest bi çîrokeke nû kir:

Tê gotin ku şevêkê ji şevan xew li emîrê bawermendan Harûnê Rêşîd herimî û qelaqekê nava wî dagir kir. Geh li vî alî geh li wî alî, di nava cihan de xwe quluband lê belê xewa wî nehat û mijankên wî neçûn ser hev, raneket. Herî dawiyê çareya derdê xwe di mesrûr de dît û gazî wî kir, jê re got: “Mesrûr, ê ku min ji vê ereq û bêxewiyê rizgar bike tu yî.” Mesrûr got: “Mîrzayê min tu dikarî ji hundir derkevî û di bin tava heyvê de, li nav bîstanê qesrê bigerî û awêneya heyvê di nava avê de temaşê bikî.” Harûnê Reşîd got: “Mesrûr, niha meyleke min î wisa nîn e.” Mesrûr got: “Mîrzayê min, sêsed carîye di qesra te de hene û her yek ji wan di odeyekê de ye û di her odeyekê de xeml û xêzeke cuda û rengîn heye. De êdî yeko yeko li ser wan bigere, wan temaşe bike û bi wan re bikeve xilwetê. Têra xwe bigere li ser gul û çiçekan.” Harûnê Reşîd got: “Mesrûr, qesr qesra min û carîye jî malên min in lê belê dilê min tu tişteki wisa naxwaze.” Mesrûr got: “Mîrzayê min, nexwe fermanê bide mirovên zana û hekîm û hozanan bila werin ber destên te û li gora dilê te biaxivin, helbestan bixwînin, çîrok û agahîyan ji te re bibêjin.” Harûnê Reşîd got: “Ez tişteki wisa naxwazim. Mesrûr got: “Nexwe fermanê bidê qewal û mesqot û tinazkar û henekkarên bila ew werin ber destê te û henekên balkêş ji bo te bibêjin.” Harûnê Reşîd got: “Ez tişteki wisa jî naxwazim.” Mesrûr got: “Mîrzayê min, nexwe şûrekî li stûyê min bide, serê min bifirîne, belkî ew bêhna te fireh bike û qelaqa nava te ji hev belav bike.”

Harûnê Reşîd bi wê gotina wî keniya û jê re got: “Mesrûr hela binerê bê kî li ber derî ye!” Mesrûr çû û hat ji xelîfe re got: “Mîrzayê min Elî, kurê Mensûrê tolaz ê Şamî li ber derî ye.” Xelîfe got: “Here wî binê vir.” Mesrûr çû, ew anî. Çawa ku derbasî cem xelîfe bû, got: “Silava Xwedê li ser emîrê

bawermendan be!” Harûnê Reşîd silava wî girt û jê re got: “Kurê Mensûr, hela hinekî serpehatiyên xwe ji min re vebêje!” Kurê Mensûr got: “Ezbenî tu dixwazî ez tiştekî ku min bihîstibe ji te re bibêjim an tiştekî ku min bi çavên serê xwe dîtibe?” Harûnê Reşîd got: “Tiştekî ku te bi çavên xwe dîtibe bibêje, lewre dîtî û gotî tu carî nabin yek.” Kurê Mensûr got: “Emîrê bawermendan, nexwe kanî dil û guhê xwe bide ser axaftina min!” Xelîfe got: “Kurê Mensûr, dilê min bi te re ye, çavên min li ser te ne û bi guhên xwe jî ez te guhdar dikim.”

Eliyê kurê Mensûr got:

Emîrê Bawermendan, adeteke min heye ku ez salê carekê diçim serdana Mihemed Silêmanê Haşimî, Mîrê Besrayê. Vêca carekê dîsa ez çûm serdana wî, min dît ku amadekariyên xwe dike ji bo ku derkeve seyd û nêçîrê. Min silavek lê kir, silava min vegerand û ji min re got: “Kurê Mensûr, ka tu jî siwar bibe û bi me re were seydê.” Min jê re got, mîrzayê min ez nikarim li hespan siwar bibim, min li odeya (mala) mêvanan bi cih bike û şîreta min li xizmetkar û cîgirên xwe bike, ez ê li vir bim, çêtir e. Wî jî daxwaza min da ber çavan û ez li wir hiştim. Xizmetkarên xwe hişyar kirin ji bo ku li min miqate bin û berê xwe da nêçîr û seydê. Xizmetkaran jî bi comerdî ez pêşwazî kirim û gelekî qedrê min girtin.

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 332'YEMÎN

Şehrezadê berdewam kir:

Îcar çawa ku şeva borî jî min got, kurê Mensûr got:

Vêca gava Mihemedê Silemanê Haşimî çû nêçîrê û ez tenê hiştim, min jî xwe re got, demeke dirêj e ku ez her car jî Bexdayê tîm Besrayê û vedigerim lê hîna jî min bi xweşkahi Besra nedîtiye û ez li nava wê negeriyame. Tenê ez tîm qesrê û diçim nav bax û bîstanê wê. Niha fersendeke baş ketiye destê min, ku ez rabim herim ji xwe re têra xwe li nav Besrayê bigerim û temaşê bikim.

Ez rabûm ser xwe min kincên xwe yên herî xweşik li xwe kirin û min dest bi geriyaneke kir, ez li kêlekên bajêr geriyam. Îcar tu jî dizanî –emîrê bawermendan- ku li Besrayê heftê kolan hene, ku dirêjahiya her yekê jî wan heftê pîvanên iraqî ne. Ji ber wê, min rêya xwe şaş kir di nava wan kolan de û ez pir tî bûm. Vêca Emîrê Bawermendan, di nava wê tîbûnê de, hîna ku ez wisa ji xwe re digeriyam, malekê bala min kişand, ku deriyê wê mezin

bû, du toqên wê yê paxirî hebûn û perdeyin ji dibacê⁵ sor bi serdakirî bû. Li kêlaka wî jî du heb mestebe hebûn û di ser wî re jî dêliyeke tirî hebû, ku siya xwe dida ser wî. Îcar ez jî li wir sekinîm û min ji xwe re lê temaşê kir. Di wê navberê de, min bala xwe dayê ku dengê nalîneke xembar ji hundir tê, ku bi stranî dilorîne û dibêje:

Laşê min bûye mala êş û serme û seqemê
Ji ber xezaleke dûrreviyayî ji war û welat û malê
Ax! Ji vê poşmaniya ku agir berdaye canê min
Hûn bi Xwedê kin di çûnê de rêya xwe pêxin
Gazinc û lomeyan lê bikin belkî bi ser xwe ve bê
Şîrîn bikin zimanê xwe belkî guh bide êşê
Agahekê bînin ji dildaran bi xêra dê û bavê
Nedin ber dilê xwe xêrekê bi min bikin xêrekê
Hûn ji baş dizanin êşa fîraqa ji mehbûb û yarê

Wê çaxê, di dilê xwe de min ji xwe re got, çi gotin û newayeke xweş!
Çawa ew hemû xweşî bûye yek bi vî dengê xweş re! Bêguman dê xwediyê
vî dengî kesekî baş be! Ez hêdika ber bi derî ve çûm û min perdeya ber
wî piçekî da alî. Min dît ku keçeke spî mîna heyveke li çardeyan spehî û
mêrkuj, bi du birhûyên zirav, mijankên westiyayî û du pêşîrên girover mîna
du hinaran. Her du lêvên wê jî tenik bûn mîna du pelên nefelan û devekî
mîna hunglîska Suleyman li ser bû, ku bi aqilê dîdarê xwe dilîst, çawa ku
hozanekî jî gotiye:

Her kesî dîkuj ew bi hatina xwe re
Di çûnê de jî her kesî dike dildarê xwe
Hem tav e hem heyv e ew bi şewqa xwe
Lê derî digire her hişk e ew bi exlaqê xwe

Hîna ku min wisa ji xwe re lê dinêrî, min dît ku berê xwe da hêla min
û ez dîtîm. Ji xizmetkareke xwe re got: “Binêre bê kî li ber derî ye!” Cariyeya
wê hat, ez dîtîm û ji min re got: “Extiyaro, qey tu ji ber xwe fedî nakî ku
wisa dikî?” Min jî jê re got: “Xatûna min, wile me extiyarî dîtiye lê ez bawer
nakim ku min tiştekî şerm kiriye.” Xatûna wê hêrs bû û got: “Qey ne şerm e
ku herî ber deriyekî ku ne deriye te be û tu li jinekê binêrî ku ne jina te be!”

Rabû min jê re got: “Xatûna min, di vê xalê de ji mazereteke min heye.
Got: “Mazereta te çi ye?” Min got: “Ez mirovekî xerib û rêwî me, ez dikim
ji tîna ku bibehecim. Xatûnê got: “Me mazereta te qebûl kir.” Piştî gazi
çend cariyeyên xwe kir û ji wan re got: “Letîfe, kanî hinek av ji wî şerbikê
zêrîn bide vî rêwiyê Xwedê!” Cariyeyê şerbikekî ji zêrê sor anî ku bi dur û
cewheran hatibû neqîşandin û tijî aveke bimisk bû û desmalek hevrişimî li
ser devê wî bû. Min şerbik ji destê wê girt, hedî hedî av vexwar û dirêj kir,

5 . Dîbac: Hevrîşimekî giranbuha

ji bo karibim demeke dirêjtir di bin çavan re lê binêrim. Piştê min şerbik da destê cariyeyê û ez di cihê xwe de sekinî mam. Wê jî got: “Kalo, bi riya xwe de here êdî!” Min lê vegerand: “Xatûna min, hişê min tevlihev bûye”. Wê jî got: “Di kîjan mijarê de?” Min got: “Di çerxa felekê de û mijara herdu bûyeran...”

Li Şhrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 333'YEMÎN

Şhrezadê vegotina çîroka xwe berdewam kir:

Eliyê kurê Mensûr ji Harûn Reşîd re çîroka xwe domand:

Wê gavê xatûnê li min vegerand û got: “Bi rastî jî wisa ye, ji ber ku dewran tiştên ecêb bi serê mirov de tîne. Lê belê te çi tiştên matmayî û ecêb dîtine, ku tu wisa tê de difikiri?” Min jê re got: “Ez di xwediyê vê malê de difikirim ji ber ku ew di seransera temenê xwe de, dostê min bû.” Wê jî got: “Navê wî çi bû?” Min lê vegerand û got: “Navê wî Mihemed Bin Elî Elcewherî bû û gelek mal û milkê wî hebû lê ez nizanîm bê ka zarok li pey xwe hiştin an na?” Wê got: “Belê, belê, keçeke bi navê Bidûr li pey xwe hişt, ku bû warisa hemû mal û milkê wî.” Min jê re got: “Mirov dibêje qey ew keça wî tu bi xwe yî?” Got: “Belê.” û kenîya, piştê jî axaftina xwe berdewam kir û got: “Extiyaro te goftûgo pir dirêj kir, de êdî rabe bi rêya xwe de here!” Min jê re got: “Bêguman ez ê herim lê bi min wisa xwiya dike, ku lewnê guherîye, vêca heger tiştek qewimîbe ji min re bibêje, belkî li ser destê min fereceke xêrê li ber te vebibe.” Rabû got: “Kalocan heger tu razgir bî ez ê razên xwe bi te re parve bikim, vêca ka ji min re bibêje, bê tu kî yî, da di destpêkê de ez bizanibim bê tu kî yî û tu dê bikaribî razên min biparêzî yan na?” Min gotina hozanekî jê deyn kir û got:

Tenê bawermend dikarin veşêrin razan

Kesên bijarte ne ew in razbarên zanan

Piştê min berdewam kir û got: “Xatûna min heger tu dixwazî bizanibî bê ez kî me; ez Elî Bin Mensûrê Dîmeşqî me, destbirakê xelîfe Harûn Reşîdê emîrê bawermendan.” Îcar çawa ku navê min bihîst, ji ser kursiya xwe da- ket xwarê, silavek da min û ji min re got: “Tu bi xêr hatî Elî Bîn Mensûr! Niha, îcar ez ê te agahdar bikim ji raza xwe. Rastiya min ew e, ku ez aşîqeke dûrketî me ji maşûqê xwe.” Min jê re got: “Xatûna min tu jineke pir spehî yî û bêguman dê dildarê te jî pir spehî be, vêca kî ye ew dildarê ku tu aşîqa wî yî?” Got: “Ez dil ketime emîrê êla Benî Şeyban; Cubeyr Bîn Omer Eş-Şeybanî.” Di pey re jî pesn û wesfê wî ji min ra da, ku bi rastî jî xortekî mîna wî di Besrayê de tune bû. Min jê re got: “Xatûna min, gelo danûstendinek devkî an nivîskî di neqeba we de hebû yan na?” Got: “Belê lê wisa diyar dibe

ku eşqa me bi ziman bû, ne ji dil û can bû, loma li ser soza xwe nesekinî û tişteke pêk neanî.” Min jê pirsî û got: “Û çi bû sebeb ku hûn ji hev veqetin, xatûna min?” Sebeb ew bû ku, rojekê ez rûniştî bûm û vê cariyeya min jî porê min şeh dikir. Piştî şehkirinê keziyên min hûnandin û xwest ku bi spehîbûna min şa bibe, xwe bi ser min de tewand û ramûsanek ji hinarikên min girt. Ew jî tam di wê kêlikê de derbasî cem min bû û min dît, ku cariyê min maçî dike. Di cî de ev her çar rist gotin û bi şûn de derket û çû:

Ger ku hebe bi dildara min re şîrîkek
Berdidim ez wê û dijîm ez bi kîsek
Bêxem dijîm ez bi tena serê xwe
Lew re bêtam e eşqa ku bi şîrîk be

Çû û nema vegeriya. Ne nameyek ji min re şand ne jî bersiveke ku dil û hinavên min germ bike.” Min jê re got: “Îcar tu çi ji min dixwazî?” Got: “Ez dixwazim bi te re nameyekê jê re bişînim. Heger te bersivek ji wî anî, ez ê pêncsed dînarî bikim xelat û bidim te. Lê heger bersiv neda min jî ez ê sed dînarî bidim te, bila heqê rêya te be.” Rabû min jê re got: “Bila weke daxwaza te be. Ew jî rabû, gazî cariyeyên xwe kir û ji wan re got: “Kanî lênûsk û pênuşkê ji min re binin! Wan jî çûn jê re pênuş û lênûsk anîn. Wê jî rabû destê xwe avêt lênûskê û dest pê kir, nivîsand:

Dildaro ev çi kul û êş û hicran e
Kanî ew hestên diloan li ku mane
Çima te piştî xwe da min tu çûyî
Gelo yê min ew nas kir ne tu bûyî
Derew kirin gelacan derbarê min da
Te jî bawer kir ji wan û te li dil da
Ger bawer kiribe ji wan te bi rastî
Karesat e ev bo min dê kêr bigihê hestî
Tu bi Xwedê bikî bibêjî te çi bihîst ji wan
Çi gotin ji te re wan tuxmê zikreşan
Ger ku tu rast dibînî wan gotinan
Wê gavê gerek gotinek te jî hebe ey can
Baş bizanibe ku wan zikreşan ez kuştine
Tewrat û Încîl hemû bi xwe re birine
Dîsa jî mezin e Xwedê ji min û wan re
Va ye roja qiyametê tê, tu yê bi ku ve here

Piştî name li hev pêça û da destê min. Min nameya wê bir û ez çûm mala Cubeyr Bîn Omerê Şeybanî. Lê ew derketibû nêçîrê û wê gavê ne li malê bû, ez runiştim û mam li benda wî.

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birri û bêdeng bû.

Şehrezadê vegotina çîroka xwe berdewam kir:

Îcar kurê Mensûr vegotina çîroka xwe berdewam kir û got:

Hîna ez li mala wî rûniştî bûm, min bala xwe dayê ku ji nêçîrê vege-riya, li ser pişta hespa xwe. Îcar Emîre Bawermendan, wisa mirovekî xweşik û lihevhatî bû, ku mirov dil jê tunebû lê binêre. De êdî gava li min zivirî û dît ku ez li wir rûniştî me, li ber deriyê wî, ji hespa xwe peya bû û hat silavek li min da, ez himbêz kirim bi germahî. Wê kêlikê wisa bi min xweş hat, ku mîna min cîhanek sax himbêz kiribe. Dûre ez derbasî mala xwe kirim û li ser doşekê dam rûniştandin. Di pey re jî ferman da xizmetkar û navmaliyan bo ku xwarinê binin. Navmaliyan xwarinên cur bi cur amade kirin û li ser xolecana Xoresanî anîn danîn ber me. Her çar piyên xolecanê ji zêr bûn û li ser wê jî hemû cureyên xweştirin ên xwarinê hebûn; goştê biraştî, ê qelandî, ê kelandî û gelek xwarinên din. Ji min re got: “De ka destê xwe dirêj bike xwarinê û ji bo xatirê min bixwe!” Min got. “Qesem bi navê Xwedê ez gepekê tenê ji xwarina te naxwim hetanî ku tu daxwaza min pêk neynî!” Wî jî got: “Daxwaza te çi ye?” Min nameya Bidûrê ji ber xwe derxist û da destê wî. Çawa ku name xwend û têgihîşt bê çi tê de nivîsandîye, di cî de çirand û avêt erdê. Piştî got: “Ey kurê Mensûr, tu çi ji min bixwazî ez ê jî te re pêk binim lê ji bo xwedîya vê nameyê tu bersiv li ba min tune ye.”

Bi hêrs ez ji cem wî rabûm, da ku ez herim. Lê wî guhkê kirasê min girt û got: “Ey kurê Mansûr raweste, ez ê ji te re bibêjim bê wê jinikê çi ji te re gotiye, li gel ku ez ne li cem wê bûm, ez vê dizanim.” Min got: “Ka bibêje bê wê çi ji min re gotiye?” Got: “Ma xwedîya vê nameyê ji te re negot ku heger tu bersivê ji min re binî ez ê pêncsed dînarî bidim te û heger tu neynî jî ez ê sed dînarî bidime te ji bo heqê rê?” Min got: “Belê.” Got: “Ka tu jî îro li cem min bimîne, bixwe, vexwe û li kêfa xwe binêre hetanî sibehê û piştî jî pêncsed dînarê xwe bigire û here!” Min bi ya wî kir, ez li cem rûniştîm û min xwar, vexwar û li kêfa xwe nêrî hetanî derengî şevê, dûre min jê re got: “Ezbenî qey muzîkjen li gel te tunene, ku em hinekî li wan guhdar bikin?” Wî jî got: “Ev demek e ku em vedixwin bêyî ku em muzîkê guhdar bikin.” Piştî gazî çend cariyeyan kir, ji yekê ji wan re got: “Ey Şeceret-Edur, kanî amûra xwe bîne û awazekê ji me re bixwinê!” Cariye hat û ûdeke Hindistanê di destê wê de. Rûnişt, ûda xwe danî ser çoga xwe û bi bîst û yek meqamî lê da; dûre vege-riya ser meqama serî û bi dengê xweş ev helbest got;

Kesê ku êş û jana evîn û eşqê nedîtibe
Her ew tama wisletê jî qet nizane
Kesê ku ne li ser rêya eşq û evînê be
Zor û hêsanîyê ji hev dernaxîne.

Min jî belaya xwe di vî curekarî dabû
 Êş û xweşiya evînê tûşî min jî bûbû
 Vexwaribû min meya wê bi qurtan
 Geh bûm bende geh azadixwazê ciwan
 Qîriya çend caran dildar di xewê de
 Vexwar çend şûşe ewî di rêya wê de
 Şev li min dirêj bûn lew pir bi jan bûn
 Êşên min pir bûn şev û roj li min bi yek bûn
 Felekê em veqetandin qedera me yek bû
 Lê va niha jî fermaneke nû daye verder bû
 Tu kes nikare li ber derkeve ev her wer bû

Li Şehrezadê bû sibih, wê ji gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 335'EMÎN

Şehrezadê vegotina çîroka xwe ji Şehreyar re berdewam kir:

Kurê Mensûr vegotina çîroka xwe dom dikir ji xelîfe re:

Gava ku cariyeyê ew helbesta xwe qedand, qîreke ecêb bi mîrzayê wê ket û li erdê veziliya, ji ser hişê xwe çû, cariyeyê got: “Kalo, extiyaro, Xwedê ji te neraziyo, te dît bê tu bûyî sebeba çi, ne wisa? Ev demek bû ku me li muzîkê nedida, ji bo ku mîrzayê me ji ser hişê xwe neçe û serêşa wî lê vene-gere lê tu bûyî sebeba vî tiştî. De êdî here wê odeya kêlekê û li wir rakeve.” Rabû ez jî çûm wê odeya ku nişanî min da û ez li wir raketim. Sibehê sî-peyek hat, tûrikekî ku pêncsed dînar tê de bû da destê min û got: “Ev soza mîrzayê min bû ji bo te, de êdî here mala xwe û qet neçe cem xwediya wê nameyê, weke ku te tiştekî wisa nebihîstibe.” Min got: “Bila be, ser seran ser çavan.”

Min rahişt dînarên xwe û ez bi rêya xwe de çûm; min di dilê xwe de got: “Niha ew xatûn li hêviya vegera min e, bêguman divê ez rêya xwe pê bixim û tiştê ku di neqeba min û vi camêrî de qewimiye, ji wê re bînim ziman. Heke na, misoger dê gelek sixêfan ji min re bide. Heta dibe ku hemû sûlaleya min û cih û warê min ji bixe nava sixêfên xwe.” Ez çûm mala wê, min dît ku li hêviya min e. Çawa ku ez dîtîm, got: “Ey kurê Mensûr, te daxwaza min pêk neaniye!” Min got: “Mixabin wisa ye.” Wê got: “Ey kurê Mensûr, wisa ez dizanim ku gava te nameya min da destê wî, wî jî di cî de name çirand, avêt erdê û ji te re got: ‘Ey kurê Mensûr, çi daxwazên te hebin ez ê pêk binim, ji xeynî daxwaza xwediya vê nameyê, lewre tu bersiv ji bo wê nîn in li ba min.’ Tu bi hêrs ji cem wî rabûyî, da ku tu derkevî. Lê wî bi guhekê kirasê te girt û ji te re got: ‘Ey kurê Mensûr, ka were rûnê, tu mêvanê min î. Ji xwe re bixwe, vexwe, muzîkê guhdar bike, li kêfa xwe binêre hetanî

sibehê û piştre vî pêncsed dinarî jî bigire û here mala xwe.’ Te jî bi ya wî kir û tu li gel wî rûniştî, te xwar, vexwar kêf û şahiya xwe kir. Cariyeya wî jî stran ji we re gotin li ser bîst û yek meqaman û di wê navberê de ew ji ser hişê xwe çû li erdê veziliya, dirêj bû.” Wê gavê min ji xatûnê re got: “Qey tu jî bi me re bûyî ku tu van gişan dizanî?” Wê bersiva min da û got: “Qey te nebihîstîye ku hozanekî gotiye:

Dilê aşiqan her bi çav in
Tiştên nedîtî jî her dibînin”

Lê belê tu jî dizanî ku bi demê re her tişt têtê guhertin.” Piştre berê xwe da asîmanan û berdewam kir got: “Xwedêyo tu pir mezin î! Te çawa serê min xist belayê bi eşqa Cubeyr Bîn Omer re, tu serê wî jî bixî belaya eşqa min!” Piştre sed dinarê heqê rêya min da destê min û got: “Here oxira te ya xêrê be.” Min dinarên xwe girtin û ez çûm cem mîrê Besrayê, min dît ku ji nêçîrê vegeyriyaye malê. Min emanetên xwe ji destê wî girtin û ez dîsa vegeyriyam Bexdayê.

Sala dîtirkê, gava ku mîna her car ez dîsa çûm Besrayê û min emanetê xwe ji mîrê Besrayê girt, Bidûr Xatûn hat bîra min û min di dilê xwe de got: “Bi navê Xwedê ez venagerim Bexdayê hetanî ku ez neçim cem wê û fêr nebin bê çi qewimiye di neqeba wê û dildarê wê Cubeyr de.” Ez çûm ber deriyê mala wê, min dît ku her der tijî xizmetkar, navmalî, cariyê û zarok in, hemû di xizmeta mêvanan de ne. Min di dilê xwe de ji xwe re got: “Dibe ku jinik ji ber kul û derdan nexweş ketibe û çûbe ber dilovaniya xwe. Loma evqas xelk hatine şîna wê.”

Ez bi şûn de vegeyriyam û çûm mala Cubeyr Bîn Omer Eş-Şeybanî, min dît ku bêdengiyeke ecêb di mala wî de heye. Min got qey ew jî çûye ber dilovaniya xwe, loma tu kes li ber deriyê wî nîn e.

Li Şhrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 336’EMÎN

Şhrezadê vegotina çîroka xwe berdewam kir:

Vêca Eliyê kurê Mensûr got, min di dilê xwe de ji xwe re got: “Nexwe ciwamêr çûye ber dilovaniya xwe.” Ez bi hestiyarî li ber deriyê wî sekinîm û bi xemgînî min got:

Ey mîrzayê çûyî te dilên me gişan bi xwe re bir
De ka vegere bo ku cejnên me li me vegerin
Li ber deriyê te rawestiyayî me ka were vir
Her hêşiran dibarînim tim şil in çavên min
Li we dipirsim ji vî dîwarî nade min ew sir

Ka ew comerdê destvekirî çima ew nayê vir
Hezkiriyên te gişan bar kirin êş ma li min
Tu jî ma di bin axê de şopa te nîn e li vir

Hîna ku min şîna wî digirt û ew helbest li ser dixwendin, min bala xwe dayê ku xirecîrek di hundirê malê de derket. Piştî bendeyekî reşîk di derî re derket û ji min re got: “Kalo, extiyaro, malxerabo! Çima tu şînê li ser xwe-diyê malê dikişîni bi van ristan?” Min jê re got: “Ji ber ku ew dostekî min î baş bû.” Got: Navê wî çi bû?” Min got: “Cubeyr Bîn Omer Eş-Şeybanî.” Got: “Ma qey çi bi serê wî hatiye? Şikir ji Xwedê re ku li ser hemd û hêla xwe ye, tenduristîya wî li cî ye û mal û milkên wî pir in. Tenê pîrsgirêkek wî yî bi tenê heye ku Xwedê jîneke bi navê Bidur lê kiriye bela û hezkirina wê xistiye dilê wî. Ew jî di nava eşqa wê de fetisiye, nema dizane bê wê çawa xwe jê rizgar bike û bûye mîna meyekî, nema dikare rabe ser xwe. Bîrçî dibe, xwarinê naxwaze; tî dibe avê naxwaze û bê navber di nava êşê de ye.”

Min jê re got: “Destûrê bide min, ez derbasî cem wî bibim. Got: “Begê min tu yê çawa derbasî cem yekî bibî ku ne guhdar dike û ne jî fêr dike?” Min got: “Bêguman divê bi çi sûretî be jî ez derbasî cem wî bibim.” Rabû bi şûn de vegeriya, piştî dîsa di derî re derket û got: “Tu dikarî derbasî cem wî bibî.” Ez derbasî cem wî bûm, min dît ku mîna kevîrê li erdê dirêjkirî ye. Ez pê re axivîm, li min venegerand. Ne ji gotinê fêr dikir ne jî ji îşaretê. Hinekan ji nasên wî ji min re gotin: “Mîrzayê hêja heger tu jiber dizanî, hinek helbestan jê re bixwîne bi dengê bilind, dê bala xwe bide ser te û bersivê jî bide te.” Rabû min ev çend rist gotin:

Qey te eşqa Bidûrê ji bîr kiriye an ku tu mirî yî
Qey mijangên te ji ser hev ranabin an bê xew mayî
Gelo hîna jî bi keder hêsirên te dibarin ji çavan
Nexwe baş bizanibî ku tu bihuştî yî ey can

Çawa ku Cubeyr ev rist bihistin, çavên xwe vekirin û got: “Silav li ser te bin ey kurê Mensûr! Binêre bê çawa henek bûne rastî!” Min got: “Gelo tu pêdeviya te bi min heye?” Got: “Belê, ez dixwazim nameyekê bo wê binivîsinim, da ku tu bi xwe re bibî ji wê re. Îcar heger tu bersivê jî cem wê binî, ez ê hezar dînarî bidime te û heger tu vala vegerî jî ez ê heqê rêya te, sed dînarî bidim te.” Min got: “Tu çawa dizanî, wisa bike.”

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 337'EMÎN

Şehrezadê berdewam kir:

Vêca kurê Mensûr vegotina serpehatiya xwe ji Harûn Reşîd re berdewam kir û got: “Îcar min jî jê re got tu çawa dizanî wisa bike.” Li ser vê

gotina min, rabû gazî carîyeke xwe kir û jê re got: “Kanî ji min re pêûs û kaxeze bînin.” Jê re kaxeze û pêûs anîn, wî jî ev riste nivîsandin:

Tu bi qedrê Xwedê kî xatûna min aram be
Evê eşq û evînê hiş bi min ve nehiştiye
Dilê vê ferîşteyê çawa ez êsir girtime
Çog li min şikandine çawa ku seqemê li min dabe
Berîya niha biçûk didît min ew evîn
Di ser kum re bû hişê min her ez bûm dîn
Lê hîna jî li ser soza xwe me ey dil
Min xera nekiriye soza xwe li gel van êş û kul

Pîştî name mohr kir û da min. Min rahiştê û berê xwe da mala Bidûrxanê. Weke her car, çawa ku min perdeya ber derî da alî, min dît ku deh carîyên pir sipehî û nûhatî di hundir de ne, ku her yek mîna heyvekê ye. Bidûrxanê mîna stêreke bi şewq di nava wan de rûniştî bû, bi kêf û şahî, çawa ku êşên wê tune bin. Hîna ku min wisa bi heyrangorî li wê rewşa wê dinêrî û ez lê matmayî dimam, min dît, ku wê serê xwe rakir û çav li min ket û dît ku ez di devê derî de sekinî me. Gazî min kir û ji min re got: “Ser seran ser çavan, tu bi xêrê hatî ey kurê Mensûr! Were hundir, were!” Ez derbas bûm, min silavek dayê û name jî da destê wê. Çawa ku lê nêrî, xwend û têgihişt ku bi çi hatiye nivîsandin; kenîya û got: “Ey kurê Mensûr, ozan şaş negotiye gava gotiye:

Sebirdar û barkêş û bêhnfireh be
Da ku qasidê min xwe bigihîne te

Vêca niha ez ê bersivê jê re binivîsinim, da ku sozê daye te pêk bîne. Min lê vegerand û got: “Xwedê xêra te binivîsîne. Wê jî gazî carîyeya xwe kir û got:” Kaxeze û pêûsê bîne! Gava ku carîyê çû pêûs û kaxeze jê re anî, wê jî dest pê kir ev misra nivîsandin:

Dibe ku min ziyan dabe te ey can ka bibore
Carekê tenê min bibexşîne lew ev ne zor e
Hema yek tiştî bixwaze gotinekê bo min bibêje
Ev dildar li ser te dîn û har e ew ne gêj e
Di van çavên bêxewî de binive ka tu li ku maye
Ger ez serxweş ketim jî meya min te daye

Min jê re got: “Xatûna min, bawer bike gava ku Cubeyr van ristan bixwîne, bi rastî jî dê dîn û har bibe.” Wê got: “Ey kurê Mensûr, qey bêrikîrîna ku pê re çêbûbû gihabû vê radeyê ku te ew gotin der barê wî de gotin?” Min lê vegerand û got: “Heger min zêdetir bigota, tu mafdar dibûyî lê lêborîn jî karê comerdan e, xatûna min!”

Gava ew gotina min bihişt, hêsir ji çavan bariyan û bi destnivîseke pir spehî çend rîstên din jî li nameya xwe zêde kirin. Vêca emîrê bawermen-

dan, xwezika te bidîta bê çiqasî xweşik dinivîsand bi wê şêwaza ruq'a ku bawer bike di dîwana te de kesekî ku ewqasî xweşik binivîsîne tune ye!

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 338'EMÎN

Şehrezadê vegotina çîroka xwe berdewam kir:

Kurê Mensûr vegotina serpêhatiya xwe domand:

Vêca gava Bidûr Xatûnê nameya xwe qedand û mohr kir; ew da min. Min jê re got: "Xatûna min, ev nameya dê bibe derman û nexweşê me ji nav nivînê rake." Piştî min rahişt nameyê û ez di derî re derketim û çûm. Lê di pey derketina min de wê gazî min kir û got: "Jê re bibêje ku ez îşev mêvana wî me!"

Ez pir kêfxweş bûm bi vê biryara wê û bi dilxweşî min berê xwe da mala Cubeyr Bîn Omer. Gava ez derbasî cem wî bûm, min dît çavên wî hîna jî zoq li derî dinêrin, li hêviya bersivê ne. Çawa min name da destê wî, vekir, xwend, têgihişt û qîreke ecêb pê ket. Di pey re jî weke termekî li erdê ket, vezeliya, ji ser hişê xwe çû. Dema ku careke din bi ser hişê ve hat û rabû ser xwe, ji min re got: "Gelo wê bi xwe name nivîsand û destê xwe da vê kaxezê?" Min got: "Mîrzayê min ma qey mirov bi nigê xwe dinivîsin?"

Vêca emîrê bawermendan, bawer bike hîna ku min û Cubeyr me ew axaftina xwe neqedandibû, me bihist ku dengê xirxalên nigê wê tê ji hêwanê û çend kêlikan bi şûn de jî me dît ku ket hundir. Çawa ku Cubeyr çav lê ket, rabû ser nigan mîna ku êş di canê wî de nemabe û bi awayekî ew himbêz kir ku mîna marê xwe li darê bipêçe! Pê re jî Cubeyr ji nexweşiya xwe rizgar bû û bi ser xwe ve hat. Cubeyr rûnişt, ew li ser nigan ma. Rabû min jê re got: "Çima tu rûnanêyî xatûna min?" Got: "Ey kurê Mensûr, ez rûnanê me hetanî şertê min û wî pêk neyê." Min jê re got: "Û şertê di navbera we de çi bû gelo? Hûn kesên evîndar wisan in, hûn razên xwe ji kesî re nabêjin."

Wê gavê min dît ku wê xwe bi ser de tewand, devê xwe bir ber guhên wî û tiştê bi dizî jê re got. Wî jî lê vegeand, got: "Ser seran û ser çavan, bila be!" Pê re jî Cubeyr rabû ser xwe, bi bendeyekî xwe re kir pistepist, piştî bende çû, bi qasî saetekê wenda bû û di pey re dîsa vegehiya, hat li gel du şahid û qadiyekî.

Cubeyr rabû ser xwe çû kîsikekî ku sed hezar dinar tê de bû anî û got: "Ey qadiyê birêz! Kanî mehra min û vê keçikê bibirre bi vî qelenî!" Qadî jî wê re got: "Tu jî bi wî razî yî?" Got: "Ez pê razî me." Qadî mehra wan birrî, Bidûr Xatûnê jî kîsik vekir, destê xwe tê dakir û çengek dînar li ser qadî û

şahidan belav kir û yê mayî jî li wî vegerand.

Qadî û şahid rabûn çûn. Ez û wan herduyan jî em li gel hev rûniştin di nava kêf û şahiyêke bêtimtêl de hetanî derengî şevê. Piştî min ji xwe re got: “Ev herdu evîndar in û demeke dirêj dûrî hev mane. Ya baş ew e ku êdî ez herim ji xwe re rakevim, wan bi tenê bihêlim!” Ez rabûm ser xwe ji bo ku herim lê wêna bi guhkê kirasê min girt û got: “Çi di dilê te de derbas bû ku tu rabûyî ser xwe?” Min got, ev û ev û ev di dilê min re derbas bûne. Wê li min vegerand û got: “Ka were rûnê, dema em çûna te bixwazin em ê ji te re bêjin.” Rabû ez dîsa rûniştim û li gel wan mam hetanî berê sibehê. Wê gavê Bidûr Xatûnê ji min re got: “Kurê Mensûr, de êdî rabe, here wê odeya hanê, me ew ji te re amade kiriye ji bo ku tu lê rakevî.” Ez rabûm çûm wê odeyê û lê raketim hetanî sibehê.

Gava bû sibe sîpeyekî test û misînek anî, danî ber min û çû. Min dest-nimêja xwe girt û ez rabûm ser xwe, min nimêja sibehê jî kir, piştî ez dîsa ji xwe re rûniştim. Di wê navberê de, min dît ku Cubeyr û dildara xwe ji serşokê derdikevin û biskên xwe zuha dikin. Min rojbaşek da wan û ew pîroz kirin, piştî jî min ji Cubeyr re got: “Tiştê ku bi şertan dest pê dike, bi razîbûnê jî diqede.” Wî jî li min vegerand û got: “Tu rast dibêji, êdî dema wê hatiye ku em qedrê te bigirin û deynê te bidin te.” Pê re jî gazî xeznedarê xwe kir û jê re got: “Kanî sê hezar dînanan ji min re bîne!” Xeznedar çû kî-sekî ku sê hezar dînar tê de bû anî da destê wî. Cubeyr jî rahişt kîsik da destê min û got: “Ji kerema xwe tu jî vê diyariyê ji destê min bigire!” Min got: “Ez nagirim hetanî ku tu ji min re nebêji bê çawa evîna wê derbasî dilê te bû, piştî wê inkara te ya mezin?” Got: “Li cem me cejnek heye jê re dibêjin cejna Newrozan. Di wê rojê de xelk ji malên xwe derdikevin ji xwe re li kelek û yextan siwar dibin û li deryayê temaşe dikin. Ez û çend destbirakên xwe jî em derketibûn, me xweza temaşe dikir. Di wê navberê de min kelekê dît, ku deh cariye tê de bûn, mîna deh heyvan û Bidûr Xatûnê jî di nivê wan de, ûda wê di destê wê de bû, bi yazdeh meqaman lê dida. Piştî ku her yazdeh meqam lê dan, vegeriya ser meqama pêşîn û ev riste gotin:

Agir jî sartir e ji agirê nava min
Lê kevir jî hişkîr e ji dilê begê min
Ecêbmayî dimînim ez li wî û vê rewşê
Dilekî ji kevir û laşekî nerm ji avê!

Min jî jê xwest ku van her çar ristan ji nû ve bixwîne li ser heman meqamî, lê wê qebûl nekir.

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 339'EMÎN

Şehrezadê berdewam kir:

Kurê Mensûr behsa Cubeyir dikir:

Cubeyir got: “Gava ku wê ew daxwaza min red kir, min jî ferman da xizmetkaran ku bi narincê wê birecimînin. Wan jî narinc bi ser de avêtin hetanî ku ew tirsîya keleka wan binav bibe. Piştî bi rêya xwe de çû. Sebeba ku hişt evîna wê bikeve dilê min ev bû.” Wê gavê min herdu pîroz kirin li ser hevghaşîna wan û min rahişt kîsikê dinarên xwe ez bi şûn de vegeriya Bexdayê.

Bi vegotina wê çîroka kurê Mensûr re, Xelîfe Harûn Reşîd aram bû û behna wî hat ber wî, ji kul û derd û mereqan rizgar bû.

(ÇÎROKA XELÎFE EL-MAMÛN Û HER ŞEŞ CARIYEYAN)

Û tê gotin ku rojekê ji rojan emîrê bawermendan EL-Mamûn li qesra xwe rûdinê û gazî hemû serkêş û siltan û wezîr û gizîr û mezinên dewleta xwe dike. Piştî jî gazî şair û ozan û destbirakên xwe dike, wan li diwana xwe dide rûniştandin. Yek ji wan destbirakên wî jî Mihemedê Besrî bû. El Mamûn lê vegeriya û jê re got: “Ey Mihemedê Besrî, kanî ji min re tiştekî bibêje, ku hetanî niha nehatibe bihistin!” Wî jî got: “Emîrê bawermendan, gelo tu dixwazî ku ez tiştekî bihistî ji te re bibêjim an tiştekî ku min ew bi çavên xwe dîtibe?” El Mamûn got: “Tiştekî ku ji herduyan jî xerîbtir be!”

Mihemedê Besrî got:

Xelîfeyê hêja, emîrê bawermendan! Tê gotin ku di roj û demên borî de zilamekî maldar û bextewar hebû li welatê Yemenê. Rojekê hat vê derê, hat Bexdayê û dît ku mana vê derê xweştir e. Rabû mala xwe jî anî Bexdayê û li vir bi cî bû. Îcar şeş cariyeyên vî zilamî hebûn, ku her yek ji wan mîna heyvekê bû. Yek spî bû, yek esmer bû; yek qelew bû, yek hejar bû; yek beşera wê zer bû û ya mayîn jî reş bû û hemû rûspehî, lihevhatî, bisinc û edeb bûn û tevan jî dizanibûn li amûrên muzîkê bidin û giş jî dengxweş bûn.

Rojekê di şevbuhêrkê de her şeş cariyeyên li dora xwe kom kirin û ji xizmetkaran xwest ku xwarin û vexwarin û meyxurê binin. Li ber newayên muzîkeke xweş xwarin vexwarin û dilşa bûn hetanî ku hişê wan ji serê wan çû. Piştî şûşeya xwe bi meyê dagirt û bi destê xwe îşaretek da cariyeya spî û jê re got: “Rûheyva min kanî xweştirin gotinên ku tu dizanî ji min re bibêje!” Cariyeyê rahişt ûdê ew saz kir û ahengek lê da ku erd bi xwe re hejand. Piştî bi helbestî got:

Dildarekî min heye nîgaşa wî li ber çavên min e

Pir bi nav û deng e di dilê min de veşartî ye
Çawa tê ber çavên min laş giş li min dibe çav
Gava tê bîra min ez giş dibim dil û hinav
Dostan gotin sebirwar be lew ku ew her heye
Min jî got wan wisa nabe tiştê nebe çawa heye

Mîrzayê wan coş bû îskana xwe vexwar, ji nû ve dagirt, hem ji xwe re hem jî ji wan re. Piştîre bi destan cariyeya esmer nîşan da û jê re got: “Hilmxweşa min ka tu jî bi wî dengê xwe yê xweş û mestkirî tişteki ji me re bibêje!” Cariyeyê rahişt ûdê û awazin dewlemend lê dan hetanî erd û ezman ji ser xwe ve çûn û dil zîz bûn. Piştîre bi helbestî got:

Bi serê te sond dixwim ez nîn e tu kes ji xeynî te
Dildara te me hetanî mirinê ez li hêviya te
Rûheyvê min tenê qencyekê bike tu bi min
Hemû keştiyên qencyê di bin ala te de dimeşin

Dîsa serî li mîrzayê wan geriya di nava şahî û coşa wan awaz û newayan de. Dîsa mey berda qedehên cariyeyan, ya xwe jî dîsa dagirt û bi destê xwe îşaretek da cariyeya dagirtî, jê re got: “Ka tu jî straneke xweş ji me re bibêje ey dilbera mêrgan!” Cariyeyê destê xwe avet ûdê û derbin lê dan û hesret bi mirov re nedihîştin. Di pey re jî bi helbestî got:

Telepkaro ger bi daxwaz bî zû tu were
Kî çi dibêje qet guh nedê dîsa were
Têne rûyê xwet nîşan de besî min e
Daxwaz û meqseda min ew her dê yek be
Razîkirina vî dildarî her dê ew besî min be

Mîrzayê wan dîsa ji ser xwe çû, di nava şahiyek bêtimtêl de. Qedehan dîsa bi meyê dagirt û bi destan îşaretek da cariyeya hejar û jê re got: “Horiya ins û canan, ka tu jî çend gotinên xweş ji me re bibêje!” Cariyeyê rahişt ûdê, ew ji nû ve saz kir û li ser meqamekî nû bi helbestî got:

Hûn hemû bêsebr in berê xwe jî nadine min
Bo xatirê Xwedê mabe awirekê navêjine min
Tenê serdarê evînê dikare ew bibe dadvan
Tenê ew dikare mafê min bistîne ji we gişan

Coş û kelecana mîrzayê wan her bilindtir bû. Qedeha di destê xwe de vexwar û bi destê xwe îşaret da cariyeya beşereya wê zer û jê re got: “Ey ro û rojîna emrê min, ka tu jî bi wî dengê xwe yê tenik tişteki ji me re bibêje.”

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 340'EMÎN

Şehrezadê vegotina çîroka xwe berdewam kir:

Îcar Mihemedê Besrî vegotina çîroka yê Yemenî ji xelîfe El Mamûn re berdewam kir û got:

Çawa ku mîrzayê wê stran jê xwestin, cariyeya rûzer rahişt ûdê û bi awazin pir xweş dest pê kir û got:

Evîndarekî min heye ew her ku min dibîne
Radibe ser simûçkan bi awirên xwe şûr dikişîne
Gava wî ez bi tenê hiştim Xwedê jê stend
Ketin dest û milê wî zincîr û bend
Her ku min gote dilê xwe dilo bes e
Gote min dil bi dil e ne nan û xes e

Xweyiya wan awazên zêrîn hemû malikên laşê mîrzayê wan dagir kir û ew bi hewa ve hilda, mîna ku baskên wî çêbûbin. Qedeha xwe ji nû ve dagirt û destê xwe ber bi cariyeya reşik ve kir, jê re got: “Çavreşa min, ka tu ji bi wî dengê xwe yê xweş awazekê ji me re bibêje!” Cariyeyê rahişt ûdê ew ji nû ve saz kir, bi çend meqaman li ser hev lê da, dûra dîsa vegeriya meqamê serî û got:

Ey çavê dil comerd be hinekî ne çîkûs be
Vê bêriyê ez kuştîme dilo îca wê çawa be
Dilxeraban rê girtiye ez jî îro bê çare me
Bêrîkarê gulan dil e lê zikreş jî her dem hene
Gulên di rû de her tîrî çînîn ez wisa li bendê me
Ger xiroşa derxwedayî li gel me gengaz bûya
Bêguman ez ê biketîme vê sicûdê ji gulrû ra

Piştî her şeş cariyê rabûn ser xwe, erda bin nigê mîrzayê xwe maçî kirin û jê re gotin: “Mîrzayê me, em dixwazin ku tu bi wekhevî û dadwerî nêzî me bibî û heqê kesî ji me nexwî!” Mîrzayê wan li husn û cemala wan nêrî li cudahiya reng û qelafetên wan nêrî û spasdariya xwe ji Xwedayê xwe re pêşkêş kir. Piştî, ji wan re got: “We gişan Qur’an xwendîye, hûn fêrî meqam û nawayên muzîkê bûne û der barê dîroka gel û xelkên dîtir de ji hûn pir têgihîştî bûne. Loma, ez ji we dixwazim ku her yek ji we bi destê xwe rikebireke xwe, hewiyeke xwe nîşan bide û dev bavêje wê û pesnê xwe jî pê re bide. Weke mînak a spî dikare dev bavêje ya reşik a qelew dikare dev bavêje ya hejar û her weha. Piştî berevajî wê bibe. Lê belê devavêtina we xwe bispêre ayet û hedîs û gotinên pêşyan, da ku ez asta wêje û gotinnasiya we bibînim. Cariyeyan gotin: “Ser seran û ser çavan.”

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 341'EMÎN

Şehrezadê berdewam kir:

Mihemedê Besrî ji Xelife El Mamûn re berdewamiya çîrokê vedigot:

Vêca çawa ku Mîrzayê Yemenî ew daxwaz ji cariyeyên xwe kir, a spî rabû ser xwe, berê tiliya xwe da ya reşik û jê re got:

Pepûkê reşikê qey nebihîstiye ku spî ronahî ye, spî roj û heyv e, spî şewq û nûr e, rengê min e, qey te bihîstiye ku şairekî gotiye:

Spî ye ew rûheyveke hungivîn e
Pir bi husn e weke zêr û zîvîn e
Qamelîf e bejindirêj û xedeng e
Tîrawir e şûrbîrhû ye çav sêreng e

Lewre rengê min rengê rojê, rengê gulên bihuştî û peykên durrî ye, Xwedayê gewre di pirtûka xwe ya pîroz de, ji pêxemberê xwe Mûsa re dibêje: “Deste xwe bixe berîka xwe û derxe, dê sipspî bibe û ji gemarê paqij bibê.” Di ayeteke din de jî Xwedayê me dibêje: “Û yên ku rûyên wan spî bûne, dê di nava dilovaniya Xwedayê xwe de sermedî bin.” Lewre rengê min ayet e, spehîbûna min xayet e û dîlkêşana min nihayet e. Lewre kesa ku mîna spî be, dilan bi ber xwe ve dikişîne. Ger mirov baş lê binêre, mirov dê bibîne ku spî mijara gelek tiştên pîroz e: Lewre berf jî spî tê xwarê ji asîmanan. Gelek dibêjin ku rengê herî baş, rengê spî ye. Misilman jî bi şaşikên spî xwe paye dîkin. Heger ez pesnê spî berdewam bikim, dê gelekî dirêj bibe. Lê belê vegotîneke kurt û kurmançî ji yeke dirêj û vala çêtir e. Vêca tu dizanî çima min ji te dest pê kir reşikê? Ey reşrenga hibr û hibriya şîniyê! Rengê qijaka ku hezkiriyên ji hev vediqetîne! Jixwe metelokek jî dibêje ma çawa dê yekî reş biaqil be?

Mîrzayê ew da sekinandin û jê re got: “Bes e te pir dirêj kir, de êdî rûnê li cihê xwe!” Piştîre bi destê xwe îşaret da cariyeya reş û jê re got: “Îcar dora te ye, cariyeya reşik rabû ser xwe, berê tiliya xwe da ya spî û got:

Qey tu nizanî ku Xwedayê me yê gewre di Qura’na xwe ya pîroz de dibêje: والليل إذا يغشى والنهار إذا تجلى “*Sonda min bi şeva tariyê tîne û rojê bi xwe re dibê!*” Ma ku şev ji rojê ne bi nirxtir bûya, ew dixist pêşiya rojê? Qey tu nizanî ku reş rengê ciwantiyê ye û gava ku kalbûn bi ser de tê, spîbûnê bi xwe re tîne? Her kes dizane ku gava spî dikeve şûna reş, mirin nêzik dibê! Heger reş ne nirxê herî mezin bûya, Xwedê teala ew nedixist nava dil û çavan. Çawa ku helbestkarekî jî gotiye:

Rengê ciwantiyê bêguman her reş e
Ew e evîna dil çiqasî xweş e
Gel ji bir kiribe min rengê spî
Ji ber ku ew e rengê pîrbûn û kefenî

Û çawa ku yekî din jî gotiye:

Ez esmeran dixwazim beriya gewran

Ew in sebra dildar û evîndaran
 Û çawa ku yekî din jî gotiye:
 Reşikên karspehî weke çavên reş in
 Her bi şewq û nûr û ronahiyê geş in
 Û çawa ku yekî din jî gotiye:
 Bi xêra tarîşevê diçim ez cem wê
 Ji ber tîrsa sibê jî direvim ji cem wê
 Û çawa yekî din jî gotiye:
 Çend şevan ber dilê min girt ewî dildarî
 Çend şevan jî em sitirandin bi baldarî
 Gava ku tava rojê li me da jî ez veşartim
 Min go nexwe Mecûsiyan jî ez xapandim

Vêca ku ez pesnê qencî û başiyên reşrengiyê berdewam bikim, dê vegotin pir dûdirêj bibe. Rengê te spîçokê jî rengê cûzamê ye. Ew berfseqema ku te behsa rengê wê dikir jî, tê gotin ku ew di roja qiyametê de ezabê munkîr û kaffîra ye. Di reş de xêra herî mezin heye, lewre rengê hibra ku gotinên Xwedê pê tînin nivîsandin. Heger ne ji qenciya reş bûya, xelkê misk û ember nedikirin diyarî û nedibirin ji melîk û siltanan re.

Mîrzayê wê ew da rawestandî, jê re got: “Ê te jî bes e, rûnê.” Cariye li cihê xwe rûnişt, wî jî tiliya xwe ber bi ya qelew ve kir.

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 342'EMÎN

Şehrezadê berdewam kir:

Îcar şahinşahê min ê bextewar, çawa ku şeva borî jî min got, Mihemedê Besrî behsa çîroka Mîrzayê Yemenî dikir:

Mîrzayê Yemenî çawa ku cariyeya xwe ya qelew destnîşan kir, jinik rabû ser xwe û vê carê wê berê xwe da ya hejar; ew weke rikebira xwe diyar kir. Piştî kincên xwe ji ser xwe da alî, zend û bendên xwe, çim û hêt û navika xwe derxist holê, hemû giroverkên laşê xwe yê şayîtok nîşanî wê da, piştî dîsa kirasekî tenik li xwe kir, ku hemû giroverkên laşê wê tê re xwiya dikirin. Di pey re jî axivî û got:

Şikîr ji Xwedê re ku ez li ser vî sûretî afirandim û ev qelewbûn da min. Ew qelewbûna ku mîna dareke berdêr laşê min bi şax û peran xemilandiye û spehîbûneke cuda daye min ku bala her kesî dikişîne. Jixwe Xwedayê me yê gewrê jî di Qur'ana xwe ya pîroz de gotiye: “Û ji wan re golikekî qelew anî.” Negot golikekî hejar û zeîf. Xwedê laşê min kiriye mîna bexçeyê sêv

û hinaran, ku çavên her kesî li ser e. Jixwe dilê bajariyan timî dibêjê teyr û mirişk û mîhên qelew; kes ji wan ji yê hejar û bêgoşt hez nake. Ya rast her kes ji her tiştê qelew hez dike. Çawa ku ozan jî dibêje:

Binêre tu li meşa vê cîrana me ya qelew
Çiqasî bi giranî tê çiqasî bala ye ew

Min qet nedîtiye ku rojekê yek hatiye cem qesabekî û hestiyekî bêgoşt jê xwestiye, misoger her kes goştê qelew jê dixwaze. Jixwe zana jî dibêjin, ku xweşî di sê tiştan de ye: “Xwarina goşt, siwarbûna li goşt û goştê ku dikeve goşt!” Îcar tu hejara Xwedê û zeîf, binêre li çîmên xwe bê çiqasî ziravik in mîna yên çûkan! Tu mîna textikekî rût î û tiştêkî ku bêhna mirov derxe nîn e di te de. Çawa ku helbestkarekî jî gotiye:

Xwedê mirov bisitirîne ji bedeneke hişkolekî
Bedeneke ku di her movikek wî de keviyek hebe
Û bi şev pê de jî mîna mîxan di mirov rabe
Çi gava ku mirov pê re bikeve nava nivînê

Mîrzayê qelewê jê re got: “Bes e, tu jî têra xwe axivîyî. Cariyeya qelew li cihê xwe rûnişt, wî jî bi destan îşaret da cariyeya hejar, da ku ew biaxeve. Hejarokê mîna dara xêzeranê, mîna şaxekî rihanê rabû ser xwe û bi wê bejna xwe ya dirêj û got:

Spas ji bo wî Xwedayê ku ev bejn û bala spehî daye min û ez kirim xaye û armanc ji bo taliban, mîna şaxekî ku dil xwe bi ser de bitewînin. Lewre di rabûn û rûniştinê de, tu jî dibînî bê ez çiqasî sivik tevdigerim mîna beytîkekê. Ez pir narîn û cansivik im. Pir jî nazenîn û rûgeş im. Sifetên evîndaran giş di min de hene, lewre min qet nedîtiye ku yekî gotiye dildara min mîna filekê, mîna çiyayekî qelew û giran e. Her kes dibêje evîndara min qamelîf û bejinzirav e, bi nanekî hindik têr dixwe û qurteke avê têr vedixwe. Bi her hawê xwe ez bala xelkê dikişînim ser xwe, lewre ez weke çikçikanekê livker û destsivik im. Weke şaxekî xêzeranê li ber bayê ditewim, li ber dilê dildarê xwe diçim û tîm. Tu kes di spehîbûnê de nagihêje min, çawa ku hozanekî jî gotiye:

Bejna te mîna spîndarekê ye
Dirûvê te yê evîndarekê ye
Dîn û har bûm ez li pey te
Ditirsim ez ji reqîbên xwe

Hemû aşiq û evîndar didin pey jinên mîna min û agir bi dilên wan dikeve, li ser xweşîkbûna yên weke min. Dildar çawa dixwaze, ez li gora wî ditewim, meyla wî bi ku ve be, bi hêsanî ez pê re diçim bêyî giraniyekê jê re çêbikim. Lê yê te tu mîna filekê qelew î û bi qasî filekê bixwî jî tu têr naxwî. Kesê ku li gel te rûnê, rihetî jê re tune ye, lewre tu ziktelêrî yî û nikare bi te şa bibe, telêra zikê te derbas bike jî, hêtên te yên qalind rê nadine wî.

Qelewbûna te ji her hêlê ve çors e û her kesê derdorê aciz dike. Tiştê qelew, tenê ji serjêkirinê re dibe. Jixwe her kes mihên xwe dike dermale, dûre serjê dike. Tu tiştêkî ku pesindanê heq bike di qelewbûnê de nîn e. Kesekî ku he-nekekê bi te bike, tu yê biqehirî, kesekî ku bi te re bilîze, tu yê bi listika xwe xemgîn bibî. Xewê de xirexir, di meşê de helkehelk bi te dikeve. Ne têrxwarin li te heye ne jî têrvexwarin, loma tu ji çiyayekî jî girantir î; ne hereket di te de heye ne jî bereket. Tu karê te jî nîn e ji xeynî xwarin û vexwarin û raketinê. Dema mîz dikî bi şîreşir î, dema gû dikî bi tiretir î, tu mîna nepoxeke badayî yî; mîna fileke ku mesixî be û bûbe însan. Bi kurtahî tiştêkî ku pesnê wî were dayîn di te de tune ye, çawa ku helbestkarekî jî gotiye:

Mîna tûrekî mîzê nepixiye
Hêtên wê tam weke yên filan e
Berê xwe bide bi xerbê ve here
Nema xîret dike bi şûn de vegere

Mîrzayê wê gotina wê birrî û jê re got: “Ê te jî bes e, here li cihê xwe rûnê. Di pey re, bi destan îşaret da zerê, got: “Îcar dora te ye!”

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 343'EMÎN

Şehrezadê berdewam kir:

Mihemedê Besrî ji Xelîfe El Mamûn re behsa çîroka Mîrzayê Yemenî û her şeş ceriya dîkir:

Gava ku mîrzayê wê jê re got dora te ye, cariyeya zerik rabû ser xwe, şikir ji Xwedayê xwe re kir û çend dua ji mîrzayê xwe re rêz kirin, piştî berê tiliya xwe da cariyeya esmer û ew weke reqîb ji xwe re diyar kir. Piştî got: “Ez zerê me û rengê min zer e. Ew rengê ku di Qur’ana pîroz de hatiye pesindan û di ser hemû rengên din re hatiye girtin. Xwedayê me yê gewre, di Qur’ana xwe ya pîroz de, di sûretê Beqere de dibêje «الناظر ينتصر» (Rengê wê zerê vekirî ye ku dilê temaşevanan xweş dike!) Lewre rengê min ayet e, spehîbûna min xayet e û dîlkêşîya mi nîhayet e; ji ber ku rengê min dînar e, rengê peyvê, rengê stêrkan e. Dirûvê min balkêş e, rengê min dîlkêş e, qelafetê min bêêş e û buhayê min jî serêş e. Hemû wateyên spehîbûnê di min de veşartî ne û ez bi xwe jî mîna zêr û îbrîz giran-buhayeke ku nayê peydekirin im. Çawa ku helbestkar jî gotiye:

Zerê wê di rengê rojê de çiqasî bi coş e
Weke rengê dînanan bi şewq û xoş e
Roj jî serî li ber datîne jê re bi xiroş e
Her şev ji nû ve dertê çiqasî bi perêş e

Îcar esmerê, ez ê bi devavêtina te dest pê bikim. Lewre tu di rengê gamêşan de yî û gava mirov li te dinêre mehdâyî dibe bi dîtina te. Jixwe ev rengê te di çî de hebe, dilxelînekê bi mirov re çêdike. Gava ku di nav xwarînekê de be, dibe jehr ji mirov re. Ji ber ku rengê te, rengê mêşan e û dirûvê te jî dirûvê kûçikan e. Çawa ku çavên mirov li rengê te dikeve, xemgînî bi mirov re çêdibe. Lewre min qet nebihîstîye, ku rojekê kesî behsa zêrekî esmer kiriye an jî durr û gewherekî esmer. Gava tu diçî qedemgehê, rengê te tê guhertin, gava tu ji wir derdikevî jî, bêmîrêsiya te xerabtir dibe. Tu ne reş î ku bi reşbûna xwe werî naskirin û ne jî spî yî ku bi spîbûna xwe werî pesindan. Çawa ku hozanekî jî gotiye, tu meziyeteke xweser bi te re nîn e;

Rengê te ji rengê toz û dûmanê ye
 Ji rengê xwelîya biniya nîga ye
 Çi gava ku ez lê dinerim dil dixele
 Çi gava tê ber çavan hinav dikele”

Mîrzayê wê ew sekinand û jê re got: “Tu jî rûnê, evqas bes e. Piştîre bi destê xwe îşaret da cariyeya esmer û jê re got: “Îcar dora te ye.” Esmer a ku xwediya spehîbûneke balkêş bû, ji her hêlê ve xweser bû. Rûgirover û laşşayîtok bû; porreş û rûgeş bû; ne dirêj û ne kin bû; herdu hinarikên wê mîna du gulan bûn; çavxezal û zimanfesîh bû; newqzirav û hêtgiran bû. Çawa rabû ser xwe, got:

Şikir ji Xwedê re ku ez bi vî afirandime: Ne qelew û ne zeîf, ne spî mîna cûzamgiran, ne zer mîna sefranê û ne jî reş mîna komirê. Baş bû ku ez esmer xulîqandim ku ev rengê hemû maşûqên biaqil in. Hemû şair û hozan jî her dem pesnê rengê esmer didin, bi hemû zimanan û wî nadin bi tu rengêkî din. Lewre esmer, rengê hemû meziyetên baş in. Xwedê ji wî mirovî razî be, ew ê ku gotiye:

Rengesmerekî pir avis e bi hemû rengan
 Esmerengek her serkêş e bo xweşikan
 Efsûnger e pir fêrker e bi hemû dengan

Lewre hendamê min lihevhatî ye, qelafetê min telebkar e û rengê min jî qîbel her kesî ve têtê xwestin; ji siltanan hetanî xizmetkaran, ji leşkeran hetanî eşqiya û rêbiran, her kes daxwazkar û heyranê rengê min e. Ji ber ku ez pir dilnaz, xwînşîrîn û narîn im; laşê min şayîtok û giranbuha ye, ji ber ku têgehên huner û wêjeyê bi giranî li ser rengê min hatine darijandin û afirandin. Zimanê min fesihe, mîzacê min cankêş û xwînşîrîn e û lîstokên min jî kêfxweşbar in. Ê te jî tu mîna virikê zer î û hemû reh î. Xwelî li ser te be, rebena pepûk î ku di rengê zingara paxir de yî! Rûçikê te di teşbiha de ye û mehdê te di tama zeqûmê de ye. Kesê ku bi te re rakeve, dê mala wî xera bibê, mîna mirovekî ku bi cendekekî re rakeve; çawa ku helbestkarek jî dibêje:

Zerê per e zer e nexweşiyê bi min re çêdike

Sing lê teng dibe serêşê bi min re çêdike
Ez wî rezîl dikim gava bêhna min teng dibe
Diran li min dikevin bi dîtina rûyê wê re

Bi van ristên dawîn re, mîrzayê wê ew sekinand û jêre got: “Ê te ji bes e, di cihê xwe de rûnê.”

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 344'EMÎN

Şehrezadê berdewam kir:

Mihemedê Besrî got:

Piştî ku mîrzayê cariyeyan a esmer jî li cihê wê da rûniştandin, bi zimanekî xweş bi gişan re axivî, ew li hev anîn, kincên xweşik li wan kirin, diyarî li ser wan belav kirin û durr û cewher bi wan ve kirin. Vêca emîrê bawermendan, baweriya te bi Xwedê bê, ez ew qasî geriyame, di temenê xwe giştî de, min dîmen weke dîmena wan her şeş cariyeyan spehî nedît.

Gava ku xelîfe El Mamûn ew çîrok û serpêhatî ji Mihemedê Besrî bihîst, ber pê ve çû û jê re got: “Ey Mihemed, gelo tu cihê van her şeş cariyeyan û mîrzayê wan dizanî? Gelo tu dikarî herî wan ji min re bikkirî?” Mihemed got: “Emîrê bawermendan, bi qasî ku ez têgihîştîme, mîrzayê wan pir ji wan hez dike û nikare ji wan veqete.” El Mamûn got: “Ji bo her cariyekê ez ê deh hezar dînarî bidim te, bibe ji xwediyê wan re; lewre bi giştî dibe şêst hezar dînar û ev tiştêkî ne hindik e.”

Mihemedê Besrî rahişt şêst hezar dînar û çû cem xwediyê wan cariyeyan û jê re got ku emîrê bawermendan xelîfe El Mamûn, dixwaze her şeş cariyeyên wî bi şêst hezar dînanan bikkire. Xwediyê wan jî, tenê ji bo xatirê xelîfe, firotina wan qebûl kir û her şeş cariyê ji xelîfe re şandin. Îcar dema ku cariyê gihan qesrê, xelîfe ziyafetek ji wan re li dar xist, bi wan re rûnişt, axivî, kêf û laqirdî kirin, bi edeb û zanîn û spehîbûn û reng û xweşaxaftina wan pir şabû û li wan ecêbmayî ma!

Demekê wisa berdewam kirin, hetanî xwediyê wan ê berê, pir bêriya wan kir û nema xwe ragirt, rabû nameyek ji xelîfe re nivîsand, tê de gilî û gazin lê kirin ji ber wê bêrikirinê û bi helbestî got:

Şeş xatûnên zor ciwan û pir spehî
Pir bi erzani ji min hatin dizî
Silavên min li wan dost û yaran
Silavên Xwedê li her şeş horiyan
Lewre ew in dest û guh û çavên min

Ew in hiş û av û can û dilê min

Dema ku ev name ket destê xelîfe, pir bandor lê kir. Rabû kinc û zîne-
teke pir buha û xweşik li her şeş cariyeyan kir û ew şandin cem xwediyê wan
ê berê. Gava gihan mala wî û ji nû ve çav li wan ket, pir kêfxweş û şanaz bû
û salin xweş bi wan re derbas kir, hetanî ku xerabkarê şahî û xweşiyê hat û
careke din ew ji hev veqetandin.

(ÇÎROKA WERDANÊ QESAB Î JIN Î HIRÇÊ)

Û tê gotin ku di heyamê xîlafeta El Hakim Bî-Emrîl-Llah, li Misrê zi-
lamekî bi navê Werdan hebû ku qesabtî dikir û goştê mihan difiro. Jinek
jî hebû ku rojê carekê dihat cem wî, dînarek didayê û digot, ka berxikekî
bide min, ku giraniya dînarê wê bi qasî giraniya du dînar û nîvan bû. Qesab
jî berxikek didayê û wî bi xwe radihiştê, dibir hetanî mala wê. Sibeha roja
dîtirkê carekê din dihat dînarek didayê û berxikek din dikirî, qesab jî ew di-
bir hetanî mala wê. Demeke dirêj bi wî hawayî berdewam kir. Rojekê qesab
li ser rewşa wê fikirî û di dilê xwe de got: “Ev jina hanê her roj bi dînarekî
ji min dikirre û rojekê tenê jî naçe ji cihekî din nakire. Tiştêkî ecêb e, ku
carekê tenê xwe şaş nake!”

Rojekê qesab rewşa wê ji barkêş pirsî. Barkêş got: “Ez jî mîna te li rewşa
wê ecêbmayî dimînim. Lewre rojê carekê wî berxikê ku ji te dikire, li pişta
min dike, ji sûkê xwarin û mûm û fêkiyan jî bi dînarekî din dikirre, ji cem
yekî fileh jî du kûzên meyê dikire û dînarekî dide wî jî û gişan li pişta min
dike û ez pê re diçim hetanî bistanê wezîr. Li wir çavên min baş girêdide û
bi destê min digire, min bi xwe re dibe di rêyeke ku nas nakim û li cihekî
jî min disekinîne û dibêje li vir deyne. Ez jî barê xwe li wir datînim, piştre
selikeke din î vala datîne ser pişta min û dîsa bi destê min digire, dîsa min
tîne cihe ku çavên min lê girêdabûn û li wir paçê ser çavên min vedike û
deh dînaran dide min û dibêje here.” Qesab got: “Xwedê alîkarê wê be!”
Û dîsa vegeriya malê. Lê hişê wî hîn bêhtir çû ser wê û xiltexilt ketin dilê
wî, tasewas ketin hişê wî, aramî pê re nehiştin. Qelaqek pê re çêbû, ku êdî
hedan lê nehiştibû.

Roja dîtirkê gava ku jinik dîsa hat berxikek jê kirrî û dînarek dayê,
qesab kurê xwe danî ber dikanê û dûra bi dizî da dû jinekê, ew şopand bi
awayekî ku nehêle bê dîtîn.

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî.

ŞEVA 345'EMÎN

Şehrezadê berdewam kir:

Îcar em li Werdanê qesab guhdar bikin:

Min kurik li dikanê hişt û min da dû jinikê. Bêyî ku ez bihêlim min bibînê, min ew şopand hetanî ku ji Misrê derket û gihîşt nav bexçeyê wezîr. Li wir min dît ku wê çavê barkêş girêda û bi destê wî girt, ew bi dû xwe de kişkişand. Min jî gav bi gav da dû wan û ez çûm heta ku em gihan çiyayekî. Li wê texmê kevirekî mezin hebû. Li ber wî kevirî, hemal(barkêş) da rawestandin û selika ser piştê wî danî, hemû tiştên tê de derxistin û ew paş de bir; dema vegeriya ew kevir ji cihê wî rakir û xwe tê re berda, nebedî bû.

Wê kêliyê, ez jî çûm, min ew kevir ji cihê wî derxist, min dît deriyekî ji paxir vekirî ye li ber min û derenceyek jî ber bi jêr ve diçe. Ez hêdî hêdî di derencê de daketim hetanî ku ez giham ber deriyekî din, weke deriyê odeyekê bû. Min xwe da ber koşeyê derî, min dît ku nêrdewanek li wir e. Ez bi nêrdewanê ve hilkişiyam hetanî ku bixêrîkek hat pêşiya min. Min li bixêrîkê nêrî, min dît ku hêwanek mezin di piş wê de heye û ew jinik jî li wir e. Jinikê berxik serjê kiribû û bi hûrkirina wî dadiket, kezeba wî û hinek perçeyên goştê xweş dan aliyekî û yê mayî giş avêt ber hirçekî ku li kêleka wê bû. Hirçê gir ê weke dêwekî ket ser berxikê hemû xwar, di wê navberê de, jinikê goştê xwe pijand û xwar. Piştê li rex hirç rûnişt, fêkî û mey danî ber xwe û hem vexwar, hem jî bi tasê da hirçê xwe, wî jî pê re vexwar, hetanî ku her du serxweş ketin. Wê gavê jinik rabû kincên xwe di ser xwe re anîn, xwe tazî kir û li ser piştê pal da. Hirç jî rabû ser xwe û ket ser zikê wê, pê şa bû bi awayekî balkêş, ku mirov digot qey zilamek pê re raketiye! Piştî bêhnvedanekê, hirç careke din rabû ser xwe ket ser dilê wê û pê şabû hetanî ku qîrîn pê ket. Careke din bêhna xwe berdan û careke din pev şa bûn û weha berdewam kirin hetanî ku deh caran hevdu şa kirin û weke du cendekan bêrûh li erdê dirêj bûn, veziliyan. Wê gavê min ji xwe re got: “Keysa herî baş niha ye.” û min xwe bi ser wan de berda. Gava ez giham cem wan, min kêra goşt ji ber xwe derxist û ez bi ser wan de çûm. Herdu di nava xweydanê de bûn, ji ber karê giran ê ku kiribûn. Min kêra xwe da ser stûyê hirçê û bi hemû hêza xwe min xwe da ser, hetanî serê wî ji gewdeyê wî veqetiya. Xirexireke ecêb pê ket, mîna gumeguma ewran. Jinik bi tirs ji xew veciniqî li ser xirexira wî û dît ku serê hirçê ji laşê wî veqetiyaye û ez jî di ser re sekinîme, kêr di destê min de ye. Qîreke ecêb pê ket, ku min got qey ruhe wê di devê wê re avêt. Piştê ji min re got: “Werdan, qey cezayê xêrê ev bû?” Min jê re got: “Ey dijmina nefsa xwe, ma qey zilam qeliyabûn ku ajalan berra ser xwe didî?” Serê xwe bera ber xwe da û bersiv neda min. Li gewdeyê hirçê ê bêserî nêrî, piştê got: “Werdan, tu dixwazî kîjanî hîlbibijêrî? Tu bi ya min bikî û li gotina min guhdar bikî ji bo ku tu temenê xwe yê mayî di nava aramî, xweşî û dewlemendiyê de derbas bikî, yan tu yê bi ya min nekî û dê felaket bi serê te de bîn?”

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî.

Şehrezadê berdewam kir:

Werdanê qesab got:

Gava ku jinikê ew herdu bijare dan ber min, min jê re got: “Ez dixwazim bi ya te bikim, de ka ji min re bibêje bê tu çi dixwazî?” Got: “Te çawa ev hirç serjê kir, serê min jî bifirrîne û têra xwe zêr û cewheran ji vê defineyê bibe û bi rêya xwe de here.” Min lê vegerand û got: “Vegere ser rêya rast û tobe bike, ez ê bi te re bizewicim û ez û tu em ê bi hev re bijîn hetanî dawîya emrê xwe, bi vê defineya hanê.” Wê got: “Werdano, ez ê çawa bijîm piştî çûna wî? De binêr wile heger tu ruhê min nestînî, ez ê ruhê te bistînî û ez ê malikê li te xerab bikim.”

Bi wê gotina wê ya dawîn ez hêrs bûm, min got: “Laneta Xwedê li te be, ez ê te bişînim ser heqiyê!” Pê re jî min bi gijika porê wê girt û min ew serjê kir. Piştî min li derdora xwe nêrî, ku ez çi bibînim! Ode tijî zêr û zîv û lûlû û mercan bûn. Ez bawer nakim ku ewqas zêr û cewher di xizaneya ti siltanî de hebe! Min rahişt wê selika barkêş û bi qasî ku min karibû, min ew tijî zêr û zîv û mercan kir. Piştî min devê selikê girt û qerpalek avêt ser, baş nixumand û min ew avêt ser milê xwe, ez ji xezîneyê derketim, çûm. Dema ku ez giham hinda deriyê Misrê, min bala xwe dayê, ku siltan û qefleyek parêzvanên xwe ji wê ve tî. Çawa ku ez dîtîm, gazî min kir. Min got: “Libê siltanê min, tu ji min çi dixwazî?” Got: “Te hirç û jinik herdu kuştin?” Min got: “Belê ezbenî.” Got: “Aram be û bila dilê te jî rihet be, hemû malê bi te re, yê te ye û tu kes nikare têkilî te bibe.” Min rahişt selikê û bir danî ber wî. Qerpale ser da alî û devê selikê vekir, lê nêrî, her tişt dît û got: “Mîna ku ez jî bi te re bim, ez her tiştî dizanim lê dîsa jî ez dixwazim ku tu mijarê vebêjî!”

Min çîroka serpêhatiya xwe ji serî hetanî binî jê re got, wî jî got: “Tu rast dibêjî Werdan, de ka rabe ser xwe û bi me re were ser wê xezîneyê. Ez bi wan re çûm, min dît ku devê wê girtî ye. Siltan got: “Kevire ser devê wê rake Werdan, lewre devê wê gencîneyê bi navê te hatiye girtin û ne bi destê te be jî, kes nikare veke.” Min got: “Bi navê Xwedê ez nikarim vî kevirî ji ser devê wê bidim alî.” Wî got: “Tu here ser û îşê te pê tune, bi izna Xwedê dê vebe!” Ez ber bi kevir ve çûm, min destê xwe dirêjî kevir kir û got bismillâh! Mîna ku kevirê pir sivik be, bi destê min ve rabû û derî vebû. Siltan got: “Her tişt li cem min nivîsandiye; ji gava ku ew gencîne çêbûye û hetanî gava ku te ev hirç û jinik kuştîye jî, ev derî li ser navê te tê girtin û vekirin û tu kes nikare wî veke ji xeynî te. Tu kes jî nikare bikeve hundirê xezîneyê ji jî xeynî te. De êdî dakeve jêrê û here çi tê de hebe, wî derîne û were. Jixwe min her tişt dizanibû û bi salan bû, ku ez li benda vê rojê bûm.”

Ez daketim jêr û min her tiştê di xezîneyê de derxist, anî, da wî. Siltan

gazî xizmetkaran kir, ajal anîn û ew zêr giş kirin bar û li ajalan kirin, birin. Min jî rahişt selika xwe û ez hatim malê. Bi wan dînanan min sûkek ji xwe re kirrî, ku hîna jî ew sûk heye û jê re dibêjin “Sûka Werdan”.

Dema Şehrezadê ew çîrok jî xelas kir, dest bi çîrokeke nû kir:

(ÇÎROKA JINÊ Û MEYMÛN Û XORTÊ QESAB)

Tê gotin ku keçike siltanekî hebû, ku dil ketibû evdekî reşik. Vêca evdê reşik pê re raketibû û ew ji keçkanî xistibû. Keçik jî li ser wî dîmir û saetekê tenê jî sebra wê bêtî wî nedihat. Carekê yek ji cariyeyên qesrê bi vê rewşa wê hesiya û jê re got: “Tu kes nikare mîna meymûnan mirov şa bike!”

Carekê zilamekî ku meymûnekî mezin pê re bû, di ber qesrê re derbas bû. Wê kêlikê ew jî li ber şibakê bû û ew meymûn dît. Perdeya ber rûyê xwe da alî û çav kir meymûn. Meymûn har bû, zincîra xwe qetand, ji nav lepê xwediyê xwe derket, bazda û bi dîwêr ve hilperikî, di şibakê re çû cem keçikê. Wê ew di odeya xwe de veşart û êdî roj û şev, xwarin, vexwarin û pev şa bûn hetanî ku bavê wê bi vê rewşa wê hesiya û xwest ku wê bikuje.

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî.

ŞEVA 347’EMÎN

Şehrezadê vegotina çîroka xwe berdewam kir:

Vêca padişahê min ê gewre, gava ku bavê keçikê pê hesiya û xwest ku wê bikuje, keçik ji nêta bavê xwe agahdar bû. Rabû ser xwe, kincên miran li xwe kir, li hespekî siwar bû û ji bo barê xwe lê bike qantirek jî peyde kir. Di pey re jî têra xwe zêr û zîv û cewher û qûmaş û caw û gelek pêdiviyên din dan ser hev, li qantirê kirin û meymûnê xwe jî da gel xwe û ji malê derket, meşiya hetanî ku giha Misrê. Li maleke ku li çolistanê bû bi cih bû. Û ji wê derê her roj çû sûkê ji xwe re goşt kirî ji cem qesabekî ciwan. Her car jî bi mehdekî zer û rewşeke westiyayî di dema piştî nîvroyê de diçû cem qesab. Vê rewşa wê bala qesabê ciwan kişand û qesab di dilê xwe de got: “Bêguman divê ku sebebekî ecêb hebe di bin vê adeta yê mirê hanê de! Divê ez bi dizî wî bişopînim û vê sedema hanê fêr bibim!”

Ka em binerin bê qesabê xort çî dibêje: Gav bi gav min ew şopand û ez li pey çûm hetanî ku derbasî mala xwe ya li çolê bû. Li wir jî bi dizî min çavdêriya xwe berdewam kir, min dît ku agir pêxist, goştê xwe pijand, têra xwe xwar û yê mayîn jî da ber meymûnê xwe, hetanî ku wî jî têr xwar. Di pey re rabû ser xwe, kincên xwe ji xwe kirin û li şûna wan kincin jinan li xwe kirin, bi wê yekê jî ez lê hay bûm ku ew jin e, ne zilam e. Piştî mey danî

ber xwe, wê û meymûnê xwe bi hev re vexwarin heta ku serê wan nepixî. Jê û pê de, bazdan ser hev û bi qasî deh carî bi hev şa bûn hetanî ku ji ser xwe çûn û li erdê dirêj bûn. Piştî meymûn rabû perdeyek starê avêt ser keçikê û çû li cihê xwe rûnişt. Gava ez derbasî hundir bûm, meymûn bi min hesiya û xwest ku bi lapûşkên xwe min bidirrîne. Lê kêra goşt bi min re bû, min di cî de ew kişand û di zikê wî rakir, hûrê wî bera erdê da. Keçik ji xew vecinikî û ziravqetiyayî zoq nêrî li min û meymûnê zikqetiyayî. Wê kêlikê, hewar û qîrînek pê ket, ku erd û ezman bi xwe re hejandin, pê re jî ji ser hişê xwe çû û li erdê dirêj bû.

Gava ku bi ser xwe ve hat, ji min re got: “Te çima wisa kir? Ez tikan ji te dikim, min jî bi dû wî de bişîne.” Lê ez li ber geriyam, min dilê wê xweş kir, ku ez jî dikarim weke meymûn deh caran pê şa bibim û min ew îqna kir ku bi min re bizewice. Ez pê re zewicîm lê min kir nekir, min nikaribû bi qasî wî meymûnî bikira û ew têr bikira. Ez çûm cem pîrêjinên zana, min derdê xwe û wê ji wan re got û alîkarî ji wan xwest. Pîrêjina zana got: “Ji min re beroşeke tijî ava sirkeyê bîne û ritilek darikên ziravê jî pê re. Ez çûm min daxwazên wê tedarik kirin, anîn. Wê jî hemû xistin beroşê û danî ser agir heta ku keliya. Piştî ji min xwest ku ez bi keçikê re rakevim. Em pev şa bûn hetanî ku keçik ji ser xwe çû. Pîrêjina zana û efsûngêr, rahişt keçika ku hîna bi ser hişê xwe ve nehatibû, şeşên wê ji hev vekirin û ewkê wê di ser beroşê re girt, heta ku keldûmana ji beroşê rabû bi nava wê de çû û tiştin jê hatin xwarê. Min li wan tiştan meyzand, min bala xwe dayê ku du kurmik in; yek reş bû û yê din jî zer bû.

Pîrêjinê got: “Kurmikê reşik, encama pevşabûna wê ya bi evdê reşik re ye û kurmikê zerik jî encama raketina wê ya bi meymûn re ye.”

Piştî bi ser xwe ve hat û demeke dirêj daxwaza tiştêkî ji min nekir. Bi xêra dermanê wê pîrêjinê, Xwedê teala ew ji wê nexweşiyê rizgar kir. Ez li wê rewşa wê behetî mam û mesele ji serî hetanî binî jê re got, ew jî hem pir kêfxweş bû, hem jî ecêbmayî ma, li wê rewşa xwe. Êdî em bi hev re man û me jiyanê xwe di nava xweşî û şahiyêke bêtimtel de derbas kir. Pîrêjina efsûngêr jî ket şûna diya wê û bi me re jiya, hetanî ku xerabkarê xêr û xweşiyê hat em ji hev veqetandin. Subhan ji wî re!

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 348'EMÎN

(ÇÎROKA QRAL Û HERSÊ HEKÎMAN)

Wê şevê Şehrezadê dest bi çîrokek din kir:

Tê gotin ku di zemanekî kevn de, şahekî mezin hebû ku pir xeternak bû û sê keçên wî hebûn mîna sê heyvan bûn; mîna sê çiçekên bihuştê bûn û kurekî wî jî hebû mîna rojê bû.

Rojekê ji rojan, şah li ser textê desthilatdariyê rûniştî bû, gava ku sê hekîmên zana derbasî cem wî bûn, ku tawisekî zêr bi yekî ji wan re bû û zirneyeke paxir bi yê din re bû û hespekî ji ac û ebenos jî bi yê sisiyan re bû. Şah ji wan re got: “Ev tiştên bi we re ne, tîr çî wateyê?”

Xwediye tawis got: “Fêdeya vî tawisî ew e ku şev û roj, her cara ku saetek derbas dibe, li çepikan dide û diqîrê.” Xwediye zirneyê jî got: “Heger mirov vê zirneyê deyne ser deriyê bajarekî, wî bajarî diparêze, lewre gava ku dijminek di wî deriyî re derbas dibe, diqîrê û bi destê mirov digire.” Xwediye hesp jî got: “Hunera vî hespî ew e, ku gava yek li vî hespî siwar bibe, bixwaze here kîjan welatî, wî dibe wir.” Şah got: “Ez tiştêkî nadim we hetanî ku ez van dûmenên hûn behs dikin, nebînim.”

Şah bi destê xwe xwest ku angeştên wan biceribîne. Di destpêkê de tawis ceriband. Dît ku gotina xwediye wî rast derket. Piştî zirne ceriband û dît ku gotina xwediye wê jî rast derket. Şah ji herdu hekîmên zana re got: “Hûn çî dixwazin bibêjin, ez ê daxwazên we pêk bînim.” Herduyan gotin: “Em dixwazin ku tu keçikê xwe bi me re bizewicîne.” Di wê navberê de hekîmê sêyemîn pêşde hat û got: “Şahê min ê gewre, ji kerema xwe heman qenciye bi min jî bike û keça xwe ya mayîn jî bide min!” Şah got: “Destpêkê divê ez gotina te di azmûnê re derbas bikim û ez bi çavên xwe rastiya wê bibînim.” Hekîm got: “Bila be û hespê xwe pêşkêşî şah kir. Tam di wê navberê de kurê şah ji bavê xwe re got: “Bavocan ez dixwazim li vî hespî siwar bibim û wî biceribînim.” Şah got: “Çawa tu dixwazî, wisa bike kurê min.”

Kurê şah rabû li hespê siwar bû û nigên xwe li newqa wî dan lê hesp di cihê xwe de ma û neliviya. Li hekîmê zana zivirî û jê re got: “Ey zanayê dem û dewrana, ka ew leza hespa te ya ku te behsa wê dikir?” Wê gavê hekîm hat cem kurik û bişkoka lez û firrê nîşanî wî da û jê re got: “Vê bişkokê bifirkîne, tu dê bibînî!”

Kurik çawa ku ew bişkoka firkand, hesp liviya û bi hewa ket, firiya. Her ku çû ber bi perên asîmanan ve bilind bû hetanî ku ji ber çavan wenda bû. Kurê şah jî mabû heyirî, nizanibû dê çî bikira û li siwarbûna wî hespî poşman bûbû. Di dilê xwe de digot: “Wisa xwiya dike, ku vî hekîmî plangeriyek li serê min gerandiye, ji bo ku malikê li min xera bike!” Bêcare li her dera hesp nêrî û ew di ber çavan re derbas kir heta ku çavên wî li tiştêkî mîna serê dik ketin, ku li ser milê wî yê rastê bû. Piştî dît ku heman tişt li ser milê wî yê çepê jî heye. Di dilê xwe de got: “Ji van herdu bişkoka pê ve, tiştêkî din xwiya nake!” Destê xwe avêt bişkoka ser milê rastê û ew firkand, dît ku leza hesp zêdetir bû, bêtir ew bi hewa xist. Destê xwe ji ser wê bişkokê

kişand û avêt ser milê çepê, ew firkand, bala xwe dayê ku leza hespê kêmbû û hêdî hêdî berjêr daket. Kurik bi tevdîr firkandina bişkoka çepê berdewam kir û daketina xwe ya ber bi erdê ve berdewam kir.

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî.

ŞEVA 349'EMÎN

Şehrezadê berdewam kir û got:

Vêca gava kurê şah bişkoka aliyê çepê firkand û hespê wî ber bi jêr ve daket, bêhnna wî hat ber wî û gelekî kêfa wî hat û spasiya Xwedayê xwe kir, ku ew ji xetereyê rizgar kir û ew derfeta bêhempa ji xist destê wî.

Kurê şah berê hespê xwe dida ku, bi wir ve diçû; berjêr bikira hesp berjêr dadiket, ber bi hêla rastê ve bikira bi wir ve diçû, ber bi hêla çepê ve bikira bi wir ve diçû; çawa dixwest wisa diçû. Edî tam serwertiya ajotina hespê dikir û edî ew li ser rûyê erdê digeland, bajar û welatên ser rûyê erdê yeko yeko temaşe dikir. Gelek bajarên ku qet nedîtibûn jî hebûn, li hemûyan temaşe kir. Yek ji wan bajaran jî bajarekî ku pir xweşik hatibû avakirin, di nava çayirin şin de ku bi dar û beran, bi ava çeman xemilandî bû. Di dilê xwe de got: “Dever ji vir çêtir tunene ji bo razana min a îşev. Ez ê îşev li vir rakevim û sibê sibehê ez ê herim welatê xwe û ez ê bavê xwe bi her tiştî agahdar bikim û ev tiştên ku min dîtî hemûyan jê re vebêjim.

Hewl da ku ciyekî daketinê ji xwe re hîlbijêre, cihekî aram ku tu kes wî û hespa wî nebîne. Hîna ku wisa raçavkirina xwe ya li ser bajêr berdewam dikir, qesreke bilind û pir spehî ku di nivê bajêr de bilind dibû, bala wî kişand. Li derdora wê qesrê jî sûrin fireh û bircin bilind hebûn, pir bi heybet bûn. Di dilê xwe de got: “Cihe herî munasib vir e!” Destê xwe danî ser bişkoka milê çepê û hişt ku hespê wî berjêr dakeve ber bi erdê ve. Daket û hey daket hetanî ku giha ser banê qesrê. Li wir ji ser piştê hespê xwe daket û got: “Şikir ji Xwedê re!” Dûre li dora hespê xwe çû û hat û got: “Bi navê Xwedê yê ku tu bi van huneran afirandiye, zanayekî pir jêhatî ye. Îcar heger Xwedê hez bike û min bi saxî û selametî li welatê min, li bavê min vegeirîne, ez ê qenciya wî hekîmê zana bikim û têra wî diyarî û yadîgaran bidimê.”

Li ser banê qesrê ma hetanî ku her kes di xew re çû. Ewqas xweragirtin ew pir tî û birçî kiribû, lewre ji sibehê ve tişteke nexwaribû. Di dilê xwe de got: “Bêguman qesreke mezin mîna vê qesra hanê ji xwarin û vexwarinê xalî nabe!” Hespê xwe li wir hişt û hêdîka daket jêr, ji bo ku li xwarinekê bigere.

Gava bi nêrdewanê daket jêr, dît ku devereke bi mermer raxistî ye lê pêjna ins û cinan jî tê de tune. Şaş û metal sekinî, ma di cihê xwe de, beyî

ku bizanibe bi ku ve here! Di dilê xwe de ji xwe re got: “A baş ez vegerim cem hespê xwe û li wir rakevim. Gava bû sibe jî, ez ê lê siwar bibim û herim.”

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 350'YEMÎN

Şehrezadê berdewam kir:

Kurê şah ji xwe re got, ya baş ew e, ku ez herim li gel hespê xwe razê. Lê hîna ku ew wisa ji xwe re diponijî, dît ku şewqek ber bi wî ve tê. Hinekî bi hûrgilî li texma wê şewqê nêrî, dît ku yên ber bi wî ve tên qefleyek carîye ne û keçek jî di nava wan de ye weke heyveke li çardehan e. Tu nabêjî ew keçek keça mîrê wî bajarî ye û ji ber ku bavê wê pir zêde jê hez dikir, ew qesir ji wê re dabû avakirin. Keçik jî her ku bêhna wê teng dibû, dihat wê derê, rojekê, duduyan dima, li gel carîyeyên xwe şa dibû û dûre dîsa vedigeriya seraya bavê xwe.

Îcar çawa ku keçik û carîyeyên xwe ketin qesrê, merş, ber û doşek raxistin, bixurdank pêxistin, bêhnên xweş dan belavkirin û ji xwe re listin, şahî li dar xistin, kêfa xwe kirin. Di nava carîyeyên wê de xizmetkarekî wê yê rimbaz hebû ku şûrê wî pê ve dixiliya. Kurê şah çawa ew dît, êrişî ser wî kir, kulmek li ser çavê wî da, ew li erdê rast kir, şûrê wî ji destê wî girt û êrişî ser carîyeyên keça mîr kir, ew ji hevdu belawela kirin, mîna noka tu li kevir bidî.

Keçik çawa çav li bejn û bala wî, li spehîbûn û lihevhatina wî ket, jê re got: “Wisa xwiya dike yê ku duh ez ji bavê min xwestim, tu yî! Li gorî gotina wî qaşo tu xortekî nexweşik bûyî lê wisa xwiya dike, ku bave min derew kiriye. Çawa tişteki wisa digot, ez jî nizamim, lewre tu xortekî rind û pir lihevhatî yî.”

Tu nabêjî roja beriya wê şahê Hindistanê hatibû ew ji kurê xwe re xwestibû lê ji ber ku kurê wî nexweşik bû, bavê wê bera wî dabû û qebûl nekiribû, ku keça xwe bide wî. Keçikê jî digot belkî yê ku şeva borî hatiye ew xwestiye, ev e. Rabû xwe avêt himbêza wî, ew ramûsa, têra xwe maçî kir û pê re rûnişt. Carîyeyên wê jê re gotin: “Xatûna me, yê ku tu ji bavê te xwestî ne ev e. Ev spehî ye û yê wî ew nexweşik bû, bi qasî ku nikaribe bibe xulamê viya, lewre ev ciwanê hanê xwedî nirxeke giranbuha xwiya dike.”

Piştî carîyeyên wê çûn cem rimbazê li erdê dirêjkirî û avek li ser çavên wî kirin, da ku bi ser xwe ve bê. Xortê rimbaz çawa bi ser xwe ve hat, veciniqî û bi şaşwazî rabû ser xwe, li şûrê xwe geriya lê nedît. Carîyekê jê re got: “Ê ku şûrê te bir û tu li erdê dirêj kirî, li ba keça mîr rûniştî ye.”

Ew rimbaz jî, qaşo ji bo parastina keça wî bike mîr ew peywirdar kiri-bû û dabû gel keça xwe. Loma, çawa ku ew gotina cariyeyê bihîst, di nava metirsiyeke mezin de û bi lez berê xwe da cihê ku keça mîr lê rûniştî bû û perdeya ber wê kişand. Çawa perde kişand, dît ku herdu bi hev re rûniştî ne, goftûgo dikin. Rimbaz li kurê şah meyzand û jê re got: “Ezbenî tu ins î an cin î?” Kurê şah got: “Bende û pîsê heram, çawa tu derbasî cem ewladê mîran dibî, bêyî îzna wan?” Pê re jî rahişt şûr û berdewam kir: “Qey tu nizanî ku ez zavayê mîr im û mîr keça xwe li min mehr kiriye, da ku pê re rakevim!” Rimbaz got: “Ezbenî, heger tu ins bî, jixwe ev keçik tam li gora te ye û tu kes nikare ber te bigre.”

Rimbaz, wisa got û bi lez rabû ser xwe, berê xwe da seraya mîr, di nava hewar û hêlehêl û carewarê de. Jixwe kincên wî qetiyabûn û ax bi serî ve mabû. Gava ku mîr qîrewîra wî bihîst, jê re got: “Kurt û zelal bibêje, çi qewimiye ku tu ketiyî vî halî?” Rimbaz got: “Mîrê min, zû bi keça xwe ve here, şeytanekî cinî dest daniyê ser, xwe xistiye dirûvê dola şahan lê ez baş dizanim, ku ew yekî cinî ye.”

Gava mîr ev gotin ji devê wî bihîstin, hêrs bû û hindik mabû ku wî bikujê. Bi bertek axivî û got: “Çawa tişteki wisa hatiye serê keça min û qaşo tu parêzvanê wê bûyî!”

Mîr bi lez berê xwe da qesra keça xwe. Gava giha wir, dît ku cariyê li ser nigan e. Ji wan re got: “Çi bi serê keça min hatiye?” Cariyeyan got: “Mîrê gewre, em rûniştî bûn û hew me dît ku vî ciwanê hanê êrişî ser me kir û şûrek di destê wî de. Xortekî mîna heyvê û pir delal e, me jê re got, tu kî yî; got, ez zaveyê mîr im û wî keça xwe bi min re daye zewicandin. Ji vê pê ve, em tu tiştî derbarê wî de nizanin lê belê xwiya dike, ku kurekî sincdar û bi edeb e, lewre tu xerabî bi kesî nekiriye.”

Vê gotina cariyeyan, bêhna wî anî ber wî û hebekî aram bû; bi goşeyê perdeya li ber wan girt û hêdîka da alî, li hundir nêrî, dît ku xortekî bi şewq mîna heyvê li rex keça wî rûniştî ye û herdu bi hev re diaxivin. Xwe li ber xîreta xwe nema girt, şûre xwe kişand, perde da alî û mîna hirçekî êrişî ser wan kir.

Gava kurê şah çav lê ket, ji keçikê re got: “Ev e bavê te?” Keçikê got: “Belê.”

Li Şehrezadê bû sibe, we jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 351'EMÎN

Şehrezadê berdewam kir:

Dema keçikê got belê ev e bavê min, kurê şah çeng bû ji cihê xwe, rahişt şûrê xwe û bi dengê bilind bi ser mîr de qîriya û hewl da ku bi şûr bigire ser wî. Mîr têgihîşt ku xort ji wî çalaktir e. Şûrê xwe xist kalanê wî li ber dilê wî çû û hat hetanî ku bêhna wî fireh kir. Piştê jê re got: “Ciwano, tu ins î an cin î?” Kurê şah got: “Heger ez ne di mala te de bûma û ne ji bo xatirê keça te bûya, min ê xwîna te birijanda. Tu çawa min dixî nav şeytan û cinan û ez ji neslê şaha me, ji xwîna kesrayên ku bixwestina dê mal û milk û desthilatdariya te giş ji destê te derxistana!”

Gava mîr ew gotinên wî bihîstin, metirsîdar bû, li ser xwe tirsîya û jê re got: “Heger bi rastî jî tu kurê şahan bî, çawa ku tu dibêjî, çawa tu bêyî destûra min derbasî mala min bûyî û te namûsa min bînpê kiriye, tu ketiyî cem keça min û te ji cariyeyên wê re gotiye; ez mêrê wê me, ez pê re zewicî me? Qey tu nizanî ku niha ez gazî xulam û celadê xwe bikim, di kêlîkekê de dê te bikujin û tu kes jî nikare te ji nav lepên min rizgar bike. Lewre ez mîrekî wisa xwirt im, ku min gelek mîr û kurên wan kuştin, gava ku hatin keça min xwestin!”

Gava kurê şah ew gotinên wî bihîstin, jê re got: “Ez şaşwaz dibim, ji ber vê kêmfirasetiya te? Qey bi rastî jî te hêvî kiriye ku tu zavayekî ji min çêtir bibînî ji keça xwe re? Qey te tu kesekî din î ji min çavsortir, jêhatîtir, şanaztir, biheztiyê angos mal û milk û leşkerên wî ji yê min pirtir dîtîye?”

Mîr lê vegerand û got: “Na bi Xwedê min nedîtîye ciwanê hêja, lê min dixwest ku di hizûra çend şahidan de tu wê ji min bixwazî, da ku ez te pê re bizewicînim. Lewre heger tu bi dizî pê re bizewicî, tu dê min bihetikînî û ev li zora min diçe.”

Kurê şah got: “Te tiştêkî pir rast got, lê belê qralê gewre, heger te jî celad û xulamên xwe li ser serê min kom kirin û te ez dam kuştin, çawa ku tu dibêjî, tê xwe bi destê xwe bihetikînî di nava xelkê de. Lewre tu çi bibêjî jî, hinek bawer nakin û hinek jî dê bêbextiyê li te bikin. Bi ya min be tiştê baş ew e, ku tu bi ya min bikî.”

Mîr got: “Naxwe ka bêje, bê tu çi difikirî!” Kurê şah got: “Ez dibêjim; ya tu şûrê xwe bikişîne û bi min re dakeve meydana şer, kê kê kuşt, ê mayî layiqtir e ji textê sultanetiyê re; yan jî îşev dev ji min berde û here artêşa xwe bide amadekirin, bila hemû li himberî min dakevin meydana şer.”

Mîr got: “Ger ez artêşa xwe gişî amede bikim, hejmara wan pir e û tu ji bin ranabî. Çil hezar siwar in ji xeynî bende û xizmetkarên min, ku ew jî bi qasî artêşê ne.” Kurê şah lê vegerand û got: “Gava bû sibe, Xwedê ji min û wan re mezin e; hejmara wan çiqas be ne xema min e. Hemûyan derxîne himberî min û ji wan re bibêje vî xortî keça min ji min xwestiye bi şertê ku bi we gişan re şer bike û zora we bibe. Piştê min û wan li himberî hev

bihêlê, heger wan ez kuştim, jixwe dê şeref û namûsa te were parastin û heger min zora wan bir û ez bi ser ketim, jixwe kesê herî bêtir layiqî keça te be ez im.”

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 352'YEMÎN

Şehrezadê berdewam kir:

Gava qral ew gotin jê bihîstin, fikra wî ket serê wî û şertê wî qebûl kir, bi heyrangoriyeke bêtîmtêl. Lewre vîn û hez û angosta wî ya şerkirina li himberî artêşêke ku ji çil hezar siwarî pek dihat, pir bandor li ser kiribû. Li gel wî rûnişt hinekî bi hev re axivîn, piştî gazî xulamê xwe kir û ferman dayê ku di cî de here cem wezîrê wî û fermana wî ya amedekirina artêşê bigihînê.

Xulam çû cem wezîr, fermana mîr jê re got. Wezîr jî di cî de gazî hemû serkirdeyên artêşê kir û ferman da wan, ku di cîh de li hespên xwe siwar bibin û herin artêşê gişî bidin amadekirin, ji bo cenga giran.

Îcar em vegezin mîrê bavê keçikê. Ew jî hîna li gel kurê şah rûniştî bû û sohbeta xwe pê re berdewam dikir. Lewre zîrekî, zanîn û zimanşîrîniya wî ecibandibû û bi hunera wî sermest bûbû. Axaftina wan berdewam kir, hetanî ku şevqê lêda, bêyî ku bi xwe bihesin. Gava bû sibe, mîr rabû çû ser textê deshilatdariyê û ferman da artêşa xwe ku amade bibe. Hespêk jî da kurê şah ku hespekî herî baş bû û jê re got: “Hespê herî baş ev e!” Kurê şah lê vegezan û got: “Ne hespên te ji min re lazim in, ne jî ez wan dicibînim. Ji hespê xwe yê ku ez pê hatim vir pê ve, ez li tu hespên din siwar nabim.” Mîr got: “Kani hespê te li ku ye?” Kurê şah got: “Li ser banê qesrê ye.” Mîr got: “Li ser ku dera banê qesrê ye?” Kurik got: “Li ser qesrê.” Mîr got: “Ev nîşana ewil e ya dinîtiya te, ma çawa hesp dertên ser banan? Lê xem nake, niha ez ê derewa te derxînim holê.”

Mîr li xizmetkarên xwe zivirî û ji wan re got: “Herin ser banê qesra min binêrin û hespê wî yê li wir binin vir.” Xizmetkar rabûn ser xwe, berê xwe dan qesrê lê hemû şaşmaz û matmayî bûn li himber gotina wî kurikî û tiştê nediker serê wan; ji hev re digotin: “Wê çawa hespek bi nêrdewanan ve hilkişe ser ban û pê dakeve; ev tiştêkî ne gengaz e û di temenê xwe de me nebihîstiyê.”

Xizmetkar gihan wir û hilkişîyan ser banê qesrê, bala xwe danê, ku hespekî ji ac û ebenosê li wir e. Çawa ku çavên wan lê ketin, hemû bi hev re kenîyan û laqirdî kirin, gotin: “Li ser vî hespî dê bi artêşekê re şer bike! Bawer bikin, ev xortê hanê dîn e û qaseke din bi şûn de, hûn ê vê rastiya wî

bibinin!”

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 353'EMÎN

Şehrezadê berdewam kir:

Xizmetkarên mîr têt kenîyan, piştî rahiştin ew hespê ji ebenos û acê û li ser destan birin cem mîr û li ber wî danîn. Xelk hemû bi şaşwazî lê hatin hev û bi hûrgilî li awa û hunera çekirina wî, li zîn û rişmeya wî nêrîn. Qral jî bi heman hawayî lê nêrî, piştî ku kurê şah re got: “Ciwano, gelo hespa te ev e?” Kurik got: “Belê mîrê hêja, ev e hespa min û qasek bi şûn de tu yê hunerên wî yên ecêb bibîn!” Mîr got: “Hespa xwe bibe û lê siwar be.” Kurê şah got: “Ez lê siwar nabim hetanî ku leşker jê dûr nekevin!” Mîr ferman da leşkerên xwe ku bi qasî mesafeya tiravêtinekê jê dûr bikevin. Leşkeran fermana mîr pêk anîn. Kurê şah got: “Mîrê gewre, ez ê niha li hespa xwe siwar bibim û ez ê mîna gurê ku bikeve nava pez, artêşa te ji hev belav bikim û ziravên gişan biqetînim.” Mîr got: “Çi ji destê te bike, lewre ew jî dê li te neyên rehmê.”

Kurê şah çû li hespa xwe siwar bû. Leşker jî li himberî wî ketin rêzê û xwe ji şer re amade kirin û ji hev re gotin: “Çawa ku ev ciwan nêzikî me bibe, em ê wî bidin ber şûr û rîman? Yekî ji wan li hevalên xwe vegerand û got: “Bi Xwedê ev musîbeteke pir xerab e! Em ê çawa vî xortê delal û spehî bidin ber şûr û rîman?” Yekî dîtirkê got: “Bawer bikin hûn ê bi hêsanî nikaribin xwe bigihînin vî xortî. Heger ew bi zanebûn, wêrebûn û hunerên xwe ne bawer bûya, nediket karekî wisa.”

Piştî ku kurê şah li hespê xwe siwar bû, bişkoka firrînê firkand. Çavên her kesî li ser wî bû û gişan di nava mereqeke bêdawî de lê temaşe dikir, bê ka wê çî bike. Çawa bişkoka firrê firkand, xumexum bi hespê ket û liv û tevgerên ecêb kirin, ku tu hespan nikaribû bikira. Pêre jî hundirê wê tijî ba bû û hêdî hêdî bi hewa ket, firriya.

Mîr ku matmayî lê dinêrî, çawa dît ku hesp bi hewa ket, bi ser leşkerên xwe de qîriya û got: “Lê bidin berî ku ji nav lepên we bifilite!” Wezîr û alîkarên wî lê vegeandin û gotin: “Mîrê me yê bextewar, em çawa xwe bigihînin teyrekî ku li hawa difire? Bi navê Xwedê ev mirovê hanê efsûnge-rekî xeternak bû û şikir ji Xwedê re ku tu ji nav lepê wî rizgar bûyî, bêtî ku tiştêkî bi serê te de bîne. De êdî dev jê berde û spasiya Xwedayê xwe bike, besî te ye!”

Mîr, gotinên wezîrên xwe maqûl dît û bi şûn de vegeriya qesra xwe, piştî wê dîmena firra wî hespî ku hişê wî tevlihev kiribû. Piştî çû cem keça

xwe û tiştê ku qewimî jê re vegot. Keçik pir xemgîn bû li ser çûna kurik û êşeke jandar ket nava wê, ku nema jê derket. Loma ket nav nivînê û nema rabû ser xwe.

Gava ku bavê wê çav lê ket û ew di wê rewşa xerab de dît, ew himbêz kir û ji nav çavan de ew maçî kir û jê re got: “Keça min, spasiya Xwedayê xwe bike ku em ji nav lepên wî sihîrbazî xelas kirin!” Piştî bi hûrgilî jê re dubare kir û got bê kurik çawa bi azmanan ket û firiya, çû. Lê keçikê qet guh nedida gotina wî, tenê digiriya, hêsiyê dibarandin û di nava êş û jana xwe de vedigevizî. Herî dawiyê jî keçikê di dilê xwe de ji xwe re got: “Soz û peyman be ji îro û pê de ez nema ne nan dixwim, ne jî avê vedixwim, hetanî ku ez dîsa negihêm wî!”

Mîr pir xemgîn bû li ser wê rewşa keça xwe û dilê wî tijî kul û derd bû. Lewre pir ji keça xwe hez dikir û çiqasî pê re mijûl dibû ji bo ku dilê wê xweş bike, hîn bêhtir pêve dihat girêdan û dilê wî jî hîn bêtir pê dişewitî lê nizanibû wê çi bike, çawa bike ji bo ku wê ji wê rewşê derxe.

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 354'EMÎN

Şehrezadê berdewam kir:

Îcar em mîrê bavê keçikê li wê derê bihêlin di nava xemgîniya wî de û em vegerin ser kurê şah.

Kurê şah jî gava bi hewa ket û dûrî keçikê ket, pir zû bêriya rûgeşî û spehîbûna wê kir. Jixwe dema ku bi keçikê re sohbet kiribû, navê wê, navê bavê wê û bajarê wan jî jê pirsîbû û fêr bûbû, ku ew bajar, bajarê Sana yê Yemenê bû.

Piştî firrineke dûdirêj gihîşt texma bajarê bavê xwe. Li dorê çû û hat, piştî berê xwe da qesra bavê xwe û li ser banê wê daket xwarê, hespê xwe li wir hişt û daket jêr, derbasî cem bavê xwe bû, dît ku bavê wî mehdedayî û pir xemgîn e li ser çûna wî. Loma çawa çavên wî bi kurê wî ketin, ji kêfan rimekê jî erdê bilind bû, çawa ku baskên wî çêbûbin. Ew himbêz kir bi herdu destan û têra xwe ew ramûsa, pê şa bû. Kurik jî bavê xwe re got: “Bavocan ka ew hekîmê ku hesp çêkiribû bi ku ve çû?” Bavê wî got: “Qeda Xwede bi wî û hespê wî keve û nexweska bi wê saeta çaven min pê ketin. Jixwe ew bû sebebê ku tu nebêdî bûyî û em ji hevdu veqetiyan. Lewre ji ber vî sûcê wî, ji roja çûna te ve min ew avêtîyê zindanê û hîna jî tê de ye.”

Kurê şah, çîroka xwe ji serî ve ji bavê xwe re vegot. Çawa bi ser sirên hespê vebûbû, çawa li asîmanan geryabû, çawa li Sanayê daketibû ser banê

qesra keça mîrê wê, çawa bi keçikê re axivîbû û çawa, çilo ji nav lepê bavê wê xelas bûbû, hemû jê re gotin çawa ku ta bi derziyê veke. Li dawiyê jî ji bavê xwe xwest ku wî rebenê hekîm ji zindanê berde.

Şah fermana berdana hekîm da, xulamên wî çûn ew anîn ber destê şah. Şah jî qedrê wî girt, têra wî zêr û zîv danê û ew xelat kir. Lê keça xwe nedayê. Hekîm pir hêrs bû, xeyidî û poşman bû, ku ew qencî bi şah kir, lewre pê hisiya ku kurê şah sirên firrîn û danîna hespa wî fêr bûye. Lê êdî nema tiştek bi destê wî ve dihat.

Şah ji kurê xwe re got: “Ji îro û pê de êdî qet nema nêzî wê hespê bibe kurê min! Ne lê siwar bibe û ne jî bifire, lewre tu pê ji ser hişê xwe diçî û tiştên ne li rê dikî. Divê tu bizanibî, ku heger wî mîrî bixwesta, dikaribû te bikuje, lê şensê te heyê ku hîna tu sax e.”

Bavê wî wisa digot lê kurê wî hey li wê keçikê difikirî û êşa bêrîkirina wê dikişand. Herî dawiyê nema xwe girt, rabû, çû li hespa xwe siwar bû, bişkoka firrînê xurand û hêdî hêdî bi hewa ket, firiya. Di wê navberê de bavê wî çavên xwe lê gerandin lê ew nedît. Bi lez derket ser ban, êşiya û xemgîn bû li ser çûna kurê xwe û pir poşman bû ku ew hesp ji ber kurê xwe veneşart û pêşiya çûna wî negirt. Di dilê xwe de ji xwe re got: “Bi navê Xwedê ger vê carê vegere malê. Ez ê vê hespê ji ber wî bidim alî û ez nema dihêlim ku çavên wî ji pê kevin.” Dûre dîsa vegeriya kul û kederên xwe û bêdeng bû.

Li Şehrezadê bû sibe, we jî gotinên xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 355'EMÎN

Şehrezadê berdewam kir:

Îcar em bavê wî di kederan de bihêlin û em vegerin cem kurê wî ku li ser piştê hespa xwe difiriya û ber bi bajarê Sanayê ve diçû. Çawa giha texma bajêr, berê hespa xwe da qesra keçikê û hespa xwe hêdîka li ser ban daxist erdê, ji hespê xwe peya bû û bi dizî meşiya ber bi cihê ku cara borî keçik lê dîtibû. Lê vê carê ne keçik li wir bû, ne cariyê û ne jî kesek ji xulaman li wir dît. Pir tirsîya û bi lez bi nava odeyên qesrê de çû û hat, lê geriya; di odeyeke din de lê rast hat. Keçik mehdedayî û rûzerikî bibû, di nava nivînê de pal dabû, pîrik û cariyeyên wê jî li derdorê bûn. Derbasî cem bû û silavek da wan. Çawa ku dengê wî çû keçikê, keçik di cî de çeng bû ji cihê xwe û pê ve rabû, ew himbêz kir û ramûsa.

Kurê şah ji keçikê re got: “Xatûna min, vê carê min pir bêriya te kir!” Wê jî le vegerand û got: “A ku zêdetir bêriya te kiribû ez bûm û bawer bike heger tu derengtir biketayî, ez ê bimirama.” Kurê şah got: “Xatûna min te rewşa min û bavê xwe çawa dît? Bawer bike heger ne ji bo xatirê çavên te

bûya, min ê ew bikuştâ û ew bikira îbretek ji dinyayê re. Lê belê ji bo xatire te ez ji wî hez dikim.” Keçikê got: “Tu çawa ji min dûr ketî û çawa bêyî min sebra te dihat?” Kurik got: “Gelo tu yê guhê xwe bidî gotina min û bi ya min bikî?” Keçik got: “Tu çawa bixwazî û çi ji min bixwazî, ez ê bi ya te bikim û tu carî ez li himberî te dernakevim.” Kurik got: “Bi min re were welatê min!” Keçikê got: “Ser seran û ser çavan.”

Gava ku kurê şah ev bersiva wê girt, şad û bextewar bû û bi coşeke mezin rahişt destê wê, soz û ehd û bext dayê û ew li pey xwe siwar kir, li paş xwe girêda û pê li bişkoka firrê kir, hespê xwe bi hewa xist, ew firrand. Pê re jî qîrîn û carîn bi cariyeyên keçikê ket, bazdan çûn bavê wê agahdar kirin. Ew jî bi lez û bez bazdan, derketin ser qesrê û dîtîn ku ew hespa ji ebanos bi hewa dikeve û her duyan bi xwe re dibe. Mîr pir hêrs bû bi wê dîmenê û bi hemû hêza xwe qîriya û gazî kir, got: “Ey kurê şah; tu bi xatirê Xwedêkî tu yê keça me ji dê û bavê wê veneqetînî û tu yê li me bêyî rehmê, keça me li me vegeîrînî!” Lê belê kurê şah bersiv nedayê.

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 356’EMÎN

Şehrezadê berdewam kir:

Piştî wê gaziya mîr, kurê şah wisa his kir ku keçik poşman bûyê ji ber veqetîna ji dê û bavê xwe. Jê re got: “Delala ber dîlan, sotînera hemû xortan! Heger tu poşman bûbî, ez dikarim te li dê û bavê te vegeîrinim.” Keçikê got: “Mîrzayê min; bi navê Xwedê û bi wî serê te yê delalî, yek armanca min heye, ew jî mana bi te re ye; li ku dibe bila bibe, ez dixwazim li gel te bim. Lewre hezkirina min ji te re bê sinor e û ez timî li ser te difikirim.”

Gava ku kurê şah ew gotina wê bihîst, pir kêfxweş bû û firra hespa xwe bi aramî berdewam kir, ji bo ku keçik aciz nebe. Firra xwe wisa berdewam kirin hetanî gihan hinda mergeke şîn î ku kaniyeke avê tê de hebû. Li wir, daketin erdê, xwarin, vexwarin û bêhna xwe berdan. Piştî, kurê şah dîsa li hespa xwe siwar bû, keçik jî li pişt xwe kir, ew bi xwe ve girêda û dîsa bi asîmanan ket, firra xwe berdewam kirin, hetanî ku gihan bajarê bavê wî. Li wê derê kurik pir şanaz bû û xwest ku milk û sîltanê bavê xwe bi keçikê bide naskirin. Ew li nava hinek bax û bîstanan danî, ku dê û bavê wî jî carinan li wan deran bêhna xwe derdixistin. Ew derbasî odeyekê kir, ku carinan bavê wî lê rûdinişt û hespa xwe ya ji ebenos jî li devê deriyê odeyê hişt û ji keçikê re got: “Li vê derê rûnê û bila çavên te li hespa min be jî hetanî ku ez herim û qasidekî ji te re bişînim. Lewre ez ê herim cem bavê xwe û jê re bibêjim, da ku qesrekê ji te re bide amadekirin û tu jî milkê min bibînî.”

Keçik pir kêfxweş bû, bi vê gotina wî û jê re got: “Tu çawa dixwazî wisa bike.” Lewre wê baş dizanibû, ku kesên mîna wê bi hêlehêl û dêlindêzen mezin tèn pêşwazîkirin.

Kurê şah keçik li wir hişt û meşiya, çû hetanî ku giha bajêr û çû derbasî cem bavê xwe bû. Çawa ku çavên bavê wî pê ketin, xwîn bi rûyê wî ve hat û pir kêfxweş bû bi vegera wî. Xêrhatineke tê da û bi germahî ew himbêz kir. Kurik ji bavê xwe re got: “Bavocan, ew keça mîrê Sanayê a ku min behsa wê ji te re kiribû, niha li nav bexçeyên derveyî bajêr e. Min ew anî danî wir û ez hatim te agahdar bikim, da ku tu xêliyekê amade bikî û bi dêlindêzeke mezin û bêhempa derkevi pêşwaziya wê û tu artêş û milk û mal û selteneta xwe nîşanî wê bidî.

Bavê wî kêfxweş bû bi vê gotina kurê xwe û di cî de ferman da xulamên xwe, ji bo ku amadekariyan bikin û hemû serkirdeyên artêş û dewletê agahdar bikin. Kurê wî ji rabû hemû kincên spehî, hemû zêr û zîv û dur û cewher ji qesra xwe derxistin û odeyeke ji hevrişîma kesk û sor û zer amade kir ji wê re, li gel qefleyek berbûyên ku cariyeyên hindî, romî û hebeşî ji di nav de hebûn, bi dûmeneke pir balkêş derketin rê.

Kurê şah ji bi lez ket pêşya wan, da ku berî wan xwe bigihîne wê û wê agahdar bike. Giha nav bistan, çû ew odeya ku keçik lê hiştibû, bala xwe dayê ku hespa wî ne li ber derî ye! Ket hundir, çavên xwe li wê gerand, ew jî nedît. Bi lapûşkan rûyê xwe kişand û kincên xwe qetandin, li çogên xwe da û weke dînan li nava bîstan û baxçe geriya bi hêviya ku şopeke wê bibîne. Lê tiştek nedît. Demekê bi şûn de hişê wî hat serê wî û di dilê xwe de ji xwe re got: “Min bi xwe tiştek derbarê hesp de jê re negotibû, gelo çawa razên hesp fêr bûbû û ew bi hewa xist? A rast ew e ku dibe ew hekîmê farisî yê ku hesp çêkiribû, xwestibe ku heyfê ji bavê min hilîne û hatibe hem hesp û hem jî keçik biribe!”

Di cî de çû gazî nobedarê bîstan kir û ji wan pirsî bê ka tu kes hatiye nav bîstan an na. Nobedaran gotin: “Tu kes nehatiye nav bîstên ji xeynî wî hekîmê farisî. Ew hatibû hinek gihayên sûdwar didan hev. Bi vê gotina nobedaran, kurê şah tê derxist, ku yê hespa wî û keçik biriye, ew hekîm bi xwe ye, ne kesekî din.

Bi rastî Xwedê wisa li hev anîbû ku gava kurê şah keçik li wir hiştibû û çûbû qesra bavê xwe, ew hekîmê farisî jî ji bo ku hinek gihayên derman ji nava bîstên kom bike, hatibû wir û gava ku bêhna misk û emberê kiribû, ketibû pey wê bêhna xweş û çûbû ser wê odeya ku keçik tê de, lewre ew bêhna xweş a wê bû. Gava gihabû cem xanî, hespa xwe ya ji ac û ebenosê, li ber deriyê wê odeyê dîtibû û pir kêfxweş û şa bûbû bi dîtina wê, lewre pir poşman bûbû ku ew hespa xwe dabû kurê şah û pir jî êşiyabû bi wê nêzikahiya şah û avêtina wî ya zindanê. Loma bi kêf çûbû gel hespa xwe û ew

raçav kiribû bi hûrgilî, hetanî ku dilê wî li ser hespa wî ketibû cî û dîtibû ku hespa wî tekûz e, tiştek jê ne kêma e. Lê gava xwestibû ku lê siwar bibe û here, tiştekî din hatibû bîra wî û ji xwe re gotibû: “Divê ez li hundir jî binêrim, bê ka kurê şah tiştekî din jî li vir hiştiye yan na! Piştî derbasî hundir bûbû û keçik di hundir de rûniştî dîtibû, ku mîna hevyeke li çardeyan şewq dida. Keçikê jê re gotibû: “Tu kî yî?” Wî jî gotibû: “Xatûna min ez qasidê kurê şah im, wî ez şandim vir da ku ez te bibim nav bîstaneke din ê nêzikî bajêr.” Ev gotina wî ketibû serê keçikê û wê jî bawer kiribû, pê re çûbû.

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 357'EMÎN

Şehrezadê berdewam kir:

Vêca gava ku hekîmê farişî ji keçikê re got ez hatime te bibim nav bîstaneke din û wê jî jê bawer kir, rabû ser xwe; ji hekîm re got: “Bavocan ka çi bi xwe re aniye, ku ez lê siwar bibim?” Hekîm got: “Xatûna min hespa ku tu pê hatiye li vir e, tê li wê siwar bibî.” Wê lê veğerand û got: “Ez tenê nikarim li wê hespê siwar bibim.” Hekîm beşî bi vê gotina wê re û tê derxist ku êdî wê bi ser bikeve. Jê re got: “Ez ê bi te re lê siwar bibim, keça min.” Di pey re li hespê siwar bû, keçik jî li pey xwe siwar kir û pê ve gîrêda, piştî pê li bişkoka firrê kir. Hesp tevgeriya, xummînî pê ket, pîkolyeke ecêb kir, hundirê xwe tijî ba kir, piştî bilind bû, bi hewa ket. Fira xwe berdewam kirin, hetanî ku di ser bajêr giştî re derbas bûn. Keçik şaşwaz bû, jê re got: “Kanî te digot ez qasidê kurê şah im û ez hatime te bibim cem wî?” Hekîm got: “Qeda li kurê şah keve; zilamakî nehs û bêmîrê e.” Keçik hêrs bû û got: “Tu çawa berevajî mîrzayê xwe tevdigerî û fermanên wî bi cih naynî, qey tu jê natîrsî?” Hekîm got: “Ew ne mîrzayê min e û ne tiştek, qey tu dizanî bê ez kî me?” Keçik got: “Ez tiştekî derbarê te de nizamim ji xeynî tiştê ku te ji min re got, der barê xwe de.” Wî got: “Ew tiştê ku min ji te re got, tenê ji bo ku ez te û kurê şah bixapînim. Ez poşman bûbûm li ser dana vê hespa di bin te de. Lewre min bi destê xwe ev hesp çêkiribû û kurê şah bi zora bavê xwe dest danibû ser. Niha jî min karî ez hespê xwe veğerînim û tu jî li ser. Helbet wê ev yek dilê wî jî bişewitîne, çawa ku wî jî dilê min şewitand. Ji niha pê ve jî dê nikaribe tu tiştî bike û ne jî dikare ji nû ve vê hespê bixe destê xwe. Îcar bila dilê te aram û bêhna te fireh be, lewre ez ji wî çêtir im ji bo te.”

Gava ku keçikê ev gotin ji hekîm bihîstin, şeqamek li rûyê wî xist û bi ser de qîriya, got: “Sed mixabin ne ez li cem bavê xwe mam û ne jî min karibû ez dildarê xwe bi dest xim!” Piştî giriya li ser wê rewşa xwe û hêsir barand. Lê dîsa jî ne xema hekîm bû û her wî firra xwe berdewam kir hetanî ku giha welatê Romê. Li mêrgeke bi dar û ber ku av tê re diherikî û li her

derê çayir hebû, peya bûn. Ew mêrg nêzikî bajarekî bû ku qralekî gewre li wir hebû.

Xwedê wisa li hev anîbû, ku heman rojê qralê wî bajarî jî derketibû seyd û nêçîrê û rêya xwe bi wê mêrgê xist. Gava di wir re derbas bû çavên wî li wî hekîmî û wê keçikê ketin. Hekîm, ji nişka ve hew dît ku bende û xizmetkarên qral bi ser de girtine! Ew û keçik û hespa wan girtin û hemû birin cem qralê xwe. Qral li xweşikbûna keçikê ya bêtimtêl nêrî û li wî rûyê hekîm ê bêmîrê nêrî û herdu dan ber hev, piştîre ji keçikê re got: “Xatûna min ev zîlamê hanê çiyî te ye?” Hekîm xwe avêt pêş û bersiv da, got: “Keça apê min û jina min e. Lê keçikê ew derewîn derxist dema ku got: “Qralê gewre, bawer bike ji Xwedê, ev zîlam ne min nas dike û ne jî tiştêkî min e. Rastiya mijarê ew e ku wî bi zorê ez girtime û ez anîme vir.”

Çawa ku qral ew gotin bihîstin, ferman da celadê xwe ku lê bide û wî ceza bike li ser derewa wî. Celad lê da û ew xist haletê mirinê. Lê qral nehişt ku wî bikujin û ji xizmetkarên xwe re got: “Wî bibin bajêr, bixin zindanê.” Xizmetkaran ew birin, qral jî keçik û hesp ji wî stend lê haya wî jê tune bû bê ew hespa textikî ji çî re dibe.

Em hekîm û keçikê li vir bihêlin û em vegerin ser kurê şah.

Kurê şah jî kincên rêwîtiyeke dirêj li xwe kirin û çî lazimiyên wî hebûn ji mal û milk û xwarinê, bi xwe re kar kirin û ket ser rê. Pir xemgîn û dilbiêş bû. Bi lez diçû, ji bajarekî derbasî bajarekî din dibû, bi hêviya ku şopeke wê, agahiyeke derbarê wê de bibîne û xwe bigihîne dildara xwe. Diçû ku, li hespa xwe ya ji ebenos dipirsî, lewre baş dizanibû, ku bi rêya wê hespê ince dikare xwe bigihîne dildara xwe. Ji kê re behsa hespa ji ebanos bikira, mirov giş lê behetî diman û tînedigihîştin bê çawa yekî mîna wî bi pey hespeke textikî ketiye. Demeke dirêj, wisa berdewam kir gera xwe. Gelekî geriya, pir pirsî lê tu encam negirtin. Piştîre çû bajarê bavê keçikê jî û li wir jî lê pirsî lê dîsa tu encam negirtin. Bavê keçikê pir xemgîn û dilbikûl bû, li ser keça xwe. Kurê şah, ji wir jî dîsa berê xwe da welatê Romê û li wê derê jî geriya û li keçikê pirsî.

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 358'EMÎN

Şehrezadê berdewam kir:

Li welatê Romê jî, kurê şah li pey dildara xwe çû, geriya, geh li wê geh li hespa ji ebanos pirsî. Rojêkê gava li xanekê daketibû, qefleyek tacîrên ku li hev rûniştî bûn, dît û ew jî çû li cem wan rûnişt. Li wir, dengê yekî hat wî, digot: “Dostino, min tiştêkî ecêb dîtiye lê heger ez ji we re bibêjim jî hûn

bawer nakin!” Taciran bi meraqdarî gotin: “Ew tiştê ecêb çi ye, ku te dîtiye?” Axivgêr berdewam kir û got: “Ez li filan derê, li filan bajarî bûm, min bihîst ku xelkê wê dibêje rojekê ji rojan qral û bijareyên qesrê derketine nêçîr û seyranê û dema gihane mêrgeke şîn û xweş, navberek dane gera xwe û li wê derê li zilamekî bêmîrê rast hatine, ku keçeke pir sipehî mîna heyvê pê re bûye û hespeke ji ebenosê ku ecêba herî mezin ew bûye, lewre li tu deverê hespeke din î mîna wê nîn e.” Zilamên derdorê gotin: “Qral çi bi wan kir?” Axivgêr berdewam kir û got: “Qral ji zilamên bêmîrê dipirse, dibêje ev keçik çiyî te ye, ew jî dibêje keça apê min û jina min e. Lê belê keçik wî derewîn derdixîne. Qral jî emir dide celadê xwe, lê didin û wî davêjin zindanê, lê çi bi wê hespa ebenosî tê, ez nizanîm.” Kurê şah çawa ku ev gotin ji wî tacirî bihîstin, xwe nêzikî wî kir û bi zimanekî şîrîn jê pirsî, gotin ji devê wî kişandin hetanî ku navê wî bajarî û navê qralê wê jê fêr bû.

Pir kêfa kurê şah hat gava navê wî qralî û bajarê wî ji tacir fêr bû. Û wê şevê bi dilekî aram raket. Roja din sibehê, çawa ji xew rabû, rabû ser xwe, amadekariyên xwe kirin û ket ser rê, berê xwe da wî bajarî û bê navber meşîya heta ku xwe gihand wir. Dema ku xwest derbasî bajêr bibe, dergevanan ew girtin, da ku wî derxînin raberî qral, ji bo ku qral li rewşa wî, li sebeba hatina wî û hunerên ku ji destên wî tên bipirse. Lewre adeta wî qralî bû ku çi xerîbê bihata bajarê wan, rewşa wî û hunerên wî jê bipirsiya. Lê belê ji ber kurê şah ber evarê gihabû wir û ne ji adeta qralê wî bajarî bû ku di wê saetê de kesî qebûl bike, dergevanan ew birin zindanê, da ku li wir wî ragirin, hetanî sibehê. Lê gava ku zindanciyan husn û cemala wî dîtin, dil jê nehatin ku wî bixin zindanê, li derveyî zindanê li gel xwe dan rûniştandin û pê re sohbet kirin. Di wê navberê de şîva wan hat, hemûçikan bi hev re şîv xwarin. Piştî gava sohbetê xwe berdewam kirin, zindanciyan jê re gotin: “Tu ji kîjan welatî yî?” Kurê şah got: “Ez ji welatê Farisan im, welatê kesrayan!” Bi wê gotina wî kenîyan û hinekan ji wan got: “Ey kesrawiyê Faris! Me gelek gotin û çîrok ji xelkê bihîstine û rewşa gelek mirovan dîtiye lê me tu kes mîna vî kesrawiyê xwe yê di zindanê de derewîn nedîtiye!” Zindanciyekî din li hevalê xwe zêde kir û got: “Tu kes mîna wî bêmîrê û rûnexweşik jî nîn e.”

Kurê şah got: “We çi derew di gotina wî de dîtiye?” Zindanciyan gotin: “Dibêje qaşo ez hekîm im, qralê me ew dîtibû, dema derketibû nêçîr û seyranê. Gava ew li nav mêrgê dibûn, keçeke pir bedew, spehî û lihevhatî jî pê re bûye li gel hespeke ji ebenosê reş ku ew jî pir xweşik û bêtîmtêl bûye. Keçik niha li gel qral e, lewre qral jê hez dike. Lê keçik din e û heger kesrawî bi rastî jî hekîm bûya, dê ew derman bikira û ji nexweşiya wê rizgar bikira. Niha qral hewl dide wê derman bike û wê ji wê nexweşiya wê rizgar bike. Hespê ji ebenos jî di xizaneyê qral de ye. Lê zilamê bêmîrê û derewîn li vir e, li cem me di zindanê de ye. Her ku şev bi ser de tê, digirî, li xwe dixê û nahêle em rakevin.”

Li Şhrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 359'EMÎN

Şhrezadê berdewam kir:

Gava peywirdarên zindanê ew agahiyên der barê hekîmê Farisî de dan kurê şah, hewiyek pê re çêbû û di serê xwe de planek saz kir ji bo rizgarkirina dildara xwe. Îcar gava peywirdarên ewlêhiyê xwestin rakevin, kurê şah birin, xistin zindanê û derî li ser girtin. Di wir de dengê mirovê hekîm hat wî, ku bi Farisî dikir wêlewêl, li xwe dida û digot: “Xwedê ji min stend û min ev felaket bi serê xwe de anî! Hem keçîk ji destê min çû, ji ber bêtedbîritiya min û hem jî min mala wî rebenê kurê şah xera kir. Hemû ji ber çavbirçîbûna min bû; tiştêkî ku ez layiqî wî bûm, min ew ji xwe re dixwest û encam jî ew bû, ku ez ketim zindanê.”

Gava kurê şah ev gotinên wî bihîstin, bi Farisî gazî wî kir û got: “Gelo hetanî kengî tu yê wisa bigirî û li xwe bidî, xwe perîşan bikî; gelo ew tiştê bi serê te de hatiye, bi serê tu kesî de nehatiye?” Dema ku hekîm ev gotin bihîstin, wensa wî bi axivgêr re hat; rewşa xwe jê re vegot û gilî û gazinên xwe pê kirin; bêhna xwe berda.

Bi sibehê re, dergevanan, kurê şah ji zindanê derxistin û ew birin cem qralê xwe û jê re gotin ku ew berêvarkî û di demeke neguncav de derbasî bajar bûbû, loma dernexistibûn hizûrê û ew hiştibûn sibehê. Qral jê pirsî û got: “Tu ji kîjan welatî yî, navê te çi ye û pişeya te çi ye û ji bo çi tu hatiya welatê me?” Kurê şah got: “Navê min bi Farisî Herce ye, welatê min jî Bîladê Faris e û pişeya min jî bijîşkî ye, ez zanist im; ez dîn û nexweşan derman dikim, loma ez li her derê digêrim, da ku ez tiştin din jî fêr bibim û heger min nexweşek jî dît, ez wî derman dikim. Ev jî karê min e.”

Qral, bi vê gotina wî pir kêfxweş bû û bi kelecânî jê re got: “Ey hekîm û zanayê hêja, tu tam di wextê xwe de hatiya vê derê.” Di pey re agahiyên berfireh der barê keçîkê de dan wî û berdewam kir, got: “Vêca heger tu wê derman bikî û tu wê ji nexweşiya wê xelas bikî, tu çi ji min dixwazî, ez ê wî bidim te.”

Gava Herce ev gotinên qral bihîstin, got: “Xwedê temenê qralê me dirêjtir bike Rebî! Gelo hûn dikarin bi hûrgilî ji min re vebêjin, bê we çawa keçîk û hespa ebenosî û hekîmê farisî girtin û ji kengî ve keçîk dîn bûye û elametên dînbûna wê çi ne?”

Qral, çîroka her sêyan ji serî hetanî binî jê re vegot û li dawiyê jî lê zedekir got, hekîm jî niha di zindanê de ye. Herce got: “Qralê gewre, gelo we çi bi hespê kir?” Qral got: “Di odeyeke qesrê de ye.”

Herceyê kurê şah di dilê xwe de got: “A baş ew e, ku di serî de ez li hesp binêrim. Heger xera nebûbe û weke berê saxlem be, jixwe rizgarkirina keçikê hêsan e û dê plana min pêk were; na heger xera bûbe, wê çaxê divê ez rêyeke din ji xwe re biafirînim.” Li qral zivirî û jê re got: “Qralê gewre, divê ez li hespê binêrim di serî de, belkî ez şopeke dermanê wê bibînim.” Qral got: “Li ser seran, li ser çavan, bila be hekîmê zana.” Qral di cî de rabû, bi destê wî girt û ew bir cem hespê ebenos. Kurê şah Herce li dora hespê çû û hat, ew raçav kir û dît ku mîna berê saxlem e, tu kêmanî tê de nîn e. Bi vê yekê kêfxweş bû û got: “Xwedê temenê qralê me zêdetir bike, niha jî ez dixwazim derbasî cem keçika dîn bibim, da ku ez rewşa wê binêrim. Ez hêvî dikim, ku dê başbûna wê li ser destê min be.”

Piştire, qral ew hespê ebenosî di cihê wî de hişt û bi destê Herce girt, ew bi xwe re bir cihê ku keçik tê de dihat ragirtin. Gava derbasî cem wê bûn, dîtin ku mîna her carê bi qîrewîr e û gotinan li bin guhe hev dixê, tevlihev dike, ya rast tu dînîti bi keçikê re tune bû lê belê ji bo ku tu kes nêzikî wê nebe, xwe li dînîtiyê danîbû. Gava kurê şah Herce ew di wî halî de dît, jê re got: “Mereqan meke gula cîhanê, ez ê te derman bikim!” Û xwe nêzikî wê kir, bi zimanekî şîrîn hewl da ku li ber dilê wê here û bê û gava fersend dît jî, xwe pê da naskirin. Ji kêfan qîrîn bi keçikê ket û ji ser hişê xwe çû. Qral got belkî ji tirsan wisa lê hatibe, hebek metirsî pê re çêbû lê belê kurê şah Herce, devê xwe bir ber guhê wê û jê re got: “Gula cîhanê, li min were rehmê û min nede kuştin bi destê vî qralî. Hebekî giran û sebirkeş be, ez ê her tiştî çareser bikim!” Keçikê got: “Ser seran û ser çavan.”

Piştire kurê şah ji cem derket û çû cem qral bi dilxweşî jê re got: “Ey qralê bextewar! Bi xêra te min nexweşîya wê tesbît kir û min dermanê wê nas kir. Min ew derman dayê û niha tu dikarî derbasî cem wê bibî û bi zimanekî şîrîn pê re biaxivî û sozin xweş bide wê, da ku piştire li gora dilê te tevbigere û hemû armancên te pêk bînin.”

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bedeng bû.

ŞEVA 360'EMÎN

Şehrezadê berdewam kir:

Gava ku kurê şah xwe kir hekîm, ket odeya keçikê, mesele pê da fêmkirin û derket, ji qral re got: “Bikeve cem wê û bi zimanekî şîrîn pê re biaxive, dê hemû daxwazên te pêk bînin.” Qral derbasî cem wê bû. Çawa ku keçikê qral dît, serê xwe danî, bejna xwe li ber wî tewand, erda ber nigê wî maçî kir û bixêrhatina wî kir. Qral pir kêfxweş bû bi vê helwesta wê ya nû. Ferman da carîye û xulaman bo ku xizmeta wê baş bikin û wê bibin hemamê, bişon da ku kincin spehî û zîneteke giranbuha lê bikin.

Cariyeyan ew birin hemamê, piştire kincên şahbanûyan lê kirin û ger-daniyeke ji cewheran xistin stûyê wê. Êdî tam bûbû heyveke li çerdehan! Di pey re ew birin derbasî cem qral kirin. Qral pir kêfxweş û bextewar bû bi vê rewşa wê ya nû û ji kurê şah re got: “Ev giş bi xêra te bû, Xwedê tenduristiyê bide te û temenê te dirêj bike ya Rebî!” Kurê şah got: “Îcar ji bo ku keçik bi temamî ji wê nexweşiya xwe rizgar bibe û vegere kemala xwe ya berê, divê tu bi hemû serkirde û artêş û mezinên dewletê ve derkevi wê devera ku te ew lê ditîbû- û bila ew hespa ji ebenosê jî pê re be- da ku li wê derê ez wî cinê wê bigirim, destgîr bikim û wî bikujim, bo ku nikaribe careke din lê vegere.” Qral got: “Ser seran û ser çavan, tu çawa dixwazî, ez ê wisa bikim.”

Qral di cî de rabû ser xwe ferman da hemû serkirdeyên dewletê, hemû artêş û karmendan û ew jî li hespa xwe siwar bû, berê xwe da wê mîrga ku keçik û hekimê farisî lê ditîbûn. Hespa ebenosê jî bi xwe re anî wir û keçik jî li gel wî, bêyî ku bizanibe wê çi bibe.

Gava gihan wê mîrgê, kurê şah ji qral re got: “Bila keçik û hespa ebenosî bi qasî çûna tîrekê dûrî qral û leşkeran be.” Îca dûra ji qral re jî got: “Ezbenî bi izna te be, ez ê li hespa ebenosî siwar bibim, keçikê jî li pey xwe bikim. Gava ez wisa bikim, belkî hesp hebekî pîkoliyê bike û bi rê ve here hetanî bigihîje cem te, dema ku hesp giha cem te, dê her tişt bi dawî bibe û wê dêlindêz jî bi dawî bibe.”

Qral beşîşî û pir kêfxweş bû bi vê agahdariya wî û bi bêsebrî ma li benda destpêkirina merasîmê.

Kurê şah li hespa ebenosî siwar bû û keçik jî li pey xwe siwar kir, ew baş girêda, asê kir. Qral û artêşa wî jî bi mereq temaşe dikirin. Herî dawiyê kurê şah bişkoka milê çepê firkand, xuşşîn bi hepê ket û ew bi hewa xistin, firiya. Qral û leşkeran jî lê temaşe kirin, hetanî ku ji ber çavan wenda bûn. Bêtirî nîv rojê li heviya vegera wan man lê bêfêde bû, ne ew vegeriyan ne jî hêvî bi wî re ma. Pir poşman bû li ser çûna wê keçikê û êşeke mezin ket dilê wî. Lê êdî tişteki ku bikira nemabû. Leşker û serkirdeyên xwe dan dû xwe û şûnde vegeriya bajarê xwe.

Îcar em vegerin cem kurê şah. Ewî ji berê hespa xwe da bajarê bavê xwe, di nava kêf û şahiyê bêtîmêl de. Hespa wî baş difiriya û di demeke kurt de xwe gihandin wir. Li ser banê qesra bavê xwe daket, keçik xist cihekî ewle di qesrê de û di cî de jî çû cem dê û bavê xwe, bo ku wan agahdar bike û mizgîniya xêrê bide wan. Çawa ku derbasî cem wan bû û çav lê ketin, ji kêfan bask bi wan ve çêbûn! Kurik jî bi bîrîkirin ew himbêz kirin û ji wan re got, min keçik jî bi xwe re aniye.

Îcar em careke din vegerin cem qralê welatê Romê. Ew jî ji roja çûna keçikê ve, li goşeyekî qesra xwe û di nava êşên bîrîkirin û bêhêvîtiyê me-

zin de, li ber xwe dida. Wezîr û gizîrên wî derbasî cem wî bûn û jê re gotin: “Ê ku keçîk bi xwe re bir, efsûngerekî bêwîjdan bû û şîkir ji Xwedê re ku tu jê xelas bûyî. Heger na, dibû ku gelek fen û fitên din jî bi serê te de bînya û malik li te xera bikira.”

Wêzîran axaftina xwe berdewam kirin hetanî ku dilê qralê xwe xweş kirin û ew ji wê tengayê rizgar kirin. Em qralê Romê li cihê wî bihêlin û em dîsa vegerin cem kurê şah.

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 361'EMÎN

Şehrezadê berdewam kir:

Kurê şah jî xêr li ser hemû xelkê bajêr belav kirin û mehekê sax, xwarin û vexwarin danîn û welîme li dar xistin, kêf û şahî geş kirin û bi daweteke mezin, bi keçîkê re zewicî; bi miradê xwe şa bû.

Bavê wî jî vê carê tevdîreke baş girt, hespa ebenos şikand û ew perçe perçe kir, da ku careke din nema were ser hev û neşixule. Piştî nameyek ji bavê keçîkê re nivîsand û jê re got, ku keça te di rewşeke pir baş de ye û bi kurê wî re zewiciye. Ew name jî li gel qefleyek diyarî da qasidekî û jê re şand.

Gava qasid li gel wan diyariyên giranbuha giha Sanayê û name radestî mîr kir, wî jî çawa ku name xwend û mizgîniya wê xebera xweş der barê keça xwe de girt, bêhna wî hat ber wî, kul û derdên xwe avêtin û bi kêfxweşîyeke mezin qasidê şah pêşwazî kir û qedrê wî girt, bi xelatkirin û pêşkêşkirina gelek diyariyên giranbuha. Piştî diyariyeke pir biqîmet jî ji bo zavayê xwe amade kir û bi qasidê wî re jê re şand.

Qasid vegeriya cem kurê şah û agahiyên kêfxweşî û şabûna bavê keçîkê bi xebera zewaca wê jê re ragihand û ew jî bi wê yekê pir kêfxweş bû û aram bû.

Mîrê Sanayê, êdî her sal nameyek ji zavayê xwe re dinivîsand û ya-dîgarî jê re dişandin. Wî jî ew bê bersiv nedihîşt. Piştî bavê kurik çû ber dilovaniya Xwedê û êdî ew li şûna bavê xwe bû şah. Bi dadweriyeke baş û rêbazeke kişîner gelê xwe bi rê ve bir, gel jî serweriya wî pejirand û taet jê re kir. Bi vî hawayî, di nava jiyaneke xweş û bextewar de berdewam kirin, hetanî ku xerabkarê xweşiyê, dijminê qenciyê û fesadê civatê, xerabkarê qesr û qonaxan û avakarê tîrb û goran li wan vegeriya! Subhan ji xwedanê herdu dinyayan re!

(ÇÎROKA MIROVÊ MIFLIS Û KODIKA BER KÛÇIK)

Şehrezadê ji Şehreyarê gewre re dest bi çîrokek din kir û got:

Tê gotin ku mirovek hebû deyn û meyn lê pir bûn û halê wî pir nexweş bû, dinya lê teng bibû, nema zanibû wê çawa debara xwe bike. Rabû dev ji malbat û kes û karên xwe berda û bi çolan ket; meşiya û hey meşiya hetanî ku giha bajarekî ku sûrên wê pir bilind û avahiyên wê pir bilind bûn. Bi dilekî şikestî û bi bedeneke jihevketî derbasî bajêr bû, ku pir tî û birçî bûbû. Di hinek kolanên bajêr re derbas bû, li qefleyek mirovên maqûl rast hat ku bi hêlekê de diçûn. Wî jî da dû wan û çû hetanî ku ketin maleke mezin, mîna mala melîkan. Ew jî bi wan re derbas bû û çûn hetanî gihan cem mirovekî biheybet û gewre, ku di zîkê malê de rûniştî bû û dora wî tijî xulam û xizmetkar bûn. Zilam bi dirûvê xwe dişîbiya wezîran. Çawa ku ew dîtîn, bi wan ve rabû, xêrhatineke germ di wan da, qedr û qîmetê wan girt û ew derbasî cem xwe kirin. Mirovê birçî û deyndar jî, bi tîrs û xof bû, nizanibû wê xwe bide kîjan aliyê, ji tîrsan xwe li dawiyê hişt û çû bi tena serê xwe, li cihekî dûrî wan rûnişt, ji bo ku kes wî nebîne. Di wê navberê de zilamekî din jî derbasî hundir bû, ku çend tajî pê re bûn. Li ser piştâ tajiyan hevrişimekî rengîn, di stûyên wan de jî toqên ji zêr û zincîrên ji zîv hebûn. Zilam, her tajiyeke bi cihekî ve girêda û çû. Qasek bi şûn de dîsa vegeriya û her tajiyeke, kodikek ji zêr da ber wan, ku xwarinin pir xweş tê de hebûn. Piştî dev ji wan berda û dîsa bi şûn de çû.

Mirovê birçî û deyndar jî dilê xwe bijandê, girêza wî herikî, dixwest ku xwe nêzikî tajiyeke ji wan bike û here pê re bixwe. Lê hem ditirsiya û hem jî fedî dikir, ku hinek bên erza wî bişkênin û nehêlin ku bi kûçik re bixwe. Di wê navberê de tajiyeke ji wan tajiyan lê nêrî û wek ku Xwedê teala ew ji rewşa wî agahdar kiribe, nexwar û îşaret da mirovê deyndar, bo ku here ser sêniyê. Wî jî bi ya tajî kir, çû ser kodikê, têr xwar û bi şûn de vekîşiya. Tajiyeke dîsa îşaret da wî, çawa ku jê re bibêje kodikê jî bi xwe re bibe û xwarina tê de maye jî bixwe û kodik ber bi wî ve dehfand. Zilam jî rahişt kodika zêr û ji malê derket, bêyî ku kes bide dû wî.

Piştî çû bajarekî din û ew kodika zêr firot û bi heqê wê gelek caw û hevrişim û amûrên jiyanî kîrîn, karwanekî ticaretê li dar xist û bi şûn de vegeriya bajarê xwe.

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 362'YEMÎN

Şehrezadê berdewam kir:

Zilam barê xwe yê ticaretê li wir firot, deynê xwe dan, pêdiviyên xwe pêk anîn û bi diravên mayîn jî ticareteke nû ji xwe re li dar xist. Mal û milkên wî pir bûn, hal û wextê wî xweş bû û demeke dirêj di nava xweşî û şahiyê de jiya li welatê xwe.

Rojekê ji xwe re got: “Misoger divê ez herim welatê xwediyê wê kodika zêrîn û ez diyariyeke pir baş û giranbuha jê re bibim, ku layiqî wî be û ez heqê wê kodika zêr jî bidim wî.” Piştî rabû ser xwe, diyariyeke baş jê re kirî û heqê kodika zêrîn jî bi xwe re bir û çû, kete ser rê. Gihîşt bajêr û xwest ku wî zilamî bibînê. Di heman kolanê re meşiya û çû cihê wê qonaxa berê, li wê derê tu tişt tunebû ji xeynî xaniyekî hilweşiyayî û kavilekî xerabe ku ji mişk û maran re bûbû war û pêjna însanan jê nedihat. Dilê wî bi êşeke dijwar lerizî û qolinc ket nava wî. Bi dilgiranî ev çend riste xwendin:

Goşeyên xênî vala bûne ji xwediyar
Çawa ku dil jî vala bûne ji zanyaran
Nema nas dikin daristan van xezalan
Ne jî xezal nas dike van şindaran

Hem digot hem jî bi awirin hestiyar û xemgîn şopên li ser dîwarên herifî dişopand û gav bi gav li pey şopên destên qederê yên wêranker diçû, da ku agahekê bigire ji dostin ku şop jî li dû xwe nehiştibûn. Tam di wê kêliyê de, çavên wî li zilamekî perîşan ket ku dilê keviran li ser diêşiya. Ber bi wî ve çû û jê re got: “Ciwamêro, gelo xwediyê vê derê bi ku ve çûye û felekê çi bi serê wî kiriye? Ka ew hêwan û dîwanên mêvanan, kanî ew stêrkên wî yên bîroqankî bi ku ve çûne û çi bûyer di serê vê qesra wî re derbas bûnê, ku ewqasî herifiye û ji çend kavilen dîwaran pê ve tiştê li dû nemaye?” Zilam kesereke kûr kişand û got: “Ew zilamê hanê ev e, ev ê ku niha tu wî li himberî xwe dibînî; ev ê ku di nava ax û waxan de bi te re diaxive! Gotineke pêxemberê me heye dibêje: ‘Xwedayê gewre tu tiştî ji ser rûyê vê dinyayê ranake, bêtî ku tiştêkî din li dewsa wî deyne!’ Ew gotin îbret e ji bo kesên ku li pey wî diçin û bi nûra wî rêya xwe ronî dikin. Vêca heger pîrsa te ji bo zanîna sebeba wî tiştê ku bi serê min de hatiye be, tu ecêb di vî karî de nîn in; ez xwediyê ve mala kavilî me, ez im ê ku ava kir weke qesra wezîran û stêrk tê de bi cî kirin; odayên mêvanan tê de vekerin, carîye û xulam li hev kom kirin û bi elba mezin li ser her kesî bela kir, ji bo ku ken kêmbû nebe ji ser lêvên her kesî. Lê belê felek li min hat xezabê û her tişt berevajî kir, mal û milk qediya, carîye û xulam çûn, qesr û bîna wêran bûn û ez jî hatim vî halê niha! Lê belê misoger sebeb ji vê pîrsa te re heye, de êdî dev ji ecêbmayînê berde û wê ji min re bibêje!”

Zilam, di nava êş û azarê de çîroka xwe jê re got û li dawiyê jî lê zêde kir: “Min diyareke baş û heqê kodika zêrîn a ku min biribû ji te re aniye, lewre bi xêra wê ez bi ser xwe ve hatim û bûm mirovekî maldar; ew bû sebeba ku çola min vegere daristaneke bi av û şînkahî; ew bû sebeba reva kul

û derdên min û vegera şahî û bextewariyê li daristana dilê min!”

Zilamê pejmûrde serê xwe hejand, giriya, axîn û nalîn pê ket û got: “Xwiyaye ku tu mirovekî dîn î, lewre tu kes ê bîaqil tiştêkî wisa nake! Çawa dê tajiyeke min kodikeke zêrîn pêşkêşî te bike û ez ê jî bi xêra wî li xwe vegerim! Tiştê ecêb ew e, ku ez bi xêra comerdîya kûçîkê xwe ji tengahiyê rizgar bibim! Lew re ez di tengahîyeke ewqasî zor de me, ku nayê wesifdan û qenciya ku tajiye min bi te kiriye, niha weke Xocê Xizir bi min ve hat. De êdî bawer bike ku bi qasî serê derziyê tiştêkî min negihaye te, lê qenciya mezin tu bi min dikî! De êdî bi xêr û selamet bi rêya xwe de here, destê Xwedê li piştê te be!” Zilam çû nigên wî maçî kirin, pesnê wî da û bi şûn de zivirî, çû. Di çûnê de jî ev riste bi lêv kirin:

Seh mirov giş bi hev re çûn

Silav li ser hemû mirov û sehan

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 363'YEMÎN

(ÇÎROKA LEŞKER Î DIZ Î WALIYÊ ÎSKENDERIYÊ)

Şehrezadê berdewam kir:

Tê gotin ku waliyekî Îskenderiyê hebû bi navê Husamedîn. Rojekê gava walî li meqamê xwe bû, leşkerê hat cem wî, jê re got: “Ezbenî vê şevê ez derbasî vî bajarî bûm û ez çûm filan xanê razam hetanî nivê şevê, gava ez şiyar bûm di wê demê de, min bala xwe dayê ku xurcika min hatiye çirandin û tûrikê min ê ku hezar dînar tê de bû, hatiye dizîn.”

Hîna ku leşker gotinên xwe kuta nekiribûn, walî giliyê wî qebûl kir û serkirdeyên xwe peywirdar kirin, ew şandin wê xana ku leşker behsa wê dikir û çî kesên di xanê de hebûn destgîr kirin û ew xistin zindanê hetanî roja dîtirkê, roja din ew anîn pêşberî walî. Leşkerê xwediyê tûrikê zêran jî li wir amade bû. Amûrên diziyê jî anîn wir û mehkeme li dar xistin, ji bo ku ceza li wan bibire. Tam di wê kêliyê de zilamek hat, xwe da pêş hetanî ku giha cem walî û zilamê leşker, li wê derê qîriya û got: “Waliyê birûmet, ev mirovên hanê hemû bêrî ne ji vî sûcî. Lewre yê ku ew dirav dizîne ez im û tûrikê dînanan jî va ye bi min re ye, min ew ji xurcika leşker derxistibû.” Pê re jî tûrik ji ber xwe derxist û da destê walî. Walî ji leşker re got: “Ê te tu malê xwe bigire û tu doza te bi van mirovan re nema!” Hemû kesên li wir kêfxweş bûn û pesnê wî zilamê diz dan.

Zilamê diz ji walî re got: “Emîrê gewre, ez bi vîna xwe hatim cem te

û min tûrikê dînanan da te. Lê marîfeta mezin ew e, ka çawa min cara duyemîn ev tûrik ji leşker dizî?” Walî got: “Çawa?” Zilamê diz got: “Emîrê hêja, ez li cihê xwe bûm, li sûka serafan; min bala xwe dayê ku ev leşker ev zêr serifandin û xistin tûrikê xwe. Min jî da dû wî hetanî ku ket sikake teng. Lê dîsa jî min keys lê nanî ku ez tûrikê wî jê bidizim. Dîsa jî min dev jê berneda û ez li pey wî çûm ji bajarokekî heta bajarokekî din. Di rê de jî min gelek fen û fit lê kirin. Lê min a xwe tê de nedît. Gava derbasî vî bajarî bû jî, ez li pey wî hatim hetanî ku derbasî xanê bû. Li xanê, ez jî li gel wî peya bûm, min ew raçav kir hetanî ku raket û xurexur pê ket. Ez hêdîka çûm gel wî, min bi kêrê xurcika wî qetand û ev tûrik jî bi vî hawayî jê derxist.”

Diz awayê diziya xwe got û destê xwe dirêjî tûrik kir, ew ji destê esker derxist, bi liva destan awayê diziya xwe nîşanî walî da û xwe bi şûn de kişand. Mirovan gişan digotin belkî şiklê diziya xwe nîşanî wan dide. Lê wî bi lez bazda û xwe avêt nav birka avê, walî li derdora xwe qîriya û got: “Zû bi pey bikevin û wî bigirin!” Lê hetanî ku wan kincên xwe ji xwe kirin û bi pey wî xwe avêtin birkê, dizê jêhatî zû tevgeriya û ji ber çavan wenda bû. Pir lê geriyan lê ew nedît, lewre sikakên Îskenderiyê hemû bi hev ve giredayî ne. Xelk hemû ji hev belav bûn, bêyî ku dizê jêhatî bigirin.

Walî ji leşker re got: “Tu mafê te li cem kesî nemaye, lewre te dizê xwe nas kir û te tûrikê xwe yê zêran jî teslîm girt lê te malê xwe neparast û ev jî sûcê te ye.”

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 364'EMÎN

(ÇÎROKA HERSÊ WALIYAN LI BER DESTÊ MELÎK NASIR)

Şehrezadê dest bi çîrokek din kir:

Tê gotin ku rojekê ji rojan Melîk Nasir her sê waliyên Qahîre, Bûlaq û Misra Kevn li cem xwe kom kirin û ji wan re got: “Ez ji her yekî ji we dixwazim ku di seranserê dema walîtiya we de tiştê herî erjeng û balkêş ê ku bi serê we de hatiye, hûn ji min re bibêjin.” Wan jî got: “Ser seran û ser çavan.”

Waliyê Qahîreyê dest pê kir û got:

Siltanê gewre, di dema walîtiya min gişî de, tiştê herî balkêş ê ku bi serê min de hat ev e: Li bajêr, du heb şahidên mîna hev hebûn û di hemû dozên kuştin û lêdanê de şahdebûn dikirin. Herduyan jî pir vedixwarin û ji meyê hez dikirin. Min fikir nedikir, min nikaribû dolabek li serê wan bigeranda

û tola xwe ji wan hilaniya. Rojekê min şîret li hemû meyfiroş, fêkîfiroş, mûmfiroş û barkêşan kir û min ji wan xwest ku di derbarê herdu şahidan de, min agahdar bikin û min got: “Li ku dibin bila bibin, tenê an bi hev re bin, kîjanî ji wan şerabek, meyek an fêkiyeke ku mey pê çêdibe kirî, divê hûn min agahdar bikin!” Wan jî gotin: “Ser seran û ser çavan.”

Rojekê zilamek ji wan hat cem min û got: “Waliyê min, îşev herdu şahid li filan derê ne, li mala filan kesî ne û bê navber meyê vedixwin li wir. Ez rabûm, min kincên xwe guhertin, xwe xist qalibê kesekî ji rêzê û min xulamê xwe jî da kêleka xwe û bi tena serê xwe min berê xwe da cem wan. Ez hatim devê deriyê malê, min li derî da, cariyekê derî ji min re vekir û got: “Tu kî yî?” Bêyî ku ez bersivê bidim, ez derbasî hundir bûm. Min dît ku herdu şahid li gel xwediyê malê rûniştî ne û ber wan tijî kûzên meyê ne. Çawa ku ez dîtîm, ji ber min rabûn û bi rêzdarî ez pêşwazî kirim û ez dam rûniştandin, di hundirê odê de. Silavdayîneke germ dan min û gotin: “Tu ser seran hatî, ser çavan hatî mêvanê ezîz û hêja.” Ne tirs bi wan re hebû ne jî tevlihevî. Pir aram û dîlxweş bûn, mîna ku dostekî wan çûbe cem wan! Piştî xwediyê malê rabû ser xwe, ji hundir derket, bi qasî saetekê nebedî bû û vegeriya li gel sêsed dînarê ku di destê wî de bûn. Herdu şahidan bêtirs gotin: “Waliyê me yê gewre, helbet tu dikarî me bihetikînin, lewre te her tişt bi çavên serê xwe dîtiye. Lê belê ev yek, tenê dê serêşekê ji te re bîne. Ya baş tu vî sêsed dînarî bigirî û tu me bisitirînî, lewre ‘Settar’ navê Xwedê ye û Xwedê ji sittarkaran hez dike; dê xêra te jî binivîsîne.”

Min jî di dilê xwe de got: “Van zêran bigire û vê carê wan bisitirîne, heger careke din te ew girtin jî, wan efû neke!” Bi wî hawayî, min tamakarî kir, ew dînar girtin û min dev ji wan berda, ez bi şûn de çûm. Tu kesî din jî bi wan nehesiya. Roja dîtirkê min dît qasidê qadî hatiye cem min, ji min re dibêje: “Waliyê rêzdar, were bi qadî re biaxive, camêr gazî te dike, dibêje; bila were dadgehê.”

Ez rabûm, çûm cem qadî bêyî ku hayê min jê hebe bê ji bo çi gazî min dike. Lê gava ez derbasî cem bûm, min dît herdu şahid li cem rûniştî ne, xwediyê malê jî li kêleka wan bû. Di hizûra qadî de xwediyê malê rabû ser xwe û angaşt kir ku sêsed dînarê zêr daye min. Min jî nizanibû ez çi bibêjim ji xeynî înkarkirinê. Lê qadî destnivîsek derxist ku herdu şahid tê de şahdebûnê li ser min didin, ku min sêsed dînar ji destê xwediyê malê girtiye. Bi şahdebûna herduyan sûc li serê min hat teqezkirin û qadî biryar li ser min da ku ez sêsed dînarî bidim xwediyê malê. Ez mecbûr mam her sêsed dînarî bidim, nexwe ez nikaribûm ji wir derketima. Ez pir poşman bûm ku min ew sûcê wan veşart û tola xwe ji wan hilneda. Lewre ez ji wan pir qehirim. Bi hêrs û di nava şermeke mezin de, ez ji wir derketim. Di dema walîtiya min de, tiştê herî balkêş ku bi serê min de hat, ev bû!

Waliyê Bûlaqê rabû ser xwe û got: Sûltanê min ê gewre, yê min jî tiştê herî erjeng ê ku bi serê min de hat ew bû ku carekê sêsed hezar dînar deynê min hebû. Çi tiştê di destê min de hebû min ew firotin lê diravên ku ji gişî hat, incex sed hezar dînar derket û ez jî heyirî mam, min nizanibû ez ê çî bikim, çawa bikim.

Di nava wê rewşa kambax de, şevêkê jî şevan yekî li deriyê min xist. Min ji xulama re got, rabin li derî binêrin. Xulamêkî çû derî vekir û hat. Lê rengê wî hatibû guhertin û çogên wî şikestibûn. Min got: “Çi bi te hatiye?” Got: “Zilamekî tazî, kêrek di ber piştê wî de û şûrek di destê wî de li ber derî ye.” Ez derketim, min dît ku mirovên şûrkêş û tazî ne, çawa ku xulamê min gotibû. Min ji wan re got: “Hûn çî dixwazin?” Gotin: “Em diz in û me îşev dizîtiyeke baş kiriye, malekî giran bi dest xistiye, em dixwazin bi vî malî tu serê xwe ji beleyê derxîni û deynê xwe pê bidî.” Min got: “Ka diziya we kanî?” Çûn sindoqeke mezin a tijî zêr û zîv û gelek sênîyên ji zîv û zêr anîn, danîn ber min. Gava çavên min lê ketin, ez pir kêfxweş bûm û min di dilê xwe de got: “Ez ê deynê xwe gişî ji van zêran bidim û bi qasî deynê min jî wê ji ber bimîne!” Min ew zêr û zîv hemû ji destên wan girtin, anî hundir û min ji xwe re got: “Bêwijdanî ye ji bo min ku ez van ciwamêran dest vala bişînim, ji ber deriyê xwe!” Min rahişt ew sed hezar dînarê cem xwe da wan û spasiya wan kir li ser wê qenciya wan. Wan jî ew dînar ji destê min girtin, spasdariya xwe nîşan dan û çûn, bêyî ku kes bi wan bihese. Gava bû sibe û min dişa li wan zêran nêrî, min bala xwe dayê ku hemû paxirên ku di ava zêr dakirine û buhaya gişan pêncsed dirhemî nagire. Bi wî hawayî dînarên min ên heyî jî çûn û ji hêrsan ez nexweş ketim, nava min tijî kul û derd bû. Di dema walitiya min de tiştê herî xerab hat serê min ev bû.

Waliyê Misra Kevn rabû ser xwe û axivî, got: Ê min jî tiştê herî balkêş ê ku bi serê min de hat ew bû ku navberekê min deh heb diz bi dar vekirin; her dizek bi darekî ve daliqand û min ji nobedaran re got: “Çavên we lê be kes tu daran nedize!” Roja dîtirê ez çûm min lê nêrî, min dît ku du diz bi yek darî ve daliqandî ne. Min ji nobedaran re got: “Kê wisa kiriyê û kanî darekî dizê duyemîn?” Înkâr kirin û tişteke qebûl nekirin. Gava min xwest ku ez li wan bidim, gotin: “Emîrê rêzdar, bawer bike şeva borî em raketin. Gava em ji xew şiyar bûn jî, me dît ku hinekan dizekî daliqandî tevî sêdara wî birine. Em jî tirsîyan û wê gavê cotkarek di wir re bihurî, me jî ew û kerê wî dan sekinandin, piştê me ew kuşt û li şûna dizê ku hatibû dizin li gel yekî mayî daliqand, da ku hejmara wan temam bibe.” Ez şaşwaz bûm li himberî wî karê wan û min ji wan re got: “We got çî bi wî cotkarî re hebû?” Gotin: “Kerek pê re hebû û xurcikek li ser piştê wî.” Min got: “Çi di xurcika wî de hebû?” Gotin: “Em nizanin.” Min got: “Ka wê xurcika ser kerê wî binin vir!” Çûn xurcîk anîn, min got: “Ka xurcîkê vekin!” Xurcîk vekirin, me dît ku zilamekî kuştî tê de ye! Ez mam ecêbmayî li wê rewşê û min di dilê xwe

de got: “Subhan ji wî re ku zilmê li kesî nake! Nexwe ew cotkar jî di ber gunehê wî zilamê kuştî de hat kuştin!”

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 365'EMÎN

(ÇÎROKA SERAF Û DIZ)

Wê şevê Şehrezadê dîsa dest bi çîrokek din kir:

Tê gotin ku serrafek hebû, tûrekî zêran pê re bû; dema ku di kêleka çend dîzan re derbas bû, yekî ji wan ji hevalê xwe re got: “Ez dikarim wî tûrê zêran jê bidizim.” Wan jî got: “Tu yê çawa jê bidizî?” Wî got: “Binêrin!” Û çû da pey wî, bi dû de meşîya hetanî mala wî. Li wir serraf derbasî hundir bû û tûrikê di destê xwe de avêt ser mînderê û bi lez gazî kir cariyeya xwe, got: “Kanî misînê avê bide min!” Lew re nimêja xwe nekiribû, wext dereng ketibû. Cariyeya wî misînê avê da destê wî û li pey wî derket çû, bêtî ku derî li dû xwe bigire. Wê kêliyê diz ket hundir û rahişt tûrikê zêran ji wir û çû cem hevalên xwe; çîroka xwe û seraf û cariyeya wî ji wan re vegot. Hevalên wî gotin: “Bi navê Xwedê tu pir jêhatî yî. Lew re her kes nikare vî kari bike. Lê belê niha seraf vegeyriyaye malê û ji ber ku zêrê wî hatine dizîn, misoger niha li cariyeya xwe dide, îşkence û azarê lê dike. Loma mirov nikare bêje te tiştêkî baş kiriye. Heger bi rastî jî tu jêhatî bî, divê tu herî cariyeyê ji îşkenceyê rizgar bikî!” Wî jî got: “Xwedê bêje erê ez ê herim cariyeyê û tûrik herduyan jî rizgar bikim.”

Dizo vegeyriya mala serraf, dît ku ji ber tûrikê zêran lêdanê li cariyeya xwe dike. Li derî da, serraf got: “Tu kî yî?” Diz got: “Ez xulamê cîranê te yê sûka serrafan im.” Serraf pê ve çû, derî jê re vekir û got: “Tu çi dixwazî?” Diz got: “Xwediyê min silavan li te dike û dibêje qey tu dîn bûyî, tûrikê xwe yê zêran li ber dikanê dihêlî û diçî. Heger yekî xerîb lê rast bihata, dê bigirta û biçûya.” Bi vê gotina xwe re jî tûrikê zêran derxist û danî ber. Gava sarraf çav li tûrikê xwe ket, ji kêfan firiya û got: “Tûrikê min ev bi xwe ye!” Û destê xwe avêtê ji bo ku bigire. Diz got: “Bi Xwedê ez nadim te hetanî ku tu bi destê xwe nameyekê nenivîsînî ji xwediyê min re û tu tê de nebêjî min tûrikê zêran teslîm girtiye, lewre ez ditirsim, ku xwediyê min ji min bawer neke. Loma ez dixwazim tu nameyekê binivîsî û bi destê xwe mohr bikî.” Wê kêlikê serraf çû hundir ji bo ku kaxezekî jê re binivîse, diz jî tûrikê zêran bir û çû. Cariyê jî ji îşkence û lêdanê rizgar bû.

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

(ÇÎROKA HÎLEBAZ Û WALIYÊ QEWS)

Şehrezadê berdewam kir:

Şahê min î şanaz û gewre! Îca ez ê çîroka “Hîlebaz û Waliyê Qews” bêjim. Tê gotin ku Ela, waliyê Qewsê, rojekê li mala xwe rûniştî bû, gava ku yekî li deriyê wî xist û ji xulamê wî re got: “Here gazî xwediyê xwe bike, ez dixwazim pê re bicivim, di derbarê razekê de pê re biaxivim.” Xulam hat ji waliyê xwe Ela re got: “Ez benî mirovekî pir spehî û lihevhatî li ber derî ye, xizmetkarê wî jî pê re ye, sindoqek li ser serê wî ye, dixwaze te bibîne, ji bo ku derbarê razekê de bi te re biaxive.” Walî got: “Vê şeva hanê, ev kî ye ku hatiye razekê bi min re biaxive? Ka here wî bîne vir, ez bibînim, bê kî ye?” Xulam lê vegeriya, ew derbasî hundir kir. Walî lê nêrî ku mirovekî lihevhatî ye. Ew li kêleka xwe da rûniştandin, qedr û qîmetê wî girt û jê pirsî, got: “Çi daxwaza te heye?” Got: “Ez rêberek im û ez dixwazim tobe bikim û li ser destê te vegerim ser rêya rast; rêya Xwedayê xwe û ez dixwazim ku di vî warî de tu alîkariya min bikî, lewre êdî ez aliye te me, di bin venêrîna te de me. Va sindoqeke tijî tiştên giranbuha hene bi qîmeta çil hezar dînarî, ez wê jî radestî te bikim, lewre xwediyê wê yê rasteqîn tu yî. Tu jî tenê hezar dînarê helal bide min ji cem xwe, da ku ez wî ji xwe re bikim sermiyan û jixwe re pê bişixulim, da ku tobeya min cî bigire û dîsa muhtacî malê heram nebim. Bila xêra te jî li ba Xwedê nivîsandî be.” Piştî devê sindoqê jî vekir ji bo ku walî tiştê di hundirê wê de bibîne.

Walî li sindoqê nêrî, tijî micewher, zêr, lûlû û madenên buha bûn; şaşwaz û ecêbmayî ma! Ji aliyekî din ve jî pir kêfxweş û dilşa bû. Di cî de gazî xeznedarê xwe kir û jê re got: “Ka ew kîsê ku hezar dînar tê de ye bîne vir!” Xeznedar kîsê ku hezar dînar tê de bû bir, da walî, wî jî bi devlikenî da destê rêbir.

Rêbir, rahişt hezar dînarê xwe, spasdariya walî kir û rabû bi rêya xwe de çû, di bin siya baskên şevê de.

Gava bû sibe, walî gazî zêrkerekî kir, bo ku li cewherên di wê sindoqê de binêre û buhaya wê bipîve. Zêrker hat lê nêrî; dît ku hemû tiştên tê de, şûna zêr paxir û çingo ne; şûna cewher û lûlûyan jî cam û tîtik bûn! Walî hêrs bû, qehirî û xulamên xwe bi dû wî zilamî de şandin, lê tu encam negirtin.

(ÇÎROKA ÎBRAHÎMÊ MEHDÎ Û TACIR)

Şehrezadê wê şevê dest bi çîrokek din kir:

Tê gotin kû rojekê ji rojan xelîfe El Mamûn ji Îbrahîmê Mêhdî re got: “Kanî ji me re bahsa ecêbeke ku te dîtibe bike!” Îbrahîmê Mêhdî got:

Ser çavan emîrê bawermendan. Rojekê ji rojan ez derketim nêçîrê. Ez meşiyam û çûm û çûm hetanî ku ez giham cihekî ku bêhna xwarinê lê dihat. Ajoyên min vehesiyar û çila min şiyar bû, dilê min çû xwarinê. Di cihê xwe de rawestiyam û min nema dizanibû ez çawa tevbigirim. Ne min dikaribû ez di wir re bibihurim ne jî ez derbasî wî cihî bibim. Bê biryar û bê qerar bûm. Di wê navberê de dengêkî pir xweş hat min, stranek digot. Dengêkî ewqasî xweş bû ku min bêhna xwarinê ji bîr kir, lewre wî dengî hiş bi min re nehiştibû. Bi hemû hunerên xwe û bi hemû rêbazan min hewl da ku ez xwe nêzikî wî cihî bikim û xwe bigînim wî dengî. Di rê de ez li terziyekî rast hatim, min silavek lê da û jê pirsî, got: “Ev mala li pêşiya me, mala kê ye?” Got: “Mala tacirekî ye.” Min got: “Navê wî çi ye?” Got: “Navê wî felan kesê filan kes e û ji taciran pê ve bi tu kesî re nade û nastîne.”

Hîna ku em di nava wê goftûgoyê de bûn, min bala xwe dayê ku du zilamên din ber bi wê malê ve diçin. Herdu jî siwar bûn. Min ew ji terzî pirsîn, got ew herdu jî dostên wî ne û navên wan ji min re got. Min nigên xwe li bin zikê hespa xwe xist, lez dayê û ez ketim pey wan, min ji wan re got: “Hûn bi qedrê Xwedê kin, hebekî hêdî bikin, ez jî bigihîjime we da ku em bi hev re herin cem bavê filan kes. Gemên hespên xwe kişandin, ez jî giham wan û em bi hev re çûn ber deriyê tacir. Ez derbas bûm, herduyên din jî li pey min derbas bûn. Gava xwediye malê çav li min û wan ket, guman ji min nekir, ku ez wan nas dikim, bi coş û dilxweşiyeke germ rabû ser xwe, ez pêşwazî kirim û li cihê herî baş dam rûniştindan. Piştî sifre raxistin û xwarin anîn; min di dilê xwe de got: “Vaye Xwedê ez gihandim daxwaza min û ew xwarina xweş hat ber min.” Piştî ku me têr xwar û vexwar, em derbasî odeyeke din bûn, ku bi hemû hêlên xwe ve dilxweşî bi mirov re çêdikir; ji raxistinê hetanî bêhnên bixurên ku lê difûriyan, her tiştî mirov hestiyar dikir. Xwediye malê jî bê navber bi min re mijûl dibû, jê werê ku ez mêvanê herdu mêvanên wî me û herdu mevanên wî jî ji wan werê ku ez nas û mêvanekî wî me, pir qedrê min digirtin. Me bi hev re dest bi vexwarina meyê kir, kêf û laqirdî kirin, hetanî cêriyeke mîna rihanekê hat û rahişt û da xwe, dest bi straneke pir xweş kir, stira, got:

Gelo ne pir erjeng e ku em giş bi hev re diaxivin
Di malekê de tu tenê bê deng î qet naaxivî?

Îcar emîrê bawermendan, wê zalimê bi wê gotina xwe lerz xist hestiyên min û ez hêjiyam li ber awazên wê. Ez mest bûm bi deng û xweşikbûna wê,

min jî bi zikreşî got: “Cariyeya delal, tişteki ji lêdana te kêma maye!” Qeherî, hers bû, ûd ji destê xwe avêt û got: “Ji kengî ve hûn sakûleyan tînin meclîsa xwe?”

Ez poşman bûm li ser wê gotina xwe, lewre her kes ji lêdan û gotina strana cariyeyê razî bû û kêmanî tê de nedidîtin. Di dilê xwe de min ji xwe re got: “Hêviyên min giş bi avê de çûn!” Lewre gotina cariyeyê hemû li ser min mabû û min nizanibû ez ê bi çi hawayî wê tuhmetê ji ser xwe bidim alî û isbat bikim, ku ez ne sakûle me. Herî dawiyê wêrekî hate min û min got: “Kanî ûdekê bidin min, ez ê meqamê rast ji we re lê bidim û nîşanî we bidim, bê cariyeyê meqam di ku de dişikand.” Civatê jî got, bila be û çûn ûdek ji min re anîn. Min ew saz kir û çend helbest bi stranî gotin li ser he-man meqamî.

Keçîka cariyê ji nîşkê ve xwe avêt erdê û herdu nigên min maçî kirin û got: “Ez lêborîna xwe ji te dixwazim begê min, wilehî min bi cihê te nizanibû û haya min ji vê asta hunera te tune bû. Bawer bike min muzîk weke vê muzîka te xweş nedîtiye û ne jî bihîstiye.”

Piştî vê helwesta cariyeyê, helwesta civatê gişî hat guhertin û hemûçikan ji min xwest ku ez ji wan re li ûdê bidim û stranan bibêjim. Min ji wan re got û wan jî guhdar kirin û li kêf û şahiya xwe nêrîn hetanî ku tevde mest bûn bi newa û awazên min. Pê re vexwarin, hetanî ku hemû serxweş ketin û yeko yeko rabûn, çûn malên xwe. Tenê xwediyê malê û cariyeya wî man. Wî jî çend kaseyên din bi min re vexwarin û got: “Mîrzayê min, ji ber ku hetanî niha min tu nas nekiribûyî, emrê min giş vala derbas bûye. De êdî tu bi qedrê Xwedê kî, ji min re bibêje bê tu kî yî, ji bo ku ez destbirakê xwe yê şevê nas bikim!” Min çîroka xwe jê re got, bêtî ku ez navê xwe bibêjim lê wî îsrar kir û ez dam sondê, min jî jê re got.

Gava navê min fêr bû, çeng bû ser nigan û got: “Balkêş e ku ev yek bi saya serê te pêk hat û felekê destek ji min re şand, ku ez spasîya wî bikim. Xwedêyo, çi tişteki balkêş e; gelo ne xewn be! Heger na, çawa û kengî tamakariyeke wisa bi min re çêbûye û xwestiye ku xîlafet were serdana min û şevbuhêrkê bi min re derbas bike îşev?”

Rabû ser piyan û bi xeyrangoriyekê li min dinêrî û diaxivî ez li ber wî geriyam, ji bo ku rûnê. Rûnişt û bi zimanekî şîrîn sebeba hatina min a cem wî pirsî. Min çîrok ji serî hetanî binî jê re vegot, bêtî ku ez tişteki jê veşêrim, min berdewam kir: “Îcar di mijara xwarinê de, armanca min pêk hat lê belê di stran û muzîkê de ez negiham meqseda xwe.” Wî li min vegerand û got: “Di wê xalê de jî, tu yê bigihîjî miradê xwe bi izna Xwedê!” Piştî yeko yeko gazî cariyeyên xwe kir, hatin cem me li ûdê dan û stiran. Lê ew dengê ku ez anibûm wir, ne di nav wan de bû. Gava min jê re got, li min vegerand û got: “Ezbenî ez bi serê te kim ji xwişk û dêya min pê ve, jin di mala min de

nemane. Lê ji bo xatirê te ez ê gazî wan jî bikim, belkî tu bicibînî.”

Ez li vê fedekariya wî behetî mam. Min jê re got: “Te comerdiya herî mezin kir, de ka bi xwişkê dest pê bike!” Got: “Ser seran û ser çavan” û gazî xwişka xwe kir. Çawa ku xwişka wî stira, min tê derxist ku xwedîya dengê xweş ew bû. Min jê re got: “Te comerdiya xwe kir, dengê ku min behsa wî dikir jî ev bû, yê ku ez anîm hetanî vir jî ew bû. De êdî ka çend xulamên xwe bişîne, bila herin şahidan binin.”

Xulamekî xwe şand dûv şahidan, ew anîn û du kodikên tijî zêr jî li ber me danîn. Ji şahidan re got: “Ev e mezin û mîrzayê me Îbrahîmê Mêhdî, apê emîrê bawermendan hatiye xwişka min dixwaze. Di şehdebûna we de ez wî pê re dizewicînim, bi qelenekî ku buhaya wî kodikek zêr e.” Dûre li min zivirî û got: “Min xwişka xwe filan kes bi wî qelenê diyarkirî da te.” Min jî got: “Min qebûl e û ez pê razî me.” Piştî rahişt tasikek zêran da xwişka xwe û ya mayî li ser şahidan belav kir. Dûre gote min: “Ezbenî ez dixwazim hinek mal û cih û xanî jî bidim te.” Comerdiya wî ya bêsînor pir bandor li min kir. Min jê re got: “Na, na hewce nake, wê veguhezîne mala min.” De îcar emîrê bawermendan, bila baweriya te bi Xwedê bê, wî camêrê reheleke ewqasî mezin bi xwişka xwe re rakir, ku di mala min de hilnehat! Piştî Xwedê ev kurikê me yê li ber destê te da me.

Emîrê bawermendan El Mamûn pir ecêbmayî ma li comerdiya wî zîlamî û got: “Bi navê xwe min bûyereke din î mina vêna nebihîstîye. De êdî here gazî wî zîlamî bike, ez dixwazim wî bibînim!” Min jî çû gazî wî kir, ew anî qesrê. El Mamûn pê re axivî li zerafet û şîrînî û cinçkariya wî heyirî ma. Ew li cem xwe girt û kir dostekî xwe yî nêzik. De êdî subhan ji wî Xwedayê ku bi elban dide hinekan!

Li Şhrezadê bû sibe, wêjî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 368'EMÎN

(ÇÎROKA JINA XÊRXWAZ Û BIRÎNA DESTÊ WÊ)

Şhrezadê berdewam kir:

Tê gotin ku rojekê ji rojan siltanekî ji gelê xwe re got: “Ji îro û pê de, ez sedeqeyê bi giştî qedexe dikim. Divê tu kes sedeqeyê nede kesî û yê ku sedeqeyê bide jî ez ê destê wî jê bikim!”

Piştî wê fermana siltan bi demekê; rojekê parsekekî jar û birçî, destê xwe li ber jinekê vekir û sedeqe jê xwest. Jinê jê re got: “Ez ê çawa sedeqeyekê bidim te û siltan destê sedeqekaran jê dike?” Parsek got: “Ji bo xatirê

Xwedê tişteki bide min!” Gava ku got, ji bo xatirê Xwedê, dilê wê pê şewitî û rabû du nan dan wî. Xeber çû ji siltan re, wî jî ferman da, got: “Zû wê bînin hizûra min!” Leşkeran çûn jinik anîn, celadê siltan, herdu destên wê jêkirin û ew bi şûn de şand mala wê.

Piştî demekê siltan çû cem diya xwe û jê re got: “Ez dixwazim tu jineke xweşik û spehî bibînî ji bo ku ez pê re bizewicim.” Diya wî got: “Jineke kamil nêzikî me heye lê belê kêmanîyeke wê heye; kêmanîyeke bi tenê.” Siltan got: “Çi kêmanîya wê heye?” Diya wî got: “Herdu destên wê jêkirî ne.” Siltan got: “Ez dixwazim wê bibînim!”

Ew jina ku diya wî behsa wê fikir, heman jina ku du nan dabûn parsek û herdu destên wê hatibûn jêkirin. Diya wî çû jinik jê re anî, wî jî ew eciband û pê re zewicî. Lê di demeke kurt de, hewiyên jinikê dexesiya wê kirin û çûn li cem siltan gelaciya wê kirin, gotin bêsinc û şemût e. Siltan jî fermanek da û ji diya xwe re got: “Wê bibe çolê, li wir berde û were.” Diya wî fermana wî pêk anî û jinik bir çolê, li wir berda û hat. Jinik jî rûnişt, giriya û li çogên xwe da ji ber wê felaketa ku bi serê wê de hatibû, zaroka wê jî di himbêza wê de. Qasekê bi şûn de, rabû ser xwe, zarokê xwe hilda ser milê xwe û meşiya, çû hetanî ku giha ser çemekî. Li wê derê rûnişt, ji bo ku avekê vexwe û bêhna xwe berde. Gava xwe bi ser avê de xwar kir, ji bo ku vexwe, zarokê wê ji ser milan şemitî û ket avê, pê de çû. Vê carê jî dîsa li çogên xwe da û li ser kurê xwe giriya, hêsir barandin.

Hîna ku ew wisa ji xwe re digiriya, du zilam di wir re derbas bûn û ew di wî halî de dîtîn. Hatîn cem wê, jê re gotin: “Tu çima digirî?” Jinikê got: “Kurikekî min hebû, li ser stûyê min bû, ket avê.” Her du zilaman got: “Tu dixwazî em wî ji nav avê derxînin?” Got: “Belê.” Herduyan rabûn dua ji Xwedê re kirin! Bi duayên wan re, kurê wê sax salîm ji nav avê derket û hat cem wê, mîna ku tişteki bi serê wî nehatibe. Piştî jê re gotin: “Tu dixwazî ku Xwedayê gewre herdu destên te dîsa li te vegerîne?” Got: “Belê.” Herdu mirovan dîsa destên xwe ber bi jor ve rakirin û dua ji Xwedê re kirin. Bi duayên wan re herdu destên wê lê vegehiyan û ji berê çetir bûn. Dûre, her du lê zivirîn û jê re gotin: “Tu dizanî bê em kî ne?” Jinikê got: “Xwedê dizane.” Zilaman lê vegehand û got: “Em ew herdu nanên ku te dabûn ew ê parsekin in! Ew sedeqeya ku te dabû, bûbû sebeba destjêkirina te. De êdî spasiya xwe ji Xwedê re diyar bike, ku hem kurê te û hem jî herdu destên te li te vegehandin. jinikê spasdariya Xwedayê xwe kir û rabû çû.

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 369'EMÎN

(ÇÎROKA XWIROŞKAR Û LÛLÛ)

Vê şevê jî Şehrezadê dest bi çîrokek nû kir û Şehreyar jî bi baldarî li çîrokê wê yê xweş guhdar dikir:

Tê gotin ku di nava qewmê Benî Îsraîl de mirovekî xwiroşkar hebû ku zarokên wî pembo dikirin rês. Wî jî her roj rês difrot û pembo dikirî, fêde-ya ku jê re dima jî, dida bi xwarinê ji bo kufletê xwe pê xwedî bike.

Rojekê dîsa derket, çû rês firot û bi rê de li birayê xwe rast hat. Birayê wî jê re got: "Pêdiviya min bi hinek dirav heye." Wî jî hema diravên ku ji firotina rês bi dest xistibûn dane wî û bêtî ku pemboyekî din bikire vegeriya malê; xwarin jî nekiribû ji iyalên xwe re. Zarokên wî jê re gotin: "Ka pembo û xwarin?" Wî jî got: "Filankeso li min rast hat, pêdiviya wî bi diravan hebû, min jî diravên xwe dan wî û tiştêk bi min re nema." Zarokên wî gotin: "Em ê çawa rês çêkin û tiştêk tune be em ê çî bifiroşin?"

Roja dîtirkê, çavên xwe li hundir gerand, beroşeke pelixî û kûzekî avê hebûn, rahişt herduyan û ew birin sûkê. Lê kesî ew nekirin. Dîsa jî bi hêviya ku rêyeke rizq li ber vebibe, çavê xwe li derdora xwe gerand hetanî li zilamekî rast hat, ku masiyek nepixî û genî pê re bû û kesî ji destê wî nekiribû. Xwediyê masiyê xerabe jê re got: "Tu tiştê di stûyê te de maye nadî bi yê di stûyê min de maye?" Got: "Belê." Û kûz û beroşa pelixî da wî û masî ji destê wî girt, bir malê. Zarokên wî gotin: "Tu yê çî bikî ji vî masîkî?" Got: "Bibirêjin ji bo ku em bixwin, hetanî ku Xwedê rizqekî ji me re bişîne."

Jina wî masî ji dest girt û bir nava wî qelaşt, dît ku lûlûyek di nava wî de ye. Di cî de li mêrê xwe vegeriya, mizgînî dayê. Zilam got: "Heger lûlûyek bi qul be, ya hinekan e lê heger ne bi qul be, Xwedê ew ji me re şandiye!" Lê nêrîn, dîtin ku qul tê de tune ye. Zilam got: "Nexwe rizqek e Xwedê ew ji me re şandiye."

Roja dîtirkê, rahişt wê lûlûyê û ew bir nişanî hinek kesên pişe û zana da, jê re gotin: "Filankeso te ev lûlû ji ku aniye?" Got: "Xwedê Teala ew ji me re şand." Zêrkerekî got: "Buhaya vê lûlûyê hezar dîrhem e û ez dixwazim bikirim. Lê tu dixwazî here cem filankes ew maldartir û zanatir e." Zilam lûlûya xwe bir cem wî zêrkerê ku behsa wî dikir. Zêrker lê nêrî û got: "Ev lûlû, qîmetê wê heftê hezar dirhem e ne zêdetir." Piştî heftê hezar dirhem dayê. Wî jî gazi barkêşan kir û ewqas diravên hanê giş birin malê. Li ber deriyê malê, parsekekî got: "Xwedê çî dabe te, hinekî jê bide min." Zilam jê re got: "Hetanî doh em jî mîna te bûn. Hema nivê van diravan ji xwe re bibel!"

Di cî de malê xwe kir du beş û ji parsek re got: "Vî nivê xwe bibe." Parsek got: "Bila malê te ji te re be. Ez ji xwe qasidê Xwedayê te me, ez hatim tenê te biceribînim, ne tiştêkî din."

Zilam got: “Hemd û sena ji Xwedayê min re.” Hetanî mirinê jî, di nava xweşî û şahî û maldariyê de jiya.

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 370'YEMÎN

(ÇÎROKA EBÛ HESSAN EL-ZEYYADÎ Û MAMÛN)

Şehrezadê berdewam kir:

Tê vegotin ku rojekê Ebû Hessian El Zeyyadi got:

Dem û dewranek bi ser min de hat ku ez ketim tengasiyeke mezin, ji hêla madî ve. Beqal û firincî û sewzfiroş, hemû bi ser min de dihatin û deynên xwe ji min dixwestin. Ez jî pir bê çare bûm û min nizanibû ez çi bikim, çawa bikim. Vêca hîna ku ez di nava wê tengasiyê de bûm, xulamekî min hat ji min re got: “Zilamek li ber derî ye, dixwaze were te bibîne.” Min jî jê re got: “Bila bê.” Zilam hat, min lê pirsî, mirovekî Xorasanî derket. Ji min re got: “Gelo Ebû HesSan tu yî?” Min got: “Belê ez im; daxwaza te çi ye?” Got: “Ez mirovekî xerîb im û ez di rêya hecê de me. Lê malekî pir li ba min heye û giran e, ez nikarim wî bi xwe re bibim. Ez ê ji vî malê xwe deh hezar dirheman li ba te deynim, hetanî ku ez herim hecê û werim bila bi emanetî li ba te be. Heger karwanê me yê hecê vegeriya û te ez di nav de nedîtîm, bizanibe ku ez çûme ber dilovaniya Xwedê. Wê gavê ev malê min ê te ye, ez wî ji dil û can diyarî te dikim; heger ez vegeyriyam jî, jixwe tu yê emanetê min dîsa bidî min.” Mi jî got: “Ser seran, ser çavan, bila wisa be.” Xurcikek derxist, danî ber min, min jî ji xulam re got: “Ka here mêzînekê bîne!” Mêzîn anî, min xurcika wî kêla û teslîm girt. Ew jî rabû bi rêya xwe de çû.

Vî camêrê hanê ez ji tengasiyeke mezin rizgar kirim. Çawa ku ew çû, ez jî rabûm, min gazî xebatkarên xwe kir û min hemû deynên xwe dan. Çiyî kê li min bû, min li wan vegerand û hilmeke kûr kişand, ez aram bûm. Min hinek ji diravên mayî xerc jî kir û min ji xwe re got: “Heta ku ew ji hecê vegere, Xwedê mezin e, misoger dê rêyeke xêrê li min vebe!”

Pişti ku rojek di ser çûna wî re derbas bû, xulamê min hat, got: “Ew zilamê te yê Xorasanî li ber derî ye.” Min got: “Bila were hundir.” Hat hundir û ji min re got: “Min dixwest ku ez herim hecê lê niha xebera mirina bavê min ji min re hat û min biryar da ku ez bi şûn de vegeyrim malê. Îcar ji kerema xwe wî emanetê min bide min!”

Gava min ev gotina wî bihîst, laşê min lerizî û dilê min hat guvaştin, qolinc xistin nava min. Xemgîniyekê giraniya xwe da ser min, ku mîna çiyayekî bi min giran hat. Min bersiv nedayê, lewre min nizanibû ez ê çi jê re bibêjim. Min înkâr bikira, dê ez ê bidama sondê û dê li wê dinyayê malik li min xera bibûya. Heger min jê re bigota min xerc kiriye jî, dê biqîriya û li vê dinyayê ez ê bihetikiyama. Di encamê de min jê re got: “Bila serê te sax be lê belê ji ber mala min zêde ne asê ye li himber diziyê, min xurcika mal şand cem camêrekî ku mala wî asê ye û niha li wir e. Sibê were cem min, bi xêr û silamet tu yê xurcika xwe li vir bibînî.”

Zilam çû û ez jî di nava şaşwazî û bêçaretiya xwe de mam. Di vegerê de min çi jê re bigota, çi negota ne diyar bû. Hişê min bûbû mîna hêka çêliqayî. Ne rastfikirîn li min mabû ne jî hedan û tebat. Şev pê de xew li min herimî û mijankên min neçûn ser hev. Ez rabûm ser xwe, min ji xulam re got: “Hespê zîn bike, ez ê herim.” Got: “Ezbenî hîna dinya şev e, tu yê bi ku ve herî!” Ez dîsa vegeriyam nav nivîna xwe lê dîsa jî hedana min nehat. Mîna ku derzî di doşeka min de bin û di laşê min re biçin, sebra min li ser nivînê nehat. Ez dîsa rabûm, min xulam şiyar kir û got: “Hespê min amade bike.” Dîsa got: “Ezbenî hîna jî dinya şev e.” Ez jî dîsa li nivîna xwe vegeriyam. Lê heta ku bû sibe, min gelek carên din jî xulamê xwe ji xew rakir, herî dawiyê, bi şeveqê re rabû hespa min ji min re amade kir. Ez li hespa xwe siwar bûm lê min nizanibû ez ê bi ku ve herim. Min serê hespa xwe berda û ez bi kul û derdên xwe daketim, bêyî ku ez bala xwe bidim hespê, bê bi ku ve diçe. Tiştê ku min dizanibû, hespa min ber bi rojhilatê Bexdayê ve diçû.

Hîna hespa min ji xwe re wisa dimeşîya, min bala xwe dayê ku çend mirov ber bi min ve tîn. Min xwe ji ser wan da alî û rêya xwe guhert lê ew dîsa bi ser min de hatin. Hespên xwe dan bezandin û xwe gihandin min, ji min re gotin: “Gelo tu mala Ebû Hesan El Zeyyadî nas dikî?” Min ji wan re got: “Ez ew im, çima, xêr e?” Gotin: “Bi me re were cem emîrê bawermendan!” Ez bi wan re çûm û em meşîyan hetanî ku em gihan qesra El Mamûn. Em derbasî hundir bûn, El Mamûn ji min re got: “Tu kî yî?” Min got: “Ez feqîh û zanayekî hedîsa pêxember im, ji civata qadiyê navdar Ebû Yûsiv.” Wî li min vegerand û got: “Nasnavê te çi bû?” Min got: “Ji min re dibêjin Ebû Hesan El Zeyyadî.” Got: “Kanî çîroka xwe ji min re bibêje!” Min çîroka xwe jê re vegot, ji serî hetanî binî. Ew jî hestiyar bû, giriya û hêsir barandin. Piştê got: “Xwedênehişt, di rûyê te de pêxemberê Xwedê nehişt ku ez rakevim di şeva borî de. Çawa ku ez raketim, ew hat xewna min û ji min re got: ‘Di hewara Ebû Hesan El Zeyyadî here!’ Ez şiyar bûm lê min tu nas nekirî. Piştê ez dîsa raketim; ew jî dîsa hat xewna min û ji min re got: ‘Hîna jî tu di xew de yî, rabe bi hewara Ebû Hesan de here!’ Ez dîsa şiyar bûm lê dîsa min tu nas nekirî. Piştê ez careke din raketim, ew jî careke din hat xewna min û got: ‘Zû bi hewara Ebû Hesan de here!’ Jê û pê de nema

xewa min hat û ez şiyar mam hetanî sibehê. Sibehê min xelk giş şiyar kirin û min ew xistin pey te.”

Piştire deh hezar dirhem dan min û got: “Vanan bide wî mirovê Xorasanî, li şûna emanetê wî.” Piştire deh hezar dirhemên din jî dan min û got: “Bi vana jî karê xwe sererast bike û pêdiviyên xwe pê temîn bike.” Di pey re sîh hezar dirhemên din jî dan min û got: “Bi vana jî xwe amade bike ji bo gava ku roja wê were, ez te erkdar bikim wezîfeyekê.”

Li gel ewqase malê ku da min, ez ji cem xelîfe derketim û min berê xwe da malê. Piştî nimêja nîvroyê, min bala xwe dayê ku mirovê Xorasanî hat. Min ew derbasî hundir kir, qedr û qîmetê wî girt; piştire jî min diravên wî derxistin dan wî. Lê wî lê nihêrî û got: “Ev mal ne yê min e.” Min got: “Rast e, ne yê te ye.” Got: “Sebeba wî çi ye?” Min çîrok ji serî hetanî binî jê re got. Ew jî pir hestiyar bû û giriya. Piştire got: “Bi navê Xwedê ku ji serî ve te rastiya meseleyê ji min re bigota, min doza tiştêkî li te nedikir. Niha jî ez vî malî qebûl nakim û ez tiştêkî jê naxwazim. Bila li te helal be.” Wisa got û rabû, çû.

Min karûbarê xwe sererast kir û roja erkdarkirina wezîfeyê ez çûm ber deriyê El Mamûn. Ez derbas bûm, min bala xwe dayê ku li ser textê xwe rûniştiye. Ji min xwest ku ez nêzikî wî bibim, piştire jî bin sicadeya xwe peymanameyek derxist, dirêjî min kir û got: “Ev peywirdarnameyeke bo ku tu bibî qadiyê Medîneya Munewer, hetanî dawîya emrê te. Her meh jî dê mehmizeke baş bidine te.”

Xwedê Teala wisa ji min re li hev anî. Mirov hemû behetî man. Gava ji min pirsîn, min mesele ji wan re rave kir.

Bi wî hawayî ew xeber di nav xelkê de jî belav bû û Ebû Hessian ma qadiyê Medîneya Munewer hetanî wefata xwe, rehma Xwedê lê be!

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 371'EMÎN

ÇÎROKA DEWLEMENDEKÎ KU ÇERXA FELEKÊ DI SER RE ÇÛ EW FEQÎR KIR

Şehrezadê berdewam kir:

Mirovekî maldar hebû ku pir zengîn bû, piştire çerxa felekê di ser re çû, mal û milkê xwe giş wenda kir û feqîr bû. Rojekê jîna wî şîret lê kir û got: “Here serî li hinek dost û hogirên xwe bide, alîkariyê ji wan bixwaze, belkî

halê me xweş bibe.” Rabû çû cem dostekî xwe û alîkarî jê xwest. Dostê wî pêncsed dînar bi deyn dayê da ku pê bixebite. Ji ber ku pîşeya wî zêrkerî bû, çû bi wan dînanan ji xwe re zêr kirî û berê xwe da sûka zêrkeran, dikanek ji xwe re kirî li wê derê û dest bi kirîn û firotinê kir.

Di wê navberê de, sê zilam hatin dikana wî pirsra bavê wî jê kirin. Wî ji got bavê min çûye ber dilovaniya Xwedê. Zilaman dîsa pirsîn û gotin: “Gelo kesek ji zuriyeta wî li pey wî maye?” Wî jî got: “Zuriyeta wî ev ciwamêre li himberî we ye.” Gotin: “Û em çi zanin ku tu kurê wî yî?” Wî jî got: “Dikandarên sûkê giş dizanin ku ez kurê wî me.” Wan jî gotin: “Naxwe kanî gazî wan bike, bila şahdebûnê bidin ku tu kurê wî yî.” Zêrker çû nasên xwe yên sûkê kom kirin, anîn ba wan. Hemûçkan şahdebûna xwe dan ku ew kurê wî ye. Li ser vê şahdebûnê, her sê zilam rabûn xurcikek derxistin, ku sîh hezar dînar tê de bû, li gel gelek cewher û madenên giranbuha dan wî û jê re gotin: “Ev emanetê bavê te bû li gel me.” Di pey re jî derketin, çûn. Piştî jinek hat dikana wî û cewhereke ku buhaya wê pêncsed dînar jê xwest bo ku bikire. Lê li şûna pêncsed dînarî, sê hezar dînar dayê.

Ber êvarkî, wî jî rahişt pêncsed dînarî û çû cem wî dostê xwe yê deyndêr, jê re got: “A ji te re pêncsed dînarên te, lewre Xwedê li min hat rehmê û deriyek li min vekir. Rewşa min baş bû.” Dostê wî jê re got: “Min ew dînar diyarî te kiribûn, wan bigire bila ji te re bin û vê nameya hanê jî bigire, bibe lê hetanî ku tu negihîjî malê, nexwîne!”

Zêrker, rahişt mal û kaxez herduyan û berê xwe da malê. Gava gihîşt malê, name vekir û lê nêrî, bala xwe dayê ku ev çend beyt tê de nivîsandî ne:

Her sê kesên di serî de hatin nasê min bûn
Bav û ap û xalê min ê dilpak bi hev re bûn
A ku êvarkî cewher kirî jî ew diya min bû
Dînar û dirav û malê şandî giş ji ba min bû
Bi vê yekê min xwest ez te kêmanîşan bidim
Armanc ew bû ku ez xwe ji ber fediyê derxînim

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 372'EMÎN

(ÇÎROKA ZILAM Î DEFÎNE)

Şehrezadê berdewam kir:

Li Bexdayê, mirovekî pir maldar û zengîn hebû. Lê demek bi ser de

hat ku mal û milkê xwe giş wenda kir û êdî bi kar û kedeke mezin incex dikaribû debara xwe bikira.

Şevêkê, di nava kul û derd û xeman de pal da û ket xewê. Di xew de xewnek dît. Di xewna wî de mirovekî jê re digot: “Rizqê te li Misrê ye, de êdî bi pey rizqê xwe keve!” Wî jî roja dîtirkê berê xwe da Misrê û ket ser rê. Rojêkê, berêvarkî gihîşt Misrê. Wê şevê, li mizgeftêkê raket.

Di heman şevê de, hinek diz ketin wê mizgeftê û di ser mizgeftê re jî derbasî maleke kêlekê bûn, diziya wê kirin. Xwediyê malê bi wan hesiyan, giliyê wan kirin. Walî jî bi destê şevqê re girt ser mizgeftê, ew mirovê Bexdayî tê de dît. Ew girtin û lêdaneke giran lê dan heta ku hat ber mirinê. Piştî jî ew avêtin zindanê. Piştî sê rojan, ew derxistin raberi walî. Walî jê re got: “Tu ji ku yî?” Got: “Ez ji Bexdayê me.” Walî got: “Ji ber çî û bi çî armancê tu hatiya Misrê?” Got: “Min xewnek dît, di xew de yekî ji min re digot, rizqê te li Misrê ye, bide dû rizqê xwe. Ez hatim vir û min rizqê xwe dît, ew jî ev lêdana ku we li min da!”

Walî keniya, likelik pê ket heta ku lal bû. Piştî jê re got: “Bêaqilo, min jî sê caran di xewna xwe de dît, ku yekî ji min re digot, li Bexdayê, li filan taxa wê, li filan sikaka wê taxê, di filan malê de bexçeyek heye, ku di bin fiskiya avê de defineyek veşartî heye, tijî zîv û zêr e, here wê ji xwe re bigire lê ez neçûm. Lê yê te, te ehmeqtiyeke mezin kiriye, ku tu bi pey xewnereşka kabûsekî ketiyî û bajar bi bajar tu hatiya hetanî vir.” Piştî çend dîrhem dan wî ji bo heqê rê û jê re got: “Here, vegere welatê xwe!”

Zilam ew dirav ji destê walî girtin û bi şûn de vegeriya Bexdayê. Jixwe mala ku walî ew di xewna xwe de dîtibû, mala wî bi xwe bû. Loma çawa ku giha malê, çû bin fiskiye ya avê kola, dît ku defineyek tê de ye! Define tijî zêr û zîv bû, Xwedê bi elba mezin dayê!

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 373'EMÎN

(ÇÎROKA EL MUTWEKIL Û MEHBÛBE)

Şehrezadê berdewam kir:

Dibêjin ku di qesra emîrê bawermendan El Mutewekil Alallah de çar hezar carîye hebûne; dused heb romî, du sed heb hebeşî, du sed heb melez û gelek carîyeyên din. Jixwe Ubeyd Bîn Tahir jî çarsed carîye diyarî El Mutewekil kiribûn, ku dused hebên wan spî, dused jî hebeş û melez bûn. Yek ji wan carîyeyan jî, melezek e ji Besrayê bû ku navê wê Mehbûbe bû û

pir spehî bû. Gelekî jî zana û bi sinc û marîfet bû. Hem li ûdê dida û hem jî dengê wê pir xweş bû û helbest dinivîsandin. Destnivîseke wê ya pir xweş hebû ku mirov heyran dihişt. Loma El Mutewekil, ew carîye di ser gişan re digirt.

Îcar gava Mehbûbe dît ku meyla xelîfe bi ser wê de ye, delalî bû û poz-bilindî pê re çêbû. Xelîfe El Mutewekil jî pir hêrs bû û jê qehirî. hetanî ku giha asta devjêberdanê û nehişt ku tu kes ji ehlê qesrê jî pê re biaxive. Bi rojan wisa berdewam kir. Lê dîsa jî meyla xelîfe bi ser wê ve bû û ew ji bîr nedikir.

Rojekê, xelîfe El Mutewekil di civatê de got: “Îşev, min di xew de dît ku ez bi Mehbûbe re li hev tîm.” Kesên di civata wî de jî gotin: “Em hêvî ji Xwedê dikin ku ev pêk were.”

Hîna ku wan wisa sohbeta xwe berdewam dikirin, xulamekî xelîfe hat û ji xelîfe xwest bi tenê pê re biaxive. El Mutewekil rabû ser xwe ji nav civatê derket, xizmetkar û xulamê wî jê re got: “Dengê ûdê û stranbêjiyekê ji odeya Mehbûbe tê û em sebeba vê yekê nizanin!”

Xelîfe derbasî heremê bû û çû ber deriyê odeya Mehbûbeyê, bala xwe dayê ku Mehbûbe li ûdê dide û bi helbestî dibêje:

Li qesrê digirim ez û tu kesî nabînim
Gelo ez ê giliyê xwe li cem kê bikim
Bi kê re biaxivim sebra xwe bi kê bînim
Mîna ku min gunehekî mezin kiribe
Mîna ku bê fêde bin ew hemû tobe
Gelo heye bo min îro serdarekî mezin
Piştî min bigire xweş bike dilê min

Gava ku El Mutewekil ev helbesta wê bihîst, şaşwaz û behetî ma, bê çawa Mehbûbe jî xewneke mîna ya wî dîtiye! Piçekî pojînî, piştî derbasî odeya wê bû. Çawa ku Mehbûbe çav li xelîfe ket, hilperikî ser nigan, pê ve rabû çû nigên wî maçî kirin û got: “Mîrzayê min bi navê Xwedê, şeva borî min ev tişt di xewna xwe de dît. Gava ez ji xew rabûm jî, min ev helbest nivîsand.”

El Mutewekil jê re got: “Bi navê Xwedê yê şîrîn, min jî şeva borî he-man tişt di xewna xwe de dît. Piştî herdu li hev hatin û mîna berê bi hev şîrîn bûn. Gava El Mutewekil mir jî, hemû carîeyan ew ji bîr kirin, tenê Mehbûbeyê şîna wî kişand û xemgîn ma hetanî ku ew çû ber dilovaniya Xwedê. Tirba wê jî li gel a wî çêkirin.

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

HEZAR Û YEK ŞEV

CİLD 8

(ÇÎROKA INSELWICÛD Û WERDÊ)

Şehrezadê got:

Tê gotin ku di dem û devraneke berê de siltanekî serbilind û hêzdar hebû ku pir bi heybet bû. Wezirekî wî jî hebû, navê wî Îbrahîm bû. Keçeke wî wezîrî jî hebû pir delal û spehî bû, pir zana û bi edeb bû, pir bi coş û rûgeş bû lê belê pir jî ji kêf û henek û şevbuhêrkan hez dikir. Her dem li pey helbest û dûrik û pêkenokan dibeziya û her kes vedixwend şahî û evînê, di nava wextên wan helbestan de. Çawa ku helbestkarekî ki jî gotiye:

Dilbera Tirk û Ereban ketiye pêxêla min de
Dibe û tîne min di fiqh û edeb û zanînê de
Dibêje çawa xwe tevnadî tu li himberî min
Lew nîne kesekî ku neheje li her bejna min
Min gote wê bi qurbana te bim ez Perîcan
Dewran zîviriye mixabin li seranserê cîhan

Navê wê keça wî jî Werdelekmmam¹ bû, ku bi kurtahî jê re digotin Werdê. Sebeba wê navlêkirinê jî ew bû ku dema xwe pir zêde xerc dikir ji bo xeml û xêza xwe û ji ber ku pir zêde nazik bû. Siltan jî pir dixwest wê bigire gel xwe û wextê xwe pê re derbas bike, ji ber zanîna wê ya edebî û hunera wê.

Vêca ji adeta wî siltanî bû jî ku her sal, hemû mezinên dewleta xwe kom bike û bi gogê bilîze. Îcar gava ew roj hat û xelk li hev kom bûn ji bo listika gogê, keça wezîr jî ket şîbakê, ji bo ku ji wê derê li wan temaşê bike. Piştî ku listikê dest pê kir û wê jî li çep û rastê xwe nêrî, ji nişka ve xortekî pir bedew û lihevhatî bala wê kişand. Li dadoka xwe zivirî û jê pirsî, got: “Dadokê ew xortê bedew ê di nav leşkeran de kî ye?” Dadoka wê got: “Keça min, hemû jî xortên bedew in, ma çi zanim tu behsa kîjanî dikî!” Wê jî got: “Ka bisekine ez wî nîşanî te bidim.”

Piştî rahişt sêvekê û avêt wî xortî. Xort serê xwe rakir û dît ku keça wezîr li ber şîbakê ye û mîna heyveke li çardehan roniya xwe belav dike! Hîna di nêrîna ewil de agir bi dilê wî xist û evîna xwe tê de bi cih kir. Pê re jî xort çend riste ji helbestkarekî vedizîn û got:

Tîr bû yê ku li min ket gelo yan mijankê te
Ji hevdu xist dilê min neçar bû xwe bide te
Ew tîra kujer bi ser min de hat mîna lehiyekê
Gelo ji nav dilan hat ango ji pişt şîbakeyekê

1 Werdelekmmam: Bi Erebi tê wateya gula di kum de.

Piştî ku sêv avêt wî û xort serê xwe rakir li wan nêrî, keçîkê ji dada xwe re got: “Navê xortê ku min ew nîşanî te da çi ye?” Dada wê got: “Navê wî Inselwicûd e.” Keçîkê serê xwe hejand û sûretê wî di nava dilê xwe de veşart, û rê li ber ramanêke agirîn vekir, hilmeke kur kişand û got:

Ne şaş bûn ê ku navê te kirin Inselwicûd
Hem ins î tu hem cin î tu bo te sicûd
Ey rûheyv û şewqdarê erd û wicûd
Tekan î tu di seranserê dîrokê de sirûd
Siltan û mîrê qeşengan tu yî welah
Ey xwediyê herdu çavên reş û fireh
Weke şaxê şîndareke nazik û nerm î tu
Di her hêlê de bexşekar û comerd î tu
Hemû siwar û cengawer li pey te man
Hîn ji serdar î tu li ser textê ciwanan

ŞEVA 375'EMÎN

Şehrezadê got:

Îcar şahînsahê min ê gewre! Tê gotin ku gava Werdê helbesta xwe qedand, hemû derbasî kaxezê kir, li hev pêça û xist nava potikekî hevrişimî ku bi zêr neqîşandî bû û di bin balîfa xwe de bi cih kir. Tu nabêjî di wê kêliyê de çavên dadîkeke wê li ser bû û dît bê çî dike. Ew dadîk hat ba wê û bi zîmanekî şîrîn pê re axivî, hetanî di xew re çû. Nuh di xew re çû, dadîkê ew kaxez ji bin balîfa wê derxist, xwend û fêhm kir ku dilê wê ketiye Inselwicûd. Piştî, kaxez dişa mîna berê pêça û xist cihê wê. Dema ku ji xew rabû jî, dadîka wê jê re got: “Xatûna min, dilê min pir bi ser te de ye û ez dixwazim tu bizanibî ku bayê evînê dijwar e û veşartina wî hesin dihelîne, nexweşîyan li pey xwe dihelîne û serêşeke mezin ji mirov re çêdike. Eşkerekirina evînê jî ne şerm e ne jî guneh e.” Werdê jê re got: “Dadêcan, dermanê evînê çi ye?” Dadê got: “Dermanê wê wîsal û hevghîştina aşîqan e.” Werdê pirsî: “Û çawa mirov dikare xwe bigihîne maşûqê xwe?” Dadê got: “Bi nivîsê ne bi axaftinê xatûna min. Bi silavdayîneke germ û bi nivîsandinê aşîq digihîjin hev û kelem ji pêşîya wan radibin. Vêca heger di vî warî de emrekî te hebe, ez amade me, ku razên te veşêrim û nameyên te bibim, pêdiviyên te pêk bînim.”

Gava ku Werdê ev gotin ji dadîka xwe bihîstin, ji kêfan baskên wê çêbûn, lê belê hestên xwe di dilê xwe de veşartin û di nava xwe de ji xwe re got: “Ji min pêve tu kes bi vî tiştê di dilê min de nizane. Hetanî ku vê jinikê neceribînim ez ji wê re nabêjim!”

Di wê navberê de jina ku dadîka wê bû jê re got: “Xatûna min, îşev min xewnek dît, yekî ji min re digot; xatûna te û Inselwicûd dil ketine hev, ji hev

û din hez dikin. Tu jî bibe qasidê xêrê di navbera herduyan de û nameyên wan bibe û bîne, pêdiviyên wan pêk bîne û razên wan veşêre, da ku Xwedê xêra te binivîse. Va min xewna xwe ji te re got, êdî jê û pê de tu dizanî!”

Bi vê gotina jinikê re, Werdê nermtir bû û jê pirsî, got: “Dadêcan, gelo tu dizanî razan veşêrî?” Jinikê got: “Ez çawa nikarim razan veşêrim û ez ji dola azadan im!” Wê gavê Werdê destê xwe avêt bin balifa xwe û ew helbesta xwe ya nivîsandî derxist, da destê wê û jê re got:” Vê nameya min bigihîne Inselwicûd û bersiva wê jî min re bîne!”

Jinikê rahişt nameya wê, bir da Inselwicûd; piştî ku destê wî maçî kir û hêzar silav lê kirin. Gava Inselwicûd xwend, wateya wê fêhm kir û têgihîşt. Destê xwe avêt hibr û kaxez û ev rîstên hanê nivîsandin:

Birîndar e dilê min bi evîna te bêdeng im ez
Lê belê rewş û hal diyar e dildar im ez
Bi girî û fixan im hêşiran dibarînim ez
Da ku birînên çavê xwe bikewînim ez
Da ku veşêrim ez ji ber dijmin kul û birîn
Da ku nas bikim ez ji nû ve eşq û evîn
Bi te mezin dibim ez ew dildarê xemrevîn
Berê nejiyabûm ez qet nas nedikir min evîn
Çîroka xwe vedibêjim û loman dikim li te
Belkî bibînî tu, ev dilê dildar baş bibe bi te
Dinivîsim ez her tiştî bi hêşirên çavan
Wergera hevokan jî barê te ye ey dilovan

Piştî kaxez li hev pêça û bir ser lêvên xwe, ew maçî kir.

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 376'EMÎN

Şehrezadê got:

Çawa ku me got, Inselwicûd kaxezê xwe li hev pêça, maçî kir, da jinikê û jê re got: “Dadokê ji bo xatirê xatûna xwe, vê nameyê jê re bibe!” Jinikê got: “Ser seran, ser çavan.” Rahişt nameyê û vegeriya cem xatûna xwe, name da wê. Werdê rahişt nameyê, danî ser lêvên xwe, ew ramûsa, piştî vekir, xwend û têgihîşt bê çî dibêje. Rahişt pênûsê, kaxezek kişand ber xwe û nivîsand:

Ey dildarê dilkewiyayî bi evîna wê
Sebir bike belkî bi ser keve tu li gel wê
Gava têgihîştim ku evîna te sadiq e
Dema fêr bûm ku dilê te pê sadiq e

Hîn bêtir dil da min bi şewqa wesletê
Mixabin kelem û bend hene bi wê xisletê
Dema şev dikeve erdê agir dikeve hinavan
Beden giş dibe pêt û pereng ji dev û lêvan
Êdî nivîn jî kêr e birîn dike sing û laşan
Şer'a evîne her ew e veşartina sir û razan
Tu jî raneke ji vê navberê wan hîcaban

Piştî ku ev helbesta xwe nivîsand, kaxez li hev pêça û ew da destê dadoka xwe. Dada wê rahişt nameyê û ji cem Werdê derket çû. Di rê de xizmetkar lê rast hat û jê re got: “Tu bi ku ve diçî?” Wê jî lê vegerand, got: “Ez diçim hemamê.” Pê re jî, bi hêrs ji wî dût ket û bi lez li derî zivirî, derket. Di nava wê lez û bezê de name jê ket di devê derî de lê ew li xwe hay nebû.

Demek bi şûnde, xizmetkarekî din di wir re derbas bû û çav li wê nameyê ket. Rahiştê û berê xwe da cem wezîrê ku wê gavê li ser doşeka xwe rûniştî bû. Çawa dît ku xizmetkarek ber bi wî ve tê, berê xwe da wî, lê zivirî, xizmetkar got: “Mîrzayê min, min ev kaxez li devê derî dît, min xwest ku ez ji te re binim.” Wezîr kaxeza pêçayî ji destê wî girt û vekir, lê nêrî, bala xwe dayê ku helbestek tê de nivîsandî ye. Helbest xwend û wateya wê fêhm kir, têgihîşt. Bi hûrgilî li teşeyê nivîsa wê nêrî, têgihîşt ku bi destê keça wî hatiye nivîsandin. Rabû ser xwe, çû derbasî cem diya wê bû. Hem li xwe dida, hem digiriya û hêsir dibarandin. Gava jina wî dît ku hêsirên wî bi ser riha wî de tîn xwarê, jê pirsî û got: “Çi qewimiye ku tu bi girî vekirîye?” Wezîr got: “Vê nameyê bigire û binêre bê çî tê de nivîsandî ye.”

Jina wî rahişt kaxez, xwend, fêhm kir û têgihîşt ku nivîsa keça wê ye, ji Inselwicûd re. Giriya wê jî hat, lê karibû bi xwe ku hêsirên xwe veşêre û giriya xwe bide sekinandin. Ji wezîr re got: “Tu fêde di girî de nîn e mîrzayê min, a baş ew e ku tu li tevdîrekê bigerî, ji bo ku tu namûsa xwe bisitirînî û razên keça xwe veşêrî.”

Piştî, hewl da ku li ber dilê wî here û bê û wî aram bike. Wezîr got: “Ez li ser keça xwe ditirsim ji eşqê, lewre siltan pir ji Inselwicûd hez dike û tu jî vê yekê dizanî! Tîrsa min ji ber du sedeman e: Yek jê ew e ku Werdê keça min e û ez terefekî meseleyê me; ya duduyan jî ew e ku terefê din siltan e û ew jî pir ji Inselwicûd hez dike û dibe ku ev bibe pirsgirêkeke mezin. Ka tu çî dibêji di vê mijarê de?”

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 377'EMÎN

Şehrezadê got:

Gava ku wezîr fikra jina xwe pirsî, wê jî got: “Ka bêhna xwe fireh bike hetanî ku ez nimêja îstixfarê bikim, piştîre ez ê ji te re bibêjim!”

Rabû du rekaet nimêj kirin, piştîre ji mêrê xwe re got: “Di nivê Derya Defîneyan de çiyayek heye jê re dibêjin Çiyayê Sêwiyan ku tu kes nikare xwe bigihîne wir. Li wê derê qesrekê ji keça xwe re ava bike û wê li wir bi cih bike.”

Ev fikra hanê ket serê wezîr. Wî û jina xwe li ser wê yekê li hev kirin ku qesrekê jê re li wir çêbikin û qûtê salekê jî jê re li wir deynin û çend heb cariyeyên ku wensa wê binin jî deynin gel wê, li gel hinek parêzvanên ku xizmeta wê û ewlehiya wê bikin.

Di pey wê re, necar û hosteyên lêkirinê li hev kom kirin û ew şandin wê deverê, li wî çiyayî jê re qesrek çêkirin ku tu kesî qesrên mîna wê nedîtibûn. Piştîre qût û zad jî amade kir û bi şev derbasî cem keça xwe bû û jê re got: “Rabe em herin!”

Dilgiraniyeke mezin bi Werdê re çêbû, mîna ku bizanibe wê çi were serê wê. Gava derket devê derî û karwanê koçkirinê dît, kûrekûr pê ket, giriya, qolinc ketin nava wê. Bi hestiyarî li ser derî nivîsand:

Ey qesra dilan
Şiyar bimîne tu her gav
Dibe ku maşûq derbas bibe li gel raçav
Li gel agirê dilan bigihîne wî silavan
Lewre bê agah e ew ji rêwîti û koçan
Qet nizanîm em ê bi ku ve herin wî alî
Çawa vegerim bo te bibînim li vî alî
Birîndar e bilbil binêre çawa ew dinale
Li ser darê her bi fixan e binêr çawa dikale
Xwedê tola me gişan hilîne ji hemû zikreşan
Hemû hasid û dilgimarên genî û çavreşan
Qedehên wisletê tijî bikin hûn bi xemran
Felek jî bi qehrê têr dike me bi karwan
Guleke sebrê bo te dişînim ez bi lêborîn
Mixabin çeka me sebr e nîn e tu mizgîn

Piştî ku nivîsa xwe qedand, siwar bû û bi karwan re ket rê. Meşîyan, çol û çiya derbas kirin, hetanî ku gihan qiraxa Deryaya Defîneyan. Li wê derê rawestîyan, çadirên xwe vegirtin. Piştîre bi keştiyeke mezin ew û malbata wê derbasî Girava Defîneyan kirin. Ji ber ku siltan ji wan re gotibû; ew û malbata wê derbasî giravê bikin û di qesrê de bi cih bikin, keştiyê jî li wir bişkinin, bi şûn de venegeşînin, da ku rêya revê li ber wan bê girtin; wan jî wisa kirin û keştî şikenandin. Piştîre vegerîyan bajêr, di nava girî û xemginiyê de.

Îcar em vegerin ser rewşa Inselwicûd. Ew jî gava sibehê ji xew rabû, du rekaet nimêja xwe kir; piştî siwar bû, da ku biçê cem xizmetkarên siltan. Lê di rê de, mîna her car rêya xwe bi mala wezîr xist, bo hinek dostên xwe bibîne. Lê gava hat ber derî, dît ku helbestek li ser nivîsandî ye. Çawa ku xwend, ber çavên wî reş bû û agir bi dilê wî ket. Vegeriya malê lê hedana wî tune bû. Di nava qelaqeke mezin de, derdê xwe di nava xwe de veşart hetanî êvarê û çawa tarîka şevê ket erdê, ew jî mîna serxweşan ji malê derket û meşiya bêyî ku bizanibe bê bi ku ve diçe. Şev pê de meşiya hetanî ya din î rojê. Gava dinya lê germ bû, xwe da ber siya dareke ku avek di ber re diçû û li wir rûnişt. Devê xwe xist avê, hewl da ku hinekî vexwe, lê tam di avê de nedît. Mehdê wî zer bûbû û nigên wî ji meşê werimîbûn. Pir bêhal ketibû, nizanibû wê çi bikira. Ji ber herdu êşan; êşa dilê xwe û êşa laşê xwe, giriya, hêsir barandin û di ber xwe de got:

Ger aşîq serxweş ketine bi eşqa maşûq
 Dê her zêde bibe di dil de birûq
 Avjenkara derya evînê wenda bûye
 Ne cî heye jê re ne jî sûretê wê heye
 Dê çawa bextewar bibe bê dildar
 Dê çawa sebra wî bê bê evîndar
 Hêsir dibarin ew weke baranê
 Ji rûçikan dinisilin her têne xwarê
 Gelo ez ê bibînim careke din wê dîlberê
 Gelo wê vemire agirê dil bi dîna yarê

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 378'EMÎN

Şehrezadê berdawam kir:

Çawa ku Inselwicûd ew helbesta ji bo Werdê xwend, pir hestiyar bû, giriya û hêsir barandin hetanî ku erd şil bû. Piştî ku bi ser xwe ve hat; rabû ser xwe, ket rê û li dû Werdê çû. Çol û beyar derbas kirin û meşa xwe berdewam kir hetanî ku şêrekî ecêb li pêşiya wî derket, ku serê wî mîna girêkî, devê wî mîna deriyekî, diranên wî mîna yên filan û lapûşkên wî mîna kalûçkan bûn. Çawa ku çavên Inselwicûd lê ket, mirina xwe dît û eşheda xwe anî, xwe ji mirinê re amade kir. Jixwe berê jî di pirtûkan de xwendibû û dizanibû ku kesê hewl bide şêr bixapîne xwe dixapîne. Dîsa jî hêviyeke wî hebû, dibe ku rastî bandorê li şêr bike. Jê re got: “Ey şêrê daristanê û melkemetê mirinê; ey mêrxasê serkêşê xortan; ey siltanê hemû dirrindeyan! Ez aşîqekî birçiyê bêriyê me û min evîndara xwe wenda kiriye, loma ez wisa gēj û weke debengan im. De êdî guh bide gotinên min û li evîn û bêrikirina min were rehmê.”

Gava ku şêr ew gotin ji devê wî bihîstin, çend gavan bi şûn de vegeriya û li ser teriya xwe rûnişt. Piştî serê xwe jê re rakir û bi herdu nigên xwe yên pêşîn birin û anîn, wek ku bixwaze tiştêkî jê re rave bike. Dema ku Inselwîcûd ew liv û tevger dît, bi helbestî got:

Qey tê min bikujî hey şêrê daristanê
Beriya ku ez wê bibînim li çolistanê
Ne nêçîr im ez ne jî di minde heye goştî
Evînê ez hejar kirime mame çerm û hestî
Xurbeta dildarê giyan nehiştiye di min de
Hezhizîme ez weke laşêkî di kefen de
Ey serokşahê hemû ajal û daristanan
Tikan dikim gunehê min neke tu tu caran
Şan û şerefa xwe nexe erdê bi kuştina jaran
Jixwe va ye ez fetisîme di deryaya razan

Gava ku şêr ev helbesta wî bihîst, pê ve rabû bi dilovanî û bi çavî tîjî hêşir ber bi wî ve çû. Hat cem wî û bi dîlnazî ew alast, bi zîmanê xwe, piştî ket pêşîya wî û bi îşaretê jê xwest ku bide dû wî. Inselwîcûd da dû wî û bi qasî saetekê meşîyan hetanî ku gihan serê çiyê. Ji wê deverê şêr li derdorê nêrî û dema çav li xaçîrêkek karwanan ket, xwe bi ser de berda, Inselwîcûd jî li pey wî. Meşa xwe di wê xaçîrêkê re berdewam kirin hetanî ku gihan qiraxa behrê. Ji ber ku xaçîrêk li wir bi dawî dibû, tê derxistin, ku karwanê tê re hatiye rêya xwe di deryayê re berdewam kiriye. Hêviya wî li wir bi dawî bû û bêçare li çep û rastê xwe nêrî lê tiştêkî ku hêviya wî dîsa jîndar bike nedît. Tirsiya ku hinek dirinde li wir lê rast bîn û wî bixwin. Rabû bi çiyê ve hilkişîya, berjor çû heta ku dengê kesekî bihîst, ku di şikeftê de diaxivî. Ber bi wê şikeftê ve çû û hebekî li wî dengî guhdar kir; bala xwe dayê, ku abidekî Xwedê ye, ketiye xiroşê. Sê caran li deriyê şikeftê da, lê wî derwêşê abid bersiv nedayê, qise ji nekir û pê ve jî derneket. Bêhna xwe berda, hilmeke kûr kişand û bi helbestî got:

Ez ê çawa bigihême hedef û armanca xwe
Ez ê çawa rizgar bibim ji kul û derdên xwe
Van êş û azaran ez pir pîr û kal kirim
Hem ji rîh û por, hem jî ji dil ve ez kal kirim
Heta niha nedît rojek min ji xwe re yek alîkar
Yek palpişteke yek dostek yek dilxweşkar
Ez pir êşbar im dil bi ar û gelekî tengav
Him neçar im him bêhêz im him jî bêgav
Dildarek im vexwariye min meya hîcran
Qey tê li min neyê rehmê ey sofîyê dilovan
Dilagir im nav bi pêt im di şubha pereng
Ji ber bêriyê hiş firiyaye bûme debeng

Li Şhrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 379'EMÎN

Şhrezadê got:

Çawa ku Inselwicûd ew helbesta xwe qedand, deriyê şikeftê lê vebû û dengê yekî ji hundir ve hat, ku digot: “Dilovanî ji bo Xwedê ye!” Di derî re derbasî hundir bû û silavek da sofî. Sofî jî silava wî girt û got: “Navê te çi ye?” Got: “Navê min Inselwicûd e.” Got: “Ji bo çi û ji ber çi tu hatiya vê deverê?” Inselwicûd çiroka serpehatiya xwe ji serî hetanî dawiyê jê re vegot. Sofî giriya û got: “Ey Inselwicûd, ev bîst salên min in ku ez li vir im û hetanî duh jî çavên min bi kesî neketibûn. Şeva borî dengê girî û wêlewêl û nalînan hat min. Ez derketim û min li hêla ku deng jê dihat nêrî, min dît ku pir kes li hev kom bûne û li qiraxa avê çadiran vedigirin. Piştî keştiyek çêkirin, xelk lê siwar kirin û bi deryayê de çûn. Dûre hinek ji ew ên ku çûbûn keştî bi şûnde vegerandin û çawa ku jê peya bûn ew şikandin, xera kirin û bi rêya xwe de çûn. Ez texmîn dikim ku yên tu li dû wan hatiya jî, ew ên li ser piştî keştiyê çûn û venegeriyan e. Ji ber wê tu ew qasî xemgîn î û mafê te jî heye. Lê belê tu evîndarekî ku bêrî û hesreta evîne nekişandibe, tune ye.” Di pey re bi helbestî got:

Min jî bide ber çavan û aram be ey Inselwicûd
Bêrîkirin pir dijwar e min jî rapêçe bi wesla wicûd
Hiş û dil vediçirine ew dipertîne her bê pîvan
Sotîner e mîna pêtan çi li lêvan çi li hinavan
Ji biçûkaniya xwe ve nas dikim ez eşq û evîne
Hîna ku min şîr dimêt ji singê diya xwe Zînê
Ez jî pê re jiyame qet nebêje ew yekî nenas e
Heger pirsî te rojekê ji wî dê bêje te ew baş dinase
Vexwar min piyala firaqê pir bi eş û jan
Pê bûme hestî û çerm ji derdê birîna can
Pir bêhêz bûm ez berê lê kanî ew roj û dem
Artêşa sebr û arama min giş bû feda li cem
Bê xurbet û dilêş û azar û lêdan û cancefa
Nagihîje tu wisleta evîne qet natehmînî wefa

Piştî ku sofîyê abid ew helbesta xwe qedand, Inselwicûd himbêz kir û herdu bi hev re giriyan, hetanî ku çiya gişî bi olana dengê wan dengveda û herdu ji ser hişê xwe çûn, li erdê ketin, veziliyan. Piştî ku bi ser xwe ve hatin, li rex hev rûniştin û sond û peyman bi hev re dan ku êdî bibin du dost û bira. Piştî sofî ji Inselwicûd re got: “Ez îşev nimêj bikim û lavan ji Xwedayê xwe bikim ku rêyekê nîşanî te bide.” Inselwicûd got: “Baş e, ez ê jî di rêya te de bim.”

Em Inselwicûd û sofiyê hevalê wî li wir bihêlin û em vegerin ser Werdelekman. Gava Werdê û malbata wê birin giravê û di qesrê de bi cih kirin, Werdê li çar dîwarên odeya xwe nêrî, kelogirî bû û got: “Wilehî tu malekî xweş û paqij î lê evîndar ji te kêr e!”

Îcar ew girava hanê tijî çûk û teyr û tilûr bûn. Çawa ku Werdê çav li wan ket, ji xizmetkarên xwe xwest ku dehfikan li ber deynin û wan bigirin. Her ku xizmetkaran çûk girtin, wê jî ew xistin qefesan û di qesrê de bi cih kirin; her qefesek xist şibakeyekê û li ber wan rûnişt, rojên bihurî anîn bîra xwe, pir hestiyar bû, bêrîkirina eşq û evînê bi agirê xwe ew rapêça û bi dilêşî got û naliya: “Ezê giliyê xwe li ba kê bikim, gazinc û lomeyan ji kê bikim û kulên firaqa hebîb ji kê re rave bikim! Agir û pêtên sotîner di nava hinavên min de ne û ez wan vedişêrim ji her kesî! Ez bûme weke dareke hişkolekî ji ber vî agirî û vê dûrketinê! Ji ber vî girî û ji ber vê hêsrbaranê! Ka çavên dildar li ku derê ne, ku min nabînin? Pêkûtî û zilmeke mezin li min kirin bi vê nefikirinê û bi vê dûrxistinê! Li vê devera ku Inselwicûdê min nikare xwe bigihîne, ez ji tîrêjên tavê dixwazim ku silavên min jê re bibe, çi gava ku tav hilê û here ava.”

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 380'YEMÎN

Şehrezadê got:

Di wê navberê de Werdê di nav biraninan de çû, hestiyariya wê kûrtir bû û bi helbestî got:

Gelek rind e pir spehî ye bi qasî ku heyv ji ber fedî bike
Rewankêş e bi her dîtîne mirov ji nû ve zindî dike
Gul û çiçek û rihan pir bi şerm in her ku pê re diaxivin
Ew qasî ewperest im ez ku qe nahêlim kes pê re biaxivin
Lêvhingivîn û rûgewez e ku pêtên dilan bi xwe re dibe
Maçek bi tenê agirkuj e pêtên hinavan tên ji dil e
Ez ê çawa wî ji bîr bikim bawer bikin aqil der e
Êş'âm ew e derman ew dildar û xoşewîst ew e

Di pey re qasekê bêdeng bû û di nava xemgîniyeke kûr de rêwîti kir. Piştî mîna ku bi xwe re biaxive, peyivî û got: “Dilê min ji ber agir û pêtan ziviriye dojeheke bêbinî, ku gurçik ji ber germa wê dipeqin. Ji ber ku bê xatirxwestin ez jê veqetiyame, dilê min tê guvaştin bi êşa poşmaniyeke dijwar û ji xwe re dibêjim xwezîka cara dawîn min xatir jê bixwesta! Kesên ku agahiyên min jê re dibin, divê bizanibin, ku ez xwe bi nivîsa pênûsan radigirim û dimînim li bendî şensê xwe. Ey şevîna şevê, silavên min bigihîne wî, bila bizanibe, ku xew li min herimiye û mijankên min qet naçine ser hev!”

Werdê, ji wir çû cem şibakeyeke din î ku qefesa çûkekî bi navê Hezar tê de bû. Çawa ku Hezar ew dît, wî tewît pê ket, stira. Wê jî bi hebvestî lê vege-
rand û çawa ku bersiva çûkan bide stira û bi saetan avêtin ber hev.

Em Werdê li ber şibakeyê bihêlin û em vegerin ser Inselwicûd. Ew jî bi hêvî bû ku sofîyê abid rêyekê bide ber wî. Sofî jê re got: “Ey Inselwicûd! Here biniya çiyê, darên xurmeyan li wir hene. Ji wan şîndaran hinek lîf bîne.” Inselwicûd çû biniya çiyê gurzek lîf anîn. Sofî lîf li hev hûnan û tiş-
tekî mîna tebekê jê çêkir. Piştî jî Inselwicûd re got: “Îcar rabe here biniya newalê, nava bîstanan, tê bibînî ku kundirin mezin î hişk di lemên xwe de ne. Çend kundirên mezin ên hişk bixe vê tebekê, wan tê de girêbide û bavêje avê lê siwar bibe û bi behrê de biçê, belkî tu li evîndara xwe rast bêtî û tu bigihîjî meqseda xwe. Baş bizanibe ku kesê talûkeyan nede ber çavên xwe, nagihê meqsedên xwe.”

Inselwicûd got: “Bila be, ez ê wisa bikim.” Spasiyên xwe pêşkêşî wî ki-
rin, xatir jê xwest, duayên xêrê jê re kirin û bi rêya xwe de çû. Berê xwe da binê newalê û sofî çî jê re gotibû, wisa kir. Di encamê de kundirên xwe giş xistin tebekê, ew pev girêdan, avêt behrê û lê siwar bû, bi avê de çû. Ba û pêlên avê ew li ber xwe birin ber bi nîvê behrê de û piştî talûke û rêwîtiyeke
pir zor, ew avêtin qiraxa Çiyayê Sêwîyan. Gava derket ser bejahiyê, çogên wî hişk û pûç bûbûn, nema dikaribû bimeşiya; lewre sê rojan di nava behrê de mabû. Pir tî û birçî jî bûbû, loma çawa ku bi nav şîndaran de çû, mîna ferxikên mirîşkan devê xwe vekir û bi lez û bez bi daran ve hilpirikî, têra xwe fêkî xwar. Lewre wan deran tijî darên fêkiyan bûn. Çem û kanî jî pir bûn, têra xwe av jî vexwar û bi xêra wê, careke din hêza wî lê vegeriya, bi ser xwe ve hat.

Gava hinekî din ber bi jora giravê ve çû, tişteki spî ji dûr ve xwiya kir. Berê xwe da wî tiştê spî û meşiya, hetanî ku gihiştê; dît ku qesreke pir mezin e, mîna kelehekê ye. Hat ber qesrê, dît ku kilîtîkirî ye. Sê rojan li ber qesrê rûnişt, hetanî ku roka sisiya deriyê wê vebû û xizmetkarek jî hundir derket. Çawa ku çavên xizmetkar li Inselwicûd ketin, şaşwaz bû, jê pirsî û got: “Tu ji ku hatiyî û kê tu aniye hetanî vir?” Inselwicûd got: “Ez ji Esfahanê me. Ez û çend heb tacirên din em di keştiyekê de bûn, me malê xwe dibir Çîn û Maçînê lê di nîvê behrê de keştiya me xwe li ber pêlan negirt, ji hev ket. Min jî xwe bi textikekî ve girt û pêlên avê ez di vir re derxistim.”

Dilê xizmetkar pê şewitî, ew himbêz kir û li ser rewşa wî giriya. Piştî jê re got: “Tu bi xêr û xweşî hatî mêvanê delal, ser seran û ser çavan hatî. Esfahan welatê min e jî. Gava ez ciwan bûm, keçeke apê min jî li wir hebû, ku min gelekî jê hez dikir. Lê di wê demê qewmekî ji me xwirtir bi ser me de girt, em talan kirin û ez jî di nava talanê de bi xwe re birim, ewkê min jêkirin û ez ji xwe re kirim xizmetkar û va ye niha jî ez li vir im.”

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 381'EMÎN

Şehrezadê got:

Xizmetkarê qesra Werdê, vegotina çîroka jiyana xwe ji Inselwicûd re berdewam kir û got: “Îcar piştî ku wan êrîşkaran ez bi koletî firotim van kesan û wan jî ez kirim xizmetkarê xwe, ez ketim vî halê ku tu dibînî.” Piştî dîsa xêrhatina wî kir û ew derbasî hundirê qesrê kir. Çawa ku Inselwicûd derbas bû, dît ku golege avê di hewşa wê de ye û derdora wê tijî şîndar û teyrik û çûk in. Li her goşeyekî jî rêzek ji qefesên zêrîn ku tijî çûkên cur be cur bûn û hinek jî bi şaxên daran ve daliqandî bûn. Ber bi wan ve çû û gava giha cem qefesa ewil, dît ku qumriyek tê de dike wî tewît û dixwîne. Gava ku qumrî çav li Inselwicûd ket, jê re got: “Mîrzayê min!” Inselwicûd, di nava şaşwaziyeke mezin de ji ser hişê xwe çû û li erdê ket. Gava bi ser xwe ve hat, hilmeke kûr kişand û ji çûk re got: “Qumriyo! Qey tu jî mîna min dinalî? Nexwe ka ji Xwedayê gewre bipirse bi vê wî tewîta xwe re! Gelo ev strana wî tewîta te ya şahî û bextewariyê ye yan a êşa evîneke ku di dilê te de rûniştî ye? An te evîndara xwe wenda kiriye û agirek di nava te de heye?”

Piştî van gotinan, Inselwicûd hestiyar bû û giriya hetanî ku dîsa ji ser hişê xwe çû. Gava dîsa bi ser xwe ve hat û meşa xwe berdewam kir û çû ber qefeseke din, dît ku bilbîlek tê de dike wî tewît. Gava çav li Inselwicûd ket, jê re got: “Ey Herdem!” Inselwicûd bi şaşwazî hilmek kişand û got:

Bilbîlek distirê bi newayeke hestiyar
Gazî dike min dibêje Herdemê hevyar
Belkî Xwedayê gewre bide min bi xêra xwe
Fîrqeta me bi dawî bike ji kerema xwe
Belkî zimanşîrînek were vir serdana min
Were pîroz bike ew evîn û eşqa min
Lewre mame ez di nava xilwetê de
Dişewitim disojim ez di nava agir de
Hêsirên dil dibarin li gel wê xwîna sor
Bi ser hinarikan de digindirin ew sor û mor
Tu giyanwer bê êş û azar nîn in ew we ye
Ez jî wisa me lê sebr û arama min heye
Lê helbet Xwedê dikare me bigihîne hev
Dikare dîsa me vegerîne bextewariyeke berhev
Dikare deriyan li ber me veke û me azad bike
Dikare xweşî û şahiyê her dayîm bike

Piştî ku helbesta xwe qedand, meşa xwe berdewam kir û çû cem qefe-

seke din, ku Hezar tê de bû. Çawa ku hezar çav lê ket, wî tewî pê ket, stira.
Inselwicûd jî lê vegerand û got:

Newaya hezar xweş û bestekar e
Mîna newaya aşîqê evîndar e
Xwedê alîkarê hemû dildaran be
Timî di qelaqê de ne dê çawa be
Geh evîne geh şewq û geh bêrî ne
Geh êş e geh azar geh jî şevîn e
Gava min dilda ez ketim qefesê
Dema evîndar bûm dest ketin qeydê
Hêsir bariyan jî çavan min jê re got
Êşa xilorîkan jî her canê min disot
Dûrbûn ket nava me de xwîn tewirî
Bêrîkirinê zor da sebrê dil qemirî
Ger heqîyek hebe ez ê bigihême te
Dilovan e Xwedê tolê nagire ji me
Xwe rût û tazî kiriye min ez weha
Bê rûpoş im bê kinc saf û eşkera

Pîştî meşa xwe berdewam kir û çû cem qefeseke din, ku zerzûlek tê de bû. Çawa ku zerzûl çav lê ket, xwend û stra.

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 382'EMÎN

Şehrezadê got:

Gava zerzûl stira, Inselwicûd jî lê vegerand û got:

Bi seherê re xweş tê dengê zerzûl
Newayek ji dil dide mirov dike mijûl
Inselwicûd jî va ye gilîkar e
Ji ber ku evîna wî pir dijwar e
Gelek awaz bihîstin me bi rengan
Gelek stran bihîstin me bi rengan
Hesin heland ewê bi awir û davan
Belkî me av bide bayê sibê bi tavan
An jî bi bêhna gul û çiçek û xuncan
Çawa mest dîkin ew me bi çêjerengan
Çawa tînin bîra me dildar û şengan
Çawa veder dîkin ji dil av û çeman
Lêborîna'm eşkere ye timî di çavan
Lê tenê binêr dibînin wê di nazan

Piştire meşa xwe berdewam kir hetanî giha qefeseke din, ku kevokeke spî û pir xweşik tê de bû, gerdeniyeke cewheran di stûyê wê de bû û dibiriqand. Inselwîcûd bi baldarî li wê kevokê nêrî, dît ku pir behetî û şaşwaz e di qefesa xwe de. Hestiyar bû û got:

Silav li te be kevoka zinaran
Xwişka evîndar û aşîq û dildaran
Dilê min li cem xezaleke spehî ma
Ku awirên wê tûj bûn weke şûra
Dişewitim ez bi agir û pêtên delalê
Kal û hejar bûm bi awirên hevalê
Dûr ketimêz ji zad û xwarin û avê
Ji xewê jî bêpar im ez evê gavê

Piştire, li hemşeriyê xwe yê Esfehanî zivirî û jê re got: “Ev çi qesr e û kê ew ava kiriye?” Xizmetkarê Esfehanî got: “Wezîrê filan siltanî ji keça xwe re çêkiriye, ji bo ku wê ji bûyer û musîbetên demê biparêze û ew tê de bi cih kiriye li gel nedîme û cariyeyên wê. Deriyê qesrê jî incex ji salê carekê lê tê vekirin; ew jî roja ku kel û pel û pêdiviyên wê yên salane jê re tên.” Inselwîcûd, di dilê xwe de ji xwe re got: “Nexwe dê meqseda min pêk were lê salek, zemanekî pir dirêj e!”

Em Inselwîcûd li wir bihêlin û em vegerin ser Werdelekman. Werdê di nava êş û azareke mezin de bû. Ne xwarinek, ne jî avek di qirîqa wê re diçû; ne hedan lê hebû ne jî aramiyê rêya xwe pê dixist; xew lê herimîbû û agirê bêrî û evînê laşê wê dikewand. Di qesrê de çû û hat, li derdora xwe zivirî, geriya lê bêhna wê fireh nebû.

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 383'EMÎN

Şehrezadê got:

Gava Werdê dît ku bêhna wê fireh nabe, dilbikeder bû û di ber xwe de got:

Bi darê zorê veqetandin wan em ji hev
Di zindana tenêtiyê de em dûr xistin ji hev
Dilê min sotin bi pêt û evîna yarê min
Ji ber çavan veşartin delalê ber dilê min
Li ser çiyayekî تنها di nîvê behrê de
Di nava zindaneke mezin bi navê qesrê da
Ez bi tenê girtime wan di vir de eman
Sebra min qet nayê bêyî rêhevalê can
Ger tune bûya xilweta wî li ber çavan

Debara min qet nedihat li van deran

Piştê ji cihê xwe rabû û derket ser banê qesrê, di nava kinc û libasên Balebekî² de, ku kincê wê yê herî xweşik û lihevhatî ew bû. Di gerdana wê de ji gerdeniyeke tijî cewher û lûlû hebû. Çend kirasên din jî bi xwe re anîbûn ser ban. Ew hemû bi hev ve girêdan, mîna werîsekî û hêdîka xwe bera erdê da, daket jêr û ber bi behrê ve meşîya û çû, hetanî ku giha qiraxa avê. Li wir dît ku keleka masîvanekî ber bi beyarê ve tê. Li qiraxa avê keleka xwe bi keviyekî ve girêda û derket ser axa giravê. Çawa ku derket ser beyarê, çavên wî li Werdê ketin û behetî ma! Lewre wî digot qey giraveke ji insanan xalî ye. Bi tirs li keleka xwe vegeriya, ji bo ku ji wir bireve. Lê Werdê lê kir gazî û bi helbestî got:

Nêçîrvano metirse lo hela raweste
Miroveke jin im ez ne keseke cinî me
Bo xatirê min be jî hebekî dilovan be
Guh bide min hema tenê yek kêlikê be
Qey awirên te baş ji hev dernaxîne
Eşqa di çavan de bi rastî jî tu nabîne
Evîndara xortekî nûgihayî me ez
Yekî ku roniya rojê derbas kiriye teqez
Çavên wî yên xezalan e por jî xelek
Delalî giş di rûyê wî de ne bê guman û şik
Kî çav lê dikeve teqez ew tête ser rê
Bi xêra nûra wî rizgar dibe ji kufrê
Xweska bi wê êşa ku bê kişandin di ber de
Hemû tev xêrên li ser xêran e bi ser de
Ditirsim mirin berî min xwe bigihîne wî
Dilê min pê re maye hişê min giş li cem wî

Gava ku masîvan ev gotinên wê bihîstin, pir hestiyar bû, dilovanî ket dilê wî û lê vegeriya. Keleka xwe da ber qiraxa avê û gazî wê kir, got: “Were siwar bibe li kelekê, tu ku dixwazî ez ê te bigihînim wir.” Keçik çû li kelekê siwar bû, wî jî bêrikên xwe li avê dan û bi behrê de çû. Lê hîna ku zêde dûr neketibûn, bayekî xwirt lê da û pêlên avê bilind bûn, keleka wan dan ber xwe û bi lez birin, hetanî ku ji ber çavan wenda bûn. Êdî masîvan jî nizani-bû bê li ku ne û bi ku ve diçin. Piştî sê rojan, dilovaniya Xwedê bi ser wan de hat û ba şikest, derya jî aram bû, pêlên wê daketin. Kelek jî baş bi rê ve çû hetanî ku giha bajarekî li qiraxa behrê.

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî.

ŞEVA 384'EMÎN

2 Balebek bajarekî Lubnanê ye, kirasê Balebekî modeleke kincên wê deverê ye.

Şehrezadê got:

Gava masîvan li wî bajarî rast hat, xwest ku keleka xwe li wir bide rawestandin û derkeve ser bejahiyê. Vêca li wî bajarî jî mîreekî hêzdar û bi heybet hebû, ku navê wî Dirbas bû. Di wê kêlikê de jî Dirbas û keça xwe, di qesra xwe de li ber şibakeyê bûn, ji xwe re li derve temaşe dikirin. Vêca gava berê wan ket behrê, çavên wan li wê kelekê ketin û ji xwe re lê temaşe kirin. Gava kelek hat benderê û nêzikî wan bû, dîtin ku keçeke pir spehî tê de ye, weke heyva li çardehan. Guharekî belxeş di guhê wê de, gerdaniyeke ji cewherên nadîde di stûyê wê de bû. Mîr nas kir ku ew keça mezinan û siltanan e. Rabû daket xwarê û di deriyê qeytûn re ji qesrê derket, ber bi wan ve çû. Gava gihîşt cem wan, dît ku keçik raketiye û masîvan jî bi girêdana keleka xwe ve mijûl dibe. Mîr keçik ji xew şiyar kir. Werdê, çawa ku şiyar bû û mîr di ser xwe re dît, cefilî û giriya. Mîr pirsî û got: “Tu ji ku hatiyî; tu keça kê yî û tu çima hatiye vir?” Werdê lê vegerand û got: “Ez keça Îbrahîmê wezîrê Siltan Şamix im. Sebeba hatina min a vir jî, ecêb û xerîb e.” Dûra, serpêhatiya xwe ji serî hetanî dawiyê jê re vegot, bêyî ku tiştêkî ji wî veşêre. Piştî hilmêke kûr kişand, keserek veda û bi helbestî got:

Evan hêsrana kortikên çavên min kûrtir kirine
Bê navber diherikin bi ser hinarkan de digindirin
Ev hemû tev ji ber çûna delalê ber dilê min e
Ne min xwe gihandiyê wî ne wî agahek daye min
Xortekî rûgeş û bejinzirav e pir şox û şeng
Nîn in xortên mîna wî di cîhanê gişî de qeşeng
Şems û qemerê serî li ber wî tewandiyê bi şerm
Di seranserê cîhanê de tê naskirin bi xortê dilgerm
Birhûyên wî mîna du kevanan her ragirtî ne
Li bendî avêtina tîr in ew bi vîne dagirtî ne
Min rewşa xwe bo te ragihand êdî ricakar im
Li vê maşûqê were rehmê lewre ji te hêvîdar im
Niha qedera min ez avêtime ber destên we
Bêhêz im bê derfet im ez bûme mêvana we
Sitara raz û sirên aşiqan ew peywira we ye
Çareserî û hevghaşîna wan jî bi destê we ye

Gava ku helbesta xwe qedand, mîr jê re got: “Netirse keça min, bila dilê te aram be. Xwedê bêje erê, dê her tişt li gora dilê te pêşve biçe.” Piştî bi helbestî berdewam kir û got:

Guhdar be keça maqûlan armanca te wasil e
Mizgîniya min li te be va meqseda te hasil e
Ez ê îro diravan kom bikim û artêşa xwe rê kim
Ji bo Şamixê siltan qasid û nameyekê verê kim
Li gel diyarî û misk û ember û pir dibacan

Çend wezîr û gizîrên necîb li gel çira û siracan
Ez ê Inselwicûd bi zavatî ji siltan bixwazim
Ez ê te bi miradê te şa kim beriya ku razim

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 385'EMÎN

Şehrezadê got:

Pîştî wê soz û gotinê, mîr di cî de rabû ser xwe, çû leşkerên xwe kom kirin, wezîr û gizîrên xwe dan ser hev, fermanên pêwîst dan gişan. Di pey re gazî kir wezîrê xwe, malekî mezin da wî û jê re got: “Tu yê herî cem Siltan Şamix û tu yê vê peyama min bigihîni wî. Mîsoger divê tu encamê bigirî û teqez divê ku tu Inselwicûd bi xwe re binî vir. Jê re bibêje, mîrê min dixwaze mervantiyê bi te re bike û keça xwe bide Inselwicûd. Loma divê tu wî bişîni welatê me ji bo ku em mehra wan li wir bibirin, lewre divê em mehra wan li wir, li welatê bavê wê bibirin!”

Pîştî nameyek jî nivîsand bi heman naverokê û da wezîr, jê re got: “Tu yê vê nameyê jî bidî Siltan Şamix û tu yê jê re bipeytîni ku teqez divê Inselwicûd li gel te bişîne vir. Heger tu wî bi xwe re neynî vir, ez ê te ji peywira wezîrtiyê bigirim, de êdî tu dizanî!” Wezîr bejna xwe li ber Dirbas tewand û got: “Bila be siltanê min, ser seran ser çavan.”

Wezîr, rahişt nameya mîrê xwe û li gel karwanekî ku radihişt gelek diyarî û xelatan, berê xwe da welatê Siltan Şamix. Gava gihîşt cem wî, nameya mîrê xwe Dirbas da destê wî û diyarî jî pêşkêşî wî kirin. Siltan Şamix rahişt nameyê, ew vekir û xwend. Pîştî li wezîrê qasid zivirî û got ku Inselwicûd ji cem wan çûye û tu agahiya wan di derbarê wî de nîn e. Pîştî wî jî gelek diyarî û hediye dan wezîr, ji bo ku ji mîrê xwe Dirbas re bibe û di nava xemgîniyê de bi xwe re axivî, got:

Ez ê çi bikim ji mal û milkan
Tenê dixwazim delalê ber dilan
Ne lazim in qet lûlû û cewher
Dixwazim ez wî dostê serwer
Li ber dilê'm rojheyvek bû ew
Geh tîreroj geh jî findek bedew
Mezin kiribû min ew bi delalî
Lê çi bikim ku çû ew bê zelalî
Li ser wî îro ez pir xemgîn im
Pir dilgiran û dilbirîn im

Pîştî li wezîrê qasid zivirî û jê re got: “Here ji mîrê xwe re bibêje ku Inselwicûd ji beriya salekê ve ji malê derketiye û kes nizane bê bi ku ve çûye.

Ne ez, ne diya wî û ne jî tu kes ji malbatê nizanin bê bi ku ve çûye. Wezîrê qasid got: “Û ez ê çawa bêyî wî bi ser mîrê xwe de herim mîrzayê min!” Şamixê siltan ji wezîrê xwe Îbrahîm re got: “Birekê ji leşker û parêzvanan bi xwe re bibe û herin bi hûrgilî li Inselwicûd bigerin, li seranserê welêt. Cihekî ku hûn wî raçav nekin nehêlin.” Îbrahîmê wezîr got: “Ser seran û ser çavan mîrzayê min.” Di pey re jimareke mezin ji leşker û xizmetkaran da dû xwe, wezîrê qasidê Mîr Dirbas jî bi xwe re birin û çûn ku li Inselwicûd bigerin.

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 386'EMÎN

Şehrezadê berdewam kir:

Herdu wezîr bi leşker û xizmetkaran ve ketin pey Inselwicûd û bi hûrgilî lê gerian. Her ku li êleke Ereban ango li qewmin din rast dihatin, Inselwicûd ji wan dipirsîn. Wan jî digot me nedîtiye. Gund bi gund, bajar bi bajar gerian, hetanî ku gihan qiraxa behrê. Li wir jî li keştiyekê siwar bûn û bi avê de çûn hetanî ku gihan girava Çiyayê Sêwîyan. Li wê derê, wezîrê Mîr Dirbas ji wezîrê Siltan Şamix re got: “Çima ev nav li vî çiyayî hatiye kirin?” Ê dîtirkê got: “Ji ber ku di dem û dewraneke kevn de, ciniyek ji ciniyên Çînê hatiye vir û li vir dîl ketiye însanekî. Îcar ji ber ku jinik ji malbata xwe dîtir-siya û ev çiya jî ji derdorê gişî qut bû, evîndarê xwe aniye li vir bi cih kiriye û ew li vir xwedî kiriye. Bêyî ku kesî ji kes û kûsên xwe agahdar bike, her carê bi dizî hatiye cem wî û vegeriyaye, bêyî ku kesî bi xwe bihesîne. Wisa berdewam kiriye hetanî ku çend zarok jê re çêbûne. Vêca çi rêwî û tacirên ku di wir re derbas bûne, dengê giriyê wan zarokan bihîstine -ku giriyê wan şibandine bi giriyê sêwîyan- û ji hev re gotine: ‘Qey sêwî li vir hene?’ û ew nav jî ji wir hatiye.”

Wezîrê Mîr Dirbas li wan gotinan behetî ma! Lê dîsa jî gera xwe li ser giravê berdewam kirin hetanî ku gihan qesra ku Îbrahîmê wezîr ew ji keça xwe Werdê re çêkiribû. Li derî dan, derî vebû û xizmetkarek derket derve. Xizmetkar çawa çav li wezîr ket ew nas kir, xwe çeng kir destê wî, ew maçî kir û rê da wan ji bo ku derbas bibin. Derbas bûn hundirê qesrê û li wir dît ku mirovekî jar û hejar di nava xizmetkaran de ye -ku ew Inselwicûd bi xwe bû-, ji wan re got: “Ev ji ku ye?” Xizmetkaran gotin: “Tacirekî ku keştiya wî tevî mal û milkên wî binav bûye û xwe xelas kiriye, hatiye xwe li me girtiye. Jixwe dîn bûye êdî. Ew bi eslê xwe tacirekî ji Esfehanê ye. Qey qedera wî wisa bû!”

Wezîr û hevrêyên xwe dev ji xizmetkaran berdan û ketin hundirê qes-rê, lê wezîr keça xwe di hundir de nedît, li tu şopên wê jî rast nehat. Ji cari-

yeyan pirsî, wan jî gotin: “Rastiya Xwedê em jî nizanin çawa çûye û bi ku ve çûye. Jixwe demeke pir kurt em bi hev re man.”

Wezîr pir xemgîn bû, keserek kişand û di ber xwe de got: “Ey qesra spehî û pozbilind û jixwerazî! Ka ew stranên li ser te dihatin gotin û ka ew emîra rûhevvî ku can dida te, bi ku ve çûye? Çima tu şîniyê digirî û ew qasî bêrîkirin di zîkê te de kom bûye? Ka ew delala dilan; kanî ew şox û şenga ji neslê ferîşteyan bi ku ve çûye?”

Piştî van gotinên xwe giriya û careke din bi zimanekî gazinokî di ber xwe de got: “Xwedê sebr û aramê bide min, helbet tu kes nikare ji qedera xwe bireve.”

Piştî derket ser banê qesrê ji bo ku wir jî raçav bike û li wê derê çavên wî li kincên keça wî ketin. Sê çar kirasên balebekî yên dirêj pêve girêdabûn û ji ser ban, ber bi jêr ve berdabûn. Di dilê wî de niqrîskan lê da û têgihişt ku keça wî weke serxweşan xwe bera jêr daye û çûye? Bi şaşwazî li derdora xwe nêrî, qijak û bûmek li ser goşeyê ban dîtîn û vê yekê bêyomiyek pê re çêkir, keserek di nava wî de xuliqand. Keserek kûr veda û bi lomekarî di ber xwe de got: “Ez hatim mala candila xwe, bi hêviya ku agirê bêriyê di dilê xwe de bitemirînim. Lê li şûna delala dilan, min bûm û qijakek dît. Dengê ji nava min tê ji min re dibêje, tu zalim û zilimkar bûyî, loma ev hemû bi serê te de hatin. De êdî bijî di nava kul û keder û rivîna agir de, lewre te heq kiriye!”

Dîsa giriya û di nava gilî û gazincan de ji ser banê qesrê daket xwarê û ji xizmetkar û leşkerên xwe re got: “Herin gera xwe li çiyê berdewam bikin hetanî ku hûn xatûna xwe bibînin.” Wan jî wisa kirin û çûn li Çiyayê Sêwiyan gişî geriyan lê tiştê nedîtîn.

Em wan li Çiyayê Sêwiyan bihêlin û em vegerin ser rewşa Inselwîcûd. Ew jî çawa pê hesiya ku Werdê ji qesrê reviyaye, çûye, qîrînek pê ket û di cî de ji ser hişê xwe çû, li erdê ket. Xelkê got belkî cezbe yeke rehmanî ew girti-be, zêde pê ve mijûl nebûn, hetanî ku bi ser hişê xwe ve hat. Di wê navberê de hêviya Îbrahîmê wezîr şikest di dîtina keça xwe de. Wezîrê Mîr Dirbas jî bêhêvî bû û biryar da ku destvala vegere welatê xwe. Gava rabû ser xwe ji bo ku xatir ji wezîr Îbrahîm bixwaze, çavê wî li Inselwîcûd ket ku ew mîna mirovekî Esfehanî pê dabûne naskirin. Ji Îbrahîm re got: A rastî ez dixwazim vî zilamê dînik û kawikî bi xwe re bibim, da ku ez destvala neçim. Belkî bi xêra wî Xwedê li me jî bê rehme. Jixwe ew Esfehanî ye û welatê wî nêzîkî me ye, ji wir em ê bi hêsanî wî bişînin welatê wî, bila ew jî bibe xêra me.”

Îbrahîmê wezîr jê re got: “Tu çawa dixwazî, wisa bike.”

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 387'EMÎN

Şehrezadê got:

Wezîrê Dirbas, bêyî ku bizanibe ew ê ku wî bi xwe re dibe Inselwicûd e, berê xwe da welatê xwe û bi dilekî xemgîn ket ser rê. Lê Inselwicûd hîna bi ser xwe ve nehatibû û mîna gêjan bû, hayê wî ji tu tiştî tunebû. Li ser piştê hespê bû lê hayê wî jê tunebû, ku bi rê de dimeşin. Piştî sê rojan ji meşêke dirêj, bi ser hişê xwe hat û got: “Ez li ku me?” Jê re gotin: “Tu bi karwanê wezîrê Mîr Dirbas re yî.”

Xizmetkaran ew gotin gotin û di cî de çûn cem wezîr, ew agahdar kirin, jê re gotin ew jarê Esfehanî bi ser hişê xwe ve hatiye. Wezîr jê re ava gulê û ava şekir şand. Xizmetkaran ew av danê û pê ve mijûl bûn, pêdiviyên wî pêk anîn, hetanî ku rewşa wî baş bû. Piştê meşa xwe berdewam kirin hetanî ku nêzî bajarê xwe bûn. Li wê derê, qasidekî Mîr Dirbas hat pêşiya wan û ji wezîr re got: “Mîr dibêje, heger Inselwicûd bi xwe re neanibe, bila qet neyê bajêr!”

Gava ku wezîr ew fermana mîr bihîst, pir tengav bû û rê li ber hatin girtin. Lewre wî qet nizanibû ku Werdê li gel mîrê wî ye û di heman demê de jî nizanibû bê mîrê wî çima ew bi dû Inselwicûd şandiye. Merivantî û zavatiya ku mîrê wî behs dikir, fêr nekiribû.

Inselwicûd jî nizanibû bê ew li ku ye û leşkerên pê re wî bi ku ve dibin; lewre ji her tiştî bê xeber bû. Wezîrê ku li pey wî bû jî, ji wî bê xeber bû û hayê wî jê tune bû ku ew jarê Esfehanî ye ku bi xwe re rakirine, Inselwicûd bi xwe ye. Dîsa jî gava dît ku bi ser xwe ve hatiye, wezîr jê re got: “Mîrê me ez bi peywirekê şandibûm da ku ez pêdiviyeke wî pêk bînim. Niha jî ji min re agahî û fermanek şandiye, dibêje hetanî ku tu wê pêdiviya min pêk neynî, venegere welat û derbasî bajar nebe!” Inselwicûd got: “Û pêdiviya ku ew dixwaze çi ye?” Wezîrê Dirbas ta bi derziyê vekir û çîrok ji serî hetanî binî jê re vegot. Inselwicûd got: “Netirse û here cem mîrê xwe lê min jî bi xwe re bibe. Ez ji te re teqez dikim ku dê Inselwicûd were vir.” Rûyê wezîr vebû, bêhna wî hat ber wî û dilê wî xweş bû, got: “Tu rast dibêji ne wisa?” Wî got: “Belê, ez rast dibêjim.”

Wezîr li hespa xwe siwar bû, ew jî siwar kir, da kêleka xwe û berê xwe dan cem mîr. Gava ku gihîştin wir, mîr ji wezîr re got: “Ka Inselwicûd?” Inselwicûd lê vegerand û got: “Mîrê gewre, ez cihê Inselwicûd nas dikim.” Mîr ew nêzikî xwe kir û jê re got: “Ew li ku derê ye?” Wî lê vegerand û got: “Ew li cihekî pir pir nêzik e, lê belê ez dixwazim bizanibim bê çima tu lê digêrî; piştê ez ê wî bînim ber destê te?” Mîr got: “Ser seran û ser çavan, ez ê wê ji te re bibêjim lê divê destpêkê em tenê bimînin.” Di pey re ferman da hemû kesên li derdora xwe ku ji wir biçin. Piştê bi tenê man, mîr çîroka

meseleyê ji serî hetanî dawiyê jê re rêz kir. Inselwicûd jê re got: “Kanî kincin baş û giranbuha ji min re bînî, ez ê di cî de Inselwicûd ji te re bînim.” Taximekî pir buha jê re anîn, wî jî li xwe kir û got: “Ez Inselwicûd im, ez im ew ê ku her kes zikreşîya wî dike!” Piştî bi helbestî berdewam kir û got:

Di tenêtiya xwe de timî ew di hewara min de tê
Sebr û wensa min ji her bi bîranînên wê tê
Tenê du çavên şil hene di destê min de
Li gel hêsir û rondikên ku dibarin bi ser de
Tiştê ku bêhna min fire dike ji her ew e
Tenê xilweta wê ya li ber çavan ne derew e
Pir bi bêrî me pir bi bêrî me pir bi bêrî
Karê evînê ew e ne dawî jê re heye ne ji serî

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 388'EMÎN

Şehrezadê got:

“Piştî ku Inselwicûd ew helbesta xwe xwend, mîr jê re got: “Bi navê Xwedê hûn herdu ji evîndarin durist û sadiq in; di asoya husn û delaliyê de mîna du stêrkan bişewq in hûn. Rewşa we erjeng e û serpehatiya we ji pir balkêş e.”

Di pey vê gotinê re, mîr tiştê ku bi serê Werdê de hatibû jê re vegot. Inselwicûd got: “Û Werdê niha li ku ye ey mîrê gewre?” Mîr got: “Ew niha li cem min e.”

Piştî Mîr Dirbas gazî qadî û şahidan kir, mehra herduyan birrî, qedr û qîmetê wan girt. Di pey re jî nameyek şand ji Siltan Şamix re û serpehatiya herduyan ji serî hetanî binî jê re vegot û ew agahdar kir. Siltan Şamix jî pir kêfxweş bû bi wê agahiyê û bersiva wî bi nameyekê da, tê de got: “Madem ku mehra wan li cem te hatiye birrîn, divê daweta wan li gel min bête lidarxistin.”

Piştî, cihêz û xêlî amade kirin, ew li hesp û deveyan siwar kirin û li gel qasid û karmendên xwe ew şandin cem Mîr Dirbas, da ku bûk û zava veguhezînin cem wî. Dema ku giha wir û name giha ber destê Mîr Dirbas, bûk û zava amade kir, gelek diyarî û mal û milk da wan û li gel hijmareke mezin ji leşkerên xwe, ew şandin cem Siltan Şamix.

Roja ku karwanê xêliya bûk û zavê giha bajarê Siltan Şamix, bû rojeke dîrokî! Kêf û şahiya daweteke wisa mezin hat lidarxistin, ku di dîroka wî bajarî de tiştêkî wisa neqewimîbû. Siltan, hemû dengbêj û muzîkjen kom kiribûn, hemû amûrên muzîkê amade kiribûn û li seranserê bajêr jî welîme

li dar xistibûn, sifreyên xwarinê raxistibûn, ji bo her kesê di bajêr de. Ew şahiya mezin heftiyekê sax berdewam kir, ku roj bi roj siltan diyarî û xêr belav dikirin li ser xelkê û qencî bi wan dikirin. Di encamê de jî Inselwicûd û Werdê daweta xwe kirin û bi hestiyariyeke mezin derbasî cem hev bûn, hevdu himbêz kirin û pev şa bûn, hetanî ku ji ser hişê xwe çûn.

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 389'EMÎN

Şehrezadê got:

Piştî ku bi ser xwe ve hatin, dişa kêf û laqirdî bi hev re kirin, helbestên evînê ji hev re xwendin, çirok û dûrik gotin û di nava deryaya evînê de avjenî kirin, bê tehb û westan. Bi wî hawayî heft roj û şev di ser wan re derbas bûn, bêyî ku hayê wan ji şev û rojê hebe. Lewre di nava çêj û xweşî û şahiyekê bêbinî de bûn ku xwe tê de wenda kiribûn. Ew heft rojên hanê mîna ku rojeke tiki tenê be bi hemû meziyetên xwe û tu rojeke din mîna wê tune bû.

Piştî wan heft rojan, ji hundir derketin û nû dest bi pêşwazîkirina xelkê kirin. Pir mal û milk û diyarî li ser xelkê belav kirin û kes bêpar nehiştin ji qencyên xwe. Ew jî di nava şahiyê de man hetanî ku xerabkarê xweşî û qencyê bi ser wan de hat û ew ji hev veqetandin. Subhan ji wî re ku sedem û encamên hemû bûyeran vedigere cem wî!

(ÇÎROKA HARÛN REŞÎD Û ZUBEYDE XATÛN)

Îca ez ê dest bi çîroka Harûn Reşîd û Zubeyde Xatûn bikim. Tê gotin ku Harûn Reşîd ji Zubeyde xatûnê pir hez dikir. Loma jê re cihekî taybet ava kir, ji bo ger û seyranê. Di wî cihî de golek avê çekir û li hawirdora wê şîndarên cur bi cur çandin û ew av dan, hetanî ku dar giş gihan hev, şaxên wan ketin nav hev û bûn toqeke ji pelşînan li dora wê gola avê.

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 390'EMÎN

Şehrezadê got:

Vêca rojekê gava Zubeyde Xatûn ket wî cihê seyrangêhê û li dora gola avê çû û hat û li dûmena xweşik temaşe kir, pir mest û serxweş bû bi spehîbûna wê. Ji ber ku wê rojê dinya germ bû, kincên xwe ji xwe kirin û ket nav ava golê, ji bo ku xwe hênîk bike. Lê ava golê hindik bû, bi zorê kaboka wê derbas dikir. Loma ji bo ku xwe hênîk bike, mecbûr ma ku avê bi ser laşê

xwe de bike. Xelîfe Harûn Reşîd, pê hesiya û di şibakeya qesra xwe re, bi dizî lê nêrî di nava pelên daran re û dît ku tazî ye û hemû derên wê yên veşartî xwiya dikin. Gava Zubeyde Xatûn lê hay bû, ku Xelîfe lê dinêre di nav pelên daran re, lê zivirî, berê xwe da wî û lê nêrî. Lê di cî de jî ket ber fediyê û her du destên xwe dan ber navrana xwe. Harûn Reşîd behetî ma li himberî vê helwesta wê û bi helbestî got:

Xweberî min li wê nihêrî

Hiş û hestan cî guherî

Û nema dizanibû wê çî li dû wê beytê bibêje. Rabû şand dû Ebû Newas³, got herin wî binin vir. Xizmetkarên wî çûn ebû Newas jê re anîn wir. Xelîfe ji Ebû Newas re got: “Ka ji min re helbestekê ava bike ku bi “xweberî min lê nihêrî /hiş û hestan cî guherî” dest pê bike? Ebû Newas got: “Ser seran û ser çavan” û di nava çend kêlikan de helbest afirand û ji ber got:

Xweberî min lê nihêrî

Hiş û hestan cî guherî

Xezalek ez sêwî hiştim

Hem gurandim hem biraştim

Li biniya darê weke durran

Bi xwe dakir ava gulan

Bi misînekî agirîn

Wê ez şûştim bi ar û jîn

Xweska ez jî ber bama

Bi ser dilê wê ketama

Harûn Reşîd, pir kêfxweş bû bi vê helbesta wî. Beşîşî û hinek dirav danê; piştî jî bi dilxweşî ji wir çû.

(ÇÎROKA KESRA ENÛŞREWAN Û KEÇIKA GUNDÎ)

Tê gotin ku rojekê ji rojan, siltanê dadwerkar Kesra Enûşrewan li hespa xwe siwar bû û berê xwe da çolê, çû seyd û nêçîrê. Li cihekî ji çolistanê, ji leşkerên xwe veqetiya û bera dû xezalekê da. Li dû wê çû û çû hetanî ku pir tî bû. Gava rastî gundekî nêzik hat, rêya xwe guhert û çû gund, berê xwe da maleke ku li ser rê bû. Li derî da, keçeke ciwan derî lê vekir. Kesra av jê xwest, keçikê çû zileke şekir guvaşt, tevî avê kir û xist qedehekê. Piştî şîraniyeke di rengê axê de jî bi ser dakir û da destê Kesra Enûşrewan. Kesra qedeha avê ji destê wê girt û lê nihêrî, dît ku tişteki weke axê di ser avê re ye. Mehdê wî jê xêliya lê ji ber ku pir tî bûbû, bi zorê be jî hêdî hêdî vexwar hetanî bi dilopa dawîn. Piştî li keçikê zivirî û got: “Ava te pir xweş bû lê

3 . Ebû Newas: Helbestkarekî navdar e di serdema 10^ê miladî de. Bi sazkirina helbestên klasîk ên evîne têtê naskirin.

gemara mîna axê ya ku te avêtibû ser wê mehdê min xeland.” Keçikê lê vegerand û got: “Mêvanê delal, min bi zanebûn ew gemar avêt ser avê.” Kesra got: “Çima te wisa kir?” Keçikê got: “Min dît ku tu pir tî bûyî û ez tirsîyam ku tu bi yek carê avê vexwî û tu zerarê jê bibînî.”

Kesra Enûşrewan şaşwaz bû li himberî wê helwesta wê û ket bin tesîra wê bi wan gotinên wê yên ku aqil jê difûriya! Tê derxist ku ew keçek jîr û zana ye. Jê pirsî û got: “Te şekirê di wê avê de ji çend zilan guvaştibû?” Keçikê got: “Ji zilekê tenê.” Kesra dîsa şaşwaz û behetî ma li wê rewşê. Belgenomeya baca gund ji wan xwest. Çûn, jê re anîn. Rahişt belgeyê lê meyzand, dît ku baca ji wî gundî distînin, hindik e. Di dilê xwe de ji xwe re got: “Heger ez vegerim serayê, ez ê baca ser vî gundî zêde bikim!” Piştî rişma hespê xwe kişand, berê wî guhert û dîsa vegeriya nêçîra xwe. Li dawîya rojê, berêvarê, kesra di riya vegerê de dîsa riya xwe bi wî gundî xist û çû li ber derîyê heman malê sekinî û li derî da. Dîsa heman keçik derket pêşîyê, Kesra av jê xwest, ew jî çû hundir lê vê carê zû venegeriya. Kesra ecele lê kir û got: “Vê carê çima tu dereng ketî?”

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotinên xwe birrîn û bêdeng bû.

ŞEVA 391'EMÎN

Şehrezadê got:

Îcar gava Kesra ecele li keçikê kir û jê re got, tu çima dereng ketî? Keçikê got: “Ji ber ku min zileke şekir guvaşt, têra qedehek av şîre jê derneket; ez jî mecbûr mam ku sê zilan biguvêşim lê dîsa jî bi qasî zileke berê şîre jê derneket.” Kesra got: “Çima şîre wisa hindik jê derket?” Keçikê got: “Me ji aqilmendan bihîstîye, ku gava kesrayek nêta xwe li qewmekî xera dike, bereket di wan de namîne û karê wan jî bêxêr dibe.”

Kesra Enûşrewan kenîya û nêta zêdekirina baca ser wî gundî ji dilê xwe derxist. Piştî bi wê keçikê re zewicî, lewre zîrebûn û axaftina wê ya xweş pir bandor lê kiribû.

(ÇÎROKA AVKÊŞ Û ZÊRKER)

Ez ê niha jî çîrokek din ya kin ji we re bibêjim. Tê gotin ku li Buxarayê avkêşek hebû, her roj av dibir mala zêrkerekî ku jineke wî ya xweşik û pir lihevhatî hebû. Avkêş, sî salî ew karê xwe berdewam kir û her roj av bir mala wî zêrkerî. Rojekê mîna her car, dîsa avkêş hat mala zêrker û av ji wan re anî. Jina zêrker a ku bi oldarî û sinckariya xwe dihat nasîn jî, li hundir bû. Piştî ku avkêş ava xwe vala kir denê wan, ber bi jinikê ve çû, rahişt destê wê,

firikand, eciqand û dev jê berda, çû.

Gava ku mêrê wê yê zêrker ji sûkê hat malê, jina wî jê re got: “Ez dixwazim tu ji min re bibêjî bê te îro li sûkê çi guneh kiriye, ku te Xwedê qehirandiye?” Zêrker got: “Min tişteki ku Xwedê biqehirîne nekiriye.” Jina wî got: “Belê wele te gunehêki ku Xwedê biqehirîne kiriye û heger tu li xwe mikur neyê û tu rastiye ji min re nebêjî, ez nema li mala te disekinim, ez ê herim û êdî tu yê qet min nebînî.”

Zêrker got: “Bila be, ez ê rastiye ji te re bibêjim û ez ê eşkere bikim bê îro min li sûkê çi kiriye. Weke her car, dîsa ez li dikana xwe rûniştî bûm gava ku jinek hat dikanê û ji min xwest ku ez bazinekî jê re çêbikim û çû. Min bazinekî zêr jê re çêkir û danî kêlekê. Gava ku jinik hat, min bazinê wê jê re anî, wê jî destê xwe dirêj kir. Îcar gava min bazin xist bazenda wê û ez çav li xweşîkbûna destê wê yê spî ketim, ez kelecani bûm û ajoyên min serî hildan, min xwe negirt û destê wê firkand û guvaşt.”

Jina wî şaşwaz bû û got: “Qey tu ji Xwedê netirsîyayî ku te gunehêki wisa kir û te Xwedê qehirand? De binêr ew avkêşê ku sî salên wî ye derbasî mala me dibe û me tu xerabî jê nedîtiye, ji rûyê te de îro rahişt destê min, firkand, ew guvaşt û çû.”

Mêrê wê got: “Em saxî û selametiya xwe ji Xwedayê xwe yê diloan dixwazin û em hêvî dikin, ku me efû bike. Ez li ber destê te tobeya xwe ji Xwedê dikim, ji ber wî karê xerab, tu jî mexfîretê ji min re bixwaze.” Jina wî got: “Xwedê min û te, me tevan efû bike û li me were rehmê, ya Rebî!”

Roja li dû wê, avkêş dîsa hat mala wan û xwe avêt ber nigên jinikê, xwe di nav xweliyê da, lêborîna xwe jê xwest û got: “Xatûna min li min were rehmê û min bibexşîne, bi Xwedê şeytanê naletlêhatî ez ji rê derxistim û ew karê xerab bi min da kirin.” Jinikê jê re got: “Bi rêya xwe de here, sûc ne yê te bû, yê mêrê min bû, ku duh li dikanê karekî mîna yê te kiribû û Xwedayê me qehirandibû, Xwedê Teala ji li vê dinyayê cezayê me da me.”

Êvarkî gava dîsa zêrker vegeriya malê, jina wî helwesta avkêş a lêborînê jê re got û ew agahdar kir. Zêrker jî got: “Şeqamek bi şeqamekê û heger zêdetir bûya, dê avkêş jî zêde bikira!”

Ev çîrok bû mîna biwêj û meselekê di nava gel de, ku her kes îbret jê digire. Lewre divê jin bi mêrê xwe re durist bin, çi zahîrî, çi batinî, divê ew jî qenaetkar bin û di rêya Hezretî Fatime û Eyşê de bimeşin.

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotinên xwe birrîn û bêdeng bû.

ŞEVA 392'EMÎN

(ÇÎROKA JINA BAŞ A JI BENÎ ÎSRAÎLIYAN)

Şehrezadê got:

Tê gotin di dem û dewranên berê de jineke baş û di rêya rast de ji Benî Îsrailiyan hebû. Jineke oldar û sincperwer bû, her roj diçû nimêjgehê, nimêja xwe dikir. Li kêleka wê nimêjgehê jî bistanek hebû, ku gava dihat nimêjê, diçû destava xwe li nava wî bistanî digirt. Îcar du nobedarên wî bistanî hebûn, mezintemen bûn. Rojekê herdu extiyaran beleya xwe di jinikê dan û dawa zînayê lê kirin lê jinikê red kir û qebûl nekir. Nobedaran jê re gotin: “Heger tu bi me re jî ranekevî, em ê şahdebûnê li ser te bidin, ku te zîna kiriye.” Jinikê dîsa qebûl nekir û got: “Wê Xwedê Teala min biparêze ji xerabiya we!”

Her du extiyarên nobedar, deriyê bistan vekirin û kirin gazî, xelk hemû li xwe kom kirin û piştê ji wan re gotin: “Me ev jina hanê bi xortekî re dît, zîna dikirin, xort ji destê me filitî lê me jinik girt.”

Îcar di wê serdemê de, kesê ku zîna dikirin, sê rojan li ser hev dihatin teşhîrkirin di nava bajêr de. Roja sisiyan jî dihatin recimkirin. Ê wê jinikê jî wisa kirin. Bangêşkar sê rojan li ser hev li nav bajêr kir gazî, gunehê wê teşhîr kir. Her roj jî herdu nobedarên bistan diçûn cem wê, destê xwe dantanin ser serê wê û jê re digotin: “Şikir ji Xwedê re ku tola me ji te hilanî û ev bobelat anî serê te.”

Dema ku dê ew bibirina recmê, Daniyalê dozdeh salî da dû wan û bi rê de çû, hetanî ku gihîşt cem wan. Li wir ji wan re got: “Bisekinin, eceleyê li recma wê nekin, hetanî ku ez wan dadgeh û lêpirsîn bikim.” Berpirsiyaran kursiyek ji Daniyal re danin ji bo ku li ser rûnê, ew jî li ser rûnişt û mucîzeyê xwe ya ewil nîşan da. Destpêkê herdu şahid ji hev veqetandin û ew dûrî hev xistin, piştê jî yekî re got: “Te çi dît, çawa qewimî.” Nobedar got, wisa wisa û mijar jê re vegot. Daniyal dîsa pirsî û got: “Ev tiştê ku tu dibêjî li kîjan aliyê bîstan qewimî?” Got: “Di biniya siya hinarê de.” Daniyal çû cem nobedarê din û heman pirs jê kir. Nobedarê din got: “Li bin dareke sêvê, li hêla rojavayê bîstan pêk hat ew bûyer.” Bi wî hawayî rastî derket holê û duayên jinika ku hîna destên wê ber bi hewa ve bûn, pêk hat. Lewre di heman kêlikê de birqa Xwedê li herdu nobedarên extiyar da û ew şewitandin, bêgunehiya jinika reben jî derket holê.

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 393'EMÎN

(ÇÎROKA CAFERÊ BERMEKÎ Û ZILAMÊ KAL)

Şehrezadê got:

Tê gotin ku rojekê ji rojan Harûn Reşîd, li gel wezîrê xwe Caferê Bermekî, dostê xwe yê şevbuhêrkan Ebû Îshaq El Nedim û helbesvanê xwe Ebû Newas derketin seyranê û ji xwe re bi çolê de meşîyan. Bi rê de li kalekî rast hatin ku hêla xwe dabû ser kerê xwe û li ber wî sekinîbû. Harûn Reşîd li Cafer zivirî û jê re got: “Kanî ji vî kalî bipirse, bê ew kî ye?” Cafer ji kalo pirsî, got: “Tu ji ku hatiya vir?” Got: “Ji Besrayê.” Cafer got: “Berê te li ku ye?” Got: “Ber bi Bexdayê ve.” Cafer got: “Tu yê li wir çi bikî?” Got: “Ez ê li dermanê çavê xwe bipirsim.” Harûn Reşîd, ji Cafer re got: “Henekan pê re bike!” Cafer got: “Ez henekan pê re bikim, ez ê gotinên nexweş ji devê wî bibihîzim.” Harûn Reşîd got: “Tu bi Xwedê kî laqirdî û henekan pê re bike!” Cafer ji kalo re got: “Heger ez dermanekî ji te re bibêjim, tu yê çi bidî min?” Kalo got: “Dê Xwedê li şûna min tiştêkî baştir bide te û te xelat bike.” Cafer got: “Nexwe li min guhdar bike, ez ê dermanekî nîşanî te bidim ku min ew nîşanî tu kesî nedaye.” Kalo got: “Ew çi ye?” Cafer got: “Sê weqîyan hebikên bayê û sê weqîyan ji tîrêjên rojê, li gel sê weqîyên çiçekên heyvê û sê weqîyên din jî ji nûra çirayê bide ser hev, li hev bixe û sê mehan li ber bayê bihêle, piştê wan bixe hawineki bêbinî û sê mehan bikute, dûre bixe qalikên belota û deyne ber bayê, bila sê mehan bimîne. Piştê wî dermanî, rojê sê dirheman beriya razanê bixe çavên xwe û bi wî hawayî sê mehan bi kar bîne, bi izna Xwedê tu yê baş bibî.”

Gava ku kalo ew gotinên Cafer bihîstin, li kera xwe siwar bû û tirreke ecêb ji ber xwe berda, jê re got: “Ev tirra hanê jî bila diyariya min be ji te re, di ber vî dermanê te de. Piştî ku ez dermanê te bi kar bînim, heger Xwedê tenduristiya bide min û min baş bike, ez ê cariyekê jî bidim te ji bo ku hetanî mirinê ji te re, xizmetê bike. Gava tu mirî û Xwedê Teala ruhê te zû stend û tu avêtî nav agirê dojahê, tu yê rûyê xwe bi hêsrên wê şil bikî, lewre dê pir li ser te bigirî, hêsiyan birijîne, li çogên xwe bide û bibêje: Ey xwediyê riha perpitî, rûyê te çiqasî cemidî ye!”

Wê gavê Harûn Reşîd kenîya û likelik pê ket, hetanî ku zikopiştê bû. Piştê ferman da xeznedarê xwe, bo ku sê hezar dirheman bide wî zilamê kal.

(ÇÎROKA CIWANÊ KUJER Û OMERÊ XETAB)

Eşerîf Huseyîn Bîn Reyyan got ku, emîrê bawermendan Omerê Xetab carinan peywira dadwerkirinê digirt ser xwe û dibû qadî, pirsgirêkên xelkê û gilîkaran çareser dikirin. Di rewşên weha de, mezintirîn sehabe-yên pêxem-

ber digirtin gel xwe, li gel gelek rûspî û aqilmendên umetê. Îcar rojekê gava dîsa wilo rûniştî bû li gel sehabe û aqilmendan, xortekî paqij û lihevhatî di nav lepên du xortên din de bû û ber bi wî ve dianîn. Herdu xortan, ew xortê spehî kişkişandin û ew anîn hizûra Omerê Xetab.

Omer Xetab di cî de ferman da wan, bo ku dev ji wî xortî berdîn û îzin da wan ji bo ku nêzikî wî bin. Piştî re herdu xortan re got: “Çi derdê we bi vî xortî re heye?” Yekî ji wan got: “Ya emîrê bawermendan, em herdu bira ne û li ser rêya rastiyê dimeşin. Kalemêrekî bavê me hebû, ji qencyê pê ve tiştê nedikir, destê wî bi xerabiyê nedibû û di nava êlan de jî baş dihat naskirin bi van taybetiyên xwe. Biçûk û mezinan, her kesî bavê min bi wê sinckariyê dinasî.”

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 394'EMÎN

Şehrezadê got:

Wî xortê gilîkar axaftina xwe berdewam kir û got: “Îcar rojekê bavê min di nav bexçe de digeriya, ji bo ku bêhna xwe berde û hinek fêkî ji xwe re kom bike. Ev xortê hanê jî çû ew kuşt. Em dixwazin ku tu li gora emrên Xwedê tevbigêrî û tola me ji vî kujerî hilîni.” Piştî vê gotinê, birayê wî jî he-man tişt dubare kir. Omerê Xetab bi hêrs li xortê kujer nêrî û jê re got: “Te angaşten van herdu birayan guhdar kirin, ka bersiva te çi ye ji van gotinan re?” Xort ê ku bi xwînsarî û giraniya xwe dihat nasîn, kirasê tirs û panîkê ji ser xwe avêt, beşîşî û bi zimanê xwe yê xweş û şîrîn silavek li emîrê bawermendan kir û got: “Xelîfeyê pêxember ê sadiq, min angaşta herdu birayan guhdar kir û ez têgihîştîm bê çi dibêjin. Herdu jî rast dibêjin û xîlaf di gotina wan de tune ye; çi qewimîbû, ew anîn ziman. Lê ez dixwazim çîroka xwe jî ji te re bibêjim, piştî biryar a te ye. Emîrê bawermendan, ez bi xwe Erebeke resen û koçer im. Ez li çolê mezin bûm, di nava malbateke xwedî eslûfêsl ku ji êleke bi nav û deng e û her kes wê dinase. Li gel mal û zarok û malbata xwe ez hatim kêleka vî bajarî. Min deveyên xwe dan pêşiya xwe û ez di hinek xaçîrêkên nav bexçe û bîstanan re hatim. Di nava deveyên min de, yekî nêr û spehî hebû ku eslê wî pir paqij û tovê wî pir baş bû, zuriyetek pir dida û di nava deveyan de mîna siltanekî dimeşiya. Gava em gihan hinda bexçeyê bavê van xortan, çend deveyan serê xwe dirêjî pelên şîndarekê kirin. Tam di wê kêlikê de bavê wan ji pişt benda dîwêr xwiya kir. Fişefîş bi pozê wî ketibû, xezebê di devê wî re davêt, çîrûsk ji ber diranên wî diçûn, kevirê mezin di destê wî de bû û bi hêrs bi ser me de dihat. Weke şêrekî har êrîş bir wî deveyê min ê eslî û kevir li serê wî xist, ew li erdê dirêj kir. Deveyê min di cî de mir.

Gava ew deveyê ku li ber dilê min şîrîn bû li erdê ket û mir, dilê min sekinî û dinya li ber çavên min reş bû, xezebê di çavên min re da der. Di cî de min rahişt heman kevirî û min ew li ser çavê wî da. Zilam ket erdê û mir. Yanê ew jî bi agirê gunehê xwe şewitî, çû. Wî kuşt û ew jî hat kuştin. Min jî lez da xwe û rêya xwe berdewam kir lê van herdu xortan ez girtim û ez anîm vir.”

Omerê Xetab -Xwedê jê razî be- lê vegerand û got: “Tu bi xwe li xwe mikur hatî û gunehê xwe anî ziman. Êdî tu rê ji xelasiya te re nemaye û divê li gora qesasê tola kuştî ji te were hılanîn û tu jî werî kuştin.” Xort got: “Ser seran ser çavan; ez razî me bi hukmê şerîetê û biryara îmamê me. Lê belê birayekî min ê biçûk heye, ku bavê min beriya wefata xwe wesiyeta wî li min kir û hinek zêr û mal jê re veqetand û bi emanetî li cem min danî, da ku gava mezin bibe ez bidim wî. Ev zêr û dirav, min di ciyekî de veşartine, ku kes cihê wan nizane. Vêca niha gava tu min bikujî, dê ew mal negihê xwediyê xwe û tu yê bibî sebeba vê neheqiyê û roja qiyametê ew birayê min ê biçûk dê heqê xwe ji te bixwaze. Lewre Xwedê şahidê her tiştî ye û her tişt li ber çavên wî qewimiye. Îcar heger tu sê rojan muhletê bidî min, ji bo ku ez herim sozê xwe pêk bînim û emanetê bigihînim xwediyê wê, dê bêhtir edlane be. Jixwe yê ku di vê xalê de ji min re bibe wekîl jî heye.”

Omerê Xetab serê xwe bera ber xwe da û hinekî ponijî, piştî serê xwe rakir û got: “Û kî ye ew ê ku ji vî xortî re dibe kefil û wekîl ku dê sê rojan bi şûn de dîsa vegere vir?” Xortê kujer, çavên xwe li ser kesên hazir gerand, ku hemû sehabe û zanayên qewmê xwe bûn. Piştî destê xwe ber bi Ebûzerê Xefarî vekir û got: “Ev dibe kefil û wekîlê min!”

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 395'EMÎN

Şehrezadê got:

Wê gavê Omer li Ebûzer zivirî û jê re got: “Gelo te gotina vî xortî bihîst û tu dibî kefilê wî ku dê dîsa bi şûn de vegere vir, piştî sê rojan?” Ebûzer got: “Belê emîrê bawermendan, min gotinên wî bihîstin û ez di ber wî de dibim kefil, ku dê sê rojên din bi şûn de vegere vir.”

Omer bi kefaleta Ebûzer razî bû û îzin da wî xortî ku here wesiyeta birayê xwe yê biçûk dewr bike û were. Xort çû û muhleta wî ya sê rojan jî hat ber qedandinê. Xelîfe Omer mîna tavekê di civata dadweran de rûnişt û sahabe jî mîna stêrkan li dora wî rûniştin, man li benda vegera wî xortî, ji bo ku şerîetê pêk bînin. Kefilê xortê kujer Ebûzer û herdu kurên zilamê kuştî jî amade bûn, dem tiji bû lê xortê kujer hîna jî nehatibû. Herdu birayan ji

Ebûzer re gotin: “Dem qediya û dijaminê me nehat ey Ebûzer! Gelo vegera kesê reviyayî heye? Lê belê em ji vir naçin hetanî ku tu dijaminê me neynî vir û em heyfa xwe jê hilneynin.” Ebûzer got: “Bi heqê navê Xwedê, gava ku sê rojên wî tamam bibin û ew xort venegere, ez ê xwe radestî imamê dadger bikim û serê xwe bidim ber kêrê.” Omerê Xetab axivî û got: “Qesem bi navê Xwedê be heger ew xort neyê, ez ê Ebûzer li şûna wî dadgeh bikim û hukmê şerîetê pêk bînim.” Himehim û pîfepîf bi haziran ket, dengê wan bilind bû û xirecîreke ecêb ket nav wan. Mezinên sehabîyan, ji herdu xortên birayên hev re pêşniyaz kirin, ku xwîna bavê xwe bistînin bi miqabilî malekî giran lê wan red kirin û ji tola xwe pê ve tiştek qebûl nekirin.

Hîna ku xelk hemû bi niçeniç û waxwax li ser Ebûzer têşîyan û xem-gîniya xwe tanîn ziman, xortê kujer di wir re derket rabêrî imamê umetê û emîrê bawermendan Omerê Xetab û silaveke xweş da wî û haziran, bi rûgeşî û aramiyeke bêtimtêl û helkehelk û xwêdana ku ji her dera wî dihat xwarê. Piştî berdewam kir û ji Omer re got: “Min birayê xwe yê biçûk radestî xalê wî kir, mijar bi wan da fêmkirin û cihê zêr û malê wî jî nîşanî wan da û bi bazdan ez hatim bo ku di wextê xwe de werim vir û li gotina xwe xwedî derkevim.”

Xelkê rûniştî hemû şaşwaz û metal bûn li vê wêrekî û xwedîderketina wî ya li gotina xwe! Hinekan jê re got: “Tu çi xortekî wefakar û xwediyê gotina xwe yî, çiqasî wêrek û hêja yî!” Xort got: “Ma qey hûn jî negihane wê rastiyê ku gava mirina mirov bê, rev jê nîn e? Min jî soza xwe pêk anî ji bo neyê gotin, ku dilsozî ji nav gel rabûye!”

Ebûzer got: “Ya emîrê bawermendan, min bawerî bi vî xortî anî û ez bûm kefilê wî, bêtî ku ez wî nas bikim û bizanibim ji kîjan êlê ye. Jixwe wê rojê, cara ewilî bû ku çavên min pê ketibûn. Lê gava ji nava civatê giştî berê xwe da min û got evê bibe kefilê min, min nekarî ez wî bişikênim û daxwaza wî red bikim, da ku di nav xelkê de neyê gotin ku qencî û camêrî qediyaye.”

Wê gavê herdu birayên gilîkar jî pir hestiyar bûn û gotin: “Ya emîrê bawermendan, em jî di xwîna bavê xwe de dibihurin û vî xortî efû dikin, lewre wî bi vê helwesta xwe hişt ku qencî bi ser xerabiyê bikeve. Em tê dibihurin ji bo ku xelk nebêje dîlovanî û qencî tune bûye di nav civatê de.”

Omer jî bi kêfxweşî û şanazî ew rewş hemû pêşwazî kir û biryara efûkirina wî xortî peyitand. Vê yekê hişt ku meqamê Ebûzêrê Xefarî bilindtir bibe di nava sehabîyan de; di heman demê de bandoreke mezin li ser xortan jî kir ku ji rêya rast û ciwamêriyê veneqetin.

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

(ÇÎROKA EL MUTELEMÎS Û JINA WÎ)

Şehrezadê got:

Tê gotin ku, El Mutelemîs ji ber Nûman Îbnîl Mûnzûr reviya, çû û nema hat. Xelkê jî got qey miriye û ji ber ku jineke wî ya pir xweşik bi navê Umeyma hebû, malbata wê jê xwest ku ji xwe re mêr bike. Lê Umeymayê qebûl nekir û nexwest ku bizewice, ji ber ku ji mêrê xwe pir hez dikir. Lê belê dê û bavê wê fişar lê kirin ew jî mecbûr ma ku daxwaza wan qebûl bike û bi merivekî xwe re bizewice.

Îcar tam di roja daweta wê de El Mutelemîs vegeriya bajêr û dît ku dengê dahol û zirneyê ji taxa wan tê. Jixwe ji gelek elametên din jî diyar bû ku şahiyek li taxê heyê. Ji zarokekî pirsî bê sebeba wê şahiyê çi ye, zarok got: “Umeymaya jina El Mutelemîs ji nû ve dane mêr û îro daweta wê ye.”

Gava El Mutelemîs ev agahî girt, bi lez û bez li çareyekê geriya ji bo ku xwe bigihîne jina xwe. Bi fen û hîleyan xwe di nava jinan rakir û derbasî hundir bû; dît ku Umeyma li ser mînderan rûniştî ye. Bêhna wî hat ber wî û dilê wî hinekî aram bû. Di wê navberê de, jina wî jî keserek kûr veda û bi hêdika got:

Xwedêyo gewreyo hêviya min her bi te yo
El Mutelemîso ka tu li kîjan diyarî mayo!

Vêca El Mutelemîsê mêrê wê jî şairekî navdar bû, hema di cî de lê ve-gerand û got:

Pir nêzikî te me wey Umeymayê
Hîna jî evîndarê te me bixwedayê

Bi vê bersiva El Mutelemîs, zavayê nû li mijarê hay bû û têgihîşt bê çi li dorê diqewime. Hema di cî de rabû ser xwe, ber bi derî ve çû û pê re jî got:

Aramiya min hebû lê ew jî çû
Va hûn gihane hev kerba we çû

Piştê ji malê derket, çû û ew bi tenê hiştin. Umeyma û El Mutelemîs jî dîsa pev şa bûn û hetanî dawiya emrê xwe di nav xêr û xweşiyê de Jiyan. Tenê mirinê ew ji hev qut kirin. Îcar subhan ji Rebê erdê û ezman re ku wisa li hev tîne!

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 397'EMÎN

(ÇÎROKA QERAŞ Û JINA WÎ Û CÎRANÊ WÎ)

Şehrezadê got:

Tê gotin ku qeraşek hebûye, ku aşê xwe bi kerê digerand. Jineke wî hebû pir cirnexweş bû lê wî pir jê hez dikir. Jinikê qet ji mêrê xwe hez nedikir û dilê wê ketibû cîranekî wan. Lê wî cîranî jî jê hez nedikir û jê aciz bû.

Rojekê qeraş, di xew de dît ku yek jê re dibêje: “Cihê gera kerê xwe di filan derê de bikole, tê li defineyekê rast werî!”

Gava ji xew rabû, xewna xwe ji jina xwe re got û jê xwest ku ji kesî re nebêje. Lê jinikê çû sirê wî ji cîranê xwe re got, ji bo ku nav xwe û wî xweş bike û xwe nêzikî wî bike. Wisa jî bû û cîranê wê civan dayê, got: “Bi şev, ez ê werim serdana te.”

Bi şev çû cem jinikê û cihê ku nîşanî wî da, kola û hey kola hetanî ku li defineyê rast hat û ew dît. Cîranê wê jê re got: “Em çî bi vê defineyê bikin?” Jinikê got: “Em wê bikin du cî, nivî ji te re, nivî ji min re. Piştî tu jina xwe berde û ez ê hîleyekê li qeraşê mêrê xwe bikim, xwe pê bidim berdan, piştî em ê herdu bi hev re bizewicin û bi wî hawayî dê herdu nivî bigihên hev û wê malê me bibe yek.”

Cîranê wê jê re got: “Ez ditirsim ku şeytan bi aqilê te bilîze û tu bi yekî din re bizewicî, lewre zêrê di mal de, mîna roka di dinyê de ye. Loma ya rast ew e ku define hemû li gel min be, da ku teqez tu ji mêrê xwe xelas bibî û werî cem min.” Jinikê lê veğerand û got: “Ez jî mîna te û ji ber heman sedemê ditirsim ku tu bi yeke din re bizewicî û nivê vî malî heqê min e, lewre min cihê wî nîşanî te da.”

Gava jinikê ew gotin anîn ziman, cîranê wê hêrs bû, şeytan ket dilê wî û rabû ser xwe ew kuşt. Piştî ew avêt cihê defineyê û bêyî ku baş ser wê bigire, mecbûr ma ku bi şeveqa sibê re ji wir dûr bikeve. Di wê navberê de qeraş ji xew rabû û dît ku jina wî ne li kêleka wî ye. Bêyî ku guh bide wê û nebûna wê, rabû ser xwe, berê xwe da aşê xwe. Kerê xwe xist ber aş, ew girêda û çû kir, ew ajot. Lê kerê wî meşiya û dîsa sekinî. Qeraş li ker da û ew êşand bi lêxistinê, lê ker, her car çend gavan diçû û dîsa disekinî. Ji ber ku cefilîbû ji ber meytê jinikê û nikarîbû bi rê ve biçûya. Lê qeraş nizanîbû bê çima kerê wî nameşe û her ku diçû hîn bêtir hêrs dibû. Herî dawiyê rahişt kêrekê û zext li kerî da lê dîsa nemeşiya. Wê gavê sebr û aramî pê re nema, kêr li bin çengên wî da, ker li erdê ket û mir.

Gava ro derket û dinya ronî bû, qeraş dît ku kerê wî miriye û jina wî jî di koncala defineyê de miriye. Hem defineya wî çûbû, hem jina wî hatibû kuştin û hem jî wî bi nezanî kerê xwe kuştibû. Ew hemû ji ber ku sirrê xwe ji jina xwe re eşkere kiribû!

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotinên xwe birrîn û bêdeng bû.

(ÇÎROKA XAFIL Û KER)

Şehrezadê got:

Tê gotin ku carekê xafilek ji xafilan dimeşiya û hefsarê kerê wî jî di destê wî de bû, ew bi dû xwe de dikişand. Du zilamên zîrek û jêhatî ew dîtîn; yekî jî yê din re got: “Ez dikarim kerê vî zilamî ji wî bistînim.” Hevalê wî got: “Tu yê çawa wî jê bistîni?” Ê dîtir got: “Bide dû min, ez ê nîşanî te bidim bê çawa!” Hevalê wî da dû, ew ber bi ker ve çû, nêzikî wî bû, hefsar ji serî derxist û ker da hevalê xwe, bi îşaretê destan got: “Bibe!” Û hefsarê kerî xist stûyê xwe, ew jî li pey xafil meşiya, hetanî texmîn kir ku hevalê wî ker bi xelasê xistiye. Piştî di cihê xwe de sekinî. Xafil hefsar kişand lê ew dîsa jî nemeşiya û li dû wî neçû. Xafil li pey xwe zivirî, dît ku hefsar di stûyê mirovekî de ye. Jê re got: “Tu çi yî?” Zîrek got: “Ez kerê te me lê serpêhatiyeke min a ecêb heye. Di rastiya xwe de ez mirov bûm û dayîkeke min î extiyar û qencerê hebû. Rojekê ji rojan ez serxweş çûm malê. Wê jî ji min re got: ‘Lawê min dest ji van gunehan berde û tobeya xwe bike vegere ser rêya rast.’ Min rahişt darekî û ez ketim ser dilê wê, min têra xwe lê da. Wê jî nifir li min kirin û Xwedê nifirên wê qebûl kirin, ez kirim ker û ez dam ber destê te, hetanî roja îro. Îro jî, ez ketim bêriya diya xwe, dilê wê bi min şewitî û ji min re dua kir; Xwedê jî duaya wê qebûl kir û ez dîsa kirim mirovê berê.” Xafil matmayî ma, piştî bi bergerî ji mirovê zîrek re got: “Subhan ji Xwedayê gewre re! Birawo tu bi qedrê Xwedê kî li min negire, ji ber siwarbûn û karên ku min bi te kirin, wilehî bêagah bûm ji vê rastiya te!” Piştî ew berda û çû malê.

Gava Xafilo vegeriya malê bi serxweşî û di nav kul û xeman de, jina wî jê re got: “Çi bi te hatiye û kanî kerê te?” Wî jî lê vegerand û got: “Agahiya te jî ji serpêhatiya kerê nîn e, ez ê jî te re bibêjim.” Di pey re çîrok ji serî hetanî binî jê re vegot. Jina wî jî şaş û metal bû, devê wê ji hev ma, nema dizanibû bê wê çi bibêje. Piştî ji mêrê xwe re got: “Xwedê li me were rehmê û gunehên me bide efûkirin, ma çawa me ev qas sal, mirovek li şûna kerê da xebitandin û me ev gunehê giran kir?” Piştî gelek sedeqe dan di ber wî gunehê xwe de û îstixfara xwe ji Xwedayê xwe xwestin.

Xafilo, demeke dirêj ji malê derneketa û neçû kar nekir. Jina wî jê re got: “Hetanî kengî tu yê wisa bê kar, di mal de rûnêyî? Rabe here sûkê û ji xwe re kerekî bikire û dîsa dest bi xebatê bike!”

Xafilo bi ya jina xwe kir û rabû çû sûkê û li ber kerekî sekinî ji bo ku wî jî xwe re bikire. Gava jî nêz ve li ker nêrî, nas kir ku ew kerê wî ye, ne yekî

din! Xwe bi ser de tewand û devê xwe xist guhê wî, jê re got: “Cirnexweşê bêmîrê, nexwe dîsa tu serxweş ketiye û te li diya xwe daye ha? Wellehî ez nema te dikirim!” Piştî dev jê berda û çû cem kerekî din.

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 399'EMÎN

(ÇÎROKA EL HAKÎM BÎ EMRÎLLAH Î TACIR)

Şehrezadê got:

Tê gotin ku rojekê ji rojan, Xelîfe el-Hakîm Bî-Emrîllah li hespa xwe siwar bû û li gel wezîr û parêzvanên xwe bi rê de diçûn. Li cihekî rêya xwe bi bistanekî xistin, dîtî ku zilamek di nav de ye û dora wî tijî bende û xizmetkar in. Xelîfe çû cem wî, avek jê xwest, zilam av da Xelîfe û got: “Gelo emîrê bawermendan dikare ji hespa xwe peya bibe û li nav vî bistanî bibe mêvanê min, min şanaz bike?”

Xelîfe daxwaza wî neşikand, ew û parazvan û artêşa xwe li cem wî peya bûn di nava wî bistanî de. Zilam ji wan re sed merş raxist, sed mînder û sed balîf jî li ser merşan rêz kir û sed tepsiyên tijî fêkî li ber wan danî. Sed camên tijî şîre û sed zerikên tijî vexwarinên şîrîn ên cur bi cur jî li kêleka fêkî danîn.

Xelîfe el-Hakîm Bî-Emrîllah şaş û behetî ma bi vê amadekariya zilam a mezin. Jê re got: “Gelo te dizanibû ku em ê werin vir, ku te ew qas amadekarî kiribûn?” Zilam got: “Na wele min nizanibû ku hûn ê bîn emîrê bawermendan. Lê ez tacîrek ji tacîrên we me û sed cariyeyên min hene. Gava we ez şanaz kirim bi daketina xwe û min xeber şand ji gişan re ji bo ku her yek ji wan mîna her car xwarin û fêkî bişîne, wan jî şand. Jixwe her roj wisa dikin û her yek ji wan hinek xwarin ji cem xwe dişîne ji min re, îro jî wisa kirin û min tiştêkî zêde pêşkêşî we nekiriye.”

Xelîfe herdu destên xwe ber bi hewa vekirin, spasiya xwe ji Xwedayê xwe re pêşkêş kir û got: “Şîkir ji wî Xwedayî re ku maldarên wisa mezin û comerd di nava gelên min de çêkirine ku bê amadekarî bi xwarina mala xwe xelîfe û artêşa wî têr bikin!”

Piştî xelîfe ferman da xeznedarê xwe, ku hefsed û heft hezar dînar ji xwediyê bistan re veqetîne û jê re got: “Bila ev jî alîkariya me be ji bo ku camêriya te mezintir bibe.” Pê re jî ew dirav dane wî û rabûn ser xwe, rêya xwe berdewam kirin.

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 400'EMÎN

(ÇÎROKA QRAL XUSREV Û NÊÇÎRVAN)

Şehrezadê got:

Tê gotin ku kesrayek ji kesrayên Farisan ku navê wî Xusrev bû, pir ji xwarina masiyan hez dikir. Rojekê ji rojan, ew û jina xwe Şîrînê rûniştî bûn, gava masîvanek hat cem wî û masiyekî mezin diyarî wî kir. Xusrev jî ew masî pir eciband û ji xeznedarê xwe re got: “Çar hezar dirhemman bide vî nêçîrvanî.”

Şîrînê bi dengêkî hêdî jê re got: “Te tiştêkî nebaş kir, bi dana ew qas dirhem!” Xusrev got: “Çima?” Şîrînê got: “Ji ber ku ji îro û pê de gava tu heman miqdarî bidî xebatkarekî xwe, dê aciz bibe û bibêje bi qasî ku daye masîvan dide min. Tew gava tu kêmtir bidî wan, dê hîn bêtir hêrs bibin û wê bibêjin ji masîvan jî hindiktir da me!”

Xusrev ponijî û got: “Tu rast dibêji lê êdî çû, min da û bi şûn de girtina danê şerm e li ba kesrayan.” Şîrînê got: “Heger tu bixwazî, ez dikarim rêyekê bibînim û wan diravan dîsa jê bistînim.” Xusrev got:

“Çawa?” Wê got: “Gazî wî bike û jê re bibêje ev masî nêr e yan mê ye? Heger got nêr e, bêje me masiyekî mê dixwest û heger got mê ye jî, bêje me masiyekî nêr dixwest.”

Xusrev gazî masîvan kir û jê re got: “Ev masî nêr e yan mê ye? Masîvan bejna xwe li ber kesra tewand û got: “Qralê min ev masî ne nêr e ne jî mê ye; nêremê ye.”

Xusrev bi heyrangorî û şaşwazî ew bersiva zîrekane pêşwazî kir û têra xwe keniya. Zîrekbûn û aqilmendiya masîvan ew pir şa kir. Loma rabû çar hezar dirhemên din jî dan wî masîvanî. Masîvan heşt hezar dirhemên xwe xist tûrikekî û avêt ser stûyê xwe û hewl da ku biçe lê di wê kêlikê de dirhemek jê ket. Rabû xwe daqûl kir wî dirhemî û ew jî hilda destê xwe. Di wê navberê de çavê kesra û jina wî li ser wî bûn û ew helwesta wî dîtîn. Wê gavê Şîrînê ji mêrê xwe re got: “Kesrayê hêja, te dît bê ev zîlamê hanê çiqasî çikûs û destgirtî ye! Dirhemek tenê jê ket, nexwest ku ew dirhem here ji xizmetkarekî kesra re.”

Ev gotina Şîrînê ket serê kesra û dilê wî xeliya ji wî masîvanî û ji wê helwesta wî ya ketî. Careke din gazî masîvan kir û bi ser de rabû, pê de xe-

yidî, jê re got: “Bêmirêsê bê sinc û bê wicdan, te çawa ew tûrikê tijî dirhem danî ser milê xwe û tu li dirhemekî sekinî, te xwe daqûl kir ji bo ku tu wî li erdê nehêlî?”

Masîvan careke din bejna xwe li ber wî tewand û got: “Xweda temenê kesrayê me dirêj bike lê divê kesrayê me bizanibe, ku min ne ji ber çikûsiyê ew dirhem ji erdê rakir. Lê belê ji ber ku li ser rûyekî wî dirhemî sûretê kesrayê min hebû û li ser rûyê din jî navê wî hebû û ez tirsîyam, ku hinek bê hemdê xwe pê li dirhem bikin û bêrêziyek li himber kesrayê me çêbibe, ku ez jê re bibim sebeb.”

Xusrev careke din bi heyrangorî li gotinên wî masîvanî guhdar kir û pir pê şa bû ji ber wê zîrekbûna wî. Loma fermaneke din da xeznedarê xwe ji bo ku çar hezar dirhemên din bide wî. Ji aliyekî din, fermanek da bangeşkarê xwe bo ku li nav bajêr bang bike û bibêje: “Divê tu kes bi gotina jinan neke, yê ku bi ya wan bike, dê dirhemên xwe wenda bike.”

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 401'EMÎN

(ÇÎROKA CAFER BÎN MÛSA ELHADÎ Û EMÎN)

Şehrezadê got:

Tê gotin ku cariyêke Cafer Bin Mûsa Elhadî hebû ku ne ji rêzê bû. Navê cariyeyê Heyva Mezin bû û di dema xwe de jin mîna wê xweşik û lihevhatî tune bûn. Ne tenê xweşikbûna rû û kamilbûna bedenê, ji aliyê huner û zanînê ve tu kes mîna wê tune bû. Hem dengê wê pir xweş bû û hem jî kesî mîna wê nizanibû li ûdê û çengê bidaya. Heta ne ew tenê jî, hemû amûrên muzîkê baş bi kar dianîn. Îcar gava Muhammed El Emin Bin Zubeyde, nav û dengê vê cariyeyê bihîst, agahî ji Cafer re şand û xwest ku wê cariyeyê jê bikire. Lê Cafer jê re got: “Tu dizanî ku kirîn û firotina cariyeyan ne layiqî min e û bawer bike, heger ew ne terbiyeya mala min bûya, min ê ew weke diyariyekê ji te re rê bikira û min tu jê mehrûm nedihîştî.

Rojekê bi armanca şevîn û şahiyê Muhammed El Emîn çû mala Cafer Bîn Mûsa Elhadî. Cafer bi germahî pêşîwaziya wî kir, gazî gelek dost û birakên xwe jî kir ji bo tevlî wan û şevbuhêrka wan bibin. Piştî ferman da cariyeya xwe Heyva Mezin, ji bo ku li muzîkê bide û bistirê.

Heyva Mezin çeng û ûda xwe saz kir, piştî stranên herî xweş ji wan re gotin. Muhammed El Emîn jî xwar û vexwar û ji yê mey digerlandin xwest ku meya zêde bide Cafer, hetanî ku ji ser hişê xwe biçe. Gava Cafer ji ser

hişê xwe çû, wî jî rahişt cariyeya wî û çû mala xwe.

Îcar gava bû sibe, Muhammed El Emîn şand dû Cafer Bîn Mûsa, ew vexwend mala xwe û gava hat şerab û mey dayê û hişt ku Heyva Mezin ji pişt perdeyê jê re bistirê. Gava Cafer dengê wê bihîst, tê derxist û ew nas kir. Pir hêrs bû lê hêrsa xwe neda der û di hundirê xwe de girt, ji bo ku rûmeta wî neşikê û şahiya xwe pê re dewam kir.

Gava şahiya wan qediya, Muhamed El Emîn ji xizmetkarên xwe xwest, ku keleka Cafer tijî dirhem û dînar û gewher û yaqût û kincên giranbuha û malên cur be cur bikin. Wan jî çû wisa kirin û hezar bedre, hezar durrên ku her durrek bi bîst hezar dirheman bû lê zêde kirin, li gel gelek tiştên din jî, hetanî ku kelekvanan nerazîbûna xwe diyar kirin û gotin bes e hûn ê kelekê binav bikin.

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 402'EMÎN

(ÇÎROKA SEÎDÊ BAHILÎ Û BERMEKIYAN)

Şehrezadê got:

Tê gotin ku Seîdê Bahilî gotiye: Di dema Harûn Reşîd de rewşa min pir xerab bû û deynên min giran bûn bi qasî ku ez nema karibim piştî xwe di bin wan de rast bikim. Êdî min nema dizanibû ez ê deynên xwe çawa bidim. Lewre xwediyê deynan li ber deriyê min ketibûn rêzê û daxwaz ji min dikirin ku kêlî berî keliyê ez deynên wan bidim wan. Rikebir û dijminên min jî kêra xwe li min disûtin û tirs û bêçaretîya min mezintir dikirin.

Gava min dît ku rewş xerab e û çare ji min re nîn e, ez çûm, min xwe li Evdilayê Malik girt û min jê xwest ku rêyeke xelasiyê bide ber min, lewre ew zanayekî navdar bû. Evdilayê Malik ji min re got: “Ji Bermekiyan pê ve tu kes nikare te ji vê tengasiyê rizgar bike; ew tenê dikarin bibin derman ji kul û xem û derdên te re.” Min jî jê re got: “Û kî dikare xwe ragire li ber pozbi-lindî û serdestiya wan?” Wî jî got: “Divê tu xweragirti bî ji bo ku tu bikaribî xwe ji vê tengasiya mezin rizgar bikî û rewşa xwe sererast bikî.”

Ez ji cem Evdila rabûm û min berê xwe da cem El Fadl û Cafer, herdu kurên Yehyayê Bermekî. Ez giham cem wan, min çîroka xwe ji wan re vegot û rewşa xwe li ber çavên wan raxist. Wan jî ji min re gotin: “Xwedê alîkarê te be û te maldar bike bi maldariya xwe û bibe sebeba qencî û başiya te û nehêle tu muhtacî tu kesî bibî!”

Bêhna min pir teng bû bi vê şîreta wan û bi hêrs ez ji cem wan rabûm û ez careke din vegeriyam cem Evdîlayê Malik û tiştê ku herdu kurên Yehyayê Bermekî ji min re gotibûn, min ji wî re jî dubare kir. Evdîla got: “A baş ew e, ku tu îro li cem me bimînî, piştî em ê binêrin bê wê Xwedê çi rêyê bide ber me.”

Min bi ya Evdîla kir û ez li cem wan mam. Piştî saetekê, min dît ku xizmetkarê min hatiye ji min re dibêje; mîrzayê min va ye gelek deve tevli barên xwe li ber deriyê te sekinîne û zilamek jî bi wan re ye, dibêje ez wekîlê El Fadl û Cafer im!” Evdîlayê Malik got: “Ez hêvî dikim ku ev rêya xelasê be hatibe ber deriyê te. De rabe here, binêre bê çi ye ne çi ye?”

Ez ji cem wî rabûm û bi bazdan min berê xwe da malê. Li devê derî, min dît ku zilamek di pêşîya deveyên barkirî de sekiniye. Kaxezek da destê min, min ew vekir û xwend, min dît ku dibêje: “Piştî ku te derdê xwe ji me re got û tu rabûyî çûyî, em jî çûn cem xelîfe û me rewşa te jê re got. Wî jî got, herin beytulmalê jê re hezar dirhemî bibin. Me got bi hezar dirhemî inçex deynê xwe bide, ka wê debara xwe bi çi bike, emîrê bawermendan? Rabû ferman da ku sê hezar dirhemên din jî ji te re veqetînin. Piştî me her du-yan jî her yekî hezar dirhem ji malê xwe ji te re veqetand, da ku tu bikaribî rewşa xwe pê sererast bikî.”

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 403'EMÎN

(ÇÎROKA ME'MÛN Û PÎRAMÎDÊN MISRÊ)

Şehrezadê got:

Hat gotin ku kurê Harûn Reşîd, El Me'mûn, gava derbasî Misrê bû, xwest ku pîramîdan xera bike, da ku xezîneyên tê de ji xwe re bibe. Amedekariyeke mezin kir û mesrefeke mezin li ser wê amedekariyê kir. Lê dîsa jî kir nekir nikaribû wan pîramîdan xera bike. Tenê bixêrîkeke biçûk di yekê ji wan de vekir. Lê belê tiştê ku di wê taqîkê tenê de dît jî, heqê mesrefa Me'mûn derxist, ne zêde ne kêr. Me'mûn bi xwe jî li wê yekê behetî ma û ji wê nêta xwe ya xerakirina pîramîdan bi şûn de vegeriya.

Hersê pîramîdên Misrê, ji ecîbeyên dinyayê ne û li ser rûyê cîhanê gişî, tiştêkî weke wan pîramîdan tune ye. Di asêbûn û bilindbûn û başlêkirinê de, tu avahî mîna wan tune ne. Lewre bi kevirin pir mezin hatine avakirin. Tê gotin ku avakarên wan pîramîdan, kevir ji herdu hêlên wî ve kun dikirin û şîşên hesinî di wan kunan de bi cih dikirin, piştî herdu hêlên kevirên din

jî kun dikirin û li ser ê ewil datanîn, kunên wî di hesinê yê dîtirkê re derbas dikirin, herî dawiyê jî risas bi ser de dihelandin û hemû kevir li gora rêzeke geometrîk li ser hev rêz dikirin. Bi wî hawayî lêkiribûn û bilindahiya wan gihandibûn sed gazên⁴ wê çaxê.

Pîramîd çargoşeyî ne û ji hêla jêrîn (zemîn) ve dirêjahiya her kêlekeke wan sêsed gaz e. Kesên berê dibêjin, ku di nava pîramîda Erebi de sih define hene; di nava kevirên berheste de, yên rengîn û tijî gewher, peykerên ecêb, çekên giranbuha yên ku bi rûnekî pir taybet hatine şayîkkirin û zingar nagirin hetanî roja qiyametê. Dîsa camên ku ditewin û naşikên, gelek cureyên derman û avan jî tê de hene.

Di pîremîda duwemîn de jî agahên di derbarê kahînan de hene ku li ser kevirên pehnik û fersîkî yên ji berehesteyê hatine kolan lewhe bi lewhe. Hinek lewhenivîs jî yên li ser zanîn û hikmetê ne û hemû nivîs jî bi awayê wêneyan hatine tomarkirin, bi hunereke pir balkêş. Li ser dîwaran jî wêneyên pûtên ku bi destên xwe her tiştî çêdikin û diafirînin. Ew pût jî li gora rade û asterêzan hatine xêzkirin û bicihkirin.

Di her pîramîdekê de jî depoyek heye ku nobedarek li ber e, wê diparêze ji ber qeda û belayan bi hezar salan. Her kesên ku pîramîd dîtine, li wan ecêbmayî mane û tu kesî tiştek ji wan fêhm nekiriye. Lê dîsa xelkê gelek tişt derbarê wan de gotine û gelek helbest li ser wan nivîsandine. Lê hindik ji wan gihane ber destê me. Yek ji wan jî ev e:

Li pîramîdan binêr guh bidêre
Bibihîze bê ew çi dibêjin lêre
Der barê dem û salên borî de
Der barê kevnecivata berê de
Ger bipeyivîna dê agahdar bikirina
Bê ka kê çi kiriye li ewilê zemana

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 404'EMÎN

(ÇÎROKA TOBEKAR Û DIZ)

Şehrezadê got:

Tê gotin ku dizek hebû, rojekê tirsaxwedê ket dilê wî, rabû tobe kir û ket ser rêya rast û bû mirovekî baş; ji xwe re dikanek vekir; firoşkariya caw û kincan kir. Hetanî demeke dirêj jî, karê xwe wisa berdewam kir. Rojekê

4. Gaz: Yekeyeke pîvana dirêjbûna tiştan e. Her gazeke 75 cm e.

gava dikana xwe girt û çû malê; çend dizên fenek ên ku xwe xistibûn dirûvê xwediyê dikanê, ketin koza wî û mifteyên dikana wî jê dizîn. Ji ber ku dinya şev bû, çûn cem nobedarê sûka ku dikan lê bû û jê xwestin ku mûmekê ji wan re pêxe. Gava nobedar çû mûmê pêxe, dikan dikan vekir û mûmekê din pêxistin. Dizê ku xwe xistibû dirûvê xwediyê dikanê, li cihê wê rûnişt, deftera hesaban danî ber xwe, ew vekir û tiliya xwe di ser hesaban re bir û anî çawa ku wan kom bike û ji hev derxe. Gava nobeder lê vegeriya û ew di wê rewşê de dît, tu guman pê re çênebûn. Dizê fenek hetanî şevqê jî ew mîzansena şopandina hesaban berdewam kir û gava şevqê lêda, gazî nobedar kir, got: “Gazî barkêşekî bike, bila deveya xwe bine û hinek malê min bar bike!” Nobedar çû jê re deve û barkêşek anî. Wî jî rahişt çar topên caw û da destê wî. Barkêş, caw li deveya xwe bar kir. Piştî dizê fenek dikan girt, du dirhem dan nobedar û da pey deveya barkirî, çû.

Gava roj hilat, dinya ronî bû û xwediyê dikanê hat; nobedar careke din spasiyên xwe pêşkêşî wî kir, ji ber herdu dirheman. Lê xwediyê dikanê behetî ma li wê gotina wî û qebûl nekir, ku tiştêkî wisa kiribe. Di pey re gava dikan vekir û deftera hesaban li gel mûma heliyayî li erdê dît, guman pê re çêbûn. Çavdêriyek li dikana xwe kir, dît ku çar topên cawên wî kêmin! Ji nobedar pirsî, got: “Mesele çi ye?” Nobedar, tiştê ku bi şev qewimîbûn, hemû jê re vegotin. Dikandar got: “Here wî xwediyê deveyê yê ku caw bar kiriye bine vir!” Nobedar got: “Ser seran û ser çavan.” Çû, ew barkêşê xwediyê deveyê jê re anî dikanê. Dikandar jê re got: “Bi şevqê re te ew caw birin ku?” Barkêş got: “Min ew birin filan benderê û li filan keştiyê siwar kirin.” Got: “Ka min ji bibe wir.” Barkêş ew bir wê benderê û keştî nîşanî wî da, got: “Min ew caw li vê keştiyê bar kirin û ev zilam jî xwediyê wê ye.” Dikandar ji keştivan pirsî, got: “Te ew bar û ew tacir bir ku?” Wî jî got: “Min ew bir filan derê; li wê derê jî deveyek anî, cawê di keştiyê lê bar kir û bi ku ve bir, ez nizanim.” Dikandar got: “Ka ew xwediyê deveyê yê ku caw ji keştîya te bar kir ji min re bine!” Keştivan çû ew zilam jê re anî. Dikandar jê pirsî, got: “Te ew qumaş û cawê ku li keştiyê barkirî bi ku ve bir?” Got: “Min ew bir filan cihî.” Dikandar got: “Ka bi min re were wî cihî!” Zilam ew bir wê deverê, ku cihekî dûrî benderê bû. Li wir, xana ku caw û tacirê xwediyê wê lê danîbû nîşanî dikandar da. Dikandar derbasî xanê bû û çû deriyê depoya ku xwediyê deveyê nîşanî wî da, vekir; dît ku her çar topên cawê wî li wir in. Tu kêmanî jî di wan de tume bû. Cawê xwe dişa li deveyê kir û bi şûnde vegeriya benderê lê bi rê de dizê wî lê rast hat û da pey wî hetanî bi cem keştiyê. Li wir, gava dikandar cawê xwe li keştiyê kir, diz pê ve beziya û jê re got: “Mîrzayê min, jixwe wa ye te cawê xwe bi saxî û selameti bir, hema ji kerema xwe ew kincên min ên ku min li ser wan ji bîr kiriye, bide min!” Dikandar kenîya û bêyî ku gotineke nexweş jê re bibêje, kincên wî dan wî û her yek ji wan bi rêya xwe de çûn.

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 405'EMÎN

(ÇÎROKA ÎBNIL FARABÎ Û REŞÎD Û MESRÛR)

Şehrezadê got:

Tê gotin ku emîrê bawermendan, Harûn Reşîd, şevê jî şevan pir qeliqî û tasewas pê re çêbûn, bêhna wî teng bû. Wezîrê wî Caferê Bermekî jê re got: “Xêr e îşelâh emîrê bawermendan, ez bala xwe didimê tu îşev pir tengav xwiya dikî û ez nizanim ez ê çi bikim?” Di wê kêlikê de, xulamê wî Mesrûr jî li gel wî bû û bi wê pîrsa Cafer re kenîya. Xelîfe Harûn Reşîd jê re got: “Tu bi çi dikenî? Tu dîn bûyî ango tu tinazên xwe bi min dikî?” Mesrûr got: “Na wile tiştêkî wisa tune ye emîrê bawermendan; bi heqê mervantiya te û pêxemberê umetê, tiştêkî wisa qet neketiye bîra min jî. Lê belê doh ez derketim derveyî qesrê û ber bi qiraxên Dicleyê ve çûm. Li wir min dît ku mirov li hev kom bûne, ez jî çûm cem wan, min bala xwe dayê ku zilamek di nav wan de ye, wan dikenîne bi qerfên xwe, navê wî jî Îbnil Farabî bû. Vêca niha ew gotinên wî hatin bîra min û bêhemdî xwe ez kenîyam. Ez lêborîna xwe dixwazim!” Xelîfe got: “Zû here, wî zilamî bine vir!”

Mesrûr bi lez derket û zû xwe gihand Îbnil Farabî, jê re got: “Were emîrê bawermendan zû te dixwaze!” Wî jî got: “Bila be, va ye ez tîm.” Mesrûr got: “Lê bi şertekî tu yê werî; ew jî gava tu derbasî cem wî bûyî û bexşîş da te, tu dê çarîkekê bigirî ji xwe re û yê mayî bidî min.” Îbnil Farabî qebûl nekir û got: “Na wele bila nîvî bi nîvî be!” Mesrûr got: “Na!” Îbnil Farabî got: “Ji sisiyan dudu ji te re!” Piştî bazareke zor û zehmet, Mesrûr ew teklîfa wî qebûl kir.

Gava Îbnil Farabî derbasî cem Harûn Reşîd bû û silava xîlafetê dayê, bejna xwe jê re tewand, xelîfe jê re got: “Heger tu min nedî kenandin, ez ê bi vê goreyê sê caran li te bidim.” Îbnil Farabî di dilê xwe de got: “Û çima sê derban bi vê goreyê li min bide, jixwe derba qamçiyê min naêşîne?” Ji wî werê ku ew gore vala ye, tiştêk di hundirê wê de tune ye. Piştî dest bi henek û laqirdiyan kir, hemû hunerên xwe pêşkêş kirin lê dîsa jî kenê xelîfe nehat û rûyê wî jî venebû. Li himberî vê dîmenê, Îbnil Farabî tengav bû, tirsîya. Emîrê bawermendan jê re got: “Niha îca te lêxistin heq kir!” Rahişt goreyê û carekê lêda. Ji ber ku çar şîş tê de bûn û her şîşek ji du ritilan girantir bû, çawa ku derb li stûyê wî ket, qîrîn bi Îbnil Farabî ket û di cî de ew şertê di neqeba wî û Mesrûr de hat bîra wî. Bi lez axivî û got: “Ez lêborîna xwe ji emîrê bawermendan dixwazim û ez tikan dikim ku hûn iznê bidin min,

ez du gotinan tenê bibêjim?” Xelîfe got: “Ka bibêje, em bibînin bê çi di bin zimanê te de ye.” Îbnîl Farabî got: “Mesrûr şertek dabû ber min û min jî pejirandibû. Li gora wî şertî heger emîrê bawermendan bexşîşek bida min, min ê ji sisiyan dudu jê bidana Mesrûr û dê yek ji min re bima. Jixwe bi zorê ew yek bi min dabû qebûlkin. Niha bexşîşa ku tu didî min lêxistin e û yê min, min heqê xwe stend, herdu derbeyên mayîn jî yên wî ne. Êdî wan her duyên mayîn jî li wî bide!”

Gava ku emîrê bawermendan ew gotin ji devê wî bihîstin, keniya û hey keniya hetanî ku zikopiştû bû. Piştî gazî Mesrûr kir û derbek bi gorê lê da. Mesrûr jî qîriya û got: “Derbek tenê besî min e emîrê bawermendan, a mayîn jî bide wî!” Xelîfe careke din bi wan keniya û ferman da xeznedarê xwe ku serê yekî hezar dînarî bide wan. Herdu jî bi kêfxweşî ji cem xelîfe derketin.

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 406'EMÎN

(ÇÎROKA KURÊ HARÛN REŞÎD Ê ZAHÎD)

Şehrezadê got:

Tê gotin ku kurekî Harûn Reşîd hebû, temenê wî hîjde sal bû. Lê hîna di wî temenî de, destê xwe ji dinyayê kişandibû û bûbû zahidekî ku serê xwe ji ser sicadê ranedikir, ji xiroş û îbadetê pê ve tiştek nedikir. Carinan jî diçû nav goristanan û li wir digot: “Berê, gelek malê dinyê di destê we de bû; niha jî hûn di gorên xwe de ne. Gelo we çi gotiye û çi ji we re hatiye gotin?” Û pê re jî digiriya û bi helbestî berdewam dikir:

Herdem bi tirs û saw im ji termê miriyan

Pir xemgîn û dilbirîn im bi girî û figan

Carekê bavê wî Harûn Reşîd rêya xwe pêxist. Ew û wezîr û gizîrên xwe giş bi hev re bûn li gel gelek karmendan. Gava hatin cem wî, dîtî ku kurik di nava cubeyekî hirî de ye û destmaleke ji liva li serê wî ye, weke perîşanan xwiya dike. Hinekan ji zîlamên bavê wî gotin: “Vî kurikî emîrê bawermendan hetikandiye di nav siltan û mîran de. Heger bavê wî hinek şîret û lome lê bikirina, belkî ji ser vê rêya xwe vegeriya!”

Ev dengê hanê çû Harûn Reşîd û ev fikra hanê jî ket serê wî. Rabû ji kurê xwe re got: “Bi vî halê xwe te ez hetikandim.” Kurê wî serê xwe rakir, lê nêrî lê belê bersiva wî neda. Berê xwe da çûkekî ku li ser şanîşeya qesrê danîbû, lê nêrî û gazî kirê, jê re got: “Ey teyrê hêja, tu bi heqê xaliqê xwe kî,

tu yê werî ser destê min!” Çûk di cî de hat li ser destê wî danî. Piştî jê re got: “Ka rabe dîsa vegere ser şanîşana xwe!” Çûk vegeriya cihê xwe. Dûvre dîsa gazî wî kir û jê re got: “Ka were li ser destê emîrê bawermendan deyne!” Çûk bi ya wî nekir û nehat.

Kurik ji bavê xwe re got: “Ey emîrê bawermendan, a rast te ez hetikan-dim bi vê hezkirina xwe ya ji dinyê; ji mal û milkê wê. Niha, êdî min biryara xwe da ku ez ji te veqetim û li te venegerim hetanî roja qiyametê.” Piştî gotina xwe xist meriyetê û ji cem bavê xwe bar kir, çû Besrayê. Li wê derê di karê kelpîçan û lêkirinê de xebitî. Rojê bi dirhem û daniqekî⁵ dixebitî. Bi daniqekî debara xwe dikir û dirhemek jî dikir sedeqe li ser hejaran belav dikir.

Ebû Amîrê Besrawî behsa wî dikir, digot:

Di wê demê de, dîwarekî min herifî, ket. Rabû ez jî çûm sûka karkeran da ku ez zilamekî bînim, dîwarê min ji min re lê bike. Wê çaxê çavên min bi xortekî ciwan û baş ket, ku rûyekî begûneh li ser wî bû. Ez çûm cem û min silav lê kir; piştî min jê re got: “Dilovan, tu dixwazî xizmetê biki?” Got: “Belê.” Min jî got: “Ka bi min re were dîwarê min lê bike!” Wî got: “Şertên min hene.” Min got: “Şertên te çi ne?” Got: “Heqê xebata rojane dirhem û daniqek e û gava mele azan bide, ez ê navberê bidim kar û herim bi cemaetê re nimêja xwe bikim.” Min got: “Bila be.” Piştî min ew bir malê. Îcar xebateke ew qasî baş û durist kir ku ez lê behetî mam. Min ew vexwend ser xwarinê, nehat; min fêhm kir ku bi rojî ye. Çawa ku dengê azana melê bihîst jî, ji min re got: “Tu şertê min dizanî!”

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 407'EMÎN

Şehrezadê got:

Ebû Amîrê Besrawî gotina xwe berdewam kir:

Wî got, tu şertê min dizanî, min jî got: “Belê.” Rabû navber da xebata xwe, navtenga xwe vekir û bi awayekî tekûz desnimêja xwe girt. Piştî derket, çû, nimêja xwe bi cemaetê re kir û dîsa vegeriya ser karê xwe. Gava melê esrê jî ban da, wî got: “Subhan ji Xwedê re lê belê xizmeta min hetanî êvarê ye.” Piştî xebata xwe berdewam kir, hetanî ku şev ket erdê. Min jî du dirhem danê. Çawa çav li herdu dirheman ket, got: “Ev çi ye?” Min got: “Kê be jî, ev heqê kar û xizmeta te ya baş e.” Herdu dirhem avêtin erdê û got: “Ji derveyî bazara min û te, ez metelîkekî tenê jî zêde nagirim.” Min hewldana xwe berdewam kir lê wî qebûl nekir û ez mecbûr mam mîna wî

5 . Daniq ji dehan yek e ji dirhem.

bikim. Min tenê dirhem û daniqek dayê.

Roja dîtirkê, çawa bû sibe ez dîsa çûm sûka karkeran lê min ew li wir nedît. Min lê pirsî, gotin: “Tenê roja şemiyê tê vir.” Gava şemiya din hat, ez çûm sûkê, min ew li wir dît. Min ew vexwend kar, got: “Bi heman şertan ez ê bêm?” Min got: “Belê.” Min ew bir malê, wî dest bi xebatê kir, ez jî li wir mam, min ji xwe re lê temaşe kir, bi awayekî ku ew min nebîne. Min bala xwe dayê ku radihêje heriyê, datîne ser dîwêr, li ser rast dike û bêyî ku destê xwe bavêje kevir û kelpîçan, ew bi xwe li ser heriyê rêz dibin! Min di dilê xwe de got: “Hebe tune be ev qencekî Xwedê ye!” Wê rojê jî hetanî ku şev ket erdê xebitî. Min heqdestê wî dayê û çû.

Gava şemiya sisiyan hat, ez dîsa çûm wê sûka karkeran lê min ew li wir nedît. Min lê pirsî, gotin, nexweş e û li filan çadirê ye. Çadira ku behsa wê dikirin, çadira pîrejineke bû ya bi qencî û xêrxwaziyê dihat naskirin. Ez çûm wê çadirê û derbasî hundir bûm, min dît ku ew li wir e û li ser erdeke neraxistî paldayî ye. Serê wî li ser kelpîçekî bû û nûr ji rûçikê wî dibariya. Min silavek lê kir, wî jî silava min girt û bixêrhatinek da min. Ez li hêla serê wî rûniştim û bi ser de giriyam ji ber ciwaniya wî, ji ber bêkesî û xerîbiya wî, xizmetkariya wî ya sinckar û taeta wî ji Rebê wî re. Piştî min pêdiviyên wî pirsîn. Got:

Pêdiviyê min heye, ew jî heger tu sibê hatî û te dît ku ez mirime, min bişo, tirba min bikole û min veşêre bêyî ku kes bi min bihese. Ev kirasê li ser min jî besî min e ji bo ku tu wî biçirînî û ji min re bikî kefen, li berîkên wî jî binêre û çî tê de hebe, li cem xwe bigire. Dema ku te li ser cenazeyê min nimêj kir û te ez binax kirim, here Bexdayê û li ser rêya Harûn Reşîd bisekine hetanî ku ji qesra xwe derkeve. Gava derket, ew tiştên ku te di berîka min de dîtine bide wî û silavên min lê bike. Piştî jî van ristan jê re bixwîne:

Emaneta kesê mirî bibim ji kê re
Bigihîne Reşîd û rizaya rebê xwe re
Bêje wî xerîb bû bêriya we kiribû
Dûr ketibû ji dostan û her dost bû
Ne ku ji ber kîn û buxzekê veqetiyabû
Tenê ji bo ku rastiye wenda neke çûbû
Nefseke pa û paqij ew dûr xistibû ji te
Da ku giyanê pîroz biparêze ji bela te

Di pey wê daxwaza xwe re, kurik îstixfara xwe anî û bêdeng bû.

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî dengê xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 408'EMÎN

Şehrezadê got:

Piştî bêdengiyeke kurt, kurik dîsa îstixfara xwe anî, çend ayet xwendin, silav û selewat li ser pêxemberê umetê xwendin û di pey re dîsa ev çend riste gotin:

Xwe qure neke tu pozê xwe bilind neke
Temen zû diqede xweşî jî dirêj nake
Gava te bi xerabiya qewmekî bihîst
Bizan tu jî mesûl î nebêj kê pê de mîst
Gava te term hilgirt û bir nava goristanan
Bizan ku tê jî sibê li ser milan bidî dû wan

Piştî ku wesiyeta xwe qedand û bi şûn de, ez jî ji cem rabûm, ez çûm mala xwe. Roja dîtirkê, piştî ku min taştê xwar û roj bejneke bilind bû, ez çûm cem wî, min dît ku miriye; çûye ber diolovaniya Xwedê. Ez rabûm, min ew şûst û beriya ku ez kirasê wî jê re bikim kafen, min li berîka wî nêrî, min dît ku yaqûtek di berîka wî de ye bi buhaya hezarên dînan. Min di dilê xwe de got: “Bi navê Xwedê ev kurik zahidekî mezin e û ne ji ber feqî-riyê xwe daye ber barê vê jiyana arîfane.”

Piştî ku min ew veşart, min berê xwe da Bexdayê, ez çûm ber qesra xîlafetê û ez mam li benda derketina Harûn Reşîd. Çawa ji qesrê derket, min rêya wî birî, ez ketim pêşiyê û min ew yaqût da destê wî. Nuh li wê yaqûtê nêrî, ew nas kir û di cî de ji ser hişê xwe çû, li erdê ket. Xizmetkar û nobedarên wî jî di cî de ez destgîr kirim. Lê dema dîsa bi ser xwe ve hat, ji xizmetkaran re got: “Wî berdin û bi min re werînin qesrê.” Wan jî wisa kir û ez li pey wî derbasî qesrê kirim. Piştî, ez hildam cem xwe û ji min re got: “Xwediyê vê yaqûtê çi kiriye?” Min got: “Tişteke nekiriye, miriye.” Di pey re jî min bi berfirehî rewşa wî û çawaniya mirina wî jê re vegot. Dest bi girî kir û got: “Kurik mezin bû û ji dest me çû!” Piştî jî gazî jinekê kir, got, filankesê were vir. Jinik hat û çawa çavên wê li min ketin, xwest ku bi şûn de vegere. Lê ew ket navberê û pêşiya wê girt, got: “Were were xem nake!”

Jinik hat hundir, silavek da û xwe da kêleka wî. Harûn Reşîd ew yaqût avêt dawa wê û hîna jê re negotibû lê binêre, qîrînek pê ket, erd hejand û pê re jî li erdê ket, ji ser hişê xwe çû. Gava dîsa bi ser hişê xwe ve hat, got: “Emîrê bawermendan, Xwedê çi bi kurê min kiriye?” Xelîfe ji min re got: “Wê agahdar bike!” Min rewşa wî jê re diyar kir û ew ji mirina wî serwest kir. Kûrekûr pê ket, giriya û bi dengê fetisokî got: “Lawê mino, roniya çavên min! Xweska te zaniba bê min çiqasî bêriya te kiriye! Xweska min av bida te di wê kêliya ku kes tunebû avê bide te! Xweska min wensa te baniya di wê kêlika tenêtiya te de!” Dûre hêsiyê barandin û di ber xwe de got:

Li ser xerîbekî digirîm bi tena serê xwe çû mirinê
Bêkes û bêdost û bêheval çû ew ji vê dewrê û dinê

Di pey şanazî û dewlemendiyeke têr û tijî
Ripîrût çû bi tena serê xwe ew çawa dibezi

Wê gavê min jê re got: “Qey ew kurê te bû emîrê bawermendan?” Got: “Belê, kurê min bû. Berê diçû serdana mirovên zana û salih, lê gava ez ketim dewrê ji min nefret kir û xwe ji min dûr xist. Wê çaxê min ji diya wî re got, ev kurik ji me cuda bûye û ketiye ser rêya Xwedê; dibe ku di ezmûnên zor re derbas bibe û talûkeyên mezin bi serê wî de bîn, ka wê yaqûta xwe bide wî da ku gava bikeve tengasiyê bila ji xwe re bi kar bîne. Wê ev yaqût da wî û li ber geriya, hetanî ku ji destê wê qebûl kir. Piştê ev dinya me ji me re hişt û çû. Wendaî ma hetanî ku giha cem Xwedê û pêxemberên wî.”

Piştê rabû ser xwe û ji min re got: “Ka tirba wî nişanî min bide!”

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 409'EMÎN

Şehrezadê got:

Îcar Ebû Amîrê Besrawî berdewam kir û got: Min da pêşiyê û ez meşiyam hetanî ku min ew bir ser gora kurê wî. Li ser gorê giriya, li xwe da û hêsir barandin heta ku ji ser hişê xwe çû. Gava bi ser xwe ve hat, îstixfara xwe anî, duayên xêrê ji bo wî kirin, dûre ji min pirsî, got: “Tu dikarî bi min re destbiraktiyê bikî?” Min got: “Emîrê bawermendan, min dersa xwe ji kurê te girtiye û ez ê li ser riya wî bimeşim.” Piştê bi helbestî min got:

Xerîb im ez naçim cem tu kesî
Xerîb im ez lew ku tenêbûn ne besî
Xerîb im û tu kesî min qet nîn e
Ne kesî ku ez herim balê bi mêvanî
Ne jî kesekî ku bê cem in bi serlêdanî
Xwe li mizgeftan digirim lê dimînim
Dilê min jî qet jê venaqete'z dîn im
Şikir ji Xwedan re ku ruh dihêlê
Beden û laş here jî her ew dimîne

(ÇÎROKA MAMOSTEYÊ ZAROKAN-1)

Niha ez ê behsa hin çîrokên mamosteyan bikim. Zanayek dibêje:

Rojekê ez çûm serdana mamosteyekî zarokan. Min dît ku di nava cilgûbergin paqij û spehî de dersê dide zarokan. Çawa ez dîtîm ji ber min rabû, ez li kêleka xwe dam rûniştandin. Di warê xwendin, nehû, serf, helbest û zimaniyê de min ew di ezmûnan re derbas kir, min dît ku mirovekî kamil

e û her tiştê jê tê xwestin pê re heye. Min jê re got: “Xwedê hêz û qawetê bide te, wile tu bi her tiştî dizanî.”

Piştire, ez demekê pê re mam û min dît ku roj bi roj ez meziyetin baştir tê de dibînim. Wê çaxê min di dilê xwe de got: “Tiştêkî balkêş e ku mamos-teyekî zarokan ew qasî bi rêkûpêk û zana ye? Li gel hemû aqilmend dibêjin ku mamosteyên zarokan kêmaqil in!”

Piştire ez ji cem wî çûm lê her çend rojan carekê ez diçûm serdana wî. Rojekê mîna her car dîsa ez çûm serdana wî, min bala xwe dayê ku cihê wî girtî ye. Min lê pirsî ji cîranê wî, gotin: “Mirinek di mala wî de çêbûye.” Min jî di dilê xwe de got: “Divê em herin serdan û sersaxiya wî.” Ez çûm ber mala wî, min li derî xist; cariyeyek derket û got: “Tu çi dixwazî?” Min got: “Ez mîrzayê te dixwazim.” Got: “Mîrzayê min bi tena serê xwe ye, şînê dikişîne.” Min got: “Jê re bibêje filan dostê te dixwaze sersaxiya te bike.” Keçik çû, jê re got, wî jî got: “Wî berde, bila were hundir.” Îzna derbasbûnê da min. Ez derbasî cem wî bûm, min dît ku terîşek li ser pêçaye û rûniştî ye. Min jê re got: “Xwedê hêz û qewetê bide te; Xwedê sebr û aramê bide te lê ev dawiya me gişan e, ma em çawa bikin!”

Dûre jî min berdewam kir û got: “Gelo kê ji malbatê wefat kiriye?” Got: “Kesê ku herî zêde min jê hez dikir û li ber dilê min ezîz bû.” Min got: “Nexwe bavê te ye?” Got: “Na!” Min got: “Nexwe diya te ye?” Got: “Na!” Min got: “Birayê te ye?” Got: “Na.” Min got: “Merivekî te ye?” Got: “Na.” Min got: “Nexwe di çi astê de merivê te ye?” Got: “Dildara min e.” Min di dilê xwe de got: “Kêmaqiliya wî ya ewil ev e!” Piştire min jê re got: “Belkî yeke ji wê spehîtir hebe?” Got: “Min qet ew nedîtiye, heta ez bizanibim ew jî hinekên din spehîtir e yan na.” Min di dilê xwe de got: “Ev jî kêmaqiliya wî ya duduyan e!” Min jê re got: “Nexwe çawa te jê hez kir bêyî ku tu wê bibînî?” Got: “Ez li ber taqa hundir bûm gava rêwiyek di ber mala min re derbas bû û ev riste gotin:

Ey Ûmmû Emr a ahîn û êşa dilê min

Hema tu li ku bî bersivêkê bide dilê min

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 410'EMÎN

Şehrezadê got:

Mamoste di derbarê evîna xwe de berdewam kir û got:

Gava min ew gotina derbarê wê jinikê de bihîst ji wî rêwiyî, min ji xwe re got: Heger ne ji Ûmmû Emr bûya û heger ew ne jina herî xweşik bûya di dinyayê de, şaîran ev helbest li ser nedigotin, loma ez jî dil ketim wê û ez pê

ve hatim girêdan.

Du roj di pey wê bûyerê re, min bala xwe dayê ku heman rêwî di rê re derbas dibe û dibêje:

Kero bi Ûmmû Emr re çûbû der
Ne Ûmmû Emr vegeriya ne jî ker

Wê gavê ez jî têngihîştîm ku Ûmmû Emr miriye. Ez li ser xemgîn bûm, ponijîm û ev çend roj in jî ku min şîna wê li dar xistiye.

Bi vê gotina wî re, ez baş têngihîştîm ku ev mamosteyê zarokan jî kêmaqil û debeng e. Loma min dev jê berda û ez çûm, bi rêya xwe de.

(ÇÎROKA MAMOSTEYÊ ZAROKAN – 2)

Yek ji wan zanayên ku behsa kêmaqiltiya mamosteyên zarokan dikir, got ku rojekê ez çûm dibistana mamosteyekî pir zerîf, nazik û lihevhatî. Ez pê re axivîm û min hebekî ew kêla û teqiland, min bala xwe dayê ku hozan û wêjekar û têngihîşteki sergihayî ye. Ez li wê rewşa wî ecêbmayî mam û min jî xwe re got: “Bi qasî ku min dizanibû, mamosteyên dibistanên zarokan kêmaqil in lê ev wisa xwiya nake!”

Beriya ku ez ji cem wî herim, mamoste ji min re got: “Tu îşev mêvanê min î.” û ez vexwendim cem xwe. Êvarê ez çûm mala wî, wî jî bi kêf û xweşî ez pêşwazî kirim, xwarin û vexwarin li ber min rêz kir û me bi hev re têra xwe xwar û vexwar. Sohbeta xwe jî me hetanî derengî şevê berdewam kir. Dûre nivîna min raxistin û ew jî derbasî cem jinên xwe bû ji bo ku em rakevin. Lê hîna ez di xew re neçûbûm, min dît ku qîrewîrek bi jinan ket û xirecîreke ecêb ji jor hat. Min gazî wan kir, min got: “Çi qewimiye?” Jinên wî gotin: “Belayeke mezin bi serê şex de hatiye û li ber mirinê ye!” Min got: “Ka rê bidin min ez werim cem wî?” Rê dan min, ez birim cem wî, min lê nêrî ku li erdê term e, ji ser hişê xwe çûye û xwîna wî diherike! Min hinek av bi ser çavên wî dakir, bi ser xwe ve hat. Min jê re got: “Ev çi hal e, çi bi serê te hatiye, hetanî çend xulekan beriya niha jî tu li ser xwe bûyî û tiştêkî te tune bû?” Got: “Birawo, piştî ku ez ji cem te rabûm, hatim jor, hemû tiştên ku Xwedê ew afirandine, hatin bîra min û min ji xwe re got: “Xwedê çi çêkiribe feydeyek tê de heye; Xwedê dest dane ne ji bo ku em pê şer bikin, ling dane me ji bo ku em pê bimeşin, çav dane me ji bo em pê bibînin, guh dane ji bo em pê bibihîzin, nêrik jî dayê ji bo ku em pê şa bibin û her wiha ji bo hemû amûrên din jî, lê ev herdu hêkên ku tu fêdeya wan ji me re nîn e çima dane me? Rabû hema min rahişt kêrekê û min herdu jêkirin, di encamê de jî ev bobelat bi serê min de hat!”

Ez ji cem wî derketim û min ji xwe re got: “Kesên ku dibêjin mamos-

teyên zarokan kêmaqil in, rast dibêjin, lew ku hemû zanînen zanistê li cem wan hebin jî!”

(ÇÎROKA MAMOSTEYÊ ZAROKAN – 3)

Şehrezadê got:

Tê gotin ku di demekê ji deman de, li welatekî ji welatan hinek kes hebûn li gel ku ne dizanibûn xwendin û nivîsandinê jî, fen û hîle li xelkê dikirin û debara xwe li ser piştê xelkê dikirin. Rojekê ket bîra yekî ji wan fenekan ku dibistanekê veke û debara xwe pê bike. Rabû hinek kaxez, textên nivîsê û ewraq peyde kirin û di hundirekî de daliqand, tê de rûnişt û şaşika serê xwe mezin kir. Mirov jî di ber re çûn û hatin, li şaşika wî, li kaxez û textenivîsên wî nêrîn, gotin belkî fêrkerekî baş e û dibistaneke çak e ji bo fêrbûna zarokan. Wan jî zarokên xwe anîn dibistana wî û dan ber destê wî. Ew jî di ser serê zarokan re sekinî, ji yekî re got, tu vê binivîse, ji yê din re got tu vêya bixwîne. Zarokan jî xwe bi xwe hevdu fêr kirin û bi wî hawayî berdewam kir.

Rojekê, dîsa mîna her car li devê deriyê dibistana xwe rûniştî bû, gava jinek hat cem wî û nameyek di destê wê de. Di dilê xwe de got: “Misoger ev jin tê cem min da ku ez nameya wê jê re bixwînim, îcar ez ê çawa bikim bi vî halî û ez nizanîm bixwînim?” Rabû ser xwe û hewl da ku ji ber wê bireve, lê jinikê da pey wî û ew zeft kir. Mecbûr ma derewan bike, got: “Ez ê herim nimêja nivroyê bikim û vegerim.” Jinikê lê vegerand û got: “Nîvro hîna dûr e, ka vê nameyê ji min re bixwîne!” Mecbûr ma, rahişt nameyê û bermeqlûb xist destê xwe. Lê nêrî û geh şaşika serê xwe hejand, geh jî birhûyên xwe rakirin û raxistin, çawa ku hêrsbûna xwe diyar bike. Îcar tu nabêjî mêrê jinikê çûye rêwîtiyeke dûr û ew name jî ji wî hatiye. Lê gava ew liv û tevger û mîmîkên mamoste dîtî, jinikê ji xwe re got: “Bêguman mêrê min miriye lê ev mamoste fedî dike, ku vê xeberê ji min re bibêje?” Mamoste serê xwe hejand û bédeng ma. Jinikê jê re got: “Ez kincên xwe biqetînim?” Got: “Biqetîne.” Jinikê got: “Ez li rûyê xwe jî bidim?” Got: “Li rûyê xwe jî bide.” Jinikê nameya xwe ji destê wî girt û vegeriya mala xwe; dest bi girî û nalînê kir, li rûyê xwe da û kincên xwe qetandin. Zarokên wê jî pê re giriyan, dengê wan çû cîranan. Ew jî hatin lê pirsîn, wê jî got ku nameyek derbarê mirina mêrê wê de jê re hatiye. Lê cîranekî wê got: “Ev tişteki derew e, lewre mêrê wê duh nameyek ji min re şandibû, tê de digot ez baş im, tenduristiya min di cî de ye û di nava deh rojan de, ez ê li cem we bim.” Ev got û di cî de rabû ser xwe, çû cem jinikê jê re got: “Kani ew nameya ku ji te re hatibû?” Jinikê çû ew name anî, da destê wî. Zilam jî lê nêrî, xwend; dît ku tê de dibêje, “Di encamê de ez baş im, tenduristiya min di cî de ye û piştî deh rojan ez ê li cem we bim. Min ji we re lihêf û mekmerek şandiye, bila hayê te jê

hebe.” Naveroka wê ji jinikê re got, ew rabû çû cem mamosteyê dibistana zarokan û jê re got: “Çima te ev xerabî bi min kir?” Name da destê wî û bi berdewamî jê re got: “Te got mêrê te miriye lê cîranê me ev name xwend ku tê de dibêje, ez baş im û deh rojan bi şûn de ez ê li cem we bim; dîsa dibêje min ji we re lihêf û mekmerek şandiye.”

Mamoste got: “Jina delal, tu rast dibêji lê li qisûra min nenêre, wile ez di wê saetê de qehiribûm, hişê min ne li serê min bû; jixwe gava min dît ku behsa mekmereyê dike, min got belkî miribe û ew pê pêçabin.”

Ji ber ku jinik pir dilpak û hişpaqij bû, jê yeqîn kir, got: “Tu jî mafdar î û ji cem wî rabû, çû malê.

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 411'EMÎN

(ÇÎROKA QRAL Ê JINIKÊ Ê MÊRÊ WÊ)

Şehrezadê got:

Tê gotin ku carekê mîrekî ji mîran kincên xwe guhertin û bi dizî daket nava bajêr ji bo ku rewşa gelê xwe ji nêz ve bibîne û rastiye fêr bibe. Mîr li nava bajêr geriya, piştê ber bi gundan ve çû û çû hetanî gihişt gundekî mezin. Pir tî bûbû, bi tena serê xwe derbasî gund bû. Li ber deriyekî rawestiya û av ji wan xwest. Jineke spehî derket ber derî bi kûzekî avê re. Kûzê avê da destê wî, mîr av vexwar û dilê wî bijiya jinikê. Jinikê bi xwe jî ew yek di çavên wî de xwend û lê hay bû. Lê daxwaza wî neşikand û ew derbasî mala xwe kir, da rûniştandin û pirtûkek derxist da destê wî, jê re got: “Ji xwe re bi vê pirtûkê re mijûl bibe, heta ku ez hinek karên xwe bikim û bêm.”

Mîr pirtûk vekir û xwend, dît ku behsa destdirêjiya ser jinan û zî-nayê dike; her wiha sizayê giran ê ku Xwedê ji zinêkaran re amade kiriye. Gizrînok bi laşê wî ketin û rehên wî hatin guvaştin. Gazî jinikê kir, pirtûka wê lê vegerand û rabû ser xwe, çû.

Gava bû êvar û mêrê jinikê vegeriya malê, wê jî ew agahdar kir ji tiştê ku qewimibû. Gava mêrê wê ew tişt bihîst, di dilê xwe de got: “Ez ditirsim ku mîr çavê xwe berdabe wê û pê re raketibe!” Loma xwe ji jina xwe dûr girt û nema wêribû biçûya pê re raketa jî. Demekê wisa berdewam kir. Piştê jina wî çû mijar bi malbata xwe re parve kir. Hinekan ji malbata jinikê mijar birin ber destê mîr û derketin hizûra wî, jê re gotin: “Xwedê meqamê mîrê me mezintir û bilindtir bike Rebî!” Mêrê jinikê destnîşan kirin û axaftina xwe berdewam kirin, gotin: “Vî zîlamê hanê zeviyeke çandiniyê ji me kirê

kiriye û beyar berdaye, naçîne. Ne dev ji zeviya me berdide ku bi kirê em bidin hinekên din, ne jî ew tov davêjê û diçîne. Bi vî hawayî jî zîzar digihê zeviyê, lewre erda ku neyê çandin, xera dibe.”

Mêrê jinikê li mîr zivirî û jê re got: “Xwedê mîrê me bisitirîne, wile min bihîst ku şêr ketiye zeviya min, loma ez tirsîyam û min newêribû ez nêzikî wê bibim. Lewre ez baş dizanim ku hêza min têrê nake ku ez li himberî şêr derkevim.”

Mîr çîrok fêhm kir û têgihîşt bê dixwaze çi bibêje. Rabû ji wî re got: “Zevî zeviya te ye û tu şêr neketin nav de. Zeviya te pir baş e, wê biçîne bi dilekî aram; berka Xwedê tê de be. Şêr jî dê qet nêzikî wê nebe.”

Ev çîroka me jî bi vî hawayî qediya.

(ÇÎROKA ÎSHAK BÎN ÎBRAHÎM EL-MÛSILÎ)

Tê gotin ku Îshaq Bîn Îbrahîm El Mûsilî gotiye:

Demek hat ku ez kerrixîm ji çûna qesra xîlafetê û xizmetkariya di qesrê de. Sibehê zû, ez li hespa xwe siwar bûm û min berê xwe da çolê ji bo ku ez ji xwe re li xwezayê temaşe bikim. Beriya ku ez bikevim ser rê jî, min ji xulamên xwe re got: “Heger qasidê xelîfe yan jî hinekên din pirsîn, ji wan re bibêjin em nizanin bi ku ve çûye, tenê em dizanin ku şeveqê ji mal derketiye û li pey karin xwe çûye.” Piştî, çawa ku min got, ez ketim rê û ji xwe re li nav bajêr geriyam hetanî ku diniya germ bû.

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 412’EMÎN

Şehrezadê got:

Îshaq Bîn Îbrahîm El Mûsilî vegotina serpehatiya xwe berdewam kir û got:

Gava ku germa rojê da min, ez tengav bûm û min çavên xwe li sîgehê gerand. Di rêya Herm de, li ber deriyên hemû malên li kêleka rê, şîndarên mezin hebûn. Ez çûm wir û min xwe da ber siya darekê ku di ber deriyê malekê de bû. Hewşeke malê ya fireh hebû ku deriyê wê li rê dinêrî, dar di ber wî deriyê de bû. Hîna ku ez li wir bûm, min dît carîyeke bi zêr û zîv û cewheran xemilandî, di nava kinçekî hevrişimî de li ser kerekê siwar, daye pey evdekî reşik û ber bi malê ve tê. Gava hinekî din nêzik bû, spehîbûna bedena wê ya lihevhatî û çavên wê yên karxezalî hîn bêhtir xwiya kir. Hîna ji nêrîna ewil ve, wê dilê min dagir kir û ez pê ve hatim girêdan. Di wê

kêlikê de hinek di ber min re derbas bûn, min ji wan pirsî bê ew keçik kî ye û çî ye. Gotin: “Stranbêjek e.” Êdî hedana min nedihat li ser pişta hespê. Lê ew hat di derî re derbasî hundir bû. Hîna ez di hîleyekê de difikirîm ji bo ez derbasî hundir bibim, min bala xwe dayê ku xortên çeleng û dînemêr hatin ku derbasî heman malê bibin. Gava izna derbasbûnê ji xwediyê malê girtin, ez jî bi wan re derbasî hundir bûm, wek ku ez bi wan re bim. Wan jî digot belkî xwediyê malê ez vexwendime hundir. Em tevde rûniştin. Piştî saetekê, xwarin danîn, me xwar. Piştî mey û şerab danîn ber me û pê re jî carîyeke ku ûd di destê wê de bû derbasî cem me bû û dest bi stranan kir. Me meya xwe vexwar û ez rabûm ku pêdivîyeke xwe pêk bînim. Di wê navberê de xwediyê malê pirsî min ji herdu xortan kir, wan gotin ku ew min nas nakin. Xwediyê malê got: “Nexwe ev kurtêlxurek e lê belê mirovekî zimanşîrîn û xwînsivik e, hûn jî pê re baş bin.” Ez dîsa vegeriya hundir û li cihê xwe rûniştim. Cariye bi newayeke xweş stira û got:

Ji xezalê re bibêje ew ne xezal e

Ji çûkî re bibêje ew ne çûk e

Me gişan ew strana wê eciband û me meyeke din vexwar. Wê jî gelek stranên din li ser gelek meqamên din gotin, herî dawiyê jî straneke min xwend û got:

Malên xweşdîmen keçên biçûktemen

Min bêriyê kiriye ew bêagah e ji min

Ev strana jorîn ji yên berê xweştir xwend. Piştî me vexwarina meyê berdewam kir, wê jî stranên cur bi cur û li ser gelek meqaman berdewam kir. Herî dawiyê jî yek ji wan li ser meqamê min xwend û got:

Bêje ji wê keça ku lomeyan dike

Ew a ku birînen min tomar nake

Êdî tu gihîştîye armanca xwe

Lew ku tu listikvaneke xêşîm bî

Di vê stranê de rista min şaş xwend û min hewl da ku ez jê re sererast bikim. Li himber vê helwesta min, yekî ji wan herdu xortan bi ser min hilbû, erza min şikenand û got: “Di dinyayê de kurtêlxurekî mîna te rûşûştî tune ye! Qey kurtêlxurî ne besî te ye, ku tu daxwaz û pêşniyarên xwe ji pêşkêş dikî? Ew kesên ku gotine; nanê bêxwê dixwe û tirên şor dike, rast gotine.” Şermê rûyê min dagir kir û ez ketim ber fediyê. Hevalê wî hewl da ku pêşîya wî bigire lê wî nedixwest dev ji min berde. Di wê navberê de rabûn nimêjê. Min xwe ji wan dereng xist û ez çûm min rahişt ûdê, min ji nû ve saz kir bi awayekî baş û ez dîsa vegeriya cihê xwe, min bi wan re nimêj kir.

Piştî ku me nimêja xwe qedand, ew zîlamê rikebirê min dîsa ziman-dirêji kirin, dev avêt min lê min bersiva wî neda. Cariyeyê dîsa rahişt ûdê û li tîlên wê nêrî, nas kir ku pê hatiye listin, got: “Kê dest daye ûdê?” Wan jî

got: “Kesî ji me destê xwe nedaye ûdê.” Cariyeyê got: “Belê weleh yekî ku baş jê fêm dike ew ji nû ve saz kiriye, bi awayekî pir baş.” Min got: “Min ew jî nû ve saz kiriye.” Wê got: “Tu bi Xwedê kî ûdê hilde û lê bide.” Min rahiştê û bi awayekî pir cuda lêda, li ser gelek meqamên zor ku mirî ji gorê radikirin û ez pê re stra û got:

Dilekî min hebû bi xêra wî dijiyam
Agir pê ket û ez bi wî sojiyam
Evîndar bûm ez wê dil neda min
Kole jî her raziye bi rizqê xwe
Heger nedîtibe min çêja wê eşqê
Bêguman kişandiye min êşa wê

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 413'EMÎN

Şehrezadê got:

Îshaq Bîn Îbrahîm El Mûsilî vegotina serpêhatiya xwe berdewam kir û got: Gava min ew helbest bi wî meqamê xweş got, kesek rûniştî nema û ji cihê xwe çeng nebû nehat ber destê min û negot: “Tu bi qedrê Xwedê kî mîrzayê me, straneke din ji me re bibêje!” Min ji wan re got: “Ser seran û ser çavan.” Piştîre bi lêdanin xurtir li ser têlan min ev helbest bi stranî got, li ser meqamekî bijarte.

Ka ew dilê ku bi êşa evînê nekewiyaye
Ka ew mirovê ku bi derdan nerizyaye
Qet min nedîtiye rojekê şahî û xweşî
Bi miradê xwe qet şa nebûme tu carî
Heram be li wê kesa ku tîrek avêtiye
A ku ji seranserê laş xwîn herikandiye

Gava min stran got, hemû rabûn ser nigan û mîna cehdasîka ku li ber bayê bihêje, li ber dengê min lerizîn û ketin erdê. Min ûd ji destê xwe avêt. Hemûçikan bi hev re tikan kirin, gotin: “Tu bi qedrê Xwedê û pêxemberan bikî vê xerabiyê bi me neke û ûdê ji destê xwe daneyne.” Min ji wan re got: “Ez ê li ûdê bidim û straneke din û yeke din û yeke din ji we re bibêjim û ez ê xwe bi we bidim naskirin. Ez Îshaq Bîn Îbrahîm El Mûsilî me, ez ji cem xelîfe hatime vir û we jî gotinên herî xerab îro ji min re gotin. Îcar bi Xwedê hetanî ku hûn vî devçaroxê devgenî ji vir dernexin, bi Xwedê ez bêjeyekê tenê jî ji we re nabêjim.”

Çawa min ev gotin kir, hevalê ew ê devçepel jê re got: “Ji êvarê ve em te hişiyar dikin û ji te re dibêjin têkilî vî camêrî nebe lê tu nasekinî, de ka rabe derkeve ji vir!” Bi destê wî girtin û ew derxistin derve. Min jî dîsa rahişt ûdê

û stranên min ên ku cariyeyê gotibûn, ji nû ve xwendin û min ji xwediye malê re eşkere kir ku eşqa cariyeyê ketiye dilê min û ez nema debar dikim. Zilam got: “Ew a te ye lê bi şertekî.” Min got: “Çi ye?” Got: “Bi şertê ku tu mehekê li cem min bimînî.” Ez mehekê li cem wî mam, bêyî ku tu kes cihê min bizanibe. Xelîfe jî li min digeriya, bêyî ku bi cihê min bizanibe.

Piştî ku meha min qediya, zilam cariyê û hemû kelûpelên wê yên giranbuha dan min û xizmetkarek jî li gel wê da min. Mîna ku min dinya giş qezenc kiribe, bi kêfeke mezin ez vegeyriyam malê. Dûre ez li hespa xwe siwar bûm û di cî de çûm cem xelîfe El Me'mûn. Çawa ez dîtîm, got: “Kuro Îshaq tu li ku bûyî?” Min çîroka xwe ji serî hetanî binî jê re got. Wî jî got: “Zû here wî zilamî bîne vir.” Min mala wî nîşanî wî da, xelîfe qasidek bi dû de şand. Gava ku ew anîn qesrê, xelîfe Me'mûn pirsra mijarê ji wî jî kir. Zilam, çîroka çûna min a cem wî ji serî hetanî binî jê re vegot. Xelîfe jê re got: “Tu mirovekî ciwamêr û xwedî rûmet î û divê mirov alîkariya te bike di vê ciwamêrtiyê de.” Piştî ferman da xeznedarê xwe ji bo ku sed hezar dirhemî bide wî. Di pey re jî ji min pirsî û got: “Ey Îshaq, here wê cariyeyê bîne vir.” Ez çûm min ew anî. Cariyê ji wan re stra û şahiyêke baş ji wan re li dar xist. Xelîfe jî pir pê kêfxweş bû û got: “Divê her pêncşemê tu binî vir ji bo ku ji pişt perdeyê ez lê guhdar bikim.” Di pey re jî pêncî hezar dirhem jê re terxan kir. Yanî ew geriyan a min a bi çolê de, feydeyek mezin ji min re anî!

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 414'EMÎN

(ÇÎROKA EBÛ BEKIR EL-ENBARÎ Û ABDILMESÎHÊ KEŞÎŞ)

Şehrezadê got:

Tê gotin ku Ebû Bekir El Enbarî gotiye:

Ji Enbarê ber bi welatê Amûriye ve -ku beşek ji welatê Roman e- derketim geriyanekê. Di rê de, ez li gundekî Amûriye daketim û ez çûm dêra gund ku jê re digotin “Dêra Ronahiyê”. Xwediye dêrê û serkeşîşê wê ez pêşwazî kirim. Navê wî Ebdilmesîh bû û çil keşîş di bin destê wî de bûn. Ciwamêran wê şevê qedrê min girtin û malovaniyeke baş ji min re kirin. Bi rastî jî hişmendî û îbadeta rasteqîn a ku min li cem wan dît, min li tu deverê nedîtibû û vê yekê bandor li min kir. Roja dîtirkê min xatir ji wan xwest û rêwîtiya xwe berdewam kir. Piştî ez dişa vegeyriyam Enbarê. Sala dîtir, ji bo ku ez herim hecê, min berê xwe da Mekkeyê. Li hecê, gava me mala Xwedê tewaf dikir, min dît, ku Ebdilmesîh û pênc keşîşên xwe jî tewafê di-

kin! Dema baş min nas kir ew e, ez ber bi wî ve çûm û min jê re got: “Gelo tu ne Ebdilmesihê keşîş î?” Got: “Na wele ez Evdilayê Rehîb im.” Min riha wî ya spî ramûsa û ez gîriyam, ji ber hestiyariya zêde. Piştî min bi destê wî girt, em çûn kêleka heremê⁶ û min jê re got: “Ka sebeba misilmantiya xwe ji min re bibêje?” Got:

Sebeba misilmantiya min ecêbek e. Carekê birrek⁷ ji zahidên misilmanan di gundê me re derbas bûn. Li gund, ciwanekî xwe şandin nava sûkê ji bo ku xwarinekê ji wan re bikire. Wî xortê ciwan çû nan ji keçeke fileh kirrî ku keça herî xweşik û spehî di gund de ew bû. Sûretê wê, mîna yê melaîketan bû. Çawa ku lê nêrî, dil ket keçikê û ji şideta eşqa wê ji ser hişê xwe çû, bi erdê ve xiliya. Gava bi ser hişê xwe hat jî, vegeriya cem hevalê xwe, serpêhatiya xwe ji wan re got. Piştî jî lê zêde kir û got: “Hûn bi rêya xwe de herin, ê min ez ê li vir bim.” Pê re axivîn, şîret lê kirin û li ber geriyan ji bo ku wî îqna bikin lê wî guh neda wan. Ew bi rêya xwe de çûn, xort jî vegeriya gund û çû li ber deriyê dikana keçikê sekinî. Keçikê daxwaza wî jê pirsî, wî jî got ez aşîqî te me. Lê keçikê berê xwe jê guhert û guh nedayê. Dîsa jî xort ji wir neçû û sê rojan, bê nan û bê av li ber wî deriyê sekinî ma, mîna pûtekî. Keçikê gava dît ku ew ji wir naçe, çû xeber da malbata xwe. Wan jî ciwanên xwe bera ser dilê wî dan, bi kevîran pê ketin, serê wî şikandin, parxanên wî reş û şîn kirin. Lê dîsa jî ew ji wir neçû. Gundîyan biryar dan ku wî bikujin. Lê yekî ji wan hat ez agahdar kirim. Ez çûm, min dît ku li erdê dirêjkirî ye. Min xwîna ser çavên wî paqij kir û ew anî dêrê, li cem xwe derman kir. Çardeh rojan li gel min ma.

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 415'EMÎN

Şehrezadê got:

Evdilayê Rehîb vegotina xwe berdewam kir:

Piştî çardeh rojan, birînen wî baş bûn û êdî dikaribû bimeşiya. Ew jî rabû çû ber deriyê dikana wê keçikê û dîsa li wir sekinî. Keçik pê ve derket û jê re got: “Bi Xwedê dilê min bi te şewitî; îcar heger tu werî ser dînê min, ez ê bi te re bizewicim.” Xort got: “Xwedê neke ku ez ji ola rastiyê veqetim.” Keçik got: “Nexwe li hundir, bi min şa bibe û bi selameti rêya xwe berdewam bike ji vir here.” Xort got: “Na, ez xiroş û îbadeta dozdeh salan nadim bi kêliyeke pevşabûnê.” Keçikê got: “Nexwe dev ji min berde û here!” Xort got: “Dilê min jî rê nade vê yekê.”

6 . Herem: Navekî Kabeya Şerîf e; mala Xwedê.

7 . Birr: Qefle, grûb

Keçikê dev jê berda çû, ciwan û sîpeyên gund jî bi keviran lê hatin hev. Di nava birînên xwe de li erdê ket û got: “Ez weliyê Xwedê me û ew dê xwedî derkeve li salihan.” Agahî ji min re hat, ez ji dêrê derketim û çûm min bera sîpeyan da û serê wî ji erdê rakir, danî ser çoga xwe. Wê kêliyê min bihîst ku dibêje: “Xwedêyo tu min û wê di bihuştê xwe de bigihîni hev!”

Min rahiştê û ew anî dêrê lê hîna em di rê de bûn ew çû ber diolovaniya Xwedê. Min ew ji gund derxist û li cihekî veşart, gorek jê re çêkir.

Gava ku şev ket erdê û nivê wê bihurî, qîrek bi wê keçikê ket, di nav nivîna wê de. Xelkê gund li ser serê wê kom bû û sebba wî tiştî jê pirsîn, keçikê got:

Di xewna xwe de min dît ku ew xortê misilman tê bi destê min digire û min dibe bihuştê. Lê li devê derî, nobedarê bihuştê nehişt ez derbas bibim hundir û ji min re got: “Vê derê qedexe ye ji bo kafiran!” Rabû ez jî li ser destê wî bûm misilman û pê re derbasî bihuştê bûm. Qesrên xweşik, dar û berên ku av bi ser wan de diherikî û gelek dîmenên ez nikarim wesfê wan ji we re bidim, li wir hebûn. Li wê derê, ez birim qesreke ji cewheran û ji min re got: “Ev qesra hanê a min û te ye. Bêyî te ez derbasî hundirê wê nabim. Bi xêr û selamet, piştî pênc şevan tu dê werî gel min.”

Piştî destê xwe dirêj kir dareke ku li devê deriyê wê qesrê bû û du sêv ji darê jêkirin, dan min û got: “Yekê bixwe û ya din li cem xwe bigire, da ku keşîş ji bibînin. Min sêvek ji wan xwar, sêv mîna wê xweş tunebûn. Piştî dîsa bi destê min girt û ez anîm hetanî ber deriyê min. Gava ez ji xew şiyar bûm jî, min dît ku tama wê sêvê hîna di bin zimanê min de ye, sêva dîtir jî di destê min de ye.”

Di pey wê gotina xwe de keçikê, ew sêva li gel xwe derxist, nîşanî gun-diyan da ku mîna stêrkeke ji agir şewq dida, di tarîka şevê de. Piştî keçik û ew sêva wê anîn dêrê. Li wê derê û di hizûra hemû keşeyan de serpêhatiya xwe ji me re vegot û sêv nîşanî me da. Sêv mîna wê tunebûn di dinyê de. Piştî min kêrek anî û min ew sêv kir tûfil tûfil bi qasî hejmara hogêrên xwe û min ew li ser wan belav kir. Me gişan bi hev re xwar, ku çêj mîna çêja wê tune bûn li ser rûyê erdê. Me jî, me go qey ev karê îblîs e, nîşanî wê dayê ji bo ku wê ji rê derxe, dinê wê biguherîne.

Xwediyên keçikê, ew birin malê. Roja dîtirkê, keçikê dev ji xwarin û vexwarinê berda û di şeva pêncan de jî ji nav nivîna xwe derket û çû ser tirba wî xortê misilman. Xwe bi ser gora wî de avêt û li wir mir, bêtî ku tu kes pê bihese.

Bi şeveqê re, du kalemêrên misilman hatin gundê me ku kincin ji rêş li wan bûn û du jinên di heman şeweyî de bi wan re bûn. Ji gundiyeş me re gotin: “Gundîno, weliyeke Xwedê li cem we heye, çûye ber diolovaniya

Xwedê. Çiqasî ku fileh bûye jî, di dema mirina xwe de çûye ser dînê misilmantiyê, loma em ji we dixwazin ku em wê veşêrin li gora rê û ristên dînê xwe.” Gundî çûn li wê keçikê geriyan, dîtî ku li ser tirba wî xortê misilman çûye ber diolovaniya Xwedê. Gundîyan gotin: “Ev keça me ye û li ser dînê xwe wefat kiriye, em ê wê veşêrin.” Herdu kalemêran gotin: “Na wele wê li ser dînê me wefat kiriye û em ê wê veşêrin.” Li ser vê yekê gengeşiyê mezin di navbera wan de derket û li hevdu nekirin. Di dawiyê de, kalemêrekî got: “Nîşana misilmanbûna wê ew e ku, bila her çil keşeyên dêrê li ser kom bibin û hewl bidin wê ji ser wê tirbê rakin. Heger bikaribin wê ji erdê rakin, dê ev were wê wateyê ku keçik file çûye ber diolovaniya xwe û heger hemû bi hev re nikaribin wê ji erdê rakin, dê ev were wê wateyê ku keçik, misilman çûye ber diolovaniya Xwedê.”

Gundî hemû bi wê pêşniyazê razî bûn. Her çil keşe li hev kom bûn, hêz dan hev û hatin ji bo ku laşê keçikê ji ser wê gorê rakin. Lê kirin û nekirin, nikaribûn wê rakin.

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 416'EMÎN

Şehrezadê got:

Evdila vegotina xwe berdewam kir û got:

Her çil keşeyî kir nekir nikaribûn meytê wê rakirina. Werîs bi newqa wê ve girêdan û hewl dan ku wê bi dû xwe de bikişkişînin lê dîsa jî nikaribûn wê tevbidin. Gundî hemû lê hatin hev, dîsa jî encam negirtin. Wê gavê me ji kalemêrekî re got: “Nexwe kanî tu xwe biceribîne bê tu dikarî meytê wê rakî.” Kalepîr pê ve çû, ew di nav eba xwe ya rîs de pêça, got: “Bi navê Xwedayê dilovan î dilovîn û pêxemberê wî Muhammed, silavên Xwedê li ser bin!” û destê xwe avêtê ew hilda ber singê xwe û li gel misilmanên din ew birin şikeftê, li wir danîn. Piştî herdu jinan çûn ew şuştin, kefen kirin û careke din ew hildan ser milên herdu kalemêran û birin li cem tirba wî xortî danîn. Li ser nimêj kirin û li kêleka wî veşartin. Di pey re jî bi şûnde çûn û ev hemû li ber çavên me qewimîn. Gava em xwe bi xwe man, me ji hev re got: “Rastî li ku be, divê mirov wê bişopîne.” Her tişt li pêş çavên me gişan qewimî û rastbûna dînê misilmantiyê ne hewceyî peyitandineke din e. Piştî ez bûm misilman, her çil keşe jî li pey min hatin û gundiye mayîn jî li pey wan û bi wî hawayî em giş bûn misilman. Di pey re me heyetek şand giravê ji bo ku mamosteyekî dînî ji me re bişînin, da ku me fêrî rê û ristên dînê misilmantiyê bike. Wan jî feqeyekî salih ji me re şandin, em hînî her tiştî kirin û niha jî şikir ji Xwedê re va ye em bi xêr û selamet in.

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 417'EMÎN

(ÇÎROKA MÎRZAYA MEŞAYIXAN)

Şehrezadê got:

Tê gotin ku mirovekî hekîm û zana gotiye:

Di nava jinan de, min tu kes mîna Mîrzaya Meşayixan zana, zîrek, behre, xwedî sinc, xweşbêjer û şîretkar nedîtiye! Ev jina Bexdadî, di sala pêncsed û şêst û yekê sala hicrî de çû Hemayê û li wir bi cih bû, karê şîretkariyê kir. Her car hildikişiya ser kursiyekê û şîret li mirovên ku li dora wê kom bûne dikir, hewl dida ku ji birînên wan re bibe derman. Carinan jî zana, feqî, hekîm û wêjevan diçûn li mala wê dibûn mêvan û derbarê gelek mijaran de nêrîn û fikrên wê jê dipirsîn an jî ew di neqeba xwe de dikirin hekem, gava ku diketin pêxîla hev û nîqaş li ser hinek mijaran dikirin.

Rojekê ez û wêjevanekî jî em çûn serdana wê. Em derbasî mala wê bûn, rûniştin; ew jî di pişt perdeyê de li himberî me rûnişt û ferman da malîyan, ji me re xwarin û vexwarin anîn, danîn ber me. Me xwar, vexwar. Fêkî danîn ber me, me ew jî xwar. Birayekî wê yî delal û rûspehî jî di ser serê me re sekinibû, xizmeta me dikir. Vêca gava em derbasî mijarên nîqaşê bûn, min mijareke fiqhê jê pirsî, ku xîlaf li ser hebû di navbeyna her çar mezheban de. Wê dest bi ravekirina mijarê kir, min jî lê guhdar dikir lê hevalê min ji xwe re li rûyê birayê wê û bejn û bala wî dinêrî, bêyî ku guh bide ser gotina wê. Vê yekê bala wê jî kişandibû, lewre di wê kêliyê de wê jî li wî dinêrî di pişt perdeyê re. Gava ku axaftina xwe qedand jî, li wî vegehiya û jê pirsî: “Ez texmîn dikim ku li şûna jinan, tu têkildarî mêran dibî?” Wî jî got: “Rast e.” Mîrzaya Meşayixan şaşwaz pirsî: “Ew çima?” Hevalê min got: “Ji ber ku zilam di ser jinan re ne û Xwedê ew wisa xuliqandine!”

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 418'EMÎN

Şehrezadê got:

Hekîmê zana berdewam kir:

Gava hevalê min wisa got, Mîrzaya Meşayixan lê vegerand û got: “Gelo di vê mijarê de tu qebûl dikî ku em herdu di nav xwe de nîqaşeke dualî bikin?” Got: “Belê, ez qebûl dikim.” Wê got: “Nexwe ka bibêje bê çi îspat li ba

te hene ku mêr di ser jinan re ne?”

Hevalê min lê vegerand û got:

Îspatên menqûl⁸ hene û yên maqûl⁹ hene. Îspatên menqûl ji Qur’ana pîroz û hedîsên şerîf pêk tê. Di Qur’ana pîroz de Xwedayê gewre dibêje: “Mêr li ser jinan serdest in, lewre Xwedayê mezin hinek di ser hinekan re xuliqandine.” Di cihekî din de jî dibêje: “Heger şahidên we ne du mêr bin, bila mêrek û du jin bin.” Di yekî din de jî dibêje: “Gava ku zarokên we xort û keç bin, bila behra xort di mîras de duqatî ya keçikê be.” Yanî mirov baş dibîne ku Xwedayê me di mîrateyê de jî mêr di ser jinê re girtiye. Heta di cihekî din de Yezdanê gewre dibêje: “Jin bi qasî niv mêrî ye, ji ber ku ew ji wê çêtir e.” Di hedîsên pêxember de jî heman tişt heye. Tê gotin ku pêxemberê umetê gotiye: “Bila diravên ku di ber xwîna jina kuştî de tînin dayîn, nivê yên ku di ber mêrekî de bînin dayîn bin.” Îcar ji aliyê îspatên aqil û mantiq ve jî, gava em li mijarê dinêrin, em dibînin ku nêr kirde ye û jin bireser e. Ev jî tê wê wateyê ku mêr ji jinê çêtir e û di ser wê re ye.

Mîrzaya Meşayixan lê vegerand û got: “Te baş anî ziman mîrzayê min. Lê bawer bike bi van gotinên xwe, te nêrîna min piştrast kir, ne ya xwe. Lewre Xwedayê gewre mêr di ser jinê re girtiye ji ber sifeta wî ya nêrîtiyê, ne ji ber tiştêkî din. Di vê xalê de ez jî bi te re hemfikir im û ez cuda lê nanêrim. Jixwe di vê meziyeta nêrîtiyê de hemû kur, sîpe, ciwanmêr û kalemêr yek in, tu ferq di neqeba wan de tune ye. Û heger ‘çêtirbûn’ a mêran li ba te di vê wateya zayendî de be, wê gavê gerek dilê te bibije kalemêran jî, çima dilê te tenê dibije nûciwan û sîpeyan? Lewre tu jî baş dizanî ku nûciwan û kalemêr yek in di nêrîtiya xwe de, cudabûn û dijberiya nêrîna min û te, li ser wan sîfat û pîvanên ku tu wan li mîrîtiyê bar dikî ye; li ser pîvanên pevşabûna bi wan re ye û li ser sedemên ku tu wan tercîh dikî ye. Di vê mijarê de te tiştêk nepeyitand û te îspat pêşkêş nekirin.”

Hevalê min lê vegerand û got: “Xanima min, qey tu nizanî bê bejn û bala nûciwanan, rûçikên wan ên gululî, bişîrîn û xweşaxaftina wan çiqasî kişîner û xweş e? Bêguman, çawa ku li jor jî min da xwiyakirin, di vî warî de jî mêr di ser jinan re ne. Îspata vê jî di gotinên pêxember de ne, ku dibêje: “Li nûciwanên har nenêrin; çîrûskên awirên çavxezalan ji çavên wan veder tînin!” Loma ciwan di ser jinan re ne û ev yek ji kesî nayê veşartin. Binêre bê Ebû Newas çiqasî xweş aniye ziman:

Başîrîn mezyetên wî her ev bûn
Pevşabûneke ewle û bêavîsbûn

8. Îspatên menqûl: Ên ku çavkaniya wan vedigere gotinên Xwedê (Qur’ana pîroz) û yên pêxember (Hedîsên şerîf).

9. Îspatên maqûl: Ên ku çavkaniya wan vedigere aqil, mantiq, qiyas, îstiqra û îstintacê. Îstiqra û îstintac jî, xwegihaştina rastiyên nû di ser hinek rastiyên din re.

Di cihekî din de jî dibêje:

Ebû Newas ê ku li pey bêsinciyê dibeze
Di derbarê kêf û şahiyê de dibêje
Bidin dû pevşabûna ku li bihuştê nîn e
Perran bi mirov re çêdike ma kî ne dîn e

Helbestkarekî din jî dibêje:

Kamaxên nûciwanan li ser wê ne
Diçe tê wan bihêdî dihejîne
Mîna zilan li ber bê ditewîne

Baş diyar e bê çawa helbestkar û bêjer keçan jî bi nûciwanan dişibînin, lewre raveker jî herdem li pey ravekar diçe û wî esas digire di hemû mez-yetan de. Yanî pîvanên xweşikbûn û spehîbûna jinan bi xwe jî nûciwan in. Heger nûciwan ne çêtir bûna, keçik û jin bi wan nedişebihandin. Nûciwan li gora daxwaza mirov tîn, hevseng in di daxwazê de, hêsan in di rêveçûnê de, cîrxweş in di danûstendinê de. Bi taybetî jî gava distewin û simbêlên wan zer dibin, rûçkên wan sor û girover dibin mîna heyva li çardehan. Helbestkarê mezin Ebû Temam, di vê mijarê de dibêje:

Gelacan digotin rûçikên wî sor bûne
Min got ew jê re ne eyb e ma hûn kî ne
Gulan sond xwarine ku ji hev veneqetin
Bi tu derê ve neçin qet neterqin
Bêjerên wî mijank in bersiv ji wan tîn
Pirsên bêbersiv jî her ji birhûyan tîn
Bêguman mîna her car tu pîr xweşik î
Porê xwe jî li gora daxwazkar dirêşî
Xweşıktir e her ku kamax girovertir dibe
Lewma her kes bi evîna wî diaxive

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 419'EMÎN

Şehrezadê got:

Hekîmê zana vegotina serpêhatiya xwe berdewam kir. Gava hevalê min wisa axivî, Mîrzaya Meşayixan got: “Xwedê tenduristiyê bide te û rêya rast nîşanî te bide. Te nîqaş xwest di vê mijarê de û tu têra xwe axivî û li gora xwe te sebeb nîşanî min dan. Niha jî va rastî derket holê, şaş û çewt jî diyar bû. Îcar xwe vêde wêde nede û rastiye bipejirîne; heger ew îsbat ne bes bin û tu îqna nekiribin, ez dikarim delîlin din jî nîşanî te bidim. Tu bi Xwedê kî keçik li ku ne, kurik li ku ne? Çawa tu wan bi hev re mûqayese dikî? Keç, bi bejn û bal in, xweşdeng û xweşpeyv in, rûçikên wan mîna sorgulan in,

lêvên wan mîna binevşan in, porê wan mîna şevê ne, rûyên wan mîna heyvê ne, pêsîrên wan mîna hinaran e, diranên wan mîna mircanan e, çavhorî ne, birhûşûr in, enîgirover in, bejinzirav in. Gava dipeyivîn gotinên wan mîna lûlû bi ser mirov de dibarin bi hemû xweşwateyên xwe ve. Gava dikenin şewq li lêvan diçe û dilê mirov dihelînin.”

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 420'EMÎN

Şehrezadê got:

Mîrzaya Meşayixan ravekirina mijarê berdewam kir û got:

Çawa ku min li jor da xwiyakirin, spehîbûna mêbûna keçikan bi nûciwanan muqayese nabe. Qey tu nabinî evê singa mîna acê ku du kaniyên hungivîn tê de ne û ew newqa zirav î şayîtok î mercanî û ew herdu hêtên ji mermer; her du kulîmekên ku mîna pêlên deryayê dihejin û mîna du girên şewqê li hev dikevin bi dilnazi, herdu nigên hûrik û spî mîna yên zarokan, herdu destên efsûnî yên tilîzirav û miştuner û ew sîlweta ku sûreteki ferîşteya davêje ser wê bedena tîesq, çawa ji ber çavê mêrekî direve û wê nabîne? Kê gotibe dinya ji jinan îbaret e, rast gotiye. Ew hedîsa ku te ji pêxember ragihand jî, îsbateke li himber nêrîna te ye, ne li gel te ye. Lewre gotiye li nûciwanan nenêrin awirên horiyan di çavên wan de hene, lewre xortên ciwan ango awirên wan bi yên keçikan şibandine. Yanî yên ravekar dîsa keç in û pîvana xweşikbûnê ew in, xweşikbûna bingeîn jî ya wan e. Mijara ku te keç bi xortan şibandiye jî şaş e, ne mîna ku te gotiye. A rast di xweşikbûnê de xortên ciwan dişibin keçikan û teswîrên wêjeyî jî wisa dibin. Heta ji bo ku kesên lewatî û jirêderketî jî keç çêtir in ji nûciwanan, ango keç ji herdu daxwaza jî çêtir in ji nûciwanan. Mezinê helbestkaran Ebû Newas bixwe dibêje:

Newqzirav e ew mîna nûciwanekî xav e

Ji zîna û tewatiyê herduyan re jî guncav e

Di wê mijara ku te got ciwanên nûsimbêldayî di xweşikbûnê de lûtke ne de jî, tu şaş î û tu ji rê jî derketiyî. Lewre ciwanbûna xortan û simbêldayîna wan spehîbûnê dîkuje, zêdetir nake:

Helbesteke nû di rûçikan de dide der

Mûyên rîhêne bihêrs we dane der

Tolê hiltîne ji dildarê xwe xweber

Keldûmanek bi ger e li ser rûyê wî

Volkaneke tûj dipeqe ji ber hêrsa wî

Gava reş dibe di rûyê wî de rûpelên spî

Kî dizane li çi digere êdî pênûsa wî

Mêrê ku vî ciwanî di ser jinan re bigire
Bêguman ew ji nezantiyê wisa werdigire
Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 421'EMÎN

Şehrezadê got:

Mîrzaya Meşayixan, piştî ku ew helbesta xwe xwend, axaftina xwe berdewam kir û got:

Ez şaşwaz dibim bê çawa tu çêj û tama pevşabûna bi jinan re nebînî? Halbûkî şahî û bextewariyeke bêyî wan ne gengaz e. Lewre Xwedayê gewre soza horiyan daye pêxember û nebî û weliyên xwe di roja qiyametê de. Ev jî, weke xelatekê li himberî karên wan ên qenc ên ku li vê dinyê kirine. Heger Xwedê Teala bizanibûya ku hinekî din ji jinan bêtir xweşî û şahiyê bidin mêran heye, dê ew bikira xelat û diyarî wan bikira di roja qiyametê de.

Lê em dizanin ku xelatên Xweda ji bo hemû bawermendan horiyên çavxezal in. Zarok, sîpe û ciwan, tenê xizmetê dikin ji nebî û pêxemberan re. Ji ber ku bihuşt, war û cihê şahiyê ye û ev jî bêyî xizmeta zarokan ne gengaz e. Lê bikaranîn sîpe û nûciwanan ji bo emrazên şexsî, karekî nelirê ye û encama xeyalên gunehkar e. Di vî warî de ez ji bo xwe û te û hemû misilmanan lêborînê dixwazim ji Xwedayê xwe.

Piştî vê axaftina wê, ew jî, hevalê min jî bêdeng bûn û nîqaşa wan jî encam girt. Me sûdeke mezin ji axaftina wê girt û bi kêfxweşî ji cem wê rabûn, me xatir jê xwest û em çûn.

Û tê gotin ku Ebûleswed gotiye:

Carekê ez û çend destbirakên xwe em derbasî nav bîstanekî bûn, da ku em ji xwe re hinek fêkî bikin. Li kêleka bîstan, em li pîrejinekê rast hatin, ku nûr ji rûyê wê dibariya. Porê xwe yê spî bi şehekî ji diranê filan şeh fikir. Em li cem wê rawestiyân lê ew necefilî, ne aramiya xwe xera kir û ne jî serê xwe girt. Min jê re got: “Pîrê, heger tu porê xwe boyax bikî, tu ji keçeke ciwan ji xweşiktir î, çima tu wisa nakî?”

Serê xwe berjor ve rakir, li min meyzand û got: Mîrê min, min bihîstiyê ku Ebûleswed gotiye:

Min boyaxek kişand ser vê boyaxa demê

Lê xwe negirt û tenê boyaxa demê ma li holê

Min jî lê vegerand û got: “Tu çiqasî pîrejineke rastgoyî di heram û helal de û xweparastina ji gunehan de.”

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 422'EMÎN

(ÇÎROKA MIROVÊ MEXRIBÎ Û TEYRÊ REX)

Şehrezadê got:

Tê gotin ku mirovekî Mexribî hebû bi navê Evdirehmanê Mexribî ku bi “Çînî” dihate nasîn, ji ber ku pir rewîtiya Çînê kiribû, çûbû wir û hatibû. Lewre Evdirehman mirovekî gerok bû û ne tenê li Çînê, li çar hêlên dinyayê geriyabû. Jixwe di encama vê gera xwe ya dûdirêj de, qedera wî ew avêtibû giravekê ku demeke dirêj li wir jiyabû û herî dawiyê li gel periyekî çêlika rexê¹⁰ vegeriyabû welatê xwe. Li gora ku tê gotin, ew çêlika rexê ya ku behsa wê tê kirin, hîna ji hêka xwe derneketibûye. Vêca qesebeya wê perîkê bi tena serê xwe neh cewdikên avê diçûnê. Lewre baskê ku ew perîk jê hatibû jêkirin bi serê xwe hezar gaz bû. Loma gava ku xelk çav li wê perîka hanê ketin şaş û metal man. Gava ku çîroka wê perîkê ji Evdirehman pirsîn, wî ji wan re got:

Rojekê ez û teyfa xwe, me bi keştiyekê rêwîti dikir di Deryaya Çînê de. Bi rê de em li giravekê rast hatin û em lê sekinîn. Me dît ku giraveke mezin û bi heybet e. Ji ber ku em bi armanca em avê hilînin û hinek êzing kom bikin, derketibûn ser giravê, me tefşo û werîs û cewdikên¹¹ xwe yên avê jî bi xwe re daxistibûn. Lê di gera li ser giravê de em li qubeyeke spî, mezin û biroqankî rast hatin ku nîvfirehiya navtenga wê sed gaz bû. Me berê xwe da wê qubeyê û em çûn cem, me dît ku hêka rexê ye. Me bi kevir û dar û tefşoyan lêda hetanî ku bi zorê me ew derizand û me dît ku çêlikek rexê tê de ye, mîna çiyayekî! Li gel ku hîna pûrtikên wî baş pê ve nehatibûn jî, em hemû bi hev re lê hatin hev û me alîkariya hev kir hetanî ku bi zorê me periyekî wî jêkir. Piştî bi qasî ku bi destê me ve hat, me hinek ji goştê wî jî jêkir û me ew û perîk herdu li keştiyê bar kirin û em jî siwar bûn û em ketin ser rêya vegeê. Ba ji paş ve li me dida, loma keştiya me baş bi rê ve diçû. Loma hetanî ku şevqê lêda û rojê da der jî em meşîyan. Di wê navberê de ji nişka ve me dît ku rex mîna ewrekî bi ser me de tê û keviyekî weke çiyakî jî di nava lapûşkên wî de ne. Gava ku giha rasera keştiyê, ji jor ve ew kevirê ku ji keştiyê mezintir bû, bi ser me de berda. Lê belê ji ber ku keşti bi lez diçû û ba jî ji paş ve ew didehfand û leza wê xurtir dikir, me xwe ji ber xelas kir û kevir bi nav avê de ket û pêlin mezin bi ava behrê xist lê Xwedê em siti-

10 . Rex: Teyrekî mitolojik e.

11 . Cewdik: Mîna meşkan ji çerm tîn çêkirin, tenê ji bo avê tîn bikaranîn.

randin. Piştre me ew goştê ferxika rexê pijand û xwar. Di nava me de hinek extiyarên rîspî hebûn lê gava roja din sibehê em ji xew rabûn, me bala xwe da rîhên wan extiyaran gişan ku reş bûye mîna yên ciwanan. Hemû bi xêra wî goştê ku xwaribûn wisa ciwan bûbûn. Piştre jî riha kesî ji wan spî nebû, çawa ku extiyarî nikaribe nêzikî wan bibe.

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 423'EMÎN

(ÇÎROKA HIND BINT ENNÛMAN Û ÛDEY BÎN YEZÎD)

Şehrezadê got:

Ennûman Bin Munzir mîrekî Ereban bû. Keçeke wî ya yazde salî hebû ku navê wê Hind bû. Roja Fushê ji malê derket û berê xwe da Bazara spî. Îcar Hind xweşikîrîn keça wê serdemê bû. Di wê roja hanê de Ûdey Bîn Yezîd jî ji Kesrayê sultanên Farisan dihat Hîrayê da ku diyariyekê bide Ennûman. Di rê de, derbasî Bazara spî bû. Ûdey, xortekî bejinzirav, rûgeş, zimanşîrîn, çavbelek bû, cariyekê wî ya bi navê Marya hebû ku wê jî Ûdey hez dikir. Loma, çawa di bazarê de li hev rast hatin û wê ew dît, ji Hindê re got: “Hela ji xwe re li vî xortî binêre, bi navê Xwedê xort mîna wî nîn in li ser rûyê vê dinyayê.” Hindê got: “Ew kî ye?” Got: “Ûdey Bîn Yezîd e.” Hindê got: “Ez ditirsim, ku min nas bike gava ez nêzikî wî bibim!” Maryayê got: “Wê çawa te nas bike û wîna qet tu nedîtiye?”

Hind ber bi wî ve çû. Ûdey bi xortên derdora xwe re laqirdî dikirin; bi zimanekî fesîh û kişîner bi wan re diaxivî. Hem bi wê axaftina xwe û hem jî bi spehîbûna xwe, bandoreke mezin li ser Hindê kir, dilê wê jê dizî. Hindê pir ji wî hez kir û xwest ku ew wê ji bavê wê bixwaze. Gava Maryayê ev meyla wê ferq kir, jê re got: “Pê re biaxive!” Hindê pê re axivî û li Maryayê vegeriya, jê re got: “Tu wî ji min re nexwazî, ez ê te perîşan bikim!” Pê re jî ji ser hişê xwe çû, ji ber êşa dil. Cariye û wesîfatên wê, rahiştinê û birin qesrê, derbasî cem bavê wê Ennûman kirin. Maryayê jî di cî de mijar ji bavê wê re got, ew ji her tiştî agahdar kir û jê xwest, ku wê bi Ûdey re bizewicîne.

Ennûman serê xwe nişûv kir û bi qasî katjêmêrekê li ser rewşê hizirî û mijar di serê xwe de bir û anî lê çare jê re nedît û bi hêrs axivî, got: “Bêyî ku ew keça min ji min bixwaze, ez ê çawa jê bixwazim ku bi keça min re bizewice?” Maryayê got: “Ew jî razî ye bi zewaca keça te, heta ji wê bêtir dixwaze. Tu qet pê re mijûl nebe û bila gotin neyên ser te mîrê min, ez ê hîleyê lê bikim û bêyî ku ez wî pê bihesînim ku tu pê hesiyayî, ez ê mijarê çareser bikim.”

Piştire Marya çû cem Êdey û jê re got: “Bi qasî ku tu ji Hindê hez dikî, ew jî ji te hez dike û dixwaze bi te re bizewice. Vêca Mîr Nûman dawetî mala xwe bike, xwarin û vexwarinê bide ber; gava ku meyê bandor li ser kir û serê wî gêj bû, tu keça wî jê bixwaze.” Êdey got: “Ez ditirsim ku ew daxwaza min wî hêrs bike û dijminahiyekê di navbera me de çêbike.” Maryayê got: “Ez pê re nepeyivîbama ez nedihatim bi te re nedixavîm.”

Di pey wê axaftina bi Êdey re, Marya vegeriya cem Ennûman û jê re got: “Ji Êdey bixwaze, bila te vexwîne cem xwe, firavînekê bike. Ennûman got: “Bila be û piştî sê rojan ji Êdey re got qey tu firavînekî nadî min?” Êdey got: “Çawa nadim mîrê min, ev yek tenê serberzî û şanazî ye ji bo min.”

Êdey çû malê, amadekariyên xwe kirin, Ennûman jî çû ser firavîna wî û gava şerab vexwar, serê wî gêj bû, Êdey keça wî jê xwest. Wî jî daxwaza wî qebûl kir û keça xwe pê re zewicand. Piştî sê rojan, daweta wan hat li-darxistin û ketin himbêza hev. Sê salan bi hev û din re jîyan, di nava xêr û xweşî û şahiyê de.

Piştire Ennûman ji Êdey qehirî û ew kuşt. Hind jî pir êşiya li ser mîrê xwe yê kuştî û şîneke bêdawî li ser wî kişand. Piştire çû li serê bajarê Hîrayê dêrek ji xwe re ava kir û bû rehbik, ket dêrê, her dem li ser wî giriya, hetanî ku çû ber dîlovaniya xwe. Ew dêra ku bi navê wê têtê nasîn jî, hîna li Hîrayê ye.

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 424'EMÎN

(ÇÎROKA EBÎ ÎSA BÎN REŞÎD Î NÛRA ÇAVAN)

Şehrezadê got:

Amr Bîn Mesede got ku Ebî Îsa Bîn Reşîd, birayê El Me'mûn dixwest bi cariyeya Alî Bîn Hîşam, Nûra Çavan re bizewice. Lê wî, ev sir û raza xwe ji her kesî vedişart û bi kesî re parve nedikir, ji serbilindî û şanazbariya xwe. Bi gelek rê û rêbazan hewl da ku bi fen û fitan wê ji xwediyê wê bikire lê bi ser neket. Gava kêr giha hestî û sebr pê re nema û bala xwe dayê ku nema dikare pêşiya daxwaz û arezûyên xwe bigire û çareyê jî nabîne, derbasî cem El Me'mûn bû û li civata wî rûnişt hetanî ku şevbuhêrk ferikî û civat belav bû. Piştire ji El Me'mûn re got: “Ey emîrê bawermendan, heger îro tu serkirde û fermandarên xwe ji nişkê ve kom bikî ji peywirê, da ku bê hazirî werin û bi berçavî tu wêrekî û serbilindiya wan di azmûnekê re derbas bikî, tu yê qelp û çêyên wan ji hev derxînî.” Halbûkî meqседа Ebû Îsa ew bû, ku rê jê

re vebe, ku bi Nûra Çavan re rûnê, di mala xwediyê wê de.

El Me'mûn got: "Fikra herî rast ew e!" Di cî de fermanek da ku keştiya bi navê Etteyar jê re amade bikin. Xizmetkaran di cî de keştî amade kirin. El Me'mûn li gel qefleyek parêzvan û xasên civata xwe li keştiyê siwar bû û di serî de berê xwe dan qesra Hemîd Ettewîl Ettûsî û ji nişkê ve ketin hundir, bi ser de girtin; dîtin ku li ser tejikekê rûniştiye û dengbêj li ber destên wî diçin û tîn, bi dengên xwe yê xweş li gel neyzen û ûdzen û lêdankerên amûrên din.

El Me'mûn, saetekê li gel wî rûnişt. Jê re xwarinek ji goştê mîhan û hinek ji yên teyran anîn, danîn ber wî. Lê El Me'mûn berê xwe jî neda xwarinê. Wê kêlikê Ebû Îsa got: "Ey emîrê bawermendan, em hatin malekê ku hayê xwediyê wî ji te tune bû û nizanibû ku tu yê werî cem wî. Ka rabe em herin cihekî ku ji bo te amade kirine û bêtir layîqî te ye."

Xelîfe û civata xwe rabûn ser xwe, li gel birayê xwe Ebû Îsa û berê xwe dan mala Alî Bîn Hîşam. Dema ku Alî haydar bû bi hatina wan, rabû ser xwe, bi awayekî baş ew pêşwazî kirin, bejna xwe li ber Xelîfe tewand û erda ber nigên wî maçî kir û ew derbasî qesra xwe kirin; ew li hêwanekê dan rûniştandin, ku tu kesî tişteki weke wê nedîtibû. Dîwar û stûn û erda hêwanê giş bi mermerên cur be cur hatibûn rapêçan, ku hemû bi nexşên romî hatibûn neqîşandin û jêzemîn jî bi hesîrên sundusî hatibû raxistin. Di kêlekên dîwaran de jî û li seranserê hêwanê doşekên besrawî hatibûn rêzkirin, ji bo rûniştinê.

El Me'mûn rûnişt û bi qasî saetekê li dîwaran, li zikê xanî nêrî, temaşe kir, piştê got: "Kanî xwarinekê bidin me!" Di cî de bêhtirî sed rengî ji xwarinê anîn pêşiya wî. Reng bi reng mirîşk û teyrên biraştî, qelî û qawirme û savar û xwarinên dîtirkê. Piştî ku têr xwar, El Me'mûn got: "Tişteki vexwarinê bide me!" Meyeke bi berfê cemidî anî ber wî, ku ji tirî û fêkiyên xweş hatibû çêkirin. Ew mey di qedehên zêr û zîv û camîn de pêşkêşî wî kirin, li gel ava gulan a bi meskê hatibû zengînkirin. El Me'mûn behetî ma li himberî wê dîmenê û got: "Ey Ebûl Hesen!"

Ebûl Hesen di cî de xwe avêt ber nigên El Me'mûn û erda bin nigên wî maçî kir, got: "Bêje emîrê bawermendan, li ber hemû fermanên we, ez amade me!" Piştê li xizmetkarên xwe zivirî û axaftina xwe berdewam kir: "Ka wan cariyeyên muzîkjen bînin hundir!" Xizmetkaran got: "Bila be, ser seran ser çavan."

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 425'EMÎN

Şehrezadê got:

Xizmetkar çûn, qasekê nebedî bûn, piştî bi şûnde vegeriyan û deh zîlamên din jî li gel wan bûn, ku her yek jî wan kursiyekî jî zêr di destê wan de bû. Kursiyên xwe danîn û bi şûn de çûn. Çawa ku ew çûn, deh cariyeyên mîna deh heyvan ku hevrişimekî reş li ser wan bû û tacin zêrîn li ser serên wan bûn derbasî hundir bûn û hatin li ser wan kursiyan rûniştin. Piştî stranên reng û reng bi amûrên reng bi reng û li ser meqamên reng bi reng gotin.

El Me'mûn çavên xwe li ser wan cariyeyan gerand û yek jî wan eciband, bi helwest û spehîbûna wê. Jê re got: "Navê te çi ye?" Wê got: "Navê min Secah e, emîrê bawermendan." Xelîfe got: "Secahê ka tu ji me re bistirê!" Secahê got:

Min xwe vedizî û bi tirs û xof meşiyam
Du şêr ji wê ve dihatin ez jî dikuliyam
Ser nişûv kirin ew bo min wekî şûrekî bû
Tirs û sawa min ji raçavkirina dijmin bû

El Me'mûn got: "Te qenc û xweş kir cariyeya delal, her bijî ji te re. Ev helbest a kê bû gelo?" Wê got: "A Amr Bîn Mûdî Kerb El Zubeydî ye, awaz jî ya Mabed e." El Me'mûn û Ebû Îsa û Alî Bîn Hîşam vexwarina meya xwe berdewam kirin. Her deh carîye rabûn çûn û dehên din hatin şûna wan, li ser kursiyên zêr rûniştin, di nava kincên Yemanî yên bi zêr hûnayî de û dest bi stranên cur bi cur kirin, li ser awaz û meqamin pir balkêş gotin. El Me'mûn li cariyekê jî wan nêrî ku mîna xezaleke çiyayî bû û jê re got: "Navê te çi ye?" Wê got: "Navê min Xezal e, emîrê bawermendan." Wî got: "Ka ji me re bistirê Xezal!" Xezalê kir wî tewît û got:

Horiyên azad in ew lê belê bi tirs diçine
Mîna xezalên Mekkeyê nêçîra wan heram e

Gava ku strana xwe qedand, El Me'mûn jê re got: "Ev helbesta ku te xwend a kê bû Xezalê?" Got: "A Cerîr bû û awaz a Îbnî Serîh bû." El Me'mûn û civata xwe, vexwarina mey û şerabê berdewam kirin, her deh carîye jî rabûn ser xwe, ji wir çûn û dehên din li şûna wan hatin, ku di nav hevrişimên sor û mor de bûn, ên ku bi zêr û dur û cewheran neqîşkirî. Hemû jî servekirî û porberdayî bûn. Li ser kursiyan rûniştin û li ser gelek meqaman stran û awaz gotin. El Me'mûn li yekê jî wan nêrî ku mîna rokê şewq dida û jê re got: "Navê te çi ye?" Wê jî got: "Navê min Fatin e, emîrê bawermendan." Xelîfe got: "Ka ji me re çend stranan bibêje Fatin."

Fatin li ser gelek meqaman stra û gava qedand, El Me'mûn jê re got: "Tu bi qedrê Xwedê kî Fatin, ev helbesta ku te xwend a kê bû?" Got: "A Êdey Bîn Zeyd e û meqamê wê kevn û folklorî ye."

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 426'EMÎN

Şehrezadê got:

Piştî ku Fatinê got helbest a Ûdey Bîn Zeyd e, xelîfe El Me'mûn û Ebû Îsa û Alî Bîn Hîşam, vexwarina meyê berdewam kirin. Cariye jî rabûn çûn, li şûna wan dehên din hatin ku kirasên hevrişim ê bi zêrê sor neqîşandî li ser wan bûn û di newqên wan de kemerên ji cewheran. Li ser kursiyan rûniştin û stranên rengareng gotin li ser gelek meqaman. El Me'mûn li cariyeyeke spehî nêrî ku mîna şitla rihanê bû û jê re got: "Navê te çi ye?" Got: "Navê min Reşa ye, emîrê bawermendan." Xelîfe got: "Ka ji me re çend awazan bibêje Reşa!"

Reşa bi çend awazan stra û çend riste gotin. El Me'mûn got: "Siheta te xweş be Reşa, te pir xweş got." Ew jî ji cihê xwe rabû, çû erda ber nigê xelîfe maçî kir û çend helbestên din jî bi stranî gotin, ew mest kir. Gava cariyeyê dît ku kêfa El Me'mûn pir tê ji wan risteyan re, wê jî ew dubare kirin. Piştî El Me'mûn ji xizmetkaran re got: "Keştiyê amade bikin!" Tam di wê kêlika ku El Me'mûn dixwest rabe ser xwe, Alî Bîn Hîşam rabû ser xwe û got: "Cariyeyek li gel min heye, min ew bi deh hezar dînarî kiriye û ez dixwazim wê raberî emîrê bawermendan bikim. Heger ew eciband, ez dixwazim ew cariyê ji wî re be. Heger nebe jî, hema bila stran û awazeke wê guhdar bike." Xelîfe got: "Ka wê bîne hizûr!"

Cariye, weke şitleke rihanê derbasî hundir bû, weke xezaleke bejî bi rê ve diçû. Taceke ji zêrê sor li serê wê bû, ku bi dur û cewheran xemilandî bû. Gava li ser kursiyê rûnişt û El Me'mûn çav li wê spehîbûna wê ket, ecêbmayî ma. Ebû Îsa jî zêde hestiyar bû, qolinc ketin nava wî, dilê wî lêda, rengê wî hat guhertin û hal lê nema. El Me'mûn jê re got: "Çi bi te hatiye Ebû Îsa, çima halê te wisa hatiye guhertin?" Ebû Îsa got: "Emîrê bawermendan, ew rewşa min ji ber nexweşiyekê ye, ku car caran xwe li min dide der." El Me'mûn got: "Tu ji berê ve vê cariyeyê nas dikî?" Got: "Belê, emîrê bawermendan ma heyv têtê veşartin?" El Me'mûn li cariyeyê vegeriya û got: "Navê te çi ye?" Cariyeyê got: "Navê min Nûra Çavan e, emîrê bawermendan." Xelîfe got: "Ka hela ji me re bistirê Nûra Çavan!" Cariyeyê dest pê kir stra û got:

Hezkiriyên te barkirin ji te dûr ketin

Şevîn girtin û bi heciyan re raketin

Konên xwe vegirtin li kêleka şêran

Xwe veşartin di bin gulên hevrişiman

Xelîfe jê re got: "Ev helbest a kê ye, Nûra Çavan?" Got: "A Dûbel El Xizai ye û newaya wê jî ya Zerzûrê Biçûk e, emîrê bawermendan." Ebû Îsa lê

nêrî û xwe di wê nêrinê de wenda kir, xwêziya xwe nema dikaribû daqurtî-
ne. Ew qasî ji ser xwe çûbû ku, bala hemû civatê kişandibû ser xwe. Cariye
li El Me'mûn zivirî û jê re got: "Emîrê bawermendan, destûrê bide min, ez ê
helbesteke din bibêjim!" Xelîfe got: "Tu çawa dixwazî, çi dixwazî, wê bibê-
je!" Nûra Çavan li ser meqamekî nû dest pê kir û got:

Gava tu dostê xwe razî bikî bi eşkere
Ew jî te razî bike bi heman şeweyê baş e
Guh mede gotegotên gelac û fesadên bêar
Bo veqetandina evîndaran ew in derewkar
Gotin gava nêzikî hev dibin herdu evîndar
Aciz dibin ji hev lê li dûrîn dibin heweskar
Xwe derman kir me gişan lê'm baş nebûn
Bi nêzîkbûna malan jî'm qet baş nebûn
Qet tune be di nava me de evîn û dostanî
Malên mirov nêzikî hev be jî qet nîn e bêrî

Gava helbesta xwe qedand, El Me'mûn rabû ser xwe, çû li keştiya xwe
siwar bû. Ebû Îsa xwe jê dereng xist û di pey re Nûra Çavan bi xwe re bir û
çû mala xwe bi dilekî aram.

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 427'EMÎN

(ÇÎROKA ELİYÊ MISRÎ KURÊ HESEN EL-CEWHERÎ)

Şehrezadê got:

Tê gotin ku di demên berê de, li Misrê tacirek hebû pir maldar bû û
gelek mal û milk û dirav û gewher û eqîq û lûlûyên wî hebûn ku nedihatîn
jimartin. Navê wî jî Hesen El-Cewherî El-Bexdadî bû. Xwedê Teala kurekî
xweşik dayê, wî jî navê wî kir Eliyê Misrî. Hesen kurê xwe baş mezin kir li
ser sinc û çandeke baş, ew fêrî Qur'an û zanîn û wêje û xweşaxaftinê kir,
heta rojek hat ku bû zanayê hemû mijaran û li ber destê bavê xwe xebitî, di
ticaretê de.

Carekê Hesenê tacir nexweş ket; nexweşiya wî lê giran bû û tê derxist
ku mirina wî nêzik bûye. Gazî kurê xwe Eliyê Misrî kir û jê re got: "Kurê
min dinya fanî ye û axîret baqî ye. Her kes jî mîsoger dê bimire û niha ez jî
hîs dikim ku mirina min nêzik bûye. Loma ez dixwazim şîretekê li te bikim
weke wesiyeta xwe ya dawîn. Heger tu bi wesiyeta min bikî, tu yê bi selametî
jiyana xwe derbas bikî di nava xêr û xweşiyê de, hetanî ku derkevî rûbarî
Xwedayê xwe. Heger tu bi wesiyeta min nekî jî, dê serê te têkeve gelek bela-

yan û tu yê poşman bibî ku te bi ya min nekiriye.”

Kurê wî lê vegerand û got: “Bavocan, ez ê çawa bi ya te nekim, nedim dû wesiyeta te û Xwedê ev yek li ser min ferz kiriye?” Bavê wî got: “Kurê min binêre, min ji te re gelek dikan û mal û milk hiştiye ku ji ber pîrbûna xwe nayê jimartin. Heger tu rojê çarsed dînarî xerc bikî jî, tiştek ji wî malê te kêr nabe. Lê belê beriya her tiştî divê tu ji rêya Xwedê û pêxemberê wî dernekevi û tu bidî pey şopa wî. Dûrî gunehan bikevî û xêran bikî; qencyê bi xwediyên qencyê bikî, xêran jî di rêya rast de, di rêya zanîn û sinckariyê de bikî. Bila dilê te bi ser feqîr û hejaran de be û alîkariya wan bike. Hetanî ji te bê dûrî çikûsî û ezezîtiyê bikeve; dûrî xeraban bikeve û hevaltiyê bi wan re neke. Dilbirehm be bi jina xwe re û di xizmeta wê de be, lewre ew jî keça maqûla ye û ducanî ye, belkî Xwedê kurekî baş ji wê bide te.”

Bavê wî wesiyeta xwe berdewam kir bi dûdirêjî, pê re giriya, hêsir barandin û piştîre dîsa got: “Ez ji Xwedayê erd û ezmanan, ji Xwedayê gewre dixwazim ku te ji xerabiya te rizgar bike û rêya xelasiyê nîşanî te bide!” Kurik giriya û got: “Bavocan ez heliyam li ber van gotinên te, mirov dibêje qey tu yê ji vê dinyayê bar bikî, biçî û tu xatirê xwe dixwazî?” Bavê wî got: “Rast e kurê min, ez xatirê xwe dixwazim, lewre ez baş bi xwe dizanim ku mirina min pir nêzik bûye. Îcar tu wesiyeta min ji bîr neki!” Di pey vê gotina xwe re, zîlam eşheda xwe anî û çend ayetên Qur’anê xwendin, hetanî ku ew wextê malûm hat. Wê kêliyê gazî kurê xwe kir, got: “Kurê min, hebekî xwe nêzikî min bike!” Kurê wî çû gel wî, wî jî kurê xwe maç kir û xirîna dawîn pê ket, helma dawîn stend û çû ber dilovaniya Xwedê.

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 428’EMÎN

Şehrezadê got:

Piştî ku tacir çû ber dilovaniya Xwedê, kurê wî Eliyê Misrî pir xemgîn bû. Giri û nalîn bi mala wî ket û dost û mirov û nasên wî lê kom bûn û hemûçikan milên xwe dan hev, cenazeyê wî bi awayekî girseyî rakirin, birin mizgeftê, li ser wî nimêj kirin û piştî ew birin nav mezelan, di gora wî de veşartin, binax kirin; ayet û Yasîn li ser xwendin û piştî careke din vegeriyan mala wî, sersaxî ji kurê wî Elî re xwestin û ji hev belav bûn, her yek ji wan çû mala xwe. Kurê wî her roj, xêr û xêrat jê re derxistin, xitmên Qur’anê li ser xwendin û serdanên nas û mirovan qebûl kirin, hetanî ku çilrojiya wî qediya. Di wî çil rojî de qet ji malê derneket. Tenê gava wextê nimêjê dihat, diçû nimêja xwe dikir û dîsa dihat malê. Rojên îniyan jî tenê diçû ser gora bavê xwe û vedigeriya malê.

Eliyê Misrî demeke dirêj di nava nimêj û rojî û xiroşê de derbas kir, bi wî halî; hetanî ku rojekê hemtayên wî yên kurên taciran lê kom bûn û jê re gotin: “Hetanî kengî tu yê di nava vê xemgînî û şîniyê de bî, bê kar û şîxul û emel? Hetanî kengî tu yê dûrî ticareta xwe û dostên xwe bî di vî halî de? Ev şîn û xemgînî wê zerareke mezin bidin beden û giyana te?” Bi wî hawayî pê re lebikîn, li ber geriyan û jê xwestin ku bi wan re were sûkê. Di wê navberê de Îblîs jî li dora wî çû û hat, ber dilê wî xweş kir û di encamê de îqna bû û pejirand ku bi wan re here sûkê. Rabû ser xwe. Hevalên wî jê re gotin: “Li hespa xwe siwar bibe, me bibe nava filan bîstanî, li wê derê dê bêhna te derkeve û tu yê ji vê dîlxemgîniyê rizgar bibî.”

Eliyê Misrî li hespa xwe siwar bû, bendeyê xwe jî da kêleka xwe û çû nav wî bîstanê ku hevalên wî destnîşan kiribûn. Li wê derê xwarin, vexwarin û hetanî êvarê guftûgo kirin, bêhna xwe derxistin, piştê her kes vege-riya mala xwe û nivîyan. Roja din bi şeveqê re dîsa hemû hatin gel wî û jê re gotin: “Rabe em herin!” Wî got: “Herin ku derê?” Gotin: “Em herin filan bîstanî, da ku em ji xwe re lê bigerin û seyranê bikin. Ev bîstan ji yê doh xweştir e!” Elî rabû ser xwe û bi wan re çû. Gava gihan nav bîstan, yek ji wan çû, bo ku xwarinê amade bike. Xwarin çêkir û mey jî pê re anî û hat. Destpêkê xwarina xwe xwarin, piştê mey pêşkêşî wî kirin û jê re gotin: “Vêna vexwe, ya ku kedera ser dilê te bibe û şahiya te li te vegerîne ev e!” Wî jî bi ya wan kir û vexwar. Xwarin û vexwarina wan berdewam kir di nava guftûgoyên rengîn de, hetanî êvarê. Bi êvarê re her kes çû mala xwe, Elî jî çû mala xwe lê Elî vê carê sermest bûbû bi meyê û sergêjokî derbasî cem jina xwe bûbû. Jina wî çawa ku ew di wî halî de dît, jê re got: “Çima tu wisa hatiya guhertin?” Elî got: “Em îro çûbûn seyranê, me hebekî bêhna xwe derxist, hinek ji hevalan mey anîn, vexwarin; min jî bi wan re vexwar û ev sergêjî bi min re çêbû.”

Jina wî jê re got: “Mîrzayê min, qey te wesiyeta bavê xwe ji bîr kir, ku digot hevaltiyê bi kesên jirêderketî re neke?” Eliyê Misrî got: “Ev mirov kurê tacira ne, ne kesin jirêderketî ne. Brevajî vê yekê, kesin bextvekirî û xwedî jiyaneke baş in.”

Eliyê Misrî, ew şêweyê jiyana xwe ya nû, li gel hevalên xwe berdewam kir. Rojê diçûn cihekî cuda, dixwarin, vedixwarin, sermest dibûn û wisa vedigeriya malên xwe. Rojekê hevalên wî jê re gotin: “Ê me dora me qediya, îcar dor hatiye ser te, tu me bibe seyranan!” Elî got: “Bila be, ser seran û ser çavan.”

Gava bû sibe, Elî amadekariyên mezin kirin û ji wan bêtir xwarin û vexwarin amade kir, aşpêj, xizmetkar û qehwevan jî bi xwe re birin û berê xwe dan bexçeyekî bi dar û ber û çûn mehekê li wir man. Mehekê sax li wê derê xwarin, vexwarin û muzîk guhdar kirin, kêf û şahiyê mezin li dar

xistin.

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 429'EMÎN

Şehrezadê got:

Piştî mehekê Elî dît ku gelek dirav xerc kirine. Lê Îblîs di cî de di hewara wî de çû û jê re got: “Dev ji mehekê carekê berde, heger tu rojê carekê ev qas dirav xerc bikî jî, malê te kêma nabe!” Wî nema guh da xerckirin û daçûna diravan û jiyana xwe bi vî awayî berdewam kir, bêtî ku li gotin û şîretên jina xwe guhdar bike, ango li dû wesiya bavê xwe here û vegere ser rêya rastiyê. Piştî sê salan jî wê jiyana mezîxkar diravên wî qediya û dînamek tenê jî di destê wî de nema. Îcar rabû dest bi xerckirina cewheran kir û her car çend heb cewher firotin û bi heqê wan ew jiyana xwe berdewam kir. Gava zêr û cewherên wî qediyên, dest bi firotina mal û milk û zewîyan kir, hetanî ku tiştek ji wan jî nema. Piştî dest bi firotina bax û bexçe û avahiyan kir, hetanî ku yek ji wan nema û di destê wî de tenê ew mala ku tê de rûdinişt ma. Piştî mermer û textên wê mala xwe jî yekê yekê rakirin, firotin, hetanî ku yek ji wan jî nema. Herî dawiyê ew mal bi xwe jî firot û diravên ku ji heqê wê girtibûn, xerc kirin. Li derdora xwe nêrî, bala xwe dayê ku ji jina wî pê ve tiştek di destê wî de nemaye. Xizmetkarên xwe jî giş firotibûn, tenê ew û jina xwe û herdu zarokên xwe yên ku nû çêbûbûn mabûn. Cihekî, maleke ku tê de bisitirin jî di destê wan de nemabû. Mecbûr man ku herin di axura hewşê beradayî de bi cih bibin û tê de rûnên. Piştî ew qas hebûn û maldarî, ketibûn wê rewşa kambax. Jina wî jê re got: “Ji bo ku em nekevin vî rewşê, min wesiya bavê te dianî bîra te û tu hişyar dikirî! Lahewla wela, îcar em ê çawa bikin û van hûrikên xwe çawa mezin bikin? Ka rabe here cem wan hevalên xwe yên tacir, belkî tiştekî bidin te, da ku em karibin debara xwe bikin!” Elî rabû ser xwe û çû li ser wan hevalên xwe geriya, yekê yekê alîkarî ji wan xwest. Lê gişan piştî xwe dan wî, gotinên tehl û tûj jê re kirin û yekê ji wan metelîkek tenê jî nedanê. Ew jî vegeriya cem jina xwe û jê re got: “Kesî tiştek neda min!”

Jina wî rabû ser xwe, berê xwe da cem cîranên xwe yên kevn, da ku tiştekî ji wan bixwaze û xwarinekê peyde bike, bo ku ji nêza nemirin û debara xwe ya wê rojê bikin. Çû li deriyê cîraneke xwe ya kevn da, cîrana wê çawa derî jê re vekir û çav li wî halê wê yê perîşan ket, şaşwaz û metel bû! Pê ve beziya, ew himbêz kir û jê re got: “Çi bi serê we hatiye, xwişkêcan?” Çîroka xwe û mîrê xwe ji serî hetanî binî jê re vegot. Cîrana wê got: “Tu bi xêr hatî, ser seran û ser çavan hatî xwişkêcan!” Ez ê hemû pêdiviyên te bidim te, bê mîqabil. Bila serê te û zarokên te sax be.” Wê jî lê vegeand û got: “Xwedê

xêra te binivisîne ya Rebî!”

Cîrana wê, bi qasî pêdiviya mehekê kel û pel danê. Wê jî rahişt wan û vegeriya mala xwe ya di axurê de. Mêrê wê bi hestiyarî ew pêşwazî kir û got: “Te ev ji ku anîn?” Got: “Min ew ji filan kesê stendin. Dema min rewş û tengasiya xwe jê re rave kir, got çî pêdiviyên te hebin bixwaze, ez ê wan ji te re temîn bikim.” Mêrê wê got: “Madem ku te ev kiriye, ez ê jî rabim herim cihekî, belkî Xwedê ji me re li hev bîne û rêyek li ber me vebe.” Piştî xatirê xwe jê xwest, rûyê zarokên xwe maçî kir û di derî re derket, bêyî ku bizanibe berê wî li ku ye!

Li Şhrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 430'EMÎN

Şhrezadê got:

Çawa ku me di şeva borî de jî got, Eliyê Misrî ji malê derket û ketûber meşiya, bêyî ku bizanibe bê bi ku ve diçe. Meşa xwe berdewam kir, heta ku gihîşt Bûlaqê. Li wê deverê rêwiyek dît ku diçe Dimyatê. Rêwî ew nas kir, lewre nasekî bavê wî bû. Ji Elî pirsî, got: “Tu bi ku ve diçî?” Elî got: “Ez diçim Dimyatê, dostekî min li wê derê ye, ez ê herim wî bibînim.” Rêwî bi destê wî girt, ew bi xwe re bir, xwarin dayê, qedrê wî girt, çend dînar jî dan wî û ew li keştiyê kir, bi hev re çûn Dimyatê. Gava gihan Dimyatê, Elî ji keştiyê peya bû û nizanibû wê bi ku ve here!

Hîna ku ew wisa weke gêjan bêserî dimeşiya, tacirekî ew dît û dilê wî pê şewitî, ew bi xwe re bir mala xwe. Çend rojekî li wir ma, piştî Elî ji xwe re got: “Ma hetanî kengî ez ê di mala xelkê de bim?” Jî mala wî tacirî derket û çû li keştiyekê rast hat ku diçû Şamê. Tacirê ku ew li mala xwe hewandibû, careke din lê xwedî derket, xwarin dayê û ew li wê keştiyê siwar kir, ew şand Şamê.

Gava ew ji xwe re ketûber li nav kolanên Şamê digeriya, xwedîxerekî ew dît, dilê wî pê şewitî, bi destê wî girt, ew bir mala xwe. Elî, hetanî demekê li cem wî zilamî ma, piştî ji mala wî derket, li karwanekî rast hat ku diçû Bexdayê. Di dilê xwe de got: “A baş ew e, ku ez bi vî karwanî re herim Bexdayê!” Vegeriya cem wî xêrxwazê ku li cem wî dima, xatir jê xwest û bi karwan re ket ser rêya Bexdayê. Di nava karwan de, tacirek hebû dilê wî pê şewitî, ew girt rex xwe û av û xwarina xwe pê re parve kir, hetanî ku neqeba wan û Bexdayê meşa rojekê ma. Li wir qefleyek rêbir derketin pêşiya wan, ew şêlihandin, tu tişt bi wan re nehiştin. Rêwiyên ku di nava wî karwanî de bûn, hemû belawela bûn, her yekî ji wan berê xwe da cihekî ku xwe lê bisitirîne. Eliyê Misrî jî berê xwe da Bexdayê û meşiya. Roj çû ava, wî jî xwe

gihand bajêr lê derî dihatin girtin. Bi lez û bez xwe gihand cem dergevanan û ji wan re got: “Ji bo xatirê Xwedê, bihêlin ez derbasî cem we bibim!” Dergevanan ew derbas kirin û jê re gotin: “Tu ji ku têyî û tu yê biçî ku?” Elî got: “Ez tacirêkî ji Misrê me, deve û qantirên barkirî bi min re hene li gel jimareke kole û xizmetkaran; ez li pêşiya wan hatim, ji bo ku ez cihekî ji xwe re bibînim ku ez barê ticareta xwe lê deynim. Lê hîna ku min xwe negihandibû vir, birrek ji rêbiran li raserî min derketin, hespa min, hemû malê li ser min birin, ez şêlandim û çûn. Ez bi xwe jî bi zor û heft beleyan ji nav lepên wan rizgar bûm.”

Dergevanan bi germahî pêşwaziya wî kirin, xêrhatin tê dan, qedrê wî girtin û jê re gotin: “Tu ser çavên me hatî! Li cem me be hetanî sibehê; piştire cihekî guncav ji bo mayînê, ji xwe re hilbijêre!”

Elî li berîka xwe geriya, destê xwe lê peland, dît ku dînarek tê de maye, ji wan dînarê ku li Bûlaqê, wî tacirî dabû wî. Ew dînar da dergevanekî û jê re got: “Vî bigire, here tişteki ji bo xwarinê ji me re bîne û yê mayî jî ji xwe re xerc bike.”

Dergevan rahişt wî dînarî û çû sûkê. Hinek nan û goştê pijyayî anî, hemûçikan bi hev re xwar. Elî li ba dergevanan raket wê şevê. Sibehê dergevanekî ew bi xwe re bir cem tacirêkî Bexdayê û çîroka serpêhatiya wî jê re vegot. Zilam jê bawer kir ku tacirêk be û karwanekî barê wî hebe. Ew bir dikana xwe, qedrê wî girt, piştire ew bir mala xwe jî. Jê re bedlek kincên giranbuha amade kir û di pey re jî ew bir hemamê.

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 431'EMÎN

Şehrezadê got:

Îcar şahînşahê min ê gewre û temendirêj, tê vegotin ku Eliyê Misrî gotiye:

Wî tacirî ez birim hemamê, min xwe şûşt û paqij kir. Piştire dîsa ez birim mala xwe. Firavîneke xweş amade kirin, me firavîna xwe xwar û piştire bêhna xwe veda. Di pey re, wî gazî bendeyekî xwe kir û jê re got: “Mîrzayê xwe Elî bibe, bila li wan herdu malan binêre, kîjan ecbandin miftayên wê bide wî, bila tê de bi cih bibe û tu were!”

Min da dû bende û em çûn kolanekê ku sê malên li rex hev tê de bûn ku her sê jî nû û girtî bûn. Deriyê mala ewil ji min re vekir, ez derbasî hundir bûm, min lê temaşe kir, piştire em çûn mala din. Deriyê wê jî vekir, ez derbasî hundir bûm, min li wê jî temaşe kir. Bende got: “Ji van herduyan te

kîjan ecibandin?” Min jê re got: “Ev mala sêyem a mezin a kê ye?” Got: “Ya me ye.” Min got: “Kanî wêna veke, em li wê jî binêrin.” Bende got: “Pêdiviya te bi wê malê tune ye.” Min got: “Çima?” Got: “Ji ber ku ew mîna bîra bêbinî ye û kî dikevê mirî jê derdikeve incex. Heta kesê ku tê de dimire jî em nikarin cenazeyê wî di derî re derxin; em diçin ser banê malekê ji van herdu malên din û ji wir ve em wî berjor ve dikişînin, derdixin. Loma mîrzayê min ew girtî hişt û got êdî em wê malê nema didin tu kesî.” Min jê re got: “Ka deriyê vê malê jî veke, ez lê meyze bikim!” Di dilê xwe de jî min ji xwe re got: “Ev mala hanê tam li gora min e. Ez ê îşev rakevim û bi dilekî aram tê de bimirim, ji wê êş û de azara xwe xelas bibim!”

Bende, deriyê wê mala mezin ji min re vekir. Ez derbas bûm hundir û min lê meyze kir; min bala xwe dayê ku bi rastî jî maleke mezin û bi heybet e. Min ji bende re got: “Ez vê malê ji xwe re hildibijêrim.” Bende got: “Ez mifteya vê malê nadim te, hetanî ku ez destûrê ji mîrzayê xwe nexwazim.”

Bende çû cem mîrzayê xwe û jê re got: “Tacirê Misrî dixwaze ku li wê mala mezin bi cih bibe.” Mîrzayê wî hat ji min re got: “Begê min ev mala hanê ji bo te ne baş e.” Min lê vegerand û got: “Ne li vê malê be, ez li tu malên din bi cih nabim; ez vê malê dixwazim.” Ew jî mecbûr bû, çû şahidek ji dadgehê anî û di hizûra wî de senedek da morkirin, li cem xwe girt, piştî mifteya derî da min. Min jî rahişt mifteyê û ez ketim hundir. Tacir jî ji min re doşek, lihêf, balgî û merş şandin, bendeyek jî da min ji bo ku malê raxîne, paqij bike û here. Bende piştî ku karê xwe kir û mal bi temamî tekûz kir, bi şûn de çû û ez tenê di malê de mam.

Piştî ku ez tenê mam, ez rabûm ser xwe, min der û dor hemû raçav kir; min bala xwe dayê ku bîrek di hewşa malê de ye û dewlek tê de ye. Ez çûm ser bîrê, min dewla xwe bera binê wê da, av jê kişand û min pê destava xwe girt. Piştî ez rabûm min nimêja xwe kir û hebekî bêhna xwe veda. Di wê navberê de bende hat û şîvek ji min re anî, ji mala xwediyê xwe. Mûmdankeke, çirayek, teştêk, misînek û leganek jî bi xwe re anî, hemû danîn hundir û dişa bi şûn de çû.

‘Eşakî, ez dişa rabûm ser xwe, min çira pêxist, şîva xwe xwar, nimêja ‘eşa kir, dişa bêhna xwe veda û min di dilê xwe de ji xwe re got: “A baş ew e ku ez doşeka xwe bibim jor û li wir rakevim, dê ji qatê jêrîn çêtir be!” Pê re jî di cî de ez rabûm ser xwe, min doşek û nivîna xwe bir jor li wir raxist. Qata jor jî hêwaneke pir mezin û gelekî xweş bû. Zikê xanî bi ava zêr hatibû neqîşandin, zemîn û dîwar hemû ji mermerekî spehî û rengareng bû. Ez li ser doşeka xwe rûniştim û min hewl da ku ez ji xwe re cizûkî Qur’anê bixwînim. Lê di wê navberê de, ji nişka ve dengê hat min, ji min re got: “Ey Eliyê Ebû Hesên, gelo tu dixwazî ku ez zêran bi ser te de bibarînim?” Min jê re got: “Ka ew zêrê ku tu yê wî bibarîni?”

Hîna ku min ew gotina xwe kuta nekiribû, zêr bi ser min de bariya, mîna ku hinek bi mendenîqê bi ser min de bavêjin. Barîna zêran wisa berdewam kir, hetanî ku hêwan tijî bû. Bi sekna barîna zêran re, ew dengê zîlamê veşartî dîsa hat û got: “Min berde êdî da ku ez bi rêya xwe de herim, lewre min xizmeta xwe bi dawî kir û emanetê te jî gihand ber destê te.” Min lê vegerand û got: “Sed qesem bi navê Xwedê be, hetanî ku tu sebeba dana van zêran ji min re eşkere nekî, ez te bernadim!” Mirovê wenda got: “Ev zêr ji serdemên kevnar ve ji bo te hatibûn amadekirin. Îcar kî diket vê malê, me gazî wî dikir û jê re digot, Ey Eliyê Ebû Hesên, em zêran bi ser te de bibarînin; ew jî ditirsiyan, dikirin qîrîn, me jî xwe bi ser de berdida, stûyê wî dişikand û em diçûn. Lê gava tu hati û me bi navê te gazî te kir û me got gelo em zêran bi ser te de bibarînin, te got ka zêr? Me tê derxist, ku tu xwediyê van zêran î, me ew ji te re daxistin xwarê. Defîneyeke te ya din jî li Yemenê ye, heger tu herî wir û tu wê jî bînî vir, dê çêtir be ji te re. Vêca ez dixwazim ku tu min azad bikî, ji bo ku ez bi rêya xwe de herim.”

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 432'YEMÎN

Şehrezadê got:

Eliyê Misrî vegotina serpehatiya xwe berdewam kir:

Rabû min lê vegerand û got: “Bi navê Yezdanê dîlovan, hetanî ku tu neçî wê defîneya min a li Yemenê ji min re neynî, ez te azad nakim, te bernadim.” Wî got: “Ger ku ez herim defîneya te ji te re bînim, tu yê min berdî; tu yê wî nobedarê defîneyê jî berdî?” Min got: “Belê, ez ê te jî berdim, wî jî berdim.” Wî got: “Ka ji min re sond bixwe!” Min jê re sond xwar. Beriya ku ew here, tişteki din hat bîra min, min jê re got: “Lê ez tişteki din jî ji te dixwazim.” Got: “Çi ye?” Min got: “Jinek û du zarokên min li Misrê ne, li filan derê ne, divê tu wan jî bi saxî û selametî bînî vir.” Got: “Ez wan di nava texterewanekê de û li gel qefleyek xizmetkar û bende bînim vir, ez ê defîneya te ya li Yemenê jî bînim lê divê tu sê rojan moletê bidî min.” Min sê roj molet dan wî, ew jî bi rê ket û çû.

Piştî çûna wî, ez rabûm ser xwe, min hundir giş li hev xist, da ku cihekî ji bo veşartina wî girê zêran bibînim. Li kêlekeke hêwanê, mermerekî ku zemberek pê ve bû hebû, bala min kişand. Min destê xwe avêt wê zemberekê û ew firikand, min dît ku ew mermer bi kêlekekê de çerixî û deriyek tê de xuya kir. Min derî vekir û ez tê re derbas bûm, min bala xwe dayê ku depoyeke mezin e, tijî telîs in. Hema min ew telîs birin û yeko yeko bi wan zêran dagirtin, hetanî ku qedîyan. Piştî min ew telîsên tijî zêr, hemû di depoyê de bi cih kirin, derî li ser wan girt û zembereka mermer firikand

hetanî ku mermer dîsa ket cihê xwe.

Piştî min doşeka xwe dîsa daxist jêrê û ew li ber deriyê malê raxist û ez li ser raketim, hetanî sibehê. Piştî ku min nimêja xwe ya sibehê kir û ez li cihê xwe rûniştim, min dît yekî li derî da. Ez rabûm min derî vekir, min bala xwe dayê ku bendeyê xwediyê xanî ye. Hîna min devê xwe venekiribû, ew çawa çav li min ket ku ez şîpya me, di cî de bi şûnde çû û qêrîn pê ket, got: “Mîrzayê min mîrzayê min, ew zilamê ku di xaniyê mezin de bû hîna sax e û cinan pê venedaye!”

Xwediyê malê bi kêf û kelecana hat cem min; taştêya min jî bi xwe re anibû. Çawa çav li min ket, ez himbêz kirim û çavên min maçî kirin û got: “Gelo Xwedê çî bi te kir?” Min got: “Ji xêr û aramiyê pê ve tiştêk nîn e. Ez li hêwana jorîn ya mermer raketim û rewşa min pir baş e.” Wî got: “Gelo hinek bi ser te de hatin, ango çavên te li hinekan ket?” Min got: “Na wele, tenê min hinek Qur’an xwend û ez raketim hetanî sibehê. Piştî ez rabûm, min destnimêja xwe girt, nimêja xwe kir û ez dîsa daketim jêrê, li ser vê doşeka xwe rûniştim.” Zilam got: “Hemd û şîkir ji Xwedê re ku saxî û selametî bi ser te de şand!” Piştî jî cem min rabû çû, ji min re bende, kole, xizmetkar û çar carîye şandin, ji bo xizmetê û tekûzkirina malê. Hemû bi hev re xebitîn, mala min ji nû ve giş rêş kirin, şûştin, paqij kirin û ji nû ve raxistin. Piştî hemû bi şûnde çûn, sê bende, sê xizmetkar û çar carîye ji min re hiştin, ên mayîn hemû bi şûnde çûn cem xwediyê xwe.

Gava ku tacirên Bexdayê bi vê rewşa min hesiyan, ez di nava diyarî û xelatan de hiştim. Her tiştê baş û biqîmet ji min re şandin, heta bi xwarin û vexwarinê jî anîn. Dûre hatin ez bi xwe re birim sûka taciran, hemû li min hatin hev û ji min pirsîn, gotin: “Gelo karwanê barên ticareta te wê kengî bigihêje vir?” Min got: “Piştî sê rojan wê bigihêje vir.”

Piştî ku ew her sê roj derbas bûn, cinê ewil, dankerê zêran hat û ji Elî re got: “Ka îca rabe ser xwe, ew zêrên defîneya xwe ya Yemenê pêşwazî bike li gel jin û zarokên xwe!” Va ye hemû barkirî ne li ser piştî karwanekî ji deve û qantiran û ber bi bajêr ve tîn.

Tu nabêjî ew cinî çûbû Yemenê û ji wir jî çûbû Misrê, dîtibû ku jina Eliyê Misrî û zarokên wî di nava perîşaniyê mezin de ne, ji tazîbûn û birçîbûnê. Wî jî ew li ser texterewanekê siwar kiribûn û bi wan zêrên ku ji defîneya Yemenê derxistibûn, kincin spehî û giranbuha li wan kiribûn û li gel karwanê barên zêr û cewheran berê wan dabû Bexdayê.

Îcar gava ku yê cinî ev agahî da Eliyê Misrî, wî jî çû ji taciran re got: “Ka rabin em bi hev re herin derveyî bajêr, karwanê ticareta xwe pêşwazî bikin. Bila keç û jinên we jî werin da ku ew jî jinên me pêşwazî bikin!”

Hemûçikan gotin: “Ser seran û ser çavan.” Ew rabûn, çûn jinên xwe

anîn û giş bi hev re derketin derveyî bajêr, li nava bexçeyekî rûniştin û man li hêviya karwanê Eliyê Misrî, piştî ku ketin nava guftugoyên cur bi cur.

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 433'YEMÎN

Şehrezadê got:

Hîna ku hemû di nava guftûgoyeke germ de bûn, bala xwe danê ku ilorêk ji toz û dûmanê ber bi zikê asîmanan ve bilind dibe. Her ku ew dûman nêzîktir bû, tiştin dîtir di bin de xwiya kirin. Gava ku hinekî din ji ber bi wan ve hat, karwanê deve, qantir, hesp û siwaran di bin wê ilorê de xwiya kir. Dema gihîştin cem wan, serkêşê karwan Ûkame, xwe bi pêş de da û hat destê Eliyê Misrî, kurê Hesenê Cewherî maçî kir û jê re got: “Ezbenî em hinekî dereng ketin ji ber ku rêbiran rê birrîbûn, em mecbûr bûn xwe ragirin hetanî ku rê vebibe, piştî me meşa xwe berdewam kir.”

Tacir hemû pê ve rabûn û hemû bi hev re, piştî pêşwaziyeke germ, ketin ser rêya vegeerê û berê xwe dan bajêr. Di nava reqs û govend û hêlehê-leke bi nav û deng de derbasî bajêr bûn. Jin û zarokên Elî yên ku li dawîya karwan dihatin, bala hemû jinên taciran dikişandin, bi wan kinc û libasên xwe yên giranbuha. Di nav xwe de şîrove li ser wan dikirin û digotin: “Ev kincên wisa, li ser sultanê Bexdayê û dinyayê jî peyde nabin!”

Zilam bi Eliyê Misrî re, jin jî bi jina Elî re meşa xwe berdewam kirin, di nava dêlindêzeke gewre û balkêş de û ketin nava Bexdayê. Piştî çûn mala wî, deve û qantirên barkirî derbasî hewşê kirin, barên wan danîn û birin di sindoqên asê de bi cih kirin û xistin embaran. Zilam û jin hemû derbasî hundir bûn û bi heyrangorî li ihtîşama mala Elî temaşe kirin ku bi berrin giranbuha hatibû raxistin. Hemû di nava dilşahî û aramiyeke mezin de rûniştin, axivîn, danûstendin û guftûgo kirin, hetanî nivroyê. Nivrokî, firavîneke xweş û dewlemend pêşkêşî wan kirin ku gelek cureyên xwarin, şîranî û meyê di nav de hebûn. Wan jî xwarin, vexwarin û bêhna bixûr û ava gulan kişandin nava xwe, di nava çêjan de vegezizîn. Piştî xatir ji Elî xwestin û her kes çû mala xwe.

Piştî ku tacir vegeeriyên malên xwe, her yekî ji wan li gora hêza xwe, hediye û diyarî ji Elî re şandin, jinên wan jî diyarî ji jina wî re şandin û bi wî hawayî mal û milkekî nû bi ser wan de bariya, ji genim û şeker û carîye û bende û xizmetkaran, bi hejmareke mezin. Tacirê cîranê wî û yê ku ew mal dabû wî, jê re got: “Ka ji bendeyan re bibêje, bila van deve û qantiran bixin cihekî din, ji bo ku bêhna xwe berdin!” Elî got: “Hewce nake, ew îşev rêwî ne, dê ji bajêr derkevin.”

Di pey re jî ferman da xizmetkaran ku hemû sewalan bi rê xîn. Ûkame jî di cî de qantir û deve dan pêşiya xwe û ew derxistin derveyî bajêr. Ji wir jî bi hewa ketin, firiyan, çûn cihê xwe. Elî û xwediyê malê jî bi hev re rûniştin hetanî derengî şevê; piştî civata wan ferikî, zîlam çû mala xwe; Elî jî derbasî cem jina xwe bû, li hal û wextê wê pirsî. Piştî jê re got: “Piştî çûna min, çi bi serê we hat gelo?” Jina wî serpêhatiya xwe jê re vegot, êş û azara ku ji ber tîbûn û birçibûn û tazîbûnê kişandibûn anî zîman. Elî lê veğerand û got: “Şikir ji Xwedê re ku va ye hûn selamet in! Îcar hûn çawa hatin vir?” Jina wî got:

Şeva borî, ez û zarokên xwe raketîbûn. Min hew dît ku yekî ez û zarokên min ji erdê rakirine û em bi hewa xistine, em difirin bêyî ku zerarek bigihîje kesî ji me. Fira me wisa berdewam kir hetanî em li cihekî daxistin, ku dirûvê erdnîgariya Ereban pê diket. Min dît ku gelek deve, qantir û hesp li wê derê ne û texterewaneke mezin î ku du qantiran ew dikişand û dora wê tijî bende û xizmetkar bûn. Min ji wan re got: “Hûn kî ne, ev çi dewar in û em niha li ku ne?” Gotin: “Em xulam û bendeyên tacir Eliyê Misrî ne; kurê tacir Hesenê Cewherî. Wî em şandine vir, ji bo ku em we bibin Bexdayê, cem wî. Min ji wan pirsî û got: “Gelo çiqas dûrahî di neqeba me û Bexdayê de heye?” Gotin: “Pir nêzik e, tenê tarîka şevê di neqeba me û Bexdayê de ye.”

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 434'EMÎN

Şehrezadê got:

Jina Eliyê Misrî berdewam kir û got: “Em li texterewanê siwar bûn, me da rê û hew me dît, ku bûye sibe û em li gel we ne.” Elî got: “Kê ev kincên giranbûha dane we?” Jina wî got: “Serkêşê karwan sindoqek vekir û ev kinc jê derxistin, hinek li min, hinek li zarokan kirin. Piştî sindoq dîsa girt, xiliqand û mifteya wê da min, ji min re got: ‘Baş lê miqate be, hetanî ku tu wê bigihînî destê mêrê xwe.’ A ji te re ew mifteya sindoqê, va ye li gel min e!”

Jina wî mifteya sindoqê da destê wî, Elî got: “Tu wê sindoqê nas dikî gelo?” Wê got: “Belê, ez wê nas dikim.” Di cî de bi mêrê xwe re rabû, daket embarê û ew sindoq nîşanî wî da, got: “Sindoqa ku kincên me jê derxistin ev bû!” Elî mifte di xilqa sindoqê re derbas kir û ew vekir, lê nêrî, gelek kincên din û mifteyên hemû sindoqên din jî tê de dîtin. Rahişt wan mifteyan û sindoqên mayîn jî yeko yeko vekirin, li wan meyzand, dît ku hemû tijî cewher, dur û zêr û lûlû ne. Ew qas zêr û zîv û cewher li cem siltanan jî tune bûn! Sindoqên xwe dîsa girtin, ew xiliqandin û dîsa bi jina xwe re derket jorê, çû eywanê û ji jina xwe re got: “Ev hemû rehma Xwedê ye!” Di pey re

derketin eywana mermerî ya li jorê û deriyê wê embara di pişt mermerê de veşartî vekir û zêrên ku di wir de jî kom kiribûn nîşanî wê da. Jina wî jê re got: “Te ev giş ji ku anîne?” Elî got: “Hemû ji cem Xwedayê gewre ne. Li Misrê gava ez ji cem te derketim, çûm; min nizanibû ez ê bi ku ve herim. Ez xweberî meşiyam hetanî ku ez gihîştim Bûlaqê. Li wê derê, ez li keştiyekê rast hatim ku diçû Dimyatê. Zilamekî nasê bavê min li wê derê ez pêşwazî kirim, qedrê min girt û ji min re got: ‘Tu bi ku ve diçî?’ Min jî got, ez dixwazim herim Dîmeşqa Şamê, cem hinek dost û nasên xwe.” Piştî ta bi derziyê vekir û serpêhatiya xwe ji serî hetanî binî jê re vegot. Jina wî got: “Mîrzayê min, ev hemû bi xêra duayên bavê te bû, ku di beriya wefata xwe de digot: ‘Ez ji Xwedê dixwazim ku çi gava serê te bikeve belayekê, ew rêyeke xelasiyê bide ber û fereceke xêrê ji te re bibexşîne!’ Vêca şikir û sena ji wî Xwedayî re ku rêyeke xêrê ji te re vekir û bêhtirî tiştê ku te wenda kiribû, li te vegehand. Îcar divê tu careke din dost û hevaltiyê bi kesên bêhawê re nekî. Divê tu ji rêya rast veneqetî.”

Jina wî bi dirêjahî şîreteke berfireh lê kir. Elî got: “Tu rast dibêjî, ez ê bi wesiya te ve girêdayî bim û ez ji rastiya venaqetim. Ez hêvî dikim ji Xwedê ku hevalên xerab neke behra me û me jî bike şopdarê pêxemberê umetê.

Elî û jina xwe, bûn hêlineke germ ji bo zarokên xwe û di nava şahî û aramiyê de jiyanê bextewar berdewam kirin. Li sûka taciran dikanek ji xwe re kirrî, hinek zêr û zîv û cewher û madenên giranbuha xistênê, ew û zarokên xwe jî tê de rûniştin û xizmetkarên xwe jî li dora xwe kom kirin. Di demeke kurt de nav û deng da û bû tacirê herî navdar di Bexdayê de.

Mîrê Bexdayê pê hesiya û qasidek şans dû wî, da ku here qesra wî. Qasid hat cem Elî, jê re got: “Mîrê me te dixwaze!” Elî got: “Ser seran û ser çavan.” Piştî rabû ser xwe, ji mîr re diyariyeke ku ji çar qutikên zêrîn ên tijî maden û cewherên giranbuha yên ku li ser rûyê dinyayê peyde nedibûn amade kir, di nava sewanekê de pêça, rahiştê û berê xwe da cem mîr. Gava derbasî cem mîr bû, serê xwe jê re danî, erda ber nigê wî maçî kir û dua jê re kirin, bi tenduristiya û temenekî dirêj. Mîr jê re got: “Ey tacirê hêja, bi hatina xwe te em kêfxweş kirin.” Elî got: “Ey mîrê dem û dewranan, min diyariyek ji bo we bi xwe re aniye, ez hêvî dikim ku hûn wê ji destê min bigirin.”

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 435'EMÎN

Şehrezadê got:

Elî ew gotina xwe got û pê re jî qutîka ku diyariyên xwe xistibûnê, pêşkêşî wî kir. Mîr rahişt qutîka zêrîn, ew vekir û li cewher û madenên tê de

meyzand, dît ku tiştên tê de li ba wî tunene û bi qasî buhayê xizana wî gişî bi qîmet in! Li Elî zivirî û got: “Diyariya te hat qebûlkirin û bi izna Xwedê em ê ji te xelat bikin li ser vê nêzikahiya te ya binirx.” Elî jî destê mîr maçî kir û bi şûn de derket, vegeriya mala xwe.

Piştî ku Elî ji dîwana wî derket, mîr gazî hemû giregir û wezîr û gizîrên xwe kir, ew li dîwanê civandin û ji wan re got: “Çend mîran hatin keça min ji min xwestin?” Gotin: “Gelek mîran.” Mîr got: “Kesî ji wan diyariyeke mîna vêna ji min re anî?” Gişan gotin: “Na, ji ber ku tiştêkî weke vê, li cem tu kesî tune ye.” Mîr got: “Xwedê teala daxwazek xistiye dilê min, ku ez keça xwe bi vî tacirî re bizewicînim, gelo hûn çî dibêjin?” Wan jî got: “Hûn çawa munasib dibînin dê wisa be.” Mîr ferman da xizmetkaran, ku wan herçar qutîkên zêr ên ku diyarî tê de bûn, rakin seraya wî.

Piştî, mîr çû cem jina xwe û ew diyarî birin nîşanî wê jî dan. Gava jina wî çav li wan diyariyên giranbuha ket û dît ku yeke tenê mîna wan li cem wan tune ye, ji mêrê xwe re got: “Ev diyarî ji kîjan mîrî hatiye gelo? Mîsoger ji yekî ji wan mîrên ku hatibûn keça te xwestibûn hatiye.” Mîr got: “Na wele ev ji tacirêkî Misrî hatiye, ku niha li vir, li cem me ye. Gava min bihîst ku hatiye Bexdayê, min qasidek şand dû wî, ji bo were û ez jê bipirsim, bê ka tiştêkî ku ji bo cihêzê keça xwe jê bikirrim heye yan na. Ew jî hat û ev her çar sindoqên tijî cewher diyarî me kirin. Min lê guhdar kir û bala xwe dayê ku xortekî jîr, giran û bi qasî kurê mîrekî paqij û lihevhatî ye. Dilê min bi ser wî de çû û kêfa min jê re hat, min xwest ku ez keça xwe bi wî re bizewicînim. Jixwe min ev diyarî nîşanî giregirên dewletê jî da û min ji wan re got: ‘Çend mîran hatiye keça min xwestiye?’ Gotin: ‘Gelekan.’ Min got: ‘Kesî ji wan diyariyeke mîna vê bi xwe re anî ji me re?’ Gotin: ‘Na, ji ber ku tiştêkî wilo li cem kesî ji wan tune ye.’ Min jî ji wan re got: ‘Xwedê ya xwe xistiye dilê min û ez dixwazim keça xwe bi vî tacirî re bizewicînim, hûn çî dibêjin?’ Gotin: ‘Tu çawa munasib dibîni, bila wisa be.’ Vêca tu çî dibêji di vê mijarê de?” Jina wî got: “Gotin gotina Xwedê û ya te ye mîrê dem û dewranan, jixwe tiştê ku Xwedê dixwaze betal nabe.” Mîr got: “Xwedê bêje erê, em keça xwe bi tu kesî re nazewicînin ji xeynî vî tacirî.”

Mîr wê şevê raket û gava bû sibe, dişa çû dîwana xwe, li ser textê xwe rûnişt û ferman da qasidê xwe ku here Eliyê Misrî û hemû tacirên Bexdayê bîne, li qesrê kom bike. Hemû hatin dîwana mîr û serê xwe jê re tewandin, wî jî ferman da wan ji bo ku rûnên; hemû rûniştin. Piştî mîr got: “Herin qadiyê dîwanê jî binin!” Ew jî anîn ber destên wî. Mîr jê re got: “Mehra keça min li tacir Eliyê Misrî bibire!” Elî ket navberê û got: “Mîrê min, taca serê min! Ez lêborîna xwe ji te dixwazim lê ne rast e ku tacirêkî mîna min bibe zavayê mîrekî mîna te!” Mîr got: “Ez vê radeyê bo te dibexşînim û di heman demê de te dikim wezîrê xwe jî!” Mîr ew di cî de kir wezîr, Elî jî çû li ser kursiya wezaretê rûnişt û got: “Mîrê min, te ev hemû da min û te ez

pir serbilind û şanaz kirim lê destûrê bide min, ez gotinekê ji te re bibêjim!" Mîr got: "Bibêje û qet metirse." Elî got: "Madem ku fermana te ya pîroz derketiye, der barê zewaca keça te de, bila ev zewac bi kurê min re be, ne bi min re." Mîr got: "Qey kurên te hene?" Elî got: "Belê."

Mîr got: "Naxwe ka di cî de bişin dû wî, bila bê vir!" Elî got: "Ser seran û ser çavan." Elî, bendeyekî xwe şand pey kurê xwe, ew anî dîwana mîr.

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 436'EMÎN

Şehrezadê got:

Gava ku kurê Eliyê Misrî hat dîwana mîr, serê xwe jê re danî û bi rêzdarî erda bin nigê wî maçî kir. Mîr lê nêrî, dît ku ji keça wî jî spehîtir, rûgeştir, lihevhatîtir û kamiltir e. Jê re got: "Navê te çi ye kurê min?" Got: "Navê min Hesên e, siltanê min û temenê min jî çardeh sal e." Mîr ji qadî re got: "Kani mehra keça min Husnul Wicûd li ser Hesên kurê Eliyê Misrî bibirre!"

Qadî mehra wan birrî û her tişt mîna ku dihat xwestin bi pêş ve çû û pêk hat. Dîwan ji hev ferikî û her kes çû kar û emelê xwe. Taciran gişan jî da dû Eliyê Misrî yê ku bûbû wezîr êdî û çûn mala wî. Posta wî ya nû lê pîroz kirin û di pey re ew jî belav bûn, çûn malên xwe. Elî jî derbasî cem jina xwe bû bi cubeyê wezîran. Gava jina wî ew di nava wî cubeyî de dît, şaşwaz bû! Jê re got: "Ev çi ye?" Elî jê re mijar rave kir û got, ji serî hetanî binî. Piştî dewam kir: "Û mîr keça xwe jî bi kurê min Hesên re zewicand." Jina wî pir kêfxweş û bextewar bû bi wê yekê. Herdu jî di nava şahî û aramiyeke mezin de raketin wê şevê.

Roja din, sibehê çû dîwanê; mîr bi coş ew pêşwazî kir û ew li kêleka xwe da rûniştandin. Piştî jê re got: "Wezîrê hêja, me biryar da ku em daweta zarokên xwe li dar bixin êdî, tu çi dibêji?" Elî got: "Siltanê gewre, tu çawa rast bibînî, wisa ye. Li ser vê bersiva wî, mîr ferman da ku daweta keça wî were lidarxistin. Bajar hemû xemilandin û şahîyeke mîna cejnê mezin li dar xistin, ku sî rojî berdewam kir, di nava bextewariyeke bêtîmêl de.

Jina mîr jî pir ji zavayê xwe hez kir û dilxweş bû, ku keça wê bi xortekî ew qasî jîr, kamil û lihevhatî, ji aliyekî din ve jî, pir ji diya wî hez kir û gelekî dilxweş bû bi mervantiya wê.

Piştî qral, fermanek da karmendan ji bo ku qesrekê ji zavayê wî Hesên re ava bikin. Karmendan hoste û karkerên herî jêhatî li hev kom kirin û di demeke kurt de qesreke mezin û pir xweşik ji Hesên re ava kirin. Hesên û jina xwe jî tê de bi cih bûn. Lê diya wî pir bêriya wî dikir û her car diçû qesra

wî, çend rojan li ba wî dima û piştîre dişa vedigeriya cem mêrê xwe yê wezîr.

Rojekê jina mîr ji mêrê xwe re got: “Ey Şahê gewre û hêja! Diya Hesên maye di navbera xelîl û celîl de; ne dikare dev ji mêrê xwe berde û here li cem kurê xwe bi cih bibe; ne jî dev ji kurê xwe berde û here li cem mêrê xwe bi cih bibe. Geh diçe wir, geh diçe aliyê din, gelo çareyek ji vê yekê re nîn e?”

Mîr got: “Tu rast dibêji û tu mafdar î.” Piştî ferman da karmendan ku qesreke din li kêleka ya berê ava bikin. Di demeke kurt de qesreke din jî li rex a Hesên ava kirin û mala wezîr û jina wî jî birin tê de bi cih kirin. Her sê qesr li rex hev bûn û şibakeyên wan li hev dinêrîn. Êdî çûn û hatina di navbera wan de jî pir hêsan bûbû. Çi gava ku mîr bixwesta bi wezîr re bi-axive, gazî wî fikir, heger bi şev bûya jî ew bi meşê diçû cem wî. Dê û bavê Hesên jî wisa, kengî bixwestina, dikarîbûn wî bibînin. Wisa di nava xweşî û bextewariyê de jiyana xwe berdewam kirin.

Rojekê mîr nexweş ket, bedena wî hejar bû û mirina wî nêzik bû. Wî jî gazî hemû serkirde û wezîr û gizîrên xwe kir, ew li dora xwe kom kirin û ji wan re got: “Ez bi nexweşîyeke giran ketime û dibe ku ev nexweşîya mirinê be, loma min gazî we kiriye, lewre ez dixwazim bi we bişêwirim di vê mijarê de, gelo hûn çi dibêjin?” Wan jî got: “Di kîjan mijarê de tu dixwazî fikra me bigirî, ey şahê gewre?” Mîr got: “Ez bûme pîrekalekî bêhêz û nexweş. Ez ditirsim ku piştî min dijmin bi ser dewleta me de werin û rewşin nebaş derkevin holê. Ez dixwazim ku hûn hemû li ser yekî tifaqê bikin û wî bikin mîrê xwe, beriya ku ez bimirim.”

Hemû bi hev şewirîn û ji mîr re gotin: “Em dixwazin ku zavayê te Hesên bibe mîrê me. Lewre me hişmendî û aqîl û ramanêke kamil li ba wî dîtiye û ew e yê ku qedrê biçûk û mezinan dizane û her kesî fêhm dike.” Mîr got: “Gelo hûn giş pê razî ne?” Hemûçikan got: “Belê, em pê razî ne, mîrê me.” Mîr got: “Belkî hûn ji min fedî dikin û di rûyê min de wisa dibêjin; di nebûna min de jî hûn tişteki din dibêjin.” Wan jî lê vegerand û got: “Bi navê Xwedê çi di hundirê me de ye, em wî ji te re dibêjin, hem jî em ji dil û can dibêjin.” Mîr got: “Heger wisa be, nexwe ka herin qadiyê şer’î binin û gazî hemû mîrek û karmendên dewletê yên mezin bikin, bila hemû werin hetanî bi hacip û cîgiran, da ku em vê biryara xwe bixin meriyet û fermiyetê.” Wan jî got: “Ser seran û ser çavan.” Piştî çûn hemû alim, zana û mîr û emîr jî vê yekê agahdar kirin.

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 437’EMÎN

Şehrezadê got:

Roja din sibehê, hemû mezinên dewletê û giregirên civatê li hev kom bûn û çûn dîwana mîr, îzin jê xwestin, derbasî cem wî bûn, jê re gotin: “Va ye em giş hatine hizûra te!” Mîr ji wan re got: “Ey emîr û giregirên Bexdayê, kanî careke din dubare bikin û ji min re bibêjin bê hûn kê dixwazin bibê mîrê we, ji bo ku ez wî li şûna xwe diyar bikim, berî ku ez bimrim?” Hemûyan got: “Me li hev kir ku Hesenê zavayê te, kurê Eliyê wezîr bibê mîrê me.” Mîr got: “Heger wisa be, naxwe herin wî binin vir!”

Hemû rabûn ser xwe, çûn qesra Hesen û jê re gotin: “Ka rabe bi me re were cem mîr!” Wî got: “Çima û ji bo çi?” Gotin: “Ji bo tişteki ku xêra te tê de heye!” Hesen rabû ser xwe û bi wan re derbasî cem mîr bû, bejna xwe li ber tewand û erda bin nigê wî maçî kir. Mîr jê re got: “Ka rûnê kurê min.” Hesen rûnişt, mîr axaftina xwe berdewam kir: “Ey Hesen, va ye hemû emîr û gizîran li hev kiriye, ku te bikin mîr li ser serê xwe, piştî min. Ez jî dixwazim vê biryarê bigirim û berî mirina xwe ji gel re ragihînim, da ku piştî min pirsgirêk dernekevin.”

Bi vê gotina mîr re Hesen rabû ser xwe, erda bin nigên wî maçî kir û ji mîr re got: “Şahê min ê dilovan, ev peywira hanê ew qasî mezin e ku temenê min li himberî wê pir biçûk e û qudreta min qels e. Heger hûn min ji vê peywirê efû bikin, dê çêtir be.” Emîr û giregirên li wir gotin: “Lê em dixwazin ku tu bibî mîr li ser serê me!” Hesen got: “Bavê min ji min guncantir e û ez û bavê xwe yek in; çênabe hûn min têxin pêşiya wî.” Bavê wî Elî got: “Ez jî tenê bi biryara emîr û gizîrên birayên xwe razi me û wan jî tu hîlbijartîye, ne kesekî din. De êdî li himberî fermana mîr dernekeve û dilê ew qase serkirde û emîran neşikîne!”

Hesen ket ber fediye, serê xwe bera ber xwe da, bêyi ku deng jê derkeve. Mîr careke din ji giregiran pirsî û got: “Hûn bi wî razî ne?” Gotin: “Em pê razî ne.” Di pey re jî hemûyan heft fatîhe li ser xwendin. Mîr got: “Ey qadiyê zana! Ka îcar peymaneke şer’î binivîsîne li ser van emîr û gizîran ku li hev kirine, ku mîrê keça min Hesen bikin mîr li ser serê xwe.” Qadî peyman nivîsand û bi gişan da îmzekirin, piştî ku hemûyan ew pejirandin. Mîr jî ew pejirand û ferman da Hesen ku here li ser textê mîrektiye rûnê. Ew çû li ser text rûnişt. Piştî hemû rabûn ser xwe û yeko yeko çûn destê mîrê xwe yê nû maçî kirin, îtaeta xwe nîşanî wî dan.

Wê rojê Hesenê kurê Elî dest bi mîrektiya xwe kir, xelat û diyari li ser karmend û xebatkarên dewletê belav kir û pêdiviyên muhtacan pêk anîn. Di pey re diwan belav bû û Hesen jî rabû çû ba bavê jina xwe, destê wî maçî kir. Xezûrê wî jê re got: “Hesen lawo destê Xwedê û pêxemberê wî li ser te be. De êdî heta ji te bê, dîlbirehm be li ser gelê xwe û ji rêya rast dernekeve!” Hesen got: “Bi xêra duayên te ez ê bi ser bikevim inşallah.”

Piştî jî rabû, derbasî qesra xwe bû. Diya wî, jina wî û hemû kes û

karên wî pê ve rabûn, destê wî maçî kirin û postê wî lê pîroz kirin. Di pey re jî derbasî qesra bavê xwe bû. Ew jî pir pê kêfxweş bû, ew pîroz kir û şîret lê kirin ji bo ku ji ser rêya dadê û dilovaniyê dernekeve.

Wê şevê, bi kêf û xweşî ket nav nivîna xwe û bi dilekî aram raket. Roja dîtir, sibehê rabû nimêja xwe kir, werdên xwe kişandin û rabû çû dîwana xwe. Piştî hemû serleşker û xwediyên postên giran di dewletê de derketin hizûra wî. Hesen jî bi dadwerî desthilatdariya xwe bi rê ve bir, qencî û sinckarî belav kir, pêşiya xerabiyê girt, rastî û şaşîti ji hev cuda kirin û hetanî êvarê li ser kar ma. Êvarê jî, dîwan bi xêr û xweşî belav bû û her kes çû mala xwe. Ew rabû çû qesra xezûrê xwe û dît ku nexweşiya wî lê giran bûye. Jê re got: “Xwedê bêje erê tu yê baş bibî.” Xezûrê wî got: “Ey Hesen!” Wî got: “Bêje bavocan!” Mîrê berê çavên xwe vekirin û got: “Mîrina min pir nêzik bûye kurê min. Îcar li jina xwe miqate be û li himberî dê û bavê xwe rêzdar be kurê min. Bila tirsra te tenê ji Xwedê be û bizane ku Xwedê ferman daye me ku em adil û alîgirên qenciyê bin.” Hesen got: “Gotin û şîretên te dê her tim di bîra min de bin ezbenî û ez ê timî li ser rêya rast bim, bi izna Xwedê.”

Mîrê kevn, piştî wê şîreta xwe bi sê rojan, çû ber diolovaniya Xwedê. Ew şûstin, li ser nimêj kirin, terqîn xwendin û cenazeyê wî bi dêlindêzeke mezin û gewre rakirin û ew binax kirin, veşartin. Piştî xêr û xêrat li ser belav kirin û hetanî çil rojî Qur’an li ser gora wî xwendin. Piştî Mîr Hesen bi serê xwe dewlet bi rê ve bir û gelê wî giş jê razî ma. Bavê wî jî her ma wezîr û karê xwe bi dadwerî meşand. Lê Hesen, wezîrekî din jî ji xwe re peywardar kir, ew danî kêleka xwe ya çepê, bavê xwe jî danî kêleka rastê û serweriyeke baş û adilane dan meşandin bi salan. Di nava wan salan de, Xwedê sê kur dan wî û keça mîr, hersê jî di nava bextewariyê de mezin bûn û şûna bavê xwe girtin di serweriya dewletê de. Hemû di nava kêf û xweşî û şahiyê de jiyan hetanî ku xerabkarê kêf û şahiyê bi ser wan de hat û ew ji hev belav kirin. Subhan ji wî Xwedayê bêmirin re!

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 438’EMÎN

(ÇÎROKA HECÎ Û PÎREJINA SALIH)

Şehrezadê got:

Tê gotin ku carekê gava qafileyê rêwiyê hecê diçûn Mekkeyê, li xanekê sekinîn, bêhnvedanek dan meşa xwe. Di wê navberê de yek ji wan di xew re çû û gava bi ser xwe ve hat, şiyar bû, kes ji qafileyê xwe nedît. Bêyî ku bizanibe hevalên wî bi ku ve çûne, ket ser rêyekê û meşiya, hetanî li ça-

direkê rast hat ku pêrejinek di deriyê wê de ye û sehek jî li kêlekê raketî ye. Berê xwe da çadirê û çû cem pêrejinê hinek xwarin jê xwest. Pêrejinê got: “Here wê dola hanê û bi qasî pêdiviya xwe ji xwe re nêçirê bike, dol tijî ajal e; ez ê jî ji te re bibirêjim û bidim te.” Rêwiyê hecê jê re got: “Min tu carî goştê ajalan nexwariye û ez qet newêrim nêçira wan bikim.” Pêrejinê got: “Ez ê bi te re bêm û wan nêçir bikim, tu jî qet metirse.”

Pêrejin pê re çû newalê û sehê wê jî pê re. Bi qasî pêdiviya xwe ajal nêçir kirin û vegeriya çadirê, ew li wir biraştin. Zilam ji birçibûnê tirsîya ku qidûmên wî bişikîne û mecbûr ma goştê wan ajalan bixwe. Piştî xwarinê tî bû û ji pêrejinê hinek av xwest. Wê jî got: “Kanî li dera hanê ye, here avê jê vexwe!” Zilam çû ser kaniyê, dît ku ava wê tehl e lê belê ji ber têhna tîbûnê mecbûr ma ji wê avê vexwe. Piştî dîsa vegeriya cem pêrejinê û jê re got: “Ey pêrejina perîşan, kê çadira te li vir vegirt û hişt ku tu vê xwarinê bixwî û ji vê ava tehl vexwî?” Pêrejinê got: “Çima ma welatê we çawa ye?” Zilam got: “Li welatê me malên xweş û fireh hene, fêkiyên stewiyayî û biçêj, ava zelal û xweşçêj, xwarinên cur bi cur, goştê pez û deveyan û xêr û bêratên ku nayên jimartin û incex di cuneta Xwedan de peyde dibin hene.” Pêrejinê got: “Baş e, li gel van gişan, siltanekî zalim û hêzdar li cem we heye ku we serkut dike, gava şaşîtiya yekê ji we çêdibe, mal û milkê wî jê distîne, mala wî xera dike û kengî bixwaze we ji mala we derdixe û li ser koka we rûdinê?” Zilam got: “Ew jî heyel!” Pêrejinê got: “Nexwe ew maldariya pir û zengîn, ew jiyana xweş û hêsan, hemû dibe jehreke kujer li gel hebûna wî siltanî û zilma wî. Xwarin û vexwarina me ya tehl jî dibe xweşî û çêj li gel aramî, azadî û ewlehiya li cem me!”

Zilam di ya xwe de israr kir û got:

Qet te nebihîstîye ku xêr û xweşiya sereke ji bo mirovan ola Îslamê ye, ya duduyan tenduristî û ya sisyan jî ewlehî ye. Ev her sê jî incex bi hebûna siltanekî adil e ku şûna pêxemberê Xwedê bigire û siyaseteke baş serwer bike li vê erda wî. Vêca siltan û xelîfeyên berê dixwestin ku dilnizm bin ji bo xelk jî wan netirse. Lê siltanên niha dixwazin pir hêzdar û bi heybet bin ji bo ku xelk ji wan bitirsin. Lewre xelkê niha ne mîna yê berê durist û pak in. Kesên niha xerab, caris, sakûle û gunehkar in; dilê wan tijî kîn û dijminahi ye û heger -Xwedê neke- siltanê wan qels be û siyaseteke wî ya hêzdar û biheybet tune be, dê bibe sebeba têkçûn û xerabûna wî welatî. Di gotinên pêşyan de jî dibêjin, “Sed salên zilma siltan, ne bi qasî salekê tenê ji zilma xelkê ye.” Jixwe gava ku xelk zilimkar dibin, Xwedê siltanekî zalim ji wan re dişîne. Di serboriyên El Heccac Bîn Yusuf El Thekafî de jî ev yek dibihure. Dibêjin rojekê nameyek ji Hecac re hatiye, xwediyê wê tê de gotiye: “Ji Xwedê bitirse û zilmê li îbadên wî neke!” Vêca gava Hecac ew name xwendîye, derketiye ser mînberê û bang kiriye, gotiye: “Xelkino! Xwedê Teala li gora kar û emelên we ez bi ser we de şandime. Ger ez bimirim jî hûn ji zilmê

xelas nabin, lewre dê Xwedê Teala zalimikî ji min xerabtir bike siltan li ser serê we, heger hûn dev ji van karên xwe yên xerab bernedin û xwe rast nekin. Ji ber Xwedê Teala gelek siltanên mîna min zalim çekirine û bi kuştina min, hûn ji wan xelas nabin. Çawa ku helbestkarekî jî gotiye:

Destê Xweda di ser hemû destan re ye
Li himberî her zalimekî jî zilimkarek heye.

Dadwerî jî ji zilmê direve û herdu bi hev re li gel hev peyde nabin. Xwedayê gewre rêyeke rast nîşanî me bide û xerabiyên heyî ji holê rake!”

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 439’EMÎN

(ÇÎROKA ELÎ BÎN MUHAMED BÎN ABDULLAH BÎN TAHIR Û MÛNISA CARIYE)

Şehrezadê got:

Tê gotin ku rojekê ji rojan Elî Bin Mûhamed Bîn Abdullah Bîn Tahir çû sûka bajêr û cariyek bazar kir ku ji xwe re bikire. Cariyek pir baş û qenc bû, ji aliyekî din ve jî wêjevan û helbestkar bû. Elî jê pirsî, got: “Navê te çi ye?” Cariyeyê got: “Xwedê ji mîrzayê min razî be, navê min Mûnis e.”

Elî, berê jî navê wê bihîstibû. Serê xwe bera ber xwe da û bi qasî saetekê ponijî. Piştî serê xwe rakir û bi helbestî got:

Çi dibêjî tu di derbarê yekî de
Ku dilê wî terikiye bi evîna te

Mûnisê got: “Xwedê temenê mîrzayê min dirêj bike.” û bi helbestî bersiva xwe berdewam kir:

Gava dibînin em ku yek êşê dikşîne ji dil
Bi dilovanî xwe bi ser de ditewînin em ji dil

Bi vê gotina wê re Elî ew eciband û bi heftê hezar dirhemî ew kirrî. Ji wê cariyeyê kurekî bi navê Abdullah Bîn Muhamed jê re çêbû ku pir nav û deng da bi huner û berhemên xwe.

Ebûl Ayna jî got ku li taxa me du jin hebûn. Yekê ji zilamekî bi rîh û simbêl hez dikir a dîtir jî ji ciwanekî nûhatî û bê rîh û simbêl hez dikir. Rojekê bi şev, herdu li hev civiyan li ser banê mala yekê ji wan, ku cîrana me bû. Hayê herduyan jî ji min tune bû û nizanibûn ku ez li ser banê mala xwe me. Yekê ji ya din re got: “Xwişkêcan, çawa sebra te li rîh û simbêlên wî tê gava ku mûyên wî di singê te rdibin û simbêlên wî dikevin ser levên te?”

Wê jî lê vegerand û got: “Kêmaqilê qey tu nizanî ku yên darê dixemilînin pelên wê ne û tiştê ku xiyar jî xweşik dike pûrtika wî ye! A din jî qey te mêr mîna mêrê gurrî û bê rîh û simbêl bêmîrêş dîtiye? Qey tu nizanî ku riha li cem mêran, mîna biskên li cem jinan e. Ma ka çi ferq di neqeba rîh û biskan de heye? Qey te nebihîstiye ku Xwedayê gewre ferîşteyeke li ezmanan çêkiriye ku her gav dibêje: ‘Subhan ji wî re ku zilam bi rîh û simbêlan û jin jî bi biskan xemilandiye?’ Vêca heger rîh jî bi qasî biskan ne biqîmet bûna, Xwedayê me jî ew bi hev nedipîvan kawika Xwedê!”

A dîtirkê hêrs bû û got: “Bi Xwedê tu neheqiyê li min û dildarê min dikî!”

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 440’EMÎN

(ÇÎROKA EBÛL HESEN Û CARIYEYA WÎ TEWEDÛD BI HARÛN REŞÎD RE)

Şehrezadê got:

Tê gotin ku demekê li Bexdayê, tacîrêkî mezin hebû ku xwedî mal û milkekî mezin bû, avahî û erdê wî pir bû û Xwedê bi elba mezin dabûyê lê belê bê zuriyet bû û zarokên wî tune bûn. Sal bihurîn, temenê wî derbas bû lê dîsa jî ne keçek, ne kurek jê re çênebû. Piştî wî xûz bû, bedena wî hezhîzî hêz tê de nema. Ew jî tirsîya ku bimire û malê wî ji xelkê re bimîne, ocaxê wî kor bibe. Xew nema bi çavên wî ket, şev pê de dua ji Xwedayê xwe re kir, nimêj kir û rojî girt, sedeqe li ser sêwî û feqîran belav kirin, xêr û qencî bi xelkê kirin bi hêviya ku Xwedê duaya wî qebûl bike û kurekî bide wî. Di encamê de dengê wî çû Xweda û jineke wî tov girt, ducanî bû. Neh mehên hemla wê qediya, jinikê hemla xwe danî û kurikek jê re anî ku sûretê wî mîna heyvê bû. Wî jî soza xwe pêk anî, xêr û xêrat li ser xelkê belav kirin, kinc li kesên tazî kirin, xwarin da ber birçîyan, sedeqe li ser sêwî û jinebiyan belav kirin.

Piştî çêbûna wî bi heft rojan, bavê wî nav lê kir û got bila navê wî Ebûl Hesen be. Gelek carîye û xizmetkar peywirdar kirin, ji bo ku baş lê binêrin û baş wî xwedî bikin. Bi rê û rêbazên baş mezin bû di nava hebûneke mezin û dewlemend de. Bavê wî mamoste dan ber wî, ew fêrî Qur’an û ilm û zanînê kirin; ji ziman û wêje û hesab û stêrknaşî û tîravêtin û gelek hunerên din jî. Bi wî hawayî kurik bû yekane zana, hunermend û aqilmendê zemanê xwe. Ji aliyê spehîbûnê ve jî pir lihevhatî, zimanşîrîn, axafxweş û kamil bû. Çawa ku hozanekî jî gotiye: “Weke buhara bakîran bû rûgul û çav bişewq

bû.”

Demekê bi bavê xwe re ma, di nav bextewarî û şahiyêke bêtîmtêl de. Bavê wî jî, pir pê kêfxweş bû û gelekî jî pê şa dibû. Gava têgihîşt û kamil bû, rojekê ji rojan, bavê wî ew li kêleka xwe da rûniştandin û jê re got: “Kurê min, ez wisa hîs dikim ku dê temenê min biqede û ez ê derkevim raberî Xwedayê xwe. Vêca va ye min têra te û zarok û neviyên te jî mal û milk û gund û bexçe ji te re hiştiye. Tu jî qîmeta vê yekê bizanibe û ji rêya Xwedayê xwe dernekeve, nede dû sincxerab û bêbextan.”

Çend rojên din bi şûn de, nexweşiya zilam lê giran bû û mir. Kurê wî cenazeyê wî rakir û bi awayekî baş ew veşart û vegeriya malê, li hundir rûnişt bi tena serê xwe û bi rojan ji malê derneket, di nava êş û xemgîniya şîna bavê xwe de ma.

Rojekê dostên wî hatin cem wî, ber dilê wî xweş kirin û jê re gotin: “Kesê ku kurekî mîna te li pey xwe hiştibe û çûbe, mirî nayê hesêb û xema wî jî nîn e. Tiştê çû nede dû û ev şînkêşana dûdirêj jî incex karê keç û jinan e. De êdî rabe ser xwe û dîsa jiyana xwe berdewam bike.”

Pê ve mijûl bûn hetanî ku ew rakirin, birin hemamê û serê wî şûştin, ew paqij kirin û dîsa vegerandin malê.

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 441'EMÎN

Şehrezadê got:

Vêca şahîşahê min ê bextewar, gava dost û hevalên Ebûl Hesên ew birin hemamê û şîna wî bi dawî kirin, li jiyana xwe vegeriya û şaş û metal ma li himber pîrbûna mal û milkên ku bavê wî jê re hiştibûn. Wisa jê ve xwiya kir ku hetanî roja qiyametê jî naqede. Wesiyeta bavê xwe ji bîr kir û tenê li kêf û rihetîya xwe nêrî. Xwar û vexwar ji tiştên herî xweş û biha û şevûroj ket pey kêf û zewq û serxweşiyê. Bi comerdî zêr û zîv belav kirin li ser derdora xwe, xelat û diyarî jî bêjimar belav kirin li ser dost û hevalên xwe. Qazên heşandî, mirîşkên biraştî, şûşeyên dagirtî, fêkiyên cur bi cur dihatin û diçûn, tîqetîq û hîrehîra cariyeyên spehî û dengxweş, bê navber bilind dibû ji eywana wî, şevêk tenê jî bê şahî derbas nedibû di ser wî û civata wî re.

Ebûl Hesên, ew jiyana xwe ya nû bi wî awayî berdewam kir hetanî ku malê wî giş qediya, berikên wî vala bûn û tu tiştek di destê wî de nema ji xeynî cariyêke ku bavê wî jê re hiştibû.

Îcar ev cariyeya ku di destê wî de mabû, bêtîmtêl bû di husn û cemala xwe de, di sinc û zanîna xwe de, di huner û zimanxweşiya xwe de. Bejn û

baleke lihevhatî, rûyekî girover mîna heyveke li çardehan, eniyeke vekirî û binûr, du birhûyên weke du şûran, çavên xezalîn, bêvileke hûsamî, rûçikin sorgulî, devekî weke hingulîska Suleyman, diranên enqûdî û lêvên şekirîn, navika gulgulî, newqa zirav û şayîtok, hêtên giran û kulîmekên girover û terr, bi giştî jî xweşikbûneke wê hebû ku nedihate wesifdan. Lewre bi ken û bişîrîna xwe agir bi nava mirov dixist, awirên wê mêrkuj bûn, weke tîran di dilê mirov de diçikiyan. Rojîşewq bû, heyvê jî nikaribû rakişandin pê re bikira. Pir rûgeş û dilgerm bû, dilê kesî nedişikand û her hêvîbexş bû bi her kesî re, bi wî zimanê xwe yê xweş û şîrîn.

Îcar gava malê Ebûl Hesên qediya û tiştê di destê wî de nema, ji xeynî wê cariyeyê, nema dizanibû wê çi bike. Sê roj û sê şevan xwarin bi devê wî, xew bi çavên wî neket. Cariyeya wî jê re got: “Mîrzayê min, ka min bibe cem emîrê bawermendan Harûn Reşîd!”

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 442'YEMÎN

Şehrezadê got:

Cariyeya Ebûl Hesên ji wî xwest ku wê bibe cem Harûn Reşîd û deh hezar dînar jê bixwaze û wê bifiroşe wî. Piştî cariyeyê axaftina xwe berdewam kir û got: “Gava ku xelîfe ji te re got ev wisa pir buha ye, tu bibêje cariyeya min hîn buhatir e, tu dixwazî wê biceribîne, tu yê bi çavên xwe bibînî, lewre tu cariyê mîna wê nîn e li ser rûyê erdê û tenê layîqî kesekî mîna te ye. Baldar be, bila te nexapîne û min erzantir ji te nekire.”

Cariyeyê ew hişiyariyên xwe kirin lê Ebûl Hesên ji qîmeta cariyeyê bêxeber bû û mezyetên wê nas jî nedikir. Bi destê wê girt, ew bir cem xelîfe Harûn Reşîd, ew pêşkêşî wî kir û tiştê ku cariyeyê berê jê re gotibû anî ziman û li benda bersiva wî sekinî.

Harûn Reşîd got: “Navê te çi ye?” Cariyeyê got: “Navê min Tewedûd e.” Xelîfe got: “Çi zanînen te hene?” Tewedûdê got: “Emîrê bawermendan, ez zimanzanîyê, rêzimanîyê, helbestkariyê, fiqhê, tefsîrê, muzîkzanîyê, teolojîyê, hesab û cebrê, erdnîgarîyê, çîrok û gotinên pêşîyan dizanim. Ez Qur'ana pîroz jî dizanim; min ew heft caran, deh caran û çardeh caran xwend. Ez hejmara sûret û ayet û beş û nivîk û çarîk û heştik û dehikan jî dizanim. Dîsa ez hejmara herfên Qur'anê, ayetên nasix û mensûx¹², ayetên Mekî û Medîneyî¹³ û sebebên daketina wan ayetan, hedîs û gotinên pêxember;

12. Ji ber ayetên Qur'anê giş bi hev re nehatine nivîsandin û di navbera bîst û du salan de hatine nivîsandin, di hinek mijaran de ayetên ku di salên pêşin de hatine (mensûx) piştî çend salan ayetî nûtir (nasix) şûna wan girtine û yên berê hatine îptalkirin.

13. Di Qur'anê de 112 sûret hene. Hemû tevde di nava bîst û du salan de daketîne. Hinek

vebêj û çavkaniya vebêjan jî dizanim. Dîsa ez geometrî û zanînên endez-yariyê, felsefeyê, mantiq û zanînên hîkmet û watenasî û xweşbêjeyê jî dizanim. A rast di gelek zanistiyan de ez agahdar im û meyleke min a mezin bi ser helbestê de heye. Ez fêrî ûdê bûme û min gelek meqam ji ber kirine.

Dema ku ez strana dibêjim, ez pê re direqisim jî. Gava ez xeml û xêza xwe girêdidim û ava gulan bi xwe dadikim jî, deriyê dilekî ku li ber min venabe namîne. Bi giştî asta ku ez gihome wê, hîna ji kesî re nebûye nesîb.”

Gava Xelîfe Harûn Reşîd ew gotinên wê bihîstin û li biçûkaniya temenê wê nêrî, şaş û metel ma li himberî wê xweşaxaftina wê. Li xwediyê wê zivirî û jê re got: “Ez ê gazî hinekan bikim ku di wan mijaran gişan de wê di ezmûnan re derbas bikin; heger bersivên rast dan, ez ê heqê wê û zêdetir jî bidim te, heger bersiv neda jî jixwe ew bêtir layiqî te ye, bi vî temenê biçûk.” Ebûl Hesen got: “Bila be, emîrê bawermendan.”

Harûn Reşîd nameyek ji emîrê Besrayê re nivîsand û jê xwest ku were seraya wî û bi xwe re xwendevanan, zanyaran, hekîman, stêrknasan, endez-yaran, filozofan, şaîran, muzîkjenan û bêjernasanan jî bîne. Emîrê Besrayê Îbrahîm Bîn Seyar En Nîzam bi xwe jî zanayê herî navdar bû di serdema xwe de. Bi taybetî jî di warê mantiq, helbest, zimanzanî û belaxetê de.

Di demeke kurt de, Îbrahîm Bîn Seyar û qafîleya zanyarên bi wî re gihan Bexdayê û derbasî seraya Xelîfe bûn, bêtî ku bizanibin ji bo çi gazî wan kiriye. Piştî derbasî dîwana xelîfe bûn, bejna xwe li ber wî tewandin, silava xîlafetê dan. Harûn Reşîd ferman da wan, ji bo ku rûnên; rûniştin. Dûre ferman da xizmetkaran, ji bo ku Tewedûda carîye binin. Xizmetkaran çûn ew anîn. Tewedûd weke heyveke li çardehan derbasî dîwanê bû û bala her kesî kişand ser xwe. Kursiyeke zêr nîşanî wê dan, çû li ser rûnişt û bi rêzdarî silav da her kesî û got: “Emîrê bawermendan, de ka îcar fermanê bide zana û hekîm û endezyar û filozof û bijîşkan bila min di ezmûnan re derbas bikin!”

Harûn Reşîd, li wan zivirî û ji wan re got: “Ez dixwazim ku hûn zanîna vê carîyeyê bipîvin û di ezmûnan re derbas bikin!” Wan jî got: “Ser seran û ser çavan, emîrê bawermendan.”

Wê gavê Tewedûdê serê xwe berra ber xwe da, hinekî ponijî, piştî serê xwe rakir û ji wan pirsî, got: “Kîjan ji we Qur’axwendiyê pirtûka pîroz û zanayê wê ye?” Yekî ji wan got: “Ez im ew kesê ku tu lê digêrî.” Tewedûdê got: “Tu çi dixwazî, wî ji min bipirse!” Zilam got: “Te pirtûka pîroz xwendiyê û te nasix û mensûxên wê ji hev derxistine gelo? Te hemû ayet û herfên wê nas kirine?” Tewedûdê got: “Belê.” Zilam got: “Naxwe kanî bersiva van

ji wan di dema ku pêxember li Mekkeyê bû daketine, loma ji wan re dibêjin sûretên “Mekkeyî”; di pey hicretê re gava ku pêxember diçe, li Medîneyê bi cih dibe jî hinek ayet dadikevin ji pêxember re û ji wan re jî dibêjin sûretên “Medîneyî”.

pirsan bide; ferz û wacib û sunetên olê çi ne, Xwedayê te, pêxemberê te, îmamê te, qublegeha te, xwişkên te kî ne, rêbaza te çi ye, terîqeta te çi ye?”

Tewedûdê got: “Ellah Xwedayê min e, Muhammed pêxemberê min e, Qur’an îmamê min e, kabe qiblegeha min e, hemû bawermend xwişk û bi-rayên min in, xêrxwazî rêça min e, suneta pêxember jî terîqeta min e.”

Bi vê bersiva wê re, xelîfe şaş û metal bû, lewre pir biçûk bû û zela-liya hiş û zimanê wê pir balkêş bû. Zilamê ku pirsîyarî pê re dikir, pirsên xwe berdewam kirin û jê re got: “Kanî ji min re bibêje, bê te çawa û bi çi Xwedayê xwe nas kiriye?” Tewedûdê got: “Bi aqilê xwe min ew nas kir.” Zilam got: “Aqil çi ye?” Tewedûdê got: “Aqil dudû ne; yek ji wan huner e û yek ji wan fêrbûn e.”

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 443’EMÎN

Şehrezadê got:

Tewedûdê got: “Aqil du beş in, yek jê aqilê hunerî ye û di tebîeta mirovan de heye; beşa din jî aqilê ku mirov ji hinekên din û ji xwezayê fêr dibe. Yanê aqilê hunerî dana Xwedê ye û yê fêrbûyî, mirov bi keda xwe qezenc dike.” Zilamê ezmûnger got: “Her bijî!” Piştî axaftina xwe bi pirsê berdewam kir û got: “Aqil di ku de ye?” Tewedûdê got: “Xwedê wî davêje dilê mirov û ji wir jî dibe tîrêj û dide mejiyê mirov, di wir de bi cih dibe.” Ezmûnger got: “Her bijî ji te re!” Piştî berdewam kir û got: “Derbarê pêxemberê me de, te agahiyên xwe ji ku girtine?” Tewedûdê got: “Min agahiyên xwe yên derbarê pêxember de ji Qur’ana pîroz, ji hedîs û delîl û mûcîze û ji îspatan.” Ezmûnger got: “Baş e, ka ferz û wacib û sunetên ku tên kirin ji min re bibêje?” Tewedûdê got: “Ferzên misilmantiyê pênc in; şehadeta eşhedû enla îlahe îllallah we enne Mûhameden resûlûllah, kirina nimêjê, dana zekatê, rojiya Remezanê û heca mala Xwedê ji bo kesên ku dikarin herin Mekkeyê. Sunetên heyî jî çar in; şev û roj û tav û heyv in, her çar jî temen û hêviyê nêzîktir dikin û kes nizane ku ev mala mirov xera dikin.” Ezmûnger got: “Her bijî ji te re! Niha jî kanî ji min re retorîkên baweriyê bibêje!” Tewedûdê got: “Retorîkên baweriyê; nimêj, zekat, rojî, hec, cîhad û dîrketina ji heraman.” Ezmûnger got: “Her bijî, niha jî kanî ji min re bibêje bê tu bi kîjan niyetê radibî nimêjê?” Tewedûdê got: “Bi niyeta bendetîya ji Xwedê re.” Ezmûnger got: “Baş e, ka bêje bê beriya nimêjê divê mirov çi bike?” Tewedûdê got: “Destavgirtin, veşartina deverên şermê di laşê mirov de, jixwedûrxistina kincên necis, sekna li ser cihekî paqij, bergehgartina qubleyê, niyetlêkirin, tekbîr û îhram.” Ezmûnger got: “Her bijî ji te re! Niha jî ka ji min re bibêje, bê bi kîjan niyetê tu ji mala xwe derdikevî?” Tewedûdê

got: “Bi niyeta îbadetê.” Wî got: “Bi çi niyetê tu derbasî mizgeftê dibi? Wê got: “Bi niyeta xizmetê.” Wî got: “Bi kîjan niyetê tu berê xwe didî qublegehê?” Wê got: “Bi niyeta sê ferzan û sunetekê.” Ezmûnger got: “Her bijî ji te re! Nexwe rêgezên nimêjê ji min re bibêje?” Tewedûdê got: “Rêgezên nimêjê yên sereke: Teharet û pakbûn e, qedexekirina tekbîra îhramê ya hecê û qedandina bi silavê.” Ezmûnger got: “Ê ku nimêj neke, gunehê wî çi ye?” Tewedûdê got: “Di sehîha Bûxarî¹⁴ de, tê gotin ê bi awayekî zanatî û bê mazeret dev ji nimêjê berde, şensê wî di îslamê de nîn e.”

Li Şhrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 444”EMÎN

Şhrezadê got:

Gava ku Tewedûdê hedîsa pêxember anî ser ziman, ezmûnger got: “Her bijî, ka ji min re wateya nimêjê vebêje?” Tewedûdê got: “Nimêj, têkiliya bende bi Xwedayê wî re ye û di nimêjê de deh meziyet hene: Ronikirina dil, ronikirina rû, razîkirina Xwedayê dilovan, hêrskirina şeytên, ji xwe dûrxistina kerb û belayan, bergirtina şerên dijminan, vezêdekirina dilovaniyê, bergirtina tolhildanê, venêzîkirina bende ji Xwedayê wî û dûrxistina wî ji nebaşî û gunehan; di heman demê de nimêj ferzeke wacib e û ji stûnên olê ye.”

Ezmûnger got: “Her bijî ji te re! Lê gelo mifteya nimêjê çi ye?” Tewedûdê got: “Destnimêj e.” Wî got: “Mifteya destnimêjê çi ye?” Wê got: “Binavkirina wê ye.” Wî got: “Mifteya binavkirinê çi ye?” Wê got: “Bawerî ye.” Wî got: “Mifteya baweriyê çi ye?” Wê got: “Tewekelî û xwe spartina Xwedan e.” Wî got: “Mifteya tewekeliyê çi ye?” Wê got: “Tikankirin.” Wî got: “Mifteya tikankirinê çi ye?” Wê got: “Taet e.” Wî got: “Mifteya taetê çi ye?” Wê got: “Lixwemikurhatina ji Xwedayê xwe re bi wijdaneke vekirî û pejirandina Xwedaniya wî.” Ezmûnger got: “Kanî ferzên destnimêjê ji min re bibêje?” Tewedûdê got: “Li gora Îmamê Şafiî şeş ferz in: Nêtkirin, şûştina rû û her du destan hetanî bi enîşkan, şilkirina pêşenîkê, şûştina nigan hetanî bi gwîzekê û sererastkirin. Sunetên destnimêjê jî şazdeh in: Besmele, şûştina herdu destan beriya xistina wan a teştê, avtêwerdana devan, hilmkişandin, şilkirina pêşenîk û herdu guhan bi aveke nû, firikandina riha tov bi şûştina rû re, firikandina neqeba tiliyên nigan, ji nigê rastê destpêkirin û sêcarekirina şûştin û avtêdina li pey hev û piştî qedandina destnimêjê gotina: ‘Eşhedû enla îlahe illallah we enne Mûhammeden resûlûllah Xwedêyo min jî bike yekî tobekar û pakrewan! Subhan ji te re û hêz ji te ye, destnîşankirina Xwedayetiya te ji min e, ez lêborînê ji te dixwazim û li ber destê

14 . Sehîh: Navê pirtûka Bûxarî ye, ya ku hedîsên pêxember tê de kom kiriye.

te tobe dikim.' Lewre di hedîsan de tê gotin ku pêxemberê umetê gotiye, piştî destnimêjê her heyşt deriyê bihuştê vekirî ne û mirov di kîjan deriyî re bixwaze, derbasî bihuştê dibe." Ezmûnger got: "Baş e, gava mirov bixwaze destnimêj bigire kî û kî li kêleka mirov in?" Tewedûdê got: "Gava mirov xwe ji destnimêjê re amade dike, ferîşte tên kêleka rastê û şeytan tên kêleka çepê. Gava di serî de navê Xwedê tîne ziman şeytan ji cem mirov direvin û ferîşte çadireke ji ronahiyê li ser mirov vedigirin bi çar werîsan, ku her werîsek jî di destê ferîşteyekê de ye û ew ferîşte jî duayan ji Xwedê dikin ji bo wî û lêborînê dixwaze, di seranserê dema bêdengiya wî de. Vêca gava ku mirov di serî de navê Xwedê nebêje û besmelê nebêje, ferîşte direvin û şeytan li mirov kom dibin, tasewasan bi mirov re çêdikin û destnimêja mirov kêmtir dimîne."

Ezmûnger got: "Her bijî ji te re. Lê ka îcar ji min re bibêje bê mirov gava nû ji xew şiyar dibe çi dike?" Tewedûdê got: "Divê di destpêkê de destên xwe sê caran bişo, beriya ku wan bixe testê." Ezmûnger got: "Baş e, ka ferzên tehareta û sunetên wê ji min re vebêje?" Tewedûdê got: "Ferzên tehareta ew in ku mirov nêtê bike û avê bi ser laşê xwe gişî de bike bi awayê ku deverêk ji laş û por nemîne ku şil nebe. Sunetên tehareta jî ew in ku mirov beriya wê destnimêj bigire û di dema tehareta de porê xwe bifirîne ji bo ku av baş pê de here û herî dawiyê jî nigên xwe bişo."

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 445'EMÎN

Şehrezadê got:

Feqîhê Ezmûnger pirseke din ji Tewedûdê kir û got: "Sedemên Teyemûmê¹⁵ çi ne, ferz û sunetên wê çi ne gelo?" Wê jî got: "Sebebên teyemûmê heft in: Nebûna avê, tirs, pêdiviya wê, xweşaşkirin, nexweşî, bêçaretî û rêwîti. Ferzên wê jî çar in: Nêtkirin, hebûna axê, destdayîna axê û rûfrikandina bi axê. Sunetên wê jî: Besmeleya bi navê Xwedê û destpêkirina bi destê rastê."

Ezmûnger got: "Her bijî ji te re. Lê te şertên Teyemûmê negotin? Tewedûdê got: "Şertên wê pînc in: Pakbûna endamên bedena mirov, veşartina deverên şermê di laşê mirov de, hatina dema limêjê, beridana qublegê û sekna li ser cihekî pak." Û Ezmûnger got: "Lê erkanê wê çend in?" Wê got: "Nêtkirin, tekbîra îhramê, rabûn û xwendina Fatîheyê tev li besmeleyê, li gel ayetekê jî heger limêj li ser mezhebê Şafî be, piştîşikandina biaramî, piştastkirina biaramî, çogşikandina biaramî û rûniştina di navbera herdu

15. Devera ku av lê tune be, misilman destnimêja xwe bi axê digirin û ji vê re dibêjin, "Teyemûm".

rukeyan de biaramî, eşheda dawîn û rûniştin, piştî jî silav û selewatên ku li ser pêxemberê umetê werin xwendin û nêta qedandinê.” Ezmûnger got: “Sunetên wê çend in?” Tewedûdê got: “Yek jê bang e, yên din; rabûn û bilindkirina herdu destan di dema îhramê de, duayên destpêkê, eûzû û amîngotin, xwendina sûreteki Qur’anê piştî Fatîheyê û tekbîrên di navberê de li gel gotina “semîallahû limên hemîdehû”^{16**} bêdengî û vedengiya di cihê wê de, dubarekirina eşheda destpêkê, rûniştin û silavên li ser pêxember û kes û karên wî di eşheda dawîn de, li gel silavdanê.”

Ezmûnger got: “Siheta te xweş! Niha jî kanî ji min re bibêje bê gelo zekât li çi dikeve?” Tewedûdê got: “Zekat li zêr û zîv dikeve, li deve, çêlek, pez, gînim, ceh, garis, fûl, nok, birinc, mewij û xurmeyan dikeve.” Ezmûnger got: “Sihetxweş. Lê gelo zekata zêran çend ji çenda ye?” Tewedûdê got: “Hetanî bi bîst misqalan jî zekat lê nakeve, gava mêjara zêr gihîşt bîst misqalan nîv misqal zekat lê dikeve. Çiqasî zêdetir bibe jî, zekat jî li gora wê zêdetir dibe.” Ezmûnger got: “Baş e, zekata diravan çiqas e?” Tewedûdê got: “Hetanî bi dused dînarî, pênc dînar lê dikevin û çiqasî zêde bibe jî, zekata wê jî ew qasî zêde dibe.” Ezmûnger got: “Baş e, zekata deveyan çawa ye?” Tewedûdê got: “Ji pênc deveyan hetanî bi bîst û pêncan, çêlikeke nû jidayîkbûyî zekata wê.” Ezmûnger got: “Baş e, zekata pez çawa ye?” Tewedûdê got: “Serê çil pezî yek ji wan zekat e.”

Ezmûnger got: “Sihetxweş, niha jî kanî ji min re bêje bê diderbarê rojiyê de tu çi dizanî?” Tewedûdê got: “Ferzên rojiyê; nêtlêkirin, îmsak û dûrketina ji hemû rengên xwarin, vexwarin, pevşabûna cînsî û vereşandinê. Rojî ferz e li ser hemû misilmanên kamil û gihîştî, ji xeynî jinên ku di reglê de ne yan jî zarok danîne. Ji bo destpêkirina rojiyê divê heyv were dîtîn ango çavdêriya stêrknasiyê agahî bide û piştrast bike. Di rojiyê de nêtgirtin wacib e û bêyî wê qet nabe. Derengxistina sihorê û leza di rojîvekirinê de jî, sunetên wê ne. Sunetên dîtir jî xwendina Qur’anê, zikir, xweşaxaftin û dûrketina ji gotinên çewt û nexweş.”

Ezmûnger got: “Her bijî ji te re. Lê gelo çi tişt rojiya mirov xera dike?” Tewedûdê got: “Tiştên ku rojiya mirov xera dikin; çi tiştê ku di qirika mirov re derbas dibe yan jî ji qirika mirov derkeve, rojiyê xêra dike.” Ezmûnger pirsî: “Û tiştên ku rojiyê xera nakin çi ne?” Wê jî got: “Donên ku mirov wan di laşê xwe dide, çavkilkirin, toza rê û daqurtandina xweziyê, meniya ku di xew de ji ber mirov diçe, kewandina bi hicaman, nêrîna li jineke biyan û fesede rojiyê xera nakin.”

Ezmûnger got: “Baş e, ka behsa nimêja herdu cejnan bike?” Tewedûdê got: “Nimêja herdu cejnan du rekaetên sunet in û bê bangdan û îqamet in. Lê belê nimêja bihevî ye, di rekaeta ewil de heft tekbîr in ji xeynî ya îhramê

16 . Wateya wê: Kesê ku spasiya Xwedê dike, dengê wî diçe wî ango dengê wî tête bihistin.

û di ya duduyan de jî pênc tekbîr in ji xeynî tekbîra qiyamê, li gora mezhebê Şafiî, rehma Xwedê lê be.”

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 446’EMÎN

Şehrezadê got:

Ezmûnger got: “Her bijî ji te re! Niha jî ka ji min re behsa nimêja girtinarojê û girtinahevyê bike?” Tewedûdê got: “Du rekaet in, bê bangdan û bê îqamet in. Di her rekaetekê de du qiyam in, du tewandin û du sicûd in. Di sicûda dawîn de silavlêdan e û piştî dua û îstixfar e li şûna tekbîra xutbeyên herdu cejnan. Divê kirasê xwe jî serobino bikî û bi xiroşkari lavayan ji Xwedayê xwe bikî.”

Ezmûnger got: “Sihetxweş be. Kanî îcar behsa nimêja wetrê bike?” Tewedûdê got: “Bi kêmanî rekaetek e û herî zêde jî yazdeh rekaet in.” Ezmûnger got: “Baş e, nimêja dûha çi ye?” Wê got: “Nimêja dûha bi kêmanî du rekaet in û herî zêde jî dozdeh rekaet in.” Ezmûnger got: “Kanî behsa îtikafê bike?” Wê got: “Îtikaf sunet e.” Wî got: “Şertên wê çi ne?” Wê got: “Nêtgirtin e, nederketina ji mizgeftê ye, rojgirtin û dûrketina ji jinan û ji axaftinê ye.”

Ezmûnger got: “Her bijî! Ka niha jî ji min re bibêje bê hec li kê ferz e û çawa?” Tewedûdê got: “Kesê ku biçe hecê, divê ku balix be, yanî kamil bûbe û têgihîştî be, divê misilman be û hêza wî ya madî hebe ji bo çûnê. Hec, di seransera temenê mirov de carekê tenê ferz e.” Ezmûnger got: “Gelo tiştên ku di hecê de ferz in, çi ne?” Wê lê vegerand û got: “Îhram¹⁷, sekna li Erefeyê¹⁸, tewafa kevirê reş, rûkurkirin, porkurtkirin û nêtlêkirin e.” Ezmûnger got: “Îcar ferzên umreyê çi ne?” Wê got: “Îhram, tewaf û dua ne.” Ezmûnger berdewam kir û got: “Ferzên îhramê çi ne?” Wê got: “Jixwekirina hemû kincên ku bi ta hatine dirûtin, dûrketina ji rihetiyê, kurkirina por, birrîna neynûkan, dûrketina ji daxwazên zayendî û nêçîrê.”

Ezmûnger got: “Baş e, sunetên hecê çi ne?” Tewedûdê got: “Bang û lavekariya bi gotina ‘lebeyk!’, tewafa destpêkê, xatirxwestin, razana li Muzdelifeyê û li Mînyayê û avêtina keviran(recim).” Ezmûnger got: “Sihetxweş, niha jî ka behsa cîhadê bike?” Wê got: “Şertên cîhadê ew in ku kafir bi ser me de bên û tehdê li me bikin; divê îmamê me hebe û mohlet bê-te dayîn; divê di pêşwazîkirina dijmin de biryardarî û sebat hebe. Sunetên

17 . Îhram: Cawê spî yê yekperçe yê ku hecî li bedena xwe digerin, li şûna kincan.

18. Erefe: Girekî nêzikî Mekkeyê ye. Hz. Muhammed li wê deverê xutbeya xwe ya dawîn kiribû ji misilmanan re (xutbetul weda).

cîhadê jî ew in ku lêsorkirina şervanan hebe, lewra Xwedayê gewre di vê hêlê de dibêje; ey pêxember, bawermendan li şer sor û har bike!”

Ezmûnger got: “Her bijî ji te re. Îcar ferzên kirîn û firotinê çi ne?” Tewedûdê got: “Şertên kirîn û firotinê erêkirin û pejirandin e, ango malê di bazarê de milkê yekî be û bi nêvî bide yekî din ji bo hevdaşeşkirina dahatîna wî, bê faîz û riba. Suneta kirîn û firotinê jî ew e ku bijare û neqandin tê de hebe yan jî veqetandin.” Ezmûnger got: “Tiştên ku serbiser bi hev neyên guhertin hene gelo?” Cariyeyê got: “Hene. Di vê mijarê de hedîseke pêxember heye, tê de qedexa dike ku xurme bi dimsê, hejîrên hişk bi yên terr, goşt bi qawirmê û nivîşk bi rûn were guhertin di kirîn û firotinê de. Yanî çi tiştên ku ji heman celebî bin, pevguhertina wan ne cayîz e.”

Gava ezmûnger bala xwe dayê ku bi pirsan nikare wê têk bibe, di fen û fûtan de fikirî. Lewre bi çavên xwe dît bê keçik çiqasî jîr, zana û têgihîştî ye. Di dilê xwe de got: “Ez fenekê lê nekim, ez nikarim wê têk bibim di hizûra xelîfe de û ez ê biçûk bikevim!” Rabû jê re got: “Gelo di ziman de û ji hêla watenasiyê ve çi wateya destnimêjê heye?” Tewedûdê got: “Destnimêj, di ziman de tê wateya paqijî û pakbûna ji gemar û qirêjiyê.” Ezmûnger got: “Û nimêj têtê çi wateyê di ziman de?” Wê got: “Tê wateya duayên xêrê.” Wî got: “Wateya abdestê çi ye di ziman de?” Wê got: “Teharet û pakbûn e.” Wî got: “Çi wateya rojiyê ye di ziman de?” Wê got: “Parêz e.” Got: “Çi wateya cîhadê ye?” Wê got: “Parastin e.”

Û bi wî hawayî Tewedûdê tu mahne di destê ezmûnger de nehiştin.

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 447’EMÎN

Şehrezadê got:

Gava ku Tewedûdê hemû pirsên feqîhê ezmûnger bi serkeftî bersivandin, ezmûnger bêçare rabû ser xwe û got: “Eşhedû enla îlahe illallah! Ey emîrê bawermendan, ev cariyeya hanê ji feqîhekî zanatir e di şerîetê de!”

Tewedûdê got: “Ez ê pirsekê ji te bikim û tu bersiva wê bide, heger bi rastî jî tu feqîhekî zana yî.” Ezmûnger got: “Ka bipirse?” Wê got: “Tîrên olê çi ne û çend in?” Ezmûnger got: “Tîrên olê deh in. Tîra ewil şehadet e, ya din nimêj û fitre ye, ya din zekat û teharete, ya çaran rojî ye, ya pêncan hec e, ya şeşan cîhad û kifayet e, ya heftan daxwazkariya qencyê ye, ya heştan lihimberderketina xerabiyê ye, ya nehan komalayetî ye, ya deha jî xwestina zanîne û rêya baş e.”

Tewedûdê got: “Sihetxweş lê pirseke din jî heye. Ka ji min re bibê-

je bê bingeheên olê çi ne?” Ezmûnger got: “Peymana rast, rastiya meqsedê, parastina sinoran, dilsoziya peymanê.” Tewedûdê got: “Raste lê pirseke din jî heye?” Ezmûnger got: “Bêje bê çi ye?” Wê got: “Şaxên îslamê çi ne?” Ezmûnger saetekê sax bêdeng ma û bersiv neda. Tewedûdê got: “Ka wê cubeya hanê ji xwe bike, ez ê ji te re bibêjim?” Xelife ket dewrê û got: “Ka tu bersiva pirsê xwe bide, ez ê cubeya wî jê bikim?” Tewedûdê got: “Şaxên îslamê bîst û dudu ne! Esasgirtina pirtûka pîroz, şopdarkirina pêxemberê Xwedê, nekirina zilm û destdirêjiyan, nexwarina malên heram, dûrketina ji gunehan, bergiriya li himber zaliman, tobekarî, kûrbûna di zanîna olî de, hezkirina pîroziyan, şopandina Qur’anê, peyitandina pêxembertiya nebî û pêxemberan, tirsê ji mesixbûnê, amadebûna ji mirinê re, hêza bîr û baweriyê, hêza lêborînê û hêzdariya di rojên teng de, sebirkerîya li himber mûsibetan, naskirina Xwedê, naskirina pêxemberê wî Muhammed- silavên Xwedê li ser bin-, dijminahiya bi îblîs re, cîhada li himber nefsa xwe û himberderketina li himber wê, li gel dilsoziya bi Xwedê re.”

Gava ew gotin ji devê wê bihîstin, Xelife ji ezmûnger re got: “Ka wî cubeyê xwe û wan nîşanan ji xwe bike!” Ezmûnger, ew hemû ji xwe kirin, rûyê wî ket ber wî ji fedîyan û paşpaşkî bi şûn de çû. Piştî ezmûngerekî din rabû ser xwe û ji Tewedûdê re got: “Ey cariyeya mîrzayan, ez ê tenê çend pîrsan ji te bikim.” Wê got: “Kerem bike, pîrsên xwe bike?” Ezmûnger got: “Şertên misilmantiya rast û durîst çi ne?” Tewedûdê got: “Qeder û çarenûsa naskirî, zayenda naskirî û ecla naskirî.” Ezmûnger got: “Her bijî! Lê gelo ferzên xwarinê û sunetên wê çi ne?” Tewedûdê got: “Ferzên xwarinê; pêzanîna ku Xwedê rizqê wî daye wî, spasdariya Xwedê li ser wê dayînê.” Ezmûnger got: “Spasdarî çi ye?” Tewedûdê got: “Dilyeqîniya mirov bi wan nîmetên ku Xwedê dane mirov û dûrketina ji temahkariyê ye.” Ezmûnger got: “Îcar were ser sunetan?” Tewedûdê got: “Sunetên xwarinê ev in: Bilêvkirina besmeleyê, şûştina destan, rûniştina li ser kulîmeka çepê, xwarina bi sê tiliyan û xwarina ji ber xwe.” Ezmûnger got: “Sihetxweş, îcar edeb û sinca xwarinê çi ye?” Tewedûdê got: “Biçûkkirina gepa xwarinê, neaxaftin û nenêrîna li kesê himberî xwe.” Ezmûnger got: “Sihetxweş!”

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 448'EMÎN

Şehrezadê got:

Ezmûnger pirseke din kir û got: “Baweriyên dil çend in û dijberên wan çi ne?” Tewedûdê got: “Baweriyên dil sisê ne û dijberên wan jî sisê ne. Baweriya yekê, baweriya olê ye, dijbera wê jî hevaltiya kufrê ye. Baweriya dudan; baweriya bi sunetên pêxember e û dijberê wê jî, hewesdarî û he-

valtiya rêyên şaş. Baweriya sisiyan jî, taet e û dijberê wê jî gunehkariya bê serûber e.” Ezmûnger got: “Her bijî! Ka ji min re behsa şertên destnimêjê bike?” Tewedûdê got: “Misilmantiya kes, kamilbûna mirov, ava pak û paqij, tunebûna astengiyên bedenî, tunebûna astengiyên şerîetê.”

Ezmûnger got: “Baş e, ka îcar behsa îmanê bike?” Tewedûdê got: “Îman û bawerî heşt beş in: Baweriya bi Xwedê, baweriya bi koletiya însan, baweriya bi taybetmendiya însan, baweriya bi mexkurinê, baweriya bi pêxember û nebi û pirtûkên pîroz, baweriya bi melaîketên wî, baweriya bi qeza û qederê – baş û xerabê wê-, baweriya kesê mesixbûyî û yê ku hatiye mesixkirin.” Ezmûnger got: “Her bijî ji te re. Ka sê tiştên ku sê tiştan berbend bike, ji min re bibêje?” Tewedûdê got: “Tê gotin ku Sufiyanê Sewrî gotiye: Sisê siyan dibin; mezexkirin diravan tune dike, nefsa mezin ruh biçûk dike, rihetiya laş êşê dide giyanê mirov.”

Ezmûnger got: “Baş e lê gelo mifteyên asîmanan û deriyên wê çend in?” Tewedûdê got: “Xwedê gotiye, me deriyên asîmanan vekirin û pêxemberê me jî gotiye; kes nizane bê çend deriyên asîmanan hene ji xeynî afirînerê wê û tu kesek nîn e ku deriyekî wî di asîman de tune be, ku tê re daketiye, rizqê xwe dîtiye û deriyekî din jî ku xêra wî û karê wî tê re hilkişê. Ew deriyê rizqê wî nayê girtin hetanî ku sax be û deriyê ku kar û xêrên wî tê re hildikişê jî nayê girtin hetanî ku ruhê wî neçe ba Xwedayê wî.” Ezmûnger got: “Sihetxweş, de ka îcar ji min re behsa tiştêkî, nîvtiştêkî û netiştêkî bike?” Tewedûdê got: “Bawermend tiştêk e, munafiq nîvtiştêk e û kafir netiştêk e.”

Ezmûnger got: “Kanî ji min re behsa cureyên dilan bike?” Tewedûdê got: “Dilê tekûz, dilê qerisî, dilê aram, dilê hişyarker û dilê ronakbîr. Dilê tekûz, ê hevalê mirov e. Dilê qerisî, yê kafiran e. Dilê aram, ê bawermendên metirsîdar e. Dilê hişyarker, dilê pêxemberê umetê ye, dilê ronakbîr jî, dilê ku mirov wî dişopîne ye. Ji aliyekî din ve jî sê cureyên dilan li ba zanayan hene: Dilê bi dinyayê ve girêdayî, dilê bi axîretê ve girêdayî, dilê bi xwedayê xwe ve girêdayî. Hinek jî dibêjin sê cureyên dilan hene: Dilekî girêdayî ku ew dilê kafiran e, dilekî tune ku ew dilê munafiqan e û dilekî qewîn ku ew dilê kesê bawermend e. Hinek jî dibêjin sê cure dil hene: Dilekî bi ronahiyê vekirî li ser baweriyê, dilekî birîndar bi tirsê hicranê û dilekî tirsok bi tirsê fedîkariyê.” Ezmûnger got: “Her bijî ji te re.”

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 449'EMÎN

Şehrezadê got:

Gava ku ezmûngerê duyemîn jî pirsên xwe qedandin, Tewedûdê ji

xelîfe re got: “Ey emîrê bawermendan, wîna gelek pirs ji min kirin, ka iznê bide min, ez jî du pirsan jê bikim? Heger bersiva wan nede, ez ê cubeyê wî jê bikim, bila bê cube here?”

Ezmûnger got: “Tu çi dixwazî bipirse!” Tewedûdê got: “Derbarê baweriyê de tu çi dibêji?” Ezmûnger got: “Bawerî, vegotina bi ziman e, peyitandina bi dil e û pêkanîna bi kar e. Pêxemberê umetê – silavên Xwedê li ser bin- gotiyê bawerîya mirov inçex bi pênc meziyetan kamil dibe: Tewekeliya bi Xwedê, xwespartina Xwedê, şopandina emrê Xwedê, razîbûna bi qedera Xwedê û di hemû karan de armanckirina razîbûna Xwedê; ev ê wisa ji Xwedê hez dike, ji bo Xwedê dide û ji bo Xwedê bergirîya xerabiyê dike, da ku bawerîya wî kamil bibe.”

Tewedûdê got: “Kanî ji min re behsa ferza di ferzê de bike; ferza di destpêka her ferzê de ferza ku timî pêdiviya wê bi ferzekê heye, ferzeke ku di seranserê ferzê de heye û sunetêke di ferzê de û sunetêke ku ferz pê temam dibe.” Ezmûngerê duduyan bêdeng ma û bersiva pirsê wê neda. Xelîfe ji Tewedûdê xwest ku ew bersiva pirsê xwe bide. Wê jî got: “Ferza di ferzê de, naskirina Xwedê û pêxemberê wî ye; ferza ku pêwîstiya wê bi ferzekê heye, destnimêj e; ferza di seranserê ferzê de xusla ji cenabetê ye; suneta di ferzê de, di destûştinê de firikandina nav tiliyan û di şûştina rû de jî firikandina rîh da ku av hemû rûyê mirov şil bike û suneta ku ferz pê temam dibe jî sinetkirin e.”

Ezmûnger ket qalîkê xwe ji ber fediye, rabû ser xwe û got: “Emîrê bawermendan, Xwedê şahid e ku ev cariyeya hanê ji min zanetir e!” Piştê cubeyê xwe jî jixwe kir û paşpaşkî bi şûn de çû.

Ezmûngerê sisiyan hafîzê Qur’anê û zimanzanê wê bû. Rabû ser xwe û ji Tewedûdê re got: “Gelo te pirtûka pîroz xwendîye, tu fêrî ayetên nasîx û mensûx ên Medîneyî û Mekkeyî bûyî û te tefsîr û wateyên wan fêm kirîye?” Got: “Erê.” Ezmûnger got: “Ka bêje bê çend sûretên Qur’anê hene, çend dehik, çend ayet, çend herf, çend secde tê de hene û navê çend nebiyan tê de derbas dibe, çend sûretên wê Mekkeyî ne, çend Medîneyî ne û navê çend cûkan tê de derbas dibe?”

Tewedûdê got: “Qur’an, sed û çarde sûret in, heftê heb Mekkeyî ne, çil û çar jî Medîneyî ne. Dehikên wê şeşsed û bist û yek in û ayetên wê jî şeş hezar û dused û sî û şeş in. Bêjeyên ku di Qur’anê re derbas dibin heftê û neh hezar û şeşsed û heftê herf in. Di xwendina Qur’anê de, xêra her herfekê deh qencî ne. Secdeyên Qur’anê jî çardeh in.”

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

Şhrezadê got:

Tewedûdê bersiva xwe berdewam kir û got: “Navê pêxemberên ku di Qur’anê re derbas dibin bîst û pênc in, ew jî ev in: Adem, Nûh, Îbrahîm, Îsmâil, Îshaq, Yaqûp, Yûsiv, Yeşû, Yûnis, Lût, Salih, Hûd, Şûayb, Dawid, Suleyman, Zulkefil, Îdrîs, Îlyas, Yehya, Zekerîya, Eyûb, Mûsa, Harûn, Îsa û Muhammed, silavên Xwedê li ser wan bin. Navên teyrên ku di Qur’anê de derbas dibin jî neh in; ew jî ev in: Kelmêş, mêşa hingiv, mêş, girikên firok, hudhud, kulî, qijak, başoke, şevşevok (barçemok) û teyrikê Îsa.”

Ezmûnger got: “Her bijî ji te re. Lê ka ji min re bibêje bê sûretê herî baş di Qur’anê de kîjan e?” Tewedûdê got: “Sûretê Elbeqera ye.” Ezmûnger got: “Kîjan ayet çêtirîn ayetên Qur’anê ye?” Wê got: “Ayeta Elkursî ye û ew ayet pêncî bêje ye û di her bêjeyekê de pêncî bereket hene.” Ezmûnger got: “Kîjan ayet xweştirîn e?” Wê got: “Xwedê Teala dibêje: ‘Di afirandina erd û ezmanan de û di dubarekirina şev û rojê de...’ hetanî bi dawiya ayetê.” Ezmûnger got: “Baş e, kanî ji min re bibêje bê kîjan ayet dadwertirîna ayetan e?” Wê got: “Gotina Xweda a ku dibêje; Xwedê Teala fermanê dide wê ku hûn bi dadwerî û qencî tevbigerin û hûn li merivên xwe miqate bin û fermanê dide we ku hûn ji xerabî û gunehan, ji zilimkariyê dûrkevin!” Ezmûnger got: “Ayeta temahkariyê kîjan e?” Wê got: “Ayeta ku Xwedê tê de dibêje: Gelo her kes temahiyê dike ku biçê bihuştê!” Ezmûnger got: “Tikan di kîjan ayetê de ye?” Wê got: “Di ayeta ku dibêje: Ji wan misrifên ku hêviya xwe ji min birîne re bibêje, bila bêhêvî nebin ji rehma Xwedê, lewre Xwedê hemû gunehan efû dike û ew dilovanekî dilovîn e!”

Ezmûnger got: “Her bijî ji te re. Lê gelo bi kîjan curexwendinê tu Qur’anê dixwîni?” Tewedûdê got: “Bi xwendina xelkên bihuştê û ew curexwendineke sûdwer e.” Ezmûnger got: “Di kîjan ayetê de behsa derewên pêxemberan dike?” Wê got: “Di ayeta ku Xwedê teala dibêje; û xwîneke derew di qemîsê wî dan û ew birayên Yûsiv bûn.” Ezmûnger got: “Di kîjan ayetê de behsa rastgotiniya kafiran derbas dibe?” Tewedûdê got: “Di ayeta ku Xwedê Teala tê de dibêje; Cihûyan got, fileh li ser rêya şaş in û filehan jî got cihû li ser rêya şaş in û hemûyan jî rast digot.” Ezmûnger got: “Di Qur’anê de, Xwedê Teala kîjan ayet ji bo xwe gotiye?” Wê got: “Ayeta ku tê de dibêje: Min ins û cin xuliqandine, tenê ji bo ku îbadetê ji min re bikin.” Ezmûnger got: “Di kîjan ayetê de ferîşte diaxivin?” Wê got: “Em te pîroz dikin û her dem bi navê te dixwînin!”

Ezmûnger got: “Lê di derbarê ‘Eûzû billahî mîneş şeytan errejîm’¹⁹ de tu çi dizanî?” Tewedûdê got: “Eûzû wacib e li ser mirov di dema xwendina Qur’anê de. Lewre Xwedayê me dibêje: Gava te Qur’an xwend, hewara xwe bigihîne Xwedê, bo xwe parastina ji şeytanê lanetlêhatî.” Ezmûnger got: “Di

19 . “Ez hêzê û mededê ji Xwedê dixwazim ku min ji şeytanê lanetlêhatî bisitirîne!”

derbarê bilêvkirina Eûzû û curegotinên wê de tu çi dizanî?” Tewedûdê got: “Hinek dibêjin: Hewara min di Xwedayê bihistok û zana de, ji şeytanê lanetlêhatî. Û hinek jî dibêjin: Hewara min di Xwedayê hêzdar de lê ya çawa ku di Qur’anê de hatiye gotin û di sunetê de jî derbas dibe, Pêxemberê me jî gava ku dest bi xwendina Qur’anê dikir, digot: “Hewara min di Xwedê de ji şeytanê lanetlêhatî. Tê gotin ku Nafî gotiye; bavê min got ku gava pêxember – silavên Xwedê li ser bin- derengê şevê radibû nimêjê, digot: Xwedê mezin e, pir mezin e, gelek spasî ji Xwedê re û subhan ji wî re sibe, nîvro û êvarê. Piştî jî digot: Hewara min di Xwedê de ji şeytanê lanetlêhatî û hemû tasewasên wan.” Tê gotin ku Îbnîl Ebas -Xwedê jê razî be- gotiye: Gava ku Cibrîl – aleyhûselam – daket ser pêxember - silavên Xwedê li ser bin – ew fêrî Eûzû kir û jê re got: Ey Muhammed, bêje ‘Eûzû billahî mîneş şeytan errecîm’ û piştî got: bixwîne bi navê Xwedayê xwe yê ku mirov ji dilopeke xwîn afirandine!”

Gava ku Ezmûnger ew gotin ji devê wê bihistin, şaş û metal ma li himberî zanîn û zimanşîrîniya wê. Lê dîsa jî bi hêviya ku nigê wê li kevirekî bilikume, pirseke din jê kir û got: “Di derbarê ‘Bismillahirrahmanirrahim’²⁰ de tu çi dibêji, gelo ew ji ayeteke Qur’anê ye yan na?” Tewedûdê got: “Belê, ayeteke ji Qur’anê ye û di sûretê Ennemil de derbas dibe û di serê her sûretê de jî heye. Lê belê nelihevkirineke mezin di navbera zanayan de heye di vê mijarê de.”

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 451’EMÎN

Şehrezadê got:

Îcar şahînşahê min ê bextewar Şehriyar, gava cariyeyê ew bersiv da, ezmûnger got: “Başe, naxwe ji min re bibêje bê çima Bismillahirrahmanirrahim di serê Sûreta Beraetê de nehatiye nivîsandin?” Tewedûdê got: “Gava ku hevpeymana di neqeba pêxember û kafiran de xera bû û di derbarê wê bûyerê de Sûretê Beraetê daket, pêxember – silavên Xwedê li ser bin- Elî kurê Ebû Talib şand cem kafiran, ji bo ku wî sûretî ji wan re bixwîne. Ew jî çû, sûret ji wan re xwend bêtî ku Bismillahirrahmanirrahim bixwîne.”

Ezmûnger got: “Ka behsa fêdeyên Bismillahirrahmanirrahim bike?” Tewedûdê got: “Tê gotin ku pêxemberê umetê gotiye: Ez Bismillah li ser çi dixwînim, berket dikevê. Tê gotin ku di ciyekî din de jî gotiye: Çi nexweşê ku min bismillah li ser gotiye, rihet bûye. Dîsa tê gotin ku gava Xwedayê izzetê gerdûn çekiriye, her tişt dilerizî. Lê gava Bismillah li ser nivîsand, her

20 . “Bi navê Xwedayê dilovanê dilovîn.”

tişt aram bû û di cihê xwe de sekinî. Vêca gava Bismillah daket ser pêxember, wî got: Min bawer kir êdî bi girtina heyvê û mesixbûn û noqbûnê. Ya rast sûdên besmeleyê pir in û bereketên wê nayên jimartin, şîroveyên wê jî zêde ne. Tê gotin ku pêxemberê me gotiye; roja qiyametê, zilamek hesabê gunehên xwe dibîne û di encamê de Xwedê dibêje wî bavêjin nav agir. Ew jî dibêje; Xwedayê min, te neheqî li min kir! Xwedê dibêje; çima? Ew dibêje; ma te navê xwe nekiribû dilovînê dilovan di serê her besmeleyê de û niha jî tu dixwazî min biavêji nava agir? Li ser vê gotina wî, Xwedê dibêje; rast e, min navê xwe kiribû dilovînê dilovan, ka vî bendeyê min bibin bihuştê, ez li wî tîm rehmê, lewre ez dilovînê dilovanan im.”

Ezmûnger got: “Te pir xweş got, her bijî ji te re!” Piştî serê xwe berra ber xwe da û ponijî, ji xwe re got: “Ev tiştêkî ecêb e! Ev carîye çawa ew qasî dizane û ew qasî xweş diaxive? Lê dîsa jî divê ez wê tengav bikim, zora wê bibim!” Jê re got: “Kanî bersiva min bide û ji min re bibêje bê Xwedê Teala ev Qur’an çawa daxist ser pêxemberê me?” Tewedûdê got: “Cibrîl – silavên Xwedê li ser bin- ev Qur’an ji ba Xwedê daxist ser pêxemberê me beş bi beş, li gora bûyeran û di nava bîst salan de.” Ezmûnger got: “Her bijî! Lê sûreta ewil daket kîjan bû gelo?” Tewedûdê got: “Sûreta Elaleq bû, li gora gotina Îbnîl Ebbas û li gora vegotina Îbn Cabir Bîn Ebdullah Sûreta El Mûdessir bû. Ayet û sûretên din jî li pey wan hatin û berdewam kirin.” Ezmûnger got: “Naxwe ka ji min re bibêje bê ayeta ku dawiyê daket kîjan bû?” Tewedûdê got: “Tê gotin ku ayeta dawîn, ayeta Er-riba²¹ bû, hinek jî dibêjin ku ayeta; Gava ku Xwedê Serkeftin da we... bûye.”

Li Şhrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 452’YEMÎN

Şhrezadê got:

Ezmûnger got: “Her bijî! Lê gelo çend sehabiyan²² Qur’an berhev kirin di dema pêxember de?” Tewedûdê got: “Çar sehabiyan Qur’an berhev kirin; Ûbey Bîn Kan, Zeyd Bîn Sabit, Ebû Ûbeyde Amîr Bîn El Cerrah û Osman Bîn Effan, Xwedê ji gişan razî be.”

Ezmûnger got: “Lê gelo xwendina Qur’anê ya rast ji ber xwendina kê dihate girtin?” Tewedûdê got: “Ew jî ji ber çar sehabiyan dihat girtin: Ebdullah Bîn Mesûd, Ûbey Bîn Kab, Meaz Bîn Cebel û Salim Bîn Ebdellah in.” Ezmûnger got: “Di derbarê gotina Xwedê û ‘tîstên ku li ber peykeran tîst serjêkirin’ de tu çi dizanî?” Tewedûdê got: “Ew peyker, pûtên ku li şûna

21 . Riba: Faîz, stendina pereyên zêde di ser deyn re.

22 . Sehabî: Hewarî, hevalên pêxember ên dozê.

Xwedê îbadet ji wan re tê kirin in, Xwedê mirov ji wan biparêze!”

Ezmûnger got: “Çi wateya gotina ji Xwedê re ‘Tu tiştê di dilê min de dizanî û ez tiştê di dilê te de nizanî’ heye?” Tewedûdê got: “Yanî tu tiştê di nava min de, tu rastiya min dizanî û ez ya te nizanî. Gotina ku dibêje, ‘Tu zanayê xeybê yî’ vê yekê piştrast dike.” Ezmûnger got: “Tu çî dizanî di derbarê gotina Xwedê de ku dibêje ‘Ey bawermendino, xweşiyên ku Xwedê li wê helal kiriye, wan li xwe qedexe nekin!’ ” Tewedûdê got: “Rehma Xwedê li şêx be, wî ji min re got ku ew qewmek ji misilmanan bû ku dixwestin rês li xwe bikin û ewkên xwe jî jêbikin. Ev ayet jî daket ji bo ku pêşiya wan bigire. Qûtade jî dibêje ku ev kes, beşek ji eshabên pêxember bûne; Elî Bîn Ebî Talib, Osman Bîn Mûsab û hinekên din bûne, ku gotibûn em ê xwe bixesînin, rês li xwe bikin û mîna keşeyan, xwe ji xiroşê re veqetînin. Ev ayet jî ji bo wan daketiye.”

Ezmûnger got: “Tu di derbarê gotina Xwedê ya ‘Xwedê, Îbrahîm ji xwe re kir heval’ de çî dibêjî?” Tewedûdê got: “Hevalê wî yê hejar û feqîr ê ku pêdiviya wî timî bi Xwedê heye. Li gora şîroveyeke din jî, ew hevalê ku xwe ji her tiştî qut kiriye û tenê xwe daye Xwedê.”

Gava Ezmûnger dît ku carîye mîna ewrekî derbas dibe di ser pirsên wî re, bêtî ku bilikume jî bi wî zimanê xwe yê zelal û şîrîn; neçar ma ku serdestiya wê qebûl bike di zanînê de. Rabû ser xwe û ji xelîfe re got: “Emîrê bawermendan, bi navê Xwedê ev cariyeya hanê, şerîet û Qur’anê ji min jî çêtir dizane.”

Wê gavê Tewedûdê jê re got: “Ez jî dixwazim pirsekê tenê ji te bikim, heger te bersiva wê da ez ê serdestiya te qebûl bikim û heger te neda jî ez ê wî cubeyê te ji te bikim?” Xelîfe got: “Pîrsa xwe jê bike!” Tewedûdê got: “Kanî ji min re bibêje bê di kîjan ayetê de bîst û sê kaf, di kîjanî de şazdeh mîm, di kîjanî de sed û çil eyn derbas dibin û kîjan hizp²³ ji celaletê xalî ye?” Ezmûnger serê xwe bera ber xwe da, nikaribû bersiva pîrsa wê bida. Tewedûdê got: “Nexwe wî cubeyî ji xwe bike!” Ezmûnger cubeyê xwe ji xwe kir. Tewedûd li xelîfe zivirî û jê re got: “Emîrê bawermendan, ayeta ku şazdeh mîm tê de ne, Sûreta Hûd e; ayeta ku sed û çil eyn tê de derbas dibin jî sûreta Elaraf e. Hizba ku celalet tê re derbas nabe jî, beşa ji Sûretê Îqterebettusaa û İnşeqelqemer, hetanî Sûretê Errahman û Elwaqia ye.”

Wê gavê, ezmûngerê ku cube ji xwe kiribû, ket ber fediyeke mezin û paşpaşî bi şûn de çû.

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

23 . Hizp: Beşeke Qur’anê ye ku ji çend sûretan pêk tê.

ŞEVA 453'YEMÎN

Şehrezadê got:

Wê gavê bijîşkê jêhatî û hoste rabû ser xwe, bi pêş de hat û got: “Zanînên Qur'an û şerîetê qedîyan, de êdî xwe ji zanînên bedenê re amade bike û ji min re bibêje bê tu di derbarê însan de çi dizanî, çawa hatiye afirandin, çend reh di laşê wî de ne, çend movikên piştê wî hene, reha ewil di ku de ye û çima navê ‘Adem’ lê hatiye kirin?”

Tewedûdê got:

Navê ‘Adem’ lê hat kirin ji ber rengê wî yê esmer e. Lewre ‘Adem’ di zaravê aramî de, tê wateya rengesmer. Hinek jî dibêjin, ji ber ku ew ji axê hatiye afirandin, yanî ji qaşilê erdê, navê ‘Adem’ lê kirine, ji ber ku di zîmanê me de ji qaşilê erdê re tê gotin ‘adîm’ û ‘adem’ jî ji wê gotinê afirîye. Li gora vê angaştê dawîn jî, serê Adem ji axa kabeyê, singê wî ji axa rojhilatê û nigên wî jî ji axa rojavayê hatine afirandin. Gava afirandiye jî, Xwedayê gewre heft derî di serê wî de vekirine: Du çav, du guh, du kunên pozî û devek. Du kunên din jî di jêra bedena wî de çekirine ku yek ji pêş ve ye û ya din jî ji paş ve ye.

Herdu çav kirine amûrên dîtînê, herdu guh kirine amûrên bihîstinê, herdu kunên poz kirine amûrên bêhnkirinê, dev kiriye amûra çêgirtinê û zîman bi xwe jî kiriye berdevkê wijdanê însan. Her wiha Xwedayê gewre bedena Adem ji çar endamên sereke afirandiye: Av, ax, agir û ba. Ji ber wê ye ku sefraya adem bi ser agir ve çûye ku mîna wî germe jî. Reşahiya di bedenê de jî bi ser axê ve çûye û mîna wê sar e; belxema wî jî bi ser avê de çûye û mîna wê şil û hêwî ye. Xwîna bedenê jî bi ser bayê ve çûye, hem germ e û hem jî hêwî ye mîna wê.

Di bedena însan de, sêsed û şêst reh hene, li gel dused û çil hestiyî. Di bedenê de sê giyanên ajalî, nefsanî û xwezayî hene, ji bo ku her yekê ji wan hekemek daniye ser serê wan.

Di bedenê de dilek, zengelorkek, aşikek, pişikek, du kezêb, du gurçîk, ziravek, fatreşkek, şeş rovî, du kulîmek û mejiyek heye. Bedena însan, bi giştî ji hestî, xwîn, çerm û pênc amûrên pênc sehekan: Dîtin, bihîstin, bêhnkirin, destdayîn û çêgirtinê hatiye çêkirin. Afirînerê me dil xistiye aliyê çepê jî singê mirov, ceger xistine kêleka dil ji aliyê rastê ve. Aşîk jî di pêşiya dil de bi cih kiriye û herdu perên kezêba spî jî kirine perwane ji dil re; di binya wan de jî perdeyek kişandiye di neqeba wan û roviyan de. Parsû û parxan jî mîna qefesekê di hawîrdora wan de bi cih kirine, da ku bibin mertal ji dil û hinavan re.

Ezmûngerê bijîşk got: “Her bijî ji te re! Lê gelo tu dizanî bê çend bêrîk

di mejiyê însan de hene?” Tewedûdê got: “Sê berîk hene û ew hersê berîk jî serdestiyê li ser pênc hêzan dikin, ku ji wan re tê gotin “Sehekên Hundirîn”. Navê wan sehekan jî ev in: Seheka hevbeş, seheka xeyalan ango nîgaşan, seheka kar û baran, seheka tiştên razber û seheka bîrewiriyê.”

Ezmûngerê bijîşk got: “Baş e, ka îcar ji min re behsa qerqûdeya însan bike?”

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 454'EMÎN

Şehrezadê got:

Tewedûdê bersiva ezmûnger da û got:

Qerqûdeyê bedena însan bi giştî ji dused û çil hestiyê pêk tê. Ev hestî giş li ser sê beşan dabeş dibin: Serî, gewde û her çar mil û paq. Serî bi xwe jî du beş in: Rû û totik. Rû, ji çena jêr û çena jor pêk tê. Çena jorîn ji yazdeh hestiyên pêk tê û ya jêr ji hestiyekî tenê, lê sîh û du diran jî li ser herdu çenan bi wekhevî belav dibin. Totik jî ji heşt hestiyên pêk tê ku her çar hestîkên guhên hundir jî lê zêde dibin.

Hestiyên di gewdeyê mirovan de jî dibin sê beş: Movikên piştê, sing û hestiyên kodikê, ango laqûn. Movikên piştê ji bîst û çar hestiyên pêk tê. Hestiyên sing jî ji bîst û çar parsûyan pêk tê ku nivê wan li aliyê çepê ne û nivê mayî jî li aliyê rastê ne. Hestiyên laqûnê jî ji boçik û qarçik û herdu hestiyên sîvanokê pêk tê.

Em werin ser herdu mil û herdu paqan. Her milek ji çar beşan pêk tê. Girmilk, serenîşkê, binenîşkê û dest. Girmilk ji du hestiyên pêk tê: Bazinê stû û ferşik ku ew in ên çepil bi qefesa sing ve girêdidin. Serenîşkê jî, tenê ji hestiyekî pêk tê. Hestiyên di biniya enîşkê re jî dudu ne. Dest jî dibe sê beş: Bazin, kefa dest û tilî. Di bazinê dest de, heşt hestî hene ku çareçar li ser du rêzan di ber hev re rêz kirî ne. Di kefa dest de jî pênc hestî hene. Tilî jî pênc in û her tiliyek ji sê hestiyên pêk tê. Tenê tiliya mezin ji du hestiyên tenê pêk tê.

Paq ango çim jî, ji sê beşan pêk tê: Ran ku ji hestiyekî tenê pêk tê; teşkê ku di biniya kabokê re ye ji sê hestiyên pêk tê; zilîk, pîjîk û ferşik. Nig jî mîna dest, dibe sê beş: pehnî û gwîzek ku ji heft hestiyên pêk tê û li ser du rêzan reqifandî ne; di rêza ewil de du hestî hene û di rêza duduyan de pênc hestî hene. Beşa din jî şehê nigan ne û ew jî ji pênc hestiyên pêk tê. Beşa sisiyan jî, her pênc tilî ne ku her yek ji sê hestiyên pêk tê û tenê tiliya mezin ji du hestiyên pêk tê.

Bijîşkê ezmûnger got: “Her bijî ji te re! Lê di derbarê rehan de tu çi dizanî?” Tewedûdê got: “Bingeha hemû rehan, dudu ne û rehên mayî jî hemû ji wan herduyan derdikevin û di seranserê bedenê de belav dibin. Ew qasî pir in ku ji xaliqê wan pê ve tu kes nikare wan bijimêre. Hinek dibêjin hejmara wan sêsed û şêst in, çawa ku berê jî me got. A girîng ew e, ku Xwedayê gewre ziman kiriye berdevkê bedenê, çav çira ne, bêvil cotkun in, herdu mil du bask in, ceger mişt in bi dîlovaniyê, faterêşk mala kenî ye, bêbextî di herdu gurçikan de ye, kezêba ser perwane ye, aşîk jî dolab e û dil endamê sereke ye di laş de. Heger dil saxlem be, laş hemû saxlem e. Heger dil xera bibe jî, hemû beden lawaz dibe.”

Bijîşkê ezmûnger got: “Nîşaneyên nexweşiyên endamên laş ên hundir û yên derve çi ne?” Tewedûdê got: “Heger bijîşk zana û zîrek be, bi destdana laş, dê bi ser cihê hişk vebe; dê germahiya laş nas bike; dê zuhabûn û hêwîbûna wî ji hev derxe û ji wan nîşaneyan rê bibe ser nexweşiyê. Nîşaneyên nexweşiyên hundir jî, zerbûna çavan nîşaneya zerikê ye û piştaxûz jî nexweşiyên kezêbê nîşan dide.” Ezmûnger got: “Her bijî!”

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 455'EMÎN

Şehrezadê got:

Ezmûnger pirsar xwe dubare kir û got: “Îcar nîşaneyên nexweşiyên hundirîn çi ne, te ew baş vekira dê çêtir bûya?” Tewedûdê got: “Heger mirov bi berfirehî bigire dest, nexweşiyên hundir bi şeş rêbazan têne tesbîtkirin: Rêbaza ewil, karê ku hatiye kirin; rêbaza duyem, tiştên ku ji laş derdikevin ji hilm û xwêdan û mîz û gû; rêbaza sêyem, ast û rengê êşê; rêbaza çarem, devera êşê; rêbaza pêncem, werma laş; rêbaza şeşem, hemû bertekên laş.”

Ezmûnger got: “Gelo êşa çi digihîje serî?” Tewedûdê got: “Xwarin xwarina li ser hev, beriya ku xwarina ewil bihele û têrxwarina li ser têrxwarinê ye ya gelan têk dibe. Kesê dixwaze temenê wî dirêj bibe, divê firavînê zû bixwe, êvarê nexwe û zêde bi jinan re ranekeve; divê kincan zêde li xwe neke, kincin sivik li xwe bike û hicaman zêde li xwe nexwe, xwîna xwe zêde bernede. Divê zîkê xwe bike sê beş; beşek ji xwarinê re, beşek ji avê re û beşekê jî vala bihêle ji hilmgirtinê re. Ji ber ku roviyên însanan hejdeh bihust in, divê şeş bihustan ji xwarinê re veqetîne, şeşan ji av û vexwarinê re û şeşan jî ji hewayê re. Di meşê de jî divê hêdî û bibaldarî bimeşe.”

Bijîşkê ezmûnger got: “Baş e, naxwe ka ji min re bibêje, bê nîşaneyên nexweşiya zerikê çi ne û kî ji vê nexweşiyê ditirse?” Tewedûdê got: “Nîşaneyên wê zerbûna rûyê mirov, tehîlbûna di dev de, zuhabûna di qirikê

de û birrîna ji xwarinê, li gel lezlêdana dil. Tiştên ku xwediyê wê digihîne radeya metirsîdar ji ev in; taya bişewat, bersam, ereq û bêxewî, werimîn û birîna aşik û roviyan û pir tîbûn, elametên vê nexweşiyê ne.” Ezmûnger got: “Her bijî, kanî ji min re behsa nîşaneyên nexweşiya reşenewe ango ta-unê bike?” Tewedûdê got: “Nîşaneyên vê nexweşiyê; dilbijokiya xwarinê ya derewîn, pîrbûna tasewas û xem û kul û kederan. Di rewşeke wisa de di-vê nexweş xwe vala bike, nexwe wê veguhere malîxoliya, cûzam, penceşêr, nexweşiya ziravê û birîna roviyan.”

Bijîşkê ezmûnger got: “Her bijî! De ka îcar ji min re bibêje, bê bijîşkî dabeşî çend beşan dibe?” Tewedûdê got: “Bijîşkî dibe du beş; yek jê zanî-na bergiriya nexweşiyê û teşxîsa wê, ya dîtir ji dermankirina nexweşiyên û başkirina nexweşan.” Ezmûnger got: “Vexwarin û girtina dermanan di kîjan wextî de baştirin e gelo?” Wê got: “Gava ku av di darik de bigire û evîn di goşî de bi cî bibe û bextê mirov vebibe, vexwarina derman ji pêkan dibe ku bera nexweşiyê bide ji bedenê.” Ezmûnger got: “Vexwarina avê di kîjan wextî de baştir e ji wextên din?” Wê got: “Gava mirov piştî xwarinê bi saetekê xwe ragire û di pey re vexwe, dê baştir be, çawa ku helbestkarekî ji gotiye:

Piştî xwarinê bi lez vemexwe wê avê
Da ku tu tehdeyê negihînî bedenê
Bêhna xwe fire bike bi qasî saetekê
Belkî di pey re tu bigihîji meqsedê”

Bijîşkê Ezmûnger got: “Kanî teşeyeke xwarin û vexwarinê bibêje ku rê li ber avgirtina navê ango sîrozê bigire?” Tewedûdê got: “Divê mirov xwarinê nexwe hetanî ku birçî nebe û gava ku bixwe ji hundirê xwe danegire; wek ku Galînos ji gotiye: Kesê ku dixwaze xwarinê bixwe, divê bêhnfireh tevbigere û lezê lê neke, şaşîtiyan neke. Pêxemberê me – silavên Xwedê li ser bin- gotiye: Aşik mala nexweşiyê ye û parêzgirtin ji serê dermankirinê ye û bingeha hemû nexweşiyên qelewbûn e!”

Li Şehrezadê bû sibe, wê ji gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 456'EMÎN

Şehrezadê got:

Bijîşkê ezmûnger pirsên xwe berdewam kirin û got: “Di derbarê hemamê de, tu çi dibêjî?” Tewedûdê got: “Şaban naçe hemamê!” Wî got: “Kîjan hemam baş in?” Wê lê vegerand: “A ku ava wê paqij be, banê wê bilind be, hewa wê fireh be, baş e. Divê ku şibake û bakêşên wê ji çar bin û li gora serdema payîz, zivistan, bihar û havînê were eyarkirin.” Ezmûnger got: “Xwarina baş kîjan e?” Tewedûdê got: “Xwarina ku jin çêbikin; a ku bi hê-

sanî çêbibe û bi hêsanî were xwarin. Xwarina herî baş jî tirîd e.” Ezmûnger got: “Lê baştirîn xwarin çi ye?” Wê got: “Goşt e.” Wî got: “Kîjan goşt?” Wê got: “Goştê mihan lê ne ye hişkirî, lew tu fêde di goştê hişkirî de nîn e.”

Ezmûnger got: “Di derbarê fêkiyan de tu çi dizanî?” Tewedûdê got: “Hemû di demsala xwe de xweş û bi fêde ne lê gava dema wan derbas bû, ji wan biqere.” Ezmûnger pirsî: “Der barê vexwarina avê de, tu çi dibêji?” Wê got: “Bi yek carê re venexwe, pir venexwe da ku serêşê bi te re çêneke û zerarên din jî nede te. Piştî derketina ji hemamê, piştî pevşabûna cinsî û piştî xwarinê jî venexwe hetanî ku pazdeh xulek di ser re derbas nebin. Piştî şiyarbûna ji xewê jî venexwe.” Wî pirsî: “Der barê meyvexwarinê de tu çi dibêji?” Wê bersiv da: “Qey gotina Xwedayê gewre ya ku dibêje: ‘Mey û qûmar û lîsk karê şeytan e, dûrî wan bikevin, ji bo ku hûn bi ser kevin!’ têra te nake? Xwedayê gewre di cihekî din de ji Qur’anê, dibêje: ‘Meyxuriyê û qûmarê ji te dipirsîn! Ji wan re bibêje ku gunehê mezî de heye li gel hinek fêdeyan jî, lê gunehên wê ji fêdeyan pirtir in!’ Ji wan fêdeyên ku pir behsa wan tê kirin: Hûrkin û helandina kevirkên di gurçikan de, xwirtkirina roviyan, alîkariya hezma xwarinê di aşik û roviyan de, belavkirina kul û kederan, parastina tenduristiya û hêzdarkirina laş û bedenê, başkirina nexweşiyên movikan, paqijkirina laş ji gemarê, xwirtkirina ajoyan, xwirtkirina pişik û mîzdankê, vekirin û firehkirina rehan, sorkirina rûçikan, şidandina masûlkeyên serî û mejî, derengxistina extiyariyê, afirandina kêf û şadûmaniyê di bedenê de. Heger Xwedayê gewre ew qedexe nekiribûya, dê tiştê cihê meya negirta, di wî warî de.”

Ezmûnger diya pirsî: “Meya baş kîjan e?” Wê got: “Ya ku heştê roj di ser re derbas bû û di ser re. Bi taybetî jî ya ji tiriya spî tê çêkirin, baştirîn meya li ser rûyê erdê ye.” Ezmûnger got: “Di derbarê hicamê de tu çi dibêji?” Tewedûdê got: “Hicam, ji bo kesên ku bedena wan tijî xwîn bûye û kêmxwîn bi wan re nîn e, baş e. Lêdana hicamê jî, divê di dema ku heyv tê de here ava, di rojê sayî, bê ewr û baran û di hivdehê mehê de be, tew ku rastî roja şêşemê were, dê hîn çêtir bibe. Hicam pir baş e, ji bo çavan; ji bo hiş û mejî.”

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 457’EMÎN

Şehrezadê got:

Piştî ku Tewedûdê behsa fêdeyên hicamê ango hecametê kir, ezmûnger got: “Hicama baş kîjan e?” Wê got: “Hicama baş, a ku di dema birçibûnê de mirov li xwe bixe. Bi wî hawayî hişê mirov vedike û bîra mirov xwirt dike. Tê gotin ku carekê yek hat cem pêxember û jê re got, êşek di serê min

û herdu nigên min de heye, ez çawa bikim? Pêxember jî jê re got: Here hicamê li xwe bide û piştî hicamê xwarina şor bi ser de nexwe, da ku te guri neke. Tirşiyê jî di pey wê re nexwe.” Bijîşk jî got: “Kîjan roj ne baş in ji bo hicamkirinê?” Tewedûdê got: “Roja şemî û çarşemê ne baş in, kesê ku di wan herdu rojan de hicamê li xwe bide, bila loman ji kesî neke. Ya rast ew e ku di rojên germahiyê de mirov hicamê li xwe nede, rojên biharê ji giştî çêtir in.”

Ezmûnger got: “Baş e kanî behsa pevşabûnê bike ji min re?” Gava Tewedûdê ew pirs bihîst, ket ber fediyê û serê xwe bera ber xwe da. Piştî serê xwe rakir û got: “Emîrê bawermendan ne ku ez bersiva pirsê nizanîm lê ji ber fedîkirinê ez bêdeng mam, lewre bersiva wê li ser zimanê min e!” Xelîfe got: “Bibêje, fedî meke!” Tewedûdê got: “Sûdwerî û fêdeyên pir di zewacê de hene. Yek ji wan fêdeyan ew e ku laş sivik dike, wî ji tarîtiyê rizgar dike, germahiya evînê tê de bi cî dike, dil aram dike û eşqê diafirîne, pirpevşabûna di havîn û payîzê de, zerartir e ji yên di rojên zivistan û biharê de.” Ezmûnger got: “Ka behsa fêdeyên pevşabûnê bike?” Tewedûdê got: “Min hinek li jor gotin. Wekî din jî, kul û kederan dibe, hêrs û bêhtengiyê ji dilê mirov derdixe, mirov ji tasewasan rizgar dike û birînên mirov dicebirîne. Ev ji bo kesên hişk û sert wisa ye. Ji aliyekî din ve, pîrbûna pevşabûnê, awir û çavan qels dike, serêş û piştêşê çêdike. Pir baldar be û bi pîrejinan re ranekeve, lewre pevşabûna bi wan re kujer e. Hezretî Elî -Xwedê jê razî bedibêje; çar tişt bedenê extiyar dîkin û mirov dikujin: Çûna hemamê piştî têrxwarinê, xwarin û vexwarina şor, pevşabûna bi zikê tijî û pevşabûna bi jineke nexweş re ku hêza te qels dike û bedena te lewaz dike; pevşabûna bi pîrejinê re jî, weke vexwarina jehrê ye, mirov dike. Loma hinek dibêjin bi pîrejinan re nezewice, lew ku bi qasî qarûn maldar bin jî.”

Ezmûnger got: “Pevşabûna herî xweş kîjan e?” Tewedûdê got: “Gava ku jin temenbiçûk be, bejindirêj û lihevhatî be, rûgewez û singdagirtî be, dê hêzê bide bedena te û tu yê bibî mîna ew ê ku helbestkar behsa wî dike û dibêje:

Çawa lê dinêrî tu dizanî bê ew çi dixwazî
Bê gotin silavê dide te her wisa ew dixwazî
Subhan ji Xwedê re spehîbûn jê difûre
Gul û çiçek hemû ji ber wê xwe vedişêre”

Bijîşkê ezmûnger pirsî: “Pevşabûna di kîjan wextî de xweş e?” Tewedûdê got: “Bi şev û piştî ku mirov xwarina şivê biserifîne, heger bi roj be jî piştî xwarinê baş e.”

Ezmûnger got: “Fêkiyên herî baş kîjan in?” Wê got: “Hinar û porteçal.” Wî pirsî: “Fasûliyên herî baş kîjan in?” Wê bersivand: “Hindîba ye.” Wî pirsî: “Cureyê herî baş ji çiçekan çi ye?” Wê bersivand: “Gul û binevş in.” Wî pirsî: “Avika zîlam çawa çêdibe?” Wê bersivand: “Rehek di laşê zîlam de he-

ye, ku hemû rehan av dide û avê jî ji sêsed û şêst rehî kom dike, di hêka çepê de dicivîne û di wir de dibe xwîneke sor, bi germahiya zilam dikele, tê pijandin û dizivire aveke tîr û spî ku bêhneke tûj jê tê.” Ezmûnger got: “Her bijî, kanî niha ji min re behsa teyrekî bike ku ew jî mîna însanan mehê carekê regl dibin, xwîn ji ber wan diçe û di nêrê wan de jî avik heye?” Tewedûdê got: “Ew teyrikê ku tu behsa wî dikî barçemok e angû şevşevok.” Ezmûnger got: “Ajalek heye gava hewayê dikişîne, dimire û gava tu hewayê ji ser dibirî dijî, çi ye?” Wê bersiv da û got: “Masî ye.” Wî pirseke din kir û got: “Wêrekek heye ku hêkan dike, çi ye?” Wê got: “Mar e.”

Di encamê de bijîşkê ezmûnger jî betilî ji ber ew qas pirs û bêdeng bû. Tewedûdê got: “Emîrê bawermendan, wî pirs ji min kirin, hetanî ku ez behecandim, iznê bide min ez pîrsekê tenê jê bikim? Heger bersiva pîrsa min neda, ez ê cubeyê wî jê bikim û ji xwe re bibim.”

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 458'EMÎN

Şehrezadê got:

Xelîfe ji Tewedûdê re got: “Tu dikarî pîrsa xwe jê bikî.” Wê jî berê xwe da ezmûnger û got: “Tiştekek heye ku bi giroverbûna xwe mîna dinyayê ye, derzika xwe ji ber çavan vedişêre, bi nîrxê xwe erzan e, singteng û qirikzirav e, girêdayî ye û ne diz e; nava wî kunkirî ye lê ne di şer de ye; birîndar e lê ne di têkoşînê de ye; temenekî sax dixwe û avê pîr vedixwe; carinan lêxistinê dixwe bêyî ku tehdekar be û bê navber têtê bikaranîn; piştî veqetînê dîsa bi ser hev de kom dibe; dîlnîzm e bi sekna xwe; biheml e lê zarok di zik de tune be; bi telkî ye lê xwe nade ser bastonan; gemar dibe, paqij dike; nimêj dike, têtê guhertin; bi yeke din re pev şa dibe bê nêrik, bê tedbîr bi navê dilîze; kar berdide û bêhna xwe berdide; gez dike û gazî nake; comerdîr e ji dostan lê dûrtir e ji dilsozan; bi şev ji jîna xwe vediqete û bi roj hevdu himbêz dikin, ev çi ye?”

Bijîşkê ezmûnger bêdeng bû û tu bersiv nedan! Ma heyirî û nema di-zanibû wê çi bike. Rengê wî hat guhertin û serê xwe bera ber xwe da û bi qasî saetekê wisa bêdeng ma, bêyî ku biaxive. Tewedûdê got: “Bersivê bide, nexwe ez ê cubeyê te ji te bikim?” Ezmûnger rabû ser xwe û got: “Emîrê bawermendan! Ez dipejirînim ku ev jin di bijîşkîtiyê û mijarin din de ji min jîr û zanatir e, ez nikarim bi wê.” Piştî cubeyê xwe ji xwe kir û revîrevî ji dîwanê derket, çû. Xelîfe li Tewedûdê zivirî û jê re got: “Kanî tu bersiva wê pîrsa xwe bide û bêje bê te behsa çi dikir?” Tewedûdê got: “Ew tişt bişkok û kuna wê bûn. Piştî li civata zanayan zivirî û ji wan re got: “Kî ji we stêrkzan e?”

Ştêrknas ji cihê xwe rabû û hat li himberî wê rûnişt. Gava çav li wî ket û lê nêrî, kenîya û jê re got: “Tu stêrknas î?” Got: “Belê, ez stêrknas im.” Wê got: “Tu çi dixwazî ji min bipirse, Xwedê bê erê ez ê bersiva te bidim!” Stêrknasê ezmûnger jê pirsî û got: “Ji min re behsa rokê, derketina wê û çûnavaya wê bike?” Tewedûdê got: “Rok ji çavan derdikeve û di çavan de diçe ava. Çavên rojhilatîne beşên rojhilatê ne û çavên avabûnê jî beşên rojavayê ne û hemû bi hev re sed û heştê beş in. Di Qur’ana pîroz de jî derbas dibe, dibêje: Ez sond dixwim bi Rebê rojhilat û rojavayan. Di cihekî din de jî dibêje: Ew e yê ku roj şewqdêr kiriye û heyv şewqdar kiriye, li menzilin cuda bi cih kirine di gerê de, ji bo ku hûn bikaribin salan bijimêrin. Heyv siltanê şevê ye û rok siltanê rojê ye û herdu ketine pey hev. Di ayeteke din de Xwedayê gewre dibêje: Ne rok digihîje heyvê û ne jî şev li pêşiya rojê dixê, her yek ji wan di hewarêya xwe de diçe.”

Stêrknas got: “Gava ku şev tê, roj dikeve çi halî û gava roj tê şev dikeve çi halî?” Tewedûdê got: “Şevê ji rojê diwelidîne û rojê ji şevê”²⁴ Stêrknas got: “Çend malikên heyvê hene?” Tewedûdê got: “Bîst û heşt malikên heyvê hene: Kevjal, zikok, avîze, duqûn, cêwî, mil, hûrik, rex, enî, zebare, hûrdek, ewtîn, masîvan, nobedar, zebana, tac, dil, dûpişk, nane, bajarok, şahiya serjêkirinê, şahiya daqurtandinê, şahiya şahiyê, qermîçok, azwirê pêş, azwirê paş û reşan.”

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 459’EMÎN

Şehrezadê got:

Tewedûdê berdewam kir û got: “Malikên temenan jî li ser herfên Ebced-Hewez²⁵ rêzkirî ne; razeke veşartî di wan de heye ku ji Xwedayê me pêve tu kes pê nizane, ji xeynî hinek zanayên kûrbîr û mezin. Beşên wê jî li ser her duwazdeh bircan belav kirî ne, her bircek du malik û ji sisyan yek ji malikekê jê re dikeve. Bi wî hawayî malika kevjal, zikok û ji sisyan yek ji avîzeyê dikevin birca Avis; ji sisyan duduyên avîzeyê û malika duqûn û ji sisyan duduyên cêwî jî dikevin birca Ga; ji sisyan yeke cêwî û herdu malikên mil û hûrik, dikevin birca Cêwîk; malikên rex, enî û yek ji sisyan ji malika zebare dikevin birca Kevjal; dudu ji sisyan ji malika zebareyê li gel malika hûrdek û dudu ji sisyan ji malika ewtîn, dikevin birca Şêr; birca Simbil; her du malikên zebana û tac, li gel yekê ji sisyan ji malika dil dikevin birca Mêzînê; dudu ji sisyan ji malika dil, li gel herdu malika dûpişkê û dudu ji sisyan ji malika naneyê, dikevin birca Dûpişk; yek ji sisyan ji ma-

24 . Ayeteke Qur’anê ye.

25 . Ebced-Hewez: Alfabe ya erebî: A, b, c...

lika naneyê li gel herdu malikên bajarok û şahiya serjêkirinê dikevin birca Kewan; yek ji sisyan ji malika qermîçokê dikevin birca Karik; yek ji sisyan ji malika qermîçok li gel herdu malikên azweriya pêş û azweriya paş dikevin birca Satilê; yek ji sisyan ji malika azweriya paş û malikên azwerî û reşanê dikevin birca Hût.”

Stêrknas got: “Her bijî! Ka îca behsa gerestêrkan bike?” Tewedûdê got: “Gerestêrk heft in, ew jî: Rok, Heyv, Ûtarîd, Zuhre, Merîx, Muşterî û Zûhal. Rok pir germ e, hişk e, ji aliyê dîtbariyê ve oxir û bextewarî tê de heye û ji aliyê rûbirûkirinê ve bêoxir e; li her bircê sîh rojî disekine. Heyv sar e, hêwî ye, bextewar e û li her bircê du roj û ji sisyan duduyan disekine. Ûtarîd hevî-rekî ji bextewarî û xemgîniyê ye, tevlihev e geh wilo ye geh bi awayekî din, li her bircê hivde roj û nîvan disekine. Zuhre şîregermî ye û bextewar e û li her bircê bîst û pênc rojan disekine. Merîx bêoxir e, nehs e, li her bircê deh mehan disekine. Muşterî bextewar e û li her bircê salekê disekine.”

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 460'EMÎN

Şehrezadê got:

Tewedûdê axaftina xwe berdewam kir û got: “Zûhal jî sar e û bêoxir e, li her bircê jî sîh mehan disekine. Rok bi xwe mala wê Şêr e, şanaziya wê Berxik e, daketina wê Satil e. Heyv jî mala wê Karik e, şanaziya wê Satil e, daketina wê Berxik e, malxerabiya wê Kevjal û Şêr e. Mala Muşterî Hût e, şanaziya wî Kevjal e, daketina wî Berxik e, malxerabiya wî jî Cêwî û Şêr e. Mala Zuhre Ga ye, şanaziya wê Hût e, daketina wê Karik e û malxerabiya wê Dûpişk e. Mala Ûtarîdê Cêwî û Simbil e, şanaziya wê Simbil e, daketina wê Hût e û malxerabiya wê Ga ye. Mala Merîx Berxik e, şanaziya wê Karik e, daketina wê Kevjal e, malwêraniya wê Mêzîn e.”

Gava ku stêrknas ev jîrbûna wê dît û çavên wî li asta zanebûna wê ket, şaşwaz bû û metirsî pê re çêbûn. Di dilê xwe de got: “Divê ez hîleyekê bibînim û wisa zora wê bibim, nexwe ez ê rezîl bibim di hizûra xelîfe de!” Li Tewedûdê zivirî û jê re got: “Niha jî ka ji min re bibêje, bê wê vê mehê baran bê yan na?” Tewedûdê serê xwe bera ber xwe da û dirêj dirêj hizirî, bêyî ku biaxive.” Xelîfe di dilê xwe de got belkî bersiva wê pirsê li ba wê tune ye. Stêrknas jî wisa difikirî ku pêdivî dît jê re bibêje: “Tu çima bersiva pirsê min nadi?” Tewedûdê got: “Hetanî ku emîrê bawermendan destûrê nede min ez napeyivim!” Wê gavê emîrê bawermendan jê re got: “Çawa û çima ev destûrxwestin?” Tewedûdê got: “Ez dixwazim ku emîrê bawermendan şûrekî bide min da ku ez serê vî zendiqî jê bikim!” Xelîfe û kesên di civata wî de rûniştî, hemû kenîyan. Tewedûdê berê xwe da stêrknas û axaftina

xwe berdewam kir, got: “Ey stêrknas! Pênc tişt hene ku ji Xwedayê me pê ve tu kes pê nizane. Xwedayê gewre di Qur’ana pîroz de dibêje: Zanîna roja qiyametê, barîna baranê li ba Xwedê ye. Ew dizane bê çi di zîkê dayîkan de heye. Tu kes nizane bê rojek pêş de wê çi qezenc bike û tu kes jî nizane bê wê li ku bimire. Xwedayê gewre van gişan dizane.”

Stêrknas got: “Her bijî ji te re. Min jî bi vê pîrsê, tenê dixwest ku lîênêrî-na te di ezmûnê re derbas bikim, ne tiştêkî din.” Tewedûdê got: “Helbet salnameger xwedî ezmûn in û nîşaneyên sersalan li ba wan hene ku bi gerestêrkan ve girêdayî ne.” Stêrknas got: “Ew çi ne?” Wê got: “Her rojeke salê gerestêrkeke wê heye. Gava ku roja pêşîn a salê yekşem be, gerestêrka wê rojê rok e. Ev nîşaneya ku wê salê dê zilm û pêkûtiya siltan û desthilatdaran giran bibe li ser xelkê û dê baran hindik bê, wexim pir be û xirecira xelkê be. Derveî nîskan dê berê genim û ceh û hubûbatan baş be, tenê nîsk û tirî xera dibe, kitan buha dibe û di seranserê demsalê de genim erzan dibe. Siltan pev dikevin û şerê di navbera wan de giran dibe lê xêr jî pir dibin di wê salê de û Xwedê çêtir dizane.”

Stêrknas got: “Roja duşemê çawa ye?” Tewedûdê got: “Duşem roja heyvê ye û ew nîşaneya ku wê siltan û desthilatdar baş bibin û bi dilovanî tevbigerin. Wê barana salê pir be, hubûbat baş û berdêr bin. Wê tovên kitanê xera bibin û genim erzan bibe, nexweşiya webayê belav bibe û nivê mîlî û bizinan bimirin. Wê tirî pir be, hungiv hindik be û pembo erzan bibe û Xwedê çêtir dizane.”

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 461’EMÎN

Şehrezadê got:

Piştî wê bersiva Tewedûdê, stêrknas jê re got: “Ji bo roja sêşemê tu çi dibêjî?” Wê jî bersiv da û got: “Ew roj a Merîxê ye. Nîşaneya mirina mezinên civatê, xerabûn û xwînrijandinê ye. Di vê roja ku sala nû dest pê bike hezkirina biha dibe, baran kêr dibe, masî namînin, rojînan pir rojînan hindik dibin; hungiv û nîsk erzan, tovên kitanê jî biha dibin di wê sala ku bi sêşemê dest pê bike. Dîsa, di wê salê de ceh geş dibe lê hubûbatên din tune dibin û şerê di navbera siltan û serdestan de gur dibe, kuştin pir çêdibe, xwîn weke çeman diherike û ker pir tên kuştin. Dîsa jî Xwedê çêtir dizane.”

Stêrknas got: “Kani behsa roja çarşemê bike?” Tewedûdê got: “Ew roj roja Ûtarîdê ye û nîşaneya xirecîreke mezin e ku dê bikeve nav xelkê û dijmin pir bibin. Baran ne kêr e ne zêde ye, hinek beşên çandiniyê dê telef bibin û mirina ajalan zêde bibe; dîsa mirina zarokan jî dê zêde bibe; kuştina

di deryayan de jî dê zêde bibe; dê genim biha bibe û hubûbatên din erzan bibin; lédana birq û birûskan dê pir bibe, hungiv biha bibe, xurme û kitan û pembo geş bibin, lê tivir û pîvaz dê buha bibin û Xwedê çêtir dizane.”

Stêrknas got: “Der barê pêncşemê de çi li ba te heye?” Tewedûdê got: “Pêncşem rojeke aîdî Mûşteriyê ye û nîşaneya dadwergeriya wezîran, rê-rastiya dadgehan, başbûna rewşa feqîr û hejaran, dîsa nîşaneya bereket û xêrûbêreke mezin e, pîrbûna baranê, geşbûna baranê, geşbûna daran, ber-hemdariya wan û pîrbûna fêkiyan, erzanbûna hingiv, kitan, tirî, masî û pemboyan. Lê Xwedê çêtir dizane.”

Stêrknas got: “Gelo di derbarê roja îne de tu çi dizanî?” Tewedûdê got: “Roj îne roja Zûhreyê ye û nîşaneya zîlm û zora mezinên cinan û belavbûna derew û bêbextiyan di nava xelkê de; nîşaneya ku di wê salê de dê şebnem gelek bikeve, payîz xweş derbas bibe li welat û dê erzanî li hinek welatan çêbibe û li ser bejahî û deryayê dê fesadî bi pêş bikeve; dê bizrê kitanê û genim buha bibe li Hatûrê, li Hemşîrê. Li hinek cihan jî dê hingiv biha bibe, tirî û petêx xera bibin. Lê Xwedê çêtir dizane.”

Stêrknas got: “Der barê roja şemiyê de çi dibêjî?” Tewedûdê got: “Şemî roja Zûhalê ye û sala ku bi wê dest pê bike nîşaneya ku di wê salê de bende û Rom serî hildin; dê xela rabe û mirov ji birçînan bimirin. Dê mirin zêde bibe di nav xelkê de û bi taybetî jî di nav gelê Misrê de; di nav gelê Şamê de dê mirin pir bibe ji ber zilma siltanan û dê çandinî bêbereket be û tov xera bibin. Dîsa jî Xwedê çêtir dizane.”

Stêrknas, serê xwe bera ber xwe da û demeke dirêj bêdeng ma. Tewedûdê jê re got: “Ez ê pîrsekê tenê ji te bikim, heger tu bersivê nedî, ez ê cubeyê te ji te bikim?” Wî got: “Bîpîrse!” Tewedûdê got: “Cihê Zûhalê li ku ye?” Stêrknas got: “Li ezmanê heftan e.” Wê got: “Û Mûşterî li ku ye?” Wî bersiv da û got: “Li ezmanê şeşan e.” Wê got: “Û Merîx?” Wî lê vegeand: “Li ezmanê pêncan e.” Wê got: “Û rok?” Wî bersiv da: “Li ezmanê çaran e.” Wê got: “Û Zuhre?” Wî bersiv da û got: “Li ezmanê sisiyan e.” Wê pîrsî: “Û Ûtarid?” Wî bersiv da: “Li ezmanê duduyan.” Wê got: “Û heyv?” Wî bersiv da: “Li ezmanê yekê.” Tewedûdê got: “Her bijî ji te re lê pîrsek din maye?” Stêrknas got: “Wê pîrsa xwe jî bike!” Tewedûdê pîrsî û got: “Kanî ji min re bibêje bê stêrk li ser çend cureyan dabeş dibin?” Stêrknas bêdeng bû û bersiv neda. Tewedûdê got: “Wî cubeyî ji xwe bike!” Stêrknas cubeyê xwe danî.

Xelîfe ji Tewedûdê re got: “Kanî tu bersiva wê pîrsa xwe bide?” Tewedûdê got: “Emîrê bawermendan, stêrk dibin sê beş: Beşek ji wan bi zîkê ezmanan ve daleqandî ne, mîna çirayan erdê ronî dikin. Beşek jî têne avêtin ji qîbelî şeytanên ve ku pir bi lez derbas dibin, di ber çavên mirov re. Beşa sisiyan jî bi hewa ve girêdayî ne û şewqê didin ser deryayan.”

Stêrknas got: “Pirsek tenê li ba min maye, heger bersivê bide wê pirsê ez ê serdestiya wê qebûl bikim?” Tewedûdê got: “Pirsa xwe bike!”

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 462'EMÎN

Şehrezadê got:

Stêrknas got: “Kanî ji min re behsa çar tiştên dijber bike, ku li ser çar tiştên din ên dijber belav dibin?” Tewedûdê got: “Ew çar tişt: Germbûn, sarbûn, hêwîti û zuhabûn in. Xwedayê gewre ji germahiyê agir afirandîye ku zuhabûn ji xeysiyetên wê ye. Ji zuhabûnê jî ax afirand ku hişkbûn û sarbûn meziyetên wê ne. Ji sarbûnê jî av afirandîye ku sarbûn û hêwîti meziyetên wê ne. Ji hêwîtiyê jî hewa afirandîye ku germbûn û hêwîbûn meziyeta wê ye. Piştî Xwedayê gewre dozdeh birc afirandine: Ew jî Bexik, Ga, Cêwî, Kevjal, Şêr, Simbil, Mêzîn, Dûpişk, Kevan, Karik, Satil û Hût. Ev diwazdeh birc li ser çar beşan dane avakirin: Sê birc agirîn in, sê birc axî ne, sê birc hewayî ne û sê birc jî avî ne. Bexik, Şêr û Kevan agirî ne; Ga, Simbil û Karik axî ne, Cêwî, Mêzîn û Satil hewayî ne, Kevjal, Dûpişk û Hût jî avî ne.”

Stêrknas rabû ser xwe û got: “Li pêşiya we gişan ez dixwazim bibêjim, ku ev jin ji min zanatir e!”

Piştî paşpaşkî çû û ji dîwanê derket. Tewedûd jî ber bi xelîfe ve çû û jê re got: “Emîrê bawermendan, kanî ezmûngerê filozof li ku ye?” Zilamek pê ve rabû û jê re got: “Kanî ji min re behsa demê bike, behsa roj û şevên wê bike?” Tewedûdê got: “Dem têgeheke ku li ser şev û rojan tête avakirin û bi pîvanên rok û heyvê û gera wan ve girêdayî ye, çawa ku Xwedayê gewre jî di pirtûka xwe ya pîroz de gotiye: Peyitandîneke ji bo wan ew e, ku em şevê ji rojê vedertînin, lewre ew neheq in. Rok jî di rêya xwe de diçe ber bi aramgehekê ve û ev teqdîra zanayê gewre ye!”

Filozofê ezmûnger got: “Ka bêje bê çawa însan dibin kafir?” Tewedûdê got: “Tê gotin ku pêxemberê me gotiye: Kufur, di laşê însanan de digere mîna xwîna ku di rehên wan de digere. Lewre em dibînin yek ji we sixêfan ji dinyayê re dide û dibêje lanet li wî kesî ku sixêfan ji min re dide. Lê kesek ji we bila sixêfan ji roja qiyametê re nede lewre ew roj tê û felat ji ber wê nîn e. Bila kes ji erdê re jî sixêfan nede, lewre Xwedayê gewre gotiye me hûn ji wê afirandine û em ê we vegerînin wê axê û careke din jî em ê we dîsa ji wê bîafirînin.”

Filozofê ezmûnger got: “Kanî behsa pênc kesan bike, ku xwarin xwaribin lê neçûbin herdu destavan?” Tewedûdê got: “Ew her pênc kes ev in: Hezretî Adem, Şemûn, deveya nebî Salih, beranê Hezretî Îsmail û ew tey-

rikê ku Hezretî Ebûbekir ew di şikeftê de dîtibû.” Filozof pirsî: “Pênc heb bihuştiyên ku ne cin in, ne jî ferîşte ne, çi ne?” Tewedûdê bersiv da û got: “Gurê Hezretî Yaqûp, sehê Eshabul Kehf, kerê El Ezîz, deveyê Hezretê Salih û Delal, qantira pêxember.” Filozofê Ezmûnger pirsî: “Mirovekî ku nimêjek kir ne li erdê û ne jî li ezman, kî ye?” Tewedûdê bersiv da: “Hazretî Suleyman bû, gava ku nimêja xwe li ser sicadeya ku bi hewa ketibû kir.”

Filozof jê pirsî û got: “Kesek rabû nimêja sibehê kir, piştê li cariyekê nêrî lê ew cariyê lê heram bû. Gava nimêja nîvroyê kir, cariyê lê helal bû; piştê gava nimêja esrê kir, cariyê dîsa lê heram bû. Êvarê, cariyê dîsa lê helal bû, piştî nimêja ‘eşa dîsa lê heram bû û sibehê dîsa lê helal bû; ev çawa çêbûye?” Tewedûdê bersiv da û got: “Vî zilamî, sibehê li cariyeya yekî din nêrî û ev jê re heram bû. Nîvrokî ew cariyê kirrî û jê re helal bû. Esirkî, ew azad kir û bi wî hawayî dîsa lê heram bû. Êvarkî pê re zewicî û bi wî hawayî dîsa lê helal bû. ‘Eşakî ew berda û dîsa lê heram bû. Bi sibehê re, dîsa lê vegeriya û bi wî hawayî dîsa lê helal bû.” Filozof got: “Gora ku bi xwediye xwe ve maye ya kê bû?” Tewedûdê got: “Hûtê ku Yûnis Bîn Meta daqurtandibû.” Filozof got: “Devereke ku tava rojê carekê tenê lêda û êdî hetanî roja qiyametê jî nema lê dide, ku der e?” Tewedûdê got: “Ew dever, cihê ku di binê behrê de ye û dema ku hezretî Mûsa darê xwe lêda, av ji hev veqetiya û rê jê re vebû, tê re derbas bû û piştê, av dîsa lê hat hev û êdî hetanî roja qiyametê jî nema roj lê dide.”

Li Şhezradê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 463’EMÎN

Şhezradê got:

Filozofê ezmûnger dîsa pirsî û got: “Kirasê ewil ê ku bi erdê ve kişiya, yê kê bû?” Tewedûdê got: “Ê Hacerê bû ku ji ber fediya ji serayê li xwe kiribû û piştê di nava Ereban de jî bû adet.” Filozof got: “Tîşteki ku hilmê bikişîne û ne zindî be, çi ye?” Wê got: “Xwedê gotiye: Gava sibeh hilma xwe dikişîne.” Filozof pirsî: “Refekî kevokan çû li ser dareke mezin danî, lê hinek ji wan daketin bin darê. Yê li ser darê, gazî yê bin darê kirin û gotin: Heger yek ji we were cem me, em ê bibin du carî li we û heger yek ji me dakeve cem we, em ê bibin wek hev. Gelo hejmara wî refê kevokan çiqas e û çawa dabeş bûne?” Tewedûdê got: “Refê wan kevokan dozdeh e, heft kevok li ser darê mane û pênc heb daketine bin darê. Gava yek ji yên ser darê dakeve jêr, dê kevokên li erdê bibin şeş û yê ser darê jî şeş dimînin; gava yek ji bin darê biçe ser darê jî, yên jor dibin heşt, ên jêr dimînin çar û Xwedê çêtir dizane.”

Di wê keliyê de filozof tê derxist ku nikare Tewedûdê têk bibe, rabû ser xwe, cubeyê ser xwe danî û reviya çû. Tewedûdê li rêza zanyaran zivirî û ji

wan re got: “Kî ji we zanayê her mijarê ye?” Nîzam rabû ser xwe û jê re got: “Ez ne mîna yên dinê me!” Tewedûdê got: “A rast ji niha ve tu yekî tîkçûyî yî li ba min û dê Xwedê hêzê bide min, ez ê zora te bibim, te tazî bikim; heger ji niha ve tu kincina ji xwe re amade biki dê çêtir be!” Ew hêrs bû û got: “Bi navê Xwedê ez ê zora te bibim û ez ê bihêlim ku tu bibî îbret û benîştê nav devê xelkê.”

Nîzam pirsî û got: “Bavê te di îslamê de kî ye?” Wê got: “Hazretî Muhammed e.” Wî pirsî: “Û bavê Muhammed kî ye?” Wê got: “Îbrahîmê Xelîl e.” Wî pirsî û got: “Pênc tiştên ku Xwedayê gewre ew afirandine beriya xuliqandina însanan çi ne?” Wê got: “Av û ax û razan û tarîti û fêkî.” Wî pirsî û got: “Tiştên ku Xwedê ew bi hêzdariya xwe afirandine çi ne?” Arşê ala, dara bihuştê (Tûba) Hazretî Adem, bihuştê baqî (Eden), ev hemû bi destê qudretê hatine afirandin, ên mayîn giş Xwedê ji wan re gotiye ‘kun’²⁶, ew çêbûne.” Nîzam got: “Ola îslamê çi ye?” Wê got: “Eşhedû enla îlahe illallah we enne Muhameden resûlûllah e.” Wî got: “Pêşiya te çi ye, dawîya te çi ye?” Wê got: “Pêşiya min dilopeke xwîn e û dawîya min berateyekî meytan e. A ewil ji axê ye û ya dawîn jî diçe axê, çawa ku helbestkar gotiye:

Ji xakê çêbûme ez bûme mirovek
Zana û jîr ez bûme dirûvek
Piştî lê vegeyriyam ez bûme ax
Mîna ku qet veneqetiyabim ez ji ax”

Nîzam got: “Ka mînaka tiştêkî bide, ku destpêkê hişkolekî ye, piştîrê bûye zindî?” Tewedûdê got: “Darikê Hazretî Mûsa, gava avêt erdê û zivirî marekî.” Nîzam got: “Jinek ji mêrekî, mêrek ji jinekê çêbûye?” Tewedûdê got: “Hewa ji Adem, Îsa jî ji Meyremê çêbûye.” Nîzam got: “Kanî ji min re behsa agirêkî bike, ku dixwe û vedixwe û agirêkî dixwe û venaxwe û agirêkî ku vedixwe û naxwe?” Tewedûdê got: “Agirê ku dixwe û vedixwe, agirê dojhê ye. Agirê ku dixwe û venaxwe, agirê vê dinyê ye. Agirê ku vedixwe û naxwe, agirê rokê ye. Agirê ku ne dixwe û ne jî vedixwe, agirê heyvê ye.”

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 464’EMÎN

Şehrezadê got:

Nîzam pirsên xwe berdewam kir û ji cariyeyê re got: “Kanî behsa destpêka Adem û afirandina wî bike?” Tewedûdê got: “Xwedayê gewre Adem ji heriyê çêkir, herî jî ji kefê, kef ji behrê, behr ji tarîtiyê, tarîti ji ronahiyê, ronahî ji hût, hût ji kevir, kevir ji yaqûtê, yaqût ji avê û av ji qudretê çêkir.”

26 Raweya fermaî ya lêkera bûnê ye: Bib!

Nîzam pirsî: “Helbestkar bi van ristên xwe yên jêrîn behsa çi dike?

Bê dev û zik e lê ew her dixwe
Qût û dar û ajalên wê ji hene
Çiqasî bidîyê her ew geş dibe
Lê ku tu avê bidî wê her dimire”

Tewedûdê got: “Behsa agir dike.” Nîzam got: “Lê meqseda vî helbestkarî bi van ristên jêrîn çi ye?

Du heval in ew ji binî ve nahejin
Şev pê de di himbêza hev de dinivin
Diparêzin xwediyê xwe ew baş in
Her ku roj dertê ji ji hev vediqetin”

Tewedûdê got: “Ev helbestkar behsa herdu milên derî dike.” Nîzam pirsî xwe berdewam kir: “Lê belê deriyên dogehê çend in?” Tewedûdê got: “Heft in.” Nîzam dîsa pirsî: “Lê ev helbestkar dixwaze çi bibêje bi van ristên jêrîn?

Biskdirêj e perçemên wê li dû diçin
Diçe tê li ber çavan e ew tê dîtîn
Bi wan çavên şiyar ku ji xewê dûr in
Pir dibetile bo kincan li xelkê bike

Tewedûdê got: “Ew derzî ye.” Nîzam dîsa pirsî: “Sîrat çi ye, çiqasî dirêj e û eniya wê çiqas e?” Tewedûdê got: “Dirêjahiya sîratê sê hezar sal e; hezar daketin, hezar hilkişandin û hezar jî ji bo xwerastkirinê. Eniya wê ji pir zirav e, mîna devê şûr e û ji mûyekî jî ziravtir e.”

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 465'EMÎN

Şehrezadê got:

Nîzam got: “Kanî ji min re bibêje bê pêxemberê me çend carî şefaet kiriye û li kê kiriye?” Tewedûdê got: “Sê caran, li sê kesan şefaet kiriye.” Nîzam pirsî: “Misilmanê ewil kî bû?” Wê got: “Ebûbekîr bû.” Nîzam got: “Lê Elî beriya Ebûbekîr bû misilman?” Tewedûdê lê vegeand: “Elî di heftsaliya xwe de hat gel pêxember û hîna ew zarok bû gava Xwedê ew anî ser rêya rast, yanî hîna îbadet ji tu pûtan re nekiribû.” Nîzam pirsî: “Ka hela ji min re bibêje bê gelo Elî baş bû yan Ebas?” Tewedûdê tê derxist ku ev pirsî wî dehfikek e, lewre ger bigota Elî baştir e, dê hêrsa xelîfe bikişandina ser xwe. Serê xwe bera ber xwe da û ponijî, piştî serê xwe rakir û got: “Tu behsa du navên hêja dikî ku her yek ji wan qîmetekî wan î cuda heye, ka were roja me ya îro û li gori wê pirsên xwe bike.” Xelîfe Harûn Reşîd pir kêfxweş bû

bi vê bersiva wê, rabû ser xwe û got: “Bi Xwedayê Kabeyê, tu xweş peyivî, Tewedûdxan.”

Nîzam got: “Ev helbestkar bi van ristên xwe yên jêrîn dixwaze çi bibêje gelo?

Dûvxweşik e pir tamxweş e
Bê diran e lê peyvxweş e
Her kes sûdê ji wê dibîne
Pir tê xwarin di rojiyê de”

Tewedûdê got: “Helbestkar, behsa qamişê şekir dike.” Nîzam got: “Behsa gelek tiştan bike?” Wê got: “Mîna çi?” Wî got: “Ji hingiv şîrîntir, ji şûr tûjtir, ji tîrê kevan lezgîntir, çêja katjimêrekê çi ye; şadûmaniya sê rojan, roja xweştirîn, şahiya îne, mafê ku xwediyê wî şaşrê be ji neyê înkarkirin, zindana gorê, şahiya dil, bêbextiya nefse, mirina jiyane, nexweşiya bêderman, şerma ku nayê ronîkirin û ew ajala ku dikeve malan, li kavilan bi cih dibe, ji mirovan aciz e û di afirandina wê de heft afrîndeyên gewre hene, çi ne?”

Tewedûdê got: “Ez ê bersiva van pirsên te gişan bidim. Lê ka destpêkê wî cubeyî û kincên xwe ji xwe bike!” Xelîfe got: “Tu bersivê bidî, ew dê kincên xwe deyne!” Tewedûdê got: “Tiştê ji hingiv şîrîntir, hezkirina zarokên ku ji dê û bavê xwe hez dikin. Tiştê ku ji şûr tûjtir e, ziman e. Tiştê ji tîrê lezgîntir çavên dîdarî ne. Çêja katjimêrekê, pevşabûn e. Şahiya sê rojan, adeta mehane (regl) ya jinan e. Roja xweştirîn jî roja qezenca mezin e li cem taciran. Şahiya îne, dawet û zemawend e. Mafê ku xwediyê wê şaşrê be jî neyê înkarkirin, mirin e. Zindana gorê, kurê xerab e. Şahiya dil, jina ku bi ya mêrê xwe dike; hinek jî dibêjin xwarina goşt e. Bêbextiya nefse, bendeyê jirêderketî ye. Mirina jiyane, hejarî û feqîrî ye. Nexweşiya bêderman, sincê xerab e, ango sincxerabî ye. Şerma ku ronî nabe, keça xerab e. Ajala ku dikeve malan, li kavilan bi cih dibe, ji mirovan aciz dibe û di afirandina wê de heft afrîndeyên gewre tê de diafirin, kulî ye. Lewre serê wê mîna yê hespê, qirika wê mîna ya ga ye, baskên wê mîna yên teyr in, çimên wê mîna yên deveyê ne, teriya wê mîna ya mar e, zikê wê mîna yê dûpişkê ye û qiloçên wê mîna yên xezalê ne.”

Xelîfe matmayî ma li himberî wê zîrekî û zanebûna wê ya kûr! Li Nîzam zivirî û jê re got: “Wan kincan ji xwe bike! Nîzam rabû ser xwe, got: “Ez li himberî vê civatê gişî eşkere dikim, dibêjim ku ev jin ji min zanatir e û di hizûra we de ez serdestiya wê qebûl dikim.” Û kincên xwe di ser xwe re anîn, ji xwe kirin; dan Tewedûdê û jê re got: “Bila ev ji ji te re bin lê ez hêvî ji Xwedê dikim ku tu xêrê ji wan nebînî!”

Xelîfe ji Tewedûdê re got: “Ezmûnek tenê li pêşiya te ma, ew jî setrenc (kişik) e. Piştî ferman da xizmetkaran ji bo ku kişik, kencefe û nerd binin.

Wan jî çûn anîn. Tewedûd li himberî listikvanê setrencê rûnişt û herduyan bi hev re kevirê xwe rast kirin. Mamoste û listikvanê kişikê çî gav avêt, Tewedûdê pêşiya wî girt û ew vala derxist.

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 466'EMÎN

Şehrezadê got:

Çawa ku me got, mamosteyê kişikê kîjan gav avêt, Tewedûdê ew vala derxist û di encamê de zora wî bir. Mamoste got: “Min ev dest da te ji bo ku tu xwe zana bihesibînî, ka keviran rast bike, vê carê ez ê nişanî te bidim, bê kî berx e, kî beran e!” Lê di heman demê de di dilê xwe de got: “Vê carê pir baldar be, nexwe wê ev jinik zora te bibe!” û pir bi tevdir list. Avêtina her gavê, bi fikir û hesab dikir. Lê dîsa jî hew dît, ku Tewedûdê jê re got: “Şah mir!” û ew tîk bir. Zilam şaşwaz û behetî ma li himberî vê zîrekbûn û zanebûna wê. Tewedûdê pê re kenîya û jê re got: “Mamoste, ez dixwazim careke sisiyan bi te re bilîzim, lê vê carê ez ê wezîrê(ferzanê) xwe, filê xwe yê rastê û hespê xwe yê çepê jê derxînim û wisa bi te re bilîzim, heger te zora min bir, ez ê cubeyê te dîsa li te vegerînim?” Zilam got: “Min qebûl e.”

Kevirên xwe dîsa rast kirin. Tewedûdê wezîr û fil û hespekî xwe derxist û jê re got: “Tu dest pê bike hoste!” Mamosteyê kişikê dest bi listikê kir û di dilê xwe de got: “Qey çî bi te hatiye, ku nikarî bi vê jinikê?” Tewedûdê neferên xwe dan pêş û bi ser de çû, ew jî bi xwarina neferan ve mijûl bû û xwe ji bîr kir hetanî ku hew dît, ku tîk çûye. Tewedûdê got: “Temahkarî mala mirovan xera dike, qey te nizanibû ku ez wan neferan ji qazîka ve didim te, ji bo ku ez te bixapînim?” Piştî axaftina xwe berdewam kir û got: “De êdî ka wan kincên xwe yên mayîn jî di ser xwe re bîne!” Zilam got: “Hema dulingên min ji min re bihêle, bila xêra bavê te be?” Û jê re sond xwar, ku bi tu kesî re nema bilîze hetanî ku ew li Bexdayê be. Piştî kincên xwe yên mayî jî ji xwe kirin û tena duling ji wir derket, çû.

Piştî, gazî mamosteyê nêrdê (tawle) kirin, ew hat li himber Tewedûdê rûnişt. Wê jî jê re got: “Ger ez îro zora te bibim, tê çî bidî min?” Hosteyê nêrdê got: “Ez ê deh kincên ji hevrîşîma Qostantînî ku bi zêr neqîşandî ne û dehên ji şîfon û hezar dînarî bidim te lê ku ez zora te bibim, tenê ji te dixwazim ku bi xêra destê xwe ji min re binivîsî ku min zora te bîriye.” Wê jî got: “Bila weke te be.” Piştî dest bi listikê kirin û ketin ber hev. Di encamê de Tewedûdê listik qezenc kir û zora wî bir. Hoste bi zimanê Frengî kir pitepit û rabû ser xwe, got: “Emîrê bawermendan, baweriya te bi Xwedê bê, kes bi qasî vê jinê nizane, li ser rûyê erdê.”

Piştire xelîfe gazî muzîkjenan kir, ew anîn dîwana xwe û ji Tewedûdê pirsî, got: “Tu dizanî li amûrên muzîkê bidî?” Wê got: “Belê.” Ferman da ku jê re ûdê bînin, ûdeke kelpitî û kevnar jê re anîn, Tewedûdê rahişt ûdê, ew xist himbêza xwe û pêsirên xwe bi ser de tewandin, weke ku dê zaroka xwe şîr dida û li ser dozdeh meqaman lêda hetanî ku guhdar hemû mest bûn, bi newayên wê. Piştire bi stranî berdewam kir û got:

Kurt bikin êşa dilan hicreta xwe kêmbikin
Dil û hinav bi we re ne hûn jî bi bîr nekin
Dilovan bin hebekî bi giriyê dildarekî re
Ê ku dîn û har bûye di behra evîna we de

Xelîfe mest û şad bû bi vê helbesta wê û jê re got: “Xwedê te bisitirîne û destê pêxemberan li ser serê te be û vê huner û zanîna te be!” Tewedûdê ra-bû ser xwe, çû bin lingê xelîfe maçî kir. Xelîfe jî ferman da xizmetkaran, çûn ji xwediyê wê re sed hezar dînar anîn, ew ji wî kirrî û jê re got: “Tewedûdê, ka îcar tu tişteki ji min bixwaze!” Tewedûdê got: “Ez dixwazim ku tu min li xwediyê min vegerînî!” Xelîfe got: “Bila be.” û ew li xwediyê wê vegerand û pênc hezar dînar da wê jî, weke xelat. Bi wî hawayî Tewedûdê hişt ku xwediyê wê jê re deyndar bimîne heta dawîya emrê xwe.

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 467'EMÎN

Şehrezadê got:

Îcar şahîşahê min ê gewre û bextewar, gava ku xelîfe Harûn Reşîd pênc hezar dînar da cariyeyê û ew li xwediyê wê vegerand, Ebûl Hesen ê xwediyê wê jî jê re bû deyndar hetanî dawîya emrê xwe.

(ÇÎROKA MELÎKÊ MIRINÊ)

Îca ez ê dest bi çîrokek din bikim. Tê gotin ku melîkek ji melîkên berê, xwest ku rojekê, li gel rêvebirên dewleta xwe siwar bibe û hunerên xwe nîşanî gelê xwe bide. Gazî mîr û emîr û gizîr û wezirên xwe kir û ji wan re got, xwe amade bikin. Ji xeznedar re jî got: “Cil û bergên min ên herî xweşik û spehî bîne.” Û ji seyyîsê xwe jî xwest ku hespê wî yê navdar jê re amade bike. Kincên xwe li xwe kirin û li hespê xwe yê navdar siwar bû, di nava cewher û durr û yaqûtan de xwe bi paye kir, mîna dîkê qoqo û da pêşiya wezîr û gizîran, di nava gel de meşîyan. Wê gavê îblîs ket pêxîla wî, destê xwe danî ser pozê wî, ber bi jor ve rakir û ew nepixand. Wî jî di dilê xwe de ji xwe re got: “Ma kî mîna min jêhatî û spehî û hêzdar heye li ser rûyê vê dinyê!” Û ket nav hestên pozbilindî û xweecibandineke bêsînor û bêtîmtêl. Êdî nema

ne li kesî dinêrî û ne jî li xwe datanî ku silava kesî bigire, xwe li ber perên asîmanan didît mîna ku baskên wî çêbûbin û nigên wî ji erdê qut bûbin.

Zilamekî ku kincin qetiyayî û pînekirî lê bûn, li ber destê wî sekinî û silavek lê da. Lê melîk silava wî negirt, mîna ku tiştek nebihîstibe. Zilam bi rişmeya hespê wî girt, melîk jê re got: “Destê xwe rake ji ser rişmeya hespê min, lewre tu nizani bê tu li himberî kê yî!” Zilam got: “Pêdiviyeke min li ba te heye.” Melîk got: “Bêhna xwe fire bike hetanî ku ez ji ser pišta hespê xwe dakevim û pêdiviya te pêk bînim.” Zilam got: “Pêdiviya min razeke veşartî ye û ne di guhê te de be, ez nikarim bi lêv bikim!” Melîk xwe jê re tewand û guhê xwe bir ber devê wî. Zilam jê re got: “Ez melîkê mirinê me û ez hatime ruhê te bistînim!” Melîk got: “Moletê bide min hetanî ku ez vegerim malê û xatir ji jin û zarokên xwe, ji cîran û nasên xwe bixwazim.” Melîkê mirinê (melkemot) got: “Na, tu nikarî vegeirî malê û ne jî zarokên xwe bibîni, lewre ecelê te hatiye û temenê te li vê dinyayê qediyaye.” Piştî di cî de ruhê wî stend û ew jî ji ser pišta hespê hat xwarê, ket erdê, mir. Melîkê mirinê jî bi rêya xwe de çû, hetanî ku li zilamekî salih qelibî. Ji zilam re got: “Ey mirovê çê û rasterê, pêdiviyeke min bi te heye?” Zilam got: “Pêdiviya te çi be, di guhê min de bibêje!” Melîkê mirinê jê re got: “Ez melkemot im!” Zilam got: “Bi xêr hatî tu, li ser seran û li ser çavan hatî tu! Ji mêj ve ez li hêviya te bûm û min bêriya te kiribû.” Melkemot got: “Heger karekî te hebe, biqedîne!” Zilam got: “Tu karê min ne girîngtir e ji çûna cem Xwedayê min û dîtina wî.” Melkemot got: “Tu çawa dixwazî, ez ê wisa ruhê te bistînim, lewre ferman ji min re hatiye dayîn, ku ez li gora daxwaza te tevbigirim.” Zilam got: “Nexwe moletê bide hetanî ku ez destnimêja xwe bigirim û nimêja xwe bikim. Gava ez daketim sicûdê, tu ruhê min bistîne!” Melkemot got: “Emir ji min re wisa hatiye dan û ez ê li gora daxwaza te ruhê te bistînim.”

Zilam çû destnimêja xwe girt, sicadeya xwe raxist û dest bi nimêja xwe kir. Gava daket sicûdê jî, melkemot ruhê wî stend û ew bir cem Xwedayê wî, cihê dîlovani û bihuştê.

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 468'EMÎN

(ÇÎROKA JINA QENC A DI NAV BENÎ ÎSRAÎL DE)

Şehrezadê got:

Tê gotin ku di nav Benî Îsrailê de qaziyek hebû ku xwediyê jineke qenc, sincdar, sebirêş û pir spehî bû. Rojekê, wî qaziyê xwest ku serdana Mala Pîroz bike li Qudsê. Birayê xwe li şûna xwe peywirdar kir di karê qazîtiyê

de û jê xwest ku li jina wî jî miqate be. Jixwe wî jî bihîstibû ku jinbira wî pir xweşik e, tembîtiya birayê xwe qebûl kir.

Gava qazî berê xwe da Qudsê û çû, birayê wî çû cem jina wî û daxwaz jê kir. Lê jinikê qebûl nekir û ew red kir. Çiqasî ku wî ew daxwaza xwe li ser wê seband, jinikê hîn bêtir li ber xwe da û daxwaza wî jî binî ve qebûl nekir. Îcar dema ku hêviya wî tê de nema, tirsîya ku dema birayê wî vegere, jina wî jî vê meseleya wî jê re veke û wî pê agahdar bike. Rabû ser xwe, çû çend şahidên derewîn peyde kirin û giliyê wê li cem siltanê wê demê kir, got jinbira min zîna kiriye. Siltan jî fermana recimkirina wê da. Ew birin, xistin kortalekê û tê de dan rûniştandin û kevir bi ser de barandin, hetanî ku ser hat girtin. Gotin bila ew koncal jê re bibe gor û ew jê dernexistin, tê de hiştin.

Hetanî şev hat, jinik bi ser xwe ve hat û ji êşa canê xwe kir axîn û nalîn, qîr dan. Di wê kêlikê de zilamek jî di wir re derbas dibû û dengê wê bihîst. Çû ser wê koncalê, kevir ji ser dan alî û ew ji wir derxist, avêt ser piştê xwe û ew bir cem jina xwe, jê xwest ku birînên wê derman bike. Jina wî ew derman kir û pê ve mijûl bû, hetanî ku rihet bû û bi ser xwe ve hat. Gava bi ser xwe hat û rihet bû, jina mêrik kurikê xwe yî biçûk da cem wê û ew li maleke din, li kêleka xwe bi cih kir, da ku li wir rakeve. Di wê navberê de dizek çav lê ket û ket bin bandora spehîbûna wê. Xeber jê re şand û jê xwest ku pê re rakeve lê jinikê qebûl nekir. Mirovê diz jî biryar da, ku wê bikuje. Bi şev, bi dizî ket hundir û hewl da ku bi kêrê wê serjê bike, lê piştê dît ku wî li şûna jinikê kurikek serjê kiriye. Pir tirsîya, çogên wî ricifin, fîltî fîltî ji malê derket û reviya, çû. Roja dîtir gava diya kurik hat û dît ku kurê wê hatiye kuştin, bi ser jina qazî de rabû û got: “Te kurê min kuştîye! Lê da û hey lê da, hetanî ku ew ji haw haw de xist. Lê hîna ku ew nekuştibû, mêrê wê bi ser wan ve giha û ew ji nav lepên wê rizgar kir. Jina qazî bi lez ji wê malê reviya, derket çû, bêyî ku bizanibe bê bi ku ve diçe. Tiştêk jî pê re tune bû ji xeynî çend dirhemên pê ve. Çû gundekî, dît ku zilamek bi darekê ve daliqandî ye û girseyeke gel jî lê kom bûye lê zilam hîna nemiribû. Jinikê ji xelkê pirsî, got: “Çi heye?” Gotin: “Gunehek kiriye, divê yan ew qas dirhem bide yan jî were darvekirin.” Jinikê got: “A jî were dirhemên ku hûn dixwazin û wî berdin!” Girseyê dirhem girtin û ew berdan. Wî jî li ser destê jina qazî tobe kir û ji xwe re sond xwar ku hetanî dawîya temenê xwe di xizmeta wê de be. Piştê jê re tekeyek ava kir û ew tê de bi cih kir. Her roj jî ardû û xwarin û qûtê wê jê re tanî. Jinik jî bûbû şêxeke ku hemû nexweş û kor û ker li ser destê wê rihet dibûn û şîfaya xwe didîtin û her tim jê re dua dikirin.

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 469'EMÎN

Şehrezadê got:

Vêca şahîşahê min ê gewre, piştî tekeya jinikê bû meqseda hemû nexweş û kerr û kor û kwîran, Xwedê Teala wisa li hev anî, ku ew birayê mêrê wê yê ku ew recimandibû, bi nexweşiya birdobelek ketibû û rûyê wî kurmî bûbû; jina ku lêdabû jî gurri bûbû û dizê ku ew kurikê di ber wê de kuştibû jî bawî û tawî bûbû, nema dikaribû bimeşe. Di wê navberê de, mêrê wê yê qazî ji Qudsê vegeyabû û li wê pirsibû, wî jî gotibû miriyê û ew jî pir li ser wê êşiyabû û xemgîn bûbû.

Navê jinikê bi şêxîti û ewliyabûnê li nav xelkê belav bû û ji çar hêlên welat, kesên nexweş û tawî û bawî bi ser tekeya wê de bariyan bi armanca ku rihet bibin û ji wan nexweşiyên xwe xelas bibin.

Rojekê qazî ji birayê xwe yê nexweş re got: “Biracan, te qet ew ewliyaya Xwedê bihîstiyê? Çima tu seriyekî lê nadî, belkî li ser destê wê tu rihet bibî û ji vê nexweşiyê rizgar bibî?” Birayê wî got: “Baş e, kanî min bibe cem vê jinikê!”

Mêrê jina ku gurri bûbû jî nav û dengê wê jinikê bihîstibû, wî jî jina xwe bi xwe re bir û berê xwe da tekeya wê. Zilamê diz jî, bi heman şeweyî berê xwe da tekeya wê. Jinikê bi xwe jî, hemû kesên ku dihatin tekeya wê didîtin, bêyî ku hayê kesî ji wê hebe. Hemû hatibûn ber derî û li hêviya xizmetkarê wê bûn, ku yeko yeko iznê bide wan, ji bo ku derbas bibin cem wê. Wê jî rûpoşek dabû ber çavên xwe, li devê derî sekinibû, li mêrê xwe û birayê wî; li mirovê diz û jina ku lê dabû dinêrî. Ew hemû nas kirin lê wan nizanibû bê jina li himberî wan kê ye. Jinikê ji wan re got: “Hetanî ku hûn li xwe mikur neyên û hûn gunehên xwe neynin ziman, hûn ji nexweşiyên xwe rizgar nabin. Lewre gava ku mirovek li xwe mikur tê û gunehên xwe dibêje, Xwedayê gewre ji lê tê rehmê, wî efû dike.”

Qazî ji birayê xwe re got: “Birawo, tobe bike û di gunehê xwe de israr neke; nexwe tu rizgar nabî!” Birayê wî, li xwe mikur hat û tiştê bi jina wî kiribû, yeko yeko anî ziman. A gurri jî got: “Jineke ku bi mêvantî li cem me bû, min gunehêkî ku wê nekiribû xist stûwê wê û bi zanebûn min lê da.” Dizê bawî jî got: “Ez derbasî cem jinikê bûm ji bo ku ez wê bikujim, ji ber ku daxwaza min red kiribû lê li şûna wê, min kurikek serjê kir û gunehê min jî ev e.”

Jina salih û ewliya got: “Xwedêyo, te çawa cezeyê wan gunehên wan da wan û te ew nexweş xistin, tenduristî û rêya rast jî nîşanî wan bide û wan ji wê eziyetê rizgar bike!”

Xwedayê gewre duaya jina salih qebûl kir û ew hemû rihet kirin. Qazî jî bi baldarî lê nêrî û şaşwaz ma. Jina salih got: “Çima tu wisa li min dinêrî?” Qazî got: “Jineke min hebû pir dişibiya te, heke ne miribûya, min ê bigota

tu bi xwe yî!”

Jina salih xwe pê da naskirin, herdu şad û bextewar bûn û spasiya Xwedayê xwe kirin, ku careke din ew gihandin hev bi saxî û selameti. Birayê wî û diz û jinika dîtir jî xwe avêtin destê wê û lêborîna xwe jê xwestin. Wê jî ew efû kirin û hemû bi hev re di wir de jiyana xwe berdewam kirin, di nava xiroş û bextewariyê de, hetanî roja qiyametê.

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 470'YEMÎN

(ÇÎROKA JINA SALIH BI MÎRZAYEKÎ RE LI MEKKEYÊ)

Şehrezadê got:

Tê gotin ku mîrzayekî behsa serpêhatiyeke xwe kiriye û gotiye:

Carekê, di şeveke tarî de dema ez li nav Mekkeyê digeriyam, min pêjna nalîn û axîna dengê kir, ku ji kezebê dihat û digot: “Ya kerîm! Ez hîna li ser soza xwe ya berê me, kanî ew dilovaniya te ya berê?” Guhên min mişt bûn bi olana wî dengê ku bandoreke mezin li min kir û dilê min bi xwe re bir, weke ku êsîr girtibe. Min berê xwe da wî dengî û ez ber bi wî ve çûm, min bala xwe dayê ku jineke dinal e. Min got: “Silava Xwedê li ser te be ey evda Xwedê!” Wê got: “Silava wî li ser te be jî.” Min got: “Tu bi Xwedê kê ew soz û ew kesê ku tu dilovaniya wî dipirsî kê ye?” Got: “Heger sonda min ji Xwedê re tune bûya, min raza xwe ji te re nedigot.” Di wê navberê de min raçavkirinike din kir û min dît ku pitikek di himbêza wê de raketiye. Jinikê axaftina xwe berdewam kir û got:

Ez ducanî ji malê derketim û min berê xwe da vir, ji bo ku mala Xwedê tewaf bikim û heca xwe pêk bînim. Ez bi keştiyê dihatim û bi rê de pêlên behrê li me rabûn, ba berê xwe guhert û keştiya me ji hev ket, binav bû. Ez jî di rê de welidîbûm û ev pitik di himbêza min de bû. Min xwe bi textikê ve girt û ez û pitikê xwe wisa rizgar bûn ji wê bobelatê. Lê hîna em di avê de bûn û pêlan em bi ku ve dibirin, min nizanibû. Demekê bi şûn de, ez û qep-tanê keştiyê li hev rast hatin. Ew jî hat textê ku em li ser bûn û ji min re got: “Hîna em di keştiyê de bûn dilê min di te de hebû û çavên min li ser te bûn. Niha jî va ye min tu bi dest xistî, de kanî rê bide min, ku ez bi te şa bibim!” Min got: “Tişteki wisa ne gengaz e.” Wî got: “Heger tu nehêlî ez ê te û pitikê te bavêjim behrê.” Min got: “Qey tu ji Xwedê natirsî û te hîna jî derseke ji vê bobelata ku bi serê me de hatiye dernexistiye?” Got: “Gelek caran wisa bi serê min de hatiye û ez rizgar bûme û qet ne xema min e jî.” Min got: “Ev

bobelat e û incex bi duristbûn û şopandina rêya Xwedê em jê xelas bibin, ne bi gunehkariyan. Lê wî pir israr kir û gava min dît ku xelasî ji nav lepên wî nîn e, min xwest ez wî bixapînim, min jê re got: “Bêhna xwe fire bike, bila pitikê min rakeve, paşê, tu çi dixwazî bike.” Hîna ku min ew gotina xwe neqedandibû, wî destê xwe avêt pitikê min û ew avêt behrê. Gava min ew êrîşkariya wî dît, dilê min hat guvaştin û êşa qolinceke ecêb ket nava min, ez peritandim. Min serê xwe berjor ve rakir û got: “Ey Xwedanê hêzdar ê ku dikare bikeve navbera dil û xwediyê wî; bikeve navbera min û vî şêrê dirinde jî!” Vêca hîna ku min ew duaya xwe kuta nekiribû, min bala xwe dayê ku ajalekî dirinde ji nav avê derket û ew şêrê dirinde yê tecawizkar ji cem min bir û dîsa binav bû, çû. Ez, tenê li ser wî textî mam. Tirsê min çûbû lê êşa pitikê min ez xistibûm nava agirekî ku nedihat vemirandin. Min di ber xwe de loran û got: “Pitikê mino, roniya ber çavê mino, tu çûyî û te ev agir di nava min de hiştî! Tu rê li pêşiya min tune ne ji xeynî vegera te! Xwedêyo tu tenê dizanî bê çi agir di nava min de ye û ez di çi halî de me û tu baş dizanî ku ev giş ji ber çûna pitikê min e. De kanî dîsa me bigihîne hev careke din, lewre tu hêzdar î!”

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 471'EMÎN

Şehrezadê got:

Jinikê vegotina serpêhatiya xwe berdewam kir:

Şev û rojekê sax, ez di wî halî de mam. Sibeha roja dîtirkê, min bala xwe dayê ku bawanê keştiyekê ji dûr ve xwiya dike. Xwedê wisa ji min re li hev anî û ew keştî ber bi min ve hat û pêlên avê jî ez ber bi wê de birim, hetanî ku li min qelibî û siwarên wê ez xelas kirim, ez girtim cem xwe. Wê gavê, min bala xwe dayê ku pitikê min jî di wê keştiyê de ye. Min xwe bi ser de avêt û ji wan re got: “Xelkino, ev kurê min e, we ew ji ku aniye?” Wan jî got: “Em di rê de bûn, carekê me dît ku ajaleke ecêb li pêşiya me ye di nav avê de û ev pitik jî li ser piştê wî ye, tiliya xwe dimije. Me jî ew hilda cem xwe û bi xwe re anî.”

Gava min ew tişt ji wan bihîst, min serpêhatiya xwe, ji wan re vegot û spasiya xwe ji Xwedanê xwe re diyar kir û min soz dayê ku ez ji mala wî veneqetim û her di xizmeta wî de bim. Wî jî her tim duayên min qebûl kirin û destê min vala nehiştin.

Bi vê gotina wê re, min jî destê xwe avêt tûrikê xwe ji bo ku ez sedeqeyekê bidim wê. Lê belê wê li min vegerand û got: “Ez ji te re behsa dana wî dikim û tu jî destê alîkariyê didî min, ma qey tu tenegehîştî ku ne ji destê wî

be ez ji destê tu kesî nagirim!”

Min kir û nekir min nikaribû ez alîkariyekê pê bidim qebûlkin. Ez bi rêya xwe de çûm û min di ber xwe de got: “Xwedêyo tu çiqasî nediyar bî jî, dan û dilovaniya te li her derê xwiya ye û her kesê xwedî feraset bê guman şopên te dibîne. Loma piştî her tengahiyekê, firehiyek tê û her ku sibehê êşek dikeve canê mirov; êvarê şûna xwe ji kêf û şahiyê re dihêle. Çiqasî dinya li mirov teng bibe jî, divê mirov bawermend be ku dê feraceke xêrê li mirov vebibe.

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 472'YEMÎN

(ÇÎROKA ZILAMÊ CIHÛ YÊ QENC)

Şehrezadê got:

Tê gotin ku di nava cihûyan de zilamekî baş û qenc hebû ku ji Xwedayê xwe pir ditirsiya û destê xwe ji xêr û xweşiyên jiyanê kişandibû, tenê îbadeta Xwedayê xwe dikir. Jina wî jî her dem pê re alîkar bû di hemû kar û xebatên wî de û qet ji rêya wî dernediket jî. Herdu pirot bûn; kûz, kûzik, kedûn û sênîkên ji qehfîk di mala xwe de çêdikirin û wan bi xwe jî difiroto û xwe pê xwedî dikirin. Roj pê de dixebitîn û êvarê jî tiştên ku çekiribûn bi xwe re derdixistin, li sikakan, li ser rêyan, li kirîdarekî digeriyan, ji bo ku bifiroşin wan.

Rojekê herdu bi rojî bûn lê dîsa jî xebitîn. Ber êvarê, zilam mîna her car rahişt hinek kûz û kedûn û sênîk û berê xwe da nava bajêr. Zilamê cihû bi xwe jî, mirovekî gewr, lihevhatî û spehî bû. Gava di ber malên maldaran re derbas bû, jineke ku mêrê wê ne li mal bû çav lê ket û dilê wê bijiya wî. Gazî xizmetkara xwe kir û jê re got: “Here pêşiya wî zilamî û bi mahneyekê wî bixapîne û bîne vir.”

Xizmetkara jin çû pêşiya zilamê cihû û jê re got: “Were hundir, xatûna min dixwaze ji nêzik ve li malên te binêre û hinekan ji te bikire.” Zilam jî gotina wê bawer kir û derbasî malê bû, li hundir rûnişt. Xatûn jî derbasî cem wî bû, deriyê malê li ser girt, kirasê wî ji ser wî kişkişand û jê re got: “Ev demeke dirêj bû ku ez li bendî vê yekê bûm û îro ji min re li hev hatiye; mêrê min ne li mal e, xwarin jî amade ye û ez jî pir bêsebr im, kêlî berî kêliyê dixwazim bi te şa bibim. Xwedê şahidê min e û ew baş dizane bê çiqas mîr û milûkan bera dû min daye lê min berê xwe nedaye yekî ji wan.”

Jinika xatûn bi daxwazeke agirîn diaxivî û hey diaxivî lê zilamê cihû

serê wî di ber wî de bû, newêrîbû serê xwe rakira û li çavên wê binihêrta an jî devê xwe vekira û bigota na. Lewre pir ditirsiya ku cezayekî lê bibirin û bêbextiyekê bixin stûyê wî. Herî dawiyê li rêyeke xelasê geriya û ji jinekê re got: “Ez tiştekî ji te dixwazim.” Wê got: “Û ew çi ye?” Zilam got: “Aveke pak û tahir ji min re bîne ku ez herim pê destavekê bigirim û hinek gemara laşê xwe pê paqij bikim.” Jinikê got: “Baş e ez ê avê ji te re bînim. Jixwe mala me jî fire ye û qedemgeha me jî heye.” Zilam got: “Ez herim ser ban wê çêtir be.”

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 473'EMÎN

Şehrezadê got:

Gava ku zilamê cihû wisa got, xatûnê gazi kir xizmetkara xwe û jê re got: “Pê re derkeve ser ban, rê nîşanî wî bide bila pêdiviya xwe pêk bîne!” Xizmetkara wê, bi zilam re derket ser banê xanî, rê nîşanî wî da. Piştî ji bo ku tehret û destnimêja xwe bigire, misîn û leganek danî cem û bi şûn de çû jêrê. Piştî ku xizmetkara jinikê çû, zilam çû kêlekê û li jêrê nêrî, ji bo ku xwe bavêje. Lê xanî pir bilind bû û tirsîya ku bi xweavêtinê re perçe perçe bibe. Lê ji aliyekî din ve jî kirina gunehekî wisa mezin da ber çavên xwe û tirsî Xwedayê wî ket nava dilê wî!

Berê xwe bi azmanan vekir û got: “Xwedêyo ji te ve xwiya ye û tu dibînî bê ez ketime çi rewşê! Hêzdarê mezin tu yî û tu her tiştî dikarî bikî!” Piştî, çavê xwe girtin û xwe berjêr berda. Di wê kêliyê de Xwedayê gewre ferîşteyek şand hewara wî û baskên xwe dan bin wî, hêdî ew daxist erdê, bêyî ku zirarek bigihîje bedena wî.

Gava ku nigên wî erd girtin û dît ku tiştek pê nehatiye, spasiya xwe diyar kir ji Xwedayê xwe re û di nava aramiyeke bêtîmêl de meşa xwe berdewam kir, çû malê, cem jina xwe. Ji ber ku dereng vegeriyabû malê û tiştek jî di destê wî de tune bû, jina wî sebaba derengketina wî jê pirsî û buhaya firotina kûzên ku bi xwe re bîrîbû. Zilam, bobelata ku bi serê wî de hatibû û şewaza rizgarbûna xwe hemû, yek bi yek ji jina xwe re vegot. Wê jî dilê mêrê xwe xweş kir û şikir ji Xwedayê xwe re kir ku ew ji nav wê bêbextiya mezin xelas kiribû. Piştî pê de çû û got: “Mêro, ji adeta me bû ku her êvar em tenûra xwe dadin û nanê xwe lê bidin, ka em îşev jî tenûra xwe dadin, ji bo ku cîranên me pê nehesin ku em bîrçî mane.”

Di pey re rabû ser xwe, hinik êzing avêtin tenûrê û agirê wê dada. Piştî ew û mêrê xwe ketin xiroşê û ji Xwedayê xwe re îbadet kirin. Di wê navberê de cîraneke wan hat izin ji wan xwest, ji bo ku hinek agir ji tenûra wan bibe, pê agirê xwe dade. Wan jî jê re got: “Tenûr li wir e, here agir ji xwe

re bibe, koza wê hîna germ e.”

Gava jinik çû cem tenûrê û lê nêrî ji bo ku agir jê bibe, qîrek da û gazî kevaniya malê kir, got; filankesê zû were nanê te dike bişewite!

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 474'EMÎN

Şehrezadê got:

Gava cîrana wê wisa pê de qîriya, xwediya malê ji mêrê xwe re got: “Te bihist bê cîrana me çi dibêje?” Zilam got: “Ka rabe here binêre!”

Jinik rabû ser xwe û bi lez çû ser tenûrê, lê nêrî; dît ku hetanî bi ber devê wê tijî nanê spî û teze ye, dike qîçeçiq! Xwedêyo ev çi ye! Hem pir kêfxweş bûbû û hem jî şaş û metal bûbû. Bi lez nanê xxe ji tenûrê rakir, da ser milê xwe û berê xwe da cem mêrê xwe. Bi rê de jî bê navber spasiya Xwedayê xer dikir, li ser wê nîmet û qenciya ku bi wan kiribû. Ew û mêrê xwe li cem hev rûniştin, nan û ava xwe li ber xwe danîn û têra xwe xwarin. Piştî jinikê ji mêrê xwe re got: “Mêro, ka were em duayan bikin û ji Xwedayê xwe bixwazin, bila tiştêkî bide me ku pêdiviya me bi vê kar û xebata zor nemîne, da ku em wextê xwe gişî bixin xizmeta îbadeta wî!” Mêrê wê got: “Ka em bikin. Piştî dest bi dua û lavayan kir, jina wî jî li pey wî dubare kir, hetanî ku zikê xaniyê wan vebû û yaqûtek tê re daket xwarê, mala wan giş ronî kir bi şewqa xwe! Pir kêfxweş bûn bi wê yaqûtê û careke din spasiya Xwedayê xwe kirin li ser wê qencyê.

Bi şev, piştî ku di xew re çûn, jinikê di xew de dît ku çûyê bihuştê û li wê derê her der tijî menber û kursî bûn. Ji kesên wir pirsî, got: “Ev çi menber û kursî ne?” Wan jî got: “Menber ji bo pêxember û nebiyan e; kursî jî ji bo hevalên wan û kesên salih û qencên Xwedê ne.” Jinikê pirsî xwe berdewam kir û got: “Kanî kursiya mêrê min li ku ye?” Wan jî tabûreyek nîşanî wê dan û gotin: “Ev cihê mêrê te ye.” Jinikê got: “Û ev çi kumik e li ser e?” Wan got: “Ew kumik jî, cihê yaqûta ku di zikê xaniyê we re daketibû.”

Bi wê bersiva hanê re, jinik bi xwe hesiya û ji xew şiyar bû, piştî dest bi girî kir, lome û gazin ji mêrê xwe kir û jê re got: “Mêro, kanî dua û lavayiyan ji Rebê xwe re bike, bila wê yaqûta xwe bi şûn de bigire, bila em li vê diniyayê feqîr û birçî bimînin lê bila li wê dinyayê kursiyeke te jî hebe di nava sahabe û qencên Xwedê de!”

Zilam rabû ser xwe û dest bi duayan kir, hetanî ku ew yaqûta wan dîsa ber bi jor ve firiya û di zikê xanî re derket, ber bi asîmanan ve çû. Herduyan jî bi hev re îbadeta xwe berdewam kirin û ji yana xwe jî di nava kedeke

mezin û hejariyê de berdewam kirin, hetanî ku derketin qada rebê xwe, bi dilekî aram.

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî dengê xwe birrî û gotina xwe bi dawî kir.

ŞEVA 475'EMÎN

(ÇÎROKA ÎBRAHÎM ÎBNIL XEWAS Û KEÇA SILTAN)

Şehrezadê got:

Tê gotin ku gorbihuşte Îbrahim Îbnil Xewas ê rehmetî gotiye:

Carekê ji caran, nefsa min xwest ku ez herim serdana welatê kafiran. Lê min bi ya nefsa xwe nekir û hewl da ku ez pêşiya vê daxwaza xwe bigirim û vê fikrê ji hişê xwe bavêjim. Lê min kir û nekir ew fikir ji serê min derneket û kezeb li min reş kir. Rabû min amadekariyên rêwitiya xwe kir û berê xwe da welatên kafiran. Ez welat bi welat geriyam û min çavên xwe li nav wan gerand lê tu kesî guh neda min. Çavên min li kîjan filehî biketa, hema di cî de berê xwe ji min diguhert û ji min dûr diket. Herî dawiyê ez çûm welatekî, min bala xwe dayê ku li ber deriyê bajêr qefleyek bendeyên çekdar hene, ku her yek ji wan perçeyek hesin di destê wan de bû. Çawa ku çavên wan li min ketin, gazî min kirin û ji min pirsîn, gotin: “Tu bijîşk î?” Min got: “Belê.” Gotin: “Nexwe were em te bibin ba siltanê xwe.”

Ez birim cem siltanê xwe, min bala xwe dayê ku siltanekî gewre û hêzdar e, rûgeş û xwînşîrîn e. Çawa ku awirên wî li min ketin, ji min re got: “Tu bijîşk î?” Min got: “Belê.” Got: “Wî bibin cem wê û şertên derbasbûna cem wê jê re bibêjin!”

Li ser vê gotina siltan, bendeyên wî ez ji wir derxistim û ji min re gotin: “Keça siltan bi nexweşiyeke giran ketiye, ku tu kes nizane bê dermanê wê çi ye û bijîşk pê re heyirî manê. Vêca kîjan bijîşkê ku derbasî cem wê dibe, ji bo ku wê derman bike û bi ser nekeve, siltan wî dukuje. Îcar tu jî li gora vê yekê biryara xwe bide!” Min ji wan re got: “Madem ku siltan ev yek ji min xwestiye, ka min derbasî cem wê bikin.”

Ez birim ber deriyê wê û lê dan. Wê ji ji hundir ve gazî kir û got bijîşk derbasî cem min bikin, ez dixwazim Xwediyê razên ecêb bibînim. Piştîre bi helbestî got:

Derî vekin va ye bijîşkê min hatî
Raza giran li ba min e va roja wê hatî
Çi tiştê ji bo min nêzik ji bo we dûr e
Çi tiştê ji bo min dûr ji bo we nêzik e

Çiqasî di nav we de bim jî ez im xerîb
Loma xerîbtîya xwe derman dikim bi yekî xerîb
Olek me tîne ba hev lê gelo kîjan î tu
Evîn î evîndar î muhîb î yan hebîb î tu
Naxwazim ez bigihême yekî fanî li vê dinê
Dixwazim ez bibim yek ji nemireke wê dinê

Pîrekalekî bi lez derî vekir û ji min re got: “Derbas bibe hundir!” Ez derbas bûm, min dît ku odeyeke bi hevrişim û gul û rihanan raxistî ye. Li goşeyekî perdeyên rengareng daliqandî bûn û dengê nalînekê ji pişt perdeyê dihat. Ez li ber perdeyê rûniştim û min niyet kir ku ez silavekê lê bikim. Lê gotina pêxember -silavên Xwedê lê bin- hat bîra min, ku digot: “Gava hûn li fileh û cihûyan rast hatin, dest bi silavdayînê nekin!” Min jî fikra xwe guhert û ez bêdeng mam.

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî dengê xwe birrî û gotina xwe bi dawî kir.

ŞEVA 476'EMÎN

Şehrezadê got:

Îbrahim vegotina serpêhatîya xwe berdewam kir:

Dema ku ez bêdeng li ber nivîna wê rûniştim, wê ji pişt perdeyê gazi kir û got: “Ey mirovê taybet û hêja, kanî silava Xwedê û xewasên wî?” Ez şaşwaz bûm li himberî wê gotina wê, min got: “Tu ji ku dizanî vê yekê?” Wê li min vegerand û got: “Gava ku dilê mirov bi hev re safî be û hestên mirov rasteqînî bin, zimanê mirov jî razên hundirê mirov êşkere dikin. Jixwe doh min ji Xwedê xwestibû ku welîyekî xwe ji min re bişîne, da ku xelasiya min çêbibe li ser destê wî. Wî jî bersiv dabû min û dengê ji goşeyê xanî hatibû, ji min re gotibû; xemgîn nebe ez ê xewasekî xwe yê bi navê Îbrahîm ji te re bişînim.”

Min jê re got: “Û rewşa te çawa ye?” Wê got: “Ji çar salan berê ve rêya heq ji min re xwiya kiribû û min Xwedayê xwe nas kiribû. Jixwe di her çar salên borî de, heval û hogir û axêvger û wenskarê min jî her ew bû. Dost û merivên min bi çavekî din li min meyzandin, çawa ku ez din bûbim û nexweş ketibim. Loma kîjan bijîşkê ku derbasî cem min bû, ez din kirim û kîjan ji wan hat serdana min ez şaş kirim.”

Min jê pirsî: “Delîlê vî tiştê ku tu dibêji çi ye?” Wê got: “Şopên ku ez dibirim ser rêya heqiyê û îbatên wê yên êşkere. Gava ku her tişt êşkere dibe, mirov delîl û medlûl herduyan jî dibîne.”

Hîna ez pê re diaxivîm, kalemêrê ber derî hat û jê pirsî, got: “Bijîşkê te çi kir?” Wê lê vegerand û got: “Nexweşiya min nas kir, dermanê rast da min

ku aramî û şahiyêke gezgezok ket nav dilê min û hişê min anî serê min.”

Kalemêr bi lez li siltanê xwe vegeriya û ew mizgîniya xweş dayê. Siltan ferman da wan, ku qedrê bijîşk bigirin û pir lê miqate bin. Bi wî hawayî ez heft rojan li gel wê mam. Roja heftan ji min re got: “Ey bavê Îshaq! Em ê kengî koçî welatê îslamê bikin?” Min jê re got: “Wê derketina te ji vir çawa çêbibe û kî diwêre vî karî bike?” Wê got: “Ê ku berê te da vir û tu derbasî cem min kirî!”

Roja dîtirkê, min ew da kêleka xwe û em di deriyê kelehê re derketin, bêyî kes me bibîne. Li gel ku em di ber parêzvanan re derbas bûbûn. Xwedê perdeyek avêtibû ser çavên wan û kesî em nedîtin. Em çûn kêleka mala Xwedê bi cih bûn. Heft salan li ser hev wê, tenê nimêj dikir û rojî digirt. Piştî ku heft salên wê tamam bûn, Xwedê ew bi rehma xwe şa kir û li wê axa pîroz hat definkirin.

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 477’EMÎN

(ÇÎROKA CIHÛYÊ DURUST)

Şehrezadê got:

Tê gotin ku cihûyekî durist û salih ji Benî Îsrâîl hebû ku pir zengîn û maldar bû û kurekî wî yî qenc û baş hebû. Vêca gava ku extiyar bû û mirina wî hat, kure wî li ber serê wî rûnişt û jê re got: “Wesiyetekê li min bike bavocan!” Bavê wî got: “Kurên min, bi navê Xwedê sund nexwe û xerabiyê meke!” Piştî mir û çû ber diolovaniya Xwedê.

Kurê wî şûna wî girt û maldariya wî bi rê ve bir. Di wê navberê de hinek ji fasiqên Benî Îsrâîl miseletî wî bûn û her roj çûn û hatin serdana wî. Yek ji wan fasiqan her roj dihat cem wî û jê re digot: “Ev qas deynê min li cem bavê te hebû yan wî deynê min bide min an jî sond bixwe ku bavê te behsa vî deynê min ji te re nekiriye!” Kurê zilam jî wesiyeta bavê xwe tanî bîra xwe, sond nedixwar û deynê ku behsa wî dikir, didayê. Wî fasiqî jî ew listika xwe wisa berdewam kir, hetanî ku mal û milk bi kurik ve nehişt.

Îcar jineke wî ya salih û durist hebû ku du kurên wî jê hebûn û herdu jî hûrik bûn. Rojekê ji jina xwe re got: “Xelkê gelek deyn û dîrav ji min xwestin û tiştê ku di destê min de hebû min da wan û tiştek di destê min de nema. Îcar ji niha û pê ve heger hinek hatin û tiştek ji me xwestin, tiştêkî ku em bidin wan jî di destê me de nemaye. A baş ew e ku em ji vir bar bikin û herin cihekî ku kes me lê nas neke.”

Piştire jina xwe û herdu zarokên xwe dan kêleka xwe û li keştiyekê siwar bûn, berê xwe dan welatekî din. Di nivê deryayê de pêlên avê li wan rabûn, keştiya wan ji hev ket û her yekî ji wan xwe bi textikekî ve girt. Binav nebûn lê pêlên deryayê ew ji hev dûr xistin û her yek ji wan bi cihekî de çû. Jina wî li bajarekî qelibî, kurekî wî çû bajarekî din, kurê wî yê din jî li keştiyekê qelibî, wan ew ji avê rizgar kirin, ew bi xwe jî li giravekê qelibî, hilkişiya ser wê, bi xelasê ket. Piştire destnimêj girt, han da û rabû nimêja xwe kir.

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birî û bêdeng bû.

ŞEVA 478'EMÎN

Şehrezadê got:

Piştî ku nimêja xwe kir û rabû ser xwe, dît ku reng bi reng mirov derketin ji nav deryayê û hatin li pey wî û li kêleka wî rêz bûn, pê re nimêj kirin. Piştî ku nimêja bi wan re jî qedand, çû bin darekê ji bo ku nêza xwe bişikêne û têr fêkî xwar.

Piştî sê rojan, dengê hat wî, jê re digot: “Ey mirovê durist û salih, ê ku bi bavê xwe re dilsoz bû û ji rastiye veneqetiya! Xeman mekişîne, misoger dê Xwedayê gewre li hewara te were û dê wendahiye te li te vegerîne. Lewre di vê giravê de dirav û define û malin giran hene, Xwedê Teala dixwaze ku wan dewrî te bike. Ew maldarî û ew define giş jî di filan derê de ne, de êdî here wan derîne û em ê jî keştiyan ji te re amade bikin. Tu jî hişyar be û hewl bide ku tu bi xelkê re qenc bî û alîkarê wan bî, da ku Xwedê Teala berê dilê wan bide te.”

Rabû ser xwe û berê xwe da ew cihê ku jê re hatibû destnîşankirin. Li wê deverê Xwedayê gewre defineyên veşartî nîşanî wî dan û keştî jî yeka yeka bi ser de hatin. Wî jî bi elba mezin dida wan, qencî bi wan dikir û ji wan re digot: “Heger hûn xelkê bi ser min de bişînin, ez ê vî mal û milkî li ser wan jî belav bikim. Piştî demekê ji çar hêlên dinyayê xelk bi ser de bariyan û di nava bîst salan de abadaniyeke mezin li gravê çêbû, tijî xelk bû, ew jî bû mîrê wê giravê. Kê berê xwe bida wî, misoger qencyek pê dikir. Her ku diçû nav û dengê wî jî li dinyayê belav dibû û xelkê ew qencyên wî dibihîstin.

Vêca kurê wî yê mezin, ketibû ber destê zilamekî ku ew fêrî sinc û zanîn û edebê kiribû. Kurê wî yê din jî, li cem mirovekî din mezin bûbû, li ser terbiyeyeke baş û fêrî ilm û îrfanê bûbû, li gel zanîna ticaret û kîrîn û firotinê. Jina wî jî ketibû ba tacirekî ku ew kiribû ewlekara mal û milkê xwe û soz pê re dabû ku bêbextiyê pê re neke û alîkariya wê bike di jiyanê li ser rêya rast de û her car ew bi xwe re dibir û tanî di keştiyên ticaretê yên barkirî de.

Îcar gava kurê wî yê mezin nav û dengê mîrê giravê bihîst -ku nizanibû ew bavê wî ye- xwe lê girt û çû cem. Gava derbasî cem mîr bû, mîr lê xwedî derket, ew kir ewlekarê razên xwe, li cem xwe girt û ew kir katibê xwe.

Kurê wî yê dîtir jî çawa nav û dengê wî bihîst, ji xwe re got: “A baş ew e ku ez herim vê girava ku mîrê wê ew qasî dadhez û xêrxwaz e.” Û berê xwe da cem wî, bêyî ku bizanibe ew kî ye. Ew jî ket xîzmeta mîr û li cem wî şixulî.

Tacirê ku jina wî li cem bû jî, nav û dengê wî bihîst, bê çiqasî mîrekî dadhez û xêrxwazê gelê xwe ye, rabû jê re kincin giranbuha amede kirin, hinek ‘entîke û tiştên biqîmet jî dan ber, ew û jinik li keştiyekê siwar bûn û berê xwe dan giravê. Keştiya xwe li benderekê sekinandin û çûn cem mîrê dadhez û diyariyên xwe pêşkêşî wî kirin. Mîr li diyariyan nêrî, pê kêfxweş bû, ferman da xizmetkarên xwe ku xelatekê bidin tacir. Piştî jê xwest ku tacir wan diyariyên xwe yeko yeko jê re bide nasîn û bi taybetî jî dermanên ku di nav de hebûn.

Di dawiya guftûgoya xwe de, mîr ji tacir re got: “Îşev li cem me be.”

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 479’EMÎN

Şehrezadê got:

Gava mîr ew vexwend, wê şevê man li cem wî, tacir got: “Wele jineke salih û ewliya di keştiya min de ye, ku bi saya serê wê Xwedê Teala ev xêr û bêr bi ser min de barandine û ez naxwazim wê bi tenê di wir de bihêlim, bê parastin. Lewre min soz daye wê, ku ewlehiya wê nespêrim kEsekî din.”

Mîr got: “Ez ê kesin dilsoz bişînim keştiya te, ji bo ku parastina wê bikin û îşev li cem wê bimînin.”

Tacir daweta wî qebûl kir û li cem ma. Mîr jî, katibê xwe û alîkarê xwe yê nû şandin keştiya tacir û ji wan re got: “Keştiyê baş biparêzin, wê xwediyê wê îro li cem me be!”

Herduyan berê xwe dan benderê û çûn ser keştiya tacir, yek ji wan li ser pêşiya wê, yê din jî li ser paşiya wê rûniştin û dest bi nobedariya xwe kirin. Piştî ku hinek ji şevê bihurî, guftûgoyên wan kûr bûn û derdên xwe bi hev re parve kirin. Wê gavê yekî ji wan ji yê din re got: “Ezmûna min a ku Xwedê ez tê re derbas kirim, pir giran bû. Lewre ez ji dê û bav û birayê xwe veqetandim, di temenê zarokatiyê de; ew roj baş tê bîra min, em giş li keştiyekê siwar bûn û berê me ketibû welatekî dûr. Lê di rê de ba li me rabû, pêlên behrê rabûn, keştiya me ji hev ket, em ji hev belav bûn.”

Gava yê dîtir ev serpêhatiya wî bihst, jê pirsî û got: “Û navê diya te çi bû?” Wî got: “Filankesê bû.” Pirsaxwe berdeyam kir û got: “Navê bavê te çi bû?” Wî got: “Filankeso bû.” Çawa ku navê bavê xwe bihîst, tê derxist ku ew birayê wî ye, hema xwe bi ser de avêt, ew himbêz kir û jê re got: “Bi navê Xwedê tu birayê min î!”

Pîştî, herduyan gili û gazinên xwe ji hev kirin û serpêhatiyên xwe yên zarokatiyê, bi hûrgilî ji hev re rave kirin û diya wan jî, li jêr, li wan guhdar dikir. Lê dîsa jî xwe girt û deng nekir, her tişt di nava xwe de girt. Gava bû sibe, birayekî ji yê din re got: “Ka em herin mala min, li wê derê em ê çîroka jiyana xwe bi hûrgilî pev re behr bikin.” Herdu rabûn, çûn û bi çûna wan re jî tacirê ku di mêvantiya mîr de mabû, vegeriya keştiya xwe û hat, dît ku jinik me’dedayî ye û di kul û kederan de ye. Je re got: “Çi bi te hatiye, xêr e îşelah?” Jinikê got: “Te îşev hinek şandibûn cem min ku xerabiya min dixwestin, xemgîniya min ji ber wê ye.”

Tacir hêrs bû û di cî de berê xwe da cem mîr, lê vegeriya û çû bûyer jê re vegot, ew agahdar kir. Mîr jî hêrs bû bi vê agahiyê, lewre ji herduyan jî pir hez dikir û li wan ewle dibû. Di cîh de gazî wan kir û lêpîrsîn bi wan re kir. Gava ku dilsozî û ewlehî di wan de dît, ferman da, got: “Herin wê jinikê bînin vir, da ku bi wan re rû bi rû bibe û kiryarên wan di rûyê wan de bîne ziman.” Xizmetkaran çûn jinik anîn diwanê. Mîr jê re got: “Xatûnê te çi xerabî dîtiye ji van herdu camêran?” Jinikê got: “Mîrê gewre, ez tikan ji te dikim, ku tu fermanê bidî wan, ji bo ku ew tiştên ku şeva borî di nav xwe de axivîbûn, dîsa bînin ziman?” Mîr ji wan re got: “Wê çi gotibe, ji min re dubare bikin, bêyî ku hûn gotinekê tenê ji jê veşêrin.”

Herduyan guftûgoya xwe ya şeva borî, ji serî hetanî binî vegotin. Mîr ji ser textê xwe çeng bû, giriya û xwe bi ser herduyan de avêt, ew himbêz kirin.

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 480'YEMÎN

Şehrezadê got:

Pîştî ku mîr têra xwe herdu maçî kirin û ew himbêz kirin, ji wan re got: “Bi rastî jî hûn herdu jî kurên min in!”

Wê gavê jinekê jî rûpoşa xwe da alî, serçavê xwe vekir û got: “Û ez jî diya wan im!”

Her çar di nava coş û kelecaneke mezin de dîsa gihîştin hev û di nava xêr û xweşî û maldariyê de jiyana xwe berdeyam kirin. Vêca subhan ji wî

re ku kesên salih rizgar dike, ji tengasiyan û piştî salan be ji dîsa wan bi hev şa dike!

Şehrezadê got:

Ev çîroka me ji bi dawî bû. Îca ez ê behsa çîroka Kurê Danyal bikim.

(ÇÎROKA KURÊ DANYAL)

Tê gotin ku di zemanên berê de bi navê Danyal, bijîşk û hekîmekî yewnanî hebû û gelek bende, xizmetkar û suxteyên wî hebûn; hemû li ber destê wî bûn, bi ya wî dikirin û xwe didan ber siya ilm û zanîna wî, pê disitirîn. Lewre wî gelekî dixwest ku warisekî wî hebûya, ji bo ku ilm û marîfeta wî, mal û milkê wî biparasta û li wan xwedî derketa.

Şevêkê ji şevan, gava dîsa li ser wê mijarê diponijî, ket bîra wî ku Xwedayê gewre duayên tobekaran qebûl dike û kesî destvala ji ber deriyê xwe bi şûn de venagerîne; kî jê daxwazan dike, daxwaza wan bi cih dike; bê hesab û bê kîtab xêr û xêratan li ser bendeyên xwe belav dike. Çû hewrayê û wî ji xwe avêt bextê Xwedayê xwe, jê xwest ku kurekî bide wî, da ku li mîrateya wî xwedî derkeve, piştî mirina wî. Piştî vegeriya mala xwe û wê şevê bi jina xwe re raket û jina wî ji wê şevê tov jê girt.”

Li Şehrezadê bû sibê wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 481’EMÎN

Şehrezadê got:

Piştî wê şevê bi çend rojan, Danyalê rêwî, li keştiyekê siwar bû û bi behrê de çû. Lê bi rê de pêlên behrê lê rabûn, keştiya wî şikest, ji hev belav bû, pirtûkên wî giş bi avê de çûn, wî jî xwe bi textekî girt û incex wisa xwe xelas kir. Ji hemû pirtûkên xwe tenê pênc pel xelas kiribûn. Gava vegeriya malê, ew pênc pel jî xistin sindoqekê û deriyê wê li ser wan girt. Di wê navberê de zikê jina wî jî bel bûbû û hemla wê êşkere bûbû. Rojekê Danyal ji jina xwe re got: “Ez wisa his dikim ku mirina min nêzik bûye û wextê çûna min a ji vê dinyaya demkî, ber bi dinyaya ebedî ve nêzik bûye. Tu jî avis î û dibe ku tu kurekî bînî. Vêca heger kurik ji te re çêbû, navê wî bike Hasib Kerîmidîn û terbiyeke baş bide wî, bila xwedîsinc û xwedîregez mezin bibe. Gava ku mezin bû û ji te pirsî, got: Ka bavê min çi mîrate ji min re hiştiye? Tu van her pênc kaxezan bide wî. Heger her pênc pel xwendin û têgihîşt, dê bibe hekîmê herî zana di zemanê xwe de.”

Piştî xatir ji jina xwe xwest û nefesa xwe ya dawîn berda, mir, çû ber

dilovaniya Xwedayê xwe; kes û kûsên wî li ser giriyan, cenazeyê wî şûştin, ew veşartin û şîna wî kişandin. Piştî çend rojekî jî, jîna wî hemla xwe danî û kurikek jê re çêbû, navê wî kir Hasib Kerîmidîn, weke ku mêrê wê wesiya xwe lê kiribû. Piştê gazî falbîn û stêrknasan kir, ji bo ku li bextê wî binêrin û pêşeroja wî jê re diyar bikin. Falbînên stêrknasan piştî ku fala wî vekirin, ji diya wî re gotin: “Xatûncan ev kurê te dê dirêj bijî, lê piştî ku êşeke xerab di zaroktiya xwe de derbas bike. Dema ew astengî derbas kir û pê de, wê bibe hekîm û zanayê dema xwe.” Piştê rabûn ser xwe, derketin çûn.

Diya wî du salan sax şîr dayê û piştê ew ji şîr qut kir. Gava ku temenê wî hat pêncan, diya wî da dibistanê, ji bo ku fêrî ilm û zanînê bibe lê tu tişt fêr nebû. Piştê ew ji dibistane girt û da ber destê hosteyan, ji bo ku fêrî pîşeyekê bibe lê ew jî bêfede derket û fêrî tişteki nebû. Tu kar jî ji destê wî nehatin. Diya wî giriya li ser wê bêşensiya wî û pir xemgîn bû, xelkê jê re got: “Nexwe wî bizewicîne ji bo ku berpirsiyariya jîna xwe bigire û karekî ji xwe re bike.”

Diya wî bi gotina xelkê kir û çû jinek jê re xwest, ew zewicand. Lê demê dirêj di ser re derbas bû û dîsa jî karek nekir. Cîranekî wan bi sotemeniyê û êzingan ve mijûl dibû, hat cem diya wî û jê re got: “Kerekî, werîsekî û bivîrekî ji kurê xwe re bikire, bila bi me re were çiyê, em ê bi hev re êzingan binin, bifiroşin. Bi kêmanî dê mesrefa xwe jê derxe.”

Diya wî pir kêfxweş bû, bi wê pêşniyaza êzingvanan û di cî de çû sûkê, jê re kerek, werîsek û bivîrek kirrî.

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 482'EMÎN

Şehrezadê got:

Dema diya Hasib Kerîmidîn ji sûkê veşariya, bi destê kurê xwe girt ew bir cem êzingvanan û tembiya wî li wan kir, da ku lê miqate bin. Wan jî jê re got: “Qet mereqa kurê xwe meke, dê Xwedê rizqekî ji wî re jî bişîne, lewre ew kurê şêxê me ye.”

Piştê êzingvanan ew bi xwe re birin û berê xwe dan çiyê. Li wê derê, êzingên xwe anîn li sûkê firotin. Roja duduyan, a sisyan, a çaran jî wisa berdewam kirin û debara xwe û iyalên xwe bi wî karî kirin.

Rojekê gava çûn çiyê, baraneke xurt li wan da, mecbûr man ku birevin hundirê şikefteke mezin, ji bo ku xwe ji ber baranê bisitirînin. Di hundirê şikeftê de Hasib Kerîmidîn ji cem wan rabû û çû xwe da kêlekeke ji şikeftê û bi bivîrê xwe li binê şikeftê da, kola. Gava çend bivîr li dîwarê şikeftê da, dît

ku gupegup jê tê, tê derxist ku binê wê vala ye. Loma kolana wir berdewam kir, bi qasî saetekê. Carekê dît ku ji bin axê seramîkeke girover derket û xelemek pêve bû! Kêfa wî pir hat, bi coş qîrîya û gazî hevalên xwe kir, rewş ji wan re diyar kir. Hemû lê kom bûn, seramîka girover î bi xelek dîtî û bi kelecana xwe çeng kirinê, ew ji cihê wê derxistin, dîtî ku deriyek di bin de ye. Gava ew deriyê hanê jî vekirin, bala xwe danê ku bîreke tijî hingiv di bin de ye. Bi şaşwazî li hev nêrîn û gotin: “Bîreke hingiv û divê em herin bajêr, kûz û hin satilan bînin, ji bo ku em hingiv dagirin û bibin bifiroşin. Piştî jî em heqê wî gişî li hev behr bikin. Lê divê yek ji me li vir bimîne li ber hingiv, hetanî ku em herin û werin!” Hasib got: “Ez ê li vir bim, nobedariyê bikim hetanî ku hûn tên.”

Êzingvanan Hasib li wir hiştin û çûn bajêr, kûz û satil anîn, tijî hingiv kirin, ew li ser keran bar kirin û birin li bajêr firotin. Piştî dîsa hatin, careke din dagirtin û dîsa birin li bajêr firotin. Bi wî hawayî çûn û hatin û gelek hingiv firotin. Hasib jî her li ber bîra hingiv nobedarî dikir û li wir dima. Carekê êzingvanan ji hev re got: “Ê ku bîra hingiv dîtiye wê doza heqê wî gişî ji me bike. Wê çaxê xelasiya me jî nabe ji nav lepên wî. A baş ew e ku em berdî binê bîrê, ji bo ku hingivê mayî dagire, piştî em ê deriyê bîrê bi ser de bigirin û herin, da ku em jê xelas bibin.”

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 483'EMÎN

Şehrezadê got:

Êzingvanan gişan li hev kirin li ser wê bêbextiyê û berê xwe dan ser bîra hingiv. Gava gihan wir, ji Hasib re gotin; dakeve bîrê û hingiv dagire! Hasib daket binê bîrê û hingivê ku tê de mabû dagirt û gazî wan kir, got: “Bikişînin!” Piştî axaftina xwe berdewam kir û got: “Êdî hingiv qediya û tiştê mabû, min ew giş dagirt.” Lê ne kesî satila dawîn kişand û ne jî kesî bersîvek dayê. Lewre hemûyan kerê xwe biribûn û vegeriyabûn bajêr. Hasib jî bê navber dikir hewar û digot: “Lahewle wela quwete îlla billah, wisa xwîya dike ku ez ê di vir de bimirim!”

Em Hasib Kerîmidîn li wir bihêlin û em vegerin ser rewşa êzingvanan. Ew jî çawa ku vegeriya bajêr û hingivê xwe firotin, çûn cem diya Hasib û jê re gotin: “Bila serê te sax be, kurê te çû ber dîlovaniya Xwedê!” Diya wî got; “Sebeba wefata wî çi bû?” Gotin; “Me li çiyê êzing dibirin û hew me dît ku baran bi şid dibare. Me xwe avêt şikeftê, ji bo ku em şil nebin. Di wê navberê de hew me dît ku kerê kurê te bi newalê de çû. Wî jî da dû kerê xwe, da ku wî vegerîne. Lê tu nabêjî ku gurekî mezin di newalê de ye. Wî gurî hem kurê te û hem jî kerê wî xwar.”

Gava diya wî ev gotina êzingvanan bihîst, porê xwe kişand, li çogên xwe da û xwelî bi ser serê xwe dakir. Piştî şîna wî jî li dar xist. Êzingvanan jî her roj, xwarin û vexwarin jê re birin, pêdiviyên wê pêk anîn. Ji aliyekî din ve jî, her yekî ji wan ji xwe re dikanek vekirin, caw xistinê, bûn tacir û li kêf û şahiya xwe nêrin.

Em êzingvanan li wir bihêlin û careke din vegerin cem Hasibê di bîrê de. Ew jî bê çare di binê bîrê de mabû, hem digiriya, hem jî li xwe dida. Carekê dît ku dûpişkeke mezin bi ser de ket. Wî jî rabû ew kuşt. Lê paşê hebekî ramiya û ji xwe re got: “Ev bîr tijî hingiv bû, îcar ev dûpişk ji ku derket? Rabû ser xwe, çep û rast li dora xwe zivirî û li cihê ku dûpişk jê ketibû geriya, hetanî kunek dît ku şewqê tê re dida der. Kêra xwe derxist û ew kun fire kir, hetanî ku bi qasî bixêrikekê vekir. Tê re derket ber serdabekê û bi qasî saetekê tê re meşiya, hetanî giha hêwaneke fireh û dirêj. Tê re derbas bû, çû hetanî giha ber deriyekî ku ji hesinê reş bû û xilqeke zîvîn li ber bû, li gel kilîdeke zêrîn. Ber bi derî ve çû, lê nêrî ku şewqeke mezin di qiraxên wî re davêje. Rahişt mifteyê, derî vekir û derbasî aliyê din bû û bi qasî saetekê meşiya, hetanî gihîşt golege avê ku pir mezin bû. Hinekî din bi pêş de çû, nêzî wê bû, dît ku di nava avê de girekî bilind ji zebercedê kesk û mercanan tê de ye û textekî xerîb jî li ser vegirtî ye ku bi gelek cureyên cewheran xemilandi ye.

Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.

ŞEVA 484'EMÎN

Şehrezadê got:

Gava Hasib gihîşt rex textê zêrîn, dît ku dora wî jî kursiyên zîv û zer in, hinek ji wan mercanî bûn. Nêzî wan kursiyên bû û ew jimartin, bala xwe dayê ku dozdeh hezar kursî ne. Çû ser wî textê ku di nava kursiyên de bû, rûnişt û gola derdorê û hemû rêzên wan kursiyên bi heyrangorî temaşe kir, hetanî ku xilmaş bû û di xew re çû.

Qasekê di xew de ma, piştî li ser dengê fizîni û kwîtinî û xirecîreke mezin, bi ser xwe ve hat, ji xew şiyar bû. Li dora xwe nêrî, dît ku li ser her kursiyekê ji wan kursiyên, marekî dirêj bê qasî sed gazî, rûniştî ye. Bêhna wî çikiya û qirika wî zuha bû ji tirsan!

Lewre çavên wan maran mîna kozên agir diçurasandin û vê yekê mirina wî anî bîra wî. Li nav ava golê meyzand, dît ku ew jî tijî marîkên biçûk in, ku ji pîrbûna xwe nayên jimartin.

Piştî saetekê marek ji wan marên mezin ber bi wî ve hat, ku mîna gayekî bû û li ser piştî wî sêniyeke zêr hebû, ku di wê sêniyê de jî marekî biçûk

hebû, mîna qizêzan dibiriqî. Serê wê yê însan bû û bi zimanekî zelal diaxivî. Gava nêzî Hasib Kerîmidîn bû, silavek dayê, wî silava wê girt. Piştî marekî din ji wan marên li ser kursiyan hat û rahişt wê mara camîn a di sênîkê de û ew danî ser kursiyekê ji wan kursiyan. Piştî bi zimanê xwe axivî û bi ser marên mayîn de qîriya, hemû ji wir derxistin, kursiyên xwe vala kirin. Piştî li ya din zivirî û ew da rûniştandin û di pey re ji Hasib re got: “Ji me netirse ey xortê bedew! Ez şahbanûya maran im.” Gava ku Hasib ev gotin ji devê wê bihîstin, dilê wî hebekî aram bû. Piştî mara ku gotibû ez şahbanû me, ji xizmetkarên xwe xwest ku hinek xwarin bin. Ew jî çûn, hinek sêv, tirî, fisteq, bindeq, gwîz, behîv, xurme û mûz anîn, danîn ber Hasib Kerîmidîn. Piştî şahbanûyê jê re got: “Tu bi xêr hatî, ser çavan hatî xortê hêja! Gelo navê te çi ye?” Wî got: “Navê min Hasib Kerîmidîn e.” Şahbanûyê got: “Hasibê delal, ka ji van fêkiyan hinekî bixwe, lewre ji van pê ve tu xwarin li ba me tune ye. Aram be û qet ji me netirse!”

Dema ku Hasib ev gotin ji şahbanûyê bihîst, bi dilekî rihet ji wan fêkiyan xwar, hetanî ku têr bû. Marên xizmetkar, sêniya fêkiyên mayî ji ber wî rakirin. Şahbanûyê got: “Hasib ka ji min re bibêje, bê tu kî yî, çi bi serê te hatiye û tu ji ku hatiyî vir?”

Hasib, ta bi derziyê vekir û serpêhatiya xwe ji serî hetanî binî jê re vegot: Çi bi serê bavê wî de hatibû, çawa ji diya xwe re çêbûbû û hîna di pênc saliya xwe de çawa diya wî ew dabû dibistanê û ew fêrî tu tiştî nebûbû; çawa ew dabû ber destê pişesazan û dîsa fêrî tu tiştî nebûbû û çawa diya wî kerek jê re kiribû ji bo ku êzingvaniyê pê bike; piştî çawa wî bîra hingiv dîtibû û çawa hevalên wî ew avêtibûn binê bîrê û çûbûn; çawa dûpişk bi ser de ketibû û çawa di rêya wî re ji bîrê derketibû. Piştî rathatina deriyê hesinî û vekirina wî û dawiyê ji hatina wî ya cem wan, hemû gav bi gav jê re vegot.

Gava ku şahbanûyê lê guhdar kir, jê re got: “Aram be, tenê xêr û xweşî li pêşiya te ye, ne tişteki din.

Li Şehrezadê bû sibe, wê ji gotina xwe birrî û bêdeng bû.

PÊVEK

**JI KITÊBA 1'EMÎN - HEZAR Ê YEK ŞEV
(CILD 1-2-3-4)**

NAVEROK

PÊŞGOTINA WERGÊR

Wergerên Pirtûkê û Şêweya Wan

Hezar û Yek Şev

Nivîskarê Pirtûkê Kî Ye?

Dema Pirtûkê û Navê Wê

Qalibê Pirtûkê

JI WEŞAXANEYA AZAD

HEZAR Û YEK ŞEV-CILD 1

ÇÎROKA MELÎK ŞEHRIYAR Û BIRÊ WÎ ŞAHZEMAN

(ÇÎROKA YÊ TACIR Û CINÎ)

(Çîroka Şêxê Yekemîn û Xezala Wî)

(Çîroka Şêxê Duyemîn û Du Tajiyên Wî)

(Çîroka Şêxê Sêyemîn û Hespa Wî)

(ÇÎROKA MASÎGIR Û EFRÎT)

(Çîroka Melîk Yûnan û Dûbanê Hekîm)

(Çîroka Melîk Sendîbad û Bazê Wî)

(Çîroka Kurê Melîk û Pirebokê)

(Çîroka Xortê Nivkevîrî û Masiyên Rengo Rengo)

(ÇÎROKA HEMAL Û SÊ KEÇAN)

(Çîroka Sakûleyê Yekemîn)

(Çîroka Sakûleyê Duyemîn)

(Çîroka Sakûleyê Sisyan)

(Çîroka Keçîka Ciwan ya Yekemîn)

(Çiroka Keçika Ciwan ya Duyemîn)
(ÇÎROKA KEÇA KUŞTÎ)
(Çiroka Şemseddîn Wezîrê Misrê û Nûreddînê Wezîrê Besrayê)

HEZAR Û YEK ŞEV-CILD 2

(ÇÎROKA TERZÎ Û XÛZO Û YÊ CIHÛ Û YÊ FILEH)

(Çiroka Simsarê File)
(Çiroka Seraşpêjê Şah)
(Çiroka Hekîmê Yahûdî)
(Çiroka Terzî)
(Çiroka Xortê Qop)
(Çiroka Berber)
(Çiroka Birayê Berber yê bi navê Beqbûq)
(Çiroka Birayê Berber yê bi Navê He-jar)
(Çiroka Birayê Berber yê bi navê Beqbeq)
(Çiroka Birayê Berber yê bi navê Kûz)
(Çiroka Birayê Berber yê bi navê Neş-şar)
(Çiroka Birayê Berber yê bi navê Şeqliq)

(ÇÎROKA HERDU WEZÎRAN Û WENSKARA CIVAKÊ)

(ÇÎROKA EYYÛB Û KURÊ WÎ GANIM Û KEÇA WÎ FITNE)

(Çiroka Reşîkê Xesandî yê Yekemîn ji Sûdanê)
(Çiroka Reşîkê Xesandî yê Duyemîn ji Sûdanê)

HEZAR Û YEK ŞEV-CILD 3

(ÇÎROKA OMER EN-NÛMAN Û HERDU KURÊN WÎ ŞERKER Û
ŞEWQA MEKAN)

HEZAR Û YEK ŞEV-CILD 4

(Çiroka Taca Mulûkan û Ezîzê Ciwan)
(Çiroka Taca Mulûkan û Dunya Xatûn)
(Çiroka Şewqa Mekan û Dorpêça Qostantîniye)

(Çîroka Hebû Tunebû û Qeza Bû)

(Çîroka Efyonkêş)

(Çîroka Hemmadê Bedewî)

(ÇÎROKA TEYR Û TILÛRAN BÎ ÎNSANAN RE)

(ÇÎROKA ŞÎVAN Û ABID)

(ÇÎROKA TEYRÊ AVÊ Û KÎSO)

(ÇÎROKA ROVÎ Û GUR)

(ÇÎROKA MIŞK Û SÎNCAB)

(ÇÎROKA KITIK Û QIJAKÊ)

(ÇÎROKA ROVÎ Û QIJAKÊ)

PÊŞGOTINA WERGÊR

Di dîroka wêjeya cîhanê de heger mirov her sê pirtûkên olî yên pîroz (Qur'an, Încil û Tewrat) derveyî mijarê bigire, yekemîn pirtûkên ku di cîhanê tevî de belav bûye "Hezar û Yek Şev" e. A herî pir bela bûye, ya ku wergerî hema hema hemû zimanan bûye û ya ku bandora herî mezin li ser civatê kiriye jî ev pirtûk e. Yê ku hiştiye wisa bibe jî, piralibûna vê pirtûkê ye. Li gorî mijarê, li gorî cûreyên nave-rokên çîrokên pirtûkê, li gorî tîpên qehreman û lehengên çîrokê û statûya wan î civatî û taybetmendiyên dem û devera wê civatê, mirov lêkolîn bike, mirov dê baş têbigihêje sedema vê bandora wê yî mezin û fireh li ser wêjevan, helbestkar, hunermend, rêvebir, siyasetmedar û hemû avahiyên kesayeta civatî. Belavbûna vê pirtûkê, bi vî şiklê fireh li temamê cîhanê jî, vê yekê piştrast dike.

Her berhemek wêjeyî hewceyî danasînê ye. Bi kêmanî di nav de-ver û kesên ku ew berhem nexwendibin, ev pêdivî heye. Lê ev ber-hema "Hezar û Yek Şev" ku bi Erebi jê re dibêjin "Elf Lêyle we Lêyle" qet ne bi hewceyî danasînê ye ji vê hêlê ve. Lew kesên ku navên wê nebihîstine tunene di nav mîrovên xwende de. Heta piraniya mirovê nexwende jî ev nav bihistine. Bêyî ku reklama wê bê kirin herkesî bihistiye. Lê belê li ser nivîskarê vê pirtûkê, li ser dema nivîsandina wê, li ser dîroka wê û gihaştina wê ya roja îro mirov dikare gelek tiş-tan bêje, lew gelek xalên ne diyar di pirtûkê de hene ji vê hêlê ve.

Lêkolîn, lêgerîn û lêhûrbûnên ku li ser vê pirtûkê hatine kirin, bê hed û bê hesab in. Her lêkolînerê jî tişteki cûda dibêje di derheqê dem û dewra wê, di derheqê nivîskar û nivîsa wê de. Lê hemû li gel van cûdatiyên wan jî, di hinek mijaran de dibin yek. Yekemîn, ev pirtûka ku di Serdemên Navîn de hatiye nivîsandin, ne ji qîbel nivîskarekî tenê ve hatiye nivîsandin. Cûdabûna ziman û şêweyê di navbera çîrokan de, ji hev dûrbûna cih û demên ku di mijaran de der-bas dibin, vê yekê bi zelalî piştrast dikin.

Duwemîn; mijar, naverok, navên cih û deveran, navên şah û xelîfe û mîr û emîrên ku tê de derbas dibin, xweş diyar dike ku ev berhem hemû ne di wextekê de hatiye nivîsandin û ne jî li deverekê tenê. Pirtûk mîna mirovekî gerok, li gelek welatan geriyaye mîna se-yahekî, li her derê jî hinan tiştin lê zêde kirine. Ne tenê çîrokin din, 'urf û adetên xwe jî lê zêde kirine. Loma mirov kesên pirrengî tê de dibîne; Erebi, Faris, Çînî, Kurd, Tirk, Musulman, Fileh, Cuhû, Mecûsî û hema ji her rengî insan tê de hene.

WERGERÊN PIRTÛKÊ Û ŞÊWEYA WAN

Gelek mirovan, bi gelek şêweyan ev pirtûk wergerandine zimanê xwe. Gelekan jê jî pir pê listine. Li gora xwe cihên jê derxistine, li gora xwe sere-rast kirine, cihên beşên wê veguhestine, kêmkirine, zêdekirine. Nivîsa wê ya orijînal bi Erebi ye û gelek helbestên klasîk yên bi wezîn tê de hene. Wergereke

Frensi baş û Îngilizî heye. Piraniya wer-gerên zimanên din jî ji wan herdu wer-gerên Frensi û Îngilizî ne, ne ji ya orjînal in. Wergerê Tirkî jî ji ber ya Frensi hatiye çêkirin. Yê min ez ê vê wergera Kurdî ji ber orjînala wê ya Erebi bigirim. Ev nîsxeya ku di destê min de, li Qahireyê hatiye çapkirin. Min li wergerên zimanên din meyzand, hema bêje tevan beşên helbestî ji pirtûkê, bê wezin wergerandine û ji qalibê wê yî klasîkî derxistine. Gelek ji wan helbes-tan jî bê wate û bê aheng bûne piştî wergerê. Min hewl da ku ez wan qalibên helbesta klasîk ji Erebi derbasî Kurdî bikim, lew helbesta klasîk ya Kurdî jî ne kêmî ya Erebi ye. Çêjeke dîrokî jî çêja Serdemên Navîn dide nivîsê ku bi raya min, divê mirov li wê jî mîqate be û wê tenê weke qalibekî şematîk nebîne.

Hinekan sererastkirina pirtûkê û cildên wê li gora mijaran çêki-rine. Yê min min ew li gora hejmara şevan daye berhevkirin. Dabeşki-rina wê li gorî hejmara şevan çêkiriye, lê belê li gor çîrok û mijaran jî min serenav dane navbera wan.

Em dîsa vegerin ser hêman, nav û danasîna vê pirtûka dîrokî û bi çend gotinan be jî, li gorî nerîna xwe, çend mijaran vebêjin dê baş be.

HEZAR Û YEK ŞEV

Ya rastî navê wê tenê têra danasîna wê dike. Belavbûna vê ber-hemê li çar hêlên cihanê û daxwaza hemû weşanxaneyan di belakirina wê de li hemû paytextên welatan û pîrbûna wergeran, bi taybetî jî wergera Frensi û ya Îngilizî vê yekê baş didine xwiyakirin.

“Hezar û Yek Şev” Çi Ye?

Pirtûkek herî balkêş e ji pirtûkên wêjeyê yên Serdema Navîn di Rojhilata Navîn de ku di wê demê de paytexta wêjeya cihanê bû, çi bi zimanê Erebi û Farişi be, çi bi zimanê Kurdî be. Di vê pirtûkê de çîrokên reng bi reng ên ku adet û jiyana û çanda civatî ya di wê demê de hene.

Çîrok û agahiyên di derheqê şah û mîr û mîrekên wan demên kevn de, zarokên melîkan, wezîrên wan, sultanên navdar, mirovên ji rêzê, ên ins, ên cîn, diz û kujer û xaper û bêbextên wê serdemê, abid û mele û şêx, tacir û bijîşk û gerok, jînepîr, kalepîr, xort û keç û zarok û hemû rengên mirovan ya di wê civata wê çaxê de anîne ziman û aga-hiyên pir hêja di derheqê jiyana civatî û siyasî û ehlaqî ya wê serdemê di komeke çîrok de aniye ziman. Tu rengên civatî jibîr nekiriye. Biaqil, dîn, aşiq û evîndar, hakim û serdestên zalim, ên dadwir, durûtiya mi-rovan û hezkirina paşgotin û qalûqurtê.

Ji aliyekî din ve di van çîrokan de hemû rengên kesayeta jinan jî hene. Şahbanû, qiralîçe, dayikên dilbirehm, jinên pir biaqil, ên zana, ên fasiq, ên şer-mût, ên sahir, ên pîr, ên ciwan û dilpak.

Di sa gelek agahî hene di derheqê ajalan de, jiyana ajalan de, xwedîkirin û fêdeyên wana. Çîrokên welatan ên ecêb, çîrokên bajaran, ên çîyan, ên deriyan, ên deştan, ên newalan, ên daristanan, ên mixaran, ên gundan, serayan û ba-

jarên efsûnî ku pêçayîne di nava xewn û xeyalên zêrîn de.

Ev avahiya ecêb û balkêş ji rengan, mirovan, ajalan, qesr û qonaxan, ins û cinan tenê tiştekî destnîşan dike, hêz û qeweta wêjeyê û xeyalê mirovahiyê.

NIVÎSKARÊ PIRTÛKÊ KÎ YE?

Di vî warî de jî pir çîrok û rîwayet hene. Berhemeke evqasî bal-dar, evqasî tijî efsûn û xeyal û aqil û dînbûn û jiyan û xuluqkarî, ne gengaz e ku ji serê mirovekî tenê derketibe. Fîkr û xeyalên mirovekî bi tenê nikare bêrhomeke evqasî kûr û fireh û baldar derxîne holê, mirov nikare vê yekê bawer bike, ji xwe lêkolîner û wêjevannas jî vê yekê qebûl dikin. Dibêjin, nivîskarekî vê pirtûkê nîne, yekî bi tenê nîne û nehatiye zanin jî. Ku ew wîlo be, vêca em ê çawa bizanibin ku ew berhem nehatiye guhertin û gelek tiştên qelp neketine nav de? Em ê çawa bikaribin vê yekitiya wê yî wêjeyî a naverok û rista wê yî çîrokî qebûl bikin?

Hineke wêjenas; tevî ku qebûl dikin eslê pirtûkê Farisî ye, dibêjin; nivîskarê “HEZAR Û YEK ŞEV” ê ne yek tenê ye. Lî gorî Mu-hammed Bîn Îshaq; ev bi Ebû Abdullah Muhammed Îbnû Abdes El Gehşiyarî; xwedîye pirtûka “WEZÎRAN” dest pê kiriye. Vî zîlamî gelek dengbêj û çîrokbêj li xwe kom kirine, yek bi yek li wana guhdar kiriye û çîrokên herî balkêş, pêkenokên herî xweş ji nav hîlbijartine û pirtûkeke bi navê “Hezar Henek Şev Ji Henek Şevên Erebb û Ecem û Rûman û yên din de” civandine. Beş bi beş nivîsandîye bîyî ku girêdanekê di nava wan de çêbike. Nivîskar di vê xebata xwe de jî gelek pirtûkên pêkenokan jî (yên wî çaxî) sûd wergirtiye û bi wî hawî çarsed û heştê henekşev (an jî çawa ku têde gotin şevîn) komî ser-hev kiriye. Her şevînek jî derdora pêncî rûpelî pêk hatiye. Lê belê nivîskar zû miriye temenê wî têrê nekiriye ku hezar şevînan binivîse.

Hinek lêkolîner û dîroknasên wêjeyê dibêjin; xwedêgiravî eslê pirtûkê Hindî ye, lê belê keda Faris û Ereban jî tê de heye.

Lê çawa bibe bela bibe, tu kes nikare bibêje ku “Hezar û Yek Şev” berhema şexsekî bi tenê ye. Bêgûman ev berhem Rojhilatî ye, ji gelek çîrok û dîrîkên gelerî hatiye berhevkirin. Her nivîskarekî, her çîrokbêjekî tiştek lê zêde kiriye, çêjek jî çêja civata xwe avêtiye nav û ew dewlemendtir kiriye, hetanî ku gîhaye ev qalibê niha di nav destê me de ye.

DEMA PIRTÛKÊ Û NAVÊ WÊ

Di vê mijarê de jî nerîn û lêkolînên cûda cûda hene, lê belê pira-niya lêkolîner û lêhûrîneran dibêjin ku “Hezar û Yek Şev” di navbera qîrnê sêzdehan û yê çardehan de hatiye nivîsandin. Ev jî li gorî bûyer û der û deverên ku di pirtûkê de derbas dibin hatiye tespîtkirin.

Lêkolîner û wêjenas li ser dîroka pexşana pirtûkê û belavbûna wêyî di nav gel de jî li hevdu nakin, ji ber ku di pirtûkê de behsa qehwê û tûtînê qet nayê kirin ku ev herdu jî berî qîrnê panzdehan nehatine nasîn, nakokiyekê derdixê di vî warî de. Hinek wêjenas jî dibêjin, ne dîrî aqilane ku di her demekê de tiştekî

nuh li vê pirtûkê hatibe zêdekirin û hin bi hin gîhabe vî şiklê niha.

Hinek ji dibêjin, ev pirtûka han di dema KELÎLA Û DUMNA de ha-tiye nivîsandin. Dibêjin, şeweya nivîsê ya basît û herikbar vî tiştî dide diyarkirin. Şeweyeke dûrî asêbûnên edebî ku herkes baş jê fem dike û jê kêfxweş dibe.

Navê pirtûkê qet nehatiye zanîn. Belbî nehatiye bîra kesî ji nivîskaran an ji ew mirovên ku çîrok lê zedê kirine ku li ser nav bise-kinin. Lê belê dîsa ji tê gotin ku navê pirtûkê di dema ewil de “Hezar Efsane” bûye ku ev nav di zimanê Farisî de, di yê Kurdî de jî têtê xebe-tandin. Ev jî tê vê wateyê ku nivîskarên pirtûkê ên ewilî Kurd û Faris bûne lê niha ji pirtûkê re dibêjin “HEZAR Û YEK ŞEV”. Vêca xelkê çima navê vê pirtûkê ji “HEZAR EFSANE”yê qulipandin “ELF LÊYLE” (ku ev tê maneya “Hezar Şev”î) û ji wê jî qulipandin “ELF LÊYLE WE LÊYLE” (ku ev tê wateya “Hezar û Yek Şev”ê) em nizanin. Belkî jî evên ku navê pirtûkê bi wî hawî guherandine, xwestine ku pirtûk ji efsaneya Şehrezadê piştrast bikin.

QALIBÊ PIRTÛKÊ

Qalibê pirtûkê çîrokî ye pir xweş e, sivik e, herikbar e û dûrî tev-liheviyê ye. Heta ku tê de gotin xwerû û vekirî ye. Zimanê wê jî sivik û gelerî ye. Herkes jê fêr dike û tamê jê distîne, bêtî ku zehmetiye di fêmkirinê de bikişînin û bera dûv wateyên veşartî bidin. Lê di dema xwendinê de mirov di cî de tê derdixe ku ne ji qîbel nivîskarekî tenê ve hatiye nivîsandin; ji ber ku carinan herikbar, xweş û lezgîn e, car-nan jî giran û kellê ye. Çîrokek mirov dorpêç dike bi şeweya nivîsa xwe, ya li dûv mirov bêhteng dike. Yanî ev cûdabûna di navbera çîrokan de zelal e û xweş dide xuyakirin ku bi gelek destan hatiye nivîsandin, her yekî jî şopeke xwe tê de hiştiye.

Lê belê uslûbê ku pirtûk pê hatiye nivîsandin gelerî ye û pir xweş û sivik e. Yê ku hiştiye ev pirtûk bi lez di nav gel de belav bibe jî ev e. Belavbûna wê bi vê firehbûnê rastiya vê şeweya nivîsandina wê diyar dike.

Ez hêvîdarim ku em ê karîbin cewherê vê pirtûkê tev li hemû hîmen edebî bi serkeftinî wergerînin Kurdî û bigihînin xwendevanên zimanê Kurdî. Tu xebatê kêmanî jî nabe, lewra ez baş dizanim ku dê kêmaniyên min jî hebin, tew di xebateke wiha giran de; ji vî alî de jî ez bexşandina xwe dixwazim.

27ê Mijdarê 2009

Menaf Osman / Girtîgeha Semsûrê

JI WEŞANXANEYA AZAD

Kitêba “Hezar û Yek Şev”ê, wek ku wergêr Menaf Osman nivîsiye yek ji kitêbê herî navdar yê dinyayê ye û wergerî gelek zimanan bûye. Cara ewil di serê sedsala 18’an de ji aliyê Antoine Galland ve, di dawiya sedsala 19’an û destpêka sedsala 20’an de ji aliyê Joseph Charles Mardrus ve wergerên Frensî bûne. Di heman demê de di sedsala 19’an de wergerên Îngilizî, Rûsî, Îspanyolî ji hatine kirin û li Ewrûpa tevî belav bûne. Hin wergêr di çîrokan de guhertin kirine, hin jê ji bêyî ku tu guhertina bikin werger kirine. Hîn ji li her derê dinyayê çapê nuh têne derxistin, axilbe ji bo zarokan bi şeweyên cuda cuda têne amadekirin û bi baldarî têne xwendin.

Çîrokên “Hezar û Yek Şev” ê ji alî fikir û sinet de gelek tesîr li dinyayê tevî kiriye. Bûye kanî û bingeh ji gelek mijarên roman, tîyat-ro, muzîk û filmê sinemaya. Gelek nivîskarên navdar, sûd ji vê ber-hemê girtine. Mirov kare bêje, tu berhem di dinyayê de bi qasî Çîrokên Hezar û Yek Şevê tesîr li sinet, edebiyat, sînema, tîatro û hwd. neki-riye. Hîn ji navê lehengê wan li deran tê kirin û dibin navê merqeyan, resmê ku wan temsîl dikin li ser gelek cihan û amûran cih digre. Yanî tesîr li hemû aliyê jiyanê kiriye; li jiyana civakî, li zarokan, li polîtîkayê, li edebiyatê, li tiyatroyê, li sinemayê...

Ev berhema bi Erebi ji aliyê kê ve û kengî hatiye nivîsandin ne zelal e, lê xweş tê zanîn ku xwediyê vê berhemê civata Rojhilata Navîn e, danheva çîrok û destan û efsaneyên vê civatê ne, bi demê re li her herêmekê lêzê-dekirin hatine kirin û ji aliyê zanayên mijarê ve fikara herî li pêş ew e ku bingeha vê berhemê kitêba Îraniyan ya bi navê “Hezar Efsane” ye. Berhema Ebu Hasan el Mesudi ya bi navê Muruf el Dehab we Maadin el-Cawahîr ya sedsala 9’an û berhema Muhammed bin Îshak en-Nedîm ya bi navê Kitâbul Fihrist ya sedsala 10’an vêna piştrast dikin.

Yek ji kaniya vê kitêbê welatê Kurdistan e û şopê kultura Kurdistan rasterast xwe di çîrokan de dide der. Li gel ku hîn ji hin ji van çîrokan di nav gel de têne gotin û di şevbuhêrkên berê de cihekî girîng digirtin, mixabin wek nivîskî ev kitêb bi tevahî hîn ji bi Kurdî nahetiye çapki-rin. Li gor ku min hebekî lêkola heya niha wergerê Kurdî yê bi tîpên Latînî ya vê kitêbê ev in: Wergera ji Swêdî Serdar Roşan, cild 1, Weşanxaneya Nûdem, Stockholm, 1998. Hesenê Bazirgan (Ji Çîrokên Hezar û Şevêkê), Weşanxaneya Nîl, Stenbol, 2012. Hinek ji Çîrokên Hezar û Şevêkê, Wergêr Abdulkadir Ulumaskan, Yekîtiya Mamos-teyên Kurd li Almanyayê, 2013.

Em jî, wek Weşanxaneya Azad, di vê gava ewil de 4 cilda bi hev re di yek kitêbê de diweşînin. Menaf Osman ev kitêb ji Erebi wergerî Kurdî kiriye û tu guhertin tê de nekiriye. Wek ku tê zanîn wergerên ji zimanê ber-

hemê bixwe her çêtir e ji yê ku wergera wergerê be. Menaf Osman wergera cilda yekemîn di sala 2009'an de li Girtîgeha Semsûrê qedandiye, bi dû de li gel gelek xebatê xwe yê din, wergera cildê din yê Hezar û Yek Şevê berdewam kiriye. Heya niha wergera 4 cildan xediyaye û hewl dide ku cildên din jî wergerîne. Ji ber ku wergêr li Tirkî di girtîgehê de ye, mixabin îmkana me û hevdîtîne, îmkana me û bi hev re lêhûrbûna li ser xebatê Menaf Os-man bi dest me nakeve. Dema redaksiyonê min wergera Kurmancî ya Serdar Roşan û wergerên Tirkî di ber çavan re derbas kirin, min ev xebat û wergerên ku min behs kir li ber hev xistin û bi hin rastkirinên biçûk ev şiklê dawî stend. Bi navê Weşanxaneya Azad, ji bo vê xebata pir hêja, ji bo ev berhema bêhempa wergerandiye Kurmancî ez gelekî spasî Menaf Osman dikim û ez hêvî dikim karibe wergera cildên din jî biqedîne.

Gerînendeya Weşanxaneya Azad

Eslîxan Yildirim